

# Pirtûkên Zimanê Kurdî

## NAVEROK


ZIMANÊ KURDÎ

ZIMANÊ KURDÎ01

ZIMANÊ KURDÎ02

ZIMANÊ KURDÎ03

ZIMANÊ KURDÎ04

ZIMANÊ KURDÎ05

ZIMANÊ KURDÎ06

ZIMANÊ KURDÎ07

ZIMANÊ KURDÎ08

ZIMANÊ KURDÎ09

ZIMANÊ KURDÎ10

ZIMANÊ KURDÎ11

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ07

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ08

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ09

WÊJEYA KURDÎ

WÊJEYA KURDÎ10

WÊJEYA KURDÎ11

WÊJEYA KURDÎ12

# ZIMANÊ KURDÎ

## ZIMANÊ KURDÎ01

# ZIMANÊ KURDÎ

## SERETAYÎ 1

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Ziman ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**



NAVEROK


BEŞA YEKEM 9

MALBATA ZOZANÊ 10

EZ Û MALBATA XWE 11

MALA MIN A PAQIJ 17

DAYIK 22

HEVKARÎ 27

DAPÎRA MIN 33

RÊZGIRTIN DI MALBATÊ DE 38

BEŞA DUYEM 43

ÇÛNA DIBISTANÊ 44

DI REFÊ DE 50

PIRTÛKAXANEYA DIBISTANÊ 55

GOG 60

GULÎSTAN 66

MAMOSTE 72

BEŞA SÊYEM 77

XALXALOK ______ 78

DEMSAL ______ 84

ZOZAN ______ 91

ÇIYAYÊN ME ______ 96

HÊLÎN ______ 102

MÊWE ______ 107

LEGLEG ______ 112

## BEŞA ÇAREM ______ 117

WELATÊ ME ______ 118

NEWROZ ______ 123

ZIMANÊ ME ŞÎRÎNE ______ 129

ÇANDA ME ______ 134

BERHEM Û XWEZA ______ 139

ŞÛNWARÊN ME ______ 144

## BEŞA PÊNCEM ______ 149

PALEYÎ ______ 150

FIROŞKAR ______ 156

TEŞÎRÊS ______ 162

COTKAR ____________________________________________167

MÛRÎ_______________________________________________172

KARÊ SERKEFTÎ ______________________________________177

# BEŞA YEKEM

1- MALBATA ZOZANÊ

2- MALA MIN A PAQIJ

3- DAYÎK

4- HEVKARÎ

5- DAPÎRA MIN

6- RÊZGIRTIN DI MALBATÊ DE

**TÎPÊN KU EM DÊ DI VÊ BEŞÊ DE FÊR BIBIN**

A- K- R- E- I- B

## WANEYA YEKEM

# MALBATA ZOZANÊ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Endamên malbata Zozanê kî ne?

**2-** Ez jî navên endamên malbata xwe bibêjim.



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# EZ Û MALBATA XWE

Navê min Zozan e.
Navê dayîka min Mahabad e.
Navê bavê min Zana ye.
Navê birayê min Amed e.



**Zana** | **Zozan** | **Amed** | **Mahabad**

# Tîpa "Aa" yê

Tîpa "**Aa**"yê ya mezin: **A**

Tîpa "**Aa**"yê ya biçûk: **a**

**- Tîpa "Aa"yê di nava gotinan de:**

Dayîk – Mahebad - Bav - Zana - Bira - Amed - Zozan

## - Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Aa"yê di sirûdê de:




Awaz wek bilûra şivanan


Biçûka dengbêj û hozanan

Mîna stêrka li asîmanan

## - Em awayê xêzkirina tîpa "Aa"yê nas bikin:



## - Em bi hev re tîpa"Aa"yê xêz bikin:




## - Em tîpa"Aa"yê rengîn bikin:





# HÎNDARÎ

**1- Em giroverekê li derdora tîpa "Aa"yê xêz bikin:**

**Ê - o - a - h - M - v - A - y - E**

**2- Em navê guncaw bigihînin wêneyê:**

**Zozan Zana Amed Mahabad**



**3- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Masî



Av



Çiya



# WANEYA DUYEM

# MALA MIN A PAQIJ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Hûn mala xwe paqij dikin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# MALA MIN A PAQIJ



**Kawa:** Ger em mala xwe paqij nekin, em dê di nav qirêjiyê de bimînin.

**Ronak:** Rast e Kawa, her wiha, em dikarin bi paqijiyê, xwe ji nexweşiyan biparêzin.



# Tîpa "Kk"yê

Tîpa "Kk"yê ya mezin: **K**

Tîpa "Kk"yê ya biçûk: **k**

**- Tîpa "Kk"yê di nava gotinan de:**

Ronak - Em dikarin - Kawa

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Kk"yê di sirûdê de:**




**Çûko çûko çivîko**


**Timî çirîk çirîko**

**Bi postal û perîko**


.- Em awayê xêzkirina tîpa "Kk"yê nas bikin:




- Em bi hev re tîpa "Kk"yê xêz bikin:



## - Em tîpa "Kk"yê rengîn bikin:




# HÎNDARÎ

**1- Em girovereke li derdora tîpa "Kk"yê xêz bikin:**

| |
|---|
| **a - C -b- K - D - o - P - k - l - R** |

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

**Kevir** **Kevok** **Kevçî**

# R

## WANEYA SÊYEM

# DAYÎK

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Divê em bi dayîka xwe re, çawa bin?

**2-** Em hestên xwe derbarê dayîka xwe, bînin ziman.





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# DAYÎKA MIN



Heft salan û neh mehan
Bê axîn û rawestan
Ez parastim ji belan
Ez xwedî kirim dayê

***Penaber***

## Tîpa "Rr"yê

Tîpa "**Rr**"yê ya mezin: **R**

Tîpa "**Rr**"yê ya biçûk: **r**

- Tîpa "Rr"yê di nava gotinan de:

Rawestan - Parastin - Xwdîkirin

- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Rr"yê di sirûdê de:



**Ez im Roka girover**


**Di rojê de ez im serwer**

**Ger êvar bi dawî dibe**


**Heyv diçe û ez têm der**




- **Em awayê xêzkirina tîpa "Rr"yê nas bikin:**




- **Em bi hev re tîpa "Rr"yê xêz bikin:**




- **Em tîpa "Rr"yê rengîn bikin:**



# HÎNDARÎ

**1- Em girovereke li derdora tîpa "Rr"yê xêz bikin:**

K - Z - r - P - o - R - t - k - L

**2- Em her rengekî bi xêzikekê bigihînin navê wî:**

Sor

Reş

Pirteqalî

**Hûn herî zêde ji kîjan rengî hez dikin?**

# E

## WANEYA ÇAREM

# HEVKARÎ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1**- Piştî ku tu ji xewê radibî, tu çi dikî?

**2**- Di danheva odeya te de, kî alîkariya te dike?




**- Em çi di wêneyan de dibînin?**



**Erdelan:** Ez her roj alîkariya dayîka xwe dikim.



**Dilber:** Hevkarî sincekî baş e, Erdelan. Ez jî bi dayîka xwe re hevkar im.



**Dayîk:** Bijî zarokino, hûn bi hevkariya xwe dilê min geş dikin.

# Tîpa "Ee"yê

Tîpa "**Ee**"yê ya mezin: **E**

Tîpa "**Ee**"yê ya biçûk: **e**

**- Tîpa "Ee"yê di nava gotinan de:**

Erdelan - hevkarî - baş e - geş - xwe

- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ee"yê di sirûdê de:




**Eger em ne hevkar bin**

**Em ê tev de xewar bin**


**Kesê ku ne hevkar be**

**Dilê me pê şa nabe**

- Em awayê xêzkirina tîpa "Ee"yê nas bikin:




## - Em bi hev re tîpa "Ee"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Ee"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em giroverekê li derdora tîpa "Ee"yê xêz bikin:**

**D - R - e - m - U - k - E - Î - ê**

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

**Derî**



**Esman**



**Firoke**



**3- Em cihên vala bi tîpa "Ee"yê dagirin ji bo ku em peyvên watedar çêkin:**

…rd...lan û Dilb…r h...r d...m bi h… valên xw… r... alikarin.

# I

# WANEYA PÊNÇEM

# DAPÎRA MIN

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Dapîra we ji we re çîrokan dibêje?

**2-** Hûn ji dapîra xwe, hez dikin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# DAPÎRA MIN



Navê min Dilxwaz e, ez pir ji dapîra xwe hez dikim; ji ber ku ew her car çîrokên xweş ji me re dibêje û bi dilekî mezin ji neviyên xwe hez dike.

## Tîpa "Ii"yê

Tîpa "Ii"yê ya mezin: **I**

Tîpa "Ii"yê ya biçûk: **i**

### - Tîpa "Ii"yê di nava gotinan de:

Dilxwaz - Pir - Hez dikim - Mezin – Dibêje


- **Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ii"yê di sirûdê de:**



**Em neviyên kiçik in**
**Pir paqij û xweşik in**
**Her dibe êvar û şev**
**Li dapîrê tên ber hev**
**Da çîrokan bibêje**
**Peyvên zêrîn birêje**


*Salihê Heydo*

- **Em awayê tîpa "Ii"yê nas bikin:**






## - Em bi hev re tîpa "Ii"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Ii"yê rengîn bikin:






# HÎNDARÎ

**1- Em girovereke li derdora tîpa "Ii"yê xêz bikin:**

R - î - I - d - W - i - G - f - A

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Mih 

Tivir 

Mişk 

**3- Em cihên vala bi tîpa "Ii"yê dagirin ji bo ku em hevokeke biwate çêkin:**

Em pênûsa xwe b… pênûsb…rê d…b…r…n

# WANEYA ŞEŞEM

## B RÊZGIRTIN DI MALBATÊ DE

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Tu ji malbata xwe re rêzdar î?

**2-** Eger mirov ji malbata xwe re ne rêzdar be, dê ew malbat çawa be?



**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

## RÊZGIRTIN

-Rêzgirtin, sincekî pir baş e, çi di malbatê de be, çi jî di civatê de be.

-Ji ber ku Buhar keseke rêzdar e, her kes di mal û dibistanê de ji wê hez dike.



**Tîpa "Bb"yê**

Tîpa "**Bb**"yê ya mezin: **B**

Tîpa "**Bb**"yê ya biçûk: **b**

**- Tîpa "Bb"yê di nava gotinan de:**

Baş - Malbat - Buhar - Birêz – Dibistan

**-Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Bb"yê di sirûdê de:**



**Çûko çûkê bilbil e**

**Bi bask û per û nikil e**


**Terî û postal rengî ye**

**Pir behremend û bengî ye**


***Salihê Heydo***



- **Em awayê tîpa "Bb"yê nas bikin:**




- **Em bi hev re tîpa "Bb"yê xêz bikin:**




- **Em tîpa "Bb"yê rengîn bikin:**



# HÎNDARÎ

**1- Em giroverekê li derdora tîpa "Bb"yê xêz bikin:**

**B - g - H - p - b - î - L - q- b**

**2- Em navên Heyînên li jên bi xêzikan bigihînin wêneyên wan:**





**Baran** **Malbat** **Simbil**

**3- Em cihên vala bi tîpa "Bb"yê dagirin, ji bo ku em hevokeke biwate çêkin:**

**Çûko çûkê …il…il e**
**…i …ask û per û nikil e**

# BEŞA DUYEM

1- ÇÛNA DIBISTANÊ

2- DI REFÊ DE

3- PIRTÛKAXANEYA DIBISTANÊ

4- GOG

5- GULÎSTAN

6 - MAMOSTE

**TÎPÊN KU EM DÊ DI VÊ BEŞÊ DE FÊR BIBIN:**

D - C - X - G - Î - Ê


# WANEYA YEKEM

# ÇÛNA DIBISTANÊ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Her sibe tu diçî ku?

**2-** Tu û kê diçin dibistanê?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# ÇÛNA DIBISTANÊ



- Dildar her sibeh diçe dibistanê. Dildar li dibistanê hevalên nû nas dike.
  Dildar û Dilber bi hev re dilîzin.

- Dibistan cihê perwede û ferkirinê ye.
  Em di dibistanê de fêrî xwendin nivîsandin û sincên baş dibin.

# Tîpa "Dd"yê

Tîpa "**Dd**"yê ya mezim: **D**

Tîpa "**Dd**"yê ya biçûk: **d**

## - Tîpa "Dd"yê di nava gotinan de:

Dildar - Diçe - Dibistan - Dilîzin - Perwerde - Nivîsandin



- **Em vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Dd"yê di sirûdê de:**



De De De De


Tîpa me îro De ye

De De De De


De tîpeke pir binaz e

Him xweşik û biawaz e

- **Em awayê xêzkirina tîpa "Dd"yê nas bikin:**




- Em bi hev re tîpa "Dd"yê xêz bikin:




- Em Tîpa "Dd"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em xêzekê li derdora tîpa"Dd"yê xêz bikin:**

D - k - S - q - d - Û - a - Z - f

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Dahol



Guldank



Find



**3- Em cihên vala bi tîpa "Dd"yê dagirin ji bo ku em hevokeke biwate çêkin:**

**...**il**...**ar her sibeh **...**içe **...**ibistanê.Li **...**ibistanê **...**ildar hevalên nû nas**...**ike.

# WANEYA DUYEM

# DI REFÊ DE

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Hûn waneyên xwe li ku dibin?

**2-** Xwendekar li kê guhdar dikin?

**3-** Ez jî hinekî behsa refa xwe bikim.





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# DI REFÊ DE



Xwendekar di refê de bi aramî rûniştî ne. Cîhan û Dilcan xwendekarine pir ciwan in. Cîhan û Dilcan li rex Armanc rûniştine. Her wiha ew di refê de pir guhdar in û bidestûr diaxivin.

## Tîpa "Cc"yê

Tîpa "Cc"yê ya mezin: **C**

Tîpa "Cc"yê ya biçûk: **c**

## - Tîpa "Cc"yê di nava gotinan de:

Cîhan - Dilcan -Ciwan - Armanc

## - Em vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Cc"yê di sirûdê de:


Ce ce ce ce

Tîpa "Cc"yê Ciwan e

Pir xweşik û hêsan e


Wek nîvheyva li esman e

## - Em awayê xêzkirina tîpa "Cc"yê nas bikin:






## - Em bi hev re tîpa "Cc"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Cc"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em giroverkê li derdora tîpa "Cc"yê xêz bikin:**

A - C - k - Z - F - c - l - G - J

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Cer 

Pace 

Kinc 

**3- Em ji tîpên li jêr, du gotinan saz bikin:**

**Mînak: Bar**.

C - A - K - R - E - I - B

…………….. ……………….

# WANEYA SÊYEM


## PIRTÛKAXANEYA DIBISTANÊ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Herî zêde pirtûk li ku derê hene?

**2-** Hindirê pirtûkxaneyê çawa ye?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# PIRTÛKXANEYA DIBISTANÊ



- Xwendekar û mamoste Merxas çûn pirtûkxaneyê
- Pirtûkxane cihê xwendinê ye. Xwendekar ji xwendinê hez dikin.

## Tîpa "Xx"yê

Tîpa "Xx"yê ya mezin: **X**

Tîpa "Xx"yê ya biçûk: **x**

**- Tîpa "Xx"yê di nava gotinan de:**

Xwendekar - Mêrxas - Pirtûkxane - Xwendin

## - Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Xx"yê di sirûdê de:




Em keç û xortên xebatkar in
Dem nû ye em xwendekar in
Roj bi roj war xweş dibe
Ji ber vê, dil xeroş dibe


## - Em awayê xêzkirina tîpa "Xx"yê nas bikin:


Xx Xx Xx

## - Em bi hev re tîpa "Xx"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Xx"yê rengîn bikin:






# HÎNDARÎ

**1- Em giroverekê li derdora tîpa "Xx"yê xêz bikin:**

| |
|---|
| **N - m - o - n - X - s - w – x - v** |

**2- Em heyînên li jêr bigihînin nanên wan:**

Xanî



Xalxalok



Berx



**3- Em tîpên "Xx" yê di nava malikadan de binivîsin, da ku em gotinan çêkin:**

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | a | n | î | M | ê | r | a | s | |

# O

## WANEYA ÇAREM

# GOG

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

1- Çi di destê xwendekaran de heye?

2- Xwendekar bi kê re dilîzin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# GOG



- Goran û Zozan bi goga pêyan, bi hevalên xwe re dilîzin.
- Lîstoka gogê pir xweş e.
- Lîstoka wan aram û bisûd e.

## Tîpa "Oo"yê

Tîpa "**Oo**"yê ya mezin: **O**

Tîpa "**Oo**"yê ya biçûk: **o**

**- Tîpa "Oo"yê di nava gotinan de:**

Goran - Zozan - Gog - Lîstok


**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Oo"yê di sirûdê de:**

Goga min pir rengîn e
Hem gilover hem şîrîn e
Di lîstinê de heval e
Hem hogir û delal e


**- Em awayê xêzkirina tîpa "Oo"yê nas bikin:**


O o


## - Em bi hev re tîpa "Oo"yê xêz bikin




## - Em tîpa "Oo"yê rengîn bikin:







# HÎNDARÎ

**1- Em giroverekê li derdora tîpa "Oo"yê xêz bikin:**

Î - o - R - S - O - Q - a - Z - w

## 2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:

Kîso





Keroşk



Sor

## 3- Em tîpan bi awayekî rast rêz bikin, ji bo ku em gotinên biwate saz bikin:





o - k - r ..........

o - d - y - a - r ...............

# WANEYA PÊNCEM

# Ê

# GULÎSTAN

## - Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:

**1-** Li nêzî mala te gulîstan heye?

**2-** Dema hûn diçin gulîstanê, hûn çi dikin?





## - Em çi di wêneyan de dibînin?




# GULÎSTAN



Êva, Hêlîn û Rênas heval in. Ew her sê li gulîstanê bi veşartok, hêlan û gelek lîstokên din dilîzin. Piştî ku dilîzin, ew gelaşê li şopa xwe nahêlin û paqij dikin.

## Tîpa "**Êê**"yê

Tîpa"**Êê**"yê ya mezin: **Ê**

Tîpa "**Êê**"yê ya biçûk: **ê**

### - Tîpa "Êê"yê di nava gotinan de:

Êva - Hêlîn - Rênas - Sê - Gulîstanê - Gelaşê - Nahêlin



## - Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Êê"yê di sirûdê de:


Rênas, Êva û Hêlîn

Sê şagirtên pir bivîn


Li gulîstanê rêzdar in

Pir paqij û baldar in


## - Em awayê tîpa "Êê"yê nas bikin:



## - Em bi hev re tîpa "Êê"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Êê"yê rengîn bikin:




# HÎNDARÎ

**1- Em girovereke li derdora tîpa "Êê"yê xêz bikin:**

ê - e - Ş - Z - v - Ê - t - W - ç

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Şêr



Êzing



rê





## 3- Em tîpên tevdayî rast bikin, ji bo ku em gotinên biwate saz bikin:

**Z - Ê - M - E**



**Ê - R - Z**



**K - Ê - H**



# Î

## WANEYA ŞEŞEM

# MAMOSTE

**- Em gûhdar bikin paşê bersivê bidin:**

**1-** Xwendekar di refê de çawa tev digere?

**2-** Di refê de, kî waneyê dide?

**3-** Mamoste xwendekaran fêrî çi dike?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# MAMOSTE




Navê mamosteya min Zîn e. Mamoste Zîn, me hînî gelek waneyan dike, mîna: bîrkarî, werzîş, zimanê kurdî...
Em hemû xwendekar ji mamosteya xwe hez dikin û jê re rêzdar in.

## Tîpa "Îî" yê

Tîpa "Î î"yê ya mezin: **Î**

Tîpa "Î î"yê ya biçûk: **î**

### - Tîpa "Îî"yê di nava gotinan de:

Zîn - Hînî - Mîna - Bîrkarî - Werzîş - Kurdî



**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Îî"yê di sirûdê de:**




Mamosteya min Zînê

Me hîn dike li jînê


Werzîş, bîrkarî û ziman

Me fêr dike bê westan


**- Em awayê xêzkirina tîpa "Îî"yê nas bikin:**



## - Em bi hev re tîpa "Îî"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Îî"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em girovereké li derdora tîpa "Îî"yê xêz bikin:**


P - d - g - H - Î - e - î - Q - N

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Îsot



Hirmî



Şîn



**3- Em du gotinan binivîsim ku tîpa "Îî"yê di wan de hebe.**

# BEŞA SÊYEM


**1- XALXALOK**

**2- DEMSAL**

**3- ZOZAN**

**4- ÇIYAYÊN ME**

**5- HÊLÎN**

**6- MÊWE**

**7- LEGLEG**


**TÎPÊN KU EM DÊ DI VÊ BEŞÊ DE FÊR BIBIN**

**U - S - G - Û - H - M**

# U

## WANEYA YEKEM

## XALXALOK

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Gelo kî ji we xalxalokan nas dike?

**2-** Hûn dizanin xalxalok li ku dijî?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# XALXALOK



Ez xalxalok im, di werza buharê de û di meha gulanê de, der dikevim. Ez di nav gul, şînatî û kulîlkan de dijîm û difirim. Ez kêzikeke pir biçûk, xweşik û bêzirar im.

## Tîpa "**Uu**"yê

Tîpa "**Uu**"yê ya mezin: **U**

Tîpa "**Uu**"yê ya biçûk: **u**

**- Tîpa "Uu"yê di nava gotinan de:**

Buhar - Gulan - Kulîlk - Gul

**-Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Uu"yê di sirûdê de:**

Xalxalokê ciwanê

Pir delal li gulistanê

Di nav rîhan û gulan


Gel heval û bilbilan



**- Em awayê xêzkirina tîpa "Uu"yê nas bikin:**


Uu Uu Uu

## - Em bi hev re tîpa "Uu"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Uu"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em girovereke li derdora tîpa "Uu"yê xêz bikin:**

u - ş - e - Û - U - f - q - U - z

**2- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Quling



Gul




Kum




**3- Em tîpên tevdayî rast bikin ji bo ku em gotinên biwate çêkin:**

**R - I - Q - U - M**



**L - U - G - Î**



S

# WANEYA SÊYEM

# DEMSAL

**- Em gudar bikin, paşê bersivê bidin:**

1- Hûn dizanin çend demsal hene?

2- Hûn herî zêde ji kîjan demsalê hez dikin?



**- Em çi di wêneyan de dibînin?**


# DEMSAL




Sîdar:
Kêfa min ji demsala buharê re tê. Ji ber ku, buharî kulîlk vedibin, baran dibare û keskesor çêdibe.



**Nesrîn:**
Demsala havînî pir germ e. Her wiha bêhinvedana dibistanê ye.



**Rênas:** Di demsala payîzê de jî, pelên daran zer dibin û dibistan vedibin.



**Sema:** Piştî payîzê, demsala zivistanê xwe bi berfê dixmîlîne. Em di vê demsalê de cilên xwe yên stûr li xwe dikin.

# 85

# Tîpa "Ss"yê

Tîpa "**Ss**"yê ya mezin: **S**

Tîpa "**Ss**"yê ya biçûk: **s**

## - Tîpa "Ss"yê di nava gotinan de:

Sîdar - Demsal - Keskesor - Nesrîn - Dibistan - Rênas - Sema - Zivistan - Stûr

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ss"yê di sirûdê de:**



**Havîn û dinya gerim e**

**Çile rabû ji ser me**


**Tav û serma û seqem**

**Êdî bar kir ji cem me**

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Ss"yê nas bikin:**


Ss Ss Ss

- **Em bi hev re tîpa "Ss"yê xêz bikin:**




- **Em tîpam "Ss"yê rengîn bikin:**





# HÎNDARÎ

## 1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:

Sêv






Dest

Garis




**2- Em ji tîpa "Ss"yê û hin kiteyan, gotinan saz bikin:**




**3- Em tîpên tevdayî rast bikin, ji bo ku em gotinên biwate, saz bikin:**

**S - Ê - P - Û - N**



**.....................**

**K - E - K - S**



**......................**

G

# WANEYA SÊYEM

# ZOZAN

**- Em guhdar bikin, paşê besivê bidin:**

**1-** Hûn dizanin zozan çi ne?

**2-** Hûn koçeran nas dikin?





**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# ZOZAN

Zozan cihên bilind û çiya ne. Xwezaya zozanan pir xweş e, ji ber ku hemî gul û giya ne.
Dema ku gerima havînê bi ser koçeran de tê, berê xwe ji mêrgê didin zozanan.



## Tîpa "Gg"yê

Tîpa "**Gg**"yê ya mezin: **G**

Tîpa "**Gg**"yê ya biçûk: **g**

**- Tîpa "Gg"yê di nava gotinan de**

Gul - Giya - Gerim - Mêrg

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Gg"yê di sirûdê de:**


Nêrgiz, gul û giya

Pir rengînin ev çiya

Bilbil bi deng û efxan


Xweş dike merg û dilan

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Gg"yê nas bikin:**





## - Em bi hev re tîpa "Gg"yê xêz bikin:




## - Em Tîpa "Gg"yê rengîn bikin:





# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Gog



Gund





Agir

**2- Em du gotinan binivîsin ku tîpa "Gg"yê di wan de hebe.**

............... ..............

û

# WANEYA ÇAREM

# ÇIYAYÊN ME

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Hûn çiyayan nas dikin?

**2-** Cihên ku hûn lê dijîn çiya hene?



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# ÇIYAYÊ LÊLÛNÊ

Çiyayê Lêlûnê li Efrînê ye. Ew bi xweza û xweşikbûna xwe navdar e. Dema ku mirov diçe ser Çiyayê Lêlûnê, ji dûr ve hemû bajarê Efrînê dibîne. Her wiha li derdora vî çiyayî gelek darên zeytûnan hene.





## Tîpa "Ûû"yê

Tîpa "**Ûû**"yê ya mezin: **Û**

Tîpa "**Ûû**"yê ya biçûk: **û**

**- Tîpa "Ûû"yê di nava gotinan de:**

Lêlûn - Xweşikbûn - Dûr - Hemû - Zeytûn

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ûû"yê di sirûdê de:**

Li Çiyayên Kurdistan

Tev bûye mij û moran


Baran hûrhûr dibare

Berû xûl bûye sar e


Yeqîn ev dem buhar e

Her kes êdî li kar e


**- Em awayê xêzkirina tîpa "Ûû"yê nas bikin:**



## - Em bi hev re tîpa "Ûû"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Ûû"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Tûtî



Tû



Tembûr




**2- Em cihên vala bi tîpa "Ûû"yêdagirin ji bo ku em gotinan biwate bikin:**

**Ten...r        Ş...ştin        Z...**

**3- Em tîpên tevdayî rast bikin ji bo ku em gotinên biwate saz bikin:**

Z - Û - M



...............

Û - Z - G



...............

R - Û - D - N - Î - B



..............................

# WANEYA PÊNCEM

# HÊLÎN

## - Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:

**1-** Em ji mala çivîkan re, çi dibêjin?

**2-** Çivîk malên xwe ji çi ava dikin?

**3-** Çivîk mala xwe li ku derê çêdikin?





## - Em çi di wêneyan de dibînin?

# HÊLÎN

Çivîk hêlînên xwe li ser daran ava dikin. Ew hêlîn ji wan re dibin mîna cih û malekê, tê de hêkan dikin û çêlîkên xwe xwedî dikin.
Her ku werza buharê dest pê dike, çivîk hêlînên xwe ava dikin.





# Tîpa "Hh"yê

Tîpa "**Hh**"yê ya mezin: **H**

Tîpa "**Hh** "yê ya biçûk: **h**


**- Tîpa "Hh"yê di nava gotinan de:**

Hêlîn - Cih - Hêk - Her - Buhar


**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Hh"yê di sirûdê de:**

Li ser çiqilên hinaran
Hêlîn çêbûn buharan
Li pey hêkan çivîk in
Li nav dehlan firok in
Em zarokên dilovan
Pê şa dibin bêziyan

- **Em awayê xêzkirina tîpa "Hh"yê nas bikin:**





- **Em bi hev re tîpa "Hh"yê xêz bikin:**





## - Em tîpa "Hh"yê rengîn bikin:






# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Hingiv



Behîv



Keleh



**2- Em sê gotinên ku tîpa "Hh"yê di wan de hebe, binivîsin.**

**.................... ....................**

M

## WANEYA ŞEŞEM

# MÊWE

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Navê hin mêweyên ku hûn nas dikin, bibêjin.

**2**- Çima mirov mêweyan dixwin?



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# MÊWE

Nûdem: Mêwe ji bo laşê me baş in.

Memo: VÎtamîn di wan de hene.

Şemal: Nahelin em nexweş bikevin.



Dema ku em mêweyan bixwin, em dê zû mezin bibin û di jiyan û dibistana xwe de serkeftî bin. Mêwe gelek sûdê didin laşê me.

# Tîpa "Mm"yê


Tîpa "**Mm**"yê ya mezin: **M**

Tîpa "**Mm**"yê ya biçûk: **m**


## - Tîpa "Mm"yê di nava gotinan de:

Nûdem - Mêwe - Memo - Vîtamîn - Şemal - Em - Dema - Mezin

## - Em awayê xêzkirina tîpa "Mm"yê nas bikin:



## - Em bi hev re tîpa "Mm"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Mm"yê rengîn bikin:






# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

**Kurim**



**Lîmon**



**Meymûm**



**2- Em ji van tîpan çar gotinên biwate, saz bikin:**

**A - K - R - E - I - B - D - C - X - G - Î - Ê - U - S - G - Û - H - M - V**

................. ................. ................ .................

V


# WANEYA HEFTEM

# LEGLEG

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Hûn leglegan nas dikin?

**2-** Legleg li ku dijîn?



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# LEGLEG

Leglegekê hêlîna xwe li jora gumbeta mizgevtê ava kiriye, her buhar vedigere hêlina xwe û dawiya havînê, koçî devereke din dike.





## Tîpa "Vv"yê

Tîpa "Vv"yê ya mezin: **V**

Tîpa "Vv"yê ya biçûk: **v**

**- Tîpa "Vv"yê di nava gotinan de:**

Mizgevt - ava kiriye - Vedigere - Havîn - Devereke


**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Vv"yê di sirûdê de:**

Ve ve ve ve
Ez im, ez tîpa ve me

Vîn û viyana we me

Hevala we teva me


Semola serkeftinê me



**- Em awayê xêzkirina tîpa "Vv"yê nas bikin:**


Vv

## - Em bi hev re tîpa "Vv"yê xêz bikin:




## - Em tîpa"Vv"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

**Çav** **Pîvaz** **Volkan**







**2- Em cihên vala bi tîpa "Vv"yê dagrin û gotina ku sazbûyî bixwînin:**

…iyan Xuna…
A...dar Ne...î ...ala

**3- Em sê gotinên ku tîpa "Vv"yê di wan de hebe, binivîsin.**

………….. ………….. ………….

# BEŞA ÇAREM

1. **WELATÊ MIN**
2. **NEWROZ**
3. **ZIMANÊ ME ŞÎRÎNE**
4. **ÇANDA ME**
5. **BERHEMÊN WELATÊ MIN**
6. **ŞÛNWARÊN ME**

**TÎPÊN KU EM DÊ DI VÊ BEŞÊ DE FÊR BIBIN**

W- Q - Ş - Ç - J - N

W

## WANEYA YEKEM

# WELATÊ ME

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Em li kijan walatî dijîn?

**2-** Navê Welatê me çi ye?

**3-** Em welatê xwe çawa xweşik bikin?






**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# WELATÊ ME

Welatê min rêngîne. Ew bi newalên xwe yên kûr û çiyayên xwe yên bilind navdar e.
Welat cih û ware me ye, em gelekî jê hez dikin.
Li welatê me, her çar werzên sale hene.



## Tîpa "Ww" yê

Tîpa " **Ww**"yê ya mezin: **W**

Tîpa "**Ww** "yê ya biçûk: **w**

**- Tîpa "Ww"yê di nava gotinan de:**

Welat - Newal - Werz

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ww"yê di sirûdê de:**


Werin werin welatê xwe

Ava bikin ware xwe


Şîn bikin xwezaya xwe

Jîn bikin zimanê xwe

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Ww"yê nas bikin:**



## - Em bi hev re tîpa "**Ww**"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "**Ww**"yê rengîn bikin:






# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jê bi xêzikan bigihînin navên wan :**

Kew



Ewir



Werdek



**2- Em Gotinên li jêr dahûrînin:**

Cewrik

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | |

Siwar

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | | | |

N

# WANEYA DUYEM

# NEWROZ

**- Em gudar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1**- Em kengî Cejina Newrozê pîroz dikin?

**2**- Em çima Cejina Newrozê pîroz dikin?

**3-** Em di roja Cejina Newrozê de, çi dikin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# NEWROZ

Bîst û yekê Adarê Newroz û sersal e. Çejina gelê kurd e. Em di vê rojê de, agir pêdixin, cilên kurdî li xwe dikin û dadikevin qada cejinê. Roja Newrozê roja azadî, aştî û yekbûna gelan e.





# Tîpa "Nn"yê

Tîpa "**Nn**"yê ya mezin: **N**

Tîpa "**Nn**"yê ya biçûk: **n**


**- Tîpa "Nn"yê di nava gotinan de:**

Newroz - Cejin - Pêdixin - Cilên kurdî - Dikin - Dadikevin - Yekbûna - gelan


**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Nn"yê di sirûdê de:**

Buhar xweşe bi navê te
Newroz Newroz
Kesk û sor e xemila te
Newroz Newroz
Kurdan agir dadane
Ji bo te can fîda ne
Newroz newroz


- **Em awayê xêzkirina tîpa "Nn"yê nas bikin:**





- **Em bi hev re tîpa "Nn"yê xêz bikin:**



## - Em tîpa "Nn"yê rengîn bikin:




# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jê bi xêzikan bigihînin navên wan :**

Tenûr



Piling



Nan



**2- Em tîpên tevdayî rast bikin ji bo ku em gotinên biwate, saz bikin:**



N - A - X - Î

....................



N - A - D - Î - L

.........................

**3- Em du gotinên ku tîpa "Nn"yê di wan de hebe, binivîsin.**

.................. ..................

Ş

# WANEYA SÊYEM

## ZIMANÊ ME ŞÎRÎNE

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1**- Em bi rêya çi, ji hev û du fêm dikin?

**2**- Em bi kijan zimanî diaxivin?

- Rojbaş Hûn dê biçin ku?

- Rojbaş ez û xwîşka xwe dê biçin dibistanê.





# ZIMANÊ ME




Bi xemil û rewş e     Şîrîn û xweş e

Şîrîn û xweş e     Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e     Letîf û naz e

Letîf û naz e     Zimanê kurdî

# Tîpa "Şş"yê

Tîpa **Ş**




Tîpa "Şş"yê ya biçûk: **ş**


### - Tîpa "Şş"yê di nava gotinan de:

Rewş - Şîrîn - Xweş


### - Em awayê xêzkirina Tîpa "Şş"yê nas bikin:




## - Em bi hev re tîpa "Şş"yê xêz bikn:




## - Em tîpa "Şş"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Mişk



Mêşa hingiv



Şilêr



**2- Em sê gotinên ku tîpa "Şş"yê di wan de hebe, binivîsin:**

.................. .................. ..................

# WANEYA ÇAREM

## ÇANDA ME

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Di rojên cejinên netewî de, em çi li xwe dikin?

**2-** Em çawa nêzî mezin û biçûkên xwe dibin?

**3-** Em li dibistanê ferî çi dibin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**



## ÇANDA ME

Dayika min cilên kurdî li xwe dike û çarikê dide sere xwe. Her wiha hûçik û qemçikên wê pir bedew in. Ew mîna kevokekê bi çelengiya xwe xuya ye.
Lixwekirina cilên kurdî ji çanda me ye.

### Tîpa "Çç"yê

Tîpa "Çç"yê ya mezin: Ç

Tîpa "Çç"yê ya biçûk: ç


**- Tîpa "Çç"yê di nava gotinan de:**

Çarik - Hûçik - Qemçik - Çelengî - Çand


- **Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Çç"yê di sirûdê de:**

Berçem keça kurda ye
Mîna stêrkê xuya ye
Çarek xweşik li ser e
Nola gula çema ye
Heger berçem dimeşe
Hûçik binaz diheje


- **Em awayê xêzkirina tîpa "Çç"yê nas bikin:**




- **Em bi hev re tîpa "Çç"yê xêz bikin:**




- **Em tîpa "Çç"yê rengîn bikin:**



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Çar





Hirç

4

Kûçik

**2- Em ji tîpên li jêr çar gotinan, saz bikin:**

**A - K - R - E - I - B - D - C - X - G - Î - Ê - U - S - G - Û - H - M - V - W - N - Ş - Ç**

…………… ……………… ……………… ………………



# WANEYA PÊNCEM

# BERHEM Û XWEZA

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Buhara welatê me çawa ye?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# BERHEM Û XWEZA

Qenco, li ser xwezaya Qamişloyê, berhemên wê û çemê ceqceqê, wêneyek nîgar kiribû. Di nava avê de, qaz û quling; li rex çem zeviyên genim, ceh û nîskan nîgar kiribû. Mamoste got: Welatê me bi xweza û berhemên xwe navdar e.

## Tîpa "Qq"yê

Tîpa "**Qq**"yê ya mezin: **Q**

Tîpa "**Qq**"yê ya biçûk: **q**

**- Tîpa "Qq"yê di nava gotinan de:**

Qenco - Qamişlo - Ceqceq - Qaz - Quling

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Qq"yê di sirûdê de:**

**QULING**


Qulingo hey qulingo

Quling qaz û qulingo


Niklê te pir dirêj e

Paqij e ne qirêj e.

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Qq"yê nas bikin:**




## - Em bi hev re tîpa "Qq"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Qq"yê rengîn bikin:





# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

**Qijak** **Çeqel** **Beq**

**3- Em tîpên tevdayî rast bikin, ji bo ku em gotinên biwate saz bikin:**

Ş - E - Q - A



..................

Z - A - Q



.............

# WANEYA ŞEŞEM

# ŞÛNWARÊN ME

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê?**

**1-** Şûnwarên dîrokî li bajar an gundê ku hû lê jiyan dikin hene?




**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# ŞÛNWARÊN ME

**Jîn**: Ez ji Serêkaniyê me, li bajarê me şûnwareke pir dîrokî bi nave Tilxelefê heye.
**Hêjar**: Ez jî, ji bajarê Amûdê me, li bajarê me jî şûnwareke pir kevnar bi navê Girê Moza heye.
**Rojda**: Ev şûnwarên me dîroka me ne, pêwîst e em wan biparêzin.



## Tîpa "Jj"yê

Tîpa "**Jj**"yê ya mezin: **J**

Tîpa "**Jj**"yê ya biçûk: **j**

**-Tîpa "Jj" yê di nava gotinan:**

Jin - Ji - Bajar - Hejar - Jî - Rojda

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Jj"yê di sirûdê de:**

Li rojavayê Kurdistan

Hene şûnwarên giran

Li Amûdê Orkêş e


Mêjûya me vedibêje

Em zarokên pêşeroj


Lê balder in şev û roj




**- Em awayê xêzkirina tîpa "Jj"yê nas bikin:**




- **Em bi hev re tîpa "Jj"yê xêz bikin:**




- **Em tîpa "Jj"yê rengîn bikin:**



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Hejîr



Mewîj



Jîjo



**2- Em sê gotinên ku tîpa "Jj"yê di wan de hebe binivîsin.**

**................. ................. .................**

# BEŞA PÊNCEM

**1- PALEYÎ**

**2- FIROŞKAR**

**3- TEŞÎRÊS**

**4- COTKAR**

**5- MÛRÎ**

**6- KARÊ SERKEFTÎ**

**TÎPÊN KU EM DÊ DI VÊ BEŞÊ DE FÊR BIBIN**

L - F - T - P - Y - Z

L

# WANEYA YEKEM

# PALEYÎ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Paleyî çi ye?

**2-** Mirov kengî paleyiyê dikin?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# PALEYÎ

Leheng çû mala xalê xwe yê li gund. Ji bo ku xalê wî dexl û danên xwe hilîne, bi paleyan re, paleyî dikir.



## Tîpa "Ll"yê

Tîpa "Ll"yê ya mezin: L

Tîpa "Ll"yê ya biçûk: l

**- Tîpa "Ll"yê di nava gotinan de:**

Leheng - Mal - Xal - Li - Dxil - Hilîne - Pale

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ll"yê di sirûdê de:**


Hey pale pale pale lo

Hey pale pale pale


Dasa te keda jînê lo

Hey pale pale pale

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Ll"yê nas bikin:**




## - Em bi hev re tîpa "Ll"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Ll"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**


Kartol



Bilûr



Landik



## 2- Em tîpên tevdayî rast bikin, ji bo ku em gotinên biwate saz bikin:

L - Ê - Ç - E - K



………………..

K - E - L - I - P



………………

# F

# WANEYA DUYEM

## FIROŞKAR

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Di malbata we de kesek firoşkar heye?



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# FIROŞKAR

Ferhad firoşkarekî calak e. Ew sibehê zû firoşgeha xwe vedike. Ji ber ku Ferhad fêkî û şinatiyên paqij difiroşe, her kes jê hez dike.

## Tîpa "Ff " yê

Tîpa "**Ff** "yê ya mezin: **F**

Tîpa "**Ff** "yê ya biçûk: **f**

### - Tîpa "Ff " yê di nava gotinan de:

Ferhad - Firoşkar - Fêkî - difroşe

- **Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Ff "yê di sirûdê de:**


Firşkar im li welat

Hem pîşe û hem xebat


Firing, fêkî û firêz

Bê paqijî nayên rêz


- **Em awayê xêzkirina tîpa "Ff "yê nas bikin:**



## - Em bi hev re tîpa "Ff "yê xêz bikin:





## - Em tîpa "Ff "yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Tifik



Firoke



Berf



**2- Em tîpên tevdayî rast bikin ji bo ku em gotinên biwate çêkin:**

**L - Î - F**

**.............**





**F - E - D**

**...............**

**3- Em sê gotinên ku tîpa "Ff "yê di wan de hebe, binivîsin.**

**................. .................. ..................**

# T


## WANEYA SÊYEM

# TEŞÎRÊS

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1**- Hûn dizanin kesên di wêneyê de çi dikin?

**2**- Teşîrêsî karekî çawa ye?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# TEŞÎRÊS

Meta Gulîstanê teşîrêseke pir jêhatî ye. Her car ew berikên pir xweşik û rengîn dirêse. Berikên wê bi nexş û gulan xemilandî ne.

## Tîpa "Tt" yê

Tîpa "Tt"yê ya mezin: **T**

Tîpa "Tt"yê ya biçûk: **t**

**- Tîpa "Tt"yê di nava gotinan de:**

Met - Gulîstan -Teşîrês -Jêhatî

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Tt"yê di sirûdê de:**

Meta me teşîrês e

Teşeyan bi tevinê dirêse


Berikên wê pir naz in

Pir xwirt in, ne lawaz in



**- Em awayê xêzkirina tîpa "Tt"yê nas bikin:**

Tt

## - Em bi hev re tîpa "Tt"yê xêz bikin:




## - Em tîpa "Tt"yê rengîn bikin:

# HÎNDARÎ

**1- Em wêneyên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Şîr



Zivistan



Tîr



**2- Em sê gotinên ku tîpa "Tt"yê di wan de hebe, binivîsin:**

**..................... ...................... ....................**

# P

# WANEYA ÇAREM

# COTKAR

## - Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:

**1-** Hûn dizanin karê cotkar çi ye?

**2-** Hûn ji gundan hez dikin?




## - Em çi di wêneyan de dibînin?

## COTKAR

Pêşeng cotkarekî pir zîrek e. Her payîz ew erdê xwe cot dike. Ew her sal şînatiyên cur bi cur diçîne, mîna: genim, pembo, pîvaz û hwd.

Di demên berê de, erd bi ga û hespan dihat cotkirin, lê niha bi terektoran e.

**Tîpa "Pp"yê**

Tîpa "**Pp**"yê ya mezin: **P**

Tîpa "**Pp**"yê ya biçûk: **p**

**- Em bi hev re sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Pp"yê di sirûdê de:**

Pêşeng kesek cotkar e

Her payîz cot li dar e

Îsal ne mîna par e


Baran heye spasdar e




**Tîpa "Pp"yê di nava gotinan de:**

Pêşeng - Pir - Payîz - Pembo - Pîvaz - Hesp

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Pp"yê nas bikin:**




**- Em bi hev re tîpa "Pp"yê xêz bikin:**




**- Em tîpa "Pp"yê rengîn bikin:**





# HÎNDARÎ

## 1- Em wêneyên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:

Pisîk



Hesp



Pinpinîk



## 2- Em ji van tîpan çar gotinên biwate, saz bikin:

**A - K - R - E - I - B - D - C - X - G - Î - Ê - U - S - G - Û - H - M - V - W - Q - Ş - Ç - J - N - L - F - T - P**

................. ................. ................. .................

Y

# WANEYA PÊNCEM

# MÛRÎ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1-** Hûn mûriyan nas dikin?



**- Em çi di wêneyê de dibînin?**

# MÛRÎ

• Mûrî zîndiyên biçûk in û bi zîrekiya xwe tên naskirin. Mûrî pir ji kar û xebatê hez dikin. Ew yekser xwerina xwe naxwin, hemû bi hev re xwerina xwe ji bo zivistanê kom dikin. Mûrî bi awayê yek yek kar nakin, Ji ber ku jiyana wan komîne.



**Tîpa "Yy"yê**

Tîpa "**Yy**"yê ya mezin: **Y**

Tîpa "**Yy**"yê ya biçûk: **y**

**- Tîpa "Yy"yê di nava gotinan de :**

Zîndiyên biçûk - Zîrekiya xwe - Yek yek - Jiyan

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Yy"yê di sirûdê de:**

**Em mûriyên hevkar in**

**Bi hev re em yarîkar in**

**Li deşt û çiya û li ser rêya**


**Bo zivistanê xemxwar in**



**- Em awayê xêzkirina tîpa "Yy"yê nas bikin:**


Yy

## - Em bi hev re tîpa "Yy"yê xêz bikin:




## - Em tîpa"Yy"yê rengîn bikin:



# HÎNDARÎ

**1- Em heyînên li jêr bi xêzikan bigihînin navên wan:**

Qehweyî



Derya



Heyv



**2- Em sê gotinên ku tîpa "Yy"yê di wan de hebe binivîsin.**

.................. ................. ..................

Z


## WANEYA ŞEŞEM

# KARÊ SERKEFTÎ

**- Em guhdar bikin, paşê bersivê bidin:**

**1**- Dema tu ji dibistanê diçî male, tu çi dikî?

**2**- Tu karê xwe yê malê kengî çêdikî?





**- Em çi di wêneyan de dibînin?**

# KARÊ SERKEFTÎ

Zelalê zarokeke zîrek e. Waneyên wê birêkûpêk in û di dema wan de çêdike. Lewre bi vê zîrekiya xwe, tê hezkirin û xelatkirin.



## Tîpa "Zz"yê

Tîpa "**Zz**"yê ya mezin : **Z**

Tîpa "**Zz**"yê ya biçûk: **z**

### - Tîpa "Zz"yê di nava gotinan de:

Zelalê - Zarok - Zîrek - Hezkirin

**- Em bi hev re vê sirûdê bixwînin û guh bidin bilêvkirina tîpa "Zz"yê di sirûdê de:**

Zelal keçkoka zana

Zîrek, xweşik û buha

Di pole de rêzdar e

Di wanê de balder e

Karan nahêle li paş

Pile her gaz, zor û baş

**- Em awayê xêzkirina tîpa "Zz"yê nas bikin:**


Zz Zz Zz

## - Em bi hev re tîpa "Zz"yê xêz bikin:





## - Em tîpa "Zz"yê rengî n bikin:





# HÎNDARÎ

**1- Em navên heyînên li jêr binivîsin:**

………..  ………  ……….

**2- Em sê gotinên ku tîpa "Zz"yê di wan de hebe, binivîsin:**

……………  ………….  …………….

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| HEFTÎ / MEH | HEFTIYA YEKEM | HEFTIYA DUYEM | HEFTIYA SÊYEM | HEFTIYA ÇAREM |
|---|---|---|---|---|
| REZBER | | | MALBATA ZOZANÊ | EZ Û MALBATA XWE |
| COTMEH | MALA MIN A PAQIJ | DAYÎK | HEVKARÎ | DAPÎRA MIN |
| MIJDAR | RÊZGIRTIN DI MALBATÊ DE | ÇÛNA DIBISTANÊ+ DI REFÊ DE | PIRTÛKXAN-EYA DIBISTANÊ | GOG |
| BERFANBAR | GULÎSTAN | MAMOSTE | XALXALOK + DEMSAL | ZOZAN + ÇIYAYÊN ME |
| RÊBENDAN | HÊLÎN | LÊVEGER | BÊHNVEDAN | BÊHNVEDAN |
| REŞEMEH | MÊWE | LEGLEG | WELATÊ ME | NEWROZ |
| AVDAR | ZIMANÊ ME ŞÎRÎN E | ÇANDA ME | BERHM Û XWEZA | ŞÛNWARÊN ME |
| COTAN | PALEYÎ | FIROŞKAR | TEŞÎRÊS | COTKAR + MÛRÎ |
| GULAN | KARÊ SERKEFTÎ | LÊVERGER | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# SERETAYÎ 2

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**BEŞA YEKEM: .......... 7**

LÊVEGER .......... 8

ZIMANÊ KURDÎ .......... 23

**BEŞA DUYEM.......... 25**

VEGERA DIBISTANÊ.......... 26

PAQIJIYA DIBISTANÊ .......... 31

DEM.......... 36

DEMA DIBISTANÊ.......... 42

**BEŞA SÊYEM .......... 43**

XWIŞK Û BIRA .......... 44

DAPÎRA MIN .......... 50

SERDANA MALA XALÊ MIN.......... 55

DAYÎKA MIN .......... 60

**BEŞA ÇAREM.......... 61**

BERHEM Û XWEZAYA WELAT .......... 62

DEMSAL.......... 67

ZOZAN.......... 75

**BEŞA PÊNCEM .......... 76**

ZAROK Û HEVKARÎ .......... 77

HEVKARIYA XWENDINÊ .......... 82

KEVOK Û NÊÇÎRVAN .......... 87

**BEŞA ŞEŞEM .......... 92**

DIBISTAN Û TENDURISTÎ.......... 93

BAKTERÎ .......... 99

TRAFÎK .......... 106


BEŞA YEKEM:
LÊVEGER

# LÊVEGER

1- Em navên heyînên li jêr bixwînin:


Av 

Bîr 

Ceh 

Çem 

Dar 

Ewr 

Êlih 

Fîl 

Ga



Hêk



Diran



Îsot




Jin



Kar



Lep



Mar




Nan




Ode



Pel



Qaz



Req



Sêv





Şev




Tirî



Gul 

Tû 

Vizik 

Werîs 

Xox 

Yek 

Zêr 

2- Di ABC'ya kurdî de, 31 tîp hene. Em dikarin wan bi vî awayî, rêz bikin:

Aa - Bb - Cc - Çç - Dd - Ee - Êê - Ff - Gg - Hh - Ii - Îî - Jj - Kk - Ll - Mm - Nn - Oo - Pp - Qq - Rr - Ss - Şş - Tt - Uu - Ûû - Vv - Ww - Xx - Yy - Zz

- Ji van tîpan, 8 dengdêr in û 23 dengdar in.

**- Tîpên dengdar:**

Bb - Cc - Çç - Dd - Ff - Gg - Hh - Jj - Kk - Ll - Mm - Nn - Pp - Qq - Rr - Ss - Şş - Tt - Vv - Ww - Xx - Yy - Zz

**- Tîpên dengdêr:**

Aa - Ee - Êê - Ii - Îî - Oo - Uu - Ûû

# 12

3- Em bi rêya tîpên dengdêr, tîpên dengdar bi lêv bikin:

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| B | + | a | → | Ba |
| G | + | a | → | Ga |
| S | + | e | → | Se |
| M | + | e | → | Me |
| R | + | ê | → | Rê |
| S | + | ê | → | Sê |
| N | + | û | → | Nû |
| R | + | û | → | Rû |
| K | + | î | → | Kî |


| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| M | | î | → | Mî |
| D | + | u | → | Du |
| T | + | u | → | Tu |
| N | + | o | → | No |
| D | + | o | → | Do |
| D | + | i | → | Di |
| J | + | i | → | Ji |

4- Em gotinên li jêr bigihînin wêneyên

wan: Pirtûk



Lênûs




Pênûs



Jêbir



Dep



5- Em gotinên têkildarî hev, bi xêzikan bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Sêv | Xwendakar |
| Pol | Av |
| Gog | Dar |
| Masî | Lîstikgeh |
| Pel | |

6- Em valahiyên li jêr bi tîpên li rex wan dagirin, da ku em gotinan saz bikin:

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ss | …êl | Da… | Ma…î |
| Şş | ...êr | Re… | He…t |
| Hh | …inar | Re.. | Bu…ar |
| Xx | …êz | Ne…şe | Mî… |

# 16

7- Em kiteyan bixwînin, paşê wan bi hev ve girê bidin:

Ba + ran

…………..



Ba + zin

…………..



Ba + wer

……………



Zî + nê

…………..




Zî + ro

…………...



17

8- Em navên heyînên li jêr binivîsin:



……………….



……………….



……………….



……………...

# 18

9- Em tîpên li jêr bi hev ve girê bidin û paşê bixwînin:

| M | A | S | Î |
|---|---|---|---|

| D | E | R | Y | A |
|---|---|---|---|---|

-

…………………..

| M | Ê | W | E | P |
|---|---|---|---|---|

| | I | S | Î | K |
|---|---|---|---|---|

………………. ……………….

| B | E | R | X | G |
|---|---|---|---|---|

| | E | N | I | M |
|---|---|---|---|---|

……………… …………………..

10- Em gotinên li jêr dahûrînin:

Gul

| | | |
|---|---|---|

Rez

| | | |
|---|---|---|

Çiya

| | | | |
|---|---|---|---|

Bira

| | | | |
|---|---|---|---|

Dayîk

| | | | | |
|---|---|---|---|---|

Xwişk

| | | | | |
|---|---|---|---|---|

11- Em ji tîpan, peyvan saz bikin:

Ç - Ê - B - M - A - R - D - E

| ÇAR | | | |
|---|---|---|---|

K - A - R - Z - O - J - D - S

| | | | |
|---|---|---|---|

12- Em peyv û dijwateya wê bigihînin hev:



Reş

Lawaz





Dirêj

Spî





Qelew

Kin



13- Em ji tîpên li jêr peyvan çêkin û paşê wan bikin
hevok:

| | | | | | | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| E | z | d | i | ç | i | m | d | i | b | i | s | t | a | n | ê |

...... .............. ......................

.............................................

| | | | | | | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | r | a | m | b | i | g | o | g | ê | d | i | l | î | z | e |

……….. ...... ........... ..............

.............................................

14- Em ji peyvên li jêr hevokan saz bikin:

ez - malê - çûm

............................

min - aram - dît

............................

me - xweş e - dibistana

.................................


15- Em hevoka li jêr bixwînin û bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin:




16- Em hevokên li jêr bi rêkûpêk bikin:

| | |
|---|---|
| 1- Lîstika me pir xweş e | 3-......................... |
| 2- Em bi gogê dilîzin | 2-......................... |
| 3- Em li qadê ne | 1-......................... |


# ZIMANÊ KURDÎ



Bi xemil û rewş
e Şîrîn û xweş e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e
Letîf û naz e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye
Kubra Xanî ye
Kubra Xanî ye
Zimanê kurdî



*Şikoyê Hesen*



# BEŞA DUYEM:

## DIBISTAN

**WANEYA YEKEM: VEGERA DIBISTANÊ**

**WANEYA DUYEM: PAQIJIYA DIBISTANÊ**

**WANEYA SÊYEM: DEM**

# VEGERA DIBISTANÊ

1- We di betlaneyê de, çi kir?

2- Bi nêzîkbûna vebûna dibistanê, we çi kir?

3- Bi vebûna dibistanê, hestên xwe bînin ziman.

4- Di refa duyem de, sala we ya xwendinê dê çawa be?



# VEGERA DIBISTANÊ



Îro roja yekem e ku Dîlan diçe dibistanê.

Piştî ku Dîlan vegeriya malê, ji dayîka xwe re got:

Dayê, dibistana me pir xweş bû! Mamosteyan pêşwaziya me kir, paşê em derbasî polê bûn.

Dayîk: Te hevalên xwe nas kirin?

Dîlan: Erê dayê, memoste em bi hev dan nasîn. Di pey re me dabaşa betlaneyê kir.

Dayîk: Bijî keça min! Pêwîst e hûn baş bixebitin.

Dîlan: Erê dayê, me soza serkeftinê da.

## Giftûgoya Waneyê (Devokî)

1- Dîlan ji dayîka xwe re, dabaşa çi kir?

2- Roja Dîlanê ya destpêkê çawa bû?

3- Kê pêşwaziya Dîlan û hevalên wê kir?

4- Xwendekaran soza çi da?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê, xêz bikin:

**Pol:** mêze - fêrgeh - dibistan

**Betlane:** hesp - dar - bêhnvedan

2- Em cihên vala bi tîpên guncaw dagirin:

û - t - s - w - r - e

Dibi…tana m… pir xweş bû.

Pêwîs… e h…n baş bixebitin.

Te hevalên x…e nas ki…in?

3- Em valahiyên li jêr bi gotinên guncaw dagirin: dan - paşê - pêşwaziya

- Mamosteyan ……………… me kir.

- …………… em derbasî polê bûn.

- Mamoste em bi hev …………… nasîn.

4- Em peyvên li jêr dahûrînin:

Dayîk Mamoste Nasîn

5- Em bi tîpên li jêr peyvan saz bikin:

| H | e | v | a | l |
|---|---|---|---|---|

| B | e | t | l | a | n | | e |
|---|---|---|---|---|---|---|---|

| S | o | z |
|---|---|---|

………………  ……………………..  ………...

6- Em bi peyvên li jêr, hevokan saz bikin:

dibistan - fêrbûnê - cihê - ye

…………………………………………….

li - dilîzin - em - qadê

……………………………………………..

7- Em ji hevokên li jêr, deqekê saz bikin:

- Ew ji waneyan hez dike.
- Bawer refa duyem e.
- Bawer diçe dibistanê.

…………………………………………………………

…………………………………………………………

# PAQIJIYA DIBISTANÊ

1- Di wêneyê de, xwendekar çi dikin?

2- Sedemên qirêjbûna polê çi ne?

3- Xwendekar çawa û bi kê re polê paqij dikin?

4- Ji bo ku pol û dibistana me paqij bimîne, pêwîst e em çi bikin?



# PAQIJIYA DIBISTANÊ




Nivîsa ku li ser kevala dibistanê hatibû nivîsîn, bala xwendekaran kişand.

Mizgînê bi dengekî xweş xwend: Paqijî navnîşana pêşketinê ye.

Li hevalên xwe zivirî û got: Rast e, paqijî derdora me ji qirêjiyê xelas dike û me ji nexweşiyan diparêze.

Zinar ber bi hevalan ve hat û got: Divê mirov li paqijiya pol û dibistana xwe baldar be.

Di pey re ew tevlî heval û mamosteyên xwe bûn û pol û dibistana xwe paqij kirin.

## Giftûgoya Waneyêê (Devokî)

1- Çi bala xwendekaran kişand?

2- Li ser kevala dibistanê çi hatibû nivîsandin?

3- Paqijî çi bandorê li jiyana me dike?

4- Gelo, divê demên paqijiyê destnîşankirî bin, an na?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast, xêz bikin:

**Baldarî:** jiyan - qad - miqatebûn

**Keval:** dîwar - tablo - pace

**Parastin:** berevanî - lawaz - xwarin

2- Em valahiyan bi gotinên guncaw yên li jêr dagirin:

xweş - derdor - nexweşî - mamoste - qirêjiyê

- Paqijî me ji ……………..yan diparêze.
- Paqijî ……………a me ji ……………. xelas dike.
- Mizgînê bi dengekî ………….. xwend.
- Ew tevlî heval û ……………..yên xwe bûn.

3- Em navan bigihînin rengên wan:

Şîn



Zer



Kesk



Sor

4- Em hevoka rast bi √ nîşan bikin:

- Ez lîstinê piştî destên xwe dişom.
- Ez destên xwe piştî lîstinê dişom.
- Destên lîstinê piştî xwe dişom ez.

5- Em peyvên li jêr kite bikin:

Paqijî

Diparêze

Xwendekar

Mizgîn

6- Em hevoka li jêr bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin û xalê li dawiya hevokê bi kar bînin:



## DEM

1- Di rojê de tu bi çi kar û çalakiyan radibî?

2- Ji bo her karekî, demek taybet pêwîst e, yan na?

3- Dema mirov demê baş bi kar tîne, çi bi dest dixe? 4- Tu çawa dema xwe dabeş dikî?



## DEM



Rojîn refa duyem e. Ew heft salî ye. Her sibeh dema ku diçe dibistanê, di dema xwe de digihêje. Li dibistanê bi dema waneyên xwe pabend e; tu carî li ser waneyên xwe dereng namîne. Her wiha li mal û kolanê jî demê bê sûd derbas nake. Dema xwendinê xwendin e; dema lîstinê lîstin e. Ji ber vê pabendiyê, ji hêla mamoste û hevalên xwe ve, tê hezkirin û di kar û xwendina xwe de serkeftî ye.

**Giftûgoya Waneyêê (Devokî)**

1- Rojîn çend salî ye?

2- Li dibistanê, Rojîn çawa tev digere?

3- Çima ji hêla mamoste û hevalên xwe ve, tê hezkirin? 4- Çawa em ê dema xwe bi rêkûpêk bikin?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Derbasbûn | Berdewam |
| | Bûrîn |
| Bêsûd | Bêkêr |
| | Baş |

2- Em valahiyan bi gotinên guncaw yên li jêr dagirin:

hevalên - xwendin - refa

- Rojîn ………….. duyem e.

- Dema xwendinê ……………... e; dema lîstinê lîstin e.

- Ji hêla mamoste û ……………. xwe ve tê hezkirin.

3- Em peyvên li jêr dahûrînin:

Pabendî

Rojîn

Serkeftî

Digihêje

4- Em peyvên li jêr kite bikin:

Dema

Kolan

Malbat

Nexweşî

Pêwîstî

Neçarî

5- Em gotinên li jêr di hevokan de bi kar bînin:

sibe - sûd - kar

.......................................................

.......................................................

.......................................................

6- Em hevoka li jêr bi rengekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:



## DEMA DIBISTANÊ

Bû dema dibistanê
Avakin vê cîhanê
Bingeh bûye azadî
Her kes wê bê serdanê



Tîpa yekê Kurdistan
Nemane xewn û leylan
Ew dem va ye îro hat
Her dem bijî Kurdistan

Tîpa duyan ka zarok
Bêjin helbest û çîrok
Her kes rake destên xwe
Pelan bughere dîrok

*Fîxan Hîmo*





# BEŞA SÊYEM:

## MALBAT

**WANEYA YEKEM: XWIŞK Û BIRA**

**WANEYA DUYEM: DAPÎRA MIN**

**WANEYA SÊYEM: SERDANA MALA XALÊ MIN**

**WANEYA ÇAREM: DAYÎKA MIN**

## XWIŞK Û BIRA

1- Hûn çawa nêzî endamên malbata xwe dibin?

2- Heger tiştek li gel te hebe û li gel xwişk an jî birayê te tune be, tu yê çi bikî?

3- Tu çawa axaftin an jî nêrîna xwe digihîne malbata xwe?



# XWIŞK Û BIRA



Malbat, dibistana me ya destpêkê ye. Em tê de, fêrî sincên civakê dibin. Rojda û Alan xwişk û birayê hev in û ji hev hez dikin. Rojda ji Alan mezintir e. Her ku Alan dikeve tengasiyê, Rojda alîkariya wî dike. Alan jî tu carî ji Rojdayê bêzar nabe; her du bi hev re dilîzin û tiştên xwe bi hev re parve dikin. Di heman demê de, her du ji dayîk û bavê xwe re rêzdar in û bi ya wan dikin.

Rojda û Alan bi van tevgerên xwe dilê dayîk û bavê xwe şa dikin û ji hêla kesên derdorê ve tên hezkirin.

**Giftûgoya Waneyêê (Devokî)**

1- Dibistana me ya destpêkê çi ye?

2- Em di malbatê de fêrî çi dibin?

3- Têkiliya di navbera Alan û Rojdayê de çawa ye? 4- Dema Alan rastî astengiyan tê, kî alîkariya wî dike?

5- Alan û Rojda çawa nêzî dayîk û bavê xwe dibin?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast xêz bikin:

**Sinc:** gotin - exlaq - reng

**Astengî:** firehî - kûr - zehmetî

**Bêzarbûn:** acizî - xweşî - gurbûn

2- Em hevokên li jêr bi peyvên guncaw sergihayî bikin, xalê li dawiyê bi kar bînin û bixwînin:

Malbat dibistana me ya …………….

Dilê dayîk û bavê xwe ………………

Her du bi hev re ………………

3- Em ji gotinên li jêr hevokekê saz bikin:

| mezinan - em - rêzdar in - ji - re |
|---|

……………………………………………………

4- Em her peyvekê ji peyvên li jêr di hevokekê de bi kar bînin:

Malbat: ………………………………………

Alîkarî: ………………………………………

5- Em li gor mînakê, pirjimariya gotinên li jêr bibînin:

Gul → gulên → gulên sor xweşik in.

Zarok → ............... → zarokên me serkeftî ne.

Pirtûk → ............... →...........................

Dar → ............... → ...........................

# DAPÎRA MIN

1- Tu çi di wêneyê de dibînî?

2- Kî li derdora dapîrê kom bûne?

3- Dapîr çi ji zarokan re dibêje?

4- Tu çawa nêzî kesên temenmezin dibî?



# DAPÎRA MIN



Bi nêrînên xwe yên dilovan, aramî û hezkirinê dixe dilê me. Bi zanebûn û temenê xwe yê mezin, me li derdora xwe kom dike. Ez dabaşa dapîra xwe dikim. Dapîra min 65 salî ye. Her gav bi şîret û nêrînên xwe, rê nîşanî me dide. Em bi çîrokên wê mezin bûne, lewre hezkirin û rêzgirtina wê roj bi roj di dilê me de mezintir dibe.

## Giftûgoyagoya Waneyêeyê (Devokî)

1- Nêrînên dapîrê çawa ne?

2- Çima em li derdora dapîra xwe kom dibin? 3- Temenê dapîrê çend sal e?

4- Çima em jê hez dikin û rêzê jê re digirin?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast xêz bikin:

**Aram:** bêdeng - lîstin - jêr

**Dilovan:** geş - dilnerm - tengezar

**Temen:** kaxez - çem - jî

**Şîret:** pend - vehesîn - rabûn

2- Em beşên hevokê yên ku hev temam dikin, bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Bi nêrînên xwe yên dilovan | roj bi roj mezin dibe |
| Bi zanebûn û temenê xwe yê mezin | rê nîşanî me dide |
| Rêzgirtina wê di dilê me de | me li derdora xwe kom dike |

3- Em bersiva pirsên li jêr bidin û xalê li dawiya hevokan bi kar bînin:

- Navê te çi ye?

  Navê min ...............

- Tu refa çendan î?

  Ez refa ..................

- Navê dê û bavê te çi ye?

  Navê bavê min ...............

  Navê dêya min ...............

4- Em pirsên bersivên li jêr binivîsin û pirsnîşanê (?) bi kar bînin:

- Tu .........................

  Ez ji bajarê Qamişloyê me.

- Tu .........................

  Ez ji taxa Hilêliyê me.

- Tu ........................

  Ez pir ji goga pêyan hez dikim.

5- Em hevokên li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:



# SERDANA MALA XALÊ MIN

1- Hûn herî zêde serdana kê dikin?

2- Hûn jiyana gundan çawa dibînin?

3- Em çawa nêzî sewalan dibin?

4- Dema ku hûn serdana xizmên xwe dikin, hûn çawa tev digerin?



# SERDANA MALA XALÊ MIN



Bawer ji hevalan re dabaşa serdana mala xalê xwe dike:

Mala xalê min li gund e. Xalê min û malbata xwe bi dilgermî pêşwaziya me kir. Zarokên xalê min Rêzan, Viyan û Canda di temenê min de ne. Em bi hev re çûn nava zeviya wan a biçûk. Di nava zeviyê de, sewalên wan diçêriyan. Her tişt balkêş û xweş bû. Me pir bi lîstikên cuda yên mîna: veşartok, bez û hwd, lîst. Dem bû dema vegerê, lê destê me ji mala xalê min û xweşikbûna gundê wan nedibû. Me xatir xwest û em bi kêfxweşî vegeriyan malê.

## Giftûgoya Waneyêê (Devokî)

1- Di betlaneyê de, malbata Bawer serdana kê kir?

2- Xalê Bawer bi çi rengî pêşwaziya wan kir?

3- Bawer bi kê re çû nav zeviyê?

4- Li nav zeviyê çi hebû?

5- Çawa dema wan derbas bû?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast, xêz bikin:

**Zevî:** kolan - çûn - erdê çandî

**Sewal:** dewar - genim - giya

**Veşartok:** meş - çavgirtin - bez

2- Em valahiyan bi gotinên guncaw yên li jêr dagirin:

nava - sewalên - Rêzan - Viyan - serdana - Canda

- Me …………….. mala xalê xwe kir.
- Zarokên xalê min ………….., …………. û ………….
  di temenê min de ne.
- Di …………. zeviyê de ………….. wan diçêriyan.

3- Em gotinên li jêr kite bikin:

Sewal

Diçêriyan

Pêşwaziya

Me


kir

Me

Xatir

xwest

4- Em her du hevokên li jêr bi awayekî xweşik, li ser lênûsa xwe binivîsin:




5- Em wêneyê li jêr bi hevokekê raber bikin:



……………………………………………

# DAYÎKA MIN



Hêja ye pir dêya min
Çi dayîkek dilovan
Hezkirina wê ji bo min
Nayê pîtav û pîvan
Min evîn tev civandin
Yên li erd û li ezman
Min ew kirin terazû Pir
sivik bûn çûne ban
Evîna dayîka min
Nehat kêşan û taydan
Her dima li fera jêr
Tenê ew bû ya giran.

***Salihê Heydo***

# BEŞA ÇAREM:

## WELAT

## WANEYA YEKEM: BERHEM Û XWEZAYA WELAT

## WANEYA DUYEM: DEMSAL

## WANEYA SÊYEM: ZOZAN

# BERHEM Û XWEZAYA WELAT

1- Navê welatê me çi ye?

2- Welat çi berheman pêşkêşî me dike?

3- Xwezaya welatê me çawa ye?

4- Çima em ji welatê xwe hez dikin?



# BERHEM Û XWEZAYA WELAT



Welatê me bi xweza û berhemên xwe navdar e. Li rojavayê Kurdistanê, xaka berhemdar yek ji çavkaniyên herî girîng ên jiyanê ye. Ji ber vê yekê bi çandiniya daran, mîna darên zeytûnan li Efrînê, navdar e.

Ji bilî xaka berhemdar, avên ku van xakan av didin jî hene. Mîna çemên Dîcle û Feratê yên ku di nava xaka rojavayê Kurdistanê re derbas dibin. Her wiha welatê me bi berhemên binerd (petrol) zengîn e. Petrol jêdereke bingehîn ji jêderên aboriyê ye. Em mazot, gaz û gelek tiştên din jê bi dest dixin. Ev hemû xweşî û zengîniya welatê me ne.

## Giftûgoya Waneyêê (Devokî)

1- Welatê me bi çi navdar e?

2- Heger xak berhemdar be, em dikarin çi sûdê jê bigirin?

3- Navên her du çemê ku di welatê me re derbas dibin çi ne?

4- Em çi sûdê ji petrolê digirin?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Zevî | Surişt |
| Zengîn | Erdê çandî |
| Xweza | Dewlemend |

2- Em li gorî mînakê, pirjimariya navan bi rêya (an) çêkin:

Buhar → Buharan → Buharan kulîlk vedibin.

Pirs→ ............... → Em gelek pirsan dikin.

Sewal → ............... → ..............................

Gund → ...............  → ..............................

3- Em li gorî mînakê, pirjimariya navên li jêr bi rêya (ên) çêkin:

Bîr → Bîrên → Bîrên petrolê.

Alav → ...............→ Alavên çandiniyê.

Heval → ............... → ................................

Reng → ...............→ ................................

4- Em li wêneyê li jêr baş temaşe bikin û sê hevokan li ser binivîsin:



1- ………………………………………..

2- ………………………………………..

3- ………………………………………..

# DEMSAL

1- Di kîjan demê de xweza dixemile?


2- Kengî em cilên tenik li xwe dikin?

3- Cotkar kengî erdê cot dikin?

4- Kengî berf û baran dibare?

5- Nevê her çar demsalan çi ye?

6- Tu ji kîjan demsalê hez dikî?



# DEMSAL



Di xwezayê de, birêkûpêkiyeke pir balkêş heye; bi taybetî hatina her çar demsalan di pey hev re. Çar demsalên welatê me hene: buhar, havîn, payîz û zivistan.

Buhar bi rengê xwe yê kesk, rûerdê dixemilîne. Buhar bi xwe re mizgîniya havîneke bi xêr û bêr tîne. Havîn bi germa xwe, dexilûdanên me digihîne temamkirinê. Havîn dexilûdanên buharê zuha dike û ji bo payîz û zivistanê hiltîne. Payîz bi sarbûna hewaya xwe me ji bo zivistanê amade dike. Di payîzê de, em erd cot dikin û zeviyan ji bo baranê amade dikin. Bi baran û berfê, zivistan her deverê dişo û mizgîniya saleke bixêr dide me.

## Giftûgoya Waneyê (Devokî)

1- Buhar çi mizgîniyê bi xwe re tîne?

2- Dexilûdanên me kengî digihêjin temamkirinê?

3- Ji bo çi em zeviyan di payîzê de cot dikin?

4- Berf û baran çi dikin?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Demsal | Haykêş |
| Balkêş | Qût |
| Mizgînî | Xweşnûçe |
| Dexilûdan | Werz |

2- Em li gor mînakê, yekjimariya gotinên li jêr çêkin:

Demsalan → demsal → Demsala zivistanê sar e.

Buharan → ............... → Buhar pir xweş e.

Welatan → ............... →.......................................

Havînan → ............... → .......................................

3- Em cihên vala bi peyvên guncaw dagirin:



Hogir .............. dixwe



Zarok .............. dixwin

Zînê .............. av dide



Zarok ........... av didin



Rêzan bi ........... dilîze



Keç bi .............. dilîzin



4- Em gotinên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

kulîlk - cot - serma - germ

.............................................................

.............................................................

.............................................................

.............................................................

5- Em her du hevokên pevgirêdayî yên li jêr, bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin:

**Di xwezayê de birêkûpêkiyeke pir balkêş heye; bi taybet hatina her çar demsaln di pey hev re.**

6- Em li hemberî wêne, navê demsalê yê guncaw binivîsin:

..................



...................




……………………



……………………



# ZOZAN



Zozanê me bilind in
Tev bi zevî û gund in
Di wan hene avên sar
Jêkê nabin ber û dar
Havînan em diçin wan
Tevî koç û pez û gan
Derbas dikin rojên germ
Li ser wê nefela nerm
Dilîzin her direvin
Heyanî koç dakevin
Dema çiya dibin sar
Payîz dibe em tên xwar



*Osman Sebrî*





# BEŞA PÊNCEM:
## HEVKARÎ

**WANEYA YEKEM: ZAROK Û HEVKARÎ**

**WANEYA DUYEM: HEVKARIYA XWENDINÊ**

**WANEYA SÊYEM: KEVOK Û NÊÇÎRVAN**

# ZAROK Û HEVKARÎ

1- Em çi di wêneyê de dibînin?

2- Hûn di dema xwe ya vala de, çi dikin?

3- Karê ku yek bike baş e, yan gelek kes bikin, çima?

4- Em ji karê ku pir kes bi hev re dikin re, çi dibêjin?



# ZAROK Û HEVKARÎ



Şêrgo û hevalên xwe ji bo ku li kolanê nelîzin, dixwestin li qada vala ya ku li rex mala Şêrgo ye, bilîzin. Destûr ji malbata Şêrgo xwestin û bi lez çûn qadê. Dema ku gihan qadê, dîtin ku qad tev bi kevir û gemar e, ji ber vê lîstik li wê zehmet bû.

Sîwan ji nişkan ve got: Hevalino! Ka werin em bi hev re qadê ji keviran paqij bikin. Zarokan bi matmayî li hev nêrîn û gotin: Çawa?! Em nikarin.

Şêrgo bi dengekî jixwebawer got: Em bi hevkariyê dikarin van keviran li goşeyeke qadê, kom bikin. Zarokan dest pê kir, her ku goşeyek paqij dikirn kêfxweş dibûn û baweriya wan bi wan xurtir dibû. Bi vî awayî nas kirin ku hevkarî, kar hêsan dike û encamên baş bi dest dixe.

## Giftûgoyagoya Waneyêeyê (Devokî)

1- Qada ku Şêrgo û hevalên xwe xwestin lê bilîzin, çawa bû?

2- Zarokan çawa qad paqij kir?

3- Encama hevkariyê çi ye?

4- Tu jî, ji hevalên xwe re dabaşa hevkariyeke ku te û hevalên xwe bi hev re kiriye, bike.

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Hevkarî | Kêlek |
| Qad | Behitîn |
| Matmayî | Meydan |
| Rex | Alîkarî |

2- Em dijwateya peyva (hêsan) ji waneyê derxin.

3- Em valahiyan bi gotinên guncaw yên li jêr dagirin:

bawerî - kêfxweş - aram - hevkarî

- Ji bo lîstinê pêdiviya zarokan bi cihekî ............ heye.

- Em dikarin bi ..................yê qadê paqij bikin.

- Zarok bi karê xwe ................. dibûn.

- ................ya wan bi wan xurttir dibû.

4- Em bi peyvên li jêr hevokan saz bikin:

dema - çawa - kir - derbas - te - xwe

...............................................................

bi - mirovan - zanist - hêz - dike

...............................................................

5- Em li gorî mînakê, pirjimariya gotinên li jêr bi rêya (an) çêkin:

Zarok → Zarokan → Zarokan dilîst.

Kevir → ............... → Keviran radikin.

Xwendekar → ................ → ...............................

Cîran → ................ → ................................

6- Em li wêneyê li jêr baş temaşe bikin û çar hevokan li ser binivîsin:



.........................................

.........................................

.........................................

.........................................


## HEVKARIYA XWENDINÊ

1- Heger xwendekarek ji pola we nehat dibistanê hûn ê çi bikin?

2- Heger hevaleke/î we tev li wane û danûstendina bi we re nebe, hûn ê çi bikin?



# HEVKARIYA XWENDINÊ



Xwendekarek ji pola me nexweş ket û demeke dirêj nehat dibistanê. Gelek wane lê çûn. Her çi qasî hewl dida xwe bighîne hevalên xwe, lê tê nedigihaşt. Her dem xemgîn û bi tena xwe dûrî hevalan diket.

Min û çend hevalên xwe yên di polê de, xwest bêyî ku pê bizanibe, alîkariya wî bikin. Me her carê pê re waneyên ku lê çûbûn, vedigerand û waneyên nû jî bi hev re dixwendin. Em roj bi roj bi pêş diketin. Hevalê me tev li lîstik û çalakiyên xwendekaran dibû û rûgeş bibû.

Di dawiya salê de, em tev de bi asteke zorbaş, bi ser ketin.

## Giftûgoya Waneyêê (Devokî)

1- Hewl bide ku tu waneyê li gor têgihaştina xwe ji hevalên xwe re vebêjî.

2- Hevalê wan ji ber çi nedihat dibistanê?

3- Hevalê wan çima xemgîn bû?

4- Xwendekarên din çawa alîkariya wî kir?

5- Encama xwendina bi hev re, çi bû?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Alîkarî | Xembar |
| Xemgîn | Jîr |
| Çalak | Pile |
| Ast | Destekdan |

2- Em gotina guncaw, li cihê guncaw bi cih bikin:

ser - hevalên - pileya - ketin

Em jî bi ................. xwe re bi pêş ................. û di dawiya salê de, em bi …………... zorbaş bi ……………... ketin.

3- Em cihên vala bi (me - wî - wan - min) dagirin: - Hevalê …...... Ronî nexweş ketibû.

- Em bi ........ re bûn alîkar.
- ........ jî bi ........ re sûdeke baş girt.

4- Em bi peyvên li jêr, hevokan saz bikin:


hev - û - hevalên - ez - re - hevkar in - bi - xwe

.......................................................................

bi hev re - zarok - av - didin - daran

.............................................................

5- Em vê hevokê bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:



# KEVOK Û NÊÇÎRVAN



Rojekê nêçîrvanekî tora xwe li erdê veda, hinek libên genim li ser belav kir û xwe di piş darekê de veşart. Di wê demê de kevokek biristik û refek kevokên din jî pê re bûn, ji xwe re li xwarinê digeriyan. Dema ku libên li ser torê belavkirî dîtin, kêfa wan hat û daketin libên genim bineqînin, lê tor li wan hat hev û di torê de man.

Her kevokekê, bi tena xwe li ber xwe dida, lê ne pêkan bû ku bi vî awayî xwe rizgar bikin. Di heman demê de nêçîrvan bi kêf ber bi wan ve dibeziya.

Kevoka biristik pir zana û zîrek bû. Ji hevalên xwe re got: "Em ê yeko yeko nikaribin xwe rizgar bikin; ya baş ew e ku em tev bi hev re tev torê bifirin." Kevok bi hev re



firiyan, nêçîrvan jî hêviya xwe nedibirî û bi dû wan diket. Ji bo ku ji ber çavên nêçîrvan winad bibin, kevokê hevalên xwe ber bi cihekî avakirî ve birin. Li ber kuna hevalê xwe mişk, ê ku li ser banê xaniyekî dijiya, danî.

Kevokê ji mişk xwest tora ku bi lingê wan ve hatiye girêdan, veke. Mişk dest bi kurisandina torê kir. Kevokê jê xwest ku destpêkê hevalên wê rizgar bike. Mişk got: "Na, tu hevala min î, ez ê destpêkê lingê te vekim". Kevokê lê vegerand: "Ez ditirsim piştî ku tu min rizgar bikî, tu bêzar bibî û girêkên hevalên min venekî, lê heger tu destpêkê wan rizgar bikî, dê dilzosiya te bihêle ku tu min jî rizgar bikî."

Bi vî awayî hevkarî û dilsozî bi ser ket û refa kevokan rizgar bû.

## Giftûgoya Waneyêê (Devokî)

1- Nêçîrvan çawa kevok xapandin?

2- Kevok bi çi awayî firiyan?

3- Kê pêşengtî ji refa kevokan re dikir?

4- Kê alîkariya kevokan kir?

5- Çima kevoka biristik xwest ku mişk destpêkê hevalên wê rizgar bike?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Tor | Azadkirin |
| Ref | Daf |
| Rizgarkirin | Kom |
| Kurisandin | Kurkitandin |

2- Em gotina guncaw li cihê guncaw bi cih bikin:

bineqînin - hat - bû - daketin - bikin - friyan

Kevok ................. libên genim ..............., lê tor li wan .................... hev.

Her kevokekê bi tena xwe li ber xwe da, lê ne pêkan ................... ku bi vî awayî xwe rizgar ..................

Kevok tev bi hev re .................... û bilind bûn.

3- Em gotinên li jêr di hevokan de bi kar bînin:

kêf - dilsozî - hêvî

...................................................

...................................................

...................................................

4- Tu jî derkeve pêşiya hevalên xwe û çîrokekê ji wan re bibêje.



# BEŞA ŞEŞEM:

## TENDURISTÎ



**WANEYA YEKEM:**
**DIBISTAN Û TENDURISTÎ**

**WANEYA DUYEM:**
**BAKTERÎ**

**WANEYA SÊYEM: TRAFÎK**

# DIBISTAN Û TENDURISTÎ


1- Dema mirov bi bapêşê dikeve, çi lê xuya dibe?

2- Mirov çawa dikare li tenduristiya xwe baldar be?

3- Çawa mirov dikare xwe ji nexweşiyan biparêze?



# DIBISTAN Û TENDURISTÎ



Li dibistanê pêjna Ronî nedihat. Xwendekaran pirsa wî kir. Hin hevalên wî gotin ku ew ji ber sermayê, bi bapêşê ketiye. Mamoste ji bo vê bûyerê pirsek li ser depê nivîsî: "Çawa em ê li tenduristiya xwe baldar bin?"

Xwendekaran gelek bersiv dan û li ser depê nivîsîn.

Kawa: Divê em li paqijiya xwe miqate bin û avê ji cihên destnîşankirî vexwin. Her wiha piştî çûna avdestxaneyê, em destên xwe baş bi sabûnê bişon.

Sema jî wiha bersiv da: Divê em cilên stûr di werzê zivistanê de li xwe bikin û dema em bi bapêşê bikevin, divê em xwe biparêzin û nehêlin vegirtin çêbibe.

Mamoste: Bijî! Ji bîr nekin, li dibistanê komîteya tenduristiyê heye, dema bûyerek çêbibe; çi birîn be çi jî nexweşî be, divê yekser em wan agahdar bikin.

## Giftûgoya Waneyê (Devokî)

1- Çima Ronî nehatibû dibistanê?

2- Kê pirsa Ronî kir?

3- Mamoste çi pirs li ser depê nivîsî?

4- Li gorî te xwendekar çawa dikarin xwe biparêzin?

5- Li gorî têgihaştina te ji waneyê re, serenavekî nû ji waneyê re binivîse.

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast xêz bikin:

| | |
|---|---|
| **Bapêş:** | zekem - dewixîn - birîn |
| **Bûyer:** | serma - kar - rûdan |
| **Tenduristî:** | saxlemî - ciwan - rev |
| **Werz:** | sal - demsal - meh |

2- Em cihên vala bi (ez - em - tu - ew) dagirin:

- ........ li paqijiya xwe baldar e.
- Dema min ........ nas kirî.
- Divê........ di werzê zivistanê de cilên germ li xwe bikin.
- ........ xwendekar im.

3- Em gotinên li jêr di hevokan de bi kar bînin:

tenduristî - hûn - ew

.............................................................

.............................................................

.............................................................

4- Çi cudahî di navbera hevokên li jêr de heye:

- Ew bi bapêşê ketiye.
- ew bi bapêşê ketiye

5- Em hevokên li jêr bi awayekî xweşik binivîsin, tîpa mezin di destpêkê de û xalê li dawiya hevokê bi kar bînin:

- li dibistanê pêjna Ronî nedihat

.................................................................

- xwendekaran gelek bersiv dan

.................................................................

- em destên xwe baş bi sabûnê bişon

.................................................................

6- Em li wêneyê li jêr baş temaşe bikin û sê hevokan li ser binivîsin:



.................................................

.................................................

.................................................

## BAKTERÎ

1- Hûn gelaşa xwe diavêjin ku?

2- Encamên avêtina gelaşê li kolan û nav avê, çi ye?

3- Kesê ku gemarê diavêje kolan, dibistan, daristan û nav avê, tu çi şîretê li wan dikî?

5- Em çi di wêneyê de dibînin?



# BAKTERÎ



Berî çend rojan, bijîşkek ji komîteya tenduristiya dibistanan, serdana pola me kir. Ji me re dabaşa bandora paqijiya derdorê li tenduristiya me kir. Di nav axaftinan de peyva bakterî derbas bû. Xwendekarekî pirsî: Bakterî çi ne? Bijîşk serê xwe hejand û ev bersiv da: Bakterî zindiyên pir biçûk in ku bi çavan nayên dîtin. Mirov dikare wan bi rêya hûrbînan li ezmûngehan bibîne. Ew li her deverê hene; di nav av, ax, ba û li ser gewdeyên mirovan jî dijîn. Hin ji wan sûdmend in û hin ji wan jî biziyan in û nexwseşiyan bi mirovan re çêdikin. Bakterî bi rêya xwarin û vexwarina nepaqij digihêjin me. Ji bo em rê li ber pirbûn û belavbûna bakterîyan bigirin, pêwîst e em li paqijiya derdora xwe baldar bin. Ji ber ku em xwarin û vexwarina xwe ji derdora xwe distînin;

ango divê em gemarê neavêjin erd, nava avê û ziyanê negihînin jîngehê.

Jîngeh warê me yê bêdawî ye.

**Giftûgoya Waneyêê (Devokî)**

1- Kê serdana polê kir?

2- Bijîşk li ser çi axivî?

3- Bakterî çi ne?

4- Em çawa dikarin xwe ji bakteriyan biparêzin?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê ya rast xêz bikin:

**Bijîşk:** mamoste - doktor - ajokar

**Ezmûngeh:** pêjgeh - taqîgeh - pirtûkxane

**Jîngeh:** derdor - kargeh - jêr

**Zindî:** giyandar - mirî - razayî

2- Em dijwateyên peyvên li jêr, bibînin:

Hûr ≠ ..................

Sûdmend ≠ ................

Pirs ≠ ................

- ……………………
……………………
……………………

Nexweşî

Jiyan

Belavbûn

3- Em gotina guncaw li cihê guncaw bi cih bikin:

| |
|---|
| mirov - sûdmend - xwarin - ziyan - paqij - bakterî |

- Hin bakterî ……………... in û hin jî bi………… in.
- Nexweşiyan bi ………….. re çêdikin.
- ………………bi rêya ……………. û vexwarina ne …………….. digihêjin me.

4- Em li derdora peyvên pirjimar, bazinan xêz bikin:

- Bakterî zindiyên biçûk in.
- Bi çavan nayên dîtin.
- Mirov nexweşiyan ji kesê nexweş digire.
- Hin nexweşî ji lawiran vediguhezin mirovan.

5- Em ji peyvên bi jêr, hevokan saz bikin:

| |
|---|
| tenduristiya - li - em - baldar in - xwe |

.........................................

| |
|---|
| mirov - divê - xwe - bakteriyan - ji - biparêze |

.........................................

| |
|---|
| laşê - xurt - werziş - mirov - dike |

.........................................

6- Em hevokên li jêr bi awayekî bi rêkûpêk rêz bikin:

- Divê em şînatî û mêweyên neşûştî, nexwin.
- Zarok hêviya civaka xwe ne.
- Û derdora xwe gemar nekin.
- Ji bo em teduristiya xwe biparêzin.

.......................................................

.......................................................

.......................................................

.......................................................

7- Hûn jî çend hevokan li ser paqijiya derdora xwe binivîsin.

# TRAFÎK



Gava dertêm ji malê Û
diçim dibistanê Xwe
nadim nava rêyan
Didim rêya peyayan

Lempeya sor raweste
Lempeya zer baldar be
Lempeya kesk derbas be



Heye him bo rêwiyan
Him ji bo erebeyan
Lempeya trafîkê
Ya ku rêberî dike

Gava lempê dibînim
Eger sor be radiwestim
Di zer de amade me
Di kesk de derbas dibim

***Aram Gernas***

# Belavkirina Waneyan li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | **Lêveger** | **Lêveger** |
| Cotmeh | **Lêveger** | **Lêveger** | **Zimanê kurdî** | **Vegera dibistanê** |
| Mijdar | **Paqijiya dibistanê** | **Dem** | **Lêvegera beşê** | **Têkiliyên malbatî** |
| Berfanbar | **Dapîra min** | **Serdana mala xalê min** | **Dayîka min** | **Lêvegera beşê** |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhnvedan | Bêhnveda n |
| Reşemeh | **Berhem û xwezaya welat** | **Demsal** | **Zozan** | **Lêvegera beşê** |
| Avdar | **Zarok û hevkarî** | **Hevkariya xwendinê** | **Kevok û nêçîrvan** | **Lêvegera beşê** |
| Cotan | **Dibistan û tenduristî** | **Bakterî** | **Trafîk** | **Lêvegera beşê** |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# SERETAYÎ 3

**2019/2020**

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

4

## NAVEROK


**BEŞA YEKEM ............ 7**

SIRÛDA ABC'YÊ ............ 8

LÊVEGER ............ 9

**BEŞA DUYEM ............ 19**

XWENDEVAN IM ............ 20

AREZÛYÊN XWENDEKARAN ............ 21

WÊNESAZA BIÇÛK ............ 28

XWENDINA ÇÎROKAN ............ 37

ZAROK Û LÎSTIN ............ 44

**BEŞA SÊYEM ............ 53**

DARA ZEYTÛNÊ ............ 54

EM DARAN BIÇÎNIN ............ 61

SEWALÊN ME ............ 71

PERPERÎK ............ 78

**BEŞA ÇAREM ............ 79**

CÛDÎ Û TELEVÎZYON ............ 80

XWARINA HEVSENG ............ 87

WERZIŞ Û TENDURISTÎ ............ 95

CIWANA ............ 104

**BEŞA PÊNCEM ............ 105**

NEWROZ ............ 106

EFRÎN ............ 113

PARASTINA XWEZAYÊ ............ 121

AY LÊ GULÊ ............ 130

# BEŞA YEKEM


WANEYA YEKEM: SIRÛDA ABC'YÊ

WANEYA DUYEM: LÊVEGER



Wane 1

# SIRÛDA ABC'YÊ



Bijî bijî Kurdistan
Rê girtî, me biçûkan
Va em diçin dibistan
Ji bo hînbûna ziman

Zimanekî şîrîn e
Ciwan û hingivîn e
Abeya wê bixwîne
Sih û yek tîp bi cî ne





Heşt tîp hene şiyar in
Navê wana dengdêr in
Bîst û sisê xewar in
Tîpên girs û dengdar in

Dibistana têkoşer
Hînbûna wana ji ber
Kar û xwendin, zanewer
Mamostê me Dilawer

Wane 2

# LÊVEGER

1- Em bersiva pirsên li jêr bidin:

- Çend tîpên kurdî hene?
- Çend tîpên dengdar hene?
- Çend tîpên dengdêr hene?

2- Em bi alîkariya tîpên dengdêr peyvan saz bikin:

**A**

Asmîn ............. ............

**E**

............. ............. ............

**Ê**

…………. …………. ………..

**O**

…………. …………. ………..

**Û**

…………. …………. ………..

**Î**

…………. …………. ………..

3- Em hevokên li jêr kite bikin:

Sala xwendinê ya nû dest pê kir.

Sa-la..................................

Li pirtûkxaneyê pir çîrokên xweş hene.

..............................................

4- Em hevokên li jêr bixwînin û peyvên pirjimar destnîşan bikin:

a- Em waneyên xwe baş dixwînin.

b- Hevalên min pir in.

c- Em bi lîstokan dilîzin.

ç- Em ji pirtûkan sûdê digirin.

5- Em hevokên yekjimar ên li jêr bikin pirjimar:

a- Ew çîrokê dixwîne. ……………………………

b- Hevala min hêja ye. ……………………………

c- Em gulê diçînin. ……………………………

ç- Min xwarin da pisîkê. ……………………………

6- Em hevokên pirjimar ên li jêr bikin yekjimar:

a- Ew helbestan dixwîne. ……………………………

b- Li daristanan lawir hene. ……………………………

c- Lîstikên me bêzirar in. ……………………………

ç- Wêneyên wan balkêş in. ……………………………

7- Em hemwateya peyva şînkirî, ji nav peyvan hibijêrin:

- Em derbasî **polên** xwe bûn.

- Em derbasî ……… xwe bûn. (ref - mêze - kursî)

- Dîmenê **xwezayê** xweşik e.

- Dîmenê ……….. xweşik e. (surişt - maf - çem)

Min **destûr** ji mamoste xwest.

Min ……… ji mamoste xwest. ( pel - kar - rêdan)

8- Em peyv û dijwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Hêsan | Kin |
| Dirêj | Qirêj |
| Paqij | Tiral |
| Zîrek | Zehmet |
| Xweş | Nexweş |

9- Em cihê vala li gorî cînava guncaw dagirin:



…….. xwendekar im.



……..  xwendekar î.



…….. xwendekar e.



……… xwedekar in.



…….. xwendekar in.

10- Em bi hevokên li jêr deqekê saz bikin:

- Em wan di pirtûkxaneyê de bi cih dikin.
- Û her demekê, em wan paqij dikin.
- Piştî ku em pirtûkan dixwînin.

.............................................................

.............................................................

.............................................................

11- Em li wêneyê li jêr baş binêrin û sê hevokan li ser binivîsin:




.............................................................

.............................................................

.............................................................

12- Em her sê pendên li jêr bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin:

- Bi gulekê gulîstan nabe.
- Kaniya ku te av jê vexwar, gemar neke.
- Welat dê ye hem jî bav e, nayê kirîn û firotin bi dirav e.

# BEŞA DUYEM

WANEYAYEKEM:

XWENDEVAN IM

WANEYA DUYEM:

AREZÛYÊN XWENDEKARAN

WANEYA SÊYEM:

WÊNESAZA BIÇÛK

WANEYA ÇAREM:

XWENDINA ÇÎROKAN

WANEYA PÊNCEM:

ZAROK Û LÎSTIN



Wane 1

# XWENDEVAN IM

Xwendevan im xwendevan
Jêhatî me bêguman
Pir pirtûkan dixwînim
Roniyê têr dibînim
Çand û dîrok û ziman
Hemû zaravên kurdan
Bi dilxweşî fêr dibim
Rê li pêş xwe vedikim
Dibistan û zanîngeh
Berek mezin pir fireh
Ramanê me li pêş dixe
Tiştekî nû derdixe
Xwendevan im xwendevan
Bo pêşerojê pehlewan



***Yûnis Behram***

Wane 2

# AREZÛYÊN XWENDEKARAN

1- Kesên di wêneyê de çi dikin?

2- Arezûya te çi ye û çima te ev arezû hilbijartiye?

3- Hûn kengî arezûyên xwe pêk tînin?



# AREZÛYÊN XWENDEKARAN



Arezû karek e ku zarok bi xwe û li gorî kêfa xwe hildibijêre yan jî ji kesên li derdora xwe digire.

**Mamoste:** Xwendekarino! Em ê îro arezûyên hev nas bikin. Mamoste ev pirs ji xwendekaran kir: Arezûya te çi ye? Bersivên xwendekaran cur bi cur bûn; arezûyên wan wênesazî, muzîk, çandina daran, xwendina çîrokan...

Tenê Cûdî ev bersiv da: "Kêfa min ji wênesaziyê re tê, lê dayîk û bavê min, ji bo ku bandoreke neyînî li xwendina min neke, nahêlin ez gelekî wêneyan xêz bikim".

**Mamoste:** Bijî xwendekarino, hûn hemû xwendekarine behremend in! Hûn dikarin arezûyên xwe bi rahênan û alîkariya malbata xwe li pêş bixin û di pêşerojê de, afrîner bin. Lê pêwîst e em, di demên vala û rojên navberan de, bi arezûyên xwe rabin. Ji bo ku bandorê li xwendina we neke, dema xwe bi rêk û pêk bikin. Bi vî awayî wê dayîk û bavê we jî alîkariya we bikin.

## Giftûgoya Waneyê:

- Em bersiva rast hilbijêrin:

1- Kî arezûyên mirov hildibijêre?

**a-** Dayîk û bav **b-** Mamoste **c-** Mirov bi xwe

2- Dayîk û bavê Cûdî nahêlin Cûdî gelekî wêneyan xêz bike, ji tirsa ku wî:

**a-** Ji xwendinê dûr bixe **b-** Xwendinê pê şîrîn bike
**c-** Nêzikî malbatê bike

3- Divê em di kîjan demê de arazûyên xwe pêk bînin?

**a-** Xwendinê **b-** Raketinê **c-** Vala û navberan

4- Arezûyên me çawa bi pêş dikevin?

**a-** Bi rahênanê **b-** Bi xemsariyê **c-** Bi dûrketinê

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Arezû | Hîndarîkirin |
| Behremend | Heskarî |
| Rahênan | Jêhatî |

2- Em cihên vala bi peyvên guncaw dagirin:

**vala - pêş - afrîner - navber - rahênan**

Hûn dikarin arezûyên xwe bi …………. û alîkariya malbata xwe li ……………... bixin û di pêşerojê de …………. bin. Lê pêwîst e em, arezûyên xwe di demên ………… û rojên ………….. de pêk bînin.

3- Em li ser lênûsa xwe, sê xêzan derbarê arezû û tiştên ku em ji wan hez dikin, binivîsin.

# RÊZIMAN

## KITE:

Em hevokên li jêr bi rengekî normal bixwînin:

Em ji bo zanînê dixebitin.

Bi lêkolînan em digihêjin rastiyê.

Em peyv bi peyv hevokên li jor kite bikin: Em ji bo za-nî-nê di-xe-bi-tin

Bi lê-ko-lî-nan em di-gi-hê-jin ras-ti-yê

Em gihaştin çi encamê?

**Rêgez:**

**Kite: Ew parçeya peyvê ya ku bi carekê ji devê mirov derdikeve.**

Em peyvên li jêr kite bikin:

| **Peyv** | **Kitekirin** |
|---|---|
| Gavan | Ga-van |
| Karker | Kar-ker |
| Zembîl | Zem-…….. |
| Zarok | ………….. |

Di her kityekê ji kiteyên li jêr de, çend tîpên dengdêr hene?

| | | |
|---|---|---|
| Dibistan | Cotkar | Bazar |
| Di-bis-tan | Cot-kar | Ba-zar |

**Encam:** Di her kiteyekê de tîpeke dengdêr heye.

Em her du hevokên li jêr kite bikin:

Xaka me berhemdar e.

……………………………………

Em ji avjeniyê hez dikin.

……………………………………

# XWEŞNIVÎS

Em her du deqên li jêr bixwînin:

1- Dema ku em ji dibistanê vedigeriyan, min dît hevala min Jiyan bi lez beza û ji nişka ve li erdê ket. Ez bi lez ber bi wê ve çûm û min alîkariya wê kir.

2- Dema ku em ji dibistanê vedigeriyan, min dît hevala min Jiyan bi lez beziya û ji nişka ve li erdê ket. Ez bi lez ber bi wê ve çûm û min alîkariya wê kir.

We çi cudahî di navbera her du deqan de dît?

**Rêgez:**

**Pêwîst e di nivîsê de valahî di navbera peyvan de hebe.**

Wane 3

# WÊNESAZA BIÇÛK

1- Di xwezayê de çi, bala te dikişîne?

2- Ji bo ku em van dîmenan nîgar bikin, pêwîstiya me bi çi heye?

3- Tu berî niha beşdarî pêşangeha dibistanê bûyî?

4- Tu bêtir ji kîjan behre û jêhatiyan hez dikî?



# WÊNESAZA BIÇÛK



Li pêşangeha ku li dibistanê çêbibû, xwendekaran gelek jêhatî û behreyên xwe pêşkêş kirin. Di beşê wênesaziyê de, gelek wêneyên cihêreng bala xwendekar û mamosteyan kişand. Bi taybet wêneya ku Zîlanê xêz kiribû, gelekî balkêş bû. Hevalê wê Zana jê pirsî: Tu çawa wêneyên balkêş, xêz dikî?

**Zîlan:** Her lawirekî xweşik an xwezayeke rind bala min dikêşe, dixwazim zû bi zû wan bikim wêne û li ser kaxezê zindî bikim.

**Zana:** Tu ji bo pêşerojê çi dihizirî?

**Zîlan:** Bibim wênesazeke navdar û xwezaya welatê xwe bi cîhanê bidim nasîn.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Xwendekaran li ku behre û jêhatiyên xwe pêşkêş kirin?

2- Çi di pêşangehê de bala xwendekar û mamosteyan kişand?

3- Zîlanê ji bo pirsa Zana, çi bersiv da?

4- Kî alîkariya Zîlanê dike?

5- Zîlan dixwaze di pêşerojê de çi bike?

6- Tu jî dabaşa jêhatî û behreya xwe bike.

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyvê ya rast hilbijêrin:

Pêşangeh

Temaşegeh

Dîtin

Kargeh

---

Behre

Çalakî

Jêhatî

Pîvan

---

Zindî

Firinde

Genim

Giyandar

2- Em behre û alavên wê yên pêwîst bigihînin hev:

Avjenî



Wênesazî



Muzîk



3- Em behreya xwe nas bikin û tiştê ku herî kêfa me jê re tê, hibijêrin û heger li nav rêzan peyda nebe em binivîsin:

a- Gelo ez ji muzîkê hez dikim?

b- Gelo ez ji xêzkirin û wênesaziyê hez dikim?

c- Gelo ez ji siwarkirina tiştan û vedîtinan hez dikim?

ç- Gelo ez ji werzişê hez dikim?...

Em çawa van behreyên xwe li pêş bixin?

4- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

**taybet - balkêş - her - xweza**

a- Bi ………… wêneya ku Zîlanê xêz kiribû.

b- Tu çawa wêneyên …………. xêz dikî?

c- ………… lawirekî xweşik an ………….yeke rind bala min dikêşe.

## DERBIRÎN

1- Her wêneyek wate û pêhesîneke li gel me çêdike.

**Mînak:**





| Alan nameyekê ji hevalê xwe re dinivîse. | Ev xwendekar ji bo çûna dibistanê amade ye. |
|---|---|

2- Em her wêneyekê bi sê hevokan derbirînin:





………………………… …………………………

………………………… …………………………

………………………… …………………………

# RÊZIMAN

## XAL:

Em rêzepeyvên li jêr bixwînin:

- Em behreyên xwe li pêş dixin.
- Dema ku em
- Ez ji avjeniyê hez dikim.
- Hûn xwendekarine jîr in.
- Ew wêneyên xweşik li

We çi cudahî di navbera wan de dît?

## Rêgez:

**Dema ku hevok bi dawî dibe, xal li dawiya wê tê nivisîn.**

## XWEŞNIVÎS

**Rêgez:** **Hevok bi tîpa mezin dest pê dike.**

1- Em her du gotinên pêşiyan yên li jêr, bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin û ji bîr nekin rêgezê bi kar bînin:

a- Nanê nekaran li tu derê tune ye.

b- Av çi qasî di golê de bimîne, genî dibe.

Wane 4

# XWENDINA ÇÎROKAN

1- Kêfa we ji çîrokan re tê?

2- Hûn çi sûdê ji xwendina çîrokan digrin?

3- Çîrokeke ku te xwendiye an jî bihîstiye ji hevalên xwe re vebêje.



# XWENDINA ÇÎROKAN



Xwendina çîrokan aşopên mirov fireh dike û rê li ber afrandinê vedike.

Gulbîn xwendekareke zarşîrîn e. Di kejê yekem de, Gulbîn tev li pêşbirka çîrokên zarokan, bûbû. Dema Gulbînê çîroka ku rêsaye xwend, awayê xwendina wê; xweşbêjî û rewanbêjiya wê û peyvên ku çîrok pê hatibû nivîsandin, bala hemû kesên amade kişand. Piştî Gulbînê xwendina çîrokê bi dawî kir, kesên amade bi coş jê re li çepikan dan.

Gulbînê bala ragihandinê jî kişand. Endamê ragihandiinê ev pirs jê kirin: Tu ji kê fêrî xwendina çîrokan bûyî û rewanbêjiya te çawa li pêş ket? Kê te fêrî hunera nivîsandina çîrokan kiriye?

**Gulbîn:** Dema dapîra min ji me re çîrok digotin, min xwe di nava çîrokê de didît. Min hewl dida çîrokan bibêjim. Dayîk û bavê min ji min re pirtûkên çîrokan û kovarên zarokan dianîn. Her ku min çîrokek dixwend, fêrî çend peyvên nû dibûm. Min ew li dibistanê di waneyên ziman de bi kar dianîn. Vê yekê bala mamosteyê min kişand û aîkariya min di nivîsandina çîrokan de kir.

Gulbînê xelata yekem a çîroknivîsê wergirt û di dawiyê de spasiya mamoste û malbata xwe kir û xelata xwe diyarî dapîra xwe kir.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Di awayê xwendina gulbînê de, çi balkêş bû?

2- Kesên amade çawa nêzî Gulnînê bûn?

3- Dema dapîrê çîrok digotin, Gulbînê çi dikir?

4- Malbat û mamosteyê wê, çawa alîkariya wê kirin?

5- Gulbînê çi sûd ji çîrokan girt?

# HÎNDARÎ

1- Em peyvên (xweşbêjî - rewanbêjî - ragihandin) di hevokên li jêr de, li şûna hemwateya wan, bi cih bikin:

- Baran wane bi awayekî hûnandî xwend.
- Baran wane bi awayekî …………….. xwend.
- Bavê zînê di çapemeniyê de dixebite.
- Bavê zînê di ………………. de dixebite.
- Ew mirovekî xweş diaxive.
- Ew mirovekî ………………..

2- Em peyvên li jêr di hevokan de, bi cih bikin:

Wergirt: ……………………………………….

Aşop: ……………………………………….

Zarşîrîn: ……………………………………….

3- Em peyvê bigihînin dijwateya wê:

Nû

Kevn | Teze | Kevir

---

Dawî

Navîn | Destpêk | Jor

---

Kişand

Vexwar | Qeşart | Dehfand

# RÊZIMAN

## BÊHNOK:

Em hevokên li jêr bixwînin:

a- Tu çawa wêneyên balkêş, xêz dikî?

b- Em baş dixebitin, lê dema me pir nemaye.

c- Tablo, firçe û reng, alavên wênesaziyê ne.

**Rêgez:**

**Bêhnok cihê bêhinvedanê, nîşan dike.**

Em bêhnokan di cihê guncaw de, bi kar bînin:

a- Ew pir ji helbestan hez dikin lê pirtûkên wan kêm in.

b- Firyal Moryan Şahîn û Dildar xwendekar in.

## XWEŞNIVÎS

- Em penda li jêr bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe binivîsin:

Tiştên bi pênûsê hatine nivîsandin,
bi bivir nayê şkandin.

Wane 5

# ZAROK Û LÎSTIN

1- Hûn ji kîjan lîstikan hez dikin?

2- Hûn bi kê re dilîzin?

3- Navên hin lîstikên ku hûn nas dikin, vebêjin.

4- Hûn li ku derê dilîzin?

5- Di dema lîstinê de hestên we çawa ne?



## ZAROK Û LÎSTIN



Em zarokên biçûk, danûstendina me ya destpêkê bi rêya lîstinê dest pê dike. Ev lîstik derfetên tevgerê li gel me xurt dike. Her wiha kêfxweşî û derûniyeke saxlem li gel me peyda dike. Em zarokên biçûk, dibezin, lîstokan dilîzin û lîstikên nû diafirînin. Ev lîstok, aşopên me fireh û bêsînor dikin. Em bi lîstikan mezin dibin û dema mirov mezin dibin jî, di aşopên xwe de, ew lîstik û tevger kêliyên herî xweş dibînin.

Li hemberî vê, gelek caran malbatên me, ji bo em xwe gemar nekin, derfetê pir nadin. Bi taybetî dema

lîstin li deveyî malê be û bi tevger be. Mîna: kişandina werîs, veşartokê… Lê ev nêzîkatî ne di cih de ne, ji ber ku divê em bi zaroktiya xwe şa bibin. Rola malbatên me di birêkûpêkiya demê û dabeşkirina wê de heye. Lê divê em ji bîr nekin piştî xwendin û kar, dema lîstinê tê.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Danûstendina destpêkê li gel zarokan, bi çi dest pê dike?

2- Sûdên lîstinê ji bo me çi ne?

3- Dema mirov mezin dibe, kêliyên herî xweş yên di bîrgeha wî de dimînin, çi ne?

4- Çima ji bo lîstinê, malbat pir derfetê, nadin zarokan?

5- Em ê çawa hevsengiyê têxin nabera xwendin û lîstinê?

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva şînkirî ji nav peyvan hilbijêrin:

- Ev lîstik **derfeta** tevgerê xurt dike.

- Ev lîstik …………….. tevgerê xurt dike. (dem - delîve - kar)

- Lîstin **aşopa** me fireh dike.

- Lîstin ……………. me fireh dike. (xeyal - hizir - agahî)

Em tiştên nû **diafirînin**.

Em tiştên nû …………... (şewitandin - çêdikin - hatin)

2- Em navên lîstikan binivîsin:

……………………… 

…………………….. 

…………………….... 

## DERBIRÎN

Em bi rêya bersivên pirsên li jêr, deqekê saz bikin:

Em herî pir ji kîjan lîstikan hez dikin?

Em bi kê re dilîzin?

Em di kîjan demê de dilîzin?

Em dema xwe ya vala, çawa derbas dikin?

.............................................................

.............................................................

.............................................................

.............................................................

.............................................................

# RÊZIMAN

## PIRSNÎŞAN:

- Em hevokên li jêr bixwînin:

  a- Tu ji xwendina çîrokan hez dikî?

  b- Hûn ji çîrokan sûdê digirin?

  c- Mirov çawa dikare arezûyên xwe li pêş bixe?

- Ev hevok çi diyar dikin û li dawiya wan çi hêma heye?

**Rêgez:**

**Li dawiya hevokên pirsyariyê, pirsnîsan tê bikaranîn.**

Em pirsên bersivên li jêr binivîsin:

1- ……………………………..…?

Min serdana bajarê Qamişloyê kir.

2- ……………………………….. ?

Dar li daristanan hene.

3- ………………………………?

Mala me li bakurê bajarê Amûdê ye.

4- ……………………………….?

Bi piranî kêfa min ji gulên rengzer re tê.

# XWEŞNIVÎS

- Em helbesta li jêr bi rengekî watedar bixwînin û paşê bi awayekî bi rêk û pêk li ser lênûsa xwe binivîsin:

Hevalê delal, ey kurê xwendekar
Me danîne ristên xwe pir bêjimar
Ji te hêvîdar im ji min megire dil
Ku pêşkêş dikim ez ji bo te gul

***Cegerxwîn***





# BEŞA SÊYEM

WANEYAYEKEM:

DARA ZEYTÛNÊ

WANEYA DUYEM:

EM DARAN BIÇÎNIN

WANEYA SÊYEM:

SEWALÊN ME

WANEYA ÇAREM:

PERPERÎK



Wane 1

# DARA ZEYTÛNÊ

1- Şaxa ku hûn di wêneyê de dibînin a çi darê ye?


2- Sûdên dara zeytûnê çi ne?

3-  Li Kurdistanê darên zeytûnan gelekî li ku derê hene?

4- Kî ji we dizane şaxê zeytûnê yê di devê kevokê de, sembola çi ye?



# DARA ZEYTÛNÊ



Dara zeytûnê, dareke her dem kesk û temendirêj e, temenê wê digihêje sedên salan. Xwe li ber mercên avhewa û jîngehê yên hişk mîna germhî, serma û axa bikevir digre. Ji (3-6) metreyan bilind dibe. Dara zeytûnê hem di warê aboriyî hem jî di parastina jîngehê de samaneke netewî ye. Dara zeytûnê dareke hilberîner û merd e. Em ji zeytûn, pel û qurmê wê gelek sûdan digirin.

Zeytûn yek ji xwarinên sereke yên tîmardar e; pêdiviya mirovan pê heye û zengîn e. Ji zeytûnan zeyt jî tê derxistin. Zeyta zeytûnan, zeyta herî baş e, ew jî ji

bo xwarinê û di warê tenduristiyê de jî, tê bikaranîn. Pelên zeytûnan ji bo gelek nexweşiyan tên bikaranîn û wek çayê tê vexwarin. Ji qurmê wê peykerên hunerî tên çêkirin. Em ji bîr nekin ku şaxê zeytûnê wek sembola aşîtiyê tê naskirin û wêjevanan dara zeytûnê wek nişaneya xweragirî û berxwedanê bi nav kirine.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Dara zeytûê dareke çawa ye?

2- Di kîjan mercan de dara zeytûnê dikare bijî?

3- Berhemên dara zeytûnê çi ne?

4- Pelên zeytûnê ji bo çi tên bikaranîn?

# HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyva rengsor, xêz bikin:

a- Darên zeytûnan dikarin di avhewayeke germ de bijîn.

kêşwer - mal - xweşik

b- Dar, jîngehê diparêzin.

pirtûk - derdor - mêze

c- Daristan yek ji samanên aboriyê ye.

sermiyan - dar - gulav

ç- Dara bêhilberîn, kes keviran navêje wê.

çav - ber - hişmendî

d- Zeyta zeytûnan ji elementên girîng pêk tê.

hêman - ax - deşt

2- Em hevoka li jêr sergihayî bikin:

- Ji ber ku dara zeytûnê di mercên dijwar de dijî, bûye nîşana ……………

3- Em cihê val bi peyva guncaw dagirin:

Zeyta zeytûnan, zeyta herî ……… e. (xerab - bisûd)

Pelên zeytûnan wek …………… tên bikaranîn. (derman - xwarin)

Dara zeytûnan, dareke ……………… e. (bêsûd - hilberîner)

# RÊZIMAN

- Em hêmaya guncaw (xal, bêhinok, pirsnîşan) di dawiya hevokê de bi cih bikin:

a- Em pirtûkên xwe diparêzin ☐

b- Hûn li dibistanê çi waneyan distînin ☐

c- Em bi dispilîn li otobîsê siwar tên ☐ lê rêya me pir dirêj e ☐

## XWEŞNIVÎS

**Rêgez:**

**Di nivîsê de, pêwîst e ku tîpên di peyvekê de, dûrî hev neyên nivîsandin.**

**Mînak:**

**Awayê çewt: D ar a xeb atkar an, her d em b ib er e.**

**Awayê rast: Dara xebatkaran, her dem biber e.**

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik, li lênûsa xwe binivîsin û rêgeza ku em fêr bûn, bi kar bînin:

**Li rojavayê Kurdistanê, bajarê ku bi darên zeytûnan navdar e, bajarê Efrînê ye. Ji ber ku bêhtirî sêzdeh milyon darên zeytûnan lê hene.**

Wane 2


# EM DARAN BIÇÎNIN

1- Dar li mala we hene?

2- Dar gelekî li ku tên dîtin?

3- Em çi sûdê ji daran digirin?

4- Hûn çawa li daran baldar in?



# EM DARAN BIÇÎNIN



Li dibistanê xwendekaran şanoyeke bi navê "em daran biçînin", pêşkêş kir. Her xwendekarek bi rola darekê rabû.

**Mîrza:** Em darên tirî bisûd in; tîmarên cur bi cur (dims, mireba) pêşkêşî we dikim û pelên me di çêkirina xwarinan de, tên bikaranîn.

**Hêvî:** Em darên tûyan ne kêmî we ne; em tûyên xweş hildeberînin û stargeha çûk, çivîk û pir zindiyan in.

**Nazdar:** Hûn baş min nas dikin; ez dara sêvê me. Hûn bi sêvên min tîmar dibin û tenduristiyeke saxlem bi dest dixin.

**Kawa:** Em daraên behîvan in; em behîvên xweş û pir bisûd pêşkêşî we dikin.

Daran tevan bi hev re got: Em dar in, em zindî ne, me biparêzin û li her derê me biçînin!

Şano, bi çepikên xwendekaran bi dawî bû. Mamoste bi bîr xist ku îro cejina daran e û cejina daran li wan pîroz kir.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Navê şanoya ku xwendekaran pêşkêş kir, çi bû?

2- Çi sûdên darên tiriyê hene?

3- Em çi sûdê ji dara sêvê bi dest dixin?

4- Xwendekaran, di dawiya şanoyê de çi bi hev re gotin?

5- Ev şano bi çi boneyê hate pêşkêşkirin?

6- Tu û hevalên xwe vê şanoyê li ser dika polê, zindî bikin.


## HÎNDARÎ


1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Biyaban | Xwarin |
| Zindî | Kêrhatî |
| Stargeh | Lûs |
| Tîmar | Çolistan |
| Bisûd | Giyandar |

2- Em berê ku ji darê tê hilbirandin, bighînin dara wê:

Pirteqal






Mûz



Sêv



Tirî

3- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

**çandin - welat - sî - hewa**

a- Dar, ……….. me ji qirêjiyê paqij dike.

b- Em li ber ………….. daran, xwe vedihesînin.

c- Li …………… me gelek cureyên daran hene.

ç- …………….. daran xwezaya me xweş dike.

# RÊZIMAN

## NAVDÊR:

**ÇÛK**

Çûkê danî ser darê
Xwariye genimê kewarê
Çûka min çilziman e
Bûye xemla buharê

Perê çûkê belek in
Sor û zer û xelek in
Yên ji çûkan hez dikin
Ji zarokan gelek in

***Gernas Koçer***

Em li jêra wêneyê, navê guncaw binivîsin:





...................... ......................





…………………… ……………………





………………….. ……………………

**Rêgez:**

**Em ji her heyînekî re navekî bi kar tînin. Ev nav wek navdêr tê bi navkirin.**

# XWEŞNIVÎS

- Em malika helbesta li jêr bi aweyekî xweşik, li lênûsa xwe binivîsin:

Serxwe nabe Kurdistan
Bê xwendin û dibistan

*Osman Sebrî*

- Em nivîsa li jêr baş bixwînin û weke rênivîsê li lênûsa xwe binivîsin:

**Ji bo ku em encamên baş bi dest bixin, divê em baş bixebitin.**

## DERBIRÎN

Cejna daran kengî ye û em tê de çi dikin?

Em pênc hevokan, li ser vê rojê binivîsin.

.........................................................................

.........................................................................

.........................................................................

.........................................................................


Wane 3

## SEWALÊN ME

1- Hûn çi di wêneya li jêr de dibînîn? 2- Li herêma te sewal hene?

3- Tu ji kîjan cureyê lawiran hez dikî?

4- Kesê ku diçe ber pez, em çi navî lê dikin?



# SEWALÊN ME



Gava dayîka min meşk dikila, ew nîvşkê ku datanî ser nanê me, cêja wî ji ser zimanê min naçe. Em li dora wê kom dibûn û berhemên ku sawalên me hildiberandin pêşkêşî me dikir. Mih yan jî bizin xwedî nirx bûn; mirov digot ew endamên malbatê ne.

Gelek caran di nava civatan de tê gotin: Sewal wek zarokên malê ne. Li gundê me tu mal bê sewal û dewar nedihatin dîtin. Van sewalan hem bi berhemên mîna: mast, penêr, rûn û firo me têr dikirin û hem jî bi hirî û mûyên xwe cilên xweşik û nivînên germ ku em xwe pê binixumînin, pêşkêşî me dikir. Li hemberî wê, di werzê zivistanê de, me ew bi êmên bisûd xwedî dikir.

Di buharan de, me zeviyên xwe ji wan re berdidan û di nava giya û nefelê de diçêriyan. Kêliyên herî xweş, gava me sewal bêrî dikirin. Te digot qey em û sewal bi zimanên hev dizanin. Bi awayekî bi rêk û pêk li dû hev dihatin ser bêriyê û bi aramî dihatin dotin. Paşê me berxikên wan dan dikirin û bi maramra wan muzîkeke xwezayî bilid dibû.

Di êvaran de, me ew di axur û xanan de bi cih dikirin û bi dilovanî me çîvên xwe li nav wan digerand û diketin xewa şîrîn.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Gava dayîkê meşk dikila, çi pêşkêşî zarokan dikir?

2- Çima sewalên malê xwedî nirx in?

3- Di civatan de çi li ser sewalan digotin?

4- Sewal, çi berheman pêşkêşî me dikin?

5- Di zivistanê de, sewal çawa tên xwedîkirin?

6- Di buharan de, sewal li ku diçêrin?

7- Kengî sewal tên bêriyê û di pey re bêrîvan çi dikin?

# HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| Çêj | Xwarina pez |
| Nirx | Dengê pez |
| Êm | Tam |
| Bêrî | Buha |
| Maremar | Dotin |

2- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

**ziman - nirx - dewar - nefel**

a- Cêja wê ji ser …………. min naçe.

b- Mih yan jî bizin xwedî …………… bûn.

c- Li gundê me tu mal bê sewal û …………….. nedihatin dîtin

d- ç- Di buharan de di nava giya û …………… de diçêriyan.

3- Em peyvên li jêr di hevokan de, bi cih bikin:

Çêre: ........................................

Pez: ........................................

Şivan: ........................................

Kar: ........................................

4- Em navên lawiran û çêlîkên wan bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| **Mih** | **Golik** |
| **Bizin** | **Cehşik** |
| **Çêlek** | **Berxik** |
| **Ker** | **Çêçik** |
| **Mirîşk** | **Karik** |

# XWEŞNIVÎS

**Rêgez:**

**Di nivîsandinê de, ji bo xweşikbûna xêza me, em nivîsê bi awayekî sivik bi aliyê rastê ve xwar dikin.**

**Mînak:**

**Awayê çewt:** **Berxê çê di kozikê de bang dike.**

**Awayê rast:** *Berxê çê di kozikê de bang dike.*

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin û rêgeza ku em fêr bûne, bi kar bînin:

**Hemû lawir û şînatî zindî ne. Divê em zirarê negihînin wan û li wan baldar bin; ango lawiran bi xwarin bikin û şînatiyan av bidin û wan nebirin.**

# RÊZIMAN

## NAVÊN RAZBER Û ŞÊNBER:

Em navên li jêr li gorî tabloyê dabeş bikin:

(**kevir** - **hezkirin** - **sêv** - **kêfxweşî** - **bivir** - **xemgînî**)

| Heyînên ku em bi çavan dibînin û bi destan digrin | Heyînên ku nayên dîtin û tên hestkirin |
|---|---|
| | |
| | **Xemgînî** |
| **Kevir** | |

Weke ku li jor tê xuyakirin, nav li gorî heyîna xwe dibin du beş:

**Navên şênber:** Ew navên heyînên ku bi çavan tên dîtin û bi destan tên girtin.

**Navên razber:** Ew navên heyînên ku bi çavan nayên dîtin û bi destan nayên girtin, lê tên hestkirin.


Em sê navên razber û sê navên şênber binivîsin.

Wane 4

# PERPERÎK




Perperîkê heft rengê
Delalê şox û şengê
Hevalên te hatine
Tu yê razê ta kengê



Bihara dilê bavê
Xemiliye bi xunavê
Ji porên şîrîna min
Xweş tê bêhina gulavê

Stêra nûhilat e
Xwe mizgîn û xelat e
Lê sed heyf û mixabin
Rinda min bêwelat e

**Gernas Koçer**



# BEŞA ÇAREM

WANEYAYEKEM:
CÛDÎ Û TELEVÎZYON

WANEYA DUYEM:
XWARINA HEVSENG

WANEYA SÊYEM:
WERZIŞ Û TENDURISTÎ

WANEYA ÇAREM:
CIWANA



Wane 1

# CÛDÎ Û TELEVÎZYON

1- Tu ji temaşekirina televîzyonê hez dikî?

2- Tu li çi pirogramî temaşe dikî?

3- Tu nêz yan dûrî televîzyonê rûdinê?

4- Dema tu li televîzyonê temaşe dikî, çiqas e?



# CÛDÎ Û TELEVÎZYON



Cûdî di pola xwe de, xwendekarekî pir jêhatî ye. Ew pir ji filmên zarokan hez dike. Dema ku Cûdî xwendin û lîstinê diqedîne, pirî caran li televîzyonê temaş dike. Rojekê berî biçe dibistanê, gazin ji çavên xwe kir; ew pir diêşiyan. Dayîk û bavê Cûdî ew birin gel bijîşk. bijîşk ew bi rûkenî pêşwaz kirin. Bijîk tabloyeke tijî sembol li hember wî danî û pirs li ser semolan dikir û li lênûsa xwe dinivîsand.

Bijîşk bi aramî destê xwe danî ser serê Cûdî û jê pirsî: Cûdî, tu li televîzyonê temaşe dikî?

**Cûdî:** Erê.

**Bijîşk:** Tu çi qasî li televîzyonê temaşe dikî?

Cûdî bi girnijînekê bersiv da û pê re serê xwe xwirand: Gelekî!

**Bijîşk:** Em gelek sûdê ji telefizyonê digrin; bi taybet gava em li filmên li gorî temenê xwe temaşe dikin.

Ew aşopên me fireh dikin û agahiyên me zengîn dikin. Ji mafê te ye tu li televîzyonê temaşe bikî, lê ne ji mafê te ye, tu ziyanê bidî çavên xwe!

**Cûdî:** Çawa?

**Bijîşk:** Bi mayîna pir li ber televîzyonê, çavên te dê kêm bibin û bi berdewamî li nêz televîzyonê rûinştin, dê çavên te pir ziyanê bibînin.

Divê tu bi qasî (3-4) metreyan dûrî televîzyonê rûnê û di nvbera (1-2) saetan lê temaşe bikî.

Di dawiyê de Cûdî û malbata xwe bi kêfxweşî ji cem bijîşk derketin û spasiya wî kirin!

Bijîşk li ber derî bi rûkenî, ji Cûdî re got: Heke tu dûbare bikî ez ê berçavka xwe bidim ber çavên te!

## Giftûgoya Waneyê:

1- Cûdî xwendekarekî çawa ye?

2- Beriya Cûdî biçe dibistanê, gazin ji çi dikir?

3- Malbata Cûdî ew birin ku?

4- Bijîşk çi pirs ji Cûdî kir?

5- Sedema êşa çavên Cûdî ji çi derket?

6- Bijîşk çi agahiyên bijîşkî pêşkêşî wî kirin?

7- Tu jî ji bo parastina çavên xwe ji ziyanan, hin pêşniyaran bike.

# HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva şînkirî ji nav peyvan hilbijêrin:

- Bijîşk her roj serdana nexweşên xwe dike.
- .......... her roj serdana nexweşên xwe dike.

(doktor - şivan - cotkar)

- Kevok sembola aşîtiyê ye.
- Kevok .......... aşîtiyê ye.

(nîşana - firinde - lawir)

Rûyê wî her dem bi girnijîn e.

Rûyê wî her dem bi ........... e.

(tirş - ken - deng)

2- Em peyv û dijwateya wê bighînin hev:

| | |
|---|---|
| **Maf** | **Valakirin** |
| **Ziyan** | **Bêmafî** |
| **Dagirtin** | **Sûd** |
| **Gazin** | **Razîbûn** |

3- Em valahiyên li jêr bi peyva guncaw dagirin:

**nêzî - ber - xwe - bisûd**

a- Divê em gelekî li ………… televîziyoê rûnenên.

b- Em xwe pir …………. televizyonê nakin.

c- Em li fîlmên ………..temaşe dikin.

ç- Em li xwendina ……….. baldar in.

# XWEŞNIVÎS

- Em helbesta li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:

Xwendin divê hem pir xebat
Bo miletê kurd û welat
Kurdino ji xew rabin hemû
Mizgîn li we roja me hat

*Cegerxwîn*

# DERBIRÎN

Li ser fîlmekî ku te lê temaşe kiriye, nivîsekê li ser lênûsa xwe binvîse û van xalan di ber çavan re derbas bike:

1- Navê fîlim.

2- Çima tu jê hez dikî?

3- Dema wî.

4- Sûdên ku te jê girtiye.

Wane 2


# XWARINA HEVSENG

1- Em çi di wêneyê de dibînin?

2- Ji bo çi mirov xwarinê dixwe?

3- Pêwîst e mirov çi xwarinan bixwe?

4- Gelo, mirov dikare bê av bijî?



## XWARINA HEVSENG



Xwarin yek ji pêdiviyên jiyanê yên bingehîn e.

Dildar birçî bûbû, xwest xwarinê bixwe. Deriyê sarincê vekir û ma sekinî nizane çi bixwe.

**Nan** bang kir: Min bixwe! Ez ê bi şekirê xwe enerjiya laşê te xurt bikim.

**Şîr û mast**: Were gel me, em ê pirotîn, vîtamîn û kalisyoma ku hestiyên te xurt bikin, bidin te.

**Mêwe û sebzeyan** (serê xwe rakirin): Em ê vêtamîn, hesin û xwêyên kanzayî yên ji laşê te re pêwîst in, bidin te! Şaneyan ava bikin û te ji nexweşiyan biparêzin.

**Goşt, hêk û baqilan**: Em pirotîn in! Em ê şaneyên laşê te nû bikin û enerjiya te xurt bikin.

**Nîvişk û zeyt**, **(**herikîn) û gotin: Em ê vêtamînan veguhêzin cihê wan û enerjiyê bidin laş te!

**Avê (**li wan guhdar dikir û ji nişkave rabû): Bêyî min tu nikarî bijî; piraniya bikaranînên jîndarî xwe dispêrin min û germahiya laşê te birêxistin dikim.

**Dildar**: Hemû xwarin li ber xwe danîn û dest bi xwarinê kir. Xwişka wî hat, ew dît û got: Tu çi dikî!!?

**Dildar:** Ez ê hemûyan bixwim, ji bo ez bi hêz bibim û nexweş nekevim. Xwişka wî lê vegerand:

- Rast e pêwîstiya me bi xwarinê heye, lê divê mirov hevsengiyê di nav xwarinê de çêke.

Hin xwarin hene, heger tu wan pir bixwî dê ziyan bighêje tenduristiya te. Pêwîst e em li gor pêdiviya laşê xwe bixwin.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Em vîtamînan ji çi, bi dest dixin?

2- Sûdên pirotînan ji bo laş çi ne?

3- Ji bo çi jiyan bêyî avê nabe?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyva rengsor, xêz bikin:

a- Pêdiviya me bi vîtamînan heye.

pêwîstî - çare - guhdarî

b- Av ji bo jiyanê heybereke bingehîn e.

alî - xistin - sereke

c- Enerjî ji bo tevgerê pêwîst e.

gog - wize - cil

ç- Em xwêyên kanzayî ji sebzeyan bi dest dixin.

lawir - metal - agir

2- Em xwarinan bigihînin heyberên ku pêşkêş dikin:

| | |
|---|---|
| **Nan** | **Hesin** |
| **Baqil** | **Vêtamîn** |
| **Mêwe** | **Pirotîn** |
| **Sebze** | **Şekir** |
| **Şîr** | **Kalîsyom** |

3- Em bersiva rast hilbijêrin:

- Ji bo xwarina me tendurist be, pêwîst e em xwarinê:

  a- Li gor pêdiviya xwe bixwin.

  b- Cureyekî tenê bixwin.

  c- Bê pîvan bixwin.

# XWEŞNIVÎS

**Rêgez:**

**Di nivîsê de, ji bo nivîsîneke bedew û lihevhatî, pêwîst e em bi awayekî rast binivîsin û ji xêzê dernekevin.**

**Mînak:**

**Awayê çewt:**

Di fêrbûnê de daxwaza azad ji koteki y ê bi bandort i r e .

**Awayê rast:**

Di fêrbûnê de daxwaza azad, ji kotekiyê bi bandortir e.

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik li ser lênûsa xwe bi awayekî rêkûpêk binivîsin:

**Ji bo ku em baş mezin bibin û nexweş nekevin, pêwîst e em xwarinên cur bi cur bixwin.**

# RÊZIMAN

- Em her du hevokên li jêr bixwînin:

Lewend bi gulokên berfê dilîze.

Ew bi gulokên berfê dilîze.

- Di hevoka duyem de, li şûna navê lewend çi peyv hatiye bikaranîn?

Karker diçin karên xwe.

Ew diçin karên xwe.

- Di hevoka duyem de, li şûna navê karker çi peyv hatiye bikaranîn?

## Rêgez:

**Cînav: Ew peyvên ku cihê navan digririn.**

**Cînavên xwerû ev in:**

**Ez - tu - ew - em - hûn - ew**

Em cihên valan bi cînavên li jêr dagirin:

**ez - tu - ew - em - hûn - ew**

a- …….. her sibe diranên xwen firçe dikim. b- …….. bi hevalên xwe re bi veşartokê dilîzî? c- Bengîn …….. dîtin.

ç- ……..her gav bi kêfxweşî diçin dibistanê. d- ……… pir ji muzîkê hez dike.

Wane 3

# WERZIŞ Û TENDURISTÎ

1- Xwendekarên di wêneyê de çi dikin?

2- Werziş çi ye?


3- Kêfa we ji werzişê re tê, çima?

4- Piranî kêfa we ji kîjan listikê re tê?

5- Kesê werzişê dike çawa ye û kesê werzişê nake çawa ye?



# WERZIŞ Û TENDURISTÎ



Em xwendekar gelekî ji werzişê hez dikin, roja ku waneya werzişê li gel me hebe, em bawer nakin kengî dema wê bê. Nemaze piştî waneyên ku pêwîstiya wan bi baldarî û hizirîneke pir heye.

Ji ber ku werziş me kêfxweş dike, mejiyê me vedihesîne, em dikarin waneyên piştî waneya werzişê xweş derbas bikin û zû tê bigihêjin. Her wiha bi rêya werzişê, gewde çalak dibe, pergalên laşê me vedigerin rewşa xwe ya asayî.

Werziş enerjiya gewdeyê me bilind dike û pergala geranê sererast dike. Bi hêsanî xwîn bi awayekî bi rêk û pêk li hemû gewdeyê me belav dibe. Senga laş diparêze û masûlkeyan xurt û bi hêz dike.

Hestiyan jî saxlem dike û wan ji rizîna hestiyan û qerimînê diparêze. Rê li ber gelek nexweşiyan digire. Em dikarin bibêjin ku werziş gewdeyekî xurt, saxlem û bihêz, ava dike.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Kengî xwendekar li hêviya waneya werzişê ne?
2- Çima werziş piştî hin waneyan ji xwenekaran re pêwîst e?
3- Hin sûdên werzşê yên ku di waneyê de, derbas nebûne, ji hevalên xwe re bibêjin.
4- Werziş gewdeyekî çawa ava dike?

# HÎNDARÎ

1- Em peyvê bigihînin hemwateya wê:

| | |
|---|---|
| | Bêhindan |
| Nemaze | Xwezayî |
| Pergal | Bi taybetî |
| Gewde | Sîstem |
| Asayî | Laş |

2- Em bersiva rast hilbijêrin:

**A.** Werziş pergala geranê:

a- Sererast dike    b- Xwar dike    c- Xera dike

**B.** Xwendekar ji werzişê:

a- Dûr dikevin    b- Hez dikin    c- Ditirsin

**C.** Bi werzişê gewde dikare li hember nexweşiyan:

a Winda bibe    b- Şaş bibe    c- Xwe ragire

3- Em hevokên li jêr bi awayekî rêkûpêk binivîsin:

- di rojbaşê de pêk tinin.

- hin rahênanên werzişî.

- em her sibe, berî em derbasî polan bibin.

……………………………………………………………

………………………………………………………….....

## XWEŞNIVÎS

**Rêgez:**

**Ji bo nivîseke lihevhatî û rind, pêwîst e di nivîsandinê de qebareya tîpên me wek hev bin û ji hev ne cuda bin.**

**Awayê çewt:** Xebat karê herî birûmet e.

**Awayê rast:** Xebat, karê herî birûmet e.

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin û rêgezên ku em fêrî wan bûne, bi kar bînin:

Ji bo ku mirov jiyaneke tenurist bijî, pêwîst e her roj werzişê bike, xwarineke hevseng bixwe û dûrî tiştên bizirar bikeve.

## RÊZIMAN

- Em her du hevokên li jêr bixwînin:

- Hevendî helbest dixwendin.
- Wî helbest dixwendin.

- Di hevoka duyem de, li şûna navê Hevend, çi peyv hatiye bikaranîn?

- Zînê gul av dan.
- Wê gul av dan.

- Di hevoka duyem de, li şûna navê Zînê, çi peyv hatiye bikaranîn?

**Rêgez:**

**Cînav: Ew peyvên ku cihê navan digririn.**

**Cînavên tewandî ev in:**

**min - te - wî - wê - me - we - wan**

Em cihên valan bi cînavên li jêr dagirin:

**min - te - wî - wê - me - we - wan**

a- Te ji min re pir wane vegerandin.

b- Mamoste ji ……. hemûyan re got.

c- …….. em li gulîstanê dîtin.

ç- …....... porê xwe kir kezî.

d- …….. pêlava werzişê li xwe kir.

e- …….. baxçeyê dibistanê paqij kir.

ê- …….. xwendin bi dawî kir?

## DERBIRÎN

1- Dema guncaw ji bo werzişê kengî ye?

2- Sûdên werzişê çi ne?

Em bi çend hevokan derbirînekê di vê çarçoveyê de binivîsin.

....................................................................

....................................................................

....................................................................

....................................................................

Wane 4

# CIWANA



Ciwana pir xweşik e
Lêv û dev tev tenik in
Fistan li bejnê rengîn
Por xelek û zêrîn
Diçe baxçê zarokan
Bi devkenî û dîlan
Her dilîze ew li wir
Bi hêlanê bi zuxir
Piştî ku xware firavîn
Dikeve xewa şîrîn
Demekê kin xew dike
Çavên xwe pê nerim
dike Paşê li gel bavê xwe
Diçe gel dayîka xwe
Ji kêfan dide lotkan
Bona baxçê zarokan

*Yûnis Bahram*

# BEŞA PÊNCEM

WANEYAYEKEM:

NEWROZ

WANEYA DUYEM:


EFRÎN

WANEYA SÊYEM:

PARASTINA XWEZAYÊ

WANEYA ÇAREM:

AY LÊ GULÊ



Wane 1

# NEWROZ

1- Navê çend cejinên ku hûn wan pîroz dikin bibêjin.

2- Di avdarê de xweza çawa dibe?

3- Çi bone di avdarê de hene?

4- Em çawa Newrozê pîroz dikin?

5- Pirsa Cejina Newrozê ji bav û dayîka xwe bikin.



# NEWROZ



Ji her boneyekê re dîrokek heye. Bi vê boneyê re pir bîranîn, hest û pêhesîn jî hene. Gava xweza bi rengên xwe yê cuda her derê dinixumîne, bi rengekî normal derûniya mirov doza derketina nava xwezyê dike.

Li herêma me, dema roja Cejina Newrozê nêzîk dibû, di dilê me de hestekî cuda çêdibû. Me roj bi roj nêzîkbûna vê rojê dihejmart. Êvara cejinê, gel agir li cihên bilind vêdixistin. Her keseî ev agir geş dikir û li dora wî kom dibûn û dîlan digerandin. Me ji jor ve her der didît; li her derê ronahiya azadiyê blav dibû.

Bi wê kêfxweşiyê roj diçû ava û tariyê digirt ser her derê, lê destên me ji ronahiya agir nedibû.

Bi şev me dixwest saet zû bibeze û bibe Newroz. Roja dîtir cilên ku me ji bo vê boneyê veşartibûn li xwe dikirin û me berê xwe dida navenda pîrozbahiyê. Te digot gel bûye yek giyan yek deng. Heta ber êvarî me xweşiya vê rojê çêj dikir û bi stranên netewî û tilîliyên dayîkan, vedigeriyan malê.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Bi nêzîkûna Cejina Newrozê, hestên zarokan çawa dibû?

2- Êvara Cejina Newrozê çi dihat kirin?

3- Kesên beşdar, li dora agir çi dikirin?

4- Di roja Newrozê de, em çi cilan li xwe dikin?

5- Roja Newrozê giyanekî çawa çêdibe?

## HÎNDARÎ

1- Em bazinekî li derdora hemwateya peyvê, xêz bikin:

**Bone:**

hilkeft - bûyer - rûdan

**Derûnî:**

rewanî - gewdî - fîzîkî

**Giyan:**

can - hewa - pirîsk

2- Em her sê peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin:

Kawa: ........................................

Hesinkar: ........................................

Newroz: ........................................

2- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Li herêma me gava roja ………. Newrozê nêzîk dibû, di dilê me de …………. cuda çêdibû. Me roj bi roj …………. vê rojê dihejmart.

3- Em navên heyînên li jêr binivîsin:



……………………….



…………………………



.....................................

# XWEŞNIVÎS

Em nivîsa li jêr bi rengekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:

Di meha avdarê de, gelek bone hene. Bi taybet Cejina Newrozê ya ku em her sal wê pîroz dikin. Her wiha 8'ê Avdarê û 12'yê Avdarê jî hene. Meha avdarê cihekî giring di salnameya kurdî de digre.

# RÊZIMAN


Ev pirtûk in


Ew pirtûk in

## Rêgez:

**Cînavên şanîdanê: Ew cînavên ku şûna navan digirin û heyînan bi nîşandanê bi me didin nasîn.**

**Cînavên şanîdanê ev in: ev - ew**

Em cihên valan bi cînavên şanîdanê (ev - ew) dagirin:

a- ……. cotkar li nava zeviya xwe ye.

b- Min ……. heval ji mêj ve nas dikir.

c- Min ……. gul av dan.

ç- ……. wane pir bi sûd bû.

Wane 2

# EFRÎN

1- Em li kîjan beşê Kurdistanê dijîn?

2- Navê çend bajarên Kurdistanê bibêjin.

3- Hûn ji kîjan bajarê Kurdistanê ne?

4- Efrînê bi çi navdar e?



# EFRÎN



Piştî ku Lîlav û malbata xwe ji Efrînê vegeriyan Dirbêsiyê, Lîlav gelekî kêfxweş bûbû. Ji ber vê yekê, hevalê wê Sîpan, mereq kir û ev pirs kir:

- Sedema vê kêfxweşiya te, çi ye?

  Lîlavê, berê xwe da Sîpan, hinekî din nêzî wî bû û got:

- Ji ber ku ez û malbata xwe çûbûn Efrînê û me demeke pir xweş li wir derbas kir.

Dema Lîlavê wiha got, bala Evînê kişand û ji Lîlavê xwest ku hinekî ji wan re dabaşa Efrînê bike.

Lîlavê jî pir jidil li wan temaşe kir û got:

- Efrîn bajarekî rengîn ê rojavayê Kurdistanê ye. Ew weke bûkekê ye; bi darên zeytûnan, rûbar, kanî, deşt û baniyan hatiye xemilandin. Ji ber wê jî avhewaya wê pir xweş û hênik e. Her wiha li Efrînê gelek cihên dîrokî jî hene mîna: Keleha Semanê, Keleha Hûriyan û Eyndara.

Di gel wan, cihên pir xweş û seyrangehên mîna sûlava Meydankê û Basûtayê jî lê hene.

Di vê navberê de, dema Lîlavê dabaşa erdîgarî, çiya û baniyên Efrînê dikir, çavên wê dibiriqîn û hezkirin ji rûyê wê dibariya. Ji ber vê yekê, Sîpan û Evîn pir bi gotinên wê bandor bûn û biryar dan ku sala were, seyrana xwe ya salane, li Efrînê derbas bikin.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Lîlavê serdana kîjan bajarî kiribû?

2- Di nerîna Lîlavê de, Efrîn bajarekî çawa ye?

3- Navên cihên dîrokî yê li Efrînê çi ne?

4- Çima Sîpan û Evînê biryara çûna Efrînê dan?

# HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva sorkirî ji nav peyvan hilbijêrin:

- Em çûn seyranê.
- Em çûn ……………
(ger û geşt - pel - bajar)

- Evînê gotinên Lîlavê mereq kirin.
- Evînê gotinên Lîlavê ……….. kirin.
(wêne - hes - lawir)

- Lîlavê li hevalên xwe temaşe kir.
- Lîlavê li hevalê xwe ……………
(dep - gefxwarin- nerî)

4- Em beşê hevokê yê kêm di cihê vala de binivîsin:

| |
|---|
| xemila Efrînê ye - cihekî seyranê ye - cihekî dîrokî ye |

- Keleha Semanê ……………………..
- Rûbar, kanî û darên zetûnan ……………………….
- Sûlavên Meydankê, ……………………..

## XWEŞNIVÎS

- Em nivîsa li jêr bi awayekî bi rêk û pêk, li ser lênûsa xwe binivîsin û hemû rêgezên rêziman û xweşnivîsê ku heta niha bi me re derbas bûne, bi kar bînin:

Xweza dikare bêyî mirov bijî lê mirov nikare bêyî xwezayê bijî Ji ber ku xweza xwe bixwe nû dike û diparêze pêdiviya wê bi mirov tune ye Lê belê mirov hemû pêdiviyên xwe ji xwezayê distîne Parastina xwezayê erkê her kesî ye

## RÊZIMAN

- Em hevokên li jêr bixwînin û bala xwe bidin jimar û zayenda peyan:

  - Bêrîvanê dar av da.
  - Hêlîn çîrokê dixwîne.
  - Alanî ew dît.
  - Ew cû bajarî.
  - Pêwîst e em daristanan biparêzin.

- Em çi dinînin?

**Rêgez:**

**Her sê pêvekên (ê - î - an) qertaf in ku mêjer û zayenda peyvan diyar dikin.**

- Em hevokên li jêr bi qertafên guncaw dagirin:

Zana li vî bajar..... mezin bûye, ew gelekî ji xwezay….. hez dike û jiyana gunad….. xweştir dibîne.

## DERBIRÎN

- Her herêmek xwedî dîrok û taybetiyên xwezayî yên cuda ne. Hûn jî pênc xêzan li ser cihên dîrokî û taybetiyên xwezayî yên bajar an jî gundê xwe binivîsin.

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

Wane 3

# PARASTINA XWEZAYÊ

1- Li derdora me çi heyîn hene?

2- Ev heyîn mezin dibin an na?

3- Gelo ev heyîn çi sûdê didin me?

4- Erkê me li hember van heyînan çi ye?



# PARASTINA XWEZAYÊ



Di baxçeyê mala Gulbînê de, gelek dar hene. Dara wan a tirî roj bi roj rengê wê zertir dibe. Vê rewşê bala Gulbînê kişand.

**Gulbîn:** Dayê, çima rengê dara me ew qas zer bûye? Çima darên din rengên wan ne zer in?

**Dayîk:** Keça min, ev dar nêzî deriyê malê ye û gelek caran ava şûştinê ya ku heyberên kîmayî dihewîne, ji boriya karîzê diçe ber wê û ew av ziyanê dide darê.

**Gulbîn**: Divê em wê biparêzin!

**Dayîk:** Belê keça min, duh min boriya karîzê çaksaz kir. Di çend rojan de wê rengê wê vegere.

Mixabin kêça min! Di xwezayê de av û bi hezaran dar, şînatî û lawir rastî van metirsiyên kîmyayî tên û xweza roj bi roj xera dibe.

**Gulbîn:** Dayê, beriya çend rojan, me li dibistanê dar çandin. Em û mamoste bi hev re wan av didin.

**Dayîk:** Destên we sax bin! Xweza mala me ya mezin e, divê em li mala xwe miqate bin.

## Wateyên peyvan:

**Baxçe:** Gulîstan

**Metirsî:** Xeterî

## Giftûgoya Waneyê:

1- Di baxçeyê mala Gulbînê de, çi heye?

2- Çima rengê dara tirî zer bibû?

3- Dayîka Gulbînê, çi bergirî standibû?

4- Li dibistanê xwendekar û mamosteyan çi kiribûn?

5- Li ser dar, lawirekî yan şînatiyekê ku tu baldariyê lê dikî, biaxive.

## HÎNDARÎ

1- Em bi peyvên li jêr sê hevokan li ser sûdên xwezayê binivîsin:

**dar - lawir - hewa - fêkî - oksîjen - goşt - me - dan**

.................................................................

.................................................................

.................................................................

2- Em hevokên li jêr li gorî xwe temam bikin:

Sûdên xwezayê ............................................

Divê em xwezayê ..........................................

Heyberên kîmyayî .........................................

Em avê .......................................................

3- Em li hemberî lawirên li jêr, li ser cihên ku lê dijîn, kurtehevokan binivîsin:



.............................................



.............................................




.............................................



.............................................

## XWEŞNIVÎS

- Em nivîsa li jêr bi rengekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin û hewil bidin ku hemû rêgezên ku bi me re derbas bûne bi kar bînin:



Roj bi roj cîhana me ber bi metirsî û xerabûnê ve diçe. Ew jî ji ber kiryar û tevgerên mirovan ên neberpirsiyar e. Mîna birîna daran, pirbûna gelaşê û dûmana tirimbêl û kargehan. Ji ber vê yekê, erkek ji erkên me yên mirovî, ew e ku em li xwezayê baldar bin û çandina daran li derdora xwe pir bikin.

# RÊZIMAN

**Em hevokên li jêr bixwînin:**

- Xwişka wê dixwîne.
- Xwişk wê dixwîne.

- Bavê min karmend e.
- Bav min karmend e.

- Em li pirtûkên xwe baldarin.
- Em li pirtûk xwe baldarin.

We çi cudahî di navbera hevokên bûrî de dît?

**Rêgez:**

**Her sê pêvekên (a - ê - ên) veqetandek in. Ew ji bo naskirina mêjer, zayend û pevgirêdana peyvan, tên bikaranîn.**

Em hevokên li jêr bi veqetandekên guncaw dagrin:

- Dar… gûzê bilind e.
- Welat… me rengîn e.
- Ew bi heval…. xwe re dilîze.
- Heval….. herî baş pirtûk in.

## DERBIRÎN

Em mijarekê derbarê av û giringiya wê li ser lênûsa xwe binivîsin û xalên li jêr di ber çavan re derbas bikin:

1- Em avê ji ku bi dest dixin?

2- Giringiya avê ji bo me çi ye?

3- Em çawa wê bi kar bînin?

Wane 4

# AY LÊ GULÊ



Ay lê gulê gula minê
Şîrîna li ber dilê minê
Gulê nadim malê dinê
Wel ser gulê têm kuştinê

Gulê kesk û sor û zer e
Nîşana alê li ser e
Êdî reng spî gewher e
Şîrîn û peymana minê

Rengê te yê pir delalî
Bilbil li ser te dinalî
Te nebînim di vî halî
Armanc û kesera minê

***Gotin: Imerê Lalê***

***Stran: Mihemed Şêxo***

## Programê Belavkirina Waneyan li Ser Sala Xwendinê

| Meh \ Heftî | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Sirûda ABC'yê | Lêveger |
| Cotmeh | Lêveger | Lêveger | Xwendevan im | Arezûyên xwendekaran |
| Mijdar | Wênesaza biçûk | Xwendina çîrokan | Zarok û lîstin | Lêvegera beşê |
| Berfanbar | Dara zeytûnê | Em daran biçînin | Sewalên me | Perperîk |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhnvedan | Bêhnvedan |
| Reşemeh | Lêvegera beşê | Cûdî û televîzyon | Xwarina hevseng | Werziş û tenduristî |
| Avdar | Ciwana | Lêvegera beşê | Newroz | Efrîn |
| Cotan | Parastina xwezayê | Ay lê gulê | Lêvegera beşê | Lêvegera rêziman |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# SERETAYÎ 4

**2019/2020**

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


## BEŞA YEKEM ........................................................ 7

**Armanc** ........................................................ 8

**Têkiliyên li Dibistanê** ........................................................ 16

**Pirtûkxane** ........................................................ 25

**Mamoste** ........................................................ 34

**Mamoste (helbest)** ........................................................ 41

## BEŞA DUYEM ........................................................ 43

**Şêwaza Axaftinê** ........................................................ 44

**Rêzgirtin** ........................................................ 50

**Gabar û Kalemêr** ........................................................ 57

**Morî û Kevok** ........................................................ 64

**Nameya Hêlînê** ........................................................ 72

**Mêvandarî** ........................................................ 78

**Rewişt (helbest)** ........................................................ 84

**Rodî û Firoşkar** ........................................................ 87

## BEŞA SÊYEM ........................................................ 95

**Bikaranîna Elektirîkê** ........................................................ 96

**Afrînerî** ........................................................ 102

**Rok** ........................................................ 109

**Roj (helbest)** ........................................................ 115

# BEŞA YEKEM

**WANEYA YEKEM:**

**ARMANC**

**WANEYA DUYEM:**

**TÊKILIYÊN LI DIBISTANÊ**

**WANEYA SÊYEM:**

**PIRTÛKXANE**

**WANEYA ÇAREM:**

**MAMOSTE**

**WANEYA PÊNCEM:**

**HELBESTA MAMOSTE**

## Armanc

1- Di jiyanê de, em dixwazin bighêjin çi?

2- Di jiyanê de tiştên ku tu dixwazî pêk bînî, çi ne?

3- Ji bo ku mirov bighêje armancên xwe pêwîst e, çi bike?



# Armanc



Li dibistanê, em di navbera sibehan de li qadê li hev dicivin; hin dilîzin, hin dimeşin û hin li ser giyayê bexçeyê dibistanê, rûdinên. Mamosteyê nobedar bi me re li qadê dimeşiya û me dabaşa mijarên cur bi cur dikir. Mamoste pirseke wiha kir: "Hûn di pêşerojê de dixwazin bibin çi; we çi armanc daniye ber çavên xwe? Nûşîn wiha got: "Karê çandiniyê gelekî bala min dikişîne. Li bexçeyê mala me gelek dar, şînatî, gul û kulîlk hene. Ez gelek caran alîkariya dê û bavê xwe dikim. Ji ber vê yekê, dixwazim bibim endazyara çandiniyê û cîhana şînatiyan bêtir nas bikim."

Mamoste bi rûkenî li Hogir zîvirî, Hogir şerim kir û wiha got: "Dixwazim bibim bijîşkê lawiran. Civaka me gelekî mijûlî xwedîkirina sewalan dibin, dixwazim wan

xwedî bikim û ji hêla tenduristî ve li wan baldar bim. Bi taybetî dixwazim civak weke heyîneke giyandar, li wan binêre". Mamoste ji min pirsî: "Dilşad hûn ê çawa van armancan pêk bînin?"

Min got: Bi xebata jidil, baş bikaranîna demê û hizirandina bi armanca xwe, me nêzî pêkanîna wê dike.

Mamoste: "Her bijî ji were, civak bi xwendekar û xebatkaran ava dibe".

## Giftûgoya Waneyê:

1- Xwendekaran di navbera sibehan de, li qada dibistanê çi dikin?

2- Li qadê mamoste û xwendekaran çi dikir?

3- Nûşîn dixwaze bibe çi?

4- Hogir çima dixwaze bibe bijîşkê lawiran?

5- Li gorî te ji bo mirov bigihêje armancên xwe, pêwîst e çi bike?

6- Di pêşerojê de tu dixwazî bibî çi û çima?

## HÎNDARÎ

1- Em peyv û hemwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Nobedar | Xerîkbûn |
| Pêşeroj | Ayinde |
| Endazyar | Bicihanîn |
| Mijûl | Muhendis |
| Pêkanîn | Çavdêr |

2- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Ristem wiha got: Karê çandiniyê .............. bala min dikşîne. Li ..................... mala me gelek ............. , şînatî, gul û .............. hene.

3- Em peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin:

Find: ……………………………………………

Karmend: ……………………………………………

Çem: ……………………………………………

Elektrîk: ……………………………………………

Kargeh: ……………………………………………

# XWEŞNIVÎS

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:

Her kes ji zaroktiya xwe ve, armancekê dide pêşiya xwe û ji bo wê armanca xwe kar û xebatên xwe bi pêş dixe. Pêwîst e, em jî li gorî armanca xwe bixebitin, da ku em sûdê li mirovahî, welatê xwe, civak û nifşên bê bikin.

# RÊZIMAN

## *Baneşan:*

- Em bi dîtina we gelekî kêfxweş dibin!

- Ax! Em gelekî li ser çûna hevalên xwe xemgîn bûn!

- Gelî xwendekaran! Dûrî elektrîkê herin.

Di her sê hevokan de, çi hêma hatiye bikaranîn?



**Rêgez:**

**Piştî hevok û peyvên ku kêfxweşî, xemgînî û tirisê dihewînin, baneşan (!) tê bikaranîn.**

- Em li dawiya hevokên li jêr, hêmaya guncaw bi kar bînin:

- Cûdî bi dilşadî got: Ez bi nasîna we bextewar im
- Em ji qirêjiyê aciz dibin
- Navê te çi ye

# Têkiliyên li Dibistanê

1- Tevgerên di wêneya yekem de, şirove bikin.
2- Hûn tevgerên xwendekaran di wêneya duyem de, çawa dibînin?
3- Divê em çawa nêzî hevalên xwe yên li dibistanê bibin?






# Têkiliyên li Dibistanê



Dibistan, mala me ya duyem e; em demeke dirêj lê derbas dikin. Li dibistanê têkiliya me bi mamoste, hevalên me yên polê û xwendekarên din re çêdibe. Ji bo ku em hemû bi hev re demeke xweş, aram û bisûd derbas bikin, pêwîst e, em hin rêgezan pêk bînin.

Di polê de, di dema wanedayînê de, ji bo ku em baş têbigêjin, pêwîst e em, bêdeng li mamoste guhdar bikin û bi awayekî çalak tev li gotûbêjên waneyan bibin. Dema em bixwazin bersiva pirsekê bidin yan jî pirsekê bikin, em rêdanê ji mamoste bixwazin.

Her wiha ji bo ku mamoste waneyê baş şirove bike û gengeşe di polê de dernekeve, nabe em bi hevalên xwe re biaxivin.

Di navberan de, em hevalên xwe dahf nedin û dema dimeşin an jî dibezin, bi wan negirin, ji ber ku ev tevger dê ziyanê bighîne wan.

Mirov çawa di malbateke hevgirtî de tev digere, pêwîst e em wisa jî li dibistanê tev bigerin. Ji hevalên xwe hez bikin, ji mamosteyên xwe re rêzdar bin û bi hev re alîkar bin.

## Giftûgoya Waneyê:

- Em deqê bêdeng bixwînin piştre bersivê didin.

1- Li dibistanê têkiliyên me bi kê re çêdibin?

2- Di polê de pêwîst e, em çawa tev bigerin?

3- Çima dema em dibezin nabe em bi hevalên xwe bigirin?

4- Pêwîst e em li qada dibistanê çawa tev bigerin?

5- Hûn ji bo hevalên xwe yên ku bi rengekî neguncaw tev digerin, çi dibêjin?

# HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva rengşîn, nas bikin û binivîsin:

a- Di polê de pêwîst e gengeşe tune be. (................)

b- Em rêdana axaftinê ji mamoste dixwazin. (..............)

c- Xwendekaran wane şirove kirin. (................)

ç- Mirovên pak zirarê nagihînin xwezayê. (...............)

2- Em valahiyên li jêr, bi peyvên guncaw dagirin:

**hez - çalak - baş - rêzdar**

- Heger em bi awayekî ……..… tev li gotûbêjên waneyan bibin, em ê ........... tê bigêjin.
- Pêwîst e em ji hevalên xwe ……..… bikin û ji mamosteyên xwe re …….......... bin.

3- Em sê hevokan, nêzî wateya hevoka li jêr, binivîsin?

*Heke em baş guhdar bikin, em ê baş tê bighêjin.*

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

# RÊZIMAN

## *Serenav û hevenav:*

- Em hevokên li jêr bixwînin û navan nîşan bikin:

  - Li Kurdistanê çemên Ferat û Dîjleyê hene.
  - Berlîn paytexta Almaniyayê ye.
  - Dilyar, Hozan, Hêvîn û Dilşa, xwendekarine zîrek in.



– Tîpa destpêkê ya van navdêran çawa ye?
– Ev navdêr çend heyînan nîşan dide?

**Rêgez:**

**Ji peyvên ku heyîneke/î tenê nîşan didin re, serenav tên gotin û em di nivîsîna wan de, bi tîpa mezin dest pê dikin.**

✚ Em hevokên li jêr bixwînin û navan nîşan bikin:

- Li çêrgehê gelek mih hene.
- Em rastî gelek tirmpêlan hatin.
- Li gulîstana me, gelek gul hene.



– Tîpa destpêkê ya van navdêran, çawa ye ?
– Ev navdêr çend heyînan nîşan dide?

**Rêgez:**

**Ji navdêrên gelemperî yên ku bêtirî heyînekê nîşan dikin re, hevenav tê gotin û bi tîpa biçûk tê nivîsîn.**

✚ Em serenav û hevenavên li jêr li gorî tabloyê cuda bikin:

**Amed - dar - Agirî - kulîlk - Wan - nêrgiz**

| SERENAV | HEVENAV |
|---|---|
| | |
| | |
| | |
| | |

## XWEŞNIVÎS

- Em benda yekem ji waneyê, bi awayekê rast û xweşik li lênûsa xwe binivîsin û rêgezên ku di sala bûrî de, bi me re debas bûne, bi kar bînin.

## DERBIRÎN

- Em nivîsekê, derbarê tevgerên xwe û hevalên xwe yên li dibistanê ku ji 5-8 xêzan pêk tê, li gorî van xalên li jêr, li ser lênûsa xwe binivîsin.

  1- Pêşgotin:
- Têkiliyên baş çi ne?

  2- Naverok:
- Divê tevgerên we di dema rojbaşê, refê û dema çûna malê çawa bin?

  3- Dawîne:
- Bi gotineke watedar, mijara xwe bi dawî bikin.

# Pirtûkxane

1- Xwendekar, di wêneyê de çi dikin?

2- Em dikarin pirtûkan ji ku derê, bi dest bixin?

3- Hûn pirtûkan dixwînin, kêfa we ji kîjan cureyên pirtûkan re tê?

4- Çima divê em pirtûkan bixwînin?



# Pirtûkxane



Li dibistanê piştî waneya xwendinê, mamoste û xwendekar ji pitrûkxaneyê derketin. Li ser refikên pirtûkxaneyê pirtûkên wênesazî, muzîk, ziman, bîrkarî û ferheng hebûn. Her pirtûkekê dabaşa zaniyariyên xwe kir û gotûbêja wan dest pê kir.

## Pirtûka bîrkariyê:

- Ez bi agahiyên birkariyê dewlemend im. Di danûstendina rojane de, zanyariyên min, pir girîng in; zemînê dipîvim, di girêftariyên bazirganiyê de, bi komkirin, derxistin û hevdanê, çare dikim. Ez nebim wê danûstendin çetin bibe.

## Pirtûka ziman:

- Wiha mebêje, ziman bingeh e. Bêyî min pirtûk dê neyên xwendin, bi rêya min hûn di hemû tiştan de

digihêjin û fêrî zimanên din jî dibin. Bi rêya min hûn wêje û zimanan dinasin.

**Pirtûka muzîkê:**

- Ez zimanê cîhanê me, bêyî ziman ez hest, kêfxweşî û azarên we derdixim. Bêyî muzîkê, giyan zuha dibe.

**Pirtûka wênesaziyê:**

- Ez hunerên we dertînim, tiştên rasteqîn û aşopî li ser kaxezê zindî dikim.

**Ferhenga dibistanî:**

- Em hemû hev temam dikin û hizira mirov dewlemend dikin û bi pêş dixin. Heke xwedin û doza pêşketinê tuneba, em ê kaxezên valabana.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Di waneyê de, gotûbêj di navbera, kê de çêbûye?

2- Zanyariyên bîrkariyê çi ne?

3- Heger ziman û pirtûkên ziman tune bana, dê bi çi awayî zanyarî bihatana ragihandin?

4- Zimanê cîhanê çi ye?

5- Ferhenga Dibistanî çi şîret li pirtûkan kir?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê û hemwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Dewlemendî | Kirîn û firotin |
| Zemîn | Edebiyat |
| Bazirganî | Zengînî |
| Çetin | Dijwar |
| Wêje | Erd |

2- Em pirtûkan bighînin beşa wan ya zanyariyê:

Pirtûkên muzîk û wênesaziyê

Pirtûkên wêjeyî ne

Pirtûkên ziman û ferhengê

Pirtûkên hunerî ne

Pirtûkên birkarî, fîzîk û kîmyayê

Pirtûkên zanistî ne

3- Em hemwateya peyva stendinê di hevokan de, nas bikin û ya rast nîşan bikin:

- Em li dibistanê waneyên ziman distînin.
  - Disekinin
  - Fêr dibin
- Wî pirtûk bi kotekî ji min stend.
  - Wergirt
  - Xwend

## XWEŞNIVÎS

- Em nivîsa li jêr bi awayekî xweşik li lênûsa xwe binivîsin:

Ji bo ku hizira me li pêş bikeve û em di jiyana xwe de baş tev bigerin, pêwîst e em pirtûkan bixwînin. Ji ber ku pirtûk asoyên mejiyê me, fireh dikin. Em gelek zanist û zaniyariyên bisûd ji pirtûkan digirin, çi sincî be, çi wêjeyê be, çi jî zanistî be.

## DERBIRÎN

Tiştên ku wênsaz dibîne, li ser kaxezê wan zindî dike, tu jî têştên di wêneyê de bi awayekî nivîskî zindî bike.



# RÊZIMAN

## *Kevanek:*

Vejîne zimanê xwe ey xwendekar
Nebûye milet hîç kesek bê ziman

(Cegerxwîn)

Em her sal di werzê (demsal) buharê de, Newrozê pîroz dikin.

Navê vê hêmayê ( ) çi ye?

**Rêgez:**

**Em hemwate û navên nivîskaran di nava kevanekê de, dinivîsin**

- Em kevanekê di cihê pêwîst de bi kar bînin:

- Zimanê me xoş û xeroş û ciwan

  Eger baş bizanî tu nakî ziyan

  Cegerxwîn

- Em waneyên xwe guftûgo gotûbêj dikin.

# Mamoste

1- Em perwerdeya xwe ji ku werdigirin?

2- Li dibistanê kî me perwerde dike?

3- Em ji mamoste fêrî çi dibin?

4- Erkê me li hember mamoste çi ye?



# Mamoste



Di polê de, gelek xwendekar hebûn, hinekî heyirîn li mirûzên wan xuya dikir; mamosteyekî nû dê were dibistana me. Navê wî mamosteyî Birahîm bû. Bi bejna xwe ya bilind û nazikbûna dirûvê xwe, kete hindurê polê. Li hember me rawestiya û bi rûyekî devliken got: "Rojbaş xwendekarên hêja!" Me bi rêzdarî silav vegerand û rabûn ser pêyên xwe. Yek bi yek pirsa nav

- rewşa me kir; te digot xizim û merivê me ye. Di dawiyê de xwe bi me da nasîn û serkeftin ji me re xwest. Her roj bê derengmayîn derbasî refê dibû, pêşwaziya me dikir û wane dida me. Her roj wane bi awayekî cuda dida, te digot dem bûye kêlî û baz dide. Roj bi roj xwendekar mîna gulên avdayî geş dibûn. Di polê de ast nema bû; her kes çalak û serkeftî bûbû. Rojekê hevalê min bê niyaz kevir li rûyê min da; kevir li rûyê min ket

- xwîn jê hat. Mamoste bi lez ez derman kirim û nehişt

ziyan bigihêje min. Ji bilî wiha jî ew li qadê her gav bi me re bû. Gelek carnan bi goga pêyan bi me re dilîst û em fêrî şwazê lîstina bêzirar dikir. Mamoste Birahîm bi perwerdeya xwe ya durist şopeke pir kûr li jiyana me da û bi serkeftinê sala me ya xwendinê bi dawî bû.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Çima heyirîn li rûyê xwendekaran xuya dikir?

2- Kî derbasî polê bû?

3- Mamoste destpêkê pirsa çi kir?

4- Her roj mamoste çi dikir?

5- Li qadê mamoste û xwendekaran çi dikir?

6- Sala xwendinê çawa qediya?

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyvan li gorî têgihaştina xwe ji waneyê re, binivîsin:

**Mirûz:** ...........................................................

**Dirûv:** ...........................................................

**Kêlî:** ...........................................................

**Niyaz:** ...........................................................

2- Valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

Rojekê hevalê min ................. kevir li rûyê min da; kevir li rûyê ............ ket û xwîn jê hat. Mamoste bi lez .................. ez derman kirim.

3- Em hevokên li jêr li gorî xwe temam bikin:

Mamoste û xwendekaran ...............................................

Perwerde ji mirovan ....................................................

Rêzdarî di jiyanê de, ....................................................

Qencî qenciyê, .............................................................

## DERBIRÎN

Em nivîsekê ku ji 5-8 xêzan pêk tê, derbarê mamoste de binivîsin ku tê de, xalên li jêr di ber çavan re derbas bikin.

- Erkê mamoste çi ye?
- Rola mamoste di civakê de çi ye?
- Divê em çi li hember mamoste, nîşan bidin?

# RÊZIMAN

## *Hemwate û dijwate:*

**1- Peyvên hemwate: Ew peyvên ku nivîsa wan cuda ye, lê wateya wan yek e.**

**Mînak:**

Kevir = Ber

Se = Kûçik

Peyv = Gotin

**2- Peyvên dijwate:** **Ew peyvên ku ji aliyê wateyê ve, dijber in.**

**Mînak:**

Dirêj ≠ Kin

Qelew ≠ Lawaz

Zîrek ≠ Tiral

- Em li hemberî her peyvekê, hemwateya wê binivîsin:

Xurt: ……………..

Hişmend: ……………

Çalak: ……………

- Em li hemberî her peyvekê, dijwateya wê binivîsin:

Mezin: …………..

Hûr: ……………

Fireh: …………..

## Mamoste

Ey hevalê mamoste
Bi dest pênûs û çente
Ji te em pir hez dikin
Mamoste zanayê me

Mijûl dibe roj û şev
Hiş û nivîs li gel hev
Hişyar dikî me tevan
Xebata te ya lihev

Tu me hîn dikî jînê
Derman dikî birînê
Hin doktor û mamoste
Nema dikşînin kînê

Bo te em tên dibistan
Fêr dibin bo pir tiştan
Tu yî her hêviya me
Li pêşeroja Kurdistan

*(Yûnis Bahram)*



## Pirsên Waneyê:

**41**

1- Mijara helbestê çi ye?

2- Helbest ji çend bendan pêk tê?

3- Mamoste, bi roj û şev bi çi mijûl dibe?

4- Benda çaran şirove bike.

# BEŞA DUYEM

**WANEYA YEKEM:**

**ŞÊWAZA AXAFTINÊ**

**WANEYA DUYEM:**

**RÊZGIRTIN**

**WANEYA SÊYEM:**

**GABAR Û KALEMÊR**

**WANEYA ÇAREM:**

**MORÎ Û KEVOK**

**WANEYA PÊNCEM:**

**NAMEYA HÊLÎNÊ**

**WANEYA ŞEŞEM:**

**MÊVANDARÎ**

**WANEYA HEFTEM:**

**REWIŞT**

**WANEYA HEŞTEM:**

**RODÎ Û FIROŞKAR**

# Şêwaza Axaftinê

1- Hûn çawa dixwazin kesên li hemberî we, bi we re biaxivin?

2- Divê em bi çi awayî bi kesên din re biaxivin?

3- Heger kesek bi awayekî hişk an jî bi dengekî bilind bi we re biaxive, hûn ê çi bertekê nîşan bidin?



# Şêwaza Axaftinê



Axaftin hunereke danûstendinê ye. Mirov, bi rêya axaftinê dikare nerînên xwe bi awayekî hêsan û xweş, ragihîne.

Hin kes hene ramanên wan xweş in û zana ne, lê nizanin hizr û ramanên xwe vebêjin an jî ji xwe nebawer in. Ji ber vê yekê, pêwîst e mirov hînî şêwaza axaftinê bibe û xwe perwede bike.

Yek ji rêgezên axaftinê jî guhdarîkirin e. Dema kesek biaxive pêwîst e em bi hemû hestên xwe lê guhdar bikin. Mijara ku tê gotûbêjkirin, têbighêjin û agahiyên wê nas bikin heta ku karibin tev li gotûbêjê bibin.

Heger em bixwazin tev li gotûbêjê bibin, nabe em axaftina kesê axêver, bibirin; em rawestin heta ku axaftina xwe bi dawî bike û piştre, em bi dengekî, xweş, şîrîn û jixwebawer biaxivin. Bi vî awayî, her kes dê li me guhdar bike û rêzgirtinê, nîşanî me bide.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Bi çi awayî mirov dikare hizir û ramanên xwe ragihîne?

2- Pêwîstiya kesê ku nizane nerênên xwe ragihîne, bi çi heye?

3- Gelo dibe em axaftina hevalê xwe, bibirin û çima?

# HÎNDARÎ

1- Em peyvên hemwate bighînin hev:

| | |
|---|---|
| Rêbaz | Fêrbûn |
| Mijar | Qenc |
| Baş | Hizir |
| Raman | Şêwaz |
| Hînbûn | Babet |

2- Em du peyvên hemwate ji deqê derxînîn.

3- Em peyvên li jêr, di hevokan de bi kar bînîn:

**Guhdarkirin** ...........................................

..........

**Axaftin** ...........................................

...

**Rêzgirtin** ...........................................

...

# RÊZIMAN

## *Lêveger:*

1- Em di nivîsê de, hêmaya guncaw bi kar bînin:

- Zarokên delal Kom bibin û li min guhdar bikin
- Hûn îsal refa pola çaran e
- Li qada dibistanê Kajîn Berçem û Siwar dilîzin
- Li qadê gelek gog hene: goga pêyan goga destan û goga zembîlê

2- Em di tabloya li jêr de, serenav û hevenavan binivîsin:

| SERENAV | HEVENAV |
|---|---|
| | |
| | |
| | |
| | |

3- Em peyvên hemwate bighînin hev:

| | |
|---|---|
| Wêrek | Req |
| Bazdan | Qenc |
| Baş | Mêrxas |
| Hişk | Rev |
| Xweşik | Rind |

4- Em peyvên dijwate bighînin hev:

| | |
|---|---|
| Şîrîn | Germ |
| Sar | Tal |
| Spî | Nerim |
| Şûm | Reş |
| Hişk | Aram |

## Rêzgirtin

1- Di jiyanê de, kesên herî nêzî me kî ne?

2- Di jiyanê de, dê û bav çi pêşkêşî me dikin?

3- Divê em li hember wan, çawa tev bigerin?

4- Kesên nepabendê rêzdariya dê û bavê xwe, hûn çi şîretan li wan dikin?



# Rêzgirtin



Gulperî, ev çend roj in ku ji dibistanê qut bûye. Me lê pirsî gotin, dayîka wê pir nexweş e, lewma wê destûr xwestiye. Mamoste got:"Pêwîst e em serdana malbata Gulperiyê bikin. Roja dîtir, me û mamoste serdana malbata wê kir. Dayîka Gulperiyê hinekî ji nexweşiya xwe rehet bûbû. Me şifa jê re xwest. Gulperiyê bi rêzdarî guhdarî dayîka xwe dikir û pêdiviyên wê pêk dianîn. Her wiha bi rêzdarî gudarî bavê xwe dikir û li nik wî rûniştî bû. Mamoste û bavê Gulperiyê li rewşa hev dipirsîn û mamoste pirseke wiha kir:" Gulperî li mal çawa ye?

Bavê gulperiyê wiha got: "Gulperî pir çalak û jîr e; her gav bi rêzdarî tev digere. Li malê piştî qedandina karmendiyên xwe, li gorî derfeta xwe, alîkariya me dike". Mamoste got:"Her bijî Gulperiya delal! Tu hem

li dibistanê û hem jî li malê, rêzdar û alîkar î!" Di dawiya serdanê de, me ji dayîka wê re, hêviya şîfayê kir û me xatir ji Gulperî û malbata wê xwest.

## Wateyên Peyvan:

**Şifa:** **Saxbûn**

**Pêdivî:** **Pêwîstî**

**Nik:** **Rex**

**Lezgîn:** **Bilez**

## Giftûgoya Waneyê:

1- Sedema qutbûna Gulperiyê ji dibistanê çi bû?

2- Mamoste û xwendekaran çi kir?

3- Gulperî li malê çawa tev digeriya?

4- Mamoste ji Gulperiyê re, çi got?

5- Li mal, dibistan û kolanê em ê çawa rêzdariyê pêk bîin? (gotûbêj)

6- Navekî nû ji wnaeyê re, hilbijêre.

## HÎNDARÎ

1- Em hevokên li jêr temam bikin:

- Di civakê de rêzdarî ............................................
  ………………….................
- Li mal, kolan û dibistanê ....................................
  ..........................................
- Bi rêzdariyê mirov ............................................
  ..........................................

2- Em sê hevokên watedar, derbarê rêzdariya, ji dayîk û bavan re, binivîsin:

1-
…………………………………………………………

2-
…………………………………………………………

3-
…………………………………………………………

# RÊZIMAN

## *Cotxal:*

- Hevalê min got: "Dema hûn dilîzin, ziyanê nedin hev."
- Pêşiyên me dibêjin:"Karê îro nespêre sibe."
- Li welatê me gelek cureyên daran hene, mîna: gûz, hinar û behîf.

- Ev hêma (:) ji çend xalan pêk tê?
- Pêwîst e em çi navî lê bikin?

## Rêgez:

**Cotxal: Ev cotxal beriya axaftin (gotinên veguheztî) û dûrêzkirina mînakan, tê bikaranîn.**

Em hevokên li jêr temam bikin:

Pêşiyên me gotine:

"………………………………………………...…"

Mamoste got

"……………………………………………………"

Gekek cureyên lawiran hene

……...……………………………………………

# DERBIRÎN

Em mijarekê derbarê rêzgirtina endamên malbatê ji hev re, binivîsin û xlên li jêr, di ber çavan re derbas bikin:

- Girîngiya rêzgirtinê çi ye?
- Tu çawa nêzî endamên malbata xwe dibî?
- Bi gotineke watedar mijara xwe bi dawî bike.

# Gabar û Kalemêr

1- Hûn çawa nêzî kesên temenmezin dibin?

2- Heke tu bibînî ku kesekî rêya xwe şaş kirye, tu yê çi bikî?

3- Çima em rêzgirtinê ji kesên temenmezin re, digirin?



# Gabar û Kalemêr



Gabar nexweş bû, lewra bavê wî ew bir gel bijîşk.

Dema ew û bavê xwe li hola bendewariyê rûniştîbûn, kalemêrek, derbas bû. Li dora xwe nerî; cihê rûniştinê nedît.

Gabar ji cihê xwe rabû, bi destê kalemêr girt û jê re got: "Fermo bapîrê min, were rûnê!"

Kalemêr girnijînî û spasiya Gabar kir û temenkî mezin jê re xwest.

Bavê Gabar dema ev tevgera kurê xwe dît, pir kêfxweş û serbilind bû.

Di rêya vegera malê de, bavê Gabar destê xwe di ser serê wî re bir û got: "Bijî kurê min! Te îro karekî pir baş kir!"

Gabar:"Bavo ez ji te hîn bûme ku rêzgirtinê ji mezinan re, bigirim. Ez dibînim ku tu her dem, ji ber kesên ji xwe mezintir radibî û alîkariya wan dikî. Ew jî çavên wan ji kêfxweşiyê diçirisînin. Ji ber vê yekê, min nas kir, tu karekî baş dikî, min jî xwest bibim weke te!

## Giftûgoya Waneyê:

1- Çima Gabar û bavê xwe serdana bijîşk kirin?

2- Dema kalemêr cihê rûniştinê nedît, Gabar çi kir?

3- Gabar reftarên xwe ji kê girtine?

4- Ger tu li şûna Gabar bûya, tu yê çi bikira?

4- Serenavekî guncaw, ji waneyê re bibîne.

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva rengşîn, nas bikin û binivîsin:

a- Gabar li hola bendewariyê bû. (................)

b- Kalemêr bi Gabar re girnijî. (..............)

c- Çavên wî çirisîn. (................)

ç- Mirov kesên mezin, ji xwe re pêşeng dibîne. (...............)

2- Em hevokên li jêr bi dawî bikin:

Em alîkariya ……………………………………….

Em li hemberî ……………………………………...

Em di axaftina rojane de ……………………………...

## XWEŞNIVÎS

Em benda dawî ya deqa waneyê li lênûsa xwe binivîsin. û tê de rêgezên ku heta niha, em fêrî wan bûne, bi kar bînin.

# RÊZIMAN

## *Veqetandek:*

- Em van peyvên li jêr bi rêya (**a**, **ê**, **ên**) bi hev ve girê bidin:

Dibistan xweş ⟶ ……………….....

Xwendekar jêhatî ⟶ ..……………........

Mal mezin ⟶ …………………

## Rêgez:

**Veqetandek: Ew pêvekên ku du peyvan bi hev ve, girê didin.**

**Veqetandên binavkirî ev in:" -a, -ê, -ên"**

Em valahiyên li jêr bi veqetandekan dagirin:

- Roj… me pir xweş bû.

- Hesp… sor gelekî beza ye.

- Mirov… qenc pir in.

# Morî û Kevok

1- Divê têkiliyên mirovan li ser çi bingehî bên avakirin? 2- Encama kiryarên baş, çi ne?

3- Gotineke pêşiyan a li ser qencî û başiyê bibêje. 4- Girêdayî vê mijarê, bûyereke civakî bîne ziman.





# Morî û Kevok



Morî ji bo vexwarina avê çû ser golê, lingê wê şemitî, moriyê xwe di nava avê de dît. Bi qêrîn û hewar, alîkarî xwest. Di wê demê de, kevokek di ser wê re difiriya. Ji xwe re got:" Ka ez alîkariyê bidim vê belengazê, da rizgar bibe. Peleke daran jê re avêt nav avê. Moriyê xwe bi pelê girt û derket. Morî:" We tu sax bî xwişka kevokê! Ez ê vê qenciya te ji bîr nekim!

Kevok kenî û got: "Tu yê çi qenciyê li min bikî." Çend roj bi şûn de, nêçîrvanekî bi tifinga xwe, nîşn li kevokê girt. Di wê kêliyê de, çavên moriyê li nêçîrvan ket, bi lez xwe gihand nêçîrvan û gezek li gûzeka wî da. Nêçîrvan ji ber êşa gûzeka xwe veciniqî û nîşana xwe şaş kir. Kevokê jî ev rewş dît û got: "Qencî qenciyê vedigerîne."

## Giftûgoya Waneyê:

1- Çima morî ket nav avê?

2- Kê morî ji fetisînê rizgar kir?

3- Moriyê ji kevokê re çi got?

4- Kevokê çi bersiv da moriyê?

5- Çawa moriyê kevok ji mirinê, rizgar kir?

7- Tu çi pendê ji vê çîrokê digrî?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê û dijwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Belengaz | Seydvan |
| Qencî | Tirsiya |
| Nêçîrvan | Hejar |
| Veciniqî | Başî |

2- Em li hemberî navê lawir navê, cihê ku lê dijî binivîsin:

**Morî:** ……………………..

**Kevok:** ……………………..

**Şêr:** ……………………..

**Masî:** ……………….........

3- Em vebijêrka rast hilbijêrin:

**A-** Alîkariya moriyê ji kevokê re li ser çi bingehî bû:

a- Berjewendî    b- Dilsozî   c- Dilovanî

**B-** Nêçîrvan dixwest kevokê:

a- Nêçîr bike    b- Bigire    c-Derman bike

**C-** Moriyê qenciya kevokê:

a- Mandele kir    b- Vegerand   c- Paşguh kir

## DERBIRÎN

Çîrokeke kurt, derbrê alîkarî û dilsoziyê de ku te bihîstiye, ji hevalên xwe re bibêje.

# RÊZIMAN

## *Cînavên pirsyariyê:*

Em peyvên li jêr di nav hevokan de bi kar bînin:

Kî ………………………………..……………………

Kê ……………………….…………………………..

Çi ………………………………………………....

**Rêgez:**

**Cinavên pirsyariyê: Ev cînav pirsa navdêr û cînavên din dikin.**

**Cînavên pirsyariyê ev in: "kî, kê, çi"**

- Em pirsên bersivên li jêr binivîsin:

- Kî çû bajar? Hogir çû bajar.
- …………………...? Rozayê tirimbêl diajot.
- …………………? Mêze li ber sobeyê ye.

# Nameya Hêlînê

1- Mirov herî zêde li kolan û dibistanê, bi kê re danûstandinê dike?

2- Divê danûstandina me bi hevalên me re, çawa be?

3- Tu jî dabaşa hevaleke/î xwe bikî.



# Nameya Hêlînê



Hevala min a hêja Mîdiya!

Min gelekî bêriya te kiriye. Ev bûye du sal ku tu dûrî min ketiye; ev du sal in ku hûn çûne Almaniyayê. Ez gelek caran li wêneyê me temaşe dikim û wan kêliyên herî xweş bi bîr tînim. Her car ew lîstikên ku me bi wan dilîst, li ber çavên min weke belgefîlmekî zindî dibin. Me gelek caran bi goga pêyan û bezê dilîst. Di bîra min de ye, gava ez ketim û lingê min birîn bû, çawa te û hevalên me, ez rakirim û gazî mamosteyê nobedar kirin û ez derman kirim. Me gelek caran bi hev re, ew sirûdên xweş ên kurdî (Bi xeml û rewşe, Ey Reqîb) bi awaz, dixwendin. Me alîkariya hev dikir; te alîkariya min di muzîk û wênesaziyê de dikir û min jî alîkariya te di bîrkariyê de, dikir. Gelek caran, ez û dayîka xwe dabaşa hatina te ya mala me, dikin. Te bi şermî gazî dayîka min

dikir û digot: "Metê Cîhan! Ez û Hêlînê, em biçin gulîstanê? Dayîka min her gav destûr dida û em diçûn gulîstanê. Di dawiya vê nameyê de, ez bi hêvî me, ev hevaltî, tevî vê dûrbûnê, zindî bimine û careke din, hûn vegerin welat!

**Hevala te Hêlîn**

## Giftûgoya Waneyê:

1- Çima Hêlînê bêriya Mîdiyayê kir?

2- Wêne çi tînin bîra Hêlînê?

3- Wan herî zêde bi kîjan lîstikan dilîstin?

4- Kê Hêlînê ji erdê rakir?

5- Hêlîn û Mîdiyayê çawa alîkariya hev dikirin?

6- Çima Mîdiyayê destûr ji dayîka Hêlînê dixwest?

**Wateyên Peyvan:**

Bezîn: rev, bazdan

Gazîkirin: Bangkirin

Destûr: Rêdan

## HÎNDARÎ

1- Em bersiva rast hilbijêrin:

**A-** Hevaltî divê li ser çi bingehî ava bibe:

**a.** Rastî **b.** Sûdwergirtin **c.**Xizmetî

**B-** Di hevaltiyê de, divê em çi nîşan bidin:

**a.** Xweşikbûnê **b.** Rêzgirtinê **c.** Xwedîtinê

2- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

a- Divê mirov ..................... werzişê bike.

b- Fêkî û sebze bi xêyên kanzeyî û ..................... dewlemend in.

c- Divê mirov karê ……………… bi paş nexe.

ç- ……………….. rast , sûdê dide mirov û civakê.

# RÊZIMAN

## *Navên xwerû û hevedudanî:*

- Em navên li jêr li gorî tabiloya li jêr, ji hev û du cuda bikin:

(Kar, dest, Cegerxwîn, baz, Dilbirîn, Çavşîn, Gulbuhar)

| Navên ku ji peyvekê pê tên: | Navên ku ji du peyvan pêk tên: |
|---|---|
| 1- ............................. | 1- ............................. |
| 2- ............................. | 2- ............................. |
| 3- ............................. | 3- ............................. |

**Rêgez:**

**Navên xwerû: Ew navên ku ji hêmanekê tenê pêk tên.**

**Mînak: dar, berx, sêv**

**Navên Hevedudanî: Ew navên ku ji du hêmanên watedar, pêk tên.**

**Mînak: Dilsoz, rojname, Dilşêr…**

Em peyvên li jêr di nava hevokan de, bi kar bînin:

**Kevok** ..........................................................

**Kalemêr** ..........................................................

**Jinap:** ..........................................................

**Zîn:** ..........................................................

# Mêvandarî

1- Mêvan kî ne?

2- Berî ku mêvanên we bên, hûn çi amadekariyan dikin? 3- Hûn çawa pêşwaziya mêvanan dikin?

4- Erkên mêvandariyê çi ne?



# Mêvandarî



Li zingilê telefona mala Rojê ket. Rojê vegerand, rûyê wê geş bû û bi kêf hat ji xwişka xwe Aşnayê re got: "Hê, Aşna! Gulnaz û Ronahiyê gotin em ê bên mala we!"

Aşna û Rojê bi lez çûn ji dayîka xwe re gotin û jê xwestin ku ji bo hevalên wan şîraniya ku jê hez dikin çêke û vegeriyan odeya xwe dan ser hev, cilên xwe yên malê guhartin û man li hêviya hatina hevalên xwe.

Demeke dirêj neçû li derî ket. Aşna û Roj beziyan; derî vekirin, bi dilgermî hevalên xwe hembêz kirin û bi zarekî şîrîn bi xêrhatina wan kirin. Derbasî hindir bûn, aveke sar dan wan û paşê pirsa rewşa hev û du kirin û hinekî lîstin.

Dayîka Aşnayê ji wan re şîranî û ava mêweyan anî. Gulnaz û Ronahiyê spasiya wê kirin. Piştî ku xwarin û vexwarin, derketin nav bexçeyê mala Aşnayê û li wir demeke xweş bi hev re derbas kirin.

Êdî dem zû derbas bû û bû dema vegera malê. Aşna û Rojê bi hevalên xwe re çûn heta ber derî; tevî ku destên wan ji hev nedibûn û xemgîn bûn, bi hêviya hevdîtinê, xatir ji hev xwestin. Di rê de, Gulnazê ji Ronahiyê re got: " Ev roj, rojeke herî xweş bû, ez ê wê di lênûsa xwe ya bîranînan de, binivîsim."

## Giftûgoya Waneyê:

1- Berî ku hûn biçin mêvandariya xizim û hevalên xwe, hûn wan agahdar dikin?

2- Aşna û Rojê çi amadekarî ji bo pêşwaziya hevalên xwe kirin?

3- Wan çawa mêvanên xwe pêşwazî kirin?

4- Demeke çawa bi hev re derbas kir?

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva (veger) a rast li gorî hevokê hilbijêrin:

- Aşna li telefonê vegerand. ( bersiv da, rahişt)
- Ew vegeriyan odeya xwe. (birin, zivirîn)

2- Em hevokeke baneşanî ji waneyê derxin.

3- Em cînavên xwerû û yên tewandî ji benda li jêr derxin û wan di damikan de binivîsin:

Gulnaz: "Aşna, ez ê îro êvarî bêm mala we, hûn ê li mal bin?

Belê, em ê li mal bin! Heke tu hatî, ew çîrokên ku me bi hev re kirîbûn, ji bîr neke.

| **Cinavên xwerû** | **Cînavên tewandî** |
| --- | --- |
| | |

# RÊZIMAN

## *Hevalnav:*

- Em baş li wêneyên li jêr temaşe bikin û taybetiyên wan vebêjin:



Dar kesk e



Av …………







Ciwan xortekî …… e. Serhed xortekî……e.

Peyvên "qelew, bejinbilind, kesk û şîn" çi diyar dikin?

**Rêgez:**

**Hevalnav, taybetiyên navan (reng, teşe, rewş..) ji me re diyar dikin.**

**Mînak:**

Karê **serkeftî**.

Rêya **dirêj**.

Keça **rêzdar**.

Hevalê **dilsoz**.

Em valahiyên li jêr bi hevalnavên guncaw dagirin:

Xwendekarê …………… her gav dixwîne.

Masiyê …………... rengê wî pir balkêş e.

Mirovên ……………. pêwîsiya wan bi alîkariyê heye.

# Rewişt

Silav bidin bi germî
Danûstandin bi nermî



Dema zana deng bikin
Bêdeng bin guhdar bikin

Pirsan bikin baldarî
Rexne bikin rêzdarî

Bi hev re bira û xwişk
Hilbijartin û bi pişk

Rê bidin hev bi dorê
Bê ezezî û zorê



Ji bo lawir û baxan
Nêzîkbûnek bêdaxan

Mîna me ew bican in
Êş û derdan dizanin

Kalilk û pîr hêjan in

Çîrokên wan derman in



Kesên seqet hewcedar
Li wan bibin alîkar

Bi rewişt û bi zanîn
Stûnên welat tên danîn

Sincê mirov bilind be
Vîna mirov dê find be

***(Nezîrê Mele)***

**Wateyên peyvan:**

**Rewişt:** Sinc
**Rexne:** Gazin
**Hilbijartin:** Neqandin
**Ezezî:** Xweperestî
**Bax:** Gulîstan
**Dax:** Sotin
**Stûn:** Bingeh
**Vîn:** Daxwaz
**Find:** Çira

## Giftûgoya Waneyê:

1- Divê mirov çawa silavê bide?

2- Şêwazê guhdarîkirinê di kîjan malikan de diyar dibe?

3- Divê têkiliya di nav xwişk û bira de, çawa be? 4- Çima pêwîst e, em ziyanê nedin lawir û şînatiyan?

5- Stûnên welat çi ne?

6- Em her du malikên li jêr şirove bikin:

**Pirsan bikin baldarî**
**Rexne bikin rêzdarî**


**Bi hev re bira û xwişk**
**Hilbijartin û bi pişk**

# Rodî û Firoşkar

1- Mirov pêdiviyên xwe ji ku bi dest dixe?

2- Navê kesê ku em pêdiviyên xwe jê dikirin, çi ye?

3- Divê têkiliyên me pê re, li ser çi bingehî bin?



# Rodî û Firoşkar



Li gundê me, xwendekar kêm bûn, lewra em her sibeh bi otobîsê diçûn dibistanê. Em her roj sibehê zû radibûn - li benda hatina otobîsê radiwestiyan. Li dibistana bajar em fêrî gelek tiştên baş dibûn û me gelek heval nas kirin. Ji ber ku me li bajar demeke dirêj diqedand, me pêdiviyên xwe jî li wir dikirî. Rojekê ez çûm firoşgehê - min du lênûs û pênc pênûs kirîn. Min dirav dan firoşkar û bi lez ji firoşgehê derketim. Di dema derketina ji firoşgehê, min dirav hejmartin û min nas kir ku dirav pir li min vegerandine. Min bi lez ji firoşkar re got: "Te gelek dirav li min vegerandin, fermo ev zêde ne".

Firoşkar: "Spas xwemdekarê dilsoz, ev sincekî baş e!

Ji bo vê wefadariya te, bila ev pênûs ji bo te diyarî be."

Piştî vegera malê, min ji dê û bavê xwer re ev serpêhatî got. Dayîk û bavê min got: "Her bijî kurê min, rastî û wefadarî mirov şahnaz û bextewar dikin!"

## Wateyên peyvan:

**Otobîs:** Bas

**Pêdivî:** Pêwîstî

**Dirav:** Pere

**Firoşgeh:** Dikan

**Wefadarî:** Dilsozî

## Giftûgoya Waneyê:

1- Rodî û xwendekarên gund li ku derê dixwendin?

2- Çima pêdiviyên xwe ji bajar dikirîn?

3- Rodî çi kirî?

4- Gava Rodî nas kir ku dirav pir in, çi kir?

5- Dayîk û bavê Rodî, jê re çi got?

6- Firoşkar çi got?

7- Navekî nû ji waneyê re binivîse.

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê û dijwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Kirîn | Xwarî |
| Wefedarî | Firotin |
| Rastî | Çûn |
| Veger | Bêbextî |

2- Em bi peyvên li jêr du hevokên dijber, binivîsin:

**(Kirîn, firotin, we, ji, min, alav)**

.................................................................

.................................................................

3- Em valahiyên li jêr dagirin:

Pêşiyên me gotine: "Nanê xwe bide nanpêj û bila …………....… zêde biçe."

Pêşiyên me gotine:"Mirov bi pirsê …....……… Xursê."

Pêşiyên me gotine:" Nanê nekaran li tu …....…….

tune ye."

# RÊZIMAN

## *Payeya rengdêran:*

Em hevrûkirinê di navbera heyînên li jêr de çêkin:




Xebat ji Cûdî ……………..

Cûdî ji Xebat ……………..




Zana ji Canê ……………

Canê ji Zana ……………

Peyvên **kin**, **dirêj**, **qelew** û **lawaz** çi pêvek, bi wan vebûne?

**Rêgez:**

**Pêveka "-tir"ê pêveka piledariyê ye.**

Em valahiyê li jêr bi pêveka (-tir) dagirin:

Du birayên min hene; yek ji min mezin……. e û yek ji min biçûk…… e.

## DERBIRÎN

Em mijarekê derbarê bûyereke wefedariyê ku bi te re yan jî bi hevaleke/î te re çêbûye, li lênûsa xwe binivîsin.

# BEŞA SÊYEM

| | | |
|---|---|---|
| | **WANEYA YEKEM:**<br>**BIKARANÎNA ELEKTIRÎKÊ**<br>**WANEYA DUYEM:**<br>**AFRÎNERÎ**<br>**WANEYA SÊYEM:**<br>**ROK**<br>**WANEYA ÇAREM:**<br>**ROJ** | |

# Bikaranîna Elektirîkê

1- Em ji bo ronîkirina malê, çi bi kar tînin?
2- Ji bilî ronîkirinê, sûdên elektirîkê hene? Em wan bihejmêrin.
3- Ji bo ku em baş ji elektirîkê sûdê bigirin, pêwîst e em çawa wê bi kar bînin?
4- Kî dizane mirov, berî vedîtina elktrîkê, çi bi kar tanî?



# Bikaranîna Elektrîkê



Sibehê em derbasî polê bûn, hevalekî me gulop vêxist û kesekî ji me dengê xwe nekir.

Mamosteya me hat û gulop vêketî dît. Ew vemirand, du peyalên tijî av anîn, ava piyalekê da xwendekaran, hinekan vexwar û himekan venexwar. Piştire mamoste ev pirs ji me kir: "Çima hin hevalên we av vexwar û hinekan venexwar?"

Bersiva me jî ev bû: "Kesê av vexwar tî bû û yên venexwar netî bû; pêwîstiya wî bi avê tune bû."

Mamoste ava peyala din rijand û got: "Me çi sûd ji ava vê peyalê girt?"

Me li hev nerî û bi yek dengî me got: "Ne tiştek."

Mamoste gernijî û got: "Elektirîk jî weke vê avê ye, heger pêwîstiya me pê hebe, Em wê bi awayekî birêkûpêk bi kar bînin.

Dema pêwîstiya me pê tune be, em wê pir nemezêxin. Bi roj pêdiviya me bi ronahiya elektirîkê tune ye, em gulopan vênexin bi taybet gulopên kolanan. Her wiha alavên elektirîkî bê serûber bi kar neyênin. Em gelek alavan bi hev re nexebitînin. Di şevê de odeyên ku karê me lê tune be em gulopên wan vemrînin. Ji ber bikaranîna şaş ji elektrîkê re, ziyanê dide îstgehên hilberîna wê.

Bi vî awayî wê her kes karibe sûdê ji elektrîkê bigre.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Hûn vêxistina gulopan di nava rojê de, çawa dibînin?
2- Çima hin xwendekaran, av vexwar û hinekan jî, venexwar?
3- Pêwîste em alavên elektirîkî, çawa bi kar bînin?
4- Navê hin alavên elektirîkî, ji hevalên xwe bibêjin.

## HÎNDARÎ

1- Em hemwateya peyva rengsor a rast hilbijêrin:

a- Em her şev li ber ronahiya gulopa elektirêkî rûdinên. (lempe, tifik, tenûr)

b- Hingî ez tî bûm, min peyaleke av vexwar. (çaydanek, kûzek, qedeh)

c- Mezaxtina elektirîkê tiştekî ne baş e. (vemirandin, xerckirin, rijandin)

ç- Heger îstgehên elektirîkê rawestin, em ê di tariyê de bimînin. ( navend, mal, kargeh)

2- Em alava elektirîkê bighînin navê wê:

Cilşo





Tozmij



Ûtî



Telvîzyon

3- Em peyva ne ji rêzê, nîşan bikin:

a- Me agir (pêxist, bir, vêxist, dada).

b- Lorîn (pir, gelekî, zor, pel) ji xwendinê hez dike.

c- Mêwe ji bo tenduristiyê (baş, xerab, çê, qenc) in

# RÊZIMAN

## *Xêzika axaftinê:*

Hevala Dîlberê, mala xwe biribûn bajarekî din.
Dîlber bi rêya telefonê, pê re axivî:

- Rojbaş Cûdî, tu çawayî?

- Rojbaş Dîlber, min bêriya te kiriye.

- Hevalên te yên nû çêbûne?

- Erê, lê ne gelek in.

- Li pêşiya hevokên ku di gotûbêja di navbera Cûdî û Dîlberê de, çi hêma hetiye bi kar anîn?

**Rêgez:**

**Xêzika axaftinê: Ew xêzika ku li ber gotinên gotûbêja ku di navbera çend kesan de çêbibe, tê danîn.**

- Hûn jî mînakekê li ser gotûbêjekê binivîsin û tê de, xêzika axaftinê bi kar bînin.

# Afrînerî

1- Navê elektrîkê, ji ku tê?


2- Navê çend zaniyarên cîhanî bibêjin.

3- Çi taybetiyên kesê afrîner e?

4- Te tu carî hewl daye ku tu tiştekî nû çêke?



# Afrînerî



Zarokekî biçûk û nûhatî, ji dibistanê tê dûrxistin û pê re pelekî spî, li ser hin nivîs hatibû nivîsandin, ji malbata wî re, hat rêkirin. Gava giha malê, li ber derî dayîka wî, ew pel ji destê wî wergirt û got: "Mamosteyê te dibêje tu xwendekarekî serkeftî ye û dibistan têra te nake, lewra divê tu li malê bixwînî." Ji wê rojê û pê ve, dayîka wî ew li malê perwerde dikir û guhdaneke baş pê dikir.

Ew zarok, her gav bi serboriyên curbicur radibû. Her wiha bi xwendina xwe re, li rawestgeha tirênê rojname difirotin û pê debara xwe dikir. Zarokê hizirhez, bi sedan serborî dikirin û dixwest tiştên nû derîne. Ji ber vê sedemê, carnan ji kar dihat qewtandin, lê tevî wilo dev ji serborên xwe bernedida. Di encamê de, lempeya elektrîkî û gelek nûderîn çêkirin.

Gelo hûn vî zaniyarê cîhanî nas dikin?

Gelo hûn dizanin çi li ser pela wî hatibû nivîsandin?

**Wateyên peyvan:**

**Nûhatî:** Nûgihaştî

**Wergirt:** Standin

**Debar:** Îdare

## Giftûgoya Waneyê:

1- Çima ew zarokê nûhatî ji dibistanê hat
dûrxistin? 2- Dayîka wî çawa tev geriya?

3- Zarokê afrîner bi çi mijûl dibû?

4- Navê vî zanyarî çi ye?

5- Navên sê nûderînên wî binivîse.

## HÎNDARÎ

1-Em navên zaniyaran û nûderînên wan bigihînin hev:

Graham Bêl





Con Logî Bêrd

2- Em valahiyên li jêr bi peyvên guncaw dagirin:

a- Mirov bi pilan û .................... digihêje armancên xwe.

b- Kesên zana sûdê digihînin ...................... xwe.

c- Xwendin, asoyê ..................... me berfireh dike.

3- Em vebijêrka rast hilbijêrin:

A- Ji bo çêkirina tiştekî nû çi pêwîst in?

**a**. Vehesîn b. Xweşî **c**. Hizir

B- Afrînerî ji ku tê?

**a.** Valahî **b**. Pêwîstî **c**. Gerê

# RÊZIMAN

## *Lêker:*

Em hevokên li jêr bixwînin:

- Sozdar pirtûkê dixwîne.
- Aras ji dibistanê hat.
- Legleg li hêlîna xwe vegeriya.
- Ew ê li gud bimîne.

Me di hevokên bûrî de dît ku peyvên rengsor hin ji wan kar diyar dikin, mîna: Dixwîne. Hin tevgerê diyar dikin, mîna: hat, vegeriya û hin rewşê diyar dikin, mîna:Bimîne.

**Rêgez:**

**Ji peyvên ku kar, tevger, rewş û bûyerê diyar dikin re, lêker tê gotin.**

- Em cihê vala bi lêkerê guncaw dagirin:

(dike, firya, dijî, maye, biparêzin)

- Çûk ji ser darê ................
- Masî di nav avê de ..................
- Pêwîst e em xwe ji metirsiyan ……...........
- Şîlan, lezê ................, ew dereng ...................

- Em di hevokên li jêr de, lêkeran nîşan bikin:

- Mamoste waneyê dide.
- Zelalê sêv xwar.
- Ez ê daran biçînim.
- Wî bilbil ji rekehê derxist.

# Rok

1- Sibehê zû Rok ji ku hil tê?


2- Dema Rok hil tê, cîhana me çawa dibe?

3- Heger Rok tuneba, wê cîhana me çawa ba?

4- Gelo hûn dizanin Rok çi ye?



# Rok



Rok stêrkeke mezin e; gelekî ji gerestêrka Erdê mezintir e û weke gogeke ji agir e. Jêdereke bingehîn a germahî, ronahî û enerjiyê ye. Ne ji Rokê ba, dê jiyana mirov, lawir û şînatiyan nepêkan ba. Bi gelek awayan sûd ji Rokê tê girtin.

Awayê xwezayî; şînatî bi rêya fotosenezê, enerjiya Rokê vediguhêze enerjiya kîmyayî. Her wiha, ava derya û okyanûsan germ dike, beşek ji ava wan dibe hêlm û li esman dibe baran û şînatî pê tên avdan.



Awayê pîşesaziyî; mirov dikare ji ronahiya Rokê bi rêya germkirinê yan jî bi rêya şaneyên şewqê, elektrîkê hilberîne. Her wiha ew ji bo tenduristiya mirovan gelekî girîng e. Ew Kalisyomê di hestiyên mirovan de, bi cih

dike û roleke wê ya çêkirina vîtamîna (D) di laşê mirov de heye. Lê divê em bizanin ku hin ziyanên wê jî hene. Gava em pir li ber tîrêjên Rokê rawestin, dibe ku nexweşiya Lêdana Rokê bi me re çêbibe. Her wiha, dibe ku hin nexweşiyên çermî jî çêbike.

## Giftûgoya Waneyê:

1- Rok, gerestêrkeke çawa ye?

2- Mirov çi sûdê ji Rokê digre?

3- Bi çend awayan sûd ji enerjiya Rokê tê girtin?

4- Ziyanên mayîna pir li ber Rokê çi ne?

## HÎNDARÎ

1- Em peyva ne ji rêzê nişan bikin:

- (Erd, Zawa , Gelawêj, deriya) gerestêrk in.
- Mirov ji (bêhin, ronahî, germahî) ya rokî sûdê werdigire.

2- Em peyvên li jêr di hevokan de bi kar bînin.

**Enerjî:** ...........................................................

**Esman:** ...........................................................

**Germkirin:** ...........................................................

3- Em çar lêkeran ji waneyê derînin û wan di hevokên cuda de, bi kar bînin.

## RÊZIMAN

### *Cînava vegerok:*

- Em hevokên li jêr bixwînin:

- Wî xwe fêrî xwendinê kir.

- Wê destê xwe rakir.

- Ew xwe perwerde dikin.

- Ez ê xwe vehesînim.

- Wan xwe nas kir.

- Em dibînin ku "xwe" cihê cinavên tewandî û yên xwerû, pirjimar û yek jimar digre.

**Rêgez:**

**Em ji cînava "xwe" re, cînava vegerok dibêjin.**

Em cihê vala bi cînava guncaw dagirin:

- Ez çûm mala xalê ................ .
- Ji ber ku .......kesekî karnas e, her kes pê dişêwire.
- ............... xwe ji ser darê avêt.
- Hevala ......... Dijle, refa çaran e.
- Wan waneyên ............. nivîsandin.
- Hûn berî xwarinê destên ............... dişon.

## Roj

Dinya me gilover e Li
dora xwe digere
Dema ger temam dibe
Şev û rojek çêdibe

Dinya me gilover e
Dora Rojê digere
Dema ger temam dibe
Sal, dozdeh meh çêdibe

Dinya me gilover e
Bi çiya, dar û ber e
Av û hewa û ber e
Cih, meskenê jîndar e

Tê da dijî însan e Teyr
û tirûd û heywan e Mêş
û morî û kêzik Hemû
cure bi can e

*(Aram Gernas)*

## Giftûgoya Waneyê:

1- Şev û roj çawa çêdibin?

2- Çi li ser cîhana me hene?

3- Dema Erd li dora Rokê digre, çi çêdibe?

## HÎNDARÎ

1- Em peyvê û hemwateya wê bigihînin hev:

| | |
|---|---|
| Dinya | Mirov |
| Mesken | Firinde |
| Însan | Cîhan |
| Teyr û tirûd | War |

2- Em navê jîndarê ku di helbestê de hene, binivîsin.

## Belavkirina Waneyan li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | **Lêveger** | **Armanc** |
| Cotmeh | **Armanc** | **Têkiliyên li dibistanê** | **Têkiliyên li dibistanê** | **Mamoste** |
| Mijdar | **Mamoste** | **Helbesta mamoste** | **Lêvegera beşê** | **Şêwaza axaftinê** |
| Berfanbar | **Şêwaza axaftinê** | **Rêzgirtin** | **Rêzgirtin** | **Gabar û kalemêr** |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhnvedan | Bêhnvedan |
| Reşemeh | **Morî û kevok** | **Nameya Hêlînê** | **Mêvandarî** | **Rewişt** |
| Avdar | **Rodî û firoşkar** | **Bikaranîna Elektirîkê** | **Bikaranîna Elektirîkê** | **Afrînerî** |
| Cotan | **Afrînerî** | **Rok** | **Rok** | **Roj** |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# SERETAYÎ
# 5

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

WELATÊ MIN........................................................8
EHMEDÊ XANÎ Û ZIMANÊ KURDÎ....................11
CIVÎNA KULÎLKAN..........................................14
HEZKIRINA PIRTÛKAN....................................18
SERXWEBÛNA MIRÎŞKAN..............................21
LEHENGÊ SÊPIYÊ...............................................24
WELATO...............................................................27
AGIRÊ SERHILDANÊ.........................................34
ROJA ZAROKÊN CÎHANÊ.................................37
JI DÎWANA XANÎ..................................................42
BIRCA BELEK........................................................44
TENÊ DILOPEK JI KOBANÊ...............................47
XERÎBÎ......................................................................52
NAME........................................................................59
WELATÊ ME...........................................................63
AR BÛMA.................................................................66
BANGA AŞTIYA GERDÛNÎ..................................68
DI CIVAKA KURDÎ DE REWŞA JINÊ................72
KOBANÊ....................................................................78
BIWÊJ.........................................................................83
HÊZA ROJÊ...............................................................90
KIRASÊ BEXTEWARIYÊ.......................................94
BEGÊ AXIR ZEMAN................................................98
KAWAYÊ HEMDEM..............................................101
HEY PALE..................................................................105
KURDISTAN..............................................................106
DAXWAZNAME........................................................108
NEWROZ E.................................................................109
ÇÎROKA WEFADARIYÊ..........................................113
GEŞTA SERÊ KANIYÊ.............................................118

JI BO BIÇÛKAN .................................................. 125
DARA ÇINARÊ.................................................... 128
QERO ............................................................ 132
PIRTÛK .......................................................... 136
DAYÎK ........................................................... 138
ARÎN MÎRKAN.................................................... 140
GOTINÊN PÊŞIYAN ............................................ 144
CÛDIYÊ MIRADAN................................................ 147

# BEŞA YEKEM

1- **Welatê min**
2- **Ehmedê Xanî û zimanê kurdî**
3- **Civîna kulîlkan**
4- **Hezkirina pirtûkan**
5- **Serxwebûna mirîşkan**
6- **Lehengê sêpiyê**
7- **Welato**
8- **Erka xweparastinê**
9- **Şox û şengê zuhre**
10- **Agirê serhildanê**
11- **Roja zarokên cîhanê**

**WANE 1**

## WELATÊ MIN

Welatê min Kurdistan
Çîmen û mêrg û bostan



Newal û deşt û banî
Xemilîne bi ciwanî

Dengê şalûl û bilbil
Li ser çiya mil bi mil

Tîne awazeke xweş
Dilê mirov dike geş

Lê çi bikim bindestî
Tê de nîne serbestî

Didim peymaneke rastî
Rizgar bikim ji bindestî

Cegerxwîn



## PEYVAN

**Bostan:** Cihê ku bêzûr lê tên çandin
**Newal:** Dol, gelî
**Awaz:** Dengê mûzîkê.

## EM TÊBIGIHIN

1- Cihê ku helbestvan ew qas pesnê wê dide, kû der e?

2- Li hemberî bindestiya welêt, helbestvan çi peyamê dide?

## RÊZIMAN

1- Nivîs dibe du beş:
**a- Hûnandî**
**b- Pexşan**
**a- Hûnandî:** Ew nivîsên bi rêzik, malik û pîvanan tên nivîsîn hûnandî ne.
**b- Pexşan:** Ew nivîsên ji hevok, bendan pêk tên û pîvana wan li ber çavan nayê girtin, jê re pexşan tê gotin.

2- Her rêzikeke helbestê bi tîpên çawa hatiye destpêkirin?

3- Di helbestê de navên taybet derbas dibin?

Ew navên ku ji bo nasandina hebûneke tenê tên bikaranîn, bi tîpên çawa hatine destpêkirin.

## HÎNDARÎ


**1-** Cihê ku tu lê dijî, aliyê ku tu jê hez dikî û pê ve hatiyî girêdan, di refê de ji hevalên xwe re vebêje.

**2-** Tiştên te ji hevalên xwe re gotî, bi çend rêzikan bihûne.

**3-** Ji bo ku tu hest û hizirînên xwe baş bidî têgihandin, çima pêwîst e, tu pir peyvan bizanî?

**WANE 2**

## EHMEDÊ XANÎ Û ZIMANÊ KURDÎ



Bêguman Ehmedê Xanî di dîroka gelê kurd de kesayeteke gelekî bi nav û deng û xwedî cihekî taybet e. Ew ne bi tenê zimanzan û helbestvan bû, di heman demê de fîlozof, zanyar, dîrokzan, wêjevan, pêşbîn û rewşenbîrekî kurd ê mezin bû. Li gorî ku tê zanîn Ehmedê Xanî di sala 1651'an de li gundê Xanî yê girêdayî bajarê Colemêrgê ji dayîk bûye. Navê bavê wî Ilyas û navê dayîka wî Xanim (Xanê) ye. Ew bi esilê xwe ji êla Xanî ye.

Navê Xanî hem navê diya wî ye, hem jî navê êl û gundê wî ye. Ehmedê Xanî bi xwe jî li gelek deverên Kurdistanê geriyaye û li cem zimanzan û şêxên bi nav û deng perwerde dîtiye. Wî paşê jî ji bo ku zarokên kurdan bi zimanê xwe yê dayîkê lê bên perwerdekirin, dibistanek vekiriye û lê wane daye zarokan. Di dibistana Ehmedê Xanî de bi zimanê kurdî hem waneyên olî hem jî waneyên zanyarî hatine dayîn. Di gel ol û zimanê kurdî li ser mijarên weke felsefe, dîrok, wêje, erdnîgarî û esmannasî jî zarok û kesayetên cuda perwerde kirine.

## WATEYA PEYVAN

**Pêşbîn:** mirovê zana yê ku pêşerojê dixwîne.

## EM TÊBIGIHIN

1- Di dîroka gelê kurd de Ehmedê Xanî kesayeteke çawa ye?
2- Ehmedê Xanî ji kû derê ye?
3- Di dibistana Ehmedê Xanî de kîjan wane dihatin dayîn?

## RÊZIMAN

1- Peyvên weke: "Ehmed, Xanî" yên di mijarê de derbas dibin, bi tîpên çawa hatine nivîsîn, çima?
2- Cudahiya di navbera navê taybet û navê giştî de li gorî nivîsa wan çi ye?

**Navên taybet (serenav):** Ew peyvên ku ji bo heyîneke bi tenê tên bikaranîn, her dem bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Navên giştî (hevenav):** Ew peyvên ku ji bo gelek heyînên heman komê tên bikaranîn û bi tîpên biçûk tên nivîsîn.

## HÎNDARÎ

**1-** Ji bo waneya Zimanê Kurdî kaxezek an lênûsekê bigire.

**2-** Dîtinên Ehmedê Xanî yên li jêr di refê de guftûgo bikin.

Ji dayîka xwe hez bikin, ji bavê xwe hez bikin û ji hevalên xwe hez bikin; da ku hûn hînî hezkirina dayîka giştî" Kurdistanê" bibin.

**WANE 3**

## CIVÎNA KULÎLKAN



Her sal, tevahî kulîlkên cîhanê li hev dicivin; bûyerên ku bi serê wan hatine û dîtine şîrove dikin. Bi vî awayî, kulîlka ku çalakiya herî xweş kiriye xelat dikin.

Îsal cihê civînê li mala Rihanê bû. Roja civînê hatibû diyarkirin. Hemû kulîlk amade bûbûn. Lê kulîlkên Nêrgiz, Sosin, Şilêr û Beybûn nehatibûn. Kulîlkan xwe li hêviya wan negirt û dest bi civînê kir.

Gulê mafê axaftinê girt û dest bi şîroveya xwe kir: -Îsal min tişteke balkêş nekiriye, tenê di qada dibistanekê de min kulîlk vekirin û dibistan xemiland. Bi hebûna min zarok gelek dilşad bûn.

Şûşanê xwe da pêş û mafê axaftinê girt**:**

-Ev çend roj in, ez li ber serê nexweşekî bêkes rawestiyabûm. Ji bo ku ez bîranînên wî yên kevin û xweş zindî bikim, min kar dikir.


Hemû kulîlkan bi hev re got:

-Pir baş e! Bê guman xelat ji mafê we ye.

Bi rêzê ve, hemû kulîlkan mafê axaftinê girt, bîranîn û serpêhatiyên xwe şîrove kirin. Dest bi danûstendina ji bo xelatdayînê kirin. Di wê demê de dengekî bilind ji derve hat bihîstin. Derî vebû. Her çar kulîlkên din "Nêrgiz, Şilêr, Sosin û Beybûn" di nava xwêdan û xwînê de, pir westiyayî ketin qadê.

**Nêrgiz:**

Biborînin hevalino, em dereng man. Em ji cihekî dûr, ji welatê rojê, ji serê çiyayên Kurdistanê tên. Di rê de em rastî termên sê ciwanên kurd ên ku ji bo rizgarî - azadiya welatê xwe giyan dayîn, hatin. Me xwe nêzîkî wan kir. Ji bo ku li hemberî germa havînê pûç nebin, me xwe ji wan re kir sîwan û sîber; bi sîbera me hatin parastin heya hevalên wan hatin.



Bi vê gotinê re tevahî kulîlk rabûn ser piyan û bi dilekî xweş li çepikan dan - gotin:

-Bijîn, her bijîn, xelata îsal li we pîroz be!

## WATEYA PEYVAN

**Şûşan:** Kulîlkeke ku li ser goran tê çandin.
**Xelat:** Diyariya di encama serkeftinekê de tê dayîn. **Sîber:** Kolik, Sîh
**Giyan:** Merg, can.
**Sîwan:** Amûreke ji bo parastina ji germahî û baranê **(**Şemsiye).

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima kulîlka Şûşanê, hêjayî xelatê hat dîtin?
2- Çima Nêrgiz û hevalên xwe dereng mabûn?
3- Kê xelata salê girt?

## RÊZIMAN

1- **Qertafên sazker:** Ev qertaf peyvên nû saz dikin.
Ev qertaf dibin sê beş: "Pêşgir, Paşgir û Navgir"

Mînak:

a- Pêşgir: **Der**+ketin= **der**ketin
**Ser**+keftin= **ser**keftin
**Da**+girtin= **dag**irtin

b- Paşgir: Nexweş+**xane**= nexweş**xane**
Ol+**dar**= ol**dar**
Huner+**mend**= huner**mend**

c- Navgir: Reng+e+reng= reng**e**reng
Ser+**an**+ser= ser**an**ser

2- "Lê kulîlka Nêrgiz, Sosin û Beybûn nehatibûn."
Vê hevokê bi awayekî kite ji hev cuda bike. Di her kiteyekê de çend tîp hene? Em dikarin bêjin li gor

rêzimana kurdî jimara kiteyan, bi qasî jimara tîpên dengdêr e?

## HÎNDARÎ

1- Tu jî metelokeke ku li ser kulîlkan hatiye nivîsîn, di refê de vebêje.

2- Lênûsekê ji bo peyvên nayên zanîn bigire. Peyvên tu nizanî ji ferhengan fêr bibe.

**WANE 4**

## HEZKIRINA PIRTÛKAN

Di zarokatiya min de, şahiya min a herî şirîn, qulibandina pelên pirtûkên biwêne bû. Her rûpelekî bi wêne ji pirtûkê, bi xulekan ez bi xwe ve dihiştim. Ez dikarim bêjim, dema min li wêneyan dinêrî, xweza dihat bîra min. Li gorî min, bi wêne jî be dîtina daran pir watedar e.

Dema pirtûkek li pêşiya min vekirîbûya, min ê xwe ji tevahî şehzadeyên çîrokan bextewartir bidîta. Reng, sih û xêzikên li hemberî min pir bandor li min dikir.



Piştî min dest bi xwendinê kir, girêdana min a bi pirtûkan re zêdetir bû. Niha jî ji bo ez li ser rûpelekê heya êvarê bêm çemandin, pêwîstî bi wêneyan tune ye. Eger di pirtûkê de çend rêzên ku mirov bixwîne hebin, ez dikarim wê pirtûkê zû bixwînim û derbas bibim. Hêj ez nebûbûm deh salî, min gelek pirtûk xwendin û kom kirin. Weke xwendina pirtûkan, dîtina wan jî pir kêfa min tîne.

Dema min serê xwe ji ser pirtûkê radikir, di serê min de pir xeyal derbas dibûn. Pirtûkên ku min xwendine, di serê min de zindî dibûn.

Carinan peyvekê ez dihizirandim. Carinan jî min hevokeke pir xweş didît û ji ber dikir. Herî zêde peyvên ku min wateya wan nedizanî, ji min re girîngtir dihatin. Ez dihizirîm ku ji bo hînî wateya wan peyvan bibim, pêwîstiya min bi pirtûkxaneyeke dewlemend hebû. Eger ez nebim xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend, ditirsiyam ku ez hînî wateyên wan peyvan nebim.

## WATEYA PEYVAN

**Çemandin:** Tewandin.
**Xeyal:** Di mejiyê xwe de çêkirina tiştekî.
**Zindî:** Giyandar, candar
**Pirtûkxane:** Cihê  pirtûk lê tên komkirin û belavkirin.

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima nivîskar dema zarok bû, bêhtir ji pirtûkên biwêne hez dikir?
2- Kengî nivîskarî xwe ji şehzadeyên çîrokan, bextewartir didît?
3- Piştî nivîskarî dest bi xwendinê kir, têkiliyê wî bi pirtûkan re çawa pêş ket?
4- Nivîskarî çima dixwest bibe xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend?
5- Di benda destpêkê ya nivîsa we xwendî de çend hevok hene, her hevokek çi dide têgihandin?

## RÊZIMAN

1- Peyvên, **pirtûkxane** û **dewlemend** di lênûsa xwe de binivîse. Binê tîpên dengdêr ên di nava van peyvan de xêz bike.

Tîpên dengdêrên **dengdirêj** "**a-ê-î-o-û**" çawa ji devê te derdikevin?

"Egîdê keçel û Siyabend çûn çiyê." Tîpên dengdêrên dengdirêj ên di vê hevokê de, di lênûsa xwe de binivîse.
Tîpên dengdêrên **dengkurt** "**e-i-u**" çawa ji devê te derdikevin?

2- Di hevoka "Ez fêrî xwendinê dibim." de tîpên dengdêrên dengkurt diyar bike?

3- Li dawiya hevokên temambûyî **xal** (**.**) tê bikaranîn.

**Mînak:** Mamoste, dayîk û bav
e. Bêrîvan çû bêriyê.

## HÎNDARÎ

1- Mirov ji pirtûkxaneyeke dewlemend çi sûdê digire?

2- Ramana bingehîn a mijara te xwendî, vebêje.

## WANE 5

# SERXWEBÛNA MIRÎŞKAN



Li welatê Xerza
Dîkek hebû şareza

Rokê ew çû nav dîka
Ji wan re got hêdîka

Rabin bêjin mirîşkan
Bes xwe bidin anîşkan

Dîk û mirîşk bûne kom
Berê xwe dane cem
bûm

Ew jî li hev bûne kom
Yekî rabû gote bûm

Rabe ser xwe tu mîro
Ji bo me bêje îro

Ev leşkerê bê jimar
Gelo heye jê zerar

Bûm kenî û gote wan
Bakin bazê pehlewan

Hudhud rabû serfiraz
Wî çû bi lez gote baz

Go rabe ey tu bazî
Şah îro te dixwazî

Baz çû ba şah li banî
Destê xwe li ser hev danî

Bûm gote bazê xwînxwar
Bi lez rabe here xwar


Bazê terî bi rêşî
Hate cem dîkê pêşî

Destê wî girt û hejand
Nilqek jê re dirijand

"Olan, sen neyrilîsin" 1
Go em xelkê bedlîs in

"sizin bûrda ne îş war"
2 Dîk xeyidî lê da dar

Go bi zor û bi gazin
Em heqê xwe dixwazin



**Cegerxwîn**

## WATEYA PEYVAN

**Şareza:** Têgihiştî, zana
**Bûm:** Kund
**Rêşî:** Bisk, bendik
**Zerer:** Ziyan
**Heq:** Maf
**Şah:** Qiral

- Kuro, tu ji kû yî
- Çi karê we li vir heye

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Mebesta Cegerxwîn ji vê helbestê çi ye?

**2-** Bûm çima banî baz kir?


## HÎNDARÎ

1- Bersiva pirsên li jêr bi çend hevokan bide.
- Dema ku dibêjin helbest, çi tê bîra te?
- Dema ku sazkirina helbestekê ji te bê xwestin, tu dê kîjan destûran bikar bînî?

2- Helbesta li jor ji ber bike û ji hevalên xwe re bêje.

**WANE 6**

## LEHENGÊ SÊPIYÊ



Seyid Riza li ber dara sêpiyê rawestiya. Destên wî vekirî ne û li her kêlekeke wî du leşker hene. Reşik Hûseyin û yên din di rêza bidarvekirinê de bûn. Fermandarê tirk Evdila Alpdoxan, dozger, bijîşk, mela û çend berpirsyarên din ên dewletê li wan temaşe dikir. Kurê Seyîd Riza, Reşik Hûseyin tevî ku birîndar bû jî tê bidarvekirin.

**DOZGER** (diqîre):

Seyid Riza, kurê wî Reşik Hûseyin û hevalên wan ji ber ku li hemberî dewletê serî hildane, raperîn û pêşengiya serhildanê kirine, xwestine ku beşek ji xaka komara Tirkiyê veqetînin û Kurdistaneke serbixwe ava bikin, gunehbarê bidarvekirinê hatine dîtin. Niha jî bidarvekirina wan dê pêk were. Ez li gorî toreya zagonan, mafê gotina wan a dawî didim û ji wan dipirsim: Gotina te ya dawî çi ye?

**SEYID RIZA** (Bi dengekî bilind û bêminet)**:**


Li tu deverên cîhanê talankar û zorkarên ku hene, heta dawî desthilatdar namînin. Sazûmanên xwînmijiyê bi zordestî û derewan li ser piyan namînin û temenê wan kin e. (Bi dengekî bilind) Hûn zarên romên bêbext in…

Hûn heya qirikê di nava rezîlî û bêşerefiyê de ne….

Gelê kurd bi darê zorê, qirkirin, bêbextî, çewisandin û derewan ji holê ranabe!

Ên ku dibêjin: "Em ê navê kurd û Kurdistanê ji holê rakin" tu carî ew bi ser nakevin û dê bi ser nekevin.

Ez bi fen û fûtên we xapiyam, ev ji bo min bû derd. Ez jî serê xwe ji we re danayînim bila ev jî ji we re bibe derd.



Rûreşino! Hûn şerm nakin, lê dîrok şahidê bêbextiya we ye. (Bi dest nîşan dide): Ev çiyayên Kurdistanê, wê rojekê rabin ser piyan.

-Ez 75 salî me. Va ez jî dibim şehîd, tevlî şehîdên Kurdistanê dibim. Serhildan têk diçe, lê kurd û Kurdistan dijîn û dê xortên kurdan tola me bistînin...

Bimirin talankar, mêrkuj û zordar!

**Reşik Hûseyin:**

- Bavo! Bila gelê kurd sax be! Bijî Kurdistan!

(Seyîd Riza, celadê rûreş dehf da û bi destên xwe xilboq xist stûyê xwe, lingê xwe li kursî da û tevlî nemiran bû.)

## WATEYA PEYVAN

**Sêpî:** Sêdarên ji bo daliqandinê tên amadekirin.
**Xilboq**: Xerboq. Ew xerboqa bi benê sêdarê ve ji bona xeniqandinê tê bikaranîn.
**Celad**: Kujer, kesê bi fermanan mirovan dikuje.
**Zagon**: (Qanûn) destûrên dewlet**ê**
**Fen û Fût:** Fêlbazî, dek û dolab
**Tore**: Adet, kevneşopî

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima fermana bidarvekirina Seyîd Riza dan?
2- Li gorî nivîsê, kê li Seyîd Riza temaşe dikir?
3- Dozgerî çi ji Seyîd Riza pirsî?
4- Baweriya Seyîd Riza bi kê dihat ku tola wan hildin?
5- Li ber darvekirinê Reşik Hûseyin çi got?

## RÊZIMAN

**Tîpên kelijandinê:** Dema ku du tîpên dengdêr li pey hev bên, tîpeke kelijandinê dikeve navbera wan û vegotinê hêsantir dikin. Tîpên kelijandinê ev in: "h, w, y"
Mînak:
Stû+ê= stûyê
min Ava+î=
avahî Rê+î= rêwî

## HÎNDARÎ

**1-** Dema em dibêjin, Seyîd Riza kesekî çawa tê ber çavên te?

**WANE 7**

## WELATO



Min ji kaniyên te dimêtî, ava jînê ey welat
Lewra dilsoj im ji bo te, min dil û can kir xelat
Ew êzingê tête sotin, ez im bo Newroza te
Ez xunav im tim dibarim, ser pelên lîloza te

Ez bi gorî kim welato, can û mal, pez û kerî
Tev ji bona te erzan e, her du çav, cerg û serî
Sed silavan bi rê dikim ez, bo kanî û lîlava
te Têr nebûm ez qet tu caran, ji ava sûlava te

Ez li zeviyên te bibarim, wek reştavên bihara
Av bidim wan gulşenên tî, mazî, çam, çinara
Min ji te hez kir ji dil û can, pirtir ji roniya
çava Hezkirina te welato, da ser a dê û bava.

## WANE 8

## ERKA XWEPARASTINÊ



Di serdema me de tu gel û pêkhate, bêyî hêz an jî yekîneyên parastinê nabin û nikarin hebûna xwe bidomînin. Ji ber vê, her dewlet an jî şoreşên xwedî bandor hêz û yekîneyên wan ên parastinê hene ku divê bê ferq û cudahî can û malê welatiyan ji êrîşên derve û hundir biparêzin. Ev yekîneyên parastinê an jî leşkerên ewlehiyê ji keç û xortên heman welatî pêk tên ku digihêjin temenekî, divê ji bo demeke diyarkirî erka xwe ya parastinê bi şanazî bi cih bînin. Ji ber ku parastina can û malê welatiyan, erka her kesê/î ya herî li pêş û pîroz e, divê hemû welatî bêyî dudilî erka xwe

ya parastinê bi serbilindî bi cih bînin, eger di wê oxirê de şehadet jî hebe.

Ger miletek hêza wî a parastinê tunebe, di jiyana xwe de di tu aliyan de bi ser nakeve û dê bibe pêlîstokên dagirker û stemkaran. Ji ber ku pergala niha heyî ya ku kapîtalîzm serkêşiya wê dike, yekîneyên parastinê ferz dike.

Gelên ku hêzên wan ên parastinê hebin, hesabên mezin ji wan tên kirin. Lê berovajî yên ku hêzên wan ên parastinê tunebin, tu hesab ji wan nayên kirin; tên çewisandin û heta ji nava nexşeya cîhanê jî tên rakirin. Mînaka vê ya herî mezin, mirov dikare di rewşa gelê kurd a beriya niha de bibîne ku digihiştin milyonan, lê ji ber tunebûna hêzeke parastinê ya hevgirtî, bi pişaftinê re rû bi rû mabûn.

Niha, bi şoreşa Rojava re ji hemû aliyan ve bêyî ferq û cudahiya gel û pêkhateyan, bi hişmendiya "KURDISTAN WELATÊ HEVPAR Ê KURDISTANIYAN E" xwe birêxistin kirine. Gelê kurd, mînaka herî baş a çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn e ku ji bo hemû gel û pêkhateyên herêmê sûdmend e.

Yek ji van rêxistinên Rojava ku ji destpêka şoreşê heta roja me, bi qehremanî û fedekariyên pir mezin pêşengî ji Şoreşa Sûriye û Rojavayê Kurdistanê re kiriye; "Yekîneyên Parastina Gel" (YPG) û "Yekîneyên Parastina Jin" (YPJ) ne. Ev yekîneyên parastinê ku ji keç û xortên kurd û pêkhateyên din pêk tên, ji bo parastina can û giyanê hemwelatiyan, ji êrîşên hovane bêyî dudilî, kom bi kom canên xwe kirin xelat di oxira azadiya gel û welatê xwe de. Weke mînak, navê hinek

ji wan cengewarên ku di parastin û qeleya vejînê ya Rojava de bûne stûna berxwedana bêhempa: "Xebat Dêrik, Çekdar Amed, Arîn Mîrkan, Gelhat Botan, Silava Efrîn, Bêrîvan Sason, Goran Dêrik, Serhed Qamişlo, Lewend Qamişlo û hwd."

Lewra, divê hemû welatî bi her şêweyî li yekîneyên parastinê weke parçeyek ji canê xwe xwedî derkevin û ji hemû deman bêhtir **erka xwe ya parastinê** bi cih bînin. Çawa ku jiyan bê nan û av nabe, bêyî parastin û **erka xweparastinê** jî, jiyaneke birûmet nabe.

## WATEYA PEYVAN

**Erk:** Wacib
**Pişaftin:** Helandin, asîmîlasyon
**Pêkhate:** Hemû mirov, an jî gelên ku li welatekî dijîn, pêkhateyên wî welatî ne
**Şêwe:** Awa, reng
**Hevpar:** Hevbeş

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima pêwîst e mirov erka xwe ya parastinê bi cih bîne?
2- Kîjan hêzan, Rojava ji dijminan parast?
3- Navên çend şehîdên şoreşa Rojava binivîse?

## RÊZIMAN

1- Di zimanê kurdî de peyv li gorî çêbûna xwe dibin sê beş.

**a-**Peyvên Xwerû

**b-**Peyvên Pêkhatî **c-**
Peyvên Hevdudanî

**a-Peyvên xwerû:** Ji wan peyvên xwedî wate, yên ku tu qertafan nagirin re peyvên xwerû tê gotin.

**Mînak:** Azad- kew- mirov- ax- av- aş- nan.

**b-Peyvên pêkhatî:** Ji wan peyvên ku bi alîkariya qertafên sazker pêk tên re peyvên pêkhatî tê gotin.

**Mînak:** Aş**van- hil**girtin.

**c-Peyvên hevedudanî:** Ji wan peyvên ku ji du peyvên watedar pêk tên û wateyeke nû didin re peyvên hevedudanî tê gotin.

**Mînak: Roj + hilat = Rojhilat**
**Gul + bihar= Gulbihar**
**Çav + reş = Çavreş**

**2-** Di hevoka "**Derdor ji milê rojhilat ve her diçû sor dibû.**" de peyva "**rojhilat**" a di vê hevokê de derbas dibe hevedudanî ye.

## HÎNDARÎ

1- Girîngiya erka xweparastinê bi çend xêzan bêje.
2- Malika li jêr, bi awayekî xweş binivîse.

Derket ji nav Bircê meşî
Ava çema qet nexweşî
Solgul ji ber şerma weşî
Ez dame ber yek awirê

Cegerxwîn

## WANE 9

### ŞOX Û ŞENGÊ ZUHRE RENGÊ



Şox û şengê zuhre rengê
Dil ji min bir dil ji min
Awirên heybet pilingê
Dil ji min bir dil ji min

Wê şepalê miskî xalê
Dêm durê gerden şemalê
Cebheta biskan semalê
Dil ji min bir dil ji min

Zilf û xalan, nûn û dalan
Wan ji min, dil bir bi talan
Goşeyê qewsî, hîlalan
Dil ji min bir, dil ji min

Dêm nedûrê, bû ebîrê
Xemriyo, kîso herîrê
Sîne kir, amancê tîrê
Dil ji min bir, dil ji min

Sur şirînê, nazenînê
Kuştim û nakit yeqînê
Wê bi çengala, evînê
Dil ji min bir, dil ji min.

**Melayê Cizîrî**

## WATEYA PEYVAN

**Şox û şeng:** Rind û delal
**Zuhre:** Navê gerestêrkê,Vênûs
**Heybet:** Mezinahî
**Xal:** Nîşana rû
**Cebhet:** Enî
**Sema:** Cureyek dîlanê
ye. **Zulf**: Bisk
**Nûn û dal:** Du tîpên erebî ne mebest jê çav, birû, birî û birh in
**Hîlal:** Çarana Heyvê
**Neđîr:** Pêta bilind
**Dêm:** hinarok, rû, gujmik, gep
**Herîr:** Hevrîşim.
**Sîne:** Sing
**Yeqîn:** Bawerî

### Em Têbigihin

**1-** Hestên helbestvan li hemberî evînê bide diyarkirin.
**2-** Girîngiya Melayê Cizirî di pêşxistina zimanê me de çi ye?

## RÊZIMAN

**Malik:** Ew nivîsên hûnandî yên ji çend rêzikan pêk tên, jê re **malik** tê gotin.
Malikên ku ji du rêzikan pêk tên, jê re **Cotik** tê gotin.
**WANE 10**

# AGIRÊ SERHILDANÊ



Îsal li Kurdistanê pir xizanî û hejarî hebû. Li aliyekî berf dibarî, li aliyê din jî serhildan bû.

Riya min ketibû aliyê Cizîrê, karekî min li wê derê hebû. Dem dema serhildanê bû. Lê hêj bihar nehatibû xaka Cizîrê. Li ser kevirê sînorê di navbera Cizîr û Dêrikê de komek mirov civiyabû, min li wan nêrî, ewên bişewq kî ne?

Haa! Wey li minê ew Egîd e, heyloo! Ew jî Bêrîvan û Newal in. Gelo ev xewn e. Lê ez bi laşê xwe ve dilerizîm, laşê min diêşiya. Min di pirtûkekê de wêneyên wan dîtibûn. Haa! Min ew nasîn. Ew ê agir pê dixe Kawayê Hesinkar e û yê din jî Kawayê hemdem Mazlûmê çavreş e.

Hey gidî dinyayê!

Şehîd Mahsûm hat ser kevirekî, hinekî bêdeng rawestiya, piştre hêdî hêdî dest bi gotina xwe kir:

- Me ji mirinê jiyan peyda kir. Me bi qêrîna xwe ya bêkesî gazî biharê kir. Biharê di bin berfê de stûyê xwe xwehr kiribû.

Em hildikişiyan çiyayên welêt, hemû şehîd rabûbûn ser piyan û ketibûn civata me. Hemû şehîdên me yên nemir bi kêfxweşî û dilşadî ketibûn nav me, em bi rê ve diçûn û agir li pey me dihat.

Dewsa me hemûyan dibû agir, em bi rê ve diçûn, diketin nav welat, dar û berên welêt bi navê doza me diqêriyan. Çiyayê Agirî, weke bûkekê kincên spî li xwe kiribûn. Cûdî, Bagok, Zagros û hemû çiyayên welêt rê dida me û ala têkoşînê bilind dikir. Mezin dibû roja welêt, îro hemû stran û helbestên azadiyê bi agirê
Newrozê geş dibin. Me hemûyan bi hev re hawîrdor, mil bi mil, dest bi dest govendeke mezin digirt.
Li xaka welêt, têkoşîna gerîla bi agirê serhildanê bilind dibû.

Hemû şehîdan li ser van peyvan bi stran û tilîliyan dora govendê girt. Ez jî dikişandim nav xwe. Govenda me heya Mahabad, Hewlêr, Amed û Qamişloyê dikişiya.

Piştî ku ez ji xewê şiyar bûm û hişê min hat serê min. Min dît ku hemû pakrawanên me weke kevokan difiriyan û li ezmanê Kurdistanê her yek dibû stêrkek. Min serê xwe rakir, demeke dirêj li stêrkan nêrî û çar dilop rondik ji çavên min hatin.

## Wateya Peyvan

**Civîn** **:** Kombûn
**Pakrewan :** Şehîd
**Dews** **:** Şûn, şop

## Em Têbigihin

1- Çima komek mirov li ser sînor civiyabû?
2- Kawayê hemdem kî ye?
3- Hevalê Mahsûm li wê derê axaftineke çawa kir?
4- Govenda şehîdan heta ku derê dikişiya?

## Rêziman

1- Di nivîsê de axaftin bi çi nîşaneyê hatiye nîşandan?


(**-**) Xêzika ku dikeve pêşiya hevoka axaftinê, em jê re dibêjin **xêzika axaftinê**.

2- Hevokên ku peyva Mazlûm û Egîd di nav de heyî bibîne, di lênûsa xwe de binivîse.
3- Di dawiya hevoka "Mala min bişewite!" de çima baneşan (**!**) hatiye bikaranîn?

## WANE 11

### MIJARA SERBEST

# ROJA ZAROKÊN CÎHANÊ





Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di sala **1925'**an de biryar da ku **1'ê Herîzanê** bibe roja zarokên cîhanê. Hin dewletan evî rojê pejirandiye. Ji ber vê yekê, mafê zarokan e ku wê rojê weke roja cejna xwe bizanin û bi coş û xuroş, kêf û şadî pîroz bikin. Ji bo vê jî, divê hemû welatên cîhanê bi deng û rengên xwe, piştgiriya vê roja zarokan bikin. Ji ber ku zarok pêşeroja rojên mezin in. Zarokên perwerdekirî mizgîniya pêşerojeke serkeftî ne. Da ku mafê zarokan were parastin ev bend hatine destnîşankirin:

1- Hemû zarokên cîhanê xwediyê wî mafî ne ku ji bo pêşerojeke ronî di aliyê xwendin û perwerdehiyê de alîkarî ji wan re were dayîn.
2- Divê dermanên dijî nexweşiyan ji bo hemû

zarokan werin peydakirin.

3- Divê derfetên xwendin û nivîsînê ji bo hemû zarokan werin dayîn û pêşxistin.

4- Nabe di temenê zarokatiyê de kar bi zarokan were kirin. Ger ji ber hejarî jî kar bikin, divê karê giran bi wan neyê kirin.




# HÎNDARÊ1

**Ay lê Gulê**

Ay lê gulê gula minê        Şirîna li ber dilê minê
Gulê nadim malê dinê        Wel ser gulê têm kuştinê

Gulê kesk û sor û zer e        Nîşana alê li ser e
Êdî reng spî gewher e        Şirîn û peymana minê

Zordar dibê ez gul nadim        Ez ê zend û benda badim
Ez ê kelh û sera radim        Azad dibî bi şoreşa minê

***Umerê le'lê*** **stran *(M. ŞÊXO)***

1- Li gorî helbesta "Ay lê Gulê" bersiva rast a her sê pirsên destpêkê hilbijêre.

- Helbestvan gul bi wateya çi bi kar aniye?
  **A.** Al        C. Welat
  **B.** Yar        D. Pirtûk
- Helbestvan di helbestê de dibêje nîşana alê li ser çi ye?
  **A.** Kelhê        C. Sera
  **B**. Gulê        D. Kaniyê
- Welat çawa azad dibin?
  **A.** Bi şoreşê        C. Bi pereyan
  **B**. Bi sozdayînê        D. Bi pesindayînê

2- Ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.

- **1-** Ji bo ku em di demeke kurt de cihê mijareke di pirtûkê de bibînin em li naverokê vedigerin. ( )
- **2-"Egîd** çû çiyê" di vê hevokê de peyva hatiye reşkirin xwerû ye. ( )
- **3-**Di peyva "Kurdistan" de çar tîpên dengdêrên dengkurt hene. ( )

- **4-"Karmend** bi hêz in" Di peyva ku hatiye reşkirin de tîpa “k” nerm hatiye bikaranîn. ( )

1- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.

| **A** | **B** |
|---|---|
| Damezrandin | Can |
| Giyan | Şop |
| Tore | kevneşop |
| Dews | Zana |
| Şareza | Avakirin |

# BEŞA DUYEM

1- Ji dîwana Xanî
2- Birca Belek
3- Tenê dilopek ji Kobanê
4- Xerîbî
5- Mirov û duristî
6- Name
7- Welatê me
8- Ar bûma
9- Banga aşitya gerdûnî
10- Di civaka kurdî de rewşa jinê

**WANE 1**

## JI DÎWANA XANÎ

**Xeberdana memê bi dilê kul re**
**Ku ketibû şerê perwane bi bilbil re**

**Geh şer dikir wî li gel dilê jar**
**Digotê: ey xayin û stemkar**

**Kanîn ew soz û biryar û ferman**
**Kanîn ew sûnd û kanîn ew peyman**

**Te digo rast im li gel te ez her!**
**Ez wekî te me tu bike bawer**

**Te digot yek im naguherim**
**Li ber derdan ez xwe radigirim**

**Lê mixabin tu pir bê wefa yî**
**Tu jar û sistê li ber çava yî**

## WATEYA PEYVAN

**Jîr:** Zîrek, jêhatî.
**Pakrawan:** Şehîd.

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima Memê Alan bi bilbil re şer dike?
2- Li gorî helbestê kê digot " Li ber derdan ez xwe radigirim"?

## Rêziman

**Tîpên hilmî û nehilmî (hişk û nerm):** Ji tîpên (ç, k, p, t) ku du dengên ji hev cuda derdixin re tîpên hişk û nerm tê gotin.

Mînak:

| **Hilmî (hişk)** | **Nehilmî (nerm)** |
|---|---|
| Çar | çem |
| Ken | kund |
| Per | pênc |
| Tevn | tîr |

## HÎNDARÎ

1- Helbesta jor ji mamosteyê xwe guhdar bike. Mamosteyê/a te helbestê bi çi awayî dixwîne?

2- Piştî te helbest baş girt, di refê de bideng bixwîne.

**WANE 2**

# BIRCA BELEK



Rojek ji rojên biharê yên xweş bû. Destpêkê baran barîbû û piştre jî rojeke xweş hilbûbû.

Şîlan:

- Rûgeş , were em biçin li Birca Belek bigerin. - Erê, ev ramaneke pir baş e.

Di cih de kincên xwe wergirtin û ketin ser rê. Şîlanê hewayê paqij kêşa û axivî:

- Ox! Dema baran dibare, her alî çi qas xweşik dibe.

Rûgeş jî ew qas bextewar dibû.

Rûgeş:

- Rast e, piştî baranê bêhna axê çi qas xweş e!... Çi qas xweş e ma ne?

Têra xwe bi rê ve çûn, ketin ser riya ku diçe Birca Belek.

Şîlan**:**

- Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?

Rûgeş:

- Ez hinekî dizanim.

Şîlan**:**

- Birca Belek cihê mîrê herêma Botan bû. Qesreke mezin ji hêla mîrê Cizîrê ve, li ser rûbarê Dicleyê hatiye

avakirin. Dîwarê qesrê rêzek bi kevirên reş, yek jî bi yên spî hatiye çêkirin. Piştî demekê ji aliyê hêzên dagirker ve hatiye dagirkirin, demeke dirêj weke baregeha leşkerî dihat bikaranîn.

Rûgeş**:**

- Rast e, gelek cihên dîrokî yên gelê me hene ku ji aliyê hêzên dagirker ve hatine dagirkirin.

Şîlan**:**

- Weke ku tê binavkirin, em bi riya Şêran ve hêdî hêdî diçin.


Şîlanê Birca Belek baş dinasî. Beriya niha bi bavê xwe re lê geriyabû. Li hemû cihên wê geriyan.

Şîlan**:**

- Rûgeş, Birca Belek ji sêsed û şêst û şeş odeyan pêk tê. Bi firehbûn û bilindbûna xwe pir tê nasîn.

Rûgeş:

- Ha Şîlan, nêzîk e ku bi têkoşîna gelê me Birca Belek ji dagirkeran rizgar bibe.



## WATEYA PEYVAN

**Birca Belek:** Avahiyeke taybet e, li Cizîra Botan li ber peravên ava Dicle ye.
**Birc:**Avahiya ku li ser sûr û kelehan hatiye avakirin.
**Belek:** Têkilbûna rengê reş û spî.
**Pak:** Paqij.

## EM TÊBIGIHIN

1- Şîlan û Rûgeş di rojeke çawa de çûbûn Birca Belek?
2- Şîlan û Rûgeş di kîjan riyê de çûn Birca Belek?
3- Di benda dawî de gotûbêj li ser çi tê kirin?
4- Birca Belek li kû dera Kurdistanê cih digire?

## RÊZIMAN

1- Ji peyvên rewş, awa, reng, heyîn û çawabûna navekî diyar dikin re **hevalnav** tê gotin.

**Mînak:**

Bizina **reş**
Birca **Belek**
Azadê **dirêj**
Çiyayê **bilind**

2- **Pirsnîşan (?):** li dawiya hevokên pirsyariyê tê danîn**.**

**Mînak:**

Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?

## WANE 3

## TENÊ DILOPEK JI KOBANÊ

Hema bêje, qama rimekê mabû roj biçe ava. Dengê guleyan ne gelekî dûr, ji nêz ve dihat. Li aliyekî berxwedana bêhempa ya keç û xortên dilê wan tije vîn ku bejna xwe bi agirê destaneyan pêçabû, li aliyekî jî bêîmaniya DAIŞ'ê û li aliyê din jî gemariyên derdor, xiyaneta hundir, dibûn sedema tengezariyên pir mezin. Lê tu hêzan nedikarîn agirê berxwedanê yê di canê keç û xortên kurdan de vemirînin.

Aha di êvareke wisa de, tevî ku kesek ji endamên malê nedixwest ax û mala xwe berde, lê kurê mezin ê kaloyê ku felekê pişta wî tewandibû, xwe amade dikir xwîşk û bira, dayîk û bavê xwe bihêle û bi dû xewnên welatê biyaniyan bikeve… Ji ber vê yekê, kalo û



malbatê bi hemû derfetên xwe hewl didan ku kurê wan, wan bi tenê nehêle.

Kalo bi van gotinan hewl dida ku kurê xwe qayîl bike û ji wê biryarê vegerîne:

- Kurê min, dizanim çi qas ji te re bêjim neçe jî, tu dê biçî. Te serê xwe çemandiye himbêza wan xayîn û xwefiroşan û wan xwefiroş û bêbextan bi dek û dolaban aqilê te bi gemarê dagirtine, lawê min.

Gotina bavê xwe dibire, radibe ser piyan û mîna ku gotinên bavê wî ne di cih de û bêkêr bin:

- Bavo, bes e! Ji bo min van çîrokan nebêje. Min biryara xwe daye, ez ê bi hevalên xwe re herim Tirkiyê, herim Ewrûpa... Ax, welat û gund hemû bila ji we re bin, min navên.

Dema van gotinan dibêje, kalo li nav çavên wî dinêre, kêşekê li cigara xwe dide û weke ku bêje "de bila tu ne lawê min ba, bila darek hişk jî li derê mala min tuneba." û wiha pê de diçe û dibêje:

- Kuro, nexwezî bi wê rojê, ew roja ku yên wekî te teres bi dû bavan ketin û dayîkan di dergûşan de hejandin. ( Kêşek din li cigara xwe dide, tasek av vedixwe û bi dengekî bilintir) De here. Ew ên ku tu bi dû wan ketî, çawa dev ji axa welatê xwe berdane, wê rojekê te jî wilo bihêlin û bera te bidin bêxîret. Ew ên ku ji ax û welatê xwe re nebin dost, ji tu kesî re nabin pişt û post. Ger tu welatê xwe bihêlî û herî, wê ne tenê bera te bidin, wê te di zinarekî de bavêjin û tu caran tu bi ser xwe ve nayê, lawê min.

Di vê navberê de êdî xwîna dayîkê jî dikele, xwe nagire û bi gotina "bêxîret" şiqamekê li kurê xwe dide û dibêje:

- De here. Em dar û kevirên vî welatî bixwin, em dest ji axa xwe, dest ji Kobanê bernadin. Tu bi kû ve diçî biçe, Elîko.

Pêşiyan ne ji xwe ve gotine; "Aqilê sivik, barê giran e." Elîko guhdarî kesekî nake, lê dixe û diçe. Vêca ka felek wê serê Elîko bi wê bêwijdaniya wî li kîjan zinarî bixe...

Her ku diçû, tevî berxwedana Cengawerên YPG/YPJ'ê jî çeteyên DAIŞ'ê bi hêza xwe ya mezin nêzî gund dibûn. Dema tê dîtin ku êdî çare tuneye, çete wê gund bistînin, gund bi fermana Yekîneyên Parastinê ji gundiyan tê valakirin. Lê kî wê kalo derxe?! " Tenê mirin wê min ji vî gundî derxe. Ez ê heta guleya xwe ya dawiyê mil bi milê we li hemberî van nemerdan şer bikim."

DAIŞ jî bi hemû gemariya xwe ve, bê navber êrîş dike; bi tank, top, doçka û sedan çekên din, bi niyaza ku kevir li ser kevir nemîne, nêzî gund dibûn. Keç û xortên kurdan derbeyên pir mezin li wan dixistin. Dikirin û nedikirin, nedikarîn dîwarê ku bi tilîlî û hêza polayî ya keç û xortên kurdan ava bûyî bişkînin. Dema Kalo vê berxwedana bêhempa û efsaneyî ya Yekîneyên Parastinê, li hemberî wan çêlikên guran dibîne, êdî ji kêfan xwîn lê dikele, derdikeve derve û radibe ser piyan û bi van gotinan bi ser wan de diqîre: "De werin çêlikên hov û har! Hemû dinya vê hovitiya we dibîne. Bizanibin; êdî ne em ê ji mirinê, mirin dê ji me bitirse....

Heya dilopek xwîn di damarên me de bimîne, em dest ji

axa xwe bernadin. Bila ev jî li bîra we be: Gund û warên ku hûn talan dikin, ne bêxwedî ne, wê bibin goristana we û bav û kalên we..." Lê hezar car mixabin... bila bextê felekê hilweşe... hîn gotinên kalo didomiyan, kalo bi reşkujî ji aliyê segvanekî çeteyan ve bi giyanê xwe yê pîroz xatir ji jiyanê dixwaze.

## WATEYA PEYVAN

**Bêhempa:** Bê mînak
**Cengawer:** Şervan, mêrxas
**Pola:** Hesinê pir hişk û qayîm
**Ferman:** Emir
**Tengezarî:** Tengavî
**Qayîl:** Razî, (Qanih)
**Bêkêr:** Bêsûd
**Damar:** Ra, reh
**Post:** Çerm

## EM TÊBIGIHIN

1- Kurê kalo çima dest ji malbata xwe berda?
2- Çima yekîneyên parastinê fermana valakirina gund dan?
3- Ji bo çi kalo dev ji gund berneda?
4- Kalo xwest ku çi di bîra çeteyan de bimîne û tu caran ji bîr nekin?

## RÊZIMAN

**1-** Di nivîsê de kevanek **( )** çima tê bikaranîn?

**Ger em di nivîsê de du peyvên ku heman wateyê didin pêşwazî bikin, yek ji wan peyvan dikeve nav kevanekê** ( ).

**Mînak:** Şehîd(pakrewan) rûmetên me ne.

**2-** Di nivîsê de qertafa ku dikeve dawiya jimaran bi kîjan nîşaneyê tê cudakirin?

**Dabir**(') **:** Ew tîp û qertafên bi jimaran ve hatine nivîsîn bi riya dabirê, tên veqetandin.

**Mînak:** Şoreşa Rojava 19 Tırmıhê 2012'de despêkır

## HÎNDARÎ

Ji mijara te xwendî, tu fêrî çi bûyî, bi kurtahî di lênûsa xwe de binivîse.

**WANE 4**

# XERÎBÎ



Piştî ku Xemgîn sêwî dimîne, li bajarê Efrînê kesekî wî namîne. Metika Xemgîn wî dibe cem xwe, bajarê Şamê. Ji ber ku Xemgîn zimanê erebî nizanîbû, gelekî bêzar bûbû. Bi vî awayî, demeke dirêj bêdeng mabû.

Rojekê, metika wî bi dengekî bilind gazî solbendê di kolanê de derbas dibû kir. Solbend ber bi deriyê mala meta Xemgîn ve hat. Piştre metika wî çend pêlavên qetiyayî, danîn ber destên solbend û solbend dest bi dirûtina wan pêlavan kir. Xemgîn bi gumanî li pêşberî wî rawestiya. Li wan mîxên solbend dikirin devê xwe û bi lez û bez li binê pêlavan dixistin, dinêrî.

Ji ber ku Xemgîn ji biyanîtiya xwe gelekî bêzar bûbû, di navberekê de Xemgîn bi dilşadî ji bîr kir li kû ye û li

gel kê ye, bi zimanê dayîka xwe
axivî: -Ma ev mîx di devê te re
naçin?
Solbend di nava coşekê de, serê xwe bilind kir.
-Ma tu kurdî lawo?
-Belê, ez ji bajarê Efrînê
hatime. -Ez jî ji Tirbespiyê me.

Dema ku Xemgîn zanî solbend kurd e û ji Tirbespiyê hatiye, bi baldarî li wî dinêrî.

Xemgîn mala xwe ji solbend re diyar kir. Dema ku li gel hevalên xwe masî ji rûbarî digirt û çawa li gel dayîka xwe diçû cem bijîşkan, hemû ji solbend re vegot.

Di rastiyê de jî yê dipeyive Xemgîn bû; Xemgîn, ji şeş mehan û şûn ve bêdeng mabû. Bêyî ku raweste û biweste dipeyivî. Solbend hem dixebite, hem jî carcaran ji bo ku Xemgîn bide axaftin wiha digot: Erê, ya rastî wisa ye.

Ji bo ku solbend zêdetir guhdariya Xemgîn bike, destên xwe giran dikirin.

Lê, di dawiyê de hemû pêlav hatin dirûtin û kar temam bû.

Xemgîn bi dilekî ne xweş pirsî:

- Ma tu yê herî?

- Belê, ez ê herim, min karê xwe temam kir. Solbend
dît ku hemwelatiyê wî yê biçûk digirî. Ji ber
vê yekê, xwest giriyê wî bisekinîne, hinekî li ber dilê wî da:

- Negirî lawo! Negirî, ez ê carinan werim serdana te.

Piştî ku Xemgîn û Solbend bûn dostê hev, êdî bêzarî ji xemgîn dûr ket.

## WATEYA PEYVAN

**Solbend:** Pêlavçêker, mişeqa
**Bêzar:** tengezar, perîşan
**Mîx:** bizmar

## EM TÊBIGIHIN

1- Di mijarê de li ser milê mirovê hatiye gazîkirin, çi hebû?
2- Solbend çawa zanî Xemgîn kurd e?
3- Hevpeyîvîna Xemgîn bi solbend re hestekî çawa şiyar kir?
4- Çima Xemgîn giriya dema ku solbend çû?

## RÊZIMAN

1- Peyvên: "**ma, gelo, çima, çi qas, çi, çend, kengî**" peyvên pirsyariyê ne ango hevokan dikin rewşa pirsiyariyê.

**Mînak:**
-Ma tu dê biçî?
-Gelo ew dê
bê? -Çima diçî?
-Çi qas mane?
-Çi dixwazî?

2- Di hevokên li jêr de cihê bêhnokan çawa hatiye diyarkirin, binase.
-Solbend hem dixebite, hem carcaran digot. -
Erê, ya rast wisa ye, ji bo Xemgîn bide axaftin.

Di kurdî de nîşaneya herî zêde tê bikaranîn, **nîşaneya bêhnokê** ( **,** ) ye.

## HÎNDARÎ

**1-** Bi hevalekî xwe re li ser girîngiya zimanê dayîkê, bipeyive.

Di dema peyivînê de li ser van xalan şiyar be. **a**.Axaftina hevalê xwe nebire.
**b**.Peyvên rast bêje.
**c**.Awaza xwe baş bi kar bîne. **d**.
Bersiva pirsên tên kirin, bide.

WANE 5

# MIROV Û DURISTÎ



Baxçeyekî dapîra min hebû, du çêlek û çend sewalên wê jî hebûn. Her çi qas xelkê ji dapîra min re digot: şîr, mast, fêkî û dermatên xwe bifiroşe, lê dapîra min bi ya kesî nedikir, her dem weke alîkarî dida mirovên ku pêwîstiya wan pê heyî, dida mirovên hejar. Ji ber vê yekê û ji ber kiryarên wê yên rast û durist dapîra min di nava gel de pir dihat hezkirin û cihekî wê yê taybet hebû.

Mala me hinekî ji ya wan dûr bû. Lê rojê herî kêm carekê diviyabû ez biçûma cem dapîra xwe. Her ku ez diçûm cem, hema gotinek ji vir dianî û yek ji wir dianî, ji min re behsa mirovên baş, rastgotin û rastbêjiyê dikir.

Carinan wisa lê dihat, hema kêm dima ez dapîra xwe bihêlim û birevim. Ji ber vê, gelek caran min di dilê xwe de digot: De bes e dapîra min a hêja, ma ez rebenê xwedê, dê pirsgirêkên vê dinyayê tevan çareser bikim. Lê ji ber ku min pir ji dapîra xwe hez dikir, min tu caran ne tenê li hemberî wê, li hemberî kesên bitemen, qet bêrêzî nedikir.

Ji bilî dapîra min, şîretên dayîka min jî tim di guhên min de bûn, "li hemberî mezinan rêzdar be û ji biçûkan hez bike." Dema min digot, ji bo çi van bikim dayê? Ji min re digot:

> - Ji ber ku pêwîstiya zarokan bi hezkirinê û ya mezinan jî bi rêzdariyê heye. Ger tu ji zarokan hez bikî, zarok jî wê ji te hez bikin. Mezin jî wê serpêhatiyên salên dûr û dirêj ên jiyana xwe, ji bo te weke şîret û wane vebêjin. Ew şîret jî, wê ji bo pêşeroja te bibin ronahî û serbilindî, lawê min.

Aha, bi van şîretên dapîr û dayîka min ve girêdayî rojekê serê sibehê ez diçûm dibistanê. Min di rê de pîrejinek dît ku ji her du çavan nabîne. Ji mal derketibû, êdî nedizanî vegere malê. Ji ber wê min destê wê girt ta min bir mala wê û paşê ez çûm malê, min ji cem dayîka xwe ji bo wê hinek tiştên xwarinê, çay û şekir anîn. Ji ber vê, wê rojê ez ji dibistanê dereng mam. Ji ber ku ez dereng mabûm, dema min destê xwe li deriyê refê da û ez ketim hundirê refê, mamoste sedema derengmayîna min, ji min pirsî. Piştî ku min jê re behsa alîkarîdayîna wê pîrejinê kir, mamoste got: "Ez bi te pir kêfxweş bûm ku te tiştekî wisa baş kiriye." Paşê ji hemû xwendekaran

xwest ku ji bo min çepikekê lêxin û wiha berdewam kir: " Hevalê we Serhat tiştekî pir baş kiriye. Divê hûn hemû her tim tiştên wisa bikin ku mamoste û malbata we pê serbilind bin. Divê hûn xwe ji dizî, gemar û derewan biparêzin.Yên ku xwe ji van tiştan neparêzin tu caran nayên hezkirin û serbilind nabin."

## WATEYA PEYVAN

**Deramet:** dahat, xêr û bêrên malê
**Rastbêjî:** Rastgotin
**serpêhatî:** serborî, tiştên ku bi serê mirov hatine

## EM TÊBIGIHIN

1- Ji bo çi pêwîst e ku mirov ji biçûkan hez bike?
2- Çima Serhatî alîkarî bi wê pîrejinê re kir?
3- Ramana bingehîn a vê mijarê çi ye?

## RÊZIMAN

1- Peyvên li jêr, di nava hevokan de bi kar bîne, wan hevokan jî di lênûsa xwe de binivîse.
Kengî, kî, çawa, çi qas, çend, çima
2- Tu dizanî **sê xal (...**) nîşana berdewamkirina nivîsê ye.

## HÎNDARÎ

1- Sergotara mijarê çi ye? Ev sergotar û tiştên di mijarê de tên şîrovekirin hev digirin, an na? Tu jî sergotareke ku bi kêrî mijarê bê, bibîne.
2- Bîranîneke xwe binivîse.

**WANE 6**

## NAME



**Mamosteya min,**

Sal çi qas zû derbas bûn. Lê her tişt weke duh li bîra min e. Roja min a destpêka dibistanê bû. Ez li gel dayîka xwe hatibûm dibistanê.

Dîsa jî ez di nava tirseke mezin de bûm. We bi dilovanî destê xwe li ser serê min danî, li rûyê min nêrî. Piştre we pirsa navê min kir. Ji ber wê nêzîkatiya we ya germ, ez ji tirsa dilê xwe rizgar bûm. Ez pir dilşad bûbûm ku min dest bi dibistanê kir. Ji ber vê jî pir zû fêrî xwendin û nivîsînê bûm.

Dema ku ez fêrî xwendin û nivîsînê bûm, hûn ji min dilşatir dibûn. Baweriyeke mezin bi min re çêdibû. Niha ez di refa 5'an de me. Dihizirim, gelo ez çi qas fêrî

tiştên nû bûme? Lê ez dizanim, pêwîst e ku ez fêrî gelek tiştên din jî bibim.
Ez tu caran wan rojan ji bîr nakim. Di dawiyê de, bi rêzdarî sersala we pîroz dikim û rojên têrhêvî ji we re dixwazim.

Silav û rêz.

Girkê Legê
Komîna Ş. Çekdar
Kolana Botan
Jimara Malê:11

Bêrîtan Azad

**30.12.2015**

## WATEYA PEYVAN

**Dilşad:** Kêfxweş **dilovanî:**
rehim – dilnermî

## EM TÊBIGIHIN

1- Di nameyê de zarok çawa bang li mamosteya xwe dike?
2- Zarok, ev name bi boneya çi nivisiye?
3- Zarok di nameya xwe de çi diyar dike û çawa dawî lê tîne?
4- Şanenav, nav û paşnavê namehinêr li kû derê hatiye nivîsîn?

## RÊZIMAN

**1-** Cînavkên di hevokên li jêr de kîjan in?
-Hûn ji me zêdetir dilşad bûn.
-Baweriya we mezin bû.
-Hûn ji me çi dixwazin, em ê bidin we.
Ew peyvên ku cihê navên kesan digirin, em ji wan re dibêjin: **cînavk**ên kesane**.**
Cînavkên kesane yên xwerû ev in:

| | |
|---|---|
| Ez | Em |
| Tu | Hûn |
| Ew | Ew |

**2-** Roj, heyv û dîroka namehinêr diyar dike, bi kîjan nîşaneyê hatiye cudakirin?
Ji bo ku em roj, sal û heyvan diyar bikin, em nîşaneya xalê bi kar tînin.
**Mînak**: 30.12.2013
**3-** Di nameyan de carinan xal di dawiya navên kurtkirî de tên bikaranîn:
**Mînak:** Prof. Dr. û hwd.

## HÎNDARÎ

**1-** Nameya te xwendî lêkolîn bike, pêwîst e di nameyekê de çi cih bigire?

**2-** Ji bo mamosteya/ê xwe nameyekê binivîse.

Şêweyê namedankê:

Hinêr………………
Navnîşan…………….
Bajar……….............

**PÛL**

Ji bo………………….
Navnîşan…………..
Bajar……….............

**Pûl**: Parçeyê kaxezeke fermî ye ku ji postexanê tê stendin, li şûna dirav tê bikaranîn.

**Mînaka Kartnameyê:**

**Xalê min ê xoşewîst,**


**Ez sersala we pîroz dikim, bi hêviya rojên şad û bextewar û destên we maçî dikim.**

Weke mînaka li jor, tu jî kartnameyekê ji keseke/î ku jê hez dikî re bişîne.

**WANE 7**

## MIJARA SERBEST

# WELATÊ ME




Piştî ku mamoste li ser depê,"girîngiya welatê me ya di cîhanê de çi ye?" nivîsî, li xwendekaran zivirî:

-Zarokên jîr, lênûs û pirtûkên xwe bigirin. Di vê waneyê de em ê li ser vê pirsa ku hûn li ser depê dibînin, biaxivin, hinekî bihizirin, piştre yek bi yek mafê axaftinê bigirin û bipeyivin.

Dîcleyê destpêkê mafê axaftinê girt û wiha got:

- Welatê me Kurdistan ku cih û warê kurdistaniyan e, welatekî dêrîn û xwedî dewlemendiyeke pir kevn e ku gelek caran ji mirovahiyê re malovanî kiriye.

Xabûr mafê axaftinê girt û wiha peyivî:

- Gotinên ku hevala me Dîcleyê anîn ziman, tev rast in. Lê, li gorî min girîngiya welatê me ji cihgirtina wî ya erdnîgariyê tê. Welatê me, dikeve parzemîna Asya. Riyên bazirganiyê yên girîng "Hevrişîm û Biharat" tê re derbas dibin. Her wiha, di welatê me de du golên mezin "Wan û Ûrmiye" hene.

Kajînê jî mafê axaftinê girt û wiha dest bi axaftinê kir**:**

- Ez jî tevlî gotinên hevalên xwe dibim. Welatê me di warê xwezayî û bermahiyên dîrokî de jî xwediyê girîngiyeke mezin e. Cihê çavkaniya pêşketina mirovahiyê ye. Ji ber vê, bala gelek şaristaniyên biyanî dikişîne.

Mafê axaftinê gihiştibû Bêrîtanê**:**

- Welatê me di warê dewlemendiyên serxak û binxak de jî xwediyê girîngiyeke mezin e. Ji binxaka welatê me, gelek cureyên kanzayî tên derxistin. Di warê av û rûbarên xwe de jî pir dewlemend e. Gelek cureyên çandiniyê lê tên çandin. Di warê lawirvaniyê de jî welatekî pir dewlemend e.

Piştî van gotinan, mamoste ji Çiya pirsî**:**

- Tu çi dihizirî, Çiya?

Çiya jî wiha bersiva mamoste da:

- Hevalên min gelek tiştên xweş anîn ziman. Ji wan cudatir, girîngiya welatê me, ji welatên cîran, di welatê me de gelek çavkaniyên petrolê hene. Petrol kanzayeke pir girîng e. Em dikarin jê sûdê bigirin.

Piştî van gotinan mamoste, wiha peyivî**:**

- Hûn her bijîn! We gelek axaftinên girîng anîn

ziman. Rast e, weke ku we jî anî ziman, li Cîhanê welatê me Kurdistan, cihekî girîng digire. Ji ber vê yekê, çavên gelek hêzên dagirker li dewlemendiyên welatê me ne. Di heman demê de, ev hêz hewl didin da ku pergaleke wekhev û demokratîk di nava gel û pêkhateyên welatê me de neyê avakirin.


## WATEYA PEYVAN

**Kanza:** Kanên xwezayî
**Maf:** Heq
**Bazirganî:** Ticaret, Kirîn û firotin
**Bermahiyên dîrokî:** tiştên ku li şûna cihên dîrokî mane.
**Peyker:** Heykel
**Stratejîk**: Cihekî girîng

## WANE 8

# AR BÛMA

Sibê zû hişyar bûma
Pêxwas û bê şal bûma
Ling terikîn, lêvên ziwa
Xwezî dîsa zar bûma



Çawa berx û bêzar bûma
Bê mal û bê par bûma
Ruhê sade dilê can
Xwezî dîsa zar bûma



Hespê kumêt siwar bûma
Ji çiyê berwar bûma
Bimama bê deng û nav
Her tek, tenê zar bûma

Gotin: prof. Dr. Se'îdê Îbo

Mûzîk: Aram Dîkran

## WATEYA PEYVAN

**Zar:** Zarok
**Pêxwas:** Bê sol, bê pêlav

## EM TÊBIGIHIN

1- Di helbestê de hevoka “Xwezî dîsa zar bûma.” çi diyar dike?
2- Ramana bingehîn a vê helbestê çi ye?
3- Ramana bingehîn, di kîjan malikan de diyar dibe? 4- Aram Dîkran ji kû derê ye?

## REZIMAN

1- Peyvên dawiya rêzikên helbestê, lêkolîn bike, wekhev hatine nivîsîn, an na?

**Qafiye:** Ji wê wekheviya dengê ku li dawiya rêzikên helbestan tê bikaranîn re **qafiye** tê gotin.

2- “Rêzikên malikeke helbestê lêkolîn bike, jimara kiteyan wekhev e, yan na?

Ji wekheviya kiteyên rêzikan re **pîvan** tê gotin. **-**Ji bîr neke, di helbestên serbest de pîvan ne şert e.

3- Malikên helbesta te xwendî, ji çend rêzikan pêk hatiye?

## HÎNDARÎ

1- Çi bangewazî di helbestê de hatiye kirin?
2- Helbest, bandoreke çawa li hestên mirovan dike?

**WANE 9**

## BANGA AŞTIYA GERDÛNÎ



Dibêjin carekê, li bêndera tebayên kedîkirî, gelek cureyên lawiran hebûn. Di nava tebayên nêr de dîkekî dengxweş, sor, zana û bihêz hebû.

Sibehekê zû, dîkê sor di nava yarî, nikildan û bangdanê de diçû, ji nişka ve xwe li derveyî herêma xwe dît.

Di vê xaka biyanî de gelek cureyên dexil, ceh, genim û hemû cureyên şênî dihatin dîtin û wî jî bi kêfxweşiyekê dixwar. Li rast û çepê xwe nêrî, lê kesekî nas nedît. Şaş ma û tirseke mezin ket dilê wî. Tam dema xwe amade dikir ku paş ve bizivire û dûr bikeve, çi bibîne! Dît ku roviyek bi gavên mezin, rast pêşberî wî tê. Dema dît, ket nav gumana windakirina jiyana xwe, pişta xwe da neyarê xwe û heya jê hat çengên xwe vekir û fir da ser dîwarekî. Cihê ku dîk çûyê, tu caran rovî nedikarî xwe bigihînê, ji bo mayîna wî jî cihekî herî baş bû.

Dîkî serê xwe bilind kir û bang da. Rovî jî bêhn çikiyayî xwe gihand binê dîwêr. Piştî ku zanî nagihêje dîk, dest bi daxwaziyê kir. Silav lê kir û got**:** "Silavên aştî li ser te be, ey birayê rûken, dîkê ciwan!" Lê dîk

xwe nebihîstî kir. Silava wî venegerand, nexwest li rûyê wî jî binêre. Dema ku rovî



bi vî awayî dît, got: “Dostê min, ez hatibûm nûçeyeke pir girîng ji bo te bêjim. Lê, çima tu silava min venagerînî? Heta li rûyê min jî nanêrî!

”Lê dîk, guh neda van gotinên vala û piştguh kir. Rovî jî, dîsa dest bi axaftinê kir: Ax binêre! Te bizaniya, ez ji bo çi hatime erkdarkirin. Tu dê di cih de bihataya xwarê, te dê ez hembêz bikirama û devê min maçî bikiraya. Bizane birayê min, paşayê lawiran şêr û siltanê balindeyan baz, di nava mêrga kulîlkên rengîn de hevdîtin çêkirin. Nûnerên hemû tebayan (piling, kund, gur, baz, qijak, sivorî, torî, kîvroşk, kevok, bilbil, û tebayên kedî) di vê hevdîtinê de kom bûbûn. Her du paşayan pêşberî hemû tuxmê xwe, daxuyaniya xwe ya pîroz a li ser aştî û biratiyê ku li ser rûyê cîhanê aştî û azadî pêk were û di navbera tebayên kedî û kovî de, kîndarî nemîne, hezkirin û dostanî pêş bikeve, weşandin. Bi heman biryarê ez ji bo belavkirina van nûçeyan hatime erkdarkirin.

Lê dîk guhdariya van gotinên xweş nedikir û bi çavên xwe yên girover her tim li dora xwe dinêrî. Rovî dîsa dest bi axaftinê kir: "Birayê min, tu çima bersivekê nadî vê biryara paşayên me, şêr û baz. Tu min neçar nehêlî ku ez giliyê te li ber wan bikim. Yê ku ji aştiya gerdûnê re bibe asteng, tawanbar e."

Dîk, heya wê demê bêdengiya xwe parastibû, serê xwe dirêjî jêr kir û got**:** "Bi rastî birayê min gotinên te li ser ser û çavên min. Rêzdariya min ji bo kesayetiya siltanê min heye. Heger ez bersivê nedim te, ev ji nezanîna min e. Ez bi serê te sond dixwim, ji ber ku ez hinek tiştên dûr dibînim, serê min dizivire."

Rovî got**:** "Yezdan ji te razî be, birayê min. Tu li ser wê derê çi dibînî?"

Dîk zêdetir stûyê xwe dirêj kir û got**:** "Li ezman gelek bazên ku ji bo nêçîra xwe digerin, dibînim." Dîk stûyê xwe bi aliyê deştê ve dirêj kir, li rast û çepê xwe nêrî û got**:** "Belê, li ser rûyê xakê lawirekî çar ling û lingên wî zirav û dirêj û guh şûr dibînim. Ev lawir, bi lezgînî bi aliyê me ve dibeze û nêzîk dibe. Yezdan me biparêze! Ev tajiyek e."

Dema rovî ev gotin bihîst, got**:** "Birayê min ez neçar im, destûra te bixwazim!" Piştî ku wiha got, ji Yezdan parastin xwest û lingên xwe li ber ba berda, revî û dîk jî rizgar bû.

## WATEYA PEYVAN

**Dîk**: Keleşêr.
**Baz**: Firindeyê herî bi hêz û nêçîrvan.
**Tawan**: guneh, sûc.
**Kedî**: lawirên ku têne xwedîkirin.

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Çima dîk bersiva rovî nedida?
**2-** Çima rovî gotinên aştiyê ji dîk re digotin? **3-** Rovî ji ber çi dîk hişt û bazda?

## RÊZIMAN

1- Li peyvên jêr binêre, ên ku bi tîpa dengdêr bi dawî bûne, lêkolîn bike.

**Mînak:**

Rona+î Ronahî
Stû+ê Stuwê min
Rêwî+ên Rêwiyên

Di zimanê kurdî de dema du tîpên dengdêr li pey hev tên, tîpeke kelijandinê dikeve navbera wan. Em ji tîpên; "**h, w, y**" re dibêjîn; **tîpên kelijandinê (tîpên siwar)**

2- **Baneşan (!):** li dawiya hevokên ku hestên tirs, xem, kelecan, kêf û matmayîbûn tê de hebin, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Dîk xwest bizîvire lê çi bibîne**!**
Heta li rûyê min jî nanêre**!**
Yezdan me biparêze**!** ew tajiyek e.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî, bûyereke ku her tim di dilê te de maye binivîse.
2- Karê ku tu di waneya wêne de dikî, ji rêzê ve bi çend hevokan bîne ziman.

## WANE 10

# DI CIVAKA KURDÎ DE REWŞA JINÊ



Di pêşketina mirovatiyê de jinan, pêşengiya civaka xwezayî kiriye û erkên sereke pêk anîne. Di dîroka mirovahiyê de, jiyan bi destê jinan pêş ketiye û hatiye avakirin. Ji bo wê jî, jin û jiyan bûne yek. Jin pîroz tê dîtin. Girêdana jinê û xwezayê jî pir bi hev re heye.

Di heman demê de jina kurd jî, ji Serdema Neolotîkê ve, ji nirxên civaka xwezayî re rêbertiyê dike. Jiyan, li derdora jinê hatiye avakirin. Ji aliyê çandinî û kedîkirina lawiran ve jina kurd, erkekî sereke lîstiye. Pîvanên jiyanê, çand û exlaq jî ji aliyê jinê ve hatine avakirin û parastin. Çand û zimanê kurdî jî ji aliyê jinan ve hatine pêşxistin û parastin.

Tevî ku li Kurdistanê, ji aliyê dagirkeran ve gelek polîtîkayên tunekirin û pişaftinê hatine meşandin jî, lê jinên kurd (bi taybet dayîkan) çand û zimanê kurdî parastine û heta roja me ya îro jî anîne. Ji bo vê, em

deyndarê dayîkên xwe ne. Di serhildanên ku li Kurdistanê hatine destpêkirin de jî jinan erkên sereke lîstine û pêşengtî kirine. Besê, Zarîfe û Leyla Qasim, ji serhildanên ku li Kurdistanê pêş ketine re pêşengtî kirine û risteke girîng lîstine. Bi lehengiyeke mezin, li hemberî dagirkeran li ber xwe dane û şehîd ketine.

Bi taybetî bi derketina Tevgera Azadiya Gelê Kurd re, her çi qas bedelên giranbuha hatibin dayîn jî, lê ji bo jina kurd, bû zayîneke nû. Bi saya Rêber Apo, jin bêtir dikarin li ser lingên xwe bisekinin û bibin xwedî biryar. Li Kurdistanê, di roja me ya îro de, jin bi her awayî rêbertiyê ji jiyan, şer, serhildan û siyasetê re dike. Di têkoşîna azadiya gelê Kurd de jî, gelek lehengên weke: Bêrîtan, Bêrîvan, Zîlan û Arîn bi awayekî lehengî li hemberî dagirkeran li ber xwe dane û şehîd ketine.
Bûne ronahiya jiyanê. Jina kurd, îro ji jinên Rojhilata Navîn û Cîhanê re pêşengtiyê dike.

Ji niha û pê ve jî, pêwîst e her keça kurd dîroka xwe baş binase û li gorî vê zêdetir azad û vîndar tev bigere. Divê bêtir bi çand û dîroka xwe ve girêdana wê hebe û li gorî pîvanên bîrdoziya rizgariya jinê tev bigere.



## WATEYA PEYVAN

**Serdema neolotîkê:** serdema kevirê nû
**Pişaftin:** helandin,
**Nirx:** tiştên girîng û pîroz

# HÎNDARÎ 2

**1- Bersiva rast hilbijêre:**

- **Nivîskarê destana "Mem û Zîn" kî ye?**
  a- Melayê Cizîrî c- Ehmedê Xanî
  b- Baba Tahir d- Feqê Teyran
- **Stranbêjê, strana "Zar Bûma" kî ye?**
  a- Xelîl Xemgîn c- Tehsîn Taha
  b- Mihemed Şêxo d- Aram Dîkran
- **Di civaka kurd de erkên ku jin pê radibû û radibe?**
  a- Parastina ziman c- Rêveberî
  b- Çandinî d- Her sê xalên berê rast in
- **Ji welatên li jêr, kîjan ne cîranê Kurdistanê ye?**
  a-Sûriye c- Iraq
  b- Hindistan d- Tirkiye
- **Birca Belek li kîjan bajarê Kurdistanê ye?**
  a- Ûrmiye c- Cizîra Botan
  b- Silêmanî d- Efrîn

**2- Ji hevokên li jêr, ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**1-** "**Gavan** li ber dewêr e" Di vê hevokê de peyva ku hatiye reşkirin, qertafa sazker girtiye. ( )

**2-** Peyva, "Dar" ji heyînekê zêdetir, heyînan diyar dike. ( )

**3-** "Gol" navekî ne giştî ye. ( )

**4-** Di hevoka, "Çiyayê bilind bi hêrs e" de hevalnav heye. ( )

**5-** Di hevoka, " Min ev dar çand" de cînavk nehatiye bikaranîn. ( )

**3- Valahiyên li jêr li gorî mijara ''welatê me'' dagirin.**

. Rast e, weke ku we jî anî ziman, li .......... welatê me Kurdistan, cihekî ............. digire. Ji ber vê yekê, çavên gelek ............ dagirker li ...................... welatê me ne. Di heman demê de, ev hêz hewl didin da ku pergaleke .............. û demokratîk di nava gel û pêkhateyên ............. me de neyê avakirin.

# BEŞA SÊYEM

1- Kobanê
2- Agirê sînema Amûdê
3- Biwêj
4- Siyabend û Xecê
5- Hêza rojê
6- Kirasê bextewarê
7- Begê axir zeman
8- Kawayê Hemdem
9- Hey pale
10- Kurdistan
11- Newroz

# WANE 1

## MIJARA SERBEST

### KOBANÊ



Kobanê Kobanê
Tu dilê me kurdanê
Kobanê Kobanê
Bi te şabûn cîhanê

Kurdistanê dîlan e
Kurd bo te canfeda
ne
Kobanê bixemlînin
Ser dil Arînê deynin

Kobanê Kobanê
Tu dilê me Kurdanê
Kobanê Kobanê
Bi te şabûn cîhanê

Tu yî keleya mezin
Neyar ji te dilerzin
Wa hawara te hatin
Baz û agir û pêt in

Kobanê Kobanê
Tu dilê me Kurdanê
Kobanê Kobanê
Bi te şabûn cîhanê

**B. Penaber**

**WANE 2**

# AGIRÊ SÎNEMEYA AMÛDÊ



Rojê berê xwe ji binxetê badabû. Di nava ewrên reş û tarî de zebaniyên cehenemê zend û bendên xwe badidan, li Amûda hêlîna dilan... Ma kê dizanî dê wê rojê li Amûda Bavê Mihemed, ne baran, agir dê ji kezeba bi sedan dayîk bibare û bajarê Amûdê, hola sînemayê dê bi dengê girî û hawara sedan zarok bişewite...

Belê li bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê ku weke bajarê rewşenbîran jî tê nasîn, di 13'ê Mijdara 1960’î de qaşo bi hênceta temaşekirina film, zarokên dibistanan biribûn da ku li filmekî temaşe bikin. Ma zarokên bêguneh, dê ji ku bizanin mirin li hola sînemayê li benda hatina wan e. Kezeb bişewite, bi

kelecana temaşekirina film, zarokên Amûdê kom bi kom diherikîn hola sînemayê.

Weke ku serkeftina şoreşa Cezayîrê li benda diravên ku ji zarokên li sînemaya Amûdê werin stendin, mabû. Propagandaya film dikirin. Li cihê ku sed û pêncî (150) kesî radigire, wê rojê bi zikreşî, sêsed û pêncî (350) zarok xistinê. Bi çend car temaşekirina film, di wê hola ku zarok bi ser hev difetisîn de, dubare dikirin. Heya ku agir bi hola sînemayê û wan zarokên ku li ser hev dikelijîn ket.

Piştî ku agir bi hola sînemayê dikeve, êdî can dişewitin; hawar û qêrîna zarokan bi ser bajêr dikeve û dibin qetên êgir, balindeyên ezmanan firiyan buhişta xweda... Di dema agir de ji ber ku derî zû nehat vekirin, zarokên ku di pacê re hewl didan derkevin derve û xwe ji şewata agir rizgar bikin, weke belaya li ser belayê, dikevin bîra avê ya li pişt pacê û tê de dixeniqin...



Aha, di wê demê de, biraziyekî Mihemedê kurê Seîd axa yê ji malbata Deqoriyan jî di nava zarokan de di hola sînemayê de bû. Dema Apê Mihemed dibihîse, kezeb dişewite, ma kî êdî dikare wî bigire, zarokên Amûdê di nava êgir de dişewitîn... Erê biraziyê wî jî di nava êgir de bû û dema Apê xwe dibîne hawar dike, lê ew ne tenê ji bo birazayê xwe, hemû zarokan weke birazayê xwe dibîne û ji bo rizgarkirina wan xwe davêje nava hola êgir. Piştî ku yazdeh zarokan ji şewatê rizgar dike, mala felekê xerab

bibe, ji kesekî re nabe dost... hesinê derî bi ser Apê Mihemed de dişike, ew jî dikeve çala êgir û bi zarokan re heya dawiyê govenda êgir digerîne...

Weke encam bi tevî Apê Mihemed, herî kêm yên ku şewitîn û yên di bîrê de xeniqîn dused û heştê (280) zarokan jiyana xwe ji dest dan.

Ji ber vê yekê, bajarê Amûdê ku bi hêlîna dilan, bajarê rewşenbîran dihat nasîn, êdî navekî nû li wan navan zêde bû, êdî bû **Amûda Bavê MIHEMED.**

## WATEYA PEYVAN

**Zebanî:** Dergevanê cehenemê
**Rewşenbîr:** Ronakbîr
**Propaganda:** Pesindan
**Balinde:** Lawirên difirin
**Hol:** Salon

## EM TÊBIGIHIN

1- Bûyera Sînemeya Amûdê kengî qewimiye?
2- Yê ku zarok ji agirê sînemayê rizgar dikirin kî bû?
3- Çima zarokên ku di pacê re derdiketin, ji mirinê rizgar nedibûn?
4- Cihê çend kesan li sînemayê hebû û çend kes xistibûnê?

## RÊZIMAN

1- Hevalnavên di hevokên jêr de kîjan taybetmendiyên nav dane diyarkirin?
- 8'ê Adarê rojeke pir **girîng e.**
- Amûdê bajarekî **dêrîn** û **pir kevnar e**.
Ji wan peyvên ku navan ji hêla rewş, pesin, jimar û hwd. ve rave dikin re **hevalnav** tê gotin.
**Mînak:** Azadê
**sor**. Gula
**zer**
**Çar** xwendevan
Keça **ciwan**

## HÎNDARÎ

**Benda li jêr bi baldarî bixwîne û baş têbigihe.**

Weke encam bi tevî Apê Mihemed û herî kêm yên şewitîn û yên di bîrê de xeniqîn dused û heştê (280) zarokan jiyana xwe ji dest da.

**Vê bendê di lênûsa xwe de binivîse.**

## WANE 3

## BIWÊJ



Gulan çû dibistanê. Mamoste di waneyê de behsa biwêjan dikir. Piştre mamoste spartekeke wiha da refê:

Bila her yek çend biwêjan, ji derdora xwe berhev bike, binivîse û bîne.

Dema Gulan çû malê, ji diya xwe Xecê û ji bavê xwe Dozvan pirsî, lê tenê du biwêj bi dest xistin. Gulanê telefona hevalên xwe kir, hîn bû ku hemû hevalên wê herî kêm pênc biwêj berhev kirine. Ji ber wê Gulan pir xemgîn bû. Dema rûnişt û dihizirî bala diya wê kêşa, dît ku qîza wê pir xemgîn e, jê re got:

-Keça min, tu çima xemgîn
î? Gulanê got:

-Dayê hemû hevalên min, herî kêm pênc biwêj berhev

kirine, lê min bi tenê du biwêj bi dest
xistine. Diya wê Xecê jê re got:

-Keça min, tu bi ber bayê hevalên xwe nekeve, tiştê ji destê te hat, te kir.

Gulanê bala xwe da diya xwe ku wê du biwêj li pey hev gotin. wê di cih de nivîsîn.

"Bi ber bayê hevalan ketin." "Tiştê ji destê hat, te kir."

Gulanê diya xwe maçî kir û got:

-Dayê spas, te du biwêj li pey hev bi kar anîn.

Xecê jî pir kêfxweş bû, ji ber ku alîkariya keça xwe kiribû. Di wê navberê de xwarina wan jî amade bûbû.

Xecê ji zarokan re got:

- Gulan, Rodî, destên xwe bişon û werin, xwarinê bixwin.

Malbat tev rûnişt ku bi hev re xwarinê bixwe. Dozvan di ber xwe de minemin dikir û digot:

-Destê min nagihîje wê xwarinê.

Birayê Gulanê Rodî li bavê xwe nêrî û
got: -Bavo destê xwarinê dirêj e.

Tev bi Rodî keniyan, Dozvan jî keniya û got: -Mirov dibêje qey mezin bûye û ji nû ve biçûk bûye. Gulanê dîsa bala xwe dayê ku bavê wê û birayê wê du biwêj gotin. Gulanê bi kêfxweşî her du biwêj nivîsîn.

"Destê xwarinê dirêj e." "Mezin bûye û ji nû ve biçûk bûye."

Gulanê wê çaxê fêm kir ku biwêj li ser bûyeran şîroveyên biçûk in. Heta bûyer neqewime, biwêj jî çênabe. Gulanê fêm kir ku divê bêtir guhdariya dê û bavê xwe bike. Êdî şeş biwêjên Gulanê amade bûn, dilê wê ji kêfan difiriya.

## WATEYA PEYVAN

**Biwêj**: Birepeyvên ku ji wateya xwe cuda wateyeke mecazî radigihînin.
**Spartek**: Karê malê

## RÊZIMAN

**1.** Biwêjên li jêr lêkolîn bikin.
-Guhên xwe bel kirin
-Dirav û xwelî li balê yek
e. -Dilê xwe jê re vekirin.
Birepeyvên ku ne di wateya xwe ya resen de, li ser bûyerekê tê gotin û di nava gel de rûniştine jê re **biwêj** tê gotin.

## HÎNDARÎ

- Tu jî çend biwêjan ji dê û bavê xwe hîn bibe û di lênûsa xwe de binivîse.
- Biwêjên ku te li malê kom kirine, bi panoya refê ve bike.

WANE 4

# SIYABEND Û XECÊ



Li ser çiyayê Sîpanê Xelatê xortekî nêçîrvan digeriya. Navê vî xortî Siyabend bû. Ji gundê Silîvê bû, lewma jê re digotin; Siyabendê Silîvî. Siyabend xortekî çeleng û bedew bû. Dilê wî ketibû Xecê. Xecê jî keçeke pir xweşik bû. Wisa xweşik bû ku çavên kê lê biketa, hiş û aqil ji serê wan diçû. Siyabend pir xizan bû. Nikarîbû qelenê Xecê bide û ji xwe re bîne.

Dilê Xecê jî ketibû Siyabend. Bavê Xecê kurdekî dewlemend bû. Wî dizanî ku dilê Xecê û Siyabend li ser hev heye. Wî jî Siyabend dipejirand, lê ji temahiya dinyayê, dixwest ku keça xwe bide yekî wisa ku qelenekî zêde jê bistîne. Mirov, ji mêranî, mêrxasî,

hurmet û bedewiya Siyabend têr nedibû. Siyabend û Xecê her du jî dengbêj bûn. Dema ku wan bi dizî hev û du didît, dilê wan geş dibû, kêfa wan dihat, bi hev re henek dikirin û dikeniyan. Lê dema ku behsa qelen dibû,
Xecê digiriya. Siyabend li ber dilê wê dida û nedihişt ku ew bigirî. Wî digot: "Bi çi awayî dibe, bila bibe; dixwaze bila bi qenciyê bibe, dixwaze bila bi xerabiyê bibe, heta dixwaze bila kuştin jî tê de hebe, ez ê Xecê ji xwe re bînim. Destê min ji Xecê nabe!"

Rojekê qîz, bûk û xortên êla Zîlan kom bûn û çûn bindarûkê. Piştre Siyabend û Xecê jî çûn. Gava ku
Siyabend û Xeca zer tên wê derê, hemû ecêbmayî dimînin, devê wan xwar dibe û li wan dinêrin. Li ser Çiyayê Sîpanê Xelatê ew qas qîz, bûk û xort civîyabûn ku nedihatin hejmartin. Lê gava ku dibû govend û dengbêjî, tu kes nedigihişt Siyabend û Xecê...

Di dawiyê de piştî evîneke dûdirêj, dema bavê Xecê, Xecê nade Siyabend, Siyabendê Silîvî neçar dibe Xecê direvîne û dibe serê çiyayê Sîpanê Xelatê. Li Çiyayê Sîpanê dema Siyabend derdikeve nêçîrê kûviyekê dikuje. Kûvî di zinarê mezin ê navsera Gola Wanê re diçe xwarê. Siyabend hewl dide kûviyê ku ji zinar ketiye bigire û bîne, lê mixabin Siyabend jî bi zinar ve diçe xwarê. Dema Xecê Siyabend wisa dibîne, diçe werîsên heft gundan kom dike, ji bo ku evîndarê xwe rizgar bike. Lê dema vedigere dibîne ku Siyabend ketiye xwarê, ew jî li pey evîndarê xwe, xwe ji zinêr diavêje...
û li nava Gola Wanê mîna bûk û zavayan dibin du tayên spîndaran.

Serê çiyayê Sîpanê Xelatê bimij e
Binê çiyayê Sîpanê Xelatê bimij e.
Kê dîtiye, kê bînaye ku nêçîr, nêçîrvanî dikuje. Gakûviyo, te stireh dirêjo weke bejna mino, Çawa te ji hev kir destê jin û mêro,
Stireh dirêjo weke dara sûkê,
Çawa te xirab kir bextê xort û bûkê.

Siyabend li Xecê vegerand:

Xecê, Xeca min a delal,
Çawa nebû mirazê min û te,
Me yê ji xwe re li serê Sîpanê Xelatê, Çêkira konekî rind û delal.
Xecê meke, melorîne,
Hêstiran di ser rûkê sor de nebarîne...

## WATEYA PEYVAN

**Sîpanê Xelatê:** Çiyayeke li Bakurê Kurdistanê **Kovî:** Lawirên ne kedî
**Spîndar:** Cureyeke darên bilind ên avî ye

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Çima bavê Xecê, Xecê neda Siyabend?
**2-** Siyabend xortekî çawa bû? Binivîse.
**3-** Ramana bingehîn a vê destanê binivîse.

## RÊZIMAN

**Peyvên hemwate**: Ji peyvên ku xwendin û nivîsîna wan cuda, lê wateyên wan yek e re **peyvên hemwate** tê gotin.

**Mînak:**

Mêjû - dîrok
Ber - kevir
Bedew - Spehî

**Peyvên Dijwate:** Ji peyvên ku wateya wan dijberî hev in re **peyvên dijwate** tê gotin

**Mînak:**

Reş - Spî
Kurt - Dirêj
Mezin - biçûk

## WANE 5

### MIJARA SERBEST

# HÊZA ROJÊ



Rojek ji rojên destpêka biharê bû. Mirovekî karker sibehê zû rabû. Xwe amade kir, taştê xwar û cil û bergên xwe li xwe kirin. Kumê xwe da serê xwe û poşiya xwe li derdora wî pêça. Qapûtê xwe yê stûr li xwe kir. Ji malê derket da ku biçe ser karê xwe. Qederekê ji malê dûr ket. Dît ku dinya pir sar e. Bişkokên qapûtê xwe ber bi hev ve anîn û riya xwe domand. Qedereke din, di rê de çû. Her ku dinya sar dibû, wî gavên xwe bi leztir diavêtin ji bo ku bigihêje ser karê xwe. Mirovê karker dema riya xwe didomand, bayî banî rojê kir û got:

-Rojê! Hêza min ji ya te zêdetir

e. Rojê bersiv neda.

Ba:

- Rojê, ma tu min nabihîsî? Ez banî te dikim.

Roj:

- Te xêr e bayo!

Ba:

-Ma min ji te re negot? Ez ji te bi hêztir im.

Roj hinekî bêdeng ma, weke ku bêje, ev ji ku derket. Bayî cardin got:

-Rojê, tu wî mirovê ku di rê de diçe, dibînî? Rojê got:

-Belê, ez dibînim. Mirovekî belengaz û karker e. Ji xwe re di rê de diçe. Diyar e ku diçe ser karê xwe.

Ba:

-Ma min negot, ez ji te bihêztir im? Ka li min binêre, ez ê hêza xwe çawa diyar bikim.

Rojê mebesta bayî fêm nekir.

Bayî dîsa got:

- Ez ê bi hêza xwe wisa bikim, ew mirovê ku di rê de diçe, qapûtê xwe ji xwe bike. Ango ez ê bi hêza xwe qapûtê wî jê bikim.

Rojê dîsa tu wate neda gotin û armanca bayî.

Bayî dest pê kir. Hêdî hêdî xwe bi hêz kir. Her ku bayî xwe bi hêz dikir, mirovê di rê de diçû, qapûtê xwe li xwe dişidand û riya xwe bi gavên giran didomand. Bayî xwe zêdetir kir. Xwe vegerand bahozê.

Mirovê di rê de diçû, bi vê bahozê re jî zêdetir, qapûtê xwe li xwe dişidand. Destê xwe dikir bin çengên xwe û hewl dida riya xwe bidomîne. Vê carê bayî xwe vegerand bablîsokê. Bablîsokê hewl dida qapûtê zilam jê bike û hêzbûna xwe diyar bike. Her ku bayî xwe bi hêz dikir, ji bayî xwe kir bahoz, ji bahozê xwe kir bablîsok, zilamê ku di rê de diçû, zêdetir qapûtê xwe li

xwe dişidand û qapûtê xwe bernedida. Her ku ba lê dida, carinan bi pêş de û bi paş de diçû û dihat. Lê dîsa jî, hewl dida bigihêje ser karê xwe û dev ji qapûtê xwe bernedida. Lê bayî, bela xwe jê venedikir. Mirovê karker ji serma û westanê ji taqetê ketibû. Êdî nedikarî riya xwe bidomîne. Ji sermayê xwîna di rayên laşê wî de tevizîbû, nediçû û nedihat. Rengê wî ji sermayê reş û şîn bibû. Di cihê xwe de bê liv û tevger rawestiyabû. Lê tevî vê jî, bayî bela xwe jê venedikir û dixwest hêza xwe diyar bike. Beramberî vê rewşê, rojê hew xwe girt
û got: -

Bayo!

Bayî bersiv neda. Dubare bi dengekî bilind û hêrsbûyî, banî bayî kir û got:

-Bayo, ma ne bes e! Tu ji wî mirovê karker û belengaz çi dixwazî?

Lê ne xema bayî bû. Ba ketibû derd û xema hêza xwe bide diyarkirin. Ka çi qas bi hêz e. Rojê dîsa dubare, bi dengekî bi hêrs banî bayî kir û got:

-Bayo! dora te xilas, ma êdî ne dora min e?

Ji ber ku bayî tevahî rêbaz bi kar anîbûn, tiştek di destan de nemabû. Ji neçarî dengê xwe nekir û rawestiya. Dor hatibû ku roj êdî hêza xwe diyar bike. Rojê, hêdî hêdî, tîrêjên xwe yên germ berdan ser hawîrdor û mirovê belengaz. Bi germahiya tîrêjên rojê re, gul û giya geş bûn. Mirovê karker jî her ku ji tîrêjên rojê germahî digirt, hêdî hêdî xwîna di rayên laşê wî de qerisî bû, diçû û dihat. Rengê wî yê ku reş û şîn bûbû, vedigeriya weke berê. Her ku tîrêjên rojê germ dibûn, karkerê belangaz bi ser xwe ve dihat. Dest pê dikir ku biçe ser karê xwe. Bi germahiya tîrêjên rojê re, pêwîstiya mirovê belengaz, bi qapûtê stûr nema. Qapûtê

xwe ji xwe kir. Hêlmeke jidil kişand, bi dilekî rihet û baweriyeke xurt riya xwe domand û çû ser karê xwe. Di vê navberê de, rojê banî bayî kir û got:

Bayo! Hêz ne di xurtî û zorê de ye. Ka bêje, ez bi hêztir im, an jî tu?

## WANE 6

# KIRASÊ BEXTEWARIYÊ

Dibêjin, carekê padîşahek hebû ku desthilatdarî li nîvê dinyayê dikir. (Ji Hindê û Çînê heta bi çiyayê Qaf.) Padîşah bi janeke giran dikeve. Di welêt de tu bijîşk neman ku nehatin cem. Lê ji derdê padîşah re tu derman nehat dîtin.

Hat gotin ku li aliyê din ê dinyayê pisporekî mezin heye ku kesek karibe, ew dikare padîşah derman bike. Berdevk çûn û ew hekîm anî. Hekîm li padîşah nêrî û got:

- Padîşahê cîhanê, nexweşiya te, ne tu tişt e. Dermanê wê jî hêsan e. Divê tu kirasê mirovekî bextiyar li xwe bikî ku te ew li xwe kir, tu yê di cih de sax û selamet bibî.

Şahî bi welêt ket. Digotin hekîmê ferzane li ser nexweşiya padîşah ve bûye. Hekîm jî da rê û çû welatê xwe. Êdî diviyabû kirasê mirovekî bextiyar peyda bikin. Ma ji wezîrê padîşah bextiyartir kî heye. Qesta wezîr kirin û kirasê wî jê xwestin.

Wezîr li wan matmayî ma û got:

- Bi min be hûn şaş in. Bextiyarî li ku û ez li ku? Ma hûn nizanin ku şûrek li ser serê min hilawistî ye û ew bi benekî zirav ve girêdayî ye. Ben her gav dikare biqete û şûr li canê min bikeve. Ma ji min bextreştir hene? Ji tirsa ku padîşah min biqewitîne, bi şev jî xew nakeve çavên min. Ev e halê min. An na, bi minetdariyeke mezin ez bi vê xizmeta şahê xwe radibûm.

Jê geriyan û çûn ba qazî mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Qazî jî li wan matmayî ma û got:

- Halê ku ez tê de me, xweda tu kesî neke wî halî. Ji şevê pê de, ez didim aqilê xwe û texmînan dikim; gelo ez dozên xelkê çawa safî bikim. Wijdana min bi vê fikarê, her tim ne aram e. Ma bextewarî û rihetî ev e?

Ji wî jî geriyan û çûn cem bazirganekî mezin û dewlemend. Bazirganê dewlemend ji wan re got:

- Xwezî û sed xwezî ez ew mirov bûma yê ku hûn lê digerin. Belê, gelek malê min heye. Ez her roj dixebitim, xwe dikujim ku wî zêde bikim. Ji aliyê din, her roj ji tirsa xisarê texmînan dikim; bi şev karwanên min ên ku li çolê ne, gemiyên min ên ku di deryayê de ne tên bîra min û xew bi çavên min nakeve. Rewşamin, mal û dewlemendiya min bi vî awayî ye.

Ji wî jî geriyan û çûn cem karmendekî hikumetê. Karmendê reben jî got:

- Sed şikur û spas ji Yezdan û ji padîşahê cîhanê re. Ez bi saya wî digel malbata xwe sitirî me. Min mûçeyekî hindik heye. Zarokên min zehf in. Ez deyndar bûme. Şev û roj xema wan dixwim. Heke ez ji wezîfa xwe hatim rakirin, an ji nişka ve mirim, dê çi ji wan were?

Berdevkên padîşah ji wî jî geriyan û dan aqilê xwe, ma kî heye? Ji gundiyan pê ve kes nemabû. Çûn cem gundiyekî, mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Gundî li wan vegerand û got:

- Ma we kengî gundiyekî bextewar dîtiye ku ez jî bextewar bibim. Ez li kû, bextewarî li kû? Ji xebitîn û westanê, pişta me du ta bûye. Çavên me li ezmanan e, gelo baran tê, an nayê? Sala ku baran hat, te dît kulî tiştek nehişt. Heke saleke xerab hat deyndar li ser

deyndaran tên... Heta deh salan em nikarin jê xelas bibin. Ma ez hêj çi bêjim…

Di dawiyê de vegeriyan qesra padîşah.

Rojekê di dîwanxanê de rûniştîbûn. Ji kolanê dengek bihîstin. Yekî bi şahî û kêfxweşî distira. Daketin kolanê. Mêrik derwêşek bû, rût û tazî bû, ebakî pînekirî lê bû… çûn cem û mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Derwêş kenî û li wan vegerand:

- Belê ez mirovekî bextewar im, ji ber ku min kiras nîne. Heke min kirasek hebûya, ma ez kengî bextewar dibûm?

Celadet Elî Bedirxan
(Ronahî, Hejmar 19, 1 Çiriya Pêşîn 1943)

## WATEYA PEYVAN

**Ferzane:** Zana, alim
**Padîşah:** Qiral, melik
**Hekîm:** Bijîşk
**Hilawestî:** Daliqandî
**Bazirgan:** Tacir

## EM TÊBIGIHIN

1- Çima li yekî bextewar digeriyan?
2- Çima kirasê bextewariyê, li cem kesî peyda nekirin?
3- Ramana bingehîn a vê çîrokê derxe.

## RÊZIMAN

1- Navên ku bi kêrî valahiyên li jêr tên bibîne û di wan valahiyan de binivîse. Van di lênûsa xwe de binivîse

................. tarî, .................sor, ............... yekemîn, .................. sê.......

2- Dijwateya, peyvên li jêr bibîne û bide nasîn.

**Hêsanî - pêşî** – **daketin**

3- **Cînavên kesane dibin du beş:**

**Cînavên kesane yên xwerû:** Ez, tu, ew, em, hûn, ew

**Cînavên kesane yên tewandî**: Min, te,wî/wê, me, we, wan

**Mînak:**

**Min** alîkariya hevalên xwe kir.
**Te** ji min re gotibû.
**Wî** qenciyek bi min kir. **Wê**
spartekên xwe çêkirin. **Me**
bi lehengî li ber xwe da.
**We** bi kêfxweşî mêvanên xwe pêşwazî kirin.
**Wan** xaka xwe rizgar kir.

## HÎNDARÎ

1- Mijara çîrokeke ku te xwendiye, bide diyarkirin.
2- Çîrokeke gelêrî binivîse.

**WANE 7**

## BEGÊ AXIR ZEMAN



Begê axir zeman Ew
zenbîla tu pê hatî
Nema datê ji ezman.
Benê wê riziya
Li nava rê qetiya
Ew ket nava derya sor
Derya sor jê ra bû gor
* * *
Mûsa û mirîdên wî
hemû Bê per û bê gemî
Ji wê deryayê derbas
bûn Ji cewr û cefayê
Li wir xelas bûn.
Firewn li wir fetisî
Mûsa li ser reqisî
* * *
Nemrûdê biçûk
Me bi agir ditirsînin
Pif meşka vala
Ey kevnarê sala
Baweriya dilê me
Taqeta milê me
Ji îmana Birahîm pirtir e
Ne kêmtir e
Viya bizan
Dostê min
Dijminê postê min,

Begê axir zeman Ew
zenbîla tu pê hatî Ne
ma datê ji ezman
* * *
Meznatî
Ne bi pere û mal e
Ne bi gorîna kal e
Meznatî
Bi cewherê însan
e Bi ilim û îrfan e
Belê, em xizanê mal
in Lê zengînê kemal in
Zengînê îdealin
Dostê min Dijminê
postê min Begê
axir zeman
Ew zenbîla tu pê hatî
Ne ma datê ji ezman

**Qedrî Can**

## WATEYA PEYVAN

**Axir zeman:** Ê dawiya demê.
**Mirîd:** Feqe û dildarên şêx û meleyan.
**Gemî:** Keştî
**Cefa:** Êş
**Meşk:** Amûra ku mast tê de tê keyandin.
**Taqet:** Hêz, enerjî
**Gorîn:** Guhertin
**Ilim:** Zanist
**Îrfan:** Zanîn
**Îdeal:** Rastî

## EM TÊBIGIHIN

1- Helbestvan di vê helbestê de behsa çi dike?

2- "Dostê min dijminê postê min" daxwaza helbestvan ji vê gotinê çi ye?

## RÊZIMAN

**1-** Malika yekem lêkolîn bike, pîvan tê de heye, yan na?

**2-** Di malika duyem û sêyem de qafiyê bibîne?

**Qafiye sê cure ne:**

a- **Qafiya lewaz (nîvqafiye)**

b- **Qafiya tam**

c- **Qafiya dewlemend**

**a- Qafiya lewaz**: Ahenga dengan a li dawiya rêzikên helbestan ji yek tîpê pêk tê.

**b- Qafiya tam**: Ahenga dengan a li dawiya rêzikên helbestan ji du tîpan pêk tê.

**c-Qafiya dewlemend**: Ahenga dengan a li dawiya rêzikên helbestan ji sê tîpan pêk tê.

## HÎNDARÎ

Van rêzikên helbestê şîrove bikin.

Ew zenbîla tu pê hatî
Nema datê ji ezman.

# WANE 8

## KAWAYÊ HEMDEM



Têkoşerê efsanewî yê Şoreşa Kurdistanê û bi taybetî çirûska hêviyan a Zindana Amedê ku di nava gorepana qeyd û bendên dijmin de agirê Newrozê de şewitand rêhevalê giranbuha Kawayê Hemdem Mazlûm Doxan. Di sala 1958'an de li navçeya Dep (Qereqoçan) a bi ser Xerpêtê ve ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî, navîn, amedeyî û zanîngehê bi pileyeke serkeftî diqedîne.

Di sala 1970’yî de bi riya çepgirên tirk hizirên şoreşgerî ên sosyalîzmê dinase û bi wan re beşdarî xebata şoreşgerî dibe. Dema ku di sala 1974’an de bi Rêber Apo re dikeve têkiliyan, êdî dibin rêhevalên hev û cihê xwe bi awayekî çalak di nava Tevgera Azadiya Kurd û Kurdistanê de digire. Di dema xebatê de Rêheval Mazlûm Doxan, bi fedekarî, dilnizmî û dilsoziya bi gel û şoreşê re dihat nasîn.

Di sala 1979'an de dema ji Serê Kaniyê diçû bajarê Rihayê, di rê de ji aliyê hêzên dewleta tirk ve tê girtin û wî dibin Zindana Amedê.

Piştî ku di 12'ê Îlona 1980'yî de bi derbeya leşkerî

artêşa tirk dest danî ser desthilatdariyê û hemû rêveberiya welêt xiste bin kontrola xwe, êrîşên mezin û hovane bi armanca çewisandina şoreşgeran dan despêkirin. Di van êrîşên artêşê de binpêkirina mafan, girtin û kuştina mirovan gihişt asta herî mezin. Êdî li bazar, kuçe û kolanên welêt, ne mirov, tank û top dihatin dîtin.

Ji bo bêdengkirina Tevgera Şoreşgerên Kurdistanê artêşê berê tank û topên xwe da gelê kurd û Kurdistanê, bi taybetî Amedê. Ameda ku di dilê kurdan de bûyî paytexta dilan, rejîmê dest pê kir ku şoreşgerên kurd di nava dîwarên Amedê de bifetisîne. Ji ber vê yekê, bi sedan şoreşgerên kurd girtin û xistin çalên tarî ên Zindanên Amedê.

Li hemberî vê zilm û çewisandinê, şoreşgerên kurd jî berxwedaneke bêhempa bi diruşmeya **"An serkeftin An serkeftin"** nîşanî rejîma çewisîner kir.

Kawayê Hemdem "Mazlûm Doxan" yek ji mînaka herî berbiçav a vê berxwedana efsanewî ya şoreşgerên doza azadiya Kurdistanê ye. Di şeva 21'ê Adara 1982'yan de, li tîpa 'E' ya Zindana Amedê, dema ku rejîm li benda xwe radestkirinê bû, Rêheval Mazlûm Doxan bi diruşmeya **"Berxwedan Jiyan e"** Cejna Newrozê bi agirê pîroz kir û dawî li jîyana xwe anî.

Piştî berxwedana Mezlûm Doxan, êdî gelê kurd li çar parçeyên Kurdistanê ket qonaxeke nû ya berxwedanê û ruhekî nû da agirê Newrozê. Ji ber vê yekê, ji Mezlûm Doxan re "Kawayê Hemdem" tê gotin.

## WATEYA PEYVAN

**Şoreşgerên çep:** Kesên wekheviya civakê ji xwe re dikin armanc û dixebitin.
**Gorepan:** Meydan, qad **Bîrdozî:**
Îdeolojî, zanista ramanê
**Sosyalîzm:** Zanista civakî, bîrdoziya rakirina çînan û wekheviya di navbera mirovan de.
**Rêxistinkirin:** Li ser doz û armancekê, yekîtî û hevgirtina bi rêgezan hatiye çêkirin.
**Desthilatî:** Serdestî
**Çewisandin:** Zextlêkirin, tirsandin,
tunekirin **Dojeh:** Cehenem

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Çima em ji Rêheval Mazlûm Doxan re dibêjin "Kawayê Hemdem"?
**2-** Rêheval Mazlûm Doxan di kîjan salê de Newroz bi agirê pîroz kir?
**3-** Çima di 21'ê Adarê de çalakî pêk anî?
**4-** Çalakiya Rêheval Mazlûm, rê li ber çi vekir?

## RÊZIMAN

**Kirde:** Di hevokê de peyva ku bi kar radibe kirde ye.

**Mînak:**
**Zelalê** wane xwend.
**Mamoste** perwerdeyê dide.

**Zarokan** dibistana xwe paqij kir.
**Em** ê welatê xwe biparêzin.

## HÎNDARÎ

**1-** Dirûşmeya "Berxwedan jiyan e." çi dide diyarkirin?
**2-** 12 Îlona sala 1980’yî çi bandor li ser gelê kurd kir? Lêkolîn bike.

**WANE 9**

## MIJARA SERBEST

### HEY PALE

Hey pale pale pale lo, hey pale pale pale
Dasa te keda jînê lo, hey pale pale pale
Rabe gurzan bihûne lo, hey pale pale pale
Hey pale pale pale lo, hey pale pale pale

Paleyê ji deşta Rojava lo, hey pale pale pale
Rahêje das û qaynaxan lo, hey pale pale pale
Roj hatiye ber ava lo, hey pale pale pale Çaxê
kar û bizavan lo, hey pale pale pale

Paleyê ji deşta Mêrdînê lo, hey pale pale pale
Rabe, rahêje dasa xwe lo, hey pale pale pale
Berî germa havînê lo, hey pale pale pale
Karê te li paş nemîne lo, hey pale pale pale

GELÊRÎ



**WANE 10**

## KURDISTAN

Kurdistan, cihê avabûna mirovahiyê yê herî kevnar e. Di dîroka cîhanê de çend cihên mirovahiyê yên herî kevnar hene, Mezopotamya, Filîstîn, Misir û Yunanîstan hinek ji wan ên herî kevnar in. Weke tê zanîn Mezopotamya, ji xaka di navbera Dîcle û Firatê re tê gotin. Kurd ji Mezopotamyayê re dibêjin Mezra Botan. Heya van salên dawî arkolog û dîrokzanan digotin Misir û Filîstîn cihên mirovahiyê yên herî kevnar in. Lê, di van salên dawî de arkeolog li başûrê Kurdistanê nêzîkî Çiyayê Zagrosê rastî şûnwarên gundê Çermo (nêzîkî deh hezar sal 10000) û Şkefta Şanîdar hatin. Li gorî zanîn û agahdariya arkologan, di vê şkeftê de 60 hezar sal beriya niha mirov jiyane.

Dîsa arkologên emerîkî, elman û tirk di sala 1985’an de li Amedê, li derdora Erxeniyê avahiyek ji bin xakê derxist. Ev avahî du ode û eywanek bûn. Ji beriya 9000 sal hatiye avakirin. Vê vedîtinê jî dîroka mirovahiyê ji binî ve guhert.

Li gorî pirtûkên dîrokê û dîrokzanan peyva kurd, berî zayînê 2000 sal hatiye bikaranîn. Lê, ji ber ku dîroka Kurdistanê û gelê kurd her tim ji aliyê biyaniyan ve hatiye nivîsîn, her yekî navê kurdan li gorî zimanê xwe bi kar aniye. Weke: kardoxî, kardaka, kurtî, kurdayê...
Navê kurd ji wateya gelê çiyayan hatiye stendin.

## WATEYA PEYVAN

**Arkolog:** Şûnwarnas.
**Şanîdar:** Şkefteke dîrokî li Başûrê Kurdistanê
**Erxenî:** navê bajarekî li bakurê kurdistanê ye

## EM TÊBIGIHIN

1- Li gorî arkolog û dîrokzanan, avabûna mirovahiyê ji kû derê dest pê kiriye?
2- Ji kû derê re dibêjin Mezopotamya?
3- Wateya navê kurd çi ye?

## RÊZIMAN

**Dema niha:** Dema karek di dema niha de tê kirin, ew hevok dibe dema niha.

**Mînak:**

Ez avjeniyê dikim.
Baran dibare.
Çûk difirin.
Zarok dikenin.

## DAXWAZNAME

Daxwazname, weke ku ji navê wê jî tê fêmkirin, ji wê nivîsa ku ji bo daxwaz, an jî bicihanîna karekî tê nivîsîn û ji cihê peywendîdar re tê şandin, an pêşkêşkirin re **daxwazname** tê gotin.
Pêwîst e, em di van daxwaznameyan de daxwazên xwe kurt û vekirî diyar bikin.

Daxwaznameyekê ji weşanxaneyê re bişîne û ji wir pirtûkekê bixwaze. Ji daxwaznameya li jêr sûdê wergire.

## Mînaka Daxwaznameyê

**21.04.2016**

**JI BO PIRTÛKXANEYA DIBISTANÊ**

**Ji bo xwefêrkirina nivîsîna romanan, ji pirtûkxaneya we daxwaza pirtûka Mihemed Uzun a bi navê "HAWARA DÎCLE" dikim.**

***Silav û rêz***
***Rojîn Serhed / Qamişlo***
***Taxa Xerbî-Komîna Ş.Rîhan-Kolana Azadiyê- Jimara malê 21***

**WANE 11**

## NEWROZ E



Newroz e bihar e cejna gelê min
Gul vebûn lê xemgîn in weke dilê min
Vê dûrê em kuştine ey Serokê min
Pîroz be cejna te pîrê dilê min

Pîroz be pîroz be pîroz be li te
Zarokan gul kom kirin îro ji bo te
Didin kevokan dişînin ji bo te
Bila gul baxçe be tev li dora te

Newroz bê bihar bê reng bide gulan
Tu li dûrî êş dikeve hemû dilan
Dilê xwe em rê dikin şûna silavan
Pîroz be cejna te seydayê dilan

Pîroz be pîroz be pîroz be li te
Zarokan gul kom kirin îro ji bo te
Didin kevokan dişînin ji bo te
Bila gul baxçe be tev li dora te

**Stran: Diyar Dêrsim**

# HÎNDARÎ 3

**1- Bersiva rast hilbijêre:**

- **Di şewata Sînema Amûdê de çend zarokan jiyana xwe ji dest da?**
  a- Sed û pêncî c- Sêsed û pêncî
  b- Dused û pêncî d- Dused û heştê
- **Ji van sergotaran kîjan sergotara helbesta Qedrî Can e?**
  a- Begê Axir Zeman c- Newrozê
  b- Kobanê d- Hey pale
- **Ji Rêheval Mezlûm Doxan re çi tê gotin?**
  a- Şehîdê Despêkê c- Pakrewanê Azadiyê
  b- Kawayê Hemdem d- Şehîdê şoreşê
- **Di destana " Siyabend û Xecê " de navê kîjan çiyayî derbas dibe?**
  a- Sason c- Bagok
  b- Cûdiyê Mirada d- Sîpanê xelatê

**2- Ji hevokên li jêr, ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

1- "Azad diçe dibistanê." Di vê hevokê de, lêker di Dema borî de hatiye kişandin. ( )
2- "Mirovên xebatkar karên xwe bi serkeftî pêk tînin."Kirdeya vê hevokê "Mirovên xebatkar" e. ( )
3- Peyva " Newroz " peyveke hevedudanî ye. ( )

4- " wî, ev çi bûye!" Di vê hevokê de, Peyva “**wî**” di rewşa cînavkê de hatiye bikaranîn.

( )

5- "tiştê ji destê te hat te kir." Ev hevok weke biwêj tê bikaranîn. ( )

**3- Valahiyên li jêr dagirin.**

Ji mijara "Agirê Sînema Amûdê"


"Ji ber vê yekê, navê bajarê ku bi hêlîna ..........., bajarê ..........., bajarê .................... dihat nasîn, êdî navekî nû li wan navan zêde bû û êdî bû **............. ............. ..............**"

# BEŞA ÇAREM

1- Çîroka wefadariyê
2- Geşta Serêkaniyê
3- Şano Hogir û Meryam
4- Ji bo biçûkan
5- Dara çinarê
6- Qero
7- Pirtûk
8- Dayîk
9- Arîn Mîrkan
10- Gotinên pêşiyan
11- Cûdiyê Miradan

**WANE 1**

## ÇÎROKA WEFADARIYÊ



Serê sibehê zû, dema çûna zarokan a dibistanê bû. Narînê di refa sêyem a seretayî de dixwend. Wê rojê dayîka wê nexweş ketibû. Ji ber ku Narînê pir ji dayîka xwe hez dikir, her çi qas dayîka wê dixwest here dibistanê jî, lê Narînê destûra xwe ji dibistanê xwestibû û wê rojê neçûbû dibistanê, qet nebe li ber serê dayîka xwe rûne, lê binêre. Di wê navberê de birayê wê yê biçûk Masîro, erê ji hişê xwe astengdar bû, lê weke parçeyekî şekir şirîn bû, giriya û xwe li erdê da û got:

- Niha ez pênûs û lênûsekê dixwazim, dê...dê.. zû... (bi dengê bilind kir qîreqîr)
- Her çi qas dayîka wî bi van gotinan hewl dide hêmin bike; “Kurê min hîn zû ye. De raweste bila

dikandar dikanên xwe vekin, hîn ji xew ranebûne." Lê nekarî wî qayîl bike.

Ji ber vê yekê, neçar dibe ku du (2) diravan bide Narînê û dibêje:

- Qîza min, bi birayê xwe re here dikanê, jê re pênûs û lênûsekê bikire û zû vegerin malê, hewa pir sar e, bi sermayê nekevin.

Narîn:

- Baş e, dayê can dema ku me stend yekser em ê vegerin malê.

Narîn destê birayê xwe Masîro digire û ji mal derdikevin, ber bi dikanê ve diçin. Dema ku Narîn di rê de diçe, zilamekî dibîne ku ji her du piyên xwe astengdar e. Yek ji diravên xwe didin wî, zilamê astengdar jî pir şa dibe, spasî û ruhê yezdanpakiyê li wan dide. Ji ber ku yek ji diravên xwe didin wî zilamê astengdar, dema diçin dikanê diravên wan tenê têra lênûsê dikin û nikarin pênûsê bistînin. Dema ji dikanê derdikevin û pênûsê nastînin, xwediyê dikanê banî wan dike.

- Dikandar: "Narîn, Narîn... were, were. Madem ji bo Masîro ye, ji te re van her du pênûs û van şekirokan jî ji bo Masîro bibe." Destê xwe bi serê Masîro datîne û axaftina xwe didomîne: "Masîro gula taxa me ye." Dema wisa dibêje, Masîro lê dinêre û dikene. Narîn vê kiryara dikandar mereq dike û jê dipirse: "Xalo ji bo çi tu tiştên xwe hema wilo bê dirav, belaş didî?"

Dikandar hinekî xwe ditewîne û her du destên Narînê digire, li rûyê wê temaşe dike û dibêje:

- Narîn, qîza min, tu tişt bê heq û ked tuneye. Her tişt, ked û zehmetiyekê dixwaze. Tu gulekê jî biçînî, lê av nedî ew gul wê biçilmise. Li çavên min binêre, di şerê Gundê Eloka de guleyek li serê min ket û rayên çavê min ê çepê derb xwarin, ger heval li min xwedî derneketana dê çi bibûya ji min, qîza min? Erê ez niha bûme dikandar, lê ez ji bîr nakim jiyana hevpar; ji bîr nakim zarokên wan hevalên li kêleka min şehîd bûne. Weke çand û exlaq jî divê em hemû li hemberî kesên astengdar birêz bin û wan bi tenê nehêlin.

Dema ku Narîn digihêje malê vê serpêhatiya xwe ji dayîka xwe re vedibêje. Dayîka wê pir dilşa dibe, her du çavên keça xwe maç dike û dibêje:

- Qîza min, xwe ji wefadariyê nede paş û tu caran ji dinyayê bêhêvî nebe. Bila her tim di dilê te de hêvî hebe. Deriyek tê girtin û bi dehan derî vedibin. Te bi çavên serê xwe dît, te çawa diravek da wî camêrê astengdar û destê wî girt, camêrekî din jî destê we girt. Bila weke guharekî di guhê te de be; tu çend destê mirovan bigirî û ji tengasiyê xelas bikî, mirov jî dê ew qas destê te bigirin û te ji tengasiyan xilas bikin. Ji ber vê yekê, pêşiyên me gotine:"Tu çi biçînî, tu yê wê biçinî."

## WATEYA PEYVAN

**Wefadar :** Dilsoz, rastbêj, pêbawer
**Astengdar:** Seqet, kor, ker, dîn…
**Hêmin:** aram
**Dirav:** Pere

## EM TÊBIGIHIN

1- Narînê ji bo çi destûra xwe ji dibistanê xwestibû ?
2- Narîn ji bo çi diravekî xwe dide wî mirovê astengdar ?
3- Ji çi diyar bû ku dikandar mirovekî wefadar e?
4- Dema Narînê ew çîroka dikandar ji diya xwe re vegot, diya wê çi got?
5- Te çi encam ji vê çîrokê derxist?

## RÊZIMAN

**Bireser:** Peyva ku di bin bandora karê ku tê kirin de ye, bireser e.
**Mînak:**

Min **name** nivîsî.
Rojda **gulan** av dide.
Em ê **cilên kurdî** li xwe bikin.
Mihemed Şêxo **stranan** dibêje.

## HÎNDARÎ

1- Tu li gorî serpêhatiyê, rêbaza alîkariya Masîro û Narînê bi kesê astengdar re çawa dinirxînî?
2- Wefadariyê bi giştî di refê de guftûgo bikin.

**WANE 2**

## GEŞTA SERÊ KANIYÊ



Hîn êvar bû, kelecana Serê Kaniyê di dilê me de dikeliya. Me nedizanî wê kengî roj li me hilê û bibe sibeh da ku em herin ger û geşta xwe ya bajarê Serê Kaniyê. Erê, li Serê Kaniyê gelek cih û warên dîrokî hene, lê berxwedana YPG/YPJ'ê ya sala 2012'an li hemberî çeteyan, nav û dengê bajarê Serê Kaniyê mezintir kiriye. Ji wî şerî û şûn ve êdî Serê Kaniyê bûbû evîneke bêdawî û ketibû dilê hemû kurdan...

Serê sibehê zû, bi hejmarek heval em ji bajarê Qamişlo ber bi Serê Kaniyê ve bi rê ketin. Di rê de yekem gundê ku em di nav re derbas bûn, gundê Hîmo bû. Alek mezin a YPG'ê bi tîrekekî bilind ve li destpêka gund daleqandîbû. Piştî ku me gundê Hîmo derbas kir,

êdî em ber bi Amûdê ve diçûn. Ji bo parastina welatiyan, weke hemû bajarên din di ketina bajarê Amûdê de jî benda kontrolê ya YPG'ê hebû. Dema ku me benda kontrolê derbas kir, êdî hema bêje em ketin bajarê
Amûdê. Lê pêşiya ku em bikevin bajêr, li ser du lewheyan nivîs hebû. Li ser tabloya li aliyê rastê, nivîsîbû " Hûn bi xêr hatin bajarê Amûdê" û li ser ya çepê jî nivîsîbû "Amûdê hêlîna dilan". Ev gotina;
"Amûdê hêlîna dilan" pir bi min xweş hat. Min got, ez ê bipirsim, ji bo çi wisa nivîsiye, lê paşê ji bîra min çû û min ne pirsî. Bajarê Amûdê bajarekî weke trênê dirêj e. Mîna ku bajar mal bi mal li ser rê avakirî be. Em li bajêr nesekinîn, lê mirovên cur bi cur di nava bajêr de dimeşiyan. Di wê navberê de hinekan behsa Sînema Amûdê jî kir, lê ji ber kêmbûna demê me nekarî em herin serdana Sînemayê. Di derketina Amûdê de jî wekî qubeyek bilind hebû, alek a Tev-Dem'ê li ser daleqandîbû.

Piştî ku me Amûdê derbas kir, êdî hêdî hêdî em gihiştin bajarê Dirbêsiyê. Di rê de pir girên ji axê çêkirî hebûn. Ji wan giran re digotin "til" wek tileylonê û hwd... Hevalên xwe nizanim, lê bajarê Dirbêsiyê ji ber ku ez berê lê mabûm, hem xem û hem jî kêfxweşiyeke pir mezin da min. Min pir bêriya wê kiribû. Ji ber vê, min weke mirovekî birçî li kolanên bajêr, li malan, li dibistanan, li mirovên wê temaşe dikir...

Dema em gihiştin bajarê Serê Kaniyê, li wir hinek hevalên mamoste em li nava bajar û taybetî li cihên dîrokî gerandin. her çi qas ew mamosteyên li wir pir bi dilgermî jî bi me ve mijûl dibûn, lê ji ber ku hewa ne xweş bû, (carinan baran dibariya, carinan hewayek dijwar dihat û dema me jî kêm bû) me li gorî dilê xwe

bajar û ew cihên dîrokî nedîtin. Lê li wir du cihan pir bala min kişand "Girê Tilhelef" ku di dema xwe de cihekî dîrokî û navendek a şaristaniya Hûriyan bû. A din, dema em çûn ser sînorê Serê Kaniya Bakur, me dît ku li pêşberî ala tirkan, hema bêje 10 metreyan di navberê de ala kurdan, ala kesk, sor û zer ber bi ba dibû. Dema me wisa dît, tiştek din li bîra me nema û em hemû ber bi ala kurdan ve çûn, weke ku em bibêjin em ê têxin nava dilê xwe. Ala kurdan li ser xaniyekî sê qat bi serê tîrekekî ve daleqandîbû. Gule, topên hawanan li her derê xanî ketibûn, lê al dihejiya. Ji ber vê, em tev çûn qata sêyem a xanî û me bi hesreta dilê xwe bi alê re her
çi qas tarî ketibû erdê jî bi dehan wêne kişandin. Me tevan digot " ev xewn bû, lê niha bûye rastî."

Piştî ku em ji Serê Kaniyê vegeriyan, êdî me berê xwe da Girê Mozan, navenda şaristaniya Hûrî û



Mîtaniyan. Weke mirovekî ku te laşê wî kiribe du qet, Girê Mozan, li Mêrdîna Bakur, Mêrdînê jî li Girê

Mozan temaşa dikir; lê destê wan nedigihşt hev. Ew ji hev qut bûn û wan têlên sînor hestiyariyek tije êş bi mirov re çêdikir. Hema hema kela girî dixiste dilê mirov. Weke ku tu li dayîka xwe temaşe bikî û ew li te temaşe bike, sal û zeman biçin nekarin bigihêjin hev. Xerîbiyê li ser xerîbiyê şax hildabû.

Li Girê Mozan pir hevalên hêja hebûn. Bi taybetî, di nava wan de hevalek bi navê “Peyman” hebû. Me ji berê de hev dinasî. Hem ji ber nasîna me û hem jî ji ber malovaniya hevalan a ji bo gel pir germ nêzî me bûn.

Piştî ku em hinekî li cem hevalan rûniştin, ji ber me nedixwest em zêde dema wan bigirin, me yekser ji wan daxwaz kir ku me li Girê Mozan bigerînin. Girê Mozan jî weke Tilhelef pir bala mirov dikişand ser xwe, lê xuya bû ku şûnpê û sazûmaniya dîrokeke bi hezaran sal lê maye. Di dema rejîmê de kesî nedikarî here Girê Mozan an jî Tilhelef. Lê ji ber ku niha herêm azad bûye, her kes bi aramî dikare here bibîne. Lê ma piştî çi?! Rejîmê tev weke cihên din ê Kurdistanê talan kiribû. Tenê cihê vala, ango weke ku sêvekê biqeşêre, tenê qaşilên wê hiştibûn. Yên din tev talan kiribûn...

**WANE 3**

# ŞANO "HOGIR Û MERYEM"

Ji dûr ve li pişt perdeya şanoyê refek kevok li ezmanan difirî. Li aliyê çepê çiyayên bilind, bi mij, serê wan tije berfa spî xuya bûn. Li aliyê rastê ku nêzîktir bûn, hinek baxçeyên gundiyan û serbanê çend malan xuya dikir.

Ji nişka ve bi dengê mûzîkeke nizim re, Hogir û Meryem derdikevin ser dikê û destpêkê dengê Meryemê tê bihîstin.

**Meryem:**

- Bawer bike Hogir, min pir dixwest bi we re werim rojbûna te pîroz bikim.

**Hogir: (gotina Meryemê dibire)**

Êê, ji bo çi tu nehatî? Min jî pir dixwest tu werî. Hevalên me tev hatibûn. Dizanî, te hezkirina xwe daye dilê me hemûyan.

Çi bikim Hogir, bila bimîne ji bo careke din. Merasîma şehîdan hebû. Ez ji ber vê yekê, nehatim. Ji ber ku şehîd di ser her tiştên me re ne.

Ya, bawer bike min bizaniya merasîma şehîdan heye, min rojbûna xwe pîroz nedikir û ez

7. bihatama merasîma şehîdan.

Wa, bi rastî tu yê bihatayî ?

Erê, çawa nedihatim Meryem can. Ma çavên min kor in?! Ger em di kêliya dawî de şehîdên xwe, şehîdên ku ji bo me canê xwe kirine qurban, bi oxir nekin; çi wateya mirovbûna me heye?!

- Her bijî Hogir. Min hevaltiyeke wisa ji te hêvî dikir. Bila parastina nirxên me, di ser her tiştî re be.
- Bêguman, divê wisa be. Divê xwendin û zanista me tev ji bo parastina nirxên me be. Tu dizanî mala me hinekî ji bajar veder e, em agahdariyan ji Tv dibihîsin. Ji ber vê, dema tiştek wisa çêbû ji kerema xwe re min agahdar bike.
- Baş e. Ez ê ji vir û şûn de, ji bo tevlîbûna hemû çalakiyan te agahdar bikim, Hogir, hevalê min ê hêja.
- Wey tu her sax bî Meryem can. Ger tu min agahdar bikî, ez ê ne tenê kêfxweş, spasiya te jî bikim. Niha bi destûra te, divê ez herim, diya min tenê li mal e, divê alîkariya wê bikim.
- Baş e. Silavên min ji dayîka xwe re bêje. Rojekê ez ê werim serdana wê, lê tu dizanî niha ji ber xwendina min heye, nikarim.

Piştî van gotinan, xatir ji hev dixwazin û perdeya dikê tê girtin.

## WATEYA PEYVAN

**Kêlî:** Dema herî kin, **Şano:** Tiyatro

## EM TÊBIGIHIN

1- Ji bo çi Meryem neçûbû şahiya rojbûna Hogirî ?
2- Ji bo merasîma şehîdan Hogir çi ji Meryemê re dibêje?

3- Li gorî naveroka şanoyê, kesên ku beşdarî merasîma şehîdan nebin, kesên çawa ne?

## RÊZIMAN

Ew peyvên ku cihê navan digirin, ji wan re **Cînavk** tê gotin.

Weke ku nav bi qertafên yekjimar û pirjimar tên veqetandin, cînavk jî li gorî yekjimar û pirjimariyê dibin du beş.

| **Cînavkên:** | **yekjimar** | **pirjimar** |
|---|---|---|
| | **Ez - min** | **Em - me** |
| | **Tu - te** | **Hûn - we** |
| | **Ew - wî/wê** | **Ew - wan** |

## HÎNDARÎ

1- Bûyerên filmekî zarokan ku te temaşe kiriye, bi rêzê ve binivîse.

2- Rêveberiya dibistanê, ji refa 5'an re spasnameya li jêr rê kiriye. Ji vê sûd bigire û tu jî spasnameyekê binivîse.

> We di cejna Newrozê de serkeftineke mezin bi dest xist.
> Em spasiya we dikin, berdewamiya serkeftinên we dixwazim.
>
> **Rêveberiya dibistanê**
> **Nav û şanenav**

## WANE 4

## JI BO BIÇÛKAN




Şêr û piling tev de çûn
Rastî serîk penîr bûn

Vî jê xwar û wî jê xwar
Her duwa li hev dane dar

Yekî ji ê din re got
Her du rabûn bûne cot

Go em herin cem rovî
Seydayê wehş û kovî

Ew ê me li hev bîne
Çavê mêrik birjînî

Her du çûne cem rovî
Bûne derwêş û sofî

Doza xwe jê re gotin
Dil û cegerê wî sotin

Rovî go de rabin zû
Ji min re bînin terazû

Wan terazû anî ber
Rovî penîr danî ser

Alîk pir û yek hindik
Yek ma giran yek sivik

Lukmek ji ya giran bir
Ew ji ya dî bû siviktir

Geh ev xwar û geh ew xwar
Heta ku ma ben û dar

**Cegerxwîn**

## WATEYA PEYVAN

**Terazû:** Mêzîn
**Kovî:** Lawirên ne kedî.
**Doz:** Dehwa, Qediye
**Sotin:** Şewitandin

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Te çi sûd ji vê helbestê girt?
**2-** Rovî çawa fena xwe li şêr û piling kir?

## HÎNDARÎ

**1-** Ramana bingehîn ya mijara te xwendî binivîse.
**2-** Vê helbestê bi şêwazê çîrok binivîse.

**WANE 5**

# DARA ÇINARÊ



Ev çi hest e, hûn dizanin? Serê xwe serbest bi şanazî ber bi ezmanan ve bilind kiriye. Çiqên xwe bi hezkirin, her yek ji bo bîranîna dîroka civakekê, bi sedan sal dirêjî xwezayê kiriye. Dema min ev darên çinarê dîtin, mûyên min rabûn. Ez bi xurûş di kûrahiya dîroka xwezayê de çûm. Ez nêzîk bûm, min destê xwe avêt gewdeya yek ji wan a mezin, bi hezkirineke mezin, çavên min li bilindî û stûrbûna wê geriyan. Ez hizirîm û min got**:** "Xwezî zimanê wê hebûya, jîna xwe ya ji beriya sedan sal û pê de ji min re bigota, çend civakên cuda cuda li bin sîbera wê rûniştine, rojên şîn û şahî derbas kirine."



Ev çinarên dîrokî li Kurdistanê pir hene û Geliyê Qiyametê yek ji cihê ku bûne daristanên çinaran. "Geliyê Qiyametê", bi kaniyên xwe yên zelal û şirîn, bi damiyên xwe yên cur bi cur ên rengîn, bi pêlên rûbarên xwe yên spî û zelal û bi tevahiya xwezaya xwe rengê bihuştê dide. Serpêhatî û çîrokên pêşiyan dibêjin, di vî gelî de, ji beriya Konferderasyona Medan, di serdema desthilatdariya asûriyan de, di navbera medan û asûriyan de şerekî mezin çêbûye. Ev gelî hemû bi xwînê hatiye avdan, bê hejmar kuştî çêbûne. Bi vê boneyê, navê wî bûye Geliyê Qiyametê.

Çinarên di vî gelî de, bi sedên salan heya niha dijîn. Malovanî, ji gelek çandên cuda re kiriye. Lewra gelek naviskên zerdeştiyan ên beriya zayînê li gelî xuya dikin. Bermahiyên asûrî, ereb û kurdan tê de diyar dibin. Çinara herî bilind 15 metre ye. Yek ji van çinaran kun bûbû. Di nava qurmê wê de dikarîbûn 10 kes bi hêsanî

rûnin.Ev parçeyê xwezaya dîrokî ya jê re dibêjin"Geliyê Qiyametê", dikeve Başûrê Kurdistanê, devera Etrûş a girêdayî Dihokê.

## WATEYA PEYVAN

**Geliyê Qiyametê:** Geliyekî li Başûrê Kurdistanê ye.
**Şanazî:** Serbilindî
**Navisk:** Cihê miriyên zerdeştiyan ên nûnerên olî. **Damî:** Darên xwezayî şîn bûne.
**Sîber:** Sih, sî

## EM TÊBIGIHIN

**1-** Nivîskar li ber dara çinarê çima bi xurûş radiweste?
**2-** Ev dar li derên cuda dijî, yan na?
**3-** Ev dar li kû derê dijî?
**4-** Geliyê Qiyametê navê xwe ji çi stendiye?
**5-** Dara çinarê, dareke çawa ye?

## RÊZIMAN

**1-** Hevoka| "Ev çinarên dîrokî li Geliyê Qiyametê ne" lêkolîn bike, ka wateyeke temam dide, yan na?

**Hevok:** Ji wan birepeyvên ku bûyer, hest, daxwaz, raman û rewşekê didin ravekirin re **hevok** tê gotin.
**Mînak:**
"Mirovê baş li ser navê xwe tê."
"Gotina xweş, bihara dilan e."
"Karê îro nehêle sibe."

**2-** Cihên vala yên hevokên li jêr li gorî wateya wan dagire.

a- Pirtûka min...........

b- Mamoste............dide.

b- .......çinarê 15..........

## HÎNDARÎ

1- Ger dara çinarê biaxive, tu dixwazî çi jê bipirsî?

2- Li jêr sûdên daristanan hatine diyarkirin. Van lêkolîn bike:

-Li ser nîrê hewayê bibandor in.

-Hevsengiya xwezayî çêdikin. -

Nahêlin hezînên axê çêbibin. -

Baranan bi rêk û pêk dikin.

-Bi belavkirina oksîjenê, hewaya paqij didin.

-Bi dîmenên xwe, xweşikbûna xwezayê zêde dikin.

-Cih û warê gelek lawiran in.

-Gelek amûr jê tên çêkirin.

- Parastina daristanên me, karê me yê sereke ye.

WANE 6

# QERO



Zarokan, dema ew di baxçeyê dibistanê de dît, tirsiyan.

Bi laşê xwe yê girs, ji hemû kûçikan cudatir bû. Guhên wî birîbûn. Bi rengê xwe yê reş, dîtineke balkêş dida.

Zarok hêdî hêdî nêzîkî wî bûn. Ji selika xwe hinek parçeyên nan, kade û kutilk jê re avêtin. Kutilk û nanên dihatin avêtin, li hewa digirt û dixwarin. Sarbûna di navbera kûçik û zarokan de, bi vî awayî nema û tirs rabû. Di demeke kurt de, di nava wan de hevaltî û dostanî çêbû. Êdî kûçik di demjimêrên destpêkê yên rojê de, dihat dibistanê. Piştî zarok diçûn malên xwe, hêdî hêdî ji dibistanê diçû.

Rojekê li dibistanê agahî belav bû ku kûçikên beredayî tên komkirin û kuştin. Di pêşiyê de kes nehizirî ku Qero beredayî ye.

Dema dengê kesên ku kûçikan kom dikin, li derdora dibistanê belav bû, ji nû ve Qero hat bîra zarokan.

Hevalê herî nêzîkî Qero, Welat ji Qero re got**:**

- Were, hin kes hene kûçikan kom dikin. Em ê te di gova vala de veşêrin.
- Piştî zarokan Qero kir gova vala, derî girt. Êdî dilê hemûyan aram bû. Vê rewşê, hinekî dom kir. Yên Qero li wê derê veşartîn, her bêhnekê deriyê wî vedikirin, xwarin û vexwarina wî didanê.
- Rojekê di bêdengiya ezmûnê de, car din deng hat bihîstin. Zarokan serê xwe ji ser kaxezan rakirin û li hev nêrîn. nêrînên wan herî zêde li ser Welat kûr bûn.
- Qero di govê de bû. Lewra ku Welat ji beriya ezmûnê karê xwarindayîna Qero pêk anîbû. Hevalê wî di refeke din de bû, di dema ezmûnê de bi qasî hevalê wî bibihîze got**:** Gotina wî bi lez "di govê de ye"."Di govê de ye…" Belavî refê bû.
- Her çendî wiha hatibû gotin jî, zarokên ji ezmûnê derdiketin li Qero digeriyan. Derê govê vekirî bû. Qero tunebû.
- Ji wê rojê û şûn ve, tu kesî Qero nedît. Lê, kesî Qero ji bîr nekir. Man li bendê ku wê rojekê li wan vegere.

## WATEYA PEYVAN

**Ezmûn:** Îmtîhan
**Kade:** Nanê patîle, nanê gelek curên xwarinê dikevin nav
**Gov:** Cihê pez

## Em Têbigihin

**1**-Di serpêhatiyê de, Qero kûçikekî çawa ye?
**2**-Zarokan, ji bo hevaltiya Qero çi kir?
**3**-Zarokan, çima pêwîstî bi parastina Qero dît?
**4**-Di beşa encamê ya serpêhatiyê de çi tê têgihandin?
**5**-Ramana bingehîn ya vê serpêhatiyê derxe.

## Rêziman

Hevok li gorî sazûmaniya xwe dibin du beş:
**a-Hevoka lêkerî**
**b-Hevoka navdêrî**

**a-Hevokên lêkerî:** Ew hevokên ku karekî didin diyarkirin.

**Mînak:**
Cotkarî dar çandin.

**b-Hevokên Navdêrî:** Ew hevokên ku rewşekê didin diyarkirin.

**Mînak:**
Dara dibistana me ciwan e.

## HÎNDARÎ

1- Te di serpêhatiyê de jî dît ku kûçikên serberedayî ji aliyê şaredariyê ve tên komkirin. Tu vê yekê rast dibînî?
2- Pêwîst e, tu ji bo lawirên serberedayî çi bikî? Ji şaredariyê re daxwaznameyekê ku tu tê de, li ser vê mijarê ramanên xwe diyar dikî, binivîse.

Dema tu daxwaznameya xwe dinivîsî, mercên li jêr pêk bîne:
-Li jor, goşeya rastê dîrokê binivîse.

-Li nîva jorê kaxeza xwe, navê cihê ku tu jê re dişînî, binivîse.
-Tiştên ku tu dixwazî diyar bikî kurt û vekirî binivîse.
-Li dawiya daxwaznameya xwe cih bide gotinên rêzdariyê.
-Li goşeya rast a jêr, nav û paşnavê xwe binivîse. Şanenava xwe lê zêde bike.
-Li valahiya çepê ya jêr navnîşana xwe binivîse. -Tiştên te nivîsîne, cardin bixwîne û bi rêk û pêk bike.
-Daxwaznameya xwe bi pênûsa hibir û li ser kaxezeke bêxêzik binivîse.
-Dema tu daxwaznameya xwe dinivîsî, ji mînaka jêr sûdê bigire.

**JI BO ŞAREDARIYA QAMIŞLO,**

Em li taxa Seyîd Riza niştecih in. Riyên me yên vê taxê, nehatine qîrkirin. Lewra, toza trimpêlan radibe û bandorê li ser tenduristiya me tevan dike.

Ji ber vê yekê, em bi hêvî ne ku hûn riyên me qîr bikin.


Silav û Rêz

Hevserokatiya Komîna Ş. Goran

**Navnîşan:**
**Taxa Seyîd Riza**
**Hejmar 169**
**QAMIŞLO**
**11.05.2016**

**WANE 7**

# PIRTÛK



Di cîhana pirtûkan de gelek pirtûkên cur bi cur hene. Mirov bi pirtûkan fêrî agahiyên pir girîng dibe; pirtûk hizir û ramanên mirovên kevn û nû tînin ber destê mirovan. Mirov di riya pirtûkan re zanînên xwe fireh dike. Hizir û bîrên mirovan bi xwendina pirtûkan dewlemend dibin. Ji ber ku pirtûk ji bo mirovan ronahiya herî baş a pêşeroj û paşerojê ye.

Dema ku mirov diçe pirtûkxaneyekê, dikare bi sedan pirtûkên li ser wêje, zanist, felsefe û hwd. bibîne. Lê pêwîst e, mirov di hilbijartina pirtûkan de li hin xalan baldar be: Ji bo mirovan, naveroka pirtûkê pir girîng e. Ji ber vê, dema ku mirov pirtûkekê hildibijêre, divê naveroka wê dagirtî be. A din jî, ji temenê xwe û têgihiştina pirtûkê agahdar be. Wekî din, pirtûka ku em dixwînin ji bo pêşerojeke serkeftî, divê li ser hizir, raman û felsefeyeke rast hatibe nivîsîn, da ku sûd jê

were girtin. Ji bo vê jî, di dema hilbijartina pirtûkan de, ji bo bidestxistina pirtûkeke bisûd, mirov dikare alîkariyê ji mirovên zana, yan jî mirovên xwende bigire.

Pirtûk, weke hevaleke herî baş a mirov e. Ger mirov bi kesek baş re hevaltiyê bike, dê mirov bibe xwedî taybetmendî û exlaqekî herî baş. Lê ger kesê ku me hevaltî pê re kiriye, xerab be wê xerabiya wan bigihe me û em ê jî bi wan re xerab bibin. Ji ber vê yekê, divê mirov zanibe ku pirtûk di aliyê xwendin û hilbijartinê de, weke hevaltiyeke baş û xerab, bandorên erênî û neyînî li ser mirovan dikin.

**WANE 8**

# DAYÎK



Heft salan û neh mehan
Bê axîn û rawestan
Ez parastim ji belan
Ez xwedî kirim dayê

Dema min kir nalenal
Tu dayîka pir delal
Dida min şîrê zelal
Çawa maf bidim, dayê



Rêveçûn nîşa min kir
Axaftin bi min fêr kir
Di ber min de xwe kal
kir Bo te çi bikim? Dayê

Bo fêrbûna jiyanê
Bi maç û hezkirinê
Şad bûm li dibistanê
Roniya min î dayê

Navê te pir şirîn e
Gotineke bievîn e
Ji min re vîn û jîn e
Tu hezkirî ye dayê

Penaber

## EM TÊBIGIHIN

1- Di salên zarokatiya nivîskar de, dayîka wî jê re çi kiriye?
2- Nivîskar, bi gotina; "Çawa maf bidim, dayê."dixwaze çi ragihîne?
3- Nivîskar li dawiya hemû malikan, çawa nêzîkî dayîka xwe dibe.

## RÊZIMAN

1- Malikên helbestê ji çar rêzikan pêk tên. Sê rêzikên pêşiyê ahengên wan yek in, rêzika dawî bi ahengeke cuda hatiye nivîsîn. Lê ahenga rêzika dawî di heman malikan de wekhev e. Ji vê destûrê re **qulf** tê gotin.
2- Qulfa di malika jêr de bibîne û binê wê xêz bike.


"Mamosteyê herî mezin
Raman li min kir serûbin
Ramanê nû afirandin
Ji kû ve tê ev bawerî?"

## HÎNDARÎ

1- Çima pêwîst e em mafê dayîka xwe bidin? Di refê de guftûgo bikin.
2- Li ser hezkirina dayîkê, helbestekê bihûne.

**WANE 9**

# ARÎN MÎRKAN




Berfa zozanan a li ser Kaşê Miştenûr, keça agir û rojê, qîrîna Rindîxana welatê Serhedê, destana çiyayên bilind... Belê, Rêheval Arîn MÎRKAN a ku pora xwe bi kenê zarokên Kobanê hena dayî û mîna bi sedan hevalên xwe bedena xwe kirî mertal, ji bo parastina Kobanê, di sala 1992'yan de li gundê Mîrkan ê girêdayî bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Keça malbateke welatparêz e. Têkoşera bêhempa Arîn Mîrkan a ku bûye navnîşana berxwedana Kobanê, hîn di temenê xwe yê biçûk de tevlî Tevgera Azadiyê dibe.

Arîn Mîrkan a ku di nava hevalên xwe de bi rûkenî, dilnizmî û fedekarî dihat nasîn, bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, tevî sê birayên xwe beşdarî nava refên berxwedanê dibin. Weke piraniya hevalên xwe yên berxwedêr Arîn Mîrkan tim dixwest li hemberî dijminan di qada cengê de şer bike. Piştî ku terorîstên DAIŞ'ê êrîşî Kobanê dikin derbasî Kobanê dibe.

Ji roja 15'ê Îlonê û pê ve terorîstên DAIŞ'ê ku xwediyê hemû hêz û teknîkê bûn, bi hovîtiyeke bêexlaqî êrîşî gund û bajarê Kobanê kirin. Her derê ku destê wan

digihîştê, bi erdê re dikirin yek û wêran dikirin. Li hemû aliyên Kobanê bi tank û topan agir bi ser gund û bajar de gur dikirin. Tevî berxwedana destanwarî ya keç û xortên kurdan jî, her ku diçû dor li Kobanê dihat girtin û êrîş li ser êrîşan bi teknîka herî pêşketî gur dikirin.

Terora hêzên DAIŞ'ê ku pala xwe dida hêzên stemkar, bi demê re weke lehiya agir diherike li ser Kobanê. Li hemberî wan jî, bi çekên ji rêzê yên sivik lê bi baweriyeke polayî, li dijî xwe radestkirinê, heta dilopek xwîn di canê wan de dima, li ber xwe didan û canê xwe ji zarokên Kobanê re dikirin mertal; xweragiriya YPG/YPJ, ango keç û xortên ji her çar parçeyên Kurdistanê bûn.

Di vê berxwedana bêhempa de Arîn Mîrkan a ku bûye sembol û efsaneya berxwedana Kobanê, di şeva 5'ê Cotmeha 2015'an de bi yekîneyeke hevalên xwe re li girê Miştenûr fermandar e û bi her awayî li ber xwe didin. Lê çeteyên DAIŞ'ê jî, weke zebaniyên cehenemê bi ser bendên berxwedanê ve dihatin. Piştî ku bendên berxwedanê dikevin qonaxa man û nemanê û tankên çeteyan dikevin nav çeperên hevalan, êdî fermandara mezin Arîn Mîrkan fermana paşvekişînê dide hevalên xwe. Piştî ku hevalên wê, xwe bi paş ve dikişînin; Arîn Mîrkan piştî ku guleyên wê xilas dibin, êdî weke parêzvana rûmeta mirovahiyê, bi bedena xwe ya ku tije bombe kiriye, xwe bi terorîstên DAIŞ'ê û tankên wan de diteqîne. Bi vê çalakiya Rêheval Arîn MÎRKAN, terorîstên DAIŞ'ê derbeyeke mezin dixwin. Piştî vê çalakiya fedayî ya rêheval Arîn MÎRKAN, êdî berxwedana Kobanê ket qonaxeke nû û bi sedan Arînên din bedena xwe bi dijmin de teqandin. Her ev fedekarî û giyanbaziyên bi sedan Arîn Mîrkanan bûn sedem ku

keleha berxwedanê ya Kobanê hilneweşe û stêrka sor, ala berxwedanê li asîmanên Kobanê her û her biheje...

## WATEYA PEYVAN

**Xweradestkirin:**Teslîmkarî, xwespartin
**Xweragirî:** Berxwedan
**Zebaniyê cehenemê:** Dergevanê dojehê
**Qonax:** Pêvajo, dem
**Giyanbazî:** Fedekarî
**Mertal:** Amûra parastinê ya di şer de
**Dilnizm:** Nepozbilind, rêzdar
**Wêran:** Talan
**Girê Miştenûr:** Girekî statejîk ê li Kobanê
**Fermandar:** serbaz

## EM TÊBIGIHIN

1- Rêheval Arîn Mîrkan kengî û li ku ji dayîk bûye?
2- Gelê Kurd bi çalakiya Rêheval Arîn Mîrkan re gihişt kîjan qonaxê?
3- Girîngiya serkeftina Kobanê, ji bo gelê Kurdistanê çi ye? Binivîse.

## RÊZIMAN

1- Çima tîpa “**î**” li pêşiya tîpa “**y**” cihê xwe bi tîpa “**i**” diguhere?
-Ji ber ku tîpa “**y**” bi xwe nîv-dengdêr e.
2- Cudahiya her du hevokên li jêr bibîne.
a- Ez pirtûkê dixwînim.
b- Ez pirtûkê naxwînim.

## HÎNDARÎ

1- Bi alîkariya nivîsê, şêweyê berxwedana Hevala Arîn veke.
2- Tu jî bîranînekê li ser şehîdan binivîse.

## WANE 10

# GOTINÊN PÊŞIYAN

Gotinên pêşiyan ji ber girîngiya xwe ya ji bo mirovan, bi sedsalan winda nebûne û nehatine ji bîr kirin. Ji ber vê yekê, mirov dikare bêje, ku bûne hizirîna baş û ronahiya riya şopandina jiyana baş a mirovahiyê. Her wiha, ji bo nifşê nû jî bûne weke parçeyê zêran ku sûdekî jiyanî ji bo pêşeroja xwe jê bigire…

Weke nimûne:

- Kurmê darê ne ji darê be, xera nabe.

- Teyr ji refê xwe naqete.

- Tu çi biçînî, tu yê hilînî.

- Her tiştê dibiriqîne, ne zêr e.

- Çiya tuneye ku ba lê nedaye.

- Weke tê zanîn ev gotinên pêşiyan di aliyê lihevanîn û watedayînê de xwedî wateyeke kûr in. Ji ber vê yekê, ji bo fêmkirina wan, hizirîn û têgihiştineke mezin pêwîst e.
- Weke mînak :
- "Çiya tune ye ku bayê lê nedaye" Ger em ne li gorî wateya wê ya kûr bihizirin, tu wateyeke mezin ku

bandorekê li ser mirov bike, jê re nayê dîtin. Lê ger em li wateya wê ya veşartî bikolin, em ê bibînin ku wateyeke pir mezin di vê hevokê de veşartî ye. Ji ber vê, divê em xwe bigihînin wateya wê ya ku dixwaze ragihîne.

- "Çiya tune ye ku bayê lê nedaye": Ev hevok ku pendeke pêşiyên me ye, ne qala çiya û bayê dike; di wateya xwe ya rastî de qala mirovan dike ku dixwaze ragihîne tu mirov tuneye ku belayek, êşek bi ser de nehatiye, lê ya baş ew e ku mirov bi hêvî be û karibe xwe li ser piyan bigire.
- Ji ber vê yekê, divê em zanibin ku gotinên pêşiyan ne tenê gotinên li hev hatine, mirovan fêrî hizirîna kûr û watedayîneke mezintir a jiyanê dikin.

## WATEYA PEYVAN

**Çilo :** Pelên daran
**Hizirîn:** Fikirîn

## EM TÊBIGIHIN

1- "Destê tenê, deng jê nayê" Vê penda pêşiyan şîrove bike.

2- Gotinên pêşiyan, me fêrî çi dikin?

## RÊZIMAN

**Gihanek:** Ji bêjeyên ku peyv û hevokan bi hev ve girê didin re gihanek tê gotin.
Hin gihanek: "û, ku, lê, lewre, ji ber ku, her wiha ... "
**Mînak:**

"Bi nanekî merd nabe **û** bi darekî mêrxas nabe."

"Dil ne sifre ye **ku** mirov li ber her kesî veke."

Min diyariyek ji te re anî, **lê** tu ne li malê bûyî.

Berf pir barîbû, **lewre** rê hemû hatibûn girtin.

**Ji ber ku** karkirin tiştekî pîroz e, pêwîst e hemû mirov karê xwe bikin.

Di biharê de giya şîn dibe, **her wiha** gul dibişkivin

## HÎNDARÎ

- Her yek ji we, deh gotinên pêşiyan binivîsin.

# WANE 11

## MIJARA SERBEST

### Cûdiyê Miradan



Cûdiyê Miradan, weke ji wateya peyvê jî tê zanîn, di efsane û mîtolojiya kurdan û hemû bîr û baweriyên Kurdistaniyan de cihekî pîroz ê miradhasilbûnê ye.

Li welatê me, Cûdiyê Miradan çiyayekî pir girîng e. Biharan weke bûka xemilandî, bi hemû cureyrên giyayên delal weke: rêvaz, kereng, belbenî û hwd. tê xemilandin. Havînan jî navsera Cûdî bi sarinc û rûtahiya Sefînê rengê zozanekî herî xweş dide.

Pesarên çiyê û daristanên wî her dem cihê lawirên kovî û bedew ên weke: Hirç, gur û bi taybetî pezkoviyên Cûdî bi nav û deng in.

Çawa bihar û havîna Cûdiyê miradan cihê geşt û gera keç û xortan in, di heman demê de zivistanan dibû cihê ref û nêçîrê. Bi taybetî, deverên Cûdî yên weke: Girê Hirmo, Derinca Sitiyê, Bergê Movik.

Li ser çiyayê Cûdî gelek efsane, çîrok û serpêhatî hatine gotin. Mînak: Strana Efino, Nêriyê Mehmed Begê, Mîrê Botan, efsaneya Lawikê Xerîb, Çilmêran, Deriyê Cebraîl…

Niha jî çiyayê Cûdî ji ber ku sê parçeyên Kurdistanê yên dagirkirî bi hev ve girê dide, cihekî herî girîng e.

# HÎNDARÎ 4

**1- Bersiva rast hilbijêre:**

- **Di şanoya "Hogir û Meryem" de çima Meryem neçûbû rojbûna Hogir?**

  a- Ji ber ku nexweş bû.
  b- Ji bîr kiribû.
  c- Çûbû merasîma şehîdan.
  d- Xwendina wê hebû.

- **Yek ji cihên ku darên çinarê pir lê hene?**

  a- Efrîn c- Amed
  b- Qereçox d- Geliyê Qiyametê

– **Di kîjan hevokên jêr de kêmasiya nivîsînê heye?**

  a- Ez di refê de bûm.
  b- Ez li dibistanê bûm.
  c- Min nivîsîn dikola.
  d- Ezmûna min xweş derbas bû.

– **lêkera "çûn"ê di kîjan vebijêrkên li jêr de, di dema niha de hatiye kişandin?**

  c- Çû c- Diçe
  d- Dê biçe d- Çûbû

**2- Ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

- Cînavk ew peyvên ku cihê navan digirin.

**( )**

- Hevokên navdêrî hevokên ku karekî diyar dikin. ( )
- Li ser Çiyayê Cûdî tu efsane nehatine gotin. ( )
- Pirtûk, hizir û ramanên mirovên kevin û nû radigihînin. ( )

**3- Valahiyên li jêr dagire.**

- Ji mijara wefadariyê**:**

Bila weke guharekî di ........ te de be; tu çend destê ................. bigirî û ji ................ xelas bikî, mirov jî dê ew qas ........... te bigirin û te ji tengasiyan xilas bikin. Ji ber vê yekê, ............. me gotine:"Tu çi ................, tu yê wê biçinî."

**4- peyvên di stûna (A) de bigihîne wateya wan a di stûna (B) de.**

**A**

Qonax
Şanazî
Sîber
Wefedar

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | Welatê min | Ehmedê xanî û zimanê kurdî |
| **Cotmeh** | Civîna kulîlkan | Hezkirina pirtûkan | Serxwebûna mirîşkan | Lehengê sêpiyê |
| **Mijdar** | Welato<br>- Erka xweparastinê | Şox û şengê zuhre<br>- Agirê serhildanê | Roja zarokên cîhanê | Ji dîwana xanî |
| **Berfanbar** | Birca Belek | Tenê dilopek ji kobanê | Xerîbî<br>- Mirov û durist | Name |
| **Rêbendan** | Welatê me | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| **Reşemeh** | Zar bûma | Banga aştiya gerdûnî | Di civaka kurdî de rewşa jinê | Kobanê<br>- Agirê sînema Amûdê |
| **Avdar** | Biwêj<br>- Siyamend û Xecê | - Hêza rojê<br>- Kirasê bextewariyê | - Begê axir zeman<br>- Kawayê hemdem | - Hey pale<br>- Kurdistan |
| **Cotan** | - Newroz<br>- Daxwazname<br>- Newroz e | - Çîroka wefadariyê<br>- Geşta serê kaniyê<br>- Şano Hogir û Meryam | - Ji bo biçûkan<br>- Dara çinarê | - Qero<br>- Pirtûk<br>- Dayîk |
| **Gulan** | - Arîn mîrkan<br>- Gotinên pêşiyan<br>- Cûdiyê Miradan | NIRXANDIN | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# SERETAYÎ
# 6

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

**NAVEROK**


## BEŞA 1 ........................................7

GIRÎNGIYA PERWERDEYÊ........................................8
KOÇERÎ ÇANDA KURDAN E........................................12
MIJARA SERBEST........................................17
QULING Û ROVÎ........................................18
WERZA BIHARÊ........................................22
JÎNAMEYA FEQÊ TEYRAN........................................25
DI CIVAKÊ DE MAFÊ ZAROKAN........................................27
DAYÎK........................................29
BEHLÛL Û DARBIRÎN........................................33
BERXWEDANA SEDSALÊ........................................36
NAME........................................40
BIHAR........................................44

## BEŞA 2 ........................................49

DENGÊ XERÎBIYÊ........................................50
DERWÊŞ Û EDÛLÊ........................................53
BERXWEDANA LEHENGAN........................................58
BELAYÊN HEZKIRINÊ ZOR IN........................................60
PÊKENOK........................................63
HÊVÎDARÎ........................................67

## BEŞA 3 ........................................71

KEWA GOZEL........................................72
ÇERXA FELEK........................................75
ÇANDA BERBIRÎ........................................81
SINC........................................83
REXNE Û REXNEDAYÎN........................................85
BEYTA CINDÎ........................................89
NIVÎSÎN........................................92

GULBIHAR ....................................................................95
BERPIRSIYARÎ ...........................................................96
RÊWÎTIYA XEYALÊN ZAROKATIYÊ ...................99

**BEŞA 4 ..............................................103**

NEWROZ........................................................................104
JIN Û JIYAN ...............................................................107
SALVEGERA ROJNAMEYA KURDÎ ....................111
WELATÊ ME ..............................................................114
DARA AZADIYÊ.......................................................117
RÛMETDAYÎN Û PARASTINA NIRXAN............120
KULÎLKÊN BIHARÊ................................................123
CEJNA KARKERAN ................................................126
EY REQÎB ....................................................................130

# BEŞA 1

1- Girîngiya perwerdê
2- Koçerî çanda Kurdan e
3- Ez şehîd im
4- Quling û rovî
5- Werza biharê
6- Jînameya Feqiyê Teyran
7- Di civakê de mafê zarokan
8- Dayîk
9- Behlûl û darbirîn
10- Berxwedana serdalê
11- Name
12- Bihar

**WANE 1**

# GIRÎNGIYA PERWERDEYÊ



Fêrbûn û hînkirin ji bo hemû giyaneweran pêwîst û girîng e. Bi taybetî, ji bo nifşê mirov û civaka mirovahiyê. Mîna xwarin û vexwarinê pêwîstiyeke ku dest jê nayê berdan e. Bi perwerde û fêrbûna xwezayî nifşên mirovan, demên derbasbûyî fêrî têgihiştina bi peyvîn û axaftinê bûne. Her wiha, beriya her tiştî heyînan bi nav dikin. Ev jî bûye destpêka perwerdeyê.

Piştî peydakirina nivîs û xwendinê, girîngiya perwerdeyê bêhtir xwe dide pêş. Ji mîtolojiyê heta zanistê, tevahî rahîb, pêxember, zanyar û pirtûkên pîroz girîngiyeke mezin dane perwerdeyê. Têgeha vê girîngiya perwerdeyê bi nivîsên: pexşan, hûnandî, gotinên pêşiyan hatiye ziman.

Weke mînak: Çînî li ser girîngiya perwerdeyê wiha dibêjin: "Kesê di perwerdeyê de xwêdanê nerijîne, wê di şer de xwînê birijîne." Abdulah Ocalan jî li ser perwerdeyê dibêje: "Dayîka hemû xerabiyan nezanî û tênegihiştin e, dayîka hemû

qenciyan jî zanîn û têgihiştin e." Her wiha, Cegerxwîn di helbesteke xwe de dibêje: "Cegerxwînê kurê min, pir dinalî ji ber aha xizanî û nezanî."

Perwerde û hînkirin, bi taybetî ji bo civakên bindest, yên ku têkoşînê ji bo azadî û demokrasiyê didin, pir girîng e. Bi vê têgehê, di destpêka têkoşîna Azadiya Gelê Kurd de bi perwerdeyê dest pê kir. Lewra ev çerxa dawî bi xwe çerxa zanistê ye, zanist jî bê perwerde ne gengaz e.

## Wateya Peyvan

**Nifş:** Cîl
**Mîtolojî:** Efsane, zanista çîrokî
**Xizanî:** Hejarî, feqîrî
**Çerx :** Sedsal
**Gengaz:** Pêkan, mumkun

### Em Têbigihin

1-Di jiyana mirovan de çi girîngiya xwendinê heye?
2- Nêrînên zanyaran li ser perwerdeyê çi ne?
3- Bêperwerdehî çi zirarê dide mirovan?

## Rêziman

1-Ji awayê derbaskirina dengan ji nivîsê re "**tîp**" tê gotin.

Di zimanê Kurdî de 31 tîp hene. Ji van 23 tîp dengdar û 8 tîp jî dengdêr in.

### A- Tîpên dengdar

#### a-Tîpên Gir:

B - C - Ç - D - F - G - H - J - K - L - M - N - P - Q

- R - S - Ş - T - V - X - W- Y- Z

**b-Tîpên Hûr**:

b - c - ç - d - f – g - h - j - k - l - m - n - p - q - r - s - ş - t - v - x - w - y - z

**B- Tîpên dengdêr**

**a-Tîpên Gir**

A - E- Ê- I- Î - O - U- Û

**b-Tîpên Hûr**

a - e - ê - i - î - o - u- û

- **Dengdêrên deng dirêj:**
  a - ê - î - o - û
- **Dengdêrên deng kurt:**
  e - i - u

2-Nivîsa ku we xwend, ji bend û hevokan pêk hatiye.

Ji nivîsa ku bê pîvana kite û qafiyan re nivîsa **pexşan** tê gotin.

**Nivîs, li gorî curên xwe pir in. Li gorî awêna xwe dibin du beş:**

-Nivîsên pexşan


-Nivîsên hûnandî

## Hîndarî

1- Hûn jî gotineke mezinan, yan jî yeke pêşiyan a li ser perwerdeyê binivîsin.
2- Li ser girîngiya perwerdeyê di refê de gotûbêj bikin.

WANE 2

# KOÇERÎ ÇANDA KURDAN E


 

Koçerî di nava civaka kurd de çandeke sereke ye. Ji ber ku civaka kurd hema bêje ji destpêka dîrokê heya roja me ya îro bi çandinî û lawirvaniyê ve mijûl dibe. Di vê derbarê de bûye xwediyê zanisteke kûr.

Erdnîgariya Kurdistanê ji lawirvanî û çandiniyê re destdayî ye. Xwediyê deşt û zozanên pir xweş in. Deşt ji çandiniyê re destdayî ne. Xwedî avhewayeke nerm e, werza zivistanê berf zêde lê nabare û her tim reş e. Zozanên wê jî zivistanan têrberf û sar in. Di vê werzê de kes nikare bi hêsanî lê bijî Lê havînan her deverên van zozanan şîn û germ in. Werza havînê giya zer nabe û tim şîn e. Mêrg û çîmenên wê pir in.

Kaniyê wê weke rûbaran diherikin bi kurtasî ji bo çêra pez û dewaran weke çêrgeheke bêdawî ne. Koçer dikarin heya meha îlonê bê pûte pez û dewarên xwe li van deveran biçêrînin. Çêra zozanan ji ya deştan cudatir e. Giyayê zozanan pir bihêz û sûd

e. Jixwe bidestxistina berhemên zêde jî, çavkaniya xwe ji giyayê şîn û bihêz digire. Civaka kurd, ji bo bi awayekî hêsan lawiran xwedî bike, fêrî koçeriyê bûye. Zivistanan li deştan xwedîkirina pez hêsantir û bêlêçûntir e.



Havînan jî li zozanan xwarina lawiran şîn û pir e. Ji ber hewaya xweş, êş û jan kêm in. Her wiha, zêde êş û azarî li pez û dewaran jî peyda nabin. Koçer ji herêmên germ ber bi herêmên sar ve diçin. Berê xwe didin kaniyên sar û keviyên berfê. Bi şêweyê karwanan dikevin ser riya zozanan. Malûvila wan li ser pişta hesp, hêstir û keran e. Hemû pêdiviyên xwe li ser pişta dewaran bi cih dikin. Heya digihîjin cihê xwe yê dawî gelek rojan dimeşin. Di nava wan zozanên xweş de dest bi jiyana xwe ya koçerî dikin.

Zozan şahî, govend û dîlanên qîz û xortan in. Zozan warê pezkûviyan in. Warê kew û keyderiyan, hêlîna çûk û teyran, qada hemû cureyên zindiyan in. Siyabo,

heliz, mendê, giyareş, kereng, kivark, soryaz, bîg, pîvok, sîrik, rêvaz û hwd. Ev hinek cure giyayên zozanan in. Gelek ji van giyayan dermanên hinek nexweşyan in. Her wiha, bêhna gul û kulîlkên zozanan dilê mirovan kêfxweş dikin. Ev bêhn, li çar aliyên zozanan belav dibe.

Zozan cihên lîstokên zarokan, dîlanên keç û xortan, warên şivan û bêriyan, cihên serpêhatiyên koçeran in. Civaka kurd, ji ber hinek ji van sedemên jor jiyaneke koçerî hilbijartiye. Bihar û havîna xwe li zozanan, payîz û zivistana xwe li deştan derbas dike. Di roja me ya îro de jî, di nava kurdan de çanda koçeriyê berdewam dike.

## Wateya Peyvan

**Pûte:** Bi dest xwedîkirina lawiran

**Çêre:** Cihê têrgiya ku pez lê diçêre

**Kevî:** Berfa li zozanan ku dereng dihele

**Malûvil:** tiştên ku koçer bi xwe re dibin koçeriyê

## Em Têbigihin

1-Koçer çawa dijîn?
2-Zozan cihên çawa ne?
3-Navê hinek giyayên zozanan binivîsin?

## Rêziman

"Berê xwe didan zozanên weke: Feraşîn, Şerefdîn û Baskê Belekê."
Hevoka jor, weke ku hûn dibînin bi tîpa gir hatiye destpêkirin û bi xalê bi dawî bûye.
**Xal, li dawiya hevokan tê bikaranîn.**
Her wiha di vê hevokê de navên: Feraşîn, Şerefdîn û Baskê Belekê bi tîpên mezin dest pê kirine, ji ber ku navên taybet (serenav) in.
**Serenav bi tîpên mezin dest pê dikin.**

## Hîndarî

1– Çanda xwe ya gelêrî fêr bibin û biparêzin.
2– Ji dayîk û bavên xwe di derbarê jiyana koçeran de agahiyan bistînin û bi hevalên xwe re parve bikin.
3- Tîpên li jêr di lênûsa xwe de rast binivîsin.

**c o n p m d e t u w q ç j ê r z f g h i û v î a ş b k y l x s**

**WANE 3**

# MIJARA SERBEST

## EZ ŞEHÎD IM

Ez şehîd im pakrewan im
Hêstrê çavê dayikan im
Ez giyana jiyanê me
Ez fedayê niştîman im

Min can hebû min feda kir
Ala sor bi xwînê rakir
Min ji bîr kir hemî dinya
Tenê min ji bo te kar kir




Ez şehîd im pakrewan im
Hêstrê çavê dayikan im
Ez giyana jiyanê me
Ez fedayê niştîman im

Dil bû kanî xwîn herikî
Bi min tava reş feriqî
Bûm roniya serxwebûnê
Birînên min derman dikî

Ez şehîd im pakrewan im
Hêstrê çavê dayikan im
Ez giyana jiyanê me
Ez fedayê niştîman im

**WANE 4**

# QULING Û ROVÎ



Rojekê ji rojan quling û roviyek dibin dostên hev. Rojekê rovî, quling vexwend mala xwe. Ket pêşiya quling û ber bi malê ve çûn. Xwe di vê kunê re kir û di bin vê diriya din re çû ta quling westiya û nîvê pirtikên wî weşiyan, gihiştin ber kuna rovî. Rovî bi lez û bez hewdelek çêkir, vala kir li ser tehtê û got:

-De fermo dostê min, em bixwin.

Quling hindî nikilê xwe li tehtê da, nikilê wî êşa û piça hewdelê bi devê wî neket. Neçar ma pesnê yezdan kir û got: Min têr xwar.

Piştî demekê quling, rovî ji bo xwarinê vexwend mala xwe. Rovî ket pey quling û çûn cihekî bilind, çend libên nokan avêt binê kulindokê û got:

- Fermo dosto

Rovî hindî zimanê xwe li devê kulindokî da, nokek bi devê wî neket. Neçar ma xwe da paş û pesnê

yezdan kir û got:
- Min têr xwar.
Quling bi nikilê xwe yê dirêj tik tik nokên xwe hemû xwarin.
Quling ji rovî re got:



- Dosto were ser çengên min, ez ê te li cih û warê xwe bigerînim.
Rovî bazda li ser pişta quling û quling firî û bilind bû.
Carekê ji rovî pirsî:
- Rovî tu çi dibînî?
Rovî:
- Cîhan ronî ye, her derê dibînim bajar, gund, deşt, çiya û daristan…
Quling firek din li xwe da û bilind bû.
Dîsa pirsî:
- Dosto tu çi dibînî?
Rovî:
- Cîhan weke tara bêjingê xuya dike.
Quling:
- Dosto ev çengê min qerimî, xwe bide ser çengê din.
Dema rovî xwest xwe bide ser çengê din, quling

çengê xwe tewand û rovî ket. Li hewayê digot:
- "Sîtkevim, badkevim li ser kurkê mela dikevim."

## Wateya Peyvan

**Hewdel:** Xwarina ji ard û avê tê çêkirin. **Kulindok:** Kundirê dirêj.

## Em Têbigihin

1-Rovî çima quling di nava diriyan re bir?
2-Çima quling nok kirin kulindokê? 3-Çima quling rovî avêt?

## Rêziman

**1-** Di zimanê me de sê tîpên kelijandinê hene. "**h, w, y**"
Ji ber ku di Rêzimana Kurdî de du tîpên dengdêr bi hev re nayên bikaranîn, pêwîstî bi alîkariya tîpên kelijandinê tê dîtin.

**Mînak:**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Stu | y | ê | Stuy**ê** |
| Efsane | w | î | efsanewî |
| Mirova | h | î | Mirova**hî** |

**2-**Di zimanê kurdî de pevdengek heye "**XW**", tu tîp nakevin navbera "xw", ji bilî peyva "**xew**" ew jî awarte ye.

**Mînak:** xwarin, Xweş, xwê, xwîn.

Têbînî:

Tîpên "o, u, û" piştî pevdengê nayên bikaranîn.

## Hîndarî

**1-** Hûn jî metelokekê li ser lawiran binivîsin û di refê de bixwînin.

**2-** Divê dostaniya rast çawa be, di refê de bi hevalên xwe re guftûgo bikin?

**WANE 5**

# WERZA BIHARÊ

**Fesla biharê, cinet tê**
**Xoş xoş, li zozanê me tê**
**Malem yerahû zînetê**
**Dîsa bi xêr bêtin bihar**

**Fesla bihar pîrozî ye**
**Bejna zirav narozî ye**
**Teyran hewar û gazî ye**
**Dîsa bi xêr bêtin bihar**

**Ewan teyran awaz digot**
**Şalûl û bilbil bûne cot**
**Ewan keyfek bi min firot**
**Dîsa bi xêr bêtin bihar**

**Ewan teyran awaz awaz**
**Nê sor dibin ew siyû qaz**
**Ref da quling têtin binaz**
**Dîsa bi xêr bêtin bihar**

*Feqê Teyran*



## Wateya Peyvan

**Fesl:** Demsal, werz
**Malem yerahû:** Eger nebîne
**Zînet:** Delalî
**Naroz:** Delaliya bejnê
**Siyû:** Navê balinda
**Ref da:** Bûn ref

## Em Têbigihin

1- Çima nivîskar werza biharê weke bihuştê dibîne?
2- Herî zêde hûn ji kîjan werzê hez dikin, çima?
3- Helbesta we xwendî, ji çend malikan pêk hatiye?
4- Rêzika dawiyê ya tê dubarekirin çi ye?

## Rêziman

- Mijara we xwend, çima ji malik û rêzikan pêk tê?

Nivîs bi du şêwayan tên nivîsin:

a- **Nîvîsên hûnandî:** Ji malik û rêzikan pêk tên. Di helbestên bipîvan de, her rêzikek bi tîpa mezin tê destpêkirin. Bi qafiye bi dawî dibe.

**Malik:** Herî kêm ji du rêzikan dest pê dike û bê dawî ye.

**Mînak:** Cotik, sêtik, çarik…

**b- Nivîsên pexşan:** Ji hevok û bendan pêk tên. Her hevok bi tîpa mezin dest pê dike û di dawiyê de nîşaneya pêwîst tê bikaranîn.

## Hîndarî

**1**-Helbesteke cotik ji du malikan pêk hatiye, binivîsin.
**2**-Helbesteke Feqê Teyran peyda bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.
**3**-Malika li jêr, bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

**Fesla bihar pîrozî ye**
**Bejna zirav narozî ye**
**Teyran hewar û gazî ye**
**Dîsa bi xêr bêtin bihar**


**WANE 6**

# JÎNAMEYA FEQÊ TEYRAN

Feqê Teyran, yek ji wêjevanên kurd ên navdar e. Di çerxa 16. de jiyaye. Hemdemê Melayê Cizîrî ye. Helbestên wî li ser welatparêzî, evîndarî û xwezayê ne. Hemû helbestên wî bi pîvan û qafiye ne.

Navê wî Mihemed e. Mixabin navê dayîk û bavê wî nehatiye zanîn. Di sala 1549'an de, li gundê Warezorê yê girêdayî navçeya Miksê ya girêdayî Wanê ji dayîk bûye. Di sala 1631'ê de li gundê Hêşetê yê girêdayî berwariya Sêrtê çûye ser dilovaniya xwedê. Li gundê Şandêsêya girêdayî Nemira hatiye veşartin.

Feqe, xwedî sê nasnavan e: Feqê Teyran, Mîmhê, Feqê Miksî.



Hinek dibêjin ku Feqê Teyran bi zimanê teyran dizanî (?), hinek dibêjin ji ber ku ji teyran pir hez dikir, hinek jî dibêjin ji ber bi lez rê ve diçû, jê re gotine Feqê Teyran.

Feqe, xwendina xwe li derdora Miksê bi piranî li Medresa Mîr Hesen temam kiriye.

Berhemên wî yên sereke: qewlê hespê reş, Şêxê Senaniyan, dîwana Feqê Teyran ya bi helbesta "Ey Av û Av" hatiye destpêkirin û hwd…

## Wateya Peyvan

**Çerx:** Sedsal
**Miks:** Navê navçeyeke Wanê ye.
**Medrese:** Dibistanên çaxa navîn
**Raye:** Çare

## Em Têbigihin

**1**-Çima, ji helbestvan re Feqê Teyran tê gotin? **2-** Berhemên herî girîng ên Feqê Teyran, kîjan in?
**3-** Feqê Teyran kengî û li kû derê ji dayîk bûye?

## Rêziman

**1-Fe-qê Tey-ran yek ji hel-best-va-nê Kurd-ê nav-da-re**.
Ji beşa peyvê ya ku bi carekê ji devê mirov derdikeve re **kite** tê gotin.

**2-**Xalbêhnok, dikeve navbera du hevokên ku ji aliyê wateyê ve bi hev ve girêdayî

**Mînak:**

Ciwan heye, malê ava dike; ciwan heye, malê xerab dike.

Ga dimire çerm dimîne; mirov dimire nav dimîne.

## Hîndarî

1-Hûn jî, jînameya wêjevanekî/e kurd lêkolîn bikin û binivîsin.

**WANE 7**

# MIJARA SERBEST

## DI CIVAKÊ DE MAFÊ ZAROKAN




Zarokatî, demeke herî xweş a temenê mirov e. Jidayîkbûnê dest pê dike, heya gihiştinê didome. Bi gihiştinê re mirov derbasî qonaxa ciwaniyê dibe, zarokatî li pey mirov dimîne.

Zarokatî xweş e, ji ber ku hîn ji aliyê cîhana me ve mejiyê wan ê pak nehatiye dagirtin. Hest û xeyalên zarokan jî, weke mejiyê wan pak e. Di hiş û dilê wan de tu xerabî tuneye. Her tiştên li derdora xwe, baş û pak dibînin û bi vî awayî nêz dibin. Hemû heyînên li derdora xwe pir meraq dikin û ji ber vê yekê jî, tim pirs dikin. Mejiyê wan, ji hilgirtina her tiştî re amade û vekirî ye. Mirov, di van salan de sinc
û zanista demê ya civak û malbatê digire. Di van salan de fêrî xwendin û nivîsînê dibe. Axaftin û jêhatinên weke: stranbêjî, nivîskarî, hunermendî,

wênevanî û hwd. di van salan de, derdikevin holê. Di zarokatiyê de mirov xeyalên rojên pêş dike, ji ber ku temenekî dûdirêj li pêşiya mirov e. Heya ku mirov bi pîrbûna xwe nehise, mirov nirxê zarokatiyê dernaxe zanebûnê.

Hinek kes hene ku qet nirxên zarokatiyê nizanin û ji ber vê jî bi awayekî şaş û hişk nêzî zarokan dibin û dibêjin: "Darê lêdanê, ji bihuştê derketiye" û bi vê zanebûnê li zarokan didin. Lê belê, mafê tu kesî tuneye li zarokan bide. Gelo, kes dikare bêje ku zarok ne pêşeroja civakê ne? Bêguman na, lê ew kesên li zarokan didin bi zanebûn, an jî ne bi zanebûn, li pêşeroja xwe didin. Ên ku zarokan qels û tirsonek mezin dikin, ew pêşeroja xwe jî qels û tirsonek dikin. Divê zarok, zarokatiya xwe bijîn. Ji ber ku zarok çi qasî baş û serkeftî bin, pêşeroja me jî dê ew qas serkeftî be.

Civak, li ser bingehê zarokan, dikare nûbûna xwe bidomîne. Ger tu zarokan baş perwerde bikî, tu dikarî pêşerojeke xweş amade bikî. Divê her zarok bixwîne. Divê her civak li gorî derfetên xwe, pêwîstiyên zarokan ji aliyê heyberî û rewanî ve pêşwazî bike. Bi taybetî, divê malbat ji hemû aliyan ve bi zarokên xwe re bibin alîkar. Di civaka kurd û di civakên xizan de gelek zarokan tînin û bi wan re eleqedar nabin. Ev, ne rêbazeke rast û nêzîkatiyeke dirust e. Ji bo vê jî, civakên wiha ji ewlekariya pêşeroja xwe bê bawer in. Ger civakek dixwaze pêşeroja xwe bixe bin ewletiyê, divê ji perwerdekirina zarokan dest pê bike. Ev jî bi lêdanê nabe, bi zanakirin, hezkirin û mirovahiyê dibe.

**WANE 8**

# DAYÎK



Tu dayîk î … Hezkirin, dilovanî, hestên dostbûnê hemû li cem te ne...

Tu dayîk î!

Te ez bi hezkirinên herî mezin bi destên xwe hilgirtim. Ji bo ku ez werim rewşa mirovekî ku bikarim xwe bi xwe bijîm, te di germahiya biskên xwe de ez germ kirim, bi dilovanî hembêz kirim.

Rêzgirtina yekem, kenîna yekem, nêrîna yekem, kite û xwendina yekem te nîşanî min da.

Strana yekem, te ji min re got. Bêyî berdêl û berjewendî, te ji min hez kir. Te waneyên di jiyanê de pêwîst dan min. te serê min şeh kir, ez şûştim, bi tevayî hestên xwe, bi tevahî kêrhatina destên xwe, cilên ku te dirûtin, bi hezkirin li ber min kir.

Di rûyê min de nexweşiya yekem te kişand. Te girînên min ên yekem di hembêza xwe de hêmin kirin. Min guman û razên xwe yên yekem ji te re gotin. Te ez kirim dostê xwe yê yekem.
Tu dayîk î!

Ez her dem bi te bawer bûm. Ji bo ragihandina derdên xwe, dihatim gel te. Xemgîniyên min, bûn xemgîniyên te jî. Tu di kulekê de, li benda min mayî, bi hatina min re dibeziyayî ber derî, te ez her dem bi heman hestan hembêz kirin.
Min bi te nav da, ez bi te hatim tacîdar û şerefkirin.

Tu dayîk î!

Tu hedar û aram î. Tu delaliya tevahî bîranîna roj û temenê min î. Tu heyîna ku li hemberî delalî, xweşî û hêviyên windakirî hatî qezenckirin î.



## Wateya Peyvan

**Bisk:** Beşa porê jinan a di navbera guh û hinarokan de
**Hembêz:** Bermil, bersing
**Kulek:** Pace, pencere

## Em Têbigihin

1- Dayîk, çawa zarokên xwe mezin dike?
2- Girîngiya dayîkê ji bo zarokan çi ye?

## Rêziman

Peyv (gotin), ji beşa zimanzaniyê ya herî biçûk û bi wate re peyv tê gotin.

Peyv, li gorî wateya xwe wiha rêz dibin:

**a- Peyvên hemwate:** Ji peyvên ku wateya wan yek û xwendina wan cuda re tê gotin.

**Mînak:**

Ber - kevir
Gelek - pir
Qenc - baş

**b- Peyvên dijwate:** Ji peyvên ku wateya wan li dijî hev in re tê gotin.

**Mînak:**

Reş - spî
Kurt - dirêj
Mezin - biçûk
Kêm - zêde

**c-Peyvên hemdeng:** Ji peyvên ku di xwendin û nivîsînê de weke hev, lê di wateyê de ji hev cuda re tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Enî: Pêşiya serî | Enî: bere, cephe |
| Ard: Berhema ku dibe nan | Ard: ar û argir |
| Gir: Beşa erdê ya bilind | Gir: mezin, gewre |

**d-Peyvên hemnivîs:** Ji peyvên ku ji heman tîpan pêk tên, lê deng û wateya wan cuda re tê gotin.

**Mînak:**

Çal: Bizina me **çal** e Çal- **Çala** li ber derê me kûr e.

Ker: Xalê min **ker** e, dengan nabihîze Ker- **Kerê** me zîrek e.

Kur: Kavira me **kur** e; guh kurt e Kur- **Kur**ê bavê min jîr e.

**e- Peyvên xaze (mecazî):** Ji peyvên ku ji derveyî wateya xwe ya rast di wateyeke din de, tên bikaranîn re tê gotin.

**Mînak:**

"**Kulîlk**ên Kurdan, dîrokê ji nû ve dinivîsin."

**Agir**ê azadiyê, ji Rojava belav dibe.

**Hîndarî**

**1-** Hûn jî, çend mînakên peyvên xaze, hemwate, dijwate û hevdeng di lênûsa xwe de binivîsin.

**2-** Hest û nêrînên we yên li ser dayîka we çi ne, di refê de binirxînin?

**WANE 9**

# BEHLÛL Û DARBIRÎN

Rojekê Behlûl ji bo darbirînê diçe daristanê. Bivirê xwe radike, diçe ser darekê û wî çiqê ku di bin lingê xwe de dibire.

Di wê demê de, zilamek di wê derê re derbas dibe û çavên wî li Behlûlî dikeve. Ji Behlûlî re dibêje: "Ma tu çi dikî?! Tu yê bikevî, tayê darê li bin lingê xwe nebire."

Behlûl, guh nade axaftina wî û darbirîna xwe didomîne. Piştî demekê, Behlûl bi dar û bivir ve zirp li erdê dikeve.

Behlûl piştî xwe komî serhev dike û bêhna xwe vedike, ji xwe re dibêje: "Wey ev çi zilamekî bihiş bû, wî çawa zanî ez ê bikevim, niha ew dizane ka ez ê kengî bimirim jî." Bi lez û bez dikeve pey wî zilamî û di rê de wî dibîne û jê re dibêje:

"Te zanî ez ê bikevim, niha bêje, ez ê kengî bimirim." Mêrik dike û nake, nikare xwe ji destên Behlûlî rizgar bike. Bi neçarî dibêjê: "Here dema ku te kerê xwe bar kir û tu gihiştî evraziyekê, kerê te sê caran bizire wê demê tu dê bimirî."



Behlûl jî bi tirs û lerz çû, barê xwe bar kir. Di rê de rastî evraziyeke dirêj hat. Kerê wî ji germa û westanê carekê zirî, Behlûl got: "Ax! laşê min diêşe." Piştî demekê cara duyem kerê kir zirîn, Behlûl got: "Ax! taya mirinê hate min." Behlûl rêya xwe bi tirs domand.

Cara sêyan kerê wî cardin zirî.

Behlûlî zanî êdî ev dawî ye, di ber xwe de got: "Ey Xwedê, ez êdî mirî me."

Weke miriyan xwe dirêjî erdê kir. Tarîtiya şevê bi ser de hat.

Behlûlî dît û got: "Ey wax gurek hat." Gur li dora kerê wî zivirî û dixwaze kerê bixwe.

Behlûl: "Guro, guro tu jî dizanî ku ez mirî me, lewma tu tê ber çavên min û kerê min dixwî, ka bila ez sax bûma, vêca bila te biwêriya nêzîkî kerê min bibûya!"



## Wateya Peyvan

**Zirp:** Dengê ketinê.
**Evrazî:** Berjor, kaş.
**Lerz:** Recif, tevgera laş a ku ji tirsê çêdibe.

## Em Têbigihin


**1-**Pêkenok çi ye?
**2-**Hûn jî pêkenokekê binivîsin.

**WANE 10**

# BERXWEDANA SEDSALÊ








Gelo, çima vê berxwedanê ev qas deng veda? Ji ber ku di Kobanê de bav û keç, bira û bira, xwîşk û xwîşk dost û hevalan li kêleka hev şer dikir, kalên temenê wan nod salî bê westan, di vê berxwedanê de

şer dikirin. Dayikan bê tirs li kêleka zarokên xwe cih digirt. Şerê li dijî hovîtiya Daiş'ê, yekgirtineke hestiyarî di nava hemû mirovên azadîxwaz de çêkir.

Ji hemû neteweyan kesên şoreşger berê xwe da vê berxwedanê û gelek ji wan şehîd ketin. Her wiha, berxwedana Kobanê bû sembola têkoşîna jinê. Ji ber ku ev dijminê hov ê xwînxwar, herî zêde dijminatî û zilma xwe li ser jinan pêk anî. Heya ji bo jinan mafê

jiyanê jî, rewa nedidît. Bi hezaran jin revandin, kirin "cariye" û kuştin. Jina kurd di bin sîwana YPJ'ê de li hemberî vê zilmê serî rakir û rengê têkoşîna xwe nîşanî dijminê hov da. Bi taybetî, di kesayeta şehîd Arîn Mîrkan de. wêrekî, fedekarî, têkoşîn û dengê jina kurd ji bo azadiya hemû jinên cîhanê bû hêvî. Bi sedan jin, bûn şopdarên xeta şehîd Arîn Mîrkan û hemû şehîdên berxwedana Kobanê.

Berxwedana Kobanê pêla serhildanan li hemû cîhanê û bi taybetî, li Bakurê Kurdistanê gihand asta serkeftinê. Bi van serhildanan, gel diyar kir ku em ê hevkariya hemû hêzên dagirker û desthilatdar a bi dijminê hov Daiş'ê re xerab bikin. Berdêla vê, canê me jî be, em ê bi kêfxweşî bidin. Di encama serhildana 6 û 7'ê mijdarê yên li bakurê kurdistanê ku tirkiye kir weke pêta agir de gelek ciwan û zarok
şehîd ketin. Bi serhildanê hevkarî û planên dijmin tarûmar bûn.

Belê, di encama berxwedana şervanên azadîxwaz de dijminê hov Daiş bi bin ket. Di vê berxwedanê de berdêlên pir mezin hatin dayîn.
Dîroka berxwedanvaniyê, bi xwîna şehîdan li Kobanê ji nû ve hat nivîsîn. Dîrok bi serkeftina nirxên mirovahiyê hat xemilandin. Berxwedana Kobanê di nava pelên dîrokê de bû çîroka serkeftina

berxwedanê. Doza mirovahiyê bi ser ket, dijminê xwînxwar û hov bi bin ket.

## Wateya Peyvan

**Lûtke:** Gupik, cihê herî bilind

**Rewa:** Maf, rast

**Tarûmar:** Xerapkirin, Talankirin

**Berdêl:** Pêguher, li şuna wê

## Em Têbigihin

1-Berxwedana Kobanê çi di nava gelê kurd de çêkir?

2- Çima Berxwedana Kobanê ev qas deng veda?

3- Rola jina kurd di berxwedana Kobanê çi ye?

4-Navê çend şehîdên Kobanê binivîsin?

5-Çima li bakurê Kurdistanê pêla serhildanan ew qas belav bû?

## Rêziman

**1- Ji aliyê sazbûnê ve peyv dibin sê beş:**

peyvên xwerû
Peyvên pêkhatî
Peyvên hevedudanî

**a- Peyvên xwerû:** Ji peyvên xwedî wate ku tu qertafan nagirin re peyvên xwerû tê gotin.
**Mînak:** reş, ewr, pel, pez, şîv, gog, rû, guh...

**b- Peyvên pêkhatî:** Ji wan peyvên ku bi alîkariya qertafên sazker pêk tên re peyvên pêkhatî tê gotin.
**Mînak:** zanîn**geh**, derman**xane**, **da**ketin, **hil**girtin, kurt**e**nivîs, nal**e**nal**...**
**c- Peyvên hevedudanî:** Ji peyvên ku ji du peyvên watedar pêk tên re peyvên hevedudanî tê gotin:
**Mînak:** rûgeş, rojname, dilbirîn, marmasî...
**2-** Li Kobanê Arîn Mîrkan çalakiya fedayî pêk anî**!**
Weke di hevoka li jor de jî tê dîtin, baneşan(!) di hevokên ku tirs û xurûşekê rave dikin de tê bikaranîn.

## Hîndarî

**3-** Çar hevokên bixurûş binivîsin û nîşaneya baneşanê(!) li dawiya wan bi kar bînin.

**WANE 11**

# NAME



Heval û hempîşeyê min Siyabend,

Despêkê, ji kurahiya dilê xwe te silav û himbêz dikim. Ez dizanim ku tu li bajarê Şamê yê dîrokî û kevnare dixwînî. Hêvîdar im di xwendina xwe de serkeftî bî. Her çi qas cih û war xweş bin, derfetên we yên aborî baş bin jî, lê mixabin, hûn nikarin bi zimanê dayîka xwe bixwînin. Her wiha, lêkolîn û lêgerînên we sînordar in. Hûn nikarin bi ramaneke azad bi mamosteyên xwe re guftûgoyê bikin û bipirsin.

Hevalê min ê hêja, em ne li ser cih û warê xwe, ne li ber deriyan, lê belê li çol û beriyan, di rewşeke

penaberî de bi derfetên kêm dixwînin. Lê derfetên me yên lêkolîn û lêgerînan serbest in. Em di guftûgo û pirsên xwe de azad in. Em bi "zimanê dayîka xwe yê şirîn" dixwînin.

Hêvîdar im, di pêşerojê de em yan jî xwîşk û birayên me yên biçûk, bi hev re li ser xaka welatê xwe bixwînin. Bi mejî û ramanên xwe yên azad, di rewşeke demokratîk de, lêkolîn û lêgerînên xwe bikin û azad bijîn. Bi hezkirin û silavên xwe çavên we radimûsim.

**Hêlîn MEXMÛR**
**12/ 05/2013**

## Wateya Peyvan

**Ramûsan:** Maçkirin.
**Hempîşe:** Kesên ku heman karî dikin.
**Penaber:** Koçber
**Guftûgo:** Gotûbêj

## Rêziman

– Ji tîp an jî rêzetîpên ku ne ji peyvê ne, bi peyvan ve tên zeliqandin û bandorê li ser peyvan dikin re qertaf tê gotin.

**Qertaf dibin du beş:**

1- Qertafên sazker
2- Qertafên kêşanê

**a- Qertafên sazker:** Ev cure qertaf tên pêşî yan jî paşiya peyvan carinan jî dikevin navbera du peyvan û ji wan peyveke nû saz dikin. Mînak:

**Çê**kirin, **Hil**weşandin, dad**geh**, ava**ker**, ser**an**ser, kal**e**mêr ...

**b- Qertafên kêşanê:** Ji qertafên ku ji bo rewşekê tên bikaranîn re qertafên kêşanê tê gotin. Ev qertaf peyvên nû saz nakin.

Mînak:
Welat**ê** me
Pirtûk**a** Bêrîvan**ê**
Heval**ek** hat
Min pirtûk**in** xwend**in.**

Zarok**ino**! Baş **bi**xebit**in**.
Ew **di**xwîn**e**

## Em Têbigihin

1- Name çi ye?
2- Cudahiya telefon û nameyê çi ye?

## Hîndarî

**1-** Her yek nameyekê binivîse.
**2-** Hûn jî çend mînakan li ser qertafan di lênûsa xwe de binivîsin.

**WANE 12**

# BIHAR

Gava dinê dibe bihar
Dibişkivin devî û dar

Zozan têne guhartin zû
Mîna cilên bûkên dinû

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul
Direvînin xeman ji dil

Dinya dibe wek gola şîn
Çîçek didin sed reng û bîn

Xasma siban berbangê zû
Tev radibin ew teyr û tû

Vêkre dikin şahî û saz
Hişyar dibin hulîlk û baz

Bilbil dibe dengbêjê wan
Dikit qîrîn ji dil û can

Pîroz dikin rojên di hev
Hîn xweştir e biharê şev

*Osman Sebrî*







## Wateya Peyvan

**Baz:** Navê firindeyekê ye, (Şahîn)
**Hulîlk:** Ciliq, elok.
**Dibişkivî:**Vedibe
**Bîn:**Bêhn
**Xasma:** Bi taybetî
**Berbang:** Ji beriya sibê
**Tû:** Tûtî, papaxan balindeyeke ku diaxive.

## Em Têbigihin

1-Ev helbest, çi rave dike?
2- Helbesta we xwendî, a kîjan helbestvanî ye? Li ser jiyana wî lêkolîn bikin.

## Rêziman

Ji wekheviya dengên dawiya rêzikên helbestê re **qafiye** tê gotin.

**Qafiye di nav xwe de dibin sê beş:**

**1-** Qafiya lewaz
**2-** Qafiya tam
**3-** Qafiya dewlemend

**1-** Ji qafiya ku dengê wê ji yek tîpê pêk tê re **qafiya lewaz** tê gotin.
**2-** Ji qafiya ku dengê wê ji du tîpan pêk tê re **qafiya tam** tê gotin.
**3-** Ji qafiya ku dengê wê ji sê tîpan pêk tê re **qafiya dewlemend** tê gotin.

## Hîndarî

**1-** Helbestê bi awaz bixwînin û cureyên qafiyeyên wê nîşan bidin.
**2-** Du malikan saz bikin ku tê de **qafiya tam** û **lewaz** hebe.

# HÎNDARÎ 1

**1- Ji wan nivîsên ku ji bend û hevokan pêk tên re çi tê gotin?**

**a-** Hûnandî
**b-** Bêserûber
**c-** Pexşan
**d-** Bi rêk û pêk

**2- Ji wan tîp û rêzetîpên ku ne ji reseniya peyvê ne û bi peyvê ve tên nivîsîn re çi tê gotin?**

**a-** Daçek
**b-** Nav
**c-** Qertaf
**d-** Hevalnav

**3- Di zimanê kurdî de dema tîpa (î) beriya kîjan tîpê tê, cihê xwe ji tîpa (i) re dihêle?**

**a-** V
**b-** R
**c-** M
**d-** Y

**4- Di hevoka, "Kurdistan pirtûkê dixwîne." de çend tîpên dengdêrên kurt hene?**

**a-** 4
**b-** 5
**c-** 8
**d-** 11

**5- Di zimanê Kurdî de çend tîp hene? a-** 36
**b-** 31
**c-** 29
**d-** 26

**6- ji hevokên li jêr, ên rast bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**a-** Pênc cureyên qafiyeyan hene.
**(...)**
**b-** Peyvên (şev- roj) dijwate ne.
**(...)**
**c-** Qertafa '**da**',    di peyva '**daket**' de qertafa sazker e.
**(...)**
**d-** Peyv, li gorî çêbûna xwe dibin çar beş.
**(...)**

**7- Peyvên li jêr, bigihînin wateya wan.**

**penaber    awa    çerx    lûtke    bişkivîn**

**sedsal    gupik    koçber    vebûn    dirûv**

# BEŞA 2

1- Dengê xerîbiyê
2- Derwîş û Edolê
3- Berxwedana lehengan
4- Belayên hezkirinê
5- Pêkenok
6- Hêvîdarî

**WANE 1**

# DENGÊ XERÎBIYÊ



Di vê meydana biçûk de dest pê kir. Zora hemû dengên din ên ku heya wê demê jiyana min hûnandibû, bir. Di ruh û dilê min de, ji xwe re cihekî taybet anî pêş. Dengê welatê xerîbiyê, naşibe dengên din mîna dengê seqemê ye, lê jê sartir e. Mîna dengê şûrê mêrkujan e, lê jê tûjtir e. Mîna dengê guliyên berfê ku hêdîka dikeve erdê, lê jê zîztir e. Mîna dengê kund û kundan e, lê jê bêtir bi tirs bû.

Dengê welatê xerîbiyê, guhdarên bîrbir! sar, zirav, zîz û tijî metirsî ye. Dengekî ku tu deng nikare wî haş bike, ji dilsozî û fikaran dûr bixîne û vegerîne dengekî xwezayî. Rengê welatê xerîbiyê, bi darê zorê dizê û dijî.

Dema ku me ji welatê xwe bêdeng û bi kesereke kûr xatir xwest, pişta xwe da çemê Dîcle û

ber bi welatê jor di nava leşker û berpirsên leşkerên Osmaniyan de, em bi rê ketin, min dengê welatê xerîbiyê di ruh û dilê xwe de hîs kir. Ev deng jî mîna êşa çavê min ê kor bû, kesekî din nedidît, lê hîseke ecêb, nefes li min diçikand û ez diavêtim di nava pêlên xurt ên tevliheviya dil, ruh, bîr û hiş…

Ji Hawara Dîcleyê/Mehmed Uzun

## WATEYA PEYVAN

**Zîztir:** Hestiyar
**Bîrbir:** Bîrdar, xwedan bîr
**Seqem:** Serma hişk
**Dizê:** Çêdibe, dafire, ji dayîk dibe.
**Ecêb:** Mat, seyr,sosret

## Em Têbigihin

**1-**Hûn jî romanekê peyda bikin û bixwînin.
**2-** Nivîskarê kurd ê bi navê Mehmed Uzun kî ye?
**3-**Nivîskar di vê romana xwe de dabaşa jiyana xwe ya ji welatê xwe dûr, dike. Gelo, li gorî we hestên we yên ji dûrbûna cih û warên we çi ne?

## Rêziman

**Qertafên kesane:**

| | |
|---|---|
| **İm** | **me** |
| **Î** | **yî** |
| **E** | **ye** |
| **İn** | **ne** |
| **İn** | **ne** |
| **İn** | **ne** |

**Qertafên kesane bi cînavkên kesane yên xwerû re tên bikaranîn.**


**Mînak:**

| | | |
|---|---|---|
| **Ez** | | **im** |
| **Tu** | | **î** |
| **Ew** | | **e** |
| **Em** | **jîr** | **in** |
| **Hûn** | | **in** |
| **Ew** | | **in** |

| | | |
|---|---|---|
| **Ez** | | **me** |
| **Tu** | | **yî** |
| **Ew** | | **ye** |
| **Em** | **zana** | **ne** |
| **Hûn** | | **ne** |
| **Ew** | | **ne** |

**WANE 2**

# DERWÊŞ Û EDÛLÊ



Malbata Derwêş, Êzîdî ne. Ji êla Şerqî ne. Ji Çiyayê Şengalê ne. Bi sorkirina padîşahên Osmaniyan mîrê Botan her tim bi Êzidiyan re di nava şer de ye. Zor û stemê li wan dike. Êla Şerqî bi xwe jî ji wê zor û zordariyê para xwe digire. Lê derfetekê bi dest dixin, gelek şervanên mîrê Botanê dikujin û ji Çiyayê Şengalê direvin, tên li Çiyayê Qerejdaxê xwe dispêrin mîrê Milan.

Mîrê Milan dixwaze ji mêrxasiya Êzidiyan sûdê werbigire, lewma di nava konfederasyona êlên Milan de cih dide wan. Di şer û cerdan de wan dide pêş, mîrê Milan bi mêrxasiya wan serbilind e. Havînan bi hev re derdikevin Zozanên Qerejdaxê û zivistanan bi hev re dadikevin germistana Wêranşarê. Di heman

salan de bi navê Derwêş kurekî Evdî û bi navê Edûlê jî keçeke mîrê Milan tên cîhanê. Konên wan nêzî hev in, zarok bi hev re mezin dibin.
Êdûl, dibe keçeke ku xweşikiya wê li ser zar û zimanan e. Derwêş di nava hemsalên xwe de her tim li pêş e, mêrxasekî gurçikpola ye.
Edûl, evîna xwe ya rojên pêşîn, wiha tîne ser ziman:
*“Ez nizanim, ne eşqê canê min girt*

*Nizanim ne lingê min li sola delal likumî*

*Bejina min li pêşiya lawikê Êzidî dihijhijî*

*Qehwa Yemenê bi ser delalê mala bavê min de rijî”*

Derwêş êdî nikare evîna dilê xwe veşêre. Di nava hevalan de gava pesnê xwe dide, dibêje; "Ez, kilê çavên Edûlê me." Ev gotin, çawa ku diçe guhê mîr, fermana wan derdixe û êla Şerqî ji wê derê diteriqe û diçe.

Roj diguhere, sal derbas dibin. Li Beriyê ziwahiyeke dijwar heye.. Bîrên avê hemû di bin destê êlên Milan de ne. Êlên ereb û tirkmen ji vê rewşê gelek aciz in. Yekîtiya xwe çêdikin, artêşeke xurt ava dikin û berê xwe didin mîrê Milan.

Mîrê Milan dikeve rewşeke gelek zor û zehmet. Di nava êlên wî de mêrxasên ku berê xwe bidin vê artêşa xurt dernakevin. Neçar dimîne û dibêje: kî berê xwe bide vê artêşê û wan ji hev belav bike, ez ê

qîza xwe bidim wî. Lê tu kes qayîl nabe. Aqilmend derdikevin, dibêjin: Agahî bişîne ji Derwêşê Evdî re. Derwêş, piştî hildana agahiyê, bi lez û bez tê.

Adet wisa ye, Edûl fîncana qehwê di dîwana mîr de digerîne kî qehwê hilde û vexwe, ew ê bibe serkêşê şer. Derwêş li dîwanê rûniştî ye, lê Edûlê zû bi zû fîncanê nêzî wî nake. Lewra dizane ku çûyîna vî şerî heye, vegera wî tuneye. Piştî ku li hemû dîwanê digerîne û tu kes fîncanê hilnade, ji mecbûrî tîne ber wî, Derwêş bêyî ku lê bihizire, fîncana qehwê hildide û bi ser xwe ve dike.

Derwêş bi çend hevalên xwe re diçe ser êlên ereb û tirkmenan.

Li rasta Wêranşarê li dora girê Edşanê şerekî dijwar diqewime. Li hemberî artêşeke gelek mezin, berxwedaneke bi nav û deng didin. Di dawiyê de hemû lehengên diçin şer jiyana xwe ji dest didin, lê paşê êlên Milan digihîjin hewara wan û dijmin ji ser axa xwe diqewitînin.

Derwêş di şer de bi giranî birîndar dibe, gava hewar digihîje wan, êdî li ber mirinê ye. Edûlê digihîje ser wî, serê wî datîne ser çoka xwe, kul û kederên nava dilê xwe dirijîne.

*"Hey lo lo delal..*

*hey lo lo delal…"*

Di ser şerê Derwêşê Evdî re sê sed sal derbas bûn. Piştî wî şerî êlên kurdan bi serbilindî li zozan û deştên xwe geriyan. Derwêş evîna axa welatê xwe, di ser evîna dilê xwe re girtibû. Her wiha, ev evîn di

çanda kurdan de bûye destan. Ev sê sed sal in ku hîn jî behsa mêrxasiya Derwêş û hevalên wî tê kirin.

## Wateya Peyvan

**Êl :** eşîr
**Fîncan:** Amûra ji bo vexwarina qehwê ye.
**Konfederasyon**: Pergala birêvebirinê ya pirrengî, her pêkhate di nav de xweser e.
**Hemsal**: Hemtemen
**Dîwan**: Civat

## Em Têbigihin

1- Navên qehremanên destanê binivîsin?
2- Li gorî mijarê, ev bûyer li kû derê çêbûye?

## Rêziman

**1-Nav:** Ji wan peyvên ku heyînan didin nasîn re “ **nav**” tê gotin.
Nav, li gorî wateya xwe; dibin du beş:

**a- Navên şênber**
**b- Navên razber**

**a-Navên şênber**: Ji navên ku mirov bi her pênc lebatên xwe pê dihese re **navên şênber** tê gotin.
**Mînak:** mirov, kevir, hesin, dar, pirtûk, pênûs, hewa û hwd.
**b- Navên razber:** Ji navên ku mirov bi her pênc lebatên xwe bi wan nahese, lê bi hebûna wan bawer dike re **navên razber** tê gotin.
**Mînak:** qencî, bawerî, hezkirin, azadî, hêvî, aramî ...

**2-** Nîşaneya sêxal **(…)** li şûna peyva ku nehatiye nivîsîn û li dawiya nivîsên ku berdewamiya wan heye, tê bikaranîn.
**Mînak:** Mamoste di refê de… dide.

"Hey lo lo delal…hey lo lo delal…"

## Hîndarî

- Navê çend destanên kurdî binivîsin.

**WANE 3**

## MIJARA SERBEST

# BERXWEDANA LEHENGAN

Sala hezar û nehsed û heştê û nehan (1989), du egîdên leheng û qehremanên şervanên azadiyê, ji yekîneyên xwe qut bûbûn. Li navsera Çiyayê Cûdî, li pêşberî bajarê Şirnexê xwe veşartibûn. Sîxurên dewleta Tirk çi bi helîkopteran, çi bi agahiyên karkerên komirê, cihê van her du lehengan dest nîşan kir.

Hêzên dewleta Tirk ji Şirnex, Basan, Hezex û Silopiyê li gel cerdevanan bi qasî heft hezar kes ji her çar aliyan ve bi çekên bejahî û hewayî êrîşî her du lehengan kir. Bi çekên bejahî yên weke: Topên hewan, doçka û obusan, her wiha, bi hêzên hewayî yên weke fantom, jet û hemû cureyên helîkopteran li wan reşandin. Tenê di destê her du lehengan de keleşkof, qernas û narîncokên destan hebûn.





Vî şerî heft roj û heft şevan dom kir. Piştî kuştina çend leşker û cerdevanan, her du qeheremanên şervanên azadiyê ji wê qiyameta leşkerî ya giran, xwe rizgar kir û parastî gihîştin yekîneyên xwe. Vî şerî, weke gelek şerên din qehremanî û lehengiyên şervanên azadiya Kurdistanê di nava rûpelên dîrokê de, mîna destanên lehengan dan nivîsîn.

Ji wê rojê û pê de, tirs û xurûşa şervanên azadiyê, ket nava leşker û cerdevanan. Hinekan digot cin in, hinekan jî digot em nizanin çi ne. Pêwîst e hemû nivîskar, çîrokbêj û hunermend li ser lehengî û qehremaniya kesên weke van: helbest, destan û romanan binivîsin.

*Dilopek ji deryaya berxwedanê.*

**WANE 4**

# BELAYÊN HEZKIRINÊ ZOR IN



**Rohniya wê şewq û tavê**
**Şerbeta qend û gulavê**
**Kes nehin mehrûm ji navê**
**Lê tenê bo min xela ye**

**Dem bi dem ew çehvenêr e**
**Bête nîşanek me jê re**
**Da bibit ew zinde vê re**
**Yarê sadiq bêbiha ye**

**Canfidayê min di rê da**
**Firqetê derbek we lê da**
**Qalibek bêrûh e wê da**
**Kuşt dibêm min lê rewa ye**

**Her çi cilwa bû ji navê**
**Nû gulek dî girt xunavê**
**Wî ji dil çû muhbeta vê**
**Ew bi ya dî re teba ye**

***Melayê Cizîrî***

## Wateya Peyvan

**Qend:** Şekirê kabik
**Nehin:** Nehêla
**Xela**: Tunetî, kêmbûna pêdiviyên jiyanê **Çehvenêr**: Çavnêrî, çavdêr
**Cilwa:** Derketin, jêketin

## Em Têbigihin

**1-**Li ser jiyana helbestvan, lêkolîn bikin.
**2-**Mijara sereke ya helbestê çi ye?

## Rêziman

**1-**Nav, li gorî heyîn û taybetmendiya xwe; dibin sê beş:

a- Serenav
b- Hevenav
c- Komenav

**a- SERENAV (navê taybet):** Ew nav in ku heyînekê tenê didin nasîn.
**Mînak:**

Amed, Kurdistan, Qamişlo, Arîn

**b- HEVENAV (navê giştî):** Ew nav in ku ji bo gelek heyînên ji heman komê ne.

**Mînak:**

çiya, av, dar, deşt, genim, dirav, mirov, zozan, xanî...

**c- KOMENAV:** Ew nav in ku pêveka komê nastînin, lê bi xwe kom in.

**Mînak:**

daristan, artêş, kerî, bir, ref

## Hîndarî

1- Hûn jî helbesteke Melayê Cizîrî peyda bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.
2- Malika yekem û duyem, bi hevalên xwe re şîrove bikin.

**WANE 5**

# PÊKENOK

Şevek zivistan û sar
Kolanê de bû hawar
Behlûl jî xwest bizane
Şer e yan pîlana dizane
Jinê gotê ey Behlûl
Serê xwe ne êxe bela
Razê nav nivîna germ
Ka wê çi lê bê ev bezm
Behlûl guh neda şîret
Lihêf aland û derket
Hate nava meydanê
Ket ber tep û lêdanê
Nîşkan ve lawek çist
Goşa lihêfê şid girt
Lêdan her berdewam
e Kes nizane çi qame
Di vê germa dîlanê
Lihêf nema li meydanê
Her yek ji wan şervanan
Belav bûn li kolanan
Behlûl nû zanî çi ye
Ava serê wî keliye
Hêdî xwe xiste mal de
Ji tirsa wexte can de
Jinê lê kire qêrîn
Kanê lihêfa hişîn?

Behlûl gotê ey hermet
Lihêf çû ez selamet

Ev kerema xwedê ye
Ji bo me pir bi cê ye
Cihê lihêfa hişîn
Eger ez hatibam dizîn
Ocaxa me kor dibû
Xwelî li serê me dibû



## Wateya Peyvan

**Ji nişkan ve:** Di kêliyekê de.
**Çist:** Xurt**,** çalak
**Aland:** Pêçan, badan
**Şid:** Şidayî

## Em Têbigihin

**1-**Çima Mele derket derve?
3- Ramana bingehîn a mijarê binivîsin?

## Rêziman

**1- Nav, li gor çêbûna xwe dibin sê beş:**

a- Navên xwerû
b- Navên pêkhatî
c- Navên hevedudanî

**a- Navên xwerû:** Ew nav in ku bêyî qertafeke sazker, an jî peyveke cuda bistîne, bi serê xwe heyînekê dide nasîn.

**Mînak:**

dar, bar, jar, heval, kulîlk, kevir, yar, şal û hwd…

**b- Navên pêkhatî:** Ew nav in ku qertafên sazker digirin û wateyeke nû distînin.

**Mînak:**

karwan, cotkar, gavan, xebatkar û hwd…

**c- Navên hevedudanî:** Ew nav in ku ji du peyvên watedar pêk tên û navekî nû pêk tînin.

**Mînak:**

Dilbirîn, Cegerxwîn, Dilgeş, Aştîxwaz û hwd…

**2-Xêzika axaftinê (-)**: Ew nîşaneya ku li pêşiya axaftina kesekî/ê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Sîpan dibêje:

- Ez ê di xwendina xwe de serkeftî bim.

## Hîndarî

**1-** Hûn jî pêkenokekê peyda bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.

**2-** Nivîsîna li jêr bi awayê destxet, di lênûsa xwe de binivîsin.

## PÊKENOK

Rojekê ba û bahoz rabûbû, tofanek li derve hebû. Di wê tofanê de kermêşek çûbû bi darekê ve girtibû.
Yekî jê pirsî û got:
- Lê kermêşê, xêr e te çima bi darê ve girtiye?
Kermêşê sînga xwe nepixand û got:
- Ma tu nabînî, min bi darê ve girtiye ku dar nekeve!

**WANE 6**

## MIJARA SERBEST

# HÊVÎDARÎ



Hevalê delal hey kurê xwendekar
Me danîne ristên xwe pir bêjimar
Ji te hêvîdar im ji min negirî dil
Ku pêşkêş dikim ji bo te gul
Hevalê te me ez, ne dostê neyar
Dixwazim bi hev re bikin kar û bar
Bi dost û bira bin hemû jar û mest
Niha bûye çil sal ku min ev dixwest
Welat xweş bikin em nemînin neyar
Mirov tev bi hev re bibin dost û yar
Bi hev re bibin em bi carek heval
Li ber hev nenêrin bi can û bi mal
Ji warê me bar kin çi tiştên nebaş
Di her war û cî de nemînin li paş
Cîhanê bikin em bi rengê buhişt
Li nav me nemînin xwedî zor û xişt



*Cegerxwîn*

# HÎNDARÎ 2

**1-Kîjan navê li jêr, taybet e? a-** Mal
**b-** Mamoste
**c-** Dar
**d-** Zîlan

**2- Kîjan ji qertafên li jêr, qertafeke sazker e?**
**a-** an
**b-** van
**c-** ên
**d-** ê

**3- Kîjan ji navên li jêr şênber e?**
**a-** Evîn
**b-** Kevir
**c-** Azadî
**d-** Bawerî

**4- Kîjan ji navên li jêr, navekî giştî ye? a-** Azad
**b-** Nermîn
**c-** Dibistan
**d-** Hogir

**5- Kîjan ji navên li jêr pêkhatî ye?**
**a-** Dilbirîn
**b-** Kalemêr
**c-** Egîd
**d-** Gavan

**6- ji hevokên li jêr ên rast bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**a-** Xêzika axaftinê li "**destpêka axaftinê"** tê bikaranîn. (...)

**b-** Li ser peyva "**Adar**" qertafa kêşanê hatiye bikaranîn. (...)

**c- Nav,** li gorî çêbûna xwe dibe sê beş. (...)

**d- Navên giştî,** ew navên ji bo gelek heyînên ji heman komê ne. (...)

**7- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.**

**Bîrbir- dîwan - êl - pê -çist – izê**

**civat - çalak – ling- bîrdar- diafire- hoz**

# BEŞA 3

1- Kewa gozel
2- Çerxa felek
3- Demokrasî
4- Çanda berbirî
5- Sinc
6- Rexne û rexnedayîn
7- Beyta cindî
8- Nivîsîn
9- Gulbihar
10- Berpirsiyarî
11- Rêwîtiya xeyalên zarokatiyê

**WANE 1**

# KEWA GOZEL

Ji ber pacê xwe bide alî
Geroka gund û cîrana
Bi min xwîna te pir talî
Te naxim şi'r û dîwana



Ez im terha serê lema
Kulîlka ber devê çema
Dilopa hingiv û xurma
Li ser lêvên di hozana

Gever gijê enî pirçê
Çepil xwarê lepê hirçê
Ji rengê pîreboka çê Li
dû rêwî û karwana

Sipîboz im gulî sor im
Bi bisk û xemrî û por im
Xezala Cûdî û Tor im
Sitêr im ez li ezmanan



Genîkê dev bi qerqêtê
Timî bêhna ne xweş jê tê
Hekîmê Wan û Xarpêtê
Rehet nakin bi dermana

Ez im navka qinê gwîza
Ez im rûnê devê hîza

Ez im rinda keç û qîza
Gula nêv bax û bistana

***Tîrêj***

## Wateya Peyvan

**Gozel:** Cûreyeke kewan.

**Genîk:** Genî

**Gwîz:** Gûz

**WANE 2**

# DAXWAZNAME

## JI BO RÊVEBERIYA DESTEYA PERWERDEYÊ YA KANTONA EFRÎNÊ

Ez xwendekarê bi navê Azad Cûdî me. Li dibistana seretayî di refa şeşan de me. Ji ber ku sala borî min xwendina xwe ya refa şeşan seretayî qedandibû, min bawernameya xwe dabû rêveberiya dibistana navîn. Lê di dema qeydkirinê de, bawernameya min xuya nekir.

Hêviya min ew e ku lêkolîn li ser bê kirin, bawernameya min bê dîtin, an bawernameyeke nû ji min re bê amadekirin.

**Li gel rêz û silavan**

**Azad Cûdî**

**Taxa Ş. Arîn/ kolana 3/ Hejmara derî 22**

**15/1/2016**

## Hîndarî

**1-** Daxwazname, nivîseke ji bo daxwaz û hêviyên xwe ragihînin cihê peywendîdar e. Weke mînaka ku li jor hatiye dayîn.

**2-** Daxwazname, divê li ser kaxezeke spî ya sade û bi pênûseke ximav (hibir), an jî komputerê bê nivîsîn.

4- Divê li her çar aliyên kaxeza daxwaznameyê, valahiyeke bi qasî 2 cm bê hiştin.

**WANE 3**

# ÇERXA FELEK





Çerxa felek rast badidim
Serê çiyan serbaz didim
Gulistana xwe av didim
Şûna avê xwînê didim

Çerxa felek ger bo me ye
Yeqîn ev dem dema me ye
Cîhan tev de bê ser me ye
Kurdistana xwe hew didim

Eniya Botan giha stêran
Simko Ceger evan şêran
Next vebirîn bi xwîna mêran
Çendî divên şehîd didim

Beytûşebab xeber dida
Başkaleyê bersiv dida
Simko Emer canê xwe dida
Bi van şêran xwe nav didim

Kanî Reşîd kanî Zinar
Kanî Ehmed kanî Dijwar
Kanî Mihyedînê serdar
Soz be li min hêjî bidim...

*Ji Dengê Penaber*

## Wateya Peyvan

**Yeqîn:** Tekez, bêguman
**Next:** Qelen
**Beytûşebab:** Elkê, navçeya Şirnexê
**Başkale:** Navçeyeke Wanê ye
**Serdar:** Pêşeng

## Em Têbigihin

**1-**Helbest, li ser çi hatiye hûnandin?
**2-**Helbestvan, dilê xwe bi çi aram dike?

## Rêziman

**1-**Di dawiya rêzika çaran de, ji ber ku peyva "**didim"** dûbare bûye û ji her sê rêzikên din cuda bûye, em jê re dibêjîn "**qulf".**
**2-**Di destûra hûnandî ya kurdî de, piştî qulfê rêzik berdewam nakin.
Ji ber ku qafiya rêzikên malikan, ji ahengiya du tîpan zêdetir in, jê re **qafiya dewlemend** tê gotin.

## Hîndarî

**1-** Li ser şehîdan, helbesteke ku ji çend malikan pêk hatiye, vehûnin.
**2-** Helbestê bi awayê çarik bixwînin.

WANE 4

# DEMOKRASÎ



Demokrasî, awayê birêvebirina gel e. Pergala jiyana civakî ya rasterast e. Rêbazeke li dijî rêbazên şaristaniya navendî ye û tê wateya vîna giştî.

Dema ku demokrasî tê gotin, nayê wê wateyê ku dilê me çi dixwaze, em wê bikin an jî pêk bînin. Demokrasî bi xwe, jiyaneke bi pîvan û birêkûpêk e. Ji ber vê yekê, demokrasiya rast, parastina nirx û sincê civakî ye.

Bêguman, demokrasî ji civaka sincî-polîtîk dest pê dike. Tu civak, bêyî jiyana sincî û polîtîk nabe. Cihê ku sinc û polîtîka lê hebe, dê demokrasî jî lê hebe. Ev her sê têgeh, weke xweşikbûn, başî û rastî bi hev ve giradayî ne.

Perwerdeyeke ku li ser van her sê têgehan bê rûniştandin, dê bêhtir rastiyên xwe yên civakî binase.

Her xwendekarê ku li ser van bingehan perwerdeyê dibîne, demokrasiyê dinase û fêrî rêgezên demokrasiyê dibe. Li gel perwerdeya ji malbat û dibistanê fêr dibin, pîvana demokrasiyê dinasin.

Ji ber ku şaristanî û dewlet li dijî demokrasiyê ne, ji bo demokratîkbûna civakê encax bi kesayet û mamosteyên demokrat perwerdeyeke demokratîk gengaz e. Bi vê boneyê,



pêwîst e mamoste têra xwe demokrat be, rêgezên demokrasiyê û şêweyê demokratbûnê baş bizane û di pêkanînê de, li ber çavên zarokan pêk bîne. Da ku zarok jî fêrî jiyana demokratîk bibin.

## Wateya Peyvan

**Demokrasî:** Rêveberiya gel.
**Vîn:** Îrade.
**Destûr:** Îzin, rê û rêçik.
**Polîtîka:** Ramyarî, siyaset, hunera birêvebirina civakê.

## Em Têbigihin

**1-** Demokrasiya rast çi ye?
**2-** Demokrasî ji kû derê dest pê dike?
**3-** Demokrasî ji bo mirovan çi dide qezenckirin?

## Rêziman

**1-** Ew peyvên ku li şûna navan tên bikaranîn û cihê nav digirin, **cînavk** in.

Gelek cureyên cînavkan hene, hinek ji wan ev in:

**a- Cînavkên kesane b-**
**Cînavkên şanîdanê**

**a- Cînavkên kesane:** Ew cînavk in ku cihê navên kesan digirin.

Cînavkên kesane, di nava xwe de dibin du beş:

**1- Cînavkên xwerû:**

Ez, tu, ew, em, hûn, ew

**2- Cînavkên tewandî:**

Min, te, wî/wê, me, we, wan

**Mînak:**

**Ez** çûm dibistanê.
**Min** pirtûk nivîsî.
**Te** xwarin xwar.
**Tu** alîkariya min dikî.
**We** karê xwe qedand?
**Hûn** kengî tên malê?

**b- Cînavkên şanîdanê:** Ew cînavk in ku li şûna navan, bi nîşandanê heyînan diyar dikin.

Cînavkên şanîdanê, di nav xwe de dibin du beş:

**1- Cînavkên şanîdanê yên xwerû:** ev, ew

**2- Cînavkên şanîdanê yên tewandî:** vî, vê, van, wê, wî, wan

**Mînak:**

**Ev** baş dinivîse.
**Vî** pirtûk xwend.
**Vê** name nivîsî.
**Ew** şervan e.

**Wî** karê malê çênekir.
**Wê** alîkarî neda min.
**Van** dibistana xwe paqij dikir.
**Wan** al hilda.

## Hîndarî

**1-** Wateya peyva cînavk çi ye?
**2-** Sê  hevokan binivîsin, tê de  cînavkên kesane û şanîdanê bi kar bînin.

WANE 5

# ÇANDA BERBIRÎ

Her neteweyek xwedî çandeke taybet e. Ji hemder û bermahiyên gel ên hevpar re çanda gel tê gotin.
Gelên xwedî derfet, her dem hewl dane ku çanda xwe li gorî demê pêş bixin û nûjen bikin.
Gelên welatên bindest û di bin dagirkeriyê de mane, nekarîne çand û toreyên xwe jî ji bin darê dagirkeriyê rizgar bikin. Çawa berhemên serxak û binxak hatine talankirin, çand û tore jî hatine talankirin.
Bo mînak: Modeya porçêkirina gelê kurd a kevnar, di modeya porçêkirina Ewrûpa û Emerîkaya nûjen de veşartî ye.
**Mînak:** Modeya Dorik, berê kurdan kum datanîn ser serê xwe, beşa ku ji kum û berjêr ve maye bi cûzanê kur dikirin.



Modeya Temerî: Tevayî serê xwe kur dikirin, tenê pêşenî dihîştin û jê re digotin temerî.
Modeya cênik û temerî: Serî bi temamî kur dikirin, tenê beşa pêşenî û cênik pêk ve dihîştin jê re digotin cênik û temerî. Navê wê modeyê jî niha kirine modeya emerîkî û ewrûpî.
Stranbêjek, di strana xwe de wiha dibêje:
"Nîşana ro û rûbaran, dehl û bîn e.
Nîşana keçikên kurdan, du bisk û çar kezîn e.

Nîşana me kurikên kurdan, cênik û temerî ne."

(Gelêrî)

Ev cure stran, ji beşa payîzokan e.

## Wateya Peyvan

**Cûzan:** Gûzan, dûzan.
**Temerî:** Tûncika por, pêşeniya por.
**Bisk:** Pora dirêj a cênîkên jinan.
**Payîzok:** Stranên payîzan tên gotin.

## Em Têbigihin

**1-** Em, çawa dikarin çanda xwe biparêzin?
**2-** Dorik, çi modeya porkurkirinê ye ?
**3-** Temerî çi ye?

## Rêziman

**1- Nîşaneya dunikê ( " " ):** ji bo balkişandina hin peyvan û dema ku nivîsek an jî gotinek ji cihekî weke heye tê girtin, tê bikaranîn.
**Mînak**:
Em, bi zimanê "dayîka xwe yê şirîn" dixwînîn.
Abdulah Ocelan, dibêje: "Asta pêşketina ziman, asta pêşketina jiyanê ye."
2- Navên roj û cejnên taybet bi tîpên mezin tên nivîsîn.
**Mînak:**
21'ê **A**darê cejna **N**ewrozê ye.
**Ç**arşema **S**or, çareşema yekem a sala kurdî ye.
**C**ejna **Q**urbanê cejneke olî ye.

## WANE 6

# SINC



Ji bo kes û civakan sinc têgeha herî girîng e. Sinc, havênê herî bingehîn ê civakîbûnê ye. Civak, bê sinc nikare bijî. Sinc, pîvanên gelan ên nenivîskî ne. Ev jî, bi rêbazên herî baş, pîvanên giştî yên ku civak diparêze û dipejirîne. Bi demê re ev kevneşopî û tore, dibin sincê civakê.

Bi vê boneyê, di perwerdeya zarok û ciwanan de zanista herî girîng a civakîbûnê sinc e. Reftar û sincê xwendekaran, pîvana herî girîng a kesayeta wan e. Zarokên bisinc di saziyên perwerdeyê, çand û jiyana civakê de, dikarin bi xweşî, asayî û hevaltiyê

bi hev re bikin û bijîn. Ji bo vê, pergalên desthilatdar bê navber êrîşî sincê civakê dikin.

Perwerdeya bisinc kesên bisinc diafirîne. kesên bi sinc malbatên bi sinc diafirînin. Malbatên bi sinc jî civakên bi sinc diafirînin. Bi vî awayî, civak jiyana xwe berdewam dike û bi pêş ve diçe.

## Wateya Peyvan

**Havên:** Hevîrtirş, hêvin, heyvan.
**Reftar:** Danûstendin
**Kevneşopî:** Tore
**Afirandin:** Xuliqandin

## Em Têbigihin

**1-** Dema ku peyva sinc tê gotin, hûn çi têdigihîjin? **3-** Li gorî mijarê sinc çi ye?
**4-** Perwerdeya bisinc kesayeteke çawa diafirîne?

## Hîndarî

**1-** Li ser sincê civakê, lêkolînê bikin.
**2-** Destnivîsa li jêr, di lênûsa xwe de binivîsin.

**QENCTIRÎN EW E YÊ KU SINCÊ WÎ QENC BE…**

**WANE 7**

# REXNE Û REXNEDAYÎN




Waneya me zimanê kurdî bû. Hemû xwendekar di refê de rûniştibûn. Cûdî jî li ser mêzeya dawî rûniştibû. Destên xwe dabûn ber lamên xwe, bi xemgînî li lênûsa xwe dinêrî. Di wê kêliyê de mamosteya me bi dengekî nazik got:

- Cûdî, çima tu ew qas kûr dihizirî û xemgîn bûyî?

Min tu dişopandî, lê mixabin bala te qet ne li ser waneyê ye. Ka bêje çi çêbûye?

Cûdî, bi kelegirî got:

- Mamoste, me îro li baxçeyê dibistanê ji xwe re dilîst. Di dema lîstinê de, min dehfek li Sîpanî da û ez reviyam. Hema di wê navberê de Jiyan hat pêşiya min, destê min girt û got: "Cûdî, wisa nabe. Ev tevgerên ku te li beramberî Sîpanî kirine şaş in, divê bêyî ku em hev û du biêşînin, em ji xwe re bilîzin. Ji

ber van nêzîkatiyan, ez te rexne dikim, hêvîdar im tu lêborîna xwe ji hevalê xwe Sîpanî bixwazî".

Mamoste bi rûkenî, li Cûdî meyzand û got:
- Belê Cûdî, Jiyanê tiştekî pir baş û rast gotiye. Cûdî tu dizanî, rexne û rexnedayîn rêbaza çareserkirina hemû şaşî û xerabiyên kesî û civakî ne. Ji ber ku bi riya rexne û rexnedayînê, em zûtir şaşî û kêmasiyên xwe dibînin. Divê tu bi vê nêzîkatiya Jiyanê kêfxweş bibî.
Xwendekarên hêja, gelek caran di jiyana perwerdeyê de, kêmasî û pirsgirêkên xwendekar û endamên perwerdeyê çêdibin. Digihîjin asta ku mirov neçar dimîne. Sedema wê ya sereke ew e ku xwendekarên me, ji kêmasiyên hev re çavên xwe digirin. An jî, lihevhatineke kêmasiyan çêdibe. Bêguman, ev nêzîkatiyên bi vî awayî, ji derveyî pîvanên hevaltiyeke rast in. Ev fêrbûn û nêzîkatiyeke şaş e. Heta bandora xwe li şêweyê avakirina malbat û civakê jî dike.
Belê xwedekarên hêja, tiştê ku hevala we Jiyanê raber kiriye di cih de ye. Pêwîst e hûn hemû şaştiyên hevalên xwe rexne bikin. Lê di dema rexne û rexnedayînê de, pêdivî bi şêwazê rêzgirtin û rêzdayînê jî heye. Pêwîst e kesê ku rexne lê tê kirin jî rexneyê ji bo xwe weke hezkirin û şîreteke rast bibîne.
Cûdî li ser gotin û şîretên mamosteya xwe hizirî û got:

Spas dikim mamosteya hêja, min rexne û rexnedayîn

bi vî awayî fêm nedikir. We riyeke rast nîşanî me da, li beramberî we hemûyan ez lêborîna xwe ji Sîpan û Jiyanê dixwazim. Di wê baweriyê de bin ku ev şaşîtî, dê careke din dubare nebe.

Mamoste got:

- Her bijî, ji te re Cûdî, ez kêfxweş bûm ku te şaşîtiya xwe nasî û lêborîna xwe ji hevalên xwe xwest.

## Wateya Peyvan

**Rexne:** Diyarkirina şaşiyên kirinekê.
**Rexnedayîn:** Di kiryarên ku kirine de kêmasiyên xwe anîna ziman.
**Şêwe:** Awa

## Em Têbigihin

**1-** Rexnekirin çawa çêdibe?
**2-** Rexne, bi çi armancê tê kirin?
**3-** Pêwîst e, em li hemberî rexne û rexnedanê çawa bin?

## Rêziman

**Lêker:** Peyvên ku kar, tevger û rewşekê diyar dikin, lêker in.

**Mînak:**

Bîrhat **çû** dibistanê.
Xebat **ket** avê.
Zîlan pirtûkê **dixwîne**.
Şervan **bezî** gogê.


## Hîndarî

**-** Hûn jî pênc hevokên ku lêker tê de hebin, di lênûsa xwe de binivîsin.

WANE 8

# BEYTA CINDÎ

**Cindiyo rabe roj e**
**Bes vê xewê hindoj e**
**Xewa berê sibê zor edab û doj e**



**Cindiyo rabe rabe**
**Bes bi vê xewê tu şabe**
**Xewa berê sibê zor ezab e**

**Rabe ji xewêt şirîn e**
**Bes gorê teng bibîne**
**Feqîr dibê kerbin dibê kîn e**

**Rabe ji xewê tarî ye**
**Xew heram dibû li cindî ye**
**Wê li xwedanêd maşan û cembeqî ye**



**Rabe ji xewê sibeh e**
**Xew heram dibû medeh e**
**Wê li xwedanêd xerqeh e**

**Rabe ji xewê hingora**
**Xew heram dibû li zora**
**Wê li xwedanêd xerqêd bimûra**

*Ji Qewlê Êzidiyan*

## Wateya Peyvan

**Hindoje:** Biponije
**Edab:** Kul, zox, îltîhap
**Dojeh:** Cehenem
**Ezab:** Êş
**Kerb:** Kîn
**Meaş:** Mûçe
**Medeh:** Dem
**Xerqeh:** Eba, bergek taybet ên zana û pêxemberan. **Bimûra:** Morîdar, morîkirî

## Em Têbigihin

**1-** Ev helbest, pesnê çi dide?
**2-** Ev helbest, ji kîjan cûreyê helbestan e?

## Rêziman

**1-** Hûn fêr bûbûn ku qafiye dibe sê beş.
**2-** Di helbesta we xwendî de, piştî qafiyê ahengek lê zêde bûye? Ji vê ahenga li pişt qafiyê re **redîf** tê gotin.

Cindiyo rabe rab**e**
Bes bi vê xewê tu şab**e**
Xewa berê sibê zor ezab **e**

Dema em malika li jor temaşe dikin, em dibînin ku qertafa "**e**" ya li dawiya rêzikan hatiye dubarekirin, **redîf** e. Di heman demê de li pêşiya

redîfê ahenga “**ab**” ji bo lihevhatina qafiyeyê hatiye sazûmankirin.


## Hîndarî

**1-** Hûn jî redîfa malikên din nîşan bidin.
**2-** Malika li jêr, bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsîn.

**Cindiyo rabe roj e**
**Bes vê xewê hindoj e**
**Xewa berê sibê zor edab û doj e**


**WANE 9**

# NIVÎSÎN



Weke tê zanîn, dema ku mirovan xwendin û nivîsîn nedizanîn, hemû hest - raman di bîra mirovan de veşartî bûn. Zanîn, agahdarî - danûstendina mirovan bi saya tejaneya mirovan pêk dihat. Ango mirov, pirtûkeke zindî bû.

Bi demê re mirov dimirin, lê bawerî, raman û agahiyên wan di tejaneyan de dijîn. Ji nifşekî derbasî nifşê din dibin. Dema ku ev bi devan derbasî devan dibûn, dihatin guhertin. Hinek agahî û zanîn, dihatin jibîrkirin û hinek jî dihatin zêdekirin.



Peydakirina nivîsê ya ji pênc hezar salî zêdetir e ku di dîroka jiyana mirovahiyê de bûye berhemeke herî girîng a jiyanî. Mirovan li hemberî lewaziya hiş a jibîrkirinê çareya herî binirx peyda kir. Li gel nivîsê parastina zanîn, hest, raman û jirêderxistina bûyeran jî pêk hat.

Bes mirov yekser fêrî nivîsê nebûne. Pêşî li ser dîwarên şkeftan, li ser teht û keviran wêneyên

bûyerên ku hatine jiyîn, çêdikirin. Ew wêneyên ku ji demên herî kevin mane îro jî di şkeftan de hene, lê tam wateya nivîsê nadin.

Bi demê re, bi pêşxistina van wêne û nîgaran re awênên (ideogirafik) nivîsê derketin holê. Li gorî dîrokzan diyar dikin, ev awênê nivîsê di dema Sumeriyan de pêş ketiye.

## Wateya Peyvan

**Bîr**: Hiş
**Nifş:** Cîl, tuxum
**Zanist:** Zanîn
**Awên:** Şikil

## Em Têbigihin

**1-** Nivisîn çi ye?
**2-** Derketina nivîsê ji bo mirovahiyê çi daye qezenckirin?
**3-** Ji beriya derketina nivîsê, mirovan bi çi awayî hest û ramanên xwe anîne ziman?

## Rêziman

**1-** Peyvên "hat, diçim, ket, anî, bezî, dixwînim, nivîsî…" lêker in.
**Mînak:**
Bîrhat **hat** dibistanê.
Xebat **diçe** geştê.
Mizgîn **ket** avê.

Mizgînê **anî** malê.
Şervan **bezî** gokê.
Zîlan pirtûkê **dixwîne**.
Peyman dê nameyekê **binivîse.**

**2**- Xêzika xwehr **(/)** di navnîşanan de, ji bo diyarkirina kolan, tax, bajar û navçeyan tê bikaranîn.

**Mînak**:
Efrîn/Qamişlo
Kolana 6/Taxa Şehîd Bêrîtan

## Hîndarî

**1-** Hûn jî sê hevokan di lênûsa xwe de binivîsin û lêkerên wan nîşan bidin.
**2-** Hûn jî hinek rêzepeyvan binivîsin û xêzika xwehr tê de bi kar bînin.

**WANE 10**

# GULBIHAR



Gulbihar gula biharê
Tu xeml û rewşa adarê
Her sal wek îro li darê
Gulbihar rewşa adarê

Çîçek û gul û nesrîn e
Nêrgiz û lal û gulçîn e
Sînem û kal soninî ne
Gulbihar rewşa adarê

Sorgul û rîhan, bi bîn in
Binefş û Çîmen şirîn in
Li ba yara xemrevîn in
Gulbihar rewşa adarê

Xemrevîna dildaran tu
Serwera evîndaran tu
Dilkuştiyê ciwanan tu
Gulbihar rewşa adarê.

WANE 11

# BERPIRSIYARÎ



Berpirsiyarî, xwedîderketina li xwe, kesayet û civakê ye.

Xwedîderketina li hemû nirx, kar û xebatên mirovahiyê ye.

Her çi qas li gorî zagon û pîvanên ol û civakan berpirsiyarî ji temenê hejdeh salî dest pê dike, lê li gorî zagon û pîvanên xwezayî berpirsiyarî jî wekî hemû rêgezên din, ji zarokatiyê dest pê dike. Her zarok, li gorî asta xwe di ber xweza, derdor û civaka xwe de berpirsiyar e. Ji ber ku em endamê vê civakê ne, divê em biparêzin.

Ji ber vê yêkê, dema ku temenê zarok dibe heft salî ji xwarin, vexwarin, paqijî û fêrbûna xwendin û nivîsê berpirsiyar e. Her ku temenê zarok mezintir dibe, bi awayekî xwezayî berpirsiyarî jî zêdetir dibe. Her wiha, zarok ji temenê deh salî derbas dibe, êdî berpirsiyariya pêşxistina kesî û xwedîderketina li gelek nirxên civakî xwe didin pêş. Êdî li pêşberî

malbat, dayîk û bav, mamoste, heval û hogirên xwe berpirsiyar e.

Dema ku zarok dikeve temenê ciwaniyê, ango rewşa temambûnê, êdî dibe dema hilbijartina çawa jiyînê. Di vî temenê ciwaniyê de berpirsiyariya malbat, civak, netewe û pîşe dikeve ser milan. Li gorî vê, ji ciwanan tê xwestin ku erka xwe hilbijêrin û berpirsiyariya xwe bizanin û pêk bînin.



## Wateya Peyvan

**Zagon:** Qanûn
**Temen:** Jî, emir
**Hogir:** heval, dost
**Pîşe:** Karê ku mirov dike.

## Em Têbigihin

**1-** Berpirsiyarî çi ye?
**2-** Em çawa dikarin, barê hevalê xwe sivik bikin?
**3-** Berpirsiyariyên xwendekar ên li dibistanê çi ne?

## Rêziman

**Daçek:** Ew peyv in ku bi tena serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokan ji aliyê wateyê ve sergihayî û temam dikin.
Bi daçekên bingehîn re paşdaçek jî tên bikaranîn. Paşdaçek: "re - ve - de"
Li ... paşdaçekan nagire.
Bi ... re, ve, de
Ji ... re, ve
Di ... re, de
**Mînak:**
Berpirsyarî xwedîderketina **li** nirxên civakî ye. Em **bi** berpirsyarî tev digerin.
Ew ber **bi** me **de** tê.
Xemgîn **bi** bavê xwe **re** kar dike.
Sêvên sor **bi** darê **ve** ne.
Dilva **ji** Tirbespiyê ye.
**Ji** duh **ve** çûye gund.
Min **ji** te **re** got.
Hemû zarokên **di** vê refê **de** zîrek in. Ew **di** ser pirê **re** derbas bûn.

## Hîndarî

**1-** Hûn jî pênc hevokan binivîsin û daçekan tê de bi kar bînin.

**WANE 12**

# RÊWÎTIYA XEYALÊN ZAROKATIYÊ

Ji demsalan bihar bû, ji ber ku xewa demsala biharê bê navber xweş û bedew bû, hêj êvarî di xew re çûm û ketim nava rêwîtiya xeyalên zarokatiya xwe yên bêdawî. Dema ku mirov dikeve nava rêwîtiya xeyalên xwe yên zarokatî, du hêmanên bingehîn li pêşiya mirov zindî dibin; ya yekem xemgînî, ya duyem jî dilşadbûn bû.

Malbata min a koçer, xwedî pez bû. Her sal em diçûn zozanên xwe. Dema ku me pezê xwe dibir Çiyayê Kezwanan, bilindbûna Çiyayê Kezwanan, bedewbûna gul û kulîlkên çiya, bayê berbanga sibehê li hinarokên rûyê min dida, hêdî ji xwe re rûdiniştim û min dilorand. Dema ku bêhna xwezayê li min dida, ez jê têr nedibûm.



Dema ku min pezê xwe kom dikir, berê xwe dida cihê bêriyê, dema digihîştim cihê bêriyê, min hemû rêz dikirin, min serê wan digirt, dayîk û bavê min pez didotin. Piştre min û dayîka xwe di bin konê reş de bi siyabûya zozanên Kezwanan penêr çêdikir.

Me penêrê xwe dikir iyarên pêz û ji bo zivistanê radikir. Ez hêj di temenekî biçûk de fêrî jiyana koçeriya xwezayî bûm. Serê sibehê ji ber dengên çûk û teyran em ji xewê şiyar dibûn. Li gel van dengên xwezayî û zozanên şirîn û bedew, dengê bilûra şivanan bi dilşadiyeke cudatir ez hestiyar dikirim.

Dema dengê bilûrê dihat min, hemû rengên biharê yên xweşik digirt nav xwe û min nedikarî di cihê xwe de rawestim. Me tu carî nedixwest ji ber xweşikbûna wê em berê xwe bidin deştê.

*Jiyan Botan*



# HÎNDARÎ 3

**1- Berpirsiyarî ji kîjan temenî dest pê dike**?

**a-** Ji zarokatî
**b-** Ji ciwaniyê
**c-** Ji kalbûnê
**d-** Ji dibistanê

**2- Berpirsiyarî çi ye?**

**a-** Ji xwe hezkirin e **b-**
Ji hemû karan rev e **c-**
Ji her tiştî axaftin e
**d-** Xwedîderketina li xwe, kesayetî û civakê ye.

**3- Li gorî zagonên heyî, berpirsiyarî kengî dest pê dike?**

**a-** Ji temenê çar salî
**b-** Ji temenê hejdeh salî
**c-** Ji temenê bîst salî
**d-** Ji temenê sih salî

**4- Ji vebijêrkên li jêr kîjan cînavkên kesane ne?**

**a-** ez, em, hûn
**b-** ez, hûn, vî
**c-** min, vê, lê
c- me, wan, wek

**5- Hevokên li jêr ên rast bi tîpa (R), ên şaş jî bi tîpa (Ş) binivîsin.**

a- **"me, te, tu**" cînavkên şanîdanê ne. (...)
**b-** Di hevoka "**Şervan pir dixwîne"** de lêker heye. (...)
**c- "di, de, ji"** daçek in. (...)
**d-** Xêzeka xwehr di navbera roj, meh û salan de tê bikaranîn. (...)

**7- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.**

| | |
|---|---|
| **vîn** | **hevçax** |
| **şêwe** | **îrade** |
| **nirx** | **awa** |
| **hemdem** | **kîn** |
| **kerb** | **biha** |

# BEŞA 4


1- Newroz
2- Jin û jiyan
3- Salvegera rojnameya kurdî
4- Welatê me
5- Dara azadiyê
6- Rûmetdayîn û parastina nirxan
7- Kulîlkên biharê
8- Cejna karkeran
9- Ey reqîb

**WANE 1**

# NEWROZ



Ey Newroz, roja şirîn û pîroz
Cejn û sersal, tu roja pîroz
Bi hatina te, bîranî balyoz
Gelê me dibêje, Newroz e pîroz…

Weke tê zanîn, di dîroka mirovahiyê de her neteweyek xwediyê rojên taybet e û wan rojan pîroz dike. Çi rojên olî, çi civakî, çi neteweyî û çi xwezayî bin, li gorî çêbûn û rûdanên di wan rojan de, ew roj bi nirx bûne û hatine pîrozkirin.

Newroz jî, yek ji wan rojên ku di Rojhilata Navîn de, di nava gelê kurd de bi taybetî tê pîrozkirin. Newroz di nava gelê kurd de, hem cejneke neteweyî, hem olî, hem sersal û hem jî sembola serkeftinê ye. Newroz roja berxwedan û

azadiyê ye. Roja ku dawî li zilmê anîn û destpêka azadbûnê ye.

Lewre ji wê rojê û pê de tarî kêm dibe, ronahî zêde dibe, reşî û nexweşiya zivistanê bi dawî dibe, xweşî û ronahiya biharê dest pê dike. Asta têkoşîn û berxwedanê di vê rojê de bi agirê Newrozê bilind dibe. Ev roj, ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn bûye hêviya azadiyê û bi taybetî, ji bo gelê kurd vedigere roja berxwedan û azadbûnê.

Van gelan, li gorî xwezaya Mezopotamyayê, ev roj ji xwe re kiriye sersal. Heta roja îro jî gelê kurd vê rojê weke cejn, sersal û sembola serketin û berxwedanê pîroz dikin.

## Wateya Peyvan

**Newroz:** Nîroz, Roja nû, Nûroz
**Rûdan:** Çêbûn, qewimîn
**Sembol:** Nîşan, hêma
**Mezopotamya:** Navbera Dîcle û Firat

## Em Têbigihin

**1-** Newroz çi ye?
**2-** Cejna Newrozê di nava kîjan gelan de tê pîrozkirin?
**3-** Çima Newroz tê pîrozkirin?

## Rêziman

**1-** Ji peyv û rêzepeyvên ku bi hev re tên bikaranîn û raman û nûçeyekê didin re **hevok** tê gotin.

Hevok, li gorî sazûmaniya xwe dibin du beş:

**a- Hevokên lêkerî b-**
**Hevokên navdêrî**

**a- Hevokên lêkerî:** Ew hevokên ku kar û bûyerek tê de hebe ji wan re **hevokên lêkerî** tê gotin.

**Mînak:**
Dilgeş dar **birî.**
Karker av **vexwar.**
Diljîn **hat.**

**b- Hevokên navdêrî:** Ew hevokên ku rewşek tê de heye ji wan re **hevokên navdêrî** tên gotin.

**Mînak:**
Ev sêv **sor e.**
Zozan pir **nexweş e.**
Azad **jîr e.**

## Hîndarî

**1-** Hûn jî du hevokên lêkerî û navdêrî saz bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.
**2-** Cudahiya di navbera hevokên **lêkerî** û **navdêrî** de rave bikin.
**3-** Hûn jî kurtemijarekê li ser cejna Newrozê binivîsin.

WANE 2

# JIN Û JIYAN

Di kurdî de peyvên "jin-jîn-jiyan" heman wateyê didin. Jîn, sedem û berdewamkirina civakê ye. Ev jî, dide diyarkirin ku jinê bingehê civakîbûnê daye avakirin û afirandin. Civakîbûn, li dora jinê pêş ketiye.




Dema mirov li dîrok û qonaxên civakan dinêre, di qonaxên despêkê yên avakirina civakîbûnê de, jinan risteke sereke lîstiye û di nava civakan de, erkên herî bilind heta navlêkirina xwedawendiyê stendiye. Weke Star, Înana bi vê boneyê demeke herî dirêj bi xwezayî rêbaza çanda dayîktiyê berdewam kiriye.

Jin, yekem afirînera çandinî û kedîkirina lawiran e. Di heman demê de vedîtinên yekem ên giştî amûrên çandinî û jiyanî afirandine. Pêşengî ji şoreşa zimên re kiriye. Vê civaka xwezayî ya ku bingehê wê li ser azadî, wekhevî, biratî û demokrasiya rasterast hatiye sazûmankirin, di

demeke pir dirêj de berdewam kiriye û heta roja me jî bi bandor e.

Li hemberî vê jiyana civakî ya xwezayî, yekîtiya zilamên pîr, şaman û leşkerên bihêz, li ser bingehê fêlbaziyê û çanda nêçîrvaniyê xwe ferz kir, li şûna civaka xwezayî, civakeke li ser bingehê desthilatdariyê dest pê kir. Di encama têkoşîneke demdirêj de sazûmaniya baviksalarî (desthilatdariya zilêm) tê avakirin. Êdî bi qonaxên cur bi cur re stemkariya zilam bi desthilatdariyê ve sînordar nema. Her tiştên jinê ji dest derxistin, jin û civak kirin kole. Jin, bi giştî ji qadên jiyana civakî hatin dûrxistin.



Vê newekheviya bêhempa ya di nava zayendan de, heta çerxa 21’ê berdewam kir. Piştî derketina jinên têkoşerên azadiyê yên ku bi bîrdozî û felsefeya jiyanê ya feylezofê çerxa 20 û 21'ê, êdî li cîhanê, bi giştî jî li Rojhelata Navîn, bi taybetî rewşa jinan ber bi reseniya xwe ya xwezayî ve hat guhertin.



"Azadiya jinê, azadiya civakê ye. Jina azad, civaka azad diafirîne." Lê azadiya ku qala wê tê kirin, encex wê bi têkoşîna lehengên weke Zîlan, Şîlan, Viyan, Jîn, Bêrîvan û hwd. bê bidestxistin.



## Wateya Peyvan

**Dayîktî:** Dema sazûmaniya dayîkê
**Çerx:** Sedsal
**Baviksalarî:** Serdema deshilatdariya zilêm
**Bîrdozî:** Raman, ideolojî
**Feylezof:** Kesê ku bi felsefê re mijûl dibe
**Resen:** Esîl, orjînal
**Afirîner:** Çêker, avaker, dahênan
**Qonax:** Demên dîrokî (merhele)

## Em Têbigihin

**1-**Wateya dayîktiyê çi ye?
**2-**Çima dibêjin: "Jina azad, civaka azad diafirîne?"
**3-** Afirînera yekem a çandiniyê kî ye?

## Rêziman

**Kirde:** Ji hêmana ku bi kar radibe re kirde tê gotin.
**Mînak:**
**Jinê** bingehê civakbûnê ava
kiriye. **Jinan** risteke sereke lîstiye.
**Gelê kurd** Newrozê pîroz dike.
**Bireser:** Ji hêmana ku kar li ser tê kirin re bireser tê gotin.
Mihemed Şêxo **stranan** dibêje.
Kurdan **agir** geş kir.
Jinê **jiyan** afirand.

**Zarok nirxên civakî diparêzin**

Kirde bireser pêveber

## Hîndarî

**1-** Hûn jî çend hevokan binivîsin û kirde, bireser û lêkerên wan diyar bikin.
2- Wateya peyvên 'jin-jîn-jiyan' ji mamosteyê xwe fêr bibin.

**WANE 3**

# SALVEGERA ROJNAMEYA KURDÎ

Bîst û dudwê nîsanê
Ronî daye gulanê
Ava çeman xurt dibe
Mizgînî da cîhanê


KURDISTAN

Çanda kurdî dest pê kir
Hozan bêrya ristê kir
Rojname dihate der
Gazî li xuristê kir

Ey xurista ker û lal
Te roj li min kirin sal
Evîn li min geş bûye
Êdî nema diçim mal

Ez im kenê biçûka
Xemla zava û bûka
Ez qêrîna Helebçe
Li kolan û li sûka

Miqdad Midhet Bedirxan
Cegerxwîn û Ordîxan
Lehî li min rakirin
Bûm dermanê nesaxan

Ez evîna lawa me
Hêza dilê Kawa me
Keçik rewşa dîlanê
Ez awira çava me…

***Tîrêj***

## Wateya Peyvan

**Xurist**: Xweza
**Rist**: Rol
**Mîqdad Midhet Bedirxan:** Nivîskarê ku Rojnameya Kurdistan derxistiye.
**Ordîxan**: Ordîxanê Celîl nivîskarekî Kurd e, ji Ermenîstanê ye.

## Rêziman

**1-** Curên qafiyeya helbesta li jor, diyar bikin.
**2-** Bikaranîna tîpên mezin:
**a- Hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.**
**-G**otinên dapîr û bapîran rûmetên neteweyî ne.
**b- Piştî cotxalê hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.**
- Rêzan got**: D**ivê em biçin dibistanê.
- Serhat got**:** "**X**wendekar wê biçin geştê."
**c- Heke piştî cotxalê mînak ne di rewşa hevokê de be, bi tîpên biçûk tên destpêkirin.**
- Ew navên komekî yên ji heyînan re tên bikaranîn **navên giştî** tê gotin.
Wekî**: p**ênûs, **j**êbir…
**d- Piştî pirsnîşanê hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.**
- Ma ji azadiyê xweştir çi heye? **X**weşiya azadiyê têbigihînin.
**e- Piştî baneşanê hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.**
- Hevalino! **E**rka we ya destpêkê, parastina welat e.
**f- Rêzik bi tîpa mezin dest pê dike.**

**-E**z naçim dîwana mîra **N**açim
şar û rêkoçk û sera **B**ila li min
xin kêr û xenceran **F**eqiyê
Teyran tengezarê dila

**g- Nav û paşnavên kesan bi tîpa mezin dest pê dikin**.

**G**abar **F**ereşîn
**K**ovan **C**ûdî

## Hîndarî

**1-** Helbestê ji ber bikin û di refê de ji hevalên xwe re bixwînin.


**2-** Hûn jî çend hevokan saz bikin ku tîpa mezin tê de hatibe bikaranîn.

**WANE 4**

# WELATÊ ME

Welat, cih û warê bûyîn û jîndariya mirovan e. Pêwîst e her mirovek welatê xwe binase. Ji ber ku tiştekî mirov nenase, jê hezkirin jî çênabe. Dema ku mirov ji tiştekî hez neke jî, mirov nikare ji dil biparêze. Weke ku ji dîroka civakan tê zanîn, piştî ku her koma mirov li ser xakeke taybet, niştecihbûn û jiyan, têgeha welat derketiye holê. Piştî derketina çand, tore û zimanên cur bi cur, têgeha netewe xwe daye pêş û ji her neteweyekê, yan ji çend neteweyên têkel re welatekî diyar, hatiye nasîn. Kesên di nava van welatên diyar de, dijîn ji wan re hemwelatî tê gotin.

Weke hemû gel û civakan, gelê kurd jî li ser xakeke diyar niştecih bûye û navê wê xaka diyar jî bûye “Kurdistan", ango welatê kurdan. Bi vê boneyê, gelek dengbêj, hunermend û hozan di gotin û nivîsên xwe de"welatê me Kurdistan e" anîne ziman. Li gelek deveran, li şûna peyva welat "dayîk, evîndar, delal" hatiye bikaranîn. Ji ber ku gelê kurd ji welatê xwe pir hez kiriye, ev gotinên li jor bi kar anîne.




Welatê me "Kurdistan" welatekî ku ji hemû aliyên xwe ve pir dewlemend, di xwezaya xwe de jî welatekî pir bedew, xweş û şirîn e. Ji ber ku li gorî herêman, welatekî ji deşt, bêlan, daristan, zozan û çiyayan pêk hatiye. Ji aliyê kanî, ro û rûbarên avê de jî welatê herî dewlemend e. Ji aliyê kanza û berhemên xwe yên binerd ve jî xwediyê dewlemendiyekê ye.

Ji ber vê bedewî, xweşikbûn û dewlemendiya xwezaya welatê me, her dem bûye cihê êrîş û dagirkirina hêzên şaristaniya navendî.



## Wateyên Peyvan

**Bûyîn:** Çêbûn, peydabûn.
**Kanza:** Me'den
**Bedew:** Delal
**Bêlan:** Berî

## Em Têbigihin

**1-** Welat çi ye?
**2-** Hemwelatî çi ye?
**3-** Dewlemendiyên welatê xwe rêz bikin.

## Rêziman

**1- Dema niha:** dema ku karek di dema niha de tê kirin.

**Mînak:**

Em ji welatê xwe **hez dikin**.
Zarokên me bi zimanê xwe **dixwînin**.
Ne her tiştê **diçirse**, zêr e.

**2-** Di rêzimana kurdî de, dema du tîpên dengdêr li pey hev bên, yek dikare sivik bibe.

**Mînak:**

Diafirîne- Dafirîne
Biîne- Bîne
Diaxive- daxive
Biajo- Bajo

## Hîndarî

**1-** Hûn jî çend hevokan di dema niha de saz bikin.
**2-** Hûn jî çend peyvên ku du tîpên dengdêr li pey hev hatine peyda bikin.

**WANE 5**

# DARA AZADIYÊ



Min xwest dareke azadiyê biçînim. Ez bi salên dûvdirêj li şitla vê dara azadiyê geriyam. Piştî lêgerîna salên dirêj, min destan û çîrokên berxwedanvaniyê kom kirin. Min şitla vê darê ji ramanên ciwanên xwendekar peyda kir.

Ji bo çandiniya vê dara azadiyê, min axa wê ji nava xaka berxwedêrên zindanan anî û ev şitil li serê çiya û zozanên Kurdistanê çand. Her roj şitla vê darê, bi ked, fedekarî û xwehdana têkoşîna şoreşgeran şîn dibû. Lê, ji xwedîkirina wê re av pêwîst bû. Ez çûm, min dîroka têkoşîna azadiyê lêkolîn kir, dîrok bi xwîna pakrewanan hatibû xemilandin. Bi salan bi vê xwîna pakrewanan hat avdan, mezin bû, şax da, fireh bû. Şax û tayên wê pel dan û dar bilind bû, heta çû ber ezmanan! Gelek rewşenbîr, xwendekar û nivîskar

li ber siha wê darê rûniştin, xwendin, hizirîn û nivîsîn. Di roman, kovar, rojname û gotaran de behsa bedewî û xweşikbûna vê darê dikin. Her roman, gotar û çîroka ku li ser vê darê tê nivîsîn, xwêner zêde dibin û belav dibin.

Pelên wê tim bi bayê azadiyê dihejin. Rayên wê di nava xakê de asê û belav bûn. Bi vî awayî, her kes bi hebûna vê darê kêfxweş e. Şaxên vê darê ber bi Rojhilat, Rojava, Bakur û Başûr ve dirêj dibin.
Ciwanan berê xwe da vê darê. Keç û xortan li derdora dara azadiyê govend geş kir. Çavên dayîk û bavan ma li berhemdayîna vê darê. Ji her çar aliyên cîhanê ve gelên hejar, ber bi sîbera wê ve tên. Ji ber ku sîbera wê darê, xwe gihand hemû mirovan. Her kesî dixwest sûdê ji vê darê bigire…

Vê dara azadiyê fêkî û berhemên xwe da hemû gel, netewe û civakan. Zindîbûneke rengîn da xwezayê. Derdor bi awayê vê darê vegeriya bûkeke rengereng. Te digot qey deryaya herî pak û rengîn e.

Belê roja me ya îro Rojavayê Welêt bi berhemên vê darê şad bûye. Li dora vê darê, stranên ku xeml û bedewiya darê rave dikin dilorînin. Bilindbûna darê bi helbestan tê xemilandin. Hest û awazên welatê rojê, bi hebûna dara azadiyê şad dibin. Ev dar, ew qas şîn û xweşik e, tu caran hişk nabe.

## Wateya Peyvan

**Şax:** Tirh, Çiqê ter
**Rave:** Şîrove

## Em Têbigihin

**1-**Tovê dara azadiyê ji kû derê anî?
**2-**Kî li binê darê rûdiniştin û sûd jê digirtin?

## Rêziman

**Dema bê:** Ji karê ku hîn nehatiye kirin, lê dê were kirin re dema bê tê gotin.
**Mînak:**
Mizgîn dê nameyekê binivîse.
Di roja cejnê de em ê li şekiran bigerin.
Ez ê karê xwe bikim.
Hûn ê biçin sînemayê?

## Hîndarî

**1-** Hûn jî wateya dara azadiyê di lênûsa xwe de binivîsin
**2-** Gotina li jêr, bi awayê destnivîs di lênûsa xwe de binivîsin.

Leheng, berên bingehîn ên neteweyan in.

WANE 6

# RÛMETDAYÎN Û PARASTINA NIRXAN



Em dikarin nirxan bi çend mînakan vebêjin. Mînak: Nirxên civakî, neteweyî û kesî… pêwîst e mirov, bi taybetî xwendekar û ciwan li tevahî van nirxan xwedî derkevin û biparêzin. Heke mirov rûmetê nede nirxên heyî, tu rûmet ji keda wî û wê re jî nayê dayîn.

**Nirxên kesî:** Ew ked û berhêmên ku ji aliyê mirovan ve hatine afirandin û dayîn. Weke nivîsa berhemekê, berhema kedekê û hwd.

**Nirxên civakî:** Ew ked û berhemên ku çi heyberî û çi rewanî ji aliyê civakê ve di domana dîrokê de hatine pêşxistin. Mînak: Hizir, sinc, çand, ol û bawerî, huner, ziman, rêxistin û hwd.



**Nirxên neteweyî:** Her netewe û komên mirovan ên di cihekî de ku bi hev re dijîn, xwedî hin xalên hevpar in. Ev xalên girîng ew in ku bi xwîn û xwêdana neteweyekê hatine bidestxistin. Em ji wan re dibêjin nirxên neteweyî.

Weke mînak: şehîd, welat, al, ziman, bawerî, çand, dîrok, tore û hwd.

Xwedîderketina li tevahî van nirxan û yên weke van, erkên her kesî ne ku van nirxan weke rûmeta xwe bibînin, biparêzin û pêş bixin. Piştre nirxên kes, malbat, civak û neteweyên ji derveyî xwe re jî rêzdar bin û biparêzin. Lewre mirov xwe neparêze û li xwe xwedî dernekeve, mirov nikare li kesekî din jî xwedî derkeve û biparêze.



Bi taybetî xwedîderketin, parastin û pêşxistina nirxên heyberî û rewanî yên neteweyî, ji bo hemû nifşên mirovan şert e.

## Wateya Peyvan

**Heyberî:** Tiştê tê dîtin
**Rewanî:** Tiştê nayê dîtin, lê tê bawerkirin.
**Peywir:** Erk

## Em Têbigihin

**1-** Nirx çi ye?
**2-** Berpirsiyariyên me yên beramberî nirxên civakî çi ne?

## Rêziman

**Dema borî:** dema ku karek hatibe kirin û dem di ser re derbas bûbe.

**Mînak:**

Nermînê pirtûk **xwend**.
Azad ji dibistanê **hat**.
Me ala berxwedanê **hilda**.

## Hîndarî

**1-** Hûn jî çend nirxên kesî, neteweyî û civakî binivîsin.
**2-** Nirxên bingehîn ên mirovan, ji mamosteyê xwe fêr bibin.
**3-**Hûn jî çend hevokan di dema borî de saz bikin.

**WANE 7**

# KULÎLKÊN BIHARÊ



Havîn payîz zivistan
Em dê biçin dibistan
Dibistana kurdî ye
Mamostê wê cindî ye
Şal û şapik lewendî
Ka em pirs kin çi xwendî?
Mamoste hat efendî
Got min xwendî bi kurdî
Em kulîlkên vî gundî
Dê bixwînin bi kurdî
Bi kurdî bi kurdî
Bi kurdî….!
Zarok gulên bihara
Hêşîn dibin li her dera
Emanetên dê û bava
Perwerde kin wek şêra
Şirîn xweş e zimanê me
Îsbat dike hebûna me …



*Casimê Celîl*



## Wateya Peyvan

**Casimê Celîl:** Helbestvan û nivîskarê kurd ê ku li Ermenistanê jiyaye**.**
**Cindî:** Delal, spehî
**Şal û şapik:** Cil û bergên kurdî
**Lewendî:** Wiçikê dirêj ê kirasan
**Efendî:** Xweşmirov, rêzdar

## Em Têbigihin

**1-** Pênaseya helbestê çi ye?
**2-** Helbestvan, dixwaze çi bîne zimên?

## Rêziman

**1-** Helbest, li gorî sazûmaniya xwe dibin du beş. a- Helbestên bipîvan.
b- Helbestên serbest.
**a-Helbestên bipîvan:** Ew helbestên ku xwedî ahengiya pîvanên qafiye, redîf û wekheviya kiteyan .
**b- Helbestên serbest:** Ew helbestên ku ahengiya qafiye, redîf û wekheviya kiteyan tê de bingeh nayê girtin e.

**2-** Li cihê van hejmarên li jêr, nîşaneya pêwîst bi cih bikin?

Kesek li ser rewşa biraziyê xwe wiha dipeyive(**1**) Na na(**2**) Nabe(**3**) Divê ez biraziyê xwe biparêzim(**4**) Jixwe zarokên min nebûn(**5**) Ev yek nebû para min(**6**) Qet nebe divê ez li biraziyê xwe xwedî derkevim**(7**)

## Hîndarî

Hûn jî helbesteke bipîvan û serbest peyda bikin û beramber bikin, xalên cuda nîşan bikin.

**WANE 8**

# CEJNA KARKERAN





Ji dîrokeke kevin heya roja me ya îro li ser karker, kedkar û xebatkaran gelek tundî, zordarî, çewisandin û bêmafiyeke bêsînor hatiye meşandin. Maldar û axayên ku hêza xwe ji pergala sermayedar digirin. Ji bo berjewendiyên xwe sûd û berhemeke pir mezin bi dest bixin, her dem karkeran, weke koleyan didin xebitandin. Ev kiryarên hovane, heya roja me ya îro jî li gelek deverên cîhanê tên meşandin.

Karkeran gelek caran, bi şêweyên cur bi cur li hemberî pergala serdest têkoşîn û berxwedan dane meşandin. Di van çalakiyan de gelek kes bi qehremanî şehîd ketine.

Ji salên 1850 heya 1890'î li parzemînên Awûstûralya, Emerîka û Ewrûpa hin çalakiyên weke çalakiyên birçîbûnê, meş û civîn hatin lidarxistin. Bi taybetî, di 1'ê Gulana 1886'an de, li bajarê Şîkago meş û grevên pir mezin hatin çêkirin. Bi sed hezaran karker li kolanan meşiyan. Hêzên dewletê bi tundiyeke bêsînor êrîşî van meşan kir. Gelek karker

di van êrîşan de hatin girtin, birîndarkirin û kuştin.
Hemû çalakiyên demokratîk, hatin qedexekirin. Ev bûyer, li gelek aliyên cîhanê bandor li ser çîna karkeran kir. Di nava karkeran de şiyariyek çêbû.
Karkeran ji bo ku hin mafên xwe bi dest bixin, xwe birêxistin kirin. Sendîka ava kirin, civîn û konferans li dar xistin.

Daxwazên karkeran yên sereke ev bûn:
1- Xebata rojê ya 12 demjimêran, daxînin 8 demjimêran.
2- Heft rojên xebatê bibin şeş roj.
3- Rojeke karkeran a taybet hebe.



Bi demê re ev maf, li hinek herêman yan jî dewletan hatin pêkanîn. Di konferansa duyem ya ku li Parîsê hat çêkirin de biryar hat dayîn ku li hemû aliyên cihanê 1'ê Gulanê bibe roja hevgirtin, têkoşîn û roja karkerên cîhanê. Ev roj, niha jî li gelek welatên cîhanê bi fermî tê pîrozkirin. Li hin welatan çalakiyên siyasî tên pêşxistin lê mixabin li hin deveran jî qedexe ye. Ji bo ku mafên karkeran bi giştî werin bidestxistin gelek kesayet, sazî û partiyên sosyalist, demokrat û azadîxwaz xebatên pir hêja meşandin.

Her wiha, têkoşîna azadiya gelê kurd bi azadiya gelan ve girêdayî ye û ji bo mafên karkeran jî li gelek deverên cîhanê li hemberî kedxwariya pergala sermayedar, berxwedaneke bêhempa meşandiye. Niha jî, ev berxwedan û têkoşîn tê dewamkirin. Bi taybetî, li Rojhelata Navîn ji bo biratiya gelan, wekhevî, demokrasî, aştî û aramiya herêmê pergala bi navê "Xweseriya demokratîk" dê bibe bersiva hemû pirsgirêkên karker, cotkar û gelên bindest. Ev felsefeya ku ji hemû gelan re azadîxwaz e, dê bibe kilîta şoreşê ya hemû pirsgirêkên civakê û herêmê.

## Wateya Peyvan

**Sermayedar:** Pergala kapîtalîzmê, pergala ku li ser mal û pereyan dijî
**Şîkago:** Bajarekî Emerîka ye
**Grev:** Çalakiya dest ji kar berdan e
**Çîn:** Tebeqe, qat
**Sendîka:** Saziyeke xwebirêxistinkirinê ya karkeran

## Em Têbigihin

**1-** Di 1'ê Gulana 1886'an de çi bûyer çêbûye?
**2-** Daxwazên karkeran yên sereke çi bûn?
**3-** 1'ê Gulanê ji bo te, tê çi wateyê?

## Rêziman

Endamên hevokê ev in:
**a- kirde b- bireser c- pêveber d- têrker.**
**Têrker:** Ji gelek aliyan ve kar sergihayî dike.

**Mînak:**

| Azad | gelekî | westiya. |
|---|---|---|
| **Kirde** | **têrker** | **pêveber** |

| Min | pirtûk | li pirtûkxaneyê | xwend. |
|---|---|---|---|
| **Kirde** | **bireser** | **têrker** | **pêveber** |

## Hîndarî

**1-** Hûn jî çend hevokan binivîsin ku tê de têrker hebe.
**2-** Mijarekê li ser 1'ê Gulanê binivîsin û nîşaneyên xalbendiyê tê de bi kar bînin.
**3-** Sirûda Neteweyî ya li jêr, bi destnivîs binivîsin.

**WANE 8**

# EY REQÎB

**Ey reqîb her maye qewmê kurd ziman**
**Naşikê û danayê topê zeman**
**Kes nebê kurd dimirin kurd jîn**
**dibin Jîn dibe qet nakeve ala kurdan**

**Em xort in rengê sor û şoreş in**
**Seyr bikin xwîna giyan me da rijan**
**Kes nebê kurd dimirin kurd jîn dibin**
**Jîn dibe qet nakeve ala kurdan**

**Em xortên Medya û Keyxusrew in**
**Dîn îman û ayîman her niştîman, kurd û Kurdistan**
**Kes nebê kurd dimirin kurd jîn**
**dibin Jîn dibe qet nakeve ala kurdan**

**Lawê kurd rabûye ser pê wek şêran**
**Ta bi xwîn nexşîn bike taca jiyan**
**Kes nebê kurd dimirin kurd jîn dibin**
**Jîn dibe qet nakeve ala kurdan**

**Xortê nû tev hazir û amade ne**
**Canfîda ne canfîda her canfîda**
**Kes nebê kurd dimirin kurd jîn dibin**
**Jîn dibe qet nakeve ala kurdan**

**Yûnis RAÛF- DİLDAR**

# HÎNDARÎ 4

**1- Ew peyva ku cihê nav digire, çi jê re tê gotin? a-** hevalnav

**b-** cînavk

**c-** hevalkar

**c-** nav

**2- Ji vebijêrkên li jêr, kîjan wateyeke tam bi me dide zanîn?**

**a-** tîp

**b-** qafiye

**c-** hevok

**d-** daçek

**3- Endamên hevoka " Azad derî vekir." Kîjan ji yên li jêr rast e?**

**a-** pêveber – bireser – kirde

**b-** kirde – pêveber – bireser

**c-** kirde – bireser – pêveber

**d-** bireser – pêveber – kirde

**4- Tîpa mezin di kîjan cihên hevokê de tên bikaranîn?**

**a-** Li dawiya hevokê

**b-** Li nava hevokê

**c-** Li destpêka hevokê

**d-** Li pişt kirde

**5- Di hevoka jêr de çend peyv hene?**

"Sosinê pirtûka xwe hêdî hêdî xwend." **a-** 5, **b-** 6, c- 7,8

**6- Kîjan hevoka li jêr, erênî ye?**

**a-** Ez nên naxwim
**b- b-** Hûn naçin dibistanê.
**c-** Wê name nivîsî.
**d-** Wî pirtûk nexwend.

**7- Kîjan hevokên li jêr, ne hevokeke navdêrî ye?**
**a-** Şervîn ciwan e.
**b-** Hogir baş e.
**c-** Hewa germ e.
**d-**Wan ref paqij kir.

**8- ji hevokên li jêr, ên rast bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

a- Hevok, li gorî avabûna xwe dibin du beş. (...)
b- Endama bingehîn a hevoka lêkerî **kirde** ye. (...)
c- Nivîskarê helbesta "Kulîlkên biharê, Casimê Celîl" e. (...)
d- Peyva "daristan" hevedûdanî ye. (...)

**9- Peyvên li jêr, bigihînin wateya wan.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **rêbaz** | **rist** | **cindî** | **sembol** | **çîn** |
| **rol** | **nîşan** | **tebeqe** | **şêwaz** | **delal** |

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | Girîngiya perwerdeyê | - Koçerî Çanda Kurdan E- <br> - Ez şehîd im |
| **Cotmeh** | - Quling û rovî <br> - werza bıharê | - Jînameya Feqê Teyran <br> - Di civakê de mafê zarokan | - Dayîk <br> - Behlûl û darbirîn | - Berxwedana sedsalê <br> - Name |
| **Mijdar** | - Bihar <br> - Dengê xerîbıyê | - Derwêş û Edûlê <br> - Berxwedana lehengan | - Belayên hezkirinê <br> - Pêkenok | - Hêvîdarî <br> - Kewa gozel |
| **Berfanbar** | - Çerxa felek <br> - Demokrasî | Çanda Berbırî | Sinc | Rexne û rexnedayîn |
| **Rêbendan** | Beyta Cindî | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| **Reşemeh** | Nivîsîn | Gulbihar | Berpirsiyarî | Rêwîtıya Xeyalên Zarokatiyê |
| **Avdar** | Newroz | Jin û jiyan | Salvegera Rojnameya Kurdî | Welatê Me |
| **Cotan** | Dara Azadıyê | Rûmetdayîn û Parastina Nirxan | Kulîlkên Biharê | Cejna Karkeran |
| **Gulan** | Ey Reqîb | NIRXANDIN | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN 1

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê
Komîteya Zimanê Kurdî
ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan
ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo
dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

BEŞA 1 .......... **7**

BÊHNVEDANA HAVÎNÊ .......... 8

ZIMANÊ DAYÎKÊ .......... 11

XWÊNDKAR .......... 15

DEMOKRASÎ .......... 17

AY LÊ GULÊ .......... 22

KELHA FINIKÊ .......... 25

ÇÛK Û PÎRÊ .......... 28

CÛDIYÊ MIRADAN .......... 33

MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT .......... 36

DELAL Û XOŞEWÎSTÊN MIN .......... 41

PENABERIYA DI ŞEVA TIRSNAK DE .......... 45

AWAZA MIN .......... 48

**BEŞA 2 .......... 55**

EKOLOJIYA CIVAKÎ .......... 56

FERHAT Û ŞIRÎN .......... 60

BEHLÛL .......... 63

ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ .......... 69

XABÛR .......... 71

EHMEDÊ XANÎ .......... 74

ÇAND .......... 77

KÎVROŞKA JÎR .......... 80

WELAT .......... 83


ZANIST Û TEKNOLOJÎ .................................................. 88
XANÊ DIMDIM .................................................. 90
ŞIVANIYA MIN .................................................. 93
NAME .................................................. 97
BIHAR .................................................. 100
BEŞA 3 .................................................. **105**
ŞANO .................................................. 106
NEWROZ .................................................. 111
GOLA QULINGAN .................................................. 113
8'Ê ADARÊ .................................................. 117
BÊRIYA BOTAN .................................................. 120
KELHA HEWLÊRÊ .................................................. 123
KÎVROŞK Û KÎSO .................................................. 126
JÎNAMEYA LEYLA QASIM .................................................. 128
BINIVE LOLO .................................................. 130
PÊNASEYA ŞANOYÊ .................................................. 132
AŞÛT .................................................. 136
PÊHESÎNA DAYÎKÊ .................................................. 140
QAZÎ MIHEMED .................................................. 144
AXÎN JI BO KURDISTANÊ .................................................. 148
DAPÎRA BELENGAZ .................................................. 150
DI CIVAKÊ DE ZAROK .................................................. 153

# BEŞA 1

- **BÊHNVEDANA HAVÎNÊ**
- **ZIMANÊ DAYIKÊ**
- **XWÊNDEKAR**
- **DEMOKRASÎ**
- **AYLÊ GULÊ**
- **KELHA FINDIKÊ**
- **ÇÛK Û PÎRÊ**
- **CÛDIYÊ MIRADAN**
- **MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT**
- **DELAL Û XOŞEWÎSTA MIN**
- **PENABERIYA DI ŞEVA TIRSNAK DE**
- **AWAZA MIN**

# WANE 1

## BÊHNVEDANA HAVÎNÊ



Em di bêhnvedana havînê de, ji bo serdana mala xalê xwe çûn gund. Mayîna me ya li wir, pir xweş û şad bû. Çiyayên bejnbilind, ezmanê şîn ê zelal, darên spîndar, çinar û bîşengan, dilê me pir xweş kiribû.

Mirov ji ava kaniyên wê yên zelal û bayê wê yê hênik têr nedibû.

Ew xaniyê biçûk ê xalê min tê de dijiya, ji ber xweza û rengîniya derdorê, li ber çavên me dibû hêlîna aramî û tenahiyê. Bêhna me wisa tê de fireh dibû, me nediviya em bihêlin û bizivirin mala xwe.

Ji bo destpêkirina xwendinê, hîn hefteyek mabû. Em vegeriyan û me amedakiriya çûna dibistanê kir.

Roja destpêkirina xwendinê, em sibehê zû ji xewê rabûn û çûn dibistanê.

Careke din, li kolanên me liv û tevgerê dest pê kir. Xwendekar ber bi dibistanan ve diçûn. Dema ku em gihiştin dibistanê, me silav li rêveberî û mamosteyên xwe kir û wan jî sala me ya nû pîroz kir. Paşê em bi rêzê rawestiyan û me guh da axaftina rêveberiya dibistanê ya li ser sala nû.

Dilê hemûyan bi hev xweşbû, ji ber ku bêriya hev kiribûn û daxwaza serkeftinê ji hev re dikirin. Me dixwest em zû pirtûkên xwe yên nû bigirin, waneyan bibînin, guh li dengê mamosteyên xwe bikin û kêrhatinên xwe nîşanî wan bidin.



## PEYV

**Aramî:** rehetî

**Kêrhatin:** jêhatin

## PIRS

1- Te li kû derê bêhnvedana havînê derbas kir?

2- Çima dema xwendekar vedigerin dibistanê, dilşad dibin?

3- Yekem roja xwendinê, xwendekar li dibistanê çi dikin?

4- Kengî xwendekar bêriya dibistanê dikin?

# WANE 2

## ZIMANÊ DAYÎKÊ




Di pêşveçûna jiyan û kesayeta mirov de, hînkariya bi zimanê dayîkê cihekî pir girîng digire. Kesên ku di zimên de têr bin, bi giştî dikarin peywendiyên baştir û duristir ava bikin. Ev di jiyanê de serkeftinek e.

Fêrbûna zimanê dayîkê, fêrbûna zimanê biyanî jî hêsantir dike. Ziman endamekî herî bingehîn ê çanda gelan e. Gelên ku girîngiyê nadin zimanê xwe, nûbûnan tê de çênakin û perwerdeya xwe bi zimanê biyanî dibînin, nikarin ramaneke afirîner û binirx derxin holê. Dûrketina ji zimanê dayîkê, dûrketina ji hemû nirxên çanda civakî ye. Ji ber ku girêdana bi zimanê biyanî ve, rêbazekî herî bibandor ê dagirkirina gelan e. Di vê mijarê de dewletên dagirker çi anîne serê kurdan, rastiyên dîrokî rave dikin.

Mixabin, heya niha di nava kurdan de, perwerde - hînbûna bi zimanê dayîkê bi awayekî rast û sazûmankirî pêş neketiye. Gelo, îro li gel mirovên me, di derbarê hezkirina kurdî û zanista zimên de, baldariyeke têr heye? Divê ev pirs baş were hizirandin - nirxandin.

Hînbûna zimên, hizir û ramana mirovan diguherîne, her wiha bi şêwe dike. Ziman bingeha avahîsaziya civakî dide çêkirin. Di sedsala dawî de her çi qas zimanê me hinekî pêş ketibe jî, lê ji aliyê şiyarî û zanista zimên ve kêmanî tên dîtin. Ev ji bo pêşeroja zimanê kurdî metirsiyeke mezin e.

Armanca bingehîn a perwerdeya zimanê dayîkê pêşxistina huner, ragihandin û ramana civakan e. Ziman, di civakê de hem ragihandinê, hem jî têgihiştinê dide çêkirin. Ji ber vê sedemê, di sazûmaniya perwerdeya hemû welatan de, di serî de girîngiyeke me-zin didin perwerdeya bi zimanê dayîkê. Kesên ku di qonaxa pêşketinê de ne bi awayekî pir baş hewl didin ku wan bi ziman fêr bikin. Ji ber ku ziman hêmanekî herî bingehîn ê çanda gelan e, sazûmaniyeke herî bihêz e, ku mirovan nêzîkî hev dikin.

## PEYV

**Hînkarî** : Hînbûn, fêrbûn

**Xerîkbûn :** Mijûlbûn

**Şêwe** : Awa

**Çand** : Hemû nirxên heyberî û rewanî yên civakî

**Sazûmanî :** Birêkûpêkî

**Peywendî :** Têkilî

**Zanist** : Zanîn

**Şiyarî** : Baldarî, haydarî

## RASTNIVÎS

Di gotara we xwendî de hinek tîp mezin, hinek biçûk hatine nivîsîn û nîşaneyên xalbendiyê yên cur bi cur hatine bikaranîn.

**Rastnivîs:** Rê û rêzikên awayê nivîsîna rast a ziman nîşanî mirov dide.

Ji tevahî nîşaneyên ku bi armanca sererastkirina nivisînê tên bikaranîn re, **xalbendî** tê gotin.

## PIRS

1- Hebûna ziman, bandoreke çawa li hebûna civakê dike?

2- Zimanê me yê dayîkê çi ye?

3- Nivîskar, çima girîngî daye fêrbûna zimanê dayîkê?

4- Ger ziman nebe çand, dîrok û huner ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin?

## CUR Û AWA

Nivîsa bi navê "Zimanê Dayîkê" hem girîngiya fêrbûna bi zimanê dayîkê radixe ber çavan, hem jî nayîniyên dûrketina ji zimanê dayîkê û metirsiyên wê dide diyarkirin. Her wiha nivîskar nêrînên xwe bi agahiyên guncav piştrast dike, ev curenivîs gotar e.

**Gotar:** ew cure nivîsa ku nivîskar tê de nêrînên xwe bi agahiyên guncav bi mebesta têgihandina rast çêbike, dinivîse.

Gotar, ji sê beşan pêk tê: "Destpêk, naverok û encam."

Ji curenivîsên li ser hizir hatine nivîsîn a herî girîng,

gotar e.

## HÎNDARÎ

Li ser mijarekê, gotarekê binivîse û piştre gotara xwe li pêşberî xwendekaran bixwîne.

**1-** Te ji mijara "Zimanê Dayîkê" hez kir, çima?

**2-** Tu dikarî li ser mijareke ku agahiyên te li ser tune bin, nirxandinekê bikî, ger tu nikarî, çima?

# WANE 3

## XWÊNDKAR




Bo nîştiman awatim

Xunçe gulî wulatim

Newey duwa rojî hozim

Weku Newroz pîrozim

Têdekoşim bê wuçan

Bo serbestî nîştiman

Amancim diyar û rûne

Hewlim bo lûtke çûne

Mandû nabim çalakim

Jîr û xawên û pakim

## PEYV

**Awat** : Hêvî

**Xunçe** : Bişkoj, bişkivîn

**Newe** : Nevî

**Duwaroj** : Pêşeroj, siberoj

**Hoz** : Êl/ eşîr

**Lûtke** : Bilidtirîn beşa derekê

# WANE 4

## DEMOKRASÎ




Demokrasî, peyveke Yûnanî ye. **Demos** tê wateya gel, **kratos** jî tê wateya rêveberiyê. Dema ev her du peyv tên gel hev, dibe demokrasî. Ev jî, tê wateya xwe bi xwe birêvebirina civakê. Têgeha demokrasiyê ji aliyê serdest, dewlet û bi giştî hişmendiya şaristaniyê ve hatiye berevajîkirin. Ji bo vê, mirov dikare demokrasiyê bi du awayan "fireh û teng" bide diyarkirin.

Bi awayê fireh: Di dîrokê de xwerêvebirina civakên ku sazûmaniya dewlet û desthilatdariyê nenasîne, dide nasîn. Bi awayekî xwezayî xwerêvebirina klan, qebîle û êlan di vê beşê de cih digire. Ji vî awayê xwerêveberinê re demokrasiya rasterast tê gotin. Bi awayê teng: Di nava wan civakên

ku diyardeya dewlet û desthilatdariyê tê de zêde û diyardeya demokrasiyê tê de kêm be, tê dîtin. Di van civakan de xwerêveberiyên ku ji derveyî rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê dimînin, dikevin vê çarçoveyê.

Lê belê, çi qas desthilatdariya dewletê zêde be; ew qas demokrasî kêm dibe, çi qas demokrasî zêde be; ew qas desthilatdariya dewletê kêm dibe.

Demokrasî: Xwe dispêre nirxên civaka xwezayî û pergala Şaristaniya Demokratîk. Civaka exlaqî û polîtîk e. Dijberî civaka girtî, civaka vekirî û xwerû ye. Civaka herî azad a ku xwe bi xwe bi rê ve dibe. Wekhevî û hevsengiya di navbera kes û civakê, jin û mêr de diparêze. Di nava cudahiyên civakan de rêgeza yekîtiyê bingeh digire. Li şûna mafan, xwe dispêre rêgezên exlaqî yên civakê. Rasterast xwerêveberin, azadiya civak û kesan e. Yanî bi awayekî giştî hemû nirxên mirovahiyê digire nava xwe.



Mirov dikare hêmanên civaka demokratîk, bi vî awayî bide diyarkirin: Malbata demokratîk, klan, qebîle, êl, qewm û netewe ne. Hêmanên gund û bajar, hêmanên hişmendî û aborî, hêmanên siyaseta demokratîk û parastina cewherî jî dikevin vê beşê.

Demokrasî, ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkên civakî yên ji dîroka kevn ta roja me, rêbaza herî baş e. Pergala demokrasiyê, pergala hemdem e.

## PEYV

**Demokrasî** **:** Rêveberiya civakî

**Exlaq** **:** Sinc, Hoy

**Desthilatdarî:** Hukumdarî, Otorîte

**Pergal** **:** Sîstem

## PIRS

1- Li gorî te taybetmendiyên demokrasiyê çi ne?

2- Cudahiya di navbera demokrasiya teng û fireh de çi ye?

3- Demokrasî xwe dispêre çi?

## RÊZIMAN

## CÎNAVK

Ji peyvên ku di nava hevokê de cihê navdêran digirin re, **cînavk** tên gotin. Di cînavkan de jî wek navdêran **zayend, mêjer û tewang** hene. **Hin cureyên cînavkan:**

1- Cînavkên kesane
2- Cînavkên şanîdanê

**1) Cînavkên Kesane**: Ew cînavk in ku cihê navên kesan digirin.

Ev cînavk dibin du cure **xwerû û tewandî**:

| Cînavk | | Kes |
|---|---|---|
| **Xwerû** | **Tewandî** | |
| Ez | Min | Kesê yekem yekjimar |
| Tu | Te | Kesê duyem yekjimar |
| Ew | Wî /Wê | Kesê sêyem yekjimar |
| Em | Me | Kesê yekem pirjimar |
| Hûn | We | Kesê duyem pirjimar |
| Ew | Hûn | Kesê sêyem pirjimar |

### a) Cînavkên kesane yên xwerû:

**Mînak:**

| **Cînavk** | | **Qertafên kesane** |
|---|---|---|
| **Ez** | | **im /me** |
| **Tu** | | **î /yî** |
| **Ew** | xwendekar | **e /ye** |
| **Em** | mamoste | **in /ne** |
| **Hûn** | | **in /ne** |
| **Ew** | | **in /ne** |

**b) Cînavkên kesane yên tewandî**: "min, te, wî, wê, me, we, wan."

**Mînak:**

**Min** ev mijar hilbijart.

**Te** xêrek kir, bibe serî.

**Wî** wane xwend.

**Wê** gul çandin .

**Me** şoreşek li dar xist.

**We** dibistan şûşt.

**Wan** gazî min kir.


**HÎNDARÎ**

Di welatê me de mafê mirov bi hêsanî nayê dayîn, gelê me ji tevahî mafan bêpar tê hiştin.

Ji bo ku em karibin di pêşerojê de mafê xwe bi dest bixin, pêwîst e em çi bikin?

# WANE 5

## AY LÊ GULÊ



Ay lê Gulê Gula minê
Şirîna l' ber dilê minê
Gulê nadim b' malê dinê
Li ser Gulê têm kuştinê

Gulê kesk û sor û zer e
Nîşana alê li ser e
Êdî reng spî û gewher e
Şirîn û peymana minê

Rengê te yê pir delalî
Bibil li ser te dinalî Te
nebînim bi vî halî
Armanc û kedera minê

Zordar dibê ez Gul nadim
Ez ê zend û bendan badim
Ez ê li kelh û seradim
Azad be b' şoreşa minê

pismamê te me
Bi sond pesindarê te me
Şer, ceng û hewarê te me
Qelenê te j' xwîna minê

Ay lê Gulê Gula minê
Şirîna l' ber dilê minê
Gulê nadim b' malê dinê
Li ser Gulê têm kuştinê

**Gotin:Umerê Le'ilê**
**Stran:Mihemed Şêxo**

## PEYV

**Gewher** : Cewher

**Qelen** : Next

**Peyman** : Lihevhatina li ser bûyerekê

**Keder** : Êş û xem

**Zend û bend:** Çeng û Bask

**Ceng** : Şerên giran

## EM HOZANÊ XWE BINASIN

Mihemed Şêxo, di sala 1948’an de li Qamişloyê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li wê derê temam dike. Di navbera salên 1962-1972’yan de ji bo xebatên hunerî li Libnanê dimîne. Li wê derê bi dengê xwe yê zelal navdar dibe. Di sala 1973’yan de derbasî Başûr dibe û xebatên xwe li wir didomîne. Piştî têkçûna şoreşa Başûr a di sala1975’an de, derbasî Rojhilatê Kurdistanê dibe û di sala 1983’yan de vedigere Qamişloyê.

Mihemed Şêxo, di sala 1989'an de li Qamişloyê çû ser dilovaniya Yezdan.

## PIRS

1- Hunermend Mihemed Şêxo, kîjan salê ji dayîk bûye?

2- Dengbêj, bingeha xebatên xwe yên mûzîkê di navbera kîjan salan de û li kû derê xurt kiriye?

3- Dengbêj, di helbestê de “Gulê” ji bo çi kiriye sembol?

4- Di rêzika "Li ser Gulê têm kuştinê" de, çima dengbêj xwe ji bo Gulê dide kuştin?

## CUR Û AWA

Rengê te yê pir delalî

Bibil li ser te dinalî

Te nebînim bi vî halî

Armanc û kedera minê

Ev curenivîs **helbest** e. Di vê helbestê de helbestvan hest, raman û xeyalên xwe vedibêje. Xwe mîna bilbilekî li ser gulê (Kurdistanê) dide diyarkirin. Her wiha armanca xwe (rizgarkirina welat) bi rengekî pir xweş tîne ziman.

Helbest: ew curenivîsa ku helbestvan tê de hest, raman û xeyalên xwe bi teşeyê rêzikan vedibêje, helbest e.

Helbest ji rêzik û malikan pêk tê. Dibe ku bi bare (qafiye) be û dibe ku ne bi bare be jî.

## HÎNDARÎ

Li ser mijara li jor baldar be. Tu jî hewl bide ku helbestekê binivîsî.

# WANE 6

## KELHA FINIKÊ



Kelha Finikê, bermahiyeke dîrokî ya Kurdistanê ye. Li pêşiya wê Dicle, li pişta wê çiyayên bilind, serê xwe bi ser Dicle de xûl dikin. Dengê av, kew, şalûl û bilbilan, rengê xwezaya ji darên mêweyan, bedewiya Kelha Finikê zêdetir dikin.

Dema mirov ji cihê Mem û Zînê, ji Cizîra Botan di ser pirê re ber bi Şirnexê ve derdikeve rê, digihêje Qesrika Gelî. Li milê çepê vedigere di nava Dicle û Çiyayê Dêran re dikeve rê, li ber keviya rê bermayên Berqertalê ya ji kurdan re paytextî kiriye tên dîtin. Ji wir jî dibore, dikeve binê Dêran, dema mirov di ser xwe re li Dêran dinêre, di rewşa wê de mirov dikare qir-kirina xirîstyanan bibîne.

Lê rêwîtî dewam dike, piştî çend xulekan, dikeve nava dehlan, ji nava dehlan derdikeve ser Kelha Finikê. Dema mirov li ser kelhê rûdine, li jora xwe li cihê Egîdan, Gabarê temaşe dike, li jêr Dicle wêneyê Feqê Teyran, dema helbesta xwe ya bi navê "**HEY AV Û AV**" dibêje tê ber çavên mirovan. Li rexekî cihê lêdana mencenîqan li ser tehta şayîk, berxwedaniya vê kelhê radixe ber çavan. Li hemberî mirov, dîtina xendekê, êrîşên neyaran ên li ser vê kelha pîroz rave dike. Li ser Dicle hatina kelekan jî rengê bazirganiya kevnar, ji mirov re şîrove dike. Li

milê rastê li ser serê Binerdê, zilamekî rûniştî payîzoka bi navê Seydiko dibêje, payîzoka wî wêneyê Melayê Cizîrî dema helbesta xwe ya li ser vê kelhê gotiye ya bi navê "**EY MELA NAMÊ TE YE XEMSE EŞER**" tîne bîra mirov.

Dema mirov li nava kelhê digere, li bermahiyên wê temaşe dike, dikare baş awayê birêvebirina kurdan têbigihêje.

## PEYV

**Xûl** **:** Tewandin/ Çemandin/Xûzbûn

**Dehl** **:** Cihê bi dar û av

**Menceniîq** **:** Amûreke şer e, ji daran dihat çêkirin, gogên agir û kevir pê diavêtin dijmin.

**Kelek** **:** Amûreke ku ji eyar û daran pêk tê û li ser avê tê bikaranîn.

**Berqertal** **:** Gundekî kevnar ê Kurdistanê ye.

**Kevî** **:** Rex/ kêlek

## PIRS

1- Çima nivîskar dibêje Melayê Cizîrî tê bîra min?

2- Çi dihêle ku em zanibin êrîşên neyaran çawa pêk hatine?

3- Hatina kelekan hestekî çawa bi mirov re çêdike?

## RASTNIVÎS

**1-** Balê bikişîne ser nîşaneya bêhnokê ya ku di mijarê de hatiye bikaranîn.

Ji nîşaneya ku ji bo bêhnvedaneke kurt tê bikaranîn re **bêhnok** tê gotin.

Di mijara jêr de bêhnokên pêwîst bi kar bîne.

Li pêşiya wê Dicle li pişta wê çiyayên bilind serê xwe bi ser Dicle de xûl dikin dengê av kew şalûl û bilbilan rengê xwezaya ji darên mêweyan bedewiya Kelha Finikê zêdetir dikin

**2-** Li ser her peyveke li jêr, hevokekê saz bike.

Kevî, Dicle, Gabar, Pir

## CUR Û AWA

Di mijara "Keleha Finikê" de nivîskar dîtinên xwe yên li ser cihê ku lê geryayî û dîtî bi awayekî balkêş rave dike, pê re bûyer û dîmenên dîrokî jî tîne roja me ya îro. Dihêle ku ew bûyer li ber çavên xwendekaran zindî bibin. Ji curenivîsên bi vî rengî re geryaname tê gotin.

**Geryaname:** Ew curenivîsa ku nivîskar tê de dîtin, agahî û pêhesînên xwe yên li ser cihê ku lê geriyayî radigihîne, geryaname ye.

Nivîskarê zana, agahî û hestên di der barê cihê geryayî û dîtî de, bi zimanekî balkêş radigihîne.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî nivîsekê li ser cihekî ku lê geriyayî binivîse, di nivîsa xwe de bêhnokê li cihên pêwîst bikar bîne.

# WANE 7

## ÇÛK Û PÎRÊ



Pîreke bejnkin, kitan li serê wê û pêşmala nan li ber bû. Hevîrê xwe tev kiribû girik û di binê teşta xwe de rast kiribû. Piştre çû deştê dar anîn û xistin tenûrê, lê kir û nekir tenûra wê sor nebû, heya hin darên din tanîn, yên din dibûn xwelî. Çûka beytik hat, li Pîrê şaş ma! Bi dengê xwe, daxwaza xwe anî ziman: "Pîrê temaşeyî lingê min bike, stiriyek tê de heye, derxe û bixe tenûrê, tenûra te dê pêkeve û nanê te xweş çêbe." Pîrê bawer nekir, lê dîsa jî stiriyê lingê wê derxist û avêt tenûrê. Agirê tenûrê gur bû. Pîrê şaş ma! Çûk jî dilşad bû. Çûkê perên xwe li hev didan û daxwaza stiriyê xwe dikir.

Got: "Nirxê stiriyê min heft nan in, an divê tu stiriyê min bidî min, an heft nanan bidî min." Pîrê neçar ma, heft nan danê. Wê nanên xwe girtin û çû. Piştî demekê çûk rastî şivanekî hat, silav lê kir, rûnişt, pê re axivî û got: "Tu çima şîr bê nan vedixwî?" Şivan: "Ji ber ku nanê min tuneye û ez birçî me."

Çûkê: "Fermo va nan, weke mirovan nan û şîrê xwe bixwe."

Dema şivan nan bi şîr xwar, spasiya çûkê kir. Lê Çûk xeyîdî, teng bû, çavên wê lîstin û got: "Te heft nanên min xwarin, nirxê nanên min heft berx in, ger tu nedî; ez li cîhanê

pir digerim, ez ê ji her kesî re bêjim ku şivan li min xist û nanên min ji min stendin. Ez ê navê te li cîhanê reş bikim û qewlê te betal bikim."

Şivan pir jê tirsiya û heft berx danê, çûkê berxên xwe birin û çû. Piştî demekê gihişt gundekî, gurmegurma daholê û dengê zirnê dihat. Daweta kurê keyayê gund bû. Gundiyan ji bo xwarina xêliyan, mirîşk ser jê dikirin. Çûkê silav kir û mafê axaftinê ji wan xwest û got: "Çima hûn mirîşkan ji bo xwarina xêliyan ser jê dikin? Goştê wan hindik e, fermo berxên min ser jê bikin." Wan jî bêyî ku daxwaza wê jê bipirsin, berx ser jê kirin û xwarin. Piştî şahiyê her kes çû mala xwe, çûk girî, çû cem keya û got: "Ez ê herim, ka nirxê berxên min."

Keya got: "Nirxê çi? Me berxên te ser jê kirin û xwarin, êdî ji zikê me dernakevin û najîn." Çûkê dest bi zirtan kir. Binêrin! Ez ê herim cem şêrê kevnar, ez ê giliyê xwe li wir bikim û dilê we biêşînim. Keya tirsiya û li çareseriyê geriya. Kir û nekir, çûkê ji bilî bûkê tiştekî din nepejirand. Çûkê bûk ji Keya stend, bir û çû. Çûn nava şînahiyekê, dît ku xortek çeltikê wî li milê wî ye, li ser kevirekî rûniştiye û li bilûrê dide. Çûkê silav li bilûrvanî kir û got: "Were em bûk û bilûrê bi hev biguherin."

Çûkê bûka xwe da bilûrvan û bilûrvan jî bilûra xwe da çûkê. Çûkê bilûr girt û firî, çû li ser kevirekî danî, li bilûrê xist û got: çîv çîv çîv ...

Min striyek da bi heft nanan

Min heft nan dan bi heft berxan

Min heft berx dan bi bûkekê

Min bûkek da bi bilûrekê

## PEYV

**Girik :** Parçeyek hevîrê ku tê giroverkirin e.

**Bilûr :** Amûreke muzîkê ye.

**Stirî :** Pîjik**,** darikên zirav û tûj/sîx

## RASTNIVÎS

Di hevoka jêr de em dibînin ku cotxal hatiye bikaranîn.

Keya got: "Nirxê çi? Me berxên te ser jê kirin û xwarin, êdî ji zikê me dernakevin û najîn."

**a-** Dema tu dabaşa kesekî/ê dikî û bixwazî gotinên wî/ê weke heyî bi kar bînî, beriya axaftinên wî/ê cotxal tê bikaranîn.

**b-** Ji bo ravekirin û pênasekirina tiştekî, cotxal tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ziman: Hizir bi xwe ye.

Dinya wiha ye: hinek kedkar in, hinek kedxwar in.

**Piştî cotxalê, peyv bi tîpa mezin dest pê dikin. Lê dema ku piştî cotxalê mînak werin rêzkirin bi tîpa biçûk tên nivîsîn.**

## PIRS

1- Çûkê çi da Pîrê û çi jê stend?

2- Çûkê çi ji nan kir?

3- Dema gundiyan mirîşk ser jê dikirin, çûkê çi da wan?

## CUR Û AWA

Ev mijara ku we li jor xwendî çîrok e. Weke tê zanîn ku gelê kurd li ser dirêjahiya dîroka xwe rastî gelek zext û zoriyan hatiye. Ji ber vê sedemê beşeke mezin ji wêjeya xwe bi awayekî

devokî aniye heya roja me ya îro. Di wê demê de bûyer, daxwaz û hêviyên xwe bi awayê çîrokî aniye ser ziman û ji nifşekî derbasî nifşekî din bûye û rastî guherînan hatiye.

**Çîrok:** bûyeran bi awayekî rast yan jî sawirî, bi armanca kêfxweşî û hînkirina xwendekaran vedibêje..

Taybetmendiyên çîrokan:

- Di çîrokê de bûyer pir in.
- Di çîrokê de cih nayên diyarkirin.
- Di çîrokê de dem zû derbas dibe.
- Tê de tiştên awarte hene.

## RÊZIMAN

**2- Cînavkên şanîdanê:** Ew cînavk in ku şûna navan digirin û heyînan bi nîşandanê bi me didin nasîn.

Ev cînavk dibin du cure: "xwerû" û "tewandî"

### A- Cînavkên şanîdanê yên xwerû:

| | |
|---|---|
| **Ev** | Ji bo heyînên nêzîk |
| **Ew** | Ji bo heyînên dûr |

**Mînak:**

**Ev** karê xwe dike.

**Ev** diçin dibistanê.

**Ev** daran dibire.

**Ev** ji bo gelê xwe dixebitin.

**Ew** karê xwe dike.

**Ew** diçin dibistanê.

**Ew** daran dibire.

**Ew** ji bo gelê xwe dixebitin.

**B- Cînavkên şanîdanê yên tewandî:** "vî, vê, van, wî, wê, wan"

| | | |
|---|---|---|
| **Vî** | Nêz | Yekjimar û nêr |
| **Vê** | Nêz | Yekjimar û mê |
| **Van** | Nêz | Pirjimar |
| **Wî** | Dûr | Yekjimar û nêr |
| **Wê** | Dûr | Yekjimar û mê |
| **wan** | Dûr | Pirjimar |

**Mînak:**

**Vî** çente hilgirt.

**Wî** barê me sivik kir.

**Vê** xatir ji hevala xwe xwest.

**Wê** nan xwar.

Ez **van** baş dinasim.

**Wan** silav li hev kir.

**HÎNDARÎ**

- Çîroka derbasbûyî, ji destpêkê ta dawiyê bi hizirîneke kûr ji malbata xwe re bêje.

-Piştî çîrok bi dawî bû, sergotareke din jê re binivîse û ji hevalên xwe re bixwîne.

-Tu jî çîrokekê binivîse.

# WANE 8

## CÛDIYÊ MIRADAN



Dibêjin di demekê de li cîhanê bi tevahî tofanek rabûye. Vê tofanê ji gundê Daderê dest pê kir, dema ku ji tenûrekê aveke reş derdikeve û ji rewşa lehî û robaran derbas dibe. Di her derê erdê re av tavêje, ji ezmanan jî bi heman awayî av tê xwarê.
Tevahî dar, ber û çiya di bin avê de dimînin û tiştên heyî wêran dibin.

Lê beriya ku tofan rabe kesekî bi navê Nûh ku Pêxember e, amedekariyên xwe kirine. Ji bo xwe û kesên bawerî pê tanîn keştiyek çêkiriye. Kesên bawerî pê tanîn û ji hemû cureyên lawiran yek nêr, yek jî mê li keştiya xwe siwar kirine. Ev keştî bi rojan li ser avê geriyaye. Ji ber sedema tofanê, her giyandarek di bejahiyê de jiyan dikir, fetisî. Dema tofan disekine, av kêm dibe. Serê gelek çiyayan tê dîtin. Keştî nêzîkî gelek çiyayan dibe, lê wan baweriya xwe pê neanîn. Hinek dibêjin, ev navên efsanewî yên çiyayên; Bêxêr, Nizmû, Zêrînker, Herekol û Cûdî di wê demê de hatine lêkirin. Dema dixwaze biçe li ser Çiyayê
Bêxêr, av rê nade, ew jî xwe baş diyar nake. Jê re dibêje Bêxêr, navê wî dibe Bêxêr. Dixwaze biçe li ser Nizmû, Nizmû xwe

nizm dike. Ji wî re jî dibêje hey Nizmû. Dixwaze biçe li ser Zêrînker, Zêrînker xwe bilind diyar dike. Lê gelek asê ye, ji wî re jî dibêje bi Yezdan tu çiyayekî zêrînî lê cih û warê min li ser te nîne. Ji wê rojê û pê de navê wî jî bûye Zêrînker. Di encamê de tê li ser Çiyayê Cûdî radiweste û kesên tê de peya dibin, gundê bi navê Heştan ava dikin û jiyaneke nû dest pê dikin. Ji wê rojê û pê de dibe ziyaretgeha gelan.

**Tofan:** Lehiya mezin/ bobelata ku bi avê çêdibe.

## PIRS

1- Bûyera Tofanê li kû derê dest pê kir?

2- Nûh kî ye?

3- Di Tofanê de Nûh çi kir?

## RASTNIVÎS

Dema ku tîpa dengdêr a dengdirêj "**î**" dikeve pêşiya tîpa kelijandinê "**y**" yê, cihê xwe ji tîpa "**i**" re dihêle.

**Mînak:** Sazî + ya = saziya zimanê kurdî

Hevaltî + ya = hevaltiya rast

## CUR Û AWA

Ev nivîsîna te xwendî, efsaneyekê têdigihîne.

**Efsane**: ew curenivîsa xwedî bûyer û çalakiyên awarte yên ji dema kevn heya niha vedibêje. Behsa xwedawend û lehengan dike û baweriyên gelan vedibêje.

## RÊZIMAN

**Daçek:**

Daçek ji cureyên bêjeyan ên erkî ne. Daçek bi xwe ne xwediyê

tu wateyê ne, lê di nav hevokê de beşên din ên peyvê ji aliyê wateyê ve sergihayî dikin. Daçek ne ji ber wateya xwe, lê ji ber peywira ku bi cih tînin, wekî peyv tên pejirandin.

**Daçekên bingehîn:** ji,li,bi,di

**Paşdaçek:** re,ve,de

**Li** bi tena serê xwe tê, tu paşdaçekan nagire.

**Ji** hem bi tena xwe tê, hem jî paşdaçekên **''re û ve''** digire.

**Bi** hem bi tena xwe tê, hem jî paşdaçekên **''re,ve û de''** digire.

**Di** bi tena xwe nayê, paşdaçekên "re û de" digire.

Mînak:

Ne şerm e, hûn hêj **bi** zimanê xwe nizanin!

Azad **ji** Amedê tê.

Ez **di** ser pirê **re** derbas bûm.

**Li** gundan jiyan xweş e.

Hûn **bi** hev **re** herin bajêr.

Te çi **ji** havala xwe **re** got?

## HÎNDARÎ

1- Daçekên bingehîn di hevokan de bi kar bîne.

# WANE 9

## MIN ÇI DÎT Û ÇI NEDÎT



Min çi dît û çi nedîtî, di vî emrê xwe yê kin

Eskerê qehr û xeman, her dem hucûmate li min

Ger belak winda bibe, nav alemê lê bigerin Bila

bên cem vî feqîrî, rast û rê serve dibin

Çi ku ez kelha bela me, sed hezar hemd û sena

Ji xudê re ku quwet daye, li nik min cih dibin

Em ketine wextekê xêr û xweşî bûye xela

Lew xilasî bi silamet, têde zor e pir çetin

Derheqa ehlê zemîn gotiye Şêxê Cizerî

Xalibê ehlê zemanî ma mela ademiyin

Emniyet nîne li ser dostaniya ehlê zemîn Pir

ecîp bû pir xerîb e rêz û risma ew dikin

Îro dost in ew ji hev re tu dibêjî canfida
Roja paşî tu dinêrî erz û hala lev didin
Tu dinêrî ew kesê muteber û nav û bideng
Xatirê qevdek ji pûşê bê kemal hev dikujin
Tên nik şêx û melayan, koya ku ew silhê bikin
Halbûkî kengê bi ya şêx û melayên xwe dikin
Tecrûbe gelekî me kir, her me dîtiye wiha
Lê belê paşahiyê re gelekî pûşman dibin

***Seyîd Elî yê Findikî***

## PEYV

**Hemd û sena:** Spasî

**Xela** : Bobelata birçîbûnê

**Çetin** : Zor

**Pûş** : Giyayê hişkbûyî

**Bê kemal :** Bê biha

**Muteber** : Rêzdar

**Erz û hala:** Daxwazname

**Emniyet** : Ewlehî, bawerî

**Ademiyin :** Mirov in

**Xalib** : Piranî

**Ehl** : Xelk, mirov

## PIRS

1- Helbestê rewşeke çawa têdigihîne?

2- Di helbestê de pirsgirêkên civakê çi ne?

## CUR Û AWA

Îro dost in ew ji hev re tu dibêjî canfida

Roja paşî tu dinêrî erz û hala lev didin

Tu dinêrî ew kesê muteber û nav û bideng

Xatirê qevdek ji pûşê bê kemal hev dikujin

Helbesta ku me li jor xwendiye, her beşa wê ji çar rêzikan pêk tê. Ji van beşan re **malik** tê gotin.

Em kîteyên her rêzikê bihejmêrin.

**Î ro dos tin ew ji hev re tu di bê jî can fi da**

Dema em temaşeyî helbestê dikin, dibînin ku di malikan de jimara kîteyên her rêzikekê pazdeh in. Em ji vê re dibêjin **pîvana kîteyan**. Helbestên bi pîvana kîteyan, bi giştî di rewşa malikan de tên nivîsîn. Di dawiya rêzikan de wekheviya deng heye.

*Ji van dengên li dawiya rêzikan tên dubarekirin re **bare** (**qafiye**) tê gotin.*

**Bare (Qafiye) di navbera xwe de dibin çar beş:**

**1-** Bareya Lawaz (Qafiya nîvî)

**2-** Bareya Tam

**3-** Bareya Dewlemend

**4-** Bareya Hevdeng (Cînas)

## RÊZIMAN

**Peyv:** ji kîteyekê yan çend kîteyan pêk tê û xwediyê wate û peywirekê ye.

### 1- Peyv li gorî wateya xwe:

**a- Wateya bingehîn:** Ew wateya peyvê ye ku di serê her mirovî de cih girtiye, dema ku tê gotin yekser tê nasîn. Ev wate bingeha peyvê ava dike.

**Mînak:** kevir, av, ax, dar, welat, ken...

**b- Wateya mecazî (xaze):** Peyv ji wateya xwe ya bingehîn û resen dûr dikeve û di wateyeke din de tê bikaranîn.

**Mînak:**

**Kulîlkên** vê dibistanê jîr in. (şagirt)

Ez bi vî karî re **mirim**. (westîn)

Dilê min **şkest**. (acizî, nerehetî)

## 2- Têkiliya wateyî ya di navbera peyvan de

**a- Peyvên hemwate:** Ew peyv in ku nivîsîna wan cuda ye, lê wateya wan yek e.

**Mînak:**

heftreng, keskesor, bûka baranê ...

avjenî, melevanî ...

pir, gelek

wilo, wisa ...

**b- Peyvên dijwate:** Ew peyvên ku ji aliyê wateyê ve dijberî hev in.

**Mînak:**

Şirîn, tal

Hişk, nerm

Kelê, şor

Nişûv, evraz

**c- Peyvên hemdeng:** Ew peyvên ku nivîs û dengê wan yek e, lê wateya wan ne yek e.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Hûr: biçûk | hûr: hûr û rovî |
| Xal: birayê dayîkê | xal: nuqte |
| Ber: kêlek | ber: kevir |
| Bîr: hafîze | bîr: bîra avê (çal) |

**ç- peyvên hemnivîs:** Ew peyvên ku nivîsa wan yek e, lê deng û wateya wan cuda ye.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Pir: cisir | Pi**r**: gelek |
| Ka: êmê lawiran | **K**a: li ku ye |
| Ker: kesê nabihîze | **k**er: lawir |
| Par: sala derbasbûyî | **p**ar: behr (pişk) |

# WANE 10

## DELAL Û XOŞEWÎSTÊN MIN





Kurdistan mala hemû kurdan e. Çawa ku her endamê malê ji bo parastina wê berpirsiyar e û yek ji yekî çavnebariyê nake, Kurdistan jî wisa ye. Eger we dît hinekan berpirsiyariyek hilda ser xwe bihêlin, bila encam bide. Kevir navêjin karê wan. Bila ji bo vî karî serpereştiyê bikin. Bizanin ku birayê we yê kurd ji her kesî dilsojtirê we ye. Eger min berpirsiyariya mezin hilnedaba ser xwe, ez ê niha ne li ber piyê sêdarê bûma. Ji bo vê yekê divê ez teng nebim. Ew kesên ku bi gotina me nekirin û li hemberî me rabûn, niha li mala xwe û di nava nivînên xwe yên germ de, bi hêsanî radizin. Lê em ji bo xizmeta gel niha li ber piyê sêdarê ne. Eger min jî ev berpirsiyariya giran nedaba ser xwe, ez ê jî niha weke wan di xewa şirîn de bûma. Ev şîreta ku ez niha ji we re bêjim, ji ber xweberpirsiyar- dîtina min a ji bo mayîndebûna we ye. Eger hevalekî din, ev berpirsiyarî daba ser milên xwe, niha di cihê min de, ew dê li ber piyê sêdarê bûya.
Ji ber vê hindê ez bextewar û dilşa me.

Niha, ez ê weke kurdekî dilsoj û xizmetbexşê gel, çend amojgariyan ji bo we bêjim. Li hemû gotinên min baş guhdar bin. Hêvîdar im ku di pêşerojê de ev gotinên min, pêşiya we rewşen bikin û hûn ê bi ser bikevin.Baweriyê bi xweda, bi Pêxember û bi pirtûkên wî bînin. Hem ji bo peywirên olî têbikoşin û paydar bin.

Yekîtî û hevkariya xwe biparêzin. Karên ne şayanê we bin nekin. Li hember hev teng nebin. Nemaze li hember berpirsiyarî û xizmeta gel. Radeya zanist û têgihîna xwe zêdetir bikin, da hûn ji aliyê dijminan ve neyên xapandin.Qîma xwe bi dijmin neyînin. Ji ber dîrok diyar dike ku ew bi gelek delîl û burhanan dijminê, ol, gel û welatê we ye. Ew li hember we li pey hêceta ne, bi kêmtirîn gunehbariyan dikarin cezayên mezintirîn li ser we biryar bidin.

Ji bo çend rojan, jiyana vê cîhana bêdom, nebin patexwerên dijminan. Ji ber ku dijmin her dijmin e, cihê baweriyê pê nîne.Li hember hev du, di hêla siyaset, can û mal de xiyanetê nekin. Ji ber ku xiyanetkar li ba Xweda gelek kirêt û bênirx e. Bizanin ku xiyaneta xayinî vedigere ser xwediyê xwe.

Eger kesekî bê xiyanet alîkariya we kir ji wî re bibin alîkar. Nebe hûn bibin asteng û sîxurên biyaniyan.Hûn tu carî ji serhildan û têkoşînê paş nemînin! Ta weke hemû gelên din, hûn jî ji koletî û dîlîtiyê rizgar bibin. Malê dinê bênirx e. Ger hûn bikaribin welatekî serbixwe û azad bêxin destên xwe û mal û axa wî bibin yê we, hingê wê her tiştê we hebe.

Ez ji bilî mafê Xweda ji tu kesî re qerdar nînim. Lê eger kesekî doz kir ku mafekî wî kêm an zêde di stuyê min de maye, min têra vê yekê li pey xwe serwetî hiştiye, bila ji mîratxwerên min wergire.Ta hûn nebin yek, hûn serkeftî û pîroz nabin. Li hember hev zordarî û zorê rewa nebînin! Xweda gelek zû zordarî û zordaran tune dike. Ev mizgîniya ku Xweda gotî: "Xweda tolê ji zalim û zordaran werdigire."Ez hêvîdar im ku hûn ê van xalan bidin ber çavan, Xweda we li hember dijminan bi hêz û serkeftî bike.

Her wekî Şêx Se’îd gotiye:

"Muradî ma nesîhet bûd û guftim

Hewalet bo Xuda kerdim û reftim."

**Qazî Mihemed**

## PEYV

**Serpereştî :** Pêşengtî

**Dilsoj :** Dilşewat

**Amojgarî :** Şîret

**Rade :** Ast

**Qerdar :** Deyndar

**Patexwer :** Qûtxwer/ Parîxwer

## PIRS

1- Du amojgariyên ku Qazî Mihemed li gel dike,diyar bike.

2- Qazî Mihemed di derheqê zordarî û zordaran de, çi dibêje?

## RÊZIMAN

**Cînavkên pirsyarî:** Ev cînavk pirsa navdêr û cînavkên din dikin.

Cînavkên pirsyarî: "kî, kê, çi, çend, kîjan..."

**Kî/kê:** Ev cînavk pirsa navên kesan dikin. "kî" ji bo navdêr û cînavkên xwerû û "kê" jî ji bo navdêr û cînavkên tewandî.

**Mînak:**

**Kî** hat? **Ez** hatim

**Kî** ket? **Ceger** ket.

**Kê** got? **Min** got.

**Kê** anî? **Xezalê** anî.

**Kî kê** dibîne? **Ew wê** dibîne/**Viyan Zozanê** dibîne.

**Kê kî** dît? **Wê ew** dît/**Zozanê Viyan** dît.

**Çi:** Pirsa tiştan dike.

**Mînak:**

**Çi** firî? **Çûk** firî.

Te **çi** xwend? Min **rojname** xwend.

Wê **çi** vekir? Wê **derî** vekir.

**Kîjan:** Ev cînavk pirsa cînavkên şanîdanê dike.

**Mînak**:

**Kîjan** hat? **Ev** hat.

**Kîjan** dixwîne? **Ew** dixwîne.

**Kîjanî** çûk firand? **Wî** çûk firand. Tu

**kîjanê** dixwaze? Ez **vê** dixwazim.

**Kîjanan** ev kar qedand? **Van** ev kar qedand.

**Çend:** Ev cînavk pirsa cînavkên jimarîn dike.

**Mînak:**

**Çend** avjeniyê dikin? **Pênc** avjeniyê dikin.

**Çend** dibistanê ava dikin? **Sê** dibistanê ava dikin.

**Çendan** parastin kir? **Çaran** parastin kir.

**Çendan** şahî li dar xist? **Dehan** şahî li dar xist.

## HÎNDARÎ

- Yek ji kilîlên serkeftinê, guhdarkirin e.
- Guhên guhdarekî/e baş, weke masulkeyên xebatkarekî/ê ye, her ku dixebitin xurtir dibin.
- Ên ji xwe re rêzdar bin, guhdarkirina kesên din ji xwe re erk dipejirînin.
- Pêwîst e guhdarkirin hînbûnên bi tiştê ku em dibînin, di-xwînin, dihizirin re temam bike.

# WANE 11

## PENABERIYA DI ŞEVA TIRSNAK DE

15’ê Sibatê bû, ewrên tarî esmanê wargeha me tarî kiribû. Bayekî pir cemidî dihat. Gelê wargehê di nava hewldanên bar-kirinê de bû. Tevgereke berçav di wargehê de xuya dikir. Her weku zarok xatirê xwe dixwazin, li ser robarê ku di nava wargehê re diherikî, dilîstin. Rojê cihê xwe ji şevê re dihêla. Tevger bi lez dibû. Gel li ser sacan û bi amûrên ku bi destê xwe çêkirîn, bi pişta xwe, bi bizin û dewaran, di riya Laleşê re ber bi sînorê desthilatdariya Sedam ve tiştên xwe dikişandin.

Vê rêwîtiyê hîn nû dest pê kiribû, her kes neçarî kirina karekî bûbû. Li ser pişta her zarokekî hinek tişt hatibûn girêdan. Tevahî teba neçarî hilgirtina baran bûbûn. Kal û pîran jî, dixwestin bi milên xwe hinek tiştan ji zarokên xwe re rizgar bikin. Xirexira dengê sac û tirempêlokên bi dest hatin çêkirin, rengekî cuda dida afirandin. Bi vî dengî, gelek teba neçarî barhilgirtinê bûn, ji tirsan dest bi revê dikir. Kesên nekar û nexweş, di nava bêçaretiyê de li benda derfetekê, ji jor de li milê desthilatiya Sedam temaşe dikirin. Qêrîna zarokên biçûk xemgîniyeke zêdetir diafirand.

Di vê demê de dengê çekên leşkerên Sedam şeva tarî, tarîtir dikir. Lê belê, ciwanên serkêş ne ji şeva tarî, ne jî ji dengê çekên leşkerên Sedam bandor dibûn. Her ku diçû hêza leşkerên Sedam zêdetir dibû. Lê dîsa jî, van ciwanan bi vînbûn xwe nîşan didan. Li aliyê din, ji milê çiya ve ji bo bermayên wan ji neyaran re nemînin, birek ciwan dest bi şewitandina çadiran kiribûn. Li aliyekî ronahiya şewata çadiran, li aliyê din jî guleyên xwefiroşan, esmanên wargeha me tarîtiya şevê ronî dikir. Ji derveyî saziyên fermî, tevahî wargeh dihat şewitandin.

Kesên ku ji wargehê derdiketin, neçar dibûn ku bikevin nava zeviyên mayînkirî û di xeta tixûb de bi cih bibin. Li gel ev qas nexweşiyan, ji nişka ve berfeke dijwar bariya. Kesên ku naylona wan heyî, ji bo zarokên xwe ji berfê biparêzin, ew di bin naylonan de bi cih dikirin. Ên derfetên wan tune jî, zarokên wan derbasî bin naylonên cîranên xwe dibûn. Her ku diçû bêhêvîbûn zêde dibû. Alîkariya ku dihat hizirîn hukumeta Iraqê bike, nekiribû. Li aliyê din cihê wargehê yê ku gel jê derketî, ji aliyê hêzên xêrnexwaz ve hatibû dorpêçkirin. Li aliyê din jî tirsa mayînan xemgînî zêdetir dikir.

Li gel van bêderfetiyan, gel ji bo parastina rûmeta xwe, şerê hebûn û tunebûnê dida meşandin.

## PEYV

**Vîn** **:** Îrade

**Tixûb:** Sînor

**Mayîn:** Teqemeniyên di bin axê de tên bicihkirin.

**Gule** **:** Fîşek

## PIRS

1- Gel, ji bo çi di nava tevgerê de bû?

2- Ji bo çi ciwanan bermahiyên xwe dişewitandin?

3- Gel, çima ew qas li ber xwe dida?

## CUR Û AWA

Ev mijar weke bîranînekê tê binavkirin. Tê de nivîskar tiştên jiyayî û bûye bîner bi şêwazekî wêjeyî vedibêje. Ev curenivîs bîranîn e.

Bîranîn: ew curenivîsa ku nivîskar tê de vegotina tiştekî borî bi serê wî de hatiye yan jî bûye bîner û şahid li ser. Bi zimanekî vekirî û zelal vedibêje.

Taybetmendiyên wê:

- mijara wê di dema borî de ye.
- rastiyeke dîrokî di nava xwe de dihewîne.
- li ber raya giştî radixîne.
- dibe ku siyasî, leşkerî û civakî be.


## HÎNDARÎ

Dema tu mijara "Penaberiya di Şeva Tirsnak de" dixwînî hêrsek an jî xemgîniyeke çawa bi te re çêdibe? Şîrove bike.

# WANE 12

## AWAZA MIN

Ez keçikek biçûk im
Navê min jî Awaz e
Dengekî min xweş heye
Mîna tembûr û saz e
Wek bilbil bi fîxan im
Bi şaxan re heval im
Çavreş û poz çilak im
Nevya Zerdeşt û Zal im
Bi zimanê dayîka xwe
Distirêm ez ji bo we
Ev sirûdên zarokan
Beşek ji hunera me
Zarê Medya û Mîtan
Xwedanê gurzê giran
Em tev xwîşk û bira ne
Sor û kurmanc û zazan
Bi hev re tev de bêjin
Em zarokên Kurdistan



**Gelêrî**

## PEYV

**Tembûr:** Amûreke mûzîkê ye.

**Fîxan:** Dengê bilbil e

**Şax:** Çiya

## RÊZIMAN

### Hevalnav (rengdêr)

hevalnav ew bêje ne ku çawanî û mêjera navdêran bi me didin nasîn.

**Hin cureyên hevalnavan:**

- Hevalnavên çawaniyê
- Hevalnavên şanîdanê
- Hevalnavên pirsyariyê
- Hevalnavên nebinavkirî
- Hevalnavên jimarîn

**1- Hevalnavên çawaniyê:** Ev hevalnav rewşa navan bi me didin nasîn.

**Mînak:**

Mirovê **baş** li ser navê xwe tê.

Warê me **xweş** e.

Rojhat xortekî **çeleng** e.

Xelat ji tiştên **kevn** hez dike.

**2- Hevalnavên şanîdanê:** Ev hevalnav, bi xwe cînavkên şanîdanê ne. Cînavkên me yên şanîdanê “ev”, “ew” dema ku ev

dikevin ber navdêran wan nîşanî mirov didin, dibin hevalnavên şanîdanê. Mînak**:**

**Xwerû**

**Ev** gul bêhnê didin.

**Ew** xanî hatin firotin.

**Tewandî**

**Vî** xwendekarî wane xwend.

**Vê** keçê bazinê xwe winda kir.

**Van** ferhengan bibe malê.

**Wî** kevirî ji riya gundiyan derxe.

**Wê** pirtûkê bixe çenteyê xwe.

**Wan** çivîkên ku te girtibûn, berde.

# HÎNDARÎ 1

**1- Çima Qazî Mihemed dibêje: "Kurdistan mala hemû Kurdan e."?**

**a-** Ji ber ku ava wê zêde

ye. **b-** Ji ber ku biberhem e.

**c-** Ji bo ku hinek din jî bêxin hundirê

wê. **d-** Ji ber ku welatê me ye.

**2- Ger te dît kesekî/ê berpirsyarî hilda ser xwe, pêwîst e tu çi bikî?**

**a-** Bibî asteng.

**b-** Ji bo serbikeve rê nediyê.

**c-** Ji bo encam bigire bibî

alîkar. **d-** Li dijî wî şer bikî.

**3- Çima Qazî Mihemed birin ber sêdarê?**

**a-** Ji ber ku berjewendîparêz bû.

**b-** Ji ber ku berpirsyarî girtibû ser

xwe. **c-** Ji ber ku di xewa şirîn de bû.

**d-** Ji ber ku Faris bû.

**4- "Ji wan curenivîsên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesiyayî, ragihandî re çi tê gotin?**

**a-** Çîrok **b-** Bîranîn **c-** Gotar **d-** Geryaname

**5- Di vê rêzika helbestê de çend kîte hene?**

"Îro dost in ew ji hev re tu dibêjî canfida/Roja paşî tu dinêrî arz û hala lev didin"

**a-** 32 **b-** 29 **c-** 31 **d-** 30

**6- Di hevoka li jêr de çend tîpên dengdar hene?**

"Ger min berpirsyartî negirta ser xwe, ne diçûm ber sêdarê."

**a-** 17 **b-** 29 **c-** 27 **d-** 28

**7- Di kîjan peyvên li jêr de diyarkirina kîteyan çewt e?**

**a-** ho – zan – van **b-** Dag – ir – ker

**c-** Cot – kar **d-** Da – ris – tan

**8- Kîjan peyvên li jêr ne yek kîte ye?**

**a-** Berx **b-** Kerx **c-** Çerx **d-** Çarox

**9- Di kîjan peyvên li jêr de tîpa hilmî û nehilmî (cêwî) nîne?**

**a-** Karwan **b-** Laleş **c-** Parêzgeh **d-** Dagirker

**10- Di kîjan peyvên li jêr de, tîpên dengdêr ên dengdirêj nehatine bikaranîn?**

**a-** Kurdistan **b-** Dengdêr **c-** Dûr **d-** Ken

**11- Çima tîpa "î" ya dengdirêj a di hevoka, “Ez rêwiyê riya dûr im.” de cihê xwe ji tîpa “i” ya dengkurt re hêlaye?**

**a-** Ji ber ku ketiye pişt tîpa hilmî û nehilmî(cêwî).

**b-** Ji ber ku du tîpên dengdar rastî hevdu hatine.

**c-** Ji ber ku ketina deng tuneye.

**d-** Ji ber ku ketiye pêşiya tîpa kelijandinê (siwar).

**12- Ji vebijêrkên li jêr, kîjan taybetmendiya bîranînê ye?**

**a-** Hêza xeyalî zêde ye.

**b-** Ji aliyê civakê ve rast nayê dîtin.

**c-** Di nava wê de gotinên mezinan tên bikaranîn.

**d-** Pêwîst e xwe bispêre rastiyê.

**13- Ji birepeyvên li jêr, kîjan ne hevok e?**

**a-** Egîdê çavreş û Sosina

bejnzirav **b-** Egîdê leheng çû.

**c-** Sosina bejnzirav hat.

**d-** Bejna zirav ciwan e.

**14- Li kû derê bêhnok tê bikaranîn?**

**a-** Di navbera kîteyan de.

**b-** Di navbera hevokan de.

**c-** Di destpêka hevokê de.

**d-** Di dawiya hevokê de.

**Hevokên li jêr ên rast bi (R) û yên şaş bi (Ş) nîşan bikin:**

**A- "Kurdistan"** navekî taybet e**.** **( )**
**B-** "**Vê bide min**" cînavka kesane ya tewandî ye. **( )**

**C-"Kîjan mirov hat"** cînavka pirsyariyê ye**.** **( )**

**Ç- "Gula sor bêhnxweş e"** hevalnav e**.** **( )**

# BEŞA 2

- EKOLOJIYA CIVAKÎ
- FERHAT Û ŞIRÎN
- BEHLÛL
- ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ
- XABÛR
- EHMEDÊ XANÎ
- ÇAND
- KÎVROŞKA JÎR
- WELAT
- MIJARA SERBEST
- (ZANIST Û TEKNOLOJÎ)
- ZANIST Û TEKNOLOJÎ
- XANÊ DIMDIM
- ŞIVANIYA MIN
- NAME
- BIHAR

# WANE 1

## EKOLOJIYA CIVAKÎ



Ekolojî, bi xwe zanisteke ku têkiliyên civakî bi derdorê re lêkolîn dike. Bi nûbûna xwe re her ku diçe, bi hemû zanistên din re di nava hev de, ji bo derbaskirina nakokiyên civakê yên bi xwezayê re, roleke pêşeng dilîze.

Di civaka komînal ya xwezayî de, girêdana bi xwezayê re, mîna girêdana zarok û dayîkê ye. Civak, xwezayê zindî dibîne. Divê li hember xwezayê dijberî û gunehan neke. Ev bûye destûreke olî ya bingehîn. Ola xwezayê, ola civaka komînal ya xwezayî ye. Di pêkhatina civakê de, nakokî tunene. Felsefe bi xwe jî, mirov û xwezaya ku xwe nasiye, rave dike. Mirov di cewherê xwe de parçeyekî xwezayê yê pêşketî ye. Sîstema ci-vakî ya ku mirov bi xwezayê re dixe nava nakokiyan, dijberî û ji derveyî xwezayê ye. Vê sîstemê, mirovê ku bi xwezayê re bûye yek, di nava coş, şahî û cejnekê de, kiriye bela serê xwezayê. Ev rastî jî, diyar dike ku ev sîstem sîstemeke çi qas bibela ye.



Hevgirtin û yekbûna bi derdor û xwezayê re, ne tenê aborî û civakî ye. Di aliyê felsefî de jî xweza, ji bo têgihiştinê evîndariyeke ku dest jê nayê berdan e. Xwezayê bi çêbûna mirov re mereqa xwe ya mezin, hêza xwe ya afirîner nîşan daye. Mirov jî, bi têgihiştina xwezayê re hebûna xwe dinase. Di navbera her duyan de têkiliyeke weke evîn û evîndariyê heye. Ev serboriyeke mezin ya evîndariyê ye. Li gorî ravekirina olî Xerabkirin û ji hev qutkirina xwezayê, gunehê herî mezin e. Ji ber ku ji vê hêjatir hêzeke watedar nayê afirandin.



Hawîrdorparêz bi tena serê xwe nikarin nakokiyên bingehîn ên bi xwezayê re çareser bikin. Lewre divê ji bo çareserkirina van nakokiyan, sîstem jî bibe alîkar. Ji aliyê din ve, civakeke ekolojîk veguherîneke exlaqî jî ferz dike. Lê eger aliyekî wê dijberî exlaq be, wê dawî li wê civakê bîne. Têkiliya exlaq û wijdan giyaneke empatîk û sempatîk dixwaze. Ev jî bi amadekariyeke baş a ekolojîk, watedar dibe. Ekolojî: dostaniya bi xwezayê û baweriya bi ola xwezayê re ye. Bi vî awayî, xwegihandina civakeke organîk û xwezayî pêkan e.

## PEYV

**Nakokî** **:** Tiştên li dijî hev

**Ekolojî** **:** Zanista jîngehê (hawîrdor)

**Organîk :** Her tiştên sirûştî/xwezayî

**Felsefe** **:** Cureyeke zanistê ye.

**Sîstem** **:** Pergal

**Sempatîk:** Tiştê xweş û xweşik ku kêfa mirov jê re tê, xwînşirîn

**Empatîk :** Di warê hestiyarî de xwexistina rewşa keseke/î din.

## RASTNIVÎS

- **(" ") Nîşaneya dunik (neynok):** Gotin û nivîsên ku ji kesek an jî ji çavkaniyekê hatibe girtin di nava dunikê de tên nivîsîn.

**Mînak:**

-Pêşiyên me gotine: "Rih dibe bost, dijmin nabe dost**.**"

## PIRS

1- Tu çawa nêzîkî derdora xwe dibî?

2- Dema ekolojî tê gotin, tu çi têdigihîjî?

3- Sûdên parastina derdorê ji bo zarokan, çi ne?

## HÎNDARÎ

-Tu dibistan û derdora dibistana xwe paqij dikî? Di refê de li ser paqijiyê guftûgo bike.

-Li derdora te kesên ku ziyanê didin xwezayê hene? Ev cureyên reftaran li xweşiya te tên, çawa tu dikarî li pêşiya van reftaran bibî asteng?

## RÊZIMAN

### Hevalnav:

**Hevalnav(Rengdêr) li gorî çêbûna xwe:**

**1- Hevalnavên Xwerû:**

Ew hevalnavên ku pêvekên(qertafên) sazker nestandî û hevgirtin bi peyveke cuda re çênekirî, jê re **hevalnavên xwerû** tê gotin**.**

**Mînak:**

Xwendekarê **jîr**

Ava **sar**

**2-Hevalnavên pêkhatî:**

Ew hevalnavên xwerû yên ku pêvekeke sazker stendine û sazûmaniyeke nû dane hevalnav, jê re **hevalnavên pêkhatî** tê gotin.

**Mînak:**

Keçika **bêrîvan** çû bêriyê.

Kulîlka **lîlozî**

**3- Hevalnavên Hevedudanî:**

Ew hevalnavên ku ji çend hêmayên serbixwe hatine diyarkirin, jê re **hevalnavên hevedudanî** tê gotin.

**Mînak:**

Xwendekara **dilsoz** jîr e.

Mirovên **çavsor, çavbirçî** ne.

| **Hevalnavên Xwerû** | **Hevalnavên Pêkhatî** | **Hevalnavên hevedudanî** |
|---|---|---|
| Gula **sor** | Hozanê **Dildar** | Mirovê **Çavreş** |
| **Kêm** kes | Evîna **Evîndar** | Gula **Dilşad** |

# WANE 2

## FERHAT Û ŞIRÎN



Dibêjin keçeke kurd a ciwan bi navê Şirîn hebû. Ma kê ev keça ciwan nedixwest; xortên çeleng, beg, kî û ne kî...

Li aliyê din Ferhatê belengaz heye. Ew jî bûbû evîndarê Şirînê. Ma dibe bavê keçikê wê bide belengazekî wekî Ferhat? Na, nade. Ferhat ne evîndarekî asayî bû, evîndariya Şirînê, wî digihîne asta dînbûnê.

Bavê keçikê nedixwest wê bide Ferhat, ji ber vê yekê mercekî mezin da ber wî. Rojekê bang li Ferhat dike, wî tîne dîwana xwe û jê re dibêje:

- Ferhat! Ez dizanim ku tu keça min dixwazî, ez ê wê bidim te, lê mercekî min heye. Ger tu vî mercî pêk bînî, tu û Şirîn dê bigihin hev.

Ma dê Ferhat çi bêje, ji vê devnermiya wî re? Bêguman wê bipejirîne. Dengê xwe dernaxe.

Bavê Şirînê mercê xwe datîne holê:

- Lawê hêja! Tu dizanî ku ava bajarê me kêm e, ger tu vî çiyayî biqelêşî û ji bajêr re avê bînî, ez ê Şirînê bidim te.

Ava ku dixwest bîne bajêr; ji bajêr pir dûr bû û di navbera avê û bajêr de çiya hebû. Dibêjin: "Tu çiya, xwe li ber zorê nagirin." Ferhat jî bi tevahî hêza xwe dest bi karkirinê dike. Dema ku xebata xwe ber bi dawî ve dibe, çend roj dimînin ku av bigihe Qesra Şirîn. Evîna Şirînê ya di dilê Ferhat de, gurzê wî yê di dest de, bi hezkirin û xebatkirina wî, zinaran difelişîne.

Lê dîsa nahêlin ku her du evîndar bigihin hev. Miroveke xapînok dixin navbera wan. Mirova xapînok diçe gel Şirînê, her wekî cîhan bi serê wê de xerab bûye, bi rewşeke perîşan, dest bi axaftinê dike.

- Tiştên hatine serê min, nepirse keça min! Ferhat hem av neanî hem jî xwe ji zinêr ve avêt û xwe kuşt.

Şirîn, li hemberî tirseke bi vî awayî, ka dê çawa karibe li ber xwe bide. Ev dilê nazdar dê piştî niha çawa lêde! Belê jiyan li Şirînê heram e, wê jî tenê bi giyana xwe karîbû.

Mirova xapînok karê xwe pêk anî, niha jî dora Ferhat e. Diçe gel Ferhatê xemgîn, ji qehran, mirov dikare bêje: zimanê wê hatiye girêdan. Bi awayekî nikare ji Ferhat re bîne ziman.

- Ferhat! Bavê Şirînê, keça xwe daye yekî din, çima tu hîn jî dixebitî?

Çiya li ser serê Ferhat hilweşiya. Piştî vê êdî tu wateya anîna avê namîne.

Dibêjin, li serê Çiyayê Ferhat sê gor hene. Dema havîn tê, li aliyê tenişta wan du şitlên gulan şîn dibin. Yek ji wan kulîlka sor, yek jî ya spî, pê ve tê, dema tam nêzîkî hev dibin ku bigihîjin hev, striyek radibe û dikeve navbera wan û nahêle bigihîjin hev.

Li gorî destana tê gotin: herikîna ava ku Ferhat anî, li hin cihan tê dîtin û ji van cihan re jî dibêjin: "Kolanên Ferhat."

## PEYV

**Gurz :** Hesinê sergupik, amûreke şer e.

**Qesra Şirîn:** Bajarekî Rojhilatê Kurdistanê ye.

## RASTNIVÎS

**1- Nîşaneya kevanek ( ):** Agahiyên ku bi çêbûna hevokê ve ji sedî sed ne pêwîst be dikevin nava kevanekê.

**Mînak:**

Heval Egîd (Mahsûm Korkmaz) di sala 1986'an de şehîd ket.

Berpirsyarê kargehê (Kawa Amed) îro nehat.

## PIRS

1- Çima bavê Şirînê nedixwest wê bide Ferhat?

2- Bavê Şirînê çi merc da pêşiya Ferhat?

3- ramana bingehîn ya mijarê çi ye?

## RÊZIMAN

### Hoker (hevalkar)

Ew bêje ne ku lêkeran ji aliyê rewş, dem, cih û bergeh û çendaniyê ve diyar dikin.

**Hevalkar di warê erkdariya xwe de dibin pênc beş:**

1- Hevalkarên demê

2- Hevalkarên cih û ber

3- Hevalkarên rewşê(çawaniyê)

4- Hevalkarên çendaniyê

5- Hevalkarên pirsyariyê

**Mînak:**

**Bi lez û bez** ji wir derket. (çawanî)

Em ê **îro** cejna zimên pîroz bikin. (dem)

Ew derket **derve.** (cih û bergeh)

Dayîk **gelekî** bi zarokên xwe re diwestin. (çendanî)

## HÎNDARÎ

**1-** "Tu çiya, xwe li ber zorê nagirin." Çima nivîskar ev gotina penda pêşiyan di parçeya bi navê "Ferhat û Şirînê" de bi kar aniye?

**2-** Bûyerekê binivîse û gotina"Tu çiya, xwe li ber zorê nagirin" tê de bi kar bîne û ji hevalên xwe re bêje.

# WANE 3

## BEHLÛL



Rojekê dadmendekî bajêr radibe diçe li ser serbanê qesrê û wiha bang dike.

- Heçî kesê bê, ta sibehê bimîne di vê gola avê de, ez ê keça xwe ya bedew û xweşik bidimê.

Lê mixabin çileyê zivistanê ye, kesek nikare ji ber serma û seqema dijwar, vî mercê dadmend rake. Hinek kes diçin, demjimêrekê dimînin lê nikarin biqedînin, direvin û tên li gel dadmend û dibêjin:

-Ji kerema xwe re em nikarin vî mercê te pêk bînin.

Mirovekî hêja û wêrek, carekê rabû û wiha ji dadmend re got:

- Dadmendê min, ez ê biçim vî karî bikim, lê divê tu bêmafiyê li min nekî.

- Baş e, ma heya niha min bêmafî li kê kiriye? Tu wisa dibêjî. Here ger tu bikarî, ez soz û peymanê didim ku keça xwe bidim te. Ma tu wekî din çi ji min dixwazî?

Vî mirovî, piştî şîva xwe bi dilê xwe xwar, cilên xwe ji xwe kirin û berê xwe da gola avê.

Dema gihişt gola avê, yekser ket golê. Li pêşberî wî guriyeke agir, ji dûr ve xuya dikir. Mirov, berê xwe da vê guriya agir, ta sibehê hedara xwe pê anî û ew guriya agir ji bo wî bû hêviyeke mezin. Sibehê, ji golê derket û berê xwe da mala dadmend.

Dadmend wiha got:

- Min hizir dikir ku heya niha tu miriyî û em ê te sibehê bibin goristanê, lê va tu li ber çavên min î û hebe nebe te fêlbaziyek kiriye.

- Ma ez kesekî ew qas jar im, ez ê ew qas bi hêsanî û zû bimirim, lê belê min ji dûr ve agirek didît û min hedara xwe pê tanî.

Bi vê gotinê dadmend dikeve gumanê û ji xwe re dibêje hebe nebe vî mirovî fêlbaziyek kiriye:

- Na, ez napejirînim, te xwe li ber wî agirî germ kiriye, ma ez nizanim, fêlbaz?

- Bira, ma ez ê çawa xwe li ber wî agirê ku bi hezarê gazan ji min dûr e, germ bikim? Tişta tu dibêjî, hiş ranake.

Bi van gotinan baweriya dadmend nehat û wiha got:

- Nexwe rabe, em biçin cem Behlûl, da doza me çareser bike.

- De em biçin.

Dadmend û mirov bi rê ketin û berê xwe dan mala Behlûl. Piştî ku gihiştin wir, mebesta ku ji ber hatine ji Behlûl re ragihandin.
Lê Behlûl got:

- Ka, niha rawestin, em hinekî birçî ne, ez ê xwarinekê ji we re çêkim, piştre ez ê pirsgirêka we çareser bikim.

Behlûl jî rabû û çû hinek goşt xist beroşekê, bir danî li ser rojneyê û ji jor ve hat, li rasta rojneyê pêtek agir kir û dest jê berda.

Dema firavînê derbas bû, lê Behlûl xwarin neanî û her got: "hêj çênebûye." Dadmend pir dipirsî, nikare xwe bigire û carekê çû mêze kir ku Behlûl di wê rewşê de ye. Ji Behlûl re wiha got:

- De here xwelîser! mane tu bi xwe dizanî ew xwarin wisa çênabe, qaşo em hatine li gel te, doza xwe çareser bikin. Na, na zilam rabe em ê biçin, ev kenê xwe bi me dike.

Ji xwe Behlûl li benda vê gotinê mabû û bi zimanekî tûj ji dadmend re wiha got: Gelo birayê min, ma ev mirov di golê de, bi hezarê gazan ji agir dûr, dê çawa xwe germ bike?

Bi vî awayî Behlûl dadmend vala derxist; bi van gotinên Behlûl, dadmend serê xwe xurand û neçar ma ku keça xwe bide wî... Rabû keça xwe da mirovê hejar û deh rojan ji bo wî kirin govend û dîlan.

## PEYV

**Dadmend:** Kesê bi dadê ve mijûl dibe.

**Gurî** **:** Pêta agir

**Fêlbaz** **:** Fenker, xapîner

**Gaz** **:** Amûreke pîvana dirêjahiyê ye.

**Rojne** **:** Cihê ku ji bo ronahîkirina malê ya ku li banê xanî hatiye vekirin.

## RASTNIVÎS

**Bendik:**

a- Peyvên ku di rêzê de bi cih nebin û ji hev bên qutkirin, bi bendikê tên girêdan, lê divê ev qutkirin li gorî kîtekirinê be.

b- Ji bo têkiliya di navbera du peyv an du hejimaran de, bendik tê bikaranîn.

Mînak: Du-sê zarok di vir re derbas bûn.

Ferhenga "Kurdî-Tirkî" ya Zana Farqînî ji min re bîne.

## PIRS

**1**- Dadmend, mercekî çawa avêt pêşiya zilam?

**2**- Dema ku zilam mercê dadmend pêk anî, çima dadmend bawerî pê nanî?

**3**- Dema ku çûn gel Behlûl, Behlûl planeke çawa ji wan re çêkir?

## CUR Û AWA

Mijara te xwendî, mijara pêkenînê bû.

Ji nivîsên ku bi awayê ken û henek tê vegotin, bi armanca kenandin, hizirandin û wanedayînê tê pêşkêşkirin, **pêkenok** tê gotin.

Di wêjeya me de pir mînakên pêkenokan ên ku hişê gelê me bi xweşbînî vedikin û pêkanînên wan didin pêhesandin hene. Gelek pêkenokvanên kurdan ên navdar hene, lê ji ber bindestiya gelê kurd piraniya wan winda ne.

Di civîn û civatan de, cihdana pêkenokan, peyvînê rengîn dikin. Lê divê pêkenok bi wê peyvînê re li hev hatî be, di cih û demê wê de bê têgihandin.

## HÎNDARÎ

- Tu jî pêkenokekê binivîse û di refê de ji hevalên xwe re bixwîne. Dema te xwend, aliyê wê yê pêkenokî bêje.

***Li mînaka jêr a daxwaznameyê baldar be:***

**09/07/2016**

**JI BO ŞAREDARIYA DÊRIKÊ,**

Li gel kêfxweşî û spasiyên xwe, ji bo vê perwerdeya tenduristî ya ku ji aliyê we ve hatî vekirin. Ger çêbe ez jî dixwazim weke hemwelatiyekî beşdar bibim.

Ji bo vê yekê jî, ez hêvîdar im ku tiştên pêwîst ji aliyê we ve bên pêkanîn.

Azad Baran
Navnîşan:

Kolan: 23

Taxa: Ş.Xebat Dêrik

Jimar: 45

DÊRIK

# WANE 4

## ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ



Şerefxan, kurê Mîr Şemsedînê kurê Mîr Eşref e. Ji binemala mîrên fermanrewayên Bedlîsê ye. Di sala 1542’yan de ji dayîk bûye û di sala 1604’an de miriye. Di temenê xwe yê ciwan de, li mala Şahê Îranê hatiye perwerdekirin. Wekî şahzadeyan hatiye xwedîkirin.
Di hemû beşên hunerî de xwendina xwe bi awayekî serkeftî qedandiye. Di dîrokna-siyê de gelek kêrhatî bûye. Karê ku di qada dîrokê de kirî, pir giranbuha bû. Dîroka Kurdistanê û navê bav û bapîrên xwe ku Mîrên Bedlîsê bûn, nemir kirine.

'Şerefname' ya wî nivîsî, karekî hêja ye. Her wekî di dawiya Şerefnameyê de gotiye: “Ez xwe bextiyar dizanim û şanaz im ku min xizmeta netewa xwe kiriye û ketime rêza nivîskarên welatparêz.”

Şerefxan, ev pirtûka xwe ya bi navê ‘Şerefname’ di serdema Sefawiyan de bi zimanê farisî nivîsiye. Seyda Hejar Mikuriyanî, Şerefname ji zimanê farisî wergerandiye zimanê kurdî. Niha ev berhem bi gelek zimanan hatiye wergerandin û di pirtûkxaneyên navdar ên cîhanê de tê pêşkêşkirin.

## PEYV

**Fermanrewa:** Karbidest, Rayedar

**Şanaz** : Dilxweş, Serfiraz

**Şahzade** : Zarokên kur ên şahan

**Dîroknas** : Dîrokzan, zanaya/ê dîrokê

## PIRS

1- Şerefxan kengî û li kû derê ji dayîk bûye?

2- Navê pirtûka Şerefxan, çi ye?

3- Kê Şerefname wergerandiye zimanê kurdî?

# WANE 5

## XABÛR



Ey Xabûr Xabûr, ey Xabûr Xabûr
Wek daxwaza min, pir dirêj û kûr

Kêferata te, xum xum û lew lew
Nayên bîra te ne razan, ne xew

Herdem dinalî, bi qîrîn, gazî
Lê kes nizanî, ka çi dixwazî



Armanca te ye, xurtî, pêşveçûn
Cihê te teng e, divê fireh bûn

Pêlan didî xwe, qîr û firyadî
Tu jî wekî min divê azadî

Sînga vê erdê te çirand bi zor

Nizanim çira tu naçî ber jor?

Ev çende xurtî, bê daxwaz û vîn
Dikevî sînga derya, bê evîn

Xweska min bi te, bê derd û bê kul
Dijî bi şadî, bê mejî û dil

Tu jî weke min, ger bûbûya kurd
Ev xurtiya te dibû kul û derd

**Cegerxwîn**

## PEYV

**Xabûr** **:** Navê çemekî Kurdistanê ye.

**Kêferat** **:** kar û xebat

**Xum xum:** Dengê herikîna avê ye.

## EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN

### CEGERXWÎN (1903-1984)

Cegerxwîn di sala 1903'yan de li Hesara girêdayî Kercewsa Mêrdînê ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Şêxmûs e. Navê bavê wî Hesenê kurê Mihemed e. Di zarokatiya xwe de şivanî û gavanî kiriye. Di zaroktiya wî de bavê wî çûye ser dilovaniya Yezdan. Sêwî dibe û li cem xwîşka xwe Asya dimîne. Li cem Mele Ubeyd, hînî zanista olî bûye. Destûrnameya xwe ya olî û zanistî stendiye.

Cegerxwîn di sala 1984'an de li Stokholmê çûye ser dilovaniya Yezdan.

## PIRS

1- Helbestvan di helbesta xwe de behsa çi dike?

2- Li gorî helbestê, tu herî zêde ji kîjan hestên helbestvan hez dikî?

3- Jînameya helbestvan bi awayekî berfireh binivîse.

## CUR Û AWA

**1-** Mirov hest û hizrên xwe bi devokî yan jî bi niviskî tîne zimên.

**2-** Di helbesta te xwendî de, ev taybetmendiyên li jêr hatine diyarkirin:

Bi şêweyê malik û rêzikan hatiye nivîsîn.

- Her rêzek bi tîpa mezin dest pê kiriye.
- Bi pîvana kîteyan hatiye nivîsîn.
- Li dawiya rêzikan dengên li hev hatî hene.

Ji helbestên ku bi jimareke diyar ên kîteyan hatî nivîsîn re **helbestên bi pîvan** tê gotin.

**3-** Malik li gorî jimara rêzikên xwe tê binavkirin.

Ji ber ku helbesta te xwendî, ji du rêzikan pêk hatiye, em jê re dibêjin **cotik**.

helbesta ku te xwendî ji neh malikan pêk hatiye.


**HÎNDARÎ**

- Destxetên li jêr di lênûsa xwe de binivîse

*Bilbil dibe dengbêjê wan, dike qîrîn ji dil û can*

# WANE 6

## EHMEDÊ XANÎ




Di nava helbestvanên kurd ên klasîk de yê herî navdar Ehmedê Xanî ye. Piraniya kurdan navê wî bihîstiye. Ehmedê Xanî helbestvanê pêşî ye, ku di helbestên xwe de behsa dewleteke kurdî û rizgarbûna kurdan kiriye. Li gorî Eladînê Secadî" Ehmedê Xanî sertaca nivîskar û helbestvanên kurd e". Gelek kes jî wî weke fîlozofekî kurd dibînin.

Ehmedê Xanî di sala 1652'yan de ji dayîk bûye. Li gelek bajarên Kurdistanê xwendiye, paşê çûye bajarê Bazîdê, li wê derê dibistanek vekiriye û bûye mamosteyê zarokên kurd. Wî ji bilî kurdî bi farisî, erebî û tirkî jî dizanî. Li gorî agahiyan Ehmedê Xanî di sala 1707'an de li bajarê Bazîdê çûye ser dilovaniya Yezdan. Gora wî li Bazîdê nêzî qesra Îshaq Paşa ye, di roja me ya îro de wekî ziyaretgeha gel e.

Berhemên wî yên navdar ev in: Mem û Zîn, Nûbihara Biçûkan û Eqîda Îmanê. Ehmedê Xanî di hemû jiyana xwe de hewl daye

ku bingeha perwerdehiya bi zimanê kurdî deyne. Berhemên xwe yên bi navê "Nûbihara Biçûkan" û "Eqîda Îmanê" jî bi vê armancê nivîsiye. Di berhema xwe ya bi nav û deng a Mem û Zînê de her çi qas dabaşa evîna "Mem û Zîn" hebe jî, bîr û ramanên wî yên di derbarê gerdûn, hebûn û mirovan de tê de cih digirin.

## PEYV

**Klasîk :** Kevnar.

**Navdar:** Xuyayî, bi nav û deng.

**Berhem:** Ber, eser, ked.

**Eqîde:** bawerî

**Dabaş:** qal, behs

## RASTNIVÎS

**Nîşaneya dunik (neynok): (" ")**

Ger em bixwazin balê bikişînin ser peyvekê, nîşaneya **dunikê** tê bikaranîn.

**Mînak:**

Berhemên xwe yên bi navê "Nûbihara Biçûkan" û "Eqîda Îmanê" jî bi vê armancê nivîsiye.

## PIRS

- Ehmedê Xanî kengî ji dayîk bûye?

- Ehmedê Xanî di berhema xwe ya bi navê Mem û Zîn de li ser çi sekiniye?

- Ehmedê Xanî pirtûka xwe ya bi navê Nûbihara Biçûkan ji bo çi nivîsiye?

## CUR Û AWA

Nivîsên ku jiyana kesekê/î bi awayekî berfireh didin diyarkirin, jê re **jîname** tê gotin.

Taybetmendiyên wê:
a- Cih û dema lê ji dayîk bûyî.
b- Mercên dema tê de jiyan kirî.
c- Rewşa perwerdeyê.
d- Kar û xebatên ku di nav de cih girtî.
e- Hemû taybetmendiyên kes.

## RÊZIMAN

**1-** Hevalkarên di hevokên li jêr de hatine bikaranîn diyar bike û beşên wan bêje.

Wan îro pirtûk bi lez xwendin.

Me karê malê kêm çêkir.

Xwendekar kengî hatin?

Hevalê Hozan berjêr çû.

**2-** Tu jî çend hevalkaran di nava hevokan de bi kar bîne.

## HÎNDARÎ

**1-** Tu jî jînameya pakrewanekî binivîse û di refê de ji hevalên xwe re bixwîne.

**2**-Hevokên li jêr di lênûsa xwe de binivîse.

**"Azadiya jinê; azadiya civakê ye."**

**" ê/a ku şer dike azad dibe, azad dibe xweşik dibe, xweşik dibe tê hezkirin."**

# WANE 7

## ÇAND



Ziman daneheva civakî ya zihnî, exlaqî, hest û fikra estetîkî ya ku civakê bi dest xistiye; ziman hebûna nasnameya zihnî ya wate û hestê serwextbûnê ye.

Watedayîn û sazîbûn hîmekî bingehîn ê çandê ye, asta pêşketina çandê; asta pêşketina hemû tiştên civakê ye. Nexwe tê xwestin em li ser çandê hîn zêdetir bixebitin û pêş bixin.

Çand, dikare bi awayekî giştî weke yekparebûna tevahiya watedayîn û avahiyên civaka mirov, ên ku di pêvajoya dîrokê de pêk anîne, bide nasîn. Ev pêkhateyên ku pêk hatine, weke tevahî saziyên ji veguherînê re vekirî, dide nasîn.





Mirov dikare watedayînê bi awayekî dewlemend, di asta naverok û saziyên veguherînê de bide nasîn. Em bi mînakekê dikarin baştir bidin nasîn. Mirov dikare avabûnê weke pêkhateya heyberî, rewaniyê jî weke zagona wê ya bi hizir, hîs û naveroka wê ya ber bi çav ku dilivîne, diyar bike.

Di çarçoveyeke teng de jî têgeha çandê tê pênasekirin. Em hewl didin çandê zêdetir weke wate, zagona avahiyê û zindîtiyê diyar bikin. Dema em dabaşa civakê dikin, di çarçoveyeke teng de çandê, weke cîhana wateyê ya civakê, zagona wê ya exlaq, zihin, huner û zanista wê pênase dikin. Di vê çarçoveya teng de saziyên siyasî, aborî û civakî dibin yek. Di çarçoveyeke berfireh de danasîna giştî ya çandê tê kirin. Yan jî li ser vî bingehî weke naverok û sazî wateya xwe hebe, mirov dikare weke hebûn dabaşa civakê bi xwe bike. Ger bi tenê dabaşa civaka sazî yan jî watedayînê were kirin, têra xwe mirov pê dixape. Ger civakek têra xwe gihiştibe asta sazîbûn û watedayînê, dikare weke hebûn bibe xwedî nasname û were binavkirin.

Her wiha têkiliyeke xurt jî di navbera têgeha zimên û çandê de heye. Di çarçoveyeke teng de ziman bi awayekî bingehîn têgeha sereke ya qada çandê ye, ji ber vê mirov dikare zimên weke çandê jî bide nasîn.

## PEYV

**Yekpare:** Giştî, giştîbûn

**Pênase :** Danasîn

**Zihn :** Kêrhatinên hizrî

**Çarçove:** Dorbend, Derdor

## RASTNIVÎS

**Nîşaneya pirsê:**

**1-** Nîşaneya pirsê li dawiya hevokên pirsyariyê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Gelo ma ji serxwebûnê xweştir, tiştek heye?

**2-**Agahiya ku tê dayîn eger biguman be, pirsnîşan dikeve nava kevanekê.

**Mînak:**

Zerdeşt B.z 610 (?) hatiye cîhanê.

**3-** Dema du hevokên pirsyarî li pey hev tên, li dawiya hevoka dawî tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ev mirov çima li vir in, çi dixwazin?

## RÊZIMAN

**Gihanek:** Ji bêjeyên ku peyv û hevokan bi hev ve girê didin re gihanek tê gotin.

**Hin gihanek:** û, ku, ji ber ku, her wiha, ango, piştî ku, berî ku

**Mînak:**

Ez **û** hevalên xwe li çiyayên Kurdistanê geriyan.

Ew diçe perwerdeyê **ku** sûdekê jê wergire.

Delîl xwendekarê zanîngehê ye, **her wiha** li dibistanê jî dersê dide.

**Ji ber ku** welat bi kedê ava dibe, pêwîst e her kes bixebite.

Di nav me de karbeşî heye **ango** her yek ji me bi karekî radibe.

**Piştî ku** em ji dibistanê vegerin, em ê biçin şahiyê.

**Berî ku** mêvan bên, em ê amadekariyên xwe bikin.

# WANE 8

## KÎVROŞKA JÎR



Şêrekî, li derdora Dêrsimê daristanek ji xwe re kiribû cihê nêçîrê. Her roj çend ji wan tebayên di nava daristanê de digirtin û dixwarin. Lê belê heya hinek digirtin, gelek ji ên din jî ditirsandin û bêzar dikirin.

Li ser vê çendê tebayan biryar girtin û gotin:

- Şûna em her roj di nava vê tirsê de bijîn, li gorî çarenûsê em ê pişkê bikişînin. Yê ku pişk lê bikeve em ê wî ji şêr re bişînin.

Hemûyan bi hev re ev biryar erê kir, şêr jî bi vê biryarê dilşad bû, bi vî awayî her roj pişk, li kê biketa, ew ji şêr re dişandin. Ji bo wê demekê aramî û xweşî hatibû nava daristanê.

Rojekê pişk li kîvroşkê ket. Kîvroşkê nedixwest giyanê xwe yê şirîn bi erzanî bide. Ji hevalên xwe re got:

- Planek dikeve mejiyê min, ger ez serbikevim, ez ê we tevan jî ji zordariya şêr rizgar bikim.

Bi qasî dema xwarinekê dereng bikeve, bi şûn ve ma. Dema birçîbûna şêr gihişt pileya dawî, ji hêrsbûnê dûvê xwe li xakê dida, ditewand û gurz dikir. Di wê demê de kîvroşk bi xiroşeke jîr hat pêşberî wî û got:

- Mezinê min, îro pişk li kîvroşkeke mîna min ket. Dema ku min xwest ez wê bînim cem we, ez rastî şêrekî din ê li ser bîrê hatim, dixwest para we bibe.

Her çi qas min jê re got "ew bi taybet ya mezinê tebayan e, dev jê berde bela xwe ji kîvroşkê veke da ku ji we bitirse, lê mixabin dijî we gelek gotinên giran jî gotin.

Dema şêr ev gotin bihîst, hêrs û kîna wî pir zêde bû û got:

- Nîşa min bike, ka ewê bêrêz li kû ye? Ez ê sînorekî jê re deynim.

Kîvroşk ket pêşiya şêr, bir ser bîreke kûr a herêmê û got:

- Belê mezinê min, ew di vê bîrê de ye.

Dema wisa ji şêr re got, şêr li bîrê temaşe kir. Di wê demê de kîvroşk jî di nava lepên şêr de li bîrê temaşe kir. Bawer kir ku ev wêneya wî ya di avê de şêrê dijber e û wêneya kîvroşkê jî ew kîvroşka ku jê re hatiye şandin e. Yekser xwe avêt bîrê, xeniqî û mir. Bi vî awayî tebayên din ên di daristanê de ji zordariya wî azad bûn.

## PEYV

**Pişk** **:** Hilbijartin

**Hêrs** **:** Engerandin, bêzarbûn

**Çarenûs:** Qeder

**Xap** **:** Hîle, fêl

## PIRS

1- Şêr biryara tebayan çawa nirxand?
2- Dema pişk li kîvroşkê ket, çi kir?

## RASTNIVÎS

1- Dema kesek dest bi axaftinê dike, ji beriya axaftina wî dest pê bike **xêzika axaftinê** tê bikaranîn.

**Mînak:**

Kîvroşk ket pêşiya şêr, bir ser bîreke kûr a herêmê û got:

- Belê mezinê min**,** ew di vê bîrê de ye.

## CUR Û AWA

*Ji wan curenivîsên ku nebûyî û negengazê bûyînê ne û lehengên wan lawir in re* ***metelok*** *tê gotin.*

Mijara te xwendî metelok e û lehengên wê jî lawir in (Şêr û kîvroşk).

Ev curenivîs her tim şîretekê ji bo mirovan pêşkêş dike.

**Metelok bi du awayan tên nivîsîn:**

**a-** Meteloka pexşan

**b-** Meteloka hûnandî

# WANE 9

## WELAT



Qurbana teye giyanê min

Li ser te dirije xwîna min

Mîna buhiştan welatê min


Ji bo te sed caran qurban im

Bihar zindî dike miriyan

Dilan de nahêle çi guman

Kalên min danga te de razan

Ji bo te sed caran qurban im



Bi rûmet qasî dayîka min

Şirîntir ji tev zarokên min

Tu yî viyana jiyana min

Ji bo te sed caran qurban im



Ev robar, ew çiya û ev bax

Ji ku tê ev ciwanî û şax

Ji evînê re bûyî qonax

Ji bo te sed caran qurban im

**Gelêrî**

## PEYV

**Viyan :** Vîn, Îrade

**Şax :** Çiya

**Dang :** Daw, himbêz

## PIRS

**1-** Çima helbestvan dixwaze sed caran bibe qurbanê welatê xwe?
**2-** Helbestvan, di malika çaran a helbestê de li ser kîjan aliyê welat radiweste?

## RASTNIVÎS

**1-XêzeXwar ( / ):**

**a-** Dema ku pêwîst be rêzikên helbestekê li rex hev bên nivîsîn, di navbera wan de **xêzexwar** tê bikaranîn.

**Mînak:**

Bi rûmet qasî dayîka min/Şirîntir ji tev zarokên min

**b-** Di navnîşanan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Çiya Serbest

Amûdê/Kolana Azadî/Jimar: 72/24

**2-** Peyvên li jêr hatine dayîn di nava hevokan de bi kar bîne.

Robar, çiya, bax, ciwanî, şax.

## CUR Û AWA

Di mijarên borî de bare û beşên wan me diyar kiribûn.

Tu fêr bûbûyî ku **bare(qafiye)** dibe çar beş**:**

**1- Bareya Lawaz:**

Dubarekirina dengekî tenê di dawiya rêzikên helbestan de, jê re **bareya lawaz** tê gotin.

**2- Bareya Tam:**

Dubarekirina du dengên wekhev di dawiya rêzikên helbestan de, jê re **bareya tam** tê gotin.

**3- Bareya Dewlemend:**

Dubarekirina sê û zêdetir dengên wekhev di dawiya rêzikên helbestan de, jê re **bareya dewlemend** tê gotin.

**4- Bareya Hevdeng (Cînas):**

Dubarekirina peyvên di dengên xwe de wekhev lê di wateya xwe de cuda, yên li dawiya rêzikên helbestan de, jê re **bareya hevdeng** tê gotin.

## RÊZIMAN

**Lêker:** Ji peyvên ku kar, tevger, bûyer û rewşekê diyar dikin re **lêker** tê gotin.

**Mînak:**


Hinek mirov ber bi me ve **dihatin**.

Pelên daran **diweşin.**

Wan pola xwe **şûşt.**

Pezê gundiyan li mêrgê **diçêre.**

Di biharê de kulîk **dibişkivin.**




**1- Lêkerên Xwerû:**

Di binyata xwe de lêker in û tenê ji hêmanekê pêk tên.

**Mînak:**

alastin, anîn, avêtin, axaftin, bihîstin, bijartin, biraştin, birin, bûn, çûn, cûtin, firotin, girtin, gotin, guhartin, guvaştin, hatin, hejmartin, hiştin, ketin, kirin, kolan, lîstin, mêtin, nivîstin, pêçan, sotin, veniştin, xistin, xwarin û hwd.

**2- Lêkerên Nexwerû:** Ev lêker jî dibin du beş:

**a) Lêkerên Pêkhatî**

Ev lêker bi alîkariya paşgir û pêşgiran tên bidestxistin. paşgir û pêşgirên van lêkeran bi tena serê xwe ne xwediyê wateyekê ne.

**1) paşgir:** "în - andin".

**Mînak:**

| Rayek | paşgir | lêker | rayek | paşgir | lêker |
|---|---|---|---|---|---|
| Rev | în | revîn | rev | andin | revandin |
| Bez | în | bezîn | bez | andin | bezandin |
| Kel | în | kelîn | kel | andin | kelandin |

**2) pêşgir:**

| pêşgir | lêker | lêker | pêşgir | lêker | lêker |
|---|---|---|---|---|---|
| ra | Bûn | rabûn | ve | bûn | vebûn |
| ra | xistin | raxistin | ve | xwarin | vexwarin |
| ra | kirin | rakirin | ve | gotin | vegotin |

**b) lêkerên hevedudanî:**

Eν lêker ji çend hêmanên serbixwe pêk tên. Eger hêman ji hev werin cudakirin, her hêmanek wateyeke wê heye.

**Mînak:**

başbûn, bawerkirin, bêhnvedan, bilindbûn, diyarkirin, hûrkirin, nexweşketin, sorkirin û hwd.

# WANE 10

## MIJARA SERBEST

### ZANIST Û TEKNOLOJÎ



Zanist, beşeke hizrînê ye. Ji destpêka mirovahiyê heya niha hebûna xwe domandiye û xwe pêş xistiye. Teknolojî jî di encama pêşketina zanistê de derketiye holê. Ji bo vê mirov dikare bêje, ew amûrên ku mirovên berê jî bi kar anîne dikevin beşa teknolojiyê.

Zanist, têgeheke sazûmaniyê ye ku gerdûnê yan jî beşek bûyerên gerdûnî digire nava xwe. Rêbazên ceribandinê zagonên wê yên bingehîn in . Lê, teknolojî çengekî zanistê ye ku beşa pîşesazî, bikaranîna amûr û alavan digire nava xwe.

Teknolojî xwe dispêre zanistê. Teknolojî, di sedsalên dawî de bûye navendeke guftûgokirina pêkanîna zanistan. Pîşesazî bi lez xist, hilberîn zêde kir, bandoreke mezin a erênî û neyînî li ser civak û mirovan kir.



Di encama pêşketina pîşesaziya çewt de, li welatê me, ji gundan ber bi bajaran ve koçberiya çêbûyî, bû sedema zê-debûna şêniya bajaran. Vê rewşê hişt ku civak

ji rastiya xwe dûr bikeve, li şûna taybetmendiyên xwezayî taybetmendiyên çêkirî pêş bixe.

Her wiha bû sedem ku hevsengiya di navbera gund û bajaran de têk biçe, berhemên civakê kêm bibin û di çandê de jî qirkirineke mezin pêş bikeve.

# WANE 11

## XANÊ DIMDIM



Xano got:

"Kuro, qet xwe qels nekin,

Heya we tê, hûn bi kêf şer bikin.

Lêxin metirsin ji mirinê,

Navê kurdan bimîne dinê."

Li hev ketin tîr, rim û nize,

Bûye hewar û bû hêwirze.

Mêrxasên Xano hindik û kêm,

Di nav cengê de dêm dane dêm.

Xwîna wan rijî û hat xwarê,

Wek ava çemên derbiharê.

Dimirin bi mêranî û kurdî,

Li ber destê Şah nabin girtî.

Wextê Şahinşahê maldarî,

Qure, pozbilind û kubarî,

Xwe bi kelê re digihîne,

Da ku talanê jê hilîne.

Belav bike li ser serbazan,

Xişir, mal û hebûn, jin û qîzan.

Dayîka Xanê Çengzêrî ne,

Haya wê ji hişê xwe nîne.

Stiya bûka xwe hiltîne,

Serbanê kelê dibe tîne.

**Gelêrî**

## PEYV

**Kel** **:** Kelh

**Xişir** **:** Ew tiştên ku jin ji bo bedewiyê li xwe dikin (gerdenîk, guhur,gustîl û hwd).

**Serbaz:** Serleşker

**Dêm** **:** Rû

**Rim** **:**Amûreke ji bo şer tê bikaranîn.

**Nize** **:** Mertal

## PIRS

1- Sedema banga Xano çi bû?

2- Mêrxasên Xano çi kirin?

## CUR Û AWA

Te parçeyek ji destana Xanê Lepzêrîn ku tê de lehengiya ciwanên kurd û Xanê Lepzêrîn heyî xwend. Di vê destanê de mirov, rewşa jiyana civakî ya kurdan di wê demê de dinase.

**Destan:** Ew curenivîsa dirêj û hûnandî ku bûyer û tiştên bi ser gel û neteweyan de hatiye, vedibêje. Tê de lehengî û evîndarî serdest in û bi awayekî helbestî tê gotin.

***Taybetmendiyên wê:***

*Ev curenivîs dirêj û hûnandî ne.*

*Dîrok û cihên wan diyar in.*

*Lehengên wan diyar in û xwedî taybetmendiyên awarte ne.*

Destan, berhemên çand û jiyana gelan a hevpar e. Destan bi hêza xeyalên gel dewlemend dibe, digihe û piştre jî, ji aliyê nivîskarekî ve tê berhevkirin. Bi vî awayî destanên xwezayî der-dikevin holê, carinan jî hozanek li ser dihizire û dikare binivîse.

Destan ji demên kevn ve, bi awayekî xwezayî ji aliyê ci-vakê ve bi rengê stran û beyt, nifş bi nifş hatiye, heya gihiştiye roja me ya îro.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî destana **Xanê Lepzêrîn** lêkolîn bike. Parçeyeke ku bala te kişandî binivîse.
**2-** Tu jî li ser lehengiya gelê kurd nêrîna xwe bîne zimên.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Mijara me ya bi navê "Şivaniya Min" bûyereke çêbûyî dide diyarkirin, çi jê re tê gotin?**

# WANE 12

## ŞIVANIYA MIN



Min jiyaye ku çawa dê û bavê min serê xwe danîne û li ber destê jinbir û xwîşka xwe mame. Lê pirî caran li cem xwîşka xwe bûm. Carinan diçûm xwendinê, lê çi xwendin!

Çil pezê mala xwîşka min hebû. Hin pezê cîranan jî dixistin nava colikê pezê min. Carinan jî ez bêkar dimam. Min komek ji zarokan çêkiribû. Em diketin werzê Amûdiyan û me gindor û zebeş didizîn.

Carekê em ji diziya werz dihatin û li ser xanî dûpişkekî bi min ve da. Min deng li xwîşka xwe kir ku min derman bike. Lê xwîşka min got:

- Wey Xwedê bike koremarek bi te ve bide! Ma tu li çi digerî?

Carekê em li ber pez bûn, çend gur hatin me; zivistan e, berf ketiye, me bi kefikên kopalan gur ji ser pezê xwe vedigerandin. Lê li pey me hatin, ta nêzîkî gund, kevir di nava berfê de dihatin xuyakirin, lê min berf dikir gulok û bi berkanî li guran werdikir.

Carekê şeş-heft pez li çolê zan, min nikarîbû-nizanîbû çawa ez ê van berxikan hilgirim. Pezê min êrîş kire nava ziyanên xelkê. Xwediyê dexlan hat û gotinên nexweş ji min re gotin. Lê çawa ez nasîm, got:

- Hey Xwedê nehiştî! Çawa te pez berdaye nava ziyanên gundiyan?

Ez giriyam û min got:

- Ez nikarim vegerînim. Ev qas berx di stûyê min de ne.

Mêrik hat, tev xistin nava ebayê min û got:

- De bide pişta xwe. Paşê keniya û got:

- Te hêjî şivanî nekiriye. Pêwîst e berx hemû li şûna wan bihiştana. Pezê xwe li wan vegeranda ta ku bêrîvan bihatana.

Dema min diziya gundiyan dikir, ji ber ku xelkê Amûdê bavê min nas nedikir, dijûn ji mêrê xwîşka min re dikirin. Lê xwişka min dijûn ji bavê min re vedigerandin û digot:

- Yadê ji bavê wî re bidin! Çima ji Mele Xelîlê reben re dibêjin? Carinan diçûm mizgeftê ku bixwînim, lê me ji xwe re henek dikirin û min çavên xwe digirtin û digot:

- Filan mirov buhiştî ye û filan kes wê here dojehê. Hin zarok digiriyan û hin bi min dikeniyan.

**Cegerxwîn**

## PEYV

**Kefik :** Ji cihê çemandî yê kopal re dibêjin.

**Colik :** Birepezê biçûk

**Werz :** Cihê gindor û zebeş lê tên çandin.

**Amûdê:** Bajarekî Kantona Cizîrê ye.

**Dijûn :** Xeber, çêr, kufrî ji yekê/î re kirin

## PIRS

1- Çima nivîskar şivanî kiriye?

2- nivîskar li cem kê mezin bûye?

## RASTNIVÎS

**Baneşan (!):**

**1-** Li pişt peyv û hevokên ku tirs, kêfxweşî, coş ecibandin û heyîrînê di nava xwe de dihewînin, tê nivîsîn.

**Mînak:**

Carinan diçûm xwendinê, lê çi xwendin!

Ax! Çi welatekî xweş, mîna buhiştê ye.

Hewar e! Agir bi malê ket.

## RÊZIMAN

**Sê demên bingehîn hene:**

### 1- Dema Borî:

Kar û bûyerên ku di **demên borî** de hatine kirin, dide diyarkirin.

**Mînak:**

Min cil **şûştin.**

Diyar **çûye** gund.

Wê xatir ji min **xwestibû.**

## 2- Dema Niha:

Dema karek di dema têdeyî de bê kirin jê re **dema niha** tê gotin.

| Rader | Qertafa dema niha | Rayek | Qertafa kesane | Dema niha |
|---|---|---|---|---|
| xwarin | di | xw | im | Dixwim |

**Mînak:**

Reşad zeviyên xwe av **dide**.

Karker xaniyekî ava **dikin**.

Gulê rojnameyê **dixwîne**.

## 3- Dema Bê:

Ji kar û bûyerên ku dê çêbibin re dema bê tê gotin. Dema bê bi alîkariya amraza dema bê (dê, ê) pêk tê.

| Rader | Amraz | Qertaf | Rayek | Qertafa kesane | Dema bê |
|---|---|---|---|---|---|
| xwarin | dê | bi | xw | im | dê bixwim |

**Mînak:**

Em **ê** di roja cejnê de serdana xizmên xwe **bikin**.

Kawa **dê biçe** zanîngehê.

Xezal **dê** cilan **bidirû**.

## HÎNDARÎ

- Di vê serpêhatiyê de bûyera herî bala te kişandî, çi ye û çima?
- Hevokekê binivîse û di her sê demên bingehîn de bikişîne.

# WANE 13

## NAME



Hevalê min ê birêz,

Piştî min nameya te, bi rondikên hezkirinê şil kir, wijdana xwe bi rondikên bextewariyê şûşt...

Girîngiya we dayî xemrevandina hevala xwe, ji min re da diyarkirin ku hebûna hevalekî weke we, bi binyat û dilpaqij xweşiyeke mezin e...

Hevalê min ê giranbuha!

Çawa pirtûka binirx a leheng û qehremanê dîrokê bûye rêzana gelê kurd, bi heman rengî gelek hêviyên min ji we hene... Hewl bide ku ev hêviyên min vala dernekevin, weke penda pêşiyan dibêje: "Rojek xweşî çêtir e ji hezar salên nexweşî." Daxwaza min, tevahî xweşî bibin rêgezên jiyana we...

Hevalê min ê ku hezkirina wî ji min re, ji her tiştî pêwîstir,

Ji bo ez bikarim piştrast, dilşad û gavên nû biavêjim, ez ê nameya we bixwînim. Wêrekî û kûrbûna di nameya we de, dê ji min re wêrekiyeke nû biafirîne...

Hûn afrînerê xweşiya heyînê ne. Hewldanên min ên jiyanê ew in ku di dema pêş de bibim hevaleke we ya baş.

Hevalê min ê dilovan,

Hûn û hevalên xwe dê bigihîjin armancên xwe... Ger tu vê serkeftinê daxwaz bikî, tu tişta ku bibe sedema nepêkanînê tuneye.

Bi rêzdarî rûyê te maç dikim.

Silav û Rêz…

## PEYV

**Giranbuha:** Hêja, binirx

**Pêgir** **:** Dilsoz

## RASTNIVÎS

**Sêxal (...):**

Li dawiya hevok û mînakên temam nebûyî tê bikaranîn.

**Mînak:**

Min dixwest ku ez ji te re bibêjim ...

Xwendekarên me yên dibistanê ev in: Egîd, Hogir ...

## PLANA NAMEYÊ:

**Beşa destpêkê:** Di vê beşê de armanc bi awayê vekirî derdikeve holê û piranî kurt tê nivîsîn.

**Beşa naverokê:** Tişta ku em bixwazin bêjin, em di vê beşê de diyar dikin.

**Beşa encamê:** Beşeke herî kurt e, bi niyaz, xwestek, evîn û silavan bi dawî dibe.

Dîrok → **Destpêk**

Bang

............................................................ → **Naverok**
............................................................

............................................................ → **Encam**
............................................................

Nav û paşnav

Navnîşan Şanenav

**Namedank**

Navnîşana hinêr

Pûl

Navnîşana girtek

# WANE 14

## BIHAR


**Gava dinê dibe bihar**
**dibişkivin devî û dar**



**Zozan têne guhartin zû**
**mîna cilên bûkên ji nû**

**Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul**
**direvînin xeman ji dil**
**Dinya dibe wek gola şîn**
**çîçek didin, sed rengî bîn**

**Xasma siban berbangê zû**
**tev radibin, ew teyr û tû**



**Vêkra dikin şahî û saz**
**hişyar dibin hulik û baz**

**Bilbil dibe dengbêjê wan**
**dike qîrîn ji dil û can**

**Pîroz dikin rojên ji hev hîn**
**xweştir e bihara şev**
Osman Sebrî

### PEYV

**Xasma:** Bi taybet

**Vêkra :** Bi hev re

**Pend :** Şîret

## EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN

Osman Sebrî di sala 1905’an de, li gundê Narincê yê girêdayî Semsûrê ji dayîk bûye. Di sala 1915’an de bavê wî diçe ser dilovaniya Yezdan. Osman Sebrî, sala 1922’yan xwendina xwe bi dawî dike.

Osman Sebrî weke gelek kesên din ên kurd, ji ber têkoşîna xwe bi awayê ramanî tîne zimên, gelek caran rastî êrîşên dewletê tê û bi tevahî 12 salan hatiye girtin. Piştre koçberî Sûriyê dibe , dîsa rastî astengiyên desthilatdariya Ferensayê tê, yên ku wî sergonî girava Madîgaskar dikin.

Osman Sebrî di sala 1993'yan de, li Şamê diçe ser dilovaniya Yezdan, li goristana şehîdan a li Berkevira Dirbêsiyê hatiye veşartin.

Berhemên wî:

**1-**Bahoz

**2-**Derdên Me

**3-**Çar Leheng

**4-**Dîwana Helbestan

**5-**Giramera Kurdî

## RASTNIVÎS

-Xalbendiyên pêwîst di mijara jêr de bi kar bînin.

Çawa pirtûka binirx a leheng û qehremanê dîrokê bûye rêzana gelê kurd bi heman rengî gelek hêviyên min ji we hene Hewl bide ku ev hêviyên min vala dernekevin weke penda pêşiyan dibêje Rojek xweşî çêtir e ji hezar salên nexweşî Daxwaza min te vahî xweşî bibin rêgezên jiyana we

## PIRS

1- Helbestvan xweşikbûna biharê çawa tîne zimên?

2- Gelo di bin navê biharê de nivîskar dixwaze çi bîne zimên?

3- Armanca nivîskar ji "hulik û baz" çi ye?

## CUR Û AWA

Mijara ku te xwendî hûnandî ye. Bi pîvan û bareyan ji pexşanê hatiye cudakirin.

Tu fêr bûbûyî ku **bareya lawaz** wekheviya tîpeke tenê ku li dawiya rêzikên helbestê tê dubarekirin e.

**Mînak:**

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gu**l**,
Direvînin xeman ji di**l**.

Weke di malika jor de jî tê dîtin, li dawiya her rêzikekê tîpa dengdar “**l**” hatiye dubarekirin, **bareya lawaz** e.

Tu fêr bûbûyî ku **bareya tam** wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestê tên dubarekirin e.

**Mînak:**

Dinya dibe wek gola ş**în**,
Çîçek didin sed rengî b**în**.

Weke di malika jor de jî tê dîtin, li dawiya her rêzikekê dengê “**în**” hatiye dubarekirin, **bareya tam** e.

# HÎNDARÎ 2

**Bersiva rast hibijêrin.**

**1- Çima pêwîst e kurd ji mirinê netirsin?**

**a**- Ji bo ku dewlemend bibin.

**b**- Ji bo ku xizmeta dostê xwe

bikin. **c-** Ji bo ku karibin şer bikin.

**d**- Ji bo ku navê kurd û rûmeta kurdan biparêzin.

**2- Çima Şahê Îranê êrîşeke ew qas dijwar bir ser Xanê Lepzêrîn?**

**a**- Ji ber ku Xano dewlemend bû. **b-**

Ji ber ku Qesreke xweş çêkiribû.

**c**- Ji ber ku Xano dixwest kurd azad bijîn.

**d**- Ji ber ku Xano ziyaneke mezin dabû Şahê Îranê.

**3- Çima xwîna mêrxasên Xano weke robarê biharê diherikî?**

**a**- Ji ber ku direviyan.

**b**- Ji bo ku parastina kelhê

bikin. **c**- Ji ber ku xwe dispartin

Îranê. **d**- Ji ber ku bê xem bûn.

**3- Kîjan curenivîsên li jêr bi bangî dest pê dike?**

**a**- Name **b-** Bîranîn **c**- Hevpeyvîn **d**- Çîrok

**5- Di kîjan hevokên li jêr de hevalnav(rengdêr) heye?**

**a**- Gulê bîne. **b**- Gula sor bîne.

**c**- Sorgulê bîne. **d**- Gul û Sosinê bîne.

**6- Nîşaneya li dawiya hevokên asayî tê bikaranîn kîjan e?**

**a-** Nîşaneya baneşan **b-** Nîşaneya cotxal

**c-** Nîşaneya xal **d-** Nîşaneya pirsê

**7- Kîjan peyvên li jêr lêker e?**

**a-**azad **b-** hatin **c-** ku **d-** li rex

**8- Ji peyvên li jêr kîjan daçek e?**

**a-** Li **b-** Ger **c-** çû **d-** û

**9- Ji nivîsên ku ji aliyê kesekê/î ve, ji bo çareseriya pirsgirêk, gilîkirin û zanistgirtinekê ji cihê peywendîdar re tê nivîsîn, çi tê gotin?**

**a-** Name **b-** Lezgînî **c-** Daxwazname **d-**Vexwendiname

**10- Ji nivîsên ku bûyeran bi awayekî bi ken û henek rave dikin, mirovan dihizirînin û waneyekê didin re, çi tê gotin?**

**a-** Çîrok **b-** Serpêhatî **c-** Destan **d-** Pêkenok

**11- Ji helbestên bi jimareke diyar a kîteyan hatiye nivîsîn re, çi tê gotin?**

**a-** Helbestên bêpîvan **b-** Helbestên serbest
**c-** Helbestên xwezayî **d-** Helbestên bipîvan

**12- Ji curenivîsên di derbarê mijareke diyar de li gorî hizir û ramanê rave dike, zanistê li dora bûyerê kom dike re, çi tê gotin?**

**a-** Metelok **b-** Destan **c-** Ramanî **d-** Pêkenok

**13- ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**A- Ji wekheviya du dengên di dawiya rêzikên helbestan de tên dubarekirin re, bareya lawaz tê gotin. ( )**

**B- "Amedê <u>nivîsîbû</u>" lêkera dema niha ye. ( )**

**C- Helbesta bi navê 'Bihar' a Cegerxwîn e. ( )**

**Ç- Helbestvan û wêjevanê kurd ê di sala 1903'yan de li Hesarê ji dayîk bûye Cegerxwîn e. ( )**

**D- Nîşaneya di destpêka hevokên peyvînê de tê bikaranîn cotxal e. ( )**

# BEŞA 3

- ŞANO
- NEWROZ
- GOLA QULINGAN
- 8'Ê ADARÊ
- BÊRIYA BOTAN
- KELHA HEWLÊR
- KÎVROŞK Û KÎSO
- JÎNAMEYA LEYLA QASIM
- BINIVE LOLO
- PÊNASEYA ŞANOYÊ
- AŞÛT
- QAZÎ MIHEMED
- AXÎN JI BO KURDISTANÊ
- DAPÎRA BELENGAZ

# WANE 1

## ŞANO



Di demên berê de, li gundekî aliyê Torê, malbateke xizan hebû. Navê bav Biro, navê dayîkê jî Zînê bû. Biro, li mala begê Torê, navmaliyê dike. Sê mirîşkên Zînê hebûn. Hêkên wan mirîşkan difiroşe û pê debara xwe dike. Nanê wan nanê cehî ye. Nanê genimî wisa bi hêsanî nakeve destên wan. Zarokên wan ên destpêkê, mîna zarokên gundiyên wan, hemû bi nexweşiya "Birîna Reş" mirine û çûne. Tenê ji vê nexweşiyê lawikekî wan, sax filitiye. Navê wî Bedo bû. Wan jî ew daye ber xwendinê. Li bajarê Amedê dixwîne. Li vî gundî, hîna lawê beg jî amadehî nexwendiye û neqedandiye. Kêfa dayîka wî pir tê, ji ber ku lawê beg dê nikaribe bibe "onbaşiyê eskerî", lê Bedo di çavên bavê xwe de hîn ne tiştek e.

Di perdeya duyem de, ev danûstandina balkêş di navbera Biro, Zînê û lawê wan Bedo de derbas dibe.

**Bedo:**

-Yabo ma te divê ez bibim çi?

**Biro:**

- Onbaşiyê cendirman.

**Bedo:**

- Çawa onbaşî yabo, onbaşî çi ye?

**Biro:**

- Çi? Tu yê hîn mezintir bibî Bedo?

**Zînê:**

-Ji xwe Biro, ma tu nizanî, wê lawê min hîn mezintir bibe?

**Biro:**

- Ha ho! Zînê, niha lawê min bikare, wê bibe rêveberê navçeyê.

**Bedo:**

-Erê yabo! Ez dikarim bibim rêveber, lê hîn tiştên girîngtir hene. Weke bijîşk, endezyar, dadger û parêzer.

**Biro:**

- Kuro lawo tu jî weke diya xwe yî, kengî te dikin, ew ên tu dibêjî? Ma ev qas zarokên beg û axan, qeliyan ku te bikin midûr û bijîşk.

**Bedo:**

- Na yabo na, niha ne wiha ye, kî bixwîne, dibe her tişt.

Roja ku Bedo hatiye mala bavê xwe, gundiyekî wan yê bi navê Sado tê mêvandariya wan. Ji Bedo, çend pirsên ser efsaneyên sewalan-ajalan dipirse. Bedo pê dernaxe, bi van tiştan nizane. Sado jî bi çîrokên demên berê efsaneyên ser van lawiran rave dike. Bedo jî çend nûçeyên ser zanist û teknolojiyê yên welatên dewlemend ên weke Ûrus û Emerîkan ku diçin ser heyvê ji wan re radigihîne. Tavilê hestên olî yên Xalê Sado radibin. Li ser temenê dinyayê, li ser siyaseta balkêş a Partiya Demokrat û Partiya Xelkçiyan a Turkiyeyê dipeyvin, dabaşa xelayê dike.

Dawiyê Bedo dibe bijîşk, li ‘Nexweşxaneya Amedê’ bijîşkiyê dike. Li rewşa gundiyan dipirse. Bi wan re pir têkildar dibe. Dê û bavê xwe tîne ba xwe. Li mala xwe, li nexweşên gundiyan dinêre. Çend zarokên gundê wan ku bi nexweşiya "Birîna Reş" ketine, li ber mirinê ne, tînin mala Bedoyê Bijîşk.

***Musa Anter (Birîna Reş)***

## PEYV

**Onbaşî** **:** Berpirsê deh leşkeran

**Cendirme** **:** Leşkerê dewleta Tirk ê ku li gundan erka xwe pêk tîne.

**Ûrus** **:**Rûsya

## EM NÎVÎSKARÊ XWE BINASIN

Mûsa Enter di sala 1918'an de li gundê Zivinga girêdayî Nisêbîna Mêrdînê ji dayîk bûye. Dibistana xwe ya seretayî li Mêrdînê, ya navîn û amadehî jî li Edenê xwendiye. Di 20'ê Îlona 1992'yan de di encama êrîşeke çekdarî û hovane de li Amedê jiyana xwe ji dest daye û tevlî karwanê nemiran bûye û li gundê Stilîlê yê girêdayî Nisêbînê spartine axê.

**Berhemên wî:**

Bîranînên Min 1-2

Qimil

Vakaîname

Birîna Reş

## RASTNIVÎS

**Nîşaneyên xalbendiyê yên pêwîst bi kar bînin.**

**Bedo**
Yabo ma te divê ez bibim çi
**Biro**
Onbaşiyê cendirman
**Bedo**
Çawa onbaşî yabo onbaşî çi ye
**Biro**
Çi Tu yê hîn mezintir bibî Bedo

**Zînê**
Ji xwe Biro ma tu nizanî wê lawê min hîn mezintir bibe
**Biro**
Ha ho Zînê niha lawê min bikare wê bibe rêveberê navçeyê
**Bedo**
Erê yabo Ez dikarim bibim rêveber lê hîn tiştên girîngtir hene Weke bijîşk endezyar dadger û parêzer

## CUR Û AWA

*Ji wan nivîs û berhemên bi mebesta li ser dikê bê lîstin û hatine amadekirin re* ***şano*** *tê gotin.*

We mijareke ji axaftinên pêşberî hev pêkhatî xwend. Em di vê mijarê de van taybetmendiyan dibînin:

**1-**Mijar, bûyerê bi awayekî rasterast şîrove dike. (Em vê, ji axaftina kesan têdigihîjin.)

**2-** Nivîsên ku bûyeran didin têgihandin, **şano** ne. Hemû berhemên nivîskî, ji bo xwendinê tên nivîsîn, lê şano ji bo temaşekirinê tê nivîsîn.

**3-** Şano hem bi awayê 'hûnandî' û hem jî bi awayê 'pexşan' tê nivîsîn. Berhema we xwendî, bi çi awayî hatiye nivîsîn?

**4-** Şano jî weke hemû berheman ji sê beşan; destpêk, naverok û encamê pêk tê.

**5-** Ew berhemên li ser dikan tên lîstin, dibe ku ji yek an jî ji gelek beşan pêk bên.

## RÊZIMAN

**Di kurdî de qertaf dibin du cure:** "Qertafên Sazker" û "Qertafên Kêşanê"

**a- Qertafên sazker:** Ev cure qertaf, dema ku tên pêşî yan jî paşiya peyvan ji wan peyveke nû saz dikin.

**Mînak:**

| Peyva xwerû | Qertafa sazker | Peyva pêkhatî |
|---|---|---|
| Aş | -van | Aş**van** |
| Gund | -Î | Gund**î** |
| Sol | -bend | Sol**bend** |
| Derya | -çe | Derya**çe** |
| Girtin | wer- | **Wer**girtin |
| Xweş | ne- | **ne**xweş |

**b- Qertafên kêşanê:** Ew qertaf in ku tu wateyê li peyvê bar nakin, lê tenê ji bo rewşekê tên bikaranîn.

**Mînak:**

| Qertafa kêşanê | Peyv | Hevok |
|---|---|---|
| -a | mal | Mal**a** me li gund e. |
| -ê | heval | Ew heval**ê** min e. |
| -ên | dar | Darên Kurdistanê pir in. |
| -tir | dirêj | Ew ji min dirêjtir e. |
| -ek | xelat | Min xelatek wergirt. |


## HÎNDARÎ

**1-** Tu jî lîstokekê bi rengê şanoyê amade bike û ji hevalên xwe re bêje.

# WANE 2

## MIJARA SERBEST

## NEWROZ



Newroz, rojeke pîroz a serkeftina gelê kurd e. Di vê rojê de li hemberî Dehakê zordar, Kawayê Hesinkar bi ser ketiye û ew roj bûye dawîlêanîna zordariyê, bi sedê salan û bi pêşengtiya kurdan, bûye roja destpêka azadiya Rojhilata Navîn.

Her wiha di vê rojê de Kawayê Hemdem (Mazlûm Doxan) jî li hemberî zordariya faşîzma dewlata Tirk, ala berxwedanê bilind kiriye û bûye sembola berxwedana bêhempa ya li hemberî zordariyê.

Belê, berxwedana ku di vê rojê de dest pê kiriye, bi serkêşiya şehîdên nemir, di zîndana Amedê de berdewam kir û tîrêjên wê berxwedanê, xwe avêtin çiyayên Kurdistanê. Ji bo bîranîna şehîdên berxwedanê, bi hezaran çalakî hatine lidarxistin û bi hezaran ciwan tevlî refê pakrewanan bûne.

Berxwedana ku di bin tîrêjên Roja nû de, pêş diket, di salên 90'î de, derbasî qadên serhildana gel bû û ev berxwedan bilind bû, heya giha her çar aliyên Kurdistanê. Bi vê berxwedanê, Kurdistana ku hatibû tarîkirin, hêdî hêdî ronî dibû.
Ev roja ku di bin perdeya reş de hatî veşartin, êdî perdeya xwe qetand û careke din, weke guleke biharê, serê xwe hilda û bêhna wê belavî hemû qadên cîhanê bû.

Ji ber bandora berxwedêrên azadiyê, êdî ev roj ji aliyê gelek kesan ve jî tê pîrozkirin. Bi taybet di roja me de dewletên

desthilatdar dixwazin wateya vê rojê berevajî bikin û weke cejneke xwe, ji xwe re bi kar bînin. Lê gelê kurd yê ku bi tîrêjên zanista Rêberê gelên bindest şîn bûyî û bi xwîna pakrewanan hatî avdan,

tu caran rê neda û nade ku ev roj ji wateya xwe ya rast derkeve û vê rojê her tim li qadan, ji bo bidestxistina azadiyê, weke roja berxwedanê, pîroz dike.

# WANE 3

## GOLA QULINGAN



Dem meha Gulanê bû, berf nemabû, deşt şîn bûbû, li çiyayên biçûk hîn jî berf hebû. Çiyayê Sîpanê jî weke şîr spî bû.

Ev deşt, deşta Patnosê ye, li vê deştê giya xwe li çokan dide. Bê qutbûn weke mehfûrekê, şîn e. Di deşta rast de Çiyayê Sîpanê bi hemû xweşikbûna xwe derdikeve pêşberî te. Ew li rasta serê te bilind û bilind e. Tu nikarî serê xwe rakî û li gupika wî binêrî, tu ditirsî... Dema ku tu ji dûr ve wisa li Çiyayê Sîpanê dinêrî, ji Çiyayê Agirî bi heybetir tê xuyakirin. Aliyekî wê Gola Wanê, aliyê din jî deşta Patnosê ye. Ew mezinahî ji nava deştê derketiye û bilind bûye. Lê belê hilkişîna serê Çiyayê Sîpanê hêsan e. Mirov dikare bi hêstiran heya nêzîkî gupika serê wî biçe. Ew qas ne asê ye. Li ser serê wî gelek zûng hene.

Ji heriyê tirimbêl nikarin bên û biçin. Ez ji Agirî têm, em sê heval in, di bin her yekî ji me de, hespekî kihêl ê resen heye. Hevalekî hespê xwe yê siwariyê da min, hespê ku weke xezalê, ew qas rê jî çû, lê careke tenê jî nehiltepilî, tenê bin guh û rûyê wî xwih da.

Di deştê de golên avê hene; ew ên baranê ne. Li kêleka wan bi hezaran cureyên firindeyan hene. Firindeyên masîgir, quling, qaz, ordek... deşt ketiye destê qulingan, di her gavê de yek heye. Li ser lingên xwe yên zirav û dirêj kuriya xwe dihejînin û digerin. Perê wan ên dirêj şor dibin. Bi dereke wan ve, çirîskek ji nişka ve hildibe û vedimire. Di nava firindeyan de, firindeya ku kesekî yan jî tiştekî nêzîkî xwe nake quling e, min li gelek cihan quling dîtine. Li vir mirovan gelek nêçîra qulingan dikir, ji ber vê tenê yek quling jî derfet neda ku ji sê sed metreyan kêmtir kes nêzîk bibe. Lê li derdora gola wanê dihêlin ku tu, ta sed metreyan jî nêzîk bibî, sedema wê jî heye. Kuştina qulingan li dora Gola Wanê gunehekî mezin tê dîtin. Ji ber wê yekê, kesên zana, qulingan nakujin û di encamê de ew der tejî quling bûne. Di ser me re refek quling diborî û diçû, ne tenê refek, çend ref... di her refekê de bêjimar quling hebûn.

Hevalê li gel min navê wî Mistefa bû; bi xwe xelkê Agiriyê bû, ev der baş dinasî.

Digot: Ev quling diçin Gola Wanê û li rexê avê, li cihekî ku kes lê neyî, di hêlînan de hêkan dikin. Dora Gola Wanê qerebalixa qulingan e. Belkî li tu cihê cîhanê ew qas quling nebin. Tu diçî cihekî dibînî deşt seranser tejî quling in, wisa weke keriyên pez zêde ne.

Min deşt nîşan kir. Aha, li vê derê jî ew qas pir in... ma ji vê zêdetir jî wê quling hebin! Seranserî deştê tev quling in.

Got: "Ey hevalê min, ev jî quling in? Ev kit û mit in, xwezî em rastî bihatana, te yê ew li deştê bidîtana û zimanê xwe gez bikira."

Em nêzîkî quntara Çiyayê Sîpanê dibin, gupikê wî yê bi berf êdî nayê dîtin, bi şînatiya esman re bûye yek. Hevalê min,

vê carê dest bi stranekê li ser Sîpanê kir. Di stranê de efsaneyeke evîndariyê tê ziman. Sê demjimêran stran got û nikarî bi dawî bike. Straneke dilşewat bû, weke pêlên deryayê... di ser me re ref bi ref quling ber bi Gola Wanê ve diçûn. Seriyekî refê, li quntara Çiyayê Sîpanê û seriyê din jî li Gola Wanê ye.

## PEYV

**Heybet** : Tirs, saw, mezinahî, bihêrs

**Zûng** : çal, kort, cihên ku ji derdorên xwe nizimtir.

## PIRS

1- Çima nivîskar ji Gola Wanê re gotiye, Gola Qulingan?

2- Nivîskar û hevalê xwe diçin ku derê û kengî?

3- Nivîskar li Deşta Patnosê çi dike?

## RASTNIVÎS

**1-** Nîşaneya **dabirê:** Qertafên ku bi hejmaran ve tên nivîsîn bi nîşaneya **dabirê (')** ji hejmaran tên cudakirin.

**Mînak:**

- Di sala 1993'yan de gelê Cizîrê serî hilda.

- 15'ê Gulanê cejna zimanê kurdî ye.

**2-** Li ser her peyveke li jêr, hevokekê binivîsin.

Gol, Wan, quling, gulan

## CUR Û AWA

Di mijara gola qulingan de geştyar dabaşa Gola Wanê û qulingên wê dike. Tê de cihên dîtî û hestên pêhesyayî bi awayekî berfireh tîne ziman.

Hûn berê fêr bûbûn ku Ew curenivîsa ku nivîskar tê de dîtin, agahî û pêhesînên xwe yên li ser cihê ku lê geriyayî radigihîne **geryaname** ye.

## RÊZIMAN

Navdêr: Ji peyvên ku tişt û kesan didin naskirin re, navdêr tên gotin.

**Nav li gorî wateya xwe dibin du beş:**

1- Navên şênber.

**2- Navên razber.**

**1- Navên Şênber:** Ji navên heyînên ku mirov bi her pênc lebetên xwe yên pêhesînê, hebûna wan diyar dike re **navên şênber** tê gotin.

**Mînak:**

mirov, ba, bêhn, tam, deng...

**2- Navên Razber:** Ji navên heyînên ku mirov bi her pênc lebetên xwe yên pêhesînê, nikare hebûna wan diyar bike, lê hebûna wan tê bawerkirin re **navên razber** tê gotin.

**Mînak:**

rûmet, jîr, exlaq, azadî, evîn, xem, bawerî ...

# WANE 4

## 8'Ê ADARÊ




**Roja Cîhanî ya Jinan** roja navneteweyî ya jinên kedkar ên cîhanê ye. Di sala 1977'an de Neteweyên Yekbûyî roja 8`î adarê weke *Roja Cîhanî ya Jinên Kedkar* pejirand.

Her çend ev roj di asta navnetewî de di salên 1970'î de hatibe pejirandin jî, bûyer û daxwaza pîrozkirina vê rojê ya weke rojeke hevbeş ya jinên cîhanê rastî salên 1800'î tê. Di 8 adara sala 1857'an de jinan li New Yorkê grevek li darxistin. Jinan bi greva xwe daxwaz dikirin ku saeta wan ya kar dakeve 8 saetan û heqdestekî weke hev ji wan re were dayîn. Lê belê di encama grevê de kargeha jinan hate şewitandin û bi qasî 129 jin di encam vê bûyerê de hatin kuştin di karge. Her çend jinan bi grevê daxwaza xwe dabin pejirandihê de şawitin. Têkoşîna bi rêxistinî ya ji bo mafên jinê di salên 1900'î de destpê dike. Di sala 1903'an de li Emerîkayê ji bo parastina mafên jinê yên aborî, polîtîk û kesayetî "Kualîsyona Sendîkayên Jinan" hate sazkirin. Di yekşema dawî ya sala 1908'an de jinên sosyalîst li New Yorkê, ji bo mafên xwe yên dengdan, polîtîk û aborî meşek pêkanîn. Her wiha ev roj weke yekem xwepêşandana "roja jinan" tê qebûlkirin. Li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê

lêgerîna jinan ya ji bo mafên xwe, di sala 1909'an de ji bi beşdariya 2 hezar kesî xwepêşandanek pêk hat û piştî vê xwepêşandanê bi beşdariya 20-30 hezar jinên karkerên tekstîlê greveke giştî hate destpêkirin. Karkerên jin, di greva xwe dixwestin ku şertûmercên xebata wan were başkirin û heqdestek baş ji wan re were dayîn. Kualîsyona Sendîkaya Jinan pêwîstiya jinên di vê grevê de pêşwazî kir û kefaleta jinên ku di vê xwepêşandanê de hatibûn girtin da. Têkoşîna Jinên Emerîkî, jinên Ewropayê jî bi tesîr kiriye.
Di sala 1910'an de li Kopenhagê Konferansa Jinên Sosyalîst a Navnetewî ya Diduyan hate li darxistin. Di konfresansê de Clara Zetkin derbarê rojeke jinan ya cîhanî de ku jin karibin tê de daxwazên xwe bînin ziman, pêşniyar kir û pêşniyara wê hate qebûlkirin. Piştî vê biryarê ku rojeke teqez nehate diyarkirin,
yekem Roja Cîhanî ya Jinan di 19 adara 1911'an de li Almanya, Awistralya û Danîmarkayê hate pîrozkirin. Giringiya vê rojê ew bû ku qralê Prusyayê di sala 1848an de hin reform mohr kiribû û di nava van reforman de jinê karibin mafên xwe yên dengdanê bikarbînin. Lê belê ev reform nehate pêkanîn. Pîrozkirina 8 adarê weke Roja Cîhanî ya Jinan jî di sala 1972an de bi rêxistineke mezin ya bi navê "Tevgera Adarê" ya li Sidneyê hate kirin, destpêkir. Piştî ku Neteweyên Yekbûyî navbêra salên 1975-1985'an weke "Deh Sala Jinên Neteweyên Yekbûyî" îlan kir, di 16 kanûna 1977'an de jî 8 adarê weke "Roja Cîhanî ya Jinan" îlan kir ku were pîrozkirin. Di salên piştî vê de welatên endamê Neteweyên Yekbûyîne 8 adarê weke Roja Cîhanî ya Jinan pîroz kirin.

## PEYV

**Kargeha:** cihên mezin ên kar

**Pejirandin:** Qebûlkirin, erêkirin

**Karker :** Xebatkar

**Encam :** Akam, netîce

## PIRS

1- Dîroka Roja Jinên Kedkar a Cîhanî digihêje kîjan salê?

2- Karkerên jin, di greva xwe dixwestin kîja mafa destbixin?

3- Di 8'ê Adara 1908'an de çi bûyer qewimî û çi encam da?

## RASTNIVÎS

**Hevokên li jêr temam bikin.**

Her çend ev roj di asta navnetewî de di salên ..……. de hatibe pejirandin jî, bûyer û daxwaza pîrozkirina vê rojê ya weke rojeke hevbeş ya ………… rastî salên 1800'î tê. Di 8 adara sala 1857'an de jinan li ………… grevek li darxistin.

## RÊZIMAN

**Raweta fermanî:** Ev rawe ji bo kesê li hember fermana kirina karekî dide.

**Mînak:**

Baş bixebite.

Ji ber baranê were hundir.

Bi goga piyan bilîzin.

Ji ser darê dakevin.

Di vê rêya xweş re biçin.

## HÎNDARÎ

**1-** Tu jî li ser mijareke diyar, ramanên xwe binivîse û di refê de ji hevalên xwe re bixwîne.

# WANE 5

## BÊRIYA BOTAN



Kanî Derwêş, ka Herekol, ka Kepir
Ka Zozanên Bavê Têlî, ka kê bir

Dibêjin ku Birca Belek hilweşî
Text û bextê Botiyan de, ka geşî

Seyrangeha Banûwa Zîn, ma çi bû
Naxuyin, qet xişr û xemlên wê li ku

Ka Westanî, ka Qesara, ka kanî
Kanên zozan, cihên bilind, kebanî



Awan jî bit kanî Beko, kanî reng
Kanîn ew bezm, kanî bade, kanî beng

Kanî Seqlan, Senefis û Nêrgizî
Gul û rîhan zeriyane, tev rizî

Kanî mîrek, ka mifirdî, kanî beng
Kanî lolo, lê lê li ku, kanî deng

Kanîn çeper, betîlik û ka celab
Nêrekew û pêjn û dengên qeb û qab



Ka banê me, yê Azîzan, kanî war
Kepirê de ne kozik in, ne jî dar

Bor mirişkan tenik biye kete ba
Ez Botî me, diştexilim her bi pa

Pa ez bêjim, pa dizanim, çi bêjim
Pa bi Xwedê, wek nexweş im û gêj im

Teter li ku, Axayê Sor û ew reng
Tembûr û ney, kemançe û zirne deng

Kanî dawet, qelîsêl û medfûnî
Tirşik, parêv, arok, mehîr, hêkrûnî

Ne Gurkêl e, ne Finik e, ne Cizîr
Ne rîspî, ne kêfxwê ye, ne gizîr

**Mîr Celadet Elî Bedirxan**

## PEYV

**Mexrib** : Li gorî helbestê, bajarên rojava

**Medfûnî** : Navê xwarinekê ye, tirşik

**Celeb** : Bir

**Mifirdî** : Noturvan, hêşedar

**Senefîs** : Gundekî li kêleka Cizîrê ye

**Seqlan** : Navê ava nêzîkî Cizîrê

**Qesara** : Navê cihekî ye

**Xişr** : Ciwanî

**Bezm** : Cirîd

**Kêfxwê** : Mezinê xiristiyanan

## CUR Û AWA

Mijara te li jor xwendî, nimûneyeke helbestên hûnandî ye.

Ew curenivîsên ku bi awayekî pir nazik û bi hev ve girêdayî, pîvana kîte û wekheviya bareyan tê de hatine bikaranîn, jê re **helbestên hûnandî** tê gotin.

Nivîsên helbest, stran, mamik û beşek ê destanan bi awayê hûnandî hatine çêkirin.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî helbestekê li ser armanceke diyar binivîse.

# WANE 6

## KELHA HEWLÊRÊ



Kelha Hewlêrê, kelheke li başûrê Kurdistanê ye. Di nîvê bajarê Hewlêrê de ye, dora wê bi firoşgehan hatiye dorpêçkirin û li ser zemîneke bilind hatiye avakirin. Dikare tevahiya bajêr bixe bin çavnêriyê.

Kelha Hewlêrê kelheke dîrokî ye. Weke tê dîtin, berê ax hatiye komkirin û bi axê girek hatiye çêkirin. Li ser vê zemînê bi kerpîçên sor dîwarên xaniyan hatine lêkirin. xanî li hemû aliyên wê bi awayekî wekhev hatine avakirin. Di pencereyên xaniyên wê re tu dikarî di bin xwe re li tevahiya Hewlêrê binêrî.
Dema tu temaşeyî kelhê dikî, dibînî ku di hinek aliyên wê de, ji ber hejîna axê, dîwarên wê herifîne. Li aliyê wê yê başûr riyek, li aliyê wê yê bakur jî riyek derbasî serê kelhê dibin. Li rex riya li aliyê başûr firoşgehên xalîfiroşan rewşeke cuda didin kelhê. Li ser devê pêpilkên riya diçe kelhê, peykerekî balkêş ê kesê ku dîroka Hewlêrê nivîsiye heye. Di destê peyker de pirtûk, li serê wî şaşik, cil û bergên wî weke temtêla kesên zanayê kevnar e. Mirov di kêleka wî peykerî re derbas dibe. Di deriyê kelhê yê bi awayê azinc hatiye çêkirin re derbasî hundirê kelhê dibe. Dema mirov temaşeyî hundirê kelhê dike, bêxweyîtiya wê

rewşeke xembar bi mirovan re dide çêkirin. Di nava riya wê de dîtina hinek leşkeran vê rewşê zehmetir dike. Ji vir derbasî deriyê bakur dibe, li wê derê jî di jor de dema tu temaşeyî jêra xwe dikî, çavên te li kolana bijîşkan dikeve.

Dema tu berê xwe didî riya ku tê kelhê, tu caran mirov bawer nake ku tirimpêl tê re derbas dibe, lê dîsa tu dibînî ku ji bo hatina kelhê, di vê riyê re tirimpêl tên bikaranîn. Dema ji kelhê ber bi jêr ve xwe berdidî, hinekî ber bi rojava ve diçî, rastî sûlava bi dest çêkirî têyî. Hinek wênekêş li wir wêneyên kesên geştyar dikişînin. Hinekî radiwestî heya ku tirimpêl rê bidin te û derbasî aliyê rojava bibî. Li wir firoşgehên di sûka sergirtî de ku hemû cureyên tiştan difiroşin, tu dibînî. Di hundirê sûka sergirtî de dikarî zêr, tiştên xwarinê yên cur bi cur û cil û bergan bikirî. Ji derveyî sûka sergirtî herî zêde şerbetfiroş bala mirovan dikişînin. Hinekî ber bi başûr ve firoşgehên alavên spî dibînî, li aliyê wê yê rojhilat firotina tiştên kevnar û antîke tên dîtin.

Kevnariya vê kelhê, dewlemendî û dîroka kurdan ji me re rave dike.

## PEYV

**Azinc : ** Akit/ Peyman

**Peyker :** Wêneyê heyînan ê ku ji heyberên cuda tê çêkirin.

## PIRS

1- Kelha Hewlêrê li ku derê ye?

2- Kelha Hewlêrê li ser zemîneke çawa hatiye avakirin?

3- Çima hinek aliyên kelhê hilweşiyane?

4- Girîngiya kelhan ji bo dîroka gelan çi ye?

## RASTNIVÎS

Kurtemijara li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin û nîşaneyên xalbendiyê yên pêwîst bi kar bînin.

Kelha Hewlêrê kelheke li başûrê Kurdistanê ye Di nîvê bajarê Hewlêrê de ye dora wê bi firoşgehan hatiye dorpêçkirin û li ser zemîneke bilind hatiye avakirin Dikare tevahiya bajêr bixe bin çavnêriyê

## RÊZIMAN

### Hevok

Dema ku çend bêje li gorî rêz û rêzikekê li pey hev rêz bibin û wateyekê bidin, ji vê koma bêjeyan re “**hevok**” tê gotin. Dîtinek, ramanek û rûdanek an jî çend rûdan û raman bi hevokê tên nimandin. Hevokek bi tîpa gir dest pê dike û li gorî wateya xwe bi xal, baneşan û pirsnîşanê diqede.

Hêmanên hevokê:

- Kirde
- Bireser
- Têrker
- pêveber

# WANE 7

## KÎVROŞK Û KÎSO



Rojekê ji rojan kîvroşk rabû û çû gel kîso. Jê re got:

- Ez hatime ba te ku em şert bilîzin. Ez û tu dê bibezin heta wî girê han, ka kî ji me dê ji berî yê din xwe bigîhîne wir.

Kîso ev yek erê kir û got: Belê, ez amade me.

Kîvroşk bi vê gotinê kenî. Xwe nepixand û ji kîso re got:

-Tu ji dil dibêjî, yan henekan dikî?

Kîso li ser gotina xwe sekinî. Soz û biryara xwe dan û bi rê ketin. Kîso hêdî hêdî, bê rawestandin diçû. Kîvroşkê lê dinêrî, dikeniya û di dilê xwe de digot: "Heta ku kîso xwe bigihîne nîvê rê, wê cîhan lê bibe şev. Ez ê niha zikê xwe têr bikim. Ji xwe paşê dikarim bi carekê xwe bigihînim serê gir".

Wisa jî kir. Di nava werzan de pel dan hev û xwarin.

Kîso qet ranewestiya û çû, li pişt xwe jî nenêrî.

Piştî ku kîvroşkê têr xwar, serê xwe rakir û li kîso geriya. Dît ku kîso bi gavên hêdî, xwe gihandibû gir û li benda wê ma ye. Kîvroşk poşman bû lê çi feyde, kîso karê xwe biribû serî.

## PEYV

**Werz:** Cihê ku zebeş, gindor û hwd tê de çêdibin.

**Gir :** Cihê ku ji derdora xwe bilintir e.

## PIRS

1- Kîvroşkê xwe li kû derê mijûl kir?

2- Çima kîso li pêşiya kîvroşkê gihaşt serê gir?

## CUR Û AWA

Tu fêr bûbûyî ku ji curenivîsên bûyereke nebûyî û negengazê bûyînê radigihînin re **metelok e** tê gotin.

## RÊZIMAN

**Li gorî rewşa pêveberê hevok:**

Li gorî pêveberan hevok dibin du cure: Hevokên navdêrî û hevokên lêkerî.

**Hevokên navdêrî**

**Mînak:**

Dar bilind e.

Ez xwendekar im.

Azadî xweş e.

**Hevokên lêkerî**

**Mînak:**

Kîso qet ranewestiya.

Kîvroşk poşman bû.

Soz û biryara xwe dan.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî metelokekê peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse.

# WANE 8

## JÎNAMEYA LEYLA QASIM

Leyla Qasim di sala 1952'yan de li Xaneqînê ji dayîk bûye. Yek ji wan keçên ku di dîroka ramyarî ya Kurdistanê de wekî pêşeng û lehenga şoreşger tê nasîn. Di 12'ê Gulana, sala 1974'an de li Bexdayê şehîd bûye.Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadehî li Xaneqînê temam kiriye. Li zanîngeha Bexdayê, Kolêja Wêjeyî, beşa Komelayetî xwendiye. Cihê xwe di nava rêzên Yêkîtiya Xwendekarên Kurdistanê de girtiye.

Di roja 28'ê Nîsana 1974'an de, Leyla û çar hevalên xwe Hesen Heme Reşîd, Nerîman Fu'ad, Azad Silêman Mîran û Cemal Hemewendî, hatin girtin. Di girtîgehê de rastî îşkence û azareke pir mezin tên. Her çendî biçûktirîn, tawan li ser wan nehatibe piştrastkirin jî lê rêjîma Iraqê, ji bo tirsandina kurdan û bi taybetî çîna rewşenbîr ku piştgiriya doza xwe ya neteweyî dikirin. Di demeke kurt de qasî 14-15 rojan bi pêkanîna dadgeheke seranser, her pênç ciwanên kurd bi darvekirinê hatin darizandin. Li gorî dîtina wan kesên ku Leyla ji nêz ve dinasîn
û ew dît, Leyla keçeke bêtirs, zîrek, axaftinxweş, esmer, bejnbilind û di karê rêxistinê de bi disiplîn û rêk û pêk bû.

Di dadgehê de li rûyê dadgerê Baasî nêrî û bi dengekî bilind wiha jê re got: "Min bikujin lê vê rastiyê jî bizanin ku bi

kuştina min, bi hezaran kurd wê ji xewa giran şiyar bibin. Ez pir kêfxweş im ku bi serfirazî û di 'Riya Azadiya Kurdistanê' de canê xwe feda dikim."

Piştî şehadata wê, Selamê birayê wê jî li Bexdayê ji aliyê Baasiyan ve hat şehîdkirin. Wêjevan û helbestvanên weke Hêmin, Mikuryanî, Cegerxwîn, Şêrgo Bêkes, Tîrêj û hwd. di helbestên xwe de dabaşa lehengiya Leyla Qasim kirine.

## PEYV

**Xaneqîn :** Navçeyeke girêdayî bajarê Silêmaniyê ye.

**Baas :** Pergala faşîst a desthilatdariya Iraqê.

**Çîn :** Tebeqe/ Qat

**Dadgeh :** Mehkeme

**Dadger :** Hakim/ Dadwer

## PIRS

**1-** Leyla keçeke çawa bû?

**2-** Çima Leyla ji aliyê rêjîma Baas ve hat girtin?

**3-** Kesên bi Leyla Qasim re hatin girtin kî bûn?

## CUR Û AWA

Tu fêr bûbûyî ku ji wan curenivîsên jiyana kesekê/î ji dayîkbûnê heya mirinê, yan beşek ji jiyana wê/î radigihînin re **jîname** tê gotin.


Di jînameyê de kar û berhemên birûmet ên xwediyê jînameyê tên diyarkirin.

## HÎNDARÎ

**1-** Çar taybetmendiyên Leyla Qasim di lênûsa xwe de binivîse û ji hevalên xwe re vebêje.

# WANE 9

## BINIVE LOLO



**Binive xweşiya dil û du çavan**

**Dadê ji te re her roj agahban**

**Da zû tu mezin bibî Bedirxan**

**Binive kezeba min, binive lolo**

**Şiyar nebe nûhû ne qenc e**

**Landik ji te re bizane qenc e**

**Bê xew nebe, paşiyê wê rêneçe**

**Binive kezeba min, binive lolo**

**Dewra felekê li ser me kîn e**

**Bextê me reş e kezeb birîn e**

**Mesken ji me re Nûh Nebîn e**

**Binive kezeba min, binive lolo**

Emîn Elî Bedirxan

Emîn Elî Bedirxan kurê Mîr Bedirxan e, kesayeteke kurdperwer, ji binemala Bedirxaniyan bû. Di sala 1851'an de ji dayîk bûye û di 1926'an de li welatê Misirê koça dawî kiriye.

### PEYV

**Agahban:** Haydar

**Rêneçe :** Rêveneçûn

## PIRS

1- Çima nivîskar ji Bedirxan re dibêje binive?

2- Çima nivîskar dibêje: "Dewra felekê li ser me kîn e"?

## CUR Û AWA

Ew rêzikên li dawiya malikên helbestê tên dubarekirin, jê re **Qulf** (**Nakarat**) tê gotin.

**Mînak:**

Şiyar nebe nûhû neqence

Landik ji te re bizane qenc e

Bê xew nebe, paşiyê wê rêneçe

**Binive kezeba min, binive lolo**

Dewra felekê li ser me kîn e


Bextê me reş e kezeb birîn e

Mesken ji me re Nûh Nebîn e

**Binive kezeba min, binive lolo**

# WANE 10

## PÊNASEYA ŞANOYÊ



Şano, hunereke herî kevnar a ku di dîroka mirovahiyê de cihê xwe girtiye. Di destpêka civakbûyînê de mirov ji bo jiyan û baweriya xwe bidomîne, li derdora agir lîstikên cur bi cur lîstine. Em dikarin bêjin ku ev dibe destpêka şanogeriyê.

Xaka Mezopotamyayê, ji hunera şanoyê re bi govend, dengbêjî û çîrokan… bingeheke bi hêz daye çêkirin.

Li Yewnanistan û Romaya kevn hunera şanoyê, xwe digihîne asta herî bilind. Ji bo şanoyê dikeyên bi heybet ên ku bi hezaran kes bi hev re dikarin guhdar û temaşe bikin, dane çêkirin. Şopên van dikeyan mirov dikare niha jî bibîne.

Elmanan beriya çêkirina bajar, nexweşxane û zanîngehan, şanogeh çêkirine.

Hebûna herî binirx gewde û giyanê mirovan e, nexweşxane cihê saxlembûna gewde û şano jî cihê saxlembûna giyanî ye. Mirovek bê giyan weke qalibekî ye; ji hizirîn, bihîstin û mirovahiya ku başî û xirabiyê ji hev cuda dike, dûr e!

Ji ber vê yekê şano, bi qasî dibistan û nexweşxaneyan girîng e. Çawa ku nexweşê gewdeyê dimire, nexweşê giyanî jî dimire.



Şano, di nava beşa wêjeyî ya herî balkêş de cih digire. Gazî derûniya civakê û kesan dike.

Di berhemeke şanoyê de, endamên weke: mijar, kes, derdor, dem, şêwe û armanc hene.

Qada şanoyê: Hemû bûyerên di nava civakê de pêk hatine yan jî dibe ku pêk werin, dikarin bibin mijara şanoyê û ji civakê re werin pêşkêşkirin.

Pîvanên çanda civakekê, şanoyên wê ne, perwerdeya mirov bi wê tê pîvan. Hestên mirovahiyê bi wê re di mirovan de tên çandin. Mirov di şanoyê de rabûn, rûniştin, ceribandin, têgihandin, nazikî û hezkirinê fêr dibin. Her ku dibînin, dihizirin û têdigihîjin.

## PEYV

**Mezopotamya:** Mezra Botan, xaka dikeve di navbera çemên Dicle û Feratê de.

**Gewde** **:** Laşê mirov

## PIRS

1- Hebûna herî binirx gewde û giyana mirovan e. Çima?

2- Pîvanên çanda civakekê çi ne?

3- Nivîskar şanoyê çawa dide têgihandin?

## RASTNIVÎS

**Bikaranîna tîpên mezin:**

**8. Hevok bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Gotinên pêşiyan rûmetên neteweyî ne.

**9. Piştî nîşaneyên xal, cotxal, pirsnîşan û baneşanê, hevok bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Pîvanên çanda civakekê, şanoyên wê ne. Hestên mirovahiyê bi wê re di mirovan de tên çandin.

- Rêzan got: Divê em biçin dibistanê.

- Ma ji azadiyê xweştir çi heye? Xweşiya azadiyê vebêje.

- Hevalino! Erka we ya sereke, bidestxistina azadiyê ye.

**c) Rêzikên helbestan bi tîpa mezin dest pê dikin:**

Ez naçim dîwana mîra

Nabim dîlê koçk û sera

Bila li min xin kêr û xencera

Feqiyê Teyran tengezarê dila

**ç) Nav û paşnavên mirovan bi tîpa mezin dest pê dikin**:

Osman Sebrî

Mehmûd Baksî

**e) Navên ku xizmantiyê diyar dikin, dema ku bi navên kesan re bûbin qalib, bi tîpa mezin tên destpêkirin.**

**Yadê** Bihar

**Apê** Osman

**ê) Navên taybet ên ku li lawiran hatine kirin bi tîpa mezin dest pê dikin:**

Qero (se)

Perê (pisîk)

**f) Navên sazî, dezgeh û rêxistinan bi tîpên mezin dest pê dikin:**

Saziya Zimanê Kurdî

Rêxistina Mafê Mirovan

Yekîneyên Parastina Gel

**g) Navê pirtûk, kovar, rojname, belavok û rêvebirnameyan, bi tîpên mezin dest pê dikin:**

Pirtûka Mem û Zîn

Kovara Hawarê

Rojnameya Ronahî

**h) Navê roj û serdemên taybet, bi tîpa mezin dest pê dikin.**

19'ê Tîrmehê roja azadiyê ye.

Serdema Neolotîkê

21'ê Adarê destpêka sersala kurdî ye.

# WANE 11

## AŞÛT



Jiyan diherike lê berf bi tûnd û dijwarî dibare!..

Mîna barana reş,li ser mirovan dibare û li pêş dibû dava mirinê. Mirin û jiyan, jiyan û mirin xwe pev diguherin. Lê dîsa darbest her dihatin amadekirin. Darbest, ji cendekên pîroz, yek li pey a

din dihatin dagirtin. Ji ber ku pêlên mirinê, ev dever ji xwe re kiribû qada giyanstendinê... Zagros, zagonên xwe yên hişk, tûj û bêwijdan li ser dilê Xinêrê çikandibûn. Her zagoneke wê bûbû dilek di sînga Xinêrê de. Carinan digirî, carinan jî dilopên xwînê jê dirijiyan! Çawa?

Destpêkê ewr li esmanên buhiştê gihan hev, çiya reş kirin û bi rûkenî pêşbazî li dar xistin. Di demeke pir nêzîk de ji barîna baranê geliyên Xinêrê, bûn qada lehiyên avê. Piştre Zagros, bagera xwe rêkir. Bagereke ew qas xurt bû, çavan çav nedidîtin, guhan deng nedibihîstin.

Piştî van tofanan, tofana mezin got: "Wa ez hatim, ê ji xwe bawer bila were şer!" Êdî berf dipeyve, hemû ziman hatin birîn. Êdî berf dimeşe, hemû meş rawestiyabûn! Êdî berfê dikir dîlan, hemû dîlan rawestiyabûn, berf dibare. Çiya bê deng û stûxwehr kiribûn. Berfa dilovan kefenê spî li ser xwezayê kiribû. Dar û daristan xeniqîbûn, lawir bê deng bûbûn, ji xwe tu

şopa biharê  nemabû. Ma  hin hêz hebûn, beramberî xezeba Zagros xwe ragirin?...

Zozana Dêrikî, bi bêrê, pêşiya deriyê rûniştgeha xwe paqij dikir. Hin hevalên wê jî berfa serê ban diavêtin, gava çavên wan bi Zozanê ket ku berfê diavêje, bi gêwil dibûn.

Heval bi lez diketin tevgerê û encama herikîna xuhdanê ji eniyan, dibû qedandina kar! Zozanê bêr da tenişta rûniştgehê, derbasî hundir bû û mazota sopê zêde kir, piştî demekê hevalên wê yên din jî li dora germahiya agirê sopê kom bûn. Zozanê berê xwe da wan rûyên ji sarmayê sor bûyîn, li ber çavên xwe yên her tim bi ken û hêvî derbas kir û kenî. Ew kenê wê, ken li derdorê belav kir. Bi dengê bêtêlê re Zozan ber bi bêtêlê ve çû.

"Ax, Ax, Ax guhdar e!"

"Belê Zagros, Ax guhdar e!"

"Rewşa we çawa ye?"

"Tu pirsgirêk nînin, rewşa hemûyan baş e, bila tu kes bi serê xwe tevgerê neke û her du du bi hev re bin, bila yek tenê bi tu deveran ve neçe.

"Rast e, di van xalan de min hêza cangoriyên li vir şiyar kirine!"…

"Baş e, duh ji Saziya Yekîtiya Rewşenbîriya Demokratîk he-valek di bin aşûtê de şehîd ket. Ger cihê we tirsnak be, wir biguherin."

"Baş e."

"Serkeftin."

″Serkeftin″

**Têbînî:** Ev mijar, bi mijara **''Pêhesîna Dayîkê''** didome**.**

## PEYV

**Aşût :** Berfa ku bi carekê ji çiyayekî yan girekî tê xwar, şape

**Xezeb:** Kîn, hêrs

**Bager:** Ba û barîna di nava hev de

**Ax : ** Ji bo nasnavê bêtêlê ye.

## PIRS

1- Bîranîna te li jor xwendî, di kîjan demsalê de û li kû derê çêbûye?

2- Nivîskar, bûyerê çawa dide têgihandin?

3- Li gorî mijarê, tu Zozanê kesayeteke çawa dibînî?

## RASTNIVÎS

**Navên parzemînan, welat, bajar, navçe, gund, tax, rê, kolan, av, çiya û navên din ên erdnîgariyê bi tîpên mezin dest pê dikin.**

**Mînak:**

Parzemîna Asya

Parzemîna Ewrûpa

Welatê Kurdistanê

Bajarê Silêmaniyê

Bajarê Waşûkanî

Kolana Şehîd Rênas

Robarê Xabûrê

Çemê Dicleyê

Çiyayê Agirî

Gundê Girziyaret

## CUR Û AWA

Te di mijarên borî de bîranîn dîtibûn û têgihiştibûyî ku ji wan nivîsên tişta bi serê nivîskarekî hatî yan jî nivîskar bi xwe bûyî bînerê bûyerê, radigihîne re **bîranîn** tê gotin.

## HÎNDARÎ

**1-** Hûn jî, çend hevokên ku navên erdnîgariyê tê de heyîn binivîsin.

# WANE 12

## PÊHESÎNA DAYÎKÊ



Zozanê, pala xwe da dîwarê rûniştgehê, lê dîwar cemidî bû. Lewra xwe li ser cihê xwe dirêj kir. Her du destên xwe kirin bin serê xwe. Hişê wê di nava çiyan de bû gerok, çiya bi çiya digeriya, ji Cûdî dest pê kir, Gabar, Herekol û Sîpan ta giha gupika Agirî, gemiya xeyala wê li Gola Wanê rawestiya û êdî bû şev, çavên wê qerimîn û çavan nema dikarîn li hember xewê li ber xwe bidin.

"Keça min! Berxika dayîka xwe! Pêjnekê dikim. Tu nexweşî! Dilê min tê guvaştin! Gewriya min zuha bûye, tayê jana xwe berdaye nava canê min. Dayê, ez qurban, çima rengê te spî ye?... Ez nabêjim karê xwe neke, na, riya xwe berdewam bike, bila tu Lîloza ber bêhna hevalên xwe bî û bila hemû ji te hez bikin. Lê min xwîşka te Jiyan dît, rewşa wê baş e. Tu dizanî
Jiyanê di encama pêlêkirina mayînekê de lingê xwe winda kiriye û niha bi lingekî ye!"

Zozan, dibeşişe ji her du quncikên çavên wê rondik dihatin xwar. Çend caran gotina dayê ji nava lêvên wê derdiket.
Vî dîmenî bala hevaleke wê kişand û ew şiyar kir.

"Zozan, Zozan! Rojbaş"

Çavên Zozanê di nava şilatiya rondikan de hêdî hêdî vebû. Çawa çavên wê bi hevala wê Têkoşîna Mêrdînî ket, bi coş got:

"Rojbaş Têkoşîn"

"Rojbaş"

"Heval şiyar bûne!"

"Na, hêj razayî ne."

"Ma demjimêr çend e?"

"Pênc û nîv e."

"Niha wan şiyar neke. Haya te ji wan hebe, carinan bê nixumandin dimînin."

Zozan, ma bi tenê, xewna wê dîsa li ber çavên wê zindî bû. Ji xwe re got:

"Dayê! Bawer bike, min tu ji bîr nekirî. Ma ez ê çawa te ji bîr bikim? Ax tu yî! Evîn tu yî! Girêdan tu yî! Dayê, yên keda dayîkê ji bîr bikin, nikarin riya pîroz berdewam bikin.

Nikarin ji çiyayên welatê me re bibin heval, ez bi şîrê te mezin bûm û ev rastî li ser dilê min nivîsiye. Wêneyê Jiyanê jî pir caran tê li ber çavên min.

Dayê hîs dikim, canê min sar e. Ez dibêjim qey qeşaya Zagrosê xwe berdaye nava min. Dayê, niha hestiyên min ji ber wê dilerizin. Nizanim, ez keça te me, keça vê axê me, keça vî welatê ku dayîktî ji şaristaniyê re kirî me! Lê dîsa jî min sar e dayê... Min sar e, dixwazim tu min hembêz bikî!... Dixwazim tu min bi germahiya xwe germ bikî!”

Di demjimêr 7'an de, Zozanê hevalên xwe şiyar kirin, da karê berfavêtinê bikin.

Gava dengê Zozanê çû wan, piraniya wan bi dengekî gotin: “Em ê berfê biavêjin?”

“Erê, em ê berfê biavêjin. Em neavêjin, berf ê me dîl bigire û piştre em ê hêdî hêdî ber bi mirinê ve herin.”

Piştî taştê xwarin, mîna moriyan dest bi karê xwe kirin. Zozan, di nava wan de bû. Zozan, ji bo xwe gêwil didîtin. Pir ji Zozanê hez dikirin û pê ve girêdayî bûn. Ji ber ku hevaltî, hezkirin, bi hev re alîkarbûyîn û tevlîbûna jiyanê di kesayeta wê de didîtin. Zozanê heya êvarî di nava hevalên xwe de, berf diavêt û bêhnekê jî li dûrî wan nediket. Lê bi hatina êvarê re rawestiyan. Çend ji wan berê xwe dan cihê televizyonê.

Zozanê dikir û nedikir, xew nedibû mêvana çavên wê, geh xwe diqulipand vî alî geh xwe diqulipand wî alî, carinan her du destên xwe li dora xwe dipêçandin, ji hemû tevgerên wê xuya dikir ku sermayê ji mêj ve xwe li canê wê pêçaye. Serê xwe danî li ser balgeh û ji xwe re digot:

“Ev çi rewş e? Çima wisa dilerizim? Lê çi dibe bila bibe, ez keça Rojê me û pora min bi tîrêjên Rojê tê ramûsandin. Min av ji kaniya jiyanê vexwariye. Ger şehîdbûnek bibe para min, fermo

bila bibe, ez amade me, ji bo wê şehîdbûnê!... Aşût bi bêbextî, weke mar bi ser wan de hat û xwe gihand rûniştgehê. Rûniştgeh biçûk bû, her du dîwarên paş û pêş bûn yek. Zozan û hevalên xwe li hember hemû hişkbûna xwezayê bûn kulîlkên Lîlozê!...

## PEYV

**Gupik** **:** Cihê herî bilind ê derekê

**Lîloz** **:** Navê kulîlkekê ye.

**Demjimêr:** Katjimêr, sa’et

**Pêjn** **:** Deng

## PIRS

1- Çima hevalên Zozanê ew qas jê hez dikirin?
2- Gelo çima Têkoşînê, Zozan ji xewê şiyar kir?
3- Çima Zozanê nikarîbû raze?

## CUR Û AWA

Parçenivîsa li jor te xwendî berdewamiya bîranîna Zozan û serdehatina Aşûtê ye.

Ji ber wê ev jî parçeyeke berdewamiya **bîranînê** ye.

## RÊZIMAN

**Kirde:** Ji hêmana ku bi kar radibe re kirde tê gotin.

Mînak:

**Gulistan** helbestekê dinivîse.

**Mîran** ji xewê rabû.

**Em** ji welat hez dikin.

## HÎNDARÎ

**1-** Tu jî nêrînên xwe li ser taybetmendiyên Zozanê binivîse.

**2-** Destnivîsa li jêr di lênûsa xwe de binivîse.

"Dayê! Bawer bike, min tu ji bîr nekirî. Ma ez ê çawa te ji bîr bikim? Ax tu yî! Evîn tu yî! Girêdan tu yî! Dayê, yên keda dayîkê ji bîr bikin, nikarin riya pîroz berdewam bikin, nikarin ji çiyayên welatê me re bibin heval. Ez bi şîrê te mezin bûm û ev rastî li ser dilê min nivîsandiye".

# WANE 13

## QAZÎ MIHEMED

Bi navê Xwedayê Dilovan û Mîhrîban



**Gelê Kurd! Xwîşk û birayên min ên xoşewîst!**

**Birayên ku malên we talan bûyî û hûn di bin zext - zorê de ne!** Ez ê di dawiya dema jiyana xwe de, çend şîret - amojgariyan pêşkêşî we bikim.

**Bo xatirê Xwedê, êdî dijminahiya hev nekin!** Bibin yek, li hemberî dijminê zordar, li ser piyan bin û tu carî xwe nefiroşin wan! Dijmin hingê ji we re dilovan e, dema ji we sûdê bigire. Eger na, tu carî dilê wan bi we nasoje. Di her fersendê de ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj, xwe digihînin we û bi we xwe digihînin armancên xwe. Dijminên gelê kurd gelek zalim û bê rehm in. Nîşana pîroz a her neteweyî, yekîtî û hevkarî ye. Ev nîşana pêşiyên we ye, ji bilî vê rewşê, ev gel tune dibe û di bin destên biyaniyan de dîl dimîne.

Ey gelê kurd!

Tu tiştê we, ji yên gelên cîhanê kêmtir nîne. Belkî dilêrî û xîreta we ji yên gelek gelên ku gihîştine azadiya xwe zêdetir e. Ew jî niha ji pencên dijmin rizgar bûne, rojekê weke we bûn. Lê ew bûn yek û gihîştin azadiya xwe. Ji vê û pê de, êdî ji destên wan tiştekî negirin û nebin dijminên hev. Hûn jî weke gelên cîhanê bigihin azadiya xwe. Dema hûn li hember hev dijminî û çavnebariyê nekin, hûn ê bikarin azadiya xwe bi dest bixin.

Gelî biraderan!

Êdî bi fend û fêlên dijmin nexapin. Dijminê kurdan ji kîjan nijad û neteweyê be, dîsa dijmin e. Bê rehm û bê wijdan e. Tu carî dilê wî bi kurdan naşewite. Wan bi hev dide qirkirin û kuştin.

Tu dijmin, ji dijminê kurdan bêrehmtir û ji Xudê netirstir nîne. Hemû bêdadî û nemirovahiyê li hember kurdan rewa dibîne. Di kûrahiya dîrokê de, li hember kurdan her tim bi kîn û dijminî tevgeraye û tevdigere.

Tu carî li hember kurdan durist nebûye. Çend soz û peyman dane, hemû ji bo fen û xapandinê bûne. Ez weke birayekî we yê biçûk, ji we re dibêjim:

"Bo xatirê Xweda, pişta hev bigirin, dema dijmin ji we re qenciyê bike, baş bizanin ku ew dê jehrê bi we bide vexwarin. Ger hezar carî, bi Quranê sond jî bixwe dîsa jî dê we bixapîne."

Ez di dawiya jiyana xwe de, şîretan li we dikim. Bila di bîra we de be ku ji bo bextewariya we, çi ji destên min hat, min texsîr nekir. Dîsa dibêm, bila hûn bi fêlên dijmin nexapin. Ji ber ku bi Xweda, pêxember û bi roja heşrê nebawer in.

Di çavên wan de çend kurd hene, eger çi musilman jî bin, tewanbar û sucdar in. Kuştin û tunekirina wan rewa ye. Me, ji bo xwe xenîmet dihesibînin. Ger çi soza me, ne ew bû ku ez biçim, we di nava pencên dijmin de bihêlim lê min gelek caran ji we re got: “Dijminê fêlbaz gelek mezinên me, bi dek û dolaban dîl girtine û kuştine. Ji ber ku di qada şer de bi we nikarin, fend û fêlan bi kar tînin.”

Ez wan, baş dinasim. Şah û rayedarên wî, bi şandina navber û mirovên xwe, peyman dan ku em nahêlin dilopek xwîna tu kesî birije û rencîde bibe. Lê hûn niha vê encamê dibînin.

Eger serokê eşîran xiyanet nekiribana û xwe nefirotibana Hukûmeta Şah, hûn û komara me rastî vê çarenûsê nedihatin.

Niha gotina min ji we re ew e ku bila ciwanên we bixwînin. Ji ber ku ji bilî paşdemayîna perwerdeyê, tu tiştê me kurdan ji yên din kêmtir tuneye. Di vê cîhanê de çeka zanistê, ji hemû çekan bihatir e.

Baş bizanin ku dema hûn yekreng û hînkirî bin, hûn ê ciwan û li hember dijmin serkeftî bin. Divê hûn ji kuştina min, bira û kurmamê min netirsin. Dibe ku di vê riyê de, hêj gelek kes şehîd bibin, ta bigihin miradên xwe. Bawer im ku piştî min jî dê gelek bên kuştin.

## PEYV

**Rewa :** Meşrû', Zagonî

**Amojgarî:** Şîret

**Mîhrîban:** Rehîm**,** Dilovîn

**Çarenûs :** Qeder

## PIRS

1- Banga nivîskar ji bo kê ye?

2- Çima nivîskar ew qas ji neyaran bê bawer e?

3- Çima nivîskar bi şehîdbûna xwe bextewar dibe?

## CUR Û AWA

Curenivîsa li jor axaftin e.

Ji curenivîsên bi amadekarî li hember girseyeke naskirî tê vegotin re **axaftin** tê gotin.

Ev curenivîs ji bo li hember komek mirovan bê vegotin tên amadekirin.

## RÊZIMAN

**Bireser:** Hêmana ji kirina karê kirdeyê bandor dibe, **bireser** e.

**Mînak:**

Min **genim** çand.

Tu **gulan** av didî.

Şervanên me **welêt** diparêzin.

# WANE 14

## AXÎN JI BO KURDISTANÊ

Axîn ji dest dûrketinê,
Bilbilê nav baxê te me.

Ji boyî min tu Sîpanî,
Belê Siyamendê te me.

Tu çeka destê gerîla,
Armanc û nîşana te me.

Tu berxwedana zîndana,
Kemal û Mazlûmê te me.

Sed carî dê ez şehîd bim,
Hîn jî ez deyndarê te me.

Van axînan ez helandim,
Berf im li Sîpanê te me.

Ji nû, dilan de xwîn rijand,
Hozan Cegerxwînê te me.

Tu Kerkûk û Mehabadî,
Çiya û sînorê te me.

Hezar axîn bi vî rengî,
Belê perîşanê te me.

Penaber im bi rêber im,
Mêvanê Mexmûra te me.

Tu pirtûka netewî yî,
Ez pênûsa navê te me.

Xaka teyî zîv û zêr e, Bi
xwîn bi can, ez bo te me.

Jiyana bê te qet nabe,
Ez mirovê xaka te me.

Faşîst nikarin min derxin,
Ez Cûdiyê singa te me.

Ji dozê, min nagerînin,
Şahîn li esmanê te me.

Navnîşana berxwedanê,
Ez azadê rêça te me.

Xiyaneta wan nûkeran,
Yûsif û Yaqûbê te me.

Tu nexweşî li ber destan,
Ez nû hesreta te me.

Tu Belqîsa li Sebabet,
Nebî Suleymanê te me.

Yan jî tu Şirîn û Zînî,
Ez Mem û Ferhatê te me.

Bes e jîna bi wî rengî,
Ez bersiva pirsa te me.

## PEYV

**Perîşan:** Belengaz

**Zar : ** Zimanê peyvînê

**Rêç : ** Şop

**Nûker :** Kirêkirî, xwefiroş

**Hesret :** Bêrîkirin

## PIRS

1- Axîna helbestvan ji bo çi ye?

2- Helbestvan, berxwedana zîndanê ya girêdayî kê tîne ziman?

## CUR Û AWA

Dema tu temaşeyî helbesta jor dikî, dibînî ku li piştî bareyê (qafiyeyê) peyvek hatiye dubarekirin. Di helbestê de peyv an qeratafa li piştî bareyê tê dubarekirin, jê re **redîf** tê gotin.

**Mînak:**

Navnîşana berxwedanê,

Ez azadê rêça te **me.**

Xiyaneta wan nûkeran,

Yusuf û Yaqûbê te **me**.

# WANE 15

## DAPÎRA BELENGAZ

Rojekê ji rojan dapîreke belengaz û hejar hebû, lê mixabin li cihê ku lê dijiya, av tunebû. Robar bi dirêjahiya çend demjimêran ji cihê wê dûr bû. Wê şevê dapîrê ji bo çûyîna avê biryar dabû. Roja paştir dema ji xewê şiyar bû, berê xwe da avê.

Piştî çend demjimêran dapîr bi bêhntengiyeke mezin gihîşt robarê avê. Vê dapîrê destên xwe şûştin, ava xwe vexwar, bêh-neke kurt kişand û cerikê xwe ji avê tejî kir û berê xwe da malê.

Di rê de dapîra belengaz rastî tehteke bilind hat, dapîr pir bêzar bûbû û wiha got:

- Tehtê-Tehtê bi ser cerikê min de nekeve, heta ez diçim û têm.

- Baş e dapîrê ez bi ser cerikê te de nakevim, ma çi karê min heye ku ez bi ser cerikê te de werim.

Lê mixabin Tehtê dapîr xapand û heta dapîr çû karê xwe qedand û hat, temaşe kir, Teht bi ser cerikê wê de hatiye û hûr kiriye. Ji ber vê sedemê dapîr gelek bêzar bûbû û tengezariyê xwe avêtibû dilê wê û êrîşî Tehtê kir.

- Tehtê-Tehtê, tu çima bi ser cerikê min de hatî?

Tehtê jî bersiva dapîrê bi kîn û kelecan da:

- Çima giya li ser min şîn dibe?

Vê carê dapîr neçar bû û berê xwe da giyê û

got: - Giya-Giya, çima tu li ser Tehtê şîn dibî?

Giya jî bi zimandirêjiyekê, got:

- Çima bizin nêriya min dixwe.

Vê carê dîsa dapîr neçar bû û berê xwe da bizinê û got:

- Bizinê-Bizinê, tu çima giya dixwî?

Bizina hejar û belengaz ji ber bêzariyên ku hatine serê wê ji dapîrê re wiha got:

- Çima gur min dixwe?

Vê carê dapîrê berê xwe da gur û got:

- Guro-Guro, tu çima bizinê dixwî?

- Ez ê bixwim-bixwim ta bi serê dûvê xwe re jî bidim. Ger tu jin î were holê, bêje te çima wiha kir, da ku ez mafê te bidim te.

Lê belê dapîrê newêra ji ber bêhefsariya gur tiştekî bêje. Ya jê hat patika xwe xwerand û berê xwe da mala xwe.

## PEYV

**Bêhefsar** **:** Serberedayî

**Tengezar** **:** Bêzar

**Nêriya giyê :** Zîla giyê

## PIRS

1- Dema dapîr çû cem gur bi dan û standineke çawa rû bi rû ma?

2- Dema em dibêjin dapîr, jineke çawa tê bîra te?

3- Dema te çîrok xwend te çi sûd jê girt?

## RÊZIMAN

**Pêveber:** Ew hêman e ku kar, bûyer û rewşekê radigihîne. Di hevokên lêkerî de lêker bi xwe pêveber e; di hevokên navdêrî de hevalnav û navdêr li gel qertafên kesane(lêkera bûn) dibin pêveber.

**Mînak:**

Ronî pirtûkê **dixwîne**. (hevoka lêkerî)

Zîlan ji bajêr **hat**. (hevoka lêkerî)

Gundiyan baxçeyên xwe **av dan**. (hevoka lêkerî)

Hêlîn **keçeke delal e**. (hevoka navdêrî)

Ew **mamoste ye**. (hevoka navdêrî)

Ew çiya **bilind in**. (hevoka navdêrî)

## HÎNDARÎ

Tu jî çîrokeke wiha binivîse û di refê de ji hevalên xwe re vebêje.

# WANE 16

## DI CIVAKÊ DE ZAROK

Zarok, heyîneke herî birûmet a civakê ye. Ji ber ku zarok, hem bingeh hem jî diyarkerê pêşeroja civakê ye. Ji ber wê çendê parastin, pêşxistin û xwedîderketina li vê heyîna birûmet erka her mirovî ye.

Bi taybet zarok di nava hemû civakên mirovahiyê de, weke heyîneke bêguneh û pîroz e. Di bin bandora malbat û derdorê de mezin dibe.

Bê guman mafê zarokan ê pêşxistin û mezinkirinê zagoneke gerdûnî ya mirovahiyê ye. Parastina zarok a mergî û giyanî ji nexweşiyên cur bi cur, erkeke bingehîn a civak, dayîk, bav û derdorê ye. Di heman demê de divê bi hînkariyeke baş û têr bê perwerdekirin.

Divê zarok bi destûrên dilnizmî, rêzdarî, azad, hezkirin û hevaltiyê werin mezinkirin. Li hemberî her beşên zordariyê bên parastin û bi nêrîneke azad bên xwedîkirin; li gel van hest, xeyal û ramaneke azad bidin rûniştandin. Divê li pêşiya hestên wan nebin asteng, da ku bikarin xwe bi awayekî azad rave bikin.





## PEYV

**Dilnizm:** Nefsbiçûk

**Zordarî:** Zilimkarî

**Giyan-Merg :** Can/ Rih

## PIRS

1- Parastina zarokan erka kê ye?

2- Zarok li welatê me çawa tên xwedîkirin?

3- Malbat û derdor çi bandorê li zarokan dikin?

## RÊZIMAN

**Têrker:** Ji peyv û birepeyvên ku wateya hevokê têr dikin re **têrker** tê gotin.

Mînak:

Wan **îro** şahiyek li dar xist.

Zarok **li ser bên** rûniştin.

Berçem **ji malê** tê.

Sîmav **baş** dixebite.

## HÎNDARÎ 3

**Bersiva rast hilbijêrin**

**1- Piştî hevalan taştê xwar çawa kar kirin?**

**a-** Mîna karkeran. **b-** Mîna herikîna avê.

**c-** Mîna moriyan. **d-** Mîna cotkaran.

**2- Çima xew nedibû mêvana çavên Zozanê?**

**a-** Ji ber ku ditirsiya.

**b-** Ji ber ku dayîka wê dihat

bîrê. **c-** Ji ber ku nexweş bû.

**d-** Ji ber ku mergê wê bi rewşê hesiyabû.

**3- Çima rûniştgeh hat tengkirin?**

**a-** Ji ber ku heval di hundir de bûn.

**b-** Ji ber ku kel û pelên hevalan pir bûn.

**c-** Ji ber pirbûna berfê, pêlavên hevalan jî di mal de bûn.

**d-** Ji ber ku Aşût bi ser de hatibû.

**4- Helbesta "Binive Lolo" ji hûnandina kîjan helbestvanên jêr e?**

**a-** Ehmedê Xanî **b-** Feqiyê Teyran

**c-** Pertew Begê Hekarî **d-** Emîn Elî Bedirxan

**5- Nîşaneya cotxalê (:) li kû derê tê bikaranîn?**

**a-** Li dawiya hevokên neyînî.

**b-** Di bêhnvedanên kurt de yên di navbera hevokan de.

**c-** Piştî jimarên rêzkirinê.

**d-** Pêşiya axaftina kesan.

**6- Kîjan ji danasînên li jêr, ji bo curenivîseke şanoyî dibe?**

**a**- Ji wan nivîs û berhemên ku bûyeran pêşberî hev şîrove dikin û piranî li ser dikê tên lîstin.

**b**- Danasîna jiyana kesekê/î.

**c**- Xwendina gotarekê ji bo gel.

**d**- Axaftineke taybet di warê ramyarî de.

**7- "Sorgula xwendekar rojnameyan belav dike." Kîjan endamê vê hevokê dibe bireser?**

**a-** Xwendekar **b-** Rojnameyan **c-** Belav dike **d-** Sorgul

**8- Di hevoka "Gel, bi coşeke mezin Newroza xwe pîroz kir." de peyva "gel" kîjan endamên hevokê ye?**

**a**- Kirde **b**- Hoker **c**- Bireser **d**- Lêker

**9- Hemwateya peyva "serhildan" kîjan e?**

**a-** Welatparêz **b**- Raperîn **c**- Zanista civakî **d**- Wêjevanî

**10- Dijwateya peyva "pirjimar" kîjan e?**

**a**- Gelek **b**- Hindik **c**- Pir **d**- Yekjimar

**11- Kîjan peyva li jêr pêkhatî ye?**

**a-** Hinart **b-** Sorgul **c-** Hatiye **d-** Guhdar

**12- Ji wan curenivîsên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesiyayî, radighîne re çi tê gotin.**

**a-** Ramanî **b-** Serpêhatî **c-** Geryaname **d-** Gotar

**13- Helbesta bi navê “Bêriya Botan” a kîjan nivîskarî ye?**

**a-** Sebrî Botanî **b-** Cegerxwîn **c-** Hezîn Kurdî **d-** Celadet Bedirxan

**14- Leyla Qasim li kîjan parçeyê Kurdistanê hatiye dinê û ji aliyê kîjan rêjîmê ve hatiye darvekirin?**

**a- Li Bakur, ji aliyê rêjîma Tirk ve.**

**b- Li Rojava, ji aliyê rêjîma Baas ve.**

**c- Li Başûr, ji aliyê rêjîma Baas ve.**

**d- Li Rojhilat, ji aliyê rêjîma Şahê Îranê ve.**

**15- Ji cihên li jêr tîpa mezin li kû derê nayê bikaranîn?**

**a-** Destpêka navên taybet.

**b-** Destpêka navên giştî.

**c-** Destpêka hevokê.

**d-** Destpêka navên rojnameyan.

**16- Ji hevokên li jêr, kîjan bêdestûr e?**

**a-** Hat gulek ciwan. **b-** Pir xwendekar hatin.

**c-** Mamoste name nivîsî. **d-** Nêrgizê çalakî pêk anî.

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Hefte / Meh | Hefteya yekem | Hefteya duyem | Hefteya sêyem | Hefteya çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | -Bêhnvedana Havînê | -Zimanê Dayîkê<br>-Xwêndkar |
| Cotmeh | - Demokrasî | - Ay Lê Gulê<br>- Kelha Finikê | - Çûk û Pîrê | - Cûdiyê Miradan |
| Mijdar | - Min Çi Dît û Çi Nedît<br>- Delal û Xoşewîstên Min! | - Penaberiya di Şeva Tirsnak de | - Awaza Min<br>- Ekolojiya Civakê | - Ferhat û Şirîn |
| Berfanbar | - Behlûl<br>- Şerefxanê Bedlîsî | - Xabûr | - Ehmedê Xanî<br>- Çand | - Kîvroşka Jîr<br>- Welat |
| Rêbendan | - Mijara Serbest<br>- Zanist û Teknolojî | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | - Xanê Dimdim<br>- Şivaniya Min | - Name<br>- Bihar | - Şano | - Newroz |
| Avdar | - Gola Qulingan<br>- 8'ê Adarê | - Bêriya Botan<br>- Kelha Hewlêrê | - Kîvroşk û Kîso | - Jînameya Leyla Qasim |
| Cotan | - Binive Lolo<br>- Pênaseya Şanoyê | - Aşût | - Pêhesîna Dayîkê<br>- Qazî Mihemed | - Axîn ji bo Kurdistanê<br>- Dapîra Belengaz |
| Gulan | - Di Civakê de Zarok | **NIRXANDIN** | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN
# 2

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê
Komîteya Zimanê Kurdî
ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan
ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo
dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


PERWERDEYA RAST ........................................................ 8
DARA Û MAMOSTE ........................................................ 10
HEVALTIYA RAST ........................................................ 15
COTYAR Û ZEVÎ ........................................................ 19
KÎ ME EZ ........................................................ 23
MÊŞÊN HINGIV ........................................................ 27
TÊKILIYA ÇANDÊ BI ZIMÊN RE ........................................ 31
HERÊMEKE KURDISTANÊ ................................................ 33
WELATÊ MIN ........................................................ 38
ŞIVANÊ BILÛRVAN ........................................................ 41
REXNEYA LI SER PERWERDEYÊ ........................................ 50
KELHA ELODÎNO ........................................................ 56
PEZKOVIYÊN CIWAN ................................................ 62
EZ ........................................................ 67
MELAYÊ CIZÎRÎ (1407-1481) ........................................ 71
ROVIYÊ STEMKAR ........................................................ 76
GELIYÊ ZÎLAN ........................................................ 82
DAYÎKA MIN ........................................................ 86
GULBIHAR ........................................................ 88
DAXWAZNAME ........................................................ 94
DÎROK Û SIRÛD ........................................................ 97
BILBILÊ DILŞAD ........................................................ 102
NAME JI BO DAYÎKÊ ................................................ 105
TILHELEF ........................................................ 111
GIRÎNGIYA XWENDINÊ ................................................ 116

**PEYAMA NEWROZÊ ........................................................ 119**
**SIYABENDÊ SILÎVÎ Û XECÊ ........................................ 123**
**ZIMAN Û GEL .................................................................... 134**
**DR. QASIMLO .................................................................... 138**
**DÎLBEREK MIN DÎT BI ÇAVAN .................................... 143**
**SEYDAYÊ HÊJA OSMAN SEBRÎ .................................... 148**
**COTYARÎ ............................................................................ 152**

# BEŞA 1

PERWERDEYA RAST

DARA Û MAMOSTE

HEVALTIYA RAST

COTYAR Û ZEVÎ

KÎ ME EZ

MÊŞÊN HINGIV

TÊKILIYA ÇANDÊ BI ZIMÊN RE

HERÊMEKE KURDISTANÊ

WELATÊ MIN

ŞIVANÊ BILÛRVAN


HÎNDARÎ 1

# WANE 1

## PERWERDEYA RAST

Perwerde, ew zanista hizrî û kiryarî ya encama ceribandina civakê ye ku weke karê fêrkirina ciwanan tê nasîn. Civakbûyîna zarokan, bi çalakbûna perwerdeya civakê ve tê birêvebirin.

Perwerdeya zarokan ne erka desthilatdarî û dewletê ye, erka herî girîng a civakê ye. Ji ber ku zarok û ciwan ên civakê ne. Civak, neçar e ku zarok û ciwanên xwe hem weke maf û hem jî weke erkeke sereke li gorî taybetiyên xwe yên xwezayî, xwedî bike. Ji bo ku civak hebûna xwe bide berdewamkirin, ev dibe mijareke sereke û girîng di jiyanê de. Ji bo vî mafî, perwerde mafekî pîroz e û çavkaniya xwe jî, ji hebûneke xwezayî digire.




Di pêvajoya dîroka şaristaniyan de yek ji çalakiyên herî mezin ên dijberî civakê, qutkirina zarok û ciwanan ji civakê ye. Vê jî bi du rêbazan pêk tînin an mezinên wan tune dikin û dikin kole, yan jî ji bo berjewendiyên desthilatdariyê werin berdewamkirin, zarok û ciwanan perwerde dikin.

Yek ji armancên herî girîng ên şeran; weke milkê herî binirx, zarok in. Keç û xortên ciwan bi van her du rêbazan digirin nava xwe û dijberî civakê bi kar tînin. Zarok û ciwanan ji cewherê civaka wan qut dikin; ziman, çand û dîrokeke cuda bi wan didin

fêrkirin. Armanca sereke ji cewherê wan biyanîkirin e. Di rastiyê de perwerdekirina civakê ne di xema wan de ye. Sermayedarek, karkerên xwe bi çi awayî perwerde dike; desthilatdar jî ew qas kesên di bin desthilatdariya xwe de, bi heman hizrê perwerde dikin. Bi vî awayî ji jor heta jêr xeleka koletiyê didin avakirin.

Netew-dewletên ku di roja me de desthilatdariyên xwe, beriya her tiştî li ser zarok û ciwanên civakê bi riya perwerdeyê didin domandin. Zarok û ciwanên dewletê, bi hişmendiya dîrok, huner, ol û felsefeya ku li ser perwerde kirîn, êdî ew zarok nabin zarokên wê malbat û civakê, rasterast dibin zarokên desthilatdarê wê dewletê. Zorî, hêza heyberî û perwerdeyê ji bo pişaftina civakê, bûye çeka herî bihêz. Bi riya tv, înternet û rojnameyan di warê leşkerî, aborî û ya herî girîng jî, qirkirina

çandî ya civakê, dixwazin temam bikin. Bi vî awayî desthilatdar dixwazin li dijî civakê, civakeke dijber bidin avakirin; li dijî civaka xwezayî, civaka desthilatdar bidin afirandin.

Civakeke ciwanên xwe winda kirî, berevajî vê jî, ciwanên civaka xwe winda kirî, ji windabûnê wêdetir jî, tê wateya ku xiyanet li rastiya hebûna xwe kirine.

Civak û kes li hemberî vê qirkirina çandê û pişaftina dewlet û deshilatdariyê, tenê bi têkoşîna li ser hîma civaka exlaqî û siyasî bi ser dikeve.

# WANE 2

## DARA Û MAMOSTE

Rojekê Dara ji xewê radibe, li demjimêra xwe temaşe dike, dibîne ku dema wî pir kêm maye. Bi lez û bez serçavên xwe dişo, berê xwe dide dibistanê û berî ku mamoste bikeve refê, Dara derbasî refê dibe. Piştî mamoste jî dikeve refê, dixwaze temaşeyî pirtûka Dara bike, lê Darayê belengaz, pirtûka xwe ji bîr kiribû.

Mamoste: "Dara! Ka pirtûka te?"



- Pirtûka min, li malê maye.

- Çima te li malê hiştiye?

- Ji ber ku demjimêr derbas bûbû, min lez kir, ji ber wê pirtûk nehat bîra min.

Mamoste:

- Here pirtûka xwe bîne û were.

Dara bi awayekî bêgêwil ji refê derdikeve û berê xwe dide malê. Di rê de rastî birayê xwe Gabar tê.

- Ew çi ye di destê te de?

- Pirtûka te ye! Dayîka min got: "Bibe, da ku birayê te ji waneya xwe nemîne."

Dema Gabar, pirtûkê dide dest birayê xwe, Dara temaşe dike, dibîne ku li şûna pirtûka zimên a bîrkariyê aniye. Li ser wê bihêrs dibe.

- Ev çi ye, te anî?!

- Pirtûka te ye.

- Diviya te pirtûka zimên bianiya.

Piştî wê herdu bira bi hev re vedigerin malê. Dayîka wan:

- Lawê min tu çima hatî malê?

- Ez hatime pirtûka xwe.

- Ma, min pirtûka te rênekiribû?



- Belê, lê we şaş rêkiribû dayê. Li şûna pirtûka zimên, Gabar pirtûka bîrkariyê anîbû.

Li ser vê Dara pirtûka xwe girt û çû dibistanê. Di deriyê hewşa dibistanê de rastî mamosteyê hîşedar hat.

- Tu çima dereng hatî?

- Min pirtûka xwe ji bîr kiribû, ez çûm, min pirtûka xwe anî. Agahiya mamosteya min ê waneyê ji min heye.

Piştî vê gotinê mamosteyê hîşedar pê re diçe û derbasî refê dike. Li ser rewşa wî agahiyan ji mamosteya waneyê digire û Dara jî, dest bi waneya xwe dike.

## PEYV

Hêrs : Acizî

Lez û bez : Lezgîn

Hîşedar : Nobedar, Zêrevan

Gêwil : Moral

## RASTNIVÎS

Gava ku gotûbêj di navbara çend kesan de çêdibe, heke gotina mirov di nava dunikê de neyê nîşandan, xêzekê datînin ber gotina mirov.

**Mînak:**

Dayîkê ji lawê xwe re got:

- Çima tu hatî malê?

## PIRS

1- Ji bo çi sedemê Dara pirtûka xwe ji bîr kiribû?

2- Çima dema Gabarî pirtûk ji Dara re anî, Dara ew pirtûk nepejirand?

## CUR Û AWA

Ev curenivîsa we xwendî, guftûgo ye.

Ji nivîsên di serpêhatiyekê de, di navbera çend kesan de axaftin bi awayê pirs û bersiv pêş dikevin re guftûgo tê gotin. Piranî guftûgo di serpêhatiyan de pêk tên.

Guftûgo di nava nivîsên bê amadekarî de cih digirin. Ji ber ku nivîskarê guftûgoyê jê ne agehdar e ku peyivîna di navbera du kesan de wê bi çi awayî pêş bikeve.

# RÊZIMAN

## Dengzanî:

Her weke ji wateya peyvê jî xuya dike, rêziman rêz û rêçikên ziman, nîşanî mirov dide. Diyar e ku tu ziman ne bê rêz û rêçik in. Deng, peyv û hevok li gorî hinek rêz û rêçikan pêk hatine.

Deng:

Bayê ku ji cîgera spî ya mirov derdikeve û diçe zengilorê, li vir bizavekê dide têlên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, zimanê biçûk û poz, wêneyekê digire.

Li gorî we cudabûna di navbera deng û tîpan de çi ye?

Ji nîşaneyên ku dengan didin nîşankirin re tîp tê gotin.

Di kurdî de 31 deng hene. Ji wêneyê dengan ê nivîskî re tîp tê gotin.

Tîp dibin du beş: Dengdêr û Dengdar

Dengdêr û taybetmendiyên wan:

Ji dengên ku rasterast ji dev derdikevin bêyî ku rastî tu astengiyan bên re tîpên dengdêr tê gotin.

Di zimanê kurdî de "8" tîpên dengdêr hene.

"A E Ê I Î O U Û"

Ev jî dibin du beş: "Dengdêrên dengdirêj û dengdêrên dengkurt."

Dengdêrên dengdirêj: "A Ê Î O Û"

Dengdêrên dengkurt: "E I U"

Li gorî rewşa lêvan jî, tîpên dengdêr dibin du beş: "Dengdêrên rast û dengdêrên girover."

Rast: "A I E Î Ê"

Girover: "O U Û"

Dengdar û taybetmendiyên wan:

Ji wan dengên ku bêyî tîpên dengdêr nikarin deng derxin re tîpên dengdar tê gotin.

Di zimanê kurdî de 23 tîpên dengdar hene.

"B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X Y Z"

Li gorî awayê derxistina deng, dendgdar dibin du beş: "Dengdarên berdewam û dengdarên neberdewam."

Dengdarên berdewam: ew dengên ku deng didin, lê bi awayê xwezayî nikarin derkevin.

1- Li gorî cîderka dengan

Li gorî cîderkê dengdarên kurdî

Lêvkî: b, m, p, w

Ev deng bi tevgera lêvan pêk tên. Di her sê dengên pêşîn (b, m, p) de her du lêv digihêjin hev, lê di dengê “w” de lêv nagihêjin hev.

Diranlêvkî: f, v

Ev deng bi tevgera diran û lêvan der tên. Diranên jorîn bi ser lêvên jêrîn de têne guvaştin.

Diranî: t, d, s, z, n

Bi tevgera zimên a li ser diranên pêşîn pêk tên.

Pêşezmandevî: c, ç, ş, j, y, l, r

Ezmandevî û qirikî: g, h, k, q, x

# WANE 3

## HEVALTIYA RAST

30.03.2007


Hevala min, piştî pazdeh salan careke din ez ketim nava deryayeke bêdawî. Ez bi tenê bûm. Çavên min li te digeriyan hevalê! Lê qet, min tu nedidîtî. Hevaltiya te ya rast, hevala min a hêja Şîlan, ez li wê hevaltiyê digerim.

Careke din di nava deryayeke bêbinî de, bi tena xwe ez mabûm. Bê te bûm û ji te dûr bûm. Bi hesreta te û kulmek axa welatê xwe mabûm! Li ser wê axê jîn tê bîra min; ax û hezar ax!



Ez careke din bi hevaltiyeke ne rast re wiha rû bi rû dimam. Piştî wê hevaltiya me ya rast, ez êdî zû bi zû bi wê hevaltiya ne rast, baş têgihîştim. Pir zor bû ku ez beramberî ew qas zor û zehmetiyan bêm. Min kesayetên wiha ketine pey berjewendiyên xwe yên kesayetî, dîtin. Lê bizane hevala min, ez dizanim, kîjan hevaltî rast e. Hinek kesayetên wiha berjewendîperest hene ku tiştek ne xema wan e. Tenê ji bo xwe veşêrin, dikarin her tiştên xerab li ser hevalên xwe bêjin.

Ez jî, ji bo vê yekê ketime nava deryayeke bêbinî û ez mame bi tenê digerim. Lê ronahiya li ser rûyê te û hemû hevalên min ên şehîd, riya rast



nîşanî min didin. Careke din berê min didin deryaya jiyanê ya bêbinî.

Ş. Çîmen Herekol

JiPirtûka "Rêwiyên Azadiyê"

## PEYV

Hesret: Bêrîkirin

Berjewendî: Sûd

Berjewendîperest: Kesên tenê sûdên xwe diparêzin.

Jîn: Jiyan

## RASTNIVÎS

### Bêhnok (,):

Di nava hevokê de cihê ku mirov lê bêhna xwe veke nîşan dide. Bi vî awayî, xwendina hevokê hêsantir dike. Lê divê ev bikaranîn wateya hevokê neguherîne. Ango bêhnok di cihê xwe de bê bikaranîn, ji ber ku bêhnok ne di cihê xwe de bê bikaranîn, an li cihê ku pêwîstî pê hebe û neyê bikaranîn, dibe ku wateya hevokê biguhere.

### Mînak:

Bixwîne, weke birayê xwe xemsar nebe.

Bixwîne weke birayê xwe, xemsar nebe.

Peyvên hempeywir ên ku li pey hev rêz dibin, bi bêhnokê ji hev tên cudakirin.

### Mînak:

Hozan, Lîloz, Berçem û Rêwan çûn geştê.

## PIRS

1- Li gorî te, hevaltiya rast çawa ye?

2- Ji bo hevaltiyeke rast pêş bikeve, çi pêwîst e?

3- Tişta ku Ş. Çîmen Herekol bi jiyanê ve girê dida, çi bû?

## CUR Û AWA

Nivîsa we xwendî, curenivîsa rojane ye. Ji ber ku di nivîsînê de dema pêkanîna bûyerê hatiye nivîsîn, dîroka rojê jî, lê hatiye zêdekirin. Ji nivîsnên bi vî awayî re em dibêjin nivîsên rojane (rojnivîs).

Girtina nivîsên rojane dibe dewlemendiyeke çandî û ramanî. Ji bo nivîsên rojane, plan nayê çêkirin. Piştî nivîsîna dîrokê, rasterast derbasî mijarê dibe. Hevokên tên bikaranîn, pêwîst e kurt, têgihiştî û bibandor bin.

Nivîsên rojane, ne ji bo weşandina di kovar û rojnameyan de tên nivîsîn

## RÊZIMAN

Dema di peyvê de, tîpa "x" dikeve pêşiya tîpa "w" yê û bi hev re dengekî hevpar derdixin, em ji wan re dibêjin pevdeng.

**Mînak:**

Xwendin, xwarin, xwê, xweda, xwîşk û ...

Di zimanê kurdî de tu tîp nakevin navbera "x û w" yê ji bilî peyva xew ew jî awarte ye.

Tîpên "o, u, û’‘piştî pevdengê nayên.

# WANE 4

## COTYAR Û ZEVÎ

Zevîkê ez negêj im


Te j' bîra xwe bavêjim

Bizane ez çi d'bêjim

Kul û derdan ved'rêjim

Ser û bin jan û êşim

Hew vê janê ved'kêşim



Heke te ne parêzim

Bizane ez nemêr im

Zevîkê bo te d'bêjim

Natirsim ez diwêrim

Mêr im têra xwe fêr im

Xudanê tevr û bêr im

Cotyarê destqilêr im

Nev'yê Kawey' Dilêr im

Sozbit, yar te bikêlim

Ji bo zordar nehêlim

Serê çepel vehêrim

Nav axa te veşêrim

Yan xwîna xwe birêjim

Hingê pitir dihêjim

Serbest û şad û têr im

Şehîdê xakê, zêr im

Li cem milet birêz im

Li cem milet birêz im

**Sebrî Botanî**

## Em helbestvanê xwe binasin:

Sebrî Botanî yek ji rewşenbîr û helbestvanên kurd e. Ew di sala 1936'an de ji dayîk bûye. Destpêkê di medreseya olî de li gundê Sêgirka xwendiye, lê piştî demeke kurt Botanî dest jê berdaye û çûye di dibistaneke fermî de xwendiye. Piştî xwendina sê salan, wî dev ji dibistanê berdaye û ketiye nava karûbarên siyasî. Ji bo azadî û serxwebûna kurd û Kurdistanê xebitiye. Du dîwanên wî hene: "Dîwana Şîn û Şadî û Dîwana Dilistan".

## RASTNIVÎS

Malika li jêr, bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîse û bixwîne.

zevîkê ez negêj im

te j' bîra xwe bavêjim

bizane ez çi d'bêjim

kul û derdan ved'rêjim

## PIRS

1- Nivîskar pesnê çi dide?
2- Malika duyemîn a helbestê şîrove bike.

## CUR Û AWA

Ji wan nivîsên ku li gorî pîvan û bareyan hatine birêkûpêkirin û bandorê li hestên mirovan dikin re **helbest** tê gotin.

Helbesta li jor, helbesteke **pastoral** e.

**Helbestên pastoral**: helbestên ku xwezayê ji xwe re dikin mijara şiroveyê ne. Jiyana şivan û gavanan, jiyana gundan, çanda çiyan, tore û kevneşopiyên zozanan û xweşikbûna xwezayê dibin mijarên sereke yên helbestên **pastoral**.
Bareya helbesta li jor, ji bareya tam û dewlemend pêk tê.

## RÊZIMAN

1- Di zimanê kurdî de du tîpên dengdêr li gel hev nayên. Dema li gel hev tên jî tîpeke kelijandinê (h,w,y) dikeve navbera wan.

**Mînak:**

**Çiya ê bilind**, li vê derê jî, tîpa kelijandinê **''y**'' ketiye navbera her du tîpên dengdêr û bûye **Çiyayê bilind**.

Rona î ⟹ ronahî
Ba î ⟹ bawî

**2- Cihguhertina dengan:**

Di zimanê kurdî de dema tîpên dengdêr (ê,î) dikevin pêşiya tîpa kelijandinê (y), cihê xwe ji tîpa (i) re dihêlin.

**MÎNAK:**

Rê + ya min   Riya min.
Enî + ya min   Eniya min

**3- Kite:**

Ji beşa peyvê ya ku bi carekê ji devê mirov derdikeve re kite tê gotin.
Di kurdî de kiteyek dibe ku ji yekdengî heta çar dengan pêk bê, kêm caran ji pênc dengan jî pêk tê.

**Mînak:** a, av, dar, reng, stêrk.
Di kurdî de peyv ji yek kiteyê heya çar kiteyan pêk tê, kêm caran peyv ji pênc kiteyan jî pêk tê.

**Mînak:**
ax, he-val, kur-dis-tan, ber-xwe-da-nî, şer-ra-wes-tan-din.
Hevok: Natirsim ez diwêrim.
Peyv: Natirsim- ez- diwêrim.
Kite: Na-tir-sim ez di-wê-rim.

**Têbînî:** Di her kiteyekê de tîpeke dengdêr heye, tîpên dengdêr bi tena xwe dibin kiteyek, lê yên dengdar bi tena xwe nikarin bibin kite.

## HÎNDARÎ

1- Çend hevokan binivîsin û kite bikin.
2- Xwezaî, kaî, mirovaî, van peyvan bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

# WANE 5

## KÎ ME EZ



1

Kî me ez
Kurdê kurdistan
Tev şoreş û volkan
Tev dînamêt im
Agir û pêt im Sor
wek êtûn Agir
giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya diheji̇̂
Ev pêt û agir
Dijmin dikujî
Kî me ez
Kurdê serfiraz

2

Dijminê dijmin
Dostê haştîxwaz
Ez xweş mirov im
Ne hirç û hov im
Lê çi bikim bê şer
Dijmin naçî der
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazim bijîm
Ta ebed bindest
Kî me ez

3

Divê ez derxim

Dijminê xwînxwar

Şahê efyûnkêş

Jontirkê dijwar

Serbest bijîm Wek

hevçaxê xwe

Dilxweş bixwim ez

Rez û baxê xwe

Çekan hilgirim

Derkevim meydan

Rêçek nû çêkim Ji

boyî insan

Kî me ez

4

Ez im ew kurdê serhişk
û hesin

Îro jî dijmin ji min

ditirsin Bêhna barûdê

Kete pozê min

Dixwazim hawîr

Biteqim ji bin

Dîsa wek mêra

Bikevin çiya

Naxwazim

bimirim Dixwazim

bigirim Kurdistana

xwe Axa Medya

Kî me ez

CEGERXWÎN

## PEYV

**Qepsûn:** cihê ku pêtên agir jê derdikeve.

**Ta ebed:** ta dawî

**Efyûnkêş:** kesê ku efyûnê vedixwe.

**Hevçax:** hevdem

## RASTNIVÎS

**Dabir:**

Qertafên ku piştî hejmar û kurtenavan tên, bi dabirê tên cudakirin.

**Mînak:**

Di **19’ê** Tîrmeha sala **2012’an** de şoreşa Rojava dest pê kir.

Li Rojava **YPG’ê** gel diparêze.

## PIRS

1-Di malika dawî de helbestvan dixwaze çi bike?

2-Di malika duyem de helbestvan xwe çawa dide nasîn?

## CUR Û AWA

Ji agahîdayîna di mijarekê de piştgiriya nêrînekê yan jî nivîsên ku bi armanca daxuyaniyekê hatine nivîsîn re **gotar** tê gotin.

Di gotarê de tekezkirin û misogerkirin di plana sereke de ye. Armanca gotaran: Bi mijarên aliyê wan ên zanistî li pêş xwendevanên xwe ronî dikin û raya giştî pêk tînin.

Gotar, piraniya xwe di rojname û kovaran de tên weşandin. Gotarên ku mijarên wan nû bin, dikevin pêşiya rojnameyan û ji wan re **gotarên sereke** tên gotin. Lê belê, gotarên di kovaran de tên weşandin, têkildarî mijarên civakî ne.

Erka herî girîng a gotaran, bandorkirin, perwerdekirin û xwegihandina xwendevanan e.

## RÊZIMAN

**Qertafên nebinavkirî:** Qertafên **"ek û in"** peyvên binavkirî dikin nebinavkirî.

**Mînak:**

**"-ek":** gul**ek**, dar**ek**, zarok**ek**, heval**ek**, dibistan**ek** ...

Min gul**ek** diyarî mamosteyê xwe kir.

Zarok**ek** hat.

**"-in":** gul**in**, darin, zarok**in**, heval**in**, dibistan**in** ...

Min gul**in** diyarî mamosteyê xwe

kirin. Zarok**in** hatin.

## HÎNDARÎ

1-Çend hevokan binivîsin û qertafên nebinavkirî tê de bi kar bînin.

# WANE 6

## MÊŞÊN HINGIV

Salekê min mêşên hingiv nedidîtin. Kêmbûna van tebayan, bala gel jî kişandibû. Piştre em fêr bûn ku bikaranîna dermanên kîmyawî yên li ser kulîlkan, bûye sedema tunebûna van tebayên giranbuha.

Roja borî li nava daristanê, li ber bêhna kulîlkan, li ber bayê hênik dimeşiyam. Bi carekê bi dengekî xweş, ji nava xeyalan hilbeyîm. Dengê ku dihat guhê min, bala min dikişand. Ji nişka ve rawestiyam. Guhê min ê ku ji dengê awaza dosta xwe biyanî mayî, di nava beşişînê de pêl bûn.

Mêşa hingiv ne tebayeke biharê ye. Bi xwe bihar e. Dengê awazên wê, weke bêhna biharê, dilê mirovan xweş dike. Bi qurmê darekê ve gulatokên mêşan û awayê tevgerên wan li ser xeyalên me yên rewanî, tiştekî zêde nakin. Daristaneke bêdawî, di nava keskahiya wê de mirov bêhiş dibe...

Bazara di nava keskahiya wê de hatî vekirin, di wê bazarê de geryana keçên ciwan, dengê piyanên ava sûsê, rengîniya cerên şerbetê, li ser gupikê daran awazên bilbilan...

Di nava van hemû xweşiyan de hizrîna mêşên hingiv û awazên wan...

Bêguman mêşên hingivîn ji bo pêkanîna gelek karan, dermankirina gelek nexweşan, hizrîna gelek tiştan, hatine afirandin.

## PEYV

**Gupik:** Cihê herî bilind

**Beşişîn:** Kenekî nerm-binlêvan-girnijîn

**Gulatok:** Koma mêşan

**Bazar:** Sûk

**Sûs:** Navê giyayekî ye, li Kurdistanê şîn dibe û dibe derman jî.

**Hilbeyîn:** Veciniqîn.

## RASTNIVÎS

Dema ku mirov bixwaze bide zanîn ku nivîsîn bi dawî nebûye, **sêxal** tên bikaranîn.

**Mînak:**

Di nava van hemû xweşiyan de hizrîna mêşên hingiv û awazên wan...

Dema ku mirov nivîsekê ji cihekî veguhêze û ew nivîs ne temam be, bi **sêxalê** tê diyarkirin û sêxal di nava kevanekê de tê danîn.

**Mînak:**

(...)

Dengê kê ye dinalî, nalenala welat e

Dikê gazî, dikalî, rabin çaxê xebat e

(...)

## PIRS

**1-** Çima nivîskar ew qas ji mêşên hingiv matmayî mabû?

**2-** Sedema mirina mêşên hingiv ên giranbuha, çi bû? **3-**

Taybetmendiyên mêşên hingiv, çi ne?

## RÊZIMAN

**Veqetandek:** Ew qertaf in ku girêdanê di navbera peyvan de çêdikin. Her wiha zayend û mêjera peyvan jî diyar dikin.

Veqetandek, di nava xwe de dibin du beş**:**

### 1- Veqetandekên binavkirî:

**a** (mê û yekjimar)

**ê** (nêr û yekjimar)

**ên** (pirjimar)

**Mînak:**

Diy**a** wê bijîşk e.

Pirtûk**a** min rengîn e.

Biray**ê** wî têkoşer e.

Bav**ê** Delalê mamoste ye.

Kulîlk**ên** me rengîn in.

Zarok**ên** me dixwînin

### 2- Veqetandekên Nebinavkirî:

**eke** **(**mê, yekjimar)

**ekî** (nêr, yekjimar)

**ine** (pirjimar)

**Mînak:**

Met**eke** min heye.

Sozvîn keç**eke** pir xweşik e.

Navê ap**ekî** min Hozan e.

Hogir mirov**ekî** zana ye.

Pirtûk**ine** Cegerxwîn li gel min hene.

Heval**ine** min li gund hene.

## HÎNDARÎ

Çend hevokan binivîsin û veqetandekên binavkirî tê de bi kar bînin.

# WANE 7

## MIJARA SERBEST

## TÊKILIYA ÇANDÊ BI ZIMÊN RE



Ziman têgeha sereke ya çandê ye. Mirov hest, hizir û pêwîstiyên xwe bi zimên rave dike. Ji ber vê çendê bikaranîna zimên, di pêşketina civakan de cihekî girîng digire.

Civakek bi parastin û pêşxistina zimanê xwe, hebûna xwe diyar dike. Gelên ku gihîştine vê rojê, bi riya bikaranîn û pêşketina zimên e. Ziman, têgehên çandê ji nifşekî digihîne nifşekî din.
Mirovên ku karîbûn zimanê xwe tevî nivîsînê bi kar bînin, xwedî pêşerojeke bihêz in.

Cihê ku ziman û hizrîn di nav de ye, cihê herî hêsan e ku dewlemendiya çandê lê tê dîtin. Çand, bi awayekî herî berfireh pênasekirina ziman û hizirê ye. Mirov hemû çêkerên xwe bi hizrînê diafirîne. Di hemû destkeftiyên ku afirandî de vedana hizrînê tê dîtin. Dibe ku civakek an jî her komeke din li gorî hişmendiya xwe hemû afirandinan negihînin dawîbûnê.

Ew kom an jî civak di ziman û hizira xwe ya dîroka derbasbûyî de hemû destkeftiyên ku afirandî li cihê wê hildigire. Têkiliya çand-hizir û çand-ziman di aliyên cudahiya nasnameyên civakan de girîng in. Ji ber vê yekê nav û zimanê her gelî cuda ye. Ziman girîngiya têkiliya mirovan dide zanîn.

# WANE 8


## HERÊMEKE KURDISTANÊ



Bi ked û xwêdana şehîdan, gelek xeyalên ku rizî û zuha bûbûn, ji nû ve şîn bûn. Her çêbûnek bi rastiya xwe ya cewherî ji nû ve ket tevgera têgihîştinê. Bayê azadiyê bi şêweyekî herî xurt dest bi herikînê kiriye. Vî bayê azadiyê hemû Kurdistan girtiye nava xwe. Herêma ku bîranîna bayê azadiyê bi xwe re jiyayî, Botan e. Botana ku di agirê Mezopotamyayê de hebûna xwe dayî pêhesîn, xweşikiyên xaka pîroz a dayîka xwedawend di hembêza xwe de hilgirtîn, şopên kûr ên ku çanda dayîka xwedawend tê de tên dîtin, bi xweşikiyên xwe yên dîrokî ku bûye mijara roman, fîlm û helbestan. Bi watekirina wê, dê zor be. Divê mirov bi xwe di nava xweşikbûnên Botanê de jiyabe, da ku xweşikbûna

Botanê bizane. Xaka Mezopotamyayê ya ku landika mirovahiyê ye, erdnîgariya ku weke diyariya jiyanê tê watekirin, bi herikîna çemên xwe yên Ferat û Dicleyê, weke kaniya buhiştê difûre û xweşikiyeke reng bi reng dide derdora xwe jî. Ciwaniya Botanê bi mêrg û kanî, deşt û zozan, çem û robar, berhem û şkeftên wê yên dîrokî ta roja me jî bedewtiya Botanê li ser piyan dihêle.     Ji van, Gemiya Nûh a ku herî

xweşik û dîrokî heta roja me jî bi coşa xwe ya mezin tê bîranîn.



Bi taybet ew rezên tirî yên Botanê bi ser Baxçeyên Babil ve diçin. Bi darên xwe yên behîv û gûzan, bi avên xwe yên ku diherikin, çavkaniya jiyanê ye. Weke hemû erdnîgariya Botanê, çanda wê jî, rêbaza jiyana ku bi keda xwe, bi xwezayê re havên bûye. Hembêza wê ya bi xwîn û rondikan hatiye avdan, bûye agirê ku tu caran niyaza xwe ji şervanên azadiyê re qut nekiriye û di rastiyê de Botan efsaneyek e. Cihê ku Mem û Zîn lê jiyane. Cihê ku evîndarên mezin û girêdanên mezin lê hatine jiyîn û bîranîn tê de hatine nivîsîn. Ji ber vê sedemê ye ku keç û kurên Botanê di asta evîndariyê de bi xaka xwe ve girêdayî ne. Mirovên vê herêmê evîndarî û bêrîkirinên xwe bi hestên herî xweşik, kirine mijara helbest û wêjeyê. Yek ji van cihên herî balkêş di navenda Botanê de, Cûdiyê Miradan e ku bi serbilindiya xwe ji nirxên mirovahiyê re malovanî kiriye; gelek kesayetên pêşeng di hembêza xwe de parastine û bûye parêzvanê civaka Botanê. Aha! Ji ber vê malovaniya xwe, Cûdî her tim bûye stargeha civaka kurd û her tim hebûn, çand û kevneşopiyên xwe tê de parastin e.

## PEYV

**Xwedawend** : Dayîka Xweda

**Bîner** : Şahid / Temaşevan

**Baxçeyên Babil** :Qralê Babilê, ji bo hevjîna xwe Semîramîs ev baxçe da çêkirin.

## PIRS

**1-** Botan dikeve kîjan aliyê Kurdistanê?

**2-** Çima herêma Botanê dergûşî ji mirovahiyê re kiriye?

## CUR Û AWA

Curenivîsa li jor **ceribandin** e.

Ji ber ku nivîskar hest û ramanên xwe yên di derbarê mijara danî holê de tîne ziman û nêrînên xwe naspêre çespandinê. Nakeve xema nebawerkirinê jî. Serbixwe ye. Ji ber ku xwesertiya kesî, taybetmendiya herî girîng a ceribandinê ye.

**Ceribandin**, curenivîseke di sedsala 16'an de, di bin rêveberiya nivîskarê Fransî Monteyin (Montaigne) de derketiye holê.

## RÊZIMAN

Ji wan peyvên ku heyînekê bi me didin naskirin re **nav** tê gotin.

**a-Nav li gorî teybetiyên xwe dibin sê beş:**

**1- Serenav**
**2- Hevenav**

**3- Komenav**

**1- Serenav (Navên Taybet):** Ew nav in ku heyîneke tenê bi me didin nasîn. Navên taybet bi tîpa mezin dest pêdikin.

Dema em navekî ji wan dibêjin, tenê heyînek tê ber çavên me.

**2- Hevenav (Navên Giştî):**

Ew nav in ku gelek heyînên ji heman cureyê, bi me didin nasîn. Navên giştî bi tîpên biçûk dest pê dikin.

Weke peyva "**dar**" dema em dibêjin "**dar**", hemû cureyên daran bi me dide nasîn. Cudahiyê nake di navbera dara sêv, hêjîr û mêwê de.

**3- Komenav (Navên Kom):**

Ew peyv in ku komeke heyînan bi me didin nasîn û di aliyê wateyê de heyîneke tenê pê nayê binavkirin.

Dema gelek pez tên gel hev, ji vê kombûna wan re kerî tê gotin. Mirov nikare ji pezekê re bêje kerî.

**Mînak:**

| hevenav | serenav | komenav |
|---|---|---|
| hirç | Qamişlo | leşker |
| rovî | Ferat | gel |
| pirtûk | Rênas | kerî |
| mişk | Cûdî | netewe |
| çiya | Kobanê | şênî |
| xanî | Amed | dewar |
| dar | Agirî | garan |
| hesin | Efrîn | |

**b- Nav li gorî wateya xwe dibin du beş:**

**1-** Navên şênber.

**2-** Navên razber.

**1- Navên Şênber:** Ji navên heyînên ku mirov bi her pênc lebetên xwe yên pêhesînê, hebûna wan diyar dike re **navên şênber** tê gotin.

**2- Navên Razber:** Ji navên heyînên ku mirov bi her pênc lebetên xwe yên pêhesînê, nikare hebûna wan diyar bike, lê hebûna wan tê bawerkirin re **navên razber** tê gotin.

**Mînak:**

| şênber | razber |
|---|---|
| çiya | rûmet |
| çem | azadî |
| mêr | bawerî |
| gelhe | dem |
| dar | helwest |
| gur | viyan |
| kevir | hişmendî |
| hirç | xeyal |

## HÎNDARÎ

1- Çend navên şênber peyda bike û di refê de ji hevalên xwe re bêje.
2- Çend navên razber peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse

# WANE 9

## WELATÊ MIN




Xwe nespêre dijminê hov bi nezanî
Xwe nexapîne çar gotinên biyanî
Li ser te cangoriyan serê xwe danî
Ma tu dixwazî nav de bibî dilmanî
Te em kirin sêwî, hiştin ber dîwaran
Rêberên me tev birin li ber sêdaran
Li Amedê hilawistin Se'îdê Pîran
Îro jî dixwazin, dawiya Rêberan
Careke din ji bo min, bibe cih û war
Dê roj derkeve ser te çêbibe bihar
Wê azad bibe, gelê bindest û hejar
Em ê bêjin rojbûna me ye 21'ê Adar

**Şehîdekî Nemir**

## PEYV

**Biyanî** **:** Xerîb

**Sêwî** **:** Kesê bê dê û bav

**Spartin** **:** Radestkirin

**Hilawestin** **:** Daliqandin

## PIRS

**1-** Ger em bi peyvên biyanî xwe bixapînin, wê çi bibe?1

**2-** Kengî wê bihara welatê me were?

3- Ji bo rêberên kurdan neyên bidarvekirin, pêwîst e em çi bikin?

## CUR Û AWA

Nivîsa li jor nivîseke hûnandî ye; pîvan û bare tê de bingeh hatine girtin.

Helbesta li jor helbesteke hûnandî ye û ji helbestên **destanî (epîk)** in.

Helbestên **destanî (**epîk**):** Ew helbestên ku mijara wan li ser şer, lehengî, egîdî û welatparêziyê ne.

Bûyerên dîrokî bi kelecanekê şîrove dikin. Di heman demê de ji van helbestan re **helbestên lehengî** jî tê gotin.

Helbesta li jor ji ber ku bi pîvana bareyan û kiteyan pêk hatiye, helbesteke bi pîvan e. Ev helbest ji bareya tam û dewlemend pêk hatiye.

Her rêzikeke vê helbestê ji 12 kiteyan pêk hatiye.

## RÊZIMAN

**Li gorî mıjarê, nav dibin du beş:**

**1- Navên yekjimar**

**2- Navên pirjimar**

**1-** Ji navên ku qertafên pirjimariyê nagirin û di aliyê jimarê de yekjimariya heyînan bi me didin nasîn re **navên yekjimar** tê gotin.

**Mînak:**

**Botan** efsaneyek e.

**Cûdî** çiyayekî biheybet e.

**2-** Ji wan navên ku qertafên pirjimariyê yên"**ên, an, inan, in, ine''** digirin û gelek heyînên bi heman navî bi me didin têgihandin re

**navên pirjimar** tê gotin.

**Mînak:**

Şervan**ên** azadiyê, dest bi meşa azadiyê kirin.

Ciwan**an** li Rojhilat çalakî li dar xistin.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî du navên yekjimar û du navên pirjimar di lênûsa xwe de binivîse.
2- Tu jî helbesteke **destanî** peyda bike û ji hevalên xwe re bixwîne.

# WANE 10

## ŞIVANÊ BILÛRVAN



Şivanek hebû, ew bilûrvanekî hêja û jêhatî bû; hîn nozdeh salî bû û pezê xwe baş diçêrand. Kesekî wî li gund tune bû. Ew ji aliyê Êrîvanê ve hatibû. Navê wî Siyabend bû, dê û bavên wî di şerê cîhanê yê duyemîn de winda bûbûn.

Hemû kesên li gund jê hez dikirin. Axayê wî gelekî dewlemend bû. Sê kur û keçeke wî hebûn. Wî her sê kur û keça xwe şandibûn xwendinê. Şivan di meha Adarê de li cem Axê dest bi şivaniyê kiribû. Wî pezê xwe bi şevê jî diçêrand û bi rojê tanî nava gund. Dema ku wî pez tanî ser avê, bilûra xwe derdixist û lê dixist, pez jî yeko yeko dida dû wî û ber bi avê ve diçû. Dengê bilûra wî wisa xweş bû, ku keç û xortên gund kar û barên xwe dihiştin, tenê li bilûrvan guhdar dikirin.

Di dawiya Hezîranê de keça axê Perîxan ji bajêr hatibû mala bavê xwe. Rojekê ew bala xwe dide ku şivanek li bilûrê dixe û pezê wî jî yeko yeko ber bi avê ve tê, Perîxan jî ber bi kaniyê ve diçe û dibîne ku ev yek rastî yan jî xewn e. Perîxan tê

ser kaniyê, çavên wê li çavên şivên dikevin. Ew li şivan dinêre û şivan jî li wê dinêre…

Demek derbas dibe, pezê şivên ava xwe vedixwe, vedikişe û diçe. Dengek wan vediciniqîne: "perîxanê were taştê bixwe!", diya wê dibêje, şivan dinêre ku Perîxan keça axayê wî ye, rûyê wî sor dibe, serê xwe dike ber xwe û ber bi pezê xwe ve diçe.

Siyabend pezê xwe ber bi çiyê ve dibe, lê Perîxan keça bedew, ji bîra wî dernediket. Perîxana çavbelek, enîkever û poz bixizêm bû. Ew weke xezalekê hatibû ser kaniyê.

Pezê şivên li serê çiyê , li aliyê beroj hêl vedabû, lê şivanê bilûrvan ji evîna dil gêj dibû û di dilê xwe de digot xwezî ew ne keça axayê min bûya yan jî ez ne li ber deriyê mala bavê wê şivan bûma, xwezî dê û bavê min hebûna, min ê ji wan re bigota, bila biçûna, gustîlk bixistana tiliya Perîxanê. Hingî ez ê bibûma bextiyarê cîhanê.

Min ê ji Perîxana xwe re bilûra evîna dilan lêxista û ji dilê xwe kul û kederên van salên ku min li welatên biyaniyan borandîn derxistana.

Siyabend bi vê yekê dihizirî û hêstir ji çavên wî dihatin xwar. Wê şevê heta sibehê xew neket çavên Siyabend. Ew ne birçî û ne jî tî bû. Çi qas şev derbas dibû, ew qas Siyabend diket xewn û xeyalên Perîxanê. Wî dîsa dest bi bilûra xwe dikir û dilê gelek şivanên din dişewitand**...**

## PEYV

**Dewlemend:** Zengîn**,** xwediyê malê pir

**Bilûr:** Amûreke mûzîkê ye.

**Xizêm:** Parçeyeke zêr ku jin bi pozên xwe ve dikin.

**Bextewar:** Bişens, dilxweş

## PIRS

**1-** Çima gundiyan ji şivên hez dikir?
**2-** Çima şivên nikarîbû raze?
**3-** Siyabend û Perîxanê li kû derê hev dîtin?

## RASTNIVÎS

Temaşeyî mijara li jor bikin, ka cotxal li ku derê hatiye bikaranîn. Gava ku di nava hevokê de tiştek tê gotin, an taybetmendiyên tiştekî tên rêzkirin an jî wateya wê tê vegotin, **cotxal** tê bikaranîn.

**Mînak:**

Nesrînê got**:** "Were malê."

Taybetmendiyên Hogir**:** mirovekî pêşketî, zana, mêvanperwer û mêrxasî.

Tîp**:** Nîşaneyên dengan in.

**Têbînî:** Piştî cotxalê peyv bi tîpa mezin dest pê dikin, lê dema ku peyv werin rêzkirin bi tîpa bicûk dest pê dikin.

## RÊZIMAN

**Nav li gorî çêbûna xwe dibe du beş:**

**1-** Navên xwerû

**2-** Navên nexwerû

Navên nexwerû jî di nava xwe de dibin du beş:

a- Navên pêkhatî
b- Navên hevedudanî

**1- Navên Xwerû:** Ew nav in ku tu qertafan nagirin û xwedî wate ne.

**Mînak:** Careke din ji bo min, bibe **cih** û **war**

Dê **roj** derkeve ser te çêbibe bihar

Wê **azad** bibe, gelê bindest û **hejar**

Em ê bêjin rojbûna me ye 21’ê **Adar**

Weke hûn di malikê de jî dibînin, peyvên reşkirî, navên xwerû ne. Ji ber ku tu qertaf û peyv negirtine.

**2- Navên Pêkhatî:** Ew navên xwerû yên ku qertafên sazker distînin û wateyeke nû bidest dixin.

**Mînak:** Evîndar, şervan, nalbend, gundî, îsal...

Dema em temaşeyî van peyvan dikin, dibînin ku:

peyva ''**evîn**'' bi girtina qertafa ''**dar**''

peyva **''şer''** bi girtina qertafa ''**van**''

peyva ''**nal**'' bi girtina qertafa ''**bend**''

peyva ''**gund**'' bi girtina qertafa ''**î**''

peyva ''**îsal**'' bi girtina qertafa ''**î**''

li ser bingeha navê heyî, navekî nû hatiye sazkirin.

**<u>Têbînî:</u>** Navên pêkhatî ji nav û qertafeke sazker çêdibin.

**3- Navên Hevedudanî:** Ji wan navên ku ji du peyvan pêk tên û wateyeke nû didin re navên hevedudanî tê gotin.

**Mînak:**

Cegerxwîn, ev nav ji du navên cuda yên weke ''**Ceger**'' û ''**xwîn**'' pêk hatiye û bûye navekî din. Her wiha navê ''**sorgul**'' jî ji navên ''**sor**'' û ''**gul**'' pêk hatiye û bûye navê guleke din.

## HÎNDARÎ

**1-** Navên li jêr di nava hevokan de bi kar bîne.
Dest, zinar, dar, av, aş

Rûken, dilgeş, çavreş

# HÎNDARÎ 1

Bersiva rast Hilbijêrin

**1- Di mijara welatê min de helbestvan rojbûna xwe di kîjan demê de gotiye?**

- 21' nîsan
- 21'ê Adar
- 21'ê mijdar
- 21'ê gulan.

**2- Ramana bingehîn ya mijara herêmeke kurdistanê çi ye?**

- Diyarkirina xweşikbûn, girîngî û zindîbûna welêt.
- Diyarkirina bêrîkirina ji Botanê re .
- Diyarkirina hestên dûrketina ji welêt.
- Negirîngîdayîna welêt.

**3- Li gorî mijara Têkiliya Çandê bi Zimên re çand di wateya xwe ya berfireh de çi ye?**

- Têkiliya wê bi ziman û hizirê re tuneye.
- Ziman bi xwe ye .
- Pênasekirina ziman û hizirê ye.
- Hizir bi xwe ye.

**4- Ji nivîsên ku bandorê li hestên mirovan dikin û bi bare û pîvan tên nivîsîn re çi tê gotin?**

- Çîrok
- Serpêhatî
- Gotar
- Helbest

**5- Di vê rêzika helbesta *''Kesê zana divê li ber wî xuya bin her du sal evro''* de çend deng hene?**

- 17
- 21
- 38
- 39

**6- Di hevoka ''*Min name xwend''* de kîjan cureyê navan hatiye bikaranîn?**

- Hevenav
- Navê pirjimar
- Serenav
- Komenav

**7- Di kîjan hevokên li jêr de diyarkirina kiteyan şaş hatiye nîşandan?**

- Xwen-din pê-wîs-ti-ya ji-ya-nê-ye.
- Ta-va hav-în-ê dij-wa-re.
- Kar-ker çû kar.
- Xwen-din ro-na-hi-ya ji-ya-nê-ye.

**8- Nîşaneya li dawiya hevokê tê danîn û her tim piştî wê nivîsîn bi tîpa girs tê destpêkirin, kîjan e?**

- Xalebêhnok
- Xal
- Cotxal
- bêhnok

**9- Peyva ku dikeve piştî nav û çawaniya wî navî diyar dike, kîjan e?**

- Cînavk
- Hevalkar (Hoker)
- Hevalnavê çawaniyê
- Hevalnavê diyarkirinê

**11- Nîşaneya ku dikeve cihê rawestandinê an jî du hevokan bi hev ve dide girêdan kîjan e?**

- Cotxal
- baneşan
- Bêhnok
- pirsnîşan

**12- Peyvên hemwate bigihînin hev:**

| | |
|---|---|
| - Kavil | qerimîn |
| - Hêşedar | veciniqîn |
| - Westan | cihê xaniyê xerabûyî |
| - Hilbeyîn | zêrevan |
| - Gupik | cihê herî bilind |

**13- Cihên vala bi peyvên guncav dagirin:**

1- Li dawiya her hevokeke ku wateya wê temam bûyî...........tê bikaranîn û piştre nivîsîn bi .......... dest pê dike.
2- Em ji wan nivîsên hest, raman û xeyalan bi awayekî hûnandî, bi rêzik û malikan diyar dikin re, dibêjin..........
3- Dema çend rêzikên helbestê tên gel hev û bi hev re watedar in, dibin............

# BEŞA 2

REXNEYA LI SER PERWERDEYÊ

KELHA ELODÎNO

PEZKOVIYÊN CIWAN

EZ

MELAYÊ CIZÎRÎ

ROVIYÊ STEMKAR

GELIYÊ ZÎLAN

DAYÎKA MIN

GULBIHAR

HÎNDARÎ 2

# WANE 1

## REXNEYA LI SER PERWERDEYÊ

Rexnekirina perwerdeyê mijareke girîng e. Perwerde bi kîjan rêbazî were dayîn, encam jî ser wî rêbazî tê girtin. Gelo mirov ji her awayê perwerdeyê re dikare bêje perwerde? Yên xwendekar û rewşenbîr bi kîjan awayî, di nava civakê de li xwe dinêrin? Kesên xwendekar û rewşenbîr bi kîjan çavî li yên nexwendekar dinêrin?



Li gorî van pirsan, hinek kesên perwerdeya xwe li ser bingehê hişmendiya dewlet û desthilatdariyê dibînin, kesayeteke li dijî civakê pêş dixin. Encama perwerdeya şaş a ku li dijî xwezeya civakê ye, ji wan kesên desthilatdar ên ku berjewendiyên xwe li ser hemû nirxên mirovahiyê digirin, derdikeve holê. Saziya perwerdeyê li gorî hişmendiya xwe sazûman kirine. Ên di wê perwerdeyê re derbas dibin, taybetmendiyên wan kesên desthilatdar û dewletparêz digirin. Ev kesên wiha xwe li ser civakê dibînin, weke zeviya xwe li civakê dinêrin. Ne civakî ne. Civakê paşketî, hov, nezan û kerî dibînin. Ji xwe kesên ne xwendekar, weke mirov jî nabînin. Li derdora xwe bi çavekî biçûk dinêrin. Xwe di ser her tiştî re dibînin. Sînorê ezezîtiya wan tuneye. Ji ber ku her tiştî bi awayê heyberî bingeh digirin, têr nabin. Ezezîtiyê dixin pêşiya hemû nirxên civakê. Weke kevneşopî, tore, nirxên exlaqî kevn

dibînin û dibêjin pêwîst e, ev bên derbaskirin. Weke serxweşan ji xwe hez dikin.

Dibêjin cîhan li derdora me dizivire. Jiyana wan li dijî gotinên wan e. Tenê bi kesayeta xwe dihizrin. Pêşketinê bi çend



gotinên zimandirêjiyê digirin dest. Zimanê wan zimanekî ezok e. Ji derve weke xwendekar û rewşenbîr tên dîtin, lê belê hundirê wan vala ye. Zanistê ne ji bo berjewendiya civakê, ji bo berjewendiya kesayetî fêr dibin û pêş dixin. Qaşo li gorî wan, asta pêşketinê di riya dîplomaya zanîngehê re derbas dibe.

Bêguman xwendekar û rewşenbîrên me yên giranbuha ku hemû xwendekariya xwe ji bo berjewendiya civak û gelê xwe bi kar tînin û ji bo pêşxistina civaka xwe, heta asta pakrewaniyê jî diçin, hene. Xwendekar û rewşenbîrên bi vî awayî pêşeng û nirxên civakê ne.



## PEYV

**Rewşenbîr** **:** Ronakbîr-jîr û zana

**Sînor** **:** Tixûb

**Ezezî** **:** Kesên tenê ji bo xwe dihizirin

**Qaşo** **:** Xwedêgiravî / ji xwe ve

**Dîploma** **:** Bawername

**Zanîngeh** **:** Zanko

## RASTNIVÎS

### Kevanek:

Agahiyên ku cihgirtina wan di nav hevokê de ji sedî sed ne pêwîst e, di nav kevanekê de tên dayîn. Bi derxistina van agahiyan tiştek ji hevokê kêm nabe. Her wiha di nav kevanekê de mirov dikare hemwateya peyveke ku zêde nayê zanîn jî bide.

### Mînak :

Xwendekarên me **(** Hogir, Dijwar, Xemê, Gulan**)** hatin.

Hevalên me li akademiya Ş.Rustem Cûdî **(Rustem Osman)** perwerdeya xwe qedandin.

Bêje (peyv) ji aliyê sazîbûnê ve dibin du beş.

## PIRS

**1-** Divê em çawa nêzîkî kesên ne xwendevan bibin?

**2-** Erk û berpirsiyariyên xwendekaran li beramberî civakê, çi ne?

**3-** Kîjan xwendekar dibin nirxên civakê?

## CUR Û AWA

**Rexne:** Ji nivîsa ku berhemên wêjeyî û pîşeyî hûrkolîn dike, di aliyê wêje û dîroka pîşeyî de rûmetê tîne holê, aliyê wê yê serkeftî û binkeftî diyar dike re **rexne** tê gotin.

Ji bo rexnekirinê, nirxandin çawa tê kirin, divê baş bê zanîn. Bûyer û mijarên ku wê bi rexnekirinê bên nirxandin, divê pêşî werin nasîn. Piştre mirov derbasî rexnekirinê dibe. Bi vî awayî aliyên erênî û neyînî tên dîtin û mirov digihêje darêzê.

Nivîsên rexneyî yên wêjeyî li ser sê xalên sereke pêş dikevin:

**1-** Parastina rastiyê.

**2-** Nêrînên rexneyî yên kesayetî.

**3-** Nêrînên çareseriyê.

## RÊZIMAN

Bêjeyên ku ditewin hinek qertafan digirin û bi vê yekê jî zayend û

mêjera wan tê nasîn.

### Qertafên Tewangê:

ê (yekjimar û mê)

î (yekjimar û nêr)

an (pirjimar)

**Mînak:**

Bêrîvan**ê** mala xwe paqij kir.

Ehmed helbest**ê** dinivîse.

Ez nan**î** dixwim.

Silêman**î** ji gund bar kir.

Gundiy**an** dibistanek ava kir.

Zarok**an** cilên nû li xwe kirin.

**Qertafên Tewangê yên Nebinavkirî:**

ekê (yekjimar û mê)

ekî (yekjimar û nêr)

inan (pirjimar)

**Mînak:**

Heval**ekî** ji min re pirtûk anîn.

Hunermend**ekî** stran got.

Gul**ekê** bide min.

Wan li mal**ekê** av vexwar.

Pirtûk**inan** ji me re bînin.

Ez ê lîstok**inan** ji te re bikirim.

**Têbinî:** Li hin herêman navdêrên nêr bi awayekî din jî ditewînin. Navdêrên nêr ên ku dengên "a û e" di wan de hebin, bi "ê"yê tên guhertin.

**Mînak**:

Bajar → Min gelek tişt ji bajêr anîn.

Çem → Ehmed li rex çêm rûnişt.

Pez →Şivan pêz dibe çêre.

Welat → Em li welêt dijîn.

## HÎNDARÎ

1- Li gorî te çi cudahî di navbera kesekî ezezok û kesekî hêjayî civakê de heye? Bi şêweyê darîştinê binivîse.

# WANE 2

## KELHA ELODÎNO



Kelha Elodîno, kelheke li ser zinarekî bilind hatiye avakirin, sê aliyên wê bi robarê Dicleyê re hatine pêçan. Riya avkêşa di nava kelhê re xwe berdide ser ava Dicleyê. Odeya bacgiran hîn hebûna xwe diparêze. Ji vê kelhê, mirov dikare êrîşên li ser Kurdistanê û berxwedêriya gelê kurd têbigihe.

Belê, danê sibê bû, em ji Germava Nebî Silêman rabûn. Rojê tîrêjên xwe avêtibûn Sîta Imara. Kelekvanan li ser ava Dicleyê, kelekên xwe amade dikirin. Geştyarên ji Cizîrê (Dûjîla Aqor) hatîn, dixwestin derbasî cihê xwe bibin. Em bi wan re li kelekê siwar bûn. Kelekvanê bi navê Reşo, kelek berda avê. Li aliyekî çaydanê li ser tirafa di sêlê de hatî danîn, dikele, li aliyê din jî, kelek bi avê ve xwe berdide, dizivire û diçe. Piştî du demjimêran digihêje Gera Qesrika Elodîno. Em xatirê xwe dixwazin û li wir peya dibin. Derbasî hundirê Qesrika Elodîno dibin. Qesrik bi kils û gêçê (ces), li ser tehteke şayîk hatiye çêkirin. Cihê zincîra bacgiran, di pencereya qesrê de xuya dike. Li wî alî kevirê zincîrê, bala mirov dikişîne. Pêlên avê hildipirijin tehta qesrê. Dengê kewan tevlî dengê avê dibe. Di nava vê xiroşê de hinekî

li wê derê rûdinin, em dixwazin derkevin serê Kelhê. Lê belê tava dijwar, me ditirsîne. Riya me asteng dike. Hinekî disekinin, lê em dîsa neçarin bi hewa bikevin. Dikevin rê, her ku gavekê diavêjin, li serê kelhê temaşe dikin. Ev rê li ber me dirêj dibe. Riya me ya dirêj a ku li ser tehtê bi awayê pêpilkan hatiye çêkirin, ji ber germê hîn dirêjtir dibe.



Em bi hewa dikevin, pêpilkan derbas dikin û diçin serê kelhê. Li ser kelhê kavilên xaniyan, şkeftên li tehtê kolayî û cihê wê yê bilind, me dixe nava hizrînê. Em digerin, li aliyê wê yê rojava kunek tê dîtin! Ji vê kunê re digotin avdiz. Belê ev kun dirêj e. Ji serê vê kelha bilind di nava tehtê re xwe berdide xwarê! Her pênc, an deh metreyan pencereyek lê hatiye vekirin û xwe berdide, digihe ava Dicleyê. Her çi qas daketina di vê kunê re zehmet be jî, lê ji ber xiroşê em bi xwe nedihesiyan.

Dema em ji kunê xwe berdidin, lingê me digihêje nava avê. Ji nava avê derdikevin, em ji ber nexweşiya rê naxwazin careke din, di heman kunê re bi hewa bikevin. Li milê kelhê yê rojava careke din bi hewa dikevin ser kelhê û temaşe dikin. Hebûna leşkerên tirk li başûrê wê, geryana me bandor dike. Li wir em çiyayên Botanê li pêşberî xwe dibînin. Keçikên ku hatine daran ji xwe re stranan dibêjin, hok hoka şivanên ku pezên xwe berdidin ser avê jî, xweşikbûna vê herêmê nîşan dike. Li milê din rêwiyên peyade bi hêstiran li Beriha Rima derbas dibin.

Pezkoviyek ji ber wan direve û xwe diavêje Lata Sorê. Ev pezkovî bala me dikişîne li ser xwe.

Belê, kelha kevnar a dîrokî, bermahiyeke cihê berxwedana gelê kurd e. Vê kelhê, di dîrokê de gelek caran erka bacstendina Riya Hevrîşimê girtiye ser xwe.

## PEYV

**Dûjîla Aqor:** Navê Cizîrê yê kevn e

**Kelh:** Xaniyên mezin ên ji bo parastin û jiyanê dihatin bikaranîn.

**Zinar:** Latên bilind

**Bacgir:** Kesên bacê digirin

**Sîta Imara:** Navê çiyayekî raserî Amara Torê ye.

**Tiraf:** Kozên agir

**Gêç:** Kils, Di êtûnan de bi encama şewitandina kevirên spî de derdikeve holê û ji bo spîkirina dîwaran tê bikaranîn.

**Şayîk:** Hilû

**Beriha Rima:** Navê cihekî li rexê ava Dicle ye.

**Riya Hevrîşim:** Riya bazirganiyê ya ji Anatolyayê dest pê dike û heta Çînê dirêj dibe.

## RASTNIVÎS

### Baneşan (!):

Dema mirov bixwaze peyvek an çend peyvan bi hestekî gur, tirs, coş, xiroş, hezkirin û wêrekî nîşan bide, nîşaneya baneşanê tê bikaranîn.

### Mînak:

Em digerin, li aliyê wê yê rojava kunek tê dîtin! Ji serê

vê kelha bilind di nava tehtê re xwe berdide xwarê!

Ax**!** Ez diêşim.

Wa dayê**!** Were em biçin.

Dema ku baneşan di nava kevanekê de were bikaranîn, tê wê wateyê ku nivîskar bi dijwateya wî tiştî bawere.

**Mînak:**

Pir welatparêz e(!)

Ew mirovekî zana ye(!)

## PIRS

1- Dema ku dabaşa vê kelhê tê kirin, kelheke çawa tê ber çavên te?
2- Berê, di vê kelhê de çi hatibû kirin?
3- Li gorî mijarê gelê vê kelhê, ava xwe ji ku derê tanîn?

## CUR Û AWA

Ji wan curenivîsên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pê hesyayî radigihînin re **geryaname** tê gotin.

Kesên zana, agahî û hestên di der barê cihê geryayî û dîtî de, bi zimanekî balkêş têdigihînin.

## RÊZIMAN

### Cînavk û Cureyên Wan:

Ji wan peyvên ku di cihê navan de tên bikaranîn erk û rista navan digirin ser xwe re **cînavk** tê gotin.

**Hinek cînavk ev in:**

- Cînavkên kesane
- Cînavkên şanîdanê

## Cînavkên jimarînê

### Cînavka vegerok

**1- Cînavkên Kesane:** Ew cînavk in ku cihê navên kesan digirin.

Cînavkên kesane dibin du beş: "xwerû û tewandî"

**a- Cînavkên kesane yên Xwerû:**

Ev cînavk, di rewşa xwe ya xwerû de ne û cihê navdêrên xwerû digirin.

Cînavkên xwerû: **Ez, tu, ew, em, hûn, ew**

**Mînak:**

**Ez** çûm dibistanê.

**Em** diçin dibistanê.

**Ew ê** biçe dibistanê.

**b- Cînavkên kesane yên tewandî:** Ev cure cînavk cihê navdêrên tewandî digirin.

Cînavkên tewandî: **min, te, wî/wê, me, we, wan**

**Mînak:**

**Min** gul av dan. **Wan** nan xwar.

**Wê** name nivîsî. **Me** dibistan şûşt.

**2- Cînavkên Şanîdanê:**

Ji wan cînavkên ku dikevin cihê navan û heyînekê nîşan didin re **Cînavkên Şanîdanê** tê gotin.

### a- Cînavkên Şanîdanê yên xwerû:

| **Ev** | **Ji bo heyînên nêzîk** |
|---|---|
| **Ew** | Ji bo heyînên dûr |

**Mînak:**

Ev baş dixebite.

Ew baş dixebite.

### a- Cînavkên şanîdanê yên tewandî:

| **Vî** | **Nêz** | **Yekjimar û nêr** |
|---|---|---|
| **Vê** | Nêz | Yekjimar û mê |
| **Van** | Nêz | Pirjimar |
| **Wî** | Dûr | Yekjimar û nêr |
| **Wê** | Dûr | Yekjimar û mê |
| **Wan** | Dûr | Pirjimar |

**Mînak:**

Ez vî baş dinasim

Tu vê xweş bi kar tînî.

Van xelat wergirt.

Wî alîkariya min kir.

Wê ji mamoste pirsîbû.

Wan serî ji dijmin re netewand.

# WANE 3

## PEZKOVIYÊN CIWAN



Herêma Heftenînê, di dîroka civaka kurd de, ji têkoşîna azadiya Kurdistanê re her û her malovanî kiriye. Gelek gundên kurd û aşûr-sûryaniyan ev herêma mîna buhiştê bi hev re parve kirine. Di nava vê herêmê de ya herî zêde bala mirovan dikişîne, Deriyê Dawetiyayê ye. Ji ber ku ji dûr ve mîna mirovên govendgirtî tê dîtin.

Li vê herêmê gelek lawirên mîna beraz, pezkovî, sivorî, rovî, gur û torî dijîn, ji van lawiran ên herî zêde bala min kişandin, pezkovî bû. Me dixwest ji nêz ve wan bibînin, ne ji bo kuştina wan, lê belê ji bo bedewbûn, narînbûn û heybeta xwezaya wan.

Bi berbanga sibehê re em sê heval çûn ser Deriyê Dawetiyayê, da ku em pezkoviyan ji nêz ve bibînin. Ji bo em pezkoviyan bibînin, divê qet tevger neyê kirin. Ji bo vê me kozikên xwe çêkirin û weke miriyan em di kozikên xwe de man li benda pezkoviyan.

Taybetiyên wan herî zêde li ser çiyayên bilind û asê dijîn.

Li derdora demjimêra 5’ê sibehê tên li ser avê, ava xwe vedixwin û ji bo parastina xwe hildikişin cihê herî stratejîk, ango herî asê û bilind. Di erda rast de, di demjimêrekê de qasî heştê kîlometreyan dikarin bibezin.

Pezkovî cureyeke lawiran e ku komî dijîn. Piştî çêrandina wan, di navbera demjimêrên nîvro de mexel tên, her û her zêrevanek ku

bikare hemû dol û newalên di bin çavdêriya xwe de, bibîne li cihekî herî bilind û bi heybet zêrevaniyê ji keriyê koviyan re dike. Di navberên diyar de zêrevan jî tên guhertin, da ku zêrevan jî, karibe biçêre û xwe têr bike. Wekî din jî, lawirekî pir bizdokî ye. Di evraziyên herî asê nîv teht de jî dikarin hilkişin û xwe ji latên sê-çar metreyan ji jêr hilavêjin jor. Pezkovî nêzî 14-15 salan dijîn. Şaxên wan ji metreyekê zêdetir, weke kevanê ne. Mirov ji bazinên şaxên wan dikare temenê wan jî, bizane.



Em di kozikên xwe de bê tevger disekinîn, hêdî hêdî derdora me ronî dibû. Di kozikên xwe yên veşartî de, me ew nêzî cihê her car, li ser Deriyê Dawetiyan dîtin. Tişta em li bendê bûn, hat. Di serê kerî de yekî, yekane serê kerî bi dengê firiniya xwe derdixîne û kerî ber bi me ve dikişand. Em bê deng
û bê tevger bûn. Di navbera me û pezkoviyan de qasî pêncî metreyan hebû. Bala wan ne li ser me bû. Li gorî xwezaya xwe

tevdigeriyan. Ji nava komê yekê berê xwe da cihê ku her tim lê hîşedariyê digire. Du ji wan ji xwe re hoçan dikirin. Dengê şîqşîqa şaxên wan, qontara ser Deriyê Dawetiyan re belav dibû.
Bi qasî deh xulekan li hev xistin û paşê bi yên din re dest bi çêrînê kirin.

Pezkoviya herî bala min kişandî ya zêrevan bû. Li ser latê bi awayekî bi heybet sekinî û bi tevgereke hêdî hêdî li derdora xwe dinêrî. Xwedî şaxekî dirêj û gelekî mûyên bozbûyî di nava mûyên wê yên qemer de xuya dikir. Çav zer bû, li ser zerika çavan rengê reşê mewîjî xuya dikir. Li ser hinarokên rûyê wê, xeteke reş xuya dikir û guhên wê yên ber şaxên wê re, hem xweşikbûneke cuda hem jî şiyarbûna wê ya li hember tirsnakiyên derdorê dida pêhesandin. Xwediya stûyekî zirav û dirêj, her wiha gerdenzeriya wê ya ser spîbûnê ve diçû, mirov bi xweşikbûna xwe ve dida girêdan.



Şaxên wê heybeteke cuda dida sekna wê. Her wiha her du lingên dawî, bi heybeteke cuda ya mîna kevanê xuya dikir. Li ser simên wê mîna xirxalekî ji mûyên reş hebû.

Piştî ku me têra xwe ew dîtin; bi derketina me ya ji kozikên xwe, pezkovî ji nişka ve ber bi aliyê sînorê Bakurê Welat û Cûdî ve revîn.

## PEYV

**Heftenîn:** Herêmeke di navbera Cûdî, Zaxo û çiyayê Garê de ye.

**Aşûrî:** Navê neteweyekê ye, di Rojhilata Navîn de dijîn

**Narîn:** Nazikî **,** ziravî

**Kozik:** Çeper

**Mexel:** Ji rûniştina sewalan-pez re tê gotin-cihê bêhnvedana pez.

**Bizdok:** Tirsok

## RASTNIVÎS

Dema tu mijarekê binivîsî, nivîsa xwe bike sê beş.

Di beşa yekem de tişta tu dabaşa wê dikî, bi awayekî kurt bîne zimên.

Di beşa duyem de, mijarê bi awayekî giştî fireh veke. Di derbarê mijarê de tu dikarî gotina ji kesên din jî bigirî, lê van gotinên ku te ji kesên din girtine, di nava dunikê de binivîse.

Di beşa sêyem de bi awayekî pir kurt ramana xwe kom bike. Ango bila benda dawî ji her du bendên din kurtir be û naverok jî, ji her duyên din dirêjtir be.

## PIRS

**1-** Çi cudahî di navbera pezê kedî û pezkoviyan de heye?

**2-** Çima pezkovî li ser çiyayên bilind û cihê asê dijîn?

**3-** Çima nivîskar dixwaze pezkoviyan binase?

## RÊZIMAN

Ew jimar in ku bi nivîskî weke peyv tên nivîsîn û li cihê navan tên bikaranîn.

**Mînak:**

**Çar** hatin.

**Pêncan** ev kar kir.

**Duyan** ji gund bar kir.

**Şeş** di vê refê de jêhatî ne.

**4- Cînavka Vegerok:** Ew cînavk e ku têkiliya wê bi hêmana berî wê re ango bi kirdeyê re heye.

**Mînak:**

Wî **xwe** dît.

Min **xwe** bi pêş xist.

Wan **xwe** parast.

Azad û Delal **xwe** fêrî xwendinê dikin.

**Têbînî:** Ev cînavk carinan ji bo tekezkirinê jî tê bikaranîn.

Min **bi xwe** got.


Aras **bi xwe** hat.

## HÎNDARÎ

**1-** çend hevokan binivîse û cînavkên jimarîn tê de bi kar bîne.

# WANE 4

## EZ



Îro ji dest husna hebîb,
Sergeşte û heyran im ez Min
eşq û muhbet bûn nesîb,
Sewdayê sergerdan im ez
Eşqê gelek sewda kirin,

Bê mal û bê mewla kirin
Nûra çira winda kirin,

Mûsayê Imranî me ez
Mûsa ji dest husna bi nûr,

Şêrîniya xalên di hûr
Secde bire ber Kohê Tûr,

Nêzîkî remzê wan im ez.
Remzê ku dê dîlber bikin,

Carek bi çeşman seyr bikin
Dê Kohê Qaf ker ker bikin,

Mecrûhê pirkovan im ez.
Min ah ji dest kovan qehran,

Min sebir nayêt li sehran
Şubhetê mewcên di behran,

Qulzûmê Umaman im ez.

Aşiqan rahetî kêm e,

Agir û pêta dilê me
Çend hezar medhan dibême, Muhîtê esîman im ez.

*Feqiyê Teyran*

## PEYV

**Sergeşt:** Sergêj

**Muhbet:** Hezkirin

**Sewda:** Evîndar

**Mewla:** Xweda

**Koh:** Lûtkeya çiya

**Secde:** Serî tewandin

**Remz:** Nîşan

**Çeşme:** Li gorî helbestê çav hatiye bikaranîn.

**Mecrûh:** Birîndar

**Şubhet:** Mîna

**Mewc:** Pêl

**Qulzûm:** Okyanûs

**Muhît:** Derdor, hawîrdor

**Medih:** Pesin

## EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN

Feqiyê Teyran, di sala 1307'an de li Miksê ji dayîk bûye. Navê wî yê rast Mihemed e. Feqiyê Teyran, nasnavê wî ye. Xwendina xwe li Miksê, Hîzan û Cizîrê domandiye. Feqiyê Teyran di sala 1375'an de jiyana xwe ji dest daye.

Hinek berhemên wî ev in:

1- Dîwaneke helbestan
2- Destana Şêxê Senaniyan
3- Qewlê Hespê Reş

## PIRS

**1-** Li gorî te, nivîskar birîndarê çi ye?

**2-** Helbesta te xwendî, ji çend malikan pêk hatiye?

## CUR Û AWA

**Hûnandî:** Nivîsên hûnandî, ji wan nivîsên ku hestekê, ramanekê yan bûyerekê bi awayê vehûnandî dinivîsin re **hûnandî** tê gotin.

Hûnandî di nava xwe de dibe du beş:

**1- Destan:** Ev curenivîsa wêjeyî bi du raweyan hatiye nasîn. Yek jê ew nivîsên li ser lehengiyan e. Ji aliyê gelan ve hatine hilberîn. Bi awayekî hûnandî li gel pîvanê tên sazkirin. Ev bûyerên girîng ên ku bi serê neteweyan hatine, bi awayekî çêbûyî hatine gotin û vehûnandin.

Du cureyên destanan hene:

**a-** Destana xwezayî.

**b-** Destana çêkirî.

**2- Helbest:** Ji wan nivîsên hest, raman û xeyalan bi awayekî hûnandî, bi rêzik û malikan vedibêjin re **helbest** tê gotin.

Rêzikên helbestan bi peyv û dengên wekhev bi dawî dibin.

Di nivîsên helbestî de, hesteke bingehîn heye. Ev hest di tevahî helbestan de ber çavan tê girtin. Ji vê hesta sereke re **ramanên bingehîn** tê gotin.

Ji ahenga ku dikeve dawiya rêzikên helbestê re **bare** tê gotin.

Ji wekheviya peyv an qertafên piştî bareyê bi heman wateyê tên nivîsîn re, **redîf** tê gotin.

Ji awayê hatina peyvên ku tên gel hev û wateyeke tekûz didin re, **rêzik** tê gotin.

Dema çend rêzik tên gel hev û bi hev re watedar dibin **malik** tê gotin.

Navê malikan, li gorî jimara rêzan tê danîn.

**Mînak:**

Ji du rêzikan re **cotik** û ji çar rêzikan re jî, **çarik** tê gotin. Helbest li gorî mijara xwe wiha tên rêzkirin:

**1-** Helbesta pastoral (xwezayî, oldarî û şivanî).

**2-** Helbesta destanî (epîk)

**3-** Helbesta sembolîk.

**4-** Helbesta hînker (dîdaktîk)

**5-** Helbesta şanoyî (dramatîk)

**6-** Helbesta pesindanî (satirîk)

**7-** Helbesta coş, tejî îlham (lîrîk)

## HÎNDARÎ

1- Çima nasnavê Feqiyê Teyran li helbestvan hatiye kirin?

# WANE 5

## MELAYÊ CIZÎRÎ (1407-1481)

Hozan û wêjevanê me yê navdar, di esmanê wêje û hozanvaniya kurdî de heta niha jî, stêrkeke geş e. Cihekî bilind ê awazên wî di nava zanistên cur bi cur û wêjeyî de heye. Dîwana wî, heta îro jî di destê wêjevan, hozanvan, oldar, evîndar û civakan de weke mînakeke jêderî tê pejirandin.

Navê rast ê Melayê Cizîrî "Mele Ehmedê Kurê Şêx Mihemedê Botî" ye. Di sala 1407'an de li Cizîra Botan ji dayîk bûye. Bavê wî Şêx Mihemed, ji binemaleke Şêxê Bermalê bû. Li gorî reftarên wê demê, binemaleke xwendevan bû. Melayê Cizîrî waneya xwe ya zanistî di destpêkê de ji bavê xwe digire. Piştre li Cizîr, Colemêrg, Amed û Amêdiyê bi serkeftî dest bi xwendinê kiriye.



Melayê Cizîrî, di zanistên erebî, farisî, kurdî û tirkî de gelek pêşketî bû. Heta 32 saliya xwe, xwendinê berdewam dike. Destûrnameya xwe ya zanistî di heman temenî de li gundê Stêrbasê yê girêdayî Amedê, li cem Mela Tahir digire. Çend salan li gundê Serba yê girêdayî Amedê dibe mela. Li herêma Amedê gelek wane û bawername jî, dane.

Piştî serdaneke Heskîfê, demekê li wê derê jî, dimîne. Piştre rewşa evîndariyê serî jê distîne, li gorî pileya zanista wê demê, bawer dikirin ku Melayê Cizîrî bûye evîndarê keçekê û bi gelek navan bang kiriyê. Lê li gorî lêkolînên li ser helbestên wî, bûye evîndarê welatê xwe, Kurdistan. Ji ber wê jî, wî di helbesta xwe de gotiye: ***"Ez çira şevtariya şeva Kurdistan im, gula bihuşta baxên Botan im."*** Ji ber vê evîndariya niştîmanperwerî, dest bi stran û helbestên dîwanî dike. Lê ji ber ne têgihîştina gel, Melayê Cizîrî baş nehatiye nasîn. Di çavên gel de weke dîn tê dîtin. Piştre diçe Cizîra Botan. Li ***Medreseya Sor*** dimîne û nav û dengê wî li cîhanê belav dibe.



Di sala ***1481***'an de, li Cizîra Botan diçe ber dilovaniya Yezdan û li Medreseya Sor tê veşartin. Heta niha jî, li Medreseya Sor, gora Melayê Cizîrî bermayeke dîrokî û ziyaretgeha gelê kurd e.

Bermayeke Melayê Cizîrî bi navê ***"Dîwana Melayê Cizîrî"*** ya wêjeyî, folklorî heye. Di Kurdistan û cîhanê de gelekî bi nav û deng e. Dîwana wî ya helbestan bi gelek zimanên biyanî hatiye wergerandin û çapkirin. Weke îngilîzî, Rûsî, Farisî, Erebî û ...

**Têbînî:**

*Di sala 1958'an de "Dîwana Melayê Cizîrî" ji aliyê Şêx Ehmedê kurê Mela Mihemedê Zivingî yê Miftiyê Qamişlo ve li Rojavayê welêt hatiye şîrovekirin. Şirovekirin bi du bergan (cild) û ji aliyê nivîskar bi xwe ve hatiye çapkirin.*

**PEYV**

**Wêje:** Tore**,** Edebiyat

**Awaz:** Newa-Sazkirina dengê mûzîkê

**Dîwan:** Pirtûka helbestan

**Botî:** Navê eşîrek û herêmeke Cizîra Botan e.

**Reftar:** Şêweyê ku yek bi wê kar û tevger dike

**Medreseya Sor:** Navê mizgefteke navdar e, li Cizîra Botanê ye.

**RASTNIVÎS**

Xwendekarên hêja!

Mijara li jêr bi baldarî bixwînin, li cihên tên xwestin nîşaneyên xalbendiyê deynin û kêmasiyên nivîsîskî de sererast bikin.

"Melayê Cizîrî di zanistên erebî farisî kurdî û tirkî de gelek pêşketî bû heta 32 saliya xwe xwendinê berdewam dike destûrnameya xwe ya zanistî di heman temenî de li gundê stêrbasê yê girêdayî amedê li cem mela tahir digire çend salan li gundê serba yê girêdayî amedê dibe mela li herêma amedê gelek wane û bawername jî dane "

## PIRS

**1-** Kengî û li kû derê Melayê Cizîrî ji dayîk bûye?

**2-** Melayê Cizîrî li kîjan bajaran xwendina xwe qedandiye?

**3-** Çima Melayê Cizîrî di cîhanê de navdar e?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên jiyana kesan bi baldarî têdigihînin re **jîname** tê gotin.

Jîname, bi awayekî dîrokî nivîsa jiyana kesên di civakê bi banor, bi şêweyekî giştî, bi baldarî pêşwazî dike.

Di jînameyê de cih û dîroka jidayîkbûn, rewşa derdor, erkên kirîn, taybetmendî, xebat, bandora wan û beşên wan ên hunerî, ger miribe, cih û dîroka mirina wan, piştî mirinê, nivîsên li ser wan hatine nivîsîn û ger hebin destnivîsên wan tên nivîsîn.

## RÊZIMAN

**Daçek:** Ji aliyê wateyê ve hevokan temam dikin; daçek ne ji ber wateya xwe lê ji ber peywira xwe weke peyv tên pejirandin.

**Daçekênbingehîn:** ji, li, bi, di... de.

**Daçekên hevedudanî:** Daçekên hevedudanî bi piranî ji daçekeke bingehîn û ji bêjeyeke ku cih û aliyekî nîşan didin pêk hatine. Her daçekeke resen komek daçekên hevedudanî çêdike.

li: li paş, li ser, li dor, li ber, li nav, li cem...

bi: bi dûv, bi bin,bi ser, bi dor...

ji: ji paş, ji dor, ji aliyê, ji nav, ji kêleka...

di: di ber de, di bin de, di nav de, di ser re, di bin re, di dor re, di nav re...

**Mînak:**

Bila av te bibe, lê **di ser** pira nemrdan **re** derbas nebe.

Barê giran **li ser** milan.

**Li bin** defa her kesî govendê negire.

**Li dû** tariyê ronahî ye.

**Ji ber** şirikê çû ber mezrîbê.

**Di nav** wan de gelek kesên baş hene.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî li ser wêjevanekî kurd, lêkolîn bike û jînameyekê binivîse.

# WANE 6

## ROVIYÊ STEMKAR

Roviyek hebû pir ziyan dida derdorê, ji ber wê her kes jê direviya. Rojekê hizirî û ji xwe re got: "Ger ez kirasekî olî li xwe nekim, bi wî rengî nekevim tevgerê, ez ê li van deran ji birçîna bimirim, ji ber ku her kesî ez nas kirime.


Rovî: "Ez ê rabim biçim

hecê, Bixwim mirîşka Xecê,

Bikim hîle û fenda

Heta herime gunda."

Rabû şaşikek da serê xwe, tizbiyek kir stûyê xwe û xwe berda nava gundekî. Dît ku mirîşk diçêrin,




Li ser sergo dinêrin,

Rovî giha dehma wan,

Silav kir ser dîkê wan.

Dîk silava wî veda,

Hema hêdîka çik da.

Rovî: "Seyda tu li ser van sergoyan çi dikî? Were em herin mala Xweda, tu kesekî melayî."

Dîk:

"Pir me dîne te xwarin,

Ji hingî ve şiyar in."

Rovî hat û hûrhûrî,

Tizbe hejand korkorî.

"Ez bûme gunehkar,

Lê min tobeye ji fêlên par."

Bi vî awayî dîkê feqîr xapand û bi dîk re ketin rê. Hinekî ji gund derketin, dîtin kewekî dengxweş dixwîne. Rovî nêzîk bû û silav kir.

Kew silava wî veda,

Hema hêdîka fir da.

Rovî jî banî kirê: "Erê wa feqî çima tu dibî şeqî? Were va seydayê te bi min re ye, em herin hecê."

Dema kew dît ku rovî û dîk bi hev re ne, baweriya wî hat, ew jî ket rex wan û rêwîtiya xwe berdewam kirin. Gihan ber ava çêm, nêrîn ordekek li wê derê ye. Rovî silav li ordekê kir, ordekê silava wî veda û xwe berda nava avê.

Rovî:



"Seyîd! Tu ji nisla resûlî

Li van deran çi dikî, bêxwedî,

Were em herin Medînê,

Da tu cidê xwe bibînê."

Wê jî bawer kir û ket rex wan.
Li wan bû êvar.

Rovî: "Em tobedar in, divê em bikevin kunekê da ku tebayên din me nexwin."

Geriyan kunek dîtin û her çar bi hev re ketin kunê.

Rovî:

"Ez bûme gunehkar,

Ez ê bibim nobedar",

Rovî rabû nobet girt,

Derê kunê taze girt.

Nîvê şevê dibore,

Dîko rabû diqîre.

Rovî: "Ev çi ye, ne wextê nimêjê ye, ev çi oldariya sexte ye tu dikî?"

Dîk: "Ne sexte ye."

Rovî li feqe zivirî: "Feqe bêje, weke min gotî, yan weke mela gotî?"

Feqîrê feqe, li çavên rovî nêrî û tirs ket dilê wî û got: "Weke te gotî, ne weke mela gotî."

Rovî serê dîk jê kir,

Li paşiya kunê kir.

Ketiye serê siharê,

Kew jî rabû diqebe,

Ew ji xwe re dixwîne

Ji Quran û Yasînê.

Rovî: "Çi adet, Quranê dixwîne xelet."

Feqe: "Ne xelet e."

Rovî li ordekê zivirî: "Seyîd weke min gotî yan weke feqe gotî?"

Seyîd: "Weke te gotî, ne weke feqe gotî."

Rovî serê feqe jî jê kir,

Li dawiya kunê kir,

Ma seyîd û ma rovî,

Seyîd ji tirsa nalivî.



Rovî: "Erê seyîd tu dibêjî ez seyîd im, ka eslê te, ka secera te, çima tu ev qas derewan dikî?"
Seyîd: "Hecî tu pir başî, Lê xeber belaşî, Min hebû birayekî biçûktir,

Eslê min wî bi xwe re bir, Ger tu bixwazî ez ê,

Herim bînim birayê xwe, Du şahid û eslê xwe."

Rovî tema bû û got: "Baş e here bîne, Lê belê pir nemîne."

Rovî derê kunê vekir, seyîd derket ji derve û got:

"Hecî ser çava, Rebî mala te ava."

## PEYV

**Ziyan:** Xerabî, Zirar

**Şeqî:** Nerihet-nesekinî-şûm

**Secere:** Dara binemalê nîşan dide.

## RASTNIVÎS Pirsnîşan: (?)

Ev nîşane li dawiya hevokên pirsiyariyê tê bikaranîn. Hevokên pirsiyariyê bi peyvên pirsiyariyê ji hevokên din cuda dibin.

**Mînak: Ma** Şiyar hat?

**Kengî** Karwan çû?

Carinan hevokên asayî bi rêya kirpandinê dibin hevokên pirsyarî:

Şiyar hat.

Şiyar hat?

Karwan çû.

Karwan çû?

## PIRS

**1-** Çima rovî pêwîst dît ku kirasê olî li xwe bike?

**2-** Kew bi çi hat xapandin?

**3-** Çawa seyîd ji rovî rizgar bû?

## CUR Û AWA

Di çanda kurdî de çîrok carinan hûnandî û carinan jî pexşan tên gotin û nivîsîn.

Çîrok bi armanca perwerdekirina civakê tên nivîsîn û ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin.

## RÊZIMAN

### Hevalnav (rengdêr)

Hevalnav ew bêje ne ku çawanî û mêjera navdêran bi me didin nasîn.

### Hin cureyên hevalnavan:

1- Hevalnavên çawaniyê

2- Hevalnavên şanîdanê

3- Hevalnavên nebinavkirî

**1- Hevalnavên çawaniyê:** Ev hevalnav rewşa navan bi me didin nasîn.

**Mînak:**

Hevalên **hêja** karên **baş** dikin.

Zozanên **xweş** ên Kurdistanê ne.

Gula **spî** sembola aşîtiyê ne.

**2- Hevalnavên şanîdanê:** Ev hevalnav navdêran bi riya nîşanê diyar dikin.

**Mînak:**

**Ev** dibistana mezin a me ye.

**Ew** dibistana mezin a me ye.

**Wê** Şagirtê bawernameya xwe wergirt.

**Vî** zarokî silav li min kir.

1- **Hevalnavên nebinavkirî:** Ew hevalnav in ku navan bi awayekî nediyar bi me didin nasîn.

**Mînak:**

**Hin** karker li vê kargehê kar dikin.

Em rastî **gelek** mirovên baş hatin.

Nêçîrvanan **çend** xezal girtin.

**Hemû** xwendekarên vê zanîngehê jêhatî ne.

**HÎNDARÎ**

Tu jî çend hevokan li ser hevalnavên nebinavkirî peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse.

# WANE 7

## GELIYÊ ZÎLAN

Kurdan, êrîşên li ser Noşarê, bajarê Erdîş û Bargiriyê jî, ji bîr nekiribûn. Bi awayekî pir tund êrîş li ser van bajaran jî çêbûbûn. Pêşengên van hêzan, rewşa di vê germahiya êrîşê de jî, ji bîr nekiribûn; wan ez agahdar kiribûm. Ez û pêşengên herêmên din jî li benda fermanên ku di fermanameyê de bûn, da ku dest bi şer bikin .



Ji bo parastina Kelha Noşarê, girên bilind pir baş hatibûn qayîmkirin. Ji xwe kelh jî li cihekî pir bilind hatibû avakirin. Bi vî awayî li hember lehiya êrîşan, şervanên leheng ên kurd, 24 demjimêran jî xwe ranegirtin. Noşarê windahiyeke mezin da û ket destê kurdan. Fermandar di şer de hatibû kuştin. Serbaz û leşkerên ku ji mirinê rizgar bûbûn, dîl hatibûn girtin. Ji aliyê din ve jî, di roja pêşî ya êrîşê de gelê kurd beşeke Erdîşê û bajarê Bargiriyê hemû bidest xistibûn. Beşeke Erdîşê û Kelha

Bargiriyê di destê hêzên tirkan de mabûn. Desteya ku ji bo girtina riya Wan-Erdîşê hatibû şandin, bûbûn cangoriyên bêewlekariya xwe. Vê desteyê bi wêrekî û lehengiyeke mezin, li gel serkeftinên matmayî canên xwe dan; wisa kirin ku li ser hêzên tirkan rewşa tirsê dan çêkirin û rewşa Erdîşê hat guhertin. Bûyer wiha geş bûye; tirk ji Wanê ji bo hewara Erdîşê biçin, çend top û komek ji leşkeran dişînin .

Ev desteya kurdan li nêzî Erdîşê, riya wan dibirin. Piştî şerê nîv demjimêrê, leşkerên tirkan ên ku têdigihin, wê jê rizgar nebin, radestî wan dibin. Şervanên Hayderî çawa dibînin ku tirk radestî wan dibin, ji kozikên xwe derdikevin, da çekên wan bigirin. Dema fermandarê tirkan dibîne ku jimara şervanên kurdan kêm e, ji bo radestkirinê jovan (poşman) dibe û ferman dide leşkerên xwe da dest bavêjin çekan û êrîşî wan bikin. Bi vê berdanê re fermandarê Desteya kurd û çend şervan tên kuştin, ên mayîn jî heta guleyên xwe yên dawî şer dikin. Di dawiyê de ew jî şehîd dikevin. Bi vî awayî hewara hêzên tirk ên alîkariyê digihêjin Erdîşê.

Êrîşa pêşî ya li ser Erdîşê, ji aliyê Bekiriyan ve hatibû kirin. Çek û cebilxaneyên van têra wan nedikirin. Ji ber kêmbûna çek û çebilxaneyên wan, nikarîn Balefirgehê dagir bikin. Van mirovan, bi rê û rêbaza xwe ya kurdewariyê ku dibêje; ***"Li cihê ku ez dîl bijîm, bila bi mêrxasî bimirim"***, bê çek bi kuling, bêr û biviran êrîş biribûn ser wan û di ber evîniya xwe ya "azadiyê" de çend cangorî dabûn. Balefirgeh bi dest xistibûn û leşkerên wê derê dîl girtibûn û dest danîbûn ser çekên wan û bi vî awayî du firokeyên wan jî girtibûn. Lê belê ne dizanîn bidin xebitandin, ji ber neçariyê ew firoke şewitandibûn.

Îhsan Nûrî Paşa

Serhildana Çiyayê Agirî

## PEYV

**Noşar:** Nûrşîn, navçeyeke Bidlîsê ye.

**Erdîş:** Navçeyeke Wanê ye.

**Bargir:** Navçeyeke Wanê ye.

**Fermaname:** Nameya fermanê

**Serbaz:** Serleşker

**Şervanên Hayderî:** Şervanên bi baldarî tev digerin.

**Radest:** Dayîna dest

**Balefirgeh:** Cihê balefir lê radiwestin û radibin.

## PIRS

**1-** Bi xwendina vê mijarê re, hesteke çawa bi te re çêdibe?

**2-** Desteya kurd berxwedaneke çawa nîşan da?

**3-** Dema Geliyê Zîlan tê gotin, çi tê bîra te?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên tişta bi serê nivîskar de hatî yan jî nivîskar bûyî şahidê bûyerê radigihîne re **bîranîn** tê gotin.

Pêwîst e bîranîn xwe bispêre rastiyê. Zimanê wê xwerû, têgihandina wê bi bandor be.

## RÊZIMAN

**Hoker:** Ew bêje ne ku lêkeran ji aliyê rewş, dem, cih û bergeh û çendaniyê ve diyar dikin.

### Hin cureyên hevalkaran:

1- Hevalkarên çawaniyê (rewşê)

2- Hevalkarên demê

**1- Hevalkarên çawaniyê (rewşê):** Ev hevalkar rewş û çawaniya karê ku tê kirin, nîşan didin.

**Mînak:**

Em **zû** çûn gund.

Pîremêr **hêdî hêdî** dimeşin.

Ez duh **bi dizî** hatim malê.

Ew **bi nezanî** kar dike.

**2.Hevalkarên Demê:** Ev cure hoker dema karê ku tê kirin diyar dikin.

**Mînak:** **Ji duşemê ve** nehatiye cem min.

**duh** çû gund. Ew

**Sibe** were mala me.

**Par** çandinî baş bû.

Ez ê **îşev** li vir bimînim.


## HÎNDARÎ

**1-** Îhsan Nûrî Paşa kî ye? Lêkolîn bike.

# WANE 8

## MIJARA SERBEST

## DAYÎKA MIN



Di wan şevên tarî de, te ji min re dilorand. Her qêrîneke min hezar carî êş dixist dilê te. Li ber serê min rûdiniştî, heta tîrêjên rojê didan cîhanê. Min tenê gava li çavên te yên reş dinêrî, dayîka min di nava çavên te yên melûl de min evîna dayîkan didît.
Li vê cîhanê, ez ji te, têr nebûm. Belkî li cîhana din, belkî li buhiştê, em hev bibînin. Gava roj sor dibe, xwe dixemilîne û di pişt asoyan re diçe ava, ez di nava xeyalên xwe de, li dayîka xwe digerim. Weke bilbilê her roj bixwîne, li hêviya vebûna gulê be, dayîka min! ez jî bi hesreta dîtina te me, tenê carekê te bibînim, derdên xwe ji te re bêjim, te bêhn û hembêz bikim, bes e!. Li çavên te yên reş binêrim û evîna dayîkê bibînim.

Ez li ezman, di nava ewran de gava stêrkan ji xwe re dilîst, di nava xeyalên xwe de digeriyam. Ez di nava deryayê de weke masiyekê her tim, dilîstim. Weke masiyeke ku nikaribe ji avê qut bibe, dimam û li dayîka xwe digeriyam. Di nava şevên tarî de, bi dengê şirqîna birûskan, bi qêrîna bahozê re ez li dayîka xwe digeriyam. Di wan şevên tarî de ku çav çavan nabînin, ez digeriyam. Ji dûr ve min xwe li çirûskeke ku ji ber agirekî geş mabû, girt û bi dilekî kul û bi hesreteke mezin, derdê xwe ji wê çirûska êgir re got. Hêviya min ew e ku ez dayîka xwe, di bin siha azadiyê de bibînim.

Ji ber hesreta dîtina te, di jiyanê de bitevger im, dayê. Weke berekê di çola havînê de bê av bimîne û li hêviya dilopek av be.

Dayîka min, ez bi hesreta te û tenê te carekê bibînim û serê xwe deynim ser zenda te û bêjim: "Dayîka min, gula biharê û çîmena ber çeman!"

***Ş. Çîmen Herekol***

# WANE 9

## GULBIHAR

Gulbihar, gula biharê

Tu xeml û rewşa Adarê
Her sal weke îro li darê
Gulbihar rewşa Adarê

Çîçek û gul û nesrîn e
Nêrgiz û lal û gulçîn e
Sînem û kal sosinî ne
Gulbihar rewşa Adarê

Sorgul û rîhan, bibîn in
Binefş û çîmen şirîn in
Li ba yara xemrevîn in
Gulbihar rewşa Adarê

Xemrevîna dildaran tu
Serwera evîndaran tu
Dilkuştiya ciwanan tu
Gulbihar rewşa Adarê

***Celadet Bedirxan***



## PEYV

**Sosin:** Kulîlkeke li Kurdistanê çêdibe.

**Lal:** Bi wateya kulîlka laleyê bi kar aniye.

**Gulçîn:** Di wateya beşên gulan de hatiye bikaranîn.

**Binefş:** Kulîlkeke rengê wê mov e.

**Sînem:** Cureyeke gulan e.

**Nesrîn:** Navê kulîlkekê ye.

### EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN

Celadet Bedirxan, ji binemala Bedirxaniyan e. Kurê Emîr Elî Bedirxan e. Celadet Bedirxan di sala 1897'an de li Stenbolê ji dayîk bûye. Celadet Bedirxan li ser ABC'ya kurdî ya Latînî, rêzimana kurdî û helbestan xebateke giranbuha kiriye.

Celadet Bedirxan, di sala 1951'ê de çûye ser dilovaniya Yezdan.

## PIRS

**1-** Li gorî helbestê, tiştên xeman direvînin, çi ne?
**2-** Di helbestê de Gulbihar di wateya çi de hatiye bikaranîn?

## CUR Û AWA

Helbesta li jor mirov dikare bi du rengan bigire dest. Ji ber ku tê de xweşikbûna xwezayê heye, weke helbesteke pastoral, her wiha ji ber di hinek rêzikên wê de mînandin (îstîare) heye, helbesteke sembolîk e.

**Pîvan:**

Ji wekheviya kiteyên rêzikên helbestan re **pîvan** tê gotin.

**Mînak:**

"Sorgul û rîhan, bibîn in
Binefş û çîmen şirîn in
Li ba yara xemrevîn in
Gulbihar rewşa Adarê"

Weke di malika jor de jî tê dîtin, dema em bixwazin helbestekê bi pîvan binivîsin, pêwîst e jimara kiteyên rêzikên helbestê bi qasî hev bin. Carinan dibe ku hejmara kiteyên du rêzikan bi qasî hev bin, lê jimara kîteyên du rêzikên li pey wan cuda bin.

**Bare**, li gorî ahengiya dengên li dawiya rêzikan, dibe çar beş:

1- Bareya lawaz (nîv)
2- Bareya tam
3- Bareya dewlemend
4- Bareya hevdeng (cînas)

Bareya helbesta we xwendî, bareya tam e.

Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestan re **bareya tam** tê gotin.

# HÎNDARÎ 2

Bersiva rast hilbijêrin.

**1- Ji wan curenivîsên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştên hîskirî radigihîne re çi tê gotin.**

- Rexnekirin
- Wêneyîkirin
- Jîname
- Geryaname

**2- Di kîjan hevoka li jêr de hevalkara demê hatiye bikaranîn?**

- Aram bi lez çû.
- Azad par xwendekar bû.
- Gulîzer li pêş dibeze.
- Aheng li jor rawestiya ye.

**3- Pêwîst e li ser kîjan hevoka li jêr pirsnîşan bê bikaranîn?**

- Ew pênûsa min e.
- Karker ji kar zivirîn.
- Ma ev xwendekar e.
- Mam Şêrwan xemgîn e.

**4- Di kîjan hevoka li jêr de hevalnavê şanîdanê heye?**

- Ev xwendekar, kesekî rêzdar û jêhatî ye.
- Ev hem zana, hem pêşketî ye.
- Wî pirtûk xwend.
- Min hevaltiya vî kir.

**5- Di kîjan hevoka li jêr de baneşan nayê bikaranîn?**

- Wax çi birîneke kûr e.
- Wa Berfîn were em biçin.
- Heval, ev mala me ye.
- Delalê negirî.

**6- Peyvên dijber bi xêzekê bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Azadî | kovî |
| Dûr | dirêj |
| Çûn | destpêk |
| Ronî | nêzîk |
| Hêdî hêdî | tarî |
| Reş | hêsan |
| Kurt | bilez |
| Dawî | spî |
| Kedî | hatin |
| Zehmet | paş |
| Hişk | nerm |
| Pêş | bindestî |

**7-** ji van hevokan kîjan hevok tê de hevalnavên çawaniyê hatiye bikaranîn.

a- Sorgul û rîhan bibîn in.
b- Ew ji xwe re dixwîne.
c- Em di ber dibistanê re derbas bûn.
d- Me duh li şanoyekê temaşe kir.

8- kîjan ji yên li jêr ne ji daçekên hevedudanî ye?

a- Bi  b- Li ser  c- li hember  d- di ber re

# BEŞA 3

DAXWAZNAME

DÎROK Û SIRÛD

BILBILÊDILŞAD

NAME JI BO DAYÎKÊ

TIL HELEF

GIRÎNGIYA XWENDINÊ

PEYAMA NEWROZÊ

SIYABENDÊ SILÎVÎ Û XECÊ

HÎNDARÎ 3

# WANE 1

## DAXWAZNAME

**Ji bo Rêveberiya Koîmteya Perwerdeyê ya Qamişloyê,**

**Di dawiya sala perwerdeya 2013/2014'an de pêşbirka ji aliyê we ve bê lidarxistin, bi çend hevalên xwe re em jî dixwazin beşdar bibin.**

**Ger daxwaza me bê pejirandin em ê kêfxweş bibin.**

***24/06/2013***

***Navnîşan: Viyan Penaber/***

***Kolana Qudûrbeg 14/***

***Şanenav Qamişlo***

## RASTNIVÎS

**1-** Di daxwaznameyê de rêzika weke sergotar tê bikaranîn an tev, an jî destpêka her peyvê bi tîpa mezin tê nivîsîn û di dawiya wê de bêhnok tê bikaranîn.

**2-** Di nivîsa daxwaznameyê de pêwîst e hemû daxwaz bi rêzdarî werin nivîsîn.

**3-** Di navbera hejimarên bi hev ve têkildar, xêzexwar (/) tê danîn.

**Mînak:**

Perwerdeya me ya 2013/2014'an dê sibe dest pê bike.

10. Di 24/06/2014'an de me ji bo rêveberiya dibistanê daxwaznameyek nivîsî.

## PIRS

**1**- Daxwazname çi ye?

**2**- Mirov ji ber çi daxwaznameyê dinivîse?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên ji bo daxwaza kes, kom û gazinên wan an jî rewşekê ji cihê peywendîdar radigihîne re **daxwazname** tê gotin.

Divê daxwazname li ser kaxeza spî ya bê xêzik û ji pîvanên wê ku bi pênûsa reş an jî şîn, bê nivîsîn.

## RÊZIMAN

**Lêker:** Ji peyvên ku kar, tevger, bûyer û rewşekê diyar dikin re lêker tê gotin.

**Mînak:**

Kêfa min ji helbestên Cegerxwîn re **tê**.

Me li ser dîroka Kurdistanê **lêkolîn kir**.

Zelal di rojnameya Ronahî de **dixebite**.

Deriyê malê ji nişka ve **vebû**.

**Lêker li gorî çêbûna xwe dibin sê beş:**

**1- Lêkerên Xwerû:** Ew lêker in ku tu qertafan nagirin.

**Mînak:**

anîn, avêtin, çûn, birin, dîtin, dan, firotin, gotin, hiştin, lîstin ...

**2- lêkerên Pêkhatî:** Ew lêker in ku bi alîkariya qertafên sazker tên bidestxistin.

**Mînak:**

| **Qertafên sazker** | **Lêkerên xwerû** | **Lêkerên pêkhatî** |
|---|---|---|
| **da-** | Ketin, girtin | Daketin, dagirtin |
| **çê-** | Bûn, kirin | Çêbûn, çêkirin |
| **hil-** | Girtin, dan | Hilgirtin, hildan |
| **ra-** | Hiştin, xistin | Rahiştin, raxistin |
| **rû-** | niştin | Rûniştin |
| **ve-** | Kirin, xwarin | Vekirin, vexwarin |
| **wer-** | Girtin, kirin | Wergirtin, werkirin |

**3- Lêkerên Hevedudanî:** Ew lêker in ku ji du peyvên watedar pêk tên.

**Mînak:**

avakirin, diyarkirin, sorkirin, hişyarkirin, bilindbûn, sarbûn, avabûn, nexweşketin ...

**HÎNDARÎ**

Daxwaznameyekê bi awayê destnivîsê ji rêveberiya dibistanê re binivîse.

# WANE 2

## DÎROK Û SIRÛD



Agirî çiyayekî bilind e. Di nava kirasekî spî de rapêçandî ye. Serî bi mij û dûman e û çiyayekî berz û kevnar e.
Ziyaretgeha dîndar, evîndar, derwêş û bîreweran e. Warê şervanan û kaniya xurtî û mêraniyê ye. Navenda serhildanan e.
Agirî, çiyayê ji agir e, çiyayê serî li asîmanan û kelha parastina xwediyê xwe ye. Kelha Xoybûnê ye.

Li ber qontarên Çiyayê Agirî, şervanên kurd, çekdar, dengdar û strana Agirî ne. Bi dengekî, hemû bi hev re, li nik wan fermandarên wan; Îhsan Nûrî Paşa, Biro Heskê ,Têlî Paşa, Temerê Şemkî, Şefdîn Beg û Ferzende Beg hebûn.

Li hemberî wan jî Îskender Beg bû. Ango Memdûh Selîm Beg. Ala kurd a rengîn li zinarekî bilind dibe, dinya sar e û berf li ser çiyê ketiye. Bilindahiyên çiyê di nava berfê de, bûne xwedî kirasekî spî.
Sirûda şervanên kurd, Destana Serhildana Kurd a Agirî ye…
Şervanên kurd xêrhatin li Îskender Beg dikirin. Îskender Beg, çend kurdên Îranê û du ermenî, li şervanên kurd dinêrîn.
Bêdeng û biken, dilê wî weke dengê Çiyayê Agirî hildiavêt.
Germ û bilez, heyecenake mezin, dil û mejiyê wî girtibû.
Xwedawo! "Tu qadirî,
ma min ê ev roj jî

bidîta***? "Leşkerên kurd, fermanderên wan û ala kurd, axa rizgarkirî. Jiyaneke ji nîr û zordariyên xerîban dûr e..."***

"Îskender Beg: Gelî hevalan… Hûn bi xêr û xweşî hatin. Em, leşker û fermandarên Şoreşa Kurd A Çiyayê Agirî silav li we dikin. We, em kêfxweş û serbilind kirin. Bi xêr bin." Dengê Îhsan Nûrî, dengekî xurt û hişk, yanî dengê serleşkerekî bû.

Îskender Beg kelegirî bû. Ji kêfxweşî û heyecanê, deng jê dernediket. Wî dizanî, eger ew devê xwe veke, ew dê bigirî. Tu carî tiştekî wiha neqewimîbû, ew, wiha bi agirê heyecanê nehatibû sotandin, pêtên heyecanê qet bi vê xurtiyê bi ser wî de nehatibûn.

Li ber çavên hemûyan Memdûh Selîm Beg tiştekî dike; ew çokên xwe datîne erdê, berjêrî erdê dibe û axa reş radimûse.



Sê caran giran, giran. Li pey ramûsandina axê re ew mistekê ji axê dixe nava lepên xwe, axa reş bêhn dike. Dirêj dirêj, ew li axê, ala çiya û şervanên kurdan dinêre.

Îhsan Nûrî Beg tê û wî ji erdê radike. Ew bi ken li hev dinêrin û hev hembêz dikin. Bi dirêjiya xulekan, paşê jî ew, bi hev re ber bi fermandar û şervanan ve diçin. Îhsan Nûrî Beg wan yek bi yek, bi Memdûh Selîm Begê dide nasîn. Ew jî wan, yek bi yek hembêz dike.

"Begê min Îhsan, ez dixwazim ala serbestî û azadiyê jî ramûsim. Ji min re vî tiştî jî bike, ji kerema xwe re, wê bîne, ez wê ramûsim û bêhn bikim. Bêhna serbestî û azadiyê bigirim…"

**Mehmed Uzun**
**Ji romana 'Siya Evînê'**

## PEYV

**Berz:** Mezin, Bilind

**Xoybûn:** Navê tevgereke kurd bû.

### EM WÊJEVANÊ XWE BINASIN

Mihemed Uzun, di sala 1953'yan de li Siwêreka girêdayî Rihayê ji dayîk bûye. Dibistana seretayî, navîn û amadehî li Siwêrekê xwendiye û li Zanîngeha Enqereyê beşa Mamostetiya Teknîkî ya Bilind, xwendiye. Ji ber zordariya dijmin di sala 1977'an de derbasî Siwêdê dibe û jiyana xwe di penaberiyê de berdewam dike. Pêşevanî ji gelek kovar û rojnameyan re kiriye û gelek berhemên navdar (Tu, Mirina Kalekî Rind, Siya Evînê, Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê, Hawara Dîcle û hwd) jî nivîsîne.

Mihemed Uzun di sala 2007'an de li bajarê Amedê xatir ji jiyanê xwestiye û çûye ber dilovaniya yezdan.

## PIRS

**1-** Çima Îskender Beg kelegirî dibe?
**2-** Çima di romanê de sirûda şervanên kurd weke destana Agirî bi nav kiriye?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên dirêj ên ku bûyerekê yan gelek bûyeran bi hev re radigihînin û di nava wan de gelek leheng heyî re **roman** tê gotin.

Roman, li ser sê endamên bingehîn tê hûnandin :

**a-** Bûyer
**b-** Kes
**c-** Cih û dem

## RÊZIMAN

**Di lêkeran de rader (jêder):** Rader awayê bingehîn ê lêkeran e, lêker di vê rewşê de li gorî tu dem û raweyan nehatiye kişandin.

**Mînak:**

anîn, xwestin, birin, gortin, dîtin, man, barîn, bezîn, daxistin, vegerîn, firandin ...

**Bidestxistina rayeka lêkeran:**

**a- Rayeka dema borî:** Dema ku mirov qertafên raderîn "in " ji lêkeran rake, rayeka dema borî tê bidestxistin.

**Mînak:**

Xwestin = xwest, xwendin = xwend, hatin = hat, ketin = ket ...

**b- Rayeka dema niha:** Dema ku mirov lêkerê li gorî dema niha bikişîne û qertafên dem û kesan jê rake, rayeka dema niha tê bidestxistin.

**Mînak:**

| Lêker | Dema niha | rayek |
|---|---|---|
| xwestin | dixwaze | xwaz |
| xwendin | dixwîne | xwîn |
| meşîn | dimeşe | meş |
| barîn | dibare | bar |
| kolan | dikole | kol |

## HÎNDARÎ

**1-** We çi roman xwendine? Navên wan binivîsin.
**2-** Rayeka dema borî û dema niha ya van lêkeran binivîsin.
Kirin , raketin , şûştin

# WANE 3

## BILBILÊ DILŞAD




Ey bilbilê dilşadî hela, wer bike fîxan
Derdê me girane ey bira , birîna me kûr e
Gorî te bitin cerg û dil û mêlak û hem can
Dengê te ye xweştir , ji ney û nay û bilûr e

Sê hawe tên deng , yek ji sira bayê siba ye
Hawayê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye
Hawê sisiya ji bêhna şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e

Karwanê me va bi rê ketî , lê şevreş û tarî
Serma ye terez kulyên di berfê her dibarî
Bahoz e çelapek têne me , ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval , rêka me dûr e

Çar hawîr me diz û keleş in , têk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin bir bi bir , heyf û mixabin
Qet çarew umîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeqel , gur zûr e zûr e

Meydan e ji bo hirç û çeqel , rovî û keftar

Gorî te bim bilbil , ji serê darê tu wer xwar
Da pêk ve mijûl bim , bi xwe çend rojên di dijwar
Îro li me ferman e , li ser gerdenê şûr e

*Seydayê Tîrêj*

## PEYV

**Fîxan:** awaza bilbil

**Cerg:** Kezeb

**Hawe:** Awa

**Meşûr:** Bi nav û deng, navdar

**Hawîr:** Hawîrdor

**Çeqel:** Torî, Cureyek ji kûçikên kovî

## EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN



Seydayê Tîrêj di sala 1923'yan de li Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye. Helbestvanê navdar li ser xwezaya Kurdistanê, li ser perîşanî û bindestiya kurdan, helbestên gelekî giranbuha hûnandine. Di sala 2002'yan de jî helbestvanê me li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê koça dawî dike.

## PIRS

**1-** Ji bo çi Seydayê Tîrêj dibêje:
"Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fîxan

Derdê me giran e ey bira birîna me kûr e"

**2-** Naveroka helbesta Seydayê Tîrêj li ser çi ye? Şîrove bike.

## CUR Û AWA

Ev curehelbest, helbesteke destanî (epîk) ye. Ji wan helbestên ku mijara wan şer, egîdî, lehengî û welatparêzî re destanî **(epîk) tê gotin**.

Bûyerên dîrokî bi vegotineke kelecan tîne ziman. Ev curehelbest têra xwe dirêj in, ji van helbestan re **helbestên destanî** û **helbestên lehengî** jî tê gotin.

Di helbestên hûnandî de bê guman malik û bare jî tên dîtin, li gel wan carinan di helbestê de li dawiya rêzikan heman rêzik tê dubarekirin; ji vê rêzika tê dubarekirin re **qulf tê gotin.**

Bareya vê helbestê jî, bareya dewlemend e. Ji wekheviya sê deng an jî zêdetir dengên wekhev ên ku dikevin dawiya rêzikên helbestan re **bareya dewlemend** tê gotin.

**Mînak:**

Sê hawe te deng, yek ji sira bayê sib**a ye**

Hewayê dî ji dengê xuşîna dehl û rez**a ye**

Hewê sisiya ji bêhna şemamok û gul**a ye**

Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e

# WANE 4

## NAME JI BO DAYÎKÊ



**10 Nîsan 2016**

Dayîka min î hêja!

Bawer bike dayê can, min pir bêriya te kiriye. Bêguman dizanim te jî, pir bêriya min kiriye. Ji ber ku va bûye demeke dirêj me hev nedîtiye. Ji ber nebûna derfetan, ez nikarim zêde nameyan bişînim... Lê xema nebe dilê xwe dayê, hezkirin û tama xwarina kesî bi ser a te nakeve. Serê sibê dema te ez ji xewê şiyar dikirim, xwarin dida min û ez bi paqijî û rûkenî dişandim dibistanê, ma ez ê çawa ji bîr bikim dayîka min a şirîn û dilovan li ber dilê min.

Niha li vir jiyana me baştir bûye. Erê, zivistanê ji ber sermayê û nebûna pêdiviyên zivistanê û ambargoya li ser me, me hinek tengasî derbas kirin, lê niha bi derbasbûna biharê re rewşa me gelekî baştir e. Li vir hevalên min ên cur bi cur pir hêja jî çêbûne, hinek ji wan ji pêkhateyên ereb û asûrî ne jî. Aha wisa, em wekî pênaseya mozayîka gelan pir bi rêzdarî bi hev re didin û distînin. Ji kesî re nebêje dayê, bila di navbera me û te

de be(!) " dibe ku ez fêrî erebî jî bibim" ku ev jî xemlandineke mezin a bîrdoziya me ye.

A din, em tev baş in. Hevalên min pir hêja ne; hema hema her yek ji herêmekê ye. Weke dema xebatê jî, em sibehê 7-8 şiyar dibin, carinan heya demjimêr 9’an û carinan heya 11’ê şevê dixebitin. Carinan ji ber înternetê pirsgirêkên me derdikevin, an wekî din em pir baş in. Aha! di vê navberê de ew penîrê te ji bo me şandî pir xweş bû, me hemû xwar. Ji ber wê jî spasî, silavên taybet ên hevalên min tevan ji bo we hene...

Ew nameyên hûn dişînin carinan dereng digihêjin min, ji ber wê dereng bersivê didim. Ger derfet hebe ez ê tim ji bo we binivîsim dayê can.

We pirsî bû, lê niha tiştek ji bo min pêwîst tuneye, tenê başî, saxî û selametiya we dixwazim. Em jî, bi hemû tiwanayên xwe ve hewl didin ku xebata xwe ya amadekirina pirtûkan heya dawiya Gulanê bi şêweyekî herî serkeftî bi dawî bikin...

Bibore dayê, min dixwest bîranînên li vir ên kar û hevalên xwe, hîn zêdetir ji bo we binivîsim û bi were parve bikim, lê dema min tuneye.

Di dawiyê de jî, silavên min ji bo hemû malê û hevalên min ragihîne, bi taybet ez destê te û bavê xwe maç dikim.

**Silav, rêz û hezkirin dayê can**

**Jînda Zagros**

**Taxa Azadî /Kolana 3/Rimêlan**

## PEYV

Dilovan**:** Dilnerm, dilnazik

Bîrdozî**:** Îdeolojî

Tiwan: karîn, şêyan

## RASTNIVÎS

Weke di mînaka li jêr de jî tê dîtin, nameya asayî bi birepeyvên bangî dest pê dike. Piştî wê navbereke kurt tê nivîsîn û dikeve navbera naverokê. Her tiştê tu dixwazî bînî ziman, di vê bendê de dinivîsî û derbasî benda encamê dibî. Divê benda encamê, ji bendên din kurtir be.

Peyvên weke: Divê, pêwîst e, her wiha tê de nayên bikaranîn.

## TÊBÎNÎ

Dibe ku naveroka nameyê ji çend bendan pêkhatî be.

Li milê jor aliyê rastê dîrok, li milê jêr aliyê çepê navnîşan û li milê rastê jî nav, paşnav û şanenav tê nivîsîn.

**Dîrok**

**Bang ..............................**

**Destpêk.......................................................................**

**.............................................................................................**

**.......................**

**Naverok**

**.............................................................................................**

**.............................................................................................**

**.............................................................................................**

**.............................................................................................**

**.**

**Encam**

**.............................................................................................**

**...............**

**Navnîşan** **Nav û paşnav**

**Şanenav**

Li ser namedankê, aliyê jor, milê çepê nav û navnîşana hinêr, li milê rastê pûl, li aliyê jêr milê rastê jî, nav û navnîşana girtek tê nivîsîn.

**Nav û Navnîşana Hinêr**

**Pûl**

**Nav û Navnîşana Girtek**

## PIRS

- Berê name çawa dihatin şandin?

2- Nameya di mijara jor de, ji kê re hatibû şandin?

## CUR Û AWA

Dema em li danasînên nameyan temaşe dikin, pê dihesin ku ev nameya me curenivîseke taybet e.

Ji ber nivîskar, ev name bi awayekî taybet ji dayîka xwe re şandiye.

Ji nivîsên ji bo dost, heval an ji bo xizman tên şandin re **nameyên taybet** tê gotin.

**Cureyên Nameyan:**

**1- Nameyên Taybet:** Ew nameyên ku ji bo heval, dost, evîndarî, serxweşî, spasî, vexwendin û pîrozbahiyan tên nivîsîn.

**2- Nameyên Wêjeyî:** Kesên navdar di aliyê huner û wêjeyê de, bi aramanca hest û hizrên xwe bidin xuyakirin û rexnekirin, nameyên wêjeyî dinivîsîn.

**3- Nameyên Fermî:** Nameyên ji bo ragihandina kar, di navbera saziyan de yan bi heman armancê ji kesên taybet re tên şandin.

**4- Nameyên Kar:** Nameyên bi armanca têkîliyên karê bazirganiyê yan jî ji bo sazûmankirina mercên xebatê di navbera aliyan de ji saziyên taybet an saziyên fermî re tên şandin.

# WANE 5

## TILHELEF



Tilhelef 3 km li rojavayê bajarê Serê Kaniyê dikeve, navê xwe ji girê bajêr girtiye, hejmara şêniyên bajêr 5 hezar kes in. Girê bajêr ji rojhilat ta rojava; ji 300 ta 500 metreyan dirêj dibe.

Li aliyê bakurê gir şaxekî çemê Xabûrê yê ku jêdera wî herêma Urfa ya Bakurê Kurdistanê ye, diherike. Herêma li derdora gir axeke berhemdar e û bi hezarê salan mirovên herêmê bi çandiniyê û xwedîkirina sewalan debara xwe dikirin.

Max Von Oppenheim (Maks Von Opênhêm) lêkolîn kir û bû sedema hilweşîna gelek şûnwaran. Lêkolînên pêşîn ên Oppenheim di sala 1899'an de dest pê kirin, lê ew têgihîşt ku di bin axa gir de gelek şaristanî hatine veşartin. di sala 1909'an de ji bo destûra lêkolînê bigire daxwaznameyeke fermî pêşkêşî dewleta Osmanî kir û di sala 1910’an de destûrnameya lêkolînê wergirt û di 5'ê tebaxa 1911'an de dest bi kolan û lêkolînan kir.

Oppenheim paşê ji karê diplomasî berda û hemû alavên xwe yên kolan û lêkolînê anîn Tilhelefê. Di sala 1913'an de karên

lêkolînê rawestiyan û dihate payîn ku di zivistana 1914-1915'an de dîsa dest pê bike, lê ji ber şerê cîhanê yê yekem karê lêkolînê 14 salan rawestiya. Piştî 14 salan di bihara 1924'an de

Oppenheim dîsa vegeriya Tilhelefê, lê dema ku ew vegeriya gelek şûnwarên gir ji aliyê Ermeniyan ve rûxiyabûn ji ber ku ji bo avakirinê hatibûn bikaranîn.Di sala 1920'an de peykerên ku di salên 1911-1913'an de hatibûn dîtin, hatin berhevkirin û li gorî hevpeymaneke bi Fransiyan re beşek ji wan peykeran dê li Muzeya Helebê bên dayîn û beşek jî, dê ji bo Berlînê bên veguhestin. Oppenheim lêkolînên xwe yên dawî li Tilhelefê di sala 1929'an de kirin, berhem û parçeyên arkeolojîk di 43 sindoqan de ji bo Berlînê hatin veguhestin.

Xerckirinên kar û barên lêkolîna Tilhelefê gihîştiye 275.000 markan. Ji ber ku rayedarên dewleta Elmanyayê ji bo dayînan li hev nekirin, li kolana Franklin a Scharltawn (Franklin a şariltawin) a Berlînê muzexaneya bi navê Tilhelefê vekirin û hemû berhemên dîrokî yên Tilhelefê tê de hatin bicihkirin.

Di sala 1943’yan de muzexaneya Tilhelefê a Berlînê sê caran ji aliyê hêzên hevkar ve hat bombebarankirin û gelek parçeyên dîrokî rûxiyan û gelek jî şkestin, lê tişta balkêş ew e ku parçeyên dîrokî yên ku li muzeyên din ên Berlînê di depoyên asê de hatibûn veşartin û tiştek bi wan nehat. Di tebaxa sala

1944'an de di encama hevpeymanekê de barê 9 kemyonan berhemên dîrokî ji bo depoya beşa şûnwarên rojhilat ê muzexaneya Berlînê hatin veguhestin. Her wiha, hin parçeyên ku berê li muzexaneyên Elmanyayê bûn, tiştek bi wan nehatibû.

Di sala 1946'an de gelek berhemên dîrokî ku di muzxaneyên Berlînê de bûn, ji aliyê hêzên Sovyetê ve hatin desteserkirin, lê di sala 1958'an de gelek ji wan berheman vegerandin Elmanyayê. Lê gelo ev berhemên ku bêyî vîna gelê kurd hatine lêkolînkirin û li cîhanê hatine belavkirin, heye ku rojekê vegerin warê xwe Rojavayê Kurdistanê?



Gelek dagirker li ser herêma Tilhelefê re derbas bûn, dagirkeriya herî dawiyê jî di 8'ê Mijdara 2012'an de ji aliyê komên DAIŞ'ê, Cebhet El-Nusra û gelek komên çete ve pêk hat.
Piştî nêzî salekê roja 5'ê Mijdara 2013'an Yekîneyên Parastina Gel (YPG) herêma Serê Kaniyê û Tilhelef jî di nav de rizgar kirin. Li gorî lêkolînên arkeolojîk, di binê axa Tilhelefê de dîroka 8 hezar sal veşartî ye. Ev dîrok û berhemên dîrokî pêwîst e bên parastin.

## PEYV

**Payîn:** Gumankirin, texmînkirin

**Rûxandin:** Hilweşandin

**Peyker:** Pût, Senem

**Muze:** Entîkxane, cihê parastina tiştên kevnar û dîrokî

## RASTNIVÎS

**Cihê Bikaranîna Tîpên Gir:**

**1-** Hevok bi tîpa mezin dest pê dikin.

**2-** Piştî pirsnîşan, baneşan, cotxan û xalê peyv bi tîpên mezin dest pê dikin.

**3-** Rêzikên helbestan bi tîpa mezin dest pê dikin.

**4-** Navên taybet ên ku ji lawiran re hatine dayîn bi tîpa mezin dest pê dikin.

**5-** Navên saziyên fermî bi tîpên mezin dest pê dikin.

**6-** Navên welat, herêm, bajar, navçe, gund, tax, kolan, çem û çiyayan bi tîpên mezin dest pê dikin.

## PIRS

**1-** Tilhelef dikeve kîjan parçeya Kurdistanê?

**2-** Sedemên hilweşîna gelek şûnwarên Tilhelefê, çi bûn?

**3-** Kê Tilhelef ji çeteyan rizgar kir û kengî?

## RÊZIMAN

### Dema niha:

Heke karek di dema têdeyî bê kirin, dema wî karî weke dema niha tê binavkirin.

Awayê pêkanîna vê demê: qertafa dema niha "di-"+ rayeka dema niha ya lêkerê+qertafa kesane.

| Lêker | Ki rde | pêşgir | Qertafa dema niha | Rayeka dema niha | Qertafa kesane | Hevok |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Bezîn | Ez | | di | bez | im | Ez dibezim |
| Çêkirin | tu | çê | di | k | î | Tu çêdikî |
| Meşîn | E w | | di | meş | e | Ew dimeşe |
| Vexwarin | E m | ve | di | xw | in | Em vedixwin |

**Mînak:**

Ez **di**xwînim. Em **di**gerin.

Tu **di**xwînî. Hûn **di**çinin.

Ew **di**xwîne. Ew **di**lîzin.

**Neyîniya dema nih**a: Bi alîkariya qertafa **''na-''**yê pêk tê.

**Mînak:**

- Ez ji Payîzê hez **na**kim.
- Em qehwê ve**na**xwin.
- Hûn **na**çin malê.
- Ew cilan ra**na**xe.
-

**Têbînî:** Her weke ji mînakan jî diyar e, di lêkerên pêkhatî (bipêşgir) de qertafa dema niha û qertafa neyîniyê dikevin navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

# WANE 6

## GIRÎNGIYA XWENDINÊ



Her mirovê ku bixwaze hemû erkên mirovahiyê pêk bîne, zana bibe, rûmetê bi dest bixe, weke mirovekî hêja di nava civakê de bê dîtin û bibe xwediyê zimanekî wêjeyî, pêwîst e bixwîne. Heke mirov nebe mirovekî xwenda, nikare bi awayekî tam pêşketinên mezin bi xwe re çêke. Ji ber ku bê xwendin, gavavêtinên mezin ne gengaz in.

Ger îro em karibin dîroka xwe ya bi hezarê salên derbasbûyî bizanin, awayê çanda xwe ya kevnar fêr bibin û awayê jiyana pêvajoyên derbasbûyî têbigihin, bi saya xwendinê ye, lewre gelên xwendin ji xwe re nekirine armanc, têk çûne û tune bûne. Li aliyê din



jî dema em temaşeyî zanyar û pêşengên civakê dikin, dibînin ku girîngiyeke mezin dane xwendin û perwerdeyê û wiha gotine:

"Civakbûna zarokan, bi çalakiya perwerdeya civakê tê meşandin."

Her wiha Hz. Mihemed jî wiha gotiye: "Zanistê bixwaze ji landikê ta gorê. " Di "Qurana Pîroz" de jî yekemîn fermana ji mirovan re hatî dayîn peyva: "**Bixwîne**" ye. Ji van gotinan jî tê zanîn di hemû qadên jiyanê de pêwîstiya me bi xwendinê heye.

Heke em bixwazin bibin mirovên birûmet, pêşketî û pêşeng, pêwîst e em bixwînin, perwerde bibin û gelê xwe bidin xwendin û perwerdekirin.

## PEYV

**Rûmet:** Nirx

**Gengaz:** Dibe, pêkan

## PIRS

**1-** Çima gelên ku girîngî nedane xwendinê, tune bûne?
**2-** Gotar li kû derê tê bikaranîn? Lêkolîn bikin.
**3-** Sûdên xwendin û perwerdeyê ji bo civakan, çi ne?

## RÊZIMAN

**Dema bê:** Ev dem ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn.

Awayê pêkanîna vê demê: Amraza dema bê "dê" û "ê" + qertafa bi + rayeka dema niha ya lêkeran + qertafên kesane.

| Lêker | kirde | Amraza dema bê | Pêşgir | qertafa merc û daxwaziyê | Rayeka dema niha | Qertafa kesane | Hevok |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Lîstin | Ez | ê | | Bi | lîz | im | Ez ê bilîzim |
| Şandin | Ew | ê | | Bi | Şîn | e | Ew ê bişîne |
| Hilgirtin | Em | ê | hil | | Gir | in | Em ê hilgirin |
| Raketin | Egîd | dê | ra | | kev | e | Egîd dê rakeve |

**Mînak:**

Ez **ê bi**xwim.

Ew **ê** vexwin.

Dilgeş **dê bi**çe.

Baran **dê bi**bare.

**Têbînî:** Her wekî ji mînakan diyar e, qertafa merc û daxwaziyê "bi" di lêkerên pêkhatî de ango bi pêşgir ji holê radibe.

**Di dema bê de neyînî:**

Qertafa neyîniyê ya dema bê "ne" ye. Di lêkerên pêkhatî de dikeve navbera pêşgirê û rayekê.

**Mînak:**

- Ez ê **ne**girim.
- Canda dê **ne**çe.
- Ez ê ra**ne**kevim.

# WANE 7

## PEYAMA NEWROZÊ




**Gelê berxwedêr!** Îro roja cejn, vejîn, berxwedan û serhildana gelê kurd a asoya herî bilind e.

Di vê rojê de, gelê kurd bi berxwedana xwe ya bêhempa, gelên Rojhilata Navîn ji bin darê zordariya desthilatdaran rizgar kiriye. Ji bo serxwebûna xwe dest bi vekirina rûpeleke nû ya dîrokê kiriye û bûye gelê herî xwedî dad. Di heman demê de, di vê roja pîroz de bi hewldanên Mezlûman ji kevneperestî û zordariya dagirkerên Kurdistanê re gotiye: Êdî Bes e û biryara berxwedana çekdarî ya ji bo azadiya gelê kurd û Rojhilata Navîn hatiye dayîn. Ev berxwedana pîroz, di bin pêşengiya Şehîdan de, bi Rewşen, Egîd, Adil, Zîlan, Bêrîtan, Leyla, Xebat, Rustem, Simko, Şîlan û Çîçekan bilind bûye.

**Gelê birûmet!**

Ev roja pîroz beriya derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê, ji aliyê neyarên gelê kurd ve weke hemû bermayên gelê kurd hatibû qedexekirin, lê bi berxwedana van lehengan û gelê welatparêz, neçar man ku vê roja binirx weke Cejna Neteweyî ya gelê kurd bipejirînin. Ji bo bidestxistina vê xelatê, xwîna gelek zarokên we, bav û dayîkên we, xwîşk û birayên we hat rijandin. Ji bo ev roj, bibe rojeke mayînde, hêvî û daxwazên pakrewanan bên pêkanîn, pêwîstî bi xebat û berxwedaneke hêj bi rêk û pêktir heye.

Tê zanîn, di pêvajoya vê berxwedana demdirêj û zehmet de, gelek îxanet û bêmafî li ser we û şoreşa me hatine pêkanîn. Her tim hat xwestin ku em dîroka xwe ya ji aliyê dijminan ve hatî reşkirin, dubare bikin. Lê we bi berxwedana xwe ya salan, bêyî ku stûxwehriyê ji tu zordaran re bikin, we, ew vale derxistin û hêviyên wan di dilê wan de hêlan.

Gelê hêja!

Em bawer in, ev berxwedana we ya binirx, dê heya gihandina mirovahiyeke birûmet berdewam bike û dê bibe berxwedana gelek rojên mîna vê roja pîroz.

Bi vê boneyê em cejna we pîroz dikin û serkeftinên bêdawî dixwazin.



## PEYV

**Aso:** Dûrahiya dawî tê dîtin-(ufuq)

**Kevneperestî:** Parastina tiştên paşverû

**Pakrewan:** Şehîd/Cangorî

**Newroz:** Roja nû

## PIRS

**1-** Peyva "Newroz" tê çi wateyê?
**2-** Çima gelên Rojhilata Navîn, Newrozê pîroz dikin?
**3-** Çawa kurd ji bin zordariya desthilatdaran, rizgar bûn?
**4-** Tu di Cejna Newrozê de çi dikî?
**5-** Çima rêjîmê cejna dayîkê ya ku di rastiyê de 13’ê Adarê ye, kiriye 21’ê Adarê?

## CUR Û AWA

Nivîsa derbsbûyî axaftin e. Dema em temaşeyî axaftinê dikin, ji ber ku li ser tiştekî girêdayî civakê yan li ser pirsgirêkekê li benda çareseriyê ye, jê re axaftina hizrî ya amadekirî tê gotin.

Di axaftinê de tevgerên dest, rû, mil, çav, serî û laş di bandorkirinê de roleke girîng dilîzin.

Bêjera/ê axaftinê, pêwîst e tevger û axaftinên xwe li hev bîne.

## RÊZIMAN

**Dema boriya têdeyî:** Dema ku bûyerek pêk hatibe û bi dawî bûbe, ev dem tê bikaranîn.

**Mînak:**

Rûken çû sînemayê. Min

karê xwe qedand. Ez li

nava bajêr geriyam.

Zîlan çîrok gotin.

**Neyîniya dema boriya têdeyî:** Bi alîkariya qertafa neyîniyê "ne" pêk tê.

**Mînak:**

Rûken neçû sînemayê.

Ez li nava bajêr negeriyam.

# WANE 8

## SIYABENDÊ SILÎVÎ Û XECÊ



...Piştî Siyabend mezin bû, dil ket Xecê, dema Xecê didin kurê Mîrê Şikaka, bi alîkariya pîrekê, Siyabend Xecê direvîne… Revand û bir serê Çiyayê Sîpanê Xelatê... Xecê rûnişt, Siyabend serê xwe danî ser çoka Xecê û raza... Di wê demê de birek pezkovî di ber wan re derbas dibin. Nêriyek, bizinê ji yên din distîne... Rewşa Xecê û Siyabend tê ber çavên Xecê û Xecê dikene, ji xwe re dibêje:

Eynî mîna Siyabendê min ê Silîvî ye.

Xwediyê tîr û kevanê zêrîn e.

Haya Siyabend ji bayê felekê qet nîne

Bizin hat ser kaniyê

Devê xwe xist kaniyê

Xecê li bizinê dinêre

Nêriyê girover bi çavê xwe dibîne

Çi qas ew nêrî li van deh nêriyan dixîne

Xecê keniya û kir qîrîn e

Siyabend bi kenê wê re

Çavên xwe vekir ji xewa şirîn e.

Rabû ser xwe dest bi kêra xwe digihîne

Dibêje:

Te nêrî ku serê min tazî ye

Tu bi keçeliya min dikeniye

Ji min re bêje rastî ye

Di dilê te de çi heye û çi nîne.

Xecê dibêje:

- Siyabend bila ez bibim bi qurbana keçeliya te,

Ji bilî muhbeta te tiştek din, di dilê min de nîne,

Bes ez ê ji te re bêjime

Min dozdeh pezkovî îro bi çavên xwe dîne,

Yek bizin bû yazdeh heb nêrî ne,

Yekî kinikî girover di nav van de bû

Şaxên wî dozdeh, şaxî ne,

Li deh nêriyan xistîne

Ji ser bizinê vedigerîne

Kenê min hat, min got:

Eynî mîna Siyabendê min ê Silîvî

Xwediyê tîr û kevanê zêrîn e.”

- Siyabend got:

Xecê ez ew qasî li dinyayê geriyame,

Min kesî fêris û pêhlewan weke xwe nedîne,

Tu nêriyê pezkoviya dikî weke min,

Tu bi çavên xwe bibîne.

Ew nêrî îşev li ku be, ez ê serê wî jê bikim,

Goştê wî ji me re bikim şîv e...



Piştî digihê pezkoviyan, nêriyê girover birîndar dike, li ber serjêkirinê, nêrî şaxê xwe lê dixe, di Çiyayê Sîpanê Xelatê de diavêje, bi serê sîxekî belalokê bi nîva tehtê ve dimîne...

Xecê lê digere wî di wê rewşê de dibîne, digirî û ban dike:

Hey lo lo Siyabendo Sibat e xweş Sibat e,

Berf li min û te, tê bi gulat e,

Di ser te re zinarekî bilind e,

Di bin te re riya karwan e,

Di bin rê de, ava Muradê, ava bi Ferat e,

Siyabendo cihê min bike, ez hatim ba te.

Siyabend:

- Hey lê lê mala bavê şewitiyê,

Xwe bikêşa gundan bigihîne.

Werîsên heft gundan li hev bicivîne.

Tu bi destê xwe, xwe bi nexweş û birîndarê mala bavê xwe bigihîne.



Siyabendê Silîvî fêris û pehlewanê dinyayê, ji binê Sîpanê Xelatê ji ser kelemê belalokê tu derîne...

Piştî werîsên heft gundan tîne weke wî gotî çêdike, nikare Siyabend rizgar bike, xwe diavêje ser laşê Siyabend û her du bi hev re ser riya karwaniyan dikevin, hîna Xecê temam nebûye... Serpêhatiya xwe ji serkarwan re dibêje û jiyana xwe ji dest dide. Karwanî jî gorên wan dikolin, navê wan ser datînin, li dora herdu goran darên spîndaran diçînin, zincîrekê bi kêla wan ve dikin, piyanekê bi zincîrê ve dikin û datînîn ser kaniyê.

## PEYV

**Muhbet:** Hezkirin

**Fêris:** Mêrxas, siwarê mêrxas

**Pehlewan:** Leheng

**Gulat:** Di mijarê de ji komikên barîna berfê re tê gotin.

## PIRS

**-** Lehengên destanê, kî ne?1

**2-** Ramana bingehîn a destanê, çi ye?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên bûyerekê yan çend bûyeran digire dest, tê de çend leheng heyî, di nava civakê de şopeke kûr hêlayî û di bin bandoriya bareyê de hatin nivîsîn re **destan** tê gotin.

Di destanê de dibe ku carinan nivîsa pexşan carinan jî di bin bandora bareyê de be. Ger hemû pexşan be taybetmendiya xwe ya destanî winda dike.

## RÊZIMAN

Kişandina lêkeran li gorî deman.

| Rader | Dema niha | Dema bê | Dema borî |
|---|---|---|---|
| xwendin | dixwîne | dê bixwîne | xwend |
| vegotin | vedibêje | dê vebêje | vegot |
| şiyarkirin | şiyar dike | dê şiyar bike | Şiyar kir |

## HÎNDARÎ

Tu jî destanekê peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse.

# HÎNDARÎ 3

# AXAFTIN

Kesê baş perwerde dîtî, zimanê wan ê axaftinê xweş e. Divê perwerdeya baş, di temenê biçûk de, ji malbat an ji dibistanê bigire, ji ber ku fêrbûn û sererastkirina ziman di temenê mezin de zor e.

Di roja me de taybetmendiya herî baş, axaftina rast û xweş e. Ji ber wê kors tên vekirin û gelek mirov ji bo şaşiyên xwe yên axaftinê rakin, tevlî van korsan dibin û di van korsan de perwerdeyê dibînin. Di serî de rêveber û mirovên kar, kesên dixwazin di karên xwe de serkeftî bin, dikin armanc ku zimanê xwe baş bi kar bînin. Di axaftin û nivîsînê de hewl didin ku zimanên wan bigihin pileyeke bijartî. Di vê riyê de hewldanan zêde dikin. Ji bo bibandor, xweş, rast û durist biaxivin.

Her sê pirsên destpêkê li gorî mijarê bibersivînin.

**1- Axaftina xweş encama çi ye?**

- Encama xebateke baş e.
- Encama perwerdeyeke baş e.
- Encama rêzdariyeke baş e.
- Encama bi pîvanbûneke baş e.

**2- Di roja me de taybetmendiya herî baş, çi ye?**

- Mêrxasî ye.
- Axaftina rast û xweş e.
- Malpeydakirin û dayîn e.
- Têkiliyên di navbera mirovan de ne.

**3- Ji bo bibandor, xweş, rast û durist biaxivin, karmend çi dikin?**

- Armanca wan, zimanê xweş û baş bi kar anîn e.
- Dikin armanc bazirganiya xwe zêde bikin.
- Siyasetê bikin.
- Hewl didin bi zimanê biyanî biaxivin.

**4- Ji nivîsên ji bo daxwaza kesan, gazinên wan an jî rewşekê ji cihê peywendîdar, radigihîne re çi tê gotin.**

- Nameya taybet
- Daxwazname

**D)** Nameya wêjeyî

**C)** Vexwendname

**5- Di navbera roj, meh û salê de, kîjan nîşane tê danîn.**

- Xal
- Xêzika axaftinê
- Xalbêhnok
- Xêzika xwehr

**6- Ji wan rêzikên tên gel hev û wateyekê bi hev re tekûz dikin re çi dibêjin?**

- Hevok
- Bend
- Mijar
- Malik

**7- Nameyên tu ji bo heval, dost, xizm û hezkiriyeke/î xwe re rêdikî, kîjan cureyê nameyê ne?**

- Nameya kar e.
- Nameya wêjeyî ye.
- Nameya taybet e.
- Daxwazname ye.

**8- Lêker li gorî çêbûna xwe dibe çend beş?**

- 2
- 3
- 4
- 5

**9- Ji peyva di hevokê de kirina kar pêk tîne re çi tê gotin?**

- Bireser
- Lêker
- Jêder
- Têrker

**10- Ji nivîsên bûyerekê yan çend bûyeran digirin dest, tê de çend leheng heyî û di bin bandoriya bareyê de mayîn re çi tê gotin?**

**A)** Roman

**B)** Serpêhatî

**C)** Destan

**D)** Axaftin

**11- Nivîsên dirêj ên ku bûyerekê yan gelek bûyeran bi hev re radigihînin û di nava wan de gelek leheng heyî re çi tê gotin?**

**A)** Nivîsên ramanî

**B)** Axaftin

**C)** Ceribandin

**D)** Roman

**12- Peyvên hemwate bigînin hev:**

| | |
|---|---|
| 1- Berz | a- Kevnxane |
| 2- Şîn | b- Xemgirtin |
| 3- Muze | c- Bilind |
| 5- Xûl | ç- Çemandî |
| 6- Şax | d- Çiya |

**13- Ji hevokên li jêr yên rast bi tîpa (R), yên şaş bi tîpa(Ş) nîşan bikin û yên şaş sererast bikin.**

1- Lêker ji raderan pêk tên û li gorî rewşê tê guhertin. ( )

2- Peyva kirina karekî dide nîşandan em ji wê peyvê re dibêjin kirde. ( )

3- Nivîsên dirêj ên ku bûyerekê yan gelek bûyeran bi hev re radigihînin û di nava wan de gelek leheng heyî re çîrok tê gotin. ( )

4- Rêzika ku li dawiya rêzikan tê dubarekirin, jê re dibêjin malik. ( )

5- Ji nivîsên ji bo daxwaza kes, kom û gazinên wan ji cihê peywendîdar radigihîne re daxwazname tê gotin. ( )

# BEŞA 4

ZIMAN Û GEL

DR. QASIMLO

DÎLBEREK MIN DÎT BI ÇAVAN

SEYDAYÊ HÊJA OSMAN SEBRÎ

COTYARÎ

HÎNDARÎ 4

# WANE 1

## ZIMAN Û GEL

Ziman diyardeyeke xwezayî ye, li ba hemî neteweyan peyda dibe, ew jî stûna herî xurt e, di bin banê mala neteweyan de, ji ber ku banê miletekî li ser sê stûnan ava dibe ziman, ax û dîrok. Dema yek ji van stûnan nebe, ew ban bi aliyekî dibe û bi taybetî Ziman ê herî sereke ye.

Dema tu bixwazî kesekî binasî, tu yê bêjî tu çi kesî û ji çi miletî yî. Dema ew bêje ez ji miletekî me, di serî de ziman tê bîra te, piştre ax û di dawiyê de jî, dîrok. Lê dema tu ji kesekî pirs nekî tu yê wî kesî nenasî, ne bi cil




û bergên wî û ne bi reng û pora wî, ew tê nasîn, tenê dema ew bipeyive, wê demê zimanê wî bala te dikişîne ku ew çi kes e. Bala xwe bidin vê helwestê bê çi qas ziman di jiyana mirovan de girîng û pêwîst e.

Bi rastî tişta herî bedew, xweşik, nazik, şirîn û xweş, ziman e. Ziman nasnameya mirovan e. Ew hebûna miletekî ye. Lewra dema dagirker dixwazin miletekî ji holê rakin di destpêkê de li tunekirina zimanê wî miletî digerin. Di dîrokê de, miletê hatî tunekirin, pêşî ew ji zimanê wî dûr kirine û hiştine ku zimanê xwe ji bîr bike, yan zimanê xwe biçûk bibîne yan jî zimanê wî pê ne xweş kirine, hiştine ew ji zimanê xwe fedî bike.




Zimanê kurdî zimanekî piralî ye û mirov dikare wî bi hemû rengan bi kar bîne.

Zimanê kurdî yek ji zimanê miletên cîhanê ye û berxwedaneke dijwar kiriye, mîna miletê kurd xwe parastiye ta xwe gihandiye vê radeyê.

Dema em zimanê kurdî bidin ber zimanên cîhanê ku îro bi rengekî çalak dijî, em ê wî weke zimanekî zengîn bibînin, ji ber ku zimanên cîhanê bi hezarê konferansan pêk anîne, lê zimanê kurdî nekariye di bin setemkariya dijminan de yek konferansê pêk bîne û kariye vê hêzê biparêze. Lewra ew weke zimanekî xurt û zengîn tê xuyakirin. Lê bi rastî zimanê bi çar zaravayan û sedê devokan dikare mîna çar zimanan were bikaranîn.

Çi qas xweş e, dema mirov bi zimanê zikmakî bipeyive, binivîse, bixwîne û bihizire. Ji ber vê yekê çi qas kesên, zana, jîr û hostayên mezin rabûne û her tim gotine: "ziman, ziman, ziman"

**PEYV**

**Diyarde:** Tişta ku heye, yan diqewime, yan jî tê kirin.

**Stûn:** Dara qayîm a di navbera ban û binê xanî de.

**PIRS**

**1-** Netewe, li ser çend stûnan ava dibe?
**2-** Mirov, bi çi tê nasîn?
**3-** Dema dagirker dixwaze miletekî tune bike, di serî de çi dike?

## CUR Û AWA

Ji agahîdayîna di mijarekê de piştgiriya nêrînekê, yan jî nivîsên bi armanca daxuyaniyekê hatine nivîsîn re **gotar** tê gotin.

## RÊZIMAN

**Hevok:** Dema ku çend bêje li gorî rêz û rêzikekê li pey hev rêz bibin û wateyekê bidin, ji vê koma bêjeyan re "hevok" tê gotin.

Di hevokê de du hêmanên bingehîn: "kirde, pêveber" û du hêmanên alîkar: "bireser û têrker" hene.

**Hêmanên hevokê:**

**1- Kirde:** Ew hêman e ku kirina karê di hevokê de digire ser xwe .

**Mînak:**

**Silava** gulan kom dike.

**Rojhatî** waneya xwe da.

**Ew** bi hevalên xwe re kar dike.

**mase** şkest.

Kêm caran be jî kirde veşartî ye, bi alîkariya qertafên kesane xwe nîşan dide.

**Mînak:**

Ji bo serbikeve dixwîne.

Helbestan dixwînim.

Kar dikî?

Ji dibistanê hatin.

Hin caran kirde ne ji tenê peyvekê, ji çend peyvan jî pêk tê.

Mînak:

**Ahîna jîr** fêrî xwendinê bûye.

**Xwendevanên Zanîngeha Rojava** di pêşbirkê de bi ser ketin.

**Birayê min ê biçûk** îro ji bajêr vegeriya.

## HÎNDARÎ

Tu jî gotarekê li ser girîngiya ziman binivîse.

# WANE 2

## DR. QASIMLO

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, di 22'yê çileya pêşîn a sala 1930'î de, li bajarê Ûrmiyeyê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li bajarê Ûrmiyeyê temam kiriye û piştre ji bo berdewamkirina xwendina xwe çûye bajarê Tehranê. Ebdulrehman Qasimlo di temenê xwe yê biçûk de pê hesiyaye ku gelê Kurdistanê di rewşeke kambax û dijwar de dijî...



Her çend Ebdulrehmanê nûgihîştî ji malbateke dewlemend û bavê wî Mihemed Axayê Wisuq yek ji dewlemend û begên herî mezin ên di herêma Ûrmiyeyê de be jî, lê wî jiyana xwe qet ji derd û xemên jiyana xelkên hejar cuda nedidît û heya ji bo mafê gel, jiyana xwe jî, ji dest da. Li ser wê helwesta kurdheziya wî, çalakiyên xwe yên siyasî ji sala 1945'an dema ku di temenê 15 saliya xwe de bû jî, damezrandina Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê li bajarê Ûrmiyeyê, da destpêkirin. Piştî ku Komara Kurdistanê, Mahabad, di 1946’an de bi hevkariya hêzên biyanî û xiyaneta Yekîtiya Sovyetan têk çû. Dr. Ebdulrehman Qasimlo bi hevkariya gelek hevalên xwe yên din, xebata xwe ya siyasî bi rengekî nepenî û berfireh dîsa da destpêkirin.

Piştre ew bû endamê fermî yê Partiya Demokratîk a Kurdistanê. Bi vî awayî, wî armanc û riya xwe ya dûr û dirêj hilbijart. Ebdulrehman Qasimlo di temenê 18 saliya xwe de ji


bo xwendina bilind diçe welatê Fransayê. Bi prensîp û şêweyê xebat û nirxandinên xwe yên siyasî û zanistî, bala her kesî dikişîne ser xwe. Dr. Qasimlo piştî pênc salan xebata li dijî emperyalîzmê careke din vedigere Komara Çîkê û di sala 1962'yan



de li zanîngeha Pragê dîplomeya doktoriya xwe ya di beşa aborî de jî, distîne. Karekî herî girîng di jiyana Dr. Qasimlo de ew bû ku ji sala 1976'an heya 1978'an di beşa ziman û bajarvaniya kurdan de, di zanîngeha Serbon li Parîsê, mijûlî dersgotinê bû. Wî bi nivîsîna babetên cur bi cur di rojname û kovarên Ewrûpî de derbarê jiyana civakî, dîrok û rewşa siyasî ya kurdan di wê demê de karî heya radeyeke dîrokî û pirsgirêka gelê kurd baştir bi raya giştî ya Ewrûpayê bide nasîn. Her ji ber van xebatên xwe Dr. Qasimlo li Ewrûpayê mîna kesayeteyeke siyasî û zana di derbarê pirsgirêka gelê kurd de dihat nasandin û dewletên Ewrûpayê di vê derbarê de dîtin û nirxandinên wî mîna Serokekî didîtin. Piştî ku di sala 1979'an de Mihemed Riza şah Pehlewî ji Îranê reviya Dr. Qasimlo vegeriya Rojhilatê Kurdistanê û xebata xwe ya siyasî bi rengekî berfireh li hemû Rojhilatê Kurdistanê, da destpêkirin. Dîsa ji bo astengiyên Komara Islamî direve û vedigere Ewrûpayê.

Roja 12 û 13'ê gulana sala 1989'an bû sêyemîn car dema ku berdevkên Komara Îslamî ji bo gotûbêjê li Viyena paytexta Awistiryayê hatibûn dîtina Dr. Qasimlo, ji nişka ve ji zimanê çekên wan xwîn peyivî û bi du guleyên ku ji demanceya yekî ji nûnerên dewleta Îranê derketî Dr. Qasimlo bi bêbextî dikujin û

tevlî karwanê nemiran dibe. Belê bi vî awayî serok û nûnerekî din ê şoreşa Kurdistanê li welatekî Ewrûpî ku her roj zêdetir ji xwarina rojane navê mirovperwerî û demokrasiyê tînin ser zimên û li ser zagonên demokrasiyê diaxivin, bû qurbaniyê protokolên aborî. Xêzana Dr. E.



Qasimlo û Partî Demokratî Kurdistan li dijî vê mirovkujiyê gilînameya xwe radestî dewleta Awistriyayê kirin û heya niha dadgeh hêjî bê sûd didome. Berhema herî navdar û girîng ê Dr. Qasimlo ku têza doktoraya wî ye. Pirtûka wî ya bi navê **" Kurd û Kurdistan "** ku bi şêweyekî akademîk û zanistî lêkolînên wî di vê pirtûkê de hatine nivîsîn. Ev pirtûk yek ji çavkaniyên herî zanistî û baş ji bo nasandina dîrok, aborî û xebata siyasî ya kurdan bi gelên cîhanê ku bi awayekî berfirehtir pirsgirêka gelê Kurdistanê binasin, nivîsîbû. Pirtûka" Kurd û Kurdistan " heya niha bi çend zimanên zindî yên cîhanê (Ingilîzî, Erebî, Farisî) hatiye wergerandin. Dr. Qasimlo bi hûrbîniyeke baş hemû aliyên pirsgirêka kurd di vê berhema xwe ya giranbuha de şîrove kirine.

## PEYV

**Nepenî:** Veşartî

**Babet :** Mijar

**Xêzan:** Malbat

**Têz:** Pile

## PIRS

**1-** Kar û xebata Dr. Qasimlo bi kurtî binivîse.

**2-** Pirtûka Dr. Qasimlo ya bi navê “Kurd û Kurdistan” li ser çi ye?

**3-** Dr. Qasimlo bi çi awayî hat şehîdxistin?

## CUR Û AWA

**Jîname**: Ew curenivîsa ku jiyana kesekî/ê bi awayekî berfireh radixe ber çavan.

**Plana jînameyê:**

**1-** Dîroka ji dayîkbûnê

**2-** Cihê ji dayîkbûnê

**3-** Rewşa tê de mezinbûyî

**4-** Erk

**5-** Taybetmendî

**6-** Xebatên hatîn kirîn

**7-** Çi bandor kiriye

**8-** Girêdayî kîjan beşa wêjeyê ye

**9-** Ger mirî be, dîrok û cihê mirinê

**10-** Piştî mirinê nivîsên ser hatîn nivîsîn

**11-** Ger wêne û nivîseke destê wan hebin, tên danîn.

## RÊZIMAN

2- **pêveber:** Di hevokê de hêmana ku karekî, bûyerekê, rewşekê radigihîne pêveber e.

Mînak:

Deriyê malê ji nişka ve **vebû**.

Dara li mala me **dinive**.

Xalê min **cotkar e**.

Bihar **demsaleke xweş e.**

Pêveber dibin du cure: Pêveberên ku bûyer û karekî nîşan didin û pêveberên ku rewş û taybetiyekê nîşan didin. Pêveberên ku kar û bûyerekê nîşan didin, bi alîkariya lêkeran pêk tên. Pêveberên ku rewş û taybetiyekê nîşan didin bi alîkariya navdêr û rengdêran pêk tên.

**Mînak:**

Bêrîvan çêlekê **didoşe**. Kar û bûyer

Xunavê gul **çandin**.

Xwîşka min **xwendekareke jîr û jêhatî ye**.

Serdar **şivan e**.

Rewş û taybetî

## HÎNDARÎ

Tu jî jînameya pakrewanekî/ê binivîse.

# WANE 3

## DÎLBEREK MIN DÎT BI ÇAVAN



| 1 | 2 |
|---|---|
| Zehmetek wan pir bi min dan, | Dîlberek min dî bi çavan, |
| Dil hedef kir, tîr li min dan. | Agirek berda hinavan. |
| Bê edet cewher bi min dan, | Şem' û rohniya zîlamê, |
| Xemzeyê pir mekr û fendan. | Zulf û xalên te temamê. |
| Lê li min berda girînê, | Şerbeta şirîn kelamê, |
| Bê sebeb ketme nivînê. | Sed şikir îro selamê. |
| Lê ji ber husna şirînê, | Şerh û teqrîra Îslamê, |
| Kanî hûrya serzemînê. | Reng û elwanê dicamê. |
| Ew bi xwe halim bibînê, | Min qebûle hikmê rindan, |
| Zulf û xalê xemrevînê. | Lê çi bêjin qewl û bendan. |

3

Zulf û xal û mest û naz e,
Gerdenê, gerden firaz e.
Cerd dikim, ehlê mecaz e,
Xef dibin estar û raz e.
Ez çib kim sewm û nemaz e,
Min di dest tembûr û saz e.
Dil ebîr û nest û mîrê,
Da li min derbek bitîrê.
Kirme heba zemherîrê,
Kanê Melayê Cizîrê.

4

Ka Xanî Şêxê beşerê,
Baba Tah'r, Elî Herîrê.
Şev dikim nalîn û zarî,
Ey Siyapûş tu xumarî.
Çend Siyapûş tu starî,
Dir û yaqûd û mirarî.
Hespê şahê şahsiwarî,
Ji işqê tu bi eh û zarî.

***Siyapûş***

## PEYV

**Şem:** Roj

**Zîlam:** Tarîtî

**Zulf:** Bisk

**Kelam:** Gotin

**Şerh:** Şîrovekirin

**Teqrîr:** Biryar

**Elwan:** Koma rengan

**Xemzê:** Navê evîndara nivîskar

**Husna:** Xweşikbûn

**Mest:** Serxweş

**Firaz:** Bilind

**Cerd:** Tor avêtin

**Mecaz:** Xaze

**Estar:** Tişta herî hatî strandin

**Raz:** Sir , xef , merez

**Sewm:** Rojî

**Nemaz:** Nimêj

**Ebîr:** Debar

**Nest:** Hest

**Heb:** Lib

**Zemherîr:** Navê beşeke dojehê ye, Sermaya zêde

**Beşer:** Mirov

**Xumarî:** Çavlixew

**Mirarî:** Micewher

**Şahsiwar:** Şahê siwar

**Hûrî:** Perî

## EM HELBESTVANÊ XWE BINASIN

Siyapûş, wêjevanekî navdar ê kurd ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Di helbest û çanda kurdî de deryayeke kûr e. Siyapûş, gelek berhemên binirx ên weke helbest di dîwana xwe de nivîsîne, jan û taybetmendiyên gelê kurd bi awayekî mecaz lorandiye û bi taybet pirtûkek bi navê "**Seyfîmilûk**" nivîsiye. Dîroka ji dayîkbûna xwe bi ebcedê wiha dibêje: ***"Bi avzêrê nivîsî xetê kufil temam ebced ji yekita ûlûfl mae'llim, dabî destê wan, lewhê sînîn. Bi carekê elîf û bêkirin telqîn."*** Yanî bi hesabê ebcedê 1205'an koçî dabaşa xwe dike.

## RASTNIVÎS

**Valahiyên di rêzikên li jêr de dagire:**

Dîlberek min dît ……,

Agirek …… hinavan.

…… .. rohniya zîlamê,

Zulf û xalên …. ……..

……. …….. kelamê,

Sed ….. ….. selamê.

## PIRS

**1- "Dîlberek min dît bi çavan",** ev berhema kîjan helbestvanî ye ?

**2-** Helbesta me ji çend malikan pêk hatiye?

## CUR Û AWA

v helbest ji ber ku tê de hem hestiyarî, hem sembol heye ji ber wê çendê helbesteke hem lîrîk e, hem jî sembolîk e.

Bareya vê helbestê tam e û li dawiya her rêzikên helbestê jî redîf hatiye bikaranîn.

Di waneyên derbasbûyî de bare weke çar beşan hatibû diyarkirin. Yek ji wan bareya lawaz e.

- Ji wekheviya tîpeke dengdar a li dawiya rêzikên helbestan ên hatin dubarekirin re **bareya lawaz** tê gotin.

**Mînak:**

Weke bibil ez işqê gul nalîn me tên xweş ji di**l**

Işqê hebîbê ez kirme zilzerd rû zeîf weke hila**l**

Siyapûş

Bareya Hevdeng:

- Dema li dawiya rêzikên helbestan ji bo ahengiyê peyveke hevdeng û wateyên wan cuda re **bareya hevdeng** tê gotin.

**Mînak:**

Ferdên ku di riya azadiyê de navêjin tu **gavan**

Bê guman dê tim û daîm ji serdestan re bibin **gavan**

# WANE 4

## SEYDAYÊ HÊJA OSMAN SEBRÎ



Rehmetî, Qenatê Kurdo pesnê Mamoste Osman Sebrî dide û wiha dibêje:

" Li paş seydayê Cegerxwîn şêrê serê çiyayên Kurdistanê yê yekemîn Osman Sebrî ye. Di rewşenbîrî û şerê xwenasîna kurdistanê de û di şerê serbestî û azadkirina kurdan de gelek roj û salên giran li pêşiya wî mêrî bûn. Lê ew di îş û karê xwe de ji riya xwe venegeriya. Wî gelek xebat ji bo serxwebûn û azadiya gelê kurd kiriye."

Seyda Osman sebrî di sala 1905’an de li gundê Narincê (Bakurê Kurdistana) ji dayîk bûye. Bavê wî serekê êla mirdesanê bû. Di sala 1915’an de bavê wî çûye ser dilovaniya Yezdan. Apê wî Şukrî ew xwedî kiriye û rê kiriye xwendinê. Wî xwendina xwe di sala 1922’yan de qedandiye. Lê weke tê zanîn ku apên wî şukrî û Nûrî ji ber têkiliyên wan ên bi şoreşa Şêx Se’îd re mîna gelek hevalên xwe hatin bidarvekirin. Bandora şoreşa Şêx Se’îd gelekî li wî kir û ew jî ket nava rojên reş û giran de. Ew tevlî hevalên xwe dibe û dikeve nava derdê neteweya xwe de. Çi bi eşkere û çi bi dizî, xebata xwe berdewam dike. Hukûmeta Roma Reş wî digire û diavêje zîndanê. Ew di zîndanê de dimîne ta sala 1928’an. Wî berdidin, lê careke din wî di sala 1929’an de didin dadgeha leşkerî. Piştî vê yekê ew di 24.09.1929’an de berê xwe dide Sûriyê. Xebata xwe ya welatparêziyê ji bo miletê xwe didomîne. Bîr û baweriya xwe ya serxwebûn û azadiya kurdistanê belav dike. Tê gotin ku Osman Sebrî 12 caran hatiye girtin û carinan jî ew sergon kirine. Ew pênc caran ketiye bin çavnêriya polîsên Sûriyeyê de. Bi gotina Nûredîn Zaza, Osman Sebrî xwendin û nivîsîna zimanê kurdî li cem Celadet Bedirxanê navdêr hîn bûye. Wî bi liv û

tevgera xwe û bi jêhatbûna xwe ev zanist di nava kurdan de belav kiriye û ji kurdan jî fêr bûye. Wî dest bi pirsên mîna dîrok, civak û siyasî kiriye û bi wan ve mijûl bûye. Wî gelek gotarên dîrokî li ser kurd û kurdistanê nivîsîne û gelek nivîsên serpêhatî
û çîrok jî nivîsîne. Wî helbest jî nîşan kiriye. Berhemên wî çi çîrok çi helbest di nava salên 1932-1945’an de di kovar û rojnameyên kurdî yên wê demê de ku Celadet Bedirxan û kamuran Bedirxan çap dikirin, hatine belavkirin.



Nivîsarên wî di Kovara Çiya de jî hatin belavkirin. Ta vê dawiyê nivîsarên wî tam nehatine çapkirin, tenê hinek ji nivîsarên wî hatine çapkirin. Ew jî ev in :

**Dîwana wî ya bi navê Apo**

**Helbestên tê de:**

- Pira gendorê
- Xweşxana çiyakî
- Cejne pîroziya welat
- Leheng
- Rewa xortan

**Wî dîroka kurd û kurdistanê di jimarên Hawarê de (28 – 29 – 30 ) belav kiriye**

**Êzdî û ola wan di Ronahî de (19 – 20 – 21)**

**Nêçîr di Ronahî de (18)**

**Nêçîra xortan di Hawar de (48)**

**Leheng serpêhatiya mêrxasên şoreşa Şêx Se’îd di çiyan de ( 3 – 4 – 5 – 6 – 7)**

**Çiyayê sasûnê Hawar (27)**

**Zîndan û nivîsandin Ronahî ( 24)**

**Li welatê çînan Ronahî ( 12)**

**Warê me ne yê Qore di Hawarê de (51)**

**Terşên şevê di Ronahî de (14)**

Bi vî rengî jiyana xwe li Sûriyeyê bajarê Şamê berdewam kiriye. Ew li Rukin aldîn maye. Di 11.01.1993’yan de li bajarê Şamê çûye ser dilovaniya Yezdan û paşê li gundê Berkevirê li goristana şehîdan hatiye veşartin.

Bi rastî piraniya helbest û hozanên wî li ser welatperwerî, yekîtî û hevkariya kurdan in. Li ser azadî, serbestî û serxwebûna kurd û kudistanê ne.

Şîret û gotinên wî di helbestên wî de tên xuyakirin.

*Ev jî helbesteke wî ye.*

***Halê welat***

Divê tu zanibî, ev bûne sê sal

Min ne dît xwîşk û bira, di mal

Ne me dît axa welat pira diyan

Ne vexwar kewsera gewrava çiyan

Dipirsî îro ji min halê welat

Dibêjim jê diçin sed agir û pêt

Çi çiya, deşt û newal rêl û zimag

Çi bajar, gund û kelat avahî pag

Heya bi dar û çiyan kuç û zinar

Bi girîn kezeb ji min anîne xwar.

## PEYV

**Hawar:** Kovareke bi zimanê kurdî li Şamê dihat weşandin di salên (1932-1943)

**Roma Reş:** Dewleta Tirk

## PIRS

**1-** Kengî Osman Sebrî ji dayîk bûye û li ku derê ?
**2-** Li gorî Nûredîn Zaza, Osman Sebrî li ber destê kê fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bûye?
**3-** Kengî berhemên Osman Sebrî hatine weşandin?

**RASTNIVÎS, HÊMADAN Û PEYVÎN**

Em çawa dikarin hevokên asayî bê ku peyva pirsyarî bi kar bînin,wê bikin hevoka pirsyarî? Bi vî rengî çend hevokên asayî vegerînin hevokên pirsyarî.

**CUR Û AWA** Mijara hatî xwendin jîname ye.

## RÊZIMAN

**3- Bireser:** Hêmana ji kirina karê kirdeyê bandor dibe, **bireser** e.

**Mînak:**

Min **genim** çand.

Tu **gulan** av didî.

Şervên me **welêt** diparêzin.

Me **al** hilda.

Hin caran bireser veşartî ye.

**Mînak:**

Min xwend.

Ew vedixwe.

Ez ê bêjim.

# WANE 5

## COTYARÎ

Dema ku cotkarek çend salan li pey hev heman zeviyê biçîne, êdî genimê wê zeviyê weke tê xwestin, çênabe. Ji ber ku di axa zeviyê de bêberhembûn çêdibe.



Her wiha tîmarên ku genim pê çêdibe, di nava axa zeviyê de kêm dibin. Ev rewş bandoreke neyînî li ser genim çêdike. Ji bo rakirina wê, pêwîst e çi bê kirin?

Di rewşeke bi vî awayî de cotkar neçar e vê zeviyê salekê bihêle neçandî. Dîsa ji bo ku tîmara windakirî careke din bi dest bixe, pêwîst e zevî were zibilkirin.

Rojekê cotkarek ji ber ku zeviya wî êdî berhem nedida, neçar dibe û ji bo kirîna genim diçe deşta Mêrdînê û rastî cotkarekî pispor tê, cotkarê pispor jê dipirse: "Ma zeviyên te nînin, tu têyî van deran genim dikirî?"



- "Hene, lê ji ber çandiniya zêde, êdî genim baş çênabe.

Ew jê re dibêje: "Here zeviya xwe bike şûv."

Piştî vegerîna malê, cotkarê belengaz dest bi hilkirina zeviya xwe dike û careke din pêwîstiya wî bi kirîna genim namîne.

Nexwe ji bo cotkarek karibe destkeftiyeke baş ji xakê bistîne, pêwîst e hem zeviya xwe bike şûv, hem jî di dema çêbûna çandiniyê de zibil bi kar bîne. Her wiha bêhnvedana zeviyan û kirêbkirina wan jî, pêwîstiyeke cotyariyê ye.

## PEYV

**Cotkar:** Kesê cot dike

**Şûv:** Zeviya hatî kêlan, lê tov lê nehatî reşandin.

**Kirêb:** Kêlana girs a zeviyê

## PIRS

**1-** Cotkarê belengaz, çima bi rexneyê re rû bi rû ma?
**2-** Çi bû sedem ku êdî zeviyê, genimekî baş nedida?
**3-** Ji bo ku cotkarek karibe destkeftiyên baş ji xakê bigire, divê çi bike?

## CUR Û AWA

Ceribandin: ew curenivîsa ku nivîskar raman û hestên xwe di derbarê mijarekê de tîne ziman bêyî ku bikeve xema nebawerkirinê yan piştrastkirina wê bi çespandinê.

## RÊZIMAN

**4- Têrker:** Têrker ji gelek aliyan ve karê ku tê kirin sergihayî (temam) dikin. Ev sergihayîkirin dibe ku ji aliyê demê, yan cih an jî rewşê ve be.

Her wekî ji ravekirinê jî diyar e, têrker di binyata xwe de hoker û daçek in.

**Mînak:**

Gundî **li dora gund** zivirîn.

Bajarî **serê sibê zû** diçin karê xwe.

Ez **gelekî** westiyam.

## HÎNDARÎ

Tu jî mijarekê li ser berhemên zeviyên herêma xwe binivîse.

# HÎNDARÎ 4

**1- Peyva ku di hevokê de kirina kar nîşan dide, kîjan e?**

**A)** Hevalkar

**B)** Lêker

**C)** Têrker

**D)** Hevalnav

**2- Navên taybet çawa tên nivîsîn?**

**A)** Bi xêzika axaftinê dest pê dike, zayenda wê bi hêmaya birînê jê tê vekirin.

**B)** Bi tîpa mezin dest pê dike û zayenda wê pê ve tê zeliqandin.

**C)** Bi tîpa biçûk dest pê dike û ji kokan pêk tê.

**D)** Bi tîpa mezin dest pê dike.

**3- Nivîsa ku nivîskar neçar e dîroka rojê binivîse, ji kîjan curenivîsê ye?**

**A)** Serpêhatî

**B)** Bîranîn

**C)** Çîrok

**D)** Rojane

**4- Ji hevokên li jêr kîjan hevok di dema niha de ye?**

**A)** Ew dê di refê de waneyê bixwîne.

**B)** Ez çûm Amedê, li bazarê geriyam û zivirîm.

**C)** Bahoz, Karwan û Derya ji daristanê zivirîn.

**D)** Şermîn wêneyan kom dike.

**5- Ji hevokên li jêr, kîjan neyînî ye?**

**A)** Ez hatim dibistanê.

**B)** Min av venexwar.

**C)** Derya Spî pir fireh e.

**D)** Heval di newalê de dimeşin.

**6- Ji wan nivîsîn û berhemên bi mebesta li ser dikê bê lîstin, hatîn amadekirin re çi tê gotin?**

**A)** Çîrok

**B)** Nutuq

**C)** Guftûgo

**D)** Şano

**7- Di nava hevoka li jêr de peyva hatî reşkirin kîjan endama hevokê ye?**

"Sorxwînê di deryayê de **li neyaran** xist."

**A)** Têrker

**B)** Bireser

**C)** Têrkera cihî

**D)** Lêker

**8- Peyvên hemwate bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| 1- Bargeh | şîretkar |
| 2- Şêwirmend | xwedîkar |
| 3- Karmend | xizanî |
| 4- Hejarî | Wargeha leşkerî |
| 5- Pesar | hurde |
| 6- Xulek | cihê kaş |

**9- Ji hevokên li jêr yên rast bi tîpa (R) û yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike û yên şaş sererast bike.**

1- Tişta nivîsa rojane ji bîranînê cuda dike, di bîranînê de diyarkirina dîroka rojê ye. ( )

2- Ez vê avê venaxwim? Hevokeke pirsiyariyê ye. ( )

3- Ger em kevanekê ji nava nivîsa xwe derxînin, ew bandorê li ser wateya bingehîn a hevokê nake. ( )

4- Di hevokên navdêrî de salox endama bingehîn e. ( )

## BELAVKIRINA WAYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Hefte / Meh | Hefteya yekem | Hefteya duyem | Hefteya sêyem | Hefteya çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Perwerdeya rast | Dara û mamoste |
| Cotmeh | Hevaltiya rast | Cotyar û zevî | Kî me ez | Mêşên hingiv |
| Mijdar | Têkiliya çandê bi ziman re | Herêmeke Kurdistanê | Welatê min | Şivanê bilûrvan |
| Berfanbar | Rexneya li ser perwerdeyê | Kelha Elodîno | Pezkoviyên ciwan | - Ez<br>- Melayê Cizîrî |
| Rêbendan | Roviyê stemkar | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | - Geliyê zîlan<br>- Dayîka min | - Gulbihar<br>Daxwazname | Dîrok û sirûd | Bilbilê dilşadî<br>- Peyama |
| Avdar | Name ji bo dayîkê<br>- Siyabendê | Til Helef<br>- Ziman Û Gel | Girîngiya Xwendinê<br>Dîlberek Min Dît | Newrozê<br>Seydayê Hêja |
| Cotan | Silîvî Û Xecê<br>- Cotyarî | -Dr.Qasımlo<br>NIRXANDIN | Bi Çavan | Osman Sebrî |
| Gulan | | | | |

# ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN
# 3

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê
Komîteya Zimanê Kurdî
ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan
ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo
dibistanan hatiye pejirandin.**

**NAVEROK**


BEŞA 1 ........ 7

GIRÎNGIYA XWENDINÊ ........ 8

BINEFŞA NARÎN ........ 11

TÊ SOTIN NAYÊ GOTIN ........ 16

SERHILDANA12'Ê ADARÊ ........ 19

MIJARA SERBEST ........ 24

GOVEND ........ 25

QEDEMXÊR ........ 29

HÎNDARÎ I ........ 30

BEŞA 2 ........ 33

EZ MAMOSTE ME ........ 34

ZEMBÎLFIROŞ ........ 38

PÊŞENGÊ SERHILDANÊN GEL ........ 42

MIJARA SERBEST ........ 46

NALÎN ........ 46

CEGERXWÎN ........ 47

HÎNDARÎ 2 ........ 53

BEŞA 3 ........ 55

KELEŞÎN ........ 56

HIZIRÎN Û BAWERKIRIN ........ 62

ROJEK JI ROJÊN BIHARÊ ........ 69

CIWAN Û PÊŞENGÎ ........ 74

ZOZANÊN FEREŞÎNÊ ........ 78

PEYAMA Ş. ZÎLAN ........ 83

HÎNDARÎ 3 ........ 89

BEŞA 4 ........ 91

**HÊVÎDARÎ....................................................................... 92**
**DOZ ................................................................................. 95**
**SINC............................................................................. 102**
**GIRÎNGIYA ZIMÊN ............................................... 105**
**29 SAL DI RIYA AZADIYÊ DE ........................... 109**
**BAZ Û ORDEK ....................................................... 113**
**BERE BIHAR BI XÊR BÊ ...................................... 116**
**HÎNDARÎ 4 ........................................................... 119**
**BEŞA 5................................................................... 121**
**SERPÊHATIYA MÛSA ENTER ............................ 122**
**PENDÊN PÊŞIYAN ................................................. 126**
**WÊJE XEMLA ZIMAN E ...................................... 129**
**NIVÎSÎN ................................................................. 131**
**HOZAN IM .............................................................. 134**
**ROJNAMEGERIYA KURDÎ ................................... 137**
**CEM BIJÎŞK............................................................ 140**
**HÎNDARÎ 5 ........................................................... 144**

# BEŞA 1

1- Girîngiya Xwendinê
2- Binefşa Narîn
3- Tê sotin nayê gotin
4- Serhildana 12ê
5- Adarê Metelok
6- Govend
7- Qedemxêr

# WANE 1

## GIRÎNGIYA XWENDINÊ



Dema ku mirov ji dayîk dibe, ne xwediyê tu zanistê ye. Mebesta xwendinê, serkeftin e. Mirov, di pêvajoya jiyana xwe de fêrî gelek tiştan dibe. Xwendin, bi qasî ku li dibistanê, di jiyanê de jî mercekî herî pêş ê serkeftinê ye. Ji bo ku em bibin xwedî çand û şaristaniyeke demokratîk, karibin ji berhemên lêkolîn û ceribandinên sedsalan sûd bigirin, pêwîst e em pir bixwînin. Divê em ne tenê pirtûkên waneyan bixwînin. Çand, kombûyîneke tevahî berhem û zanistên ku nifşên beriya me jiyane ye. Em dikarin bi riya xwendina pirtûkên wan nifşan, tevlî mirovahiyê bibin. Tiştek nikare cihê xwendinê bigire. Piştî ku mirov pirtûkek xwend û pê de, divê ji berê bêhtir tevbigere. Êdî karibe bêje hêza min a jiyanê zêde bûye. Têgeha min a jiyan û mirovahiyê baştir bûye, hizirên min pêş ketine. Wê demê, ew xwendin vala neçûye. Dema ku hûn nikaribin wan tiştan bêjin, hûn ê bibin weke kesekî pîşekar ku tu sûd ji pîşeya xwe wernegirtibe.

Dema em bê program, bi mejiyekî westayî û neşidayî dixwînin, ji wê xwendinê sûd nagirin. Belê, ger em tevahî hêza xwe nekin yek û bi hev re tevger nekin, derfetên baş ji xwendinê re çênabin. Hizireke pêşketî, dikare li ser bingehê civaka xwezayî, ramaneke nû bi me bide afirandin.

Lê belê, xwendin û perwerdeya li ser bingehê dewlet û desthilatdariyê pêk hatiye ku bandoreke neyînî çêkiriye, nakeve xizmeta civak û mirovahiyê, ev jî tê wê wateyê ku pelên pirtûkan vala hatine qulibandin û ew xwendin vala çûye.



Dema ku pirtûkeke navdar, dubare hatibe xwendin tê pejirandin. Her wiha, dema ku em li mirovekî şareza, bi baldarî guhdar bikin, weke ku pirtûkeke girîng ji me re hatibe xwendin.

## PEYV

**Mebest:** Armanc

**Çand:** Nirxên heyberî û rewanî yên civakê

**Şaristaniya demokratîk:** Hemû nirxên civaka xwezayî, bê desthilatdarî û xwe bi xwe rêvebirin.

## PIRS

- Çi girîngiya xwendinê di jiyana me de heye?
- Zanist û hêza ku me ji xwendinê girtiye, em ê çawa di xizmeta civak û neteweya xwe de bi kar bînin?
- Kêrhatinên mirovan, bi çi awayî pêş ketine?

## RASTNIVÎS

Dema di nivîsê de, hin peyvên tên nasîn, bi yek an jî bi çend tîpan tên kurtkirin, ji wan re **kurtepeyv** tê gotin.

**Mînak:**

**YPG** (Yekîneyên Partastina Gel)

**ANHA** (Ajansan Nûçeyan A Hawarê)

**Dr.** (Doktor)

**Prof.** (Profesor)

**NY** (Neteweyên Yekbûyî)

## CUR Û AWA

Di mijara girîngiya xwendinê de, nivîskar hewl dide ku girîngiya xwendina bisûd bi me bide têgihandin her wiha neyniyên xwendina bêsûd diyar bike. Ev curenivîs ceribandin e.

**Ceribandin:** Ew curenivîsa ku nivîskar raman û hestên xwe di derbarê mijarekê de tîne ziman bêyî ku bikeve xema nebawerkirinê yan piştrastkirina wê.

**Taybetmendiyên kesên ku ceribandinê dinivîsin:**

1- Divê xwedî zanisteke berfireh be.
2- Divê wêrek û xwedî bizaveke zêde be.

## HÎNDARÎ

Tu jî bi çend hevalên xwe re li ser girîngiya xwendinê û bandora wê ya li ser civakê, ceribandinekê binivîse.

# WANE 2

## BINEFŞA NARÎN



Dema ku bavê wê Faris Beg jiyana xwe li beriya Wêranşarê didomand, Derwêş Axayê 90 salî, Mîrê Êla Milan ku li herêmê dijiya, tê xwestina Narînê, bav û her sê birayên Binefşa Narîn vê rewşê napejirînin; bi nepejirandinê re biryara koçberiyê didin û ber bi jêriya Kurdistanê ve diçin. Li wê derê ji aliyê Derwêş Paşayê Mîrê Milan ve Binefşa Narîn bi zorê neçarî zewacê dikin, lê ji ber ku Binefş napejirîne, di encamê de şer derdikeve û du birayên wê tên kuştin.

Piştre, Cembeliyê Kurê Mîrê Hekariyê li hewara wan tê û wan ji vî şerî rizgar dike. Piştî demekê, Binefş bi zilamekî re dizewice û xweda kurekî dide wan, navê wî dikin Cembelî. Piştî ku Cembelî mezin dibe, berê xwe didin herêma Hekariyê û li wir dibe şivanê Cembelî Paşayê Mîrê Hekariyê. Binefşa Narîn, piştî mirina hevjînê xwe,bi Cembelî Paşayê Mîrê Hekariyan dizewice.

De lorî lorî lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî
Lê Faris Begê diçû alîkî Derwêş Begê Derwêş Begê radibû pê Faris Begê digo Derwêş Begê dilê min dibê sed carî dilê min dibê
Ez ê bidim te sed devê cotpezê sed kibêlê serê tevlê sed miyê dotinê sed ê firotinê
Her çar lawê te bizewicînim ji êlê, tu yê bidî min Binefşa Narînê, stêrka berbanga sibê Rewşa xezala, rewşa bêrîvana min tenê ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî
Lê Derwêş Begê diçû alîkî Eynê Êynê radibû pê Derwêş Begê digo lê lê Êynê dilê min dibê sed carî dilê min dibê
Hatiye mala me mêvanek ji mêvanê ebrê ne mêvanê xêrê Mêvanê şerê dibê tê sed devê cotpezê sed kibêlê serê tevlê sed mihê dotinê sed ê firotinê



Her çar lawê te bizewicînim ji êlê tu yê bidî min Binefşa Narînê stêrka berbanga sibê
Rewşa xezala, rewşa bêrîvana min, tenê ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî
Lê Êynê diçû alîkî Binefşê radibû pey dikete peşnê min anî başbazirganiyê
Salê digo lê lê dayê ez kanî me kaniya Diyarbekirê çil û çar kanî derbûne li dorê. Ez biçûk im hîna nehatime zewacê ez ê bême zewacê nastînîm zêdebî Cembelî lawê Hekerya li dunê.
Bila serê sibê hetanê êvarê cotê tajiya berde ber êzeyê cotê kewa berde ji qefesê li ser sîng û berê min rebena xwedê bike seyd û nêçîrê
Ax lorî lorî lorî lorî lorî Cembeliyê min lorî lorî

***Gelêrî***

## PEYV

**Şefeq:** Berbang

**Oba:** War

**Dîdar:** Çavpêketin, Dîmen

**Qurix:** Stêrka Gelawêj

## CUR Û AWA

1-We nivîseke destanî xwend ku tê de serboriya keçeke kurd a bi navê Binefşa Narîn hatibû şîrovekirin. Di vê destanê de mirov rewşa jiyana civakî ya kurdan a wê demê dinase.
Ji nivîsên ku bûyerekê, yan jî çend bûyeran digirin dest, tê de çend leheng hene, di nava civakê de şopeke kûr hiştine û di bin bandora bareyê de hatine nivîsîn re **destan** tê gotin.

**Destan**, berhemên çand û jiyana gelan a hevpar e. Destan, bi hêza xeyalên gel dewlemend dibe, digihêj û piştre jî ji aliyê nivîskarekê/î ve tê berhevkirin. Bi vî awayî, destanên xwezayî derdikevin holê, carinan jî hozanek li ser dihizire û dikare binivîse.

2-Destan di demên kevn de bi awayekî xwezayî ji aliyê civakê ve bi awayê stran û malik, nifş bi nifş hatiye, heya gihîştiye roja me.

## RÊZIMAN

**Daçek:** Ew cure peyv in ku ne xwedî wate ne, lê xwedî erk in.

Daçek dibin du beş:

1- Daçekên xwerû

2- Daçekên hevedudanî

**a)Daçekên xwerû yên bingehîn:** Ev daçek, ji hêmanekê û hin ji wan ji du hêmanan pêk tên (daçek, paşdaçek).

Daçekên bingehîn: Bi, li, ji, di

Bi: ... re, ve, de

Ji: ... re, ve

Di: ... de, re

Li: Bê paşdaçek e.

**Mînak:**

Ez **bi** tirimbêlê çûm gund.

Dema min tu dîtî, kes **bi** te **re** tunebû.

Canda **bi** kû **ve** diçe.

Ew **bi** aliyê me **de** hat.

Perwîn **ji** Serê Kaniyê ye.

Ez ê helbestekê **ji** te **re** bêjim.

**Ji** înê **ve** min ew nedîtiye.

**Di** wê navberê **de** hevalekî me ji ser kevir şemitî.

Zelal **di** ber min **re** borî.

Birayê min ê biçûk **li** Qamişlo ye.

**Daçekên hevedudanî:** Ev daçek ji du hêmanan pêk tên. Ji daçekên bingehîn û hokereke cihî çêdibin. Her wiha paşdaçek jî bi wan re tên.

**Mînak:**

Hin ji daçekên hevedudanî ev in: **li ser, li ber, li bin, li paş, li pêş, li dor, li cem, li hember, li rex, li nav, ji ber, di nav...**

**Li ser:** Em **li ser** bên radikevin**.**

**Li ber:** Zarok **li ber** malê dilîzin**.**

**Li bin:** Em her roj **li bin** wê darê rûdinin**.**

**Li nav:** Ez kêfxweş dibim ku **li nav** daran digerim**.**

**Li dor:** Dapîra min zarokan **li dor** xwe kom dike**.**

**Ji ber:** **Ji ber** ez hatim.

**Di nav:** Ew **di nav** malê **de** dimîne**.**

## HÎNDARÎ

Çend daçekên bingehîn û çend ên hevedudanî di hevokan de bi kar bîne.

# WANE 3

## TÊ SOTIN NAYÊ GOTIN



Tê sotin nayê gotin,

Ax! Tê sotin nayê gotin.

Şêx û axa û mela û pê re derwêş û feqîr,

Dest dirêjin, lê nabêjin, tê sotin nayê gotin.

Min ceger bûye rejî, yekcar li ser nema mejî,

Çi bikim, dewran dihêjî, tê sotin nayê gotin.

Tirk û pêxwas bûne mêrxas, girtine Şengal û Sêwas,

Em nezan bûn, guh li nan bûn**,** tê sotin nayê gotin.

Mêrg û av bûn, em li nav bûn, îro em tev jev belav bûn,

Dijmin em kuştin, neşûştin, tê sotin nayê gotin.

Ew kesê milet divîbûn, kirine qaçaxê çiya,

Got: Gidî ev bûne kafir, tê sotin nayê gotin.

*Hezîn Kurdî*

## PEYV

**Rejî:** Komir

**Qaçax:** Qedexe

**Sotin:** Şewitîn

## PIRS

**1-** Armanca helbestvan a ji rêzika; "Dest dirêjin, lê nabêjin, tê sotin nayê gotin." çi ye?

**2-** Gotina helbestvan a ku dibêje; "Em nezan bûn, guh li nan bûn, tê sotin nayê gotin." rave bike.

## CUR Û AWA

**Hûn fêr bûbûn ku helbest di nava xwe de dibin heft beş:**

**1-** Helbestên lîrîk
**2-** Helbestên destanî (epîk)
**3-** Helbestên pastoral (xwezayî, oldarî û şivanî)
**4-** Helbestên hînker (dîdaktîk)
**5-** Helbestên şanoyî (dramatîk)
**6-** Helbestên pesindanî (satirîk)
**7-** Helbestên sembolîk

Dema ku em temaşeyî helbesta li jor dikin, dibînin ku ew helbesteke **destanî ye**.

Ji ber ku mijara wê li ser şer, egîdî û welatparêziyê ye. Her wiha, bûyerên dîrokî bi kelecanekê şîrove dike. Di heman demê de ji van helbestan re **helbestên destanî** yan jî **lehengî** tê gotin.

Helbesta li jor, ji şeş malikên cotik pêk hatiye. Di her malikê

de du rêzik hene. Ji van malikan re jî, **cotik** tê gotin.

Ji wan rêzikên ku piştî her malikê tên dubarekirin re, **qulf** tê gotin.

## HÎNDARÎ

**1-** Hewl bide ku tu helbestê ji ber bikî.

# WANE 4

## SERHILDANA 12’Ê ADARÊ

Qamişlo, paytext an jî bûka Rojavayê Kurdistanê, Aramgeha Cegerxwîn, cih û warê stranên Kerebêtê Xaço, Mihemed Şêxo û Aramê Dîkran. Bajarê Qamişlo hembêza xwe ji sedan pakrewanên tevgera azadiyê re kiriye war. Her wiha, di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de jî, bejna xwe bi xwîna sedê pakrewanan xemilandiye.



Di 12’ê Adara sala 2004’an de qaşo wê lîstokvanên Qamişlo û Dêrazorê bi hev re goka piyan bilîstana. Ji ber vê yekê, di wê rojê de ne tenê ciwanên Qamişlo, ji tevahî bajarên Kantona Cizîrê, ji bo temaşekirina lîstokê piraniya wan ciwan û zarok ref bi ref dadiketin qada lîstikgehê ku temaşeyî lîstina lîstikvanên xwe bikin.

Di dema derbasbûna ciwanên kurd a lîstikgehê de polîsên li ber deriyê qadê ji bilî cil û bergan, nedihiştin ku ciwanên kurd tiştekî bi xwe re derbasî hundir bikin. Heta pênûsên di berîkên wan de jî derdixistin, weke ku bêjin " bila li te bixin û tiştekî parastinê jî, bi te re tunebe."

Lê berovajî wê, dema temaşevanên ereb ên nijadperest (şovenîst) diketin qada lîstikgehê hemû tiştên dixwestin, bi xwe re dibirin hundirê qadê û polîsên li ber derî tu rêgirî an jî astengî ji wan re çênedikirin; kevir, kêr û her tiştên ku li lîstikgehê qedexe, derbas dikirin. Ger gotin di cih de be, beriya lîstikê xwe ji pevçûn û lêxistinê re amade kiribûn.

Erê, ciwan û alîgirên tîma “CÎHAD” a Qamişlo ji bo serkeftinê, ji bo coş û xiroşdayîna lîstikvanên xwe daketibûn qada lîstinê, lê haya wan ji vê pevçûn û lîstika bipilan hatiye birêxistinkirin tunebû.



Lê dema ku lîstikê dest pê kir, hin ji wan kesên nijadperest dev avêtin nirxên kurdan û ji nişka ve bi hovane êrîşî ciwanên kurd ên di lîstikgehê de kirin. Dema ku dengvedana vê êrîşa hovane gihîşt nava gel, gel ji bo bi hewara ciwanên xwe ve werin, herikîn kolanan û derdora lîstikgehê dorpêç kirin. Bi vê re êdî hêzên rejîmê, bi awayekî eşkere alîkarî dan êrîşkarên xwe û êrîşî gelê kurd kirin. Di encama êrîşa rejîmê de heft kes şehîd ketin û bi sedan kes jî, ji berxwedêrên kurd hatin girtin û birîndar bûn. Lê nikarîbûn hêrsa gelê kurd rawestînin.

Di roja 13’ê Adara heman salê de, êdî hêrsa gelê kurd bilind bû, agirê serhildanê gihîşte tevahiya Sûriyeyê û kurd li hemû bajaran herikîn kuçe û kolanan. Ji ber vê yekê, rejîm êdî tirsiya û heta êrîşî merasîma gel a her heft pakrewanan jî kir. Lê gel li piraniya Rojavayê Kurdisanê li hemberî vê êrîşa rejîmê gav bi paş ve neavêt û dest ji berxwedana xwe berneda. Di vê berxwedanê de çend bajarên Rojavayê Kurdistanê yên weke: Efrîn, Dirbêsiyê, Amûdê, Dêrik û bi dehan gund û navçeyên din jî, ji hêzên rejîmê hatin paqijkirin.

Lê dîsa, hezar carî mixabin; serhildana 12’ê Adarê ya ku tê de 36 welatî bi destê rejîmê hatin şehîdxistin jî, mîna serhildanên

din ên kurdan, ji aliyê hin hêzên hundir ên gemar û partiyên xwefiroş û xayîn ve hat rawestandin.

Belê, rejîmê karîbû serhildanê vemirîne, lê nikarîbû bide jibîrkirin. Ji ber vê yekê, her sal ev roj ji aliyê kurdan ve bi şêweyên cur bi cur tê bibîranîn û kiryarên rêjîmê tên şermezarkirin. Heta gihîşt Şoreşa Hemdem a Rojavayê Kurdistanê; ew qada lîstikgehê ya ku kurd tê de hatibûn şehîdxistin, di 12'ê Adara 2015'an de ji aliyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ve ji nû ve bi festîvaleke sporê ya ku bi lîstika di navbera Qamişlo û Amedsporê de bi tevlîbûna hezarê kesan bi coşeke mezin bi navê stada " Şehîdên 12'ê Adarê" hat vekirin.

## PEYV

**Stadyom:** Hola lîstikê ya ku tê de cihê rûniştina temaşevanan jî heye.

**Paytext:** Serbajar

## PIRS

**1-** Çima dema ku ciwanên kurd diketin lîstikgehê, hêzên rejîmê her tişt ji wan distandin?
**2-** Di komkujiya 12'ê Adara 2004'an de çend welatî şehîd bûn?
**3-** Stadyom, kengî û bi çi awayî ji nû ve hat vekirin?

## CUR Û AWA

Di mijara 12'ê adarê de nivîskar bûyeran bi hûrbînî tîne ziman. Van agahiyan bi çespandin û nîşaneyan piştrast dike. Di despêka mijarê de agahiyên guncav ji bo derbasbûna mijarê

dide. Di pey re dikeve naverokê û baş zelal dike. Di beşa dawî de encamê bi ziraviyên wê ronî dike, ev curenivîs gotar e.

Gotar: ew curenivîsa ku nivîskar nêrînên xwe bi belge û agahiyên tekûz piştrast dike. Bi armanca têgihandineke rast li cem xwendekaran çêbibe.

Beşên wê:

- Despêk
- Naverok
- Encam

## RÊZIMAN

**Gihanek:** Ji bêjeyên ku peyv û hevokan bi hev ve girê didin û têkiliyekê dixin navbera wan re gihanek tê gotin.

**Hin ji gihanekan ev in:**

**Her wiha, lewra, ango, lê belê, ji ber vê yekê, lewma, ji ber ku…**

**Mînak:**

Li gundan karbeşî heye, **ango** her yek karekî dike.

Me civîna xwe li dar nexist, **ji ber ku** endamên me kêm

bûn. Ez ji pirtûkan hez dikim, **lewma** ez wan dixwînim.

Debara gundiyan bi ajaldariyê dibe, **ji ber vê yekê** ajal ji bo gundiyan pir girîng in.

Ez ji xwendinê hez dikim**, her wiha** ji helbestan jî hez dikim.

## HÎNDARÎ

1- Tu dikarî sergotareke cuda ji vê gotarê re peyda bikî û di lênûsa xwe de binivîsî.
2- Romaneke kurdî peyda bike, naveroka wê ji hevalên xwe re bixwîne.

## WANE 5

# MIJARA SERBEST

## METELOK

**1- Çante**

- Her roj li dibistan e, lê tiştekî nizane.

**2- Zengil**

- Hildidim digirî, datînim haş dibe.
  Hildigirim digirî, datînim nagirî.

**3- Agir**

- Tiştekî min heye çi qas bixwe, têr nabe.

**4- Pênûs**

- Mele ye mele nîne, aqilmend e, ruh tê nîne.
- Tişteke hemî di bin re diçin.
- Ximav û xar, lastîk û dar, tilî lê hewar, li kaxezê bar, tîpên yar û har, digirin rêz û tar.

**5- Pirtûk**

- Şûva spî, xeta reş.
- Wekî pirpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, ji te re heval e.

**6- Nexşe**

- Çiyayê bê kevir, deryaya bê av, daristana bê dar, bajarê bê mirov.
- Bi pişt e, bê zik e, bi dest e, lê bê ling e, bi dev e, bê diran e, bi çav e, lê nabîne.

# WANE 6

## GOVEND



Govend, berhema ceribandin û awayê jiyana mirovan a demdirêj e. Berhevbûna çandekê ye ku her dem tê domandin. Berhemên folklorî bi hevpariya mirovan a bi sedê salan bi hev re hatine afirandin, karkirin û pêşxistin; berhemên tên jiyîn û dijîn, ji civakan derbasî civakan dibin.

Dema ku em helbestekê, berikekî yan jî nîgara govendekê bigirin dest, ev nîgar ji xwezaya, mirov û encama bûyerekê derketiye holê. Derketina yekem a berik, helbest û govendekê çors in, lê piştre di encama bikaranîna zêde de zirav dibin, digihîjin û xweşik dibin.

Nîgara berikekî biçûk, xalên peykereke biçûk, dengê parçeya helbestekê û awayê dîlana govendekê ji sedê salan û vir ve bi keda milyonan kesî, weke xîza bi sedê salan di binê avê de hatiye şûştin, rast û hilûbûyî, berhemên gihaştî ne. Folklor, her çi qas berhemên neteweyî jî bin, bi heman awayî berhemeke mirovahiyê bi xwe ye jî.

Baldar bin, govendên gel çi qas herêmî jî bin, kesên dîlan dikin jî girêdayî neteweyekê ne.

Folklor, berhemên mirovan ên bi hezarê salan in. Ger niha cîhana me di nava aloziyekê de be, bi huner û mirovahiya xwe re biyanîbûnekê bijî û ber bi xerabûnekê ve biçe, yek ji sedemên

wê ew e ku nûneriya rast a wê çandê nayê kirin. Dûrketina ji vê çandê û pişta xwe dayîna wê, dûrketina ji mirovahî û xwezayê ye.

Roja ku mirov bi vê pêwîstiyê bihese, cîhana me wê bêhtir ber bi xweşiyê ve biçe.

Folklor, stûna bingehîn a civak û mirovahiyê ye.

**PEYV**

**Xerabûyî:** Têkçûyî

**Çors:** Bê teşe

**Hevpar:** Hevbeş

**Stûn:** Tîrê sereke yê di bin banê malê de.

**Folklor:** Folk = Gel, lor = zanist ⟹ Zanista gel.

**Hilûbûyî:** Şayîkbûyî

**PIRS**

**1**- Nivîskar çawa foklorê pênase dike?

**2**- Berhemên foklorî ji aliyê kê ve û çawa çêdibin?

**3**- Li gorî te ramana bingehîn a vê mijarê çi ye?

**RASTNIVÎS**

- Peyvên li jêr, bi awayekî rast binivîse û di nava hevokan de bi kar bîne: huner, berg, folklûr, govand
- Li ser nîşaneya ku li dawiya rêzika yekem a hevoka li jêr hatiye danîn, baldar bin. Ev nîşane bendik e, dema ku di rêzekê de nivîsîn tê domandin, ger bigihîje dawiya rêzikê

û peyv kêm bimîne, ji bo berdewamkirina wê peyvê, bendik tê bikaranîn, lê bendik di peyvê de kîtekirinê bi awayekî rast dibire.

**Mînak:**

Gelê kurd di pêşengiya şoreşê de têkoşîneke pir dijwar li hemberî zordariyê da.

## RÊZIMAN

### Cînavk

Ji wan peyvên ku di cihê navan de tên bikaranîn, erk û rista wan digirin ser xwe re **cînavk** tê gotin.

**Hinek cureyên cînavkan ev in:**

**1- Cînavkên Nebinavkirî**

**2- Cînavka Qertafî**

**3- Cînavkên Pirsyarî**

**1- Cînavkên Nebinavkirî:** Ev cînavk cihê tiştên nebinavkirî digirin.

Peyvên ku dibin cînavkên nebinavkirî: “kesek, yek, her kes, hin, hinek, hemû, çend, filan, bêvan, gelek ...”

**Mînak:**

**Kesek** hat.

**Hinek** çûn.

**Hin** dikin, **hin** dixwin.

Dunya ava ye, **her kes** bi aqilê xwe şa ye.

**Yek** dîn û **yek** durist.

**Gelek** ji vî gundî çûne bajêr.

## HÎNDARÎ

- Çend cureyên govenda kurdî bi nav bike.

# WANE 7

## MIJARA SERBEST

# QEDEMXÊR

Di tevgera rizgarîxwaza kurdî de, ne tenê mêran xebat û cangorîtî kirine, bi sedan jinên Kurdistanê di riya gel û welatê xwe de, eger lehengî û çelengiya wan, ji ya birayên wan zêdetir nebe, ne kêmtir e.



Qedemxêr, yek ji wan jinên kurd ên şoreşger û leheng e ku li Rojhilatê Kurdistanê, di dema Riza Şahê Îranê de, dest bi şoreşeke çekdarî kiriye. Qedemxêrê piştî ku Yusufxanê birayê wê ji aliyê Riza Şah ve hat darvekirin, ala xebat û şoreşê rakir û li herêma Hemedan û Loristanê li hemberî çewisandin û zordariyê, dest bi xebatê kir û bi dirêjahiya heft salan kariye derbeyên mezin û giran li leşkerên Îranê bide.

Piştî van serkeftinên şoreşgeran, dewleta Îranê neçar bû ku bi artêşeke giran, bi alîkariya hin serokeşîrên xwefiroş ên kurd, weke (Omerxanê Şikakî) û çend kesên din herêma şoreşê dorpêç bikin. Piştî berxwedaneke mezin a sê mehan, ji ber nemana çek û teqemeniyan, Qedemxêr û hevalên wê neçar bûn ku xwe radestî dijmin bikin.

Di encamê de Qedemxêra leheng tê girtin û rêdikin girtîgeha Tahranê û li wê derê sih sal temenê xwe yê mayî di girtîgehê de diborîne û di dawiyê de bi nexweşiya zerikê, ew jî tevlî karwanê şehîdên azadiya Kurdistanê dibe.

# HÎNDARÎ I

**WÊNE**

"Min wêneyek çêkir;

Dixwazim her dem lê bê mêzekirin.

Ez bûm dengek;

Dixwazim her dem bê bihîstin.

Ji welatê min re

Ji cîhanê re

Ji gerdûnê re"

**Her çar pirsên li jêr, li gorî helbestê bibersivîne.**

**1-** Du hestên bi giranî di helbestê de hatine destgirtin, kîjan ji yên jêr in?

- **a-** Guhdarîkirin - xemginî
- **b-** Dîtin-bihîstin
- **c-** Tamkirin - hezkirin
- **d-** Hezkirin - êş

**2- Kîjan ji hevokên li jêr, wateya "min wêneyek çêkir" herî baş dide?**

- **a-** Min ked da, vala neçû.
- **b-** Min neteweyek pêş xist.
- **c-** Min têkoşînek berhemdar da.
- **d-** Min bi têkoşîna xwe re berhemeke girîng derxist holê, divê bê dîtin.

**3- Kîjan ji yên li jêr, ne bersiva "helbestê" ye, çima dixwaze her dem li wêneya ku çêkirî, bê mêzekirin?**

- **a-** Ji ber ku wêneyeke xweş dîmen e.
- **b-** Ji ber ku di wêneyê de her kes û her tişt heye.
- **c-** Ji ber ku wêneyeke herdemî ye.
- **d-** Ji ber ku naveroka wêneyê, girêdana xwe bi her kesî re nîne.

**4- Ji bo çi peyama helbestê ji welat, cîhan û gerdûnê re ye?**

**a-** Ji ber ku pirsgireka kurd a li ser radiweste, ew qas ne berfireh e.

**b-** Ji ber ku welat, cîhan û gerdûn bê hev tên destgirtin.

**c-** Ji ber ku peyama di helbestê de welatî, cîhanî û gerdûnî ye. **d-** Ji bo her kes nehizire.

**5- Ji wê curenivîsa ku mijara xwe bi agahiyên tekûz piştrast dike re, çi tê gotin?**

a- Ceribandin
b- Gotar
c- Helbest
d- Destan

**6- Kîjan cînavka li jêr, nebinavkirî ye?**

**a-** Ez
**b-** Vê
**c-** Hinek
**d-** Me

**7- daçek dibin çend beş?**

**a-** 2
**b-** 3
**c-** 4
**d-** 5

**8- Dema kesek dest bi axaftinê bike, ji beriya axaftina wî/ê kîjan xêzika li jêr tê bikaranîn?**

**a-** Xêzika axaftinê
**b-** Xêzika navber
**c-** Xêzika xwehr
**d-** Xêzika berdewamkirinê

**9- Peyvên li jêr, bi hemwateya wan ve girê bidin:**

| | |
|---|---|
| **1-** Çand | a- Berbang |
| **2-** Şefeq | b- Ji derveyî rewşa asayî |
| **3-** Sotin | c- Nirxên heyberî û rewanî yên civakî |
| **4-** Tendurist | ç- Şewitîn |
| **5-** Awarte | d- Saxlem |
| **6-** Hovîtî | e- Dirindeyî |
| **7-** Kelecan | ê- Xuroş |
| **8-** Vejîn | f- Nûbûn |

# BEŞA 2

1- Ez mamoste me
2- Zembîlfiroş
3- Pêşengê serhildanên gel
4- Mijara serbest
5- Cegerxwîn

# WANE 1

## EZ MAMOSTE ME



Dema vê gotinê tînim ziman, wisa şanaz dibim û girîngiyê didim xwe. "Tenê hezkiriyeke we heye, yê min bi hezaran in, viyana we di hundirê yek kesî de bi tixûb e, ya min di dilên cur bi cur de ye."

Belê, min vîna xwe ji bo xwendekarên xwe kiriye beş beş. Ez di van çavên li min temaşe dikin de, hezkirinê dibînim. Ew qas kesên ku ez jê hez dikim û ez ji dil bi wan ve hatime girêdan hene ku...

Ez mamoste me,

Ez kulekan li odeyên tarî vedikim, destên zarokên xwe digirim û dibêjim: "Binêrin, ev nexşeya cîhanê ye." Ez cîhanê bi wan didim nasîn, pirtûkan didim destên wan, pirtûkan bi viyan hembêz dikin û dixwînin û dixwînin... Çavên wan pir vedibin.

Çawa dilşad dibin, çawa matmayî dibin?

Ez mezinbûna kulîlkekê ji bo wan şîrove dikim, girîngiya Têkoşîna Azadiyê ji bo wan vedibêjim. Ez mamoste me, Li pêşberî min bi hezaran zarok dixwînin û dinivîsin. Nezanînê bi

xwendinê dişikînin. Di hundirê xwe de şanaz dibim. Ez berhemê keda xwe distînim. Ji bo zêdetir bixwînin pir dixebitim. Ev bextewarî ne di qesrên mezin de, ne jî di evînên mezin de nayên dîtin.



Ez nîgarkêşek im. Cîhanê di xeyalên xwe de şîrove dikim. Ez bi zanabûn û vîna xwe girêftariyan çareser dikim.

Dema ku ez li hemberî pêşeroja civakê radiwestim, xuroş dilê min dorpêç dike. Viyan û hezkirinê dide dilê min. Zindîkirin û vejînkirina civakê, bi helwesta mamosteyan ve girêdayî ye. Ji ber ku welat xwe spartiye me. Ez ew qas şanaz û serbilind im, ji ber ku ez mamoste me.

## PEYV

**Şanaz:** Serbilind

**Girêftarî:** Pirsgirêk

**Matmayî:** Ecêbmayî, behitî

**Vejîn:** Nûbûn, nûjiyan

## CUR Û AWA

Di nivîsa we xwendî de hûn pê dihesin ku nivîskar rasterast bi we re diaxive? Nivîskar dema mijarê şîrove dike, bêyî ku bikeve kûrahiya wê, bi xwendekarê xwe re dikeve têkiliyê. Tenê ramanên xwe û tiştên li derdorê çêdibin, şîrove dike.

Di van berheman de mijar gelek caran ji bûyerên rojane, ji

cîhana huner û wêjeyê, yan jî nirx û jiyana hevbeş a mirovan, tê hilbijartin. Ji nivîsên bi vî awayî re **nivîsên civatî** (sihbetî) tê gotin.

Ev cureyê nivîsan, zêde dirêj nayên nivîsîn. Bi piranî, nivîsên civatî di rojname û kovaran de tên dîtin. Nivîsên civatî, di nava civatê de, rasterast tên têgihîştin.

## RÊZIMAN

**1- Cînavka qertafî:** Ev cînavk cihê kesê sêyem "wî, wê" digire û wekî qertaf bi dawiya lêkeran ve tê nivîsîn.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Ez çûm gund. | → Ez çûm**ê**. |
| Ew hat sînemayê. | → Ew hat**ê**. |
| Wî kevir avêt çêm. | → Wî kevir avêt**ê**. |
| Te av xist cêr. | → Te av xist**ê**. |
| Serdêr pênûs dan wê. | → Serdêr pênûs dan**ê**. |
| Ez ê vî pezî bifiroşim wî. | → Ez ê vî pezî bifiroşim**ê**. |

**2- Cînavkên pirsyarî:** Ev cînavk pirsa navdêr û cînavkên din dikin.

Cînavkên pirsyarî: "kî, kê, çi, çend, kîjan..."

**Kî/kê:** Ev cînavk pirsa navên kesan dikin. "kî" ji bo navdêr û cînavkên xwerû û "kê" jî ji bo navdêr û cînavkên tewandî.

**Mînak:**

**Kî** hat? **Ez** hatim

**Kî** ket? **Ceger** ket.

**Kê** got? **Min** got.

**Kê** anî? **Xezalê** anî.

**Kî kê** dibîne? **Ew wê** dibîne/**Viyan Zozanê** dibîne.

**Kê kî** dît? **Wê ew** dît/**Zozanê Viyan** dît.

**Çi:** Pirsa tiştan dike.

**Mînak:**

**Çi** firî? **Çûk** firî.

Te **çi** xwend? Min **rojname** xwend.

Wê **çi** vekir? Wê **derî** vekir.

**Kîjan:** Ev cînavk pirsa cînavkên şanîdanê dike.

**Mînak:**

**Kîjan** hat? **Ev** hat.

**Kîjan** dixwîne? **Ew** dixwîne.

**Kîjanî** çûk firand? **Wî** çûk firand. Tu

**kîjanê** dixwaze? Ez **vê** dixwazim.

**Kîjanan** ev kar qedand? **Van** ev kar qedand.

**Çend:** Ev cînavk pirsa cînavkên jimarîn dike.

**Mînak:**

**Çend** avjeniyê dikin? **Pênc** avjeniyê dikin.

**Çend** dibistanê ava dikin? **Sê** dibistanê ava dikin.

**Çendan** parastin kir? **Çaran** parastin kir.

**Çendan** şahî li dar xist? **Dehan** şahî li dar xist.

# WANE 2

## ZEMBÎLFIROŞ



Kuro selika vir de bîne

Mîr dixwaze te bibîne

Buha buha ji te bistîne

Lawiko ez birîndar im

Xatûna min a delal e

Min bihîştî mîr ne li mal e

Bazar’m bi malê helal e

Xatûnê ez tobedar im

Delalê ez tobedar im

Zembîlfiroş lawikê biyanî



Ez dibêjim tu pê dizanî

Min bo eşqa dil tu anî

Lawiko ez evîndar im

Xatûna min a zerîn e

Qusûr li ser te qet nîn e

Lê dilêm kesî nahebîne

Xatûnê ez tobedar im

Delalê ez tobedar im

**Melayê Bateyî**

## PEYV

**Zembîl:** **Selik, kelik**

**Bazar:** **Cihê kirîn û firotinê**

**Qusûr:** **Kêmasî**

## EM WÊJEVANÊ XWE BINASIN

Melayê Bateyî li Gundê Bateyê yê li herêma Colemêrgê di sala **1417'**an de ji dayîk bûye. Di sala **1491**'ê de koça dawî kiriye. Li gorî Aleksandir Jaba daye diyarkirin, ev destana ku me li jor daye xuyakirin, dîwaneke mezin e.

Yek ji berhemên din ên Melayê Bateyî 'Mewludname' ye ku tê de rewşa jidayîkbûna Hz. Muhemed û pîrozbûna vê rojê, bi awayekî hûnandî nivîsiye. Destnivîsa vê dîwanê bi alîkariya A. Jaba di pirtûkxaneya Lenîngiradê de tê parastin.

## PIRS

**1-** Zembîlfiroş çi kar dikir?
**2-** Kîjan helbestvanî, destana Zembîlfiroş berhev kiriye?

## RASTNIVÎS

**Cotxal: (:)**

Cotxal piştî axaftina kesekî/ê tê danîn.

**Mînak:**

Xwendekarê got**:** "Ger ez di xwendinê de bi ser nekevim, dê ji min re miroveke serkeftî neyê gotin."

## CUR Û AWA

Ev helbest; hem helbesteke **destanî** ye, ji ber ku lehengekî şîrove dike û hem jî helbesteke **pastoral** e, ji ber ku jiyana gundan, çanda çiyayan, kevneşopî û toreyên zozanan û xweşikbûna xwezayê şîrove dike.

Helbesta li jor hatiye nivîsîn bi dengên lihevhatî û bi pîvan hatiye nivîsîn.

Dema ku di dawiya helbestan de yan jî di rêzikên malikên helbestan de ahengek a deng hebe, jê re **helbestên bi bare (qafiye)** tê gotin.

Di helbestekê de ahengek a deng, yan jî bi bare hebe, ew helbest, helbestên bipîvan in.

Bare, li gorî ahengiya deng dibin çar beş:

**a- Bareya lawaz**
**b- Bareya tam**
**c- Bareya dewlemend**
d- **Bareya hevdeng**
Ev helbest, hem ji bareya tam, hem jî ji bareya dewlemend

pêk hatiye.

Bareya tam, ji ahenga du dengan a li dawiya rêzikên helbestê re **bareya tam** tê gotin.

Bareya dewlemend, ji ahenga sê deng û sê dengan zêdetir a li dawiya rêzikên helbestê re, **bareya dewlemend** tê gotin.

**HÎNDARÎ**

Tu jî parçeyekî ji helbesteke Melayê Bateyî peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse.

# WANE 3

## PÊŞENGÊ SERHILDANÊN GEL



Vedat Aydin, di sala 1953’yan de, li navçeya Bismilê ya girêdayî Amedê ji dayîk bûye. Dibistana seretayî, navîn û amedeyî li Bismilê diqedîne. Di sala 1979'an de, Enstutiya Perwerdehiyê ya Amedê (Zanîngeha Dîcle), Beşê Wêjeyî diqedîne. Ji ber hest û helwestên xwe yên neteweyî gelek caran tê girtin, binçavkirin û êşkence lê tê kirin.

Di dema derbeya leşkerî ya 12’ê Îlonê de, careke din tê girtin û di girtîgeha Amedê de, bi tevahî hovîtiya wê demê re çar salan di girtîgehê de dimîne.

Dema ku ji girtîgehê derdikeve, dibîne ku gelek tişt hatine guhertin û zanabûna gel a neteweyî gihiştiye asteke rêxistinbûyî. Her wiha, Vedat Aydin jî di heman demê de, weke pêşengê gel dikeve nava têkoşînê. Tevlî xebata avakirina 'Komela Mafên Mirovan (KMM) -Şaxê Amedê' dibe. Di heman demê de tevlî xebatên avakirina Partiya Kedê Ya Gel(HEP) jî dibe û serokatiya wê ya şaxê Amedê dike. Di 28’ê Cotmeha 1990’î de li Enqereyê di kombûna giştî ya sazkirina KMM de, ji ber ku rapora xwe bi zimanê zikmakî (kurdî) xwend, dîsa hat girtin.

Bi demê re têkoşîna gelê kurd a demokratîk pêş dikeve û bi kesên welatparêz, demokrat û şoreşger re bêhtir xwe bi tevger dike û tevlî kar û xebatan dibe. Di encama van têkîliyan de, Vedat Aydin di asteke bilind de berpirsyariyeke mezin digire ser xwe.

Dewlet û Konter-gerîla vê germbûna gel û pêşengên wê ji bo xwe tirsnak dibîne û bi ser de diçe. Di encama vê serdeçûnê de, di roja (05.07.1991) de Vedat Aydin ji aliyê polîsên sivîl ve, bi şev li mala xwe tê girtin û bi



hênceta ku navenda polîsan banî wî kiriye, dibin. Lê di rastiyê de, ew xapandin û revandinek bû, ji bo tunekirinê bû, êdî Vedat Aydin venagere malê. Piştî sê rojan (08.07.1991) li bin pira di navbera navçeya Erganî ya Amedê ûMadena Elezîzê de termê wî yê ku bi hovîtî êşkence lê hatiye kirin, tê dîtin.

Gel, sazî û derdorên kurd, ew tişt eşkere anîn ziman û gotin: "Kujer, dewlet bi xwe ye" lê dewlet li dijî vê, helwestê nîşan dide. Lê mixabin, kontra û dewletê ev bûyer ji xwe re kirin destpêka bûyerên kujerên wan nediyar. Ji wê dîrokê û pê de, her



ku çû bêhtir kesên welatparêz bi "kuştinên" kujerên wan nediyar, tune kirin. Ev tunekirin, di dema çeteya sê çengî ya Çîler-Axar-Gureş de digihîje asta herî bilind û dijwar; hejmara kesên bi vî awayî hatine kuştin, kujerên nediyar 17 hezar kes in.

Ji aliyê din ve bûyera Vedat Aydin, ji gelê kurd re jî dibe bingeh û destpêka serhildanan. Di merasîma cenazeyê têkoşerê gel Vedat Aydin de zêdeyî sed hezar kes amade dibin; bi yek deng, bi yek dil û bi yek armancê ve girêdayî, dengê xwe bilind dikin, diruşmeyên xwe diqîrin, daxwazên xwe di asteke bilind de tînin ziman. Dewlet, xwe li vê rewşê ranagire û êrîşî gel dike, çardeh kes şehîd dikevin, bi dehan birîndar, bi sedan kes jî tên girtin.

Bi kurtahî, ev bûyer û serhildan; ji bo gel û Têkoşîna Kurdan, dibe destpêkeke nû.

## PEYV

**Serhildan:** Raperîn

**Hovîtî:** Dirindeyî

**Şax:** Çiq, bask

**Tirsnak:** Xeter

## PIRS

**1-** Vedat Aydin kî ye, di kîjan salê de û li kû derê ji dayîk bûye?
**2-** Asta perwerdeya Vedat Aydin çi bû?
**3-** Vedat Aydin, çima tê girtin û êşkence lê tê kirin?

## CUR Û AWA

Ji nivîsên ku di derbarê jiyana kesekî/ê de agahiyan didin re “**jîname**” tê gotin.

**Taybetmendiyên jînameyê:**

- Cih û dîroka jidayîkbûnê,
- Mercên dema ku tê de jiyaye,
- Rewşa perwerdeyê,
- Kar û xebatên ku di nav de cih girtiye,
- Taybetmendiyên wê/î
- Koça dawî.

## RÊZIMAN

**Veqetandek:** Ji bo ku em du peyvan bi hev ve girê bidin ango peyvekê li ya din zêde bikin û têkiliyekê di navbera wan de saz bikin, pêwistiya me bi veqetandeyan heye.

Veqetandek, di nava xwe de dibin du beş**:**

## 1- Veqetandekên binavkirî:

**a** (mê û yekjimar)

**ê** (nêr û yekjimar)

**ên** (pirjimar)

**Mînak:**

Ax**a** mirov ji gulistan**a** xelkê çêritir e.

Av**a** bîrê bi tedbîrê.

Bar**ê** giran mede ser pişta hevalan.

Bay**ê** reş bay**ê** baranê ye.

Gotin**ên** pêşiyan zêr**ên** veşartî ne.

Ji zarok**ên** xwe hez bikin.

## 2- Veqetandekên Nebinavkirî:

**eke (**mê, yekjimar)

**ekî** (nêr, yekjimar)

**ine** (pirjimar)

**Mînak:**

Nazdar keç**eke** xwînşirîn e.

Met**eke** min çû Wanê.

Mihemed Şêxo hunermend**ekî** navdar e.

Cegerxwîn helbestvan**ekî** kurd e.

Zarok**ine** delal ji wir ve tên.

Di şanoyê de lîstik**ine** xweş hatin pêşkêşkirin.

# WANE 4



## MIJARA SERBEST

## NALÎN

Nalînek tê guhê min, lê winda û nihan e
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dûxan e
Barek da ser milê min, lê barekî giran e
Dabûn ser hev kulên min, hemî derd û belan e

Kurdistana delal im, her kes tê min dixwazî
Ez pir şox û şepal im, min deng daye bi nazî
Ev bûye bîst û du sal, li ser min cengebazî
Kurdo wer min bixwaze, belê bi serfirazî




Xemilandî me seranser, destgirtiya xorta me
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me
Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistana kurda me
Bê tang top û leşker, îro we ez berda me

Xortê kurdo şiyar bin, guh nedin van nemerda
Bav û kalê we rabûn, hemî mirin ji derda
Derdê li wan giranbûn, îro li me çi ser da
Ne wek bav û bira bin, yara xwe ji dest xwe berdan

***Cegerxwîn***

# WANE 5

## CEGERXWÎN



Navê Cegerxwîn Şêxmûsê kurê Hesen e. Navê dayîka wî Eyşê ye. Ew li gundê bi navê Hesarê nêzîkî Mêrdînê sala 1903'yan hatiye dinyayê. Hesar bi navçeya Kercewsê ve girêdayî ye, ew dikeve rojavayî Heskêfê. Seydayê Cegerxwîn, li derveyî welat li Siwêdê di 22'yê çêriya pêşî ya sala 1984'an de çûye ser dilovaniya Yezdan.

Bi rastî jî, navê Cegerxwîn cihekî herî girîng di pirtûka bi navê "Dîroka Toreya Zimanê Kurdî" ya Qenatê kurdo nivîsandiye de girtiye.

## Jiyana Cegerxwîn:

Cegerxwîn, di dema zaroktiya xwe de mîna gelek zarokên Kurdistanê zor û zehmetî borandiye. Ew, di dema destpêka jiyana xwe de sêwî maye û jiyana xwe bi xizanî derbas kiriye. Ew bi xwe, bê dê û bav mabû û li cem birayê xwe yê mezin dijiya, lê jinbira wî pê nedikir. Wî gelek karên zehmet derbas kirin, mîna:
şivanî, golikvanî û rêncberî jî kir û piştre jiyana xwe li cem xwîşka xwe berdewam kir. Wî li cem axa û began kar kir, gelek zehmetî jî dîtin. Cegerxwîn bi birayê xwe re ji ber seferberlîkê di sala 1914'an de derbasî Rojavayê Kurdistanê bû û li Amûdê bi cih û war bû. Li wir jî şivanî, gavanî û palehî kir, lewra dev ji malê berda û bi nav gundan ket, bi vî awayî wî bi derengî li cem meleyan dest bi xwendina olî kir. Cegerxwîn xwendina olî bi

dawî kir û gelek caran li hemberî feqeh û meleyan derdiket. Piştî demekê melatî jî kir. Lê qîma xwe neanî û dest bi gera Kurdistanê kir. Ew li her çar aliyên Kurdistanê geriya û rewşa gelê kurd baş nasî, çînên kurdan nasîn. Ol û civak ji hev derxist, êşa gelê kurd nasî û li ser her cureyên jiyanê nivîsî.



Pêşî li dijî xapandina şêx û meleyan derket û li dijî çewisandina çîna feodal jî derket û gel li dijî zordar û desthilatdaran hişyar kir. Li ser her cureyên jiyanê helbest nivîsîn. Ji ber vê yekê, ew ji lêdan û girtinê bêpar nema. Lewra neçar ma ku derbasî Libnanê bibe û piştre li wir hin pirtûkên xwe çap kirin. Lê dema şoreşa Barzanî dest pê kir, Cegerxwîn pir caran li wir bû û ta li Bexdayê jî waneyên zimanê kurdî li zankoyê da xwendekaran. Piştî vê ew careke din vegeriya Rojava. Di dema ku Mîr Celadet Bedirxan û hin rewşenbîr ji Bakur hatibûn Rojava û Komela Xweybûn ava kiribûn. Cegerxwîn jî yek ji damezrînerên vê komeleyê bû. Lê bûyerên şerê cîhanê yê duyemîn bandora xwe li Cegerxwîn kir. Wî sosyalîzim û internasyonalîzim bi hev re nasîn û gelek nivîs li ser van bûyeran dinivîsî. Wî di sala 1979'an de xwe gihand Siwêdê û li wir jiyana xwe berdewam kir, gelek berhemên xwe li wir jî çap kirin, ta ew çû ser dilovaniya xwedê.

**Berhemên Cegerxwîn :**

- Dîwana yekem. Sala 1945
- Sewra azadî. 1954
- Kî me ez. 1973
- Ronak. 1980
- Zend avêste. 1981
- Şefaq. 1982
- Hêvî. 1983

**Nivîsên din:**

- Cîm û gulperî. Çîrok 1947
- Reşoyê darî. Çîrok 1954
- Gotinên pêşiyan. 1956
- Awayê destûra zimanê kurdî. 1961
- Ferhenga kurdî cildê pêşîn. 1962
- Ferhenga kurdî cildê paşîn 1962
- Salar û Mîdiya helbesta çîrokî. 1973

**Pirtûkên Seyda yên ku piştî koça wî derketine:**

15- Tarîxa Kurdistan / Cild I-II / 1986-


87 16- Dîwana heştan a bi navê Aştî /

1986

17- Folklora kurdî / 1988

**Dema ku em li berhemên Seydayê mezin binêrin, em ê van xalan bibînin :**

a- Êşa gelê kurd dinasî.
b- Serpêhatiyên gel tanîn ziman.
c- Çanda kurdan dida pêş.
d- Li ser Kelepor û kevnetoreyên kurdan rawestiyaye.
e- Cegerxwîn li ser zimanê kurdî gelekî radiwestiya.
f- Seydayê Cegerxwîn li ser gelek babetan nivîsiye. Tore, rêziman, çîrok û bi taybetî helbestên çîrokî.



g- Li ser girîngiya xwendinê pir sekiniye.

## PEYV

**Serpêhatî:** Bûyerên bi serê mirovan hatine.

## PIRS

**1-** Cegerxwîn kengî û li ku derê ji dayîk bûye?
**2-** Cegerxwîn jiyaneke çawa derbas kir?
**3-** Hin ji berhemên Cegerxwîn binivîse?
**4-** Çend xalên girîng ji berhemên Cegerxwîn diyar bike.

## RASTNIVÎS

Kevanek: ( )

- Agahiyên ku cihgirtina wan di nav hevokê de ji sedî sed ne pêwîst e, di nav kevanekê de tên dayîn. Bi derxistina van agahiyan tiştek ji hevokê kêm nabe.

**Mînak:**

Şêxmûs Mihemed **(Cegerxwîn)**, di 22'yê çiriya pêşî ya sala 1984'an de çûye ser dilovaniya xwe.

- Hemwateya peyvên ku nayê zanîn jî di nava kevanekê de tên dayîn.

**Mînak:**

Xal(nuqte) li dawiya hevokan tê nivîsîn.

- Her wiha, di berhemên şanoyan de agahiyên di derbarê kes an jî dekorê de tên dayîn, dikevin nava kevanekê.

**Mînak:**

Serhat: **(Bi rûkenî)** banî hevalan kir.

## RÊZIMAN

**Tewang:** Bêjeyên kurmancî di axaftinê de rastî hinek guherînan tên. Ji vê guherînê re tewang tê gotin.

Ev guherîn bi du awayan pêk tê:

**1-** Bêjeyên ku ditewin hinek qertafan digirin , bi vê yekê jî zayend û mêjera wan tê diyarkirin.

**Qertafên tewangê yên binavkirî:**

(yekjimar û mê)

- (yekjimar û nêr)

an (pirjimar)

**Mînak:**

**''-ê'' (yekjimar û mê)**

**Navdêr:**

Di zivistan**ê** de berf dibare.

Nazdar**ê** giya çinî.

Ew di kargeh**ê** de dixebite.

**Cînavk:**

**wê** sêv xwar.

**Kîjanê** wane xwend?

**Vê** av vexwar.

**''-î'' (yekjimar û nêr)**

**Navdêr:**

Demhat**î** bi lehengî ev xak

parast. Serhed**î** stran digot.

**Cînavk:**

Ez **wî** dibînim.

**Vî** karê xwe kir.

**Kîjanî** got?

**''-an'' (pirjimar)**

**Navdêr:**

Gundiy**an** dibistanek ava kir.

Zarok**an** cilên nû li xwe kirin.

Şagirt**an** dibistan paqij kir.

**Cînavk:**

Ez ji **wan** hez dikim.

**Kîjanan** ev kar kir?

**Çendan** ref paqij kir?

# HÎNDARÎ 2

**1- Kîjan ji yên li jêr, şaş e?**

**a-** Ehmedê Xanî - Mem û Zîn
**b-** Mûsa Anter - Birîna Reş.
**c-** Seydayê Tîrêj – Ronak
**d-** Cegerxwîn – Kî Me Ez (Dîwana helbestan)

**2- Di kîjan hevoka li jêr de, veqetandeka nebinavkirî peyda dibe?**

**a-** Azad çû dibistanê.
**b-** Ew bi çiyê ve hilkişiya.
**c-** Wan gul av dan.
**d-** Nermînê nameyeke taybet nivîsî.

**3- Ji peyvên li jêr, kîjan bi nivîsên pexşanê ve girêdayî ye?**

**a-** Pîvan
**b-** Bend
**c-** Malik
**d-** Bare

**4- Kîjan rêzkirina endamên vê hevoka li jêr, rast e?**

"Kovanî pirtûk xwend."

**a-** Lêker, kirde, bireser
**b-** Bireser, lêker, kirde
**c-** Kirde, bireser, pêveber
**d-** Kirde, lêker, bireser

**5- Kîjan peyvên li jêr, daçekeke hevedudanî ye?**

**a-** Evîndar
**b-** Cegerxwîn
**c-** Li ser
**d-** Temaşekirin

**1- Kîjan nîşaneya li jêr, ji bo bêhnvedaneke kurt tê bikaranîn?**

**a-** Xal
**b-** Cotxal
**c-** Bêhnok
**d-** Baneşan

**8- Kîjan ji peyvên li jêr, gihanek e?**

**a-** Hilkir
**b-** Xebat
**c-** Ji
**d-** Ango

**9- Di vê hevoka li jêr de, çend şaşiyên nivîsê hene?**

**"Îro cihan pîr germ e"**

a) **5** b) **4** c) **3** d) **2**

**10- Kîjan ji pênaseyên li jêr, jînameyê dide nasîn?**

**a-** Axaftina di navbera du, yan jî çend kesan de.
**b-** Ji her alî ve danasîna jiyana kesekê/î.
**c-** Tenê ji aliyê ramyarî ve nasandina kesekê/î. **d-** Nasandina taybetmendiyên giştî yên civakekê.

**11- "Zembîlfiroş" ji nivîsa kîjan nivîskarên li jêr e?**

**a-** Melayê Bateyî
**b-** Melayê Cizirî
**c-** Cegerxwîn
**d-** Ehmedê Xanî

**12- ji hevokên li jêr, yên rast bi tîpa (R), yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike.**

-Ji lihevhatina sê dengan a li dawiya rêzikên helbestê re bareya tam tê gotin. ( )
- Min hevalê xwe dît. Tîpa ê di vê hevokê de qertafa tewangê ye. ( )
-Nivîsa ku jiyana kesan lêkolîn dikin jîname ye. ( )
-Ew peyvên ku cihê navan digirin gihanek in. ( )

**12- Hemwateya peyvên li jêr, binivîse.**

Şanaz, vejîn, hovîtî, balinde, kelecan, zembîl

# BEŞA 3

1- Keleşîn
2- Hizrîn û bawerî
3- Rojek ji rojên biharê
4- Ciwan û pêşengî
5- Zozanên fereşînê
6- Peyama Ş. Zîlan

# WANE 1

## KELEŞÎN

Di meha gulanê de me komek heval, ji bajarê Hewlêrê berê xwe da Zozanên Keleşînê yên girêdayî herêma Xinêrê. Piştî derbaskirina gelek dol û newalan em gihîştin bajarê Diyanayê. Em ji bajarê Diyanayê ber bi herêma Xinêrê ve bi rê ketin. Piştî ku em gihîştin Navtenga Sinînê, ji dûr ve Zozonên Keleşînê, di bin ewrên spî de mîna belekiyên li ser rûyê erdê hatin dîtin. Me xwe ji Navtenga Sinînê berda û li ser avên ji Zozanên Keleşînê diherikin re derbas bûn û berê me ket evraziya ku hildikişe Zozanên Keleşînê. Li kêleka rê herikîna avên ku ji bin berfê diherikin û derketina kulîlka berfîn, bala mirovan dikişand.



Her ku em ber bi Keleşînê ve diçûn û nêz dibûn, coş û xiroşa min zêde dibû. Min hîs dikir ku pileya lêdana dilê min bilind bûye û danûstandina nefesa min kêm bûye. Min ev bûyer, bi sedema hilkişîna bilindbûna çiyê ve girê dida, lê di rastiyê de ne wisa bû. Bandora xweşikbûn û heybeta Zozanên Keleşînê bû, ku li ser giyana min dikir û ez kiribûm dîlê xwe.



Ev der Keleşînê bû ku di destpêkê de çiyayekî di encama şewatekê de çêbûye, şopên şewatê li her deverê dihatin dîtin. Ev her du gol û bi dehan golên din ên ji wan biçûktir,

çavkaniyên volkanê ne ku bi demê re ji encama helîna berfê, bi avê hatine dagirtin û bûne gol.



Ji xwe Zozanên Keleşînê bi golên xwe navdar in. Di nava gel de ji vê herêmê re, Herêma Hezar Kanî jî tê gotin.

Me mêrg û avzêmên Keleşînê yek bi yek derbas kirin û em ber bi gola wê ve diçûn. Me gola yekê a herî mezin derbas kir, em ê herin li ser gola ku ji gola mezin biçûktir e. Ev gol, ji hemû golan bilindtir e û serkaniya her du golan (gola biçûk û mezin), li jorî gola biçûk derdikeve.

Gola biçûk, nêzîkî Rojhilatê Kurdistanê ye. Gol, li cihekî bilind e. Dema ku em li ser vê golê rûdinin, Zozanên Keleşînê bi hemû xweşikbûna xwe ve li ber çavên me dihatin raxistin.
Çûm li ser kevirekî jorî golê, ku serê xwe ji nava keviya berfê derxistiye, rûniştim û min li dîmenê bêdawî temaşe dikir.
Tîrêjên rojê, ji aliyê Rojhilat ve, di nava ewran re xwe berdidan li ser rûyê Keleşînê.

Bi dehan mergên wê yên li ber keviyên berfê, ji keskbûna tarî hatine xemilandin ku ji keskahiyên din cudatir bûn. Belekbûna asîman, li ser belekbûna Keleşînê xemleke bêhempa dabû çêkirin. Tav û sih, ewrên spî û şînatiya asîman, keviyên berfê û keskahî di nava hev de li ser xemla Keleşînê, belekbûneke dûrî hemû dîmenan, dîmenek dabû çêkirin. Di encama tîrêjên rojê de, li ser rûyê avê çirisandinên mîna zêr çêdibûn. Çavên min diçirisandin. Ji dûr ve, li aliyê başûr, Çiyayê Helgurt bejna xwe nîşanî min dikir. Gupika Çiyayê Helgurt, weke parêzvanekî ku serê xwe bi ser Zozanên Keleşînê ve tewandiye, dihat dîtin. Li derdorê qebqeba kewên gozel dihat...

## PEYV

**Mêrg:** Cihê keskahî û bi avî

**Avzêm:** Cihên ku av hema hema ji her deverê wê derdikeve.

**Mest:** Serxweş

## PIRS

**1-** Zozanên Keleşînê, dikevin kîjan herêma Kurdistanê?
**2-** Mebesta nivîskar a di mijarê de, çi ye?
**3-** Çima pileya lêdana dilê nivîskar, zêde dibû?

## RASTNIVÎS

**-Nivîsa li jêr, bi nîşaneyên pêwîst sererast bikin.**

Her ku em ber bi Keleşînê ve diçûn û nêz dibûn coş û xiroşa min zêde dibû Min hîs dikir ku pileya lêdana dilê min bilind bûye û danûstandina nefesa min kêm bûye

## CUR Û AWA

Ji wan nivîsên ku di ger û geştan de, li ser cihên hatine dîtin tê nivîsîn re, **geryaname** tê gotin.

Di nivîsên geryanameyan de: Aliyê taybet ên dîmenên cihê geryanê, taybetmendiyên dîrokî, jiyana mirovên li wê derê, çand û toreya wan û hwd. tên ravekirin.

Ji ber vê sedemê, nivîsên geryanameyê ji bo lêkolînên cur bi cur çavkaniyên herî binirx in.

## RÊZIMAN

**Qertafên tewangê yên nebinavkirinî:**

**ekê (yekjimar û mê)**

**ekî (yekjimar û**

**nêr) inan**

**(pirjimar). Mînak:**

**“-ekê” (yekjimar û mê)**

Ez ê xelat**ekê** ji hevala xwe re

bibim. Em li mal**ekê** bûne mêvan.

Me li dibisten**ekê** çîrok gotin.

**“-ekî” (yekjimar û nêr)**

Heval**ekî** ji min re pirtûk anî.

Mamostey**ekî** helbest ji me re gotin.

Berî niha Hunermend**ekî** behsa vê stranê kiriye.

**“-inan” (pirjimar).**

Roj**inan** kes li van deştan xuya nake.

Sal**inan** baran kêm dibare.

Car**inan** havînê jî baran dibare.

**2-** Bêjeyên nêr ên ku dengên (tîp) " a û e" di wan de hebin, bi dengê "ê" yê tên guhertin, bi vê yekî jî ditewin.

**Mînak :**

Bajar → Min gelek tişt ji bajêr anîn.

Nan→ Ew nên tîne.

Çem → Ehmed li rex çêm rûnişt.

Pez →Şivan pêz dibe çêriyê.

## - Rewşên tewandina navdêr û cînavkan:

**1- D**ema ku peyvek veqetandekê werdigire, peyva piştî wê tê tewandin.

Mînak:

Pirtûka Zîlan**ê** spî ye.

Bavê Rizgar**î** mamoste ye.

Pirtûkên Zarok**an** rengîn in.

**2-** Navdêr û Cînavkên ku piştî daçekan tên, ditewin.

**Mînak:**

Min xatir ji Nisrîn**ê** xwest.

Min ji Ehmed**î** re got.

Me li mamostey**an** guhdar kir.

**3-** Navdêr û cînavk dema ku piştî lêkerên mîna: "çûn, hatin, rahiştin, gotin, avêtin, anîn, dan..." tên, ditewin.

**Mînak:**

Şagirt çûne dibistan**ê**.

Min rahişt pirtûk**ê**.

Mamoste wane da xwendevan**an**

## HÎNDARÎ

Tu jî nivîseke weke mijara "Keleşînê" amade bike. Ji bo vê, di destpêkê de mijarê hilbijêre, piştre bi awayê nîgarî binivîse.

## WANE 2

# HIZIRÎN Û BAWERKIRIN



Mirov, giyandareke/î ku dihizire, girêdayî rastiya hebûna xwe ye. Pêdiviyê bi hizirînê dibîne, lê ji hizirînê zêde hez nake. Ji hizirînê ditirse. Çawa netirse? Hizirîn ne tenê mirovan diwestîne, mirovan şaş jî dike. Dixe nav gumanên cur bi cur. Dema ku we dest bi hizirînê kir, wisa hêsanî hûn nikarin xwe jê rizgar bikin.

Bi sedan nêrînên ne wekhev derdikevin holê. Dibe ku carinan hev du mandel bikin, lê her nêrîn aliyekî wê yê rast jî heye. Hemû jî xwe dispêrin dîtin û çavdêriyên mirovan. Kîjan aliyê wan ne rast e û çima nikarin wan di dema wê de bibînin? Tu yê kîjanê hilbijêrî? Her yek xwedî taybetmendiyên erênî û neyînî ne.

Mirov gelek caran ji hizirînê direve, lê dîsa jî dixwaze weke ku dihizire, xwe bide diyarkirin û bawer dike ku dihizire. Ji ber vê yekê, bi hin derdor û mirovan ve tê girêdan. Êdî hundirê wî aram dibe, fêrî rastî, başî û xweşikbûnê dibe û diçe. Hemû tiştên ji derveyî wan dimîne, weke: şaşî, kirêtî û xerabî bi wan ve nayê girêdan û baweriyê bi wan nake. Ger piçekî wêrek be, dê bikare bi wan re dest bi têkoşînekê jî bike. Li hemberî kesên ku ketine nava xerabî, kirêtî û şaşiyan, bê deng namîne û hewl dide wan bîne rê; ger neyên rê jî, tenê wan bîne asta çêkirinê. Bi vî awayî,

rûyê xakê ji nebaşî, nerastî, rik û nifiran tê paqijkirin!

Tê gotin ku bawermend, mirovên sazûmankar in, ji aliyekî ve rast e; dema ku bawermend belavî derdora xwe dibin, gelek kesan li xwe dicivînin. karên ku hêza gelek kesan têrê nake, ew dikarin bi hêsanî çareser bikin. Ew kesên ku dibêjin bawermend sazûmankar in, bi xwe aliyê wan ê xerabkirinê nabînin. Ji bo çareseriyê, hin kar dibin asteng. Lê ew tiştên ku ji baweriyê re astengiyê çêdikin; ji bo bawermendan bi xwe ne tiştên baş in, xerabî ne, divê neyên kirin, ger hebin, divê bi têkoşînê re ji holê bên rakirin.

## PEYV

**Kirêt:** Nespehî, nebaşî

**Nifir:** Duayên ne baş

**Giyandar:** Candar

**Mandel:** Ew tiştên ku mirov tune dihesibîne, redkirin.

**Asteng:** Kelem

## PIRS

**1-** Li gorî nivîskar, mirov giyandarine çawa ne?
**2-** Çima hin mirov, ji hizirînê ditirsin?
**3-** Di nivîsê de bandora bawermendan a çêkirin û xerabkirinê çawa tê diyarkirin?

## CUR Û AWA

**Ceribandin**: Dema ku nîvîskar, li gorî dilê xwe ji xwe re mijarekê hildibijêre û li ser vê mijarê nêrîn û ramanên xwe bêyî ku bikeve pey delîl û isbatkirinan, li gorî dilê xwe vedibêje jê re, ceribandin tê gotin.

Ji mijarên ceribandinê re bend û tixûb tune ne. Nivîskarên ceribandinê, her çi mijara dixwazin, dikarin li ser wê hest û ramanên xwe vebêjin.

## RASTNIVÎS

**Dunik: ('' '')**

Peyv û nivîsên ku ji kesek an jî ji çavkaniyekê tên girtin û di nava nivîsekê de werin bikaranîn, dikevin nava dunikê.

**Mînak:**

Xwendin ji bo mirovan girîng e û weke pêşengê şoreşê jî dibêje: ''Xwendin, ronahiya jiyanê ye.''

## RÊZIMAN

### Hevalnav (rengdêr)

hevalnav ew bêje ne ku çawanî û mêjera navdêran bi me didin nasîn.

**Hin cureyên hevalnavan:**

**1- Hevalnavên çawaniyê**
**2- Hevalnavên jimarîn**
**3- Hevalnavên pirsyariyê**

**1- Hevalnavên çawaniyê:** Ev hevalnav rewşa navdêran bi me didin nasîn.

**Mînak:**

Kurdan di Kobanê de qehremaniyeke **bêhempa** meşand.

Bi bihna **fireh** her kes digihêje mafê xwe.

Ev pirtûkeke **hêja** ye.

Dîmenên **balkêş** li vî welatî hene.

## Di hevalnavên çawaniyê de piledarî:

**a- Pileya hevrûkirinê:** Di vir de çend tişt bi hev re tên hevrûkirin. Du tişt an dê mîna hev bin an jî yek ji wan dê bi taybetiyeke xwe ji ya din kêm an zêdetir be.

**Mînak:**

Azad bi qasî Ehmed **mezin e**.

Ev zarok mîna kulîkekê **xweşik e**.

Şam şekir e, welat jê **şêrîntir e**.

Ev zebeş ji wî **sortir e**.

Havîn ji biharê **germtir e**.

**b- Pileya berztirîn:** Ev pile diyar dike ku tiştek ji hemûyan kêm an jî zêdetir e. Bi alîkariya peyva "herî yan qertafa "tirîn" pêk tê.

**Mînak:**

Dengê **herî xweş** yê vî hunermendî ye.

**Xweştirîn** deng yê vî hunermendî ye.

Ev bajarê **herî asê** ye.

**Asêtirîn** bajar ev e.

**2- Hevalnavên jimarîn:** Ev hevalnav mêjera navdêran diyar dikin.

**1) Hevalnavên jimarîn ên bingehîn**

**Mînak:**

Em li çar gundan geriyan.

Karkeran **şeş** xanî ava kirin.

**Sê** girtî hatin berdan.

Me **neh** pirtûk çap kirin.

**2)Hevalnavên jimarîn ên rêzîn**

Ev hevalnav piştî navdêran tên û rêza wan diyar dikin.

**Mînak**:

Ew di refa **yekê** (**yekemîn**) de dixwîne.

Di rûpela **çilî** (**çilemîn**) de behsa azadiyê dike.

Em di meha **şeşan** (**şeşemîn**) de çûn geştê.

Di roja **dehan** (**dehemîn**) de me karê xwe qedand.

**3- Hevalnavên pirsyariyê:** Ev hevalnav tên ber navdêran û pirsa hevalnavên din dikin. Bersiva ku tê dayîn hevalnav e.

**Hevalnavên pirsyariyê:** çawa, çend, çi qas, kîjan.

**Mînak:**

Ava kaniyê **çawa** ye? Ava kaniyê **zelal** e.

Te **çend** pênûs kirîn? Min **şeş** pênûs kirîn.

**Çi qas** berf bariya? **Piçek** berf bariya.

**Kîjan** xwendekarî xelat wergirt? **Vî** xwendekarî xelat wergirt.

Her wekî diyar e, hevalnava "**çend**" ji bo tiştên ku tên jimartin tê bikaranîn; hevalnava "**çi qa**s" ji bo tiştên nayên jimartin, lê xwedî tibabekê ne tê bikaranîn.

**Hoker:** Bêjeyên ku lêkeran ji aliyê dem, cih, bergeh, rewş, sedem, rêje û hejmarê ve diyar dikin "hoker" in.

## Cureyên hokeran

1- **Hokerên çawaniyê (rewşê)**
2- **Hokerên demê**
3- **Hokerên cih û berekê**
4- **Hokerên çendanî û hevrûkirinê (mêjerî)**

**1- Hokerên çawaniyê (rewşê):** Ev hoker rewş û çawaniya karê ku tê kirin nîşan didin. Dema ku mirov pirsa "çawa" ji pêveberê bike, dê hevalkarên çawaniyê bên bidestxistin.

**Mînak:**

Ew karê xwe **bi rêk û pêk** dike.

Mirovan **bi xweşî** bide têgihiştin.

Me **bi lehengî** li ber xwe da.

Kevok **bilind** firiya.

**2- Hokerên Demê:** Ev cure hoker dema karê ku tê kirin diyar dikin. Dema ku mirov pirsa " kengî, heta kengî, ji kengî ve..." ji pêveberê bike, dê hokerên demê bên bidestxistin.

**Hinek hokerên demê:** duh, pêr, niha, îro, îsal, îşev, sibe, par, piştî nîvro, êvarkî, berêvarkî...

**Mînak:**

Me **duh** serdana hevalên xwe kir.

Em ê **îro** cejna zimên pîroz bikin.

**Piştî nîvro** civîneke me heye.

Ez ê **berêvarkî** spartekên xwe çêkim.

**3- Hokerên cih û berekê (aliyan):** Ev cure hoker cih û bereka karê ku tê kirin, nîşan dide.

**Hinek hokerên cih û berekê:** derve, xwarê, hundir, bi şûn ve, bi wir de, li jor, başûr, bakur... Her wiha hemû navên cihan dibin hoker.

**Mînak:**

Mamoste **ji dibistanê** hat.

Ew derket **derve.**

Zarok **li jor** dilîzin.

Ew her tim **li pêş** dimeşe.

Serdar **li rojavayê welêt** dimîne.

**4- Hokerên çendanî û hevrûkirinê (mêjerî):** Ev hoker mêjer, rêje û radeya karê ku tê kirin, nîşan didin.

**Hin hevalkarên çendaniyê:** kêm, zêde, pir, gelekî, hinekî, piçekî...

**Mînak:**

Ew **kêm** kar dike.

Delîl **pir** dixebite.

Ez **gelekî** li nûçeyan temaşe dikim.

Li vî bajarî berf **zêde** dibare.

# WANE 3

## ROJEK JI ROJÊN BIHARÊ



Me sibehê zû xwe amade kir, pêdiviyên xwe kirîn û bi sê tirimbêlan berê xwe da Siwêdîkê. Em û hevalên xwe yên ereb û suryan bûn, vê jî rengekî bi xeml û xweşikbûneke cuda da seyrana me. Di serê sibehê de me bi kêf û şahî berê xwe da cihê geşt û seyranê. Me digot qey rojeke biewr û ne xweş e, lê wê rojê em hemû mîna malbatekê bi kêf û şahî ketin ser rê

- bi coşeke mezin meşiyan, her kesî xwe berpirsyar didît, ma çi rojeke xweş bi xweza û pêkhateyên xwe bi aheng û stranan, bi liv û tevgera xwe ber bi kaşê Siwêdîkê ve xwe berdan xwarê, daketin ber keviya çem
- nêzîkî kaniyê. Her yekî, bi dilşadî rahişt tiştên xwarinê
- bi rêzê ketin pey hev.

Xweza bi me re dikenî, dengê avê dihat guhên me, bêhna biharê li pozê me dixist. Bi vî awayî, em gihan ber avê, hinek derbas bûn, lê hinek bi zorê, di vê navberê de hevaleke me ji ser kevir şemitî û ket nav avê, tev şil bû. Heval tev keniyan gotin: "te masiyek ji xwe re girt." Bi vî awayî, me xwe gihand cihê seyranê. Hevalan weke mîroyan her yekî ji aliyekî ve dest bi amadekariyên firavînê kirin; hinekan bi gokê dilîstin û hinekan dar kom dikirin û dest bi biraştina goşt kirin. Tişta xweş; wêne girtin, dîlan gerandin, ango hemû bi dilekî paqij tev digeriyan ta ku firavîn amade bû û me tevan bi hev re dest bi xwarina firavînê kir.



Hinek keç û xortan berê xwe dan ser avê, da ku firaxan bişon, lê ya xweş ew bû ku hinekan av bi serê hev de kirin û şil bûn. Piştî vê jî, em ketin tirimbêlên xwe û me berê xwe da Goristana Şehîd Xebat Dêrik, li wir jî careke din me Şehîd bi bîr anîn. Piştre me berê xwe da Pira Bafê ya li Endîwerê, em li wir jî gelekî kêfxweş bûn û di dawiyê de jî piştî girtina wêneyan me berê xwe da Kaniya Xeyda, em li



dora kaniyê rûniştin û me fêkiyên mayî jî li ser kaniyê xwarin. Erê, em pir westiyan, lê bi rastî jî rojeke xweş, dilşa, hestiyar û tijî hezkirin bû.

## PEYV

**Siwêdîk:** Gundekî bi av û dar ê herêma Dêrikê ye.

**Pira Bafê :** Pireke kevnar a Cîzira Botan.

## PIRS

**1-** Nivîskar û hevalên xwe seyrana xwe li kû derê qedandin?
**2-** Çima firavîna wan zû amede bû?
**3-** Çima pêwîstiya mirovan bi seyranê heye?

## RÊZIMAN

**Lêker:** Ew cure bêje ye ku bi mebesta pêkanîna ahenga bi kirdeyê re li gorî dem, rawe, avanî û rewşê tê kişandin.

**Taybetmendiyên lêkeran:**

**Rader (jêder):** Rader awayê bingehîn ê lêkeran e, lêker di vê rewşê de li gorî tu dem û raweyan nehatiye kişandin.

anîn, axaftin, bihîstin, bijartin, givaştin, hejmartin, nivistin, sotin...

**Lêker li gorî çêbûna xwe dibin sê beş:**

**1- Lêkerên Xwerû:** Ew lêkerên ku ji peyveke xwerû pêk tên.

**Mînak:**

anîn, avêtin, hatin, firotin, girtin, dan, bûn, guhastin, xwendin, xwestin...

**2- lêkerên Pêkhatî:** Ew lêker in ku bi alîkariya qertafên lêkersaz tên bidestxistin.

**Mînak:**

**a- Pêşgir:**

| **Pêşgirên lêkersaz** | **Lêkerên xwerû** | **Lêkerên pêkhatî** |
|---|---|---|
| da- | Xistin, girtin | Daxistin, dagirtin |
| çê- | Bûn, kirin | Çêbûn, çêkirin |
| hil- | Kirin, kişîn | Hilkirin, hilkişîn |
| ra- | Ketin, bûn | Raketin, rabûn |
| rû- | Dan, niştin | Rûdan, rûniştin |
| ve- | Dan, gotin | Vedan, vegotin |
| wer- | Girtin, kirin | Wergirtin, werkirin |

**b- Paşgirên lêkersaz:**

| **Nav** | **Paşgirên lêkersaz** | **Lêkerên pêkhatî** |
|---|---|---|
| Bar | -în/-andin | Barîn, barandin |
| Fir | -în/-andin | Firîn, firandin |
| Bez | -în/-andin | Bezîn, bezandin |
| Ken | -în/-andin | Kenîn, kenandin |
| Meş | -în/-andin | Meşîn, meşandin |
| Rev | -în/-andin | Revîn, revandin |

**3- Lêkerên Hevedudanî:** Ew lêker in ku ji du peyvên watedar pêk tên.

**Mînak:**

bawerkirin, başbûn, hûrkirin, dilman, balkêşan, biryardan...

## HÎNDARÎ

Tu jî mijarekê li ser seyraneke tu beşdarbûyî binivîse.

# WANE 4

## CIWAN Û PÊŞENGÎ



Di temenê mirov de pêvajoya herî girîng, pêvajoya ciwaniyê ye. Mirov di ciwaniya xwe de, di bihara temenê xwe de; germ, bihêz û baldar e, dixwaze her tiştî bizane û bike. Di heman demê de ji nûbûn, guhertin û pêşketinan re vekirî ye. Her tim di nav lêgerînan de ye; li pey azadî, aştî û wekheviyê ye. Zordarî, çewisandin û bêdadiyê qet napejirîne. Hêza civakê ya nûbûn û nûkirinê, her wiha, hêza şoreşê ye. Ji ber vê yekê, ciwanî pêşengî ye.

Ciwan, pêşeroja civakê ne. Ciwan her tiştî bi riya perwerdeyê fêr dibin û bingeha civakê ya pêşerojê, ji nû ve ava dikin.

Di pêvajoya şoreşê de ciwan dikarin risteke girîngtir û mezintir bilîzin.



Ji ber vê yekê, divê ciwan bi zanebûn û berpirsiyarî nêzî pêvajo û nirxên şoreşê bibin û bêguman, bê navber, bêyî ku bikevin nava ezeziyekê, nava hizir û hesabên teng, pêwîst e bi cangorî û lehengî têbikoşin.

Ciwan, pêwîst e pêvajoyê baş têbigihêjin û bi her kesî jî bidin têgihandin. Belê, erkeke wan a wiha jî heye û girîng e.

Ciwan, ji ber van sedeman di jiyanê de xwedî cihekî girîng in, erkên mezin li ser milên wan e. Bi van pêkanînan re rista xwe ya pêşengiyê dilîzin.

## PEYV

**Pêvajo:** Qonax

**Ezezî:** Kesê ku ji bo berjewendiyên xwe dijî**,** Xweperestî

**Seranser:** Tevahî

## PIRS

**1-** Çima ciwanî pêvajoya herî girîng a temenê mirov e?

**2-** Taybetmendiyên ciwaniyê yên herî girîng çi ne?

**3-** Çima ciwan pêşeroja civakê ne?

## RASTNIVÎS

**Xêzika axaftinê: (-)**

Ji bo diyarkirina destpêka axaftinê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Wî got:

``Şoreşa Rojava, şoreşa Kurdistanê ye``

## CUR Û AWA

Nivîsên weke; nivîsîna rojname û kovar, cureyeke nivîsên ku mijarekê pêşkêş dike, wê diparêze, bi awayekî zelal û jidil tîne ziman, lê ji xwendevanên xwe re naçespîne (îsbat nake), jê re **nivîsên ramanî** tê gotin.

**Di vê nivîsînê de ev taybetmendî hene:**

**a-** Bi şêweyê pexşan hatiye nivîsîn.
**b-** Nivîskar, li ser ciwaniyê; hizr û ramanên xwe bi zimanekî zelal vegotiye, ji bo pejirandina hizrên xwe serî li tu belge û tiştekî wiha nedaye.
**c-** Têgihandineke gelekî zelal û jidil e.

## RÊZIMAN

### Dema Niha:

Ji kar û bûyerên ku di dema têdeyî tên kirin re **dema niha** tê gotin.

Di zimanê kurdî de, dema ku qertafa dema niha "**di**" û qertafa kesane li ser rayeka dema niha bên zêdekirin, lêkera dema niha saz dibe.

| Rader | Qertafa dema niha | Rayek | Qertafa kesane | Lêkera dema niha |
|---|---|---|---|---|
| Xwendin | Di | xwîn | İm | Dixwînim |
| Nivîsîn | Di | Nivîs | Î | Dinivîsî |
| Lîstin | Di | Lîz | E | Dilîze |

**Mînak:**

Zarok li televîzyonê temaşe **dikin.**

Ez pirtûkê **dixwînim**.

**Neyîniya dema niha** "**na**"

**Mînak:**

Zarok li nav zeviyan **na**gerin.

Ew derî ve**na**ke.

**Neyîniya hin lêkerên awarte** "**ni**"

**Mînak:**

Ez **ni**karim li vir bijîm.

Ew **ni**zane li tembûrê bide.

## HÎNDARÎ

1- Tu jî mijarekê li ser girîngiya ciwaniyê binivîse.

**WANE 5**

## ZOZANÊN FEREŞÎNÊ

Fereşîn, li herêma Botanê nêzîkî navçeya Elkê cih digire. Fereşîn nêzî 1000-1500 metreyan ji gund bilindtir e. Ji ber vê yekê, gelekî biberf e. Jixwe ji cihên hênik re zozan tê gotin. Zozanên Fereşînê bi mêrg, çêrgeh, kanî, gul, giya û biyîka xwe navdar in. Ji ber vê taybetmendiya xwe, bûye bihuşta mirovên ku terşdariyê dikin. Li herêmê cihê her gund, bavik, eşîr yê zom, koz û çêrgehên diyar heye. Kes naçe, cihê kesî.

Di van zozanan de bi qasî 3-4 mehan dimînin. Lê belê, ew hemû tişt û lîstikên me li gund dikirin, li zozanan bi coş û xiroştir in.



Bi taybetî, dema ku berxbir dihatin û kulav çêdikirin, coş û xiroşa herî mezin jî li serborê bû. Dema ku em li gel bêrîvanan diçûn bêriyê, me kulîlkên cur bi cur berhev dikirin û li ber bêriyê nan û şîr dixwar. Jixwe kêfxweşiya zozanan, yek jî lîstok û stranên şivan û bêrivanan e. Li her zomeke zozaniyan, keriyekî pez hebû. Çend şivanên vî keriyê pez, serşivanek hebû.

Weke helbesta:

Lo şivano lo şivano,
Lo şivano dilkovano,
Dil ranabe ji ber xemano,
Ser ranabe ji ber xemano,
Ji ber xema bavo birano.
Navê şivanî mîrmişk e,



Hoy delalê malê mîrmişk e,
Keryok berdan dola hişk e,
Pezgok berdan dola hişk e,
Ya li serbêrê pir xweşik e,
Ya li bin bêrê gevyok rişk e.

Giyana me di van mêrg û geştgehan de, li ser zozanên çiyayên bilind, li rex van latên tirsnak, li ser van riyên kaş û tirsnak, ji ber dengê lawirên cur bi cur, bi coş û xiroş dibû. Ji bo lîstokên me, ev gir û banî, holên herî xweş û baş bûn. Li van deveran bezîn, derketin, hilkişîn, li ser dev xişikandin û li ser pehniya ling xişikîn, bi xiroş dibûn. Dema ku em ji van ger û lîstokan diwestiyan, me devê xwe dixist binê keviyên berfê, ava berfê vedixwar û lingên xwe dixistin nav kaniyên sar, ew jî yek ji wan lîstokên me ya ku her roj dihat dubarekirin bû.

Tenê şevên zozanan zor û sar bûn. Ji ber vê yekê, her kes li ber agirê sergînan rûdinişt. Ji gefên xwezayê, tarîbûna şevê zêde dibû; li derdorê dengekî herî biçûk weke destpêka bûyerekê

dihat pejirandin. Çend caran, min dîtiye ku guran êrîşî zomê kirine û gelek caran li perê zomê, dengê hirçan hatiye bihîstin.

Di van zomên zozaniyan de gelek rojên weke: cejn, sersal, Çarşema Sor, berxbirîn û hwd. hene. Di wan mêrgên fireh de, gel kincên xwe yên xweşik û rengereng li xwe dikirin û li derdora mêrgê diciviyan. Jixwe herî zêde di wan deman de çand û kevneşopiyên civakê diyar dibûn.

Li aliyekî xwarinên gelêrî, li aliyê din jî pêşbirk û lîstokên ciwanan, li aliyekî berxbir û li aliyê din jî hevkariya civakê ya bi hev re, coş û xiroşeke cuda bi mirovan re çêdikir.

Her sê mehên havînê mîna xewn û xeyalekê di nava coş, xiroş û şahiyan de, weke bahozê, bêyî ku mirov pê bihise derbas dibûn.

**Çanda Gel**

## PEYV

**Terşdarî :** Lawirvanî

**Serborê:** Dema ku kulav hîn rewşa xwe ya kulavî nestandiye
- di awênê kulav de li nexşên xwe, li ser paçekî hatiye raxistin
- piştre hatiye pêçan, ji wê pêçanê re tê gotin.

**Sergîn:** Kopilên lawirên mezin.

**Gef :** Tehdît, tirsandin

**Biyîk:** Cureyek giya ye.

## PIRS

**1-** Taybetmendiyên sereke yên jiyana zozanan çi ne?
**2-** Lîstok û xweşiyên zozanan çi ne?

## CUR Û AWA

Nivîskar bîranên xwe yên bi zozanên fereşînê tîne ziman. Hem şivantî û şêwazê jiyanê û hem lîstok û xweşiyên zaroktiyê vedibêje.

Dema ku nivîskar bûyerek jiya be, tiştek ser wî re derbas bûbe, an jî bi xwe dîtibe, li gel zanîn, hest û çavdêriyên xwe şîrove dike, ji vê curenivîsê re, **bîranîn** tê gotin.

## RÊZIMAN

**Dema bê:** Ev dem ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn.

Awayê pêkanîna vê demê: Amraza dema bê "dê" û "ê"yê+qertafa "bi"yê+rayeka dema niha ya lêkeran+qertafên kesane.

| Lêker | kirde | Amraza dema bê | Pêşgir | qertafa mercû daxwaziyê | Rayeka dema niha | Qertafa kesane | Hevok |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Kirîn** | Ez | ê | | Bi | kir | im | Ez ê bikirim |
| **ketin** | Ew | ê | | Bi | kev | e | Ew ê bikeve |
| **vekirin** | Em | ê | ve | | k | in | Em ê vekin |
| **Rabûn** | Egîd | dê | ra | | b | e | Egîd dê rabe |

**Mînak:**

Ez **ê bi**bînim.

Ew **ê** vexwin.

Dilgeş **dê** şiyar **bi**be.

Baran **dê** bibare.

**Têbînî:** Her wekî ji mînakan diyar e, qertafa merc û daxwaziyê "bi"di lêkerên pêkhatî yên bi pêşgir de ji holê radibe.

**Di dema bê de neyînî:**

Qertafa neyîniyê ya dema bê "ne" ye. Di lêkerên pêkhatî de dikeve navbera pêşgirê û rayekê.

**Mînak:**

- Ew ê ra**ne**keve.
- Canda dê **ne**çe.

## HÎNDARÎ

**1-** Tu jî li ser zozanan mijareke kurt binivîse.

# WANE 6

## PEYAMA Ş. ZÎLAN



Di dîroka her gelî de bûyerên girîng ên ku çarenûsa wî gelî diguherîne, hene. Weke: Şoreşa Firansa, Şoreşa Bolşewîk, Şoreşa Îslamê ku bandoreke mezin li dîroka wan gelan kiribûn. Her wiha, bûyerên ku karîne, bandorê li ser dîroka tevahiya mirovahiyê bikin jî hene.

Di dîroka her gelî de rêber û pêşengên ku muhra xwe li dîrokê dane, derketine. Îskenderê Makedonî, Hz. Mihemed, Lenîn û hwd. van karîne, bi hizir û bîrdoziya xwe, hem di dîroka gelê xwe, hem jî dîroka mirovahiyê de pêvejoyên girîng û mezin afirandine.

Dema ku em li dîroka Kurdistanê dinêrin, tê dîtin ku dîroka kurdan, her tim berovajî hatiye nivîsîn. Dîroka kurdan, dîroka serejêrçûyî bû. Mirovên kurd ku di dema civaka xwezayî û koledariyê de, di qada dîrokê de xwediyê rewşeke girîng bûn, di nava gelan de jî xwedî bandoreke mezin bûn. Piştî ku dikevin bin desthilatdariya persan, azadiya xwe winda dikin û êdî nikarin careke din vîna xwe ji bin bandora wan rizgar bikin. Gelê kurd, bi hezarê salan di bin desthilatdariyên cur bi cur de jiyaye û welatê wan, Kurdistan jî her dem di navbera wan desthilatdaran de bûye qada şer. Dema ku neteweyan kêm zêde li gorî rewşa xwe pêşketinên dîrokî dijiyan, gelê kurd di dîroka xwe de ji ber zextên desthilatdaran paş ve mabû. Ji bo azadiya welatê xwe, gelek caran serê xwe hildaye, lê ji ber ku ne xwediyê rêbereke/î şayan bû, nekariye serkeftinê bi dest bixe.

Nekariye pêşî li xiyaneta navxweyî bigire û ne jî kariye rêxistinekê biafirîne û serhildanan bi encam bike. Di dîroka me ya nêzîk de valaderketina serhildana Şêx Se'îd û ya Dêrsimê jî

mînakên vê yên herî balkêş in.

Konevaniya deshilatdaran "parçe bike, ji hev belav bike û bi rê ve bibe." Şerê taybet, bi rêbazekî pir qirêj li ser gelê me dihat pêkanîn û bi “tevkujiya spî” ber bi tunekirinê ve dibirin.

Berxwedan û xiyanet her tim di nava hev de jiyane, xiyaneta navxweyî her dem li pêşiya berxwedaniyê bûye asteng û piranî jî encam girtiye.

Pêwîst e em bibin keleporê dîrokê û daxwazên demê pêk bînin; dem dixwaze ku em çalakiyên cangorî pêk bînin. Ew ji bo me, wê bibe bûyereke dîrokî û bandoreke neyînî li moralê dijmin bike.

Daxwaza min, ji bo berdewamkirina jiyaneke mezin e. Ez dixwazim bibim xwediya jiyaneke watedar û çalakiyeke mezin; ji ber ku ez ji mirovan û jiyanê gelekî hez dikim. lewra, dixwazim vê çalakiyê pêk bînim.

Bangewaziya min ji bo cîhanê ye; pêwîst e dengê min bibihîzin û mezinahiya têkoşîna me bibînin û bipejirînin.

Gelê min ê welatparêz!

Divê hûn bi her awayî erkên xwe yên welatparêziyê pêk bînin, xwedî li Rêber, têkoşîn û nirxên xwe yên neteweyî derkevin. Ji ber vê yekê, pêwîst e hûn xwe birêxistin bikin, bibin yek û di nava xwe de zelal bin.

Ma ji bilî van qeyd û bendên di destên me de, tiştekî din heye ku em winda bikin!

***Zîlan (Zeyneb Kinaci)***

## PEYV

**Çarenûs:** Qeder

**Konevanî:** Siyasî

**Serejêr:** Berjêr

**Cangorî:** Giyanbaz, Canfida

**Kelepor:** Bermahiyên dîrokî, çand, tore

## PIRS

**1-** Nivîskar di destpêka nameyê de bang li kê dike?
**2-** Çima nivîskar ew qas bi çalakiya xwe bawer e?
**3-** Çima nivîskar bangewaziyê li cîhanê dike?

## EM LEHENGA XWE BINASIN

Ew di sala 1972'yan de li Gundê Elmalî yê girêdayî bajarê Meletî hatiye dinyayê. Navê wê Zeyneb Kinaci ye. Ji eşîra Mamûrkî ye. Wê li Meletiyê di Zanîngeha Înonuyê de, beşa rehberî û şêwirmendiya derûnî xwendiye. Beriya ku beşdarî nava refên tevgera azadiyê bibe, li nexweşxaneya Meletî weke teknîsyenekê rontgenê (eşîa) kar dikir. Ew bi hevalê xwe yê ji gundê Xilyan ê girêdayî navçeya Exîl a Amedê dizewice. Wê, di sala 1994'an de li bajarê Edeneyê di nava gel de kar û xebat dimeşand. Di sala 1995'an de li herêma Dêrsimê beşdarî nava refên ARGK'ê bû.

Di 6'ê Gulana 1996'an de ji aliyê dewleta tirk û hêzên navneteweyî ve êrîşek li Şamê dijberî Rêber Apo hat pêkanîn. Ji bo bersivdayîna vê êrîşê, hevala Zîlan di 30'ê Hezîrana

1996'an de li Dêrsimê, li hemberî artêşa tirk çalakiyeke fedayî pêk anî û tevlî kerwanê nemiran bû.

## RASTNIVÎS

**1-** Di benda dawî ya mijara we xwendî de, bêhnokên ku hatine bikaranîn, bibînin û çima hatine bikaranîn, diyar bikin.

**2-** Ji mijarê, çar hevokên ku tê de bêhnok hatiye bikaranîn, derxin.

## CUR Û AWA

Ew hestên taybet ên ku ji aliyê rêxistin, dewlet, sazî, yan jî kesekê/î ve ji bo agahdarkirina raya giştî, yan jî pêşîlêgirtina bûyerekê; bi awayê devkî, yan jî nivîskî tên diyarkirin re **peyam** tê gotin.

Cureyên wê?

1- Peyamên kesayetî: ew peyamên ku kesek ji kesekî dîtir re rê dike. Mijarên wê hest û daxwaz in ...

2- Peyamên karî: ew curenivîsên ku di kar û bazirganiyê de tên bikaranîn.

3- Peyamên wêjeyî: ew curenivîsên ku wêjevan ji hev re rê dikin

## RÊZIMAN

**Raweya fermanî:** Ev rawe bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkerê û qertafa raweya fermanî "**bi**" derdikeve holê. Ji ber ku ferman li kesên duyemîn ên yekjimar û pirjimar tê kirin, qertafên kesane yên ku tên dawiya vê raweyê jî **''e''** û **''in''** in.

| Lêker | Kirde | Pêşgir | Qertafa raweya fermanî | Rayeka dema niha | Qertafa kesane | Raweya fermanî |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Xwendin** | Tu | | Bi | xwîn | e | bixwîne |
| **Dan** | Hûn | | Bi | d | in | bidin |
| **Vekirin** | Tu | Ve | | k | e | veke |
| **Rabûn** | Hûn | Ra | | k | in | rabin |

**Mînak:**

- Tu pirtûkê bixwîne.
- Hûn daran av bidin.
- Deriyê dibistanê veke.
- Xwarina seyranê çêkin.

**Têbînî:**

Raweya fermanî di lêkerên ku bi pêşgiran pêk hatine de, qertafa "bi" wernagire.

**Neyîniya raweya fermanî: "Ne" û "Me".**

**Mînak:**

Derî ji kesî re ve**ne**ke.

Derî ji kesî re ve**me**ke.

**Raweya bilanî (fermana nerasterast):** Her wekî tê zanîn ferman li kesên duyem tê kirin. Vêca fermana ku nerasterast li kesên sêyem tê kirin jî bi alîkariya raweya bilanî pêk tê.

**Mînak:**

**Bila** Delîl biçe malê.

**Bila** ew bixwîne.

**Bila** ew karê xwe bikin.

**Bila** ew spartkên xwe çêkin.

**Qertafa neyîniya raweya bilanî "ne-"ye:**

**Mînak:**

**Bila** ew sibe **ne**çe gund.

**Bila** ew zarok **ne**çin ber sermayê.

## HÎNDARÎ

**-** Tu jî di lênûsa xwe de ji bo raya giştî, peyameke ramyarî li ser rewşa bindestiya gelê kurd binivîse.

# HÎNDARÎ 3

**1- Du curenivîsên ku her dem bi gotineke bangî dest pê dikin, kîjan ji yên li jêr e?**

**a-** Name - Bîranîn **b-** Bîranîn - hevpeyvîn **c-** Hevpeyvîn - axaftin **d-** Axaftin - name

**2 - Kîjan ji yên li jêr, di danasîna ziman de cih nagire?**

**a**- Ziman, amûra bingehîn a têkiliyên di navbera mirovan de ye.

**b-** Ziman, taybetmendiyeke mirovbûnê ye.

**c** - Ziman, parçek goştê sor e, di devê mirovan de ye. **d**- Ziman, nasnameya civakbûnê ye.

**3- Di kîjan hevoka li jêr de şaşîtiyeke nivîsînê heye?**

**a-** Zîlan di sala **1972**'yan de ji dayîk bûye.
**b-** Em ê îsal jî biçin Mûşê.
**c-** Tu jî ji helbestê hez dikî?
**d-** Wan li rojava li ber xwe dan.

**4- Di vê hevokê de kîjan peyv lêker e?**

"**Masiyên mezin, di deryayê de dijîn.**"

**a-** dijîn **b**- masî **c**- di deryayê de **d-** mezin

**5- Di vê hevokê de peyva "bi lez" çi ye?**

**"Azad, bi lez çû dibistanê."**

**a-** Hevalkara demê
**b-** Hevalkara çawaniyê
**c-** Hevalkara cih û ber

**d-** Hevalkara çendaniyê

**6- Kîjan peyva vê hevokê kirde ye?**

**"Sosin, duh ji Kerkûkê hat."**

**a-** Kerkûkî b- hat c- duh **d-** Sosin

**7- Zozanên Fereşînê li kû dera Kurdistanê ne?**

**a-** Dihok b- Colemêrg **c-** Efrîn **d-** Mehabat

**8- Di kîjan hevoka li jêr de kirdeyaa veşartî heye?**

**a-** Dîwarê dibistanê spî bû.
**b-** Genimê beriya Mêrdînê zer bû.
**c-** Jîr bûn.
**d-** Rewş gelekî germ e.

**9- Peyvên hemwate bigihîne hev:**


| | |
|---|---|
| Mest | Kelem |
| Asteng | Qonax |
| Pêvajo | Tirsandin |
| Gef | Bermahiyên dîrokî |
| Kelepor | Serxweş |
| Konevanî | Lawirvanî |
| Terşdarî | Siyasî |

# BEŞA 4

1- HÊVÎDARÎ
2- DOZ
3- SINC
4- GIRÎNGIYA ZIMÊN
5- 29 SAL RIYA AZADIYÊ DE
6- BAZ Û ORDEK

# WANE 1

## HÊVÎDARÎ



Hevalê delal hey kurê xwendekar
Me danîne ristên xwe pir bê jimar

Ji te hêvîdar im ji min negrî dil
Ku pêşkêş dikim ji bo te gul
Hevalê te me ez, ne dostê neyar
Dixwazim bi hev re bikin kar û bar

Bi dost û bira bin hemû jar û
mest Niha bûye çil sal ku min ev dixwest
Welat xweş bikin em nemînin neyar
Mirov tev bi hev re bibin dost û yar
Bi hev re bibin em bi carek heval Li
ber hev nenêrin bi can û bi mal

Ji warê me barkin çi tiştên nebaş
Di her war û cî de nemînin li paş

Cîhanê bikin em bi rengê bihuşt
Li nav me nemînin xwedî zor û xişt

*CEGERXWÎN*

**PEYV**

**Mest:** Ji ser hişê xwe ve çûn.

**Xişt:** Bistikên şêxan ên ku oldar bi kar tînin.

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan dibêje: **"Hevalê te me ez, ne dostê neyar/ Dixwazim bi hev re bikin kar û bar**" xwestiye çi vebêje?

**2-** Li gorî helbestvan, ji bo ku kurd bigihêjin azadiya xwe, pêwîst e ji nava wan çi rabe?

## RASTNIVÎS

**Sêxal (…)**

**1-** Li dawiya hevokên temam nebûne, tê bikaranîn**.**
**Mînak:**

Welat xweş û **…**

2- Li cihê peyvên ku nayên xwestin werin gotin, tê bikaranîn.

***Mînak:***
Hevalê delal! hey **…**ê xwendekar

## CUR Û AWA

Helbesta hatiye xwendin, helbesteke **destanî** ye. Ji ber ku helbestvan hestên welatparêziyê rave dike.

Dema ku mirov li malika duyem a helbestê dinêre, bareya wê, bareya lewaz e. Ji ber ku ji lihevhatina dengekî dengdar tenê pêk hatiye.

Ji ahengiya dengekî dengdar ê ku li dawiya rêzikên helbestan hatiye dubarekirin re **bareya lewaz** tê gotin.

## RÊZIMAN

### Di lêkeran de avanî:

Ji avaniyê tê zanîn ka lêker têkûz e, yan jî kêm e. Heke lêker têkûz be, bûyer li kirde vedigere, heke kêm be, li tiştekî/kesekî

din vedigere. Bi vî awayî tê zanîn ka lêker gerguhêz e, yan ne gerguhêz e.

**Gerguhêzî û negerguhêzî:**

**a- Lêkerên gerguhêz:** Lêkerên gerguhêz ew lêker in ku bireserên wan hene, ango bandora kar li ser tiştekî yan kesekî ye û ew tişt an jî kes bireser e.

**Mînak:**

Sozdarê pirtûk xwend.

Te derî vekir.

Hewlêr Hêlînê dibîne.

**b- Lêkerên negerguhêz:** Lêkerên negerguhêz ew lêker in ku bireserên wan tunene.

**Mînak:**

Delîl hat.

Zarok razaye.

Berf dibare.

**HÎNDARÎ**

Pirtûkekê li gorî taybetmendiyên li jêr, bidin nasîn.

a- Navê pirtûkê û nivîskar
b- Cih û dîroka weşanê
c- Navê weşanxaneyê
ç- Hejmara çapê

d- Hejmara rûpelan
e- Cureya pirtûkê,
ê- Ramana bingehîn a pirtûkê

f- Girîngiya pirtûkê (di warê şîretkirinê de)

# WANE 2

## DOZ



"Xeyrî mirovekî welatparêz e. Ji ber vê yekê, ji aliyê dost, xizim û cîranan ve pir tê hezkirin û jê re rêz tê girtin. Lê ji ber rastî û duristiya wî, her tim di navbera wî û axayê gund de nakokî û dijbertî derdiketin.

Rojekê dema ku Xeyrî ji kar vedigere malê, dibîne ku xaniyê wî şewitiye û aliyekî xaniyê wî hatiye rûxandin.

Em ê li jêr, bûyera bi serê wî ve hatiye, raxin berçavan."

**Xeyrî**: "Çima agir bi xaniyê me ketiye? Ma birûskê lê da!"

**Xanê (hevjîna wî):"**Ji bo zalim kêfxweş bibin, agir berdanê. Ev jî ne bes bû, ger min bi lezgînî Xemgînê biçûk ji pêşiya tirimbêlê ranekiribûya, wê ew jî weke kêzikekê bihata perçiqandin."

**Xeyrî**:"Wey zalimno! Ma Xweda rehm ji we stendiye! Hûn dilê xizan û jaran diêşînin. Sozê didim, heya ku gunehbarê vê tawanê peyda nekim û di dadgehê de nedim darezandin, ez ê ranewestim. Ka bêje min dayîka Xemgîn, kî bû? Kurê kê bû? Navê wî çi bû?"

**Xanê:**"Min nikarî ji hêrs û kerba dilê xwe binasim."

**Kendal (**Cîran**):**"Min dît. Cîran bêzar nebe. Tirimbêleke reş bû. Lê tiştê ez bêzar kirim ew kenê weke yê hirçan bû. Min jimara tirimbêlê girtiye. Giliyê wî li dadgehê bike û bila sezayê xwe bibînin."

**Xeyrî**: "Ma hûn ê bîneriya vê tawanê ji min re bikin?"

**Kendal û Rêber (**Cîran**)**: Serçavên xwe cîran, ma mirov dikare li hemberî bêwijdaniyeke wiha bêdeng bimîne! Va jimara tirimbêla kesê gunehbar, ka em biçin ji bavê wî bipirsin."

**Axa**: "Haaa....haaa.... haaa...xaniyê te! Ji ber çavên min winda bibe, here derve. Bila keya û xulamên min tişta pêwîst ji bo te bikin."

**Xeyrî**: "Axa! axa! Kurê we xaniyê min ê ku bi xwîn û xwêhdanê, ked û deyndariyê ava kiriye, ji bo kêfa dilê xwe şewitand. Lê tu weke ku tiştek çênebûye, dikenî. Ez ê giliyê we bikim."

**Axa:** "Here hêj min tu weke seyekî rezîl nekirî. Hejarê pîs! Tu dizanî bi kê re diaxivî?"

Ji beriya ku Xeyrî serî li dadgehê bide û giliyê kurê axê bike, axa keyayê xwe dişîne cem Xeyrî û dibêje:

**Keya:** "Xeyrî, were ji vê rika xwe vegere. Va ji bo ziyana xaniyê te 20.000 lîre, ger têrê neke, wê 30.000’î bidin te.

Xeyrî, tu yê poşman bibî. Ka li hemberî axê serîrakirin, çawa ye? Dê te weke seyekî bixeniqîne!"

Xeyrî serî li dadgehê da û giliyê kurê axê kir. Roja dadgehê hat. Desteya dadgehê rûnişt û dest bi xwendina dozê kir.

**Xeyrî**: "Birêz dadger, dozger, parêzger, guhdar û temaşevan: Ez weke hemwelatiyekî ji aliyê kurê axê ve hatime perîşankirin û serê vê zivistanê mirov mala mar û mişkan jî xerab nake, lê kurê axê ji ber kêf û gêwilê wî xweş bibe, xaniyê min şewitand.

Belê, birêz dadger. Rêzdar Kendal û rêzdar Rêber jî şahidên bûyerê ne."

**Kendal**: "Birêz dadger, li malê rûniştîbûm. Dengekî balkêş hat guhê min, dema ku ez hatim derve, min dît ku tirimbêlek bi lez dûr ket, lê min nezanî kî bû."

**Dadger**: "Yanî hûn dibêjin ne kurê Kamil axa bû, yê ku xaniyê Xeyrî şewitandiye."

**Kendal**: "Belê, birêz dadger."

**Rêber**: "Birêz dadger, wê demê ez nû ji kar hatibûm. Min jî ew dengê balkêş bihîst, dema derketim, min dît ku xanî şewitiye, lê min tirimbêl bi xwe nedît."

**Parêzvan**: "Birêz dadger û dozgeran, weke we jî bi xwe bîner guhdar kirin, ev kesê ku bi navê Xeyrî bêbextî û derewan li mûwekilê min dike. Mûwekilê min, ji binemaleke resen û xwedî navnîşan e. Ev ê hûn dibînin, dixwaze bi riya we û dadgeha pîroz re, bi şerefa mûwekilê min bilîze û hin diravan jê bistîne."

**Dadger:** "Hemwelatî Xeyrî hûn çi dibêjin."

**Xeyrî**: "Ez benî, baweriya we be, min ne ji bo diravan doz vekiriye. Ger berdêla tawaniyê diravan bipejirînim, xerabiya herî mezin e. Ji ber ku min doz winda kir, lê ez dev ji vê tawanbariyê bernadim."

Desteya dadgehê belav dibe û Xeyrî serî li dadgeha bilind a neteweyî dide ku doz ji nû ve bê destgirtin. Rojekê erkdarekî dadgehê bersiva serîlêdana dadgehê anîbû.

**Erkdar:** "Hemwelatî Xeyrî, serîlêdana we ya dadgehê nehatiye pejirandin. Divê hûn vê kaxezê îmza bikin ku mezaxa dadgeh û parêzvanên aliyê din jî bidin."

Ji ber ku Xeyrî nikarî mezaxa dadgeh û parêzvanan bide, ji aliyê saziya desteserkirinê ve, dest danîn li ser hemû heyînên

wî.

Xeyrî gelek bêzar û bêgêwil dibe, lê baweriya serkeftin û hêviyên xwe winda nake. Diçe malê bi hevjîn û kurê xwe re biryara rêzeçalakiyên şermezarkirinê digirin. Ji bo ku vê bêmafiyê, bi raya giştî bidin nasîn, bi sedan belavokan çap dikin û li kolan û şeqamên bajêr belav dikin. Hemwelatîno! Li hemberî vê tawanê bêdengmayîn, pejirandina tawanê bi xwe ye.
Vê jî, bes nabîne û her cihê ku kurê Kemal axa lê kêf û şahî dikir; Xeyrî weke xeyalekê li pêşberî wî radiweste, bi vê şêwaza xwe tirseke mezin, dixe dilê kurê axê. Kurê axê bêgêwil û bêzar dikir. Vê yekê jî, zêde bala raya giştî û saziyên têkildar nekişand. Lê Xeyrî ranaweste, biryara çalakiyeke nû digire. Li pêşberî qesra walî, dest bi rojiya birçîbûnê dike.

Roj bi roj piştgirî û têkiliyeke zêdetir ji bo Xeyrî çêdibû.

**Xeyrî**: "Hemwelatîno! Bêdeng nemînin. Îro dora mexduriya Xeyrî ye, sibe dora we ye!"

Xeyrî bû rojev. Di hemû TV, radyo û rojnameyan de weke bûyera yekem hat weşandin. Dengekî mezin veda.

Axa bi awayekî bêhnbizdayî, bi lez tê malê û pirsa kurê xwe dike.

**Axa:** "Ka ew bêxîretê lawê min?"

**Keya:** "Razaye, ez benî."

**Axa:** "Rabe, rabe! Ji derve cîhan li bin guhê hev ketiye, te hay ji bayê felekê nîne, bêxîret."

**Kurê Axê**: "Bavo li min nede, ez ketime bextê şerefa te!"

**Axa:** "Tu yê biçî dadgehê, bi dengekî bilind bêjî: Ez tawanbar im."

**Kurê Axê**: "Bila, bavo bila!"

Desteya dadgehê, mizgînî gihandin Xeyrî.

**Deste:** "Mizgînî, Xeyrî mizgînî! Hûn bi ser ketin, kurê axê tawana xwe pejirand."

**Xeyrî: "Ev, amojgariya şehîdê nemir Mazlûm Doxan e. Li hemberî tawanê bêdengmayîn, pejirandina tawanê bi xwe ye, riya herî pîroz û rast; li hemberî tawanan helwestdanîn û berxwedan e."**

## PEYV

**Dadger:** Hakim

**Dadgeh:** Cihê darezandinê (Mehkeme)

**Tawan:** Guneh, Sûc

**Mûwekil:** Kesê ku wekîlek heyî.

**Resen:** Esîl

**Darizandin:** Dadgehkirin

**Berdêl:** Şûn(bedel)

## PIRS

**1-** Çima cîranên Xeyrî li gotina xwe xwedî derneketin?
**2-** Çima Xeyrî di bûyerê de berdêl dirav nepejirand? **3-** Xeyrî hêza berxwedanê ji kê girt?

## RASTNIVÎS

Di hevokên jêr de, li cihê ku kevanek lê hatiye bikaranîn, baldar bin.

Tîrêj (Mele Nayîf) helbestvanekî kurd ê navdar bû.

Hosta: **(**Bi cil û bergên xwe yên kar**)** “Fermo guhdar dikim.”

Weke ku li jor tê dîtin, ravekirinên ku bandorê li hevokê nakin,

di nava kevanekê de tên bikaranîn.

Her wiha di berhemên şanoyî de, rewş û bizavên kesên ku dipeyivin, di nava kevanekê de tên nivîsîn.

## CUR Û AWA

Ji wan nivîs û berhemên ku bi mebesta li ser dikê bên lîstin, hatine amadekirin re, **şano** tê gotin.

Her şano, li ser sinaryoyekê tê avakirin.

**Sê beşên bingehîn ê şanoyê hene:**

**a-** Şanoyên pêkenok (komedî)
**b-** Şanoyên xemgînî (trajêdî)
**c-** Şanoyên ken û xemgînî (drama)
Du hêmanên bingehîn ên şanoyê hene: Dîtin û bihîstin. Peyv, helwest û tevger jî, wan temam dikin.

Ev şano, şanoyeke trajîk e. Şanoya trajîk, aliyê dilşewatiyê yê jiyanê, bi hin taybetmendiyên xwe yên xweserî xwe, li ser dikê pêşkêş dike. Mînakên: sincî, ne sincî, qencî, ne qencî, başî û ne başiyê nîşan dide. Ev cureya şanoyê, bi mebesta ku waneyekê bide temaşevanan û li gel wan hesteke tirs, coş û dilpêvemanê şiyar dike.

Ew berhemên li ser dikan tên lîstin, dibe ku ji gelek beşan pêk bên, ji her beşê re **perde** tê gotin**.** Ji cihê ku li ser tê lîstin re **dik** tê gotin. Ji wî cihê piştî dikê re ku mirov xwe lê amade dikin re **kulîs** tê gotin. Ew cil û bergên ku lîstikvan li gorî pêwîstiya şanoyê li xwe dikin re **kostum** tê gotin.

## RÊZIMAN

Ji avaniyê tê zanîn ka kirde di hevokê de berbiçav e, yan jî hatiye veşartin, li şûna kirde bireser derketiye pêş. Bi vî awayî jî lebatî û tebatiya lêkerê diyar dibe.

## Tebatî û lebatî:

**Avaniya lebatî:** Dema ku yek rasterast karekî bike, avaniya wî karî lebatî ye.

**Mînak:**

Min kevir avêt.

Cotkar zeviyê av dide.

Bêrîvan dê rojnameyê bixwîne.

**Avaniya tebatî:** Dema ku di hevokê de karê ku tê kirin "bireser" li pêş be, kesê ku wî karî dike ne diyar be, Avaniya wî karê dibe tebatî.

Avaniya "tebatî" bi alîkariya lêkera "hatin"ê tê bidestxistin. Mirov lêkera "hatin"ê li gorî dem û kesan dikişîne û lêkera bingehîn jî di forma raderê de dide, bi vî awayî avaniya tebatî derdikeve holê.

**Mînak:**

Kevir hat avêtin.

Zevî tê avdan.

Rojname dê bê xwendin.

Di hevokên tebatî de kirde ne diyar e, heke diyar bibe jî ne bi awayekî rasterast, bi awayekî nerasterast diyar dibe.

**Mînak:**

Kevir ji aliyê min ve hat avêtin.

Zevî ji aliyê cotkar ve tê avdan.

Rojname ji hêla Bêrîvanê dê were xwendin.

**Têbînî:** lêkerên negerguhêz di avaniya tebatî de nayên kişandin.

# WANE 3

## SINC



Sinc, yek ji taybetmendiyên herî girîng ê kesayet û pîvana rast a jiyana mirovan e. "Tişta ku hûn naxwazin li we were kirin, hûn jî li keseke/î din nekin." Rastiya vê gotinê, di dil û mejiyê xwe de bipejirînin, hûn jî bi hizrîneke rast tev bigerin û karên baş bikin.

Tişta hûn naxwazin li we were kirin, hûn jî, li keseke/î din nekin. Dibe ku hêsan tê dîtin, lê ev ne hêsan e. Jixwe gelek kesan ji bo pêkanîna sinc, zagon û destûr danîne. Ev jî, ji nêzîkatiyên erzan û sivik tê. "Tişta ku hûn naxwazin li we were kirin, hûn jî li kesek din nekin" Ango hûn ê xwe bixin şûna wî/ê, hûn ê xwe ji ezeziyê daweşînin. Çawa ku goşt û hestiyên we hene, wisa jî goşt û hestiyên wan jî hene, divê hûn wisa bihizirin. Hin kes hene, gelek zû teng û hêrs dibin, hûn ê xwe bixin şûna wan û nehêlin tiştên ku pê hêrs dibin, werin kirin. Hûn ê kêmasiyan nekin, lê nekirina wê tenê jî têrê nake. Ger hûn êşandina mirovan debar bikin û vê gotinê bêjin: "Marê bi min ve nede, bila hezar salan bijî." Bi rastî jî tê wê wateyê, ku we xwe nexistiye şûna wan. Dema ku mirov li hemberî bêmafiyekê rû bi rû ma; tengezarî û bobelatek hat serê mirov, mirov li benda alîkariyê dimîne, lê dema ku derdor hay jê nemîne û alîkariyekê nede, zora mirov diçe û mirov di nava civak û cîhanê de



xwe tenê dibîne. "Nexwe, tişta ku hûn naxwazin li we were kirin, hûn tenê li nekirina kesek din ve bi tixûb nemînin", dema ku kesek bikeve nava tengezariyan, divê hûn xwe li hemberî tengezariyên wî/ê berpirsiyar bibînin, tengezariyên wan kêm bikin û çareser bikin, her wiha, hûn ê beşdarbûna xwe li hemberî xemên wan diyar bikin û tenêmayînê pê nedin hesîn.

Sinc, ne tenê xwe ji nebaşiyan dûr girtin e. Sinc ferman dike, ku pêşî li nebaşiyên ku werin serê mirovan jî bigirin.

Mirovên wisa hene ku li kîjan devera cîhanê dibe, bila bibe, nebaşî, bêmafî û bêdadî bê serê mirovan, her weke ku ev nebaşî hatiye serê wî/ê dipejirîne û bêzar dibe. Tişta ku hûn naxwazin li we bê kirin, hûn jî li kesek din nekin.

## PEYV

**Zagon:** Yasa- Qanûn

## PIRS

**1-** Çima civak neçar e xwedî sinc be?
**2-** Sûdên sinc çi ne?
**3-** Ma tu dixwazî nebaş bî?

## RASTNIVÎS

**Bendik: (-)**

- Peyvên ku di rêzê de nayên temamkirin, bi bendikê tên veqetandin, lê bendik di peyvê de kîtekirinê bi awayekî rast dibire.

**Mînak:** Mala Apê Mûsa, di nava gul û rîhanan de winda di bû.

- Ji bo têkiliyên di navbera du peyv û hejmaran de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Çar-pênc kesan civîn li dar xist.

Kêm- zêde min pênc heval dîtin.

## RÊZIMAN

### Demên borî:

**1- Dema boriya têdeyî:** Dema ku bûyer pêk hatibe û bi dawî bûbe ev dem tê bikaranîn.

**Mînak:**

| **Ji bo lêkerên negerguhêz** | **Ji bo lêkerên gerguhêz** |
|---|---|
| **Çûn** | **Xwendin** |
| Ez çûm malê. | Min pirtûk xwend/xwendin |
| Tu çûyî malê. | Te pirtûk xwend/xwendin |
| Ew çû malê. | Wî pirtûk xwend/xwendin |
| Em çûn malê. | Wê pirtûk xwend/xwendin |
| Hûn çûn malê. | Me pirtûk xwend/xwendin |
| Ew çûn malê. | We pirtûk xwend/xwendin |
| | Wan pirtûk xwend/xwendin |

**Neyîniya vê demê bi alîkariya qertafa "ne-" pêk tê.**

**Mînak:**

Ez çûm → Ez **ne**çûm.

Ez ketim → Ez **ne**ketim

Min xwar → Min **ne**xwar.

Min vexwar → Min ve**ne**xwar.

## HÎNDARÎ

**1-** Çend pend û gotinên pêşiyan ên li ser sinc peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse.

# WANE 4

## GIRÎNGIYA ZIMÊN



Afirandina çand û wêjeya gel bêyî ziman nabe. Kilîla pêşketina civakê, zimanê wê bi xwe ye. Ziman hîmê bingehîn ê civakê ye. Hêz, hebûn û sembola neteweyekê, ziman e. Belê, ev baskên ku me anîn ziman, bêyî hev nabin û hev temam dikin. Ger gelê me heya niha hebûna xwe parastibe û gihiştibe qonaxa îro, ev di serî de bi riya axaftin û bikaranîna ziman bi xwe ye. Her wiha, kariye bi ziman hebûna xwe berdewam bike. Gelê me, ev tenê bes nedîtiye; zimanê xwe, weke giyanekî bi rêk û pêk û bi nazdarî xurt kiriye û xemilandiye. Her çi qas gelê kurd bi sedê salan bindest maye jî, lê ji ber dewlemendiya zimanê xwe, hebûna xwe parastiye.


Dagirker û talankerên welatê me, tim xwestine ku gelê me bipişêvin, bindestiyê heta dawiyê li ser gelê me bisepînin. Belê, gelê me di nava vê rewşa teng û dijwar de jî zimanê xwe parastiye. Ev çespandina gelê me ya biryardar, di warê ziman de, îro baştir tê zanîn.



Ger em rewşa erdnîgariya welatê xwe bi temamî raxin berçavên xwe, dê baştir bê dîtin ku gelê me çi qas zimanê xwe bi rik û xwedî biryar parastiye. Ger gelê me bi hezkirin û evîneke mezin li zimanê xwe xwedî

derneketibe, nediyar bû ku ziman û gelê me, weke gelên din ên di nava rûpelên dîroka Mezopotamyayê de winda bûne, winda bibûya.

Belê, neketina gelê me ya di nava şaşiyên dîrokî de tê wateya ku gelê me bi hemû hêz û hebûna xwe, li zimanê xwe xwedî derketiye. Bi vê boneyê, kîjan ronakbîr û zanayên kurd ên rabûne, beriya her tiştî bala gelê xwe kişandine ser parastina zimên. Her nivîskar û helbestvanên me yên ku rabûne, ji Baba Tahirê Hemedanî yê ku hestên keleporî ji Avesta



Pîroz girtine, di hestên gel de, bi lorandinê zindî kiriye û diyarî Cegerxwînê dilkovan kiriye. Bi taybetî, hewldan û helwesta Ehmedê Xanî ya ji bo parastina zimanê me, di hemû aliyan de risteke girîng û bingehîn lîstiye.

**PEYV**

**Ronakbîr :** Rewşenbîr
**Afirandin:** Nû çêkirin, nû avakirin
**Çespandin:** Pê ve asê kirin.
**Sembol:** Nîşan
**Kelepor:** Mîrate

**PIRS**

**1-** Çi cudahî di navbera çand û wêjeyê de heye?

**2-** Tu ji gotina **"Ziman nasnameya neteweyî ye."** çi têdigihêjî?

**3-** Di dîrokê de yek ji sedemên sereke yê windanebûna kurdan, çi ye?

## RÊZIMAN

**2- Dema boriya dûdar:** Ev dem ji aliyê wateyê ve bûyerekê diyar dike ku berî niha pêk hatiye, lê hîn têkiliya wê bûyerê bi vê gavê re heye ango encama wê li ber çavan e. Bo nimûne dema ku em bibêjin: "Çarşemê Serdar nexweş ket " tê wê wateyê ku Serdar nexweş ket û rehet bû. Lê dema ku em bibêjin : "Ji çarşemê ve Serdar nexwş ketiye" ev tê wê wateyê ku hîn jî Serdar nexweş e.

Ev dem bi alîkariya qertafa "**-e**" û rayeka dema borî pêk tê. Lê ji bo kesê sêyem lêkerên ku bi dengdarekê diqedin ev qertaf dibe "**-iye**"**.**

Her wekî:

Ket →Ket**iye**.

Xwend→Xwend**iye**.

Hat → Hat**iye.**

**Mînak:**

| **Ji bo lêkerên negerguhêz** | **Ji bo lêkerên gerguhêz** |
|---|---|
| **Çûn** | **Xwendin** |
| Ez çûm**e** malê | Min pirtûk xwend**iye**/xwendin**e**. |
| Tu çûy**e** (çûyiy**e**) malê | Te pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |
| Ew çûy**e** malê. | Wî pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |
| Em çûn**e** malê. | Wê pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |
| Hûn çûn**e** malê. | Me pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |
| Ew çûn**e** malê. | We pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |
| | Wan pirtûk xwend**iye**/xwendin**e** |

**Neyîniya vê demê bi alîkariya qertafa "-ne" yê pêk tê.**

**Mînak:**

Ez **ne**çûme dibistanê.

Ew **ne**hatiye gund.

Wê av ve**ne**xwariye.

Wan xwarin çê**ne**kiriye.

Min ew şiyar **ne**kiriye.

## HÎNDARÎ

**1-** Her peyva li jêr, di hevokekê de bi kar bîne.
Mezopotamya, ziman, jiyan, qonax

**2-** Li ser vê hevokê, mijareke kurt binivîse."Ziman, neteweyan ji tunebûnê diparêze."

# WANE 5

## 29 SAL DI RIYA AZADIYÊ DE



Îsa Hiso, di sala 1953’yan de li gundê Bora yê girêdayî bajarokê Girbawî yê Qamişlo ji dayîk bûye. Zewiciye û deh zarokên wî hene. Du zarokên wî di têkoşîna azadiyê de şehîd ketine, yek jî di nava refên têkoşîna azadiya Kurdistanê de ye.

Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Qamişlo xwendiye. Li zanîngeha Şamê beşa hiqûqê xwendiye.

Di sala 1984’an de tevlî têkoşîna azadiya gelê Kurdistanê bûye. Ji wê dîrokê û vir de, di gelek xebatên ramyarî û rêxistinî de bi awayekî çalak cihê xwe girtiye.

Piştî xebatên avakirina Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), bi awayekî çalak di nava xebatê de cih girtiye. Di 2003’yan de beşdarî kongireya damezrandina PYD’ê bûye, weke yek ji damezrînerên PYD’ê risteke girîng lîstiye.

Di 12’ê Adara 2004’an de, di Serhildana Qamişlo ya ku rejîma Baasê komkujî pêk anî de, bi awayekî çalak beşdar bûye.

Bi avakirinaTevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) re jî weke rêveber, di vê sazûmaniyê de kar kiriye. Her wiha, di 2011’an de tevlî xebatên avakirina Meclisa Gel a Rojavayê Kurdistanê bû û weke Endamê Dîwana Serokatiya Meclisê kar bi rê ve biriye.

Di sala 2012’an de, di avakirina Desteya Bilind a Kurd de jî cih girt û heta ku şehîd dikeve jî weke Endamê Komîteya Dîplomasiyê ya desteyê, têkoşîna xwe domandiye.

Şehîd Îsa Hiso, her wiha di xebatên dîplomasiyê de jî bi awayekî çalak cihê xwe girtiye û li Fransa, Norwec, Tirkiye û Başûrê Kurdistanê tevlî gelek hevdîtin û civînan bûye.

Şehîd Îsa, di vê têkoşîna xwe de gelek caran bû armanca hêzên rejîmê û komên li dijî kurdan. Ew, ji aliyê rejîma Baas ve 5 caran hatiye girtin û di girtîgehê de salek û sê mehan maye.



Endamê Komîteya Dîplomasiyê ya Desteya Bilind a Kurd û Endamê Dîwana Serokatiya Meclisa Gel a Rojavayê Kurdistanê û TEV-DEM'ê, Şehîd Îsa Hiso, di 30'ê Tîrmeha 2013'an de, sibehê dema ku ji mala xwe ya li Taxa Kornîş a bajarê Qamişlo derdikeve, ji bo ku biçe karê xwe li maşîneya xwe siwar dibe, di encama teqîna bombeyî ya ku di maşîneya wî de hatibû bicihkirin, şehîd dikeve.

Di têkoşîna Azadiya Gelê Kurdistanê de, 29 salên tejî êş û têkoşîn li pey xwe hiştin.

## PEYV

**Ramyarî:** Siyasî

**Beşdarî:** Tevlîbûn

**Dîplomasî:** Têkiliyên bi derve re

## PIRS

**1-** Şehîd Îsa Hiso kengî û li kû derê ji dayîk bûye ?
**2-** Şehîd Îsa Hiso kengî tevlî xebatên avakirina Meclisa Gel a Rojavayê Kurdistanê bûye ?
**3-** Şehîd Îsa Hiso çend caran hatiye girtin?

## RASTNIVÎS

**Cihên tîpên mezin lê tên nivîsîn, ev in:**

**a-** Destpêka hevokê.
**b-** Peyvên ku piştî pirsnîşan, baneşan, cotxal û xalê tên.
**c-** Hemû navên taybet bi tîpa mezin tên destpêkirin.

## RÊZIMAN

**3- Dema boriya berdest** : Dema ku bûyerek di dema borî de bi domdarî hatibe kirin an jî karekî ku li ser hev hatibe kirin, ev dem tê bikaranîn.

Ev dem bi alîkariya qertafa dema niha "di-" û rayeka dema borî pêk tê.

**Mînak :**

| **Ji bo lêkerên negerguhêz** | **Ji bo lêkerên gerguhêz** |
|---|---|
| Berê ez her tim **di**çûm gund. | Min jê re **di**got. |
| Ew bilind **di**firî/**di**firya. | Me mala xwe **di**şûşt. |
| Em zû **di**hatin. | Evînê her sal gul **di**çandin. |
| Tu ji hal **di**ketî. | Wan her tim alîkarî dixwest. |

**Neyîniya vê demê bi alîkariya qertafa "ne-" pêk tê.**

**Mînak:**

Em zû **ne**dihatin.

Wan alîkarî ji me **ne**dixwest.

Me xwarin çê**ne**dikir.

Van av ve**ne**dixwar.

Me mijara bingehîn diyar **ne**dikir.

## HÎNDARÎ

Tu jî sê hevokan di dema boriya berdest de binivîse.

# WANE 6

## BAZ Û ORDEK



Dibêjin, carekê ji caran du firindeyên dostên hev, baz û ordek hebûn. Rojekê bi hev re derdikevin ger û firînê. Hewa pir xweş bû, her der mîna kirasekî bi rengê kesk bû. Her duyan bi hev re temaşeyî derdora xwe dikirin û bilind dibûn.

Her ku bilind dibûn xwesteka firînê bi wan re zêdetir dibû. Êdî gelek li jor bûn.

Baz, piştî hizirîneke, ji nişka ve ji ordekê re got:

- Ez bawer nakim ku di vê cîhanê de, candarek mîna min tiştan ji dûr ve bibîne.

Ordekê, di van gotinên baz de, bêhna pesindayînê kir.

- A tu dibêjî pesindayîn e, pesnê xwe dayîn hêsan e, lê belê rastiya wê pêwîst e.

Ka em binêrin, ji bo min bêje, li derdora vê beriyê tu çi dibînî?

Dema ku baz bê baweriya ordekê dît, ji xwe re got: "Pêwîst e ez tişteke wisa ji bo ordekê bêjim ku ji dîtina min bawer bike ku çavên min çi qas dûr dibînin." Cihê ku lê difiriyan, di navbera wan û erdê de, qonaxa rojekê dûr bû. "Li jêr dinêre," piştre li ordekê zivirî û wiha got:

- Ger baweriya te bi gotina min bê, tu wan darên li milê çepê yê wê beriya ha, li rexê wan libek genim heye, dibînî?

Ordekê bi dilekî xweş dest ji gotina baz berneda û ji vê gotinê

matmayî ma.

Baş e! Ka em herin xwarê bibînin, gotina te rast e, ka bi rastî liba genim li wir heye, yan na?

Her duyan bi hev re xwe berdan jêr.

Ordekê, bi çavên xwe jî liba genim dît, her ku nêzîk dibû, hestiyar dibû.

Baz, bilez danî ser dareke nêzîkî wê derê. Ordek, ber bi liba genim ve bezî. Mixabin, ew genimê xefikê bû!

Dema ku ordekê xwest liba genim rake, ket xefkê. Ordekê nedizanî ku wê ji bo libek genim bikeve xefkê.

Nehizirî ku "her çûk hejîran naxwin."

Dema ku baz dît, ordek ketiye xefkê lê zivirî û got:

- Hevala min! Belkî te xefik nedît, lê ma te nezanî ew liba genim ji bo çi li wir e?

- Rast e, rast e heval! Lê tu jî zanibe ku gazinên piştî qewimandinê bê sûd in.

## PEYV

**Xefik:** Dav

**Kiras:** Fîstan

**Berî:** Deştên fireh

**Matmayî:** ecêbmayî

## PIRS

**1-** Dema ku her du firinde firîn, derdor çawa bû?

**2-** Baz, nêrîneke çawa ji Ordekê re got?

**3-** Mirov çi encamê ji vê metelokê digire?

## CUR Û AWA

Di mijara baz û ordekê de mîna ku her du firinde rastî diaxivin diyar dike. Tê de dabaşa tiştên ne gengaz tê kirin, ev curenivîs metelok e.

> **Metelok:** curenivîsa ku dabaşa tiştên nebûyî û ne gengazê bûyînê ne dike, lehengên wê lawir in û bi armanca perwerdekirinê tê vegotin.

Cureyên metelokê:

1- Pexşan
2- hûnandî

## HÎNDARÎ

Tu jî metelokekê peyda bike û ji hevalên xwe re bêje.

# WANE 7

## BERE BIHAR BI XÊR BÊ

Bihare ba bi xêr bê, li ser çavên me Nîroz,
Bila kurd bi hev re bibêjin cejna te pîroz.

Kincê ciwan wergirin, li Kurdistan keç û kur,
Zerî biçin semayê, çi amoz û çi xaloz.



Mizgîn ji bo me bêtin doza me va giha me,
Em aştî dixwazin, kengê bigihê me ew doz.

Perî û xal û reşkal li her derî bibêjin,
Bijî serdarê zana serdarê me ye Behroz.

Canfidayên ciwanmêr em deynin ser milê xwe,
Êdî em şer naxwazin gulebaran û bahoz.

Em dixwazin bihar bê biken û li her derî,
Himbêz bikin keç û xort hemû pismam û amoz.



Bi serbestî bileyzin, maçan li hev big'herin,
Bila dijmin bixeydin, ew nexşebend û kerboz.

Xwedê li jor dizane wî em ji bo çi dane,
Çima girtî û dîl bin, weke berxan dinav koz.

***CEGERXWÎN***

## PEYV

**Sema:** Govend, dîlan

**Amoz:** Pismam

**Xaloz:** Kurxal

**Behroz:** Paşayekî kevn ê kurdan e.

## PIRS

**1-** Girîngiya Newrozê, ji bo gelê kurd çi ye?
**2-** Daxwaza sereke ya helbestvan, di vê helbestê de çi ye?

**3-** Hemwateyên peyva Newroz, çi ne?

## CUR Û AWA

Ev helbest, helbesteke **destanî ye**. Ji ber ku mijara wê li ser lehengî û welatparêziyê ye.

**Di helbesta we xwendî de, ev taybetmendî tên diyarkirin.**

- Bi şêweyê malik û rêzikan hatiye nivîsîn.
- Her rêzik bi tîpa mezin hatiye destpêkirin.
- Bi pîvana kîteyan hatiye nivîsîn.
- Li dawiya rêzikan dengên lihevhatî hene.

Ji helbestên bi jimareke diyar a kîteyan hatine nivîsîn re helbestên **bipîvan** tê gotin.

Malik li gorî hejmara rêzikên xwe tê binavkirin.

Ji ber ku helbesta we xwendî, ji du rêzikan pêk hatiye, jê re **cotik** tê gotin.

Di dema xwendina helbestê de, bêhnvedaneke kurt, di nava rêzikan de tê stendin, ji wê re **rawestek** tê gotin.

**Mînak:**

Kincê ciwan wergirin**,** li Kurdistan keç û kur,

Zerî biçin semayê**,** çi amoz û çi xaloz.

## HÎNDARÎ

Helbestê ji ber bike û di refê de ji hevalên xwe re bêje.

# HÎNDARÎ 4

**1- Di vê hevokê de kîjan peyv kirde ye?**
"Me di roja Newrozê de agirekî geş pêxist."
**a-** Me **b-** roj **c-** di-de **d-** geş

**2- Kîjan danasînên li jêr ji bo ''lêker'' rast e?**
**a-** Ew tişta ku kar li ser tê kirin.
**b-** Ew karê ku di hevokê de tê kirin.
**c-** Ew peyva ku li şûna nav tê bikaranîn. **d-** Ew peyva ku rewşa hevalkarî diyar dike.

**3- Peyvên di vê hevokê de dibin ''lêker'' kîjan in?**
''Nermîn ji seyranê vegeriya û zû raza.''
**a-** vegeriya-raza **b-** zû-raza
**c-** ji-seyranê **d-** vegeriya-seyran

**4- Kîjan ji ''lêkerên'' li jêr di warê çêbûnê de hevedudnî ye?**
**a-** pêxist **b-** rijand **c-** ava kir **d-** kenî

**5- Di zimanê kurdî de bi giştî dem dibin çend beşên serek e?**
**a**-Sê **b-** Şeş
**c-** Çar **d-** Pênc

**6- Di vê hevokê de peyva "hat" kîjan demê diyar dike?**
"Sîpan ji Çiyayê Sîpanê Xelatê hat."
**a-** Dema bê **b-** Dema niha **c-** Dema borî **d-** Raweya fermanî

**7- Kîjan ji lêkerên li jêr, dema niha diyar dike?**
**a-** Xwendiye **b-** Dixwend
**c-** Dixwîne **d-** Xwend

**8- Kîjan lêkerên li jêr, dema bê diyar dike?**
**a-** Hat **b-** Dihat
**c-** Hatibû **d-** Dê bê

**9- Bangewaziya pakrewan Zîlan ji bo cîhanê, çi bû?**
**a-** Pêwîst e dengê min bibihîzin û meznahiya şoreşa me bibînin…
**b-** Pêwîst e kurd alîkariyê bidin hev.
**c-** Pêwîst e alîkariya madî bi me re bikin. **d-** Pêwîst e zimanê me serbest bikin.

**10- Kîjan ji rojên li jêr, weke bîranîna Zeyneb Kinaci (Zîlan) tê nasîn?**
**a-** 30'ê Tebaxê
**b-** 30'ê Hezîranê
**c-** 30'ê Mijdarê
**d-** 30'ê Adarê

**11- Kîjan ji gotinên li jêr, ne rast e?**
**a-** Ziman nasnameya neteweyî ye. **b-** Ziman ne bingeha civakê ye.
**c-** Ziman amûra têkiliyên di navbera mirovan de ye. **d-** Mafê her kesê/î heye, bi zimanê xwe biaxive.

**12- Peyvên hemwate bighînin hev:**

| | |
|---|---|
| Tawan | tevlîbûn |
| Sema | guneh |
| Sembol | Dav |
| Beşdar | dîlan û govend |
| Xefik | nîşan |

**13- Ji hevokên li jêr de yên rast bi tîpa (R) û yên şaş jî bi tîpa(Ş) nîşan bike û yên şaş sererast bike**.
1- Du hêmanên bingehîn ên şanoyê hene: dîtin û bihîstin. Peyv, helwest û tevger jî, wan temam dikin. ( )
2- Peyvên ku di rêzê de nayên temamkirin bi xêzika xwehr tê veqetandin. ( )
3- Di zimanê kurdî de du demên bingehîn hene**:** Dema niha û dema borî. ( )

# BEŞA 5

1- Serpêhatiya Mûsa Enter
2- Pendên Pêşiyan
3- Wêje Xemla Ziman e
4- Nivîsîn
5- Hozan im
6- Rojnamegeriya Kurdî
7- Cem Bijîşk

## WANE 1

# SERPÊHATIYA MÛSA ENTER



Rojekê ciwanekî şoreşger, ji Dîlokê nameyeke rexnekirinê ji Mûsa Enter re rêdike û di nameya xwe de gelek gotinên giran ên weke; "tu bê… tu bê… ji ber ku tu kesayatekî zana û rewşenbîr î, lê heya niha te ji bo gelê kurd, xebatek nekiriye." Piştî Mûsa Enter vê nameyê digire û dixwîne, gelek dilşad dibe. Ji bo dilşadbûna xwe bîne ziman, vê nameyê dibe û di rojnameyê de diweşîne.

Li binê nameyê jî wiha dinivîse: "Ciwanê hêja,

ne ji ber ku ez bêzar bûme, min nameya te di

rojnameyê de weşandiye, lê ji ber ku pir dilşad bûme.

Min ev nameya te bê ku tîpekê jê kêm bikim, di rojnameyê de weşand, lê ez dixwazim niha ji we re serpêhatiyekê binivîsim."

Rojekê, zilamek temenê wî bûbû heftê û pênc sal, lê xweda dûnda nedabûyê. Piştî heftê û pênc salan, ji nû ve xweda kurek dayê. Bi vî kurê xwe gelek dilşad û bextewar bû.

Rojekê, dayîka kurik dema diçe tenûrê, kurik dide dest bavê wî. Kalê heftê û pênc salî, kurik datîne ser ranê xwe û pir pê şa dibe. Ha di wê demê de, kurikê biçûk xwe şil dike. Cilên kalê heftê û pênc salî dilewitîne. Kalê heftê û pênc salî pir û pir kêfxweş dibe û dibêje: "Hemd ji Xweda re min dît, xweda kur da min û bi min de mîst."

Ciwanê hêja, min şaş fêhm neke, ez pir şa bûm ku xweda kurik da min û bi min de mîst.

## PEYV

**Dîlok:** Navê bajarekî Kurdistanê ye.

**Tenûr:** Amûreke ji axê çêbûyî û cihê nanpehtinê ye.

**Dûnda:** Zarok (zuryet)

## PIRS

**1-** Ciwanê name nivîsî, ji kû dera Kurdistanê bû?
**2-** Ciwan, rexneyeke çawa li Mûsa Enter kir?
**3-** Mûsa Enter beramberî rexneya ciwanê ku name nivîsî, helwesteke çawa nîşan da?

## RASTNIVÎS

Nîşaneyên li jêr di nava hevokan de bi kar bînin: **(, : ; ! ? )**

## CUR Û AWA

We mijareke girêdayî rastiya jiyanê, bi awayekî tekûz û plankirî şîrove dike, xwend. Em di vê nivîsê de van taybetmendiyan dibînin.

- Bûyereke rast e.

- Bûyereke di cih û demeke diyar de derbas dibe.

- Kesayetên di bûyerê de cih digirin, kesên rast in.

Ji wan nivîsên xwedî taybetmediyên hunerî ku bûyerên rast an jî nêzîkî rastiyê hatine amadekirin şîrove dikin re, **serpêhatî** tê gotin.

## RÊZIMAN

**Hevok:** Ew çend bêje ne ku li pey hev rêz dibin bi mebesta dîtin, raman, rûdan û nûçeyekê diyar bikin.

**Mînak:**

Dengê defê ji dûr ve xweş tê.

Ez ji werzîşê hez dikim.

**1- Hêmanên hevokê:** Di hevokê de du hêmanên bingehîn "kirde û pêveber" û du jî alîkar "bireser û têrker" hene.

**a- Kirde:** Kes an jî tiştê ku kar, tevger û kirinê pêk tîne kirde ye.

**Mînak:**

**Şîlanê** derî vekir.

**Gulê** mijar şîrove kir.

**Çivîk** ji ser darê firîn.

**Kulîlkên me** pişkivîn.

**Zarokên dibistana me** çûn seyranê.

Her wekî ji mînakên jor diyar e, dibe ku kirde ji çend bêjeyan pêk were.

**b- Pêveber:** Ew hêman e ku kar, bûyer û rewşekê radigihîne. Di hevokên lêkerî de lêker bi xwe pêveber e; di hevokên navdêrî de hevalnav û navdêr li gel qertafên kesane dibin pêveber.

**Mînak:**

Ronî pirtûkê **dixwîne**. (hevoka lêkerî)

Zîlan ji bajêr **hat**. (hevoka lêkerî)

Gundiyan baxçeyên xwe **av dan**. (hevoka lêkerî)

Hêlîn **keçeke delal e**. (hevoka navdêrî)

Ew **mamoste bû**. (hevoka navdêrî)

Ew çiya **bilind in**. (hevoka navdêrî)

Diyar e, dibe ku pêveber jî ji çend bêjeyan pêk

were. **c- Bireser:** Ew hêman e ku kar li ser tê kirin.

**Mînak:**

Gulê **romanê** dixwîne.

Me **cilên xwe** şûştin.

Min **pirtûka Cegerxwîn a helbestan** kirî

Em **Newrozê** pîroz dikin.

Dîsa dibe ku bireser jî ji çend bêjeyan pêk were.

**ç- Têrker:** Ji peyv û birepeyvên ku wateya hevokê têr dikin re têrker tê gotin.

Mînak:

Wan **îro** şahiyek li dar xist.

Zarok **li ser bên** rûniştin.

Berçem **ji malê** tê.

Sîmav **baş** dixebite.

**HÎNDARÎ**

**1**- Tu jî serpêhatiyekê peyda bike û di lênûsa xwe de binivîse. 2- Sê hevokan binivîse û hêmanên wan bide nasîn.

**WANE 2**

# PENDÊN PÊŞIYAN

Pendên pêşiyan, berhemeke çandî ya pir kevn a dapîr û bapîran e, ku ji serpêhatî û bûyerên di her aliyê jiyanê de, bi serê wan hatine, şîret û waneyek jê girtine. Bi alîkariya çend peyv û gotinan an jî hevok û rêzikên xwerû, bi rêk û pêk kirine û ji bo nifşên piştî xwe diyarî hiştine.




Da ku karibin, bi riya wan gotinan, şîret û destketiyên xwe yên baş, bigihînin wan.

Her civak li gorî hebûna xwe, xwedî şîretên taybet e. Ew şîret, serpêhatiya jiyana wan civakan pênase dike. Em kurd jî weke civakên din, di aliyê pendên pêşiyan de xwedî gencîneyeke dewlemend in. Pendên pêşiyan ên kurdî bûne stûneke sereke ya parastina ziman û wêjeya kurdî.

Hûn ê li jêr çend mînakan li ser pendên pêşiyan ên kurdî bixwînin û binasin.

Karkerê xwe be, delalê ber dilê xelkê be.

11. Go: Ew çi ye tu diçînî? Go: Dema şîn bû tu yê bibînî.
12. Siwarê hespê xelkê, her tim peya ye.
13. Heta kefa dest reş nebe, tama dev xweş nabe.
14. Her evraziyekê, nişûviyeke xwe heye.
15. Deriyê xwe bigire, cîranê xwe neke diz.
16. Sal bi sal, xweziya bi par.
17. Serê neêşe, ne hewceyî girêdanê ye.
18. Kesê kes e, tîpek bes e.

## PEYV

**Destket:** Berhem

**Pend:** Şîret

**Gencîne:** Xezîne

**Evrazî:** Cihê ber bi jor ve bilind dibe, riya diçe bilindahiyê.

**Nişûvî:** Cihê ber bi jêr ve nizim dibe, riya ku ji dereke bilind diçe dereke nizim.

## PIRS

**1-** Girîngiya pendên pêşiyan ji bo parastina ziman û wêjeyê çi ye?

**2-** Gotina pêşiya ya li jêr, tê çi wate yê?

**Go: "Ew çi ye tu diçînî."Go:"Dema şîn bû tu yê bibînî."**

## RASTNIVÎS

**1-** Xalbendiyên pêwîst di benda jêr de, bi cih bikin:

Her civak li gorî hebûna xwe xwedî şîretên taybet e Ew şîret serpêhatiya jiyana wan civakan pênase dike Em kurd jî weke civakên din di aliyê pendên pêşiyan de xwedî gencîneyeke dewlemend in Pendên pêşiyan ên kurdî bûne stûneke sereke ya parastina ziman û wêjeya kurdî

## CUR Û AWA

Di mijara pendên pêşiyan de dabaşa beşeke girîng ya wêjeya me tê kirin. Ew jî gotinên pêşiyan e.

**Gotinên pêşiyan:** ew gotinên kurt, tijî zanîn û serboriyên ku bêjerên wan ne diyar in.

**Hin ji taybetmendiyên pendên pêşiyan, ev in:**

**1**- Xwediyê gotinê ne diyar e û malê civakê ne.

**2**- Di wateya her gotinê de hevparbûna civakê heye.

**3**- Her gotinek encama serpêhatî û bûyerên civakî ye.

**4**- Naveroka her gotineke pêşiyan li ser bingehê ceribandinekê hatiye derxistin.

**5-** xwedî wateyên kûr in.

**6-**Peyvên wan nayên guhertin.

**7-** Pendên pêşiyan carinan bi awayê xaze (mecaz) tên vegotin.

## HÎNDARÎ

Tu jî pênc gotinên pêşiyan peyda bike û di refê de ji hevalên xwe re wateya wan şîrove bike.

**WANE** 3

# WÊJE XEMLA ZIMAN E

Mirov dikare bêje, wêjeya ku xwe dispêre tore yê , tê wateya perwerde û



xwedîkirinê, hiş û bîreke saxlem û taze ye ji bo hebûna civakan. Li gel vê jî, pêhes û vîneke mezin di dilê mirovan de çêdike, hezkirineke bihêz peyda dike. Her wiha, ji ber hêzbûna wêjeyê, wêje li ser her axê şîn dibe. Wêje, li gorî xaknîgariyên cur bi cur awayan digire. Axeke kêm av be jî, wêje rengê xwe di nava wê de, bi firehî û kûrahî belav dike. Ger li cihekî nivîsîn nebe jî, bi awayekî devokî hebûna xwe didomîne. Bi tu riyan xwe namirîne, rê nade ku av li ser were birîn, her gav coyên jiyanê çêdike û hebûna xwe dide pêhesîn.



Wêje, hêza berxwedanê ji ziman digire. Ji ber ku ziman û wêje weke hestî û goşt in. Bi hev ve ristî ne, jiyane û pêk ve dijîn. Yek bêyî yê din nabe. Li vê derê endamê bingehîn ziman e. Belê, zimanekî bêwêje mirî ye. Wêje, giyanê dide zimên.

Di dîrokê de gelek gel hene ku ji ber sedema wêje û zimanê wan hev temam nekirine, tune bûne. Her wiha gelek ziman hene ku jar û lawaz mane. Ev rewşa dîrokî girîngiya wêjeyê diyar dike.

Ji ber sedema desthilatdariya pergala netew-dewletê li gelek aliyên cîhanê çand, ziman, wêje û qirkirinên neteweyî hatine pêkanîn.

Zimanê me, li hemberî hemû pişaftin û qirkirinan bi wêjeya xwe, li ber xwe daye. Bi çîrok, serpêhatî, destan û stranan…xwe têr kiriye. Bi wêjeya xwe li ber xwe daye û di vê rikberiyê de bi ser ketiye.

## PEYV

**Birîn:** Qutkirin

**Pişaftin:** Helandin

**Rikberî:** Dijberî, qayîş

## PIRS

1- Çawa gelê kurd li hemberî ewqas zordariyan, kariye hebûna xwe biparêze?
2- Ji ber çi gelek netewe tune bûne?

## RASTNIVÎS

Çar hevokan binivîse û xalbendiyên li jêr, li gorî pêwîstiyan di hevokan de bi kar bîne. **( - ! . , : )**

## HÎNDARÎ

**1-** Vê benda li jêr, svererast bike û di lênûsa xwe de binivîse:
"Di dîrokê de gelek gel hene ku ji ber sedema wêje û zimanê wan hev temam nekirine tunebûne her wiha gelek ziman hene ku jar û lawaz mane ev rewşa dîrokî girîngiya wêjeyê diyar dike."

## WANE 4

# NIVÎSÎN

Nivîsîn, xwedî dîrokeke pir kevn, dûr û dirêj e. Ger îro yek ji te re bêje ka wê pirtûkê biavêje nava tenûrê da hişk û sor bibe, diyar e tu dê bi wî bikenî û henekê xwe pê bikî, na, henekê xwe pê neke, ji ber ku bi hezaran sal berê tevahî nivîsên heyî li ber tîrêjên rojê û bi agir dihatin hişkirin û sorkirin.

Babilî û Misiriyên kevn, her yek ji wan xwedî curenivîseke taybet bû. Wan ji bo her peyvekê tîp ango nîşanek diyar kiribûn, lê ji ber nebûna pênûs û kaxezê, nivîsîna wan dereng pêş diket. Babiliyan herî dixist nava qalibên taybet, piştre bi amûreke ser tûj, tiştên dixwestin li ser dinivîsîn û paşê dixistin nava agir an jî datanîn ber tava rokê da ku zuha û sor bibe. Ger tiştek li cem wan pir girîng bûya weke yasa û bernameyên olî, bi amûreke kanzayî li ser kevirekî mezin dikolan, weke mînak: Zagona "Hamûrabî" berî çar hezar sal, li ser kevirekî hatiye kolan. Her wiha 2000 sal berî zayînê, Hûriyan jî berhemên xwe li ser keviran nivîsîne.

Misiriyan jî, destpêkê li ser keviran dinivîsîn, lê piştre pelçimê dareke taybet ku ji Dola Nîlê tanîn, qamîş dixistin nava diwêdê û li ser wan pelçiman dinivîsîn. Medan jî, qamîş li diwêdê hiltanîn û bi wê qamîşê berhemên xwe li ser çerm dinivîsîn.

**Ev mijar bi hin destkar ji pirtûka (Ziman û Edebê Kurdî) hatiye girtin.**







## PEYV

**Kanza:** Maden

**Diwêd:** Ximav/ Hibir

**Qamîş:** Çîq

**Çerm:** Kevilê hatî paqijkirin.

## PIRS

**1-** Çima di demên kevn de, mirovan nivîsên xwe diavêtin nava agir, an jî datanîn ber tava rojê?
**2-** Medan, berhemên xwe li ser çi dinivîsîn?
**3-** Hûriyan, kengî berhemên xwe li ser keviran nivîsîne?

## RÊZIMAN

**Ji aliyê wateyê ve hevok:**

Hevok li gorî wateya xwe ango peyama ku jê derdikeve tên dabeşkirin.

Her wekî hevokên "ragihandinî, fermanî, navberî, erênî / neyînî, pirsyarî, baneşanî, divêtî, bilanî, karînî"...

**Cureyên hevokan:**

### 1- Hevokên ragihandinî:

Hevokên ku di derbarê rewş û tevgerekê de agahî û ramanekê bi riya

ragihandinê didin, hevokên ragihandinî ne.

Mînak:

Berî sê rojan li vê taxê agir bi sê malan ket.

Ez ê sibê gazî hevalên xwe yên dibistanê bikim.

### 2- Hevokên fermanî:

Di van hevokan de fermanek heye, ji yekî yan jî ji hinekan pêkanîna karekî tê xwestin.

**Mînak:**

Mêvan hatin, derî veke.

Tiştên min ji te re gotin, ji kesî re mebêje.

### 3- Hevokên navberî:

Ji bo di nava hevokekê de mirov mijarê hê baştir rave bike, mirov hinek hevokên biçûk dixe navberê, ji van hevokan re hevokên navberî tê gotin. Ev hevok dema ku ji nava hevoka mezin bêne derxistin, wateya hevokê xera nabe.

**Mînak:**

Xwedê hez ke, ez ê îsal herim ber Behra Wanê.

Dûrî haziran, hevalekî min duh qeza kiriye.

## HÎNDARÎ

1- Xalbendiyên pêwîst di benda li jêr de bi kar bîne.

"Ger tiştek li cem wan pir girîng bûya weke yasa û bernameyên olî bi amûreke kanzayî li ser kevirekî mezin dikolan weke mînak Zagona Hamûrabî berî çar hezar sal li ser kevirekî hatiye kolan Her wiha 2000 sal berî zayînê Hûriyan jî berhemên xwe li ser keviran nivîsîne"

## WANE 5

# HOZAN IM

Hozanvanek im hatime vê derê,
Heya hebitin dengê began,
Nivîskar im li ser kaxeza spî
Ne diçim mizgeftê, ne diçim
dêrê Ger li çolê tazî jî bimînim,
Dikim qîrîn û hawar,
Çend jî xizan û birçî bimînim,





Dilê min ji bo wan lê dide,
Qeder wê her rojekê bikene,
Wê bê gotin navê miletê belengaz, Hêdî
hêdî wê pesnê min bê gotin, Zarok wê
bixwînin bi nivîsandinê bêjin,
Rojên dilşewatî wê derbas bin,
Wê bibin rojên serbilind û xweş,
Wê bi zanabûna
xwe, Ji koletî û stema began dûr bikevin,
Gul wê çêbin wek demsala biharê,
Mêrg û zevî tim wê şîn be!
Ava zelal dê bizê ji serkaniya,
Namîne Feqiyek li ber deriya,
Jiyanê hez bikin û tim şer bikin,
Hûn jî jin, zarok û hûn hemî,
Li hember began, hember zorê.

**Feqiyê Teyran**

## PEYV

**Hozanvan:** Helbestvan

**Dêr:** Cihê nimêj û îbadeta xiristiyanan

**Mizgeft:** cihê nimêj û îbadeta mislimanan

**Xizan:** Hejar , feqîr

**Koletî:** Kesê bindest , Evdîtî

**Stem:** Zor, Zulm

**Tim:** Berdewam

## PIRS

**1-** Di helbestê de dijberiya helbestvan piranî, li hemberî kê ye?

**2-** Helbestvan, li hemberî zor û stema began berxwedaniyeke çawa nîşan daye?

3- Feqiyê Teyran, kengî ji dayîk bûye?

## RASTNIVÎS

**Nivîsa li jêr, sererast bike.**

"Ji kolîtî û sîtema began dur bikvên,

Gul wê çêbin wek densala biharê,

Merg û zevî tim we şin be."

## CUR Û AWA

Feqiyê Teyran di helbesta xwe pêşbînî û kêfxweşiyên xwe bi pêşerojê tîne, dizane ku dê rojek were bindest û jar ji bindestiyê xelas bibin. Ev helbest helbesteke lîrîk e.

**Helbestên lîrîk:** Ew helbestên ku hest tê de li pêş e, bi

rengekî coş û peroş tên vegotin.

Helbestên lîrîk ji ramanê bêhtir deng li hestan dikin, balê dikişînin li ser hestan.

Helbesta we xwendî reseniya wê ji hûnandina Feqiyê Teyran e, lê ji ber ku bi zimanê biyanî hatiye wergerandin, lewma jî ziman û gotinên helbestvan weke xwe nemane, tenê naveroka wê parastî maye.

## HÎNDARÎ

Tu jî helbestekê peyda bike, ji ber bike û di refê de bixwîne.

## WANE 6

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ



كردستان

Dîroka rojnamegeriya kurdî ji ber rewşa dagirkerî û çewisandinê, xwedî temenekî kurt e. Yekemîn rojnameya kurdî bi navê "Kurdistan" di roja 22’yê Nîsana 1898’an de li Qahîra paytexta Misirê dest bi weşana xwe kiriye. Ev rojname ji aliyê Miqdad Elî Bedirxan ve hat amadekirin. Bedirxanî, malbateke kurdên Botanê ne û li hemberî dagirkeriya Osmaniyan serî rakirine û li wê herêmê begîtiyeke kurdî ava kirine. Piştî şikestin û dûrxistina wan ji Kurdistanê piraniya kesên wê malbatê, giraniya xwe dane ser xebata rewşenbîrî û têgihandina gelê kurd.




Rojnameya Kurdistan, ji ber destûrnedana Osmaniyan bi neçarî li derveyî welat û Misirê dest bi weşana xwe kiriye. Vê rojnameyê, di çar salên temenê xwe de, çend cih guhertin. (Misir, Cenêv, London, Folksiton) Di van çar salan de, sih û yek jimar ji vê rojnameyê hatin weşandin. Rojnameya Kurdistan, bi zimanê kurdî û tirkî û bi tîpên erebî derdiket. Di her weşanekê de du hezar rojname dihatin weşandin. Naveroka Rojnameya Kurdistan ji

aliyê ramyarî, dîrokî, olî û civakî ve dihat dagirtin.

Nivîskarê rojnameyê di gel zorî û zehmetiyên çapkirinê, rêdikir Kurdistanê û di nava gel de belav dikir. Rojnameya Kurdistan weke hîmê bingehîn ê rojnamegeriya kurdî tê zanîn. Bi vê yekê re xebata rojnamegeriya kurdî li Kurdistan, Tirkiye

- derveyî welêt hat domandin ku îro em xwediyê dehan rojname
- kovarên cur bi cur in.

## PEYV

**Kovar:** Komenivîsên bi awayekî rêk û pêk weke pirtûk tên weşandin.

**Rojname:** Komenivîsên bi awayekî bi rêk û pêk rojane tên weşandin.

**Weşan:** Belavkirin

## PIRS

**1-** Çima yekemîn rojnameya kurdî, li derveyî Kurdistanê derket?
**2-** Mijarên sereke, di Rojnameya Kurdistan de çi bûn?
**3-** Cihê Rojnameya Kurdistan, di nava rojnamegeriya kurdî de diyar bike?

## RASTNIVÎS

**Cotxal: (:)**

**1-** Dema ku mînak tên rêzkirin cotxal tê bikaranîn.
**Mînak:**

Dengdêrên dengkurt**:** i, e, u

## RÊZIMAN

### 4- Hevokên erênî:

Hevokên erênî diyar dikin ku karê ku lêker radigihîne hatiye kirin, tê kirin an jî dê were kirin. Ev cure hevok bi alîkariya forma erênî ya lêkeran saz dibin.

**Mînak:**

Şaredariyê li vê derê avahiyeke xweşik çêkir.

Hevalên min dê alîkariya me bikin.

### 5- Hevokên neyîniyê:

Neyînîbûna lêkeran bi qertafên neyînî, neyînîbûna rengdêr

û navdêran jî bi daçekên neyîniyê pêk tê. Ev cure hevok karê ku lêker radigihîne, nehatiye kirin, nayê kirin an jî dê neyê kirin nîşan didin.

**Mînak:**

We karê xwe baş nekir.

Ez sibe nayêm dibistanê.

Ew hevalekî ne baş e.

Koçer ne şagirt e.

Bi alîkariya gihaneka “ne... ne”, “nema” û “hew” em hevoka erênî

dikin neyînî.

Çû malê û hew vegeriya.

Ne min ew dîtin, ne jî wan ez dîtim.

## WANE 7

# CEM BIJÎŞK

(Taştêya xwe xwarin, Zînê sifrê dide hev, Bedo alîkariya diya xwe dike, Biro çixareya xwe pêxistiye, di wê demê de, deriyê wan yê hewşê vedibe, jineke gundî, kurikekî bi jana birîna reş ketî, li pişta wê ye, di derî re tê hêwanê, navê wê, Xensê ye.)

**Xensê:** Mala bijîşk li vir e, efendî?

**Bedo:** Erê, dayê ev e.

**Xensê:** De ka lawo, bi xêra xwe banî bijîşk bike.

**Bedo:** Bêje yadê, bijîşk ez im.

**Xensê:** De lawo, dev ji min feqîrê berde, kuro, ma ez a tinaza me, tu dibînî lawikê min nexweş e.

**Bedo:** Çi tinaz! Bi rastî bijîşk ez im, çima tu bawer nakî?

**Xensê**: Pey… yû… û! Ma bijîşkê kurmanc, hene keko?

**Bedo:** Hene. Va ez.

**Xensê:** Lê bavê min digot: Bijîşk yekî pir xurt û mezin e.

**Bedo:** Hema çi gotibe, ez im, netirse.

**Xensê:** Mala Xweda sed carî ava, îcar bijîşk ji me jî çêbûne.

(Lawikê Xensê hîn li pişta wê ye, ji kêfa re şaş bûye, ji aliyekî dua dike, hema diçe û tê û ji xwe re diaxive. Jiyana Zînê ya borî weke şelîta sînemayê tê ber çavên wê û bi kul û kelûgirî, li wan dinêre.)

**Zînê:** Erê keça min, erê! Çawa bijîşkê kurmanc tunene, kî biçe dibistanê û bixwîne, kurmanc jî be, dibe her tişt. Kê ji te re gotiye kurmanc nabin tiştek, nîvên karmendan giş kurmanc in, lê newêrin rebena, xwe lê nakin xwedî lawo.

**Xensê:** Belê, Weleh yadê wê salê hikumet hat, li gundê me dibistanekê çêke, yekî xwediyê gund hat û nehişt, li pêş me gişan got: Kurmanc nabin tiştek, wê çi bikin ji dibistanê!

**Xensê:** De bila lawê min, bila ez gorî te bim.

**Zînê:** Ma lawo te xêr e!

**Xensê**: Xêr li te yadê, Weleh me lawikê xwe anî cem bijîşk.

**Biro:** De Zînê, we dayê li ser lingan hişk kir, ka bila rûne.

**Zînê:** Erê, Weleh Biro, gotina te ye. De keça min, ka were rûne, lawikê xwe veke. Xensê bi fedî û tirs zaroka xwe ji pişta xwe datîne û li Bedo dinêre.

**Xensê:** De ez goriya we gişa bim Rebî. (Bedo diçe ba wan û radihêje destê lawikê nesax ku di nava paçik û qepala de bûye weke çêlîkeke meymûnan, laşê wî ji birîna reş qelişî ye.)

**Bedo:** Ev lawikê spehî nesax e? De ka ez bibînim, na, na netirse, ez kekê te me lawo, ka, ka destê xwe yê xweşik, kurikê min, maşalah gelekî baş, sibehî werin nexweşxaneyê, wê zû sax bibe înşallah…

***Ji pirtûka "Birîna reş" hatiye girtin***

***Apê Mûsa***

## PEYV

**Taştê:** Xwarina serê sibehê

**Bijîşk:** textor

**Nesax:** Nexweş

## PIRS

**1-** Çima dayê Xensê bawer nedikir ku bijîşkekî kurd heye?
**2-** Nêzîkatiya bijîşk bi dayîkê re çawa bû?

## CUR Û AWA

Ev şano, şanoyeke **trajîk** e.

Şanoyên xemginî (trajîk), aliyê dilşewatî yê jiyanê bi hin rêbazên xweser li ser dikê tên pêşkêşkirin, ji bo temaşevanan qencî û başiyê nîşan didin, her wiha ev cureşano, bi temaşevanan re hestekî tirs, coş û dilpêvemanê nîşan dide.

## 6- hevokên pirsyarî:

Ev cure hevok bi riya pirsê dixwaze agahiyan wergire, gumanan ji holê rake. Di van hevokan de her tim pirsek heye, lewra jî divê li hember bersiv jî hebe.

**Mînak:**

Kî ji bajêr hat?

Çi hat serê te?

**7- Hevokên xwestekî:** Di van hevokan de xwestekek heye.

**Mînak:**

Xweziya hevala min bihata.

Xwaziya ciwanî bi dest mirov biketa.

Xwezî îsal baran pir bibare.

**8- Hevokên baneşanî:** Di van hevokan de hestên tirs,xem kêfxweşî, kelecan, matmayîn û hwd tên diyar kirin.

**Mînak:**

Çi zarokekî xweşik e!

Ew gund çi qas dûr bûye!

Çi dengekî xweş li ser e!

## HÎNDARÎ 5

**1- Bi derketina nivîsê re, kîjan ji têgehên li jêr rast e?**

**a-** Bi derketina nivîsînê re dîroka nivîskî dest pê dike.
**b-** Nivîs hestên mirovan lewaz dike.
**c-** Bi nivîsînê gelên bindest azad dibin.
**d-** Nivîsîn, bingehê dewlemendiya aboriya civakê ye.

**2- Helbesta “Hozan im” ji hûnandina kîjan helbestvanên li jêr e?**

**a-** Ehmedê Xanî **b-** Feqiyê Teyran
**c-** Pertew Begê Hekarî **d-** Melayê Cizîrî

**3- Kîjan ji rojnameyên li jêr, yekemîn rojnameya kurdî ye?**

**a-** Kurdistan **b-** Niştîman **c-** Roja Nû **d-** Jîn

**4- Kesê yekemîn ê rojnameya kurdî derxistî, kî ye û kengî weşandiye?**

**a-** Celadet Bedirxan -1898

**b-** Miqdad Elî Bedirxan -1898

**c-** Kamûran Bedirxan - 1914

**d-** Osman Sebrî -1933

**5- Çima yekemîn rojnameya kurdî, li derveyî Kurdistanê derket?**

**a-** Ji ber nebûna rojnamevanên kurd.
**b-** Ji ber lewaziya zimanê kurdî.
**c-** Ji ber dagirkeriya li ser Kurdistanê.
**d-** Ji ber sedemên aborî.

**6- Nîşaneya "cotxal" di kîjan rewşê de tê bikaranîn?**

**a-** Li dawiya hevokên neyînî.
**b-** Di bêhndanên kurt ên di navbera hevokê de.
**c-** Piştî jimarên rêzkirinê.
**d-** Pêşiya axaftina kesekê/î.

**7- Kîjan endamê vê hevokê, dibe bireser?**

"Sorgula xwendekar rojnameyan belav dike."

**a-** Xwendekar **b-** Rojnameyan

**c-** belav dike **d-** Sorgul

**8- Di hevoka: "Gel bi coşeke mezin Newroza xwe pîroz kir" de. Peyva "gel" kîjan ji endamên li jêr e?**

**a-** Kirde **b-** Têrker
**c-** Bireser **d-** Lêker

**9- Hemwateya peyvên li jêr, binivîse:**

a- Girêftarî
b- Balinde
c- Şax
d- Şanaz

**10- ji hevokên li jêr, yên rast bi tîpa (R) û yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bike û yên şaş sererast bike.**

1- Ew nîşaneya ku pirsê çêdike û li dawiya hevokan tê bikaranîn, jê re pirsnîşan tê gotin. ( )
2- Ew peyva ku ji kirina karê kirde yekser bandor dibe, jê re lêker tê gotin. ( )
3- Ji lihevhatina du dengan ya li dawiya rêzikên helbestê re, bareya tam tê gotin. ( )

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Hefte / Meh | Hefteya yekem | Hefteya duyem | Hefteya sêyem | Hefteya çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Giringiya Xwendinê | Binefşa Narîn |
| Cotmeh | Tê sotin nayê gotin | Serhildana12' ê Adarê | metelok | - Govend<br>- Qedemxêr |
| Mijdar | Ez mamoste me | - Zembîlfiroş<br>- Pêşengê serhildanên gel | - Mijara serbest<br>Nalîn | -Cegerxwîn |
| Berfanbar | - Keleşîn<br>-Hizirîn û Bawerkirin | Rojek ji rojên biharê | Ciwan û pêşengî | - Zozanên Fereşînê |
| Rêbendan | - Peyama Ş. Zîlanê<br>- Hêvîdarî | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | - Doz<br>- Sinc | - Girîngiya ziman | 29 Sal di riya Azadiyê de | Baz û ordek |
| Avdar | Serpêhatiya Mûsa Enter | Pendên Pêşiyan | Wêje xemla ziman e | Nivîsîn |
| Cotan | Hozan im | Rojnamegeriya Kurdî | Rojnamegeriya Kurdî | Cem Bijîşk |
| Gulan | Cem bijîşk | NIRXANDIN | | |

# RÊZIMANA KURDÎ

## AMADEYÎ 1

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

BEŞA YEKEM ........................................................... 7
ZIMAN ÇI YE? ........................................................... 8
GIRÎNGÎ Û TAYBETIYÊN ZIMAN ................................... 10
CIH Û GIRÎNGIYA ZIMAN DI JIYANA CIVAKÊ DE .. 13
TÊKILIYA ZIMAN Û ÇANDÊ ........................................... 15
BEŞA RÊZIMANÊ .......................................................... 17
BIRÊN ZIMAN ÊN SERBIXWE Û CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ DI NAVA ZIMANÊN CÎHANÊ DE ...................... 19
PÊŞKETINA DÎROKÎ YA NIVÎSA KURDÎ ...................... 22
BEŞA DUYEM ............................................................. 31
DENGNASÎ ................................................................... 32
DENGDÊR Û TAYBETIYÊN WAN................................... 36
DENGDAR Û TAYBETIYÊN WAN ................................... 39
HEVGIRTINA DENGAN, KITE Û ÇÊBÛNA WAN ...... 43
BEŞA SÊYEM ............................................................. 47
PEYVNASÎ.................................................................... 48
BEŞA ÇAREM ............................................................. 59
KOKNASÎ ..................................................................... 60
CURE Û TAYBETIYÊN PÊVEKAN................................. 64
RAWE Û CUREYÊN WÊ ................................................ 76
VEQETANDEK Û BEŞÊN WÊ......................................... 84
CÎNAV Û CUREYÊN WAN ............................................ 87
BEŞA PÊNCEM ............................................................ 93
DESTÛRÊN NIVÎSÊ ...................................................... 94
XALBENDÎ................................................................. 100

# BEŞA YEKEM

**1- Ziman çi ye**

**2- Girîngî û taybetiyên ziman**

**3- Cih û girîngiya ziman di jiyana civakê de**

**4- Têkiliya ziman û çandê**

**5- Beşa rêzimanê**

**6- Birên ziman ên serbixwe û cihê zimanê kurdî di nava zimanên cîhanê de**

**7- Pêşketina dîrokî ya nivîsa kurdî**

# ZIMAN ÇI YE?

## DAXUYANIYÊN KURT

Em dizanin ku mêş, mîro û masî bi nîşandayîna hev, ji hev û du digihêjin. Em mirov, daxwaz û armancên xwe bi nîşanên dest, tilî, serî, çav û rûyê xwe (zimanê bedenî) didin têgihaştin. Lê, ev rêya têgihaştinê ya pir hêsan e. Di gelek mijarên cur bi cur de, ji bo têgihaştina hest û ramanên xwe, ji bo ku bi tevahî bidin diyarkirin, pêdiviya me bi ziman heye. Ziman, rêbaza nîşanên bi deng e û amûra ragihaştinê ya herî pêşketî ye.

Ziman, bingehê xwe ji peyvê digire. Çêbûna deng û wateya peyvê, herikandin û rêzkirina wê, di nava hevokê de bi hin destûrên diyar ve girêdayî ne.

Ev destûr, di pêkanîna ziman a pêvajoyeke dirêj de, bûne destûrên ziman. Di navbera peyv, heyîn an jî tevgerên ku tên têgihaştin de, girêdaneke diyar heye. Ev girêdan, di fêrbûna pêvajoya ziman de, di mejiyê mirovan de bi cih dibe. Ji ber vê yekê, çend kesên ku bi heman zimanî diaxivin, li ser wateya peyvan bi hêsanî li hev dikin.

Peyvên weke; dar, çiya, firîn... Di mejiyê me hemûyan de heman wateyê diyar dikin. Ev dide xuyakirin ku ziman jî ji aliyê hevkariya civakê ve derketiye holê.

Ji van daxuyaniyên kurt ên heya niha, mirov dikare van encaman derxe:

- Ziman, rêbaza nîşanan a bi deng e.
- Zimanekî ku bingehê wî pir kevn be, destûrên ku ji xwezaya wî derketine, hene.
- Ziman, pergaleke pêşketî ya ragihandinê ye.

- Ziman, saziyeke ji aliyê hevkariya civakê ve hatiye pêkanîn.

## PIRS

**1-** Ziman çi ye? Şîrove bike.
**2-** Çima ziman pergala pêşketî ya ragihandinê ye?

# GIRÎNGÎ Û TAYBETIYÊN ZIMAN

## A- Girîngiya Ziman

Zarok, di nava civakê de tên mezinkirin. Ji aliyê biyolojîk ve mezin dibin; fêrî tiştên li derdora wan diqewimin dibin. Heyîn, tişt û çalakiyan bi nav dike. Bi vî awayî, bi wî zimanî re, hunera hizirînê jî bi pêş dikeve. Zarok, di nava mezinbûnê de bi qasî fêrbûna ziman, bi tiştên li derdorê çêdibin jî dihesin. Ev ji aliyê ramanê ve, dibe sedema pêşketinê.

Destpêkê, ziman yek ji pergalên ragihandinê ye, têgihaştina me û kesên din pêk tîne. Ziman nebe; mirov ji hev û du tênagihêjin; em nikarin bi mirovên ji xwe dûr re danûstandinê bikin. Pergala ji bo perwerdeyê ya herî baş, ziman e. Ji ber ku agahî; bi gotin û nivîsê tên ragihandin. Ji bo pirtûkan, pêwîstî bi ziman heye. Ji bo dayîna waneyan jî, her wisa ye. Diyar e bê ziman perwerde û hînkarî nayên kirin. Ziman, pergaleke ji zanistê ye. Ji ber ku nivîsandin û belavkirina encamên lêkolînan, ji nifşekî ragihandine nifşekî din. Hest û raman hebûna xwe bi riya ziman diparêzin. Ji sedsalekê digihîne sedsaleke din. Ziman nebe; kombûna zanistê çênabe û nirxên
çandî yên sedsala tê de ranagihînin sedsala pişt xwe re. Civak bê ziman, ziman jî bê civak nabe. Têgihaştina bi ziman, di pêvajoya pêşketina mirovan de dema herî girîng pêk tîne.

## B- Taybetiyên Ziman

Zimanê ku xwedîçêbûneke têkilhev û pir alî be, destpêkê bi van taybetiyan ji hev tê cudakirin.

## 1- ZIMAN HEBÛNEKE ZINDÎ YE

Ziman, bingehê xwe ji peyvê digire. Peyv, heyînek e ku her tim tê bikaranîn e. Di nava herikîna jiyana giştî de, ji hin

aliyan ve tê guhartin. Dibe ku peyv, ji aliyê deng û awayan ve bê guhartin.

Weke mînak: Peyvên "spîh, êstir, kehnî" bi demê re, ji aliyê deng ve hin guhartin çêkirine û bûne "spî, stêr, kanî." Dibe ku peyv bi giştî bê guhartin, peyvek biçe û peyveke din cihê wê bigire. Di vir de bi taybetî guherîna di aliyê çandî de bi bandor e.


Ji aliyê din ve, ziman bi derketina pergalên nû û hilberîna hemdem re peyvên nû jî derdixe holê û xwe dewlemend dike.

Peyvên weke; komputer, roman, bêtêl pêdiviya tegihaştina hin peyv û tiştan e. Ev rewş, bi giştî dide xuyakirin ku ziman jî xwediyê jiyanekê ye û mîna zindiyên din, di pêvajoyekê de guhartina wî çêdibe.

## 2- ZIMAN SAZIYEKE CIVAKÎ YE

Ziman; pergala têgihaştin û ragihandinê ya di navbera mirovan de ye. Ziman, heyîneke ku ji aliyê hevkariya civakê ve derketiye holê. Ziman, hebûneke hevbeş a ku civak pêk tîne ye.

Bi rastî jî pêkhatin û pêşketina ziman, bi heyîna civakê ve girêdayî ye. Peyama veşartî ya di navbera peyv û hebûna wê de hembêz dike. Peyvên zimanê me yên weke; roj, av, kulîlk, rez, kenîn, girîn, axaftin û pêşketinê mînak in. Ev peyv, di hizirê mirovan de heman tiştî zindî dikin. Her çi qas ji aliyê axaftinê ve hin destûrên ziman hebin jî, lê guhartinên di ziman de çêdibin, li gel van



rêgezên bingehîn, li gorî guhartina civakê awayan digire. Weke bi hatina islamiyetê re guhartinên di civakê de çêbûne, bandor û guhartinek li ser zimanê me çêkiriye.

## 3- ZIMAN DIYARKERÊ RAMANÊ YE

Ziman û raman di nava pêşketineke ahengdar de ne. Bi qasî pêşketin û dewlemendiya ziman, asoya ramanê jî ew qas fireh dibe. Bi vî awayî, mirov bêhtir dibihîze, dihizire û darazandinê dike. Li ser vê, mirov çi qas bi berhem dihizire jî zimanê wan ew qas tê têgihaştin.

Tiştê herî girîng ê ku mirovan peyda kiriye, ziman e. Ronahiya raman û tîrêjên hişê mirov, herî baş di ziman û berhemên ziman de xuya dibin.

# CIH Û GIRÎNGIYA ZIMAN DI JIYANA CIVAKÊ DE

## Daxuyanî

Di nava hebûna civakê de, cihekî pir girîng ê ziman heye. Ji ber ku ziman, di nava mirovan de, di pêkanîna hest û ramanên hevbeş de, ji bo pêkanîna yekîtiya civakî pergaleke girîng e. Ziman, bi nirxên çandî yên hevbeş ji nifşekî derbasî nifşekî din bûye, di navbera dema borî û niha de girêdanekê çêdike. Ev girêdan, li gel mirovan bi avakirina zanîna dîrokî re baweriya wan a pêşketinê pêk tîne.

Dema ku em girîngiya hebûna ziman a ji bo civakê diyar dikin, ji ber ku wêje jî hunera xwe ji ziman digire, pêwîst e em li ser rewşa wêjeyê jî rawestin. Hemû civak, hestên xwe bi berhemên wêjeya xwe ya ku bi ziman pêk hatiye, derdixin holê.

Berhemên weke; destan, stran, helbest, çîrok û lorikan bi demdirêjiya sedsalan derxistine holê, mînaka vê ya herî berbiçav e. Bi rastî jî, di jiyana civakan de yekîtiya ziman pir girîng e. Civaka ku yekîtiya zimanê xwe winda kiriye, bi hêsanî ji hev dikeve û dikeve bin desthilatdariya civakeke din. Pêwîst e, civak yekîtiya zimanê xwe biparêze û bijî. Ji ber ku ziman, girêdana di nava hemû mirovên wê civakê de, her tim zindî dihêle. Civaka ku xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê jiyaneke bihêz û watedar. Asta pêşketina ziman, asta pêşketina jiyanê ye. Civakek çi qas zimanê xwe yê dayîkê bi pêş de biribe, ew tê wê wateyê ku asta xwe ya jiyanê jî bi pêş de dibe. Dema ku mirov li dîroka civaka kurd binêre, ev rastî pir aşkere tê dîtin.

Piştî rûxandina Konfederasyona Medan, gelê kurd; ji ber ku zimanê xwe parastiye, hebûna xwe ya civakî jî parastiye.

Her çi qas desthilatdaran parçebûna zaravayên kurdî kiribin sedema parçebûn û pişaftina kurdan jî, lê girêdana kurdan a di warê ziman de nehişt ku civaka kurd di dîrokê de tune bibe.

Bi kurtasî, pergala herî girîng a ku civakan dikin civak, ziman e. Ji ber ku ziman saziya nirxên civakî yên hevbeş pêk tîne, pêş dixe û dide jiyankirin. Weke: hest, raman û aşop jî bi ziman re bi pêş dikevin. Ji ber vê yekê, di jiyana civakê de cih û girîngiya ziman pir mezin e.

## PIRS

**1-** Ziman, ji bo civakan tê çi wateyê?
**2-** Girîngiya di navbera ziman û wêjeyê de çi ye?

# TÊKILIYA ZIMAN Û ÇANDÊ

Têgeha ziman, girêdaneke xwe ya xurt, bi têgeha çandê re heye. Di çarçoveyeke teng de, ziman bi awayekî bingehîn têgeha sereke ya qada çandê ye.

Di çarçoveyeke teng de mirov dikare ziman weke çandê jî bide naskirin. Em dikarin bi awayekî giştî çandê, weke yekparebûna tevahiya watedan û avahiyên civaka mirov a ku di pêvajoya dîrokî de pêk aniye, bidin naskirin. Ev avahiyên ku pêk hatine; weke tevahiya saziyên ji veguhartinan re vekirî ne, didin naskirin û watedanan jî, dikarin weke asta naverok an jî watedanê ya saziyên dewlemend û cur bi cur bidin naskirin.

Her wiha, jiyan û hizirîna gelan ji hev cuda ne, di nava dîrokê de danûstandinên wan, şîrovekirina bûyeran, nêrîna wan a li cîhanê jî cuda cuda ne. Ji ber vê, cil û berg, lîstok, govend, amûrên malê, pergalên kiştûkal, (gêsin, mer, tevr û bêr, kudika bêrîvaniyê, meşk, cuhnî, destar û hwd.) û baweriya wan a li ser gelek mijaran bi tevahî bi ser yê her welatî ve naçe.

Çand, têgeheke zanistê ye ku hemû taybetiyên civakê tê de tên şîrovekirin. Endamekî girîng ê çandê, hunerên bedew in. Bi rastî jî muzîk, wêje, avahîsazî û hunerên weke van, bi taybetiyên naverok û awayên di nava çanda civakî de ji nifşekî ta nifşekî din dihat guhartin û derbaskirin.



Li vê derê jî muzîk, wêje, stran, heyranok û lawik, ji avahîsaziyê jî mirov dikare kelhe û piran weke mînak nîşan bide. Ev hin mînakên ji bo têgeha xemilandin û avakirina civaka me ne. Mirov vê berfirehtir di nexş, nîgar, amûrên aşxane û cil û bergan de dikare bibîne. Di nava endamên ku çandê pêk tînin de, yê herî girîng ziman e. Destan, çîrok, gotinên pêşiyan û hemû nivîsên ku ji bo perwerdeyê tên bikaranîn, bingehê çandê yê sereke ne û ev jî bi ziman pêk tên. Bi kurtasî, nirxên wêjeya

devokî û nivîskî ku bi hebûna civakî ya navxweyî ve hatine stran, bi ziman re hatine naskirin û ji nifşekî derbasî nifşekî din bûne. Ji ber vê yekê, çanda ku ji kesayetiya netewî nayê veqetandin, zindîhiştin û jîndarkirina wê, bi parastina ziman ve girêdayî ye. Civak, bi qasî ku zimanê xwe ji dest daye û ketiye bin serdestiya zimanên din, tê wê wateyê ku ew qasî jî hatiye mêtin, qirkirin û pişaftin.

Civakên ku xwediyê vê rastiyê ne; eger jiyaneke wan a watedar a hişmendî, exlaqî û estetîk nebe; eşkere ye ku ta ji holê rabin, wê weke civakên nexweş, neçarî jiyaneke dilsotîner (trajîk) bimînin.

## PIRS

**1-** Girêdaneke çawa di navbera têgeha ziman û çandê de heye?

**2-** Civakên ku ziman û hişmendiya xwe ji dest dane, wê bi rewşeke çawa re rû bi rû bimînin? Şîrove bike.

# BEŞA RÊZIMANÊ

Ziman, ji yekeyên weke; "deng, peyv, birepeyv û hevokan pêk tê." Ji yekeyên deng ên ziman, peyv, birepeyv ji gelek aliyan ve lêkolînkirina hevokan, destûrên pêdiviya ji bo axaftin û nivîsê pêk tînin re, **"rêziman"** tê gotin. Her civak, zimanê xwe bi şêweyê zanistî lêkolîn dike, taybetiyên çêbûna wî derdixe holê û destûrên wî diyar dike. Li ser wê, rêzimana xwe saz dike. Ji ber vê yekê, rêziman weke çavkaniya lêkolînkirina taybetî û destûrên girêdayî ziman tê dîtin.

Diyar e ku tu ziman ne bêrêzik e. Deng, kite, peyv û hevok li gorî hin rêz û rêzikan pêk hatine; rêziman van rêz û rêzikan nîşanî mirov dide. Di ziman de çar warên bingehîn hene: Deng, teşe û cureyên peyvan, wateya wan, rêz û rêzikên pêkhatinê û rêzbûna wan.

## 1- DENGNASÎ (FONOTÎK):

Ji beşa ku dengên zimanekî lêkolîn dike re, "**dengzanîn**" tê gotin. Çêbûna dengan, parçebûna wan, peyv û guhartina dengan, di vê beşê de tên lêkolînkirin.

## 2- PEYVNASÎ (MORFOLOJÎ):

Ev beş, peyvan ji xwe re dike mijar. Çêbûna peyvan; di aliyê wate û erka wan de, dabeşkirina cureyên peyvan, di aliyê awa û wateyê de cur bi cur guhartinan nîşan dide, di vê beşê de tên lêkolînkirin.

## 3- HEVOKNASÎ (SENTAKS):

Ji vê beşa ku hevokan digire dest re, **"hevoknasî"** tê gotin. Di vê beşê de destpêkê sazkirina hevokê, endamên hevokê û cureyên hevokan tên lêkolînkirin.

## 4- WATENASÎ (SEMANTÎK):

Peyv, di aliyê wateyê de taybetiyên cur bi cur nîşan dide. Dema ku peyv, ji aliyê dariştî û xwezayî ve tên bikaranîn, hin wateyên din jî digirin. Ji ber vê yekê, wateya peyvan ji qada ferhengê firehtir e. Beşa watenasiyê ji sedê salan ve û di encama bikaranînan de, wateyên ku standine lêkolîn dike.

## 5- KOKNASÎ (ETÎMOLOJÎ):

Beşa koknasiyê kok û jêdera peyvan lêkolîn dike. Bi taybetî, destpêkê pêkhatina navan çawa bû, piştre guhartinên çawa pê re çêbûn, lêkolîn dike.

## PIRS

**1-** Dengnasiya zimanê kurdî, şîrove bike.
**2-** Koknasiyê şîrove bike.

# BIRÊN ZIMAN ÊN SERBIXWE Û CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ DI NAVA ZIMANÊN CÎHANÊ DE

**Têbînî:**

Her civak, xwediyê zimanekî ye. Heya îro li cîhanê 6809 ziman hatine diyarkirin. Niha jî, nêzîkî 3000 ziman bi tunebûnê re rû bi rû ne.

## DABEŞKIRINA ZIMANAN

Li gorî awayên tîp û dîrokê, ziman bi du awayan tên dabeşkirin:

### 1- DABEŞKIRINA LI GORÎ ÇÊBÛNÊ

**a- Zimanê yek kite:**

Di vî zimanî de peyv pêvekan nagirin, nakevin bin bandora guhartinê. Peyv, li gorî cihê xwe yê di hevokê de wate û erkê digirin. Zimanê çînî, viyetnamî û hin zimanên Afrîkayî jî dikevin vê beşa ziman.

**b- Zimanên bi hev ve girêdayî:**

Di van zimanan de, kok û pêvek bi hev ve tên girêdan. Bi kokê; pêvekên peyvsaz, pêvekên demê, pêvekên neyînî yan jî pêvekên kesane tên girêdan.

**c- Zimanên tewandî:**

Bi guhartina kokan an jî pêvekên cur bi cur ve, ziman tên çêkirin. Zimanê aryenî û birên zimanê samî, dikevin vê beşê.

Di kurdî de ji koka "**gotin**"; peyva "dibêje" û ji koka "**hat**"; peyva "tê" çêdibe.

Zimanê kurdî, di aliyê çêbûna xwe de, hin aliyên wî weke zimanê bi hev ve girêdayî û hin aliyên wî yên din jî, weke zimanê tewandî ye.

Weke mînak:

– Da+ket = Daket
  Hil+ket = Hilket
  Gotin = Dibêje

## 2- DABEŞKIRINA DÎROKÎ (ZIMAN LI GORÎ ÇAVKANIYAN)

Di vê beşa ziman de ya girîng kokên zimanan û rewşa wan a dîrokî ye. Zimanên ku ji kokekê û ji yek çavkaniyê derdikevin, malbateke ziman pêk tînin.

### A- Malbata Zimanê Aryenî (Hind û Ewrûpî):

Zimanên weke; kurdî, farisî, hindî, belûcî, afxanî, bulxarî, lehî (bolonî), sirbî, makedonî, rûsî, îtalî, fransizî, îspanî, îngilîzî, almanî, îsweçî (siwêsrî), norwêçî, yûnanî, arnawûtî, ermenî û hwd. digire nava xwe. Ev malbata ziman, di nava xwe de dibe du beş:

**1- Beşa Asyayê:** kurdî, farisî, hindî, belûcî, afxanî, rûsî, …
**2- Beşa Ewrûpayê:** îtalî, fransizî, îspanî, îngilîzî, elmanî,

### B- Malbata Zimanê Samî:

Zimanên sumerî, babilî, akadî, asûrî, kenanî, fînîkî, îbranî, erebî, hebeşî, misrî, lîbî û çadî di nava vê malbatê de cih digirin.

### C- Malbata Zimanê Ûral-Altayî:


**Şaxê Ûral:** finî (finlendî), macarî, estonî, …
**Şaxê Altay:** Zimanên weke; tirkî, moxolî, mançûyî (şaxeke ji zimanê çînî), tongozî, kûrî, japonî di nava vê malbata ziman de cih digirin.

### D- Malbata Zimanê çînî-tîbetî:

Zimanên weke; çînî, tîbetî, birmanî (bormayî) û viyetnamî di nava vê malbata ziman de cih digirin.

### E- Malbata Zimanê Awusturalya û Oqyanûsê:

Zimanê weke; endunusî, tava (tewrêz), malaya (zimaneke li hindistanê), maldaş (afrîkî), hawayî, polînezyayî, papoyî (papua), awusturalyayî û aranda di nava vê malbata ziman de cih digirin.



# PÊŞKETINA DÎROKÎ YA NIVÎSA KURDÎ

## DAXUYANÎ

Zimanê kurdî heya îro di van deman re derbas bûye.

**1-** Dema sumeriyan
**2-** Dema aryenî
**3-** Dema hûriyan
**4-** Dema avêsta (Med)
**5-** Kurdiya kevn
**6-** Kurdiya navîn
**7-** Kurdiya nû

Li gorî belgeyên ku di dîrokê de derbas dibin, pêşketinên dîrokî yên zimanê kurdî, bi vî awayî hatine rêzkirin:

### 1- Dema Sumeran:



Gelek nêrînên cur bi cur li ser derketina sumeriyan hene. Li gorî hin belgeyan, dibêjin Samî ne, hin jî dibêjin Arî ne.

Avabûna Sumer, êrîşên êlên komên Samî yên dijberî çanda Arî, hem di warê fîzîkî, hem jî di warê çandî de belavbûna çanda Arî ya li Mezopotamyaya jêrîn, ji senteza her duyan çanda nîjadan, derketiye holê.

Şaristanî, bi sumeran re dest pê kiriye. Her çi qas tê de bingeha şaristaniyê dijî civakê pêş ketibe jî, lê gelek vedîtinên nû yên ku çavkaniya xwe ji şoreşa neolîtîkê digirin, pêş xistine. Weke; nivîsa mîxî. Di nava çand û nivîsên mîxî yên sumeriyan de bandoreke mezin a çand û zimanê aryeniyan heye.

Weke: Nuh = nû, Gil+ga+miş = Gilgamiş (Gayê mezin) û hwd. Di vê serdemê de nivîsa mîxî 36 tîp bûn, pêşiyên kurdan jî 6 tîpên din li ser zêde kirine û weke 42 tîpan nivîsa mîxî bi pêş xistine û di warê wêjeyê de bi kar anîne.

## 2- Dema Aryenî:



Du wateyên peyva arî hene; ya yekem tê wateya agir, a duyem jî tê wateya erdê-xakê. Peyva arî, ji aliyê etîmolojî ve jî peyveke kurdî ye. Li gorî lêkolînên dîrokî, ev pêvajo ji 12000 sal B.Z. ta 4000 sal B.Z. ye, bi pêşengiya gelê kurd bi pêş ketiye. Her wiha, şoreşa ziman a ku bi pêşengiya dayîkê bi pêş ketiye, di çanda aryeniyan de bandoreke herî mezin û bingehîn lîstiye.

Koma ziman-wêjeya Aryen çi di warê ziman de, çi jî di avakirina hevsengiya hest û ramanê de xwedîkokeke kûr e. Ev jî, bi mercên erdnîgarî û dîrokî ve girêdayî ye. Salên di navbera 12000-4000 B.Z. de dema dirêj a bi cihbûn û sazbûna vê çandê û vî zimanî, rave dike. Di vê serdemê de her cure kuzikvanî, ji bo ajotina zeviyan bikaranîna nîr û lawiran, tekelek, tevn, destar, huner û hwd, saz bûye.

Her wiha, gelê herêmê îro jî van amûrên çandiniyê û komgotinên ku van amûran rave dikin, bi kar tînin. Ev jî nasnameya devera kakil an jî dendikê ronî dike. Di zimanê Ewrûpî de, îro jî bi dehan peyvên ku tên bikaranîn, mijara çavkaniyê zelal dikin. Mirov dikare hin ji van gotinan wiha rêz bike: Geo-cih, erd, jin, roj, bra, mur-mirin, sol, neo-nû, ga, gran-gram, meş, xweda-guda-gudea û hwd. Her wiha, li gorî lêkolînên arkeolojiyê yên 12000 sal B.Z bingeha nivîsa hîroglîfî jî yekem car di vê serdemê de, li Perestgeha Xerabreşkê ya li Rihayê, hatiye dîtin.

## 3- Dema Hûriyan:

Piştî pêvajoya çanda aryenan vê pêvajoyê dest pê kiriye û di vê pêvajoyê de bandora çanda aryenan diyarker e. Li gorî şûnwarnasî (arkeolojî), koknasî (etîmolojî), nijadnasî (etnolojî)

û mirovnasiyê (antropolojiyê) rêvebirina vê pêvajoyê jî bi pêşengiya kurdan çêbûye.

Komên 'Aryen' ên ji proto-kurd, fars, afxan û belûciyan di vê guftûgoyê de, li rêzên pêş cihê girîng digirin. Bi taybetî, rengê zimanê hûriyan ku proto-kurd in, diyar bû, jêdera (aîdiyeta) çand-zimanê aryen ê ku xwe dispêre gelên otantîk zelal bû. Teza ku ez bi xwe jî rast dibînim, ew e ku herêma kakil a Şoreşa Neolîtîkê tenê bi vê çand û vî zimanî çêdibe. Herêma kevan jî, ji sîstema Toros-Zagrosan pêk tê û weke **"Kevana Berhemdar"** jî tê binavkirin.



Bi vî awayî, mirov dikare bibêje ku Hûriyan (Çand û zimanê Aryenî) pêşengî ji koma ziman û çanda Hind-Ewrûpiyan re kiriye û pirsgirêkên wê yên çavkaniya ku xwe dispêre koka wê, çare kiriye.

Di serdema Babiliyan de, gelek belgeyên kurdan ên kevnar bi ABC'ya aramî hatine nivîsîn. Ev belge, li şkeftên herêma Rojhilatê Kurdistanê, li Hewramanê hatine dîtin. Her wiha, ev belgeyên kurdî yên ku li ser çermê xezalan hatine nivîsîn, hatine dîtin.

## 4- Kurdiya Avestayê:


Kurdiya Avestayê di serdema medan de bi pêş ketiye. Bi pêşengiya Zerdeşt, Avesta li gorî lêkolînan tê gotin bi 44, 48 û 60 tîpan hatiye nivîsandin. Avesta her çi qas bi tîpên pehlewî hatibe



nivîsîn jî, lê zimanê wê medî ye. Cara yekem li Rojhilata Navîn, zimanekî ku di hêla wêjeyî de ew qas dewlemend, derdikeve holê. Bi alîkariya vê wêjeya dewlemend a kurdî, pêngava wêjeyî bi pêşengiya Zerdeşt di nava farisan de bi Zendê û di nava Hindiyan de jî bi Bazendê hat avêtin.

Piştî hilweşandina Medan û şehîdbûna Zerdeşt, pêşketina di wêjeya kurdî ya nivîskî de lewaz bû, lê piştî hatina Îskender (330 B.Z.) qirkirineke mezin li ser ziman û nivîsa kurdî pêk hat, di encama vê qirkirinê de 17 bergên li gel Avestayê û gelek nivîsên din jî hatine tunekirin.

## 5- Kurdiya Kevn:



Ev dem, bi hatina yûnaniyan re dest pê kir û ta hatina îslamê dom kiriye. Di vê pêvajoyê de her çi qas gelê kurd bi tîpên farisî û romî (yûnanî) hin berhemên wêjeyî nivîsî bin jî, lê bi awayekî giştî, gelê kurd wêjeya xwe bi devokî parastiye. Zimanê wî zêde neket bin bandora zimanê biyanî, lê nikarîbû di nava xwe de jî nûbûn û guhartinan çêke.

Di vê serdemê de ji aliyê êzîdiyan ve (31) tîp hatine bikaranîn. Bi van tîpan, pirtûkên xwe yên pîroz; Mishefa Reş û El Cilwe nivîsîne. Marfet û Pîr Şalyar nivîsên wan bi awayê helbestî hatine nivîsîn û pêşxistin. Bi piranî, helbestên wan li ser çerman hatine nivîsîn.

## 6- Kurdiya Navîn:

Di sala 640'î de islam derbasî Kurdistanê dibe û bi hatina islamê re ABC'ya erebî di nava kurdan de bandoreke neyînî çêdike û serwer dibe. Di vê serdemê de, herî zêde di nava civaka kurd de, ji aliyê çand û ziman ve pişaftin bi pêş dikeve. Weke; navên erebî li zarokên xwe kirin, guhartina cil û bergan û hwd. Berhemên ola islamê, li Kurdistanê bi erebî hatin xwendin û nivîsandin.

Di bin bandora ABC'ya erebî de bi tîpên erebî, berhemên kurdî jî hatin derxistin. Her çi qas hizirîn bi kurdî jî be, ji ber ku bi zimanê erebî ev berhem hatine nivîsîn, her ku çûye, bandora zimanê erebî zêde bûye. Ji salên 900 ta salên 1600 gelek berhemên nivîskarên kurd, nîv bi nîv erebî derketin. Weke; Dîwana Baba Tahirê Hemedanî, Mewlûda Melayê Bateyî, Dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî û hwd.  Piştî ku Kurdistan ji aliyê dagirkeran ve dabeşî çar parçeyan bû, bandorên zimanê erebî, farisî û tirkî li ser çand, ziman û dîroka civaka kurd çêbû. Heya ku gelek hozanên kurd helbestên xwe yên kurdî wergerandin tirkî, farisî û erebî.



Gelek zanyarên kurd jî, berhemên xwe bi zimanê tirkî, farisî û erebî nivîsandine.

## 7- Kurdiya Nû:

Karwanê huner û wêjeya kurdî bi destan, çîrok, helbest, stran û cureyên din ên zargotinî ji kûrahiya dîrokê dest pê kiriye - heta serdema niha berdewam kiriye. Kesên weke; Celalê Xanima Loristanî, Fatma Lariya Goristanî, Mestûra Kurdistanî Sîne, Nalî Şarezorî, Hacî Qadirê Koyî, Pîremerd, Celadet Elî Bedirxan, Mîthat Mîqdat Elî Bedirxan, Erebê Şemo, Qanadê Kurdo, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Mihemed Uzun, Mûsa Anter, Şêrgo Bêkes, Rêber Apo û hwd.

Gelek wêjevanên kurd ên bi nav û deng bi berhemên xwe ve, ev çand û zimanê kurdî gihandine roja me ya îro. Tê zanîn ku di vê pêvajoyê de gelê kurd 28 caran li dijî siyaseta mandel û tunekirinê ketiye nava serhildan û berxwedanan. Mirov dikare kurdiya nûjen, bi rojnameya "Kurdistan" (1898), - pêşengên wê Celadet Bedirxan û weke şopdarên wan Erebê

Şemo, Qanadê Kurdo bigire dest. Ev pêvajo, ji aliyê ziman û çanda kurdî ve jî pêvajoyeke berxwedanê ye.


Gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd, di van pêvajoyan de ketine nava têkoşîna çand û zimanê kurdî û ji bo bipêşxistina wan hewl dane. Ta wan deman, ev xebat ji derveyî welat hatibin birêvebirin jî, lê bi giranî girêdayî rastiya kurd û Kurdistanê hatine birêvebirin. Bi pêşketina vê pêvajoyê re ta salên 1970'yî berdewam dike.

Lê piştî derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê, êdî rewş tê guhartin. Piştî damezrandina vê tevgerê û şûn de, êdî ev xebat hem li derveyî welêt û hem jî li welêt hatine birêvebirin.

Di bin pêşengiya vê tevgerê de, wêjeya kurdî ya ku ji aliyê ereb, faris û tirkan ve hatiye talankirin, pişaftin û qedexekirin; careke din girêdayî xwezaya xwe giyan girt û ji nava pencên xwînxweran hatiye derxistin. Ji wê dîrokê heya îro, gelek berhemên nivîskî yên dîrokî derketine holê. Gelê kurd ê ku zimanê xwe ji bîr kiribû, dest bi afirandina zimanekî hemdem kir û ev pêvajo heya niha berdewam dike.

Weke encam, li gorî ku dîrokê tomar kiriye, zimanê kurdî; li ser xaka Mezopotamyayê weke zimanê herî kevn û dîrokî ji 10 hezar ta 15 hezar sal jiyaye.

Di vê dîroka kevn de hûrî, gûtî, kasît, mîtanî, naîrî, medî
- hwd, bi vî zimanî, civaka xwezayî ava kirine, çand afirandine
- pirtûkên weke Zend Avêsta nivîsîne. Ji wê rojê û heta niha, bi vî zimanî jiyane.



## PIRS

**1-** Di serdema Aryenan de şoreşa ziman li ser kîjan bingehan bi pêş ketiye?
**2-** Di serdema Hûriyan de rewşa zimanê kurdî çawa bû?
**3-** Rista "Avesta" ya di ziman û wêjeya kurdî de çi ye?
**4-** Navê çend berhemên wêjeyî yên di dema kurdiya navîn de bi pêş ketine, binivîse.
**5-** Çima destpêkirina wêjeya kurdî ya nûjen, bi rojnameya "Kurdistan"ê tê binavkirin?

# PIRSÊN BEŞA YEKEM

1- Ziman çi ye, çi pêdiviya mirovan bi ziman heye?
2- Rêziman, çi ye?
3- Dengzanîn, çi ye?
4- Li gorî awayê tîp û dîrokê, ziman bi çend awayan hatiye dabeşkirin?
5- Ziman li gorî çavkaniyan, dabeş bike.
6- Zimanê kurdî, ji kîjan malbata ziman e?
7- Avesta bi kîjan tîpan hatiye nivîsîn, jimara tîpên ku pê hatiye nivîsandin, çend in?
8- Di kîjan serdemê de Êzîdiyan pirtûkên xwe yên pîroz nivîsîne? Navê wan pirtûkan, binivîse.
9- Di kîjan salê de, islam derbasî Kurdistanê bû, çi bandor li ziman û wêjeya kurdî kiriye?
10- Yekemîn rojnameya kurdî ya ku bi tîpên latînî hatiye nivîsîn çi ye, di kîjan salê de û bi pêşengiya kê bû?
11- Malbata van zimanan, diyar bike:

| **Ziman** | Kurdî | Îngilîzî | Asûrî | Tirkî | Çînî | Erebî | Japonî | Ermenî | Hindî |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Malbat** | | | | | | | | | |

12- **Hevokên rast; bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) hêma bike û sererast bike:**

- Ziman, saziyeke ji bo parvekirina civakê hatiye pêkanîn.
- Ziman, pergaleke pêşketî ya ragihandinê ye.
- Piştî rûxandina Konfederasyona Medan, gelê kurd zimanê xwe neparast, lê hebûna xwe ya civakî parast.
- Di zimanê yekkiteyî de, peyv pêvekan digire.
- Zimanê kurdî, ji aliyê çêbûna xwe û ji hemû aliyan ve zimanekî tewandî ye.

# BEŞA DUYEM

**1- Dengnasî**

**2- Dengdêr û taybetiyên wan**

**3- Tîpên pevdeng**

# DENGNASÎ

## 1- Deng, çi ye?

**Daxuyanî**

Bi giştî, deng lerizîna ku bi guh tê bihîstin e. Deng, ji ber vê taybetiya xwe, bûyereke xwezayî ye û bi riya pêlên deng çêdibe.

Lerizînên ku ji laş derdikevin, di hewayê de pêl bi pêl belav dibin û digihêjin guh. Perdeya guh, bi alîkariya hestiyokên guh, wan digihîne guhê hundir. Ji vê derê jî, ev lerizîn bi sinirên bihîstinê diçin mejî, li wê derê tên dahûrandin û şîrovekirin. Bi vî awayî, çawaniya deng tê têgihaştin.

Dengên ku ziman ji xwe re dike mijar, dengên ziman in. Mişmişa avê, xişxişa pelçiman, fîzîniya ba û dengên weke wan gengeşeyê derdixin û dengên bêawa ne. Dengên ziman jî di nava mirovan de hatine bikaranîn û rawekirin.

### a- Girîngî û Taybetiyên Dengan:

Deng, endamê herî biçûk ê ziman e. Ger di ziman de wateyeke diyar a deng nebe jî, girîngiya wî mezin e. Ji ber ku peyv, bingeha ziman pêk tîne û yekeya ziman e.
a-v/ av, k-u-r-d/kurd, w-e-r-e/were û hwd.

Deng, weke endamên cudakirina wateyan jî girîng in.

**Mînak:**

bej/beş
çar/çal / gav/kav

### b- Dengên Zimanê Kurdî:

Dengên di zimanekî de, pêkhatina wî zimanî diyar dikin. Di pêkhatina zimanê kurdî de (31) tîp hene.

# 2- TÊKILIYA DENG Û TÎPAN

### Daxuyanî

Ji hêmana deng a tê nivîsandin re, **"tîp"** tê gotin. Deng û tîp, têgehên cuda ne. Deng bi guh tê bihîstin, tîp jî bi çav tê dîtin. Di navbera deng û tîpan de têkiliyeke rasterast tune ye.
Mirov dikare dengên zimanekî, bi rêbazên tîpên cuda cuda binivîse û diyar bike.

**Mînak:**

Peyvên; “ciwan, leheng, Cegerxwîn, Kurdistan, sirûda netewî” bi kurdiya latînî û erebî, bi nivîskî nîşan bike.
Kurdiya latînî Tîpên erebî

**Alfabeya Kurdî**

**Tîpên Girdek:**

“A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z”

**Tîpên Hûrdek:**

“a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z”

Bi vî awayî, ji rêzkirina diyar a tîpan re, "**ABC**" tê gotin.

Di ABC’ya kurdî de (31) tîp hene. Ji wan “**8**” dengdêr û “**23**” dengdar in.

Ji bo têgihaştina dengên ziman û derketina wan a holê, pêwîstî bi naskirina hêmanên axaftinê heye.

**PIRS**

**1-** Mena herî biçûk a ziman, çi ye?
**2-** Danasîna tîpê di lênûsa xwe de binivîse.
**3-** Deng çawa çêdibe?

## 3- AWAYÊ DERKETINA DENGAN

Derketina dengan, bi vî awayî çêdibe:

**Riya ku dengan pêk tîne**

Qirik ← Têlên deng ← Cegera spî
↓
Zimanê biçûk → Ziman → Ximximk → Diran

Qirik, dev, ximximk û poz dibin hêmanên axaftinê, mîna boriyekê duçiq e û jê re, "**rêya deng**" tê gotin. Têlên axaftinê, depikê qirikê, zimanê biçûk, diran, dev û endamên weke wan ên dengderxistinê, hene. Hêmanên axaftinê bi bêhinstandinê dixebitin.

Bayê ku ji cegera spî tê, bi dehfdanê di qirikê re derbas dibe, têlên deng dilerizîne. Ev lerizîn, li gorî dengê bê derxistin, an diçe valahiya dev an jî poz. Zimanê biçûk vê rewşê pêk tîne. Piraniya dengan di valahiya dev de pêk tên. Li vê derê rista herî girîng, ziman dilîze. Dema ku ziman li pêş û paş dilive, pişta wî bilind dibe, li diran, lêv, an jî ximximkê dikeve. Bi vî awayî, dengên axaftinê pêk tên.

Bi rastî jî, dengên ziman di dev de bi ziman, diran, ximximk û lêvan ve tê girêdan û vekirin. Girêdana her dengekî cuda ye.

**Mînak:**

Dema ku em dibêjin **"bapîr"** lêvên me du caran li hev dikevin û ji hev vedibin. Sedem ew e ku tîpa **"b"** bi hevketina lêvan çêdibe. Bê livandina lêvan em nikarin dengê tîpa **"b"** derxin.

Dema ku em li dengê **"kade"** binêrin: Destpêkê pişta ziman diwerime û li ximximkên dawiyê dikeve, piştre serê ziman li diranên jor dikeve. Ji ber ku xala girêdana dengê **"k"** ximximk e û xala girêdana dengê **"d"** diran in. Hêmana axaftina mirovan, weke hêmana pêşketî ya bêhnlêdanê ye û gelek cureyên dengan dikare derxe. Lê ji bo vê, bi endamên deng re, endamên tên bikaranîn jî, pêwîst e bi saxlemî bixebitin.

**PIRS**

**1-** Deng, bi çi awayî derdikeve?

**2-** Endamên ku dengan pêk tînin, di lênûsa xwe de binivîse.

# 4- DABEŞKIRINA DENGAN

Beşeke deng, dema ku rêya deng vekirî be, tê derxistin. Weke dengê tîpa **"a"** ya di destpêka peyva **"avê"** de, bêyî ku rastî astengiyekê bê, derdikeve, jê re **"dengdêr"** tê gotin. Hin deng jî dema ku rêya deng, di rewşa girtî yan jî teng de be, derdikevin. Weke dengên **“b”**, **“c”** û dengên weke wan, di dema derketinê de kêm zêde bi hin astengiyan re rû bi rû dimînin, ji wan re **"dengdar"** tê gotin.

# DENGDÊR Û TAYBETIYÊN WAN

Dengdêr, ew dengên ku ji ziman tên derxistin, dema ku rêya deng bi giştî di rewşeke vekirî de be. Endamên herî bingehîn ên wan dengan, lerizînên têlên qirikê ne. Lerizînên ji têlan tên, li gorî taybetiya dengdêran bên pêkanîn, di valahiya dev de tên awakirin. Ev awakirin, li gorî rewş, erzinga jêr, ziman
- lêvan pêk tê.

**Dengdêr bi vî awayî tên dabeşkirin:**

## 1- Li Gorî Rewşa Ziman

Ziman, di dema derxistina dengdêran de, dema ku bi paş ve diçe, nêzîkî ximximka nerm dibe, dema ku bi pêş ve diçe, nêzîkî ximximka hişk dibe. Dema ku ziman stûr dibe, bi paş ve diçe, nêzîkî ximximka nerm dibe, ji dengên stûr ên derdikevin re, dengdêrên "**dengstûr**" tê gotin.

**Dengdêrên dengstûr, ev in: "a, i, o, u"**

Dema ku ziman bi pêş ve diçe, nêzîkî ximximka hişk dibe, dengê zirav ê ku derdixe, ji wî dengî re **"dengdêrên dengzirav"** tê gotin.

**Dengdêrên dengzirav, ev in: "e, ê, î, û"**

## 2- Li Gorî Rewşa Lêvan

Di dema pêkhatina dengdêran de; lêv, an rast (di rewşa xwezayî de) dimîne, yan jî diçe hev û girover dibe. Bi derketina dengdêrê re dema ku lêv rast (di rewşa xwezayî de bin) dengdêrên derdikevin rast in, dema ku lêv girover bin, ji dengdêrên derdikevin re **"dengdêrên girover"** tê gotin.

**1- Dengdêrên rast:** Dema ku lêv li ser hev nakevin û di xwezayiya xwe de bin yan jî rast bin, jê re **dengdêrên rast** tê

gotin.
**Dengdêrên rast, ev in: “a, e, ê, i, î”**
**2- Dengdêrên girover:** Dema ku lêv girover dibe û ji xwezayîbûna xwe derdikeve, ji dengên girover ên derdixin re **"dengdêrên girover"** tê gotin.
**Dengdêrên girover, ev in: “o, u, û”**

## 3- Li gorî valahiya dev û erzinga jêr

### A- Deng li gorî valahiya dev û erzinga jêr, dibin du beş:

**1-** Ger valahiya dev fireh û erzinga jêr vekirî be, jê re **"dengdêrên fireh"** tê gotin.
**Dengdêrên fireh ev in: “a, e, o”**

**2-** Ger valahiya dev teng û erzinga jêr kêmekê vekirî be, jê re **"dengdêrên teng"** tê gotin.
**Dengdêrên teng ev in: “ê, î, i, u, û”**

### B- Dengdêr li gorî kurtbûn û dirêjbûna dengê xwe, dibin du beş:

**1- Dengdêrên dirêj:** Ji wan dengdêrên ku dengên wan dirêj derdikevin re **"dengdêrên dirêj"** tê gotin.
**Dengdêrên dirêj ev in: (a, ê, î, o, û)**
**2- Dengdêrên kurt:** Ji wan dengdêrên ku dengên wan kurt derdikevin re **"dengdêrên kurt"** tê gotin.
**Dengdêrên kurt ev in: (e, i, u)**

## Taybetiyên dengdêran:

| Li gorî rewşa lêvan | RAST | | GIROVER | |
|---|---|---|---|---|
| | **Dirêj** | **Kurt** | **Dirêj** | **Kurt** |
| **Stûr** | **A** | **i** | **o** | **u** |
| **Zirav** | **ê, î** | **e** | **û** | |

Weke di pêşdariya jor de jî tê dîtin, çar taybetiyên bingehîn ên her dengdêrê hene. Her dengdêr, li gorî van taybetiyan tê naskirin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **A** | Stûr | Fireh | Rast | Dirêj |
| **E** | Zirav | Fireh | Rast | Kurt |
| **Ê** | Zirav | Teng | Rast | Dirêj |
| **I** | Stûr | Teng | Rast | Kurt |
| **Î** | Zirav | Teng | Rast | Dirêj |
| **O** | Stûr | Fireh | Girover | Dirêj |
| **U** | Stûr | Teng | Girover | Kurt |
| **Û** | Zirav | Teng | Girover | Dirêj |

# DENGDAR Û TAYBETIYÊN WAN

Dema ku rêya deng di rewşeke teng an jî girtî de be, ji dengên derdikeve re **"dengdar"** tê gotin. Di dema derketinê de kêm zêde, li kelemekî dikevin û derdikevin.

Dengdêr û dengdar, ji hev cudatir in. Bi astengkirin û serbest derketina hêlmê ve girêdayî ne. Bayê ku ji cegera spî tê, di rêya deng de eger rastî tu keleman neyê, dengê derdikeve **dengdêr** e, ger rastî kelem û astengiyan bê **dengdar** e.
Dema ku em dengdêrekê bînin pêşiya dengdaran, ev rewş pir baş tê têgihîştin.

**Mînak:** a-ab, î-îm, e-ek, u-u û hwd.
Dema ku dengên **"a, î, e, u"** tê gotin, rêya deng vekirî ye, lê dema ku **"b, m, k, ç"** tê gotin, rêya deng girtî ye.
Di dengdêrên kurdî de cudakirina dengên kurt û zirav tune ye.
Ji xala girêdana dengdaran re **jêder** tê gotin. Jêderên diyar ên dengdaran hene.
**Mînak:**
Dengdara **"b"** bi nêzîkbûna her du lêvan û bi hevketina wan pêk tê. Dengdara **"d"** bi lêketina ziman li diranên pêşî pêk tê.
**Dengdar ji 23 tîpan pêk tê**:
**( b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z )**
Dengdar bi tenê nayên xwendin. Ev dengên ziman bi alîkariya dengdêran tên xwendin.
Dengdar li gorî taybetiyên li jêr tên dabeşkirin:

## 1- Li gorî cihê deng lê tê girêdan

Li gorî rêya deng û cihê deng lê tên girêdan, dengdar dibin pênc beş:

**a-** **Dengdarên lêvkî:** **(b, m, p, w)**

**b-** **Dengdarên diranlêvkî:** **(f, v)** **c-**
**Dengdarên diranî:** **(d, n, s, t, z)**
**d-** **Dengdarên pêşezimandevî:** **(c, ç, j, l, ş, r, y)** **e-**
**Dengdarên zimandevî û qirikî:** **(g, h, k, q, x)**

## 2- Dengdar li gorî awayê derketinê

Di dema pêkhatina dengdaran de rêya deng; girtî ye yan jî di rewşeke teng de ye. Li gorî vê pêkhatina rêya dengdaran, dengdar dibin du beş:

a- Ji dengdarên dema ku rêya deng girtî be re, **"dengdarên girtî"** tê gotin. Ji ber taybetiya wan a gotinê bêhtirî xwe, "**nedomdar**" tê gotin.

**Dengdarên girtî, ev in:** **"b, c, ç, d, g, k, t, p, q"**

b- Ji dengdarên dema ku rêya deng di rewşa teng de pêk tên re **"dengdarên teng"** tê gotin. Ji ber taybetiya gotina wan, ji wan re **"dengdarên domdar"** tê gotin.

**Dengdarên domdar, ev in:** **"f, x, h, j, l, m, n, s, ş, r, v, w, y, z"**

## 3- Li Gorî Rewşa Têlên Deng

Di pêkhatina dengdaran de, li gorî lerizandin û nelerizandina têlên dengan jî, ji hev tên cudakirin û dibin du beş.

**a-** Di dema pêkhatinê de, ji dengdarên ku têlên deng dilerizînin re, "**dengdarên nerm**" tê gotin.

**Dengdarên nerm, ev in:** **"b, c, d, g, j, l, m, n, r, v, w, y, z"**

**b-** Di dema pêkhatinê de, ji dengdarên ku têlên deng nalerizînin re **"dengdarên hişk"** tê gotin.

**Dengdarên hişk, ev in:** **"ç, f, h, k, p, q, s, ş, t, x"**

| Li gorî rewşa têlên deng | | HIŞK | | NERM | |
|---|---|---|---|---|---|
| Li gorî rewşa rêya deng | | Domdar | Nedomdar | Domdar | Nedomdar |
| Li gorî cihê derketinê | Lêv | f | p | m,v, w | b |
| | Diran | s, ş | ç, t | j, n, z | c, d |
| | Ximximk | | k | l, r, y | g |
| | Qirik | h, x | q | | |

## Ximximk: Kun û perên difina mirov.

## TÎPÊN PEVDENG (DUÇENG)

Di zimanê kurdî de, dema tîpên **“x, w”** digihêjin hev û dengekî nû çêdikin an jî cih didin dengekî nû, yanî ji hevgirtina her du tîpan re, **"pevdeng"** tê gotin.

**Mînak:**

**xw**endin, **xw**în, **xw**arin, **xw**ê, **xw**işk

## TÎPÊN HILMÎ Û NEHILMÎ

Di zimanê kurdî de, tîpên **“ç, k, p, t”** her yek ji van tîpan du dengan derdixin, weke dengên peyvan diguherin. Kesên ku dixwîne pêwîst e li gorî awayê xwendina wan ên hilmî û nehilmî ji hev cuda bikin.

**Mînak:**

| **Hilmî** | **Nehilmî** |
|---|---|
| Bizina çal pir şîr e. | Çala avê kûr e. |
| Kargeh vedibin. | Keriyê pez mezin e. |
| Xwişka min para min xwar. | Zivistana par pir sar bû. |
| Tiliyên Evînê zirav in. | Tiriyê zeynebî xweş e. |

# TÎPÊN KELIJANDINÊ (SIWAR)

Di kurmancî de du dengdêr li pey hev nayên. Lê, dema ku du dengdêr tên ber hev, dengekî alîkar dikeve navbera wan û wan digihîne hev. Di zaravaya kurmancî de sê dengên ku bi vî karî radibin hene, ew jî ev in: **“H”, “W”, “Y”**

Dema ku du dengdêr tên ber hev, dengek ji van dikeve navberê û wan digihîne hev.

**Mînak:**

**H:** avahî, ronahî, şînahî, perwerdehî...
**Y:** rûyê min, xwezayî, bi vî awayî...
**W:** duwem, xesiwa te...

Ji van her sê dengan a ku pir tê bikaranîn **“y”** ye. Ew her du dengdarên din kêm tên bikaranîn.

Di zimanê kurdî de dema ku tîpa dengdêra dengdirêj **"î"** dikeve pêşiya tîpa siwar **"y"** yê, cihê xwe ji tîpa dengdêra dengkurt **"i"** re dihêle.

**Mînak:**

**Amedî** **Amediyên**
**Hêvî** **Hêviyên**
**Rêwî** **Rêwiyên**

**TÊBÎNÎ**

Di zimanê kurmancî de, tîpên kelijandinê di heman demê de tîpên dengdar ên alîkar in.

## TÎPÊN LERZOK Û BIŞID

Di kurmanciyê de, hin tîp hene lerzok tên bilêvkirin û hin jî bişid tên bilêvkirin. Ew jî, ev in:
**“L”** bişid bi lêv dibe.
**“R”** jî di lêvkirinê de dilerize.

**Mînak:**

- Peyva **pir** a ku wateya zehf dide, weke “pirr” tê bilêvkirin, lê bi yek **“r“** yê tê nivîsandin.
- Peyva **gelek** a ku wateya jimareke mezin dide, weke **"gellek"** tê bilêvkirin, lê bi yek **“l“** yê tê nivîsandin.

## HEVGIRTINA DENGAN, KITE Û ÇÊBÛNA WAN

Dengên ziman, bi pêkhatina çend yekeyên ku ji amûrên axaftinê derdikevin, çedibe. Ev yekeyên deng ên ku di nava peyvê de cih digirin, bi giştî di hilmê de tên derxistin.

**Mînak:** Ka - nî, ger - den, ku - lîlk û hwd.

Dengdêr, di destpêka peyvê de dikare weke yek dengî bê derxistin.

**Mînak:**
A-med        î-sal        e-vîn

Ev dengên kit jî di rewşa yekeyekê de ne.
Ji wan dengên ku bi yek carê ji dev derdikevin re, **"kite"** tê gotin.

**Mînak:** Av, Av-dar, Çek-dar, Ce-ger-xwîn, …

Di zimanê kurdî de, kite li ser dengdêran tên avakirin, bê dengdêr kite çênabin. Ji aliyê din ve, bi yek care vekirina dev re, tenê dengdêrek dikare were derxistin. Ji ber vê yekê, di kiteyekê de ji yek dengdêrê bêhtir cih nagire. Her dengdêr, di nava peyvê de kiteyekê pêk tîne. Dengên ku kiteyan pêk tînin; dengên hevgirtî ku bi yek carê ji dev derdikevin. Bi rastî jî, dengên ku di peyvê de hev digirin, li derdora dengdêrekê hev û du digirin û dibin yek. Ev hevgirtina dengên di peyvê de bi nivîsê wiha tên nîşankirin.

N + i + + t + î + m + a + = Niştîma

Weke li jor jî tê dîtin, hevgirtina dengên di nava kiteyekê de, bê girêdan li pey hev rêz dibin.

## Cureyên Kiteyan

1- Kiteya ku ji tîpekê pêk tê.
**Mînak:** Azad û Amed jêhatî ne.

2- Kiteya ku ji du tîpan pêk tê.
**Mînak:** Ez û tu heval in.

3- Kiteya ku ji sê tîpan pêk tê.
**Mînak:** Sed û şeş şagirt di ezmûnê de bi ser ketin.

4- Kiteya ku ji çar tîpan pêk tê.
**Mînak:** Jiyana gund û bajaran ji hev cuda ye.

5- Kiteye ku ji pênc tîpan pêk tê.
**Mînak:** Stran, di hunerê de cihekî girîng digirin.

## PIRSÊN BEŞA DUYEM

1- Deng çi ye? Pênase bike.
2- Têkiliya di navbera deng û tîpan de çi ye?
3- Tîpê pênase bike.
4- Cudahiya di navbera tîp û dengan de çi ye?
5- "ABC" çi ye?
6- Awayên derketina dengan, çi ne? Veke.
7- Dengdêrên dengstûr pênase bike û diyar bike.
8- Dengdêrên dengrast pênase bike û diyar bike.
9- Dengdêrên dirêj, çi ne? Wan diyar bike.
10- Dengdaran, li gorî rêya deng û cihê deng lê tê girêdan dabeş bike.
11- Dengdêrên nerm û hişk li gorî pênaseya wan ji hev cuda bike.
12- Kite çi ye, ji çend tîpan pêk tê?
13- **Hevokên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike û sererast bike.**

- Dengên ku derdikevin bêyî ku rastî astengiyan bên, ji wan re tîpên dengdêr tê gotin.
- Dengdêrên dengzirav, ev in: a, ê, î, o, û.
- Dengdêrên dengirover, ew dengên dema ku lêv girover dibe û ji xwezayîbûna xwe derdikevin, dengdêrên girover tê gotin.
- Ger valahiya dev fireh û erzinga jêr hinekî vekirî be, jê re dengdêrên teng tê gotin.
- Erka tîpên kelijandinê, ew e ku du tîpên dengdar ji hev cuda dikin.
- Bûyera dengan a ku ji lihevanîna du tîpên dengdêr an jî du tîpên dengdar re "herikîna deng" tê gotin.
- Ketina tîpa dengdêr çêdibe, dema ku pêveka neyîniyê bi lêkeran ve dibe.

# BEŞA SÊYEM

## PEYVNASÎ

1- PEYV LI GORÎ WATEYÊ

2- PEYV LI GORÎ ÇÊBÛNÊ

3- CUREYÊN PEYVÊN PÊKHATÎ (DARIŞTÎ)

4- NIVÎSANDINA PEYVÊN HEVEDUDANÎ (HEVGIRTÎ)

# PEYVNASÎ

Ew beşa ku peyvan ji xwe re dike mijar. Çêbûna peyvan ji aliyê wate û erkê ve, dabeşkirina cureyên peyvan ji aliyê awa û wateyê ve û guhartinên cur bi cur nîşan dide, di vê beşê de tên lêkolînkirin.

## A- PEYV LI GORÎ WATEYÊ

### 1- Peyvên xaze (mecaz)

"Li welat bêzarî, bêdengî û bêgêwilî desthilat bû."

Di hevoka li jor de peyva **"bêzarî"** û **"bêgêwilî"** dema tê gotin, ji aliyê her kesê/î ve, heman tişt tê hizirandin. Ji ber ku, ev peyv li gorî ferhengê, di wateya xwe ya resen de hatine bikaranîn. Dema ku peyvek li gorî wateya xwe ya resen hatibe bikaranîn, ji wê peyvê re **"wateya rast"** tê gotin.

Di hevokên li jêr de peyvên ku hatine reşkirin, di kîjan wateyê de hatine bikaranîn.

- Xwarina nanê **kelê** zor e.
- Ciwan nivîsandineke **kelê** xwend.
- Xwarinên Rihayê pir **tûj** in.
- Axaftinên te pir **tûj** in.

Di hevoka jor a yekem de peyva **"kelê"** hatiye nivîsîn, peyv di wateya xwe ya rast de ye. Ango "Xwarina nên bê xwê zor e." hatiye bikaranîn. Di hevoka jor a duyem de jî, peyva **"kelê"** derbas dibe. Ev peyva **"kelê"** ji derveyî wateya xwe ya rast, di wateyeke din de hatiye bikaranîn. Ango "Nivîseke bêzanist û bêwate hatiye xwendin." Di hevoka sêyem de jî, peyva **"tûj"** derbas dibe. Ev peyv, di wateya xwe ya rast de hatiye bikaranîn. Di hevoka çarem de jî, peyva **"tûj"** di

wateya xwe ya rast de nehatiye bikaranîn û di wateya mecazî de hatiye bikaranîn. Ji wan peyvên ku ji derveyî wateya xwe ya rast, di wateyeke din de tên bikaranîn re **peyvên xaze (mecaz)** tê gotin.

**Mînak:**

Azad **dilvekirî** hat dibistanê.
Ez îro **germ** nêzîkî waneyê bûm.
Dilê min **geş** bû.

### 2- Peyvên hevwate

Ji wan peyvên ku awayê wan a nivîsandinê ji hev cuda, lê di wateya xwe de wekhev û li cihê hev tên bikaranîn re **"peyvên hevwate"** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Mijar | Babet |
| Ber | Kevir |
| Mêjû | Dîrok |
| Sot | Şewitî |

### 3- Peyvên dijwate (dijber)

Ji wan peyvên ku di wateya xwe de dijberî hev in re **"peyvên dijwate"** tê gotin.

Mînak:

| | |
|---|---|
| Teng | Fireh |
| Stûr | Zirav |
| Reş | Spî |
| Tirsonek | Wêrek |
| Azadî | Koletî |

### 4- Peyvên hevdeng

Ew peyvên ku xwendin û nivîsandina wan wekhev; lê yek di wateyekê de, ya din jî di wateyeke din de hatibe bikaranîn, ji peyvên wiha re **"peyvên hevdeng"** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Li gundê me **gir**ek heye. | **Gir** nexweşiyeke ku bi çermê mirov dikeve. |
| Em di ser **pir**ê re derbas bûn. | Ez ji xwendinê **pir** hez dikim. |
| **Ger** pir xweş e. | **Ger**a avê pir kûr bû. |
| Hogir darek **çand**. | **Çand,** di civakê de nirxekî girîng e. |

Di hevokên li jor de em dibînin ku her peyva **reşkirî**; bi du wateyan hatiye nivîsîn û ev peyv bi heman awayî tên xwendin û nivîsandin. Ji ber vê yekê, em ji van peyvan re dibêjin; **"peyvên hevdeng"**.

### 5- Peyvên hevtîp

Peyvên hevtîp, ji tîpên hilmî û nehilmî çêdibin. Peyvên hevtîp; ji aliyê wate û xwendinê ve ji hev cuda ne, lê awayê nivîsandina wan wek hev in, ji wan re **"peyvên hevtîp"** tê gotin.

**Mînak:**

| Hilmî | Nehilmî |
|---|---|
| **Ker:** Lawirek e. | **Ker:** Kesê ku dengan nabihîze. |
| **Ta:** Bilindbûna germahiya laş. | **Ta:** Dezî |
| **Çal:** Lawirên beş. | **Çal:** Kûrahî |
| **Par:** Pişk, behr, parçe | **Par:** Sala derbasbûyî. |

### 6- Peyvên waje

Ew têgehên ku raveyekê di nava xwe de digire û di nava gel de qalibek girtiye û têgihandinekê çêdike, ji wan re **"peyvên waje"** tê gotin.

**Mînak:**

Kok, rêziman, şano, roman û hwd.

## B- PEYV LI GORÎ ÇÊBÛNÊ

Peyv li gorî çêbûnê, li sê beşan tê parvekirin. Ev jî; peyvên xwerû, peyvên pêkhatî û peyvên hevedudanî ne. Ji bo zelalkirinê, em ê vê helbestê bi hev re bixwînin:

**Keko ez bi<u>lûrvan</u> im**
**Ez <u>şivan</u> û <u>gavan</u> im**

**<u>Rûniştî</u> me bin <u>darê</u>**
**Didim pesnê <u>biharê</u>**

**Dengê <u>saza</u> min zîz e**
**Darblûra min <u>gwîz</u> e**

**Dijimin dêwê <u>xwînvexwar</u>**
**Welat kriye tar û mar**

**1-** Peyvên weke: dar, blûr, saz û gwîz, peyvên di rewşa kokê de ne.
2- Peyvên weke: bilûrvan, şivan û gavan, peyvên ku ji navan pêk hatine û peyvên ji lêkeran jî pêk tên hene, weke; rûniştin.
**3-** Peyvên weke: darblûr û xwînvexwar hevedudanî ne. Her yek ji wan, ji du peyvan pêk hatiye.

**Mînak:**
Dar + blûr = Darblûr
xwîn + vexwar = xwînvexwar

## 1- Peyvên Xwerû

Ew peyvên ku di rewşa kokê de ne, weke peyvên xwerû tên binavkirin.

**Mînak:**
Ba, baran, dar, ber, hat, çû û hwd.

Ew peyvên xwerû yên ku pêvekên peyvsaz nagirin, bi hevgirtinê nehatine sazkirin û bêyî ku wateya wan xerab bibe, nayên kurtkirin. Piraniya peyvên xwerû yek kite ne û çêbûna wan xwerû ye. Li gel vê, peyvên xwerû yên ku ji yek kiteyê bêhtir jî hene.
**Mînak:**
Kanî, welat, Azad û hwd.
Dema ku peyveke xwerû pêvekeke kêşanê bigire, ji ber ku ew pêvek bandorê li wateya peyvê nake, peyva xwerû çêbûna xwe winda nake û weke xwe dimîne.
**Mînak:**

Kaniy**ên** me.
Gul**ê** pirtûk xwend.

## 2- Peyvên pêkhatî (dariştî)

Dema ku koka peyvê pêvekeke peyvsaz stand û wateyeke nû da peyvê, ji van peyvan re **"peyvên pêkhatî"** tê gotin.
**Mînak:**

Aş + van = Aşvan
Hesin + kar = Hesinkar

Hêvî + dar = Hêvîdar
Ra + ket = Raket

## CUREYÊN PEYVÊN PÊKHATÎ

Peyvên pêkhatî; li ser kokê pêk tên û pêvekan digirin.

**Peyvên pêkhatî, di nava xwe de dibin çar beş:**

**A- Navên ku ji navekî û pêvekên peyvsaz pêk tên: Mînak:**

Bêrî + van = Bêrîvan
Sol + bend = Solbend
Dil + dar = Dildar

**B- Navên ku ji lêker û pêveka peyvsaz pêk tên: Mînak:**

Xwend + in = Xwendin
Hat + in = Hatin
Bir + in = Birin

**C- Lêkerên ku ji navekî û pêvekên peyvsaz pêk tên: Mînak:**

Bez + în = bezîn
Ken + în = kenîn
Şop + andin = şopandin

**D- Lêkerên ku ji lêkerekê û pêvekên peyvsaz pêk tên: Mînak:**

Hil + ketin = Hilketin
Da + ketin = Daketin
Ra + xistin = Raxistin

**TÊBÎNÎ**

Peyvên ku bi pêvekan pêk hatine, weke gewde yan jî pêkhatî tê binavkirin. Carinan pêveka peyvsaz li ser gewdeyê jî tê zêdekirin û peyveke pêkhatî ya nû pêk tîne.

**Mînak:**

Bêrî + van + î = Bêrîvanî
Xebat + kar + î = Xebatkarî
Heval + bend + î = Hevalbendî
Aş + van + î = Aşvanî
Bi vî awayî, gewde jî peyvên pêkhatî derdixe holê.
**Di zimanê kurdî de rêya herî dewlemend û berhemdar; peyvên tûredayî (pêkhatî + hevedudanî) ne.**

## 3- PEYVÊN HEVEDUDANÎ

Peyvên ku ji du peyvan an jî bêhtir pêk tên û ji bo têgihaştinê tên bikaranîn, ji wan re **"peyvên hevedudanî (hevgirtî)"** tê gotin.

**Mînak:**

Mar + masî = Marmasî
Ceger + xwîn = Cegerxwîn
Ga + masî = Gamasî
Dar + hinar = Darhinar
Pez + kûvî = Pezkûvî
Çav + sor = Çavsor
Çav + reş = Çavreş
Xwîn + sar = Xwînsar

Peyvên hevedudanî, bi taybetî ew navên ku ji palvedariya navan an ji raveka hevalnavan pêk tên. Dema ku du nav hev digirin an nav û hevalnavekê bi pêveka veqetandekê ji nav wan derdikeve, her du bi hev ve dibin. Bi vî awayî, peyva hevedudanî çêdibe.

Zimanê kurdî, zimanekî ku bi awayê asayî ji peyvên hevedudanî çêdibe. Di zimanê kurdî de bi hevgirtina peyvan hin têgehên nû çêdibin.

**Mînak:**

Mar + ê + masî = Marmasî
Tevn + a + pîr + ê = Tevnepîr
Çav + ê + reş = Çavreş

### TÊBÎNÎ

Dema ku em peyveke hevedudanî, ji nav û hevalnavan çêdikin, di destpêkê de tîpa veqetandekê radikin û paşê jî hevalnav tînin pêşiya nav û bi hev ve dikin, bi vî awayî dibe peyveke hevedudanî.

**Mînak:**

Dar + a + sor = Soredar
Gul + a + sor = Sorgul

Peyvên hevedudanî li gorî wate û erkên xwe, dibin pênc beş:

**a- Hevgirtina navdêran**
**b- Hevgirtina hevalnavan**
**c- Hevgirtina hevalkaran**
**d- Hevgirtina navdêr û lêkeran**
**e- Hevgirtina navdêr û hevalnavan**

## a- Hevgirtina Navdêran

Dema ku du nav dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, navekî nû bi xwe re çêdikin, jê re **"navdêrên hevedudanî"** tê gotin.

**Mînak:**

Mar + masî = Marmasî
Ser + êş = serêş
Jin + tî = jintî

### b- Hevgirtina Hevalnavan

Dema ku du hevalnav dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, hevalnavekî nû bi xwe re çêdikin, jê re **"hevalnavên hevedudanî"** tê gotin.

**Mînak:**

Reş + belek = Reşbelek
Kesk + sor = Keskesor
Boz + belek = Bozbelek

### c- Hevgirtina Hevalkaran

Dema ku du hevalkar dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, hevalkarekî nû bi xwe re çêdikin, jê re **"hevalkarên hevedudanî"** tê gotin.

**Mînak:**

Ber + êvarî = Berêvarî
Piştî + nîvro = Piştînîvro
Zor + kêm = Zorkêm

### d- Hevgirtina Navdêr û Lêkeran

Dema ku navdêrek û lêkerek dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, lêkereke nû bi xwe re çêdikin, jê re **"lêkera hevedudanî"** tê gotin.

**Mînak:**

Mêze + kirin = Mêzekirin
Fêr + bûn = Fêrbûn
Şerm + kirin = Şermkirin
Guhdarî + kirin = Guhdarîkirin

### e- Hevgirtina Navdêr û Hevalnavan

Dema ku navdêr û hevalnavek dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, navdêrekî nû bi xwe re çêdikin, jê re, **"hevgirtina navdêr û hevalnavan"** tê gotin.

**Mînak:**

Dil + geş = Dilgeş Rû
+ xweş = Rûxweş
Dil + tenik = Diltenik

# PIRSÊN BEŞA SÊYEM

1- Peyvnasî, çi ye?
2- Peyvên xaze (mecaz), pênase bike.
3- Çi cudahî di navbera peyvên rast û yên xaze de heye? Bi mînakan şîrove bike.
4- Peyvên hevdeng pênase bike û bi mînakan diyar bike. 5- Peyvên waje, çi ne?
6- Peyvê, li gorî çêbûnê dabeş bike.
7- Peyvên pêkhatî, çi ne? Bi mînakan şîrove bike.
8- Cureyên peyvên pêkhatî diyar bike û bi mînakan şîrove bike.
9- Peyvên hevedudanî, li gorî wate û erkên wan dabeş bike.
10- Hevgirtina navdêran pênase bike û sê mînakan li ser bide. 11- Hevalkarên hevedudanî çi ne? Bi mînakan diyar bike. 12- Hevgirtina navdêr û hevalnavan çi ye?
13- **Hevokên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike sererast bike**.

- Dema ku peyvek li gorî wateya xwe ya resen be, ji wê peyvê re **"peyva rast"** tê gotin.
- Peyvên ku di nivîsandinê de cuda bin lê di wateyê de wekhev bin, ji wan re **"peyvên hevdeng"** tê gotin.
- Ji peyvên ku nivîsandina wan û bilêvkirina wan yek, lê wateya wan cuda re **"peyvên hevtîp"** tê gotin.
- Peyvên ku di rewşa kokê de ne, weke **"peyvên xwerû"** tên binavkirin.
- Dema ku peyveke xwerû pêvekeke kêşanê bigire, dibe **"peyveke pêkhatî"**.
- Peyvên hevedudanî bi tenê ji du peyvan, an jî ji peyvek û pêvekekê pêk tên.
- Dema ku du hevalnav dikevin kêleka hev û bi hev ve dibin, navdêrekî nû çêdikin, jê re **"hevalnavên hevedudanî"** tê gotin.

# BEŞA ÇAREM

**1- Koknasî**

**2- Cure û taybetıyên kokan**

**3- Cure û taybetıya pêvekan**

**4- Rawe û cureyên wê**

**5- Veqetandek û beşên wê**

**6- Cînav û cureyên wan**

# KOKNASÎ

Beşa koknasî; kok û jêdera peyvan lêkolîn dike. Bi taybetî, destpêkê pêkhatina navan çawa bû, piştre guhartinên çawa pê re çêbûne, lêkolîn dike.

# CURE Û TAYBETIYÊN KOKAN

Di mînakên li jor ên hatine lêkolînkirin de hat dîtin ku peyvên: **ser, deşt û ber** ger ev peyv bên parçekirin, wateya wan xerab dibe.
Ji parçeya herî biçûk a biwate û tevgerekê pêşwazî dike re **kok** tê gotin.

**Taybetiyên hevpar ên kokan**

**a-** Kok li gorî çêbûna xwe peyvên xwerû ne.
**b-** Bi pêvekan nehatine tûredan, bi rêyên hevgirtinê nehatine sazkirin.

# CUREYÊN KOKAN

Kok, li gorî heyîna xwe dibe sê beş:

### a- Kokên Lêkerî

Ew kokên ku kirin, bûyer û tevgerekê diyar dikin, jê re **“kokên lêkerî”** tê gotin.
**Mînak:**

Xwend, çû, kir, bir

Kokên lêkerî, reftarên heyînan ên hevbeş pêşwazî dikin.
**Mînak:**

Zarok ket. Ber ket. Sêv ket.

Kokên lêkerî, bi hin paşgirên herikandinê yên bi kes û demê ve girêdayî, tên bikaranîn.
**Mînak:**

Ez welatê xwe **di**parêz**im**.
**Di:** Pêveka dema niha ye.
**Im:** Pêveka kesane ye.

### b- Kokên Navdêran

Ji wan kokên ku heyînekê didin nasîn re **"kokên navdêran"** tê gotin.
**Mînak:**

Dar, yek, sor, çav, masî, gul, av û hwd.

### c- Kokên hevdeng

Kokek; an dibe koka nav, an jî dibe koka lêkerê. Di karanînê de destûra giştî ev e. Ev cure kok; di nivîsandin û xwendinê de wekhev in, lê wateyên wan ji hev cuda ne.
**Mînak:**

Gir: Girek li gundê me heye, ew pir bilind e.
Gir: Girek bi laşê min ket, ez pir êşand
im. Çand: Min darek çand, lê ew şîn nebû.
Çand: Çand û hunera kurdî pir dewlemend in.

Ji van her du kokên ku xwendin û nivîsa wan wekhev re “**koka hevdeng**” tê gotin.

Ji bo ku em van her du kokan ji hev cuda bikin, em li wate û paşgira ku bi kokê ve dibe, temaşe dikin.

**Mînak:**

Xwar: Min xwariye.
Xwar: Ez çûm xwarê.

# TAYBETIYÊN KOKAN

**1**- Kok ji bo erkên navdêr, hevalnav û hevalkaran tên bikaranîn.
**Mînak:**

**Gulê** gulek çand.
**Du** mal li ber lehiyê çûn.
Bîrhat **îro** pênûs anîn.

- Di hevoka yekem a li jor de peyva "**gul**" koka navdêrê ye.
- Di hevoka duyem de peyva "**du**" hevalnav e (hevalnavê jimarê ye).
- Di hevoka sêyem de peyva "**îro**" hevalkar e (hevalkara demê ye).

**2**- **Kok**, di ziman de parçeya herî biçûk a watedar e. Wateya bingehîn diyar dikin.
Ger kok bên parçekirin, wateya wan winda dibe.

**3-** Di zimanê kurdî de piraniya kokan ji yek kiteyê saz bûne.
**Mînak:**

Ba, got, hat, xwend, bir, çav, geş, bin, sor, dûr, av, roj, dem, baş û hwd.
**Kokên du kite û bêhtir jî hene**.
**Mînak:**

Genim, tirî, ziman, Zîlan, mişar, kulav û hwd.

**4-** Koka peyvên zimanê kurdî piranî xwezayî ne.
Ji bo wateyên nû di ziman de diyar bikin, nayên çêkirin.
Li ser kokên hene, peyvên nû tên çêkirin.

**Mînak:**

**Guh**-dar
**Gund**-î
**Cot**-yar

**5-** Mirov dikare di zimanê kurdî de hevgirtina kok û paşgirê, an jî kok û pêşgiran vekirî bibîne.

**Mînak:**

**Aş**-van
**Nerm**-în
**Roj**-ev
Î-**şev**
Pis-**mam**

**6-** Di zimanê kurdî de pêşgir li pêşiya kokê, paşgir jî li pişt kokê tê bikaranîn:

**Mînak:**

| PÊŞGIR | KOK | PAŞGIR |
|---|---|---|
| Bê | Kar | |
| Zir | Bav | |
| | Guh | Dar |
| | Bêrî | Van |

## PIRS

1- Kok tê çi wateyê? Şîrove bike.

2- Çi taybetiyên hevpar ên kokan hene? Şîrove bike.

# CURE Û TAYBETIYÊN PÊVEKAN

Pêvek, peyvên nû çêdikin an jî li gorî erkê peyvê di hevokê de kêrî rûdana peyvê tên, ji van endamên ziman re **"pêvek"** tê gotin.

Pêvek dibin du beş:

## 1- PÊVEKÊN PEYVSAZ

Ji pêvekên ku bi peyvê ve tên nivîsîn û peyvên nû saz dikin re **"pêvekên peyvsaz"** tê gotin. Ev pêvek, bi serê xwe wateyê nadin, lê bi peyvê re erka xwe digirin.
Pêvekên peyvsaz, dibin du beş:

- **Pêvekên navdêrsaz**
- **Pêvekên lêkersaz**

### A- Pêvekên Navdêrsaz

Pêvekên navdêrsaz; bi navdêran ve dibin, wateyeke nû didin wan û navdêrekî pêkhatî ava dikin. Ev pêvek li gorî cihê xwe, dibin du beş:

**a) Pêvekên navdêrsaz ên pêşgir**
**Pêvekên navdêrsaz ên paşgir**

- Pêvekên navdêrsaz ên pêşgir

Pêvekên navdêrsaz ên pêşgir; bi destpêka navdêran ve dibin, wateyeke nû didin navdêran û peyveke pêkhatî ava dikin. Hin ji van pêvekan, ev in:

**1- (Ve-)**: Ev pêşgir bi navekî ve dibe û ji wî navî, navekî nû çêdike.

**Mînak:**

**Ve** + jîn = Vejîn
**Ve** + xwendin = Vexwendin
**Ve** + gotin = Vegotin

2- **(Hem-)**: Ev pêşgir bi navekî ve dibe û navekî nû çêdike. Yekbûn û hevpariyê diyar dike.

**Mînak:**

**Hem** + welat = Hemwelat
**Hem** + pîşe = Hempîşe
**Hem** + raman = Hemraman

3- **(Mê-)**: Ev pêşgir bi navekî ve dibe û zayenda mê diyar dike.

**Mînak:**

**Mê** + kew = Mêkew
**Mê** + kund = Mêkund
**Mê** + ker = Mêker

4- **(Bê-)**: Ev di rastiya xwe de daçek e, lê dema ku tê ber navdêran, wan dike hevalnav û rista pêşgirekê pêk tîne.

**Mînak:**

**Bê**+dawî = Bêdawî
**Bê** + deng = Bêdeng
**Bê** + war = Bêwar

**5- (Bi-):** Ev jî daçek e, lê dema ku tê ber navdêran wan dike hevalnav û rista pêşgirekê pêk tîne.

**Mînak:**

**Bi** + ceger = Biceger
**Bi** + deng = Bideng
**Bi** + keser = Bikeser

**6- (Ne-):** Ev jî daçeka neyîniyê ye, lê li hin deveran rista pêşgirekê hildigire li ser milên xwe.

**Mînak:**

**Ne** + xweş = Nexweş
**Ne** + yar = Neyar
**Ne** + zan = Nezan

**7- (Zir-):** Ev pêşgir tiştên derewîn nîşan dide û ji navekî, navekî nû çêdike.

**Mînak:**

**Zir** + bav = zirbav
**Zir** + tajî = zirtajî
**Zir** + tilî = zirtilî

**8- (Kele-):** Ev pêşgir jî, derewînbûna tiştekî nîşan dide û ji nav û hevalnavan, navekî nû çêdike.

**Mînak:**

**Kele** + şêr = Keleşêr
**Kele** + rim = Kelerim
**Kele** + vajî = Kelevajî

### b) Pêvekên navdêrsaz ên paşgir

Pêvekên navdêrsaz ên paşgir; bi dawiya navdêran ve dibin û wateyeke nû didin navdêran û peyveke pêkhatî ava dikin. Hin ji van pêvekan, ev in:

**1- (-Î):** Ev paşgir bi van peywiran radibe:

**A.** Ji navdêran navdêrekî din çêdike.

**Mînak:**

Ser + **î** = Serî
Nêr + **î** = Nêrî
Mal + **î** = Malî

**B.** Ji hevalnav û hevalkaran, navdêran çêdike.

**Mînak:**

Germ + **î** = Germî
Tehl + **î** = Tehlî
Dereng + **î** = Derengî

**C.** Pêgiriyê (Mensûbiyetê) nîşan dide.

**Mînak:**

Bot**î**, Efrîn**î**, Amûd**î**, Bajar**î**, Gund**î**, ...

**D.** Navê zimanan pêk tîne.

**Mînak:**

Kurd**î**, ereb**î**, tirk**î**, elman**î**, ıngilîz**î**, faris**î**, ...

- **(-İk)**: Ev paşgir, di xwezaya xwe de heyînên ji xwe biçûktir diyar dike.

**Mînak**

Dar + **ik** = Darik
Keç + **ik** = Keçik
Cot + **ik** = Cotik

- **(-ok)**: Ev paşgir ji bo biçûkirina tiştekî yan kesekî/ê tên bikaranîn. Ev biçûkirin carinan ji bo hezkirinê, carinan jî ji bo naskirinê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Zilam + **ok** = Zilamok
Binefş + **ok** = Binefşok
Bazin + **ok** = Bazinok

**G. (-van)**: Ev paşgir karê (pîşeya) kesekî/ê diyar dike.
**Mînak:**

Helbest + **van** = Helbestvan
Ga + **van** = Gavan
Bêrî + **van** = Bêrîvan

**H. (-kar)**: Ev paşgir jî, karê (pîşeya) kesekî/ê diyar dike.
**Mînak:**

Xebat + **kar** = Xebatkar
Xwende + **kar** = Xwendekar
Hesin + **kar** = Hesinkar

- **(-bend)**: Ev paşgir bi navekî ve dibe û kesê bi karê vî navî ve mijûl dibe, ji me re diyar dike.

**Mînak:**

Sol + **bend** = Solbend
Nal + **bend** = Nalbend
Saz + **bend** = Sazbend

- **(-mend)**: Ev paşgir bi navekî ve dibe û xwediyê wî navî diyar dike. Yanî navekî nû saz dike.

**Mînak:**

Huner + **mend** = Hunermend
Kar + **mend** = Karmend
Dad + **mend** = Dadmend

**K. (-dar)**: Ev paşgir bi navekî ve dibe û xwediyê wî navî diyar dike.
**Mînak:**

Mal + **dar** = Maldar
Guh + **dar** = Guhdar
Hêvî + **dar** = Hêvîdar

- **(-geh)**: Ev paşgir bi navekî ve dibe û cihê wî navî diyar dike.

**Mînak:**

Pêşen + **geh** = Pêşengeh
Firoş + **geh** = Firoşgeh
Dad + **geh** = Dadgeh

**M. (-dank**): Ev paşgir, bi navekî ve dibe û cihê ku ew tişt lê tê danîn diyar dike û bi vî awayî, navekî nû çêdike.

**Mînak:**

Xwelî + **dank** = Xwelîdank
Agir + **dank** = Agirdank
Gul + **dank** = Guldank

**N. (-ker**): Ev paşgir, bi navekî ve dibe û karê wî navî diyar dike. Bi vî awayî, navekî nû saz dike.

**Mînak:**

Kar + **ker** = Karker
Şer + **ker** = Şerker
Dagir + **ker** = Dagirker

**O. (-istan)**: Ev paşgir, bi navekî ve dibe û cihê nifşê wî navî diyar dike.

**Mînak:**

Kurd + **istan** = Kurdistan
Dar + **istan** = Daristan
Gul + **istan** = Gulistan

**P. (-ber)**: Ev paşgir, bi navekî ve dibe û kesê ku di karê vî navî de pêşengiyê dike, diyar dike.

**Mînak:**

Rê + **ber** = Rêber
Koç + **ber** = Koçber
Rênc + **ber** = Rêncber

**Q. (-baz)**: Ev paşgir, bi navekî ve dibe û kesê der barê karê vî navî de şareza ye diyar dike. Bi vî awayî, navekî nû saz dike.

**Mînak:**

Tîr + **baz** = Tîrbaz
Şeh + **baz** = Şehbaz
Rê + **baz** = Rêbaz

## B- Pêvekên lêkersaz

Ev pêvek; bi lêkeran ve dibin û lêkerên pêkhatî saz dikin. Ev pêvek; li gorî cihê xwe, dibin du beş:

### a) Pêvekên lêkersaz ên pêşgir

Ev pêvek bi pêşiya lêkeran ve dibin, wateyeke nû li wan bar dikin, ango lêkereke nû pêk tînin.

**Pêvekên lêkersaz ên pêşgir:**

**1- (hil-)**:
Ev pêşgir, dikeve pêşiya lêkerekê û lêkereke pêkhatî saz dike.
**Mînak:**

**Hil** + dan = Hildan
**Hil** + weşandin = Hilweşandin
Hil + avêtin = Hilavêtin

**2- (ve-)**: Ev pêşgir, tevgera dubarebûn û jêkvebûnê diyar dike.
**Mînak:**

**Ve** + dan = Vedan
**Ve** + xwarin = Vexwarin
**Ve** + gotin = Vegotin

**3- (da-)**: Ev pêşgir, bi piranî tevgera ber bi jêr ve, ango sernişîvê nîşan dide.
**Mînak:**

**Da** + dan = Dadan
**Da** +xistin = Daxistin
**Da** + girtin = Dagirtin

**4- (ra-)**: Ev pêşgir, bi piranî tevgerên ji jêr ber bi jor û ji jor ber bi jêr, bi hev re nîşan dide.
**Mînak:**

**Ra** + şistin = Rahiştin
**Ra** + perikandin = Raperikandin
**Ra** + kirin = Rakirin

**5) (wer-)**: Ev pêşgir, bi piranî wateya tevgera serûbinbûnê dide lêkerê.
**Mînak:**

**Wer** + gerîn = Wergerîn
**Wer** + girtin = Wergirtin
**Wer** + ketin = Werketin

**TÊBÎNÎ:** Ji bilî van pêşgiran, du pêşgirên din hene ku pir nayên bikaranîn. Ew jî "**rû-**" û "**çê-**" ne.
**Mînak:**

**Rû** + kirin = Rûkirin
**Rû** + niştin = Rûniştin
**Çê** + kirin = Çêkirin

### b) Pêvekên lêkersaz ên paşgir

Ev pêvek ne gelek in û yên herî zêde tên bikaranîn, ev in:

**1- (-în)**: Ev paşgir, ji navdêr û hevalnavan lêkeran çêdike û ev lêkerên pêkhatî bi piranî negerguhêz in, ji bilî hin lêkeran, weke "birîn û girîn".

**Mînak:**

Bez + **în** = Bezîn
Rev + **în** = Revîn
Fir + **în** = Firîn

**2- (-andin):** Ev paşgir jî, ji navdêr û hevalnavan, lêkeran çêdike û ev lêkerên pêkhatî gerguhêz in.

**Mînak:**

Bez + **andin** = Bezandin
Rev + **andin** = Revandin
Fir + **andin** = Firandin

**3- (-an):** Ev paşgir rasterast li ser rayeka dema niha ya lêkerê pêk tê.

**Mînak:**

Kol + **an** = Kolan
Pêç + **an** = Pêçan
West + **an** = Westan

**TÊBÎNÎ-1:** Ev lêkerên ku bi "**-an**"ê pêk hatine, carinan bi pêveka "**-în** û **-andin**"ê jî çêdibin.

| | | |
|---|---|---|
| Pêç**an** | pêç**în** | pêç**andin** |
| Kol**an** | kol**în** | kol**andin** |
| West**an** | west**în** | west**andin** |

**TÊBÎNÎ-2:** Ji bilî van hin paşgirên din jî hene, weke; "**-ijîn, -ijandin, -isîn, -isandin**", lê pir nayên bikaranîn.

**Mînak:**

Germ germ**ijîn** germ**ijandin**
Kel kel**ijîn** kel**ijandin**
Tep tep**isîn** tep**isandin**

# 2- PÊVEKÊN KÊŞANÊ

Ji pêvekên ku bi peyvê ve tên nivîsîn û peyvê ji aliyê kes, rawe, nediyarbûn, rade û bangê de didin rakişandin re, **"pêvekên kêşanê"** tê gotin.

**Pêvekên kêşanê, di nava xwe de dibin şeş beş:**

1- Pêvekên kêşanê yên kesane
2- Pêvekên kêşanê yên nebinavkirinê
3- Pêvekên kêşanê yên raderan
4- Pêvekên kêşanê yên bangî
5- Pêvekên kêşanê yên raweyan
6- Pêvekên demê

## 1- Pêvekên kêşanê yên kesane

Ji cure pêvekên ku bi dawiya lêkeran ve dibin û kesan pêşwazî dikin re **"pêvekên kêşanê yên kesane"** tê gotin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Ez diç**im**. | Em diç**in**. |
| Tu diç**î**. | Hûn diç**in**. |
| Ew diç**e**. | Ew diç**in**. |

Pêveka kesê yekem ê yekjimar: "**-im, -me**"
Pêveka kesê duyem ê yekjimar: "**-î, -yî**" "-
Pêveka kesê sêyem ê yekjimar: **e, -ye** " "-
Pêveka kesê yekem ê pirjimar: **in, -ne**"

Pêveka kesê duyem ê pirjimar: "**-in, -ne**"
Pêveka kesê sêyem ê pirjimar: "**-in, -ne**"

## TÊBÎNÎ-1:

**(im, î, e, in):** Dema ku lêker bi tîpa dengdar diqedin. **(me, yî, ye, ne):** Dema ku lêker bi tîpa dengdêr diqedin.

## TÊBÎNÎ-2:

Ev pêvek; piştî navdêr û hevalnavan tên, bi wan ve dibin û bi rola lêkera "**bûn**"ê radibin.

**Mînak:**

| **Cînav** | **Navdêr** | **Pêveka kesane** | **Hevok** | **Cînav** | **Hevalnav** | **Pêveka kesane** | **Hevok** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Ez | karker | im | Ez karker im. | Ez | zana | me | Ez zana me. |
| Tu | karker | î | Tu karker î. | Tu | zana | yî | Tu zana yî. |
| Ew | karker | e | Ew karker e. | Ew | zana | ye | Ew zana ye. |
| Em | karker | in | Em karker in. | Em | zana | ne | Em zana ne. |
| Hûn | karker | in | Hûn karker in. | Hûn | zana | ne | Hûn zana ne. |
| Ew | karker | in | Ew karker in. | Ew | zana | ne | Ew zana ne. |

## 2- Pêvekên kêşanê yên nebinavkirinê

Ev cure pêvek, dema ku bi navdêrekê ve dibin, rewşeke nediyar didin navdêrê, ji van pêvekan re **"pêvekên kêşanê yên nebinavkirinê"** tê gotin.
Pêvekên kêşanê yên nebinavkirinê, ev in: **"-ek", "-in".**
**Mînak:**

Gul + **ek** = Gulek
Pênûs + **ek** = Pênûsek
Berx + **ek** = Berxek
Heval + **in** = Hevalin
Bajar + **in** = Bajarin

## 3- Pêvekên kêşanê yên raderan

Ji pêvekên **"-in"**, **"-n"** ên ku bi dawiya lêkeran ve dibin û navdêreke raderî çêdikin re **"pêvekên kêşanê yên raderan"** tê gotin.

**Mînak:**

Hat + **in** = Hatin
Çû + **n** = Çûn
Xwend + **in** = Xwendin
Kola + **n** = Kolan

## 4- Pêvekên kêşanê yên bangî

Ji pêvekên **"-o"**, **"-ê"**, **"-ino"** ên ku bi dawiya navdêran ve dibin û van navdêran ber bi rewşeke bangî ve didin herikandin re **"pêvekên kêşanê yên bangî"** tê gotin.
**Mînak:**

Heval**ino**! (**-ino**: pirjimar)
Heval**o**! (**-o**: yekjimar nêr)
Heval**ê**! (**-ê**: yekjimar mê)

### 5- Pêvekên kêşanê yên raweyan

Ji pêvekên ku ne ji resenbûna lêkerê bin, bi lêkerê ve dibin û lêkerê ber bi karanînê ve didin rakişandin re **"pêvekên kêşanê yên raweyan"** tê gotin.

# RAWE Û CUREYÊN WÊ

**Rawe, wiha tên rêzkirin:**

### 1- Raweya Fermanî

Ev rawe, bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkerê û pêveka raweya fermanî **"bi-"** derdikeve holê. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek **(bi-)** ji holê radibe. Ji ber ku, ferman li kesên duyem ên yekjimar û pirjimar tê kirin, pêvekên kesane yên tên dawiya vê raweyê jî, ev in: "**-e**" û "**-in**".

**Mînak:**

Biç**e** - Biç**in**
Vexw**e** - Vexw**in**
Derkev**e** - Derkev**in**

### Neyîniya raweya fermanî

Ev rawe, bi alîkariya pêveka neyîniyê ya vê raweyê "**ne-, me-**" ya ku tê pêşiya lêkerê û pê ve dibe, dikeve rewşa neyîniyê.

Têbînî: Dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, pêveka neyîniyê dikeve di navbera pêşgir û rayeka lêkerê de.

**Mînak:**

| **Raweya fermanî (erênî)** | | **Raweya fermanî (neyînî)** | |
|---|---|---|---|
| **Yekjimar** | **Pirjimar** | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| Biçe | Biçin | Neçe<br>Meçe | Neçin<br>Meçin |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Bixwe | Bixwin | Nexwe<br>Mexwe | Nexwin<br>Mexwin |
| Vexwe | Vexwin | Venexwe<br>Vemexwe | Venexwin<br>Vemexwin |

## 2- Raweya Bilanî

Ev rawe, fermanê li kesê sêyem (yekjimar û pirjimar) dike.

**Mînak:**

**Raweya bilanî** (yekjimar)

**Bila** ew **bi**xwîn**e**.
**Bila** ew rast **ba**xiv**e**.
**Bila** ew karê xwe **bike**.

**Raweya bilanî** (pirjimar)

**Bila** ew **bi**xwîn**in**.
**Bila** ew rast **ba**xiv**in**.
**Bila** ew karê xwe **bikin**.

## Neyîniya raweya bilanî

Ev rawe, dema ku pêveka neyîniyê "**ne-, me-**" dikeve pêşiya lêkerên bingehîn û pê ve dibe, dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**

**Bila** ew **neçe**.
**Bila** ew **neçin**.

**Bila** ew **meçe**.
**Bila** ew **meçin**.

## 3- Raweya divêtî

Ev rawe, bi alîkariya lêkera alîkar **"viyan"** çêdibe. Ev lêker, bi hemû cînavan re tê kişandin.

**Mînak:**

**Divê** ez vegerim.
**Divê** tu vegerî.
**Divê** ew vegere.
**Divê** em vegerin.
**Divê** hûn vegerin.
**Divê** ew vegerin.

### Neyîniya raweya divêtî

Ev rawe, dema ku pêveka neyîniyê "**ne-, me-**" dikeve pêşiya lêkerên bingehîn û pê ve dibe, dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**

Divê ez ve**ne**gerim.
Divê tu ve**ne**gerî.
Divê ew ve**ne**gere.
Divê em ve**ne**gerin.
Divê hûn ve**ne**gerin.
Divê ew ve**ne**gerin.

Divê ez ve**me**gerim.
Divê tu ve**me**gerî.
Divê ew ve**me**gere.
Divê em ve**me**gerin.
Divê hûn ve**me**gerin.
Divê ew ve**me**gerin.

## 4- Raweya Mercî

Ev cure rawe bi alîkariya peyvên mercî pêk tên.
Di mînakên li jêr de peyvên mercî; **"heke"**, **"ger"** û **"ta"** tên dîtin, bandoreke mercî li gel peyvên lêkerî saz kirine.

**Mînak 1:** (Lêkerên gerguhêz)

**Ger** min gotiba.
**Ger** te gotiba.
**Ger** wî/wê gotiba.

**Ger** me gotiban.
**Ger** we gotiban.
**Ger** wan gotiban.

**Mînak 2:** (Lêkerên negerguhêz)

**Heke** ez bihatama.
**Heke** tu bihatayî.
**Heke** ew bihata

**Heke** em bihatana.
**Heke** hûn bihatana.
**Heke** ew bihatana.

### Neyîniya raweya mercî

Ev rawe, bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-, me-**" yên ku dikevin pêşiya lêkerê û pê ve dibin, dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak 1:** (Lêkerên gerguhêz)

**Heke** min **ne**xwariba.
**Heke** te **ne**xwariba.
**Heke** wî/wê **ne**xwariba.

**Heke** me **ne**xwariba.
**Heke** we **ne**xwariba.
**Heke** wan **ne**xwariba.

**Mînak 2:** (Lêkerên negerguhêz)

**Heke** ez **ne**çûbam.
**Heke** tu **ne**çûbayî.
**Heke** ew **ne**çûba.

**Heke** em **ne**çûban.
**Heke** hûn **ne**çûban.
**Heke** ew **ne**çûban.

# Raweya Daxwaziyê

## a- Raweya daxwaziyê ya dema boriya têdeyî

Raweyên daxwazî, dabaşa karê ku pêkanîna wê tê xwestin dike. Raweya daxwaziyê ya dema boriya têdeyî, bi alîkariya pêvekên "**-ba**", "**-a**" yên ku dikevin li ser karê dema

**Mînak:**

**Gerguhêz**

Xwezî min bidît**a**.
Xwezî te bidît**a**.
Xwezî wî/wê bidît**a**.

Xwezî me bidît**a**.
Xwezî we bidît**a**.
Xwezî wan bidît**a**.

**Negerguhêz**

Xwezî ez bihat**am**.
Xwezî tu bihat**ayî**
Xwezî ew bihat**a**.

Xwezî em bihat**an**.
Xwezî hûn bihat**an**.
Xwezî ew bihat**an**.

## Neyîniya raweya daxwaziyê

Ev rawe, dema ku pêveka neyîniyê "**ne-, me-**" dikevin pêşiya lêkerê û pê ve dibin, dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak 1:** (Lêkerên gerguhêz)

Xwezî min **ne**dirûtiba. Xwezî me **ne**dirûtiba.
Xwezî te **ne**dirûtiba. Xwezî we **ne**dirûtiba.
Xwezî wî/wê **ne**dirûtiba. Xwezî wan **ne**dirûtiba.

**Mînak 2:** (Lêkerên negerguhêz)

Xwezî ez **ne**ketibam. Xwezî em **ne**ketiban.
Xwezî tu **ne**ketibayî. Xwezî hûn **ne**ketiban.
Xwezî ew **ne**ketiba. Xwezî ew **ne**ketiban.

### b- Raweya daxwaziyê ya dema boriya çîrokî

Ev rawe, li ser bingehê karê dema boriya çîrokî pêk tê.

**Mînak:**

| **Gerguhêz** | **Negerguhêz** |
|---|---|
| Xwezî min xwaribû**ya**. | Xwezî ez hatibû**ma**. |
| Xwezî te xwaribû**ya**. | Xwezî tu hatibû**yayî**. |
| Xwezî wî/wê xwaribû**ya**. | Xwezî ew hatibû**ya**. |
| Xwezî me xwaribû**ya**. | Xwezî em hatibû**na**. |
| Xwezî we xwaribû**ya**. | Xwezî hûn hatibû**na**. |
| Xwezî wan xwaribû**ya**. | Xwezî ew hatibû**na**. |

#### Neyîniya raweya daxwaziyê ya dema boriya çîrokî

Ev rawe, dema ku pêveka neyîniyê "**ne-, me-**" dikevin pêşiya lêkerê û pê ve dibin, dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**

Xwezî min **ne**girtibûya. Xwezî me **ne**girtibûya.
Xwezî te **ne**girtibûya. Xwezî we **ne**girtibûya.
Xwezî wî/wê **ne**girtibûya. Xwezî wan **ne**girtibûya.

## 5- Pêvekên demê

Ji pêvekên ku bi lêkeran ve dibin û dema wan diyar dikin re **"pêvekên demê"** tê gotin.

## 1- Pêveka dema niha "di-"

Ev pêvek, dikeve pêşiya rayeka dema niha ya lêkera xwerû û pê ve dibe. Piştî ku lêker li gorî kesê ku bi vî karî rabûye tê kişandin, dirûva dema niha pêk tîne. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek dikeve navbera pêşgir û rayeka dema niha ya lêkerê. Her wiha, dema ku lêker hevedudanî be, ev pêvek dikeve pêşiya lêkera alîkar û pê ve dibe.

**Mînak:**

Çûn ⟶ **di**çe (lêkera xwerû)
Vexwarin ⟶ ve**di**xwe (lêkera ku bi pêşgirê pêkhatî)
Fêrkirin ⟶ fêr **di**ke (lêkera hevedudanî)

## Neyîniya dema niha

Neyîniya dema niha bi alîkariya pêveka neyîniyê ya dema niha "**na-**" û "**ni-**", pêk tê. Ev pêvek, dikeve cihê pêveka dema niha "**di-**" û lêker dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**

Çûn ⟶ **na**çe (lêkera xwerû)
Vexwarin ⟶ ve**na**xwe (lêkera pêkhatî bi pêşgirê)
Fêrkirin ⟶ fêr **na**ke (lêkera hevedudanî)

Zanîn ⟶ **ni**zane (lêkera xwerû)
Karîn ⟶ **ni**kare (lêkera xwerû)

## 2- Pêveka dema bê "bi-"

Ev pêvek, dikeve pêşiya rayeka dema niha ya lêkera xwerû, piştî ku emraza dema bê **"ê"** û **"dê"** li pêşiya wan tên danîn û lêker li gorî kesê ku bi vî karî dê rabe tê kişandin û bi vî awayî, dirûva dema bê ya lêkerê çêdibe. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek ji holê radibe. Her wiha, dema ku lêker hevedudanî be, ev pêvek dikeve pêşiya lêkerê û pê ve dibe.

**Mînak:**

Lîstin → (**ê, dê**) **bi**lîze (lêkera xwerû)
Hilgirtin → (**ê, dê**) hilgire(lêkera ku bi pêşgirê pêkhatî)
Temaşekirin → (**ê, dê**) temaşe **bi**ke (lêkera hevedudanî)

## Neyîniya dema bê

Neyîniya dema bê, bi alîkariya pêveka neyîniyê ya dema bê "**ne-**" pêk tê. Ev pêvek, dikeve cihê pêveka dema bê "**bi-**" û lêker dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**

Lîstin → (**ê, dê**) **ne**lîze (lêkera xwerû)
Hilgirtin → (**ê, dê**) hil**ne**gire (lêkera ku bi pêşgirê pêkhatî)
Temaşekirin → (**ê, dê**) temaşe **ne**ke (lêkera hevedudanî)

## 3- Pêveka dema boriya dûdar " -e "

Ev pêvek, dikeve dawiya rayeka dema borî û dirûva dema boriya dûdar pêk tîne, lê bi piranî ev pêvek dirûva " **-iye** " distîne, bi taybetî dema ku lêker bi tîpa dengdêr biqede.

**Mînak:**

| Ji bo lêkerên gerguhêz | Ji bo lêkerên negerguhêz |
|---|---|
| Te heval dît**iye**, lê jê re negot**iye**. | Ew bilez meşiya**ye**, lewma zû hat**iye**. |
| Wê kinc şûştin**e** û raxistin**e.** | Mirovek ket**iye** erdê, divê em wî rakin. |
| Va ye min nan kir**iye**. | Xweziya min bi te, tu gihaşt**iye** armanca xwe. |
| Wî mirov girtin**e**, piştre jî berdan**e**. | Bihar îsal hat**iye**, lewma kulîlk zû vebûn**e.** |

## Neyîniya dema boriya dûdar

Neyîniya vê demê jî weke demên din ên borî pêk tê. Bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-**" ya ku dikeve pêşiya lêker û pê ve dibe, pêk tê. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek dikeve navbera pêşgir û lêkerê.

**Mînak:**

Xwariye ⟶ **ne**xwariye
Vexwariye ⟶ ve**ne**xwariye
**Têbînî:**

Ev pêvek "**-e**" dikeve dawiya çîroka dema boriya têdeyî û dirûva çîroka dema boriya dûdar pêk tîne.

**Mînak:**

Hatibû ⟶ hatibû**ye**
Xwendibûn ⟶ xwendibûn**e**

## 4- Pêveka dema boriya berdest "di-"

Ev pêvek, dikeve pêşiya rayeka dema borî û dirûva dema boriya berdest pêk tîne. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek dikeve di navbera pêşgir û rayeka dema borî de.

**Mînak:**

Şûştin ⟶ **di**şûşt
Çûn ⟶ **di**çû Vexwarin
⟶ ve**di**xwar Guhartin
⟶ **di**guhart

## Neyîniya dema boriya berdest

Neyîniya vê demê jî, weke demên din ên borî pêk tê. Bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-**" ya ku dikeve pêşiya lêkerê û pê ve dibe, pêk tê. Lê dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, ev pêvek dikeve di navbera pêşgir û lêkerê de.

**Mînak:**

Lîstin ⟶ **ne**dilîst
Hilgirtin ⟶ hil**ne**digirt
Wergirtin ⟶ wer**ne**digirt

# VEQETANDEK Û BEŞÊN WÊ

Di kurmanciyê de du peyv bi alîkariya hin pêvekan bi hev ve tên girêdan, ango tên ravekirin, ji wan pêvekan re **"veqetandek"** tê gotin. Bi rêya veqetandekê tiştek ji yên din ji aliyê zayend û mêjerê ve tê veqetandin. Ji ber vê sedemê, ji wan pêvekan re veqetandek tê gotin. Ango di dema ravekê de mirov zayend û mêjera bêjeyan jî nas dike.

**Veqetandek dibin du cure:**

## 1- Veqetandekên Binavkirî

| ***(a) yekjimar û mê*** | ***(ê) yekjimar û nêr*** | ***(ên) pirjimar*** |
|---|---|---|
| - Hevala min ev e. | - Apê min duh ji bajêr hat. | - Pirtûkên min pir in. |
| - Gula zer xweşik e. | - Bavê Cûdî şehîd ket. | - Xwişkên Hogirî jêhatî ne. |
| - Meta Dildarî bijîşk e. | - Ev lawê rûgeş, hevalê min e. | - Xortên mêrxas pêşengên şoreşê ne. |

## 2- Veqetandekên Nebinavkirî

| ***(-eke) yekjimar û mê*** | ***(-ekî) yekjimar û nêr*** | ***(-ine) pirjimar*** |
|---|---|---|
| - Hevaleke min bi ser ket. | - Kêmaqilî barekî giran li xwediyê xwe dike. | - Hevaline min hatin serdana min. |
| - Meteke Ronî çû bajêr. | - Dostekî min pir alîkariya min kir. | - Pirtukine Delalê hene. |
| - Me li gund maleke mezin ava kir. | - Hevalekî Serhetî, ew ji mirinê rizgar kir. | - Şîlanê guline sor çandin. |

**Têbînî:**

Piştî veqetandekan her tim yek ji van her sêyan tê: nav, cînav û hevalnav.

# Tewang

Ev peyv (tewang), peyveke hevedudanî ye. Ji rayeka dema niha ya lêkera (tewîn) û paşgira (ang) pêk tê.
Tewang = tew+ang
Tewandin, tê wateya xwarkirinê. Ji ber ku bi rêya tewangê peyv tê tewandin, an jî xwarkirin.
**Mînak:**
Ew çû gulistan**ê**.
Dîlan**ê** karê xwe qedand.
Hogir**î** darek çand.

Pêvekên tewangê

Pêvekên tewangê, dibin du beş:
**1- Pêvekên tewangê yên binavkirî**
**2- Pêvekên tewangê yên nebinavkirî**

## 1- Pêvekên tewangê yên binavkirî

- **-ê: Yekjimar, mê Mînak:**

Zînê rojname xwend.

- **-î: Yekjimar nêr**

**Mînak:** Ehmedî bersiva mamoste da.

- **-an: Pirjimar**

**Mînak:** Hevalan welat rizgar kir.

### 3- Pêvekên tewangê yên nebinavkirî

Ev pêvek, ji pêvekên nebinavkirinê (**ek**, **in**) û pêvekên tewangê yên binavkirî (**ê**, **î**, **an**) pêk tên.

- **-ekê: Yekjimar mê**

**Mînak:** Ew bi hevalekê re dipeyive.

- **-ekî: Yekjimar nêr**

**Mînak:** Xortekî alîkariya min kir.

- **-inan: Pirjimar**

**Mînak:** Em ê vê mehê darinan biçînin.

# CÎNAV Û CUREYÊN WAN

## CÎNAV

Her weke ji wateyê tê têgihaştin ku cînav di nava hevokê de cihê navdêran digirin. Ji ber vê yekê, jê re "**cînav**" tê gotin.

Ji ber ku ew cihê navdêran digirin, taybetiyên navdêran derbasî wan jî dibin.

Cînav an nêr an mê, yan jî nêtar in. Cînav jî yekjimar, an jî pirjimar in. Her wiha, di nava hevokê de, cînav an kirde yan jî bireser e.

Di ravekê de cînavên tewandî; raveker û cînavên xwerû; raveber in. Piraniya cînavan ditewin û bi vî awayî cihê navdêrên tewandî digirin.

## CUREYÊN CÎNAVAN

1- Cînavên kesane
2- Cînavên şanîdanê
3- Cînava vegerok
4- Cînava pêvekî
5- Cînavên nebinavkirî
6- Cînavên jimarîn
7- Cînavên pirsiyariyê
8- Cînavên girêkî
9- Cînavên berbihevîn
10- Cînavên lihevxistî
11- Cînavên xwedîtiyê
12- Cînavên kesandinê

Di refên navîn de, me hin cureyên cînavan şîrove kiribûn
19. em ê niha jî hin cureyên din şîrove bikin.

## 1- Cînavên berbihevîn

Cînavên berbihevîn, ev in: "**êk**" û "**hev**"
"**<u>êk</u>**" bi tenê li herêmên Behdînan û Colemêrgê tê bikaranîn. Li herêmên din "**<u>hev</u>**" tê bikaranîn.

Ev cure cînav, têkilî û danûstandina piralî nîşan dide. Her weke ku cînava pêvekî "**ê**" bi tenê kesê yekjimar nîşan dide û

bi tu awayî nikare kesên pirjimar nîşan bide, ev cînavên berbihevîn jî, nikarin kesê yekjimar nîşan bidin.

Weke mînak, dema ku em dibêjin: "Em birayên hev in" an jî "Em birayên êk in", tê zanîn ku li holê, ji yekî bêhtir kes hene û ev cînav têkiliya wan kesan rave dike.

**Mînak:**

- Ew xwişk û birayên hev in. Ew xwişk û birayên êk in.
- Em kurapên hev in. Em kurapên êk in.

## 2- Cînavên lihevxistî

Ev cure cînav, cînavên hevedudanî ne û ji du hêmanan pêk tên. Her tim hêmanek ji wan daçeka bingehîn e û hêmana duyem an cînava pêvekî (qertafî) "**-ê**" ye, yan jî cînava berbihevîn (**êk**, **hev**) e.

**1-** Cînavên lihevxistî yên ku ji daçekên bingehîn (**ji**, **bi**, **li**, **di**) cînava pêvekî "**-ê**" pêk tên.

- Ji + ê = Jê **Mînak:** Min **jê** re rastî got.
- Bi + ê = Pê **Mînak:** Heval hat û Zozan **pê** re çû.
- Li + ê = Lê **Mînak:** Ew fîstanê ku te ji Evînê re anî, pir **lê** dihat.
- Di + ê = Tê **Mînak:** Barkêşê qeza kir û **tê** de du kes mirin.

**2-** Cînavên lihevxistî yên ku ji daçekên bingehîn û cînavên berbihevîn (**hev, êk**) pêk tên:

- Ji + hev = Jev **Mînak:** Ev avahî **jev** ketiye.
- Ji + êk = Jêk **Mînak:** Evîndaran **jêk** nekin.
- Di + hev = Tev **Mînak:** Hûn **tev** hatin.
- Di + êk = Têk **Mînak:**Te dît, me çawa ew **têk** birin.
- Bi + hev = Pev **Mînak:** Em û dijmin **pev** ketin.
- Bi + êk = Pêk **Mînak:** Ez ê vî karî **pêk** bînim.
- Li + hev = Lev **Mînak:** Wan kaxezan **lev** bixe.
- Li + êk = Lêk **Mînak:** Hûn kengî **lêk** hatin?

## PIRS

**1-** Raweya dema bê, li gorî cînavên kesane çawa tê kişandin?
**2-** Raweya fermanî, bi kîjan pêvekê çêdibe?
**3-** Rawaye daxwaziyê, çawa çêdibe?
**4-** Raweya mercî, bi kîjan peyvan çêdibe?
**5-** Raweya divêtî, rewşeke çawa dide lêkeran?
**6-** Rawaye daxwazî ya dema boriya çîrokî, çawa pêk tê? Bi mînakan diyar bike.

## PIRSÊN BEŞA ÇAREM

1- Kok, çi ye?
2- Kokan, li gorî heyîna wan dabeş bike.
3- Kokên lêkerî, pênase bike.
4- Kokên hevdeng, çi ne? Bi mînakan diyar bike.
5- Pêvek, çi ye?
6- Pêvekên peyvsaz, çi ne?
7- Taybetiyên hevpar ên kokan, diyar bike.
8- Pêvekên nebinavkirinê, pênase bike û wan diyar bike.
9- Pêvekên raderîn, çi ne? Wan diyar bike.
10- Pêvekên demê, çi ne?
11- Veqetandek, çi ye û çima ev nav li wan hatiye kirin?
12- Çend cureyên veqetandekan hene? Wan diyar bike û hevokekê li ser her cureyê
binivîse. 13- Tewang, çi ye?
14- Pêvekên tewangê yên nebinavkirî, diyar bike û li ser her yekê hevokekê binivîse.
15- Cînavên lihevxistî, pênase bike û hêmanên wan diyar bike.
16- **Hevokên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike û sererast bike.**

- Kok di ziman de, parçeya herî biçûk a watedar e.
- Ger kok bên parçekirin, wateya wan winda nabe.
- Di zimanê kurdî de, kok her tim ji yek kiteyê saz dibe.
- Pêvek xwedî erk e, lê ne xwedîwate ye.
- Pêşgira "**hem**" yekbûn û wekheviyê diyar dike.
- Pêşgira "**bê**" hin caran neyîniyê pêşwazî dike.
- Paşgira "**mend**" bi navekî ve dibe û karê kesekî/ê diyar dike.
- Paşgira "**geh**" bi navekî ve dibe û cihê ku tişt lê tê danîn diyar dike.
- Paşgira "**baz**" bi navekî ve dibe û kesê/a der barê karê vî navî de şareza ye, diyar dike.
- Raweya divêtî, fermanê li kesê sêyem dike.
- Pêvekên ku bi peyvê ve tên nivîsîn û peyvê ji aliyê kes,

rawe, nediyarbûn, rader û bangê ve didin rakişandin, jê re **"pêvekên kêşanê"** tê gotin.

- Dema ku lêker hevedudanî be, pêveka dema niha "**di**" dikeve pêşiya lêkera bingehîn.
- Piştî veqetandekan; her tim cînav, hevalkar û navdêr tên.
- Di hevokan de cînav cihê navdêran digire, lê taybetiyên navdêran derbasî cînavan nabin.

o) Cînavên berbihevîn, kesê yekjimar nîşan didin.

# BEŞA PÊNCEM

**1- Destûrên nıvîs û xalbendî**

**2- Destûrên nivîsê**

**3- Xalbendî**

# DESTÛRÊN NIVÎSÊ

Nivîs, bi hin destûrên diyar nivîsandina zimanekî ye. Nivîs, tê wateya tevahiya destûrên ku zimanekî derbasî nivîsê dike.

Aliyê lawaz ê gelek kesan, mijara nivîsê ye. Cihê mirov herî bêhtir tê de şaş dibe, nivîsandina nîşanên dem, alav û bikaranîna tîpên gir û hûr in.

## DAXUYANÎ

Di zimanê kurdî de kurdiya kevn, bi awayekî xwezayî bingeh tê girtin. Ji bo her dengî, tîpek tê nivîsîn. Li jêr, destûrên ku nivîsê bi rêkûpêk dikin, hatine vekirin.

## 1- Nivîsandina peyva pirsiyariyê "ma"

Peyva pirsiyariyê "**ma**", her tim ji peyvên din cuda tê nivîsandin. Lê di karanîna hevokê de bandoreke wê ya diyar çêdibe. Dema ku ev peyv di hevokê de tê bikaranîn, rewşa pirsiyariyê dide hevokê.

**Mînak:**

**Ma** hatin?
**Ma** xwarin?
**Ma** ketine?
**Ma** mane?

## 2- Nivîsandina "ku" ya peywendiyê

Peyva "**ku**" her tim cuda tê nivîsandin. Karê wê di hevokê de du peyvan an jî du hevokan bi hev ve girê dide.

**Mînak:**

Pênûsên **ku** hevalan ji me re anîn, xweşik in.

Mafê her kesî heye **ku** azad bijî.

## 3- Nivîsandina daçekan

Alavên daçekî; hem daçek hem jî paşdaçek bi xwe her tim bi peyvan ve nabin û cuda tên nivîsandin. Bi navan ve dibin û rewşeke daçekî bi navan re çêdikin.

**Mînak:**

- **Di** daristanê **de** lawirên cur bi cur hene.
- Em **bi** zarokan **re** dixebitin.
- Amed **ji** wir **ve** tê.
- Ew **li** cîhanê geriya.

## 4 - Bikaranîna tîpên mezin

- Hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

**G**otinên pêşiyan, rûmetên neteweyî ne.
**W**elatê me, pir dewlemend e.

- Piştî cotxalê, hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

Rêzan got: **D**ivê em biçin dibistanê.

Serhat got: **X**wendekar dê biçin geştê.

**Têbînî**

Dema ku piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka pêşîn jî bi tîpa hûr dest pê dike.

**Mînak:**

Navdêr du cure ne: xerenav û hevenav
Mirov dikare wan nexweşiyan wiha rêz bike: serêş, zikêş, tagirtin…

- Hevokên dikevin piştî hêmaya pirsê, bi tîpa mezin tên

destpêkirin.

Mînak:

- Ma ji azadiyê xweştir çi heye? Xweşiya azadiyê têbigihînin.

ç) Hevokên dikevin piştî baneşanê, bi tîpa mezin tên destpêkirin.

Mînak:

Hevalino! Erkên me yên destpêkê fêrbûna zimanê me ye.

- Rêzik bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak:

Ez naçim dîwana mîran
Nabim şalûlê koçk û seran
Bila li min xin kêr û xenceran
Feqiyê Teyran tengezarê dilan

e) Navê taybet û paşnavên wan bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak:

- Rustem Cûdî - Şêrgo Bêkes - Aram Tîgran

ê) Peyvên rêzgirtinê yên dikevin beriya nav an piştî nav, nasnav - pîşe bi tîpên mezin dest pê dikin.

Mînak:

- Şehîd Baran - Birêz Hebûn - Bedirxan Beg
- Mamoste Viyan - Kawayê Hesinkar

f) Nasnav bi tîpên mezin tên destpêkirin.

Mînak:

- Cegerxwîn (Şêxmûs Hesen) - Zîlan ( Zeynep Kinaci) Viyan (Çîçek Demîr)

E) Navê ku xizmaniyê diyar dikin, dema ku li pêşiya navê kesî bê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak:

- Xal Egîd - Mam Reşo - Met Xecê - Apê Osman

h) Navê saziyên fermî bi tîpên mezin tên destpêkirin.
Mînak:
- Enstîtuya Kurdî - Weşanên Roj - Weşanên Doz

i) Navê pirtûk, kovar, rojname, zagon û birêveberiyan bi tîpa mezin dest pê dike.
Mînak:
- Mem û Zîn - Hewar - Dîwana Melayê Cizîrî - Wêjeya Zimanê Kurdî

î) Navê stêrk û gerestêrkan bi tîpên mezin tên destpêkirin.
Mînak:
- Cîhan - Roj - Heyv - Gelawêj - Zawa

E) Navê welat, herêm, bajar, navçe, gund, tax, rê, kolan, av û çiyan bi tîpên mezin tên destpêkirin.
Mînak:

**1- Navê parzemînan:**
- Asya - Ewrûpa - Afrîka

**2- Navê welatan:**
- Kurdistan - Îran - Îtalya

**3- Navê herêman:**
- Rojhilata Navîn - Bakurê Sûriyeyê- Cizîr (Rojava)

**4- Navê bajaran:**
- Amed - Mehabad - Hewlêr - Qamişlo

**5- Navê navçeyan:**
- Til Koçer - Çil Axa - Cindirês

**6- Navê gundan:**
- Abrê - Helincê - Dêrna Axê - Meydana

**7- Navê taxan:**
- Taxa Cûdî - Taxa Berberoj - Taxa Enteriyê

**8- Navê kolanan:**
- Kolana Mûsa Enter - Kolana Nisêbînê
- Kolana Pîşesaziyê

**9-Navê Çeman:**
- Çemê Dîcleyê - Çemê Feratê - Çemê Hêzilê

**10- Navê çiyayan:**
- Çiyayê Cûdî - Çiyayê Qendîl - Çiyayê Kurmênc

## 5- Nivîsandina peyvên hevedudanî

Ew gotinên ku ji hevgirtina çend peyvan pêk tên û bi hev du ve dibin, jê re "**peyvên hevedudanî**" tê gotin. Di zimanê kurdî de peyvên hevedudanî her tim bi hev ve tên nivîsandin.

Mînak:
- Cegerxwîn - Çavreş - Sorgul - Gamasî

## 6- Nivîsandina peyvên biyanî

Peyvên biyanî, em di jiyana rojane de gotûbêj dikin, çawa tên bilêvkirin wisa tên nivîsandin.

Mînak:
- Tirk - Internet - Televîzyon

## 7- Nivîsandina navên taybet

Navê mirovan ji ber ku heyîneke tenê diyar dikin, taybet in. Ji ber vê yekê, her tim bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak:

- Gulistan - Mêrxas - Nêrgiz - Şoreş

### PIRS

**1-** Navê herêm, bajar, gund û taxan çawa tên nivîsandin?
Bi mînakan diyar bike.

**2-** Di zimanê kurdî de daçek çawa tên nivîsandin?
Şîrove bike.

# XALBENDÎ

Ji bo cih û wateya peyvan di nivîsandinê de bên diyarkirin, hin hêma tên bikaranîn. Weke; xal, bêhnok, cotxal û hwd. Ji van re **"xalbendî"** tê gotin.

## 1- Xal (.)

û Dikeve dawiya hevokê.
**Mînak:** Dijwar çû Amedê.
û Di rêzkirina jimarê de tê bikaranîn.
**Mînak:** "1. 2. 3."
û Li dawiya peyvên ku tên kurtkirin tê bikaranîn.
**Mînak:** Dr. (Doktor)
Hwd. (Her weke din)
N.Y. (Neteweyên Yekbûyî)
ç) Dema ku em dîrokê dinivîsin; di navbera dîroka roj, meh û salê de tê bikaranîn.
**Mînak:** 20.01.1991
d) Di bîrkarî de li cihê hêmaya hevdanê tê bikaranîn.
**Mînak:** 2.20 = 40 40.5 = 200

## 2- Bêhnok (,)

**a)** Di hevokên dirêj û dema kirde ji lêkerê dûr bikeve, tê bikaranîn.

**Mînak:** Bilindê mêrxas, pir bi lez diçe dibistanê.

**b)** Di hevokê de di navbera peyv û birepeyvên di heman erkê de tê bikaranîn.
**Mînak:** Hoşeng, Şervan, Hozan û Berçem şoreşger in.

**c)** Ji bo jihevcudakirina rêzehevokan, tê bikaranîn.
**Mînak:** Roj diçe ava, kew dixwînin, gêrîla ji cihê xwe derdikevin û dest bi şer dikin.
**ç)** Peyvên weke; "erê, na, baş e, dibe, serçavan" ên ku girêdayî hevokên li pey xwe tên, li pişt wan peyvan tê bikaranîn.
**Mînak:**
- Na, ev rewş bi vî awayî berdewam nake.
- Erê, em ê biçin şanoyê.

## 3- Xal Bêhnok (;)

1- Dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî yên ku hev sergihayî dikin.
**Mînak**: Ga dimire çerm dimîne; mêr dimire nav dimîne.

2- Di pêşiya gihanek û daçekan de ku bi tevahî ji hev du vediqetin tê bikaranîn.
**Mînak:** Ew jî bi me re hatin; lê belê venegeriyan.

3- Dikeve navbera komikên hevokên ku hêmanên wan bi bêhnokan ji hev hatine cudakirin.
**Mînak:** Ez pir bi coş û peroş im; ez dixwazim biqîrim, bistrêm, bibezim, ...

## 4- Cotxal (:)

**Cotxal hêmaya daxuyaniyê ye.**
1- Dema ku mînak tê dayîn, cotxal tê nivîsandin.
**Mînak:** Çend peyvên xwerû hene: av, dar, nan…

2- Dema ku der barê wêjeyê gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê cotxal tê danîn.

**Mînak:**
Ahîn: Rojbaş Zozan
Zozan: Rojbaş

3- Di demê de ji bo nivîsandina demjimêrê, cotxal tê bikaranîn.
**Mînak:**9:25 8:30 10:00

## 5- Sêxal (...)

1- Li dawiya hevokên ku sergihayî nebûne tê bikaranîn.
**Mînak:**
"Îro ne tixûb mane, ne leşkertî û ne şer..."
Ev xwendin û perwerde bi mirov çi nade têgihandin...
2- Li cihê gotinên ku nayê xwestin bên gotin, tên bikaranîn.
**Mînak:**
Ji min re got… û pê de çû.

## 6- Pirsnîşan (?)

1- Hêmaya pirsê, li dawiya hevokên pirsiyariyê tê bikaranîn.
**Mînak:** Gelo, ji azadiyê xweştir çi heye?

2- Di hevokên rêzkirinê de dema pirs pir bin, hevok bi bêhinokê tên girêdan û pirsnîşan tê dawiya hevoka dawî.
**Mînak:** Te ew pirtûk xwend, çi tê de hebû, te çi sûd û encam jê girtin?

3- Eger agahiya ku tê dayîn bi guman be, pirsnîşan dikeve nava kevanê (?)
Mînak:

Cegerxwîn di sala (1920-1940?) de berhema xwe ya bi navê Salar û Medya nivîsand.

## 7- Baneşan (!)

1- Li pişt peyv û hevokên ku coş û xemê diyar dikin, tê danîn.

**Mînak:**
Hey bextê xerab! Ev koçberî, ji mirinê ne xweştir e!

2- Piştî bangên hezkirin û tirsê diyar dikin, tê danîn.
**Mînak:**
Ax çi welatekî xweş, mîna bihiştê ye!
Hewar e! Agir bi malê ket.

## 8- Xêzika Axaftinê(–)

1- Ji bo diyarkirina axaftinê tê bikaranîn.
**Mînak:**
– Em di rewşeke ewlehiyê de ne...
– Êdî zehmetiyên me jî zêde dibin.
– Jixwe ev germahî, ji bo şînatiyan pir baş e.

## 9- Xêzika navber (bendik)(-)

1- Dema ku peyvek di rêzê de bi cih nebe, ev xêzik li dawiya rêzê tê danîn.
**Mînak:**
Di zimanê me de hin paşgir hene ku ji navdêr û hevalna-van lêkerê çêdikin, "**andin**" yek ji wan e.

2- Di xebatên rêziman de ji bo ku girêdana kok û paşgirê nîşan bide, an jî peyvekê bi kiteyan dabeş bike, tê danîn.
**Mînak:**
a-xîn, cot-yar, he-val-bend, şa-re-za
3- Dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de peywendî heye.

**Mînak:**
Du-sê mirovan pirsa te kir.

## 10- Xêzika Xwehr(/)

**1-** Rêzikên helbestan li bin hev tên nivîsîn, dema pêdivî hebe ku li rex hev bê dîtin, di navbera wan de xêzika xwehr tê bikaranîn.
**Mînak:** Dema dinê dibe bihar / Dibişkivin devî û dar.

**2-** Di navbera dîrokan de û di navnîşanan de tê bikaranîn.
**Mînak:**
07/05/2002
Çiya Serbest
Kolana azadî, hêjmar: 72/24
Enteriyê/Qamişlo

## 11- Dunik (")

**1-** Peyv û nivîsên ji kesekê/î yan jî ji çavkaniyekê hatine girtin û di nava nivîsekê de hatine bikaranîn, di nava dunikê de tê nivîsîn.

**Mînak:**

Rêber Apo li ser xwendinê wiha dibêje: "Xwendin, ronahiya jiyanê ye".

**2-** Di nivîsê de ji bo balkişandina li ser peyvekê jî, hêmaya dunikê tê bikaranîn.

**Mînak:**
Di tevahiya perwerdeyên ku bi zimanê kurdî tê dayîn de, "Dibistanên Mexmûrê" mînakên herî girîng in.

## 12- Kevanek ( )

**1-** Di daxuyaniyên ku bi çêbûna hevokê ve ne girêdayî de, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Helbestvan Cegerxwîn (Şêxmûs Hesen) di sala 1903'yan de ji dayîk bûye.

**2-** Di berhemên şanoyan de liv û tevgera lîstokvanan di nava kevanê de tê diyarkirin.

**Mînak:**
Mêwefiroş (bi lez ji cihê xwe rabû) got: Tu bi xêr hatî xalo, tu sêvên zer dixwazî yan ên sor?

# PIRSÊN BEŞA PÊNCEM

û eyvên hevedudanî çi ne? Bi mînakan diyar bike.
û Çima xalbendî di nivîsandinê de tê bikaranîn?
û Erkên xalbêhnokê diyar bike.
û Kengî cotxal tê bikaranîn?
û Kengî baneşan tê bikaranîn?
û Rewşên ku xêzika navber tê bikaranîn, diyar bike.
û Kengî dunik tê bikaranîn?

û **Hevokên rast bi tîpa (R) û yên şaş bi tîpa (Ş) hêma û sererast bike.**

**a**) Dema ku peyva "**ma**" di hevokê de tê bikaranîn, rewşa baneşanê dide hevokê.

b) Peyva "**ku**" di hevokê de du peyvan an jî du hevokan bi hev ve girê dide.

**c)** Di berhemên şanoyî de liv û tevgera lîstokvanan di nava dunikê de tê diyarkirin.

d) Bêhnok, di hevokên dirêj de û dema kirde ji lêkerê dûr be, tê bikaranîn.

e) Xêzika xwehr, di navbera dîrokan de û navnîşanan de tê bikaranîn.

f) Xal, li dawiya kurtkirinan tê bikaranîn.

g) Xalbêhnok, di navbera peyv û birepeyvên di heman erkê de tê bikaranîn.

h) Dema ku der barê wêjeyê gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê, xal tê bikaranîn.

i) Xêzika navber, dema ku peyvek di rêzê de bi cih nebe, tê bikaranîn.

j) Sêxal, li dawiya hevokên sergihayî, tê bikaranîn.

k) Di hevokên rêzkirinê de dema ku pirs pir bin, her hevok bi pirsnîşanê tê bidawîkirin.

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | - Ziman çi ye?<br>- Girîngî û taybetiyên ziman | - Cih û girîngiya ziman di jiyana civakê de |
| Cotmeh | - Birên ziman ên serbixwe<br>- Malbata ziman | - Pêşketina dîrokî ya zimanê nivîsa kurdî | - Pêşketina dîrokî ya zimanê nivîsa kurdî<br>- Pirsên beşê | - Dengnasî<br>- Alfabeya kurdî |
| Mijdar | - Dabeşkirina dengan<br>- Dengdêr û teybetiyên wan | - Dengdar û taybetiyên wan | - Hevgirtina dengan, kite û çêbûna wan | - Ketina deng<br>- Guhartina dengan<br>- Pirsên beşê |
| Berfanbar | - Peyvnasî.<br>- Peyv li gorî wateya xwe | - Peyv li gorî çêbûnê | - Peyv li gorî çêbûnê<br>- Pirsên beşê | - Xebatên amadekariyê<br>- Koknasî |
| Rêbendan | Lêveger | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | - Cure û taybetiyên kokan | - Cure û taybetiyên pêvekan<br>- Pêvekên navdêrsaz | - Pêvekên navdêrsaz | - Pêvekên lêkersaz |
| Avdar | - Pêvekên kêşanê<br>- Raweya fermanî | - Rawe: bilanî, divêtî, mercî û daxwaziyê | - Pêvekên demê | - Veqetandek û tewang |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Cotan | - Cînav û cureyên wan...<br><br>- Pirsên beşê | - Destûrên nivîsê | - Bikaranîna tîpên mezin | - Nivîsandina navên taybet, peyvên hevadudanî û yên biyanî<br>- Xalbendî |
| Gulan | Lêveger | BÊHINVEDAN | | |

# RÊZIMANA KURDÎ

## AMADEYÎ 2

**2019/2019**

# 2

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Zimanê Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM.....7
ZIMAN Û CIVAKBÛN.....7
ZIMAN Û MIROV.....8
DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ.....10
CIHÊN KU ZIMANÊ KURDÎ LÊ TÊ AXAFTIN.....14
ZIMANÊ AXAFTINÊ, ZIMANÊ NIVÎSÊ Û BIRÊN WÎ YÊN CUR BI CUR.....15
BEŞA DUYEM.....19
PEYVÊN NAVDÊRÎ.....19
DABEŞKIRINA NAVAN.....19
NAV, LIGORÎ ZAYENDA XWE, DIBIN DU BEŞ.....23
NAV LI GORÎ ÇÊBÛNA XWE.....31
CUREYÊN NAVÊN PÊKHATÎ.....33
BEŞA SÊYEM.....39
HEVALNAV.....39
CUREYÊN HEVALNAVAN:.....41
BANEŞAN.....50
CUREYÊN BANEŞANAN.....51
BEŞA ÇAREM.....57
PÊVEBER.....57
CUREYÊN PÊVEBERAN.....58
CÎNAVK.....59
BEŞA PÊNCEM.....67
DEM Û AVANIYA TEBATÎ Û LEBATÎ.....67
BEŞA ŞEŞEM.....79
DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ.....79

# BEŞA YEKEM

## ZIMAN Û CIVAKBÛN

Zimanê destpêkê, xwe dispêre hêmanên jest û mîmîkan(nîşaneyên gewdî), hîn jî ji hatina asta dengan pir dûr in. Her ku jiyana civakî bi pêş dikeve, ziman jî bi pêş dikeve û her ku ziman bi pêş dikeve, jiyana civakî jî bi pêş dikeve. Asta pêşketina zimên, asta pêşketina jiyanê ye. Civakeke ku zimanê xwe yê dayîkê çi qasî bi pêş xistibe, ew tê wê wateyê ku asta xwe ya jiyanî jî bi pêş xistiye.

Ziman, daneheva civakî ya hişmendî, sincî, hîs û ramana bedew (estetîk) e ku civakê bi dest xistiye. Ziman, hebûna nasnameyî, hişmendî, wate û hîsiya serxwebûnî ye û bûye xwedî raveya civakê. Civaka ku xwe gihandibe zimên, bûye xwediyê hêza jiyanê.

Ev, di heman demê de, pêşketina dualîteya (dualîbûn) civakî jî nîşan dide. Pêwîste li vir di avakirin û pêşketina civakê de, rista dayîkê bê zanîn; ango ziman, çawa bi rêya dayîkê bi pêş ket?

Dema ku em berê xwe didin rastiya dîroka avabûna jiyana civakî û pêşketina civakê, em her tim dibînin ku jinê,

ango dayîkê, risteke dîrokî lîstiye. Ango rista dayîka xwedawend, di çêbûna zimên de, pir mezin e. Civaka ku çi qas, zimanê xwe yê dayîkê ji dest dabe û ketibe bin serweriya zimanên din, ev diyar dike ku ewqas hatiye mêtin, qirkirin û pişaftin.

## ZIMAN Û MIROV

Ziman, hîm û taybetiyeke mirov û mirovbûnê ye û berhema jiyaneke hevkar, hevpar a civakî ye. Di nava têkiliyên hilberîn û danûstandinan de, weke navgîneke lihevkirin û jihevtêgihîştinê derketiye.

Bi gotineke giştî, mirov dikare bêje: Her tiştê ku di xwezayê (xwezaya razberî û şênberî) û mejiyê mirov de hebe, li hemberî wateyekê be, ziman e.





Lewra ji destpêka ku mirov ber bi mirovbûnê ve ango ber bi civakbûnê ve diçe, hem di hêla giyanî û hem jî di hêla daringî de ji aliyekî ve li rastî bextreşî, bûyer, qewimîn, xişim, bêtar, astengî, zor û zehmetiyên dijwar û heyberên xwezayî yên cuda cuda tê. Her wiha ji aliyekî din ve jî di encama ked û serkeftina di têkoşîna li hemberî wan tiştan de, li rastî bextewarî, dilxweşî û şadiyan jî tê.

Belê, baş an xerab, her tiştê ku derdikeve pêşiya wan, destpêkê wêneyeke wî dikêşe û ji bo ku ji tişt û heyberên din cuda bike, wateyekê didê; ango nav lê dike û di cihekî mejiyê xwe de tomar dike. Li vir, em ji vê hêza watedayînê, ango navlêkirinê re dibêjin, ziman û hizir.

Lewra ziman û hizir, du tiştên wisa bi hev ve girêdayî ne ku bi tu awayî mirov nikare, wan bêyî hev bihizire û ji hev qut bike.

Di heman demê de bi ked, hilberîn, çand û civakbûnê re jî di nava têkilî û girêdaneke weke goşt û hestî de ne; yek bêyî yê din nabe, bi hev re dimeşin, hev xwedî dikin û bi pêş dixin.

Jixwe tiştên ku mirov dikin mirov jî ev pênc hêmanên bingehîn in: ked, hilberîn, ziman, hizir, çand û civakbûn in. Lê di nava van de yek heye ku weke nasname û bîra civak, gel û netewan derdikeve pêş; van her çarên din di xwe de vedihewîne û ji nifşekî derbasî nifşekî, ji demên bûrî derbasî dema bê dike, ew jî ziman e.

Li vir, têkilî û taybetiya zimên a bi dîrokê re jî derdikeve pêşiya me û gotina ku: ‘‘Kes an jî gelê ku zimanê wî hebe, dîroka wî jî heye. Kes an jî gelê ku zimanê wî nebe, dîroka wî jî tune ye.” watedar dibe.

Pirsgirêka zimên, çawa ku bi çalakiya kes a afirîner ve girêdayî ye, her wisa bingeha diyarkirina hebûna wî ye jî.

Dema ku zimanê kesan ji wan tê standin, ew dikevin, rewş û asteke wisa ku ji lawiran kêmtir û paşdetir dibin. Lewra, di lawiran de gelek melekeyên (mêldarî) xwezayî ku di mirovan de tune ne, peyda dibin. Lawir, bi wan melekeyan jiyana xwe didomînin. Lê melekeyên wiha xwezayî, di kes an jî mirovan de tune ne. Mirov, wan kêmasiyên xwe yên xwezayî, bi zimên tekûz dikin. Ji ber vê sedemê, ziman hêmana pêkhatina kesî ye. Ev pêkhatin jî çalakiyeke ku bi afirîneriya zimên derdikeve holê.


Ziman, bi hidam(hiş, aqil, hest), zanyarî, vîn, têgihîştin û bîrê ve girêdayî ye, lê ancax bi avakirina ahengiyeke bi wan melekeyan re, hêza xwe ya hilberîner, nîşan dide.

Bîr, binkêşa zimên e, vîn, venêrînerê wî ye û hiş jî ronahîkirina wî ye.

Li cihê ku ev meleke nekevin nava ahenga zimên, ji navgîna şaş bikaranîna gotinê wêdetir naçe tu derê, di gotinên tên kirin de jî, wateyeke tevahî û hevgirtî dernakeve û binkêşeke dengan derdikeve holê.

# DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ






Gelek şûnwarnas(arkeolog), vê dîtinê parve dikin ku zimanê yekem ê Şoreşa Neolîtîkê, ziman û çanda kurdî ye ku li qontarên çiyayên Toros-Zagrosê dest pê kiriye. Bi demê re, bingeha hemû zimanên ku koka wan Arî (Hind-Ewrûpî) pêk aniye. Tê hizirîn ku ji salên 9000 B.Z û vir ve, ne bi fîzîkî lê bi awayekî çandî li erdnîgariya Mezopotamyayê belav bûye.

Derketina ji Serdema Çarem a Qeşayê (20000-15000 B.Z) weke ziman û çanda Arî, li ser xaka Mezopotamyaya Jorîn ji aliyê civaka kurd ve, hatiye bipêşxistin.





Li gorî lêkolînên ku di perestgeha Xerabreşkê (li Rihayê ye) de hatine kirin, 12000 sal B.Z gelek berhemên binirx ên wê serdemê, yê (wêneyên lawiran, peyker û nivîsên hiyegrolîfî ) li ser dîwarên perestgehê hatine çêkirin û dîtin. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje, nivîsa hiyegrolîfî, ji aliyê civaka kurd ve bi pêş ketiye.

Kurd, yekem car li ser dika dîrokê (bi navkirina Sumeriyan) bi navê Hûriyan 3000-2000 sal B.Z. tên nasîn. Pergala muzîk û lîstikên kurdan li Rojhilata Navîn, çanda herî geş û xwedî nirxên hunerî ye. Mirov çanda kurdan herî zêde di muzîk û govendên wan de dibîne.

Her wiha, mirov bi heman awayî bi çavdêriya li sekna jinê, cil û berg lixwekirin, şêwaza wê ya bi nazikî û narîniya rabûn û rûniştina wê de dibîne. Çavkaniya reseniya nifşê kurdan, ji serdema seretayî digire.

Dema ku em li çîrok û folklora kurdan dinêrin, dibînin ku zêdetir destanî ne. Bi giranî destanên lehengiyê tînin zimên.

Em di destanên Gilgamêş, Semîramîs, Tufana Hz. Nebî Nûh, Mem û Zîn, Memê Alan û Derwêşê Evdî de, van rastiyan dibînin.

Di pêkhatina vê reseniyê de, xwezaya çiyayên asê yên Kurdistanê, berxwedana gelê kurd a li dijî dagirkeriya domdar û zordar, dîrokeke demdirêj bandor dike. Di demên dawiyê de, gelek belgeyên ku bi zimanê hûrî hatine nivîs, ji aliyê şûnwarnasan ve hatine dîtin. Belgeyên ku li bajarên Orkêş (Amûdê) û Hîtîtan hatine peydakirin, der barê Hûriyan de agahiyên berfireh didin. Tê gotin ku Hûrî, berdewamiya civakên 6000 sal B.Z ku çanda neolotîk û şoreşa zimên, gihandine sazîbûnê û çanda Til Xelefê ava kirine.

Jixwe, di salên 3000 B.Z de Sumeran navê Hûrî, ango gelê çiyayî li Hûriyan kiribûn. Civaka kurd, di serdemên cuda de bi navên cuda yên mîna: Kurtî, Hûrî, Mîtanî, Gotî, Sobarî, Kasîtî, Naîrî û Med hatine binavkirin, heman çand û ziman domandine.

Di belgeyên Sumeran de jî tê vegotin, dema ku dîrokê bi awayekî nivîskî dest pê kiriye, civakên binyad kurd in û di dika dîrokê de risteke sereke lîstine. Sumeran navê mîna: Kurtî, Hûrî, Gotî, Naîrî û hwd. li kurdan kirine.

- Kurtî: Kur = cihê bilind, tî = yên xwemal
- Hûrî: Gelê welatên bilind.
- Gotî: Gelê ku gayan xwedî dikin.

Go = Xuda , Gotin = Xudayê herî bilind.

- Naîrî: Gelên robaran; gelên di navbera her du çeman Dîjle û Feratê de dijîn. Li vir tê dîtin ku Hûrî, Gotî û Naîrî bi Sumeran re pir di nava hev de bûn. Koka zimanê Hûriyan, Aryenî ye.
- Kasîtî: Gelê xizan.

Tê çespandin ku gelek gotinên ji koka vî zimanî derbasî zimanê Sumeran bûne. Bi taybetî, navê dexil û danan, navê amûrên çandiniyê, navê keştiya çolê(deve) bi zimanê Semîtîkî e. Gelek pêşgir û hêmanên mêtiyê yên di zimanê Sumeran de hene, ji heman çandê hatine. Lihevanîna destana Derwêşê Evdî jî çavkaniya xwe ji nivîsên li ser kevalên Sumeran ên 2000 sal B.Z. digire.

Heman tişt li herêma Şengalê(Sincar) ji aliyê keçeke nediyar ku weke Gîro tê binavkirin jî li ser navê lehengekî gel tê gotin. Di navbera helbesta Gîro û nivîsên li ser kevalan ên 2000 sal B.Z. û destana Derwêşê Evdî de, hevdirûveke bêhempa heye.

Di navbera ola xwedawenda Înana-Îştar û Stêrkê de hevdirûv heye. Bi taybetî, destana Hz. Nûh û Gilgamêş jî dişibin hev. Ji aliyê mîtolojiyê ve jî Hûriyan bandor li ser Sumeran kirine.

Bi kurtasî, dîroka nivîskî destnîşan kiriye ku ziman û çanda kurdî bi yekem şoreşa ziman û cotkariyê re li ser xaka Mezopotamyayê, ango li ser xaka Kurdistanê, weke nasnameyeke cuda awa girtiye û gihîştiye sazîbûnê. Piştî vê pêvajoyê, di destpêka şaristaniyê de, li cih û demên cuda di bin navên cuda de weke; Hûrî, Gotî, Kasît, Mîtanî, Naîrî, Med û hwd. jiyana xwe domandiye.

Her wiha, civaka kurd, bandoreke sereke li civakên derdora xwe kiriye. Di dîroka Heredot de pir zelal e ku ziman û çanda Medan bandora xwe li Helenan kirine û çavkaniya wan Med e. Helenî(Yewnanî), 900-400 ê B.Z pir zêde di bin bandora Medan de mane.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Rista jinê ya di pêşketina zimên de, diyar bike.
2- Çi têkilî di navbera zimên û mirov de heye?
3- Çi têkilî di navbera zimên û hizir de heye?
4- Hêmanên ku mirov dikin mirov, çi ne? Ya herî girîng diyar bike.
5- Dema ku zimanê kesan ji wan tê standin, ew dikevin rewşeke çawa?
6- Çi têkilî di navbera zimên û bîr, vîn û hiş de heye?
7- Li gorî hin şûnwarnasan, zimanê yekem çi ye û li ku derê dest pê kiriye?
8- Li perestgeha Xerabreşkê çi hatiye dîtîn û wateya wê çi ye?
9- Belgeyên ku li bajarê Orkêş(Amûdê) û Hîtîtan hatine peydakirin, çi diyar dikin?
10- Kurd, di serdemên cuda de bi kîjan navan hatine binavkirin? 11- Dîroka nivîskî, çi destnîşan kiriye?
12- Heredot, di pirtûka xwe ya dîrokê de, der barê ziman û çanda Medan de, çi diyar kiriye?

# AXAFTINA BI ZIMANÊ KURDÎ

Zimanê kurdî, zimanekî kevnar ji nav zimanên ê cîhanê ye. Li gorî kevnarbûna xwe, ji aliyê nirxên dîrokî û wêjeyî ve jî cihekî birûmet digire.

Bingeha zimanê kurdî, ji hezarê salan B.Z ve dest pê kiriye û heta ku digihêje Şoreşa Neolîtîkê. Li hemberî êrîşên dijwar ên dagirkeran, hebûna xwe parastiye. Ji ber ku di her derfetê de , dagirker ji bo tunekirina ziman, çand û dîroka gelê kurd xebitîne. Gelek nirxên wêjeyî yan tune kirine, yan weke berhemên xwe bi gel dane naskirin û pejirandin. Lê dîsa jî nikarîbûn ziman, çand, wêje û dîroka kurdan ji holê rakin.

Gelek ziman li cîhanê hene ku nikarin bi nivîskî xwe bi pêş bixin, tenê bi axaftinên xwe dijîn. Lê zimanê kurdî, bi çend şêweyên nivîsê dikare weşanê bike, çand û wêjeya xwe bi pêş bixe.





## CIHÊN KU ZIMANÊ KURDÎ LÊ TÊ AXAFTIN

Di cîhanê de zimanê kurdî, ji wan zimanên herî kevnar e. Ji ber ku gelê kurd ne gelekî koçber e, di heman erdnîgariyê de hebûn û niştecihbûna xwe domandiye, ji ber vê yekê zimanê wî jî hebûna xwe parastiye.

Her çi qas êrîşên neyaran di zimanê kurdî de parçebûn çêkiribe û weke zarava ji hev û du hatibin parçekirin jî lê nikarîne vî zimanê kevnar ji holê rakin.

Mirov dikare bêje ku zimanê kurdî, zimanê herî kevnar e. Ji ber ku Avestaya Hz. Zerdeşt bi kurdiya kevin (pehlewî) hatiye nivîsandin. Lê piştî hilweşandina dewleta Medan, zimanê kurdan ê nivîsê, ji aliyê neyaran ve hatiye tunekirin û zimanê axaftinê jî ji ber dagirkeriya neyaran, hatiye parçekirin.

Ev bûye sedem ku di nava kurdan de sê cureyên ABC'yan werin bikaranîn (erebî, latînî, kirilî).

Her çi qasî zimanê kurdî bindestî jiyan kiribe jî, lê taybetiyên xwe yên xwezayî û xweserî, bi giştî zaravayên xwe parastiye û ABC'ya latînî weke ABC'ya xwe daye pejirandin. Niha li Kurdistan, Anatolya, li gelek herêmên Ereban, Îran, Ermenîstan, Ewropa û gelek dewletên Sovyeta kevn bi şêweyên cur bi cur, zimanê kurdî tê axaftin.

## ZIMANÊ AXAFTINÊ, ZIMANÊ NIVÎSÊ Û BIRÊN WÎ YÊN CUR BI CUR

Ziman, zanist û teknîk ji bo bersivê bidin pêwîstiyên rojane, derketine holê û pêşketineke misoger çêkirine.

Di encama van pêşketinan de, li ser zimanê rojane, zimanê duyem derketiye holê. Ev di jiyana rojane û nivîsandinê de, tên bikaranîn. Weke zimanê axaftin û nivîsê, weke du parçeyan, ji hev hatine cudakirin.

### a- Zimanê Axaftinê

Zimanê axaftinê, bikaranîna bersivdayîna pêdiviyên jiyana rojane ye. Ji bo van pêdiviyan, mirov her tim bi hev re di nava danûstandinê de ne. Dema ku mirov rastî hev tên, livandinên dest, mil, çav û rû dikevin nava zimanê axaftinê.

Dema ku kesek diaxive, bi piranî rastiya rêziman û sazkirina hevokê li berçavan nagire. Bi vê taybetiya xwe,

zimanê axaftinê, ji aliyê peyvê ve sînordar û di çêkirina hevokê de jî zimanekî asayî ye. Lê belê, ji ber ku rojane tê bikaranîn, germ û zindî ye.

Ziman, hebûneke zindî û herikbar e. Ew di pêşketina peydakirin û teknîka nû de, bibandor e. Zimanê axaftinê jî para xwe ji vê digire. Lê belê, dema ku peyvên weke; telefon, Tv, elektirîk, komputer û feza dikevin nava zimanê axaftinê, ji nava zimanê rojane dernakevin.

Ev, weke endamên dewlemendkirina zimanê axaftinê tên pejirandin. Ji zimanê ku bi awayê deng tê bikaranîn re, **zimanê axaftinê** tê gotin.

## b- Zimanê Nivîsê

Zimanê nivîsê, xwe dispêre zimanê axaftinê. Di navenda çandekê de, zimanê axaftinê yê herî resen, weke zimanê nivîsê tê pejirandin.

Di roja me de zimanê me xwe dispêre xwezaya xwe. Ji ber ku gelek herêmên me çiyayî ne, bandora zimanê biyanî li ser çênebûye. Zimanê ku xwe bispêre xwezayîbûna xwe, derfetên têgihîştinê firehtir dibin.

Zimanê nivîsê, bi endamên zimanê axaftinê yên herêmî re, xwedî dibe û digihêje rewşa zimanê dewlemend. Lê belê di navbera zimanê nivîs û axaftinê de, ji aliyê peyv, pêvek û rêzkirinê ve hin cudahî hene. Ji ber ku zimanê nivîsê, bêhtir li gorî destûrên zimên bi pêş dikeve.

Daxwaz ew e ku mirov cudahiyê di navbera zimanê nivîs û axaftinê de bike. Zimanê nivîsê, zimanê pirtûkê ye. Peyva pirtûk, li şûna hemû nivîsên tên weşandin, hatiye bikaranîn. Her civaka ku dihizire û dinivîse, raman û hizirînan bi rêya nivîsê kom dibe û bermahiyên çandî derdikevin holê. Ev bermahî, ji nivîsên pey xwe re, dibin berhemek.

Wateya zimanê nivîsê ji bo komkirin û hilanînê, zimanekî şayan e. Gencîneya herî mezin a zimên, berhemên nivîskî ne. Dema ku çand tê gotin, ev berhemên nivîskî û giranbuha, di nava wê de tên têgihîştin.

Gelê xwedî dîrok û çand, deyndarê zimanê nivîsê ye. Ger zimanê nivîsê nebûya, tiştê bi serê kurdan hatiye, wê çawa bihata têgihîştin? Çavkaniya berhemên çandî yên tên bikaranîn û mirov dikare bêje zimanê çandê bi xwe ye jî. Zimanê ku ji bo berhemên çandî, pîşe û nivîsa welatekî tê bikaranîn, jê re **zimanê nivîsê** tê gotin.

Çi qas ku zimanê axaftin û nivîsê têkildar bin, dibe ku bi demê re belavbûn û pêşketina zimanê kurdî ya li Rojhilata Navîn ji aliyê deng, awa û wateyê ve cudahiyek di navbera wan de bê dîtin. Di encama wan cudahiyan de, destûrên weke zimanê herêmî û zarava derketine holê.

## 1- Devok

Li gelek herêmên me peyvên cur bi cur ên ne wekhev tên dîtin, lê ji aliyê rêziman ve wekhev in. Her çi qas peyvên devokî, ne weke hev bin jî, lê bandorê li zimanê nivîskî nakin. Zimanê ku li herêmeke biçûk a welatekî tenê ku girêdayî wê herêmê, ji aliyê deng ve cudahiyan nîşan dide, jê re **devok** tê gotin.

Devok, dewlemendiyeke zimanê nivîskî ye. Devokên Kurdistanê pir in. Weke devoka Amed, Mêrdîn, Silêmanî, Kirmanşah, Efrîn, Riha, Botan, Çewlik û hwd.

## 2- Zarava

Ji ber hin sedemên dîrokî û ramyarî, pêşketina zimên çêbûye. Di encama wan pêşketinan de, li herêmên cuda cuda, bikaranîna peyvên cuda û gencîneyên zimên ên cuda, ji xwe re çêkirine. Bi vî awayî, ev zarava ji hev cuda hatine bipêşxistin. Ji van beşên zimên re **zarava** tê gotin.

Ji ber ku pêşketinên lezgîn çêbûne, dûrketina wan a ji hev zêdetir bûye û her yek, weke zimanekî hatiye bikaranîn.

Ji ber vê sedemê, kesên ku bi zaravayên cuda diaxivin, ji axaftinên hev du baş tênagihêjin. Ji ber vê sedemê, carinan li şûna zarava, peyva zimên tê bikaranîn.

**Çar zaravayên zimanê kurdî hene:**

**1- Kurmanciya jorîn**
**2- Kurmanciya jêrîn (Soranî)**
**3- Dimilî (Kirmanckî-Zazakî)**
**4- Lorî**

## PIRSÊN BEŞA YEKEM

**1- Têkiliya di navbera ziman û civakbûnê de çi ye? 2- Pêşketina zimanê mirovan, çawa çêbûye?**
**3- Mirov di jiyana rojane de çend zimanan bikar tîne?**
**4- Avestaya Zeredeşt, bi çi zimanî hatiye nivîsîn û ev çi diyar dike?**
**5- Zimanê kurdî li ku derê tê axaftin?**
**6- Zimanê axaftinê û zimanê nivîsê, pênase bike.**
**7- Zimanê devokî, pênase bike.**
**8- Çend devokiyên Kurdistanê, diyar bike.**
**9- Zaravayên zimanê kurdî, diyar bike.**
**10- Çima zimanên biyanî, bandoreke xurt li ser zimanê kurdî nekirine?**

# BEŞA DUYEM

## PEYVÊN NAVDÊRÎ

### Navdêr

Li gel komên peyvên biwate, di nava hevokan de erk digire. Mînak: **kirde, bireser û hevalkar.**

1- Ger di nava hevokê de karekî bi rê ve bibe, dibe **kirde**.
**Mînak:** **Amediyan** jî têkoşîn kirin. (**Amediyan** kirde ye)
2- Ger nav ji karê kirde bandor bibe, dibe **bireser**.
**Mînak:** Ciwanan **pirtûk** xwendin. (**pirtûk** bireser e)

3- Ger nav rewşa kar diyar bike, dibe **hevalkar**.
**Mînak:** Her **sibeh**, ez rûyê xwe dişom**. (sibeh** hevalkar e)

## DABEŞKIRINA NAVAN

**Nav, li gorî taybetiyên heyînan, dibin du beş:**

### 1- Navên Taybet

**Gulistana Efrînî, li rojavayê Kurdistanê rojnamevanî dikir.**

Di hevoka li jor de peyvên weke; Gulistan, Efrîn, rojavayê Kurdistanê, ji ber ku di cîhanê de mîna wan tune ye û heyînekê tenê didin nasîn, ji wan re **navên taybet** tê gotin.

Weke navên; gel, welat, cih, ziman, ol, pirtûk, rojname, kovar, sazî, robar, derya û çiyayên naşibin hev.

Ew navên ku taybet in û weke wan tune ye. Ji ber vê yekê, heyînekê tenê didin nasîn.

Di hevoka we xwendî de peyvên weke; Gulistan, Efrîn, rojavayê Kurdistanê, bi tîpên mezin hatine destpêkirin.
Navên taybet wiha tên sazûmankirin:

## Mînak:

**Navên mirovan:** Bêrîvan, Aram, Gulîzar, ...
**Binemal (paşnav):** Bedirxanî, Mala Haco, ...
**Navên saziyan:** TEV-DEM, QSD, MSD, YPG, YPJ ...
**Navên welatan:** Kurdistan, Tirkiye, Îran, Suri...
**Navên bajaran:** Nisêbîn, Qamişlo, Kobanê, Mahabad, Hewlêr, ...
**Navên herêman:** Botan, Aliyan, Soran, Cizîr, Efrîn, Dirbêsiyê, ...

## 2- Navên Giştî (hevenav)

- **Wan, pirtûkên xwe li baxçeyê dibistanê, xwendin.**

Li peyvên ku di hevoka jor de hatine yên mîna: pirtûk, baxçe û dibistan, baldar bin.

Ev di cîhanê de tenê ne? Na, weke wan gelek in. Ji komeke heyînên wekhev re, navek hatiye dayîn:

- Ji hemû pirtûkan re **pirtûk** tê gotin.
- Ji hemû baxçeyan re **baxçe** tê gotin.
- Ji hemû dibistanan re jî **dibistan** tê gotin.

Heyînên di heman birê de û ji heman navên pêkhatî re, **navên giştî** tê gotin.

### Nav, li gorî wateya xwe, dibin du beş

## 1- Navên şênber(heyberî)

Ew navên ku mirov bi çavan dibîne, hebûna wan diyar, berbiçav û bi her pênc lebetên pêhesînê bi heyîna wan dihesin, ji wan navan re **navên şênber(heyberî)** tê gotin.

Weke; çiya, sarinc, av, jin, îsot...

## 2- Navên razber(rewanî)

Ji tiştên ku heyînên wan nayên dîtin, lê belê bi riya hizirînê heyîna wan tê bawerkirin re **navên razber(rewanî)** tê gotin.
Peyvên weke; hezkirin, tirs, başî, xemgînî, maf, azadî, namûs hiş, aramî, hêvî, guneh, bawerî, ...

Ev peyv, tên naskirin an jî tên bawerkirin. Em nikarin bi lebeteke pêhesînê heyîna wan tekez bikin.

## 2- Nav, li gorî jimara xwe, dibe du beş

### 1- Navên yekjimar

Dema ku navdêr bi tena serê xwe be, yekjimar e.
Rewşên yekjimariyê:
1- Bi lêkeran re. Min
av **vexwar.**
Min sêv **da.**

2- Bi veqetandekan re: Xwîşk**a**
min xwendekar e. Biray**ê**
min karker e.

3- Bi tewangê re:
Sêl**ê** baş gerim bike.
Ew li binê darek**ê** rûniştî bû.

### 2- Navên pirjimar

Dema ku navdêr bi serê xwe be, nabe pirjimar û tu qertaf di kurdî de tune ne ku navdêran bi tena serê xwe, bikin pirjimar. Pirjimariya navdêran bi vî awayî pêk tê:
1- Bi lêkeran re:

Min pirtûk anî**n**.
Xwendekar hat**in**.

2- Bi veqetandekan re:
Mih**ên** me şîro ne.
Dar**ine** me ji nû ve şîn bûne.
3- Bi tewangê re:
Dengê marmara berxik**an**.
Ez ê dar**an** biçînim

Di zimanê kurdî de carinan pêveka kom dikeve li ser hin navên giştî, ne ji bo kombûna nav, têgehên nû çêdikin.
**Ew jî ev in:**

**1- Zêdekirinê diyar dike**

**Bêrîvan, çeka xwe dide milê xwe, li ber tava rokan digere û diçe serê zinaran, li hemberî neyaran şer dike, ji serma zivistanan natirse.**

Tevî ku rok yek bi tenê ye jî peyva rok, weke kom hatiye bikaranîn. Her wiha, zivistan yek tenê ye, lê kom hatiye bikaranîn. Li vir xwestiye zêdehiya germbûna rokê û sarbûna zivistanê diyar bike.

**2- Rêzdariyê diyar dike**

**Mamoste! "Kerem bikin jor."**

Tevî ku mamoste kesek bi tenê ye jî, lê ji ber rêzdariyê pêveka kom hatiye bikaranîn.

**3- Wateya nêzîkbûnê diyar dike**

**Di salên neh dehê de ye.**

Ji ber ku neh û deh bi serê xwe pêveka komê negirtine, pêveka "-ên" a ketî ser peyva sal, ne ku gelek salên neh û dehê hene, dibe ku dixwaze bêje temenê wî/ê nêzîkî neh û dehê ye.

### 4- Mezinahiya nav diyar dike

**Egîdan, em gihandine roja îro.**

Di vê hevokê de her çi qas Egîd yek be jî, lê ji bo mezinahiya nav, pêveka komê standiye.

## Nav, li gorî zayenda xwe, dibin du beş

### 1- Navên Mê

Ew navên ku heyîneke mê didin nasîn, jê re **navê mê** tê gotin.

**Mînak:**

**Navê tiştan:** Pencere, dibistan, xak, pênûs, ...
**Navê şînatiyan:** Mêw, kulîlk, dar, hinar, gul, mêrg, ...
**Navê mirovan:** Gulistan, Bêrîvan, Nêrgiz, ...
**Navê lawiran:** Mih, mirîşk, mehîn, bizin, ...

### 2- Navên nêr

Ew navên ku heyîneke nêr didin nasîn, jê re **navê nêr** tê gotin.

**Mînak:**

**Navê tiştan:** Derî, kevir, xanî, ...
**Navê mirovan:** Azad, Şivan, Serbest, ...
**Navê lawiran:** Beran, keleşêr, nêrî, ...

Navên giştî, hem nêr hem jî mê tên bikaranîn. Ji bo diyarkirina zayenda van navan; pêvekên tewangê "**-ê**, **-î**" û veqetandekên "**-a**, **-ê**" tên bikaranîn.

**Mînak:**

Vî karkerî, karê xwe zû qedand.
Vê helbestvanê, helbesteke seyr nivîsand.
Xwendekarê me.
Xwendekara me.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

**Heyf e mêr bimre nebîne**
**Sed birîn û ceng û şer**
*Hezîn Kurdî*

**1.** Di malika li jor de kîjan ji vebijêrkên li jêr tune ye?

a- Navên şênber
b- Navên taybet
c- Navên giştî
d- Navên yekjimar
e- Navên nêr

**2.** Ji endamên hevoka li jêr, kîjan ne nav e?

| Şivan | biharê | diçin | zozanan. |
|---|---|---|---|
| Kirde | Têrker 1 | Lêker | Têrker 2 |

a- kirde
b- lêker
c- têrkera 1
d- têrkera 2

**3.** Di kîjan vebijêrkên li jêr de bêhtir nav hene?

a- Xeyrî, Kemal û Bêrîvanan vala şer nekirine. b- Zarok ta êvarî dilîzin.
c- Bêrîvan diçin bêriyê.
d- Em pirtûkan dinivîsin.
e- Dar di biharê de şîn dibin.

**4**. Kîjan hevoka li jêr, pêvekên komê "**-an**, **-ên**" negirtiye?

a- Mamoste û şagirtan karekî binirx pêşkêş kirin.
b- Hogir, di salên pazdeh û şazdehan de ye.
c- Tava rojan nikare me ji xebatê bide dûrxistin.
d- Mamoste! "Kerem bikin jor."
e- Xwendekaran kom bikin û waneyê bidin wan.

# REWŞA NAVAN

**Evîndarekî bi hêviyên xwe re yar im**
**Dildarekî bi jiyana xwe re birîndar im**
**Di nav dil de agirekî bêreng im**
**Dilkovan im ji karwanê jiyanê re**
**Pênûs im ji rastiya dîrokê re**
**Bi navê îro şewirî me dilşad im**

Di helbesta we xwendî de navên “pênûs, îro”, bêpêvek in, navên ku “Evîndarekî bi hêviyên xwe re/Dildarekî jiyana di dil de/Agirekî karwanê bi hizir û birên evîndariya jiyanê” pêvek standine û hatine bikaranîn. Hûn dizanin pêveka "**-ên**" a komê ye, pêvekên “**-a**, **-ê**, **-î**, **-ek**, **-o**” û daçekên "**bi-re**, **di-de**, **ji-re**" li gel navan di nava hevokê de têkiliyê li gel peyvên din çêdikin û saz dikin. Ji ber erka navan a di nava hevokê de ketine nava dirûvekê(qalibekî), jê re **rewşa navan** tê gotin.
Pêvekên ku van rewşan diyar dikin, jê re **pêvekên rewşa navan** tê gotin.

### Sê rewşên nav ên sereke hene:

1- Rewşa nav a xwerû
2- Rewşa nav a herikandî
3- Rewşa nav a daçekî

## 1- Rewşa nav a xwerû

Ev nav, tu pêvekên rewşa navan nagirin.

**Mînak:**

Agir geş dibe.

Hevalan hol li neyaran teng kirin.
Gel bi serokatiya xwe serbilind e.
Dil bi dilan şa dibe.
Kevir û kuç li te bibarin.

Navên ku di mînakên li jor de binê wan hatine xêzkirin, çi di rewşa kit de bin û çi di rewşa kom de bin; pêveka komê standibin jî, ji ber ku pêveka rewşa navan nestandine, di rewşa xwerû de ne. Ger nav, pêveka rewşa nav nestandibe, jê re **rewşa nav a xwerû** tê gotin.

## 2- Rewşa nav a herikandî

Rewşa navan a herikandî, di nava xwe de dibe çar beş:

- **Rewşa navan a herikî ya zayendî**

  **Rengê gulê pir ciwan e**
  **Sosin û Beybûn jêr heval**
  **e Ya ditirê ez nasnakim**
  **Ser çiyayî xweş heval e.**

Weke di malika li jor de tê dîtin peyva "gul û çiya" di pêvekên zayendî de (**-ê**, **-î**) ji rewşa xwe ya xwerû derketine û ketine rewşa navan a herikiya zayendî. Ew navên xwerû yên ku pêveka zayendî ya nêr û mê standin û zayenda wan diyar dikin, ji wan re **rewşa navan a herikî ya zayendî** tê gotin.

### b) Rewşa navan a herikî ya ravekê

**Gula deştan ciwan e**
**Gula çiyayî ciwantir e**

Di malika li jor de peyva deşt, pêveka ravekê "**-an**" standiye û ketiye rewşa nav a herikî ya ravekirinê.

Her wiha, peyva çiyayî jî pêveka ravekê "**-î**" girtiye û ew jî ketiye heman rewşê. Ji ber ku rewşa wan a xwerû "deşt û çiya" bi pêvekan, rewşa wan hatiye guhartin.

### c) Rewşa navan a herikî ya bangî

**Xezalê mazîçinê,**
**Dema ez ban te bikim**
**Bersivê li min nede**
**Hevalo delalo heta bihar bû Li**
**Wanê warkozê te dey nekir**

Dema em temaşeyî peyvên di malika li jor de dikin, dibînin ku pêvekên bangî "**-o**, **-ê**" girtine û bi vî awayî ketine rewşa nav a herikî ya bangî. Dema ku navek, pêvekên bangî digire û rewşeke bangî dide peyvê, jê re **rewşa nav a herikî ya bangî** tê gotin.

### d) Rewşa navan a herikî ya nediyar

| | |
|---|---|
| **Nalînek** tê guhê min | lê winda û nihan e |
| Agir berda dilê min | tev bû pêt û dixan e |
| **Barek** da ser milê min | lê barekî giran e |
| Dabûn ser hev kulê min | hemî derd û belan e |

***Cegerxwîn***

Dema em temaşeyî peyvên "**nalînek**, **barek**" dikin, dibînin ku pêveka nediyar "**-ek**" girtine û ketine rewşa navan a nediyar. Ji vê rewşa navan re **rewşa navan a herikî ya nediyar** tê gotin.

## 3- Rewşa navan a daçekî

Rewşa navan a daçekî, dibin şeş beş:

### 1-Rewşa navan a daçekiya têdeyî

**Di dil de ez evîndar bûm**
**Ji lewra ez pir bêhal bûm**
**Ji mêlakê birîndar bûm Ji**
**ber wê pir bêhal bûm**

Dema ku em temaşeyî malika li jor dikin, dibînin ku peyva "dil" daçeka "**di**" paşdaçeka "**de**" girtiye û ketiye rewşa daçekî

ya têdeyî. Ji ber ku dema "**di-de**" navekî dixin navbera xwe û diyar dikin ku karê hatiye kirin, di wî navî de hatiye kirin.

### 2- Rewşa navan a daçekiya tevayî

**Di demsala biharê de pezkûvî bi karikên xwe ve li çiyayên Kurdistanê dijîn.**

Dema ku em temaşeyî hevoka li jor dikin, dibînin ku daçeka "**bi - ve**" li ser navê karik hatine bikaranîn û rewşa tevayî daye nav. Ji ber ku dema daçeka "**bi**" û paşdaçeka "**ve**" dikevin li ser navan, diyar dikin ku tevahiya kar hatiye kirin.

### 3- Rewşa navan a daçekiya pêreyî

**Rojekê keleşêr(dîk), kew û ordek bi rovî re derdikevin rê, dema dibe êvar, rovî ji wan re dibêje: Em tobedar in, ji ber wê pêwîst e, em xwe bixin kunekê, da ku lawirên dirinde me nexwin. Dema ku dikevin kunê rovî dibêje: Ez bûme gunehkar, ez ê bibim nobedar.**

Dema ku em temaşeyî benda li jor dikin, dibînin ku daçeka "**bi**" û paşdaçeka "**re**" ketine ser navê rovî û diyar dikin ku navên din bi wî re çûne.

Ji ber vê yekê, em dibêjin dema daçeka "**bi**" û paşdaçeka "**re**" dikevin li ser navekî, rewşa pêreyî didin wî navî.

### 4- Rewşa navan a daçekiya jêreyî

**Dema dibe êvar, rovî ji wan re dibêje: Em tobedar in...**

Dema em temaşeyî benda li jor dikin, dibînin ku daçeka "**ji - re**" ketine li ser cînavka kesane û rewşa jêreyî daye wî navî. Dema ku ev daçek û paşdaçeka xwe dikevin li ser navekî, rewşa jêreyî didin wî navî.

### 5- Rewşa navan a daçekiya alî

**Dema ku ji bakur ve şilî dest pê dike, piştî rojek-du rojan bandora xwe li başûr dike.**

Dema ku em temaşeyî hevoka li jor dikin, dibînin ku daçeka "**ji-ve**" ketiye li ser navê bakur û aliyê wî diyar dikin.

### 6- Daçeka serbest

**Li zozanan berf pir dibare û li deştê jî baran dibare.**

Dema ku em temaşeyî hevoka li jor dikin, dibînin ku daçeka "**li**" ketiye li ser navê zozanan û deştê, cihê bûyerê daye diyar dikin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

**Rojekê em li dibistanê bûn; rêveberiya Qamişlo bi mamosteyan re hatin dibistanê, ajokarê wan jî bi wan re bû, xwestin ku em bi hev re alîkariyê bikin. Ev daxwaz, ji aliyê mamosteyan ve jî bi erênî hat pêşwazîkirin.**

1- Di benda li jor de kîjan rewşa navan a daçekî tune ye?

- Rewşa navan a daçekiya têdeyî
- Rewşa navan a daçekiya pêreyî
- Rewşa navan a daçekiya alî
- Rewşa navan a daçekiya jêreyî
- Rewşa navan a daçekiya serbest

**2- Di vebijêrkên li jêr de daçek û paşdaçekên ku binê wan hatine xêzkirin, kîjan navî dixe rewşa têdeyî ?**

- Min **di** xew **de** dît.
- Ew **li** ser ban bûn.
- Dilgeş **bi** hevalê xwe **re** bû.
- Têkoşîn **bi** hevalê xwe **re** hatiye.
- Daxwaza min ew e **ji** aliyê wan **ve** nexweşî derketibin.

**3- Di kîjan vebijêrkên li jêr de rewşa navan a zayendî tune ye?**

- Gulê ji Rewan re got were vir.
- Rewan gotina wê nepejirand.
- Lê dem derbas bû bi dijwarî.
- Gulê careke din dixwest Rewan bibîne.
- Vê carê Rewan daxwaza Gulê pejirand.

**4- Di kîjan vebijêrkên li jêr ên ku binê wan hatine xêzkirin de pêveka nediyar heye?**

- Gula baxê min hejar e.
- Bihara dilê min xedar e.
- Biharek di dil de şîn hat.

d) Dara jiyanê bi xwînê tê avdan.

**5- Di kîjan vebijêrkên li jêr de rewşa pêreyî heye?**

- Dilê me birîn e.
- Dîrokzanê mezin Rêber Apo ye.
- Di dîrokê de mafê kurdan nehatiye dayîn.
- Bi jiyanê re gelê me pêş dikeve.
- Ji kîjan neyaran, me xerabî nedît?

**6- Di kîjan peyvên di vebijêrkên li jêr de rewşa navan a herikî ya ravekê heye?**

- Dilşad gul çandin
- Gulê were bêriyê.
- Havîna germ zor e.
- Çiyayê Gabarê nerm e.
- Azadî, ji zarokatiyê dest pê dike.

# NAV LI GORÎ ÇÊBÛNA XWE

**Xortên me Kurdan hûn werin**
**Da em herin ceng û şerî**
**Dijmin ji me qet nagerî**
**Talan kirin mal û serî**
**Ta kengî em bibin xewar**
**Rabin ji xew bibin şiyarî**

Çend peyvan di malika li jor de em lêkolîn bikin. "**Xortên kurdan**" peyva "**xort**" pêveka pirjimariya navan "**-ên**" standiye.

Peyva "**kurd**" pêveka pirjimariya navan "**-an**" standiye. Peyva "**Dijmin**" pêvek nestandiye. Dema ku em van pêvekên kişandinê ji navan cuda dikin, ên weke; "xort" û "kurd" dimînin.

Dema ku em temaşeyî rêzên din jî dikin, peyva weke "ceng" wisa ye. Vî navî, hevgirtin bi tu pêvekên peyvsaz re çênekiriye û bi peyveke din ve nebûye.

**Nav, li gorî çêbûna xwe, dibin du beş:**

**1- Navên xwerû**
**2- Navên nexwerû**

## 1- Navên xwerû

Ew navên ku ji hêmaneke tenê pêk hatine û dema ku parçe dibin, wateya xwe ji dest didin.

Her wiha, tu pêvekên peyvsaz negirtine û hevgirtin bi peyveke din re çênekirine. Weke di rewşa kokê de hatine bikaranîn, jê re **navên xwerû** tê gotin.

**Mînak:**

Xak, çiya, derî, dest, meh, kes, temen, kum, zevî, berx, ...

## 2- Navên nexwerû

Ew navên ku ji hêmanekê zêdetir pêk hatine, bi alîkariya pêşgir, paşgir û navgiran. Dema ku ev nav parçe dibin, wateya xwe ji dest nadin.

**Ev cure navdêr, di nava xwe de dibin sê**
**beş: a- Navên pêkhatî(dariştî)**
**b- Navên hevedudanî(hevgirtî)**
**c- Navên kompleks**

### a- Navên pêkhatî(dariştî)

Ew navên ku ji navekî xwerû û pêvekeke navdêrsaz pêk tên.

**Mînak:**

Bi derketina rojê re, te yê ruyê xwe vekira
Û bi kenê evînê li min binêriya
Min ê li dengê bilbilên te guhdarî
kiriba Gula min bi dema rojava re jî
Te yê bejna xwe li ber bayê min
Bi nazdarî bihejanda û xatir bixwesta
Piştre li ber strana min biketiba xewê
Xeweke şîrîn li nav taviyên xunavê
Ez jî bibûma hêşadarê te
Zêrevan li ber xemil û xêla te
Heya xwediyê te, roja bişewq
Careke din silav bida me.



Di helbesta li jor de em çend peyvan bigirin û lêkolîn bikin.

"**Guhdar**, **hêşedar** û **zêrevan**". Van navan hevgirtin bi pêvekên peyvsaz "**-dar**, **-van**" re çêkirine û navên nû hatine çêkirin.

Navê "guh" bi pêveka peyvsaz a "**-dar**" re hevgirtin çêkiriye û wateyeke nû daye wî navî. Peyva "**-zêr**" bi pêveka pêkhatî ya "-van" re hevgirtin çêkiriye û bûye navekî pêkhatî. Ew peyvên ku pêvekeke peyvsaz standî û wateyeke nû çêkirine jê re **navên pêkhatî** tê gotin.

## Cureyên navên pêkhatî

Navên pêkhatî li gorî kokan tên sazkirin û pêvekan digirin. Li gorî van beşan ji hev tên cudakirin:

### a) Navên ji nav saz dibin:

**1-** Bin + kirask = binkirask

**Mînak:** Ew binkiraskê ku te kiriye, pir xweşik bû.

4- Ser + çav = serçav

**Mînak:** Ez her sibeh di heftan de serçavên xwe dişom.

5- Guh + ar = guhar

**Mînak:** Guharê ku te bi min re dît, winda bû.

6- Gaz + inc = gazinc

**Mînak:** Gazincan ji min neke, ji ber ku ez jî bêzar im.

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, dibînin ku navek bi alîkariya pêvekên peyvsaz, navekî nû çêkirine.

Dema ku koka nav, pêvekeke peyvsaz bistîne; navekî nû tê çêkirin.

Navên "kirask û çav", pêveka peyvsaz "**bin**- û **ser**-" standine û navên nû çêkirine.

Navên "guh û gaz" pêveka peyvsaz "**-ar** û **-inc**" standine û navên nû çêkirine.

**b) Navên ji lêkerekê saz dibin:**

**Mînak:**

**1-** Xwend + in = Xwendin

Xwendin tiştekî pîroz e.

**2-** Bir + în = Birîn

Birîna daran li welatê me qedexe ye. **3-** Da + n = dan

Ji danê tiştek xweştir tune ye.

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, dibînin ku pêvekên raderîn ên peyvsaz bi lêkerê ve bûne û navekî nû çêkirine.


Weke "xwend" pêveka peyvsaz "**in**" standiye û bûye "xwendin" (peyveke pêkhatî ye).

**b- Navên hevedudanî (hevgirtî)**

**ŞÎRETA MIN**

**<u>Cangorî</u> be kurê mino!**
**Ta ku saxî dem û gavê**
**Şareza be kekê mino!**
**Da nekevî qeyd û davê**
**Bese êdî heya kengê**
**<u>Berevajî</u> biçî ravê**
**Berde rêça çewt û kirêt**
**Xwe derxîne ji tengavê**
**Hilû rabe bilind hilde!**
**Al û xetîra bizavê**
**Nezîrek û nezana bê**
**Tu ketî bûtka bişavê**

*Sebrî Botanî*



Dema ku em temaşeyî helbesta li jor dikin, dibînin ku navên binê wan hatine xêzkirin, ji du navan pêk hatine. Navê "**can**" hevgirtin bi peyva "**gorî**" re çêkiriye, peyva **cangorî** hatiye çêkirin.

**Bere+vajî = Berevajî**

Ew navên ku ji du peyvên xwerû û zêdetir pêk tên û navekî nû çêdikin, ji wan re **navên hevedudanî** tê gotin.

### Navên hevedudanî di nava xwe de dibin çar beş:

#### 1- Navên hevedudanî yên ji du navan çêdibin

Dema ku du nav hevgirtinê bi hev re çêdikin û ji bo wateyeke nû tên bikaranîn, jê re **navên hevedudanî yên ji navan çêdibin** tê gotin.

**Mînak:**

Serma, **serêşê** bi xwe re tîne.

**Tevnepîr** mala xwe ji tevnê çêdike.

- Dema ku em temaşeyî peyva "serêş, tevnepîr" dikin, dibînin ku ev nav ji du navan pêk hatine. Ji ber ku di bingeh de **ser-e-êş** û **tevn-e-pîr**, piştre veqetandek ji nava wan rabûye û weke navê heyîneke cuda çêkirine (serêş, tevnepîr).

#### 2- Navên hevedudanî yên ji nav û hevalnavan çêdibin

1- **Soredar** darek a çiyayên Kurdistanê ye.
2- **Sorgul** xwendekareke jîr e.
3- **Rûkenê** pirtûk xwend.
4- **Dilgeş** gotarekê dinivîse.

Dema ku em temaşeyî mînakên li jor dikin, dibînin ku navên hevedudanî, ji hevgirtina nav û hevalnavekî pêk hatine. Ji ber ku di bingehê de "**dara-sor e**, **gula-sor e**" piştre veqetandek radibe, hevalnav tê pêşiya nav û hevgirtina her du peyvan çêdibe û navekî hevedudanî tê çêkirin.

Di hevokên li jor de peyva Rûken û Dilgeş, di bingehê de "**Rûyê bi ken e, Dilê - geş e**", veqetandeka wan rabûye û navekî hevedudanî derketiye holê.

### 7- Navên hevedudanî yên ji nav û lêkerekê çêdibin.

a- **Kedxwar** li ser gel zordariyê dike.

b- **Demhat** ji nêçîrê vegeriya.

c- **Rojda** gulan diçîne.

Dema ku em temaşeyî peyvên "kedxwar, Demhat û Rojda" dikin, em dibînin ku ev her sê nav, her yek ji wan jî, ji du peyvan pêk hatiye; yek nav e, yê din jî lêker e.

### 8- Navên hevedudanî yên ji du hevalnavan çêdibin.

Hin caran du hevalnav tên rex hev û navekî nû çêdikin.

**Mînak:**

Me **reşnivîsa** karê xwe nivîsî, beriya ku em derbasî kongreyê bibin.

## c- Navên kompleks

Ew navên ku ji navekî pêkhatî, yan jî navekî hevedudanî û pêvekeke navdêrsaz pêk tên.

**Mînak:**

a- Şaristan + î = şaristanî

- Gelek **şaristanî** li Mezopotamyayê hebûn.

b- Kurt + e + nivîs = kurtenivîs

- Min **kurtenivîsek** li ser jiyana Osman Sebrî xwend.

c- Ser + an + ser = seranser

- Ez li **seranserî** cîhanê geriyam, lê min weke welat xweş nedît.

ç- Rojnameger + î = rojnamegerî -
**Rojnamegerî** karekî dijwar e.

# PIRSÊN BEŞA DUYEM

**1**- Navên ku pêveka peyvsaz girtine, em ji wan re dibêjin **navên pêkhatî**.
Li gorî vê raveyê, kîjan vebijêrka li jêr, navê pêkhatî ye? **a-** dar **b-** av **c-** hewa **d-** nan **e-** çiyayî
**2** – Di kîjan vebijêrka li jêr de, navê pêkhatî yê ku ji nav û pêveka peyvsaz çêbûye, heye?
- Cotyar berxwedaneke bêhempa li hemberî dijmin kir.
- Sorgul diçe bêriyê.
- Qamişlo bajarekî Rojava ye.

**b)** Dilgeş hêja ye. **e)**
Rûken rûbiken e.
**3**- Di kîjan vebijêrka li jêr de navê hevedudanî yê ji nav û lêkerek, pêk hatiye heye?
**a-** Gulistan
**b-** Goristan
**c-** Cegerxwîn
**d-** Canda
**e-** Gamasî
**4**- Di kîjan vebijêrka li jêr de navê hevedudanî yê ji du hevalnavan pêk hatiye?
**a-** Nalbend
**b-** Reşbelek
**c-** Kêmendam
**d-** Pozberan
**e-** Xweşkirin
**5**- Di kîjan vebijêrka li jêr de, navê kompleks heye? **a-** Balkişandin
**b-** Bejinbilind
**c-** Nûçegihanî
**d-** Hilweşandin
**e-** Şaristan

# BEŞA SÊYEM

## HEVALNAV

Gulên sor, zer û spî yên biharê, welatê me dixemilînin

Ji ber ku peyvên " sor, zer û spî" taybetiya heyînekê dane diyarkirin, weke hevalnavan hatine bikaranîn.

Di zimanê me de di navbera nav û hevalnavan de bikaranîna veqetandekê pêwîst e. Pêveka kom a weke veqetandekê hatiye bikaranîn hejmara navan diyar dike.

Ger di navbera çend hevalnavan de jî bê, weke hevalnavên pêvekstandî nayê pejirandin.

Ji ber ku li rex her veqetandekê jî di bingehê de navekî veşartî heye.

**"Gelê kurd, li ser çiyayên bilind ên Kurdistanê, li hemberî êrîşên dijmin, xwe diparêzin. Dijminê gelê kurd daristanên kesk dişewitînin, çekên kimyayî bi kar tînin, mirovên welatparêz digirin û dikujin. Li hemberî wan, bazên tolhildanê berxwedana xwe ya lehengî bi awayekî serbilind berdewam dikin û gelê xwe diparêzin."**

- Peyvên ku taybetiyên heyînan diyar dikin û wan didin nasîn, ji wan re **hevalnav** tê gotin.

Hevalnav, her tim li gel navan tên. Ji bo peyv bibe hevalnav, pêwîst e taybetiyeke diyarker a peyvên pêşiya xwe bidin diyarkirin. Ji birepeyvên ji nav û hevalnavekê pêk tên re **raveka hevalnavan** tê gotin.

**Mînak:**

Kesk, sor û zer rengên ala kurdî ne.

Di hevoka li jor de peyvên “kesk, sor û zer” taybetiya heyînekê nedane diyarkirin, weke navan hatine bikaranîn. Ev peyvên ku di koka xwe de, hevalnav in û weke nav hatine bikaranîn, dikarin pêveka kêşanê bistînin.

**Têbînî:**

Dema ku em dibêjin hevalnav, pêveka kêşanê nagire, divê em bi vê peyva ku pêveka peyvsaz girtiye û bûye hevalnav, neyên xapandin.

**Mînak:** Evîndar

Dibe ku ji yekê zêdetir taybetiyên wan hebin. Di vê rewşê de, peyvên ku taybetiyên wê heyînê didin diyarkirin, bi rêzê ve tên nivîs û di navbera wan de bêhnok, tê bikaranîn.

**Mînak:**

"Min li ser pirê, mirovekî bejnbilind, çavreş û rûken dît."

Di vê hevokê de taybetmendiyên mirovekî yên weke; bilindbûna bejnê, reşbûna çav û rûkeniya rûyê wî bi rêzê ve taybetmendiyên wî hatine dayîn.

Hin nav ji ber ku taybetmendiyên kesekî didin diyarkirin û mînandinan çêdikin, dibin hevalnav.

**Mînak:**

Xwendekarê jêhatî, ji bo xwendina xwe têkoşîneke dijwar kir.

Di vê hevokê de peyva "jêhatî" navek e, lê ji ber ku xwendekar weke jêhatî daye mînandin, bûye hevalnav.

## Hevalnav li gorî awayê bikaranîna xwe

Di nivîsa li jêr de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, çawaniya navan ji me re diyar dikin. Van peyvan, bi baldarî bixwînin.

Gula sor xweşik e.
Gula reş balkêş e.
A zer geş e.
A şîn beş e.
Bi van re Kurdistan geş e.

Di mînakên li jor de peyvên; "sor, reş, zer û şîn" çawaniya rengê gulê diyar dikin.

## Cureyên hevalnavan:

**1- Hevalnavên çawaniyê**
**2- Hevalnavên diyarkirinê**
**3- Hevalnavên nebinavkirî(nediyar)**

### 1- Hevalnavên çawaniyê

Ev cure hevalnav, çawaniya navdêran nîşan didin. Ev hevalnav bi du awayan bi navdêran re têkildar dibin; bi alîkariya

Veqetandekê, mînak: "mirov**ê** baş", "keçik**a** bedew" û bi alîkariya lêkera "**bûn**" mîna "ev dar hişk **e**", "xaniyê me fireh **e**".

Ev cure hevalnav di nava hevokê de ji bilî pêvekên payeyê, tu pêvekan nagirin û di wan de tu guherîn çênabe.

## Hevalnavên çawaniyê, di nava xwe de dibin du beş:

#### a- Hevalnavên rengdêr

Ev cure hevalnav, rengên navan diyar dikin.

**Mînak:**

Keroşka **spî** gêzeran dixwe.
Şagirta **çavşîn** û **porzer** pir zîrek e.

#### b- Hevalnavên rewş û awa

Mirovê **baş**, ji mirovê **xerab** bi rûmetir e.

Dema ku em temaşeyî vê hevoka li jor dikin, dibînin ku peyvên "baş û xerab" çawaniya navan ji aliyê rewş û awa ve diyar dikin.

Hevalnavên çawaniyê, bi awayekî giştî taybetmendiyên navan ên demdirêj diyar dikin.

### 2- Hevalnavên diyarkirinê

Ev cure hevalnav, dibin sê beş:

**a- Hevalnavên şanîdanê b-**
**Hevalnavên jimarîn**
**c- Hevalnavên pirsiyariyê**

## a- Hevalnavên şanîdanê

Ev hevalnav, bi xwe cînavkên şanîdanê ne. Lê dema ku dikevin pêşiya navdêran, wan nîşanî mirov didin û dibin hevalnavên şanîdanê.

**Mînak:**

- Çar xwendekaran bi hev re **ew** pirtûk xwend.
- Ger gelê kurd **ev** zanîn, **ev** hêz û **ev** biratî nebûya, **van** neyaran wê **ev** xak ji kurdan paqij bikira.

Dema ku em temaşeyî benda li jor dikin, dibînin ku peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, nav diyar kirine.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Zanîn | Ev zanîn |
| Neyaran | Van neyaran |
| Xak | Ev xak |
| Hêz | Ev hêz |
| Biratî | Ev biratî |

Ev hevalnavên ku navan ji aliyê dûr, nêzîk û zayendê ve diyar dikin, ji wan re **hevalnavên şanîdanê** tê gotin.

| | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|---|
| Hevalnavên nêzîk nêr û mê | Ev | Van |
| Hevalnavên dûr nêr û mê | Ew | wan |
| Hevalnavên zayenda nêr û dûr | Wî | |
| Hevalnavên zayenda mê û dûr | Wê | |
| Hevalnavên zayenda mê û nêzîk | Vê | |
| Hevalnavên zayenda nêr û nêzîk | Vî | |

**Mînak:**

**Vê:** Vê hevalê, bi wêrekiya xwe ez matmayî kirim. **Vî:** Vî mamosteyî, ez fêrî zimên kirim.
**Wê:** Min bi wê hevalê re lîst.
**Wî:** Wî zilamî, ez ji mirinê rizgar kirim.

## b- Hevalnavên jimarîn

**<u>Heft</u> xwendekaran, bi <u>heft</u> zimanan, bi <u>heft</u> awayan nivîs nivîsandin. Ev xwendekar, di refa heştê de dixwînin. Ji van hevalan, Rûgeşa <u>yekem</u> ji tevan jîrtir e. Lê xwendekarên me <u>ji dehan pêncên</u> wan di refê de serkeftî ne.**

Dema ku em temaşeyî mijara li jor dikin, em dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, jimara navan diyar dikin. Ji ber vê yekê wan re "**hevalnavên jimarîn"** tê gotin.

Hevalnavên jimarîn, jimara heyînan diyar dikin.

**Hevalnavên jimarîn, di nava xwe de dibin sê beş:**

### 1- Hevalnavên jimarîn yên xwerû

Dema ku îro Dilşêr ji bajêr hat, weke diyarî ji hevalên xwe re **<u>çar</u>** pênûsên risasî, **<u>şeş</u>** lênûsk û **<u>du</u>** pirtûkên çandî anîn.

Dema ku em temaşeyî mijara li jor dikin, em dibînin ku hevalnavên binê wan hatine xêzkirin, bi jimara xwerû, jimara nav diyar dikin.

Ew hevalnavên ku jimara heyînan diyar dikin, ji wan re **hevalnavên jimarîn ên xwerû** tê gotin. Hevalnavên jimara xwerû, ji jimara sifirê (0) dest pê dike, heya bê dawî diçe.

### 2- Hevalnavên jimarîn ên rêzîn

Sosina **<u>yekem</u>** îro têkiliyek li gel Nêrgiza **<u>çarem</u>** çêkir û her du bi hev re çûn serdana Nûbihara nexweş.

Dema ku em temaşeyî hevoka li jor dikin, em dibînin ku peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, pile û rêza navan diyar dikin.

Ew hevalnavên ku pile û rêza heyînan diyar dikin, jê re **hevalnavên jimarîn ên rêzîn** tê gotin.

Piranî jimara xwerû li gel pêveka "**-emîn**, **-em**" hevgirtinê çêdike û jimara pile yan jî ya rêzê derdikeve holê.

### 3- Hevalnavên jimarîn ên kertî

Min **<u>ji sêyan duyê</u>** pirtûkê xwend.

Berxwedana YPG'ê **<u>ji sedî sed</u>** li Rojava bi ser ket.

Dema ku em li her du hevokên li jor temaşe dikin, peyvên "**ji sêyan duyê**", "**ji sedî sed**" navan ji tevahiyekê, parçeyekê diyar dike.

Ew hevalnavên ku li gorî tevahî jimara parçeyên heyînan diyar dikin, ji wan re "**hevalnavên jimarîn ên kertî"** tê gotin.

### c- Hevalnavên pirsiyariyê

**<u>Kîjan</u>** xwendekarî pirtûk negirtibû?
**<u>Çend</u>** xwendekaran pirtûk girtibûn?
Jiyan li cemseran **<u>çawa</u>** ye?

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, em dibînin ku peyvên "**kîjan**, **çend**, **çawa**" li gel navan hatine û rewşeke pirsiyariyê dane navan û sergihayî kirine. Hevalnavên ku ji aliyê pirsiyariyê ve navan diyar dikin, ji wan re "**hevalnavên pirsiyariyê"** tê gotin.

Ew hevokên ku di nava wan de hevalnavên pirsiyariyê hene, li dawiya wan hevokan pirsnîşan tê bikaranîn.

### 3- Hevalnavên nediyar

**<u>Hindek</u>** heval bi çêkirina pirtûkan ve mijûl dibin, **<u>hinek</u>** heval jî tevlî perwerdeya branşan dibin û **<u>hin</u>** heval jî ji bo xwe kar dikin.

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, em dibînin ku peyvên "**hindek**, **hinek**, **hin**" bi awayekî diyar jimara heyînan diyar nekirine.

Di van cure hevalnavan de, diyarkirina jimarê tune ye. Hevalnavên ku jimar û awayê heyînan bi awayekî nezelal diyar dikin, ji wan re "**hevalnavên nediyar"** tê gotin.

## Hevalnav li gorî çêbûnê

Di mijara li jêr de peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, li gorî çêbûna wan lêkolîn bikin.

Mamosteya dilovan, ji xwendekarên pir biçûk, pir hez dike. Lê hezkirina wê ya ji xwendekarên biçûk û jîr re zêdetir e.

Evîndara çavbelek, di refa xwe de pir tê hezkirin.

Dema ku em hevokên li jor dixwînin û temaşe dikin, em dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, di hevoka yekem de peyva "dilo" pêveka peyvsaz "-van" standiye û bûye "dilovan" û rewşa mamoste diyar dike. Di heman hevokê de, hevalnavên "pir û biçûk" li gel hev hatine û rewşa xwendekaran diyar kirine û hevalnava payepîv e. Peyvên, "pir, biçûk" tê wateya biçûktir. Di heman hevokê de hevalnava "biçûk û jîr" ji ber ku weke peyveke asayî bûne hevalnav, ji wan re **hevalnavên xwerû** tê gotin.

Di hevoka duyem de peyva "çavbelek" ji ber ku ji du peyvan pêk hatiye û çawaniya nav diyar dike, bûye hevalnava hevedudanî.

**Hevalnav li gorî çêbûna xwe, dibin sê beş: 1- Hevalnavên xwerû**

"Raperîna bejnzirav, îro ew keleha navdar dît, bi dîtina wê, kelehê re xuroşeke **mezin** û hesteke **xurt** pê re çêbû, **hêja** ye ku her kes bibîne. Her wiha, bandor li ser hin hevalên wê jî kir."

Di mînaka li jor de peyvên "**mezin**, **xurt**, **hêja**" tu pêvekên peyvsaz nestandine. Ev peyv, di rewşa kokê de hatine bikaranîn.

Ew hevalnavên ku pêvekên peyvsaz nestandine û hevgirtin bi peyveke cuda re çênekirine, ji wan re "**hevalnavên xwerû"** tê gotin.

### 2- Hevalnavên pêkhatî

- Rojîna **evîndar**, çû malê.
- Cegerxwînê **dildar**, hemû helbestên xwe li ser evîna welêt saz kirine.
- Hogirê **solbend**, solên xwe bi erzanî firotin.

Di hevokên li jor de li ser peyva "**evîn**" pêveka peyvsaz "**-dar**" zêde bûye û peyv hatiye sazkirin, bûye "**evîndar**".

Di hevoka duyem de peyva "**dil**" pêveka peyvsaz "**-dar**" lê zêde bûye û peyv hatiye sazkirin û bûye "**dildar**".

Di hevoka sêyem de jî peyva "**sol**" pêveka peyvsaz "-**bend**" lê zêde bûye û peyv hatiye sazkirin, bûye "**solbend**."

### 3- Hevalnavên hevedudanî

Hemû peyvên hevedudanî yên ku dikarin erka hevalnavan bigirin, ji wan re **"hevalnavên hevedudanî"** tê gotin.
**Hevalnavên hevedudanî, li gorî çêbûna xwe, dibin çar beş:**

#### a- Hevalnavên ji nav û hevalnavekî pêk tên

- Rewşena **porzer**, mijarek li ser xwezayê nivîsî.
- Dilovanê **çavreş**, bi keda xwe ve girêdayî ye.
- Rûkena **bejnbilind**, dilpak e.

Dema ku em temaşeyî her sê mînakên li jor dikin, em dibînin ku ji nav û hevalnavekî pêk hatiye û bûye hevalnavekî hevedudanî.

#### b- Hevalnavên ji hevalnav û navekî pêk tên

Hin caran hevalnav beriya nav tê û bi vî awayî hevalnavekî nû pêk tê.

**Mînak:** Kêmxwê, pirbêj, xweşmêr, pîrejin, ...

### c- Hevalnavên ji du navan pêk tên

Hin caran du nav tên ber hev û hevalnavekî nû pêk tînin.
**Mînak:** Bejnrîhan, pozberan, diranpîj, çavxezal, cegerxwîn, ...

### d- Hevalnavên ji daçek û navdêrekî pêk tên

Hin caran daçekek tê ber navekî, yan jî dikeve navbera du navan û hevalnavekî pêk tîne.
**Mînak:** Jipiya, lirê, jidil, devliken, dilbiêş, çavlirê, ...

### Hevalnavên payepîv

Hozan şagirtekî **jîr** e, lê belê Ferhad **jîrtir** e û Zinar ê **jîrtirîn** (**herî jîr**) e.

Parzemîna Ewropayê **mezin** e, lê Efrîqa **mezintir** e û Asya ya **mezintirîn** (**herî mezin**) e.

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, pîvana jîrbûn - mezinbûna navan tê naskirin û pileya di navbera sê navan de, dipîvin.

### Hevalnavên birepeyv

- Ala **<u>kesk, sor û zer</u>** ala Kurdistanê ye.
- Kesên **<u>rasterast</u>** diaxivin, kesên baş in.

Dema ku em temaşeyî hevokên li jor dikin, dibînin ku birepeyvên ku binê wan hatine xêzkirin, bûne hevalnavên navan.

Ev birepeyvên ku dibin hevalnav, ji wan re "**hevalnavên birepeyv**" tê gotin.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1- Di hevoka li jêr de kîjan vebijêrka li jêr heye?**
Wan çar sed û pêncî û pênc peyv, ji parêznameya Rêber APO girtine.
**a-** Hevalnavên jimarîn ên jimara
xwerû **b-** Hevalnavên pirsiyariyê
**c-** Hevalnavên payepîv
**d-** Hevalnavên jimara rêzîn
**e-** Hevalnavên jimara kertî
**2- Di hevoka li jêr de kîjan vebijêrka li jêr heye?**
Di beyaniyê de bêrîvanên **<u>baş</u>** diçin bêriyê.
**a-** Hevalnavên çawaniyê
**b-** Hevalnaven nîşandanê
**c-** Hevalnavên pirsiyariyê
**d-** Hevalnavên jimara kertî
**e-** Hevalnavên jimara rêzîn
**3- Di kîjan vebijêrkên li jêr de, hevalnava jimara rêzîn heye?**
**a-** Hespê boz pir beza
ye. **b-** Bayê êvarê qerisî
bû. **c-** Vê gulê av bide.
**d-** Çar hevalên jin parastin dikirin.
**e-** Egîdê yekem pir leheng bû.
**4- Di kîjan vebijêrkên li jêr de hevalnavê nediyar heye?** **a-** Şeş şagirt di ezmûnê de, bi bin ketin.
**b-** Gelek heval beşdarî civînê bûn.
**c-** Şilêra bedew çiyayên me xemilandiye.
**d-** Ala kesk, sor û zer rûmeta me ye.
**e-** Vê gotinê ez xembar kirim.

# BANEŞAN

Di waneyên beriya niha de, em li ser peyvên biwate rawestiyabûn. Dema ku peyvên biwate tên gotin, tiştek, bîranînek, karek, taybetiyek, çêbûnek û tevgerek tê bîra mirov. Ev jî, mêna: nav, cînavk, hevalnav û hevalkar hatine bikaranîn.

Niha jî mînakên li jêr, bi baldarî bixwînin û bersiva pirsan bidin.

**1-** Ax dilo! Tu çima ew qas bê aramî?
Di hevoka li jor de peyva "**ax**" hevok xistiye rewşeke bangî.
**2-** Wey dayê! Heya kengî em ê bindest bin?
**3-** Ay! We dît?

Di mijara li jor de peyvên mîna: "dayê, ay, wey, ax, hewar e" ji bo balê bikişînin, hatine bikaranîn.

Peyva "dayê" pêveka bangê "ê" girtiye, ji bo bangkirinê hatiye bikaranîn.

Dema ku em van peyvan, yek bi yek bi kar tînin, tu wateyê nadin.

Ev li gorî cihên ku lê tên bikaranîn, hestekî diyar dikin. Peyvên ku bi serê xwe wateyê nadin, lê ji bo hezkirin, bêzarî, xuroş, tirs û êşandinê tên bikaranîn û li hemberî wan hestên mirovan dixin tevgerê, ji wan re **amrazên baneşanê** tê gotin. Li paşiya peyvên bangî, baneşan (**!**) tê bikaranîn.

## Di hevokê de erkên amrazên baneşanê

1- Dema ku hûn destê xwe birîn bikin, an jî destê we li tiştên hişk bikeve, hûn bi tirs û êşandinê re çi dibêjin?
2- Li hemberî bûyerekê ku we biêşîne, yan xemgîn bike, hûn kîjan peyvê bi kar tînin?
3- Li hemberî bûyereke ku we dilşad bike, hûn bi kîjan peyvan hestên xwe tînin zimên?
4- We bal kişandiye ji bo bangkirina(gazîkirina) tebayan, kîjan peyv tên bikaranîn? Hûn çawa bangî seh, pez, pisîk, mirîşk û dewaran dikin?

Li dawiya van peyvan hêmaya baneşanê tê bikaranîn. Hûn wateya wê hêmayê dizanin?

**1-** Ey welat! Tu çi qas buha yî.
**2-** Ofyan! Dijminên me rastî belayê hatin.
**3-** Hevalino rabin! Dijminan ji welatê xwe derxînin. **4-** Bes e! Qey tu ji xwe fedî nakî.
**5-** De zû were, em biçin ji vir!

Li hevokên li jor temaşe bikin û peyvên ku xuroş, tirs, hêrs, hezkirin û xweşiyê diyar dikin, peyda bikin.

## Cureyên baneşanan

Di zimanê kurdî de li gorî rewşan mirov hestên xwe derdixîne, mîna: kêfxweşî, xemgînî, tirs, heyirîn, ecibandin, ...

### 1- Peyvên baneşanî yên kêfxweşiyê

Dema ku mirov di rewşeke şahî û dilxweşiyê de be, hestên xwe bi rêya peyvên baneşanî yên mîna: bijî!, ox!, xweş!, êh!, aferîn! ... dide der.

**Mînak:** Aferîn, tu weke şêran î!
Hah, te çi maleke rind û mezin girtiye!
Êh, ev çi guleke bêhnxweş e!

## 2- Peyvên baneşanî yên xemgîniyê

Dema ku mirov di rewşeke xemgînî û liberketinê de be, hestên xwe bi rêya peyvên weke: ax!, ay!, heyf!, off!, wax!, hawar! ... dide der.

**Mînak:** Ax, ev çi derd e!
Heyf, çima em bi bin ketin!
Ox, serê min diêşe!

**TÊBÎNÎ:** Hin caran jî mirov êş û nifiran jî bi rêya van baneşanan diyar dike.

**Mînak:** Wey lo, tu xêrê ji xwe nebînî!
Ay, piyê min şkest!

## 3- Peyvên baneşanî yên heyirîn û ecibandinê

Dema ku mirov ji tiştekî seyr(ecêb) dibe, yan jî dikeve rewşeke heyirînê, hestên xwe bi peyvên weke: ha ho!, hela!, tew!, wa!, lê lê, ... diyar dike.

**Mînak:** Wa! Tu rast dibêjî?
Na lê! Ev ji bo min nabe.

# PIRSÊN NIRXANDINÊ

**1- Di kîjan vebijêrkên li jêr de, rewşeke baneşanî heye, diyar bike û hêmaya baneşanê li cihê guncav bi kar bîne?**

**a-** Ax lawê hêja tu çiqasî ciwan bû.
**b-** Ger ew neyên, hûn neçin.
**c-** Hiş be kuro bila kes nebihîze.
**d-** Hêvîdar im, ku bi dilê we be.
**e-** Lo dengbêjo, dengê xwe bilind bike.

**2- Di kîjan vebijarkên li jêr de wateya xemgîniyê heye?**

**a-** Wax! Gelek xweş bû.
**b-** Of! Hat.
**c-** Heya tu neyê, ew nayê.
**d-** Keko rabe! Mala te hilweşiya.
**e-** Hey wax! Felekê te çima li me wiha kir.

**3- Di hevokên li jêr de rewşa her hevokê li gorî amrazên baneşanê diyar bike?**

**a-** Hiş be kuro! Bila kes nebihîze.
**b-** Ox! Li vir çi bêhneke xweş tê.
**c-** Ax dilo! Tu çima ew qas bêşens î.
**d-** De zû vekişin! Va dijmin bi giranî bi ser me de hat.
**e-** Ha ho! De werin li vê bobelata giran binêrin.

## PIRSÊN BEŞA SÊYEM

**1-** Hevalnav, pênase bike.
**2-** Cureyên hevalnavan diyar bike û li ser her cureyê hevokekê saz bike.
**3-** Hevalnavên diyarkirinê rêz bike û sê hevokan li ser wan saz bike.
**4-** Hevalnavên jimarîn pênase bike û du hevokan li ser wan saz bike.
**5-** Cureyên hevalnavên jimarîn diyar bike û li ser her cureyê hevokekê saz bike.
**6-** Hevalnavên jimarîn ên rêzîn pênase bike û du hevokan li ser wan saz bike.
**7-** Peyvên; çend, çawa û kîjan di sê hevokan de, bi cih bike ku hevalnavên pirsiyariyê, diyar bikin.
**8-** Hevalnavên li jêr, li gorî çêbûna wan dabeş bike.
**Jîr, evîndar, biçûk, pozbilind, solbend, devliken, kêmxwê.**
**9-** Cureyên hevalnavên hevedudanî diyar bike û li ser her cureyê hevokekê, saz bike.
**10-** Du hevokan li ser hevalnavên payepîv û hevalnavên birepeyv, saz bike.
**11-** Amrazên baneşanê pênase bike û çar hevokan li ser wan saz bike.
**12-** Erkên amrazên baneşanê yên di hevokê de çi ne?
**13-** Cureyên baneşanê diyar bike û li ser her cureyê, hevokekê saz bike.
**14- Hevokên li jêr, ên rast bi tîpa (R) û yên şaş, bi tîpa (Ş), hêma bike û yên şaş sererast bike.**

- Hevalnavên çawaniyê, çawaniya lêkeran nîşan didin.
- Hevalnav dikarin pêvekên kêşanê bistînin.
- Peyvên ku taybetiyên heyînan diyar dikin, bi rêzê ve tên nivîsîn û di navbera wan de, bêhnok tê bikaranîn.

- Hevalnavên çawaniyê, ji bilî pêvekên payeyê, tu pêvekan nagirin.
- Hevalnavên çawaniyê, bi awayekî giştî, taybetiyên navan ên demkurt diyar dikin.
- Hevalnavên şanîdanê bi xwe cînavkên şanîdanê ne, lê piştî wan, navdêr hatine.
- Hevalnavên ku pêvekên peyvsaz nestandine, ji wan re" **hevalnavên xwerû"** tê gotin.
- Hevalnavên hevedudanî ji navekî û pêvekeke peyvsaz, pêk tên.

Wey lo, tu xêrê ji xwe nebînî! (hevokeke baneşanî ye, xuroşê diyar dike).

# BEŞA ÇAREM

## PÊVEBER

– Hevalên me kedkar in.
– Ji ber wê, xwendekarên me jîr in.
– Dema ku di xebatekê de ked neyê dayîn, di wî karî de, pêşketin jî çênabin.
– Di bingeh de gul sor e, lê gulên zer jî hene.

Di mijara li jor a we xwendî de, peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, **pêveber** in. Her yek ji wan, rewşa navekî radigihîne.

Di hevokê de ji hêmana ku karekî, bûyerekê, rewşekê radigihîne re **pêveber** tê gotin.

**TÊBÎNÎ:**
Pêveber, weke lêkeran, hevokan saz dikin.

**Encam:** Pêveber ew tiştê ku hevokê ji aliyê wate, rewş, dem, cih, kirin, kar û tevgerê ve ber bi dawiyê ve dibe.
- Li gorî hevokê, du cureyên pêveberan hene:
  a- Pêvebera rewşî(wesfî)
  b- Pêvebera lêkerî
- Ji bo ku hevok bê sazkirin, pêwîstî bi pêveberê heye.

## CUREYÊN PÊVEBERAN


Pêveber li gorî hevokê, li ser du beşan parve dibe:

### 1- Pêveber di hevoka navdêrî de

20. Raman mirovekî baş e.
21. Bavê Rêvan şoreşger e.
22. Ev zarok pir jîr û jêhatî ye.

Peyvên di mînakên li jor de, yên ku binê wan hatine xêzkirin, hevokê ji aliyê wateyê ve sergihayî kirine.

**Hevoka navdêrî ji du beşan pêk tê:**




Dema ku em li hevokên li jor dinêrin, dibînin ku peyvên binê wan xêzkirî, şîrovekirina destpêkê ne.
Ango pêveber, di hevoka navdêrî de, rewşa kirdeyê şîrove dike.

**TÊBÎNÎ:**

Dibe ku pêveber; di hevoka navdêrî de ji peyvek, du peyvan an jî bêhtir û lêkera bûnê pêk were.

### 2- Pêveber di hevoka lêkerî de

- Aram pirtûkê dixwîne.
- Gulistanê av ji bîrê kişand.
- Dayîka min şîv amade kiriye.

Her weke ji mînakên li jor tê naskirin, ku bêyî peyvên binxêzkirî wateya hevokê sergihayî nabe.
Kar, tevger, kirin, bûyer bi rêya peyvên binxêzkirî tên naskirin; ango xebata ku hatiye kirin, radigihînin.

**TÊBÎNÎ:** Pêveber di hevoka lêkerî de, lêker bi xwe y

# CÎNAVK

Hûn beriya niha fêr bûbûn ku peyva navê heyînan pêşwazî dike, nav e. Di pêvajoya peyvan de, bi taybetî navê kesan, di her cureyê de, tê diyarkirin.
Gulbihar digere.
Gulbihar niha li vê derê
bû. Gulbihar çû ku derê?
Hûn li cihê navê xwe, kîjan peyvan bi kar tînin?
Çi yên me hebûn, ji yên wan cudatir bûn?
A kê bû, ev pirtûk?
Dema ew çûne geştê, li rastî wan hatibûn.

Dema ku em hevokên li jor temaşe dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, "**yên**, **me**, **wan**, **a**, **kê**, **ew**" cihê kîjan navan girtine?

Hûn dikarin van ji hevokan derxînin û hin navên din, bi kar bînin.

Di van hevokên li jor de, peyvên **"me, wan"** cînavk in; ji ber ku ev peyv li cihê heyînekê yan jî çend heyînan hatine bikaranîn. Weke di mînakan de jî hatiye dîtin, ev peyvên ku cihê heyînekê digirin, ji wan re **cînavk** tê gotin.

### Di nava hevokê de erka cînavkan

Ji ber ku cînavk li cihê navan tê bikaranîn, weke navan tê nirxandin.

**Mînak:**

Min li wêneyê temaşe kir.
Ez helbestên Cegerxwîn dixwînim.
Tu îro çuyî kargehê?
Te karê malê bi dawî kir?
Ew kesekî dîroknas e.
Wê roman nivîsî.
We hevalên xwe agahdar kirin ji bo geştê?
Hozan ew perwerde kirin.
Wan welat parast.

Di hevokên li jor de, peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, cînavkên kesane ne ( xwerû û tewandî ).

Cînavkên kesane yên xwerû, dema ku cihê navekî xwerû digirin, tên bikaranîn. Lê dema nav tewandî be, em cînavkên kesane yên tewandî di cihê wan de bi kar tînin.

**TÊBÎNÎ:**

1- Birepeyvên ku ji nav û cînavkê pêk tên, dibin raveka cînavkan.

## Mînak:

**Pênûsa min**, ji **pênûsa te** ciwantir e.

Di vê hevokê de, cînavk cihê nav girtiye û bi peyva "pênûs" re bûye raveka cînavkan.

2- Di zimanê kurdî de cînavkên "kesane û şanîdanê" yên tewandî nabin raveber, her tim dibin raveker.

# Mînak:

Pirtûka **te** ji ya **vî** nûtir e. (**te**, **vî**) raveker in.

## CUREYÊN CÎNAVKAN

1- Cînavkên kesane
2- Cînavkên şanîdanê
3- Cînavka vegerok
4- Cînavka pêvekî
5- Cînavkên nebinavkirî
6- Cînavkên jimarî
7- Cînavkên pirsiyariyê
8- Cînavkên girêkî
9- Cînavkên berbihevîn
10- Cînavkên lihevxistî
11- Cînavkên xwedîtiyê

Di refên borî de me hin cureyên cînavkan şîrove kiribûn û em ê niha du cureyên din jî şîrove bikin.

### 1- Cînavkên xwedîtiyê

Di kurdî de bi serê xwe cînavkên xwedîtiyê tune ne. Lê belê, veqetandek û hin cînavkên bireser digihêjin hev û ji wan cînavkên xwedîtiyê pêk tên. Veqetandekên binavkirî **"a, ê, ên"** li gel cînavkên kesane yên tewandî; **"min, te, wî/wê, me, we, wan"**, cînavkên şanîdanê yên tewandî; **"vî, vê, van, wî, wê, wan"** cînavka vegerok" **xwe** ", cînavkên berbihevîn; **"hev, êk"**, tên û cînavkên xwedîtiyê pêk tînin.

**a- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên kesane yên tewandî pêk tên, ev in:**

| cînavk<br>veqetandek | Min | Te | Wî/wê | Me | We | Wan |
|---|---|---|---|---|---|---|
| a | a min | a te | a wî/wê | a me | a we | a wan |
| ê | ê min | ê te | ê wî/wê | ê me | ê we | ê wan |
| ên | ên min | ên te | ên wî/wê | ên me | ên we | ên wan |

**Mînak:**
- Ev pirtûk **a min** e.
- Ev xanî **yê te** ye.
- Ferhenga Kurdî **a wî/ wê** ye.
- Gulên zer **ên me** ne.

- Ev dibistan **a we** ye.
- Ew pênûs **ên wan** in.

**b- Cînavkên xweďîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên şanîdanê yên tewandî pêk tên, ev in:**

| cînavk veqetandek | Vî/wî | Vê/wê | Van/wan |
|---|---|---|---|
| a | a vî/wî | a vê/wê | a van/wan |
| ê | ê vî/wî | ê vê/wê | ê van/wan |
| ên | ên vî/wî | ên vê/wê | ên van/wan |

**Mînak:**

- Dara gûzê **ya vî/wî** ye.
- Sêva zer **a vê/wê** ye.
- Ev hesp **ê van/wan** e.
- Tevr **ê vî/wî** ye.
- Baxçe **yên van/wan** in**.**
- Ev dar **ên vî/wî** ne.

**c- Cînavkên xweďîtiyê yên ji veqetandek û cînavka vegerok (xwe) pêk tên:**

a xwe, ê xwe, ên xwe

**Mînak:**

- Min navê xwe jê re got, lê wî **yê xwe** ji min re negot.
- Te hespa xwe neanî? Min **a xwe** anî.
- Gelo te deynê xwe neda? Min **ê xwe** da.
- Min hêviy**ên xwe** bi cih anîn, lê wan **ên xwe** bi cih nanîn

Ev cînavk, cînavkên xweďîtiyê pêk tîne û hin caran jî, wateya xweďîtiyê ya cînavkan xurt dike. Vê yekê bi alîkariya daçeka **"bi"** dike.

**Mînak:**

- Ev pirtûk **a min bi xwe** ye.
- Pirsgirêk **ên me bi xwe** ne.

**d- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên berbihevîn (hev, êk) pêk tên:**

- Ev xwişk û bira y**ên hev** in.
- Ew heval û hogir **ên êk** in.
- Ev kilîl û ev kilît **ên êk** in.

**TÊBÎNÎ:**

Em nikarin veqetandekên yekjimar (a, ê) bi cînavkên berbihevîn re bi kar bînin, ji ber ku cînavkên berbihevîn her tim kesên pirjimar dinimîne.

## PIRSÊN BEŞA ÇAREM

**1- Pêveber, çi ye?**

**2- Cureyên pêveberan, çi ne? Li ser her cureyekê, hevokekê saz bike.**

**3- Şeş cureyên cînavkan diyar bike û li ser her cureyekê ji wan, hevokekê saz bike.**

**4- Cînavkên xwedîtiyê ji çend hêmayan pêk tên? Wan diyar bike.**

**5- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavka vegerok pêk tên, diyar bike û li ser her yekê ji wan hevokekê saz bike.**

**6- Di hevokên li jêr de pêveberan diyar bike.** a- Delîl çû çiyê.
b- Gula sosinê reng dide xakê. c- Ev keçeke rûgeş e.
d- Marmasî weke masiyan tev digerin.

7- **Di kîjan vebijêrkên li jêr de pêveberên rewşî(wesfî) hene? Wan diyar bike.**
a- Av germ e.
b- Zivistan sar dibe.
c- Gul xweşik e.
d- Darên hinaran şikestine.

8- **Di kîjan vebijêrkên li jêr de, ji yekê zêdetir hevalnav bûne pêveber?**
a- Havîn germ e. b- Pelên darê şîn in.
c- Serkeftin bi berxwedanê çêdibe.
d- Gul, sor û bibêhn e.

**9- Di kîjan vebijêrkên li jêr de pêveber ji raveka hevalnavan pêk hatiye?**
a- Bahoz şoreşger e.
b- Manî baş e.
c- Neyar bêwijdan e.
d- Ev Çîçeka çeleng e.

10- **Di hevokên li jêr de binê cînavkên xwedîtiyê xêz bike**.

a- Ev pênûsa şîn a min e.

b- Ew gul a te ye.

c- Ev derî yê vî xaniyî ye.

d- Ev çek ên van e.

11- **Hevokên li jêr bi cînavkên xwedîtiyê dagire.**

a- Min sola xwe ji lingên xwe kir, lê wê ............... ji lingên xwe nekir.

b- Ev daristan ...................... ne.

c- Ev pênûs ........... ne, lê ............. kanî?

d- Refa me di pêşbirkê de, bi ser ket û ........... bin ket.

12 - **Hevokên li jêr, ên rast, bi tîpa (R) û yên şaş, bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

a- Cînavkên (kesane û şanîdanê) xwerû her tim dibin raveker, nabin raveber. (.....) b- Birepeyvên ku ji nav û cînavkê pêk tên, dibin raveka hevalnavan. (.....)

c- Peyva ku cihê heyînekê digire, jê re pêveber tê gotin. (.....)

d- Pêveber weke lêkeran, hevokan saz dikin. (.....)

e- Dibe ku pêveber di hevoka navdêrî de, ji peyvek an jî du peyvan pêk were. (.....)

f- Kirde, di hevoka navdêrî de pêveberê şîrove dike. (.....)

g- Pêveber, di hevoka lêkerî de, lêker bi xwe ye. (.....)

# BEŞA PÊNCEM

## DEM Û AVANIYA TEBATÎ Û LEBATÎ

### A- Dem

Bûyîn, heyîn, pêkhatin û bi her awayî bizavên kar di pêvajoyekê de pêk tên. Ji vê pêvajoyê re **dema lêkerê** tê gotin. Lêker li gorî daxwazê, pêvekên kes û demê distîne.

Di zimanê kurdî de, sê demên bingehîn hene:

- Dema niha
- Dema bê
- Dema bûrî

### 1- Dema niha

Heke karek di dema têdeyî de bê kirin; ango karekî ku dest pê kiriye û didome, weke dema niha tê binavkirin.

**Mînak:**

Ba, darên zeytûnan **dihejîne**.
Dayîka min şîr **dikelîne**.
Mamoste pileyên ezmûnê, **diyar dike**.

Di mînakên li jor de, di dema axaftinê de bûyer, kirin, tevger û hwd. diqewimin.

Dema niha, bi alîkariya pêveka dema niha ″**di-**″, rayeka dema niha ya lêkerê û pêvekên kesane pêk tê.

**Teşeya hevokê ya dema niha:**

**Kirde + (di + rayeka lêkerê ya dema niha + pêvekên kesane) + têrker**

**• Kişandina lêkerê di dema niha de li gorî cînavkan**

**Ez** bejna xwe li hemberî şehîdên azadiyê **ditewîn<u>im</u>**.
**Tu** bejna xwe li hemberî şehîdên azadiyê **ditewîn<u>î</u>**.

**Ew** bejna xwe li hemberî şehîdên azadiyê **ditewîne**.
**Em**–**Hûn**–**Ew** bejna xwe li hemberî şehîdên azadiyê **ditewînin**.

### Neyîniya dema niha

Neyîniya dema niha, bi alîkariya pêveka neyîniyê ″**na**-″ pêk tê. Ev pêvek, dikeve şûna pêveka dema niha ″**di**-″ û wateya neyîniyê dide lêkerê.

**Mînak:**

Xwendekarên dibistanê **na**çin seyranê.
Şehîd **na**mirin.

Her wiha dema ku lêker pêkhatî be bi pêşgirê, pêveka dema niha û pêveka neyîniyê dikevin navbera pêşgir û rayeka dema niha ya lêkera bingehîn.

**Mînak:**

-Ez pirtûkekê werdigerînim zimanê ingilîzî. -Birayê min çaya sivik venaxwe.

**TÊBÎNÎ:**
Pêveka neyîniyê ya lêkerên "karîn" û "zanîn", "**ni**-" ye.

**Mînak:**

Ez **ni**karim werim.
Ez **ni**zanim tu çi karî dikî.

### Dema niha û dema fireh

Di zimanê nivîskî de, dema niha û dema fireh bi heman awayî ne. Her du dem, bi alîkariya hevalkaran ji hev cuda dibin.

Ji bo **dema niha** hevalkarên mîna; "niha, a niha, va ye" û ji bo **dema fireh** hevalkarên mîna; "tim, her gav, her tim, carinan, hin caran" tên bikaranîn.

**Mînak:**

| Dema niha | Dema fireh |
|---|---|
| Ez **niha** kincan dişom.<br>**Va ye** ez têm. | Ez **her roj** zû radibim.<br>Ciwan **her tim** dereng tê malê. |

## 2- Dema bê

Her weke ji navê xwe jî diyar e, ev dem ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn.

Kar hîn dest pê nebûye, lê wê di dema pêş de pêk bê.

Dema bê ; bi alîkariya amraza dema bê ″**dê**″, ″**wê**″, ″**ê**″, pêveka ″**bi-**″, rayeka dema niha ya lêkerê û pêvekên kesane pêk tê.

### Teşeya hevokê ya dema bê:

**Kirde + amraza dema bê +pêveka bi + rayeka dema niha ya lêkerê + pêveka kesane + têrker**

**Mînak:** Projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, **dê bibe** bersiva pirsgirêkên Rojhilata Navîn.

– **Kişandina lêkerê di dema bê de li gorî cînavkan**

**Ez ê** hevalên xwe li şahiyê **bi**bîn**im**.
**Tu yê** dest bi pêşbirkê **bi**k**î**?
**Ew ê** nên belav **bi**k**e**.
**Em-hûn-ew ê** bi ser **bi**kev**in**.
Ger ewr tarîtir bibin, **wê** baran were.

### Neyîniya dema bê

Neyîniya dema bê, bi alîkariya pêveka neyîniyê ″**ne-**″ pêk tê.
Ev pêvek, cihê pêveka ″**bi-**″ digire.

**Mînak:**
Em ê xwîna şehîdên xwe li erdê **ne**hêlin.

Her wiha dema ku lêker pêkhatî be bi pêşgirê, pêveka "**bi-**" ji holê radibe. Di neyîniya lêkerên pêkhatî de, pêveka neyîniyê (**ne-**) dikeve navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

**Mînak:**
Ez ê îşev zû rakevim, ji ber ku ez pir westiyayî me.

Em ê tu carî ji doza azadiyê ve**ne**gerin.

## 3- Dema bûrî

Ev dem, karekî ku beriya niha hatiye kirin, diyar dike. Dema bûrî, di nava xwe de dibe pênc beş

- Dema bûriya têdeyî
- Dema bûriya dûdar
- Dema bûriya berdest
- Çîrokiya dema bûriya têdeyî
- Çîrokiya dema bûriya dûdar

### 1- Dema bûriya têdeyî

Di dema bûriya têdeyî de hêj zêde dem di ser kirina kar re, derbas nebûye û nû hatiye kirin.

**Mînak:**

**Min pirtûk xwend.**

Di dema bûriya têdeyî de, koka dema bûrî ya lêkerê tê bikaranîn.

**Mînak:**

**Lêkera gerguhêz**

| **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|
| Min pirtûk xwend | Me pirtûk xwend |
| Te pirtûk xwend | We pirtûk xwend |
| Wê/wî pirtûk xwend | Wan pirtûk xwend |

**Lêkera negerguhêz**

| **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|
| Ez ketim | Em ketin |
| Tu ketî | Hûn ketin |
| Ew ket | Ew ketin |

### Neyîniya dema bûriya têdeyî

Di dema bûriya nêzîk(têdeyî) de, lêker pêveka neyîniyê "**ne-**" distîne û dikeve rewşa neyîniyê de.

**Mînak:**
Min erka xwe **ne**kir.
Wî av ve**ne**xwar.
Wê li nûçeyan temaşe **ne**kir.

## 2- Dema bûriya dûdar

Di dema bûriya dûdar de, kar pêk hatiye û demek di ser kirina wî karî re derbas bûye û bandora wî ta niha berdewam dike.

Ev dem, ji pêveka dema bûriya dûdar "**-e ,-ye** " û rayeka dema bûrî pêk tê. Lê ji bo cudahî bikeve navbera pêveka dema bûriya dûdar "**-e**" û pêveka kesane ya kesê sêyem ê yekjimar "**-e**", pêveka dema bûriya dûdar dibe "**-iye** ". Her wiha dema ku lêker bi dengdêrê biqede, ev pêvek dîsa "**-iye** " ye.

**Mînak:**

### Lêkera gerguhêz

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Min dît**iye**. | Me dîtiy**e**. |
| Te dît**iye**. | Wan dîtiy**e**. |
| Wî/wê dît**iye**. | We dîtiy**e**. |

### Lêkera negerguhêz

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Ez ketim**e**. | Em ketin**e**. |
| Tu ket**iye**. | Hûn ketin**e**. |
| Ew ket**iye**. | Ew ketin**e**. |

## Neyîniya dema bûriya dûdar

Dema bûriya dûdar, pêveka neyîniyê "**ne-**" distîne û dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:**
Min pirtûkên dîrokî pir **ne**xwendine.
Mixabin, me hin hevalên xwe ve**ne**xwendine şahiyê.
Me şehîdên xwe ji bîr **ne**kirine.

### 3- Dema bûriya berdest

Dema ku bûyerek di dema bûrî de, bi domdarî hatibe kirin, ev dem tê bikaranîn.

Ev dem, ji pêveka dema niha "**di-**" û rayeka dema bûrî pêk tê.

**Mînak:**

**Lêkera gerguhêz**

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Min name **dinivisî**. | Me name **dinivîsî**. |
| Te name **dinivisî**. | Wan name **dinivîsî**. |
| Wê/wî name **dinivîsî**. | We name **dinivîsî**. |

**Lêkera negerguhêz**

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Ez **diketim**. | Em **diketin**. |
| Tu **diketî**. | Hûn **diketin**. |
| Ew **diket**. | Ew **diketin**. |

### Neyîniya dema bûriya berdest

Dema bûriya berdest, pêveka neyîniyê "**ne-**" distîne û pêkhatina kar di warê neyîniyê de, pêşwazî dike.

**Mînak:**

Kes bi wan ewle **ne**dibû. Min
kakilê mijarê ve**ne**digot.
Ji ber kurtbûna demê, mijarên me bi dawî **ne**dibûn.

### 4- Çîrokiya dema bûriya têdeyî (dema bûriya çîrokî)

Di dema bûriya çîrokî de, kar, bizav û bûyer di dirêjahiya dîrokê de çêbûne. Ev dem, ji rayeka dema bûrî û lêkera"**bûn**" ê pêk tê. Her wiha, tîpa "**i**" weke dengekî alîkar dikeve di navbera du dengdaran de.

**Mînak:**

**Lêkera gerguhêz**

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Min tirî **xwaribû**. | Me tirî **xwaribû**. |

| | |
|---|---|
| Te tirî **xwaribû**. | We tirî **xwaribû**. |
| Wî/wê tirî **xwaribû**. | Wan tirî **xwaribû**. |

## Lêkera negerguhêz

| Yekjimar | Pirjimar |
|---|---|
| Ez **ketibûm**. | Em **ketibûn**. |
| Tu **ketibûyî**. | Hûn **ketibûn**. |
| Ew **ketibû**. | Ew **ketibûn**. |

### Neyîniya çîrokiya dema bûriya têdeyî

Dema bûriya çîrokî, pêveka neyîniyê "**ne-**" distîne û pêkhatina kar di warê neyîniyê de, pêşwazî dike.

**Mînak:**

Wê tu guneh **ne**kiribû, lewma ew neditirsiya.
Min hevalekî xwe ve**ne**xwendibû, tevî ku min ew ji bîr **ne**kiribû.

### 5- Çîrokiya dema bûriya dûdar

Ev dem pir zêde nayê bikaranîn. Dema mirov qewimîna tiştekî ji hinekan bibihîze yan jî mirov bêhemdî tiştek kiribe, tê bikaranîn.

Ev dem ji çîrokiya dema bûriya têdeyî û pêveka dema bûriya dûdar "**-e** " pêk tê.

**Mînak:**

## Lêkera gerguhêz

Heval ez **dîtibûme**, lê ji min re **negotibûye**.
Min ev pirtûk **xwendibûye**, lê nehatiye bîra wî.
Wî diyariyek **anîbûye**, lê nedaye min.

## Lêkera negerguhêz

Em ber bi wan **beziyabûne**.
Ew ji ber dijmin **reviyabûye**.
Tu ji welêt **hatibûye**.

## Neyîniya çîrokiya dema bûriya dûdar

Ev dem weke demên din ên bûrî dikeve rewşa neyîniyê bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-**" ya ku tê pêşiya lêkerê.

**Mînak:**

Tu ji welêt **ne**hatibûye.

Min pirtûk **ne**xwendibûye.

Min hevalê xwe **ne**dîtibûye.

Demên bûrî

| Cînavk | Dema bûriya têdeyî | Dema bûriya dûdar | Dema bûriya berdest | Çîrokiya dema bûriya têdeyî | Çîrokiya dema bûriya dûdar |
|---|---|---|---|---|---|
| | Bê pêvek e | e - ye | di | bû | bûye |
| Ez | hatim | hatime | dihatim | hatibûm | hatibûme |
| Tu | hatî | hatiye | dihatî | hatibû | hatibûye |
| Ew | hat | hatiye | dihat | hatibû | hatibûye |
| Em | hatin | hatine | dihatin | hatibûn | hatibûne |
| Hûn | hatin | hatine | dihatin | hatibûn | hatibûne |
| Ew | hatin | hatine | dihatin | hatibûn | hatibûne |

## B- Avaniya tebatî û lebatî

Dema ku yek rasterast karekî bike, avaniya wî karî lebatî ye. **Mînak: Min nan xwar**.

Di mînaka bûrî de, lêkera "**xwar**" di avaniya lebatî de ye. Tê de kirde diyar e.

Lê dema em bibêjin: **Nan hat xwarin**. Lêker di avaniya tebatî de ye. Tê de kirde ne diyar e.

Avaniya tebatî bi alîkariya lêkera "**hatin**" ê pêk tê. Mirov lêkera "**hatin**" ê li gorî dem û kesan dikişîne û lêkera bingehîn jî dikeve rewşa raderîn û bi vî awayî, avaniya tebatî derdikeve holê.

**Mînak:**

| Avaniya lebatî | Avaniya tebatî |
|---|---|
| -Min kevir avêt. | kevir hat avêtin. |
| -Zozan tûyan dadiweşîne. | Tû tên daweşandin. |
| -Xezalê av vexwariye. | Av hatiye vexwarin. |
| -Te dîtinên xwe digot. | Dîtin dihatin gotin. |
| -Em ê sibe şahiyê li dar bixin. | Sibe dê şahî bê lidarxistin. |
| -Wê karê xwe zû qedandibû. | Kar zû hatibû qedandin. |

## Neyîniya avaniya tebatî

Di avaniya tebatî de, neyînî ji lêkera "**hatin**" ê diyar dibe, ango lêkera "**hatin**" ê pêveka neyîniyê "**ne-**" yan jî "**na-**" werdigire.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Goşt **ne**hat xwarin. | (Dema boriya têdeyî) |
| Goşt **ne**hatiye xwarin. | (Dema boriya dûdar) |
| Goşt **ne**dihat xwarin. | (Dema boriya berdest) |
| Goşt **ne**hatibû xwarin. | (Çîrokiya dema boriya têdeyî) |
| Goşt **na**yê xwarin. | (Dema niha) |
| Goşt dê **ne**yê xwarin. | (Dema bê) |

**TÊBÎNÎ:**

Her wiha, avaniya tebatî ji lêkerên gerguhêz çêdibe. Ji ber ku lêkerên bêbireser nikarin bibin tebatî, lewre di vê avaniyê de rista bireseran li pêş e.

## PIRSÊN BEŞA PÊNCEM

1- Teşeya dema niha û dema bê binivîse û bi mînakan diyar bike.
2- Amrazên dema bê diyar bike û her yekê di hevokekê de bi kar bîne.
3- Demên borî dibin çend beş? Wan diyar bike û li ser her beşê hevokekê saz bike.
4- Di demên borî de lêker li gorî çi tê kişandin?
5- Dema boriya berdest, kengî tê bikaranîn? Bi du hevokan diyar bike.
6- Çîrokiya dema boriya dûdar, kengî tê bikaranîn û ji çi pêk tê?
7- Hevoka li jêr bike avaniya tebatî û li gorî demên (niha, bê, boriya dûdar, boriya berdest û çîrokiya boriya têdeyî) bikişîne.

**Gelê me, roja 19'ê Tîrmehê bi coşeke mezin pêşwazî kir.**

8- Lêkerên di nava kevanê de li gorî demên li kêleka wan hatine diyarkirin, bikişîne.

a- Wan mirovan rexne li me ............. (**kirin**) Ç.D.B. Têdeyî
b- Du sed karker ji kar ................(**hatin avêtin**) D.Bê
c- Cotkar zevî .............. (**avdan**) D.B.Dûdar
d- Dema ez ketim refê, mamoste wane ............. (**şîrove kirin**) D.B.Berdest

**9- Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

a- Neyîniya dema niha bi alîkariya pêveka "**ne-**" pêk tê. (.....)

b- Dema niha û dema fireh bi alîkariya hevalkaran ji hev cuda dibin. (.....)

c- Pêveka neyîniya dema bê "**ne-**" dikeve navbera "**bi-**" û rayeka lêkerê. (.....)

d- Di dema boriya têdeyî de kar pêk hatiye û demek li ser kirina wî karî re derbas bûye û bandora wî ta niha berdewam dike. (.....)

e- Dema boriya berdest, ji pêveka dema niha "di-" û rayeka dema borî pêk tê. (.....)

f- Di avaniya tebatî de lêkera bingehîn li gorî dem û kesan tê kişandin. (.....)

g- Avaniya tebatî ji lêkerên negerguhêz çêdibin, lewre di vê avaniyê de rista kirdeyan li pêş e. (.....)

# BEŞA ŞEŞEM

## DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

### A- Destûrên nivîsê

Ziman, bi hin destûrên diyar derbasî nivîsê dibin. Ger di nivîsê de yekîtiyek çênebe, bi demê re çêbûn û sazûmaniya ziman xerab dibe û destûrên wî serûbin dibin. Ji bo pêşîgirtina vê pirsgirêkê, riya rast ew e fêrbûna destûrên zimên ên ku yekîtiya zimên diparêzin.

Di zimanê kurdî de bi awayekî xwezayî bingeh tê girtin ku ji bo her dengekî tîpek tê nivîsîn. Li jêr hin destûrên ku nivîsê bi sazûmanî dikin, hatine vekirin.

### 1- Nivîsa lêkeran

- Lêkerên hevedudanî dema ku di hevokê de li gorî dem û kesan tên kişandin, ji hev cuda tên nivîsîn.

**Mînak:**
Xwendekar xwe ji bo zanîngehê **<u>amade dikin</u>.**
**(Amadekirin)**
Mamoste şagirtan **<u>fêr dike</u>**.
**(Fêrkirin)**
Ez di demjimêra heşt de **<u>hişyar dibim</u>**.
**(Hişyarbûn)**
**TÊBÎNÎ:**
Hin caran bireser dikeve navbera her du beşên lêkerên hevedudanî.

**Mînak:**
Mamoste şagirtan **fêrî** zanistê **dike**.

**b)** Lêkerên bi daçek dema ku di hevokê de tên kişandin, ji hev cuda tên nivîs.

**Mînak:**

Nivîskaran kongira xwe **li dar xist**. **(Lidarxistin)**
Min îro karê xwe zû **bi dawî kir**. **(Bidawîkirin)**
Dilovan dê gotina xwe **bi cih bîne**. **(Bicihanîn)**

**c)** Lêkerên biwêjî dema ku di hevokê de tên kişandin, ji hev cuda tên nivîs.

**Mînak:**

Refa me di pêşbirkê de **têk çû**. **(Têkçûn)**
Di 21'ê Adarê de agirê Newrozê **pê ket**. **(Pêketin)**
Şoreşê dest pê kir, lê mixabin hin alî **pê lîstin**. **(Pêlîstin)**

**TÊBÎNÎ:**

Lêkerên biwêjî: Ev lêker ji du hêmanan pêk tên; cînavka lihevxistî û lêker di rewşa raderîn de.

**Mînak:**

Pev + çûn → pevçûn
Lê + dan → lêdan

**d)** Lêkerên hevedudanî di avaniya **tebatî** û **dançêker** de piştî lêkerên alîkar "**hatin**" û "**dan**" di rewşa raderîn de û bi hev ve tên nivîsandin.

**Mînak:**

Li gundê me pir xanî tên **avakirin**.
Divê em zarokên xwe bidin **fêrkirin**.
Ji ber kêmbûna endaman, civîna me nehat **lidarxistin**.
Eyşo miha xwe da **serjêkirin**.

**TÊBÎNÎ:**

Avaniya dançêker: Ev avanî tê bikaranîn dema ku mirov karekî bi yekî din bide kirin. Ev avanî, bi alîkariya lêkera "**dan**"ê pêk tê. **Mînak:** Fatê kincên xwe **dan şûştin**.

## 2- Nivîsa veqetandekan dema ku cuda tên nivîsandin

Di nava hevokê de heke peyva berî veqetandekê bi tîpa dengdêr biqede, tîpa kelijandinê "y" tê pêşiya veqetandeka serbixwe û dibe "ya", "yê" û "yên".

Her wiha gihaneka "an" jî dema peyva berî wê bi tîpa dengdêr biqede, divê em tîpa kelijandinê "y" li pêşiya wê deynin û bibe "yan".

**Mînak:**

Hevala min **a** dibistanê hatibû mala me.
Dara gûzê **ya** li ber derî hate birîn.
Bapîrê wan **ê** 70 salî koça xwe ya dawî kir.
Birayê wê **yê** biçûk pir jîr e.
Mamosteyên me **yên** jêhatî kêm bûne.
**An** wî gotiye, **yan** jî birayê wî.

## 3- Daçekên "bi", "bê" û "ne" yê

Ev daçek dema ku rista pêşgiran bi cih tînin û hevalnav û navdêrên nû çêdikin, bi bêjeyê ve tên nivîsandin. Lê dema ku hevalkaran çêdikin, cuda tên nivîsandin. **Mînak:** Peyvên; "**bikir**, **nexweş**, **neyar**, **nemir**, **bêbav**, **bêteşe**" bi hev ve hatine nivîsandin, ji ber ku daçekên "**bi-**", "**bê-**" û "**ne-**" rista pêşgiran dilîzin.

**Mînak:**

Ez çayê **bi şekir** vedixwim. ( bi şekir: hevalkar e)
Ez çaya **bişekir** vedixwim. ( bişekir: hevalnav e)

Çayê **bêyî şekir** nayê vexwarin. (bêyî şekir: hevalkar e)
Ez çaya **bêşekir** nikarim vexwim. (bêşekir: hevalnav e)

**TÊBÎNÎ:**

Gihanek û hevalkarên hevedudanî ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:**

**Gihanek:** Her wiha, her weke, her tişt, her kes, her tim, her roj, her yek, her sal, her du, her sê, ...

**Hevalkarên hevedudanî:** Tu carî, tu demê, tu rojan, tu kes, tu mirov, ev tişt, ev kes, ew kes, ew qas, çi qas, çi qeder, hin kes, gelek kes, du kes, …

## B- Hêmadanîn

Xalbendî, xwendinê hêsantir dike û rê li ber tevliheviyan digire. Bi alîkariya xalbendiyan, hest û ramanên me bi awayekî zelal xwe didin der, xwendin û têgihîştin hêsantir dibin.

Di nivîsarên kurdî de, gelek caran em dibînin ku ji ber nebikaranîna xalbendiyan, pirsgirêk derdikevin û wate tevlîhev dibin.

Di salên bûrî de, me çend hêmayên xalbendiyê ji we re diyar kiribûn û niha em ê li ser hêmayên mane jî rawestin.

**Dabir ('):** Ev nîşan bi gelek peywiran radibe:

**a-** Di kurtkirina peyvan de, pêveka tewangê bi rêya dabirê tê veqetandin.

**Mînak:**

YPG'ê hêzeke sereke ye di nava QSD'ê de.

**b-** Di hejmaran de jî, pêveka tewang û veqetandekê bi rêya dabirê ji hev tên veqetandin.

**Mînak:**

8'ê Adarê rojeke taybet e, ji bo jinan.

**c-** Di kurdî de pêvekên ku rêza hejmaran nîşan didin jî, bi dabirê ji hejmaran tên veqetandin.

**Mînak:**

Em deh heval bûn, ez ê 4'em bûm.
Di bazdanê de ez ê 1'em im.

**Kevaneka çarçik ([ ]):** Heke mirov neçar bimîne gotineke di nava kevanekê de, careke din bixe nava kevanekê, mirov kevaneka çarçik bi kar tîne.

**Mînak:**

Helbestvanê kurd ê navdar Cegerxwîn [ê ji Hesarê (gundekî Kercewsê ye)] di Kovara Hawarê de, gelek berhemên xwe weşandin.

**Yeknik ('....'):** Dema ku mirov neçar bimîne hevoka di nava dunikê de dîsa bixe nava dunikê, wê demê "yeknik" tê bikaranîn.

**Mînak:**

Mamoste ji şagirtên xwe pirsî: "Pirtûka 'Salar û Mîdya' berhema kê ye? "

## PIRSÊN BEŞA ŞEŞEM

**1- Di hevokên li jêr de, lêkerên di nava kevanekê de, bi awayekî rast binivîse.**

a. Ez û hevalê xwe li televîzyonê ...................... (temaşekirin)
b. Ciwanên Şoreşger duh kongira xwe ............... (lidarxistin)
c. Divê mamoste erkên xwe .............................. (pêkanîn)
d. Cejna karkeran bi kêfxweşî hat ...................... (pêşwazîkirin)
e. Hevalê min xaniyekî mezin dide .................... (avakirin)

**2- Kengî veqetandekên serbixwe ''a'', ''ê'' û ''ên'' bi awayê ''ya'', ''yê'' û ''yên'' di hevokan de tên bikaranîn? Bi mînakan diyar bike.**

**3- Kengî gihaneka ''an'' bi awayê ''yan'' di hevokan de tê bikaranîn? Bi mînakekê diyar bike.**

**4- Kengî daçekên ''bi'', ''bê'' û ''ne'' bi bêjeyan ve û kengî cuda tên nivîsandin? Bi mînakan diyar bike.**

**5- Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike û sererast bike.**

**a-** Di hevokên tebatî de, lêkera bingehîn a hevedudanî ji hev cuda tê nivîsandin. **(......)**

**b-** Gihanek û hevalkarên nexwerû di hevokan de, cuda tên nivîsandin. **(......)**

**c-** Dema ku daçekên "**bi**", "**bê**" û "**ne**" hevalkaran çêdikin, bi bêjeyan ve tên nivîsandin. **(......)**

**d-** Xwarina bê xwê nexweş e. **(......)**

**6- Kengî xalbendiyên ''dabir, kevaneka çarçik û yeknik'' tên bikaranîn? Bi mînakan diyar bike.**

**7- Di vê benda li jêr de, xalbendiyan bi cih bike.**

Celadet Bedirxan ji malbata Bedirxan Paşa ye Bingeha rêzimana kurdî ya nûjen daniye Di sala 1932yan de bi çend hevalên xwe re dest bi weşana HAWARÊ kiriye

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | - Ziman û civakbûn<br>- Ziman û mirov | - Dîroka zimanê kurdî |
| Cotmeh | - Axaftina bi zimanê kurdî<br>- Cihê ku zimanê kurdî lê tê axaftin | - Zimanê axaftinê<br>- Zimanê nivîsê | - Pirsên beşa yekem | - Navdêr<br>- Dabeşkirina navan |
| Mijdar | - Dabeşkirina navan<br>- Pirsên nirxandinê | - Rewşa navan | - Rewşa navan<br>- Pirsên nirxandinê | - Nav li gorî çêbûnê |
| Berfanbar | - Navên kompleks<br>- Pirsên beşa duyem | - Hevalnav li gorî bikaranînê | - Cureyên hevalnav<br>- Hevalnav li gorî çêbûnê | - Pirsên nirxandinê<br>- Baneşan |
| Rêbendan | Lêveger | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | - Pêveber | - Cureyên pêveberan | - Cînavk û cureyên wê | - Pirsên beşa çarem |
| Avdar | - Dem | - Dem | - Avanî | - Pirsên beşa pêncem |
| Cotan | - Destûrên nivîsê | - Destûrên nivîsê | Hêmadanîn | - Pirsên beşa şeşem |
| Gulan | Lêveger | NIRXANDIN | | |

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ07

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN

# 1

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Zimanê Kurdî ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

BEŞA YEKEM ........................................................ 7
GUHDARKIRIN........................................................ 8
XWENDIN ........................................................ 13
RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE ........................................ 17
ZAROKÊ XEMSAR ........................................................ 21
ZIMAN Û ÇAND ........................................................ 25
BEŞA DUYEM ........................................................ 31
HEVALBENDÎ ÇI QAS XWEŞ E! ........................................ 32
PIRTÛK ........................................................ 36
ŞÊR, ROVÎ Û XEZAL ........................................................ 41
NAME JI BO DAPÎRÊ ........................................................ 45
HIZIR Û ZANIST ........................................................ 49
BEŞA SÊYEM ........................................................ 57
PARASTINA XWEZAYÊ ........................................................ 58
ZEMBÎLFIROŞ ........................................................ 62
HEŞTÊ ADARÊ ........................................................ 66
GULA DEVLIKEN ........................................................ 71
VEGERA LEGLEGAN ........................................................ 75
AZADÎ ........................................................ 79
ÇÎROKA KEÇEL Û APÊ WÎ ........................................ 83
BEŞA ÇAREM ........................................................ 91

BAJARÊ TIRBESPIYÊ ............................................ 92
KOÇBERÎ Û WELATPARÊZÎ ................................. 97
MAMOSTEYA MIN ................................................ 101
BILBILÊN DI RIKEHÊ DE .................................... 105
ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ ........................... 109

# BEŞA YEKEM

## WANEYÊN BEŞÊ

**GUHDARKIRIN**

**XWENDIN NEBE, KES NAÇE PÊŞ**

**RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE**

**ZAROKÊ XEMSAR**

**ÇAND Û ZIMAN**

# WANE 1

## GUHDARKIRIN



Yek ji karê ku em her roj dikin, guhdarkirin e. Em her roj, sê-çar demjimêrên xwe jê re vediqetînin. Em li malê; guhdarî dê û bav, li dibistanê jî; guhdarî heval û mamosteyên xwe dikin. Bi kurtasî, guhdarkirin di jiyana me ya rojane de cihekî girîng digire. Guhdarkirin jî, weke xwendinê ye. Dema ku em dixwînin, em fêrî hest û ramanên kesên din dibin. Heman tiştî, em bi guhdarkirinê jî fêr dibin.
Bi vî awayî, guhdarkirin destpêka riya fêrbûnê ye.

Ji bo ku em bibin guhdarine baş, pêwîstî bi hin hînbûnan heye. Hin kes hene dema ku yek diaxive, bêdeng dimînin û çavên xwe ji ser kesê ku diaxive danayînin.
Çav li yê diaxive, bal û hiş li dereke din e, ew nabin guhdarên baş. Guhdarên baş ne bi çavan, lê bi pirsan guhdarî dikin; li ser mijara ku tê axaftin zêdetir lêkolîn dikin. Ji bo wan pirsên ku di serê wan de çêbûne, li bersivan digerin.



Hin guhdar; têkiliyên wan ne bi axaftinan re lê belê bi kesên ku diaxivin re ne. Li cil û berg û lêvên bêjer dinêrin.
Ev jî, ne guhdarên baş in.

Guhdarên baş bi hedar in, ta dawî axaftinê dişopînin.
Dibe ku bi axaftinan re ne hembîr bin, lê tu carî axaftina wan nabirin. Ger pirsên wan hebin, piştî ku axaftin bi dawî dibe, dipirsin.

Nirxandina tiştên ku hatine guhdarkirin, karê herî girîng e. Pêwîst e guhdarên baş, baş binirxînin. Mînak, armanca yê diaxive çi ye? Şîretan dike, yan der barê mijareke diyar de hin rastiyan vedibêje? Dema vê dike, bi xiroş dibe? Ramanan diguherîne û ji heyîna wan mezintir dike? Nirxandina van pirsan
û pirsên weke van jî karê guhdarên baş e.

## WATEYA PEYVAN

**Vediqetînin:** Cuda dikin

**Girîng:** muhîm, binirx, berketî, hêja, pirî jê

**Hest:** Hîs, pejn, pêjn, pêhesîn

**Raman:** Hizir, fikir

**Hînbûn:** Fêrbûn

**Bersiv:** Îfade, cewab

**Têkilî:** Peywendî

**Şîret:** Amojgarî

**Hembîr:** Hemhizir, hemraman

**Bêjer:** Axêver, kesê diaxive

**Lêkolîn:** Kar û xebata ku ji bo naskirin û zanîna tiştekî tê kirin.

**Hedar:** Sebir, aram

**Xurûş:** Kelecan, heyecan

## PIRS

**1-** Tu di jiyana xwe ya rojane de herî zêde li kê û çi guhdar dikî?

**2-** Di nivîsê de xwendin û guhdarkirin, bi kîjan aliyên xwe ve hatine pêşberî hev?

**3-** Pêwîst e guhdarên baş, kîjan hînbûnan bi dest bixin?

**4-** Di mijara we xwendî de çend bend hene? Di benda duyem a nivîsê de çend hevok hene? Her yek ji wan hevokan; hestek an ramaneke tekûz dide têgihîştin?

**5-** Encama ku te ji mijarê derxistiye, bêje.

**Em ji vê encamê re dibêjin; soje (ramana bingehîn).**

# DESTÛRÊN ZIMAN

**Cînavk:** Ji peyvên ku cihê navdêran digirin, em ji wan re dibêjin **cînavk.** Di salên borî de me hin cureyên cînavkan ji we re şîrove kiribûn, weke; **cînavkên kesane**(xwerû û tewandî), **cînavkên şanîdanê yên xwerû û cînavkên nebinavkirî**.

Niha jî em ê du cureyên din ên cînavkan, bi we bidin nasîn:

**1- Cînavka Vegerok(vegerandinê) (xwe):**

Ew cînavka ku bi awayê vegerandinê, li navan vedigere jê re **cînavka vegerok** tê gotin. Heke kirde û bireser di hevokê de heman kes be, cînavka vegerok di cihê bireserê de tê bikaranîn.

**Mînak:** Hesen hevalê **xwe** li pirtûkxaneyê dît.
Wî bi **xwe** kar kir.

Me **xwe** amade kir.

**2- Cînavka pêvekî(ê):**

Ev cînavk, cihê kesê sêyem(wê, wî) digire, ji bo kurtkirinê tê dawiya lêkeran.

| | | |
|---|---|---|
| **Mînak:** | Ew çû **Dêrikê**. | Ew çûy**ê**. |
| | Min nan da **wê**. | Min nan day**ê**. |
| | Min pênûs da **wî**. | Min pênûs day**ê**. |

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Rastnivîs

Ew tişta ku awayê nivîsîna rast nîşan dide û bingeha xwe ji çend tiştên sereke digire. Yek ji wan hêmanên bingehîn, rêziman e û hêmaneke din a rastnivîsê **alfabe** ye.

## Hêmadanîn:

Dema ku axaftinek li gorî destûrên diyar derbasî nivîsandinê bibe, ji bo nivîsîn hêsanî were têgihîştin, ji wan hêmayên ku tên bikaranîn re **hêmadanîn** tê gotin.

## HÎNDARÎ

**1-** Di hevokê de erka cînavka vegerok û pêvekî, çi ye? Bi du hevokan diyar bike.

**2-** Di hevokên li jêr de cihên vala bi cînavkên; vegerok, pêvekî û kesane dagire.

- …. çûme Hesekê, lê ew neçûy….
- Dîlan û xwişka …. pirtûk kirîn.
- …. lênûs da Fadî lê …. neday…
- Osman hat dibistanê, lê pênûsa …. ji bîr kiribû.
- Çima …. her tim dilîzin û waneyên … naxwînin?

**3-** Cînavkên li jêr, li gorî cureyên wan dabeş bike.

**tu – xwe – min – wan – hûn – ê – wî - we**

## MAMIK


➢ Ne ker e, ne hêstir e, bar jê mezintir e.
(Mîro)

➢ Girê didim diçe, ber didim naçe.
(Pêlav)

# WANE 2

## XWENDIN

**Xwendin nebe kes naçe pêş,**
**Peyda dibin pir derd û êş,**
**Her dem di bin destê neyar,**
**Em dê bidin xukî û bêş.**



**Her çi nexwendî rêncber e,**
**Yê ku bixwîne rêber e,**
**Her dem di nav xan û sera,**
**Serkar e ew, ya serwer e.**

**Xwendin divê hem pir xebat,**
**Bo miletê Kurd û welat,**
**Kurdno ji xew rabin hemû,**
**Mizgîn li we roja me hat**

**(Cegerxwîn)**

### WATEYA PEYVAN

**Derd:** nexweşî

**Neyar:** dijmin

**Xukî:** bac, qemçûr

**Bêş:** Diravên ku ji bo xizmetê ji gel tên standin.

**Rêncber:** pale, kedkar

**Rêber:** serok

**Xan:** avahî, mal

**Serkar:** rêveber

**Serwer:** serdest, serdar

**Xebat:** ked, kar

**Mizgîn:** nûçeya xweş

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan, ger xwendin nebe, dê çi bibe? **2-** Çi cudahiya mirovê xwendevan, ji yê ne xwendevan heye?

**3-** Ji bo pêşketina welatan, çi pêwîst e?

## DESTÛRÊN ZIMAN

### Veqetandek:

Dema ku du peyv bi alîkariya hin pêvekan bi hev ve tên girêdan, ango tên ravekirin, ji wan pêvekan re **veqetandek** tê gotin. Bi riya veqetandekê, zayend û mêjer tên naskirin.

Veqetandek, di nava xwe de dibin du beş**:**

- **Veqetandekên binavkirî:**
  **-a:** Mê, yekjimar

  **-ê:** Nêr, yekjimar

  **-ên:** Mê û nêr (nêtar), pirjimar

**Mînak:**

- Pirtûk**a** min rengîn e.
- Xaniy**ê** spî yê min e.
- Du biray**ên** Ferîd bijîşk in.

**2. Veqetandekên nebinavkirî:**

**-eke:** Mê, yekjimar

**- ekî:** Nêr, yekjimar

**- ine:** Mê û nêr (nêtar), pirjimar

**Mînak:**

Zelal keç**eke** pir xweşik e.

Ciwan mirov**ekî** zana ye.

Heval**ine** min li gund hene.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

**Cînavkên kesandinê (im+me, î+yî, e+ye, in+ne)** bi lêkeran ve tên zeliqandin, lê ji navdêr, hevalnav û cinavkan cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** - Ez di heftan de diç**im** kargehê. (**im** bi lêkerê ve hatiye zeliqandin).

- Ez baş **im.** (**im**, ji hevalnava "**baş**"cuda hatiye nivîsandin).
- Em **in** xwediyê vê xakê. (**in**, ji cînavka "**em**" cuda hatiye nivîsandin).

- Tu şagirt **î** yan karker **î**? (**î**, ji navdêran “**şagirt û karker**” cuda hatiye nivîsandin).

## Hêmadanîn

Hin ji hêmayên nivîsînê, ev in:

**xal(.) bêhnok(,) xalbêhnok(;) cotxal(:) pirsnîşan(?) baneşan(!) dunik(”) yeknik(’) kevanek( ) sêxal(...)**

**Bêhnok(,):**

- Di hevokên dirêj de li cihê ku mirov bêhna xwe vedide, bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:** Şagirtê ku duh li ser depê dinivîsî, pismamê min e.

### HÎNDARÎ

1- **Di benda li jêr de veqetandekan diyar bike.**

“Bi xwendina wê, xew dibe dijminê çavên reş.

Şev tev diçe, lê tu dibê hê êvar e.

Ne dê û ne bav, di bîra te nayên kes.

Wek jana zirav, lê mêrkuj e, wek mar e." **(Cegerxwîn)**

2- **Valahiyên li jêr, bi veqetandekên guncav dagire.**

- Diy… Dilberê çû bazarê.
- Bav… Cemîl şekir da zarokan.
- Şagirt… dibistana me gul dane mamosteyan.

3- **Valahiyên li jêr, bi veqetandekên nebinavkirî yên guncav dagire.**

- Nalîn keçik… bedew e.
- Mirov… alîkariya min kir.

Sêv… rind ji mêvanan re bîne

## WANE 3

# RÊZDARIYA JI MAMOSTE RE



Rojekê li Efrînê, vekirina dibistanekê hebû. Rêveberiya dibistanê, mêvanên vexwendî, xwendekar û malbatên wan amade bûn. Ji ber ku dibistana xwe vedikirin, hemû di nava kêfxweşiyeke mezin de bûn. Yekem car, wê bi zimanê dayîkê dest bi perwerdeyê kiribana.

Dema ku mamosteyekê, ji bo axaftina vekirinê bang li Hevseroka Meclîsa Gel a Efrînê kir, xwendekarekê gulek pêşkêşî wê kir. Lê, wê gul negirt û got:

- Ên ku şayanê vê gulê mamoste ne, ne ez im. Gulê bide mamosteyên birûmet. Ji ber ku mamostetî, karekî pîroz e. Divê em li hemberî wan rêzdar bin.

## WATEYA PEYVAN

**Rêveberî:** Kesên ku kar bi rê ve dibin.

**Mêvan:** Kesên ku demekê li cih an jî mala kesine din dimînin.

**Bang:** deng

**Pêşkêş kirin:** berpeşi, raberi, qedimandin, teqdim

**Rêzdarî:** Hurmet dayîn

**Vexwendin:** daxwazkirin, dawetkirin
**Şayan:** hêja, guncav, stêle, layîq

## PIRS

1- Mamoste, xwendekar û malbatên wan ji bo çi kom bûbûn?

2- Kêfxweşiya wan kesên amade, ji bo çi bû?

3- Mamoste, ji bo axaftinê bang li kê kir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

### Tewang

Tewang, tê wateya xwarkirinê. Ji ber ku bi riya tewangê, peyv tê tewandin, an jî xwarkirin.

Pêvekên tewangê

Pêvekên tewangê, dibin du beş:

**Pêvekên tewangê yên binavkirî**

**Pêvekên tewangê yên nebinavkirî**

**1- Pêvekên tewangê yên binavkirî:**

- **-ê: Mê, yekjimar**

**Mînak:** Zînê rojname xwend.

- **-î: Nêr, yekjimar**

**Mînak:** Ehmedî bersiva mamoste da.

- **-an: Mê û nêr (nêtar), pirjimar**

**Mînak:** Hevalan welat rizgar kir.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

**Nivîsîna tîpa "î" dema beriya tîpa "y"**

Dema ku beriya tîpa "**y**" tîpa "**î**" bê, ev tîp kurt dibe û dibe "**i**". Ji ber ku "**y**" tîpeke nîvdengdêr e, "**î**" kurt dibe.

Mînak:
- Derî ⟶ Deriyê mala me pir teng e.
- Hêvî ⟶ Hêviya min qet jê nema.
- Gulî ⟶ Wî guliyên darê jêkirin.

**Têbînî:** Dema ku tîpa "**î**" û "**y**" ji hev cuda bên nivîsandin, "**î**" nayê kurtkirin û weke xwe dimîne.

Mînak: Ew kî ye?

## Hêmadanîn

**Bêhnok (,):**

- Di nava hevokê de piştî erêkirin û redkirinê tê bikaranîn.

Mînak: Erê, ez baş im.

Na, ne wisa ye.

- Di nava peyvên ji heman nifşî de bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Li gundê me, darên tû, sêv, hinar û hirmiyan hene.

## HÎNDARÎ

**1-** Di hevokên li jêr de pêvekên tewangê yên binavkirî diyar bike.
- Ez ji gulan hez dikim.
- Zeynebê diyariyek ji Necahê re anî.
- Pênûsên Caklînê pir bedew in.
- Em bi Ehmedî re çûn geştê.

**2-** Valahiyên li jêr, bi pêvekên tewangê yên guncav dagire.
- Ez nan… dixwim
- Zîn… alîkariya hevala xwe kir.
- Cotkar… bexçeyên xwe av dan.

### MAMIK

➢ Şil e ziwa nabe, bêxwê ye, genî nabe.

(Ziman)

Çiyayê bêkevir, deryaya bêav,
daristana bêdar, bajarê bêmirov.

(Nexşe)

WANE 4

## ZAROKÊ XEMSAR



Zarokekî xemsar hebû. Cilên ku ji xwe dikirin, davêtin erdê. Pirtûkên xwe li holê ji bîr dikirin. Li ku derê dilîst, pêlîstokên xwe li wir dihiştin.

Rojekê, tiştên wî yên belawela, di navbera xwe de dipeyivin.

**Gore**: Tu çima heya niha li vir î? Ma ne divê tu niha li dibistanê bûya?

**Pirtûk**: Belê, mixabin zarokê xemsar dema ku çû dibistanê, ez li vir hiştim. Cil û gore jî, ji zarok bêzar bûbûn.

**Şal**: Binêrin, hûn dizanin em ê çi bikin? Zarokê xemsar bilêta servisê di berîka min de ji bîr kiriye. Em hemû bi hev re li servîsê siwar bin û ji vir biçin.

Tişt miştên wî, bi hev re dibêjin: Erêêê!

Servîsa ku lê siwar bûn, ew birin gerangeheke şîn. Li wê derê,

bi gog û veşartokê lîstin. Di nava axê de xwe gevizandin.

Ber bi êvarê ve dîsa li servisê siwar bûn û vegeriyan malê. Her yek çû cihê xwe. Zarok ji dibistanê hat. Dema ku rewşa tiştên xwe dît, got: Xwezî min ew rakiribûya, da neketibûma vê rewşê. Zarokê xemsar, ji wê rojê şûn de cil, pirtûk û pêlîstokên xwe li erdê nedihiştin.

## WATEYA PEYVAN

**Xemsar:** sersar

**Belawela:** Tarûmar**,** tiştên ku li her derê bela bûne.

**Mixabin:** heyf

**Bêzarbûn:** tengavbûn, acizbûn

**Bilêt:** tikêt, bitaqe

**Gerangeh:** seyrangeh, geştgeh, park

**Gevizandin:** Xwe di nava axê de gindirandin û qirêjkirin.

## PIRS

**1-** Çi ji zarokê xemsar bêzar bûn?

**2-** Tişt û miştên wî, bi çi çûn gerê?

**3-** Qirêjî û belavbûna tiştan, bandoreke çawa li zarokê xemsar kir?

# DESTÛRÊN ZIMAN

**2- Pêvekên tewangê yên nebinavkirî**

Ev pêvek, ji pêvekên nebinavkirinê (**ek, in**) û pêvekên tewangê yên binavkirî (**ê, î, an**), pêk tên.

- **-ekê : Mê, yekjimar**

**Mînak:** Ew bi hevalekê re dipeyive.

- **-ekî: Nêr, yekjimar** **Mînak:**

Xortekî alîkariya min kir.

- **-inan: Mê u nêr (nêtar), pirjimar**

**Mînak:** Em ê vê mehê darinan biçînin.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

**Nivîsîna tîpa “û” ya beriya tîpa “w”**

Dema ku beriya tîpa “**w**” tîpa “**û**” were, ev tîp kurt dibe û dibe “**i**”

Mînak: - Rû ⟶ Ez nikarim li r**iw**ê wî binêrim.

- Xwesû ⟶ Xwes**iw**a wî ji pirtûkan hez dike.

## Hêmadanîn

**Xal**(.)

- Ev hêma, bidawîbûna hevokê nîşan dide. Dema ku hevok diqede, mirov xalekê datîne dawiya hevokê. Peyva piştî xalê bi tîpa mezin dest pê dike.

**Mînak:** Azad li baxçeyê dibistanê dilîst. Ji nişka ve zarokek derket pêşberî wî û her du li hev ketin.

## HÎNDARÎ

**1-** Her sê pêvekên tewangê yên nebinavkirî, di sê hevokan de bi kar bîne.

**2-** Cihên vala, bi pêvekên tewangê yên nebinavkirî dagire.

- Pirs... bike, ku hevalên te jê sûdê wergirin.
- Şîret... li min bike, da ku ez tu carî te ji bîr nekim.
- Heval... bibîne û rastiyê ji wan re bêje.
- Dost... ev qencî bi min kir.

## PENDÊN PÊŞIYAN

- **Çavê li deriya, xwelî li seriya.**
- **Av çi qas di golan de bimîne, genî dibe.**

# WANE 5

## ZIMAN Û ÇAND



Ziman, têgeha ramanî ya çandê ye. Mirov hest, hizir û pêwîstiyên xwe bi ziman rave dike. Ji ber vê yekê, bikaranîna zimên di pêşketina civakan de cihekî girîng digire.

Civakek, bi parastin û pêşxistina zimanê xwe, hebûna xwe diyar dike. Hatina civakan a heya roja îro, girêdayî pêkanîn û pêşketina ziman e. Ziman; têgehên çandê ji nifşekî, radigihîne nifşekî din. Mirovên ku karibin zimanê xwe bi kar bînin, nivîsandin jî di nav de ew xwedî pêşerojeke ronî ne. Cihê ku ziman û hizir di nav de heye, cihê ku herî bi hêsanî dewlemendiya çandê lê tê dîtin e. Çand bi xwe, bi awayekî herî berfireh pênasekirina ziman û hizir e. Ziman, hîmê bingehîn ê civakê ye.

Mirov, hemû çêkerên xwe bi hizirê diafirîne. Di hemû destkeftiyên ku afirandî de vedana hizira wan tê dîtin. Dibe ku civakek, an jî komeke din ku li gorî hişmendiya xwe hemû afirandinan negihîne encamê, lê ew kom, an jî civak di ziman û

hizira xwe ya dîroka derbasbûyî de hemû destkeftiyên ku afirandî, li şûna wê hildigire.

Ziman, nasnameya civak û çandê ye. Ziman, girîngiya têkiliya mirovên di civakê de dide zanîn û zindî dike.

## WATEYA PEYVAN

**Têgeh:** têgîn, musteleh

**Çand:** kultûr, edet

**Pêwîst:** gerek, divê, lazim

**Ravekirin:** şîrovekirin

**Parastin:** ji belayê dûrkirin

**Nifş:** cîl, nesl

**Radigihîne:** diyar dike, belav dike.

**Pêşeroj:** dema bê

**Dewlemendî:** zengînî**,** maldarî

**Hîm:** kevir, bingeh

**Diafirîne:** çêdike, peyda dike

**Destkeftî:** tiştên bi dest ketî

**Nasname:** nasnav, xwenasî

**Zindî:** sax, ne mirî

## PIRS

1- Ziman, çi ye?
2- Têkiliya di navbera çand û zimên de çi ye?
3- Ramana bingehîn a mijarê, çi ye?

# DESTÛRÊN ZIMAN

## Zayend û mêjera navdêran

Di kurdî de mêjer û zayenda navdêran, bi alîkariya veqetandek û tewangê diyar dibin.

**Mînak (veqetandek):**

- Diy**a** wî bang lê kir. (**-a**) yekjimara mê diyar dike.
- Bav**ê** min çû bazarê. (**-ê**) yekjimara nêr diyar dike.
- Heval**ên** me hatin. (**-ên**) pirjimara nêr/mê diyar dike.

**Mînak (tewang):**

- Dar**ê** av bide. (**-ê**); yekjimara mê diyar dike.
- Em li bajar**î** man. (**-î**); yekjimara nêr diyar dike.
- Pirtûk**an** bide min. (**-an**); pirjimara nêr/mê diyar dike.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

Lêkerên hevedudanî, dema ku weke lêker bên kişandin,

hêmanên lêkerê ji hev cuda tên nivîsandin. Lê dema ku weke navdêr bin, bi hev ve tên nivîsandin.

**Mînak 1:** Em ji bo ezmûnê, xwe **amade dikin**.

**Mînak 2:** **Amadekirina** me ji bo ezmûnê, pir baş e.

## Hêmadanîn

**Cotxal(:)**

Dema ku di nava hevokê de tiştek tê gotin, an taybetmendiyên tiştekî tên rêzkirin, an jî wateya wê tê vegotin, cotxal tê bikaranîn.

**Mînak 1:** Mamoste li şagirtê jîr mêze kir û got: “Her bijî!”

**Mînak 2:** Tiştên ku mirovê baş ji yê xerab vediqetînin, sê ne: dilpakî, wêrekî û camêrî.

## HÎNDARÎ

1- Zayend û mêjera peyvên binê wan xêzkirî, diyar bike.

**Ziman, têgeh û kevirên bingehîn ên bîr û pêşketina hişmendiya civakê ne. Ta mirov nebe xwediyê van keviran, mirov nikare tu çalakiyeke civakî li dar bixe.**

2- Sê hevokan li ser navdêrên yekjimar nêr, yekjimar mê û pirjimar saz bike.

## MAMIK

Ev qas dinya diçiyê, qirşikek naçiyê. (Çav)

Qefdek giya, li pişta çiya. (Kezî)

## HÎNDARÎ

**1-** Cînavka pêvekî, di kîjan hevokê de heye? Binê wê xêz bike.

**a-** Bavê Delalê karmend e.
**b-** Ez çûm bajarê Amûdê.
**c-** Min pirtûka xwe dayê.
**d-** Hevalê min jîr û jêhatî ye.

**2-** Cînavka vegerok, di kîjan hevoka li jêr de heye? Binê wê xêz bike.

**a-** Min bi çend hevalan re guftûgo kir.
**b-** Ez û Fehîm bi hev re kar dikin.
**c-** Xalid pirtûka xwe di refê de ji bîr kir.
**d-** Diya wê çend şîret lê kirin.

**3-** Peyva "Rêncber" tê wateya:

**a-** Karker **b-** Pale **c-** Karmend **d-** Penaber

**4-** Çend cureyên veqetandekan hene?

**a-** Yek cure **b-** Du cure **c-** Sê cure **d-** Çar cure

**5-** Kîjan vebijêrka li jêr, veqetandekên nebinavkirî ne?

**a)** ekî, ekê, inan **b)** a, ê, ên
**c)** eke, ekî, ine **d)** ê, î, an

**6-** Kîjan vebijêrka li jêr, pêvekên tewangê yên binavkirî ne?

**a)** î, a, an **b)** a, ê, ên
**c)** ekê, ekî, inan **d)** î, ê, an

**7-** Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev.

| | |
|---|---|
| Şîret | hêja |
| hîm | derd |
| xemsar | bingeh |
| şayan | sersar |
| nexweşî | amojgarî |

**8-Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike.**

**a-** Ew cînavka ku bi awayê vegerandinê li navan vedigere, jê re **cînavka vegerok** tê gotin. ( )

**b-** Ew tişta ku awayê nivîsînê nîşan dide, jê re **hêmadanîn** tê gotin. ( )

**c-** Cînavkên kesandinê, ji lêkeran cuda tên nivîsandin û bi navdêr, hevalnav û cînavkan ve tên zeliqandin. ( )

**d-** Di nava gotinên ji heman nifşî de xalbêhnok tê bikaranîn. ( )

**e-** Daçekên xwerû dema ku pêşdaçeka wan dikeve, paşdaçek jî bi bêjeyê ve dizeliqe. ( )

**f-** Navê roj û mehan, bi tîpa biçûk dest pê dike. ( )

**g-** Zayend û mêjera navdêran, tenê bi alîkariya veqetandekan diyar dibe. ( )

**h-** Xal(**.**), dikeve navbera du hevokên bi hev ve grêdayî. ( )

**i-** Lêkerên hevedudanî dema ku weke nav bên kişandin, ji hev cuda tên nivîsandin. ( )

**j-** Bêhnok(**,**) di nava hevokê de piştî erêkirin û redkirinê tê bikaranîn. ( )

**k-** Di hevokên dirêj de li cihê ku mirov bêhna xwe vedide, bêhnok tê bikaranîn. ( )

# BEŞA DUYEM

## WANEYÊN BEŞÊ


**HEVALBENDÎ ÇI QAS XWEŞ E!**

**PIRTÛK**

**ŞÊR, ROVÎ Û XEZAL**

**NAME JI BO DAPÎRÊ**

**HIZIR Û ZANIST**

# WANE 1

## HEVALBENDÎ ÇI QAS XWEŞ E!



Azad, di refa sêyem de dixwend. Azad rojekê li baxçeyê dibistanê dilîst. Ji nişka ve zarokek derket pêşberî wî û her du li hev ketin. Azad li erdê ket û serê wî şikest. Serbest zû rahişt destê wî, destmala xwe ji berîka xwe derxist, danî ser birîna wî û ew bir odeya mamosteyan. Li wir, mamosteyan birîna wî derman kir. Piştre, Azad çû refa xwe û bi rêzdarî spasiya hevalê xwe Serbest kir.

Ji wê rojê û şûn de Azad êdî bêhtir ji Serbest hez dikir û wî jî her tim bi dilsozî alîkariya hevalên xwe dikir. Êdî ji wê bûyerê û pê de Azad bû xwendekarekî mînak di nava hevalên xwe de û ta ji bo alîkariya hevalên xwe carinan pêwîstiyên weke; pênûs, jêbir û pênûsbir zêde bi xwe re tanîn, ji bo ku wan bide hevalên xwe.

Ji ber vê rewşê, êdî ne tenê xwendekaran, mamosteyan jî ji ber van alîkariyên wî, ji Azad hez dikirin.

## WATEYA PEYVAN

**Hevalbendî:** hevaltî, lihevkirin

**Destmal:** Cawekî biçûk e ku mirov destên xwe yan serçavên xwe, pê zuha dike.

**Birîn:** Ziyana ku di laş de çêdibe û dibe sedema derbûna xwînê.

**Dilsozî:** Sozdarî, bicihanîna erk û sozên xwe.

## PIRS

1- Azad, li ku derê birîndar bû?

2- Dema ku Azad birîndar bû, Serbest çi kir?

3- Çima xwendekar û mamosteyan, ji Azad hez dikirin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Peyv, li gorî wateya xwe, dibin pênc beş**:

**1- Peyvên hemwate:** Ew peyvên ku wateya wan yek e, lê xwendin û nivîsandina wan cuda ye.

**Mînak:**
**Gelek = pir , axaftin = peyivîn , hevalbendî = hevaltî**

**2- Peyvên dijwate:** Ew peyvên ku wateya wan, li dij hev in.

**Mînak:**
**Kêm × zêde - mezin × biçûk - qenc × xerab**

**3- Peyvên hevdeng:** Ew peyvên ku di xwendin û nivîsandinê de wekhev, lê di wateyê de ji hev cuda ne.

**Mînak:**

Rovî, lawîrekî xapînok e.

Rovî, parçeyek di hinavê mirov û lawiran de

ye. Enî: pêşiya serî

Enî: cebhe, bere

**4- Peyvên hevtîp:** Ew peyvên ku ji heman tîpan pêk tên, lê deng û wateya wan cuda ne.

**Mînak:**

Çil: (40) Hejmarek e, çil: Balindeyek kor e(pelçemok)

Ker: Kesê ku dengan nabihîse, ker: Lawirek e

**5- Peyvên xaze (mecazî):** Ew peyvên ku ji derveyî wateya xwe ya rastîn, di wateyeke din de tên bikaranîn.

**Mînak:**

<u>Agirê azadiyê</u>, ji Rojava belav bû. (**Mecazî**)

<u>Agirê</u> ku me pêxist, pir gur bû. (**Wateya rastîn**)

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

Bêjeya hevoka ku piştî cotxalê tê, bi tîpa mezin dest pê dike. Lê heke piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka pêşîn jî bi tîpa biçûk dest pê dike.

Mînak 1: Zerdeşt dibêje: **B**aş bihizire, baş biaxive û baş pêk bîne.

Mînak 2: Navdêr, li gorî zayenda xwe, dibin du cure: **n**êr û mê

## Hêmadanîn

**Cotxal(:)**

Dema ku mînak tê dayîn, cotxal tê bikaranîn.

Mînak 1: Cureyên cînavkan, di zimanê kurdî de pir in: kesane, şanîdan, pirsiyarî…

Mînak 2: Hin peyvên xwerû, ev in: av, dar, nan…

## HÎNDARÎ

1- Du peyvên hemwate peyda bike û li ser her yekê ji wan hevokekê saz bike.
2- Peyvekê di du hevokan de bi kar bîne, carekê di wateya wê ya rastîn de û cara din jî di wateya wê ya xaze de.
3- Li ser peyva (bîr) du hevokan saz bike, ku di her hevokê de wateya vê peyvê cuda be.
4- Dijwateya peyvên li jêr, peyda bike.

**dereng - paş - maldar - nerm - mezin - dijwar**

## WANE 2

# PIRTÛK



Dosteke min a pir delal
Heye bêdest, pê û bal
Weke kesa ker û lal
Bêdeng rûdine li mal

Ne hawar û şer û qîr
Ne şivan e ne jî mîr
Ne xwarin dixwe ne cil
Tev pesnê wê ye ji dil

Lê ne ker e û gewc e
Her kes pê dibe hewce

Xwedî zimanekî şîrîn

Zana, zîrek û hişîn

Dema vala bûm ji kar

Diçim dîwana rêzdar

Bersiveke rast û dilnerm

Pêşkêş dike bi dilgerm

Heke we got ew çi ye?

Ew dostê zana kî ye?

Na, ji we re nabêjim

Ma qey ez şaş û gêj im

Bipirsin ji bihîstok

Heke we dîte pirtûk

**(Gelêrî)**

## WATEYA PEYVAN

**Dost:** heval, hogir

**Lal:** Kesên ku nikarin biaxivin.

**Gewc:** gêj, aqilsivik

**Zîrek:** jîr, jêhatî, çalak

**Bal:** hişyarî

**Pesn:** Meth, bi gotinên xweş qala kesekî, yan jî tiştekî kirin.

## PIRS

**1-** Di malika şeşê de kîjan pesn tên dayîn? Şîrove bike.

**2-** Nivîskar di dema xwe ya vala de çi dike?

**3-** Pirtûk, çawa bersiva pirsên mirov dide?

**4-** Bi çend hevokan, nêrînên xwe yên li ser girîngiya pirtûkê ya di jiyana mirov de diyar bike.

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Peyv, li gorî sazbûnê; dibin sê cure:**

**1- Peyvên xwerû:** Ev cure peyv, ji hêmanekê pêk tê û dema ku ji hev were xistin, wateya xwe ji dest dide. Ev peyv, tu pêvek bi wan ve nebûne.

**Mînak:** Casim, dest, roj, sar, ketin, kar, pez, gul…

**2- Peyvên pêkhatî:** Ev cure peyv, ji peyveke xwerû û pêvekek, an jî çend pêvekên bêjesaz pêk tê.

Ev pêvek, dibe ku pêşgir an jî paşgir be.

**Mînak:**

**a- Peyvên bi pêşgirê pêkhatî:** **zir**bav, **kele**şêr, **ra**gihandin, **da**girtin, **ve**xwendin, **rû**kirin, **wer**gerandin…

**b- Peyvên bi paşgirê pêkhatî:** kom**ar**, kurt**asî**, nal**bend**, gul**dank**, mal**dar**, kul**ek**, bar**geh**, nexweş**xane**…

**3- Peyvên hevedudanî:** Ew peyvên ku ji çend hêmanên serbixwe pêk tên. Dema ku mirov wan ji hev cuda bike, her peyv xwedî wateyeke serbixwe ye. Ew peyvên ku li gorî rêz û rêzikên zimên digihin hev, peyveke nû pêk tînin.

**Mînak:**

**a- Peyvên hevedudanî yên ji du navan pêk tên:**

pozberan, gulbihar, jinap, marmasî, destbira…

**b- Peyvên hevedudanî yên ji nav û hevalnavekî pêk tên:**

çavreş, destdirêj, bargiran, pozbilind, porzer…

**c- Peyvên hevedudanî yên ji du hevalnavan pêk tên:**

reştarî, reşbelek, belekreş, keskesor, sorgevez…

## DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

### Destûrên nivîsînê

- Navê rojan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.
Mînak: în, şemî, yekşem...

- Navê mehan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.
**Mînak:** adar, nîsan, gulan...

- - Navê ziman û zaravayan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.
Mînak: farisî, kurdî, rûsî, erebî, soranî, kurmancî...

- Navê qewm û neteweyan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.

Mînak: ereb, kurd, turk, çerkes, suryan, ecem...

### Hêmadanîn

- **Cotxal(:)**
- - Di deqên wêjeyî de dema ku gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê cotxal tê danîn.
Mînak: Nesrîn**:** Rojbaş Hemrîn

Hemrîn**:** Rojbaş Nesrîn

- Di demê de ji bo nîşandana demjimêr û xulekan, cotxal tê danîn.

Mînak: Ez her şev, di demjimêr 11:35'an de radikevim.

## HÎNDARÎ

1- Du peyvên xwerû peyda bike û li ser her yekê ji wan, hevokekê saz bike.

2- Peyveke pêkhatî û yeke hevedudanî peyda bike û du hevokan li ser wan saz bike.

3- Peyvên li jêr, li gorî sazbûna wan dabeş bike.
**(dost – stranbêj – bêdest – şêr – dilnerm – rêzdar – bihîstok – bejnbilind – bazar)**


## MAMIK

- Ka zer e û kadîn spî ye.
  (Hêk)

- Canê wî goşt e, kincên wî derzî ne.
  (Jîjo)

## WANE 3

# ŞÊR, ROVÎ Û XEZAL



Şêr, pir nexweş bûbû; çûbû di şkeftekê de razabû. Rovî jî gazî kir cem xwe, ji bo ku dostaniyê pê re bike û got:

- Eger tu başbûna min bixwazî, tu yê xezala di daristanê de bixapînî. Ez dixwazim dil û mêlaka wê bixwim. Rovî, di cih de xwe berda nava daristanê û xezal dît. Jê re got:

- Paşayê me şêr, niha gelek nexweş e. Hêviyên xwe yên rabûnê, birîne. Biryar girtiye ku paşatiya xwe bide te.

Xezalê bawer kir, ket pey rovî û berê xwe dan şkeftê û çûn. Şêr, li ber deriyê şkeftê rawestayî bû. Di cih de xwe avêt li ser pişta xezalê û girt. Tenê guhê wê piçekî xwîn kir û berda.

Xezal revî, çû daristanê û xwe veşart. Li ser vê, rovî pir bêzar bû. Hîrîna şêr ji cerg û hinav dihat. Şêr, dîsa ji rovî pir hêvî kir û got:

- Riyekê bibîne, dîsa wê xezalê ji min re bîne.

Rovî got: Ma xapandina xezalê wisa hêsan e, lê dîsa ez ê hewl bidim.

Rovî, xezal di nava daristanê de dît û çû pêşiyê, pirça xezalê qij bû.

- Hey bêwijdanê bêwijdan! Tu here rovîtiya xwe nîşanî kesine din bide. Rovî, bi gotinên wê naweste û bêzar nabe.

- Şêr, hema wisa ji paşatiya xwe bernade û dixwest hêza te bibîne ji bo paşatiyê, lê tu ji ber êşa xermişka ku şêr li guhê te dayî, veciniqî! Wisa bi hêsanî mirov nabe paşa. Rovî, dîsa xezal xapand û bir şkeftê. Şêr hestî û goştê xezalê bi xweşîtî xwar. Rovî jî ew dilê ketî xakê girt û xwar! Şêr, li dil geriya lê nedît.

Rovî got: Ma dilê lawirên bi vî awayî hene?! Ger dilê wê hebûya, cara duyem nedihat xapandin.

## WATEYA PEYVAN

**Cerg:** kezeba reş, cegera reş

**Hinav:** Parçeyên laş ên di zik de

**Xapandin:** Tiştekî ne rast bi kesekî dana bawerkirin.

**Veciniqîn:** Hilbeyîn, tirsa ji nişka ve.

**Mêlak:** kezeb

## PIRS

**1-** Şêrê nexweş, çi ji rovî xwest?

**2-** Rovî, xezal bi kîjan peyvan xapand û çi hat serê xezalê?

**3-** Di nava civakê de mirovên xwedî van taybetmendiyan hene, yan na?

**4-** Ger tu li şûna xezalê bûya, te yê çi bikira?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Navdêr:** Ew peyva ku tiştekî bi mirov dide nîşan, ew tişt dibe ku giyanewer, an jî ne giyanewer be; her wiha dibe ku tiştekî razber an jî şênber be; ew tişt dibe ku serenav an jî hevenav be. Hin caran jî, dibe ku navên komî be.

**Nav, li gorî taybetiya heyberên ku nîşan dide, dibe du cure:**

**a- Serenav (navên taybet):** Ew cure navdêra ku yekta ye, li ser rûyê cîhanê yek jê heye. Serenav, her tim bi tîpa mezin dest pê dike.

**Mînak:** Ferat, Zap, Şêrgo, Neteweyên Yekbûyî, Rojnameya Welat, Kurdistan, Çiyayê Cûdî…

**b- Hevenav (navên giştî):** Ew cure navdêrên ku navê komekê ye ku ew kom ji ber hin taybetiyan di bin wî navî de gihîştine hev. Hevenav di nivîsandinê de ji bilî destpêka hevokê, bi tîpa biçûk dest pê dike.

**Mînak:** xanî, pênûs, jêbir, hirç, çiya, hesin, giya, kulîlk, das, gund, dar…

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Navê bîr û baweriyên olî û hevalnavên bi wan pêk hatine, bi tîpa biçûk dest pê dikin.

Mînak: xirîstiyanî, xirîstiyan, cihûtî, cihû, misilmantî, misilman, bûdîzm, bûdî...

## Hêmadanîn

**Cotxal(:)**

- Di bîrkariyê de weke nîşana parvekirinê tê danîn.
Mînak: 15:5 = 3

## HÎNDARÎ

**Li Mezopotamyayê, gelê kurd pêşengî ji Şoreşa Neolîtîkê re kiriye. Vê Şoreşa Neolîtîkê pêşengî ji mirovahiyê re kiriye. Her wiha, navenda vê şoreşê, ya ku dergûşvanî ji mirovahî û pêşengên wê re kiriye. Civakên cîhanê wê ji xwe re mînak digirin, her wiha Riha jî, yek ji bajarên pêxemberan e.**

1- Benda li jor, bi awayekî rast bixwîne, serenav û hevenavên ku derbas dibin, bi awayekî cuda li ser lênûsa xwe binivîse.
2- Sê hevokan li ser hevenav û serenavên ku di benda li jor de derbasbûyî saz bike.

### PENDÊN PÊŞIYAN

**1- Dijminê bav û kalan, nabe dostê lawan.**

**2- Bi darê zorê, hezkirin nayê torê.**

## WANE 4

# NAME JI BO DAPÎRÊ

Dapîra min a hêja, **9 Nîsan 2017**

Ez dizanim, ji bo nivîsandina nameyê dereng mam. Min îro hejmart. Ev sê meh in, em ji hev dûr ketine. Min bibexşîne. Em hemû li vê derê baş in. Waneyên min jî, baş diborin. Birayê min jî, fêrî xwendin û nivîsandinê dibe. Ji bo vê, bi şev û roj dixebite. Xweşiyên bêhnvedana ku min li gel we derbas kirî, ji bîr nakim. Dehla ku me bi hev re av dida, fêkiyên me ji çiqên wan kom dikirin, hîn jî li pêş çavên min in. Dema ku Çavreş ji koxa xwe dûr dimîne, dike orîn? Tama nîvişk û toya ku we çêdikir, tu carî ji devê min naçe. Caniya me ya reşbelek, careke din, teriya xwe radike û dibeze?

Dapîra min, ez li benda dîtina we me. Ji bo hatina li gel we bêhedar im. Min gelek bêriya we, bapîrê xwe û gund kiriye. Ez ji dayîk, bav û birayên xwe re silavên xwe yên ji dil û can dişînim. Ji bo we, rojên bitenduristî dixwazim.

Silav û hezkirin.

**Qamişlo, Taxa Enteriyê**

**Kolana Şehîd Serhed** **Wajo:**

**Fatma Hesen**

Navnîşan:

Hesekê

## WATEYA PEYVAN

**Name:** Peyama ku ji kesekî/ê re tê şandin.

**Bexşandin:** lêborîn, efûkirin

**Dehl:** Daristanên biçûk.

**Orîn:** Dengê ku ji çêlekê derdikeve.

**To:** Serşîr, şîrê ku pir dohn di nav de heye.

**Tenduristî:** saxlemî, sihet, nebûna êşan

**Canî:** Mehîna biçûk, an jî çêlîka mehînê.

**Wajo:** îmze, şanenav, destnîşan

## PIRS

1- Fatma, ji bo kê name nivîsiye?

2- Fatma, di rojên ku li gund borandî de çi ji bîr nekirine?

3- Fatma, di her du bendên dawî yên nameya xwe de çi gotiye?

4- Dîrok û navnîşan, li ku dera nameyê hatine nivîsîn, wajo li ku derê hatiye avêtin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Nav, li gorî hestpêkirinê; dibe du beş:**

**1- Navên şênber:** Ew navên ku mirov bi yek ji pênc lebatên xwe (dîtin, bihîstin, bêhnkirin, çêştin û pêbûnê), pê dihese.

**Mînak:** kevir, dar, çiya, îsot, hesp, bazin, ba, elektirîk…

**2- Navên razber:** Ew navên ku mirov bi her pênc lebatên xwe pê nahese, yan jî hebûna wan nayê pêhesîn, lê tê bawerkirin.

**Mînak:** giyan, rûmet, tirs, azadî, aramî, qencî, evîn.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

Seretîpa bêjeya yekem a hevokê, ango bêjeya piştî xal, pirsnîşan û baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: - Diya min, ji mala xalê min tê. Meta min jî, pê re ye.

23. Gelo hûn ê kengî herin serdana Sozdarê? Dema hûn çûn, gazî min jî bikin.
24. Wî! Kurê min, tu çima wiha dikî?!

## Hêmadanîn

**Xal(.) -** Piştî peyvên ku hatine kurtkirin, xal tê danîn.

Mînak: Hz. Muhemed gotiye: "Mirov, di zimanê xwe de veşartî ye."

- Ji bo ku xaneyên hejmaran ji hev bên veqetandin, piştî sê xaneyan xal tê danîn.

Mînak: Dûrahiya rokê ya ji cîhana me, nêzî 150.000.000 km ye.

# HÎNDARÎ

1- Ji xizmeke xwe re nameyekê binivîse. Dema tu nameyê dinivîsî, van xalan ji bîr neke:

- Dîroka wê, wajo û navnîşana xwe li cihê wan binivîse.


- Nameya xwe li ser peleke bêxêzik û bi pênûsa ximavê(hibir) binivîse.

- Nivîsandina tiştên tu dixwazî vekî, pirs bike û ji bîr neke.

Nameya xwe bi silav û hêviyên baş, bi dawî bike.

**2-** Li ser namedanka(zerfa) li jêr, kîjan zanîn cih digirin, lêkolîn bike û bêje.

**3-** Nameya xwe, weke mînakê binivîse, bixe namedankê û bişîne.




# MAMIK

- Biharan bûk e, havînan sûk e;
  payîzan pepûk e.
  (Dara fêkî)

- Li vir dişînim, li Bexdayê hiltînim.
  (Name)

## WANE 5

# HIZIR Û ZANIST



Hizirîn û lêkolîn; mirovan digihînin asta zanistî. Hûn jî dikarin, bi lêger û lêkolînan bibin zanyar. Dibe ku we xwendibe. Çawa ku Krîstof Kolomb û Bord, gelek cihên nû vedîtine. Îro zanyar, li şûna vedîtina cihên nû, tiştên nû diafirînin. Weke;
Edîson bi zanîna xwe ve gilopê vedît û cîhana me ronî kir. Gramham Bell bi derxistina telefonan, rêvebirina kar hêsan kir. Du birayên hev ên ji malbata Rayt jî, bi hizirên xwe firoke derxistin. Mirov zûtir gihandin hev.

Rast e, mirovan ji zû ve xwe gihandine asta herî bilind. Li gel vê jî, hûn dikarin gelek tiştan bibînin. Ev vedîtin û destkeftiyên nû, weke vedîtina cihên nû girîng e.

Em çawa dikarin, vîtamînên pêwîst di nava xwarinên cuda de bibînin? Em bi çi awayî, ji tîrêj û ronahiya rokê sûdê bigirin? Gelo cîhanên weke cîhana me hene, yan na?



Gelek pirsgirêkên weke van, li benda çareseriya zanyaran mane. Em bihizirin ku hûn dixwazin bibin zanyar. Hûn dixwazin vedîtinan bikin. Hûn ji taqîkirinan, pir hez dikin. Beriya ku hûn ji bo karê zanyariyê, biryara xwe ya dawî bidin; pênc pirsên ku hûn ji xwe bikin hene.

**Ew pirs jî, ev in:**

**1-** Gelo ez ji karkirinê, gelekî hez dikim?

**2-** Gelo ez bi hedar im, an na?

**3-** Gelo ez hestiyar û baldar im, an na?

**4-** Gelo ez xwediyê ramaneke vekirî me, yan na?

**5-** Gelo ez dikarim rast bihizirim û bi wijdan tevbigerim, an na?

Heke hûn dikarin ji van pirsan hemûyan re bêjin: **Erê**, hûn dikarin di pêşerojê de bibin pêşengên zanyariyê.

## WATEYA PEYVAN

**Zanist:** Şarezayî, nasîna bi riya lêkolînên zanyarî.

**Vedîtin:** Dîtina tiştên nû yan windabûyî, kifşkirin

**Firoke:** balafir, teyare

**Destkeftî:** Tiştên hatine bidestxistin.

**Tîrêj:** Ronahiya ku weke tîran ji rokê derdikeve.

**Pirsgirêk:** arîşe, problem, muşkîle

**Taqîkirin:** ezmûnkirin, ceribandin

**Biryar:** bijartin, qerar

**Hedar:** hedan, bêhnfirehî

## PIRS

**1-** Edîson û Graham Bell, çi afirandine?
**2-** Kesê ku bixwaze bibe zanyar; pêwîst e kîjan pirsan ji xwe bike?
**3-** Ji çavkaniyekê fêr bibe, telefon kengî û çawa hatiye vedîtin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

Dema ku peyvek kirina karekî nîşan dide, em ji wê peyvê re dibêjin **lêker**.

Lêker, ji jêderên lêkerî pêk tê û li gorî dem û kesan, forma xwe diguhere.

**Mînak:** Ji jêdera “xwarin” lêkerên: “xwar, xwariye, xwaribû, dixwar, dixwe, wê bixwe” çêdibin.

Her lêker, tê wateya hevokekê. Ji ber ku dema em dibêjin; “çûye” em têdigihin ku kesek li wê derê, karê çûyînê pêk aniye. Ji ber wê, her wekî hatiye gotin; “Delîl çûye zozanan” xwediyê wateyeke tekûz e.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Nav û paşnavê mirovan, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: Sebrî Botanî, helbestvanekî kurd ê navdar e.

- Nasnavê mirovan, dema ku bi navê wan re bûbe yek û tevî navê wan bê bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Navê Serokê Komara Mehabadê, Qazî Mihemed bû.

## Hêmadanîn

**Xal(.):**

- Di nivîsandina dîrokê di navbera roj, meh û salê de xal tê danîn.

Mînak: Di 17.4.1946’an de gelê Sûriyeyê, serxwebûna xwe bi dest xist.

- Di bîrkariyê de weke nîşana hevdanê tê bikaranîn.

Mînak: 6 . 7 = 42

## HÎNDARÎ

1- Lêkerê, pênase bike û rista wê ya di hevoka lêkerî de diyar bike.

2- Sê lêkeran hilbijêre û li ser her yekê ji wan, hevokekê saz bike.

3- Di benda li jêr de binê lêkeran, xêz bike.

**Dayîkê, ji lawê xwe re got:**

“Lawê min, dema ku di dîwanekê de rûdinî; kêm bêje û pir guhdarî bike. Eger te xwest ku biaxivî, axaftina kesekî nebire. Xwe bigire, heta axaftin temam bibe û dora te bê. Piştre, biaxive. Ji ber ku bi vî awayî, her kes dê guhdariya te bike.”

# HÎNDARÎ

**1-** Peyv, li gorî wateya xwe; dibe;

**a-** Du beş **b-** Sê beş **c-** Çar beş **d-** Pênc beş

**2-** Kîjan peyva li jêr, dijwateya peyva “dirêj” e?

**a-** Mezin **b-** Kurt **c-** Bilind **d-** Dûr

**3-** Kîjan vebijêrka li jêr, tê wateya “lal” ?

**a-** Kesê ku nikare dengan bibihîze.
**b-** Kesê ku nikare bibîne.
**c-** Kesê ku nikare bi tiştan bihese.
**d-** Kesê ku nikare biaxive.

**4-** Peyv, li gorî sazbûna xwe; dibe;

**a-** Du beş **b-** Sê beş **c-** Çar beş **d-** Şeş beş

**5-** Kîjan peyva li jêr, hevedudanî ye?

**a-** Ragihandin **b-** Gulbihar **c-** Welat **d-** Nexweşxane

**6-** Kîjan peyva li jêr, serenav e?

**a-** Pênûs **b-** Cemîl **c-** Çiya **d-** Daristan

**7-** Kîjan navê li jêr, navekî razber e?

**a-** Derî **b-** Ba **c-** Jêbir **d-** Rûmet

**8-** Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev.

| | |
|---|---|
| Dilsozî | Hilbeyî |
| Tenduristî | Raman |
| Hizir | Sozdarî |
| Zîrek | Saxlemî |
| Veciniqîn | Jîr |

**9- Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa(R) û yên şaş; bi tîpa(Ş) hêma bike.**

**a-** Ew peyvên ku wateya wan wekhev, lê xwendin û nivîsandina wan cuda ye, peyvên hevtîp in. ( )

**b-** Peyvên dijwate; ew peyvên ku wateya wan dijhev e. Ew peyvên ku di xwendin û nivîsandinê de wekhev, lê di wateyê de cuda, ji wan re peyvên hevdeng tê gotin. ( )

**c-** Ew peyvên ku ji derveyî wateya xwe ya rastîn wateyeke din didin, ji wan re dibêjin peyvên xaze(mecazî). ( )

**d-** Piştî cotxalê, peyv bi tîpa biçûk dest pê dike, lê heke piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka pêşîn jî bi tîpa mezin dest pê dike. ( )

**e-** Ew cure peyva ku ji peyveke xwerû û pêvekekê an zêdetir pêk tê, jê re peyva pêkhatî tê gotin.
( )

**f-** Di deqên wêjeyî de dema ku gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê xal tê danîn. ( )

**g-** Ew peyvên ku ji çend hêmanên serbixwe pêk tên, ji wan re peyvên hevedudanî tê gotin. ( )

**h-** Navê ziman û zaravayan, bi tîpa biçûk dest pê dike. ( )

**i-** Hevenav(navê giştî), bi tîpa mezin dest pê dike. ( )

**j-** Di bîrkarî de cotxal, weke nîşana parvekirinê tê danîn.
( )

**k-** Ji bo xaneyên hejmaran ji hev bên veqetandin, piştî sê xaneyan, bêhnok tê danîn. ( )

**l-** Nav û paşnavê mirovan, bi tîpa mezin dest pê dikin. ( )

**m-** Dema ku peyvek kirina karekî nîşan dide, em ji wê peyvê re dibêjin “navdêr”. ( )

# BEŞA SÊYEM

## WANEYÊN BEŞÊ

**PARASTINA XWEZAYÊ**

**ZEMBÎLFIROŞ**

**HEŞTÊ ADARÊ**

**GULA DEVLIKEN**

**VEGERA LEGLEGAN**

**AZADÎ**

**ÇÎROKA KEÇEL Û APÊ WÎ**

## WANE 1

# PARASTINA XWEZAYÊ




Parastina xwezayê, parastina jiyanê ye. Ji ber vê yekê, divê em her tim xwezayê weke canê xwe biparêzin. Ji ber ku xweza were gemarkirin, wê ne tenê jiyana mirovan, her wiha jiyana hemû zindiyan bikeve metirsiyê û roj bi roj nexweşî û mirin zêde bibin.

Em jî ji bo kêf û şadiyê, bi malbateke nas û bi keştiyê ve çûbûn geşta Gola Wanê. Di wê navberê de dostê min, ji berîka xwe pakêteke çîkolateyan derxist. Piştî ku çîkolate dan zarokan, kaxeza wê qurmiçand û avêt golê. Di wê navberê de zarokekê da ber qîran:

-Aaa! Hûn ê golê qirêj bikin! Temaşe bikin, li pêşberî we gelaşdank heye. Ji bo hûn gemara xwe bavêjinê, neavêjin golê.

Rojeke din, ez û hevalekî xwe ji aliyê navçeya Xelatê ve daketin golê. Dema ku em bi keştiyê di nava golê de digeriyan, derdor bi gemarê tijî bû. Peravên golê, ji ber gemarê nedihatin dîtin.

Ji ber vê yekê, min banî berpirsiyar kir:

- Ji bo çi, hûn van deran paqij nakin?
Berpirsiyar bersiveke wisa da:

- Camêr, em van deran her tim paqij dikin, lê bênavber hin kes gelaş û gemara xwe tavêjin golê. Ya zor ew e, em derfetê bibînin ku xwe ji gemarê rizgar bikin.

Ji bo gol paqij bimîne; tê xwestin ku em ji her goşeya welatê xwe, weke mala xwe hez bikin. Di rastiyê de divê welat, weke malek firehtir bê dîtin. Wê demê, welat dê maleke paqij û malbateke birêkûpêk be.

## WATEYA PEYVAN

**Xweza:** sirûşt, tebî'et

**Zindî:** sax, jîndar, biruh, ne mirî

**Gola Wanê:** Gola herî mezin a Kurdistanê ye.

**Xelat:** Navçeyeke girêdayî bajarê Bedlîsê ye.

**Perav:** Qirax, kenar, cihê li ber an jî nêzî avê.

**Metirsî:** gef, xeterî

**Keştî:** gemî, sefîne, qeyîk, beleme

**Geşt:** seyran, ger, tûrîzm

**Berpirsyar:** Rêveber, kesê/a ku rêvebirina karekî erka wî/ê ye

**Gelaş:** gemar, qirêj

**Derfet:** delîve, şans, keys

**Goşe:** qorzî, quncik

## PIRS

**1-** Zarokê, çima da ber qîran?
**2-** Zarokê xwest, ew mirov çi bike?
**3-** Çima li navçeya Xelatê, gol paqij nedikirin?
**4-** Çima pêwîst e ku em derdora xwe paqij bikin? Şîrove bike.

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Di lêkeran de gerguhêzî û negerguhêzî:**

Lêkerên gerguhêz, ew lêkerên ku biresera wan heye.

**Mînak:**
Min pirtûk xwend. (pirtûk: bireser e)

Me çar kes bijartin. (çar kes: bireser e)

Lêkerên negerguhêz, ew lêkerên ku biresera wan tune ye.

**Mînak:**
Xewla ji dibistanê vegeriya.

Ez bi hevalê xwe re hatim.

## DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

### Destûrên nivîsînê

Serenavên cih, sazî, çem, derya, zerya, parzemîn, çiya û navên din ên erdnîgariyê, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: **1- Navê cihan:** Mezopotamya, Qamişlo, Til Hemîs Hesekê,
Şam, Dirbêsiyê…

**2- Navê rêxistinan:** Rêxistina Mafên Mirovan, Neteweyên Yekbûyî, Însiyatîfa Dayîkên Aştiyê...

**3- Navê çeman:** Dîcle, Ferat, Nîl, Xabûr...

**4- Navê deryayan:** Beltîq, Manş, ...

**5- Navê zeryayan:** Pasîfîk, Hind, Aram...

**6- Navê parzemînan:** Asya, Efrîka, Ewrûpa...

**7- Navê çiyayan:** Hîmalaya, Agirî, Zagros...

## Hêmadanîn

**Xal (.)**

Di destnîşankirina xalên bingehîn de xal tê danîn.

Mînak: Mijarên me, ev in:

. Hevalnav

. Cînavk

. Navdêr

## HÎNDARÎ

1- Li ser du lêkerên gerguhêz, du hevokan saz bike. 2- Li ser du lêkerên negerguhêz, du hevokan saz bike.
3- Lêkerên gerguhêz û yên negerguhêz ên li jêr, ji hev cuda bike.

**xwarin, raketin, çûn, xwendin, hatin, çêkirin.**

## WANE 2

# ZEMBÎLFIROŞ

Zembîlfiroş zembîlan tîne
Delalo zembîlan tîne
Kolan kolan digerîne
Nan û danî pê distîne
Zarokan pê ditêrîne

Gava ew zembîlan tîne
Xatûn li bircê dibîne
Bi eşqa dil dihebîne
Aqil diçe sewda namîne


Kuro selikan vir de bîne
Mîr dixwaze te bibîne
Buha buha ji te bistîne
Lawiko ez birîndar im

Xatûna min a delal e
Min bihîstî mîr ne li mal e
Bazaram bi malê helal e
Xatûnê ez tobedar im

Zembîlfiroş lawikê biyanî
Ez dibêjim tu pê dizanî
Min bo eşqa dil tu anî
Lawiko ez evîndar im

Xatûna min a zerîn e
Qusûr li ser te qet nîn e
Lê dilêm kesî nahebîne
Xatûnê ez tobedarim
Delalê ez tobedarim

FEQIYÊ TEYRAN



## WATEYA PEYVAN

**Zembîlfiroş:** Kesê ku selikan difiroşe.

**Dan:** Genimê kelandî ye.

**Têrîn:** Kesê têrxwarî ku pêdiviya wî bi xwarinê tune ye.

**Sewda:** Evîn, dildarî, hezkirina zêde.

**Biyanî:** nenas, xerîb

## PIRS

**1-** Zembîlfiroş, çima zembîlan difiroşe?

**2-** Xatûn, çima zembîlfiroş tîne dîwana mîr?

**3-** Nêrîna xwe ya der barê vê helbestê de vebêje?

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Feqiyê Teyran:** Navê wî yê resen Mihemed kurê Mîr Ebdal e. Di sala 1563’yan de li gundê Mîksê ji dayîk bûye.

Feqiyê Teyran, xwe weke helbestvanê jar û bindestan bi nav kiriye. Wî helbestên xwe, bi zimanê gel nivîsandine.

Li gorî baweriya hin mirovan, Feqiyê Teyran bi zimanê teyran dizanî.

Feqiyê Teyran, di helbestên xwe de nasnavê “Mîm û Hê” bi kar aniye. Helbestên Feqiyê Teyran ên gel bi wan dizane
“Ey avê av” û “Ay Dîlberê” ne.

Dîroka koça wî ya dawiyê ne diyar e, lê di helbesta “Dilo rabe” de tê xuyakirin ku temenê wî 70 salî bû, dema ku ev helbest nivîsiye.

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Peyvsaziya lêkeran**

**Lêker, li gorî peyvsaziya xwe; dibin sê beş:**

**1-** Lêkerên xwerû

**2-** Lêkerên pêkhatî

**3-** Lêkerên hevedudanî

**1- Lêkerên xwerû:** Ev cure lêker, ji hêmanekê tenê pêk tên. Hejmara lêkerên xwerû kêm e, lê ev cure lêker bingeha piraniya lêkerên kurdî pêk tînin.

**Mînak:**

çûn, ajotin, alastin, xwarin, bihîstin, birin, pişaftin, bûn, dan, dotin, firotin, gotin, gihaştin, hinartin, hiştin…

**2- Lêkerên pêkhatî:** Ew lêkerên ku ji lêkereke xwerû û pêvekeke lêkersaz pêk tên. Ev pêvek, dibe ku pêşgir be, yan jî paşgir be. Ev cure lêker, beşeke mezin ji cihê lêkeran digire.

**Mînak:**

**a- Lêkerên bi pêşgirê pêkhatî:** **ve**dan, **ra**bûn, **hil**girtin, **da**dan, **wer**girtin, **çê**kirin, **rû**niştin…

**b- Lêkerên bi paşgirê pêkhatî:** bez**în**, rev**andin**, kol**an**, tepis**în**, tengij**andin**, kêş**an**…

**3- Lêkerên hevedudanî:** Ew lêkerên ku ji çend hêmanên serbixwe pêk tên. Dema ku mirov wan hêmanan ji hev cuda bike, her yek ji wan xwediyê wateyeke serbixwe ye.

**Mînak:**
diyarkirin, başbûn, topavêtin, nexweşketin, dilman, balkêşan, bêhnvedan.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Navê roj û serdemên taybet, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: Roja 1'ê Gulanê, cejna karkerên cîhanê ye.

- Bergeh, dema ku bi wateyeke taybet bên bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: Şoreşa Rojava, di 19'ê Tîrmeha sala 2012'an de dest pê kir.

## Hêmadanîn

**Bêhnok(,)**

- Di hevokên dirêj de ji bo ku kirde ji hêmanên din ên hevokê veqete, bêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Entre Bin Şadad, di çîrokan de weke lehengekî navdar tê naskirin.

- Piştî hevokên xîtabetê, bêhnok tê bikaranîn. Mînak: Hevalên hêja, paş nekevin, îro roj roja me ye.

## HÎNDARÎ

1- Li ser her lêkera li jêr, hevokekê saz bike.
**vexwarin, şûştin, temaşekirin, lîstin, raketin, fêrbûn**

2- Lêkerên li jêr, li gorî sazbûna wan; ji hev cuda bike.
**vekirin, bidawîbûn, rabûn, firandin, kirîn, gotin, birin, germkirin.**

## WANE 3

## HEŞTÊ ADARÊ



**Hêlîn:** Îro 8'ê Adarê ye û rojeke pîroz e. Em jî bi vê rojê gelek dilşad in.

**Sîdra:** Ji bo çi, rojeke pîroz e?

**Hêlîn:** Weke tê zanîn, jinên karker di 8'ê Adara 1857'ê de li kargeha Kotal a li bajarê Newyork ê Emerîkayê, ji bo mafên xwe serî hildan. Karbidest û dewlet, bi hev re bi ser wan de çûn.
Di wê êrîşê de gelek jinên karker, jiyana xwe ji dest da.

8'ê Adarê ji sala 1910'an û pê ve weke "Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê" hatiye pejirandin û tê pîrozkirin.

**Sîdra:** Gelo ji bo me, çi wateyên wê yên taybet hene?

**Hêlîn:** Belê, hevala Sîdra! Têkoşîna me ya ji bo azadiyê didome. Aliyekî wê yê girîng, domandina têkoşîna jinê ye.

**Sîdra:** Çawa?

**Hêlîn:** Azadiya jinê, azadiya civakê ye.

**Sîdra:** Jin, di jiyanê de ew qas girîng e?

**Hêlîn:** Ma te nebihîstiye? “Jin jiyan e.” Jin dayîk, eşq û evîn, hezkirin û hembêzkirin, delalî û zelalî, dilnizmî û dilxweşî ye. Çavkaniya avakirin û afirandinê ye.

## WATEYA PEYVAN

**Dilşad:** dilxweş, kêfxweş

**Kargeh:** Cihê ku tişt lê tên çêkirin.

**Karbidest:** berpirsiyar

**Kedkar:** Kesa/ê ku kar dike û kedê dide.

**Pejirandin:** Qebûlkirin, bi tiştekî razîbûn.

**Taybet:** Ne mîna yên din e, ne giştî ye.

**Têkoşîn:** ceng, xebat

**Hembêzkirin:** Dema ku du kes singên xwe digihînin hev û bi destan li navmilên hev du dixin.

**Dilnizm:** Ne pozbilind.

**Çavkanî:** jêder

## PIRS

**1-** Hêlîn, ji hevala xwe re çi rave dike?

**2-** Ji kengî ve 8’ê Adarê tê pîrozkirin?

**3-** Azadiya jinê, tê çi wateyê?

**4-** Jin, çavkaniya çi ye?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Rayeka lêkerê:** Di zimanê kurdî de du rayekên lêkerê hene.

**1- Rayeka dema borî:** Dema ku ji lêkeran pêvekên raderîn "**-in**" û "**-n**" tên avêtin, ev rayek tê bidestxistin.

Ev rayek bi xwe, dema boriya têdeyî nîşan dide.

**Mînak:**

| Lêker (rader) | Rayeka dema borî |
|---|---|
| gotin | Got |
| hatin | Hat |
| temaşekirin | temaşe kir |
| hilgirtin | Hilgirt |
| bûn | Bû |

**2- Rayeka dema niha:** Dema ku lêker li gorî dema niha tê kişandin û pêveka dema niha û cînavkên kesandinê jê tên rakirin, rayeka dema niha bi dest dikeve.

**Mînak:**

| Lêker (rader) | Lêker li gorî dema niha | Rayeka dema niha |
|---|---|---|
| bûn | di**b**e | **B** |
| cûtin | di**cû** | **Cû** |
| firotin | di**firoş**e | **Firoş** |
| lîstin | di**lîz**e | **Lîz** |
| kirin | di**k**e | **K** |

**TÊBÎNÎ:**
Di lêkerên ku bi pêşgirê pêkhatî de pêşgir jî tê rakirin û nabe parçeyek ji rayekê.

**Mînak:**
Vexwarin vedi**xwe** **xw**

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Navê xizmaniyê, dema ku bûbe nasnav û bi nav re bûbe yek, mezin tê nivîsandin. Lê heke nebûbe parçeyeke serenav, wê demê bi tîpa biçûk dest pê dike. Mînak: - Dema ku ez çûm Amûdê, min Apê Mûsa dît.

  Ez çûm Tirbespiyê, min apê xwe Mûsa dît.

- Seretîpa bêjeya yekem a veguhastî, ango hevoka di nava dunikê de mezin tê nivîsandin.

  Mînak: Hesen got: “Em ê sibe biçin geştê.”

## Hêmadanîn

**Bêhnok(,)**

- Di hejmarên şikestî (dabeşkirî) de xaneyên ji yekê (1) biçûktir, bi bêhnokê tên veqetandin.

  Mînak: Serjimara şêniyên Sûriyeyê, di sala 2010’an de gihîşt 22,5 mîlyon kesî.

- Di navbera dîrok û cihan de bêhnok tê bikaranîn.

  Mînak: Kovara Hawarê, di sala 1932’yan de li Şamê hat weşandin.

## HÎNDARÎ

**1-** Rayeka dema borî ya lêkerên li jêr, diyar bike.


**(anîn, kuştin, pêçan, kolan, dirîn)**

**2-** Rayeka dema niha ya lêkerên li jêr, diyar bike.

**(xwendin, mirin, xwarin, girtin, bihîstin)**

## WANE 4

# GULA DEVLIKEN



Hebû nebû, dibêjin di demekê de paşayek hebû. Fermanek derxist û fermana xwe wiha ji wezîrê xwe re ragihand: Ji niha û pê ve li vî welatî hatina du kesan a cem hev, qedexe ye!

Wezîr, fermana paşa li kuçe û kolanên welêt belav dike û piştre paşa fermana qedexekirina kenînê jî dide. Li ser fermana paşa, ji tirsan êdî tu kes nedikeniya û nedibişirî. Hemwelatiyan, ken û kêf ji bîr kiribûn. Her kes di nava hizir û bîrên tarî de dijiya.

Di wî welatî de keçeke biçûk û bêderfet hebû. Ew keçika dilxemgîn, rojekê ji rojan bê rawestan giriya û du rondik ji çavên wê dikevin nava axê. Ji wan rondikan, kulîlkeke spî şîn dibe. Kulîlk, roj bi roj zêde dibin. Kesên ku li wan kulîlkan dinêrîn, dilê wan tijî hezkirin dibe. Kulîlk, her roj bi dengekî xweş "haa, haaa" dikeniya. Keçika ciwan, ew kulîlk belav kirin û bi wan kulîlkan welat tijî hezkirin û ken bû. Di dawiyê de ev kulîlk, gihîşt destê paşa û dilê wî jî geş kir. Bi qasî ku paşa kêfxweş kir, ew qasî jî bû sedem ku dest bi hizirînên baş bike. Bi vê re paşa hemû qedexeyan radike, kêf û xweşiyê vedigerîne tevahiya welat û ji gel re dibe paşayekî baş.

## WATEYA PEYVAN

**Paşa:** Padîşah, serokê welatekî yê ku ne bi hilbijartinê hatiye.

**Ferman:** Emir, gotina ku kesek dibêje û divê kesên din pêk bînin.

**Wezîr:** şalyar

**Qedexe:** bend, qaçax, dij zagonî

**Kuçe:** kolan, cade, sikak

**Dibişirî:** Dibeşişî, kenîna bi awayekî sivik.

**Hemwelatî:** Kesê ku di welatê xwe de jiyan dike.

**Rondik:** Hêstir, firmêsk, ava ku ji çavan dibare.

**Rawestan:** man, sekinîn, ji cihekî neçûn, nelivîn

## PIRS

**1-** Paşa, di welatê xwe de çi qedexe kiribû?

**2-** Qedexeyan, bandoreke çawa li ser welatiyan kiribû?

**3-** Kulîlka spî ya devliken, çawa derket holê û rê li ber çi vekir?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Di zimanê kurdî de sê demên bingehîn hene:**

**1- Dema niha**
**2- Dema bê**
**3- Dema Borî**

### 1- Dema Niha:

Dema ku karek dest pê kiribe û kirina kar didome, jê re **dema niha** tê gotin. Ev dem, bi alîkariya pêveka dema niha "**di-**", rayeka dema niha û cînavkên kesandinê pêk tê.

**Forma dema niha:**

**(**di + rayeka dema niha ya lêkerê + cînavka kesandinê**)**

**Mînak:**

**1-** Ew **dixwîne**. (di+xwîn+e)
**2-** Va ye em **diçin**.(di+ç+in)
**3- Xwarin:**

Ez dixwim.

Tu dixwî.

Ew dixwe.

Em dixwin. Hûn dixwin. Ew dixwin.

| Lêker | Pêveka dema niha | Rayeka lêker | Cînavka kesandinê |
|---|---|---|---|
| Dixwim | di | xw | im |

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Di serenivîsan de ji bilî gihanek, daçek û veqetandekên ku cuda tên nivîsandin, hemû bêje bi tîpa mezin dest pê dikin.

Mînak: Wî nivîsa bi navê "**Raman û Ziman**" xwend.

Mînak: Nivîsa bi navê "**Çiyayên ji Kevirî**" hat weşandin.

Mînak: **Şaredariya Gel a Bajarê Girkê Legê**.

## Hêmadanîn

**Bêhnok(,)**

- Di nivîsandina çavkaniya gotarên lêkolînê de bêhnok dikeve navbera nav, paşnav, navê berhemê û hwd.

Mînak: Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol, 2002.

- Beriya gihanekên weke; "çimkî, lewre, lê belê, lê, ji ber ku..." bêhnok tê danîn.

Mînak: Tiştek negot, lê ez têgihîştim.

## HÎNDARÎ

1- Lêkerên li jêr, li gorî dema niha bikişîne.
**bûn, bihîstin, kolan, firotin, birin, man, xistin, xwestin**

2- Rayeka dema niha ya lêkerên li jêr derxîne.
**ketin, kirin, nivîsîn, xwendin, girtin**

3- Sê lêkeran peyda bike, wan li gorî dema niha bikişîne û li ser her lêkera ji wan, hevokekê saz bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1- "Bila li nav miletê xwe parsek bim û ne li nava biyaniyan mîrek bim."**

**2- "Çiya li çiyayan nakevin, lê çav li çavan dikevin."**

## WANE 5

# VEGERA LEGLEGAN



Bihar hatibû, derdor şîn bûbû; daran kulîlk dabûn. Li ber deriyê mala Serdar, stûneke mezin hebû. Dema legleg dihat, qurmê biyê zindî û şad dibû.

Sibehekê dayîka Serdar, bi dengê bilind got: Mizgînî, mizgînî! Legleg hatiye! Kurê xwe ji xewê şiyar kir. Serdar bezî ber kulekê. Di hêlîna li ser dara biyê de du legleg hebûn.

Bêhnekê temaşeyî leglegan kir, piştre, li dayîka xwe zivirî û jê pirsî: Dayê, çima payîzê legleg van deran berdidin û diçin? Ma ev qas ked, ne ziyan e?

Dayîk: Ma çi bikin kurê min? Zivistanê li van deran nikarin xwarinê peyda bikin.

Serdar: Eger wisa ye, bila li wan welatên germ ku diçinê, bi cih bibin.

Dayîk: Ji bo zêdebûn û hin sedemên din, tên van deran. Havînê,

ew der pir germ in. Çêlîkên ji hêkan derdikevin, nikarin xwe li ber wê germahiyê bigirin. Dema bihar tê, mar, beq, kurm û marmarîşok pir hene. Legleg, çêlîkên xwe bi wan xwedî dikin.

Dema digihêjin vê derê, hêlînên xwe çêdikin. Piştre leglega mê hêkan dike û dibe kurk.

Dema têjik derdikevin, rojên destpêkê, dê û bavên wan, wan xwedî dikin. Bi salan e, ez temaşe dikim. Çêlîkên leglegan, nikilên xwe ber bi jor ve vedikin û bê navber xwarinê dixwazin.

Dayîkê gotinên xwe berdewam kir: Têr dixwin û mezin dibin. Per û baskên wan bihêz dibin. Fêrî firînê dibin. Payîzê, bi dê û bavên xwe re derdikevin rêwîtiyeke dûr û dirêj.

## WATEYA PEYVAN

**Stûn:** Darên qayîm ên ku di navbera ban û binê xanî de tên danîn.

**Qurm:** Gewdeya daran.

**Bî:** Cureyeke daran e(Sindiyan).

**Kulek:** pencere, pace

**Kurk:** Balindeya ku li ser hêkên xwe rûdine, da ku germ bike û bibin çîçik.

**Têjik:** Çêlîk, zarokên lawiran.

**Nikil:** Devê req û zirav ê firindeyan.

**Per:** Pûrtê laşê firindeyan.

**Bask:** çeng

**Rêwîtî:** gervanî, geşt, sefer

## PIRS

**1-** Qurmê biyê yê li ber deriyê malê, kengî zindî û şad dibû?

**2-** Legleg, payîzê diçin ku derê?

**3-** Legleg û çêlîkên xwe, bi çi xwedî dibin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

### 3- Dema Bê:

Ev dem, ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn. Dema bê, bi alîkariya amraza dema bê(dê, ê, wê) pêk tê.

**Forma dema bê:**

**(**Amraza dema bê + bi- + rayeka dema niha ya lêkerê + cînavka kesandinê**)**

**Mînak:** Kişandina lêkera “**xwarin**” li gorî cînavkan:

| Hevok | Amraz | Pêvek | Rayeka dema niha | Cînavka kesandinê |
|---|---|---|---|---|
| Ez dê/ê bixwim. | dê/ê | bi | xw | im |
| Tu dê/yê bixwî. | dê/yê | bi | xw | î |
| Ew dê/ê/wê bixwe. | dê/ê/wê | bi | xw | e |
| Em dê/ê bixwin. | dê/ê | bi | xw | in |
| Hûn dê/ê bixwin. | dê/ê | bi | xw | in |
| Ew dê/ê/wê bixwin. | dê/ê/wê | bi | xw | in |

**Têbînî:**

Amraza dema bê(wê), bi nav û cînavka kesê sêyem re(ew) tê bikaranîn.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Dema ku yek bixwaze balê bikişîne ser tiştekî, wî tiştî bi tîpên mezin dinivîse.

Mînak: ASTA PÊŞKETINA ZIMAN, ASTA PÊŞKETINA JIYANÊ YE.

## Hêmadanîn

**Bêhnok(,)**

Li pêş û paşiya hevok û hêmanên navîn, bêhnok tê danîn.
Mînak: Berkevirê, gundewarê Dirbêsiyê, warê şehîdan e.

- Di hin hevokan de ji bo ku peyv bê kirpandin, piştî wê bêhnok tê danîn.

Mînak: Eliyê mêrxas, ew bi rastî jî camêr bû.

## HÎNDARÎ

**1-** Forma dema bê, binivîse.
**2-** Du hevokan li gorî dema bê saz bike, ku amraza dema bê(wê) tê de hatibe bikaranîn.
**3-** Du hevokan li gorî dema bê saz bike, ku tê de amrazên dema bê (dê, ê) hatibin bikaranîn.

## MAMIK

➢ Ser mazî ye, stû derzî ye, ber kaşa ve beziye, kir hewar û gaziye.
(Kew)

➢ Sêniya savarê, ser guhê darê.
(Hinar)

## WANE 6

# AZADÎ



Rojekê, pîremêrek li kêleka gund, li ser kevirekî rûniştibû. Her du enîşkên wî, li ser kabê çoka wî û her du destên wî li ber lamên wî bûn. Bi baldarî temaşeyî zarokên ji wî hinekî dûr

F) ji xwe re dilîstin, dikir. Di nava bîranînên zarokatiya xwe de ji ser hişê xwe çûbû. Jiyana wî, weke şelîteke fîlman di ber çavên wî re derbas dibû. Lîstokên mîna; kalêmalê, baza koviyan

G) kûmkulavkanê, yek bi yek dihatin ber çavên wî.

Ji nişkan ve dengek: “bapîro, bapîro!... “

Bapîr hilciniqî, li xwe zivirî, dît ku neviyê wî li ber serê wî ye, bêhnek kûr kişand: Hey, hey, hûûû... ye.

Zarok: Xêr e bapîrê min ê hêja, çi hat bîra te?

Bapîr: Tiştek nebû lawê min, ka em herin malê. Destê xwe danî ser serê wî, hinek gemirand û her du bi hev re ketin ser rê, ber bi malê ve çûn.

Bapîr: Berxê min, dema tu mezin bûyî, tu dixwazî bibî çi?

Zarok: Bapîrê min, ez dixwazim bibim nivîskar.

Bapîr: Giyanê min, ger tu bûyî nivîskar, tu yê çi binivîsî?

Zarok: Ez ê çîrok, helbest û pirtûkan binivîsim.

Bapîr: Bijî delalê min! Dema tu mezin bûyî, dîroka berxwedana gel, qehremaniyên şehîdan û hovîtiya dijmin binivîse. Ger em îro di nava aramî û ewlekariyê de dijîn, bi ked û xwîna pak a şehîdan e. Em hemû deyndarên wan in. Nivîsandina ked û berxwedana wan, erka we nifşê nû ye. Di dema me de me nedikarî ziman fêr bibin, bixwînin û binivîsin. Zimanê kurdî qedexe bû. Lê îro bi saya qehremaniya şehîdan, hûn azad in, azad dixwînin û azad dinivîsin...

Kalê pîr, çok bû ber lawik û wiha got: Vê amojgariya min baş bixe guhê xwe û tu carî ji bîr neke. Azad bijî, azad binivîse û xiyanetê li xeyalên xwe neke. Wê demê, tu yê bigihêjî armanca xwe.

## WATEYA PEYVAN

**Pîremêr:** mêrê kal

**Kêlek:** rex, tenişt

**Enîşk:** Navbera zend û çeng.

**Kap:** Hestiyê çokê.

**Lam:** Hestiyê hinarokên rû.

**Bîranîn:** Serborî, bûyerên berê ku tên bîra mirov.

**Kovî:** Ne kedî, lawirên ku berdayî dijîn.

**Kumkulavk:** Cureyek ji lîstokan e.

**Hilciniqîn:** veciniqîn

**Nevî:** Zarokê zarokan

**Gemirandin:** firikandin

**Giyan:** can, rewan, rih

**Qehremanî:** xweşmêrî, camêrî, bêtirsî

**Hovîtî:** wehşîtî, tevgera hovane

**Pak:** paqij, temîz

**Bi saya:** bi xêra

**Ewlekarî:** ewlehî

## PIRS

**1-** Pîremêr, ji neviyê xwe re çi got?

**2-** Neviyê wî piştî mezin bibe, dixwaze bibe çi?

**3-** Pîremêr, ji neviyê xwe xwest ku li ser çi binivîse?

**4-** Amojgariyên pîremêr, çi ne? Bi hevalên xwe re guftûgo bike.

## DESTÛRÊN ZIMAN

### 1- Dema Borî:

Dema borî, karek an bûyereke ku di **demên borî** de hatiye kirin, diyar dike. Ev dem, bi alîkariya rayeka dema borî ya lêkeran û hin pêvekan pêk tê.

**Dema borî, di nava xwe de dibe pênc beş:**

**1-** Dema boriya têdeyî(nêzîk): (şûştin şûşt)
**2-** Dema boriya dûdar: (şûştin şûşt**iye**)
**3-** Dema boriya berdest: (şûştin **di**şûşt)
**4-** Çîrokiya dema boriya têdeyî: (şûştin şûşt**ibû**)
**5-** Çîrokiya dema boriya dûdar: (şûştin şûşt**ibûye**)

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

Seretîpa navê taybet ê ku li lawiran tê kirin, mezin tê nivîsandin.
Mînak: Piştî çend rojan, dê Kanûn bizê. (Kanûn; navê çêlekekê ye).

## Hêmadanîn

**Xalbêhnok(;)**

- Ev hêma, dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî, yên ku hev sergihayî dikin.

Mînak: Ga dimire, çerm dimîne; mirov dimire, nav dimîne.

- Ji bo cudakirina komikên hevokên ku hêmanên wan bi bêhnokan ji hev hatine cudakirin, xalbêhnok tê bikaranîn.

Mînak: Ez pir bi coş û peroş im; ez dixwazim biqîrim, bistrêm, bibezim...

# HÎNDARÎ

1- Rayeka dema borî ya lêkerên li jêr, peyda bike.
**raketin, dîtin, hatin, dadan, çêkirin, hildan**

2- Du hevokan li ser lêkerên (şûştin û raketin) ên li gorî dema boriya têdeyî saz bike.

# PENDÊN PÊŞIYAN

**1- "Bila zikê mirov birçî be, lê rûmeta wî li cî be."**
**2- "Ger dostê te hingiv be, tevî nealîse."**

## WANE 7

# ÇÎROKA KEÇEL Û APÊ WÎ

Li gundekî, yekî keçel hebû û sêwî bû. Ew li cem apê xwe dima. Keçel, yekî fêlbaz bû.



Rojekê, Keçel bi apê xwe re çûn nava zeviyan. Dem bû nîvro, Keçelo birçî bû. Kêra Apê xwe dizî
û berê xwe da gund, çû cem jinapa xwe û got:

- Apê min got; "biçe malê, ji jinapa xwe re bêje, bila gayê me serjê bike, goşt bikelîne û ji me re bîne."

Jinapa wî bawer nekir. Îca Keçel got:

- Bi vê kêrê serjê bike. Bi vî awayî, jinapa wî jê bawer kir û rabû ga serjê kir. Goşt keland û da Keçel. Keçelî rahişt çend nanên sêlê
û berê xwe da zeviyan. Li ser zeviyan, apê wî dema ku di destê Keçel de goşt û nanên sêlê dît, şaş bû û got:

- Keçel, ev goşt ê çi ye û te ji ku aniye?

Keçel got: Apo, gayê mala axayê gund li ber mirinê bû, rabû serjê kir û li gundiyan belav kir. Ev jî, li para me ket û min anî.

Apê Keçel, ji vê gotina wî bawer kir û her duyan bi hev re goşt xwar.

Êvarê, dema ku vegeriyan gund, jinapa Keçelo ji hevjînê xwe re got:

F) Mêro, ma te çima xwest ez gayî serjê bikim? Apê Keçel got:

G) Gayê çi? Hevjîna wî got:

H) Keçelî kêra te anî, ji min re wisa got û min jî serjê kir.

Apê Keçelo nizanî wê çi xweliyê li serê xwe bike û Keçel ji mala xwe qewirand.

## WATEYA PEYVAN

**Keçel:** Kesê ku ji ber nexweşiyeke li serê wî ketiye û porê wî şîn nabe, ji ber vê yekê bê por e.

**Sêwî:** Zarokên ku dê û bavê wan mirine

**Fêlbaz:** Xapîner, kesê ku fen û fûtan dike.

**Zevî:** Erdê çandiniyê, axa ku dexlûdan lê tê çandin.

**Ga:** Nêrê çêlekan.

**Axa:** Serokê eşîr, yan jî hozekê.

**Par:** pişk, parçe

**Xwelî:** toza gewr, ax

**Qewirandin:** derkirin, derxistin, qewitandin

## PIRS

**1-** Keçel, çima li cem apê xwe dima û ew kesekî çawa bû?

**2-** Keçel, çawa kir ku jinapa wî, jê bawer bike ku apê wî gotiye gayî serjê bike?

**3-** Dema ku apê Keçel rastiya wî nas kir, çi li keçel kir?

**4-** Te çi sûd, ji vê çîrokê wergirt?

# DESTÛRÊN ZIMAN

## Pêvek(qertaf):

Ew parçepeyvên ku li dawî û destpêka peyvê tên zêdekirin, ji aliyê wate yan zayendê ve bandorekê li ser peyvê dikin, **pêvek** tê gotin.

### Pêvek di nava xwe de dibin du beş:

**1-** Pêvekên sazker(pêşgir û paşgir)
**2-** Pêvekên kêşanê

**1- Pêveka Sazker:** Ev cure pêvek, li ser peyvê tên zêdekirin û bi peyvê ve tên zeliqandin, li ser bingeha wateya peyvê wateyeke nû didin heman peyvê.

**Mînak:**

| **Peyva xwerû** | **Pêveka sazker** | **Peyva pêkhatî** |
|---|---|---|
| Aş | van (paşgir) | Aşvan |
| Şev | î (pêşgir) | Îşev |
| Gund | î (paşgir) | Gundî |
| Cot | kar (paşgir) | Cotkar |

**Têbînî:**

Carinan di zimanê me de peyvên pêkhatî careke din tên tûredan û dibin peyvên kompleks.

**Mînak:**

Nêçîr**van** + **î** = Nêçîr**vanî**

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

- Navê pirtûk, kovar û rojnameyan bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Min îro ji pirtûka “**Elif leyle we leyle**” çend çîrok xwendin.

Mînak: Kovara “**Elerebî**” mehane tê weşandin.

Mînak: Rojnameya “**Elheyat**” rojnameyeke navdar e.

## Hêmadanîn

**Xalbêhnok(;)**

- Di mînakên ku tên rêzkirin de yên ku ji aliyê cure û wateyê ve ji hev cuda ne, bi riya xalbêhnokê ji hev tên cudakirin.

Mînak: Di kurdî de navê zarokên keç dikin Zozan, Sosin, Binefş; navê zarokên kur jî dikin Şêrgo, Hogir, Piling...

## HÎNDARÎ

1- Li ser peyvên bi pêşgirê pêkhatî, du hevokan saz bike.
2- Li ser peyvên bi paşgirê pêkhatî, du hevokan saz bike.
3- Çi cudahî ji aliyê wateyê ve di navbera peyva xwerû û peyva pêkhatî de heye? Bi mînakekê diyar bike.

# HÎNDARÎ

**1-** Kîjan peyva li jêr, tê wateya “keştî”?
**a-** gemî **b-** seyran **c-** goşe **d-** gef

**2-** Di kîjan hevoka li jêr de bireser heye? Binê bireserê xêz bike. **a-** Bavê min zû radikeve.
**b-** Zarok bi gokê dilîzin.
**c-** Elî ji dibistanê hat. **d-** Min gulek çand.

**3-** Lêker, li gorî peyvsaziya xwe dibin;
**a-** du beş **b-** sê beş **c-** çar beş **d-** şeş beş

**4-** Kîjan lêkera li jêr, pêkhatî ye?
**a-** alast **b-** germ kir **c-** hilgirt **d-** dilîze

**5-** Di zimanê kurdî de çend rayekên lêkeran hene?
**a-** yek rayek **b-** du rayek **c-** sê rayek **d-** çar rayek

**6-** Kîjan vebijêrka li jêr, rayeka dema niha ya lêkera “çûn” e?
**a)** diçe **b)** ç **c)** çûn d) çû

**7-** Kîjan vebijêrka li jêr, rayeka dema borî ya lêkera “xwendin” e?
**a)** xwend **b)** xwîn **c)** x **d)** dixwend

**8-** Di zimanê kurdî de çend demên bingehîn hene?
**a-** du dem **b-** sê dem **c-** pênc dem **d-** şeş dem

**9-** Kîjan hevoka li jêr, li gorî “dema bê” hatiye sazkirin?
**a-** Ew pirtûkê dixwîne.
**b-** Wî pirtûk xwend.
**c-** Ew ê pirtûkê bixwîne.
**d-** Wî pirtûk dixwend.

**10-** Di nava du hevokên bi hev ve grêdayî de kîjan hêma tê danîn?
**a-** bêhnok **b-** xal **c-** cotxal **d-** xalbêhnok

**11-** Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev.

| | |
|---|---|
| Fêlbaz | Çeng |
| Kêlek | Kolan |
| Bask | Nepozbilind |
| Kuçe | Xapîner |
| Dilnizm | Tenişt |

**12- Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike.**

**a-** Lêkerên gerguhêz; lêkerên ku biresera wan heye. ( )

**b-** Serenavên cih, sazî, çem, derya û navên din ên erdnîgariyê, bi tîpa biçûk dest pê dikin. ( )

**c-** Lêkerên pêkhatî; lêkerên ku ji lêkereke xwerû û pêvekeke lêkersaz pêk tên. ( )

**d-** Navê meh û serdemên taybet, bi tîpa mezin dest pê dikin. ( )

**e-** Di hevokên dirêj de ji bo ku kirde ji hêmanên din ên hevokê veqete, bêhnok tê bikaranîn. ( )

**f-** Dema ku ji lêkerên raderîn, pêvekên raderîn(**in**, **n**) tên avêtin, rayeka dema niha bi dest dikeve. ( )

**g-** Seretîpa bêjeya yekem a veguhêz, ango hevoka di nava dunikê de mezin tê nivîsandin. ( )

**h-** Di nivîsandina navbera dîrok û cihan de bêhnok tê bikaranîn. ( )

**i-** Dema niha, bi alîkariya pêveka (bi-), rayeka dema niha ya lêkerê û cînavka kesandinê pêk tê. ( )

**j-** Di serenivîsan de ji bilî gihanek, daçek û veqetandekên ku cuda tên nivîsandin, hemû bêje bi tîpa mezin dest pê dikin. ( )

**k-** Dema borî, di nava xwe de dibe sê beş (têdeyî, dûdar, berdest). ( )

**l-** Dema ku karek tê kirin û didome, jê re dema borî tê gotin.

( )

**m-** Forma dema bê = amraza dema bê+ bi- + rayeka dema bê + cînavka kesandinê. ( ) **n-** Navê pirtûk, kovar û rojnameyan bi tîpa mezin dest pê dike. ( )

**o-** Pêvek, di nava xwe de dibin sê beş. ( )

# BEŞA ÇAREM

## WANEYÊN BEŞÊ

**BAJARÊ TIRBESPIYÊ**

**KOÇBERÎ Û WELATPARÊZÎ**

**MAMOSTEYA MIN**

**BILBILÊN DI RIKEHAN DE**

**ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ**

# WANE 1

## BAJARÊ TIRBESPIYÊ




Bajarê Tirbespiyê, li deşta Cizîrê ye. Li Kantona Cizîrê, di navbera bajarê Qamişlo û Dêrikê de cih digire. Cihê vî bajarî, balkêş e. Bajar û navçeyên weke; Dêrik, Girkê Legê û Çilaxa, bi Qamişloyê ve girê dide.

Navê bajêr; ji du gorên kevn ên ku ji gêçê û li destpêka bajêr hatibûn çêkirin, tê.

Tirbespiyê, bi çandiniya dexil û danan bi nav û deng e, ew jî bi baranê ve girêdayî ye. Du bendav lê hene; Mizgeft û Maşûq.

Ji derveyî vê, şêniyên bajêr debara xwe bi xwedîkirina lawirên weke; pez û dewaran dikin. Tu kargeh, lê tune ye. Lê ew bi petrolê dewlemend e. Tê de bêhtirî 200 bîrên petrolê hene.

Serjimariya bajêr kêm e, nêzî 25 hezarî ye. Niştecihên wê; ji pêkhateyên kurd, suryan û ereb in.

Di navbera wan de jiyaneke hevbeş û wekhev heye.

Her çi qasî bajarekî ku ji aliyê bermahiyên dîrokî ve dewlemend e jî, lê mixabin tu lêkolînên dîrokî tê de nehatine kirin, ji bilî girê Gundê Lêlanê yê ku perestgeheke asûriyan tê de hatibû avakirin.

Gundên girîng ên ku bi bajêr ve girêdayî ne, ev in; Maşûq, Girdêm, Beyandûr, Dêrûna Qulingan û Til Xatûn.

Her wiha, li bajêr bazareke bazirganiyê heye, ku di vê demê de pêş ketiye, bi rêk û pêk û firehtir bûye.

## WATEYA PEYVAN

**Deşt:** Devera rastgeh, cihê ne çiyayî.

**Balkêş:** Ecêb, tişta ku ji bo mirov dibe mereq.

**Navçe:** herêm, bajarok

**Gor:** Cihê ku mirî tê de tên veşartin.

**Gêç:** kils

**Dexil:** genim

**Bendav:** Cihê ku av lê tê komkirin.

**Şênî:** Niştecih, pêkhate, mirovên ku li cihekî dijîn.

**Serjimar:** Nifûs, hejmara giştî ya mirovên ku li cihekî dijîn.

**Bermahî:** Tiştên ku ji ber tiştekî mane.

**Perestgeh:** Cihên perestinê (weke; dêr û mizgeft)

## PIRS

1- Bajarê Tirbespiyê, li ku derê cih digire?

2- Bajêr, navê xwe ji çi standiye?

3- Debara niştecihên bajêr, li ser çi ye?

4- Niştecihên bajêr, ji kîjan pêkhateyan in?

5- Gundên girîng ên ku bi bajêr ve girêdayî ne, kîjan in?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Pêvekên(qertafên) kêşanê:**

Ew cure pêvekên ku dema bi peyvê ve tên, bandorê li ser wateya peyvê nakin. Dibe ku ji aliyê zayend, jimar û palvedanê ve kêşanê pêk tînin.

**Pêvekên kêşanê:** Cînavkên kesandinê, pêveka dema niha(**di**), pêveka raweya fermanî(**bi**), pêvekên tewangê(**ê**, **î**, **an**, **ekî**, **ekê**, **inan**), pêvekên gazîkirinê(**o**, **ê**, **ino**), pêvekên dema borî(**di**, **e**), pêveka raweya merc û daxwaziyê(**bi**), pêvekên neyîniyê(**na**, **ni**, **ne**), pêvekên payeya hevalnavan(**tir**, **tirîn**).

**Mînak:**

- Ez îro **naçim** kargeh**ê**.
- Elî **di**xwaz**e** çîrok**ekê** **bi**nivîs**e**.
- Heval**ino**, hişyar bin! Va dijmin bi ser me de tê.
- **Bi**xwîn**e** da tu bi ser kev**î**.
- Bajarê Qamişlo ji yê Tirbesp**iyê** mezin**tir** e.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

Dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, pêveka dema niha “**di-**” û ya neyîniyê “**na-, ne**” dikevin navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

[redacted] [redacted]

ra**di**be

Rabûn pêveka neyîniyê (na, ne) → ra**na**be, ra**ne**be.

Her wiha, di van lêkeran de di dema bê, raweya fermanî û raweyên daxwaziyê de pêveka “**bi-**” ji holê radibe.

Mînak: - Tu yê **dakevî** jêr?

- Derî **veke** da em **derkevin**.
- Ez dixwazim zû **rakevim**, ji ber ku sibe ezmûna min heye.

## Hêmadanîn

**Pirsnîşan(?)**

ûEv hêma, tê dawiya hevokên pirsê. Pirs, bi riya çend alavên din yên weke; **ma**, **qey**, **gelo** jî tê kirin.

Mînak: - Kî hat? - Ma tu naçî? - Gelo we karê xwe qedand?

## HÎNDARÎ

**1-** Hevokekê saz bike, ku pêveka kêşanê tê de cînavka kesandinê be.

**2-** Hevokekê saz bike, ku pêveka kêşanê tê de pêveka dema niha be.

**3-** Çi cudahî di navbera pêvekên sazker û kêşanê de heye? Bi mînakan diyar bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1- “Xwarina xwe bihêle, lê karê xwe nehêle.”**

**2- “Wêrankirin hêsan e, lê avakirin giran e.”**

**WANE 2**

## KOÇBERÎ Û WELATPARÊZÎ

Gundê me, gundekî pir xweş û dewlemend bû, tevahî şêniyên gundê me bi hev re alîkar bûn. Bê cudahî, ji hev pir hez dikirin. Erê erê!... Mala xayîn û bêbextan bişewite, gundiyên dilpak nizanîbûn ku ev demeke dirêj e, zordar û xwefiroş li ser wan planên qirêj çêdikin. Vê lihevhatina gundiyan, çavnebarî bi dagirkeran re çêkiribû. Ji ber vê yekê, xwestin gund dagir bikin

E) li gorî daxwazên xwe bi rê ve bibin. Tevahî dewlemendiyên gundiyan, bixin bin xizmeta xwe. Îro, çerxa felekê li ser serê gundiyên pak, şaş vegeriya. Dagirkeran bi awayekî pir xerab, êrîşî gund kirin. Bû teqreqa fîşek û bombeyan! Asîman, ji deng

F) hawara dayîkan, qîreqîra zarokan dilerizî!. Şerekî dijwar, dest pê kir. Gundiyan jî bi awayekî pir baş li ber xwe dan, lê mixabin hin gundiyên tirsonek, ji tirsan, dev ji axa xwe berdan û koçber bûn.

Bi vî awayî, çeteyên hov ên tundrew ketin aliyekî gundê me. Gund, tarûmar kirin. Sewalên gund, tev kuştin. Jinên ku ketin destên wan birin û li bazaran firotin. Gelek ciwanên me, bi awayekî hovane kuştin. Beşek ji gundiyan, dev ji axa xwe berdan û koçberî welatên din bûn. Lê tevî vê yekê jî, beşek ji gundiyên ku bi axa xwe ve girêdayî bûn di gund de man, mal û xaka xwe ji êrîşkaran re bernedan.

## WATEYA PEYVAN

**Zordar**: zalim, sitemkar

**Dagirker:** Kes, an jî hêza ku deverekê bi darê zorê distîne.

**Pak:** Baş û paqij.

**Çerx:** sedsal, qern

**Dilerizî:** direcifî, diliviya

**Koçber:** Kesên ku ji gund, an jî bajarê xwe ji neçarî çûne welatekî din.

**Tundrew:** Kesên ku tundiyê bi kar tînin.

**Tarûmar:** wêran

**Sewal:** pez

**Hovane:** dirinde, har, wehşî

**Mohr:** xitim

**Şopdar:** Kesên ku li ser riya pêşiyên xwe dimeşin.

## PIRS

1- Gundê wan, gundekî çawa bû?
2- Çawa êrîş li ser gund çêbû?
3- Kesên welatparêz, çawa diyar bûn?
4- Çima yê ku ji welatê xwe derdikeve, bi çavekî kêm lê dinêrin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**Hevok:** Ji peyv, an jî rêzepeyvên ku hest, raman, daxwaz, nûçe û bûyerekê têdigihînin re **hevok** tê gotin.

Hevok, bi tîpa mezin dest pê dike û bi hêmayekê (xal,

pirsnîşan, baneşan an cotxal) li gorî wateya wê, bi dawî dibe.

**Mînak:**

E) Ez ji werzîşê hez dikim.
F) Çiyayê Cûdî li ku derê ye?
G) Gelî hevalan, guh bidin min!
H) Mamoste ji min re got: Karê îro, nehêle sibe.

**Hêmanên hevokê:**

Di hevokê de du hêmanên bingehîn hene; **kirde** û **pêveber**, her wiha du hêmanên alîkar hene; **bireser** û **têrker**.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

Daçekên "**bi**, **bê** û **ne**" dema ku rista pêşgiran bi cih tînin û navdêr û hevalnavên nû çêdikin, bi bêjeyê ve tên nivîsandin. Lê dema ku hevalkaran çêdikin, cuda tên nivîsandin.

Mînak: - Ev mirovekî **bihêz** e. (hevalnav)

E) Ew **bi hêz** tevdigere. (hevalkar)

F)Ew nanê **bêrûn** dixwe. (hevalnav)

G) Wê xwarin **bê rûn** çêkir. (hevalkar)

H) Ev mirovekî **nexweş** e.(hevalnav)

I) Ew **ne** **xweş** axivî. (hevalkar)

## Hêmadanîn

### Pirsnîşan(?)

Dema ku agahiyên tên dayîn, bi guman bin; pirsnîşan di nava kevanekê de tê danîn (**?**).

Mînak: Ehmedê Xanî, di salên (1651 -1707?) di Nûbara Biçûkan de gelek şîretan li zarokan dike.

## HÎNDARÎ

1- Hevokê, pênase bike û endamên wê diyar bike.
2- Hevok, bi kîjan hêmayan bi dawî dibe? Bi hevokan diyar bike.

## MAMIK

➢ Weke pirpel e, nivîs lê bel e,
bi bend û bal e, ji te re heval e! (Pirtûk)

➢ Di rojê de bûk e, di şevê de pepûk e! (Nivîn)

## WANE 3

# MAMOSTEYA MIN




Ew hem dê ye, hem jî bav e
Bê mûçe û bê dirav e
Bi rojbaş dike silav
e Bi rûkenî dike rave

Tu bê mirinî her dijî
Lewma te dagirtî mejî
Ji çand û wêjeyê tijî
Êdî çewtî nema dijî

Mamosteya min a delal
Bi wî zarê şirîn zelal
Zanîn bo min kiriye mal
Ji bo xwe kirime heval

Mamosteya xwedî raman
Şev û rojê westan nezan
Dixebite bi merg û can
Mirov jê re dibe heyran.

***(M. Elî)***

## WATEYA PEYVAN

**Mûçe:** Pereyên ku xwediyê kar, dide karkerên xwe, ratib.

**Dirav:** pere

**Wêje:** tore, edeb

**Çewtî:** şaşîtî, xeletî

**Delal:** xweşik

**Zarê şirîn:** Zimanê xweş.

**Westan:** erimîn, betilîn.

**Merg:** can

**Heyran:** Kesê ku ji tiştekî pir hez dike, qurban.

## PIRS

**1-** Di helbestê de mamoste bi çi awayî tê ziman?

**2-** “Êdî çewtî nema dijî.” Vê hevokê şîrove bike.

**3-** Di helbestê de piranî kîjan bûyer, an jî hest tên şîrovekirin?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**1- Kirde:**

Ew peyva ku di hevokê de kirina kar digire ser xwe, jê re **kirde** tê gotin.

**Mînak:**

**Nûra** gulan kom dike.

**Hîşam** avjeniyê dike.

**Ew** bi hevalên xwe re kar dike.

Kirde her çi qas dibe ku peyv be, dibe ku birepeyv be jî.

**Mînak:**

**Qasimê Çavreş** nameyê dinivîse.

**Sosina Mamoste** diçe dibistanê.

Dema ku kirde ne diyar be, cînavkên kesandinê yên ku bi dawiya lêkerê ve tên danîn, hebûna kirdeyê diyar dikin.

**Mînak:**

Hat**im** dibistanê.

Çû**n** gulîstanê.

**Çûbû** çiyê.

# DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

## Destûrên nivîsînê

**1- Daçekên hevedudanî:** Ji hev cuda tên nivîsandin.
Mînak: Di ser de, bi jor ve, li rex, ji jor ve, di bin de…

**2- Daçekên hevedudanî** dema ku pêşdaçeka wê dikeve, paşdaçek jî bi bêjeyê ve dizeliqe.
Mînak: Piştre(di bingeha xwe de: di pişt re)

E) Lewre (di bingeha xwe de: ji lew re)
F) Peyre (di bingeha xwe de: di pey re)

## Hêmadanîn

**Pirsnîşan(?)**

Dema ku di hevokên pirsiyariyê de ji pirsekê zêdetir hebe, pirsnîşan li dawiya hevoka dawî, tê danîn.

Mînak:

Te ew mijar xwend, çawa bû, te çi encam jê wergirt?

## HÎNDARÎ

1- Du hevokan saz bike, ku di wan de kirde, cînavkên kesane bin.
2- Sê hevokan saz bike, ku di wan de kirde, navdêr be.
3- Di hevokên li jêr de kirdeyan diyar bike.
E) Mamoste, waneyê şîrove dike.
F) Ez û hevalê xwe bi hev re çûn bajêr.
G) Wan karê malê di lênûsa xwe de nivîsandin.
4- Du hevokan saz bike ku di wan de cînavkên kesandinê, hebûna kirdeyê diyar kiribe.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1- "Welat, hem dê ye hem jî bav e, nayê kirîn û firotin bi tu diravî."**
**2- "Bila dilê te geş be, bila nanê te reş be."**

## WANE 4

# BILBILÊN DI RIKEHÊ DE



Rojek ji rojên payîzê bû. Pîremêrek di destê wî de kopal, hêdî hêdî di rê de diçû. Dît ku zarokek ber bi wî ve tê. Di destê zarok de rikehek û di rikehê de du bilbil hebûn. Bilbilan, rikeh didan ber nikilan û hewl didan ku xwe derxînin. Pîremêr, li ser vê rewşa bilbilan, pir dilteng bû. Piştre, ji zarok pirsî: Tu yê bi ku ve herî?

E) Ez ê herim bazarê û van bilbilan bifiroşim.

F) Baş e, bifiroşe min. Ez ê van bilbilan bikirim.

Tu nafiroşî min?

- Belê, çima nefiroşim?!

Pîremêr, ji berîka êlekê xwe pere derxistin û dan destên zarok. Rikeh ji destê zarok girt. Destpêkê bilbilek ji rikehê

derxist. Piştî demekê destê xwe li ser perên wê gerand û berda. Bilbil ji nişka ve çengê xwe vekir, bi şahî dest bi firînê kir. Heman tişt ji bo bilbilê duyem jî kir.

Li ser vê yekê, zarokê biçûk matmayî bûbû. Zarok, carekê li pereyên di destên xwe de temaşe kir û carekê jî li pîremêr mêze kir û piştre jê pirsî: Çima te wisa kir, mamo?
Çima te bilbil berdan?

Pîremêr kenî û wiha bersiv da: Binêre lawê min, ji beriya çend salan şoreşeke çekdarî çêbû. Ji bo ku em welatê xwe ji bin destên neyaran derxin, me şer dikir.

Aha! Di wî şerî de ez birîndar bûm û dîl ketim destên neyaran, weke van çûkên di destên te de bûm. Ji bo ez rizgar bibim, min jî her tim hewl dida. Weke ku dilê min dixwest, min nedikarî tevbigerim. Dîlî û bindestî, tiştekî gelek zor
û zehmet e!

Pîremêr bi çavên xwe yên şil, ev axaftina xwe berdewam kir: Tu dizanî çima min bilbil serbest berdan? Ew ne çûkên rikehan in. Çawa dixwazin, bila wisa bifirin. Dixwazin li ser çi rawestin, bila rawestin. Bila ji dîliyê, rizgar bibin.

## WATEYA PEYVAN

**Rikeh:** Cihê ku firinde tê de tên ragirtin.

**Êlek:** Çakêtê bê zendik.

**Matmayî:** heyirî, ecêbmayî

**Çekdarî:** Şer û têkoşîna ku bi çekan tê kirin.

**Dîl:** girtî, êsîr

**Rizgarî:** Serbestî û azadî.

## PIRS

1- Pîremêr, rastî kê hat?

2- Helwesta pîremêr çi bû, dema ku bilbil di rikehê de dîtin û çi kir?

3- Çima pîremêr, bilbil ji rikehê berdan?

4- Ramana bingehîn a mijarê, çi ye?

5- Li ser girîngiya azadiyê, tu çi dibêjî?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**2- Pêveber:** Di hevokê de hêmana ku kar, bûyer û rewşekê radigihîne, jê re **pêveber** tê gotin. Ji bo pêveberê, pêwîstî bi lêkereke kişandî heye.

**Mînak:** - Derî **vebû.** **-** Destê wî **şikestiye**.

## DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

### Destûrên nivîsînê

Tîpa “i”, dema ku bi awayê tîpa mezin were nivîsandin, dibe “I” û bêyî xalê tê nivîsandin.
**Mînak:** Hz. **I**brahîm, bavê Hz. **I**smaîl e.

### Hêmadanîn

**Pirsnîşan(?)**

Li dawiya hevokên pirsê yên ku bi riya kirpandinê çêdibin, tê danîn. Bêyî ku peyvên pirsê bên bikaranîn.

Mînak: Te xwarin xwar?

## HÎNDARÎ

**1-** Du hevokan saz bike û di wan de binê pêveberê xêz bike. **2-** Di hevokên li jêr de binê pêveberan xêz bike.

E) Çima te karê xwe neqedand?
F) Bêrîvan çêleka zer didoşe.
G) Ez û hevalê xwe pendên kurdî berhev dikin.

## MAMIK

û Ne pî heye ne pehnî, her roj diçe kanî. (Cer)
û Ciwan e, lê serboz e,
her dem dora wî toz e. (Aşvan)

# WANE 5

## ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ



Rêzan, ji ber birîna xwe bêhiş ketibû. Mirovekî xêrxwaz ew rakir û bir nexweşxaneyê. Agahî dan dê û bavê wî. Dê û bavê wî, bi lezgînî hatin. Piştî nêrîna bijîşk, hat zanîn ku kûçikê ku Rêzan gezdayî, har bû. Bijîşk, gelek xemgîn bû.
Ji ber vê yekê, Rêzan bi tirsnakiyeke mezin re rû bi rû mabû.

Tirsnakiya mirinê! Der barê vê nexweşiyê de bijîşkeke pispor a bi navê Nalîn li bajarê Qamişloyê hebû. Bi lezgînî, Rêzanê biçûk şandin Qamişloyê. Dîrok 6'ê Tîrmeha 1999'an bû. Bijîşk Nalîn, di vê nexweşiyê de gelek serkeftî bû.

Dijmîkroba nexweşiya hariyê, pisporek bi navê Pastor dîtibû. Bijîşk Nalîn, ev dijmîkroba han li ser Rêzanê biçûk bi kar anî. Bijîşk Nalîn, roj bi roj Rêzanê biçûk dişopand, dibîne ku ew ber bi başiyê ve diçe. Bijîşk Nalîn, berbanga sibehekê

westiyayî û li ber pacê xilmaş bûbû, dema ku çavên xwe vedike, dibîne ku Rêzanê biçûk baş bûye.

## WATEYA PEYVAN

**Harbûn:** Nexweşiyeke ku ji gezkirina lawirên weke; kûçik, rovî, gur û hwd. çêdibe.

**Dijmîkrop:** Antîmîkrop

**Bijîşk:** doktor, hekîm

**Pispor:** Kesên ku di pîşeyekê de kûr dibin.

## PIRS

1- Ji bo çi Rêzan rakirin nexweşxaneya Qamişloyê?

2- Bijîşk Nalîn, çawa Rêzanê biçûk derman kir?

3- Te ji vê bûyerê, çi sûd wergirt?

## DESTÛRÊN ZIMAN

**3- Bireser:**

Peyva ku ji kirina karê kirdeyê bandor dibe, jê re **bireser** tê gotin.

**Mînak:** - conî **gulan** av dide.

- Min **ew** dît.

Hêjayî gotinê ye ku hebûna bireserê, girêdayî cureya lêkerê ye. Ger lêker gerguhêz be; wê bireser hebe, ger lêker negerguhêz be; wê bireser tune be.

**Mînak:** - Leyla **wêneyê** xêz dike. (lêker gerguhêz e)

- Şagirt ji dibistanê tên. (lêker negerguhêz e)

**4- Têrker:**

Ji gelek aliyan ve karê ku tê kirin, sergihayî dikin. Ev sergihayîkirin, dibe ku ji aliyê dem, yan cih, an jî rewşê ve be. Têrker, di binyata xwe de **hevalkar** û **daçek** in.

**Mînak:** - Zarok **li dora darê** dizivirin.

1.Gundî, **serê sibê zû** diçin nava zeviyên xwe.
2.Ez **duh gelekî** westiyam.

## DESTÛRÊN NIVÎS Û HÊMADANÎNÊ

### Destûrên nivîsînê

Daçek û gihanek bi giştî, ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** - Em **bi hev re** dixebitin.

ûEz ê **li rex te** rûnim.
û**Ji ber ku** karê min pir e, ez nikarim te bibînim.
û**Ji bilî** sêvan, ez ji fêkiyan hez nakim.

### Hêmadanîn

**Baneşan(!)**

Dema ku mirov bixwaze hesteke bilind (coş, xem, tirs kêfxweşî...) nîşan bide, hêmaya baneşanê(!) li dawiya hevokê datîne. Bêjeya piştî baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: - Hiş be kuro! Bila kes dengê te nebihîze.

- Ax, derdê me çi qas giran e!

Her wiha, baneşan bi armanceke cuda jî tê bikaranîn. Dema ku di nava kevanekê de li ber bêjeyekê bê danîn, tê wê wateyê ku nivîser bi dijwateya wê tiştê bawer e.

Mînak: Osman, mirovekî pir biaqil (!) e.

## HÎNDARÎ

1- Bireserê, pênase bike û du hevokan li ser saz bike.

2- Di hevokên li jêr de bireseran diyar bike.

1. Osman kolan paqij kir.
2. Şêrîn helbestan dinivîse.
3. Min ji ber derengmayînê, ew siza kir.

3- Hêmanên hevokên li jêr, diyar bike.

4. Rojda êvaran pirtûkan dixwîne.
5. Zarok li kuçeyan dilîstin.

## GOTINÊN PÊŞIYAN

**1- "Kedkarê xwe be, ezîzê ber dilê hevalên xwe be."**

**2- "Av dikeve xewê, lê dijmin ranakevê."**

## HÎNDARÎ

**1-** Kîjan peyva li jêr, tê wateya “riswa”?

**a-** Hovane **b-** rezîl **c-** serbilind **d-** serfiraz

**2-** Hêmaya pirsnîşanê(?), li dawiya kîjan hevoka li jêr pêwîst e?

**a-** Me karê xwe qedand

**b-** Kî di pêşbirkê de bi ser ket

**c-** Ew ji xwendinê hez dike **d-** Fewaz şagirtekî jîr e

**3-** Hevok, ji çend hêmanên bingehîn pêk tê?

**a-** du hêman **b-** sê hêman **c-** çar hêman **d-** pênc hêman

**4-** Di hevoka “Silêman karê xwe zû qedand” de kîjan vebijêrka li jêr, li gorî rêzê hêmanên vê hevokê ne? **a-** bireser, kirde, lêker, têrker

**b-** pêveber, têrker, kirde, bireser

**c-** kirde, bireser, têrker, pêveber

**d-** pêveber, kirde, bireser, têrker

**5-** Dema ku agahiyên tên danîn, bi guman bin; kîjan hêma di nava kevanekê de tê danîn?

**a-** Baneşan **b-** pirsnîşan **c-** xal **d-** xalbêhnok

**6-** Di hevoka “Îşev, em ê biçin şanoyê” de kîjan peyv kirde ye?

**a-** îşev **b-** em **c-** biçin **d-** şanoyê

**7-** Di kîjan hevoka li jêr de bireser heye? Binê bireserê xêz bike.

**a-** Leyla ji bazarê tê.

**b-** Ez li bajarê Dêrikê dijîm.

**c-** Yehya pirsek ji mamoste kir.

**d-** Hûn di ezmûnê de bi ser ketin?

**8-** Di hevoka “Huda her roj gulan av dide.” de kîjan peyv pêveber e?

**a-** Huda **b-** her roj **c-** gulan **d-** av dide

**9-** Di hevoka “Min, bi tembûrê stranek got.” de kîjan peyv têrker e?

**a-** min **b-** bi tembûrê **c-** stranek **d-** got

**10-** Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev. Matmayî Kils

| | |
|---|---|
| Pispor | Pez |
| Delal | Xweşik |
| Sewal | Heyirî |
| Gêç | Kesên ku di pîşeyekê de kûr dibin |

**11- Hevokên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş; bi tîpa (Ş) hêma bike.**

**a-** Bêjeya piştî hêmaya baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike. ( )

**b-** Daçek û gihanek, bi giştî ji hev cuda tên nivîsandin. ( )

c- Pirsnîşan(?) li dawiya hevokên pirsê yên ku bi riya kirpandinê çêdibin tê danîn, ên ku bêyî peyvên pirsê bên bikaranîn. ( )

**c-** Pêvekên kêşanê, bandorê li ser wateya peyvê dikin û wateyeke nû didin peyvê. ( )

**d-** Dema ku lêker bi pêşgirê pêkhatî be, pêveka dema niha **(di)** dikeve pêşiya pêşgirê. ( )

**e-** Ez dixwazim rabikevim. ( )

**f-** Ew, çaya bi şekir navexwe. ( )

**g-** Ji peyv an jî rêzepeyvên ku hest, raman, nûçe û bûyerekê têdigihînin re hevok tê gotin. ( )

**h-** Peyva ku kirina karê di hevokê de digire ser xwe, jê re **bireser** tê gotin. ( )

**i-** Hebûna bireserê, girêdayî hebûna kirdeyê ya di hevokê de ye. ( )

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| **Rezber** | | | Lêveger | Guhdarkirin |
| **Cotmeh** | Xwendin Nebe, Kes Naçe Pêş | Rêzdariya ji Mamoste re | Zarokê Xemsar | Çand û Ziman |
| **Mijdar** | Hîndarî | Hevalbendî Çi Qas Xweş e! | Pirtûk | Şêr, Rovî û Xezal |
| **Berfanbar** | Name ji bo Dapîrê | Hizir û Zanist | Hîndarî | Parastina Xwezayê |
| **Rêbendan** | Zembîlfiroş | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| **Reşemeh** | Heştê Adarê | Gula Devliken | Vegera Leglegan | Azadî |
| **Avdar** | Çîroka Keçel û Apê Wî | Hîndarî | Bajarê Tirbespiyê | Koçberî û Welatparêzî |
| **Cotan** | Mamosteya Min | Bilbilên di Rikehê de | Çareseriya Nexweşiyekê | Hîndarî |
| **Gulan** | Lêveger | NIRXANDIN | | |

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN 2

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Zimanê Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**BEŞA 1 .......................................................... 7**

**GIRÎNGIYA PERWERDEYÊ ....................... 8**

**ŞIVAN ........................................................ 12**

**WERZÎŞ ...................................................... 16**

**GIMGIMOKA BIÇÛK .................................. 21**

**DIBISTAN ................................................... 26**

**BEŞA 2 ........................................................ 33**

**ÇAND Û HUNER ........................................ 34**

**ŞAM ŞEKIR E WELAT ŞÊRÎNTIR E ........ 39**

**AZADIYA TÛTÎ JI RIKEHÊ ....................... 43**

**KEWAR (SELEMÊŞ) .................................. 48**

**DAYÎK ......................................................... 53**

**BEŞA 3 ........................................................ 61**

**HEZKIRINA PIRTÛKAN ............................ 62**

**BÎST Û YEKÊ ADARÊ ................................ 67**

**MIH, ŞÊR Û GUR ....................................... 71**

**AŞÛT ........................................................... 76**

**BIHAR ......................................................... 81**

**BEŞA 4 ........................................................ 87**

**LEHENGÊ SÊDARÊ .................................... 88**

**DIYARIYA YARÊ........................................ 93**
**QERO ........................................................ 97**
**FERHAT Û ŞÊRÎN.......................................101**
**SEBRA Û ŞATÎLA .......................................106**

# BEŞA 1

## WANEYÊN BEŞA YEKEM

1- Girîngiya Perwerdeyê

2- Şivan (Helbest)

3- Werzîş

4- Gimgimoka Biçûk

5- Dibistan (Helbest)

**WANE 1**

# GIRÎNGIYA PERWERDEYÊ



Fêrbûn û hînkirin, ji bo hemû giyaneweran pêwîst û girîng e. Bi taybetî, ji bo nifşên mirovan û civaka mirovahiyê. Weke xwarin û vexwarinê, pêwîstiyeke ku dest jê nayê berdan e. Bi vê têgeha pêdiviya perwerde û fêrbûna xwezayî; nifşên mirovan di demên borî de fêrî têgihandina bi peyivîn û axaftinê bûne. Her wiha, beriya her tiştî, heyînan bi nav dikin. Ev jî, bûye destpêka perwerdeyê.

Piştî peydakirina nivîs û xwendinê, girîngiya perwerdeyê zêdetir xwe dide pêş. Ji efsanasiyê ta zanistê, tevahî rahîb, pêxember, zanyar û pirtûkên pîroz girîngiyeke mezin dane perwerdeyê. Têgeha vê girîngiya perwerdeyê, bi nivîsên; pexşan, hûnandî, gotinên pêşiyan ve hatiye ziman.

**Weke mînak:** Çînî li ser girîngiya perwerdeyê wiha dibêjin: “Kesê di perwerdeyê de xwêdanê nerijîne, wê di şer de xwînê birijîne.” **Abdulah Ocalan** jî li ser perwerdeyê dibêje:
“Dayîka hemû xerabiyan; nezanî û tênegihîştin e, dayîka hemû qenciyan jî; zanîn û têgihîştin e.” Her wiha, Cegerxwîn di helbesteke xwe de dibêje: “Cegerxwînê kurê min, pir dinalî ji

ber aha xizanî û nezanî.”

Perwerde û hînkirin; bi taybetî, ji bo civakên bindest ên ku ji bo azadî û demokrasiyê têdikoşin, pir girîng e. Bi vê têgehê ve destpêka têkoşîna azadiya gelê kurd, bi perwerdeyê dest pê kiriye. Ji ber vê yekê, ev serdema dawî bi xwe, serdema zanistê ye û zanist jî bêperwerde ne gengaz e.

## WATEYA PEYVAN

**Fêrbûn:** Hînbûna zanistekê

**Hînkirin:** Perwerdekirin

**Giyanewer:** Heyînên xwedî giyan.

**Nifş:** Hemû kesên ku temenê wan nêzî hev, cîl.

**Têgihandin:** Zelalkirina karekî, yan gotinekê ji mirovek din re.

**Efsanasî:** Mîtolojî, zanista berhevkirin û vekolîna destan û efsaneyan.

**Pêxember:** Kesê ku peyamên Xweda radigihîne mirovan.

**Pexşan:** Çîrok, roman, serpêhatî û nivîsên din ên nehûnandî.

**Xizanî:** hejarî, feqîrî

**Gengaz:** pêkan, mumkin

## PIRS

1- Çi girîngiya xwendinê ya di jiyana mirovan de heye?
2- Nêrînên zanyaran ên li ser perwerdeyê, çi ne?
3- Bêperwerdehî, çi zirarê digihîne mirovan?
4- Çima serdema dawî, weke serdema zanistê tê binavkirin?
5- Tu jî gotineke mezinan, an jî yeke pêşiyan a li ser perwerdeyê, binivîse.

# RÊZIMAN

## Cureyên Hevokan:

Dema ku em qala cureyên hevokan dikin, divê em ji sê aliyan ve bala xwe bidin hevokan;

**1-** Hevok, li gorî wateyê
**2-** Hevok, li gorî rewşa pêveberê
**3-** Hevok, li gorî avasaziyê(çêbûnê)

### 1- Hevok li gorî wateyê:

**Hevok, li gorî wateya xwe; dibin çar beş:**

**a-** Hevoka erênî

**b-** Hevoka neyînî

**c-** Hevoka pirsiyarî

**d-** Hevoka baneşanî

### a- Hevoka erênî:

Ev cure hevok, diyar dike ku karê ku lêker radigihîne; hatiye kirin, tê kirin, an jî dê were kirin.

**Mînak:**

- Ez ê roja yekşemê, serê sibehê zû rabim.
- Berf, bi tundî û dijwarî dibare.
- Şervan di nava sermaya zivistanê de dixebitin.

### b- Hevoka neyînî:

Ev cure hevok, diyar dike ku karê ku lêker radigihîne; nehatiye kirin, nayê kirin, an jî dê neyê kirin.

**Mînak:**

- Em îro naçin geştê.
- Ez nikarim avjeniyê bikim.
- Îsal hewa ne hênik e.
- Bindestî, bêrûmetî ye.

**TÊBÎNÎ:**
Bi danîna pêvekên; **ne, na, bê, ni** ya li pêşiya lêker, an jî pêveberê re hevok; ji rewşa erênî, derbasî rewşa neyîniyê dibe.

## RASTNIVÎS

### Destûrên nivîsê

**Rastnivîsa hejmaran:**

- Hejmarên ji yek ta bîstan, ji hev nayên cudakirin.

**Mînak:** yek, du, ..... deh, yazdeh, .....nozdeh, bîst.

### Hêmadanîn

**Sêxal (...)**

- Piştî hevokên ku ji ber sedemekê, nehatine sergihayîkirin (temamkirin), sêxal tê bikaranîn.

**Mînak:** Min ew qasî bêriya te kiriye ku...

## HÎNDARÎ


**1-** Li ser her peyva li jêr, hevokeke erênî saz bike. gengaz – hatin – xizan

**2-** Li ser her peyva li jêr, hevokeke neyînî saz bike. hêsan – vegotin – çêkirin

Çawa hevok, ji rewşa erênî dikeve rewşa neyîniyê? Bi du mînakan diyar bike.

## WANE 2

# ŞIVAN



Têm û diçim deşt û şax
Derbas dikim dem û çax
Ber sêber û helava
Ser nefel û berava

Car nizar û car pesar
Mêrg û çîmen, avên sar
Dîmen geş in seranser
Û spî û kesk û zer

Tev dar û gul û giya
Wek bihuşt in ev çiya
Bilbil û kew dixwînin
Xemên dil direvînin

Seyê min tim şiyar e
Neyarê gurê har e
Nêrî kever pêşeng e
Zengil bi qîr û deng e

Ku pezê min dibûrê
Ez pif dikim bilûrê
Ev karê min xebat e
Ji bo min û welat e

**(Sebrî Botanî)**

## WATEYA PEYVAN

**Çax:** dem, serdem

**Helav:** Cureyeke şînatiyan e.

**Sêber:** Cihê ku sih lê heye, sîber.

**Nefel:** Giyayekî sêpel û bikulîlk e.

**Nizar:** Pala ber sihê, erda evraz.

**Pesar:** Erda paldayî

**Çîmen:** Cihê ku giyayê kurt û gul lê şîn dibin.

**Dîmen:** xuyang, dîdar, menzer

**Se:** Ajalekî navmalî ye, kûçik.

**Kever:** Belek, reş û spî.

**Bilûr:** Amûreke muzîkê ye, mirov bi dev pif dikiyê.

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Sebrî Botanî,** an jî **Sebriyê Ehmedê Temir:** Helbestvan û nivîskarekî kurd e. Botanî, di sala 1925'an de li gundê Lodê yê navçeya Dihê hatiye cîhanê. Ew, ji hoza Jêliyan e.

Wî, hemû jiyana xwe xistibû bin xizmeta ziman, wêje û çanda kurdî. Di gelek kovar û rojnameyên kurdî de li ser mijarên cihêreng dinivîsand û yek ji çalaktirîn kesayetên kurd bû. Ew, di salmeziniya xwe de mişext bû û ta dawiya jiyana xwe li Norwêcê dijiya.

Sebrî Botanî, di 25'ê Cotmeha 1998'an de li paytexta Norwêc Osloyê, jiyana xwe ji dest da.

**Hin berhemên Sebrî Botanî yên çapkirî:**

- Şîn û Şadî — Dîwan -1
- Dilistan — Dîwan -2
- Dengê Metîn û Cûdî — Dîwan -3

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan, çiyayê welatê wî çawa ye?
**2-** Tu, ji hevoka "Dîmen geş in, seranser" çi wateyê derdixî?
**3-** Heger wateya "şivan" ew kesê ku diçe ber pêz be, gelo wateya "gavan" û "bêrîvan" çi ye?

## RÊZIMAN

### c- Hevokên Pirsiyariyê:

Ji hevokên ku ji bo naskirina rewş û karê tê kirin, pirsekê dike re **hevokên pirsiyarî** tên gotin.

**Mînak:**

- Rewşa hevalan çawa ye?
- Tu çi dikî?
- Tu pirtûkê naxwînî?

TÊBÎNÎ:
Li dawiya hevokên pirsiyariyê, her tim nîşana pirsê (**?**) tê danîn.

Hevokên pirsiyariyê, erênî yan jî neyînî bin, bandorê li rewşa wan a pirsiyariyê nakin.

### d- Hevokên Baneşanî:

Hevokên ku ji bo hest, tirs, qehr û xweşiyê balê dikişînin, weke hevokên baneşanî tên bikaranîn û li dawiya wan hêmaya baneşanê (**!**) tê danîn.

**Mînak:**

- Ew çi roj bûn! (hestyarî)
- Ev marekî mezin e! (tirs)
- Bi koçberiyê ve em belengaz bûn! (qehr)
- Çiyayê Cudî, weke bihuştê ye! (xweşî)

# RASTNIVÎS

## Destûrên nivîsê

### Rastnivîsa hejmaran:

Hejmarên ku bi gihaneka "û" yê bi hev ve hatine girêdan, divê ji hev cuda bên nivîsin.

**Mînak:** bîst û pênc, şêst û heft, sed û heştê û neh ...

**Hêmadanîn**

**Sêxal (…)**

Piştî mînakan, dema ku sêxal were bikaranîn, wateya pirbûna wan dide.

**Mînak:** Wî, ji bazarê kemyonek tişt kirîn; xox, tirî, zebeş...

# HÎNDARÎ

**1-** Hevoka pirsiyariyê, çi ye?
**2-** Du hevokên pirsiyariyê, saz bike.
**3-** Sê hevokên baneşaniyê, saz bike.
**4-** Hevokên li jêr, li gorî wateya wan bi nav bike û hêmaya guncav li dawiya her hevokê bi kar bîne.

- Azadî çi qas xweş e
- Gelo rewşa nexweşê me çawa ye
- Ez qet ji sînemayê hez nakim
- Birayê min di karê xwe de serkeftî ye

## WANE 3

# WERZÎŞ



Her du waneyên me yên destpêkê, bîrkarî bûn. Pir xweş derbas bûn, lê ez pir westiyabûm. Ji ber ku waneya bîrkariyê, pêwîstiya wê; bi guhdarkirin û hizirandineke zêde û baldar heye. Piştî wê, waneya werzîşê hebû. Hemû xwendekar, tim li benda hatina waneya werzîşê ne. Bi vê waneyê, pir şad dibin. Ez jî ji vê waneyê pir hez dikim. Ji ber ku, em fêrî gelek beşên spor û lîstokan dibin.

Mamosteya me, hat refê û bi rûkenî got: Dembaş xwendekarino. Xwendekaran gotin: Dembaş mamoste!

Mamosteyê got: Zarokino, em ê niha biçin baxçeyê dibistanê, rêza xwe çêkin û dest bi werzîşa xwe bikin. Zarok hemû pir kêfxweş bûn, ji bo derkevin derve di nava liv û tevgerê de bûn.

Ji nişka ve min destê xwe rakir û pirsî: Mamoste! Mamoste! Mamosteyê li min meyzand û got: Keremke Xebat.

Mamoste, pirseke min heye; destûr hebe dixwazim bipirsim.

Mamosteyê got: Belê, dikarî bipirsî, keremke.

Mamoste, werzîş ji bo çi baş e, em çima werzîşê dikin?



Mamoste her du destên xwe dan hev du, çend kêliyan çû û hat, bi rûkenî li min nêrî û got: Xebat, bi rastî pirseke pir baş e. Belê, werzîş ji bo mirovan, pêwîstiyeke neçarî ye.
Ji bo beden û mejiyekî bitendurist, ji bo jiyaneke temendirêj û derûniyeke baş; pêwîstiya me bi werzîşê heye. Her mirovê ku werzîşê dike û di nava liv û tevgerên werzîşê de ye; her tim kêfxweş, rûgeş û zana ye. Lê binêre, hevalên te çi qas bi waneya werzîşê kêfxweş in. Her kes li ser piyan li benda me ye.

Em ê niha biçin, di nava vê xwezaya rengîn û xweşik de bilîzin. Em ê fêrî gelek tevgerên nû û baş bibin.

“Di nava wan kêliyan de min li derdora xwe meyzand, her kes li ser piyan û dilgeş e.”

Min ji bo van zanîn û agahiyan, spasiya mamosteya xwe kir û em bi rêzê ve derketin derve. Me pir beşên lîstokan lîstin; em beziyan û me pêşbirka bezê bi hevalên xwe re kir.
Wê rojê, ez li hemberî du hevalên xwe, bûm yekem. Ez di nava kelecaneke pir mezin de bûm. Bi vî awayî, roja me bi tevger û xweş derbas bû. Ez bi saya werzîşê, pir kêfxweş û dilgeş bûm.

## WATEYA PEYVAN

**Werzîş:** Spor, çalakiyên bedenî ku bi hevrikî jî tên kirin.

**Bîrkarî:** Matematîk, zanista jimaran û jimartinê

**Baldarî:** Bi awayekî pir baş lê meyzandin, an jî guhdarkirin.

**Şad:** dilxweş

**Rûkenî:** rûgeşî, dilşadî

**Liv:** Tevger, ne sekinîna li cihekî.

**Meyzand:** Temaşe kir, lê nihêrt.

**Kêlî:** Demeke pir kurt.

**Neçarî:** mecbûrî, kotekî

**Derûnî:** psîkolojî, nefsî

**Dilgeş:** dilşad, dilxweş

**Pêşbirk:** pêşbazî, hevrikî

**Kelecan:** peroş, heyecan

**Saya:** xêr, qencî

## PIRS

1- Çima Xebat beriya waneya werzîşê, westiyabû?
2- Pirsa Xebat çi bû û mamoste çi bersiv da?
3- Çi sûdên werzîşê hene?
4- Çawa xwendekar ji refê derketin û çi kirin?
5- Xwendekaran roja xwe çawa derbas kir?

## RÊZIMAN

### 2- Hevok, li gorî rewşa pêveberê:

**Hevok, li gorî rewşa pêveberê; dibin du cure:**

**1-** Hevoka navdêrî
**2-** Hevoka lêkerî

### Hevoka navdêrî:

Hevoka ku bi alîkariya lêkera “bûn”ê û cînavkên kesandinê, tê sazkirin û rewşekê nîşan dide, jê re **hevoka navdêrî** tê gotin.

**Mînak:**

- Ew karkerekî jêhatî ye.
- Ez û Riyad hevalên hev bûn.
- Awaza bilbil gelekî xweş e.

### Hevoka lêkerî:

Hevoka ku ji bilî lêkera “bûn”ê ya ku rewşê nîşan dide çêdibe, jê re **hevoka lêkerî** tê gotin.

**Mînak:**

- Em di refê de nameyê **dinivîsin**.
- Ew beriya du salan **bû** mamoste.
- Kurik ji darê **ket** û destê wî **şikest**.

**Têbînî:**

Lêkera “bûn”ê xwediyê du wateyan e; yek ji wan rewşê nîşan dide ku hevokên navdêrî saz dike, ya din jî qewimîn û guherînê nîşan dide.

**Mînak:**

- Ez mamoste **bûm**. (Rewşê nîşan dide.)
- Ez fêrî zimanê kurdî **bûm**. (Qewimînê nîşan dide.)

## RASTNIVÎS

### Destûrên nivîsê

**Rastnivîsa hejmaran:**

- Hejmarên ku bê gihanekê gihaştibin hev, ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** çar sed, heft sed, pênc hezar, deh hezar, du sed hezar, sê milyon, çar sed milyon…

### Hêmadanîn

**Sêxal(...)**

Li şûna peyveke ku mirov naxwaze bi kar bîne, piştî tîpa yekem a ji peyvê, sêxal tê danîn.

**Mînak:** Mêrik, di bernameyê de jê re got: **Q**...

Te dîsa çi **j**... belav kiriye?

## HÎNDARÎ

**1-** Du hevokên navdêrî, saz bike.
**2-** Kengî lêkera "bûn"ê hevokên navdêrî saz dike? Bi mînakekê diyar bike.
**3-** Du hevokên lêkerî, saz bike.
**4-** Hevokeke lêkerî saz bike ku tê de lêkera "bûn"ê qewimînê nîşan dide.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Birçiyê mala xwe be, ne têrxwarê mala xelkê be. **2-** Destê tenê, pêjin jê nayê.
**3-** Hin hingiv dixwin, mêş bi hinan ve dide.

## WANE 4

# GIMGIMOKA BIÇÛK



Hebû tune bû, di demên kevn de gimgimokeke biçûk hebû. Rojekê, gimgimok li daristanê digeriya. Cama ku li erdê diteyîsî dît, lê dinêre ku neynikek e.

Gimgimok, demeke dûr û dirêj di neynikê de li xwe dinêre. Rûyê wê yê bitirs, serê wê yê mezin, diranên wê yên tûj û dûvê wê yê dirêj; pir li kêfa wê hatibû.

Carekê çi bibîne! Li beramberî wê, susmarek dihat! Susmarê dibîne, lê susmar ji gimgimokê pir mezintir bû.
Gimgimok dihizire, "Dibe ku ez jî têjika susmarê bim. Dema ku ez mezin bibim, ez ê jî bibim susmareke wiha."

Gimgimoka biçûk, êdî pesnê hevalên xwe nedida û xwe ji hevalên xwe mezintir didît. Her kesî jê re digot: "Dema ku tu mezin bibî, dîsa tu yê her gimgimok bimînî
û tu nayê guhertin." Lê gimgimokê digot: "Na! Ez susmarek im."

Êdî tim li gel susmaran digeriya, tiştên ku wan dikir, wê jî hewl dida ku heman tiştan dubare bike. Rojekê dibîne ku susmar xwe li avê didin, gimgimok jî xwe li avê dide û dixwaze melevaniyê bike. Dema ku susmaran xweş-xweş melevanî dikir, gimgimok jî binav dibû. Li milê din jî diqêriya:
"Hawar! Hawar! Min rizgar bikin, ez ê bixeniqim."

Masiyê ku di wir re derbas dibû, bang li gimgimokê kir: "Ma tu jî ne susmar î? Tu jî melevaniyê bike!" "Na! Na!
Ez gimgimoka biçûk im, melevaniyê nizanim, min rizgar bike." Wê demê, susmareke dûvê xwe yê mezin dirêj kir, gimgimokê xwe pê ve kir û derbasî rexê avê bû. susmarê got: "Careke din, ji rastiya xwe dûr nekeve."

Gimgimok, gelekî şermîn bûbû. Ji wê rojê û pê ve her dem xwest bibe gimgimoka baş.

## WATEYA PEYVAN

**Gimgimok:** Lawirek xişinde û xwînsar e, li ser kevir û tehtan dijî.

**Teyisîn:** çirisîn, biriqîn

**Neynik:** Mirêk, awêne, cama ku mirov xwe tê re dibîne.

**Dûv:** kurî, boçik, terî

**Melevanî:** avjenî, soberî

**Qêrîn:** Bi dengekî bilind gazîkirin.

**Şermîn:** Fedîkirin.

## PIRS

**1-** Gimgimokê, çima xwe weke susmarê didît?
**2-** Hevalên gimgimokê, jê re çi digotin?
**3-** Susmara ku bi dûvê xwe ve gimgimok rizgar kir, çi şîret lê kir?
**4-** Te çi soje ji vê nivîsê derxist?

## RÊZIMAN

### 3- Hevok, li gorî avasaziyê (çêbûnê):

**a- Hevokên hêsanî (xwerû):** Hevokên ku hest û ramaneke tenê rave dikin û bi lêkereke tenê ya kişandî ve tên sazkirin, jê re **hevokên hêsanî** tê gotin.

**Mînak:**

- Mamoste, pirsên ezmûnê amade kirine.
- Vî karî ez bextewar kirim.
- Jiyan xweş e.

**b- Hevokên hevedudanî:** Dema ku mirov nikaribe hest û ramanên xwe bi hevokeke tenê derbibire, neçar dibe ku hest û ramanên xwe bi çend hevokan vebêje. Ji van hevokan re **hevokên hevedudanî** tê gotin.

Hevokên hevedudanî, di nava xwe de dibin du beş:

**1- Hevokên hevedudanî yên serbixwe**: Ev hevok, ji çend hevokên li pey hev rêzkirî pêk tên û bi alîkariya bêhnok û gihaneka "**û**" bi hev ve tên girêdan. Her hevoka ji van, xwediyê wateyeke serbixwe ye.

**Mînak:**

- Ez nikarim li vir bijîm, ev der pir sar e.
- Rûkenê name dixwend û hevala wê lê guhdarî dikir.

**2- Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî:** Ev cure hevok, çend hevokan di nava xwe de dihewîne; yek ji wan hêmana bingehîn e û yên din jî alîkar in. Ev cure hevok, ji aliyê wateyê ve bi alîkariya hin gihanekan bi hev ve hatine girêdan. Hin ji van gihanekan, ev in: **lê, lê belê, hem**…**hem jî, ne**… **ne jî, belkî, dibe ku, ji ber ku, her wekî, piştî ku**...

**Mînak 1:**

Ji ber ku tu nehatî, bavê min destûra çûna min jî neda.

Gihanek Ramana alîkar Ramana bingehîn

**Mînak 2:**

Heke te alîkariya min bikira, ez ew qas dereng nedimam.

**Gihanek Ramana alîkar Ramana bingehîn**

# RASTNIVÎS

## Destûrên nivîsê

### Rastnivîsa hejmaran

- Di nivîsan de hejmar ta dehan, bi tîpan tên nivîsandin û ji dehan bi şûn de bi jimaran (reqeman) tên nivîsandin.

  **Mînak:**

  Min vê havînê şeş pirtûk xwendin.

  Birayê min, 15 salan li penaberiyê jiyan kir.

## Hêmadanîn

### Sêxal(…)

- Dema ku ji nava gotina yekî din, tiştek hatibe derxistin, wê demê sêxal di nava kevanekê de tê danîn.

**Mînak:** "Çîçek çîçek bi destan

Em li hember rawestan (...)

Da ser derdê Kurdistan" (**Cegerxwîn**)

## HÎNDARÎ

**1-** Du hevokên hêsanî saz bike, yek ji wan lêkerî be û ya din jî navdêrî be.

**2-** Du hevokên hevedudanî saz bike, yek ji wan hevedudanî serbixwe û ya din jî hevedudanî pevgirêdayî be.

**3-** Hevokên li jêr, li gorî avasaziyê ji hev cuda bike.

**a-** Dê û bavên Newrozê çûne ser avê.

**b-** Hevalê min î ku duh li vir bû, ji bo ku debara xwe bike, bi şev û roj kar dike.

**c-** Min bala xwe dayê ku tu qet baş naxebitî.

**d-** Vî karî ez bextewar kirim.

**e-** Xalid serê xwe dişûşt, Ranya firavîn amade dikir û dayîka wan Xatûn jî li benda hevjînê xwe bû.

## WANE 5

# DIBISTAN



Destpêkê bi navê Yezdan
Ev e diçim dibistan

Divê êdî bixwînim
Bo rastiyê bibînim

Da her tiştî bizanim
Heya ku pê bikarim

Welatê xwe bistînim
Neyaran jê derînim

Em in xweyî war û şûn
Doza me ye serxwebûn

Serxwe nabe Kurdistan
Bê xwendin û dibistan

***(Osman Sebrî)***

## WATEYA PEYVAN

**Yezdan:** Xweda, afirîner

**Neyar:** Dijmin, kesên ku li dijî hev şer dikin.

**War û şûn:** cih, welat, şop

**Doz:** daxwaz

**Serxwebûn:** serbestî

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Osman Sebrî,** di sala 1905'an de li gundê Narincê yê girêdayî Semsûrê ji dayîk bûye. Piştre, di sala 1915'an de bavê wî jiyana xwe ji dest dide.

Osman Sebrî, di sala 1922'yan de xwendina xwe bi dawî kiriye.

Osman Sebrî, weke gelek kesên din ên kurd, ji ber ku têkoşîna xwe ya ramanî, bi awayekî aşkere tîne ziman, gelek caran rastî êrîşên dewletê tê û tê binçavkirin.

Piştre, koçberî Sûriyeyê dibe, dîsa rastî astengiyên desthilatdariya Fransayê tê ya ku wî mişextî Girava Madagaskar dike. Bi tevahî, mayîna wî ya li zîndanan, dibe 12 sal.

Osman Sebrî, di sala 1993'yan de li Şamê jiyana xwe ji dest da û li goristana şehîdan a li Berkevirê ya girêdayî Dirbêsiyê hat veşartin.

**Hin berhemên wî:**

**1-** Bahoz
**2-** Derdên Me
**3-** Çar Leheng
**4-** Dîwana Helbestan
**5-** Giramera Kurdî

## PIRS

**1-** Çima helbestvan girîngî daye xwendinê?
**2-** Li gorî helbestvan, çi têkilî di navbera rastî û xwendinê de heye?
**3-** Li gorî helbestvan, çi têkilî di navbera serxwebûna Kurdistanê û xwendinê de heye?
**4-** Bi çend hevokan, li ser girîngiya xwendinê û bandora wê ya li ser siberoja civakê, hestên xwe vebêje.

## RÊZIMAN

**Cînavk:** Ji peyvên ku di hevokê de cihê navdêran digirin re **cînavk** tê gotin.

Em ê niha jî çend cureyên cinavkan nasbikin.

### Cînavkên şanîdanê:

Ji cînavkên ku şûna navdêran digirin û heyînan nîşanî mirov didin re **cînavkên şanîdanê** tê gotin**.**

Cînavkên şanîdanê, di nava xwe de dibin du cure:

**1- Cînavkên şanîdanê yên xwerû**
**2- Cinavkên şanîdanê yên tewandî**

**1- Cînavkên şanîdanê yên xwerû:** Ev cînavk, ji aliyê zayendê ve nêtar in, yekjimarî û pirjimariya wan ji cînavkên kesandinê diyar dibe. Ev cure cînavk; (**ev, ew**)

| **Ev (nêzîk)** |
|---|
| Ev pênûs e. **(yekjimar/mê û nêr)** |
| Ev pênûs in. **(pirjimar)** |
| **Ew (dûr)** |
| Ew çiya ye. **(yekjimar/mê û nêr)** |
| Ew baxçe ne. **(pirjimar)** |

**Mînak:**
Ev jêbir e.

Ev jêbir in.

Ew nexşe ye.

Ew nexşe ne.

## RASTNIVÎS

### Destûrên nivîsê

**Rastnivîsa navên biyanî:**

- Navê neteweyên ku tîpên latînî bi kar tînin, divê weke rastnivîsa zimanê resen bên nivîsandin.

**Mînak:** George Bush, Christophorus Columbus, Thomas Alva Edison ...

**Hêmadanîn**

**Dunik (“ ”)**

**1-** Gotinên ku tên veguhastin, dikevin nava **dunikê**.

**Mînak:**

Pêşiyên me gotine: “Rih dibe bost, dijmin nabe dost”

**2-** Ji bo balkişandina li ser peyveke di nava hevokê de ew peyv dikeve nava **dunikê**.

**Mînak:**

- Ew pirtûka wî ya “yekem” e.
- Em li ser mijara “lêkeran” rawestiyan.

## HÎNDARÎ

**1-** Pênc cureyên cînavkan bi nav bike û li ser her cureyê hevokekê saz bike.
**2-** Du hevokan li ser cînavkên şanîdanê yên xwerû saz bike.
**3-** Cînavkên li jêr, li gorî cureyên wan bi nav bike.
**min**, **ev**, **em**, **wan**, **hin**, **im**, **ê**, **xwe**, **gelek**, **hûn**, **te**, **pir**

# HÎNDARÎ

**A- Ji bo pirsên li jêr, vebijêrka rast nîşan bike.**

**1-** Hevok, li gorî wateyê; dibin:
**a-** du beş **b-** sê beş **c-** çar beş **d-** pênc beş

**2-** Hevoka "Şervan di nava sermaya zivistanê de berxwedanê dikin." hevokeke;
**a-** pirsiyarî ye **b-** erênî ye **c-** neyînî ye **d-** baneşanî ye

**3-** Piştî hevokên ku ji ber sedemekê nehatine sergihayîkirin, kîjan hêma tê danîn.
**a-** xal **b-** sê xal **c-** bêhnok **d-** xalbêhnok

**4-** Ji hevokên li jêr, kîjan jê lêkerî ye?
**a-** Awaza bilbil, gelekî xweş e.

**b-** Şagirtek di refê de ket û destê wî birîndar bû.

**c-** Zivistana par, pir sar bû.

**d-** Huda, xwendekareke pir serkeftî ye.

**5-** Ji hevokên li jêr, kîjan jê xwerû ye?
**a-** Ez dixwazim avjeniyê bikim, lê ez nizanim.

**b-** Min karê xwe qedand, paşê derketim ji malê.

**c-** Xelîl her şev di demjimêr 11'an de radikeve.

**d-** Ger tu alîkariya min bikî, ez ê zû karê xwe biqedînim.

**6-** Ji bo balkişandina li ser peyveke di hevokê de ew peyv dikeve nava;
**a-** yeknikê **b-** dunikê **c-** kevanekê **d-** kevaneka çarçik

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Xizanî | Tevger, nesekinîna li cihekî |
| Kever | Çirisîn, biriqîn |
| Liv | Hejarî |
| Teyisîn | Avjenî, soberî |
| Melevanî | Dijmin |
| Neyar | Belek, reş û spî |

**C- Hevokên li jêr ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**a)** Hevokên erênî, diyar dikin ku karê ku lêker radigihîne; hatiye kirin, tê kirin an jî dê were kirin ( )

**b)** Bi danîna pêvekên (**na**, **ne**, **ni**, **bê**) ya li pêşiya lêker, an jî pêveberê, hevok dikeve rewşa pirsiyariyê. ( )

**c)** Hevokên ku ji bo hest, tirs, qehr û xweşiyê balê dikişînin, weke hevokên baneşanî tên bikaranîn. ( )

**d)** Hejmarên ku bi gihaneka “**û**”yê bi hev ve hatine girêdan, ji hev cuda tên nivîsandin. ( )

**e)** Ji hevokên ku bi alîkariya lêkera “**bûn**”ê û cînavkên kesandinê tên sazkirin re hevokên lêkerî tê gotin. ( )

**f)** Lêkera “**bûn**”ê, dema ku rewşê nîşan dide, hevokên navdêrî saz dike. ( )

**g)** Hejmarên ku bê gihanek gihaştine hev, bi hev ve tên nivîsandin. ( )

**h)** Hevokên hevedudanî yên serbixwe, ji çend hevokên li pey hev rêzkirî pêk tên û bi alîkariya gihaneka “**û**” û bêhnokê bi hev ve tên girêdan. ( )

**i)** Di nivîsan de hejmar ta dehan bi reqeman tên nivîsandin û jê bi şûn de bi tîpan tên nivîsandin. ( )

**j)** Cînavkên şanîdanê yên xwerû sê ne; **ev**, **em**, **ew**. ( )

**k)** Peyvên ku di hevokê de cihê navdêran digirin, ji wan re **cînavk** tê gotin. ( )

# BEŞA 2

## WANEYÊN BEŞA DUYEM


**1- Çand û Huner**

**2- Şam Şekir e Welat Şêrîntir e**
**(Helbest)**


**3- Azadiya Tûtî ji Rikehê**

**4- Selemêş**

**5- Dayîk (Helbest)**

## WANE 1

# ÇAND Û HUNER




Ji bo naskirina gelan; çand û huner cihekî girîng digirin. Dema ku huner tê gotin; wênekêşî, peykertraşî, avahîsazî, hunerên xemilandinê, şano, muzîk û wêje tên bîra mirov. Wêne, peyker, avahî, awaz, roman û serpêhatiyek; di mirovan de hestên bedew û ciwan şiyar dikin.


Her wiha, di her demê de jî, ji bo hunerên bedew girîngiyeke mezin hatiye nîşandan. Girêdayî vê, hunerên bedew ji bo naskirina gelan, risteke girîng dilîzin. Di hunera kurdî de gelek tiştên dişibin hev, hene. Ev şibandin, weke; dengbêjî, govend û lîstinên bêpeyv (pandomîm) in.

Di heman demê de huner bi xwe jî, çanda mirovan e. Çand, hemû tiştên ku di encama keda mirovan a dîrokî de hatine afirandine. Çand, nasnameya kes û civakê ye. Her civak, bi çanda xwe ve tê nasîn. Mînak; civaka kurd, bi mêvanperweriya xwe, cil û bergên xwe, berxwedêriya xwe û hwd. ve tê nasîn. Her wiha, kes jî bi çanda xwe ve tê nasîn, ev jî dibe cudahiya kes a ji kesên din.

Çand, ji du aliyan ve tê destgirtin; çanda daringî û çanda rewanî. Mînak; avahî, cil û berg, xwarin, teknîk, huner û hwd. çanda daringî ne. Ol, bawerî, rêzgirtin û hwd. çanda rewanî ne. Çand, di dema seretayî (civaka xwezayî) de ji ber pêwîstiyan pêş ketiye.

Her netewe û civak, pêwîst e xwedî li çand û hunera xwe derkeve. Ji ber ku her netewe, bi çand û hunera xwe ve tê nasîn. Em dikarin bi riya saziyan, çand û hunera xwe zêdetir biparêzin.
Ji bo xwedîderketin û pêşxistina çand û hunera kurdî, gelê kurd jî gelek navendên weke; HUNERKOM, TEV-ÇAND, Navenda Çanda Mezopotamya(NÇM) û hwd. ava kirine. Xwedîderketina li çand û hunerê; mafê xwezayî yê her civak û neteweyê ye.







## WATEYA PEYVAN

**Wênekêş:** Kesê ku karê kişandina wêneyan dike.

**Peykertraşî:** Peykervanî, karê çêkirina peykeran.

**Avahîsazî:** Hunera avakirina xanî, qesr û avahiyan.

**Awaz:** Şêwe û dengê muzîkê.

**Roman:** Çîrokên dirêj.

**Serpêhatî:** Serborî, bûyerên ku hatine serê mirovan.

**Afirandin:** çêkirin, sazkirin, peydakirin

**Mêvanperwerî:** Rêzgirtin û xizmeta mêvanan.

**Berxwedêrî:** Berxwedanî

**Daringî:** Şênber(madî)

**Rewanî:** Razber(manewî)

**Bawerî:** Îman, yeqîn

## PIRS

**1-** Di mijara te xwendî de navê kîjan huneran derbas bûn?
**2-** Ji bo naskirina gelan, çi rista hunerê heye?
**3-** Çand, çi ye?
**4-** Navê du saziyên kurd ên çand û hunerê, binivîse.

## RÊZIMAN

**Cînavkên şanîdanê yên tewandî:** Ev cure cînavk, şeş in;

**a- Vî**: Yekjimar, nêr nêzîk **b-** **Vê**: Yek jimar, mê nêzîk **c-** **Van**: Pirjimar, nêzîk
**d- Wî**: Yekjimar, nêr dûr

**e-** **Wê**: Yekjimar, mê dûr
**f-** **Wan**: Pirjimar, dûr

**Mînak:**

- **Vî** mala xwe bar kir.
- **Vê** helbesteke balkêş xwend.
- **Van** ji me re stranek got.
- **Wî** ji min re got.
- **Wê** şîretek li min kir.
- **Wan** karê xwe neqedand.

## RASTNIVÎS

## Destûrên nivîsê

### Rastnivîsa navên biyanî:

- Navên biyanî yên ku ji bilî tîpên latînî bi kar tînin, weke; erebî, kirîlî, dê bi awayê ku tên bilêvkirin bên nivîsandin; ango navên Rûsî, Çînî û Japonî, navên Yewnanî û Silavî bi awayê ku tên xwendin dê bên nivîsandin.

**Mînak:** Mao, Arîsto, Xuroşof

## Hêmadanîn

### Dunik (“ ”)

- Navên pirtûk, rojname, kovar û nivîskaran, ji bo balkişandinê dibe ku di nava dunikê de bên danîn.

**Mînak:** - Min duh beşek ji “Şerefnameyê” xwend.

- Mamosteyê wejeyê, destana “Mem û Zîn” ji me re şîrove kir.

## HÎNDARÎ

**1-** Cînavkên şanîdanê yên tewandî diyar bike, her yekê li gorî bikaranîna wê, şîrove bike,
**2-** Sê hevokan li ser cînavkên şanîdanê yên tewandî, saz bike.
**3-** Cihên vala bi cînavkên şanîdanê dagire.

- …. pirtûka mamoste ye.
- …. şagirtî nameyek nivîsî.
- …. hevalê ez ji mirinê rizgar kirim.
- …. şehîdan rûmeta me parast.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Ger dostê te hingiv be; tevî nealîse.
**2-** Çûkekî di dest de, çêtir e ji dehên li ser darê.

## WANE 2

# ŞAM ŞEKIR E WELAT ŞÊRÎNTIR E



Wêlatê min tu wî bûka cîhanî
Hemî bax û bihuşt û mêrg û kanî

Şepal û şeng û şox û naz û gewrî
Gelek şêrîn û rind û pir ciwanî

Serî taca Selahedînê kurdî
Enî roja, di birca asîmanî

Du birhên te kevanên Rustemê Zal
Du zilfên te ji tîrên qehremanî

Riwê te agirê Zerdeşt û Mazdek
Ji te hêstir şeraba Kamîranî

Herê bûkê pepûkê jar û mestê
Li ser sînga te zava man biyanî

Te reş daya serê xwe ber li ser me
Li te rokê dibî pîroz kitanî

Cegerxwîn e kurê te her dinale
Ji ber jana nezanî û xizanî

**(Cegerxwîn)**

## WATEYA PEYVAN

**Bax:** Baxçe, gulîstan, cihê ku gul an jî dar lê hatine çandin.

**Bihuşt:** Cinet, cihê pir xweş.

**Şepal:** Piling

**Gewr:** Boz

**Birh:** Birû, mûyên li raserî çavan û li jêrî eniyê.

**Qehremanî:** lehengî, xweşmêrî, camêrî, wêrekî

**Zerdeşt:** Damezirînerê oleke ku pêşiyên kurdan pê bawerî tanîn.

**Mazdek:** Damezirînerê olekê ya di dema zerdeşt de.

**Pepûk:** rezîl, riswa, bêçare, hejar

**Mest:** Serxweş, kesê ku mey vexwariye û di bin bandora wê de ye.

**Jan:** êş, azar

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

### CEGERXWÎN (1903-1984)

Cegerxwîn, di sala 1903'yan de li Hesara girêdayî Kercewsa Mêrdînê ji dayîk bûye. Navê wî yê resen, Şêxmûs e. Navê bavê wî, Hesenê kurê Mihemed e. Di zarokatiya xwe de şivanî û gavanî kiriye. Hîn di biçûkaniya wî de bav û diya wî jiyana xwe ji dest dane. Sêwî dibe û li cem xwişka xwe Asya, dimîne. Li cem Mele Ubeyd, hînî zanista olî bûye. Destûrnameya xwe ya olî û zanistî standiye.

Cegerxwîn, di sala 1984'an de li Stokholmê jiyana xwe ji dest daye.

**Hin berhemên wî:** Heşt dîwanên helbestan, Gotinên

Pêşiyan(1957), Awa û Destûra Zimanê Kurdî(1961), Ferhenga Kurdî(1962).

## PIRS

**1-** Helbestvan, welatê xwe dişibîne çi?
**2-** Çima helbestvan, bûkê weke pepûkê dibîne?
**3-** Çima helbestvan, her tim dinale?
**4-** Nêrîna xwe ya li ser vê helbestê, diyar bike.

## RÊZIMAN

### Cînavkên pirsiyariyê

Ji peyvên ku pirsê ji navên nehatî diyarkirin, an pirsê ji karê wan dikin re **cînavkên pirsiyariyê** tê gotin.

**Mînak:** **Kî** ye? **Kê** got?
**Çend** hatin? **Kîjan** a we ye?

Dema ku em temaşe dikin, dibînin ku di mînaka yekem de; pirsa navê nediyar hatiye kirin, di mînaka duyem de; pirsa kesê kar kirî tê kirin, di mînaka sêyem de; pirsa jimara navên nehatine diyarkirin, hatiye kirin û di mînaka çarem de jî; pirs kiriye ka kîjan heyîn a we ye.

- **(kî/kê):** Ev her du cînavk, pirsa kesan dikin; **kî** pirsa peyvên xwerû dike û **kê** pirsa peyvên tewandî dike.

**Mînak:**

Kî hat? **Ew** hat. (Bersiv, cînavka xwerû ye.)
Kê pirsî? **Wê** pirsî. (Bersiv, cînavka tewandî ye.)

- (**Çi**) Ev cînavk, pirsa tiştan dike.

**Mînak:**

Te çi kir?
Ew çi dixwe?

- (**Çend**) Ev cînavk, pirsa cînavkên jimarîn dike.

**Mînak:**

- **Çend** hatin? Pênc hatin.

Hin cînavkên din ên pirsiyariyê: (çawa, çima, kengî, kîjan, çi qas...)

# RASTNIVÎS

## Destûrên nivîsê

**Rastnivîsa navên biyanî:**

- Heke navek di kurdî de bi cih bûbe û rengekî kurdewarî girtibe, ew bi wî awayî tê nivîsandin.

**Mînak:**

- Edene, Enqere, Bexda, London, Berlîn, Evdilah, Evdirehîm, Silêman, Ûsiv, Cebar…

## Hêmadanîn

**Yeknik (‘ ’)**

Dema ku mirov neçar bimîne ku hevoka di nava dunikê de dîsa bixe nava dunikê, wê demê yeknik tê bikaranîn.

**Mînak:** Mamosteyê wêjeya kurdî, ji min pirsî; “Dîwana ‘Kî me ez’ berhema kîjan helbestvanî ye?”

## HÎNDARÎ

1- Du hevokan li ser cînavkên pirsiyariyê (**kî**, **kê**), saz bike.

2- Cînavkên pirsiyariyê; “**çi**, **kîjan**, **çend**” di sê hevokan de bi kar bîne.

3- Cihên vala yên di hevokên li jêr de bi cînavkên pirsiyariyê yên guncav dagire.

- …….. şagirt di ezmûnê de bi ser ketin? Deh şagirt.
- …….. pirsa min kir? Hevalê te Hesen.
- …….. çû pirtûkxaneyê? Mehmûd çû.
- We ……. helbest ji ber kir? Helbesta “Kî me ez?”

WANE 3

# AZADIYA TÛTÎ JI RIKEHÊ



Dibêjin, di rojên kevn de bazirganek hebû. Tûtiyekî bazirgan hebû. Tûtiyê bazirgan, tim û tim jiyana xwe di rikehê de derbas dikir û ji vê jiyana girtî, pir dilêş û tengav bûbû. Rojekê bazirgan ji bo karê bazirganiyê bike, berê xwe da bajarê Ûrmiyê. Ji zarokên xwe re got: Ka we çi divê, ez ji we re bînim? Her yekî tiştek xwest. Piştre, bazirgan çû ber rikeha tûtî û jê re got: Wa tûtiyê delal! Ez ê biçim rêwîtiya Ûrmiyê, ka daxwaza te çi ye?

Tûtî got: Ger te di riya xwe de tûtiyên hevalên min dîtin, silavên min bigihîne wan û rewşa jiyana min ji wan re bêje.

Bazirgan got: Baş e. Bazirgan bi rê ket, di rêwîtiya xwe de di daristaneke mezin re dibore. Ji nişka ve çavên wî bi refeke tûtiyan ket ku li ser çîmeneke rengîn awaz dixwendin. Daxwaza tûtî, hat bîra bazirgan. Bazirgan ber bi refa tûtiyan ve çû, silav kir û got: Ka pêşengê we kî ye?

Di nava tûtiyan de yek derket û got: Ez im pêşengê refê.

Bazirgan, serboriya tûtiyê xwe yê di rikehê de ji wî re got. Pêşengê tûtiyan di heman demê de xwe li xakê da û bû tayek

dar. Te digot qey ev salek e miriye. Bazirgan, gelek bi vê bûyerê êşiya û riya xwe girt û çû. Piştî ku bazirgan karê xwe pêk anî û vegeriya malê, ji bo her zarokê xwe diyariyek anîbû, bazirgan çû dîtina tûtî. Tûtî jê pirsî: Ka te ji min re çi anî?

Bazirgan serê xwe tewand. Nexwest ew bûyera ku dîtiye, ji tûtî re bêje. Lê ji ber daxwaza tûtî, bazirgan got: Rewşa min û pêşengê tûtiyan, ev e.

Dema tûtî axaftina bazirgan bihîst, wî jî hema xwe li erdê da û xwe mirand. Hingî bazirgan pê re axivî: Ka rabe tu çima wisa dikî? Lê, bêfêde bû.

Bazirgan, di dilê xwe de got: Diyar e ku ji qehra hevalê xwe miriye. Rabû, tûtî ji rikehê derxist û bir nava baxçeyê malê û li wir danî. Dema ku tûtî xwe ji derve dît, ji nişka ve rabû ser xwe, çû ser darê û got:

Bazirgan, te baştirîn xelat ji min re anî, ew xelat jî azadiya min a ji rikehê bû.

## WATEYA PEYVAN

**Tûtî:** Firindeyeke rengîn e ku bi lasayîkirina dengê mirovan navdar e.

**Bazirgan:** Kesê/a ku tiştan dikire û difiroşe, tacir.

**Tengav:** Aciz, kesê di rewşeke teng de.

**Ûrmiye:** Bajarekî li Rojhilatê Kurdistanê ye.

**Rêwîtî:** Sefer, gera ji cihekî ber bi cihekî din ve.

**Daristan:** Cihê ku gelek dar lê hatine çandin û şîn bûne.

**Ref:** Gelek kes, an jî tiştên li gel hev, kom, kerî.

**Pêşeng:** Rêber, serok

**Xelat:** Diyarî

## PIRS

**1-** Bazirgan ji bo karê xwe, berê xwe da ku derê?
**2-** Bazirgan, ji zarokên xwe re çi anî?
**3-** Çima tûtiyê di rikehê de xwe weke miriyan kir?
**4-** Encama ku mirov ji vê çîrokê bigire, çi ye? Ji vê encamê re çi tê gotin?

## RÊZIMAN

- **Cînavkên kesandinê (pêvekên kesane):**

Ev cure cînavk, weke paşgir bi dawiya lêkeran ve dibin, lê ji navdêr, hevalnav û cînavkan cuda tên nivîsîn.

| **Mînak:** | **Mînak:** |
|---|---|
| Ez diç**im** zanîngehê. | Ez Ehmed **im**. |
| Tu diç**î** zanîngehê. | Tu Rodî **yî**. |
| Ew diç**e** zanîngehê. | Ew **e** xwediyê vê pirtûkê. |
| Em diç**in** zanîngehê. | Em **in** ên welat diparêz**in**. |
| Hûn diç**in** zanîngehê. | Hûn jîr **in**. |
| Ew diç**in** zanîngehê. | Ew jêhatî **ne**. |

Li hemberî her cînavka kesane ya xwerû, cînavkeke kesandinê heye.

| **Cînavkên kesane yên xwerû** | **Ez** | **Tu** | **Ew** | **Em** | **Hûn** | **Ew** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **Cînavkên kesandinê** | im/me | î/yî | e/ye | in/ne | in/ne | in/ne |

- Weke ku li jor jî derbas bû, du dirûvên cînavkên kesandinê hene. Diyarkirina wan, li ser bingeha tîpa dawî ya peyva beriya wan e. Dema ku tîpa dawî ya peyvê, dengdar be; (**im, î, e, in**) tên bikaranîn, lê dema ku tîpa dawî ya peyvê, dengdêr be; (**me, yî, ye, ne**) tên bikaranîn.

**Mînak:**

- Ez xwendekar **im**, lê birayê min mamoste **ye**.
- Tu xemsar **î**, yan jêhatî **yî**?

- Ez Cûdî **me**, lê ew Xalid **e**.
- Deh ji van şagirt **in** û du mamoste **ne**.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

### Nivîsandina lêkerên bidaçek:

Ev cure lêker, dema ku weke lêker di hevokê de were bikaranîn, hêmanên wê ji hev cuda tên nivîsandin, lê dema ku weke navdêr were bikaranîn, hêmanên wê bi hev ve tên nivîsandin.

**Mînak: -** Sala xwendinê bi dawî bû.
- Bidawîbûna ezmûnê, cihê kêfxweşiya şagirtan e.

## Hêmadanîn

**Dabir (’)**

25. Di kurtenivîsa peyvan de pêveka tewangê bi riya dabirê tê veqetandin.

**Mînak:** YPG’ê rûmeta gelên Rojava parast.

- Di hejmaran de pêveka tewang û veqetandekê bi dabirê ve tên veqetandin.

**Mînak:** Di 19'ê Tirmihê de 2012'an de şoreşa Sûriyeyê dest pê kir.

## HÎNDARÎ

**1-** Sê hevokan ku tê de cînavka kesandinê piştî lêkerê be, saz bike.
**2-** Çar hevokan ku tê de cînavka kesandinê, piştî navdêr û hevalnavê be, saz bike.
**3-** Hevokekê saz bike ku tê de cînavka kesandinê, piştî cînavka kesane ya xwerû be.
**4-** Cihên vala, bi cînavkên kesandinê yên guncav, dagire. - Ez şagirtekî jîr …. - Osman xortekî bejinzirav ….
- Hûn ji ku derê ….? - Navê me Adil û Cemal ….
- Zarok ji seyrangehê hat…

## WANE 4

# KEWAR (SELEMÊŞ)



Bû zîqîna deriyê dar û vebû. Bavê min bi lez û bez hat. Rûyê wî bi xwêdan bû; gelo ji nava zeviya bidar, bi vê dasa sincirî ve çima hatibû?

Beriya ku em jê bipirsin, ji min re got: Bilez! Selemêşa li cem kewarê bîne. Baqek nefel jî, ji bîr neke.

Di cih de ez bezîm, dema ku me li tengezariya bavê xwe dinêrî, me digot: Roja ku em li hêviyê ne, hatiye.

Dema ku min xwe amade kir û ez hatim binê daran, dayîka min kenî û dara tûyê nîşan da û got: Binêre Egîdê min; çûka bihuştê hat!

Çîqê mêşa hingîvîn pê ve tewa bû. Hê jî libên mêşan li asîmanan dizivirîn. Di bêdengiya geştê de awaza wan bi nav û deng bû.

Komika şilxê, bi awayekî zindî hev du girtibûn. Bi wan perîkên xwe yên kurt û tenik ve li ber tavê dilerizîn. Selemêşa

ku şerbeta şekir û nefel lê hatiye kirin, me hêdîka nêzîkî şilxê kir. Dema ku dayîka min çîq hejand, mêş ket nava selemêşê û me selemêş li binê darê bi cih kir. Me serê wê, bi giya ve nixumand.

Rûyê bavê min ê bixwêdan, bi xweşî vebû û got: Selemêş nîvî bû. Ez bawer dikim, şilxa destpêkê ye. Dibêjin şilxa destpêka, bihêz e.

Serê xwe, bi aliyê Mêhrê ve zivirand. Belê, ji vî milî ve weke ewrekî biçûk derketin û hatin. Dara me ya tuwê hilbijartin. Niha mêşeke me heye. Bavê min, destên xwe yên nerm danî ser serê min û got: Ev mêşa te ye lawê min; divê tu çavê xwe vekî û baş lê xwedî derkevî.

Mêşvanî, karekî zanînê dixwaze. Temaşe bike, sê beşên mêşên hingiv hene; mêşên dayîk, mêşên nêr û mêşên karker. Kurê min, her mêş karekî wê heye. Hemû mêş jî, erkdar in. Mêş, zû digihêjin û zû zêde dibin. Piştre, me cihê selemêşa xwe li ber dîwarê xaniyê xwe yê li milê başûr çêkir. Ez gelek dilşad bûm. Êdî selemêşeke min jî çêbû.

## WATEYA PEYVAN

**Selemêş:** Kewar, cihê ku mêş tê de tên bicihkirin.

**Zîqîn:** Dengê vekirina derî.

**Xwêdan:** Dema ku mirov zêde germ dibe, ava ku li ser laş çêdibe.

**Das:** Amûreke ku darên zirav pê tên birîn.

**Sincirî:** Pir germ, keliyayî

**Nefel:** Navê giyayekî, cureyeke gulên sêpelî ku kulîlkên wan spî, yan jî sor in.

**Tengezarî:** bêzarî, acizî, tengijîn

**Şilx:** Mêşên ku bi aweyekî kom ji dayîka xwe cuda dibin.

**Perîk:** Çeng

**Mêhrê:** Navê gundekî yê Botanê ye. Hingivê wan, bi nav û deng e.

**Hilbijartin:** Bijartina kes, an jî tiştekî.

**Mêşvanî:** Pîşeya xwedîkirina mêşên hingiv.

## PIRS

1- Şilx, li ku derê kom bûbû?
2- Kê şilx xist selemêşê?
3- Ji bo şilxê bixin selemêşê, bi rêzê ve çi hat kirin?
4- Bavê wî der barê mêşan de çi agahî dan wî?
5- Selemêş, li ku derê bi cih bû?

## RÊZIMAN

### Gihanek:

Her wekî ji navê wê diyar e ku gihanek bi serê xwe, ne xwediyê tu wateyê ye. Lê belê peyvan û hevokan bi hev ve girê didin, an jî peyvekê bi hevokekê ve girê didin.

Hin gihanek; **her wiha, lewre, ango, ji bilî, lê belê, ji ber vê yekê, lewma, ji ber ku, û…**

**Mînak:**

- **Ji ber ku** bajar ji gundê me dûr e, ez bi tirimbêlê diçimê.
- Ez ji wêjeya kurdî hez dikim, **lê belê** dîrok jî bala min dikişîne.
- Hevalê min pir dixwend, **lewma** ew di ezmûnê de bi ser ket.
- Cîhad **û** Mehmûd di bîrkariyê de pir serkeftî ne.
- Ez duh nexweş ketim, **ji ber vê yekê** ez neçûm karê xwe.
- **Ji bilî** sêvan, ez ji fêkiyan hez nakim.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

Her peyv, di hevalkarên hevedudanî de bi serê xwe tê nivîsandin.

**Weke mînak:**

Bi şev, bi roj, ji niha ve, ji niha û bi şûn de, ji îro pê ve…

- Ez, **bi şev** li nûçeyan temaşe dikim.
- **Ji îro pê ve** ez nikarim werzîşê bikim, ji ber ku germahiya rokê pir dijwar e.
- **Ji niha û bi şûn de** divê em xebata xwe zêdetir bikin.

## Hêmadanîn

**Dabir (’)**

- Di kurdî de pêvekên ku rêza hejmaran nîşan didin, bi dabirê ve ji hejmaran tên veqetandin.

**Mînak:** Piraniya mamosteyên Rojava, di kongreya **1’em** de amade bûn.

- Dema ku di bêjeyekê de dengek ketibe, yan jî bi taybetî hatibe xistin, li şûna wî dengî dabir tê bikaranîn.

**Mînak:** Gava ku ew **n'axive**, mirov nizane ku lalûte ye.

## HÎNDARÎ


**1-** Şeş gihanekan rêz bike û sê hevokan li ser wan saz bike.

**2-** Valahiyên li jêr, bi gihanekên guncav dagire.

- Ez ji zimanê kurdî hez dikim, ………….. ez têm saziyê.
- Li gundan karbeşî heye, ………….. her yek karekî dike.
- Me civîna xwe li dar nexist, ……… endamên me kêm bûn.
- Ez ji pirtûkan hez dikim, ……….. ez diçim pirtûkxaneyê.
- Li gundan debar bi ajaldariyê ve dibe, ………… ajal ji bo gundiyan girîng in.
- Ez ji xwendinê hez dikim, …... ez helbestan jî dixwînim.
- ………. meşê, ez qet ji werzîşê hez nakim.

## WANE 5

### DAYÎK



Ji xeyrî dê ma kî m'dilalijîne
Ji xeyrî dê ma kî m'dihejîne
Ji xeyrî dê ma kî ye m'dimijîne
Her dem bi gorî û heyran dilorî

Li dergûşê bi zarokî e'dinivandim
Tar li destan bi nermî e'dihejandim
Li pişta xwe li nava gundî gerandim
Digote ez bi qurban û bi gorî

Devê wê l'ser dêmên min her dimînin
Ji keyfa her rondik ji çav dirêtin
Heger çendî li ber çavan kirêt bim
Li ber çavên wê dimam gula corî

Nikarim ez tu car mafê te bidim
Dibêjin bihuşt di bin piyê dayîkan e
Ger min karîba jiyê te nû bikim
Hin jiyê min ji bo te ba ez gorî

**(Emerê Lalê 'Rêncber')**

## WATEYA PEYVAN

**Dilalijîne:** Çilekiyên zarokan pêk tîne.

**Dihejîne:** Dilivîne.

**Dimijîne:** Dide mêtin.

**Dilore:** Gotinên xemgîn distrê.

**Dinivand:** Dibe sedem ku kesek bikeve xewê.

**Tar:** Amûreke mûzîkê ya kevn e.

**Dêm:** Rûyê mirov (çav, dev, poz…)

**Dirêtin:** Dirijandin

**Kirêt:** Ne xweşik, ne bedew

**Jiyê te:** Jiyana te, temenê te

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Emerê Lalê:** Navê wî yê resen, Emer kurê Hesen kurê Isma'îl e. Bi Emerê Lalê hatiye naskirin, ji ber ku di biçûkatiya xwe de bavê wî jiyana xwe ji dest daye.

Emerê Lalê, di sala 1935'an de li gundê Qesir Dela yê ku dikeve rojhilatê Cizîra Botanê ji dayîk bûye. Piştî şoreşa Şêx Seîdê Pîran, malbata wî neçar dibe ku derbasî rojavayê Kurdistanê bibe û li gundê Eyndîwerê bi cih dibe.
Di 6.11.2011'an de jiyana xwe ji dest dide.

**Berhemên wî:**

Sê dîwanên wî hatine çapkirin.

**1-** Xem û Sawêr
**2-** Çar Çira

**3-** Tewafa Yarê

Helbesteke wî heye, bi awayê malikan hûnandî ye. Ev helbest, geryaneke li Kurdistanê ye, tê de havîngeh, xweşiyên Kurdistanê û hemû tiştan diyar dike. Ev helbest, li Başûrê Kurdistanê hatiye çapkirin.

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan, di malika yekem de dayîk ji bo zaroka xwe çi dike?
**2-** Dayîk çawa zaroka xwe dibîne, tevî ku ew zarok kirêt be?
**3-** Helbestvan, dixwaze çi pêşkêşî dayîka xwe bike?
**4-** Bi çend hevokan, hestên xwe yên der barê dayîka xwe de vebêje.

## RÊZIMAN

**Daçek:**

Ev peyv, bi serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokan ji aliyê wateyê ve sergihayî dikin. Ne ji ber ku xwediyê wateyekê ne, lê ji ber ku xwediyê peywirekê ne, weke peyv tên pejirandin.

**Daçek, li gorî peyvsaziya xwe; dibin du cure:**

**1- Daçekên xwerû(bingehîn):** Hin daçek, ji hêmanekê pêk tên: (**li, bi, di, ji).**
Hin jî, ji du hêmanan pêk tên; ji pêşdaçek û paşdaçekan; **(bi…re, bi…de, bi…ve, di…de, di…re, ji…re, ji…ve)** Ev her du hêman, bêjeyê digirin nava xwe, rewş û cihê navdêrê diyar dikin.

**Mînak:** Min **bi** keviran xaniyek çêkir.
Ew **bi** bavê xwe **re** çû gund.

Hogir **ji** gund derket.

Tu **ji** nişka **ve** winda bûyî.

Ew **di** zinêr werbû.

Ez **di** balafirê **de** gêj bûm.

Ez **li** bajêr dijîm.

**2- Daçekên hevedudanî:** Ev cure daçek, bi piranî ji daçekekê û bêjeyeke ku cih û aliyekî nîşan didin, pêk tê.
Her daçeka xwerû, komek daçekên hevedudanî çêdike.

**bi:** (bi pêş ve, bi jor de...) **li:**(li paş, li ser, li nav…)

**di:** (di bin re, di ber de… **ji:** (ji dûr ve, ji pêş ve...)

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

Dema ku daçeka neyîniyê "**ne**" tê pêşiya lêkeran; pê ve tê zeliqandin, lê dema ku li pêşiya navdêr, hevalnav û cînavkan tê; ji wan cuda tê nivîsandin.

**Mînak:**
Ez **neçûm** pêşengehê, ji ber ku karê min pir bû. (lêker)
**Ne şagirt**, **ne jî mamoste**, mamika min nizanîbûn. (navdêr)
Nîhad, şagirtekî **ne jîr e**, lê jêhatî ye. (hevalnav)
**Ne ez** im ew kesê ku xiniziyê bike. (cînavk)

## Hêmadanîn

**Kevanek ( ):**

- Agahiyên ku cihgirtina wan di nava hevokê de ji sedî sed ne pêwîst be, di nava kevanekê de tên danîn. Bi derxistina van agahiyan, tiştek ji hevokê kêm nabe.

**Mînak:** Meha Cotanê (meha çarem a salê), meha biharê ye.

- Carinan hemwateyên peyvan, di nava kevanekê de tên danîn.

**Mînak:** Em her roj, wisa (welê) bi dilekî geş diçin zanîngehê.

## HÎNDARÎ

**1-** Çar hevokan li ser daçekên xwerû (**bi**, **di**, **ji**, **li**), saz bike ku bê paşdaçek bin.
**2-** Ji her daçeka xwerû, du daçekên hevedudanî peyda bike û li ser her yekê ji wan, hevokekê saz bike.
**3-** Valahiyên di benda li jêr de bi van daçekan dagire. (**li ber**, **di**..**de**, **bi**, **di**…**re**, **ji**)

- Rojekê, roviyek …. kurkê Mele Silêman … … kuna xwe rûniştiye. Dem zivistan e, dunya sar e, xwe … nava kurk … germ kiriye û şêrek …. wê sermayê … ber rovî … derbas dibe.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Ta tu dojehê nebînî, bihûşt bi te xweş nabe.
**2-** Azadî, xweştir e ji her tiştî.
**3-** Heta mirov xwe nas dike, temenê xwe xilas dike.
**4-** Karê demekê, çêtir e ji axaftina salekê.

## HÎNDARÎ

**A- Ji vebijêrkên li jêr a rast hilbijêre.**

**1-** Afirandin, tê wateya;
**a-** darizandin **b-** çêkirin **c-** fêrkirin **d-** amadekirin

**2-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de cînavka şanîdanê heye? Binê wê cînavkê, xêz bike.
**a-** Tu kes nikare ji rastiyê bireve.
**b-** Em her roj li nûçeyan guhdar dikin.
**c-** Vê, berxwedaneke bêhempa kir. **d-** Çi kar hat kirin?

**3-** Navên pirtûk, rojname, kovar û nivîskaran, ji bo balkişandinê, dibe ku bên nivîsandin, di nava;
**a-** dunikê **b-** yeknikê **c-** kevanekê **d-** kevaneka çarçik

**4-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de lêkera bidaçek heye? Binê lêkerê, xêz bike.
**a-** Me pirtûka xwe bi dawî kir.
**b-** Ez li zanîngehê kar dikim.
**c-** Hevalê min Tewfîq ji helbestan hez dike.
**d-** Rodî, li dawiya refê rûdine.

**5-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de gihanek heye? Binê gihanekê, xêz bike.
**a-** Husên karê xwe zû qedand.
**b-** Meryem her êvar diçe gulîstanê.
**c-** Tu di derbarê vê mijarê de çi dihizirî?
**d-** Dayîka min, ji ber ku karê wê hebû, nehat.

**6-** Daçek, li gorî peyvsaziya xwe; dibin:
**a-** du cure **b-** sê cure **c-** çar cure **d-** pênc cure

**7-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de daçeka hevedudanî heye? Binê wê daçekê, xêz bike.
**a-** Semîr li kêleka min rûnişt.

**b-** Ez û Hogir bi balafirê çûn Şamê.

**c-** Kesê li welatê xwe xwedî dernekeve, ew bêrûmet e.

**d-** Dema tu hatî, min tu ji dûr ve dîtî.

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Awaz | Êş, azar |
| Jar | Ne xweşik, ne bedew |
| Kewar | Kesê/a ku tiştan dikire û difiroşe |
| Kirêt | Şêwe û dengê muzîkê |
| Jiyê te | Selemêş |
| Bazirgan | Temenê te |

**C- Vebijêrkên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa - hêma bike û yên şaş sererast bike.**

Navên biyanî yên ku tîpên latînî bi kar tînin, dê bi awayê ku tên bilêvkirin, bên nivîsandin. ( )

**b)** "**kî**" pirsa peyvên xwerû dike û "kê" pirsa peyvên tewandî dike. ( )

**c)** Cînavka pirsiyariyê "**çend**" pirsa tiştan dike. ( )

**d)** Dema ku mirov neçar bimîne, hevoka di nava dunikê de dîsa bixe nava dunikê, wê demê yeknik tê bikaranîn. ( )

**e)** Cînavkên kesandinê, bi dawiya lêkeran ve dizeliqin, lê ji navdêr, hevalnav û cînavkan cuda tên nivîsandin. ( )

**f)** Dema ku tîpa dawî ya peyva beriya cînavka kesandinê dengdar be, ev cînavk (**im**, **î**, **e**, **in**) tên bikaranîn. ( )

**g)** Lêkerên bidaçek, dema ku weke lêker werin bikaranîn, hêmanên wê ji hev cuda tên nivîsandin. ( )

**h)** Di kurtenivîsa peyvan de pêveka tewangê bi riya bêhnokê tê veqetandin. ( )

**i)** Her peyv, di hevalkarên hevedudanî de bi tena serê xwe tê nivîsandin. ( )

**j)** Dema ku di bêjeyekê de dengek ketibe, yan jî bi taybetî hatibe xistin, li şûna wî dengî dabir tê bikaranîn. ( )

# BEŞA 3

## WANEYÊN BEŞA SÊYEM

**1- Hezkirina Pirtûkan**

**2- Bîst û Yekê Adarê (Helbest)**

**3- Mih, Şêr û Gur**

**4- Aşût**

**5- Bihar (Helbest)**

WANE 1

# HEZKIRINA PIRTÛKAN



Di zarokatiya min de şahiya min a herî şêrîn, qulibandina pelên pirtûkên biwêne bû. Her rûpela biwêne ya pirtûkê, bi hûrbînî ez bi xwe ve dihiştim. Ez dikarim bêjim, dema ku min li wêneyan dinêrî, xweza dihat bîra min. Li gorî min, bi wêne jî be, dîtina daran pir watedar e.

Dema ku pirtûkek li pêşiya min vekirî bûya, min ê xwe ji tevahiya şehzadeyên çîrokan bextewartir bidîta. Reng, sih û xêzikên li hemberî min, pir bandor li min dikirin.

Piştî min dest bi xwendinê kir, girêdana min a bi pirtûkan ve zêdetir bû. Niha, ji bo ku ez li ser rûpelekê heya êvarê dihatim çemandin, pêwîstî bi wêneyekê tune ye. Eger di pirtûkê de çend rêzên ku mirov bixwîne hebin, ez dikarim wê pirtûkê zû bixwînim û derbas bibim. Hêj ez nebûbûm deh salî, min gelek pirtûk xwendin û kom kirin. Weke xwendina pirtûkan, dîtina wan jî pir kêfa min tîne.

Dema ku min serê xwe ji ser pirtûkê radikir, di serê min de pir xeyal derbas dibûn. Pirtûkên ku min xwendine, di serê min de zindî dibûn.

Carinan peyvekê ez dihizirandim. Carinan min hevokeke pir xweş didît û ji ber dikir. A herî zêde peyvên min nedizanîn, ji min re girîngtir dihatin. Ez dihizirîm ku ji bo hînî wateya wan peyvan bibim, pêwîstiya min bi pirtûkxaneyeke dewlemend hebû. Eger ez nebim xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend, ditirsiyam ku ez hînî wateyên wan peyvan nebim.

## WATEYA PEYVAN

**Şahî:** aheng, xweşî, cejn

**Rûpel:** Aliyekî pelê.

**Watedar:** Xwedî wate.

**Şahzade:** Zarokên şah, an jî paşeyan.

**Bextewar:** Kesê/a ku bextê wî/ê xweş û ji rewşa xwe razî ye.

**Çemandin:** Tewandin.

**Xeyal:** Di mejiyê xwe de çêkirina tiştekî.

**Zindî:** giyandar, candar

**Pirtûkxane:** Cihê pirtûk lê tên komkirin û belavkirin.

## PIRS

1- Çima nivîskar dema ku zarok bû, bêhtir ji pirtûkên biwêne hez dikir?

2 - Kengî nivîskar xwe ji şahzadeyên çîrokan, bextewartir didît?

3 - Piştî nivîskar dest bi xwendinê kir, têkiliya wî ya bi pirtûkan re çawa pêş ket?

4 - Nivîskar, çima dixwest bibe xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend?

5 - Di benda destpêkê ya nivîsa we xwendî de çend hevok hene, her hevok çi dide têgihandin?

## RÊZIMAN

Jimar û hemû taybetmendiyên wan diyar dikin, ji wan re **hevalnav(rengdêr)** tê gotin.

**Hevalnav, di nava xwe de dibin pênc beş:**

**1-** Hevalnavên çawaniyê(wesfî).
**2-** Hevalnavên şanîdanê
**3-** Hevalnavên pirsiyariyê
**4-** Hevalnavên jimarîn
**5-** Hevalnavên nebinavkirî(nediyar).

**1- Hevalnavên çawaniyê (wesfî):** Ev cure hevalnav, çawaniya navdêran nîşan didin. Ev hevalnav, bi du awayan bi navdêrê re têkildar dibin:

**a- Bi alîkariya veqetandekê:**
**Mînak:** "mirov**ê** baş" "keçik**a** bedew" "xort**ê** jêhatî" "dar**a** hişk"

**b- Bi alîkariya lêkera "bûn" ê:**
**Mînak:** "Ev dar hişk e." "Xaniyê me fireh e." "Çiya bilind e."

**Mînak li ser hevalnavên çawaniyê:**

- Hevala min a **çeleng** baş dixebite.
- Karika **biçûk** winda bûye.
- Hespê min **beza** ye.

**Neyîniya hevalnavên çawaniyê:** Ev cure hevalnav, bi alîkariya daçeka "**ne**" dikeve rewşa neyîniyê. Ev daçek, dikeve pêşiya hevalnavê û jê cuda tê nivîsîn.

**Mînak:**
- Ev wenê **ne bedew** e.
- Ev xwarin **ne xweş** e.

**Têbînî:** Ev cure hevalnav, tu pêvekan nagire; ji bilî pêvekên payeya hevalnavan (**tir**, **tirîn**).

**Mînak:**

- Amed, ji Qamişlo mezintir e.
- Dirêjtirîn çemê cîhanê, Çemê Nîl e.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

Di payeya hevalnavan de dema ku du tîpên wekhev, an jî nêzî hev di bilêvkirinê de tên gel hev, yek ji wan dikeve.

**Mînak:**

- Xurt+ tir = xurtir
- Bilind + tir = bilintir
- Kurt + tirîn = kurtirîn

## Hêmadanîn

### Kevanek ( ):

- Nivîsandina orîjînal a peyvên biyanî, di nava kevanekê de tê danîn.

**Mînak:** Albert Einstein, zanyarekî navdar e.

- Dîrokên destpêkirin û bidawîbûnê, di nava kevanekê de tên danîn.

**Mînak:** Şerê yekem ê cîhanê (1914-1918) pir dijwar bû.

## HÎNDARÎ

**1-** Du hevokan saz bike ku tê de hevalnavên çawaniyê bi alîkariya veqetandek û lêkera “**bûn**”ê bin.

**2-** Sê hevokan saz bike ku tê de hevalnavên çawaniyê di rewşa neyîniyê de bin.

**3-** Du hevokan saz bike ku tê de hevalnavên çawaniyê pêvekên (**tir**, **tirîn**) girtibin.

**4-** Valahiyên li jêr, bi payeya hevalnavan dagire.

**H)** Fîl, ji mişkê …………….. e.

**I)** Şam şekir e, lê welat ……….….. e.

**J)** Çiyayê Hîmalaya, …………….. çiyayê cîhanê ye.

## WANE 2

# BÎST Û YEKÊ ADARÊ



Bîst û yekê Adarê, hezar carî bi xêr hat
Di dewrana biharê, Newroz û cejna welat

Agir li deşt û çiyan, pêtî jê diçne banî
Li çar goşê Kurdistan, dikî şewq û xuyanî

Ew agirê dilê me, pêtî jê diçne ezman
Perava xwe da welat, deşt û çiya û zozan

Keç û xortên di kurdan, li her war û der û cî
Bi ser bejna xwe berdan, xeml û xêza kurmancî

Keç û xort û mêr û jin, dikin pîroziya hev
Tev rûgeş in, devliken bi ax û xweziya hev

Heta ku em nebin yek, nabe tu kar û xebat
Goga xwe em nabin şeg, azad nabe ev welat

Daxwaza min ji dinyê, ji vê pê ve min navê
Tîrêj li ser we û wan, dike her dem silavê

**(Seydayê Tîrêj)**

## WATEYA PEYVAN

**Pêt:** Beşa herî bilind a agir.

**Goşe:** qorzî, quncik

**Şewq:** ronahî, nûr

**Rûgeş:** şad, kêfxweş

**Şeg:** Nîşangeh, cihê ku gog armanca xwe lê pêk tîne.

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Seydayê Tîrêj,** di sala 1923'yan de li gundê Nicim ê girêdayî Hesekê ji dayîk bûye. Navê wî yê resen, Nayif Heso ye. Dema ku ew dibe şeş salî, bavê wî mala xwe koç dike û li gundê Sêmitik bi cih dibin. Tîrêj, li wê derê li cem mele Ibrahîmê Golî Quranê û çend pirtûkên olî dixwîne. Di sala 1937'an de hatiye Amûdê û li wê derê dest bi dibistanê kiriye. Li wir pênc salan dibistan xwendiye. Lê ji ber mercên aborî, xwendina xwe nedomandiye. Li wê derê, têkiliyên wî bi helbestvanên mezin, ên weke; Cegerxwîn, Qedrî Can, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza re xurt bûne. Bi bandora wan jî, evîna nivîsandina helbestê di dilê wî de şax daye. Bi wan re xebata welatparêziyê kiriye, weke gelek welatparêz û rewşenbîrên kurdan. Her wiha, S. Tîrêj di bin bandora Cegerxwîn de dimîne û di navbera salên 1948-1952'yan di nava refên aştîxwazan de kar dike. Di sala 1952'yan de ji aliyê hêzên parastinê ve tê girtin û dîwaneke ji helbestên wî yên belav nebûye, tê desteserkirin. Di sala 1973'yan de berê xwe dide Hesekê û li wir bi cih dibe. Di 23.3.2002'yan de jiyana xwe ji dest dide.

## PIRS

1- Kîjan bone (helkevt) di 21'ê Adarê de heye?
2- Li gorî helbestvan, di malika çarem de keç û xortên kurdan, çawa Newrozê pêşwazî dikin?
3- Peyva agir a di hevoka "Ew agirê dilê me, pêtî jê diçne ezman" tê çi wateyê?

## RÊZIMAN

**1-Hevalnavên şanîdanê:** Ew hevalnavên ku navan ji aliyê nîşandanê ve diyar dikin, ji wan re **hevalnavên şanîdanê** tê gotin. Ev hevalnav, bi xwe cînavkên şanîdanê ne.

Cînavkên şanîdanê yên xwerû "**ev, ew**" dema ku dikevin pêşiya navdêran, wan nîşanî mirov didin, dibin hevalnavên şanîdanê.

Dema ku em dibêjin: "**Ev çû mala xwe.**" "**Ev**" cînavka şanîdanê ye. Lê dema ku em dibêjin: "**Ev heval çû mala xwe.**" "**Ev**" dibe hevalnava şanîdanê. Her wiha, ev tişt li ser cînavkên şanîdanê yên tewandî jî pêk tê.

**Mînak:**

I) **Ev** mal, ji mala me xweşiktir e.
J) **Ew** rez ê pismamê min e.
K) **Vî** lawikî têr nan nexwar.
L) **Vê** rastiyê li her cihî bêje.
M) **Van** karkeran pir dijwarî kişand.
N) **Wî** xortê bejnbilind alîkariya min kir.
O) **Wê** keça xweşik guh neda min.
P) **Wan** hevalên li jor, berxwedaniyeke bêhempa kir.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsê

Dengdêrên kurt ên mîna “**i**”, “**u**”, “**e**” yên ku tîpa “**h**”yê li ber wan heye, dema ku “**h**” ji ber wan radibe, cihê xwe ji dengdêrên dirêj ên mîna “**î**”, “**û**”, “**o**” û “**a**”yê re dihêlin.

**Mînak:**

| **Awayê dirêj** | **Awayê kurt** |
|---|---|
| Cih | Cî |
| Mih | Mî |
| Rih | Rî |
| Sih | Sî |
| Duh | Do |
| Tirih | Tirî |
| Suhtin | Sotin |

### Hêmadanîn

**Kevanek ( ):**

- Di deqên (tekstên/nivîsarên) şanoyê de liv û tevgera lîstikvanan, di nava kevanekê de tê danîn.

**Mînak:** - Kalo (hêdîka nêzîkî fêkîfiroş bû û bi dengekî nizm) got: Ka xwarzê du kîlo sêv bide min.

û Fêkîfiroş (bi lez ji cihê xwe rabû) got: Tu bi xêr hatî xalo, tu sêvên zer dixwazî yan ên sor?

## HÎNDARÎ

1- Kengî cînavkên şanîdanê, dibin hevalnavê şanîdanê? Bi du mînakan diyar bike.

2- Du hevokan ku tê de “**ev**” û “**ew**” hevalnavên şanîdanê bin, saz bike.

3- Sê hevokan, li ser “**vî, vê** û **wan**” ku tê de hevalnavên şanîdanê bin, saz bike.

## WANE 3

# MIH, ŞÊR Û GUR



Hebû tune bû, carekê ji caran êleke koçeran bar kir, mihek li şûna warê wan ma. Mihê jî rê girt, çû çû rastî mêrgekê hat; mêrgeke pir xweş bû. Mihê di mêrgê de warê xwe çêkir û za; du berxên mê anîn.

Rojekê mihê dît ku vaye şêrek bi ser de hat.

Şêr, jê re got: Tu çima li vê derê yî?

Mihê got: Bi saya serê te, ku tu mîrê daristanê yî, ez û berxikên xwe li vê derê, di vê mêrgê de diçêrin.

Şêr got: Qet tu xeman mexwe, dilaram be, ez parêzerê te me.

Şêr bi riya xwe de çû, mih û berxikên xwe man li mêrgê.

Rojekê, mihê dît ku vaye gurek hat.

Gur, jê re got: Ma tu nizanî ku ev mêrg a min e? Tu bêyî ku pirsê ji min bikî, hatiyî û tê de diçêrî.

Mihê got: Ev mêrg a şêr e.

Gur got: Na, ev mêrg a min e, heke careke din ez vegerim û te li vê derê bibînim, ez ê berxikên te bixwim. Gurî da rê û çû.

Rojekê, şêr li welatê bin destê xwe digeriya, hat li ser mêrgê jî, mih hat hal û rewşa xwe û gur jê re got.

Şêr gava bihîst, ji mihê re got: Guhê xwe bide min, ka ez ji te re çi dibêjim, ez ê xwe di pişta wî kevirî de veşêrim, gava gur hat û gote te: “Ev mêrg a min e” tu bêje: “Na, ev mêrg a şêr e”.

Heke got: “Na, ev mêrg a min e.” tu bêje: “Hema sê gavan ber bi wî kevirî ve bavêje û sond bixwe û bêje: “Bi vî kevirî, ev mêrg a min e.” ez ê bipejirînim.

Şêr rabû û xwe li pişta kevir veşart.

Demek di ser re derbas bû, gur hat û gote mihê: Hê tu li vir î, ma min ji te re negot, ji vir here!

Mihê got: Ev mêrg a şêr e.

Gur got: Na! Ev mêrg a min e.

Mihê got: Sê gavan ber bi wî kevirî ve bavêje û pê sond bixwe,

ez ê bipejirînim.

Gur jî li tiştekî wiha digeriya, hema ber bi kevir ve çû û hejmart: Ev gavek, ev du gav û ev sê gav…

Di gava sêyem de çavên wî bi yên şêr ketin, tirsiya destê xwe avêt pêsîra xwe û got: Bavo, ez bextê xwe xera nakim, ev mêrg a şêr e.

Dema ku wiha got, şêr rabû û ber bi wî ve hat û jê re got: Belê guro, ji ber ku te ez li pişt kevir dîtim, ev bû mêrga min, lê gava ez ne li vir bûm, ev mêrg a te bû.

Şêr, hema pencek li qehfê gur da û gur di cih de kuşt û got: Bila tu bibî îbret, ji kesên ku zêdegaviyan dikin re.

## WATEYA PEYVAN

**Êl:** hoz, eşîr, qebîle

**Mîr:** qral, padîşah

**Çêrin:** Dema ku lawir li çolê giyayan dixwin.

**Dilaram:** Bêtirs, bi ewlekarî

**Parêzer:** Kesên ku kesine din diparêzin.

**Gav:** Livandina lingan.

**Sond:** soz, qesem

**Pejirandin:** Qayîl bûn, razî bûn.

**Pêsîr:** bersing, paxil

**Penc:** lep, neperûşk

**Qehf:** Hestiyê serî.

**Zêdegavî:** destdirêjî, zordarî

## PIRS

1- Dema ku mihê şêr dît, şêr çi jê re got û mihê çi lê vegerand?
2- Dema ku mihê gur dît, gur çi jê re got?
3- Dema ku gur sê gav avêtin û şêr dît, çi got?
4- Sojeya vê çîrokê çi ye?

### Destûrên Ziman

**2- Hevalnavên pirsyariyê:** Ev cure hevalnav, tên ber navdêran û ji wan pirsa hevalnavan dikin, ji ber vê yekê ev nav li wan hatiye kirin. Her yek ji hevalnavên pirsiyariyê, pirsa cureyeke hevalnavan dike.

**1- Çawa**: Pirsa hevalnavên çawaniyê dike.
**Mînak:** Salih hevalekî **çawa** ye? Salih hevalekî **baş** e.
**2- Kîjan:** Pirsa hevalnavên şanîdanê dike.

**Mînak:** **Kîjan** xwendekar bi ser ket? **Ev** xwendekar bi ser ket. **3- Çend:** Pirsa hevalnavên jimarîn dike.

**Mînak:** **Çend** zevî hatin avdan? **Çar** zevî hatin avdan.

**4- Çi qas:** Pirsa hevalnavên jimarîn ên ku ji aliyê mêjerê ve nayên hejmartin, dike.

**Mînak:** **Çi qas** xwarin ma? **Piçek** xwarin ma.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsê

**Nivîsîna lêkerên bidaçek:**

**Lêkerên bidaçek:** Ev cure lêker, bi alîkariya daçekan sergihayî dibin. Weke; bikaranîn, lidarxistin, bidawîbûn…

Ev cure lêker, dema ku weke lêker were bikaranîn; hêmanên wê ji hev cuda tên nivîsîn, lê dema ku weke navdêr were bikaranîn; bi hev ve tê nivîsîn.

**Mînak:** Me duh şahiyek **li dar xist**. (weke lêker)
**Lidarxistina** şahiyê hinekî dereng bû.(weke navdêr)

## Hêmadanîn

**Kevanek ( ):**

Dema ku mirov agahiyekê ji berhemekê veguhêze, navê nivîskarê berhemê di nava kevanekê de tê danîn.

**Mînak:** Mey nenoşî Şêxê Senanî xelet,

Ew neçû nêv Ermenistanê xelet

Mislê Mûsa wî tecellaya te dî

Ê tu dî kanî xeta, kanî xelet

**(Melayê Cizîrî)**

## HÎNDARÎ

**1-** Hevalnavên pirsiyariyê, pênase bike û sê hevokan li ser wan saz bike.

**2-** Valahiyên li jêr, bi hevalnavên pirsiyariyê dagire.

- ……… zarok ji darê ket?
- ……… pirtûk vê heyvê te xwendin?
- ……… pûş te da hev?

**3-** Bi alîkariya hevalnavên pirsiyariyê, ji bo her hevoka li jêr pirsekê saz bike.

- Mingeleklawirxwedîkirin.
  …………………………..?
- Hevalêminpênûsekesordamin.
  ………………………?
- Xwişkaminpêncdarêngulançandin.
  ………………….?
- Ev mamoste, jêhatî ye. …………………..?

**WANE 4**

# AŞÛT



Weke hemû demsalan, gelek taybetî û bedewiyên girêdayî demsala zivistanê jî hene. Jixwe, ew berfa ku dibare, zarok di nav de bi gulatan dilîzin. Ev jî, aliyekî xweş ê zivistanê ye. Bi taybetî, xiroşa xişikandina li ser berfê, tiştekî pir cuda ye.

Çêkirina bûka berfê û piştre xweragirtina li ber gulatên berfê, di hewaya sar de lîstin çi qas xweş e!

Di zivistanê de gelek aliyên berfê yên nebaş jî hene. Aşût, dibe sedema karesatên mezin, jê re **dojeha spî** tê gotin.

Barîna berfa zêde ya li herêmên çiyayî û cihên bilind, qateke berfa stûr çêdike. Aşût, bi lerizîna her cihekî berfê ve çêdibin. Qata berfê, di encama şikestinê de ji jor ber bi jêr ve her ku gêr dibe, koma berfê mezintir dibe. Dema ku ev koma berfê, rastî cihên avahî tên, malan bi tevahî wêran dikin. Malên ku di bin berfê de dimînin, hildiweşin.

Aşût, ne tenê ji berfa zêde ya li ser hev kom dibe, carinan ji ber

sedema barîna berfa zêde çêdibe. Carinan jî, ji ber germbûna xakê, aşût çêdibin. Valahiya di van tebeqeyan de dibe sedem ku berf bi hêsanî bilive û bişemite. Gurîna asîman, dengên mirov, an jî dengê top û tifingan dibe sedema livîna berfê.

Li navendên xişikandinên berfê, bi taybetî cihên ku aşût lê çêdibin, pêwîst e her gav daxuyaniyên şiyarkirina gel bên dayîn. Ewlekariya herî girîng a li hemberî aşûtê, cihên ku berf lê heye, carinan mirov bixwe lerizandinan pêk bîne û berfa aşûtan kêm bike.

Her wiha, pêdivî bi çandina daran û parastina daristanan heye. Ji ber ku astengiya herî bingehîn a li pêşiya aşût û heziyana xakê, dar û daristan in.

## WATEYA PEYVAN

**Aşût:** Şape, şemitîna berfa kom a ji jor ber bi jêr ve.

**Gulat:** girêk, şaltî

**Xişikandin:** xirikandin, xirxirandin

**Bûka berfê:** Awayê mirov ku ji berfê tê çêkirin.

**Xweragirtin:** Xweparastina di rewşên teng de

**Dojeh:** Cehneme, cihê sezakirina mirovên gunehkar.

**Qat:** Tebeqe, tiştên ji heman cureyê yên li ser hev.

**Gêr dibe:** Digindire.

**Karesat:** felaket, bobelat

**Ewlekarî:** Xweparastina li hemberî metirsiyan.

**Hezandin:** zelandin, tehisandin, şemitandin.

**Heziyan**: Veguhezîna xakê, yan jî berfê ji cihekî ta cihekî din.

## PIRS

1- Di nivîsê de kîjan taybetmendiyên demsala zivistanê hene?
2- Çima ji aşûtê re dibêjin; "dojeha spî"
3- Aşût, çawa çêdibe?
4- Ji bo ku em ji aşûtê xwe biparêzin, divê em çi bikin?
5- Di mijarê de parastina li hemberî aşûtê di kîjan bendê de tê vegotin?

## RÊZIMAN

**3- Hevalnavên jimarîn:**

Dema ku jimarnav tên ber navdêran, dibin hevalnavên jimarîn.

Ji ber ku navdêran, ji aliyê hejmarê ve bi me didin nasîn. Mînak; dema ku em dibêjin "Çar gundiyan nan xwar." hejmara "**çar**" taybetmendiyeke gundiyan, ango hejmara wan bi me dide nasîn, ji ber vê yekê jî dibe hevalnav.

**Mînak:**

**G)** Sê xwişkên wî hene.
**H)** Pênc hevalên min bi min re hatin.
**I)** Du mihan bikire û sê gîskan bifiroşe.
**J)** Çaryek nanî bixwe û nîvî bide min.

Hevalnavên jimarîn, li gorî taybetmendiyên jimarnavan, bi vî awayî ji hev cuda dibin:

**1- Bi jimarnavên bingehîn re: Mînak:**
Du bûkên mala apê min hene.

**2- Bi jimarnavên rêzîn re:** Berovajî jimarnavên bingehîn, piştî navdêran tên û bi veqetandekan rêza navdêran nîşan didin.
**Mînak:** Di waneya çarem de mamoste nexweş ket.

**3- Bi hejmarên şikestî (dabeşkirî) re:**
**Mînak:** - Ji sedî çil karê min qediya.
- Min du kîlo û nîv sêv kirîn.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsê

**Nivîsîna daçekan**

- Daçek, erkên cuda li peyvê bar dikin û bi piranî ji peyvan cuda tên nivîsîn.

**Mînak:** - Ew, ji dibistanê zû derket.

Birayê min, bi balafirê çû Şamê.

I) Daçekên “**bi**, **bê**” dema ku rista pêşgiran bi cih tînin û ji navdêran hevalnavan çêdikin; bi bêjeyê ve tên nivîsandin, lê dema ku hevalkaran çêdikin; cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** - Kesê **birûmet** stûxwariyê napejirîne.

J) Min mêvanê xwe **bi rûkenî** pêşwazî kir.
K) Jiyana **bêrûmet**, ne tu jiyan e.
L) Welat **bê ked û xebat** pêş nakeve.

## Hêmadanîn

**Kevanek ( ):**

Di veguhastinan de cihê ku nehatiye wergirtin, di nava kevanekê de bi sê xalan tê nîşandan.

**Mînak:** Ehmedê Xanî, di berhema xwe ya navdar “Mem û Zîn” de bi van gotinan qala Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran dike:

(...)

Bînave riha Melayê Cizîrî

Pê hey bikira Elî Herîrî

Keyfek wê bida Feqiyê Teyran

Heta bi ebed bimayî heyran

(...)

## HÎNDARÎ

1- Kengî jimarnav, dibin hevalnavên jimarîn? Bi du mînakan diyar bike.
2- Du hevokan li ser hevalnavên jimarîn ên rêzîn, saz bike.
3- Du hevokan li ser hevalnavên jimarîn ên şikestî, saz bike.
4- Sê hevokan li ser hevalnavên jimarîn ên bingehîn, saz bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Av, her tiştî dişo; lê şermê naşo.
**2-** Zimanê xweş, mar ji kunê dertîne.
**3-** Xwehr rûne, rast biaxive.

## WANE 5

## BIHAR




Gava dinê dibe bihar
        Dibişkivin devî û dar.

Zozan têne guhartin zû Mîna
        cilên bûkên ji nû.

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul
        Direvînin xeman ji dil.

Dinya dibe wek gola şîn
      Çîçek didin, sed rengî bîn.



Xesma siban berbangê zû
       Tev radibin, ew teyr û tû.

Vêk re dikin şahî û saz
       Hişyar dibin hulik û baz.

Bilbil dibe dengbêjê wan
       Dike qîrîn ji dil û can.

Pîroz dikin rojên ji hev
       Hîn xweştir e bihara şev.

**(Osman Sebrî)**

## WATEYA PEYVAN

**Dibişkivin:** Vedibin.

**Devî:** Dehl, darên biçûk.

**Çîçek:** Kulîlk û gul.

**Xesma:** bi taybetî, nemaze

**Hulik :** golik

**Baz:** Balindeyeke dirinde ye.

**Vêk re:** Bi hev re.

## PIRS

1- Dema ku dunya dibe bihar, çi li dar û zozanan tê?
2- Li gorî helbestvan, nêrgiz, sosin û kulîlk çi bandorê li ser hestê mirovan dikin?
3- Dema ku bihar tê, çi bandor li ser teyr û bazan dibe?
4- Bi çend hevokan, nêrînên xwe yên li ser helbesta "Bihar"ê diyar bike.

## RÊZIMAN

**4- Hevalnavên nebinavkirî:**

Dema ku cînavkên nebinavkirî tên ber navdêran, dibin **hevalnavên nebinavkirî**.

Mînak; dema ku em dibêjin, "**Hinek** mirov hatin vir." Tê zanîn ku mirovin hatine, lê hejmara wan ne diyar e, ango nebinavkirî ye.

Her wiha, dema ku em dibêjin, "Min **piçek** xwarin xwar."

Qasiya xwarinê ne diyar e. Ji hevalnavên wiha re **nebinavkirî** tê gotin.

**Mînak:**

G) **Hin** berx li mêrgê diçêrin.
H) **Gelek** kar hatin kirin.
I) **Tu** mirov bêyî welat nikare bijî.

- **Çend** heval hatin mala me.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

### Nivîsîna daçekan

H) Hin hevalnav hene ku ravebera wan ketiye û weke navdêr tên bikaranîn, di wan hevalnavan de jî daçek bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** Li bêkesan xwedî derneketin.

Bêwijdan li mala xwe rûdinin.

- Daçekên hevedudanî ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** Di ser de, bi şûn de, bi jor ve...

## Hêmadanîn

### Kevaneka çarçik [ ]

**1-** Dema ku di nava kevanekê de pêwîstî bi kevanekeke din hebe, kevaneka çarçik tê bikaranîn.

**Mînak:** Helbestvanê navdar ê kurd Cegerxwîn [ê ji Hesarê (gundekî Kercewsê ye)] di Kovara Hawarê de gelek berhemên xwe weşandine.

**2-** Ji bo hin hûrgiliyên nasnavan, tê bikaranîn.

**Mînak:** Feqiyê Teyran [Mihemed kurê Mîr Ebdal] destana Zembîlfiroş nivîsandiye.

**3-** Di wergirtinan de ji bo ravekirinê, kevaneka çarçik tê bikaranîn.

**Mînak:** Pêvajo [pêvajoya şoreşê] dê bi dawî bibe.

## HÎNDARÎ

**1-** Çi cudahî di navbera cînavkên nebinavkirî û hevalnavên nebinavkirî de heye?
**2-** Du hevokan li ser cînavkên nebinavkirî, saz bike.
**3-** Sê hevokan li ser hevalnavên nebinavkirî, saz bike.
**4-** Peyva “**çend**” di du hevokan de bi kar bîne, carekê weke hevalnava pirsiyariyê û careke jî weke hevalnava nebinavkirî.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Erd birinc be, av rûn be, ku xwedî tune be, xelas dibe.
**2-** Pirsker be, da tu zana bî.

## HÎNDARÎ

**A- Ji bo pirsên li jêr, vebijêrka rast nîşan bike.**

**1-** Hevalnav, di nava xwe de dibin;
**a-** du beş **b-** sê beş **c-** çar beş **d-** pênc beş

**2-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de hevalnava çawaniyê heye? Binê wê xêz bike.
**a-** Ez bilez ji mal derketim.
**b-** Ev heval çû mala xwe.
**c-** Keçika bedew bala min kişand.
**d-** Hin xwarin ji ber me ma.

**3-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de hevalnava şanîdanê heye? Binê wê xêz bike.
**a-** Çend heval bi min re hatin malê.
**b-** Vî xortê bejnbilind alîkariya min kir.
**c-** Sê xwişkên wî dixwînin.
**d-** Kesê birûmet ji welatê xwe hez dike.

**4-** Peyva "**penc**" tê wateya;
**a-** dest **b-** ling **c-** lep **d-** rû

**5-** Di hevoka li jêr de kîjan peyv hevalnava jimarîn e?
"Çaryek nanî bixwe û hinekî bide min."

**a-** nanî **b-** çaryek **c-** bixwe **d-** hinekî

**6-** Peyva "**bêrûmet**" a di hevoka li jêr de çi cureya peyvê ye?
"Jiyana **bêrûmet**, ne tu jiyan e."

**a-** navdêr **b-** lêker **c-** hevalkar **d-** hevalnav

**7-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de hevalnava nebinavkirî heye? Binê wê xêz bike.
**a-** Gelek xwendekar di ezmûnê de bi ser ketin.
**b-** Pênc karker ji kar hatin dûrxistin.
**c-** Xalid sê kîlo tirî kirîn. **d-**
Ev xwendekar gelekî jîr e.

**8-** Ji bo hin hûrgiliyên nasnavan, kîjan hêma tê bikaranîn?
**a-** dunik **b-** kevanek **c-** kevaneka çarçik **d-** dabir

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Goşe | Qral, padîşah |
| Gêr dibe | Awayê mirov ku ji berfê tê çêkirin. |
| Mîr | Bi taybetî |
| Çemandî | Qorzî, quncik |
| Bûka berfê | Digindire |
| Xesma | Tewandî |

**C- Vebijêrkên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**G)** Ji peyvên ku bi piranî piştî navan tên û reng, awa û hemû taybetmendiyên wan diyar dikin re "**hevalkar**" tê gotin. ( )
**b)** Hevalnavên çawaniyê, çawaniya lêkeran nîşan didin. ( )
**c)** Hevalnavên çawaniyê bi du awayan bi navdêran re têkildar dibin; bi alîkariya veqetandek û lêkera "**bûn**"ê. ( ) **d)** Di payeya hevalnavan de dema ku du tîpên wekhev, an jî nêzî hev, tên gel hev, yek ji wan dikeve. ( ) **e)** Nivîsandina orîjînal a peyvên biyanî di nava dunikê de tê danîn. ( )
**f)** Hevalnavên şanîdanê, bi xwe cînavkên nebinavkirî ne. ( )
**H)** Cînavkên şanîdanê yên xwerû (**ev**, **ew**) dema ku dikevin pêşiya navdêran, wan nîşanî mirov didin û dibin hevalnavên şanîdanê. ( ) **h)** Di deqên (nivîsarên) şanoyê de liv û tevgera lîstikvanan, di nava kevanekê de tê danîn. ( )
û Hevalnavên pirsiyariyê tên ber navdêran û ji wan pirsa hevalnavan dikin, ji ber vê yekê ev nav li wan hatiye kirin ( )
û Lêkerên bidaçek, dema ku weke lêker bên bikaranîn, hêmanên wê ji hev cuda tên nivîsîn. ( ) **k)** Dema ku mirov agahiyekê ji berhemekê veguhêze; navê nivîskar, di nava dunikê de tê danîn. ( ) **l)** Dema ku jimarnav tên ber navdêran, dibin hevalnavên jimarîn. ( )

# BEŞA 4

## WANEYÊN BEŞÊ

**1- Lehengê sêdarê**

**2- Diyariya yarê (Helbest)**

**3- Qero (Çîrok)**


**4- Ferhat û Şêrîn**

**5- Sebra û Şatîla (Helbest)**

**WANE 1**

# LEHENGÊ SÊDARÊ

Seyid Riza, li ber dara sêdarê rawestiya. Destên wî vekirî ne û li her kêleka wî, du leşker hene. Reşik Huseyn û yên din di rêza darvekirinê de bûn. Fermandarê tirk Evdila Alpdoxan, dozger, bijîşk, mela û çend berpirsiyarên din ên dewletê li wan temaşe dikirin. Kurê Seyid Riza, Reşik Huseyn tevî ku birîndar bû jî, tê bidarvekirin.



**DOZGER** – (Diqîre):

“Seyid Riza, kurê wî Reşik Hûseyn û hevalên wan ji ber ku li hemberî dewletê serî hildane, raperîn û pêşengiya serhildanê kirine û xwestine beşek ji xaka Komara Tirkiyê veqetînin û Kurdistaneke serbixwe ava bikin, gunehbarê bidarvekirinê hatine dîtin. Niha jî bidarvekirina wan, dê pêk bê. Ez li gorî toreya zagonan, mafê gotina wan a dawî didim û ji wan dipirsim: Gotina te ya dawî çi ye?”

**SEYID RIZA** - (Bi dengekî bilind û bêminet):

“Li tu deverên cîhanê talankar û zordarên hene, ta dawî desthilatdar namînin. Sazûmaniyên xwînmijiyê bi zordestî û derewan, li ser piyan namînin û temenê wan kin e. (Bi dengekî bilind) Hûn zarokên romiyên bêbext in…Hûn heya qirikê di nava rezîlî û bêşerefiyê de ne….Gelê kurd bi qirkirinê, bi darê zorê, bi bêbextî, bi çewisandinê û bi derewan ji holê ranabe!

Ên ku dibêjin: “Em ê navê kurd û Kurdistanê ji holê

rakin" tu carî ew bi ser nakevin û wê bi ser nekevin.

Ez bi fen û fûtên we xapiyam, ev ji bo min bû derd. Ez jî serê xwe ji we re natewînim, bila ev jî ji we re bibe derd.

Rûreşino! Hûn şerm nakin, lê dîrok şahidê bêbextiya we ye. (Bi dest nîşan dide): Ev çiyayên Kurdistanê, wê rojekê rabin ser piyan.

- Ez 75 salî me. Va ez jî dibim şehîd, tevlî şehîdên Kurdistanê dibim. Serhildan têk diçe, lê kurd û Kurdistan dijîn û dê xortên kurdan tola me bistînin...

Bimirin talankar, mêrkuj û zordar!."

**Reşik Huseyn:**

"Bavo! Bila gelê kurd sax be! Bijî Kurdistan!"

(Seyid Riza, celadê rûreş dehf da û bi destê xwe xilboq xist stûyê xwe, lingê xwe li kursî da û tevlî nemiran bû.)

## WATEYA PEYVAN

**Fermandar:** komutan, amir

**Dozger:** Kesê ji dadgehê ku dixwaze kesekî seza bike.

**Raperîn:** Serhildan, derketina li dijî tiştekî.

**Pêşengî:** serokatî, serkêşî

**Komar:** Dewleta ku serokê wê bi hilbijartinan, an ji aliyê parlemanê ve tê hilbijartin.

**Serbixwe:** Welatê ku ne di bin desthilatdariya dewlet, an jî hêzên derve de ye.

**Gunehbar:** Sûcdar, tawanbar, kesê ku guneh kiriye.

**Zagon:** Destûrên dewletê, yasa.

**Talankar:** Kesê ku tiştên kesên din bi darê zorê dibe.

**Sazûman:** Rêxistin, komek mirov ên ku li gorî rêziknameyekê û ji bo armancekê dixebitin.

**Xwînmij:** Zordar, kesê ku xwîna mirovan dimije.

**Çewisandin:** Stemlêkirin, zordarîlêkirin.

**Fen û fût:** fêlbazî, dek û dolab

**Tore:** kevneşopî, çand

**Xilboq:** Awayekî girêdana benik, ta û werîs e.

## PIRS

1- Çima fermana bidarvekirina Seyid Riza dan?
2- Li gorî nivîsê, kesên li Seyid Riza temaşe dikirin, kî bûn?
3- Dozger, ji Seyid Riza çi pirsî?
4- Baweriya Seyid Riza bi kê dihat ku tola wan hildin?
5- Li ber darvekirinê, Reşik Huseyn çi got?

## RÊZIMAN

**Hevalkar:** Ji bêjeyên ku wateya lêker, hevalnav, hevalkarên weke xwe ji aliyê dem, cih, ber, rewş, rêje û hejmarê ve sergehayî dikin re **hevalkar** tê gotin.

Ji ber ku hevalkar, bi gelemperî hevaltiya lêkerê dike jê re **hevalkar** tê gotin.

**Peyvsaziya hevalkaran:** Ji ber ku hevalkar, bi piranî di bingeha xwe de hevalnav û navdêr in, zêde cudahî di navbera wan, navdêr û hevalnavan de jî tune ye. Bo mînak; hevalkarên cih, bi piranî navê cihekî ne. Her wiha, hevalkarên demê jî, navê demekê ne. Li aliyekî din, hevalkarên çawaniyê jî bi piranî hevalnav in. Hevalkar, li gorî peyvsaziyê; dibin du cure:

**1- Hevalkarên xwerû:** zû, hêdî, duh, niha, pêr, paş, pêş, vir, wir, hîn, par, pir …

**2- Hevalkarên nexwerû:** îro, îşev, nîvro, bi şev, bi roj, betir pêr, şeva din, roja çûyî, serêvarkî, berî nîvro…

Hevalkarên nexwerû, bi alîkariya daçek, pêşgir û paşgiran, pêk tên;

**1- Bi alîkariya daçekan:** bi şev, bi roj, ji niha ve, ji îro pê ve, mîna mirovan, fena zarokan, di ser de…

**2- Bi alîkariya:**

**a- Pêşgiran:** **î**şev, **î**ro, **î**sal…

**b- Paşgiran:** serser**kî**, pêşpê**kî**, çîti**kî**, nîvro**kî**, êvar**kî**, roj**ane**, mêr**ane**, hêdî**ka**…

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsê

#### Nivîsîna daçekan

3. Di hin peyvan de daçekên hevedudanî yên ku ji pêşdaçek û paşdaçekê pêk tên, dema ku pêşdaçek bikeve, paşdaçek bi bêjeyê ve dizeliqe.

**Mînak:** dûre, piştre, lewre, peyre...

Ev daçek. di bingeha xwe de bi vî awayî bûn; di dû re, di pişt re, ji lew re, di pey re…

## Hêmadanîn

### Xêzika navber/bendik (-)

**1-** Peyva ku di rêzê de bi cih nabe, bi xêzika navber tê veqetandin (bendik, li dawiya rêzê tê danîn).

**Mînak:** Di vê mijarê de gotina xwe ya dawî got û pirsa te kir.

**2-** Dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de hogirî heye.

**Mînak:** Eger tu çûyî bajêr, ji min re du-sê lênûsan bîne.

**HÎNDARÎ**

**1-** Çima ev nav li hevalkar hatiye kirin?
**2-** Hevalkar, li gorî peyvsaziya xwe; dibin çend cure? Bi mînakan diyar bike.
**3-** Hevalkarên nexwerû, bi alîkariya çi pêk tên? Bi sê mînakan diyar bike.
**4-** Du hevokan li ser hevalkarên li jêr, saz bike.
bi rêk û pêk - salane

## WANE 2

# DIYARIYA YARÊ



Ji dostê re çi rêkim ez diyarî?

Diyara yar dixwazî min bi yarî

Dixwazim can û dil jê re bişînim

Tenê şerm e hemî derd û hejarî

Dixwazim her du çavan jê re rêkim

Bi kêr nayên ji wan her xwîn dibarî

Divêm jê re ziman û dev bişînim

Ne hêja ne şev û rojan bizarî

Nizanim ez çi hêja ye ku rêkim

Cîhan pêk ve buhayê biskê tarî

Serî neçar e min danî li ber pê

Me go şahêm tu pêlêkî b'siwarî

Tenê xanim bi nazî hate ser min

Zivistan e li min şîn kir buharî

Bi wan lêvên şêrîn go: Rabe Seyda

Tu serbest î ji min çi bikî tu karî

**(Cegerxwîn)**

## WATEYA PEYVAN

**Yar:** Kesê/a ku pir jê tê hezkirin. **Hejarî:** xizanî, feqîrî
**Bizarî:** Girîna biqêrîn.
**Bisk:** Zilf, beşa pirçê ya ku dikeve li ser gepê. **Nazî:** xweşikî, delalî
**Serbest:** azad, rizgar

## PIRS

**1-** Yara helbestvan, çi diyariyê ji wî dixwaze?
**2-** Çima helbestvan her du çavên xwe ji yarê re rênake?
**3-** Li gorî helbestvan, biskê yara wî hêjaye çi?
**4-** Hestên xwe yên der barê vê helbestê de vebêje.

## RÊZIMAN

**Cureyên hevalkaran:**
Hevalkar, di nava xwe de dibin şeş beş:
**1-** Hevalkarên çawaniyê
**2-** Hevalkarên şanîdanê

**3-** Hevalkarên demê
**4-** Hevalkarên cih û ber
**5-** Hevalkarên çendanî û hevrûkirinê
**6-** Hevalkarên pirsiyariyê

**1- Hevalkarên çawaniyê:** Ev cure hevalkar, bi piranî hevalnav in, lê çawaniya lêkerê nîşan didin. Bo mînak; dema ku mirov dibêje, "hevala xweşik zû dimeşe." Li vê derê, peyva "**xweşik**" taybetmendiya hevalê bi me dide nasîn, ji ber vê yekê; hevalnav e, lê dema ku em dibêjin; "hevala me xweşik dimeşe" li vê derê "**xweşik**" çawaniya meşê bi me dide nasîn, ji ber vê yekê jî; hevalkar e.

**Hin hevalkarên çawaniye:** zû, dereng, hêdî, bi lez, rasterast, çarmêrkî, çîtikî, bi dizîka, bi nezanî…

**Mînak:**

- Hevala zozan karê xwe **bi rêk û pêk** dike.
- Ez **bi lez** ji vir dûr ketim.
- Kalemêr **hêdî** dimeşin.
- Pirsgirêkê **rasterast** şîrove bike.
- Zarok **çîtikî** li erdê ket.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsê

**Nivîsîna veqetandekan:**

**a-** Veqetandekên "**-a**", "**-ê**", "**-ên**" peyvê bi ravekerê ve têkildar dikin û bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** - Sal**ên** xweş li pey me man.

6. Kevir**ê** reş bînin ji me re.
7. Hêviy**a** me hîn jî heye.

**b-** Di ravekên têkel (zincîrî) de veqetandek peywira cînavkê digire ser xwe û cuda tên nivîsîn. Heke peyva beriya

veqetandekê bi tîpa dengdêr biqede, tîpa kelijandinê “**y**” tê pêşiya veqetandeka serbixwe û dibe “**ya**”, “**yê**” û “**yên**”.

**Mînak:** - Şaredariya mezin **a** Serêkaniyê.

- Desteya Jinê **ya** Kantona Cizîrê.

## Hêmadanîn

### Xêzika navber/bendik (-)

**3-** Di kîtekirina peyvê de xêzika navber dikeve navbera kîteyan.

**Mînak:** Mirov dikare peyva hilweşandin wiha dahûrîne; “hil-weş-andin”, lê belê vekîtandina wê, bi awayê; “hil-we-şan-din” pêk tê.

**4-** Dema ku pêvek tên nîşandan, xêzika navber dikeve aliyê pêvekê ya bi peyvê ve dibe.

**Mînak:** Di zimanê kurdî de hin paşgir hene ku ji navdêr û hevalnavan, lêkerê çêdikin; /-**andin**/ yek ji wan e.

### HÎNDARÎ

**1-** Çi cudahî di navbera hevalnav û hevalkaran de heye? Bi du mînakan diyar bike.
**2-** Hevalkarên çawaniyê, çi bi me nîşan didin? Bi mînakekê diyar bike.
**3-** Sê hevalkarên çawaniyê peyda bike û sê hevokan li ser wan saz bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Aqil taca zêrîn e, lê di serê her kesî de nîn e.
**2-** Bila pişta te li malê te be, ne berê xelkê li malê te be.

# WANE 3

## QERO



Zarokan, dema ku ew li baxçeyê dibistanê dîtin, tirsiyan. Bi laşê xwe yê girs, ji hemû kûçikan cudatir bû. Guhên wî, qutkirî bûn. Bi rengê xwe yê reş, dîmeneke balkêş dida.

Zarok, hêdî hêdî nêzîkî wî bûn. Ji selika xwe, hin parçeyên nan, kade û kutilk jê re avêtin. Kutilk û nanên dihatin avêtin, li hewa digirtin û dixwarin. Sarbûna di navbera kûçik û zarokan de bi vî awayî nema û tirs rabû. Di demeke kurt de di nava wan de hevaltî û dostanî çêbû. Êdî kûçik di demjimêrên destpêkê yên rojê de dihat dibistanê. Piştî zarok diçûn malên xwe, hêdî hêdî ji dibistanê diçû.

Rojekê li dibistanê agahî belav bû ku kûçikên beredayî tên komkirin û kuştin. Di destpêkê de kes nehizirî ku Qero beredayî ye. Dema ku dengê kesên kûçikan kom dikin, li derdora dibistanê belav bû, ji nû ve Qero hat bîra zarokan.

Hevalê herî nêzîkî Qero, Welat, ji Qero re got:

- Were, hin kes hene kûçikan kom dikin. Em ê te di gova vala de veşêrin.

Piştî ku zarokan, Qero kir gova vala, derî girtin. Êdî dilê hemûyan aram bû.

Vê rewşê, hinekî dom kir. Ên Qero li wê derê veşartin, her bêhnekê deriyê wî vedikirin, xwarin û vexwarina wî didanê.

Di rojeke bêdengiya ezmûnê de cardin deng hat bihîstin. Zarokan serê xwe ji ser kaxezan rakirin û li hev meyzandin. Meyzandinên wan herî zêde li ser Welat kûr bûn.

Qero di govê de bû. Ji ber ku Welat, ji beriya ezmûnê karê xwarindayîna Qero pêk anîbû. Hevalê xwe yê di refeke din de di dema ezmûnê de bi qasî hevalê wî bibihîze got: Ev gotina wî bilez "di govê de ye." "Di govê de ye…" Belavî refê bû.

Her çi qas wiha hatibû gotin jî, zarokên ji ezmûnê derdiketin, li Qero digeriyan. Deriyê govê vekirî bû. Lê Qero tune bû.

Ji wê rojê ve û şûn de tu kesî Qero nedît. Lê kesî Qero ji bîr nekir. Man li bendê ku wê rojekê li wan vegere.

## WATEYA PEYVAN

**Ezmûn:** taqîkirin, ceribandin, test

**Kade:** Nanê patîle, nanê ku pir cureyên xwarinê dikevin nav.

**Gov:** Axur, cihê ku lawirên kedî tê de tên xwedîkirin.

**Meyzandin:** temaşekirin, lênihêrtin

## PIRS

**1-** Di serpêhatiyê de Qero kûçikekî çawa ye?
**2-** Zarokan, ji bo hevaltiya Qero çi kirin?
**3-** Zarokan, çima pêwistî bi parastina Qero dîtin?
**4-** Di beşa encamê ya serpêhatiyê de çi tê têgihandin?
**5-** Sojeya vê serpêhatiyê derxe.

## RÊZIMAN

**2- Hevalkarên şanîdanê:**

Ev hevalkar, bi nîşandana karekî ve awayê pêkhatina wî karî vedibêje. Ev hevalkar, dibin du cure.

**1-** Hevalkarên şanîdanê yên ku karên nediyar û dûr, nîşan didin. Ew jî: wisa, wilo, werê…

**2-** Hevalkarên şanîdanê yên ku karên diyar û nêzîk, nîşan didin. Ew jî: wiha, halo, hanî…

**Mînak:**

1. Min ji te re **wisa** negot.
2. **Wiha** kir û **wiha** xwar.
3. Te **werê** gotibû min.
4. Te çilo got, min **wilo** jê re dubare kir.

**3- Hevalkarên demê:**

Ev cure hevalkar, dema kar nîşan dide. Mirov ji van hevalkaran derdixe ku ev kar kengî çêbûye. Dema ku mirov dibêje “îro ez ji gund hatim,” **îro**, di vê hevokê de hevalkara demê ye. Hin hevalkarên demê, ev in: duh, îro nîvro, serê sibê, piştî nîvro, pêr, par, îsal, îşev…

**Mînak:**

1. **Duh** hevalê min hat vir.
2. **Di meha gulanê de** ez ê bêm.
3. **Berêvarkî** were cem min.
4. **Roja duşemê** ev bûyer qewimî.
5. **Serê sibehê** diçe kar, **piştî nîvro** vedigere.
6. Ew ê **îşev** werin mala me.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

- Gihanek û hevalkarên hevedudanî, bi giştî ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** her wiha, her tişt, ew qas, çi qas, her tim, tu kes, tu carî...

- Cînavkên kesandinê, bi lêkeran ve tên nivîsandin. Lê ji hevalnav, cînavk û navdêran ve cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** - Ez diç**im** pirtûkxaneyê.

- Ez baş **im**.
- Tu şagirt **î**?
- Em **in** xwediyê vê xakê.

## Hêmadanîn

### Xêzika axaftinê ( _ )

Dema ku gotûbêj di navbera çend kesan de çêdibe, heke gotina yekî/ê di nava dunikê de neyê nîşandan, wê demê xêzika axaftinê li ber gotina wî/wê tê danîn.

**Mînak:** Cegerxwîn, ji bavê xwe re got:

1. Bavo tu yê kengî herî welêt?
   Bavê wî lê vegerand;
2. Di nêzîktirîn demê de ez ê herim.

## HÎNDARÎ

**1-** Hevalkarên şanîdanê, çend cure ne? Li ser her cureyê, du hevokan saz bike.
**2-** Hevalkarên demê, çi nîşan didin? Bi mînakekê diyar bike.
**3-** Sê hevokan li ser hevalkarên demê, saz bike.

## WANE 4

# FERHAT Û ŞÊRÎN



Dibêjin keçeke bedew a bi navê Şîrîn hebû. Ma kê ev keça bedew nedixwest?! Xortên çeleng, beg, kî û ne kî...

Li milê din, Ferhatê belengaz heye. Ew jî bûbû evîndarê Şêrînê. Ma dibe ku bavê keçikê wê, bide belengazekî weke Ferhat? Na, nade. Ferhat, ne evîndarekî asayî bû, evîndariya Şîrînê, wî digihîne pileya dînbûnê.

Bavê keçikê nedixwest wê bide Ferhat. Ji ber vê yekê, mercekî mezin da ber wî. Rojekê banî Ferhat dike, tîne dîwana xwe û jê re dibêje;

- Ferhat! Ez dizanim tu keça min dixwazî, ez ê bidim te, lê mercekî min heye. Ger tu vî mercî pêk bînî, tu û Şîrînê dê bigihin hev.

Ma wê Ferhat çi bêje, ji vê devnermiyê re? Bêguman, wê bipejirîne. Dengê xwe, dernaxe.

Bavê Şîrînê, mercê xwe datîne holê:

- Lawê hêja, tu dizanî ava bajarê me kêm e, ger tu vî çiyayî biqelêşî û avê ji bajêr re bînî, ez ê Şîrînê bidim te.

Ava dixwest bîne bajêr; ji bajêr pir dûr bû û di navbera avê û bajêr de çiya hebû. Dibêjin; “Tu çiya, xwe li ber zorê nagirin.” Ferhat jî bi tevahiya hêza xwe ve dest bi kar dike.

Dema ku xebata xwe ber bi dawî ve dibe, çend roj ji bo anîna avê ta Qesra Şîrînê dimînin. Evîndariya Şîrînê ya di dilê Ferhat de gurzê wî yê di dest de bi hezkirin û xebatkirina wî, zinaran difelişîne.

Lê dîsa, nahêlin her du evîndar bigihin hev. Miroveke xapînok, dixin navbera wan. Mirova xapînok diçe gel Şîrînê, her wekî cîhan bi serê wê de xerab bûye, bi rewşeke perîşan, dest bi axaftinê dike:

- Tiştên hatine serê min, nepirse keça min! Ferhat hem av neanî, hem jî xwe di zinêr de avêt û xwe kuşt.

Şîrîn, li hemberî tirseke bi vî awayî, ka dê çawa bikare li ber xwe bide?! Ev dilê nazdar, dê piştî niha çawa lê bide?! Belê jiyan li Şîrînê heram e, wê jî tenê bi giyana xwe karîbû.

Mirova xapînok jî karê xwe pêk anî, niha dora Ferhat e. Diçe gel Ferhatê xemgîn, ji qehran, mirov dikare bêje; zimanê wê hatiye girêdan. Bi awayekî nikare ji Ferhat re vebêje.

- Ferhat! Bavê Şîrînê keça xwe daye yekî din, tu hîn jî çima dixebitî?!

Çiya li ser serê Ferhat hilweşiya. Piştî vê, êdî anîna avê jî tu wateya xwe tune ye.

Dibêjin, li serê Çiyayê Ferhat sê gor hene. Dema havîn tê, li hêla tenişta wan du şitlên gulan şîn dibin. Yek ji wan kulîlka sor, yek jî spî pê ve tê, dema ku tam nêzîkî hev dibin û bigihêjin hev, striyek radibe û dikeve di navbera wan de û nahêle bigihêjin hev.

Li gorî destanê tê gotin, herikandina ava Ferhat anî li hin cihan tê dîtin û ji van cihan re jî dibêjin; “Kolanên Ferhat.”

## WATEYA PEYVAN

**Çeleng:** zîrek, mêrxas, qehreman

**Belengaz:** hejar, perîşan

**Evîndar:** Kesê/a ji kesekî/e din pir hez dike.

**Asayî:** normal, ne taybet, ne seyr

**Merc:** şert, pêwîst

**Devnerm:** zarşêrîn, zarsivik

**Bêguman:** Tişta ku guman tê de tune ye, bêşik.

**Biqelêşî:** Qul bikî

**Qesra Şêrîn:** Bajarekî Rojhilatê Kurdistanê yê girêdayî Kirmanşahê ye

**Difelişîne:** Hildiweşîne, dirûxîne

**Xemgîn:** Kesê/a bikul û keser.

**Gurz :** Hesinê sergupik, amûreke şer e.

**Strî:** Cureyek ji şînatiyan e ku serê wan tûj û zirav e.

## PIRS

1- Çima bavê Şîrînê, nedixwest wê bide Ferhat?
2- Bavê Şîrînê, çi merc danî pêşiya Ferhat?
3- Mirova xapînok, bi kîjan gotinan Şîrîn xapand?
4- Sojeya mijarê, çi ye?

# RÊZIMAN

**4- Hevalkarên cih û ber:**

Ev cure hevalkar, cih û berê karê ku tê kirin, nîşan dide.

Bo mînak; dema ku em dibêjin: “Ez ber bi malê ve diçim.” Li vê derê, “**ber bi** … **ve**” berê kar nîşan dide û “**mal**” jî cih nîşan dide. Ji ber vê yekê, "**ber bi**… **ve**” hevalkara ber e û “**mal**” hevalkara cih e.

**Mînak:**

- Ez **bi wir de** çûm. - Ew **li pey hespê** dimeşiya.

**5- Hevalkarên çendanî û hevrûkirinê:**

Ev cure hevalkar, mêjer û radeya karê ku tê kirin, nîşan dide.

Bo mînak; di hevoka “Karmend gelekî meşiyan” de “**gelekî**” qasiya meşînê nîşan dide.

Hin hevalkarên çendaniyê, ev in: kêm, zêde, pir, hindik gelek, herî kêm, herî zêde, piçekî, qet, ta radeyekê…

**Mînak:**

a. Ev heval **kêm** dipeyive, lê yê din **pir** dipeyive.
b. **Herî zû** ew diçin zeviyan.
c. **Car caran** bi min re xwarinê dixwe.
d. Hûn **ji me zêdetir** kar nakin.
e. Em **qet** newestiyan di karê xwe de.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

**Peyvên ku bi tîpa biçûk dest pê dikin:**

**a-** Navê rojan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.

**Mînak:** yekşem, duşem, pêncşem, în ...

**b-** Navê mehan, bi tîpa biçûk dest pê dikin.

**Mînak:** gulan, mijdar, gelawêj, cotmeh...

**c-** Navê ziman û zaravayan bi tîpa biçûk dest pê dikin.

**Mînak:** kurdî, elmanî, erebî, kurmancî, soranî, zazakî...

**- Xêzika xwehr (/)**

**1-** Dema ku malikên helbestê li cem hev tên nivîsîn, bi xêzika xwehr ji hev tên veqetandin.

**Mînak:**

Canfidayê gel, şehîdê welat / Em dikin pîroz cejna te bişewat

**2-** Carinan du tiştên hemwate li cem hev tên nivîsîn, bi xêzika xwehr ji hev tên veqetandin.

**Mînak:** Birc/Bedenên Amedê gelekî kevnar in.

## HÎNDARÎ

**1-** Hevalkarên cih û ber, çi nîşan didin? Bi mînakekê diyar bike.
**2-** Du hevokan li ser hevalkarên cih û ber, saz bike.
**3-** Hevalkarên çendanî û hevrûkirinê, çi bi me nîşan didin? Bi mînakekê diyar bike.
**4-** Du hevokan li ser hevalkarên çendaniyê, saz bike.
**5-** Du hevokan li ser hevalkarên hevrûkirinê, saz bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Mala bêserî, weke xaniyê bêderî.
**2-** Zimanê dirêj, ji xwediyê xwe re bela ye.
**3-** Li her gundî, malekê ava bike.

## WANA 5

# SEBRA Û ŞATÎLA



Şoreşgerêd Felestîn, cengawerê b'nav û deng

Mêrxasî û gernasî, karê we ye roja teng

Tang û topên sehiyonî, çavên we naşikîne

Dijmin vê qenc dizanî, roja cengê dibîne Singê

didin li ber gulan, hûn pêk ve canfîda ne

Yek leşkerê Felestîn, hemberî sedê wan e

Xwîna we û gelê kurd, hat rijandin li Hitîn

Dema cenga selîbî, heyamê Selahedîn

Kete rûpelê tarîx, şermek kirêt û giran

Roja Sebra û Şatîla, ew kuştina bêwijdan

Keç û pîr û kalemêr, ew zarokên du sê meh

Hatin kuştin wê çaxê, bê sebeb û bê guneh

Bila hûn qenc bizanin, bi kuştin û bi talan

Tu car milet namirin, der hiyam û der zeman

Silavê miletê kurd, ey şoreşa Felestîn

Li we hene bi bara, bi bawerî û yeqîn

Di gel we ne gelê kurd, hem şoreşvanên cîhan

Bijî bijî Felestîn, bijî bijî Kurdistan **(Seydayê Tîrêj)**

**Têbînî:** Di sala 1982'yan de artêşa Îsraîlê, êrîşî gundê Lubnanê yê bi navê Sebra û Şatîla kir û komkujiyeke mezin pêk anî. Îsraîlê dixwest ku gerîlayên Rêxistina Rizgariya Filistînê bikuje, lê gelek sivîl jî hatin kuştin.

## WATEYA PEYVAN

**Cengawer:** şervan, şerker, leşker
**Gernas:** egîd, qehreman, mêrxas
**Tang:** Maşîneyeke zirxî ya cengê ye.
**Top:** Amûreke cengê ye, gule û bombeyan dûr tavêje da ku di nava dijmin de biteqe.
**Gule:** Berikên çekan, fîşek
**Hitîn:** Cihekî li Filistînê ye ku di navbera misilman û selîbiyan de şer lê çêbû, bi serkêşiya Selahedînê Eyûbî.
**Selîbî:** Kesên ku di dema Selahedîn de Filistîn dagir kiribûn,
**Selahedîn:** Serokê artêşa îslamê yê ku şerê selîbiyan kir û bi ser ket.
**Kirêt:** Gemar, genî, ne paqij, ne pak
**Guneh:** Sûc, tişta qedexe, ger bê kirin; dê ew kes were sezakirin.
**Bar:** Tişta tê hilgirtin.
**Bawerî:** îman, yeqîn

## PIRS

1- Li gorî helbestvan, şoreşgerê Filistînê çawa ne?
2- Kengî û li ku derê, xwîna gelê kurd û filistîniyan bi hev re hatiye rijandin?
3- Îsraîl li gundê Sebra û Şatîla, çi bi serê gelê filistînî kir?
4- Di her du malikên dawî de helbestvan çi dide xuyakirin?

# RÊZIMAN

**6- Hevalkarên pirsiyariyê:**

Ev cure hevalkar, pirsa hevalkarên din dike. Hin hevalkarên pirsiyariyê, ev in: çawa, çi, kengî, çi wext, li ku, bi ku ve, ji ku ve, çi qas, wekî çi…

Her yek ji van hevalkaran, pirsa cureyekê ji hevalkaran dike. Bo mînak; hevalkara “**çawa**” pirsa hevalkarên çawaniyê dike. Dema ku em dibêjin “Çûk çawa difire?” bersiva vê pirsê, hevalkareke çawaniyê dide dest, weke; nizm, an jî bilind.

**Mînak:**

- Tu **ji ku** têyî? Ez **ji malê** têm.
- Ew **bi ku ve** diçe? Ew **ber bi dibistanê ve** diçe.
- Şêrgo **kengî** ji gund derket? Ew **duh** ji gund derket.
- Fatma **çawa** dimeşe? Fatma **bilez** dimeşe.
- Ev şagirt **çi qas** jîr e? Ew **gelekî** jîr e.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsê

1. Navê qewm û neteweyan, bi tîpa biçûk dest pê dikin. **Mînak:** ereb, kurd, turk, çerkes, suryan, ecem...

2. Navê bîr û baweriyên olî û hevalnavên bi wan pêk hatine, bi tîpa biçûk dest pê dikin.
**Mînak:** xirîstiyanî, xirîstiyan, misilmantî, misilman...

## Hêmadanîn

### Xêzika xwehr (/)

- Di navnîşanan de ji bo cudakirina tax, bajar û jimara avahiyê xêzika xwehr tê bikaranîn.

**Mînak:** Amûdê/Gundê Sinceqa Xelîl/Taxa Rojhilat/Hej.11

- Di bîrkariyê de weke nîşana parvekirinê tê bikaranîn.

**Mînak:** 6/3 = 2 , 10/2 = 5 , 36/6 = 6

- Di navbera dîrokan de xêzika xwehr tê bikaranîn.

**Mînak:** 15/2/1999 , 19/7/2012

## HÎNDARÎ

**1-** Hevalkarên pirsiyariyê, pirsa çi dikin? Bi mînakekê diyar bike.
**2-** Hin hevalkarên pirsiyariyê, rêz bike û sêyan ji wan di sê hevokan de bi cih bike.
**3-** Hevalkarên pirsiyariyê di hevokên li jêr de binê wan xêz bike.

1. Xwişka te ji kîjan aliyê bajêr ve tê?
2. Te çawa pêşwaziya mêvanan kir?
3. Hesen weke çi dibeze?
4. Tu ji kengî ve li vir î?

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1-** Mirovê xerîb, kor e.
**2-** Nanî bide nanpêj, bila nanek zêde be.
***3***- Goştê hemû teyrikan, nayê xwarin.

## HÎNDARÎ

**A- Ji bo pirsên li jêr, vebijêrka rast nîşan bike.**

**1-** Peyva "raperîn" tê wateya;
**a-** berxwedan **b-** serhildan **c-** serxwebûn **d-** pêşengî

**2-** Ji hevokên li jêr, di kîjan hevokê de hevalkara xwerû heye? Binê wê hevalkarê, xêz bike.
**a-** Ez ê êvarkî biçim sînemayê.

**b-** Îro, Cejna Karkerên Cîhanê ye.

**c-** Hevalekî me, pêr şehîd ket.

**d-** Şivan, paşpêkî li kerê siwar bû.

**3-** Hevalkar, di nava xwe de dibin;
**a-** du beş **b-** sê beş **c-** pênc beş **d-** şeş beş

**4-** Ji hevokên li jêr, di kîjan hevokê de hevalkara çawaniyê heye? Binê wê hevalkarê, xêz bike.
**a-** Ev mamoste, waneyê xweş şîrove dike.

**b-** Mamosteya ziman, jêhatî ye.

**c-** Te çi got, min wilo jê re dubare kir.

**d-** Di meha gulanê de ezmûn dest pê dikin.

**5-** Di kîtekirina peyvan de kîjan hêma dikeve navbera kîteyan?
**a-** xêzika xwehr **b-** xêzika axaftinê **c-** dabir **d-** bendik

**6-** Hevalkarên şanîdanê, di nava xwe de dibin;
**a-** du beş **b-** sê beş **c-** pênc beş **d-** şeş beş

**7-** Ji hevokên li jêr, di kîjan hevokê de hevalkara demê heye? Binê wê hevalkarê, xêz bike.
**a-** Roja duşemê, ev bûyer

qewimî. **b-** Wiha kir û wiha xwar.

**c-** Ez çîtikî ji serê ban hatim xwar.

**d-** Sefwan, ji min bileztir dimeşe.

**8-** Di hevoka li jêr de kîjan peyv, hevalkara şanîdanê ye?
"Te werê gotibû min."

**a-** te **b-** werê **c-** gotibû **d-** min

**9-** Ji hevokên li jêr, di kîjan hevokê de hevalkara çendaniyê heye? Binê wê hevalkarê, xêz bike.

**a-** Hin heval îşev dê werin mala me.
**b-** Mamoste, bilez wane şîrove kir.
**c-** Te wisa got, lê min bersiva te neda.
**d-** Ev şagirt; pir jêhatî ye, lê birayê wî; ne zêde.

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Meyzandin | Normal |
| Serbest | Sûcdar |
| Cengawer | Zarşêrîn |
| Asayî | Azad |
| Devnerm | Temaşekirin |
| Gunehbar | Şerker |

**C- Vebijêrkên li jêr, ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa hêma bike û yên şaş sererast bike.**

□ Hevalkarên xwerû, bi alîkariya daçek, pêşgir û paşgiran ve pêk tên. ( )
**b)** Di daçekên hevedudanî de dema ku paşdaçek dikeve, pêşdaçek bi peyvê ve dizeliqe. ( )
**c)** Xêzika navber (-) dikeve navbera du bêjeyên ku di navbera wan de hogirî heye. ( )
**d)** Hevalkarên çawaniyê, bi piranî hevalnav in, lê çawaniya lêkeran nîşan didin. ( )
**e)** Di ravekên zincîrî de veqetandek peywira cînavkê digirin ser xwe û cuda tên nivîsandin. ( )

**f)** Hin hevalkarên şanîdanê yên ku karên diyar û nêzîk nîşan didin, ev in: wisa, wilo, werê... ( )

**g)** Hevalkarên demê, dema kar nîşan didin. ( )

**h)** Gihanek û hevalkarên hevedudanî, bi giştî ji hev cuda tên nivîsandin. ( )

**j)** Dema ku gotûbêj di navbera çend kesan de çêdibe, heke gotina yekî/ê di nava dunikê de neyê nîşandan, wê demê xêzika axaftinê li ber gotina wî/ê tê danîn ( )

**k)** Hevalkarên cih û ber; cih û dema ku kar lê tê kirin, nîşan didin. ( )

**l)** Navê ziman û zaravayan, bi tîpa mezin dest pê dikin. ( )

**m)** Carinan du tiştên hemwate li rex hev tên nivîsîn, bi xêzika xwehr ji hev tên veqetandin. ( )

**n)** Hevalkarên pirsiyariyê, pirsa hevalkarên din dike. ( )

**o)** Navê qewm û neteweyan, bi tîpa mezin dest pê dikin. ( )

**p)** Di navnîşanan de ji bo cudakirina tax, bajar û jimareya avahiyê; xêzika xwehr tê bi karanîn ( )

## BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| HEFTE / MEH | HEFTEYA YEKEM | HEFTEYA DUYEM | HEFTEYA SÊYEM | HEFTEYA ÇAREM |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | LÊVEGER | Girîngiya Perwerdeyê |
| Cotmeh | Şivan | Werzîş | Gimgimoka Biçûk | Dibistan |
| Mijdar | Hîndarî | Çand û Huner | Şam Şekir e Welat Şêrîntir e | Azadiya Tûtî ji Rikehê |
| Berfanbar | Selemêş | Dayîk | Hîndarî | Hezkirina Pirtûkan |
| Rêbendan | Bîst û Yekê darê | NIRXANDIN | BÊHINVEDAN | BÊHINVEDAN |
| Reşemeh | LÊVEGER | Mih û Şêr û Gur | Aşût | Bihar |
| Avdar | Hîndarî | Lehengê Sêdarê | Diyariya Yarê | Qero |
| Cotan | Ferhat û Şêrîn | Sebra û Şatîla | Hîndarî | Hîndarî |
| Gulan | LÊVEGER | NIRXANDIN | | |

# FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN 3

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Zimanê Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

BEŞA 1 ........................................................................7

SINC ............................................................................8

EZ ŞEHÎD IM..............................................................12

KIRASÊ BEXTEWARIYÊ.......................................17

DARA ÇINARÊ ..........................................................23

HÊVÎDARÎ ..................................................................29

BEŞA 2 ........................................................................35

REXNE Û REXNEDAYÎN.......................................36

JI DÎWANA XANÎ.....................................................41

DERWÊŞ Û EDÛLÊ..................................................45

PIRTÛK .......................................................................50

SEBAHÛL XEYR .......................................................54

BEŞA 3 ........................................................................61

DEMOKRASÎ..............................................................62

ZOZAN........................................................................67

BEHLÛL Û DARBIRÎN............................................71

CEJNA KARKERAN.................................................76

HOGIR Û MERYEM ................................................82

BEŞA 4 ........................................................................89

**BERPIRSIYARÎ.......................................................90**
**EY XORT................................................................95**
**ÇÎROKA WEFADARIYÊ ....................................99**
**BIRCA BELEK ...................................................105**
**ROJA ZAROKÊN CÎHANÊ...............................109**

# BEŞA 1

**1- Sinc**

**2- Ez Şehîd im (Helbest)**

**3- Kirasê bexteweriyê**

**4- Dara Çinarê**

**5- Hêvîdarî (Helbest)**

**WANE 1**

## SINC



Ji bo kes û civakan, sinc têgîna herî girîng e. Sinc, havênê herî bingehîn ê civakîbûnê ye. Civak, bê sinc nikare bijî. Sinc, destûrên gelan ên nenivîskî ne. Ev jî, bi rêbazên herî baş, pîvanên giştî yên ku civak wan diparêze û dipejirîne. Bi demê re ev kevneşopî û tore, dibin sincê civakê.

Bi vê boneyê, di perwerdeya zarok û ciwanan de zanista herî girîng a civakîbûnê, sinc e. Reftar û sincê xwendekaran, pîvana herî girîng a kesayeta wan e. Zarokên bisinc, di saziyên perwerde, çand û jiyana civakê de dikarin bi xweşî û asayî hevaltiyê bi hev re bikin û bijîn. Ji ber vê yekê, pergalên desthilatdar, bênavber êrîşî sincê civakê dikin.

Perwerdeya bisinc, kesên bisinc diafirîne. Kesên bisinc, malbatên bisinc diafirînin. Malbatên bisinc jî, civakên bisinc diafirînin. Bi vî awayî, civak jiyana xwe berdewam dike û bi pêş ve diçe.

## WATEYA PEYVAN

**Havên:** Tov, tişta ku tişteke din jê çêdibe, yan jî tê çêkirin.

**Rêbaz:** rê, rêç, awa

**Kevneşopî:** kelepor, tore, dap, nerîd

**Bone:** helkeft, munasebet

**Reftar:** Şêweyê kar û tevgera mirov û lawiran a bi kesên din re.

## PIRS

1- Dema tê gotin "sinc" tu çi têdigihêjî?
2- Li gorî mijarê, sinc çi ye?
3- Çima pergalên desthilatdar êrîşî sincê civakê dikin?
4- Perwerdeya bisinc; kesayetek çawa diafirîne?

## RÊZIMAN

**Cînavk:** Ji peyvên ku di hevokê de cihê navdêran digirin re cînavk tê gotin.

**Cureyên Cînavkan:** 12 cureyên cînavkan hene:

**1- Cînavkên kesane**
**2- Cînavkên şanîdanê**
**3- Cînavka vegerok**
**4- Cînavka pêvekî**
**5- Cînavkên kesandinê**
**6- Cînavkên pirsiyariyê**
**7- Cînavkên nebinavkirî**
**8- Cînavkên berbihevîn**
**9- Cînavkên jimarîn**
**10- Cînavkên lihevxistî**
**11- Cînavkên xwedîtiyê**
**12- Cînavkên girêkî**

Di refên borî de şeş cureyên cînavkan hatibûn şîrovekirin, niha jî em ê cureyên mane şîrove bikin.

**Cînavkên nebinavkirî:** Ev cure cînavk, cihê tiştên nenaskirî digirin.

Bo mînak; dema ku em dibêjin; "**Kesek hat**" li vê derê "**Kesek**" cihê tiştekî digire, lê reng û dirûvê wî tiştî nayê zanîn. Ji ber vê yekê, ji van cînavkan re **cînavkên nebinavkirî** tê gotin.

Cînavkên nebinavkirî gelek in. Hin ji wan, ev in: **yek, hin, tu, kes, kesek, hemû kes, her kes, gelek, pir, piçek, filan, bêvan…**

**Mînak:**

- **Hin** dikin, **hin** jî dixwin.
- **Hemû** hatin, ji bilî **yekî**.
- Guhê xwe nede gotina **filan** û **bêvan**.
- **Kes** bi min re nehat.
- **Gelek** di ezmûnê de bi ser ketin, lê **hinek** bin ketin.
- **Her tiştê** tê bihîstin, nayê gotin.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin ve dest pê dikin:**

- Seretîpa bêjeya yekem a hevokê, ango bêjeya piştî xal, pirsnîşan û baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike.

**Mînak:**

**1-** Ez duh êvarî çûm pirtûkxaneyê. Min li wir hevalê xwe Zana dît.
**2-** Ma tu rastiyê nizanî? Ger tu nizanibî, ez ê ji te re bêjim. **3-** Wax kurê min wax! Te zû ji vê cîhanê bar kir.

### Hêmadanîn

**Xal** (.)

- Ev hêma, bidawîbûna hevokê nîşan dide. Dema ku hevok diqede, mirov xalekê datîne dawiya hevokê. Peyva piştî "xal"ê bi tîpa mezin dest pê dike.

  **Mînak:**

  Şaredariya bajarê me, îsal gelek dar çandin. Ev yek jî cihê kêfxweşiya gel bû.

## HÎNDARÎ

1- Şeş cureyên cînavkan bi nav bike û sê hevokan li ser wan saz bike.

2- Çima cînavkên nebinavkirî, bi vî navî hatine naskirin? Bi mînakekê diyar bike.

3- Pênc cînavkên nebinavkirî binivîse û siyan ji wan di sê hevokan de bi cih bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1- Bêje min hevalê xwe, ez ê bejim tu kî yî.**

**2- Bila hindik be, lê rindik be.**

## WANE 2

# EZ ŞEHÎD IM

Ez şehîd im pakrewan im
Hêstrê çavê dayîkan im
Ez giyanê jiyanê me
Ez fedayê niştîman im

Min can hebû min feda kir
Ala sor bi xwînê rakir
Min ji bîr kir hemî dinya
Tenê min ji bo te kar kir

Dil bû kanî xwîn herikî
Li min tava reş feriqî
Bûm roniya serxwebûnê
Birînên min derman dikî

Ez şehîd im pakrewan im
Hêstrê çavê dayîkan im
Ez giyana jiyanê me
Ez fedayê niştîman im

**Hekîm Sefqan**

## WATEYA PEYVAN

**Pakrewan:** Şehîd, kesê/a ku ji ber doza xwe hatiye kuştin.

**Niştiman:** Welat, war

**Feriqî:** Mîna baranê lê barî.

## PIRS

**1-** Helbestvan, di malika yekem de kesê şehîd dişibîne çi?
**2-** Li gorî helbestvan, şehîd ji bo welatê xwe çi dike?
**3-** Hestên xwe yên der barê şehîdan de bi çend hevokan vebêje.

## RÊZIMAN

### Cînavkên berbihevîn:

Ev cure cînavk, du lib in: "**êk**" û "**hev**"

Cînavka "**hev**" li piraniya herêman tê bikaranîn, lê cînavka "**êk**" bi tenê li herêmên Botan û Behdînanê tê bikaranîn. Ev cure cînavk, têkilî û danûstandina piralî dinimîne. Her weke ku cînavka pêvekî "**ê**" bi tenê kesê yekjimar dinimîne û bi tu awayî nikare kesên pirjimar binimîne, ev cînavk (berbihevîn) jî nikarin kesê yekjimar binimînin.

Weke mînak, dema ku em dibêjin: "Em birayên hev in" an jî

"Em birayên êk in", tê zanîn ku li holê, ji yekî bêhtir kes hene û ev cînavk têkiliya wan kesan rave dike.

### Mînak:

- Ez û Enes bi hev re mezin bûne.
- Em pismamên êk û du ne.

- Ma hûn li rewşa hev napirsin?

**Cînavkên jimarîn:**

Ev cure cînavk, di koka xwe de jimarnav in. Lê rista ku pêk tînin, rista cînavkan e. Ji bilî hejmara “yek”ê hemû hejmar dibin cînavkên jimarîn, hejmara “yek” cînavka nebinavkirî ye.

**Mînak:**

- Çar hatin, lê didu vegeriyan.
- Heft bi ser ketin û sê bin ketin.

**Tewanga cînavkên jimarîn:** Cînavkên jimarîn ji duyan ta nozdehan, bi “**an**”ê ditewin. Piştî wê, bi “**î**”yê ditewin. Di hejmarên duxaneyî de tewang, li gorî hejmara dawî ye.

**Mînak:**

- Çilî kiriye, lê çaran xwariye.
- Pêncan gotiye, em naçin ser kar.
- Pêncî hatin, bîst û pêncan xwe amade kirine.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Nav û paşnavên mirovan, bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Osman Sebrî helbestvan û siyasetmedarekî kurd ê navdar bû.

- Nasnavên mirovan, dema ku bi navê wan re bûbin yek û tevî navên wan bên bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Navê Serokê Şoreşa Bolşevîk Lênîn bû.

## Hêmadanîn

**Xal (.)**

- Piştî peyvên ku hatine kurtkirin, xal tê danîn.

**Mînak:** Zerdeşt dibêje; “Baş bihizire, baş biaxive û baş bixebite.”

## HÎNDARÎ

**1-** Li ser her cînavka berbihevîn, hevokekê saz bike.
**2-** Du hevokan, li ser cînavkên jimarîn ên di navbera 2 – 19’an de saz bike.
**3-** Du hevokan, li ser cînavkên jimarîn ên ji 20’î û bêhtir saz bike.

## Ehmed û Ker

Rojekê Ehmed bi kerê xwe ve diçe bajarê Hewlerê.

Ew tê ba lempeyên trafîkê. Lempeya sor pêdikeve. Her kes radiweste, lê Ehmed bi kerê xwe ve derbasî aliye din dibe.

Polîsê trafîkê wî digire û jê re dibêje:

– Çima dema ku lempeya sor pêketiye, tu derbasî aliyê din bûyî?

Ehmed matmayî dimîne û ji polîs dipirse:

– Lempe lempe ye, ya sor çi ye, ya zer çi ye! Cudahî tune ye û hemû jî ji bo ronahî û spehîbûnê ne, ma ne wisa ye?

Polîs dinêre ew tiştekî fam nake, hema wî digire û dibe polîsxaneyê. Li polîsxaneyê jê re dibêjin:

– Dema ku lempa sor pêketî be û mirov jî derbas bibe ceza ye û ji ber vê yekê, em ji bo te du dînar û ji bo kerê te jî dînarekê ceza li te dibirin.

Ehmed, li polîs dinêre û bi lavatî:

– Ma hûn nikarin min jî wekî kerekî hesab bikin û ji min jî dînarekî ceza bistînin?

WANE 3

# KIRASÊ BEXTEWARIYÊ



Dibêjin, carekê padîşahek hebû, ku desthilatdarî li nîvê dinyayê (ji Hindê û Çînê ta Çiyayê Qaf) dikir. Padîşah, bi janeke giran dikeve. Li welat tu bijîşk nemaye ku nehatiye ser. Lê ji derdê padîşah re tu derman nehatiye dîtin.

Hat gotin ku li aliyê din ê cîhanê pisporekî mezin heye ku kesek karibe padîşah derman bike, ew e. Berdevk çûn û ew hekîm anîn. Hekîm, li padîşah nêrî û got:

- Padîşahê cîhanê, nexweşiya te, ne tu tişt e. Dermanê wê jî hêsan e. Divê tu kirasê mirovekî bextewar li xwe bikî, ku te ew li xwe kir, tu yê di cih de sax û selamet bibî.

Şahî, bi welêt ket. Digotin hekîmê ferzane li ser nexweşiya padîşah bûye. Hekîm jî da rê û çû welatê xwe. Êdî diviyabû kirasê mirovekî bextewar peyda bikin. Ma ji wezîrê padîşah bextewartir kî heye? Qesta wezîr kirin û kirasê wî jê xwestin.

Wezîr, ji wan seyr ma û got:

- Bi min be hûn şaş in. Bextewarî li ku û ez li ku? Ma hûn nizanin ku şûrek li ser serê min hilawistî ye û ew bi benekî zirav

ve girêdayî ye? Ben, her gav dibe ku biqete û şûr li canê min bikeve. Ma ji min bextreştir heye? Ji tirsa ku padîşah min biqewitîne, bi şev jî xew nakeve çavên min. Ev e rewşa min. Jê geriyan û çûn ba qazî; mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Qazî jî ji wan seyr ma û got:

- Rewşa ku ez tê de me, xweda tu kesî nexe vê rewşê. Ji şevê pê de, ez didim hişê xwe û texmînan dikim; gelo ez dozên xelkê çawa safî bikim? Wijdana min bi vê fikarê, her tim bê aram e. Ma bextewarî û rihetî ev e?

Ji wî jî geriyan û çûn cem bazirganekî mezin û dewlemend. Bazirganê dewlemend, ji wan re got: Xwezî û sed xwezî ez ew mirov bûma, yê ku hûn lê digerin. Belê, gelek malê min heye. Ez her roj dixebitim, xwe dikujim ku wî zêde bikim. Ji aliyê din ve her roj ji tirsa xisarê texmînan dikim; bi şev karwanên min ên ku li çolê ne, keştiyên min ên ku di deryayê de ne, tên bîra min û xew bi çavên min nakeve. Rewşa min, mal û dewlemendiya min, bi vî awayî ye. Ji wî jî geriyan û çûn cem karmendekî hikumetê. Karmendê reben jî got: Sed şikur û spas ji Yezdan û ji padîşahê cîhanê re ku ez bi saya wî digel malbata xwe sitirî me. Min mûçeyekî hindik heye. Zarokên min zehf in.
Ez deyndar bûme. Şev û roj xema wan dixwim. Heke ez ji wezîfê hatim rakirin, an ji nişka ve mirim, wê çi bibe ji wan?

Berdevkên padîşah ji wî jî geriyan û dan hişê xwe, ma kî ma ye? Ji gundiyan pê ve kes nema bû. Çûn cem gundiyekî, mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Gundî, li wan vegerand û got: Ma we kengî gundiyekî bextewar dîtiye ku ez jî bextewar bim.
Ez li ku, bextewarî li ku? Ji xebitîn û westanê, pişta me bûye du ta. Çavên me li asîman e, gelo baran tê, an nayê? Sala ku baran hat, te dît kulî tiştek nehişt. Heke saleke xerab hat, deyndar li ser deyndaran tên. Ta deh salan em nikarin jê xelas bibin. Ma ez hêj çi bêjim...?

Di dawiyê de vegeriyan qesra padîşah. Rojekê li dîwanxanê rûniştîbûn. Ji kolanê dengek bihîstin. Yekî bi şahî û kêfxweşî distira. Daketin kolanê. Mêrekî derwêş bû; rût û tazî bû, ebakî pînekirî lê bû... çûn cem û jê re gotin û kirasê wî jê xwestin.

Derwêş kenî û li wan vegerand: Belê ez mirovekî bextewar im, ji ber ku min kiras tune ye. Heke min kirasek hebûya, ma ez kengî bextewar dibûm?

## WATEYA PEYVAN

**Desthilatdar:** rayedar, karbidest, serdar

**Qaf**: Li gorî efsaneyên Rojhilata Navîn, çiyayê li dora cîhana me.

**Bijîşk:** Nojdar, hekîm, doktor, kesên ku nexweşan sax dikin.

**Derd:** kul, keser, xem

**Ferzane:** zana, alim

**Hilawestî:** Daliqandî

**Benik:** Werîs, an jî çi tiştê ku tiştên din pê tên girêdan.

**Bextreş:** Bênesîb, bêşens, ne bextewar

**Biqewitîne:** Dûr bike, biqewirîne

**Fikar:** Ne aramiya hiş.

**Kulî:** Lawireke xwe hiltavêje, ji giyayekî xwe davêje giyayekî din.

**Dîwanxane:** Koçika mêvanan.

## PIRS

1- Çima li yekî bextewer digeriyan?
2- Çima kirasê bexteweriyê, li cem kesî peyda nekirin?
3- Çima mêrikê derwêş kesekî bextewer bû?
4- Ramana bingehîn a vê çîrokê çi ye?

# RÊZIMAN

## Cînavkên lihevxistî:

Ev cure cînavk, cînavkên hevedudanî ne û ji du hêmanan pêk tên. Her tim, hêmanek ji wan daçeka bingehîn e û hêmana duyem an cînavka pêvekî (qertafî) “**-ê**” ye, yan jî cînavka berbihevîn (**êk**, **hev**) e.

**1-** Cînavkên lihevxistî yên ji daçekên bingehîn ( **ji**, **bi**, **li**, **di**) û cînavka pêvekî “**-ê**” pêk tên.

- Ji + ê = jê **Mînak:** Min **jê** alîkarî xwest.
- Bi + ê = pê **Mînak:** Dema ew ket, ez **pê** ve çûm.

Li + ê = lê **Mînak:** Min kirasek ji xwişka xwe re kirî, mixabin ew **lê** nehat.

- Di + ê = tê **Mînak:** Ez çûm pirtûkxanê, min **tê** de hevalê xwe dît.

**2-** Cînavkên lihevxistî yên ji daçekên bingehîn û cînavkên berbihevîn (**hev**, **êk**) pêk tên:

- Ji + hev = jev **Mînak:** Min her du zarokên cêwî **jev** nas nekirin.
- Ji + êk = jêk **Mînak:** Li welatê biyanî, em **jêk** cuda bûn.
- Di + hev = tev **Mînak:** Em **tev** çûn şahiyê.
- Di + êk = têk **Mînak:** Dewleta Osmanî di şerê cîhanê yê yekem de **têk** çû.
- Bi + hev = **pev** **Mînak:** Em **pev** re çûn geştê.
- Bi + êk = pêk **Mînak:** Ez û Zozan **pêk** ve çûn zanîngehê.
- Li + hev = lev **Mînak:** **Lev**dana Xalid û Semîr tiştekî seyr bû.

Li + êk = lêk **Mînak:** Me her du hevalên xwe yên jev xeyîdî, **lêk** anîn.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Serenavên cih, sazî, çem, derya, zerya, parzemîn, çiya û navên din ên erdnîgariyê, bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak:**

**1-** Navê cihan: Sûriye, Qamişlo, Heleb, Libnan, Hums…
**2-** Navê rêxistinan: Rêxistina Mafên Mirovan, Heyva Sor a Kurdî, Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê...
**3-** Navê çeman: Berede, Ferat, Nîl, Asî...
**4-** Navê deryayan: Beltîq, Manş, ...
**5-** Navê zeryayan: Pasîfîk, Hind, Aram...
**6-** Navê parzemînan: Asya, Antartîka, Ewrûpa...
**7-** Navê çiyayan: Hîmalaya, Qelemon, Zagros...

## Hêmadanîn

**Xal (.)**

- Di nivîsandina dîrokê, di navbera roj, meh û salê de xal tê danîn.

**Mînak:** Di 13.11.1960'î de agir bi Sînemaya Amudê ket.

- Di bîrkariyê de weke nîşaneya hevdanê tê bikaranîn.

**Mînak:** 8 . 5 = 40

# HÎNDARÎ

**1-** Cînavkên lihevxistî bi çend awayan pêk tên? Wan diyar bike.
**2-** Çar hevokan li ser cînavkên lihevxistî yên ku ji daçek û cînavka pêvekî pêk tên, saz bike.
**3-** Çar hevokan li ser cînavkên lihevxistî; jev, pêk, tev û lev saz bike.

# PÊKENOK

Rojekê ba û bahoz rabûbû, tofanek li derve hebû. Di wê tofanê de kermêşek çûbû, xwe bi darekê ve girtibû. Yekî jê pirsî - got:

Lê kermêşê, xêr e te çima bi darê ve girtiye?

Kermêşê sînga xwe nepixand û got:

Ma tu nabînî, min bi darê girtiye, ji bo ku dar nekeve!

## WANE 4

# DARA ÇINARÊ



Ev çi hest e, hûn dizanin? Serê xwe serbest bi şanazî ber bi asîman ve bilind kiriye. Çiqên xwe bi hezkirin, her yek ji bo bîranîna dîroka civakekê, bi sedê salan dirêjî xwezayê kirine. Dema ku min ev darên çinarê dîtin, mûyên min rabûn. Ez bi xurûş di kûrahiya dîroka xwezayê de çûm. Ez nêzîk bûm, min destê xwe avêt gewdeya yek ji wan a mezin, bi hezkirineke mezin, çavên min li bilindî û stûrbûna wê geriya. Ez hizirîm û min got: "Xwezî zimanê wê hebûya, jiyana xwe ya ji beriya sedan sal û pê de ji min re bigota, çend civakên cuda cuda li bin sîbera wê rûniştine, rojên şîn û şahî derbas kirine."

Ev çinarên dîrokî li Kurdistanê pir hene û Geliyê Qiyametê yek ji cihê ku bûne daristanên çinaran. "Geliyê Qiyametê", bi kaniyên xwe yên zelal û şêrîn, damiyên xwe yên cur bi cur ên rengîn, bi pêlên rûbarên xwe yên spî û zelal û bi tevahiya xwezaya xwe ve yek ji rengê bihuştê dide. Lê serpêhatî û çîrokên pêşiyan dibêjin; li vî gelî ji beriya Konfederasyona

Medan, di serdema desthilatdariya Asûriyan, di navbera Medan û Asûriyan de şerekî mezin çêbûye. Ev gelî, hemû bi xwînê hatiye avdan, bêhejmar kuştî çêbûne. Ji ber vê yekê, navê wî; bûye Geliyê Qiyametê.

Çinarên di vî gelî de yên bi sedê salan, heya niha dijîn. Malovanî, ji gelek çandên cuda re kiriye. Ji ber vê yekê, gelek naviskên Zerdeştiyan ên beriya zayînê, li gelî xuya dikin. Bermahiyên asûrî, ereb û kurdan tê de diyar dibin. Çinara herî bilind 15 metre ye. Yek ji van çinaran, kun bûbû. Di nava qurmê wê de dikarîbûn 10 kes bi hêsanî rûnin. Ev parçeyê xwezaya dîrokî ya jê re dibêjin;

"Geliyê Qiyametê", dikeve Başûrê Kurdistanê, devera Etrûş a girêdayî Dihokê.

## WATEYA PEYVAN

**Çinar:** Cureyeke daran ku 20 – 30 metreyan bilind dibin.

**Şanaz:** serbilind, serfiraz, dilşad

**Gewde:** Ser, dest, ling, zik, pişt û hemû parçeyên din ên mirovekî/ê yan candareke din.

**Stûrbûn:** qalindbûn, ne ziravbûn

**Şîn û şahî:** Dilsojî û kêfweşî

**Kanî:** Cihê ku av tê re ji bin axê dizê.

**Damî:** Darên xwezayî şînbûne.

**Pêl:** Şepol, ava ku ji ava din bilindtir bibe û di ser wê re dilive.

**Rûbar:** Ava diherike ji çeman biçûktir e, lê ji coyan mezintir e.

**Konfederasyon:** Yekîtiya di navbera hin dewletan, an jî wîlayetên welatekî de.

**Malovanî:** mêvanî, mazûvanî

**Navisk:** Cihê miriyên Zerdeştiyan ên nûnerên olî.

## PIRS

1- Çima nivîskar li ber dara çinarê, bi xurûş radiweste?

2- Çima nivîskar dixwest ku zimanê dara çinarê hebûya?

3- Ev dar, bi piranî li ku derê hene?

4- Geliyê Qiyametê, çawa ye û navê xwe ji çi wergirtiye?

## RÊZIMAN

**Cînavkên xwedîtiyê:** Di kurdî de bi serê xwe cînavkên xwedîtiyê tune ne. Lê belê veqetandek û hin cînavkên bireser digihêjin hev û ji wan, cînavkên xwedîtiyê pêk tên.
Veqetandekên binavkirî; “**a**, **ê**, **ên**” li gel cînavkên kesane yên tewandî; “**min**, **te**, **wî/wê**, **me**, **we**, **wan**”, cînavkên şanîdanê yên tewandî; “**vî**, **vê**, **van**, **wî**, **wê**, **wan**” cînavka vegerok “**xwe**” û cînavkên berbihevîn; “**hev**, **êk**” tên û cînavkên xwedîtiyê pêk tînin.

**a- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên kesane yên tewandî pêk tên:**

| | **Min** | **Te** | **Wî/wê** | **Me** | **We** | **wan** |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **a** | a min | a te | a wî/wê | a me | a we | a wan |
| **ê** | ê min | ê te | ê wî/wê | ê me | ê we | ê wan |
| **ên** | ên min | ên te | ên wî/wê | ên me | ên we | ên wan |

**Mînak:**

- Ev lênûs **a min** e.
- Ferhenga kurdî **ya wî/wê** ye.
- Ev dibistan **a we** ye.

Ev xanî **yê te** ye.

- Gulên zer **ên me** ne.

Ew pênûs **ên wan** in.

**b- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên şanîdanê yên tewandî pêk tên:**

| | **Vî/Wî** | **Vê/wê** | **Van/wan** |
|---|---|---|---|
| **A** | a vî/wî | a vê/wê | a van/wan |
| **Ê** | ê vî/wî | ê vê/wê | ê van/wan |
| **Ên** | ên vî/wî | ên vê/wê | ên van/wan |

**Mînak:**

- Dara gûzê **ya vî/wî** ye.
- Ev komputer **ê vî/wî** ye.
- Ev dar **ên vî/wî** ne.
- Sêva zer **a vê/wê** ye.
- Ev hesp **ê van/wan** e.
- Ev baxçe **yên van/wan** in**.**

**c- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavka vegerok (xwe) pêk tên: a xwe**, **ê xwe**, **ên xwe**

**Mînak:** - Min navê xwe jê re got, lê wî **yê xwe** negot.
- Min solên xwe ji lingê xwe kirin, wê **yên xwe** jênekirin.

Te xwişka xwe neanî? Min **a xwe** anî.
Gelo te deynê xwe neda? Min **ê xwe** da.

Ev cînavk, cînavkên xwedîtiyê pêk tîne û hin caran jî wateya xwedîtiyê ya cînavkan xurt dike. Vê yekê, bi alîkariya daçeka “**bi**” dike.

**Mînak:** - Ev pirtûk, **a min bi xwe** ye.
- Ev pirsgirêk, **ên me bi xwe** ne.

**d- Cînavkên xwedîtiyê yên ji veqetandek û cînavkên berbihevîn (hev, êk) pêk tên:**

**Mînak:** - Ev xwişk û bira **ên hev** in. -
Ew heval û hogir **ên êk** in.

**TÊBÎNÎ:** Em nikarin veqetandekên yekjimar (**a**, **ê**) bi cînavkên berbihevîn re bi kar bînin. Ji ber ku cînavkên berbihevîn, her tim kesên pirjimar dinimîne.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Navên ku ji ravekekê pêk tên, heke hevenavek bûbe parçeyeke serenavî; ew serenav bi tîpa mezin dest pê dike.

**Mînak:** Çiyayê Zagros, Deşta Haranê, Kelha Helebê...

- Lê heke ew hevenav, ne parçeyeke serenavî be; bi tîpa biçûk dest pê dike.

**Mînak:** Ew çemê ku di Eyn Dîwerê re dibore, Dîcle ye.

### Hêmadanîn

**Xal (.)**

- Ji bo ku xaneyên hejmaran ji hev bên veqetandin, piştî sê xaneyan, xal tê danîn.

**Mînak:** Rûbera cîhana me, nêzî 510.100.000 km$^2$ e.

## HÎNDARÎ

1- Cînavkên xwedîtiyê, bi çend awayan pêk tên? Wan diyar bike.
2- Du hevokan li ser cînavkên xwedîtiyê yên ku ji veqetandek û cînavka vegerok pêk tên, saz bike.
3- Sê hevokan li ser cînavkên xwedîtiyê yên ku ji veqetandek û cînavkên şanîdanê yên tewandî pêk tên, saz bike.

## WANE 5

# HÊVÎDARÎ



Hevalê delal hey kurê xwendekar
Me danîne ristên xwe pir bêjimar
Ji te hêvîdar im ji min negrî dil
Ku pêşkeş dikim ji bo te gul
Hevalê te me ez, ne dostê neyar
Dixwazim bi hev re bikin kar û bar
Bi dost û bira bin hemû jar û mest
Niha bûye çil sal ku min ev dixwest



Welat xweş bikin em nemînin neyar
Mirov tev bi hev re bibin dost û yar
Bi hev re bibin em bi carek heval
Li ber hev nenêrin bi can û bi mal
Ji warê me barkin çi tiştên nebaş
Di her war û cî de nemînin li paş
Cîhanê bikin em bi rengê bihişt
Li nav me nemînin xwedî zor û xişt

**Cegerxwîn**

## WATEYA PEYVAN

**Rist:** erk, rol
**Hêvîdar:** Bihêvî, kesê/a xwedî hêvî.
**Jar:** belengaz, hejar, perîşan, reben
**Yar:** Kesê/a ku pir jê tê
hezkirin **Zor:** sitem, kotek
**Xişt:** Amûreke weke rimê ye ku hin olperestan pê li xwe didan.

## PIRS

**1-** Di malika sêyem de helbestvan ji xwendekar çi dixwaze?
**2-** Di malika şeşem de helbestvan çi dixwaze?
**3-** Helbestvan dixwaze ku cîhan çawa be?
**4-** Weke xwendekarek, hêviyên te çi ne?

## RÊZIMAN

**Cînavkên girêkî:** Ev cure cînavk, du hevokan bi hev ve girê didin, an jî komên hevokên hevedudanî digihînin hev. Bo mînak: “Min mirovek dît. Ew mirov, birayê hevalê min bû.” Mirov dikare van her du hevokan, bi alîkariya cînavkên girêkî “**ê ku**”, “**a ku**” bi hev ve girê bide: Mirov**ê ku** min dît, birayê hevalê min bû

Ev cînavk, ji du hêmanan pêk tê; gihaneka “**ku**” û veqetandekên binavkirî (**a**, **ê**, **ên**). Bi vî awayî, ev cînavk dibin sê heb: “**a ku**, **ê ku**, **ên ku**.”

**Mînak:**

26.**Ê ku** hat, bavê min bû.
27.**A ku** te dît, meta min bû.
28.**Ên ku** vegeriyan, êdî neçûn.
29.Kes**ê ku** xerabiyê bike, xerabiyê dibîne.
30.Ders**a ku** min xwend, pir dijwar bû.

- Dar**ên ku** we birîn, ên me bûn.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

**-** Navê roj û demên taybet bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Roja 8'ê Adarê, Cejna Jinên Cîhanê ye.

**-** Bergeh(alî), dema ku bi wateyeke taybet bên bikaranîn, bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak**: Şoreşa **Rojava**, di 19'ê Tîrmehê de dest pê kir.

## Hêmadanîn

**Bêhnok ( , )**

- Di hevokê de cihê ku mirov bêhna xwe vedide, bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:** Eger tu kedê bidî, tu yê bi ser bikevî.

- Peyv û komepeyvên ku xwedî heman peywirê ne, bi bêhnokê tên veqetandin û bêhnok cihê gihanekê digire.

**Mînak:** Mirov bi ked, hizrîn û axaftinê ji lawiran vediqetin.

# HÎNDARÎ

**1-** Erka cînavkên girêkî çi ye?
**2-** Cînavkên girêkî, ji çend hêmanan pêk tên? diyar bike.
**3-** Li ser cînavkên girêkî, sê hevokan saz bike.

# HÎNDARÎ

**A- Ji vebijêrkên li jêr, a rast hilbijêre.**

**1-** Peyva “**Bone**” tê wateya;
**a-** Reftar **b-** Rêbaz **c-** Helkeft **d-** Şêwaz

**2-** Cinavk, di nava xwe de dibin;
**a-** 8 cure **b-** 10 cure **c-** 12 cure **d-** 14 cure

**3-** Peyvên: “hemû, gelek, piçek, hinek, her kes”;
**a-** Cînavkên kesandinê **b-** Cînavkên nebinavkirî c- Cînavkên berbihevîn **d-** Cînavkên lihevxistî

**4-** Di hevoka li jêr de kîjan peyv cînavka berbihevîn e;
“**Ez û Cemîl bi hev re mezin bûne**.”
**a-** Cemîl **b-** hev **c-** mezin **d-** bûne

**5-** Ji hevokên li jêr, di kîjanê de cînavka jimarîn heye? Binê cînavkê xêz bike.
**a-** Ev mamoste pir jêhatî ye.
**b-** Kes bi min re nehat malê.
**c-** Çar çûn, lê yek vegeriya.
**d-** Avahiya dibistana me jev ketiye.

**6-** Cînavkên lihevxistî yên ku ji daçek û cînavkên berbihevîn pêk tên, çend in?
**a-** Çar **b-** Şeş **c-** Heft **d-** Heşt

**7-** Kîjan ji vebijêrkên li jêr, cînavka xwedîtiyê ya ku ji veqetandek û cînavka şanîdanê ya tewandî ye?
**a-** a xwe **b-** ên hev **c-** a vî **d-** a te

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Kevneşopî | Dalaqandî |
| Pakrewan | Perîşan |
| Hilawestî | Kelepor |
| Jar | Serfiraz |
| Şanaz | Şehîd |

**C- Hevokên li jêr ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**a-** Ji peyvên ku di hevokê de cihê lêkeran digirin re **cînavk** tê gotin. (...)

**b-** Bêjeya piştî baneşeanê(!) bi tîpa mezin dest pê dike. (...)

**c-** Piştî hevoka pirsiyariyê, xal tê danîn û peyva piştî xalê, bi tîpa mezin dest pê dike . (...)

**d-** Cînavkên berbihevîn, kesê yekjimar dinimîne. (...)

**e-** Hemû hejmar, dibin cînavkên jimarîn. (...)

**f-** Cînavkên lihevxistî; cînavkên hevedûdanî ne û ji du hêmanan pêk tên. Her tim, hêmanek ji wan cînavka pêvekî (qertafî) ye. (...)

**g-** Cînavkên jimarîn, ji du ta nozdehan bi "**an**"ê ditewin. (…)

**h-** Piştî peyvên hatine kurtkirin, bêhnok tê danîn. (…)

**i-** Ji bo veqetandina xaneyên hejmaran, piştî sê xaneyan xal tê bikaranîn. (…)

**j-** Serenavên cih, sazî, çem, derya û çiya bi tîpa mezin dest pê dike. (…)

**k-** Di bîrkariyê de cotxal weke nîşaneya hevdanê tê bikaranîn. (…)

**l-** Navên ku ji ravekekê pêk tên, heke hevenavek nebûbe parçeyeke serenavî, ew serenav bi tîpa mezin dest pê dike. (...)

**m-** Cînavkên girêkî, ji du hêmanan pêk tên; veqetandekên binavkirî û gihaneka "**ku**". (…)

**n-** Peyv û komepeyvên ku xwedî heman peywirê ne, bi bêhnokê tên veqetandin û bêhnok cihê gihanekê digire. (…)

# BEŞA 2

**1- Rexne û rexnedayîn**

**2- Ji dîwana Xanî (Helbest)**

**3- Derwêş û Edûlê**

**4- Pirtûk**

**5- Sebahûl Xeyr (Helbest)**

**WANE 1**

## REXNE Û REXNEDAYÎN




Waneya me zimanê kurdî bû. Hemû xwendekar di refê de rûniştibûn. Cûdî jî li ser mêzeya dawî rûniştibû. Destên xwe dabûn ber lama xwe, bi xemgînî li lênûsa xwe dinêrî. Di wê kêliyê de mamosteya me bi dengekî nazik got:

- Cûdî, çima tu ew qas kûr dihizirî û xemgîn bûyî? Min te dişopand, lê mixabin bala te qet ne li ser waneyê ye. Ka bêje çi çêbû ye?

Cûdî, bi kelegirî got:

- Mamoste, em îro li baxçeyê dibistanê ji xwe re dilîstin. Di dema lîstinê de min dehfek li Sîpan da û ez reviyam. Hema di wê navberê de Jiyan hat pêşiya min, destê min girt û got: "Cûdî, wisa nabe. Ev tevgerên ku te li beramberî Sîpan kirine şaş in, divê bêyî ku em hev du biêşînin, em ji xwe re bilîzin. Ji ber van nêzîkatiyan, ez te rexne dikim, hêvîdar im tu lêborîna xwe ji hevalê xwe Sîpan bixwazî."

Mamoste bi rûkenî, li Cûdî meyzand û got:

- Belê Cûdî, Jiyanê tiştek pir baş û rast gotiye. Cûdî tu dizanî, rexne û rexnedayin rêbaza çareserkirina hemû şaşî û xerabiyên kesî û civakî ne. Ji ber ku bi riya rexne û

rexnedayînê; em zûtir şaşî û kêmasiyên xwe dibînin. Divê tu bi vê nêzîkatiya Jiyanê kêfxweş bibî.

- Xwendekarên hêja, gelek caran di jiyana perwerdeyê de; kêmasî û pirsgirêkên xwendekar û endamên perwerdeyê çêdibin. Digihîjin asta ku mirov bêçare dimîne. Sedema wê ya sereke ew e ku xwendekarên me, ji kêmasiyên hev re çavên xwe digirin. An jî, lihevhatineke kêmasiyan çêdibe. Bêguman, ev nêzîkatiyên bi vî awayî, ji derveyî pîvanên hevaltiyeke rast in. Ev fêrbûn û nêzîkatiyeke şaş e. Heta bandora xwe li şêweyê avakirina malbat û civakê jî dike.
- Belê xwedekarên hêja, tişta ku hevala we Jiyanê raber kiriye, di cih de ye. Pêwîst e hûn hemû şaşitiyên hevalên xwe rexne bikin. Lê di dema rexne û rexnedayinê de pêdivî bi şêwaza rêzgirtin û rêzdayinê jî heye. Pêwîst e rexnegir jî, rexneyê ji bo xwe weke hezkirin û amojgariyeke rast bibîne.

Cûdî li ser gotin û amojgarîyên mamosteya xwe hizirî û got:

Spas dikim mamosteya hêja, min rexne û rexnedayin bi vî awayî fêm nedikir. We riyeke rast nîşanî me da, li beramberî we hemûyan ez lêborîna xwe ji Sîpan û Jiyanê dixwazim. Di wê baweriyê de bin ku ev şaşitî, wê careke din dubare nebe.

Mamoste got:

- Her bijî, ji te re Cûdî, ez kêfxweşbûm ku te şaşitiya xwe nas kir û lêborîna xwe ji hevalên xwe xwest.

## WATEYA PEYVAN

**Rexne:** Der barê mijarekê de rastî û şaşiyên wê diyar kirine.

**Rexnedayîn:** Dema ku mirov kêmasiyên xwe tîne zimên.

**Dişopand:** Lê nêrî da ku bizane ka çi dike.

**Raber kir:** nîşan da, pêşkêş kir

**Kelegirî:** Kesê/a ku dike bigirî.

**Dehf:** Avêtina ber bi pêş ve.

**Lêborîn:** Bexşandin, efûkirin, lênegirtin

**Çareserkirin:** Çare lêkirin, dermankirin

**Rêzgirtin:** Qedirgirtin, ihtîram

**Rexnegir:** Kesê ku rexne lê tê kirin.

## PIRS

1- Çima Cûdî di refê de xemgîn bû?
2- Çima rexne ji bo me pêwîst e?
3- Rexne, bi kîjan armancê tê kirin?
4- Çima kêmasî û şaşiyên xwendekar û endamên perwerdeyê, digihîjin asteke ku mirov bêçare dimîne?
5- Pêwîst e, em li hemberî rexne û rexnedayînê çawa bin?

# RÊZIMAN

**Lêker:** Ji peyvên ku kar, tevger, bûyer û rewşekê diyar dikin re **lêker** tê gotin.

**Mînak:**

- Hin şagirt ji refê **derdiketin.**
- Pileya germahiyê, di demsala havînê de **zêde dibe.**
- Wan refa xwe **şûşt.**
- Pezê gundiyan li mêrgê **diçêre.**
- Di biharê de kulîk **dibişkivin.**

**Peyvsaziya lêkeran:** Lêker, di nava xwe de dibin du cure:

**1-** Lêkerên xwerû
**2-** Lêkerên nexwerû

**1- Lêkerên Xwerû:**

Ev cure lêker, di binyata xwe de lêker in û ji hêmaneke tenê pêk tên. Hejmara lêkerên xwerû kêm e, lê ev cûre lêker, bingeha piraniya lêkerên kurdî pêk tîne.

**Hin lêkerên xwerû, ev in:**

alastin, anîn, avêtin, axaftin, bihîstin, bijartin, biraştin, birin, bûn, çûn, cûtin, firotin, girtin, gotin, guhartin, guvaştin, hatin, hejmartin, hiştin, ketin, kirin, kolan, lîstin, mêtin, nivîstin, pêçan, sotin, xistin, xwarin û hwd.

**Mînak:**

- Me goştê xwe li ser komirê **biraşt.**
- Bilbilê rengîn li ser darê **venişt**.
- Em bênavber karê xwe **dikin**.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

**-** Navê xizmaniyê, dema ku bûbe nasnav û bi nav re bûbe yek, mezin tê nivîsandin. Lê heke nebûbe parçeyeke serenavî, wê demê bi tîpa biçûk dest pê dike.

**Mînak:** - Dema ez çûm Şamê, min Apo Osman li wir dît.

Ez û apê xwe Osman li pirtûkxanê rastî hev hatin.

- Seretîpa bêjeya yekem a veguhaztî, ango hevoka di nava dunikê de mezin tê nivîsandin.

**Mînak:** Mamoste got: “Divê em kedê bidin da ku em bi ser kevin.”

## Hêmadanîn

- Di nava hevokê de piştî erêkirin û redkirinê, bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak**: Erê, ez dengê te dikim.


Na, min wisa negotiye.

# HÎNDARÎ

**1-** Lêker çi ye?
**2-** Lêker, li gorî peyvsaziya xwe dibin çend cure? Wan cureyan diyar bike.
**3-** Pênc lêkerên xwerû rêz bike û sêyan ji wan di sê hevokan de bi cih bike.

WANE 2

## JI DÎWANA XANÎ



**Xeberdana Memê bi dilê kul re**

**Ku ketibû şerê perwane bi bilbil re**

**Geh şer dikir wî li gel dilê jar**

**Digotê: ey xayin û sitemkar**

**Kanîn ew soz û biryar û ferman**

**Kanîn ew sûnd û kanîn ew peyman**

**Te digot rastim li gel te ez her!**

**Ez wekî te me tu bike bawer**

**Te digot yek im naguherim**

**Li ber derdan ez xwe radigirim**

**Lê mixabin tu pir bê wefa yî**

**Tu jar û sistê li ber çava yî**

**Ehmedê Xanî**

## WATEYA PEYVAN

**Perwane:** Perperîk, hin ajalên firok ên hûr ku bi çarbaskî ne.

**Soz:** Sond, ehd

**Biryar:** Qerar, bijartin, lihevkirina li ser kirina tiştekî.

**Ferman:** Gotina ku kesek dibêje û yên din wê gotinê pêk tîne.

**Peyman:** lihevkirin, rêkeftin, bihevrekirina hevkarî.

**Radigirim:** Li ber xwe didim.

**Sist:** Ne şidandî, kesê karê xwe zû pêk naîne.

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Ehmedê Xanî:** Di sala 1651'ê de hatiye cîhanê.

Li gelek bajarên Kurdistanê xwendiye, paşê çûye bajarê Bazîdê, li wê derê medreseyek vekiriye û bûye mamosteyê zarokên kurd. Wî, ji bilî zimanê kurdî; bi farisî, erebî û tirkî jî dizanî. Li gorî agahiyan, Ehmedê Xanî di sala 1707'an de li Bazîdê jiyana xwe ji dest daye û gora wî li Bazîdê nêzî Qesra Îshaq Paşe ye. Niha jî ew cih, bûye ziyaretgeha gelê kurd.

**Berhemên wî yên navdar:**

- Mem û Zîn
- Nûbihara Biçûkan
- Eqîda Îmanê

Ehnedê Xanî di hemû jiyana xwe de hewl daye ku bingeha perwerdeya bi kurdî deyne. Berhemên xwe yên bi navê "Nûbihara Biçûkan" û "Eqîda Îmanê" jî bi vê armancê nivîsandine. Li gorî Eladînê Secadî, Ehmedê Xanî sertacê nivîskar û helbestvanên kurd e.

## PIRS

1- Memê Ala çima bi bilbil re şer dikir?
2- Li gorî helbestê, kê digot; "Li ber derdan ez xwe radigirim?"
3- Helbestvan, di malika şeşan de çi ji dilê xwe re dibêje û çima wiha dibêje?

## RÊZIMAN

**2- Lêkerên nexwerû:** Ev cure lêker; ji lêkerên xwerû, navdêr û hevalnavan; bi alîkariya pêvek, daçek û lêkerên din tên bidestxistin. Ev cure lêker jî, dibin du beş:

**a) Lêkerên pêkhatî** Ev lêker, bi alîkariya paşgir û pêşgiran tên bidestxistin, dema ku li ser rayeka lêkerê zêde dibin. Paşgir û pêşgirên van lêkeran, bi tena serê xwe ne xwediyê wateyekê ne, lê dema ku li ser rayeka lêkeran zêde dibin, wateyeke nû li lêkerê bar dikin.

**1) Paşgirên lêkersaz: "în - andin - an"**

| Rayek | Paşgir | Lêker | Rayek | Paşgir | Lêker |
|---|---|---|---|---|---|
| **Rev** | **în** | **Revîn** | **bez** | **în** | **bezîn** |
| **Rev** | **andin** | **revandin** | **bez** | **andin** | **bezandin** |
| **Kol** | **an** | **Kolan** | **pêç** | **an** | **pêçan** |

**2) Pêşgirên lêkersaz:**

| Pêşgir | Lêker | Lêker | Pêşgir | Lêker | Lêker |
|---|---|---|---|---|---|
| **Ra** | **bûn** | **Rabûn** | **ve** | **gotin** | **vegotin** |
| **Hil** | **girtin** | **hilgirtin** | **da** | **xistin** | **daxistin** |
| **Wer** | **ketin** | **werketin** | **çê** | **kirin** | **çêkirin** |

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

**-** Di serenivîsan de ji bilî gihanek, daçek û veqetandekên ku cuda tên nivîsandin, hemû bêje bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak**: Wî nivîsa bi navê “**Raman <u>û</u> Ziman**” xwend.

**Mînak:** Nivîsa bi navê “**Çiyayên <u>ji</u> Kevirî**” hat weşandin.

**Mînak: Tevgera Demokratîk <u>a</u> Demên Dawî.**

## Hêmadanîn

**Bêhnok ( ,)**

- Di hevokên dirêj de ji bo kirde ji hêmanên din ên hevokê veqete, bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:** Ristem, di çîrokan de weke şêrê serê çiyayên Kurdistanê, dihat nasîn.

- Piştî hevokên xîtabetê, bêhnok tê bikaranîn.


**Mînak**: Zarokên delal, divê hûn rêzê ji dê û bavên xwe re bigirin.

## HÎNDARÎ

**1-** Lêkerên nexwerû, çawa tên bidestxistin?
**2-** Sê lêkerên ku bi paşgirên "**în- andin- an**” ve pêk hatiye peyda bike û li ser her yekê ji wan, hevokekê saz bike.
**3-** Çar lêkerên ku bi pêşgirê ve pêk hatiye, di çar hevokan de bi cih bike.

WANE 3

## DERWÊŞ Û EDÛLÊ



Malbata Derwêş, Êzidî ne. Ji êla Şerqî ne. Ji çiyayê Şengalê ne. Bi sorkirina padîşahên Osmaniyan re mîrê Botanê her tim bi Êzidiyan re di nava şer de ye. Zor û sitemê li wan dike. Êla Şerqî bi xwe jî, ji wê zor û zordariyê para xwe digirin. Lê derfetekê bi dest dixin, gelek şervanên mîrê Botanê dikujin û ji çiyayê Şengalê direvin, tên li çiyayê Qerejdaxê xwe dispêrin Mîrê Milan.

Mîrê Milan, dixwaze ji mêrxasiya Êzidiyan sûdê werbigire. Ji ber vê yekê, di nava konfederasyona êlên Milan de cih dide wan. Di şer û cerdan de wan dide pêş, mîrê Milan bi mêrxasiya wan serbilind e. Havînan bi hev re derdikevin zozanên Qerejdaxê û zivistanan bi hev re dadikevin Germistana Wêranşarê. Di heman salan de bi navê Derwêş kurekî Evdî û bi navê Edûlê jî keçeke mîrê Milan tên cihanê. Konên wan nêzî hev in, zarok bi hev re mezin dibin.

Êdûl, dibe keçeke ku xweşikiya wê li ser zar û zimanan e. Derwêş, di nava hemsalên xwe de her tim li pêş e, mêrxasekî gurçikpola ye.

Edûl, evîna xwe ya rojên pêşîn, wiha vedibêje:

“Ez nizanim, ne eşqê canê min girt

Nizanim ne lingê min li sola delal likumî

Bejna min li pêşiya lawikê Êzidî dihijhijî

Qehwa Yemenê bi ser delalê mala bavê min de rijî”

Derwêş êdî nikare evîna dilê xwe veşêre. Di nava hevalan de gava pesnê xwe dide, dibêje; “Ez, kilê çavên Edûlê me.” Ev

gotin, çawa ku diçe guhê mîr, fermana wan derdixe û Êla Şerqî ji wê derê diteriqe û diçe.

Roj diguhere, sal derbas dibin. Li beriyê ziwahiyeke dijwar heye. Bîrên avê hemû di bin destê êlên Milan de ne. Êlên ereb û tirkmen, ji vê rewşê gelek aciz in. Yekîtiya xwe çêdikin, artêşeke xurt ava dikin û berê xwe didin mîrê Milan. Mîrê Milan dikeve rewşeke gelek zor û zehmet. Di nava êlên wî de mêrxasên ku berê xwe bidin vê artêşa xurt, dernakevin. Neçar dimîne û dibêje; kî berê xwe bide vê artêşê û wan ji hev belav bike, ez ê keça xwe bidim wî. Lê tu kes qayîl nabe. Aqilmend derdikevin, dibêjin; agahiyan bişîne ji Derwêşê Evdî re. Derwêş, piştî hildana agahiyê, bi lez û bez tê.

Adet wisa ye; Edûl fincana qehwê di dîwana mîr de digerîne kî qehwê hilde û vexwe, ew ê bibe serkêşê şer. Derwêş, li dîwanê rûniştiye, lê Edûlê zû bi zû fincanê nêzî wî nake. Ji ber ku dizane çûna vî şerî heye, lê vegera wî tune ye. Piştî ku li hemû dîwanê digerîne û tu kes fincanê hilnade, ji neçarî tîne ber wî, Derwêş bêyî ku lê bihizire, fincana qehwê hil dide û bi ser xwe de dike.

Derwêş, bi çend hevalên xwe re diçe ser êlên ereb û tirkmenan. Li rasta Wêranşarê li dora Girê Edşanê şerekî dijwar diqewime. Li hemberî artêşeke pir mezin, berxwedaneke bi nav û deng didin. Di dawiyê de hemû lehengên ku çûbûn şer, jiyana xwe ji dest didin, lê paşê êlên Milan digihîjin hewara wan û dijmin ji ser axa xwe diqewitînin.

Derwêş, di şer de bi giranî birîndar dibe, gava hewar digihîje wan, êdî li ber mirinê ye. Edûlê digihîje ser wî, serê wî datîne ser çoka xwe, kul û kederên nava dilê xwe dirijîne.

Di ser şerê Derwêşê Evdî re sê sed sal derbas bûn. Piştî wî şerî, êlên kurdan bi serbilindî li zozan û deştên xwe geriyan. Derwêş evîna axa welatê xwe, di ser evîna dilê xwe re girtibû. Her wiha, ev evîn; di çanda kurdan de bûye destan. Ev sê sed sal in ku hîn jî behsa mêrxasiya Derwêş û hevalên wî tê kirin.

## WATEYA PEYVAN

**Sorkirin:** Gurkirina nakokiyan a di navbera du aliyan de.

**Qerejdax:** Çiyayeke li Bakurê Kurdistanê, di navbera deşta Ruha û Amedê de ye.

**Sûd werdigire:** Qezenc dike, fêde dike.

**Wêranşar:** Herêmeke li Bakurê Kurdistanê ye.

**Gurçikpola:** Kesê biceger, wêrek (mecazî)

**Hemsal**: Hemtemen

**Likumî:** Terpilî, hilpekî.

**Diteriqîne:** Bi her alî ve belav dike.

**Ziwahî:** Kêmavî, yan jî salên kêm baran.

**Artêş:** Lêşker, sûpa, koma eskeran.

**Çok:** Parçeya lingê mirov a ku ditewe.

## PIRS

1- Çima Mîrê Milan, Êla Şerqî diteriqîne?
2- Çima Edûlê neçar dimîne ku fincana qehwê li ber Derwêş datîne?
3- Piştî şerê Derwêşê Evdî û hevalên wî, rewşa êlên kurdan çawa bûye?
4- Tevî ku di ser şerê Derwêşê Evdî re sê sed sal boriye, hîn jî di nava gel de behsa mêrxasiya wî tê kirin, çima?

## RÊZIMAN

**3- Lêkerên hevedûdanî:** Ev cure lêker, ji çend hêmanên serbixwe pêk tên. Dema ku mirov wan hêmanan ji hev cuda bike, her yek ji wan xwediyê wateyeke serbixwe ye.

Hin lêkerên hevedûdanî: diyarkirin, başbûn, topavêtin, nexweşketin, dilman, bidestketin, rêzgirtin…

**Mînak:** Hêzên me, Kobanê ji çeteyan rizgar kir.

Me zevî **av dane**.

Neyaran malên me **talan kirin**.

Em ê sibe, civîna xwe **li dar bixin**.

Lêkerên hevedudanî, bi sê awayan çêdibin:

**a- Lêkerên hevedudanî yên ku ji navdêr û lêkerê pêk tên: Mînak:**

Piştî ez û hevalên xwe bi hev şêwirîn me **biryar da**.

Mamoste wêne bi berfirehî **şîrove kir**.

**b- Lêkerên hevedudanî yên ku ji hevalnav û lêkerê pêk tên:**

**Mînak:**

Ava me li ber tava havînê **germ bûye**.

Rûyê wî ji fedîbûnê **sor bû**.

**c- Lêkerên hevedudanî yên ku ji daçek, navdêr û lêkerê pêk tên (lêkerên bidaçek):**

**Mînak:**

Divê em karê xwe zû **bi dawî bikin**. (bidawîkirin)

Kê **li** te **daye** lawo? (lêdan)

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Bêjeya hevoka ku piştî cotxalê tê, bi tîpa mezin dest pê dike. Lê heke piştî cotxalê mînak hatibin rêzkirin, mînaka destpêkê jî bi tîpa biçûk dest pê dike.

**Mînak:** Hz. Muhemed gotiye: Ji dê û bavên xwe re baş bin, wê zarokên we ji we re baş bin.

**Mînak:** Lêker, li gorî peyvsaziya xwe dibin du cure: xwerû û nexwerû.

## Hêmadanîn

**Bêhnok ( , )**

- Di hejmarên şikestî (dabeşkirî) de xaneyên ji yekê (1) biçûktir, bi bêhnokê tên veqetandin.

**Mînak:** Min di ezmûna ziman de 9,5 pile bi dest xist.

- Di nivîsandina navbera dîrok û cihan de bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:** Ehmedê Xanî, di sala 1707'an de li Bazîdê jiyana xwe ji dest daye.

# HÎNDARÎ

**1-** Lêkerên hevedudanî, çi ne?
**2-** Lêkerên hevedudanî, bi çend awayan pêk tên? Wan diyar bike.
**3-** Sê lêkerên hevedudanî peyda bike û sê hevokan li ser wan saz bike.

## WANE 4

# PIRTÛK




Di cîhana pirtûkan de gelek pirtûkên cur bi cur hene. Mirov ji pirtûkan fêrî agahiyên pir girîng dibe; pirtûk hizir û ramanên mirovên kevn û nû tîne ber destê mirovan. Mirov, bi riya pirtûkan re zanînên xwe fireh dike. Hizir û bîrên mirovan, bi xwendina pirtûkan dewlemend dibin. Ji ber ku pirtûk, ji bo mirovan ronahiya herî baş a siberojê ne.

Dema ku mirov diçe pirtûkxaneyekê, dikare bi sedan pirtûkên li ser wêje, zanist, felsefe û hwd. bibîne. Lê pêwîst e, mirov di hilbijartina pirtûkan de li hin xalan baldar be; ji bo mirovan, naveroka pirtûkê pir girîng e. Ji ber vê yekê, dema ku mirov pirtûkekê hildibijêre, divê naveroka wê dagirtî be. A din jî, ji temenê xwe û têgihiştina pirtûkê agahdar be. Wekî din, pirtûka ku em dixwînin ji bo siberojeke serkeftî, divê li ser hizir, raman û felsefeyeke rast hatibe nivîsandin, da ku sûd jê were girtin. Ji bo vê jî, di dema hilbijartina pirtûkan de ji bo

bidestxistina pirtûkeke bisûd, mirov dikare alîkariyê ji mirovên zana, yan jî mirovên xwende werbigire.

Pirtûk, weke hevalek herî baş ê mirov e. Ger mirov, bi kesek baş re hevaltiyê bike, dê mirov bibe xwedî taybetmendî û sincekî herî baş. Lê eger kesê ku me hevaltî pê re kiriye, xerab be; wê xerabiya wî/ê bigihêje me û em ê jî pê re xerab bibin. Ji ber vê yekê, divê mirov zanibe ku pirtûk ji aliyê xwendin û hilbijartinê ve weke hevaltiyek baş û xerab, bandorên erênî û neyînî li ser mirovan dikin.

## WATEYA PEYVAN

**Cur bi cur:** cihêreng, cur bi cur

**Bîr:** Hiş, mejî, tiştên di mejiyê mirov de ku dikare vegerîne.

**Siberoj:** Dema bê, yan jî rojên li pêş ên ku hîn nehatine.

**Naverok:** Tiştên sereke yên di pirtûkekê, yan jî mijarekê de.

**Agahdar:** Kesê/a ku haya wî/ê ji tiştekî heye.

**Bidestxistin:** peydakirin, bidestveanîn.

## PIRS

1- Çi sûd ji pirtûkan tê wergirtin?
2- Çi pêwîst e, ji bo hilbijartina pirtûkan?
3- Pirtûk ji bo mirov, weke çi ye?
4- Bandorên pirtûkan ên li ser mirovan çi ne? Şîrove bike.

# RÊZIMAN

**Dem: Bûyîn, heyîn, pêkhatin û bi her awayî tevgerên kar, di pêvajoyekê de pêk tên. Ji vê pêvajoyê re dema lêkerê tê gotin. Lêker, li gorî daxwazê, pêvekên kes û demê bi xwe ve digire.**

Di zimanê kurdî de sê demên bingehîn hene:

**1-** Dema niha **2-** Dema bê **3-** Dema borî

**1- Dema niha: Heke karek di dema têdeyî de bê kirin, dema vî karî; weke dema niha tê binavkirin.**

**Mînak:** Diya min şîr **dikelîne**.
Fêkî di demsala havînê de **digihîjin**.

Mamoste waneyê **şîrove dike**.

Di van mînakên li jor, di dema axaftinê de bûyer, kirin, tevger... diqewimin.

Dema niha; bi alîkariya pêveka “**di-**“ û rayeka dema niha ya lêkerê, piştre pêvekên kesane (cînavkên kesandinê) lê tên zêdekirin. Bi vî awayî, dema niha saz dibe**.**

**Teşeya hevokê ya di dema niha de:**

**Kirde + (di + rayeka lêkerê ya dema niha + pêvekên kesane li gorî kirde) + têrker**

Neyîniya dema niha: Neyîniya dema niha, bi alîkariya pêveka neyîniyê “**na-**“ pêk tê. Ev pêvek, tê şûna pêveka dema niha “**di-**“ û wateya neyîniyê dide lêkerê. Lê pêveka neyîniyê ya lêkerên “**karîn**” û “**zanîn**”, “**ni-**“ ye

**Mînak:** - Ez ji welatê xwe **na**revim.

**-** Ez **ni**karim werim. - Ez **ni**zanim tu çi karî dikî.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Dema ku yek bixwaze balê bikişîne ser tiştekî, wî tiştî bi tîpên mezin dinivîse.

**Mînak:** ZIMAN, NASNAMEYA MIROVAN E.

- Seretîpa navê taybet ê ku li lawiran tê kirin, mezin tê nivîsandin.

**Mînak:** Ez her roj Reşê li beyarê gund diçêrînim. (Reşê; navê çêlekekê ye.)

## Hêmadanîn

**Bêhnok (,)**

- Di nivîsandina çavkaniya gotarên lêkolînê de bêhnok dikeve navbera nav, paşnav, navê berhemê û hwd.

**Mînak:** Dîwana Osman Sebrî, Osman Sebrî, Weşanên Perî, Stenbol, 2004.

- Beriya gihanekên weke; “çimkî, lewre, lê belê, lê, ji ber ku...” bêhnok tê danîn.

**Mînak:** Min ew nedît, lê belê min dengî wî kir.

## HÎNDARÎ

**1-** Demên bingehîn ên zimanê kurdî, diyar bike.
**2-** Teşeya hevokê ya dema niha binivîse û bi mînakekê şîrove bike.
**3-** Lêkerên (zanîn- çêbûn- pirsîn) di sê hevokan de bi cih bike ku di rewşa neyînî ya dema niha de bin.

## WANE 5

# SEBAHÛL XEYR

Sebahûl xeyrî xanê min, şehî şêrîn zebanê min
Tu yî rûh û rewanê min, bibit qurban te canê min

Te'alalah çi zatî tu, çi wê şêrîn sîfatî tu
Ne wek qend û nebatî tu, yeqîn rûh û heyatî tu

Heyat û raheta canim, sebahûl xeyrî ya Xanim
Were bînahiya çavan, bibînim bejn û balayê

Sebahûl xeyrî mesta min, letîfa cam bi destan im
Xumar û meyperesta min, tu yî meqsûd û qesta min

Ji meqsûdan tu yî bes min, bibin ber çerxê Etles min
Ji xeynî te nevêt kes min, bi reş tu zîn muqews min

Di benda zulf û çewgan im, sebahûl xeyrî ya
Xanim Were bînahiya çavan, bibînim bejn û balayê

**Melayê Cizîrî**

## WATEYA PEYVAN

**Xanê min:** xatûn, sitî, rêzdar
**Şehî:** Qralîçe, şaha jin.
**Zeban:** zar, ziman
**Qend û nebat:** Du cureyên şekiran ên pir şêrîn**.**
**Bînahî:** Dîtin, pêhesîna çavan.
**Bala:** bilind, berz, ne nizm
**Xumar:** Serxweş**,** kesê meyvexwarî.
**Meyperest:** Kesê ku ji meyê pir hez dike.
**Çerx:** Felek, cihê ku bê stêrk.
**Nevêt:** naxwazim
**Bireş:** birih reş
**Zîn:** xemilandî, bedew
**Çewgan:** Qewsandî, tewandî, bi awayê girover.

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

**Melayê Cizîrî**: Navê wî yê resen Mele Ehmed e, kurê Mihemed e. Di sala 1566'an de li Cizîra Botan ji dayik bûye. Mamosteyê wî yê yekem, bavê wî ye. Piştî wê, li gelek cihan xwendina xwe domandiye, weke; Amed, Çewlig, Heskîf û hwd. Melayê Cizîrî şêwirmendiya Mîrê Botan; Mîr Şerefxan kiriye. Berhema wî ya navdar, dîwana wî ye. Ji bilî vê dîwanê, hin helbestên wî yên di nav gel de tên gotin. hene. Di sala 1640'î de jiyana xwe ji dest daye, li Cizîra Botan, li Medresa Sor hatiye veşartin û gora wî bûye ziyaretgeha gel.

## PIRS

1- Helbestvan, di malika duyem de yara xwe dişibîne çi?
2- Helbestvan, di malika pêncem de dixwaze çi bêje?
3- Çima helbestvan, gelek peyvên erebî bi kar anîne?

## RÊZIMAN

**2- Dema bê:** Ev dem, ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye, tê bikaranîn. Kar, hîn dest pê nebûye, lê wê di dema pêş de pêk bê.

Dema bê; bi alîkariya amrazên dema bê "**dê**" , "**ê**" û "**wê**" pêk tê. Pêveka "**bi-**" tê ber rayeka dema niha ya lêkerê. Bi vî awayî, dirûvê dema bê ya lêkerê bi dest dikeve.

**Teşeya hevokê ya dema bê, bi vî awayî ye:**

**Kirde + amraza dema bê (dê, ê, wê) + (bi + rayeka lêkerê ya dema niha + pêveka kesane li gorî kirdeyê) + têrker**

**Mînak:** - Ez ê karê xwe biqedînim, paşê bi te re biaxivim.

- Yasir dê helbestekê bixwîne.
- Ger tu alîkariya min bikî, wê karê me zû biqede.

. **Li gorî cînavkan kişandina lêkerê ya di dema bê de**

- **Ez ê** hevalên xwe li şahiyê **bi**bîn**im**.
- **Tu yê** dest bi pêşbirkê **bi**k**î**?
- **Ew ê** nên belav **bi**k**e**.
- **Em-hûn-ew ê** bi ser **bi**kev**in**.

**Neyîniya dema bê**

Neyîniya dema bê, bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-**" pêk tê.

Ev pêvek, şûna pêveka "**bi-**" digire.

**Mînak:**

Em ê xwîna şehîdên xwe li erdê **ne**hêlin.

**TÊBÎNÎ:** Di lêkerên ku bi pêşgirê pêk hatine de pêveka (**ne-**) dikeve navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

**Mînak:** Em ê tu carî ji doza azadiyê ve**ne**gerin.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Peyvên ku bi tîpa mezin dest pê dikin:**

- Navê pirtûk, kovar û rojnameyan, bi tîpa mezin dest pê dikin.

**Mînak:** Pirtûka "**Eleyam**" ya Taha Husên pir bala min kişand.

**Mînak:** Kovara "**Hawar**" di sala 1932'yan de dest bi weşanên xwe kir.

**Mînak:** Min çend gotarên xwe di rojnameya "**Vedeng**" de weşandin.

## Hêmadanîn

**Bêhnok (,)**

K) Li pêş û paşiya hevok û hêmanên navîn, bêhnok tê danîn. **Mînak:** Dugirê, Gundewarê Tirbespiyê, warê şehîdan e.

L) Di hin hevokan de ji bo ku peyv bê kirpandin, piştî wê bêhnok tê danîn.

**Mînak:** Melayê Cizîrî, helbestvanekî mutesewif bû.

## HÎNDARÎ

**1-** Teşeya dema bê çawa ye? Wê teşeyê binivîse.
**2-** Amrazên dema bê binivîse û li ser her yekê ji wan, hevokekê saz bike.
**3-** Sê hevokan li ser neyîniya dema bê saz bike, ku lêkerek ji wan bi pêşgirê ve pêkhatî be.

# HÎNDARÎ

**A- Ji vebijêrkên li jêr, a rast hilbijêre.**

**1-** Lêker, li gorî peyvsaziya xwe dibin;

**a-** Du cure **b-** Sê cure **c-** Çar cure **d-** Pênc cure

**2-** Di hevokên li jêr de kîjan jê lêkera wê xwerû ye? Binê lêkera xwerû xêz bike.

**a-** Me av vexwar.
**b-** Wan hin fêkiyên xwe firotin.
**c-** Zarok ji darê werket.
**d-** Cotkar zeviyê xwe av da.

**3-** Peyva “peyman” tê çi wateyê?

**a-** Helkeft **b-** Rêkeftin **c-** Name **d-** Lihevnekirin

**4-** Ji lêkerên li jêr, kîjan jê ne pêkhatî ye?

**a-** Ajotin **b**- Revandin **c**- Bezîn **d**- Kolan **5-** Lêkerên hevedûdanî, bi çend awayan pêk tên?

**a-** Du **b-** Sê
**b-** Çar **d-** Şeş

**6-** Di hevokên li jêr de lêkera kîjanê hevedudanî ye û ji lêker û hevalnavekî pêk tê?

**a-** Rêveberiya xweser, saziyên cuda ava kirin.
**b-** Çûk li ser darê venişt.
**c-** Şahiya me zû bi dawî bû.
**d-** Rûyê Ciwan ji tirsa zer bû.

**7-** Di zimanê kurdî de çend demên bingehîn hene?

**a-** Du dem **b-** Sê dem **c-** Çar dem **d-** Heft dem

**8-** Ji lêkerên li jêr, kîjan jê ne di dema niha de ye?

**a-** Vedixwe **b**- Temaşe dike **c**- Rûniştin **d**- Dişo

**9-** Ji hevokên li jêr, kîjan jê ne di dema bê de ye?

**a-** Ew ê zû rakeve.
**b-** Nalîn û Hesan wê biçin malê.
**c-** Ez wê her roj dibînim.
**d-** Mihemed dê xwarinê bixwe.

**Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev.**

| | |
|---|---|
| Dehf | Ziman |
| Sist | Terpilî |
| Likumî | Neşidayî |
| Bidestxistin | Avêtina ber bi pêş ve |
| Zeban | Peydakirin |

**C- Vebijêrkên li jêr ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**a-** Ji peyvên ku kar, tevger, bûyer û rewşekê diyar dikin re lêker tê gotin. (. . . )

**b-** Lêkerên xwerû, ji hêmanekê zêdetir pêk tên. (...)

**c-** Navê xizmaniyê, heke nebûbe parçeyeke serenav, wê demê bi tîpa biçûk dest pê dike. (.. .)

**d-** Di nava hevokê de piştî erêkirin û redkirinê, xal tê bikaranîn. (...)

**e-** Lêkerên hevedudanî, bi alîkariya pêşgir û paşgiran tên bidestxistin, dema ku li ser rayeka lêkeran zêde dibin. (...)

**f-** Di sernivîsan de ji bilî daçek, gihanek û veqetandekên ku cuda tên nivîsandin, hemû bêje bi tîpa mezin dest pê dikin. (...)

**g-** Di nivîsandina çavkaniyên lêkolînê de bêhnok dikeve navbera nav, paşnav û navê berhemê. (...)

**h-** Dema bê, ji bo karekî ku hîn pêk nehatiye tê bikaranîn. (...)

**i-** Di lêkerên ku bi pêşgirê ve pêkhatine de pêveka neyîniyê (**ne**) dikeve pêşiya lêkerê. (...)

**j-** Navê pirtûk, kovar û rojnameyan, bi tîpa biçûk dest pê dikin. (...)

# BEŞA 3

**1- Demokrasî**

**2- Zozan (Helbest)**

**3- Behlûl û Darbirîn**

**4- Cejna Karkeran**

**5- Hogir û Meryem (Şano)**

**WANE 1**

# DEMOKRASÎ




Demokrasî; awayê birêvebirina gel e. Pergala jiyana civakî ya rasterast e. Rêbazeke li dijî rêbazên şaristaniya navendî ye û tê wateya vîna giştî.

Dema tê gotin, demokrasî; nayê wê wateyê ku dilê me çi dixwaze, em wê bikin, an jî pêk bînin. Demokrasî bi xwe, jiyaneke bipîvan û rêkûpêk e. Ji ber vê yekê, demokrasiya rast, parastina nirx û sincê civakî ye.

Bêguman, demokrasî ji civaka sincî û polîtîk dest pê dike. Tu civak, bêyî jiyana sincî û polîtîk nabe. Cihê ku sinc û polîtîka lê hebe, wê demokrasî jî lê hebe. Ev her sê têgeh; weke xweşikbûn, başî û rastiyê bi hev ve giradayî ne.

Perwerdeyeke ku li ser van her sê têgehan bê rûniştandin, wê bêhtir rastiyên xwe yên civakî nas bike.

Her xwendekarê ku li ser van bingehan perwerdeyê dibîne, demokrasiyê nas dike û fêrî rêgezên demokrasiyê dibe. Li gel perwerdeya ji malbat û dibistanê fêr dibin, pîvana demokrasiyê nas dikin.

Ji ber ku şaristanî û dewlet, li dijî demokrasiyê ne. Ji bo demokratbûna civakê, encax bi kesayet û mamosteyên demokrat ve perwerdeyeke demokratîk gengaz e. Bi vê boneyê, pêwîst e mamoste têra xwe demokrat be, rêgezên demokrasiyê û şêweyê demokratbûnê baş bizane û pêkanîna wê li ber çavên zarokan pêk bîne. Da ku zarok jî fêrî jiyana demokratîk bibin.

## WATEYA PEYVAN

**Demokrasî:** Rêveberiya gel xwe bi xwe.

**Pergal:** Sîstem, awa û şêweya kirina tiştekî.

**Rasterast:** Yekser, dîrek, yekderb

**Şaristanî:** Medeniyet

**Navendî:** Tişta li navendê,

**Bêguman:** Bêşek, tişta ku guman tê de nebe.

**Polîtîka:** Ramyarî, siyasî

**Rêgez:** Prensîp, mebde

**Gengaz:** Pêkan, mumkin, tişta dibe ku bûbe, yan jî bê kirin.

## PIRS

1- Demokrasiya rast çi ye?

2- Demokrasî, ji ku derê dest pê dike?

3- Demokrasî, çi bi mirovan dide qezenckirin?

## RÊZIMAN

**3- Dema borî:** Ev dem, karekî ku beriya niha hatiye kirin, diyar dike.

**Dema borî, di nava xwe de dibe pênc beş:**

**Q)** Dema boriya têdeyî (nêzîk)

**R)** Dema boriya dûdar

**S)** Dema boriya berdest

**T)** Çîrokiya dema boriya têdeyî

**U)** Çîrokiya dema boriya dûdar

**1- Dema boriya têdeyî:** Di dema boriya têdeyî de hêj zêde dem di ser kirina kar re derbas nebûye û nû hatiye kirin.
**Mînak:** **Min pirtûk xwend.**

Di dema boriya têdeyî de pêveka demê li ser koka pevyê nehatiye zêdekirin û bûyer bi awayê xwerû maye.

**Mînak:**
**Lêkera negerguhêz**

| **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|
| Ez ketim. | Em ketin. |
| Tu ketî. | Hûn ketin. |
| Ew ket. | Ew ketin. |

**Lêkera gerguhêz**

| **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|
| Min pirtûk xwend. | Me pirtûk xwend. |
| Te pirtûk xwend. | We pirtûk xwend. |
| Wê/wî pirtûk xwend. | Wan pirtûk xwend. |

**Neyîniya dema boriya têdeyî:** Di dema boriya têdeyî de lêker pêveka neyîniyê “**ne-**“ distîne û dikeve rewşa neyîniyê.
**Mînak**:

Min erka xwe **ne**kir.

Wî av ve**ne**xwar.

Wê li nûçeyan temaşe **ne**kir.

Wan soza xwe bi cih **ne**anî.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsînê

**Rastnivîsa lêkeran:**

Dema ku lêker bi pêşgirê ve pêk hatibe, pêveka dema niha “**di-**” û pêveka neyîniyê “**na-**” dikevin navbera pêşgir û rayeka lêkerê.

**Mînak:**

vekirin —pêveka dema niha (di)→ ve**di**ke

vekirin —pêveka neyîniyê (na)→ ve**na**ke

### Hêmadanîn

**Cotxal (:)**

Dema ku di nava hevokê de tiştek tê gotin, an taybetmendiyên tiştekî tên rêzkirin, an jî wateya wê tê vegotin **cotxal** tê bikaranîn.

**Mînak 1:** Hevalê wî lê nihêrt û wiha got: “Em ê te jî bibînin.”
**Mînak 2:** Tiştên ku mirovê baş ji yê xirab vediqetînin, sê ne: dilpakî, wêrekî û camêrî.
**Mînak 3:** Rengdêr: Ew tiştê ku rengê navdêrê nîşan dide.

## HÎNDARÎ

1- Çi cudahî di navbera dema niha û dema boriya têdeyî de heye?
2- Dema borî, di nava xwe de dibe çend beş? Wan diyar bike.
3- Du hevokan li ser lêkerên (xwestin, revîn), di dema boriya têdeyî de saz bike.
4- Du hevoka li ser lêkerên (dagirtin, bezandin), di dema boriya têdeyî û rewşa neyînî de saz bike.

## PENDÊN PÊŞIYAN

**1- Bêje ev nanê ha ji sibe re, nebêje ev karê ha ji sibe re.**
**2- Belaya ji nezanbûnê mezintir tune ye.**
**3- Heta nekeve li ser destan, nizane qîmetê lingan.**

**WANE 2**

## ZOZAN

Zozanên me bilind in

Tev bi zevî û gund in



Di wan hene avên sar

Tev devî û rêl û dar

Raxerên wan gulçîçek

Firinde tê lek bi lek

Havînan em diçin wan

Tevî koç û pez û gan

Derbas dikin rojên geş

Li ser wê nefela xweş



Dilîzin û dibezin

Heyanî koç dakevin

Dema çiya dibin sar

Payîz dibe em tên xwar

**Osman Sebrî**

## WATEYA PEYVAN

**Zozan:** Çêrgehên havînan ku koçer diçinê, ji ber ku hênik in.

**Zevî:** Erdê çandiniyê, axa ku dexl û dan lê tên çandin.

**Rêl:** Daristanok, dehlên biçûk.

**Raxer:** hawîrdor, qirax

**Gulçîçek:** Cureyeke gulan, ku pir reng û bêhn xweş e.

**Lek bi lek:** Ref bi ref, pêl bi pêl.

**Koç:** Malên barkirî yên ku lawirvaniyê dikin.

**Gan:** Lawirên kedî yên weke; çêlek, ga, gamêş.

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan, zozanên me çawa ne û çi tê de hene? **2-** Kengî koçer diçin zozanan û çima?
**3-** Koçer, çawa dema xwe ya li zozanan derbas dikin? **4-** Kengî koçer ji zozanan vedigerin û çima?

## RÊZIMAN

**2- Dema boriya dûdar:** Di dema boriya dûdar de kar pêk hatiye û demek di ser kirina wî karî re derbas bûye û bandora wî ta niha berdewam dike.

Ev dem; ji pêveka dema boriya dûdar "**-e**" û rayeka dema borî pêk tê. Lê ji bo cudahî bikeve navbera pêveka dema boriya dûdar "**-e**" û pêveka kesane ya kesê sêyem ê yekjimar "**-e**", pêveka dema boriya dûdar dibe "**-iye**". Her wiha, dema ku lêker bi dengdêrê biqede, ev pêvek dîsa "**-iye**" ye.

**Mînak:**

| Lêkera negerguhêz | | Lêkera gerguhêz | |
|---|---|---|---|
| **Yekjimar** | **Pirjimar** | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| Ez ketim**e.** | Em ketin**e.** | Min darin çandin**e.** | Me darek çand**iye.** |
| Tu ket**iye.** | Hûn ketine | Te darin çandin**e**. | Wan darek çand**iye**. |
| Ew ket**iye.** | Ew ketin**e**. | Wî/wê darin çandin**e.** | We darek çand**iye**. |

**Neyîniya dema boriya dûdar**

Dema boriya dûdar, pêveka neyîniyê “**ne-**” distîne û dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:** Min pirtûkên dîrokî pir **ne**xwendine.
Mixabin, me hin hevalên xwe ve**ne**xwendine şahiyê.
Me şehîdên xwe ji bîr **ne**kirine.

**3- Dema boriya berdest:** Dema ku bûyerek di dema borî de bi domdarî hatibe kirin, ev dem tê bikaranîn. Ev dem, ji pêveka dema niha “**di-**” û rayeka dema borî pêk tê.

**Mînak:**

| Lêkera negerguhêz | | Lêkera gerguhêz | |
|---|---|---|---|
| **Yekjimar** | **Pirjimar** | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| Ez dihatim. | Em dihatin. | Min pirtûk dixwend. | Me pirtûk dixwend. |
| Tu dihatî. | Hûn dihatin. | Te pirtûk dixwend. | We pirtûk dixwend. |
| Ew dihat. | Ew dihatin. | Wî/ê pirtûk dixwend. | Wan pirtûk dixwend. |

**Neyîniya dema boriya berdest:** Dema boriya berdest, pêveka neyîniyê “**ne-**” distîne û pêkhatina kar di warê neyîniyê de pêşwazî dike.

**Mînak:** - Kes bi wî re **ne**dilîst.
ûMin rastiya mijarê **ne**dizanî.
ûEw li cihekî rû**ne**dinişt.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Rastnivîsa lêkeran:**

- Lêkerên hevedudanî, dema ku weke lêker bên kişandin, hêmanên lêkerê ji hev cuda tên nivîsandin. Lê dema ku weke navdêr bin, bi hev ve tên nivîsandin.

**Mînak:** - Ez xwe ji bo ezmûnê **amade dikim**.

- **Biryardan** hêsan e, lê **destpêkirin** dijwar e.

## Hêmadanîn

**Cotxal (:)**

- Dema ku mînak tê dayîn, cotxal tê bikaranîn.

**Mînak:** Endamên hevokê, ev in: pêveber, kirde, bireser û têrker.

- Di deqên wêjeyî de dema ku gotûbêj hebe, piştî navê kesekî/ê cotxal tê danîn.

**Mînak:** Hanî: Tu kengî hatî?

Hala: Ez duh bi şev hatim.

## HÎNDARÎ

1- Çî cudahî di navbera dema boriya têdeyî û dema boriya dûdar de heye.

2- Li ser lêkerên (bezîn, bezandin) du hevokan saz bike ku ev lêker di dema boriya dûdar de bin.

3- Dema boriya berdest ji çi pêk tê?

4- Du lêkeran peyda bike; yek gerguhêz û ya din negerguhêz be û du hevokan li ser wan saz bike ku di dema boriya berdest de bin.

## WANE 3

# BEHLÛL Û DARBIRÎN



Rojekê Behlûl ji bo darbirînê, diçe daristanê. Bivirê xwe radike, diçe ser darekê û wî çiqê ku di bin lingê xwe de dibire.

Di wê demê de zilamek di wê derê re derbas dibe û çavên wî li Behlûl dikeve. Ji Behlûl re dibêje: “Ma tu çi dikî! Tu yê bikevî, tayê dar ê li bin lingê xwe nebire.”

Behlûl, guh nade axaftina wî û darbirîna xwe didomîne. Piştî demekê, Behlûl bi dar û bivir ve zirp li erdê dikevin.

Behlûl, piştî xwe komî serhev dike û bêhna xwe vedike, ji xwe re dibêje: “Wey, ev çi zilamekî bihiş bû, wî çawa zanî ku ez ê bikevim, niha ew dizane ka ez ê kengî bimirim jî.” Bi lez û bez dikeve pey wî zilamî û di rê de wî dibîne û jê re dibêje:

“Te zanî ez ê bikevim, niha bêje, ez ê kengî bimirim.” Mêrik dike û nake, nikare xwe ji destê Behlûl rizgar bike. Ji neçarî dibêjê: “Here dema ku te kerê xwe bar kir û tu gihîştî evraziyekê, kerê te sê caran bizire wê demê tu yê bimirî.”

Behlûl jî bi tirs û lerz çû, darên xwe komkirin û barê xwe bar kir. Di rê de rastî evraziyeke dirêj hat. Kerê wî ji germa û westanê carekê zirî, Behlûl got: "Ax! laşê min dêşe." Piştî demekê, cara duyem ker zirî, Behlûl got: "Ax! Taya mirinê hat min." Behlûl riya xwe bi tirs domand.

Cara sêyan kerê wî careke din zirî. Behlûl zanî êdî ev dawî ye, di ber xwe de got: "Ey Xweda! Ez êdî mirî me."

Weke miriyan xwe dirêjî erdê kir. Tarîtiya şevê bi ser de hat.

Behlûl dît: "Eywax gurek hat." Gur li dora kerê wî zivirî û xwest kerê wî bixwe.

Behlûl got: "Guro, guro tu jî dizanî ku ez mirî me, ji ber vê yekê tu tê ber çavên min û kerê min dixwî, ka bila ez sax bûma, vêca bila te biwêriya nêzîkî kerê min bibûya!"

## WATEYA PEYVAN

**Bivir:** Amûreke ku mirov li daran dide û wan pê dibire.

**Zirp:** Gurmîn, ketina li ser erdê ya bi awayekî xurt.

**Rizgarkirin:** Azadkirin, serbestkirin

**Evrazî:** Kaş, riya diçe bilindahiyê, cihê ku ber bi jor ve bilind dibe.

**Bizire:** Dema ku ker dengê xwe derdixe.

**Lerz:** recifîn, qutifîn, livlivîn

**Westan:** Betilîn, kerixîn

**Ta:** Germahî, an jî sermaya zêde ya laş digire, ji ber nexweşiyê.

**Biwêriya:** cesaret kiriba, netirsiya

## PIRS

**1-** Çima Behlûl û bivirê xwe zirp li erdê ketin?
**2-** Mêrik, çi ji Behlûl re got da ku xwe jê rizgar bike?
**3-** Behlûl çi gote gur, dema ku gur dixwest kerê wî bixwe? **4-** Tu jî pêkenokekê binivîse.

## RÊZIMAN

### 4- Çîrokiya dema boriya têdeyî (Dema boriya çîrokî):

Di dema boriya çîrokî de; kar, tevger û bûyer di dirêjahiya dîrokê de çêbûne. Ev dem; ji rayeka dema borî û lêkera "**bûn**"ê pêk tê. Her wiha, tîpa "**i**" weke dengekî alîkar dikeve navbera du dengdaran.

**Mînak:**

| Lêkera negerguhêz | | Lêkera gerguhêz | |
|---|---|---|---|
| **Yekjimar** | **Pirjimar** | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| Ez çûbûm. | Em çûbûn. | Min av vexwaribû. | Me av vexwaribû. |
| Tu çûbûyî. | Hûn çûbûn. | Te av vexwaribû. | We av vexwaribû. |
| Ew çûbû. | Ew çûbûn. | Wî/ê av vexwaribû. | Wan av vexwaribû. |

### Neyîniya dema boriya çîrokî

Dema boriya çîrokî, pêveka neyîniyê "**ne-**" distîne û pêkhatina kar di warê neyîniyê de pêşwazî dike.

**Mînak:**

- Wê tu guneh **ne**kiribû, ji ber vê yekê ew neditirsiya.
- Min hevalekî xwe ve**ne**xwendibû, tevî ku min ew ji bîr **ne**kiribû.

### 5- Çîrokiya dema boriya dûdar:

Ev dem, pir zêde nayê bikaranîn. Dema ku mirov qewimîna tiştekî ji hinekan bibihîze, yan jî mirov bêhemdî tiştek kiribe, tê bikaranîn. Ev dem; ji çîrokiya dema boriya têdeyî û pêveka dema boriya dûdar "**-e**" pêk tê.

**Mînak:**

| Lêkera negerguhêz | | Lêkera gerguhêz | |
|---|---|---|---|
| **Yekjimar** | **Pirjimar** | **Yekjimar** | **Pirjimar** |
| Ez hatibûme. | Em hatibûne. | Min pirtûk xwendibûye. | Me pirtûk xwendibûye. |
| Tu hatibûye. | Hûn hatibûne. | Te pirtûk xwendibûye. | We pirtûk xwendibûye. |
| Ew hayibûye. | Ew hatibûne. | Wî/ê pirtûk xwendibûye. | Wan pirtûk xwendibûye. |

### Neyîniya çîrokiya dema boriya dûdar

Ev dem; weke demên din ên borî, bi alîkariya pêveka neyîniyê "**ne-**" ya ku tê pêşiya lêkerê û dikeve rewşa neyîniyê.

**Mînak:** - Tu ji welêt nehatibûye.
- Min pirtûk **ne**xwendibûye.

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsînê

**- Nivîsîna tîpa "î" ya beriya tîpa "y"**

Dema ku tîpa "**î**" beriya tîpa "**y**" bê, ev tîp kurt dibe û dibe "**i**". Ji ber ku "**y**" tîpeke nîvdengdêr e, "**î**" kurt dibe.

**Mînak:** Kerî ⟶ Ev keriyê pez ê gundê me ye.
Gundî ⟶ Ez û Emer gundiyê hev in.

**Têbînî:** Dema ku tîpa "**î**" û "**y**" ji hev cuda bên nivîsandin, "**î**" nayê kurtkirin û weke xwe dimîne.

**Mînak:** Ew kî ye? Ew Conî ye.

### Hêmadanîn

**Cotxal (:)**

- Di demê de ji bo nîşandana demjimêr û xulekê, di navbera demjimêr û xulekan de cotxal tê danîn.

**Mînak:** Ez her şev, di demjimêr 8:30'an de li nûçeyan guhdarî dikim.

- Di bîrkariyê de weke nîşana parvekirinê tê danîn.


**Mînak:** 18:6=3

## HÎNDARÎ

1- Çi cudahî di navbera çîrokiya dema boriya têdeyî û çîrokiya dema boriya dûdar de heye?
2- Çîrokiya dema boriya têdeyî û dûdar ji çi pêk tên?
3- Du hevokan li ser çîrokiya dema boriya têdeyî saz bike, ku lêkerek gerguhêz û ya din negerguhêz be.
4- Du hevokan li ser çîrokiya dema boriya dûdar saz bike, ku lêkerek gerguhêz û ya din negerguhêz be.
5- Du hevokan li ser lêkerên (raketin- vexwendin) saz bike di her du demên borî yên çîrokî de ku tê de ev lêker di rewşa neyînî de bin.

WANE 4

# CEJNA KARKERAN



Ji dîroka kevn heya roja me ya îro li ser karker, kedkar û xebatkaran; gelek tundî, zordarî, çewisandin û bêmafiyeke bêsînor hatiye meşandin. Maldar û axayên ku hêza xwe ji pergala sermiyandar digirin, ji bo berjewendiyên xwe, sûd û berhemeke pir mezin bi dest bixin, her dem karkeran weke koleyan didin xebitandin. Ev kiryarên hovane, heya roja me ya îro jî li gelek deverên cîhanê bi awayekî rêkûpêk tên meşandin.

Karkeran gelek caran, bi şêweyên cur bi cur li hemberî pergala serdest têkoşîn û berxwedan meşandine. Di van çalakiyan de gelek kes bi qehremanî şehîd bûne.

Ji salên 1850 heya 1890'î li parzemînên Awûstiralya, Emerîka û Ewrûpayê hin çalakiyên weke; çalakiyên birçîbûnê, meş û civîn hatine lidarxistin. Bi taybetî, di 1'ê Gulana 1886'an de li bajarê Şîkago meş û grevên pir mezin hatine çêkirin. Bi sed hezaran karker li kolanan meşiyane. Hêzên dewletê bi tundiyeke bêsînor êrîşî van meşan kirine. Gelek karker di van êrîşan de

hatine girtin, birîndarkirin û kuştin. Hemû çalakiyên demokratîk, hatine qedexekirin.

Ev bûyer, li gelek aliyên cîhanê bandor li ser çîna karkeran kiriye. Di nava karkeran de şiyariyek çêbûye. Karkeran, ji bo ku hin mafên xwe bi dest bixin, xwe birêxistin kirin. Sendîka ava kirin, civîn û konferans li dar xistin. Daxwazên karkeran yên sereke ev bûn:

**1-** Xebata rojê ya 12 demjimêran, daxînin 8 demjimêran.
**2-** Heft rojên xebatê, di hefteyê de bibin şeş roj.
**3-** Rojeke karkeran a taybet hebe (Roja karkerên cîhanê). Bi demê re ev maf, li hinek herêman, an jî dewletan hatin pêkanîn. Di konferansa duyem a ku li Parîsê hat çêkirin de biryar hat dayîn ku li hemû aliyên cihanê 1'ê Gulanê bibe roja hevgirtin, têkoşîn û roja karkerên cihanê.

Ev roj, niha jî li gelek welatên cîhanê bi fermî tê pîrozkirin. Li hin welatan çalakiyên siyasî tên pêşxistin, lê mixabin li hin deveran jî qedexe ye. Ji bo ku mafên karkeran bi giştî werin bidestxistin; gelek kesayet, sazî û partiyên sosyalist, demokrat û azadîxwaz xebatên pir hêja meşandine. Her wiha, têkoşîna azadiya gelê kurd, bi azadiya gelan ve girêdayî û ji bo mafên karkeran jî li gelek deverên cîhanê li hemberî kedxwariya pergala sermiyandar, berxwedaneke bêhempa meşandiye. Niha jî, ev berxwedan û têkoşîn tê berdewamkirin. Bi taybetî, li Rojhilata Navîn ji bo biratiya gelan, wekhevî, demokrasî, aştî û aramiya herêmê, pergala bi navê; "Xweseriya demokratîk" wê bibe bersiva hemû pirsgirêkên karker, cotkar û gelên bindest. Ev felsefeya ku ji hemû gelan re azadîxwaz e, wê bibe kilîla şoreşê ya hemû pirsgirêkên civakê û herêmê.

## WATEYA PEYVAN

**Tundî:** Dijwarî, kotekî, zorî

**Sermiyandar:** kapîtalîst, maldar, dewlemend

**Berjewendî:** fêde, sûd, qezenc

**Berhem:** Encama karekî, tişta/ê hatiye çêkirin, an çêbûye.

**Kole:** Benî, kesê bindest ê ku di jiyana xwe de ji bo kesekî din dixebite.

**Kiryar:** Tişta/ê hatiye kirin, an jî tê kirin.

**Parzemîn:** Rûberekî pir fireh ji bejahiyê, ku bi derya û zeryayan ve dorpêçkiriye, weke; Asya, Ewrûpe, Emerîka…

**Şîkago:** Bajarekî Emerîkayê ye.

**Grev**: Ji ber nerazîbûnê, demekê rawestandina kar.

**Sendîka:** Saziyeke ku karkeran birêxistin dike û parastina mafê wan dike.

**Konferans:** civîn, kombûn,

**Hevgirtin:** hevalbendî, îtîfaq

**Sosyalîst:** Kesê ku baweriyê bi sosyalîzmê tîne.

**Bêhempa:** Bê nimûne, tişta ku weke wê tune ye.

**Kilîl:** Mifte, hesinê ku derî pê tê vekirin.

## PIRS

1- Di 1'ê Gulana 1886'an de çi bûyer çêbûye û li ku derê?
2- Daxwazên karkeran ên sereke çi bûn?
3- Ji bo çareserkirina pirsgirêkên gelan, kîjan pergal hat avakirin?
4- 1'ê Gulanê çi helkeft tê de heye û ji bo te, tê çi wateyê?

# RÊZIMAN

**Avaniya lêkeran:** Avanî, tişta ku avasaziya lêkeran nîşan dide. Ji avaniyê tê zanîn ku kar rasterast bi destê yekî pêk tê, yan jî bi awayekî ne rasterast pêk tê.

**Lêker, ji aliyê avaniyê ve dibin sê beş:**

**1-** Gerguhêz û negerguhêz
**2-** Tebatî û lebatî
**3-** Dançêker

Ji ber ku me mijara gerguhêzî û negerguhêziyê di refê navîn yek de şîrove kiribû, em ê niha li ser her du avaniyên din hin şîroveyan bikin.

**- Avaniya tebatî û lebatî: Dema ku yek rasterast karekî bike, avaniya wî karî lebatî ye. Weke mînak: Min pirtûk xwend.**

Di mînaka li jor de lêkera "**xwend**" di avaniya lebatî de ye. Tê de kirde diyar e.

Lê dema ku em bêjin: Pirtûk hat xwendin. Lêker, di avaniya tebatî de ye. Tê de kirde ne diyar e.

Avaniya tebatî; bi alîkariya lêkera "**hatin**"ê tê bidestxistin. Mirov lêkera "**hatin**"ê li gorî dem û kesan dikişîne û lêkera bingehîn jî dikeve rewşa raderîn û bi vî awayî, avaniya tebatî derdikeve holê.

**Mînak:**

| Avaniya lebatî | Avaniya tebatî |
|---|---|
| - Cewad gulan berhev dike. | Gul **tên** berhevkirin. |
| - Meha bê em ê kar biqedînin. | Meha bê, dê kar **bê** qedandin. |
| - Min kevir avêt. | Kevir **hat** avêtin. |
| - Necahê dara hinarê av daye. | Dara hinarê **hatiye** avdan. |
| - Te nêrînên xwe digotin. | Nêrînên te **dihatin** gotin. |
| - Ciwan kovar xwendibû. | Kovar **hatibû** xwendin. |

## TÊBÎNÎ:

Her wiha, avaniya tebatî ji lêkerên gerguhêz çêdibe. Ji ber ku lêkerên bêyî bireserê (negerguhêz) nikarin bibin tebatî. Ji ber vê yekê, di vê avaniyê de rista bireseran li pêş e.

### Neyîniya avaniya tebatî

Di avaniya tebatî de neyînî, ji lêkera "**hatin**"ê diyar dibe. Ango lêkera "**hatin**" pêveka neyîniyê "**ne-** û **na-**" werdigire.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Goşt **ne**hat xwarin. | (Dema boriya têdeyî) |
| Goşt **ne**hatiye xwarin. | (Dema boriya dûdar) |
| Goşt **ne**dihat xwarin. | (Dema boriya berdest) |
| Goşt **ne**hatibû xwarin. | (Çîrokiya dema boriya têdeyî) |
| Goşt **ne**hatibûye xwarin. | (Çîrokiya dema boriya dûdar) |
| Goşt **na**yê xwarin. | (Dema niha) |
| Goşt dê **ne**yê xwarin. | (Dema bê) |

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**- Nivîsîna tîpa “û” ya beriya tîpa “w”**

Dema ku tîpa “**û**” beriya tîpa “**w**” bê, tîpa “**û**” kurt dibe û dibe “**i**”.

**Mînak:** - Rû ⟶ Ez nikarim li riwê wî binêrim.

- Xwesû ⟶ Xwesiwa wî jineke bejnbilind e.

## Hêmadanîn

**Xalbêhnok (;)**

- Ev hêma, dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî yên ku hev sergihayî dikin.

**Mînak:** Şêr şêr e; çi jin, çi mêr e.

K) Ji bo cudakirina komên hevokên ku hêmanên wan bi bêhnokan ji hev hatine cudakirin, xalbêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:** Em ji serê sibê de li vir in; ne kes tê, ne kes diçe.

# HÎNDARÎ

1- Avaniya tebatî, çawa tê bidestxistin? Bi mînakekê diyar bike.
2- Lêkerên (revandin-kolan-firotin-gotin) di hevokan de bi cih bike, ku di avaniya tebatî de bin.
3- Du lêkerên gerguhêz peyda bike û du hevokan li ser wan saz bike, ku di avaniya tebatî û rewşa neyînî de bin.

WANE 5

## HOGIR Û MERYEM



Ji dûr ve li pişt perdeya şanoyê refek kevok li asîman difirin. Li aliyê çepê çiyayên bilind, bimij, serê wan tijî berfa spî xuya dikir. Li aliyê rastê ku nêzîktir bû, hinek baxçeyên gundiyan û serbanê çend malan xuya dikir.

Ji nişka ve bi dengê muzîkeke nizm re Hogir û Meryem derdikevin ser dikê û destpêkê dengê Meryemê tê bihîstin.

**Meryem:**

- Bawer bike Hogir, min pir dixwest werim bi we re rojbûna te pîroz bikim.

**Hogir: (gotina Meryemê dibire)**

J) Êê, ji bo çi tu nehatî? Min jî pir dixwest ku tu werî. Hevalên me tev hatibûn. Dizanî, te hezkirina xwe daye dilê me hemûyan.

K) Çi bikim Hogir, bila bimîne ji bo careke din. Merasîma şehîdan hebû. Ez ji ber vê yekê nehatim. Ji ber ku şehîd di ser her tiştên me re ne.

L) Ya, bawer bike min zanîbûya merasîma şehîdan heye, min rojbûna xwe pîroz nedikir û ez ê bihatama merasîma

şehîdan.

M) Wa, bi rastî tu yê bihatayî ?

N) Erê, çawa nedihatim Meryem can. Ma çavên min kor in?

Ger em di kêliya dawî de şehîdên xwe, şehîdên ku ji bo me canê xwe kirine qurban, oxir nekin; çi wateya mirovbûna me heye?

O) Her bijî Hogir. Min hevaltiyeke wisa ji te hêvî dikir.

Bila parastina nirxên me, di ser her tiştî re be.

P) Bêguman, divê wisa be. Divê xwendin û zanista me tev ji bo parastina nirxên me be. Tu dizanî mala me hinekî ji bajêr veder e, em agahdariyan ji televîzyonê dibihîsin. Ji ber vê yekê, dema ku tiştek wisa çêbû, ji kerema xwe re min agahdar bike.

Q) Baş e. Ez ê ji vir û şûn de ji bo tevlîbûna hemû çalakiyan te agahdar bikim, Hogir, hevalê min î hêja.

R) Wey tu her sax bî Meryem can. Ger tu min agahdar bikî, ez ê ne tenê kêfxweş, spasiya te jî bikim. Niha bi destûra te, divê ez herim, diya min tenê li mal e, divê alîkariya wê bikim.

S) Baş e. Silavên min bigihîne dayîka xwe. Rojekê ez ê werim serdana wê, lê tu dizanî niha ji ber ezmûnan nikarim.

Piştî van gotinan, xatir ji hev dixwazin û perdeya dikê tê girtin.

## WATEYA PEYVAN

**Şano:** Tiyatro, berhema zarvekirinê ya ku lîstikvan bi xwe li pêş temaşevanan lîstika xwe pêşkêş dikin.

**Mij:** Moran, hewayê şil û ne zelal.

**Dik:** Platform, cihê piçekî ji derdora xwe bilintir ê ku şanoger û muzîkvan hunera xwe li ser pêşkêş dikin.

**Rojbûn:** Roja ku kesek ji dayîk bûye.

**Nirx:** Buha, qîmet, tiştên girîng, an jî pîroz.

**Veder:** Dûrî navendê, an jî ji derveyî cihekî.

**Serdan:** Çûna derekê ji bo dîtina kesekî/ê, yan jî tiştekî.

## PIRS

**1-** Ji bo çi Meryem neçûbû şahiya rojbûna Hogir ?
**2-** Ji bo merasîma şehîdan Hogir çi ji Meryemê re dibêje? **3-** Li gorî naveroka şanoyê, kesên ku beşdarî merasîma şehîdan nebin, kesên çawa ne?

## RÊZIMAN

**Avaniya dançêker:** Dema ku mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov **avaniya dançêker** bi kar bîne.

Avaniya dançêker, bi alîkariya lêkera “**dan**”ê pêk tê. Bo mînak; dema ku yek dibêje: “Ez kincan dişom.” Ew, vî karî bi xwe dike. Lê dema ku kesekî din li şûna wî kincan bişo, wê demê dê bêje; “Ez kincan didim şûştin.”

Ji bo pêkanîna avaniya dançêker, em lêkera “**dan**”ê li gorî dem û kesan dikişînin û tînin ber lêkera bingehîn û lêkera bingehîn dikeve rewşa raderîn.

**Mînak:** - Bozan xanî da avakirin.

J) Remezan miha xwe dide serjêkirin.
K) Em ê zarokên şehîdan bidin xwendin.

**Neyîniya avaniya dançêker:** Di avaniya dançêker de neyînî ji lêkera “**dan**”ê diyar dibe, ango lêkera “**dan**” pêveka neyîniyê “**ne**- û **na-**” werdigire.

**Mînak:** Min karê xwe **ne**da rawestandin.

Ew hestê xwe **na**de xuyakirin.

Elî helwesta xwe **ne**dabû xuyakirin.

**TÊBÎNÎ:** Avaniya dançêker, tenê ji bo lêkerên gerguhêz pêk tên. Ji ber ku divê di bûyerê de bireser hebe.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Nivîsîna daçekan:**

Daçekên "**bi**, **bê** û **ne**" yê dema ku rista pêşgiran bi cih tînin navdêr û hevalnavên nû çêdikin, bi bêjeyê ve tên nivîsandin. Lê dema ku hevalkaran çêdikin, cuda tên nivîsandin.

**Mînak:**

H) Ez çaya bêşekir vedixwim, lê Azad çayê bi şekir vedixwe.
I) Parastina welat karekî birûmet e.
J) Wan bi mêranî şer kir.
K) Ew karê xwe bi xwe dike.
L) Ev mirovekî nexweş e.
M) Xwarina te çêkirî ne xweş e.

## Hêmadanîn

**Xalbêhnok (;)**

- Di mînakên ku tên rêzkirin de yên ji aliyê cure û wateyê ve ji hev cuda ne, bi riya xalbêhnokê ji hev tên cudakirin.

**Mînak:** Divê mirov welat û paytextên wan ji hev cuda bike. Fransa, Îngiltere û Almanya welat in; Parîs, London û Berlîn paytextên wan in.

# HÎNDARÎ

1- Avaniya dançêker kengî tê bikaranîn?
2- Avaniya dançêker çawa tê bidestxistin?
3- Sê hevokên di demên cuda de li ser avaniya dançêker saz bike.
4- Du hevokan li ser neyîniya avaniya dançêker saz bike.

# HÎNDARÎ

**A- Ji vebijêrkên li jêr, a rast hilbijêre.**

**1-** Dema borî di nava xwe de dibin;

**a-** Du beş **b-** Sê beş **c-** Çar beş **d-** Pênc beş

**2-** Di hevokên li jêr de kîjan dema wê boriya nêzîk e? **a-** Me mêvanê xwe pêşwazî kir.

**b-** Cewad karê xwe qedandibû.

**c-** Efaf pir gul çandine.

**d-** Mamoste şagirtên xwe dişopandin.

**3-** Kîjan hevoka li jêr, dema wê boriya dûdar e? **a-** Min gelek pirtûk xwendin.

**b-** Ew bi baweriyeke xurt diaxive. **c-** Wan mêvanên xwe pêşwazî kirin.

**d-** Azad, çîroka Xecê û Siyabend xwendiye.

**4-** Ji hevokên li jêr, kîjan ne dema boriya berdest e? **a-** Kes bi min re nediaxivî.

**b-** Wî zeviyên xwe av dabû.

**c-** Min li televîzyonê temaşe dikir.

**d-** Xelîl dixwest bibe bijîşkek, lê nekarî.

**5-** Ji hevokên li jêr, kîjan di dema çîrokî de ye? **a-** Wê dixwest vegere welatê xwe.

**b-** Min tiştek negotibû.

**c-** Lemîs wêne xêzkirin.

**d-** Me ev kes nedîtiye.

**6-** Kîjan ji hevokên li jêr, ne di avaniya tebatî de ye? **a-** Xanî hat şûştin.

**b-** Xebat hatiye dibistanê.

**c-** Çalakî tên kirin.

**d-** Xwarin hatibû xwarin.

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Rasterast<br>Raxer<br>Kole<br>Westan | Benî<br>Kerixîn<br>Hawîrdor<br>Yekser |

**C- Vebijêrkên li jêr ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**a-** Di dema boriya nêzîk de pêveka demê li ser koka peyvê nehatiye zêdekirin û bûyer bi awayê xwerû maye. (...)

**b-** Di lêkerên ku bi pêşgirê pêk hatiye de pêveka dema niha (**di**) û pêveka neyîniyê dikevin pêşiya lêkerê. (...)

**c-** Dema ku di nava hevokê de tiştek tê rêzkirin, cotxal tê bikaranîn. (...)

**d-** Dema boriya dudar; ji pêveka dema boriya dûdar "**e**" û rayaka dema niha ya lêkerê pêk tê. (...)

**e-** Dema ku di hevokan de mînak tê dayîn, cotxal nayê bikaranîn. (...)

**f-** Dema boriya berdest; ji pêveka dema niha "**di**" û rayeka borî pêk tê. (...)

**g-** Di dema çîrokî de kar, tevger û bûyer di demeke nêzîk de çêbûne. (...)

**h-** Di demê de ji bo nîşandana demjimêr û xulekê cotxal tê bikaranîn. (...)

**i-** Dema ku kesek rasterast karekî bike, avaniya wî karî tebatî ye. (...)

**j-** Xalbêhnok, dikeve navbera du hevokên bi hev ve girêdayî yên ku hev sergihayî dikin. (...)

**k-** Avaniya dançêker; bi alîkariya lêkera "**hatin**"ê pêk tê. (...)

# BEŞA 4

1- Berpirsiyarî

2- Ey Xort (Helbest)

3- Çîroka Wefadariyê

4- Birca Belek

5- Roja Zarokên Cîhanê

WANE 1

# BERPIRSIYARÎ



Berpirsiyarî; xwedîderketina li xwe, kesayetî û civakê ye. Xwedîderketina li hemû nirx, kar û xebatên mirovahiyê ye.

Her çi qas li gorî zagon û destûrên ol û civakan, berpirsiyarî ji temenê 18 salî dest pê dike, lê li gorî zagon û destûrên xwezayî, berpirsiyarî jî weke hemû rêgezên din, ji zarokatiyê ve dest pê dike. Her zarok, li gorî asta xwe di ber xweza, derdor û civaka xwe de berpirsiyar e. Ji ber ku em endamê vê civakê ne, divê em biparêzin.

Ji ber vê yêkê, dema ku temenê zarok dibe heft salî; ji xwarin, vexwarin, paqijî û fêrbûna xwendin û nivîsê berpirsiyar e. Her ku temenê zarok mezintir dibe, bi awayekî xwezayî berpirsiyarî jî zêdetir dibe. Her wiha, zarok ji temenê deh salî derbas dibe, êdî berpirsiyariya pêşxistina kesî û xwedî lêderketina gelek nirxên civakî, xwe didin pêş. Êdî neçar e li pêşberî malbat, dayîk û bav, mamoste, heval û hogirên xwe berpirsiyar be.

Dema ku zarok dikeve temenê ciwaniyê, ango rewşa gihaştinê, êdî dibe dema hilbijartina çawa jiyankirinê. Di vî temenê ciwaniyê de neçariya berpirsiyariya malbat, civak, netewe û pîşe dikevin ser milan. Li gorî vê, ciwan neçar e erka xwe hilbijêre û berpirsiyariya xwe bizane û pêk bîne.

## WATEYA PEYVAN

**Berpirsiyarî:** Erk, karê ku divê mirov bike.

**Ast:** Pile, rade, bilindahî yan nizmahiya tiştekî.

**Pêşxistin:** perisandin, pêşvebirin, baştirkirin

**Hogir:** heval, dost, yar

**Pîşe:** Karê ku mirov tê de pispor bûye.

## PIRS

1- Berpirsiyarî çi ye?
2- Berpirsiyarî, li gorî zagon û destûrên xwezayî kengî dest pê dike?
3- Çi têkilî di navbera temenê zarok û berpirsiyariyê de heye? 4- Berpirsiyariyên xwendekar ên li dibistanê, çi ne?

## RÊZIMAN

**Navdêr:** Peyva ku tiştekî bi mirov dide nîşan. Ew tişt; dibe ku giyanewer, an jî ne giyanewer be; her wiha, dibe ku tiştekî razber, an jî şênber be; ew tişt dibe ku serenav, an jî hevenav be.
Hin caran jî dibe ku navên komî be.

Mirov dikare navdêran, wiha dabeş bike:

**1- Nav, li gorî pêhesînê:**

**a-** Navdêrên şênber (kevir, pîvaz, mêr, jin, newal…)

**b-** Navdêrên razber (rûmet, azadî, guneh, aramî…)

**2- Nav, li gorî taybetiya heyberên ku nîşan didin**:

**a- Serenav:** Ew navê ku taybet e û jê tenê yek heye li cîhanê (Ferat, Fransa, Şam, Azad…)

**b- Hevenav:** Ev navê gîştî ne (spîndar, çiya, derî…)

**3- Nav, li gorî mêjerê:**

**a- Yekjimar:** Navdêrên yekjimar, dema ku xwerû bin, nêtar in. Di dema ravekê de zayenda wan diyar dibe. Dema ku binavkirî bin; tu pêvekan nagirin, lê dema ku nebinavkirî bin; pêveka "**ek**" digirin. Bo mînak; "**Gul**" navdêreke binavkirî ye, tu pêvek negirtiye, lê peyva "**Gulek**" navdêreke nebinavkirî ye, pêveka "**ek**" girtiye.

Yekjimariya navdêran, bi alîkariya tewang û veqetandekê tê nîşandan:

**1-** Bi alîkariya tewangê. **Mînak:** Gul**ekê** bide min.

**2-** Bi alîkariya veqetandekê. **Mînak:** Bav**ê** min hat.

**b- Pirjimar:** Ji bo diyarkirina pirjimariya navdêrên xwerû tu pêvek tune ne. Ji ber vê yekê, dema ku navdêr bi serê xwe be, pirjimar nabe. Mêjera navdêrên xwerû di hevokê de bi alîkariya lêkerê tê nîşandan

**Mînak:** Zarok hat. (yekjimar)

Zarok hatin. (pirjimar)

**c- Komenav:** Ev cure navdêr, komekê nîşan didin, tevî ku bi xwe piraniyekê di nava xwe de dihewîne jî, lê weke yekjimar tên pejirandin. Bo mînak; "**Gel**" dema ku em dibêjin; "Gelê min" em qala pir kesan dikin, lê navdêr bi xwe yekjimar e. Ji bo ku em vê peyvê bikin pirjimar, divê em pêvekên pirjimariyê pê ve bikin.

**Mînak:** gel, netewe, pez, artêş, garan, şênî…

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Nivîsîna daçekan**

**-** Hinek hevalnav hene ku ravebera wan ketiye û weke navdêr tên bikaranîn. Di van hevalnavan de jî daçek bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** - Bêrûmet koletiyê dipejirînin.

Biwijdan bêmafiyê napejirînin.

**I)** Dema ku daçek, weke pêvekên peyvsaz bên bikaranîn û ji wan peyvên nû bên çêkirin, bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** - Bêlome be, ev çi bû?

- Neyarê gelê me, bi şerê taybet zora me dibir.

## Hêmadanîn

### - Pirsnîşan (?)

1- Ev hêma, tê dawiya hevokên pirsê. Pirs, bi riya çend alavên weke; ma, qey û gelo jî tê kirin.

**Mînak:** - **Kî** hat?

- **Gelo** we karê xwe qedand?

## HÎNDARÎ

**1-** Nav, li gorî pêhesînê dibin çend beş? Bi mînakan diyar bike.
**2-** Nav, li gorî taybetiyên heyberên ku nîşan didin, dibin çend beş? Bi mînakan diyar bike.
**3-** Nav, li gorî mêjera xwe dibin çend beş? Bi sê mînakan diyar bike,
**4-** Navên li jêr, li gorî pêhesînê ji hev cuda bike.
(bawerî, rastî, çem, rastkêş, pirtûk, evîn, ba, mejî, aşopî)
**5-** Sê hevokan saz bike, ku kirde di yekê de yekjimar, a din de pirjimar û ya sêyem de komenav be.

## WANE 2

# EY XORT

Xortê jîr û xwendevan, çare û omîda milet
Rabe ji xew tu carek, serê roja me derket

Xwe rapêçe birader, ji bo kar û xebatê
Kes nemaye di xew de cîhan pêk ve li hev ket

Li çar kenar û hawîr, şer û halan û ceng e
Karwanê riya jînê, binêre va bi rê ket

Li şûna wara nemînî, dem pir xweş e birader
Di vî wextî nemane, tu kes bê al û şewket

Ger ranebî tu ser xwe, welat bi pêş ve naçî
Ew rebenên miletan, tev wek te ne bi himet

Welatê xwe bi zorê, ji bin destan derînan
Ketin rûpelê tarîx, bi mêranî bi şuhret

Heta ku em wisa bin, dê tim halê me ev be
Perîşan û belengaz, jar û bêser û siket

**Seydayê Tîrêj**

## WATEYA PEYVAN

**Omîd:** hêvî, daxwaz, xwestek

**Rapêçe:** Bipêçe, yan jî binixumîne.

**Kenar:** rex, goşe

**Hawîr:** Derdor, hemû rexên tiştekî.

**Halan:** êşandin, acizkirin

**Karwan:** Çend kesên ku bi hev re di riyekê de dimeşin, bi taybetî kesên bi dewar û bar.

**Şewket:** mezinahî, hêz, ezamet

**Reben:** belengaz, hejar, perîşan

**Himet:** karîn, taqet, xîret, enerjî

**Siket:** pergal, awa

## PIRS

**1-** Li gorî helbestvan; xortê xwendevan, ji bo milet çi ye?
**2-** Helbestvan, çi ji xortê jîr û xwendevan dixwaze?
**3-** Miletê cîhanê çawa welatên xwe ji destê zordaran rizgar kirine?
**4-** Ger welat rizgar nebe, dê halê milet çawa be?

## RÊZIMAN

**Peyvsaziya navdêran:** Navdêr, li gorî peyvsaziya xwe; dibin du beş:

**1-** Navdêrên xwerû
**2-** Navdêrên nexwerû

**1- Navdêrên xwerû:** Ew navdêrên ku ji hêmanekê bi tenê pêk tên û dema ku ji hev parçe dibin, wateya xwe ji dest didin.

**Mînak:** aş, ax, av, kevir, temen, roj, meh, kes, kum, çem, ûr, dest, çiya, şev, sal, sêv, nan, hinar…

**2- Navdêrên nexwerû:** Ev cure navdêr, di nava xwe de dibin sê beş:

**a-** Navdêrên pêkhatî
**b-** Navdêrên hevedûdanî
**c-** Navdêrên kompleks

**a- Navdêrên pêkhatî:** Ev cure navdêr, bi alîkariya pêşgir û paşgirê pêk tên, dema ku li ser navên xwerû zêde dibin.

**Mînak:**

Navdêrên bi pêşgirê pêkhatî: **î**şev, **zir**bav, **kele**mêr, **ma**ker…

Navdêrên bi paşgirê pêkhatî: ser**î**, şîn**ahî,** nav**çe,** dar**ik**,…

**b- Navdêrên hevedudanî:** Ew navên ku ji du peyvên xwerû û bêhtir pêk tên û navekî nû diafirînin.

**Mînak:** cangorî, bejnbilind, pozberan, rûken, reşbelek, dilgeş, kedxwar, rojda…

**c- Navdêrên kompleks:** Ew navên ku ji navekî pêkhatî, yan jî navekî hevedudanî û pêvekeke navdêrsaz pêk tên.

**Mînak:** şaristanî, nalbendî, rojnamegerî, dûvmeqesk…

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**Nivîsîna daçekan**

- Daçekên hevedudanî, ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** di ser de, bi şûn de, bi jor ve, ji paş ve...

- Di hin peyvan de daçekên hevedudanî yên ku ji pêşdaçek û paşdaçekê pêk tên, dema ku pêşdaçek bikeve, paşdaçek bi bêjeyê ve dizeliqe.

**Mînak:** dûre, piştre, lewre, peyre...

Ev daçek, di bingehê xwe de bi vî awayî bûn: di dû re, di pişt re, ji lew re, di pey re…

## Hêmadanîn

**Pirsnîşan (?)**

û Dema ku agahiyên tên dayîn biguman bin, di nava kevanekê de ( **?** ) pirsnîşan tê danîn.

**Mînak:** Ehmedê Xanî, di salên (1651-1707?) di Nûbihara Biçûkan de gelek şîretan li zarokên kurd dike.

- Di hevokên hevedudanî yên pirsê de pirsnîşan li dawiya hevoka dawî tê danîn.


**Mînak:** Te Qasim dît, te çi jê pirsî, ma bersiva te da?

# HÎNDARÎ

**1-** Navdêrên xwerû çi ne? Du hevokan li ser wan saz bike.
**2-** Navdêrên nexwerû çend beş in? Her beşê bi mînakekê diyar bike.
**3-** Navdêrên li jêr, li gorî peyvsaziya wan, ji hev cuda bike.
Welatparêz, pirbêj, dibistan, maldarî, îşev, çapemenî

WANE 3

# ÇÎROKA WEFADARIYÊ



Serê sibehê zû, dema çûna zarokan a dibistanê bû. Narînê di refa sêyem a seretayî de dixwend. Wê rojê dayîka wê nexweş ketibû. Ji ber ku Narînê pir ji dayîka xwe hez dikir, her çi qasî dayîka wê dixwest here dibistanê jî, lê Narînê destûra xwe ji dibistanê xwestibû û wê rojê neçûbû dibistanê, da ku li ber serê dayîka xwe rûne û lê binêre. Di wê navberê de birayê wê yê biçûk Masîro, erê ji hişê xwe astengdar bû, lê weke parçeyeke şekir şêrîn bû, giriya û xwe li erdê da û got:

4. Niha ez pênûs û lênûsekê dixwazim, dê...dê... zû... (bi dengê bilind kir qîreqîr)

Her çi qas dayîka wî bi van gotinan hewl dide hêmin bike; “Kurê min hîn zû ye. De raweste, bila dikandar dikanên xwe vekin, hîn ji xew ranebûne.” Lê nekarî wî qayîl bike.

Ji ber vê yekê, neçar dibe ku du diravan bide Narînê û dibêje: Keça min, bi birayê xwe re here dikanê, jê re pênûs û lênûsekê bikire û zû vegerin malê, hewa pir sar e, bi sermayê nekevin. Narîn: Baş e, dayêcan dema ku me kirî, yekser em ê vegerin malê.

Narîn destê birayê xwe Masîro digire û ji mal derdikevin, ber bi dikanê ve diçin. Dema ku Narîn di rê de diçe, zilamekî dibîne ku ji her du piyên xwe astengdar e. Yek ji diravên xwe dide wî zilamê astengdar. Ew pir şa dibe, spasî û ruhê yezdanpakiyê li wan dide. Ji ber ku yek ji diravên xwe dane wî zilamê astengdar, dema ku diçin dikanê diravên wan tenê têra lênûsê dikin û nikarin pênûsê bistînin. Dema ku ji dikanê derdikevin û pênûsê nastînin, xwediyê dikanê banî wan dike:

- Dikandar: "Narîn, Narîn... were, were. Madem ji bo Masîro ye, hişte van her du pênûs û van şekirokan jî ji bo Masîro bibe." Destê xwe li serê Masîro datîne û axaftina xwe didomîne: "Masîro gula taxa me ye." Dema ku wisa dibêje,

Masîro lê dinêre û dikene. Narîn vê kiryara dikandar mereq dike û jê dipirse: "Xalo, ji bo çi tu tiştên xwe hema wilo bê dirav, belaş didî?"

Dikandar, hinekî xwe ditewîne û her du destên Narînê digire, li rûyê wê temaşe dike û dibêje:

Narîn, keça min, tu tişt bêheq û ked tune ye. Her tişt, ked û zehmetiyekê dixwaze. Tu gulekê jî biçînî, lê av nedî; ew gul wê biçilmise. Binêre li çavên min, di şerê Gundê Eloka de guleyek li serê min ket û rayên çavê min ê çepê derb xwar, ger heval li min xwedî derneketana, wê çi bibûya ji min, keça min? Erê, ez niha bûme dikandar, lê ez ji bîr nakim jiyana hevpar, ji bîr nakim zarokên wan hevalên li kêleka min şehîd bûne.

Weke çand û sinc jî, divê em hemû li hemberî kesên astengdar rêzdar bin û wan bi tenê nehêlin.

Dema ku Narîn digihêje malê, vê mesela bi serê wê ve hatiye, ji dayîka xwe re vedibêje. Dayîka wê pir dilşa dibe, her du çavên keça xwe maç dike û dibêje:

- Keça min, xwe ji wefadariyê nede paş û tu carî ji dinyayê bêhêvî nebe. Bila her tim di dilê te de hêvî hebe. Deriyek tê girtin û bi dehan derî vedibin. Te bi çavên serê xwe dît, te çawa diravek da wî camêrê astengdar û destê wî girt, camêrekî din jî destê we girt. Bila weke guharekî di guhê te de be; tu çi qas destê mirovan bigirî û wan ji tengasiyê xelas bikî, mirov jî wê ew qas destê te bigirin û te ji tengasiyan xelas bikin. Ji ber vê yekê, pêşiyên me gotine: “Tu çi biçînî, tu yê wê biçinî.”

## WATEYA PEYVAN

**Wefadar:** dilsoz, rastbêj, pêbawer

**Qîreqîr:** Hawar, qîjeqîj, bi dengekî bilind peyvîn.

**Hewl dide:** dixebite, têdikoşe

**Hêmin:** aram, ewle, rihet

**Qayil dike:** Razî dike, kesê tiştekî qebûl dike yan pê kêfxweş e.

**Astengdar:** Kesê ku kêmasiyek fîzîkî û derûnî heye, weke; seqet, kor…

**Şa dibe:** Kêfxweş dibe, dilxweş dibe.

**Yezdanpakî:** Rehmeta Xweda.

**Tax:** Beşeke diyar a ji bajarekî, yan jî gundekî.

**Mereq dike:** Pir xwestina ku tiştekî bizane.

**Biçilmise:** Biqurmiçe, ji ber piçek hişkbûnê geşbûna xwe winda dike.

**Guhar:** Parçeyên zêr, an jî zîv ên ku keç û jin bi guhên xwe ve dikin.

**Tengasî:** Rewşa zehmet, an jî ne xweş.

## PIRS

1- Narînê ji bo çi destûra xwe ji dibistanê xwestibû?
2- Narîn ji bo çi diraveke xwe dide wî mirovê astengdar?
3- Çawa diyar bû ku dikandar mirovekî wefadar e?
4- Dema ku Narînê çîroka dikandar ji dayîka xwe re vegot, dayîka wê çi got?
5- Te çi encam ji vê çîrokê derxist?

## RÊZIMAN

**Hevoksazî:** Beşa zimanzaniyê ya ku awayê pêkhatina hevokan û rêzbûna bêjeyan vedikole û wan şîrove dike. Ji ber vê yekê, em ê di vê beşa ziman de hêmanên hevokê û cureyên hevokan şîrove bikin.

**Hêmanên hevokê:** Di hevokê de du hêmanên bingehîn hene, ew jî; kirde û pêveber in. Du hêmanên alîkar hene, ew jî; bireser û têrker in.

**1- Kirde:** Ji peyva ku kirina kar di hevokê de digire ser xwe re **kirde** tê gotin.

**Mînak:** - **Nîhad** kevir avêt. -
**Bizinê** giya xwar.

**2- Pêveber:** Di hevokê de ji hêmana ku karekî, bûyerekê, rewşekê radigihîne re **pêveber** tê gotin. Ji bo pêveberê, pêwîstî bi lêkereke kişandî heye.

**Mînak:** - Pelên darê **hilweşiyan**.
- Hesen şagirtekî **jîr** e.

**3- Bireser:** Ji peyva ku ji kirina karê kirdeyê bandor dibe re **bireser** tê gotin. Hêjayî gotinê ye ku hebûna bireserê, girêdayî cureya lêkerê ye; ger lêker gerguhêz be; wê bireser hebe, lê ger lêker negerguhêz be; wê bireser tune be.

**Mînak:** - Leyla **helbestekê** dixwîne. (lêker gerguhêz e)

- Şagirt ji dibistanê **tên**. (lêker negerguhêz e)

**4- Têrker:** Ji gelek aliyan ve karê ku tê kirin, sergihayî dikin. Ev sergihayîkirin, dibe ku ji aliyê dem, an cih, an jî rewşê ve be. Têrker, di binyata xwe de **hevalkar** û **daçek** in.

**Mînak:** - Zarok, **li dora darê** dizivirin.

8.Gundî, **serê sibehê zû** diçin nav zeviyên xwe.
9.Ez **duh gelekî** westiyam.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

**- Nivîsîna veqetandekan**

**a-** Veqetandekên "**-a**", "**-ê**", "**-ên**" peyvê bi ravekerê ve têkildar dikin û bi peyvê ve tên nivîsîn.

**Mînak:** - Tiliy**ên** wî di nava berfê de pûç bûn.

- Biray**ê** min te baş nas dike.
- Dar**a** guzê hişk bûye.

## Hêmadanîn

### Pirsnîşan (?)

Li dawiya hevokên pirsê, bêyî ku peyvên pirsê bên bikaranîn, yên ku bi riya kirpandinê ve çêdibin, pirsnîşan tê danîn.

**Mînak:** Te xwarin xwar?

We heval dîtin?

Te çîroka Mem û Zîn xwendiye?

## HÎNDARÎ

**1-** Hevoksazî, çi lêkolînan li ser hevokê dike?
**2-** Hêmanên hevokê yên bingehîn û alîkar çi ne? Bi du mînakan, van hêmanan diyar bike.
**3-** Hêmanên hevokê yên li jêr, diyar bike.

5. Ez îro ji malê derneketim.
6. Cîhad pirsgirêk çareser kir.
7. Ronî kesekî birûmet e.
8. Xatûnê name di refê de nivîsî.

## PÊKENOK

**Xwediyê sola nû**

Yekî destgirtî û çavteng cara yekem ku ji xwe re cotek solên (qundere) nû kirî. Rabû çû nav zadê xwe, da ku li rewşa wî binêre. Ev demeke dirêj bû, ku baran nehatibû. Lê piştî ku gihaşt nav zad, baraneke xurt dest pê kir. Mêrik li ber sola xwe ket, ku biqete. Wî berê xwe da asîman û bangî Xweda kir:
“Xwedayo! Ez bêjim bila baran neyê; zadê min şîn nabe û wê mala min xerab bibe, ez bêjim bila baran bê; sola min a nû wê bilewite û biqete. Hema ya rebî, tu rihê min bistînî û min ji vî halî xelas bikî.”

**WANE 4**

# BIRCA BELEK



Rojek ji rojên biharê yên xweş bû. Destpêkê baran barîbû. Piştre jî rokeke xweş hilatibû.

Şîlan: Rûgeş, were em biçin li nava Birca Belek bigerin.

- Erê, ev ramaneke pir baş e.

Di cih de kincên xwe wergirtin û ketin ser rê. Şîlanê hewayê paqij kêşa û axivî: Ox! Dema ku baran dibare, her alî çi qas xweşik dibe.

Rûgeş jî ew qas bextewar dibû.

Rûgeş: Rast e. Piştî baranê bêhna axê çi qas xweş e!... Çi qas xweş e, ma ne wilo ye?

Têra xwe bi rê ve çûn, ketin ser riya ku diçe Birca Belek.

Şîlan**:** Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?

Rûgeş: Ez hinekî dizanim.

Şîlan**:** Birca Belek cihê mîrê herêma Botanê bû. Qesreke mezin ji aliyê mîrê Cizîrê ve li ser rûbarê Dicleyê hatiye avakirin. Dîwarê qesrê; rêzek bi kevirên reş, yek jî bi yên spî

hatiye çêkirin. Piştî demekê ji aliyê hêzên dagirker ve hatiye dagirkirin, demeke dirêj weke baregeha leşkerî dihat bikaranîn.

Rûgeş**:** Rast e, gelek cihên dîrokî yên gelê me hene, ku ji aliyê hêzên dagirker ve hatine dagirkirin.

Şîlan**:** Weke ku tê binavkirin, em bi riya Şêran ve hêdî hêdî diçin.

Şîlanê Birca Belek baş nas dikir. Beriya niha, bi bavê xwe re lê geriyabû.

Şîlan**:** Rûgeş, Birca Belek ji sê sed û şêst û şeş odeyan pêk tê. Hem bi firehbûna xwe ve pir fireh e, hem jî bi bilindbûna xwe ve pir bilind e.

Rûgeş: Ha Şîlan, nêzîk e ku bi têkoşîna gelê me Birca Belek ji dagirkeran rizgar bibe.

## WATEYA PEYVAN

**Birca Belek:** Avahiyeke dîrokî ye, li Cizira Botan li ber peravên Çemê Dîcleyê ye.

**Birc:** Avahiya ku li ser sûr û kelehan hatiye avakirin.

**Belek:** Têkilbûna rengê reş û spî.

**Baregeh:** cih, navend, meqer

## PIRS

**1-** Şîlan û Rûgeş, di rojeke çawa de çûbûn Birca Belek?
**2-** Şîlan û Rûgeş, di kîjan riyê re çûn Birca Belek?
**3-** Birca Belek, ji çi pêk tê û çawa ye?
**4-** Birca Belek li ku dera Kurdistanê cih digire?
**5-** Çend cihên dîrokî yên li herêma xwe, bi nav bike.

# RÊZIMAN

## Hevok, li gorî rewşa pêveberê:

### 1- Hevoka navdêrî:

**Ji hevokên ku bi alîkariya lêkera "bûn" û cînavkên kesandinê tên sazkirin û rewşekê nîşan didin re hevokên navdêrî tê gotin. Her weke ku tê zanîn, lêkera "bûn" xwediyê du wateyan e, yek ji wan rewşê nîşan dide ku hevokên navdêrî saz dike.**

**Mînak:**

7. Aram û Warşîn hevalên min **in**.
8. Awazên bilbil pir xweş **in**.
- Raman jêhatî **ye**.
- Ew gotin, ne zelal **e**.

### 2- Hevoka lêkerî

Ev cure hevok, kirina karekî dide diyarkirin. Dema ku pêveber ji lêkerekê pêk bê, ango hevok li ser lêkerê bê avakirin, jê re **hevoka lêkerî** tê gotin. Ango hevokên çêdibin, ji bilî lêkera "**bûn**" a ku rewşê nîşan dide, hevokên lêkerî ne.

**Mînak:**

3. Hogir xwe **mexapîne**, em ê li jor karekî **bikin**.
4. Dijmin ji nişka ve **tê**.
5. Divê wekhevî di navbera jin û mêr de **bê** avakirin.
6. Ew beriya du salan **bû** mamoste.

# RASTNIVÎS

## Destûrên Nivîsînê

### f.Nivîsîna veqetandekan:

Di ravekên têkel(zincîrî) de veqetandek erka cînavkê digirin ser xwe û cuda tên nivîsîn. Heke peyva beriya veqetandekê bi tîpa dengdêr biqede, tîpa kelijandinê “**y**” tê pêşiya veqetandeka serbixwe û dibe “**ya**, **yê** û **yên**”.

Mînak: - Şaredariya Qamişlo **ya** Rojhilat, şahiyek li dar xist.

- Hevala min Yasmîn **a** yekem bû di pêşbirkê de.
- Şagirtên jêhatî **yên** dibistana me hatin xelatkirin.
- Gelên bindest **ên** birûmet, zordariyê napejirînin.

## Hêmadanîn

### - Baneşan (!)

Dema ku mirov bixwaze hestekê (coş, xem, tirs kêfxweşî...) nîşan bide, hêmaya baneşanê (**!**) li dawiya hevokê datîne. Bêjeya piştî baneşanê, bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak: Hiş be kuro! Bila kes dengê te nebihîze.

Hey wax! Felekê te çima li me wiha kir.

# HÎNDARÎ


**1-** Lêkera **bûn**ê kengî hevokên navdêrî saz dike? Bi mînakekê diyar bike.
**2-** Du hevokên navdêrî saz bike.
**3-** Du lêkeran peyda bike û du hevokan li ser wan saz bike. **4-** Endamên hevoka li jêr, diyar bike.

“**Min bi keviran xaniyek ji xwe re ava kir**.”

**108**

WANE 5

## ROJA ZAROKÊN CÎHANÊ



Rêxistina Neteweyên Yekgirtî, di sala **1925**’an de biryar da ku **1**’ê **Hezîranê** bibe roja zarokên cîhanê. Hin dewlet evî rojê pejirandin. Ji ber vê yekê, mafê zarokan e ku wê rojê; weke roja cejna xwe bizanin û bi coş û xuroş, kêf û şadî pîroz bikin. Ji ber vê yekê, divê hemû welatên cîhanê bi deng û rengên xwe, piştgiriya vê roja zarokan bikin. Ji ber ku zarok, siberoja civakê ne. Zarokên perwerdekirî; mizginiya siberoja serkeftî ne. Ji ber vê yekê;

**1-** Hemû zarokên cîhanê xwediyê wî mafî ne ku ji bo siberojeke ronî ji aliyê xwendin û perwerdehiyê ve alîkarî ji wan re werin dayîn.

**2-** Divê dermanên dijî nexweşiyan, ji bo hemû zarokan werin peydakirin.

**3-** Divê derfetên xwendin û nivîsandinê, ji bo hemû zarokan werin dayîn û pêşxistin.

**4-** Nabe ku di temenê zarokatiyê de kar bi zarokan were kirin. Ger ji ber hejarî kar bikin jî, divê karê giran bi wan neyê kirin.

## WATEYA PEYVAN

**Rêxistin:** Sazûmanî, komek mirovên ku ji bo hin armancên diyarkirî, dixebitin.

**Yekgirtî:** yekbûyî, hevgirtî, hevbend

**Coş û xuroş:** heyecan, kelecan

**Piştgirî:** alîgirî, alîkarî, yarmetî, destek, piştevanî

**Mizgînî:** Nûçeya xweş, peyama dilxweşker, xebera bixêr.

**Peydakirin:** hebûn, bidestxistin

**Derfet:** Delîv, fersend, keys

## PIRS

1- Kîjan roja salê, roja zarokên cîhanê ye, kengî û kê ev biryar daye?
2- Zarokên perwerdekirî, ji bo welatê xwe çi ne?
3- Rêxistina Neteweyên Yekgirtî ji bo parastina mafê zarokan, kîjan zagon danîne?
4- Tu weke xwendekarek, roja zarokên cîhanê çawa dibînî? Bi çend hevokan ve hestên xwe yên der barê vê mijarê de vebêje.

# RÊZIMAN

**Hevok, li gorî avasaziyê:**

**Hevok, li gorî avasaziya xwe; dibin du beş:**

**1- Hevokên xwerû:** Hevokên ku hest û ramaneke tenê rave dikin û bi lêkereke tenê ya kişandî ve tên sazkirin, hevokên xwerû ne.

**Mînak:** - Dê û bavê Delîl çûn ser avê.

3. Vî karî ez bextewarkirim.
4. Divê her kes ji bo rastiyê têbikoşe.

**TÊBÎNÎ:**

Hevokên ku bi alîkariya lêkerên alîkar saz dibin jî, hevokên xwerû ne. Ji ber ku lêkera alîkar, lêkera bingehîn sergihayî dike.

**Mînak:** - Ez **diwêrim** rastiyê bêjim.

- Ew **dixwazin** daran biçînin.

**2- Hevokên hevedudanî:** Dema ku mirov nikaribe hest û ramanên xwe bi hevokeke tenê vebêje, wê demê dikare hest û ramanên xwe bi çend hevokan vebêje.

Hevokên hevedudanî, di nava xwe de dibin du beş:

**a- Hevokên hevedudanî yên serbixwe:** Dema ku hevok ji çend parçeyan pêk tên, her yek ji wan xwedî wateyeke serbixwe ye û bi alîkariya bêhnok û gihanekan bi hev ve tên girêdan, ji wan re **hevokên hevedudanî yên serbixwe** tê gotin.

**Mînak:** Ez nikarim li vir bijîm, ev der pir sar e.

Ehmed li tembûrê dixe û Ronî lê guhdar dike.

**b- Hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî:** Ev cure hevok, ji aliyê wateyê ve bi alîkariya hin gihanekan bi hev ve tên girêdan. Hin gihanekên ku ji bo pêkanîna van hevokan tên bikaranîn, ev in: “**lê**”, “**lê belê**”, “**hem...hem jî**”, “**ne...ne jî**”,

“**yan...yan jî**”, “**belkî**”, “**dibe ku**”, “**her wekî**”, “**ku**”. Gihanekên sedemî, weke; “**ji ber ku**”, “**da ku**”, “**çima ku**”. Gihanekên demî, weke; “**dema ku**”, “**piştî ku**”, “**beriya ku**”, “**çer ku**”. Amrazên raweyê, weke; “**divê**”, “**bila**”, “**heke**”.

**Mînak:** - **Heke** serma wisa bimîne, dê berf bibare.

- **Ji ber ku** ez pir westiya bûm, ez zû raketim.

**TÊBÎNÎ:** Di hevokên hevedudanî yên pevgirêdayî de hêmaneke bingehîn heye û yek jî alîkar e.

**Mînak:** Ji ber ku tu nehatî, bavê min destûra çûna min neda.

Hevoka alîkar — Hevoka bingehîn

## RASTNIVÎS

### Destûrên Nivîsînê

**5. Gihanek û hevalkarên hevedudanî**, bi giştî ji hev cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** her wiha, her tişt, ew qas, çi qas, her tim, tu kes,...

**6. Cînavkên kesandinê**, bi lêkeran ve tên nivîsandin. Lê ji hevalnav, cînavk û navdêran cuda tên nivîsandin.

**Mînak:** - Ez diçi**m** pirtûkxaneyê.

- Ez baş **im**. - Tu şagirt **î**? - Ez **im** hevalê te.

### Hêmadanîn

**- Baneşan (!)**

Baneşan, bi armanceke cuda tê bikaranîn. Dema ku di nava kevanekê de li ber bêjeyekê bê danîn, tê wê wateyê ku nivîser bi dijwateya wî tiştî bawer e.

**Mînak:** Hesen mirovekî wêrek(**!**) e, ji ber vê yekê bi şev dernakeve.

## HÎNDARÎ

**1-** Hevokên xwerû çi ne? Bi mînakekê diyar bike.
**2-** Kengî hevokên hevedudanî tên bikaranîn?
**3-** Hevokên hevedudanî, di nava xwe de dibin çend beş? Li ser her beşê hevokekê saz bike.

# HÎNDARÎ

**A- Ji vebijêrkên li jêr, a rast hêma bike.**

**1-** Kîjan navdêr ji yên li jêr, serenav e?

**a-** Gul **b-** Sazî **c-** Cûdî **d-** Çiya

**2-** Kîjan navdêr ji yên li jêr, şênber e?

**a-** Guneh **b-** Lênûs **c-** Hizir **d-** Rûmet

**3-** Navên nexwerû di nava xwe de dibin;

**a-** Du beş **b-** Sê beş **c-** Çar beş **d-** Pênc beş

**4-** Kîjan peyv ji yên li jêr, navekî pêkhatî ye?

**a-** Temen **b-** Şaristanî **c-** Maldar **d-** Gakovî

**5-** Hêmanê hevokê çend in?

**a-** Du **b-** Sê **c-** Çar **d-** Şeş

**6-** Kîjan ji hevokên li jêr, navdêrî ye?

**a-** Dijmin ji nişka ve hat.

**b-** Nalîn dixwaze bibe dîroknas.

**c-** Em her havîn diçin zozanan.

**d-** Zivistan li welatê me pir sar e.

**7-** Peyva “derfet” tê wateya;

**a-** Coş **b-** Piştgirî **c-** Delîv **d-** Awarte

**8-** Kîjan ji hevokên li jêr, hevokeke hevedudanî ya serbixwe ye?

**a-** Divê her kes ji bo azadiya welatê xwe têbikoşe.

**b-** Ez nikarim te bibînim, karê min pir heye.

**c-** Ez dûv ketim da ku jê re mijarê rave bikim, lê wê qet guh neda min.

**d-** Mamoste pirsên ezmûnê amade kirine.

**B- Peyvên li jêr ên hemwate, bigihîne hev:**

| | |
|---|---|
| Mizgînî | Biqurmiçe |
| Baregeh | Erk |
| Biçilmise | Hevî |
| Berpirsiyarî | Cih |
| Omîd | Nûçeya xweş |

**C- Vebijêrkên li jêr ên rast; bi tîpa (R) û yên şaş jî; bi tîpa (Ş) hêma bike û yên şaş sererast bike.**

**a-** Navdêr, li gorî hestpêkirinê dibin du beş; serenav û hevenav. (…)

**b-** Yekjimariya navdêran, bi alîkariya tewang û veqetandekê tê nîşandan. (…)

**c-** Hin hevalnav hene ku ravebera wan ketiye û weke navdêr tên bikaranîn, di wan hevalnavan de daçek ji peyvê cuda tê nivîsandin. (…)

**d-** Navdêrên xwerû, ji hêmanekê zêdetir pêk tên. (…)

**e-** Daçekên hevedudanî, ji hev cuda tên nivîsandin. (…)

**f-** Dema ku agahiyên tên dayîn, bi guman bin; pirsnîşan di nava kevanekê de tê danîn. (…)

**g-** Hêmanên hevokê yên alîkar; kirde û bireser in. (…)

**h-** Peyva ku di hevokê de kirina kar digire ser xwe, kirde ye. (…)

**i-** Li dawiya hevokên pirsê yên ku bi riya kirpandinê çêdibin, pirsnîşan tê danîn. (…)

**j-** Hevokên ku bi alîkariya lêkera "bûn" û cînavkên kesandinê tên sazkirin û rewşekê nîşan didin, hevokên lêkerî ne. (…)

**k-** Dema ku mirov bixwaze hestekê (coş, tirs, kêfxweşî )…) nîşan bide, hêmaya pirsê li dawiya hevokê datîne. (…)

**l-** Hevokên ku bi alîkariya lêkerên alîkar saz dibin, hevokên hevedudanî ne. (…)

**m-** Cînavkên kesandinê, ji lêkeran cuda tên nivîsandin û bi navdêr, hevalnav û cînavkan ve tên zeliqandin. (…)

**n-** Hêmaya baneşanê, dema ku di nava kevanekê de li ber bêjeyekê bê danîn, tê wateya ku nivîser bi dijwateya wî tiştî bawer e. (…)

WÊJEYA KURDÎ

# WÊJEYA KURDÎ AMADEYÎ 1

WÊJEYA KURDÎ10

**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Wêjeya Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
  **Komîteya Fotoşopê**
  **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM ........ 7

WÊJE ÇI YE? ........ 8

GIRÎNGIYA WÊJEYÊ ........ 12

ZIMAN Û WÊJE ........ 15

MIJAR Û ŞÊWEYÊN WÊJEYÊ ........ 18

BEŞA DUYEM ........ 21

DÎROKA WÊJEYA CÎHANÎ ........ 22

DÎROKA WÊJEYA KURDÎ ........ 26

WÊJEYA KURDÎ YA DEVOKÎ ........ 29

QONAXÊN WÊJEYA KURDÎ ........ 33

BEŞA SÊYEM ........ 37

ÇÎROK ........ 38

EFSANE ........ 42

DESTAN ........ 46

HELBEST ........ 50

PENDÊN PÊŞIYAN ........ 55

MAMIK ........ 57

BEŞA ÇAREM ........ 61

QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA AVESTAYÊ ........ 62

PÊŞENGÊ WÊJEYA KURDÎ YÊ DEMA AVESTAYÊ ........ 65

PÎR ŞALYAR ........ 67

BEŞA PÊNCEM ........ 71

QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA ISLAMÊ ........ 72

BEHLÛLÊ MAHÎ ........ 76

BABA RECEBÊ LORISTANÎ ........ 79

LÎZA XANIM ........ 84

EBDULSEMEDÊ BABEK ........ 87

RÊYHAN XANIM ........ 92
DIBISTANÊN WÊJEYÎ ........ 97
BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ ........ 100
DAYÊ XEZANA SERKETÎ ........ 104
BEŞA ŞEŞEM ........ 107
PÊVAJOYA DESTPÊKA HATINA ISLAMÊ ........ 108
ELÎ HERÎRÎ ........ 111
ŞÊX ADÎ ........ 116
NÊRGIZ XANIMA ŞAREZÛRÎ ........ 125

# BEŞA YEKEM

Wêje çi ye?

- Girîngiya wêjeyê
- Ziman û wêje
- Mijar û şêweyên wêjeyê

Wane 1

# WÊJE ÇI YE?

## ❖ Pênaseya Wêjeyê

**Wêje**: Zanistek e ku hemû têkiliyên jiyana mirov û civakê bi me dide nasîn û têgihandin. Bi hemû aliyên xwe ve, raboriya mirovahiyê ye. Bingehê xwe ji sincê pak, hizira hevpar û wijdanê civakê werdigire. Li aliyekî din jî gelek nivîsên bi awayên nebaş di bin siya wêjeyê de, tên bikaranîn.

Wêje: Hunera ku bi zanebûn, şarezayî û bi rengekî rast tê bikaranîn. Di nava xwe de xemilandina peyv, raman, hest û aşopan bi devokî yan jî bi nivîskî ji bo xwendevan û guhdarên xwe bi hest, xiroş, coş û bedewiyeke bilind, radigihîne.

Her netewek bi şêwazên cuda cuda, peyva wêje li gorî xwe şîrove dike. Mînak: Li şûna peyva **"wêje"** ya di zimanê kurdî de, di zimanê ingilîzî de **"literature"** e û di zimanê rojhilatî (tirkî, erebî û farisî) de peyva **"edeb"** an jî **"edebiyat"** hatiye bikaranîn. Ev peyv wateya xwe di jiyanê de, ji rastkirina rêkûpêkiya reftar, perwerde, zanîn û çandina nirxên hêja, werdigire.

Her wekî ku ramyarê sosyolojiya azadiyê **Ebdullah Ocalan** dibêje:"**Pêvajoya seretayî ya mirovahiyê, pêvajoya helbestê ye**". Sumeran, dema ku dest bi nivîsandinê kir, bi awayekî wêjeyî nivîsandin. Her wiha rahib û oldaran jî, awaz û gotinên

xwe bi awayekî wêjeyî digotin. Dema ku gelek dîrokzan, Zerdeşt wekî helbestvan didin nasîn, ne şaş in.

**Wêje**: Di serdemên berê de, dihat wateya vegotina xweş û pak a ku bandorê li hest û giyanê mirov dike, çi helbest be yan jî pexşan be.

Di serdema nûjen de, wêje du wateyan li xwe bar dike:

1- Wateyeke giştî ku hemû zanîn û berhemên ku di bin navê wêjeyê de tên nivîsandin, di nava xwe de digire.
2- Wateyeke taybet; ev jî bi mebesta ku vegotin xwedî wate estetîk be, heta ku bibe wêje. Gelek rêbaz û awayên nivîsandinê yên wekî: helbest, pexşan, roman, şano, pend hwd di nava xwe de digire.

### Peyva wêje ji ku hatiye?

Peyva **"wêje"** formeke devokî (**kelhûrî**) ye, bi wateya "bêje" hatiye bikaranîn; ango gotin.

## ❖ Hin nêrînên derbarê wêjeyê de:

**"Wêje;** hîmê giyan e"

**Ebdullah Ocalan**

**"Wêje;** ciwanan digihîne û kalan bi çêj dike"

**Sîsêro (Cicero)**

**"Wêje;** komarek e ku nivîskaran aniye holê"

**Moliyêr (Moliere)**

**"Wêje;** ya ku jiyanê xweşik dike, mirovan girêdayî jiyanê dike û hestên bigewher dewlemend dike,wêje ye"

**Suut Kemal Yetkin**

"**Wêje;** pêşanga jiyanê ye, wê lasa nake, awayê ku dixwaze, dide jiyanê"

**Oskar Wayld (Oscar Wilde)**

## Pirsên Nirxandinê


- Çi cudahî di navbera peyva "wêje" ya kurdî û "edeb" ya erebî de, heye?

- Wêje, bingehê xwe ji **"sincê pak, hizra hevpar û wijdanê civakê werdigire"**. Şîrove bike.

- Hevrûkirinekê di navbera wêjeya kevin û ya hemdem de, çêke.

Wane 2

# GIRÎNGIYA WÊJEYÊ



Zanista bêwêje, mîna agirê bêêzing e.

Wêjeya bêzanist, mîna laşê bêgiyan e.

Gelek pirs di serê mirov de digerin û yek ji wan jî ev e: Wêje û nirxê wê di jiyana mirovan de, çi ye?

Di demên kevin de gelek nîgar, wêne û nivîsên wêjeyî ku rewşa derûnî û civakî ya wê serdemê derbirîn dikin, li ser dîwarên şikeftan hatine dîtin. Ew jî ji me re diyar dikin ku pêwîstiyeke zikmakî ya nivîsandinê bi mirovan re heye.

Gelek çîrokên kevin di rêya çavdêriya mirovan re, ji stêrk, firinde, çiya û têkiliyên bi xwezayê re, hatine nivîsandin. Tevî ku mijar yek e, lê rêbazên pesindayînê têne guhertin, ev jî tê wateya ku mirov bi nêrînekê li tiştekî meyze dike û bi rêbazên cur bi cur dikare li ser binivîse.

Mînak: Di demên berê de, dema ku erdhejek çêdibû, mirov ew bûyer li gorî hizirandina wê demê şîrove dikir û digot: Ku goga zemînê li ser quloçê ga ye; dema ku ga diweste, ji ser quloçekî diavêje ser quloçê din û bi vî awayî erdhej pêk tê.

Tevî ku ev çîrok efsaneyî ye, lê heta roja me ya îro tê vegotin û derbasî beşê nivîsandinê jî bûye.

Wêje: Rê ji pêşketina hizirê re vedike, ev jî bi rêya teşe û nivîsên wêjeyî mîna efsane, destan, pirtûkên pîroz û berhemên klasîk û nûjen, me li dîrokê vedigerîne.

Hemû berhemên wêjeyî yên ku dîrok wan zindî dibîne, heta roja me ya îro jî zindî ne. Mîna destana Enûma Elîş a Babilan ku li gorî wan destana vejînê ye. Wekî rênîşanderekî ji nirxê mirovahiyê re tê dîtin; ku di rêya wê re mirov jiyana xwe û yên derdorê dinase.

Wêje: Çi di rêya pêşketin û serkeftiyên ku wêjevanan pêk aniye û çi di rêya kurtejiyana wan a di wêjeya rasteqînî de be, dikare nêrîna mirovan li ser jiyanê biguhere.

Girîngiya wêjeyê di rêya hişyarkirina mirov û serhildana wan li dijî dagirker û sitemkaran de xuya dike. Em dikarin navê **"wêjeya şoreşgerî"** li vê beşê bikin.

Mînak:

Şer bike ji bona evînê
Vî dilê min şa bike Dest
bidin hevdû de îro
Rojhilatê nû bike
Kanî Laleş kanî Amed
Rabe min ava bike
Kanî Ur û Waşûkanî
Xweş li Moza meyzeke
Bes e bindestî hevalo
Rabe alî min bike

***Fîxan Hîmo***

## Pirsên Nirxandinê

- "Zanista bêwêje, mîna agirê bêêzing e". Şîrove bike.


- Li gorî te, wêje guherînan di hişmendiya mirov de çêdike yan na? Şîrove bike.

- Çi bandora wêjeyê li gelê bindest heye?

Wane 3

# ZIMAN Û WÊJE





Ziman; hizir ava dike, hizir jî; ziman ava dike.

**Ziman**: Teşeyeke ji nîşan û sembolan e û yek ji amûrên zanistê ye. Di nava civakan de, girîngtirîn rêbaza têgihandin û danûstandinê ye. Bê ziman; dê çalakiyên mirovan ne temam (seqet) bin.

Ziman bi awayekî xurt, bi hişmendiyê ve girêdayî ye û hemû hizira mirov bi rêya ziman tê derbirînkirin. Bi alîkariya ziman, raman heyîna xwe ya rasteqînî bi dest dixe. Li gorî **Fêrdînand dê Sosêr** (Ferdinand de Saussure): **"Hemû tiştên mîna nîşaneyên deng, nivîs an jî sembol, derbasî nava çalakiyên ziman dibin. Ev jî tê wateya ku ziman birêveberê giştî yê ku çalakiya mirov a zimanî di teşeyekî çandî, vegotî yan jî nivîskî de, digire nava xwe û pêşengtiyê jê re dike"**.

**Wêje**; ji berhemên nivîskî û devokî pêk tê û bi ziman re têkildar e. Hêza wê ya bikaranîna ziman heye û bi berhemên xwe, zimam temam dike û dixemilîne. Li gorî ramyarê sosyolojiya azadiyê **Ebdullah Ocalan**: **"Divê evîn weke têgîneke bingehîn a wêjeyê bê hizirandin"**; ango divê wêje weke rastiyekê di nava civakê de, bê dîtin û di rajeya civakê de be.

Ji bo ku mirov û civak, karibin xwe bi awayekî herî baş rave bikin, wêje rêya herî guncaw e.

## 1. Têkiliya di navbera ziman û wêjeyê de:

Ziman û wêje wekî du masiyan in ku di kûrahiya deryayê de, bi hev şad dibin. Çiqasî berhemên wêjeyî yên têr û tije ji aliyê nivîskar û helbestvanan ve bên nivîsandin, ziman jî ewqasî dewlemend dibe. Ziman bandorê li gelek tiştan dike. Bandorên herî girîng jî, ku ji bo parastina nasnameya neteweyekê pir girîng e. Ziman bandorê li ser yekîtiya neteweyî û nirxên civakî (dîrok, çand û hwd) dike. Ger ziman têk biçe, dê nirxên civakî jî têk biçin û wêje jî yek ji wan nirxan e.

Ji ber ku ziman; ji bo nasname, parastin û pêşketinên dînamîkî girîng e, her dem bi qirkirinên mezin re, rû bi rû dimîne. Têkiliyên di nava civakên hiyerarşîk û her wiha ramyariya mêtinger û desthilatdaran de, nehiştine ku ziman bi pêş bikeve. Bi vê yekê jî nehiştine ku wêje jî bi pêş bikeve. Ango, eger ziman tune bibe, dê wêjeya civakê jî bi pişaftinê re rû bi rû bimîne.

Bi pêşketina civakê re, hizira mirovan jî, zêdetir bi pêş dikeve. Aliyekî pêşketina hest û hizira mirovan, wêje û berhemên wêjeyî ne. Wêje, hunerek e ku bi ziman re, hatiye holê.

Di vê rewşê de amûra wêjeyê ya bingehîn, ziman e. Çêbûna berhemên wêjeyê, bi awayê herî baş û bibandor, bi rêya ziman pêk tê.

## Agahiyên Giştî

Kurdan bi domana dîrokê re, hejmarek ji abeceyan bi kar aniye, ji wan jî:

Hîroglîfî, mîxî, avestayî, aramî, pehlewî, masîsoratî, êzidî, kirîlî, erebî, latînî.

## Pirsên Nirxandinê

- Gelê ku zimanê wî hatibe pişaftin, dê bi çi awayî wêjeya xwe bi civakan bide nasîn?

- Nirxên civakî yên bingehîn çi ne? Yekê ji wan şîrove bike.

- Çima dagirker û desthilatdaran destpêkê ziman û wêjeya gelê kurd, armanc girtine?

Wane 4

# MIJAR Û ŞÊWEYÊN WÊJEYÊ



Huner û wêje, du amûr in ku bêyî wan civak nabe.

Mijarên wêjeyê, bi giştî mirov û civak in. Wêje, ne tenê wênekêşana jiyanê ye, di heman demê de, pêwîst e ku wêje gel bi pêş bixe û ji gel re rajeyê bike.

Eger wêje, ne ji bo bipêşxistina civakê be, berjewendiyên gel pêk nayne. Yê ku gel nas neke, birînên wî nebîne û êşa wî nekişîne, nikare wêje û dîroka wî jî binivîse. Li gorî vê, wêje çavkaniya afirandina mirov û civakê ye û rêzdayîna wan e.

Şêweyê têgihîştina mijarekê, cureyên helbestan û nivîsên wêjeyî, daxwaz û armancên wêjeyê pêk tînin. Ev bi giştî bi şêwaza hunermend, dewlemend dibe û di berhemên wêjeyî de tê nivîsîn. Ji ber vê sedemê, dema ku xwendevanek berhemên nivîskar dixwîne, asta pêşketina wî/ê bilind dibe, cîhana aşopên wî/ê fireh dibe, nirx û dewlemendiyên wî/ê tîne zimên û hestên nivîskar bi awayekî sazûmankirî dinirxîne.

Ji tevahî mijarên şîrovekirina ramanan û derbirîna hestan a berhemekê re ;**"naveroka wêjeyê"** tê gotin.

## Şêweyên Wêjeyê:

Wêje, beşek ji hunera xweşik e û cureyeke ji derbirîna bi peyvên bedew e. Ew jî, weke zanistekê tê naskirin. Wêje, ji zanistên mîna: dîrok, civaknasî, derûnnasî, felsefe û aboriyê, sûdê digire.

Armanca hemû berhemên wêjeyî, gihandina peyamekê ji bo gel û hunermendên wî gelî ye. Hunermendên gel, cîhana hundirîn a civakê û asta çanda wê li ber çavan digire û berhemên xwe dinivîse.

## Pirsên Nirxandinê

- Wêjeya ku ne di berjewendiya civakê de be, çi tîne holê?
- Bi çi şêwazî, mirov dikare wêjeya xwe biparêze?
- Çima wêjeya civakê, asta wê dide diyarkirin?

# BEŞA DUYEM

- Dîroka wêjeya cîhanî
- Dîroka wêjeya kurdî
- Wêjeya kurdî ya devokî
- Qonaxên wêjeya kurdî

Wane 1

# DÎROKA WÊJEYA CÎHANÎ





Kevirê Reşîd

## ❖ Pênaseya wêjeya cîhanî:

Wêjeya cîhanî; ew wêjeya ku li pêş ketiye û gihaştiye asta cîhanî, sînorên welatan derbas kiriye, ji gelek zimanên cîhanê hatiye wergerandin, bi awayekî pir berfireh belav bûye û pir navdar e. Bi awayekî hunerî ye ku hemû jîngeh û nakokiyên girêdayî mirov di nava xwe de dihewîne. Mînak: wêjeya Shake-spear (Şîkespîr), Tolstoy (Tolistoy), Victor Hugo (Vîktor Hogo), Arnest Himingway (Arnêst Hîmingway) û Gabriel Gar-cia Marquze (Gabriyêl Garsiya Markîz). Lê heta niha jî têgeha wêjeya cîhanî hinek nepenî tê de heye ku hemû wate û pêna-seyên ku li ser hatine gotin, di asta bilind de cih negirtine.

Têgîna wêjeya cîhanî di warê axaftinê de, komekê ji wêjeya netewî û niştimanî li cîhanê, destnîşan dike. Bi saya derketina amûrên çapê û weşanxaneyan, wêjeyên netewî bi pêş ketin. Van amûran bandor li hebûna wêjeyê kir û ew ji sînorên teng ên net-ewî rizgar kir û ber bi cîhaniyetê ve bir.

## ❖ Dîroka wêjeya cîhanî:

### Civak, bi wêjeya xwe tê naskirin

Di destpêka sedsala 19'an de, yekemîn car bû ku wêjevanê Alman ê bi navê Johan Wolfgang von Goethe (Jon Wolifgang fon Gotê) têgîna wêjeya cîhanî di gotarên xwe de, aniye ziman. Heta ku bikaribe pesneyê ji belavbûna cîhanî û pêşwazîkirina gel ji berhemên wêjeyî yên Ewropayî re bide, ev têgeh bikar aniye.

Piştî ku Johan Peter Eckermann (Yuhan Pîter Îkerman) guftûgoyên xwe bi Goethe re di sala 1835'an de nivîsandin, ev têgeh bêhtir hate belavkirin.

Di sala 1827'an de, Goethe di gotareke xwe de, aniye ziman ku wêjeya cîhanî dê şûna wêjeya netewî bigire; ji ber ku ew wêjeya cîhanî wekî teşeya bingehîn a afrîneriya wêjeyî dibîne.

Li gorî wêjeya kevin a li ser tabloyên ku ji aliyê Sumeran û hin cihên din ve hatine nivîsandin, wekî jêdera wêjeya cîhanî tên dîtin, mînakên wê jî ev in: Destana Gilgamiş, Enûma Elîş, Ilyada, Odîsa û hwd.

## ❖ Wêje, çawa dibe wêjeyeke cîhanî?

Ji ber ku gihiştina asta cîhanî girêdayî gelek xalan e, em dikarin van tiştan bi hin berhem û navdarkirina nivîskar di hin boneyên ku di herêma wî de çêdibin an jî derveyî herêma wî ve, girê bidin.

## ❖ Wêje çawa dibe wêjeyeke cîhanî?

Xwegihandina asta cîhanî nayê wê wateyê ku nivîskarê hemdem dê di cîhaniyê de bijî. Ev jî hin xal in ku wêjeyê ber bi cîhaniyê ve dibin:

- Dibe ku dûrî wêjeya netewî bikeve, ev jî dibe sedema binkeftina di warê wêjeya herêmî de. Ji ber ku wêjeya netewî di dîrokê de bi wêjeyên din bandor bûye.
- Dema ku berhemek pir tê wergerandin.
- Cihê herêmê û hêza wê ya ramyarî û aborî, hejmara şêneyan a pir û belavbûyîna pir a zimanê wê herêmê, derfetê dide ku zû derbasî warê cîhanî bibe.
- Nêzîkbûna wêjeyan û bandora wan li hev. Mîna: wêjeya Ewropaya rojavayî, Amerîkaya Bakurî û Awistralyayê ku pir nêzî hev in.
- Girîngiya gel bi warekî wêjeyî destnîşankirî, wekî mijarên ramyarî yên weke **"islamofobiya"** li Ewropa û Amerîkayê, roleke pir mezin di warê bandorbûn û bandorkirinê de, dilîze.

Di dawiyê de jî û bi kurtasî, mirov dikare bibêje ku wêjeya cîhanî, ew wêje ye ku di rêya werger û belavbûnê de sînoran derbas dike û xwedî taybetiyên hunerî û afirîneriyê ye.


## Pirsên Nirxandinê

- Wêjeya netewî çawa dibe wêjeyeke cîhanî?
- Çavkaniya wêjeyê li ku hatiye dîtin û bi kê dest pê kiriye?
- Li gorî nêrîna te, kevintirîn belgeyên wêjeyî li ku derê hatine dîtin? Herêmê diyar bike.

Wane 2

# DÎROKA WÊJEYA KURDÎ





❖

## Pênaseya wêjeya kurdî:

Wêjeya kurdî: Ew wêjeya ku bi zimanê kurdî hatiye vegotin û nivîsandin, di nav de zaraveyên soranî, zazakî, lorî û kurmancî hene.

Di kurdî de, du beşên bingehîn ên wêjeyê hene; devokî û nivîskî. Di nava wêjeya kurdî ya devokî de helbest, çîrok, destan, mamik û hwd hene û heta roja me ya îro berdewam e; ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe.

Wêjeya kurdî ya nivîskî jî bingehê xwe ji ya devokî girtiye û li ser hatiye avakirin. Wêjeya nivîskî xwe dispêre belgeyên dîrokî, şûnewaran û hwd, mîna pirtûka Zerdeşt a pîroz **"Avesta"**.

❖

## Dîroka wêjeya kurdî:

Wêjeya kurdî, weke hemû wêjeyên cîhanê bi derketin û pêşketina mirovahiyê re derketiye holê. Wêjeya kurdî ya ku li Mezopotamyayê hatiye dîtin, xwedî gelek dewlemendiyan e. Ev wêjeya dewlemend berî derketina Avestayê bi hezarên salan, hebûna xwe bi awayê devokî domandiye.

Bi derketina Avestayê re, ev wêje bûye çavkaniya wêjeyên nivîskî yên Rojhilata Navîn û Avestaya ku bi alfabeya avestayî hatiye nivîsandin, ji gelên Rojhilata Navîn re bûye mînak. Her çi qasî wêjeya kurdî nebûye wêjeya desthilatdariyê, lê ji ber dewlemendiya wê bandoreke mezin a erênî li Rojhilata Navîn û cîhanê kiriye.

Vê rewşa parastinê, heta hatina islamê dewam kiriye. Piştî derbasbûna islamê li Kurdistanê, wêjeya islamî ya ku bingehê wê erebî ye; herikiye nava wêjeya kurdî. Ji ber ku wêjeya kurdî pir kevnar û dewlemend bû; li gelek deveran wêjeya ereban û netewên din jî jê bandor bûne. Heta roja me ya îro jî, gelek peyvên wêjeya me di nava ziman û wêjeyên derdor û cîhanê de tên dîtin. Mînaka vê yekê jî gotinên weke: ered, deyîn, dîn, milet (mille), gûz (coz), pîrdos (ferdews) û hwd. Her wiha gelek wêjevanên me yên ku bi tîpên erebî jî nivîsandine hene. Mîna: Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqeyê Teyran û hwd.

Her çi qas bi hatina islamê re wêjeya me jê bandor bûbe jî, lê belê gelek wêjevanên me yên ku fêrî nivîsandina erebî bûne, gelek berhemên giranbuha bi zimanê kurdî lê bi tîpên erebî nivîsandine. Bi vî awayî, wêjeya kurdî derbasî qonaxeke nû dibe. Ev rewş, heta parçekirina Kurdistanê berdewam dike.

Dema ku dewletên dagirker êrîşên xwe yên hovane li ser Kurdistanê pêk anîn, bandoreke mezin li wêjeya kurdî jî bû. Lê ji ber dewlemendiya wêjeya kurdî û biryardayîna wêjevanên wê, dagirkeran nikarîbû li pêşiya pêşketina wê bibin asteng. Li gel hemû astengiyan jî hebûna xwe hem devokî hem jî nivîskî parastiye.

## Pirsên Nirxandinê

- Sedema ku leza pêşketina wêjeya kurdî ya dewlemend rawestand, çi bû?

- Çima wêjeya kurdî li beramberî êrîş û pişaftinan têk neçû?

- Dewlemendiya wêjeya kurdî, lêkolîn bike.

Wane 3

# WÊJEYA KURDÎ YA DEVOKÎ



Bi pêşketina ziman re wêjeya kurdî ya devokî jî dest pê dike.

Di nava kurdan de ji ber sedemên erdnîgarî û ramyarî, wêjeya nivîskî zêde bi pêş neketiye. Lewre gelê kurd girîngî daye wêjeya devokî. Mirov dikare bibêje ku kurdan xwe bi vê wêjeya xwe ya devokî ku ji; çîrok, efsane, destan, mamik, stran û helbestên gelêrî, pendên pêşiyan û hwd pêk tê, parastiye û bi saya wê zimanê kurdî xwe li ser pêyan girtiye. Kurdan bi rêya van berhemên wêjeyî, rewşa xwe ya heyî aniye ziman. Ev berhem ji nifşekî derbasî nifşekî bûne û heta niha li ser zimanan digerin. Piraniya wan di sedsala 20`an de hatine nivîsandin. Bê guman dîroka van berheman xwe digihînîn berya zayînê bi hezarên salan.

Gelê kurd ji hêla wêjeya devokî ve, pir dewlemend e. Mirov dikare bibêje ku gerdûna wêjeya devokî ji wêjeya nivîskî re, cih nehiştiye.

Dema mirov beşa wêjeya kurdî ya devokî lêkolîn dike; di hundirê wê de hestiyarî, xemgînî û hestên mirovahiyê yên pir binirx dibîne. Ev yek, dewlemendî û taybetiya wêjeya devokî ya kurdî ye û ev beş heta serdema derketina Zerdeşt dewam dike. Piştî ku ji malbata Espîtmanî ya Medyayî, kesek bi navê

Zerdeşt rabûye, gel vexwendiye û bang li gel kiriye ku baweriya xwe tenê bi felsefeya dualîzmê bîne. Gel jî bawerî û peyama wî pejirandiye. Her wiha, di pêvajoya jiyana kurdan de, di her qada jiyanê de jin û mêr bi hev re bûn. Ji ber vê sedemê, beşeke wêjeya me, li ser têkiliyên di navbera jin û mêr de bi pêş ketiye. Her wiha, ji ber ku bingehê xwe ji çanda neolîtîkê digire, hin beşên wêjeya xwe li ser xemlûxêla welat bi pêş de birine. Her wiha, ji ber ku jina kurd piranî bi çandinî û xwedîkirina zarokan ve mijûl dibû, navên piraniya şînatiyan mê ne, mîna strîzerk, qinêber, gwîrisk û hwd. Her wiha, gelek stranên lorandinê yên ku dayîkan ji bo zarokên xwe gotiye, hebûna xwe parastiye.

Ji ber ku mêr bi karê nêçîrvaniyê ve mijûl dibû, li ser lehengiya mêr jî, hin stranên kurdî hene. Tê hizirîn ku ev stran jî ji aliyê jinê ve hatine hûnandin.

Ev wêjeya ku beriya destpêkirina wêjeya nivîskî, bi hezarê salan hebûna xwe parastiye, em dikarin di çend beşan de bigirin dest.

## Mînak: Destana Filîtê Quto

Şemê, dayîka Filîtê Quto ye û ew vê destanê dibêje ku kurê wê serokê êla Reşkotan e.

Şemê go: Filîto lawo
Meke ko heya mala Xwedê ye
Ew kerwanê Emê Mamê Ginê ye
Min ji berê de seh kiriye
Hetanî extermê xwe mêrê xwe nede
kuştinê Lawo malê xwe li xelkê belav neke
Neke bac û xeraca serê rê ye

Filîtê Quto go: Şemê lê dayê
Rabe ji boy vê gotina teyî hanê
Ev bi sê telaqê fitû ye
Ko jin diçe mala bavê ye
Ez ê rabim herim pêşiya vî kerwanî
Jê bistînim bazinbeleka milê wî
Ku navê wê bûkê ye
Lê lê dayê yan cinazê min li meydanê dikeve
Yan ez ê bistînim bazinbeleka milê Emê

## Pirsên Nirxandinê


- Wêjeya kurdî ya devokî, çawa xwe parastiye?

- Sedemên ku li ber pêşketina wêjeya nivîskî bûne asteng, şîrove bike.

- Rola jinê di parastina wêjeyê de, çi bû?

Wane 3

# QONAXÊN WÊJEYA KURDÎ





Ziman û wêjeya kurdî, li gorî dem, erdnîgarî û olan di çend qonaxan re derbas bûne. Dema ku em temaşeyî dîroka ziman û wêjeya kurdî dikin, dibînin ku ji ber Şoreşa Çandiniyê bi destê gelê aryenî hatiye pêkanîn. Her wiha zimanê gelê kurd jî beriya zimanê civakên din, derbasî birêkûpêkiyê bûye. Ji ber vê yekê, pêwîstiya kurdan di wê demê de bi afirandina peyvên nû hebû. Ji ber ku her tiştê ku dihat afirandin, navek ji bo wî dihat xwestin û ew jî neçar dibûn ku jê re navekî peyda bikin. Her wiha têkiliyên civakê jî, mirov neçarî sazûmankirina hevokan ji bo danûstandinê dikir.

Di vê qonaxa ku em weke qonaxa berî Avestayê bi nav dikin de, wêjeya kurdî bi awayekî xwerû heyîna xwe bi devokî û bi xwezayê ve girêdayî, domandiye. Piraniya helbest û stranên wê demê, li ser xweşikbûna xwezayê û bûyerên girêdayî xwezayê bûn.

Piştî vê qonaxê, wêjeya kurdî gaveke mezin diavêje û bi Avestayê re derbasî nivîsê dibe. Her çi qas ev qonax bi qirkirinê re rû bi rû dimîne jî xwerûbûna xwe heta hatina islamê domandiye.

## QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA BERIYA AVESTAYÊ



Ew qonax ji dema neolîtîkê dest pê dike û bi hezarê salan, pêşketina xwe li ser xweza û çandiniyê didomîne.

Di vê qonaxa xwezayî de pêvajoyên pir girîng derbas dibin. Mînak: Li ser bingehê vê wêjeyê, çanda aryen hatiye avakirin. Li ser vê çandê ramyarê sosyolojiya azadiyê **Ebdullah Ocalan** wiha dibêje: **"Koma ziman-wêjeya aryen çi di warê ziman de çi jî di avakirina hevsengiya hest û ramanan de; xwedî kokeke kûr e. Ev yek jî, bi mercên erdnîgarî û dîrokî ve girêdayî ye. Salên di navbera 12000-4000 B.Z de dema bicihbûn û sazîbûna vê çandê û vî zimanî, rave dikin"**.

Di vê serdemê de her cure kûzikvanî, ji bo ajotina zeviyan bikaranîna lawiran, teker, tevn, destar, huner û hwd saz bûne. Her wiha xelkên herêmê jî îro van amûrên çandiniyê û koma gotinên ku van amûran rave dikin, bi kar tînin. Ev jî, nasnameya devera kakil an jî dendika pêşî ronî dike. Li ser çanda hûriyan a ku di vê qonaxê de hatiye jiyîn, ramyarê sosyolojiya azad
**Ebdullah Ocalan** wiha dibêje: **"Komên aryen ên proto-kurd, pers, efxan û belûciyan di vê guftûgoyê de, cihekî girîng digirin"**.

Bi taybet, rengê zimanê hûriyan ên ku **proto-kurd** in, diyar bû. Xwemaliya çand-ziman û wêjeya aryen a ku xwe dispêre gelên rasteqîn, zelal bû. Teza rast ew e ku herêma kakil a Şoreşa Neolîtîkê tenê bi vê çandê û vî zimanî çêbûye. Bi vî awayî, mi-rov dikare bibêje ku hûriyan (çand, ziman û wêjeya aryenî) pêşengî ji koma ziman û çanda Hind-Ewropî re kiriye.

Ev wêjeya ku li ser çandeke kevnar hatiye avakirin, bûye bingeh ji bo derketina Avestayê û pêşxistina çanda medan. Bi awayekî giştî, di vê qonaxê de, her çi qasî nivîs li ser lat û şkeftan hebin jî, lê wêjeya kurdî bi awayekî devokî xwe berdewam kiriye.

## Pirsên Nirxandinê

- Wêjeya kurdî ya devokî bingehê xwe ji ku digire?

- Tevî ku nivîs li ser lat û dîwarên şkeftan hatibûn dîtin, lê wêjeya kurdî bi devokî hebûna xwe domandiye, çima?

# BEŞA SÊYEM

- Çîrok
- Efsane
- Destan
- Helbest
- Pendên pêşiyan
- Mamik

Wane 1

# ÇÎROK

Vegotina bûyerkê ye; çi bi devokî çi jî bi nivîskî be. Berhem an jî bûyeran bi rastî an jî aşopî û bi rêbazeke xweş pêşkêşî guhdar û xwendevanan dike.

Yek ji şaxên girîng ên wêjeya gelêrî û ya devokî ye. Bûyer û kesayetên leheng û qehreman, bi şêweyên cur bi cur ji mirovan re radigihîne. Gelek caran di nava çîrokên kurdan de serdema birêveberiya jinê û girîngiya wê di civakê de, tê ravekirin.

Çîrok; di bingehê xwe de devokî ye û hebûna xwe bi awayekî devokî domandiye û heta ku ji aliyê nivîskarekê/î ve hatiye nivîsandin. Lê ji ber sedemên ramyarî hîn gelek çîrokên kurdî nehatine berhevkirin û nivîsandin. Tevî vê yekê jî heta roja me ya îro jî bi devokî hîn berdewam in û di nava civakê de têne vegotin.

Bûyerên di çîrokan de hemû berhemên aşopî û rasteqînî ne. Cih û demên wan ne di hin çîrokan de diyar in û di hinan de nediyar in. Di hin çîrokan de lehengên çîrokê xwediyê taybetiyên awarte û dûrî baweriya hişê mirovan in.

Di çîrokan de armanca bingehîn, fêrkirin e. Gelek caran mijarên gerdûnî digire nava xwe. Çîrokên devokî yên herî kevnar, çîrokên ku cih didin hêza hizir û aşopên ne xwezayî û bi rewanbêjiyeke bedew tên vegotin.

Di wêjeya kurdî de risteke girîng a çîrokê heye. Ji ber ku gelê kurd, weke hemû gelên cîhanê, demeke dirêj wêjeya xwe bi awayê devokî domandiye. Ev yek jî bûye sedem ku di gelek deman de gelê kurd hêvî û daxwazên xwe bi awayê çîrokî aniye ziman.

## ❖ Taybetiyên çîrokê:

- Çîrok berhema hizir û aşopa giyanî ya civakê ye. Bûyer û rewşên awarte, bi lehengên awarte ve girê dide. Bi awayê devokî, ji nifşan derbasî nifşan dibe.
- Carinan lehengên çîrokê mirov in, carinan jî lawir û heyînên din in. Li gorî hizreke destnîşankirî bûyereke balkêş vedibêje û dikare bi guhdaran, bide bawerkirin.
- Çîrok, bi awayekî giştî ji aliyê kesên taybet ve di rewşên awarte de lêgera dadmendî û rastiyan e. Bi awayekî rêkûpêk jiyana civakekê bi awayê aşopî be jî tîne ziman. Bi gotinên balkêş dest pê dike û bi gotinên balkêş bi dawî dibe.
- Çîrok, bi hunereke taybet, zîrekî û rewanbêjiyekê tê vegotin. Ji ber vê yekê, bandora lehengên çîrokê rasterast li guhdaran dike û weke ku rastiyek e, bi baldarî dişopînin.

## Mînak: Ka em biavêjin ber aqilan

Hebû tune bû, rehme li dê û bavên min û we bû. Li gundekî sê bira hebûn; ji malê dinê, tenê du kerê wan hebûn. Bi van keran ji çiyê êzing dibirin bajêr, difirotin û pê debara jiyana xwe dikirin.
Rojekê ji rojan, ev her du kerê wan hatin dizîn. Li çol û çiya bi giştî geriyan, lê nedîtin. Berê xwe dan malên gundiyan, dîsa nedîtin. Her sê bira li ser kevirekî rûniştin û ji hev re gotin:
- Ka em biavêjin ber aqilan?
Ê mezin got:
- Heger ez bim, ê ku kerê me biriye yekî kinik e.
Ê nêvî got:
- Ger kinik be, ji Xirbebelik e.
Ê biçûk got:
- Ger kinik be û ji Xirbebelik be, sed ji sedî ew Elik e.

Rabûn berê xwe dan gundê Xirbebelik û girtin ser mala Elik.

Jê re gotin:
- Zû kanîn kerên me?
Elik got:
- Kerên we ne li cem min in.
Wan got:
- Me avêt ber aqilan, ker li cem te derket.
Elik got:
- Ger hûn bi aqilê xwe bawer in, çi di bin lihêfa min de ye?
Ê mezin got:
- Ger ez bim, tiştê di bin lihêfa te de, tiştekî girover e.
Ê ortê got:
- Ger girover e, ez bibêm orte sor e.
Ê biçûk jî got:
- Ger girover e, orte sor e û sed ji sedî hunar e.
Elik zer û şîn bû, destê xwe ji bin lihêfê derxist û got:
"Kerê we wan e di êxur de ne."

## Pirsên Nirxandinê

- Armanc ji vegotina çîrokê di nava civakê de, çi?
- Te çi pend ji çîroka "ka em biavêjin ber aqilan," girt?
- Çima gelê kurd heta roja me ya îro, hemû çîrokên xwe nenivîsiye?

## Lêkolîn

Hûn jî li ser çîrokên kurdî lêkolîn bikin û çîrokekê bi hevalên xwe re, parve bikin û binirxînin.

Wane 2

# EFSANE



Şahmaran

Ta ku mirov lawaziya xwe di vedîtina rastiyê de veşêre,
efsane afirandiye.

Efsane, çîrokên lasayî ne, bûyerên ku bi dîroka kevin a gelekî ve girêdayî ye yan jî diyardeyên xwezayî û civakî şîrove dike. Carcaran heyîn an jî bûyerên mîtafîzîk di nava xwe de dihewîne.

Dibe ku em efsaneyê wekî çîrokên destpêkê ku bi dîroka çêbûna gerdûnê ve girêdayî ye, pênse bikin. Dibe ku bi herêmekê ve girêdayî be yan jî xwedî sînorên berfireh be.

Di aliyekî din de jî, mîna çîrokên xwezayî yên pîroz ku bi hin rêûresman ve girêdayî ne, yan jî wekî çîrokên gerdûnî, pênase bikin. Tevî van jî, efsane nûnertiya hizir, zanist, naskirin û têgihiştina mirov ji xwezayê re, dike.

Şîrove û ragihandinên ku hatine kirin, piranî bi awayekî devokî belav dibin. Di encama vê de çandeke devokî çêdibe. Efsane, hêmaneke ku mirov bi mirov, erdnîgarî, rewanî û heyînên din ve girê dide.

Efsane, li ser du hêmanan tê avakirin; ew jî awarte û pîrozî ye. Awarte mîna Şamaran ku zindiyê nêvî mirov e û nêviyê din jî lawir e. Pîrozî jî mijarên bawerî û xwedawendan e.

Sê bingehên efsaneyê hene; ol, aşopî û dîrok in. Weke her civakê, gelê kurd jî girêdayî vê rêgezê, efsaneyên xwe nivîsandine. Efsane, di nava netewa kurdan de xwediyê cihekî pîroz e. Her wiha, di wêjeya kurdî de jî cihekî taybet digire. Heta niha jî di nava kurdan de efsaneyan vedibêjin. Efsane, di nava gelê kurd de xwedî paye ye.

Efsane, wêneyeke ji bo ronîkirin û fêrbûna awayê jiyana gelê kurd e. Em bi rêya efsaneyê; rojên borî, serpêhatî û jandariyên bi ser kurdan de hatine û awayê jiyana wan a wê demê fêr dibin.

## Taybetiyên Efsaneyê:

- Efsane, çîrokên kevn û berhemên wêjeya gelêrî ne ku devokî ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe.
- Mijarên efsaneyan, xwe dispêrin mijarên; kes û bûyer an jî cih û di derbarê wan de agahiyan didin.
- Tişta ku di efsaneyan de tê gihandin, bê pîvan jî be, taybetiyeke wê ya bawerkirinê heye.
- Di efsaneyan de rewşên awarte bandorker in. Ji ber ku efsane, ji aliyekî ve civakan weke hemdem tîne ziman, endamên pîroz jî hembêz dike.
- Efsane, wêneyeke wê ya diyar tune ye; ne girêdayî şêwaz û awa ye, bi zimanê devokî tê gihandin. Weke têgihandinên gel ên kurt e, bi awayekî giştî çavkaniya xwe ji kûrahiya dîroka derbasbûyî digire.
- Efsane, têgihandinên gel ên kurt û xwerû ne, dev ji devan tê vegotin. Dema ku bi awayê devokî tê gihandin; li gorî taybetiyên her bêjerî, bi guhertinan re rû bi rû dimîne.
- Efsane, bi awayekî giştî li ser baweriyekê tên avakirin.

Di efsaneyan de têgehên qalibkirî kêm tên bikaranîn. Ew jî, bi vî aliyê xwe ve ji çîrokan tên cudakirin.

## Mînak: Efsaneya Kawayê Hesinkar:



Tê gotin ku di demeke pir kevn de padîşahekî stemkar hebû; navê wî Ejdehak (Dehak) bû. Ji ber stemkariya wî ya li ser mirovan, xwedê ew siza kir û nexweşiyeke giran li canê wî peyda kir; du kul di navmilê wî de derketin, mîna serê du maran. Ejdehaq, hedar û qirana wî ji ber wê nexweşiyê nedihat. Ji hemû welat û deveran bijîşk û nojdar dane hev, lê çare û dermanê nexweşiya wî nedîtin.

Nojdarekî nenas ji Ejdehak re dibêje: "Divê tu her roj mejiyên du mirovên ciwan deynî ser birînên xwe, da ku tu ji êşa xwe rehet bibî".

Bi vê şîreta nojdar, vî stemkarî her roj du mirovên ciwan ji gelên herêma Mezopotamyayê ser jê dikirin û mejiyên wan datanî ser birînên xwe, da ku rehet bibe. Kawayê Hisinkar, kesekî serhildêr e, bi qamçîbazê koşkê re peymanekê bi dizî çêdike. Pilana wan ew bû ku ji bedêla ciwanekî, lawirekî serjêbike û ciwanên din jî dişîne serê çiyan. Heta ku doza serê kurê Kawa tê kirin. Kawa dibêje: "Ez ê bi destê xwe, kurê xwe radestî padîşah bikim". Bi vê yekê Kawa derfetê destine û planekê amade dike. Padîşah bi vê agahiyê kêfxweş dibe û destûrê dide. Kawa bi vî rengî tevî kurê xwe derbasî koşka padîşah bû û bi çakûçê xwe di dema destmaçîkirinê de, serê Padîşah dipelixîne û kurê wî li ser banê qesrê agir vêdixe. Bi vê yekê ciwanên li çiyan agahdar dibin û êrîşî qesrê dikin. Bi vî rengî paytetxa zordariyê tê hilweşandin. Ew roj, bû roja azdiya gelên bindest û agir bû sembola azadiyê.

## Agahiyên giştî

Efsane, li ser karesat, bûyer, an jî serpêhatî û çîrokekê tê vegotin. Di nava vê çîrokê de hin tiştên awarte yên ku di nava aşopên civakê de, mîna rastiyan tên dîtin, hene. Ji bo xemilandinê, girêdayî cih û kesên bi bûyerê ve girêdayî ne, tên bikaranîn. Ji çîrokên wiha re **efsane** tê gotin. Di nava kurdan de cihekî wê yê taybet heye.

Mînak: Şahmaran, Cûdiyê Miradan, Dêwê Sêserî... hwd.

## Pirsên Nirxandinê

- Li gorî te, di wê demê de çima efsane hate afirandin?
- Efsane li ser çi tê avakirin?
- Tu li ser efsaneyên Kurdan çi dizanî?

## Lêkolîn

Şahmaran sembola çi ye? Lêkolîn bike.

Wane 3

# DESTAN



Destan: çîrokeke dirêj e û bi awayekî helbestî hatiye hûnandin. Di destpêka dîroka gelekî yan jî neteweke de, bûyerên ku bi wan re derbasbûne, bi awayekî helbestî vedibêje.

Destan, çîrokên dirêj in ku li ser tevgera gel û hozan diaxive. Dibe ku efsane di nava destanê de hebe, lê destan nakeve nava efsaneyê. Ji ber mijara efsaneyê li ser xweda, lawir û hin heyînên din e, lê mijara destanê piranî li ser mirov e û lehengê wê jî mirov bi xwe ye.

Têgeha destanê, tê wateya karê leşkerî, evîndarî, lehengî…hwd.

Destan, ji ber ku piştî pêşketina ziman û di dema wêjeya devokî de derketiye holê; bi awayekî hûnandî derbasî qada wêjeyê bûye. Destana ku dîroka derketina wê nayê zanîn, xwediyê hêjatiyeke pir binirx e.

Di nav netewên cuda de, destaneyên bi nav û deng hene. Mîna: Gilgamiş, Ilyada û Odîsyos, Inyada, Mihabuharata, Biyolf û hwd.

Weke her netewê, gelê kurd jî xwediyê gelek destanên binirx e. Destana kurdî di rêya devokê re, ji nifşekî veguhêzî nifşekî din bûye. Her nifşek bi zimanê xwe hest, raman û folklorê xwe dianî ziman û di heman demê de her nifşek bi kelepûrê xwe ve girêdayî bû û xwedî berpirsyar bû.

Ji ber sedemên qirkirin, komkujî, dagirkerî û qedexekirina ziman a li ser gelê kurd dihate pêkanîn, gelê kurd destaneyên xwe bi awayekî devokî berdewam kirine û parastine.

Destana Kurdî, dabeşî sê beşan dibe:

1. Lehengî 2. Evîndarî 3. Komîdî

### 1. Lehengî:

Ya ku li ser hêz, vîn, mêrxasî û berxwedaniyê diaxive. Di dawiyê de piraniya lehengên vê destaneyê, bi awayekî şînî jiyana xwe ji dest didin û dibin sembola gelê xwe.

Mînak: Destana Derwîşê Evdî û destana Keleha Dimdimê.

### 2. Evîndarî:

Ya ku li ser hezkirin, xweşikbûn û dildariyê diaxive, di dawiyê de piraniya lehengên vê destaneyê bi mirin, dûrketinê re rû bi rû dimînin.

Mînak: Destana Memê Alan, Mem û Zîn, Ferhad û Şêrîn, Siyabend û Xecê.

### 3. Komîdî:

Ya ku bi kêfxweşiyê bi dawî dibe û gelek pendan di nava xwe de dihewîne.

Mînak: Destana Reşîto û Xezalê.

Bi vî awayî destana kurdî; di her dem û cihî de, dibe navgîna ragihandinê di nava civaka kurd de.

Piraniya destanên kurdî di rêya dengbêjan re, xwe parastiye û hebûna xwe domandiye. Bi awayekî stranî di rêya dengbêjan re hatiye veguhestin.

Mînak: Şakiro, Gerebêtê Xaço, Meryem Xan

Mînakek ji destana Mem û Zîn



**'Ey şah û wezîrê ’iz-û temkîn Ez hêvî dikim nekin ’înadê**

**Derheqê vî menbe’ê fesadê Lewra ku xwedanê ins û canan**

**Wî xaliqê erd û asimanan, Roja ewî hubê da hebîban**

**Hingê ewî buxzê da reqîban**

**Em sorgul in, ew ji bo me xar e**

**Em gencîne ne ew ji bo me mar e**

**Gul hifzî di bin bi nûkê xaran**

**Gencîne xwedan dibin bi maran**

**Ger ew nebûya di nêv me hail**

**’Işqa me di bû betal û zail'.**

**(Ehmedê Xanî)**

## Wateyên peyvan:

Temkîn: Cihgirtî

Înad: Serhişkî

Menbe’: Çavkanî

Hub: Hezkirin

Buxz: kîn, rik

Reqîb: dijber, dijmin

Xar: Strî

Gencîne: Sebet

Hifzî: Parastin

Zail: Têkçûyî

Hail: navber, bend

## Lêkolîn

Hûn çi li ser Destana Keleha Dimdimê dizanin? Cih û dema wê diyar bikin û ew destan ji bo çi çêbûye û lehengê wê kî ye?

Wane 4

# HELBEST



Helbest, hunereke ku bi peyvên levhatî û ciwan tên hûnandin, bi hevokên xemilandî derbirîna hizir û hestan dike. Hêmanên weke; ziman, deng û ritim di nava rêkûpêkiyeke diyar de bi kar tîne û bûyerên balkêş bi taqîkirineke gihayî tîne ziman.

Helbest, yek ji curenivîsên wêjeyî ya herî girîng e. Lê ne tenê li gorî çêbûna xwe, li gorî naveroka xwe jî, ji curenivîsên wêjeyî yên din cuda dibe.

Bîranîn, hêvî, aşopî, evîndarî, lehengî, şoreşgerî, ev hemû bi helbestê tên ziman. Xwendekar ku hêza helbestê bibîne, fêr dibe ku ka çawa aşopên xwe dewlemend bike, asoyên xwe fireh bike û yê li hemberî xwe bandor bike.

Helbest, cureyeke wêjeyê ya herî kevn e. Helbest, hunera bi awayekî xweş avakirina peyvan e. Di helbestê de ji wateya peyvê girîngtir, mijara ku tê gotin e.

Helbest, ji pexşanê cuda ye û xwediyê nasnameyeke taybet e. Li gorî belgeyên ku di destên me de hene, herî kêm 4000-3000 B.Z. di nava cîhana me de hatiye dîtin. Li gorî ku gelê kurd xwediyê çanda Neolotîkê ye, dibe ku peydabûna helbestê di nava kurdan ji vê dîrokê gelek kevntir be. Ronî û eşkere ye ku helbest beriya zayînê bi zimanê kurdî hatine hûnandin.

Helbesta kurdî, serê xwe di gelek qonaxan de rakiriye û gelek şûnwar dîtine. Bandora helbesta devokî ya kurdî, xwe di dema Avestayê de jî daye der. Beşa Avestayê ya bi navê “Gata, yan Gatan” hemû bi awayê helbest û bi pîvana kiteyan hatiye nivîsandin. Ev diyar dike ku beriya Avestayê jî, bi awayekî devokî helbest hatine nivîsîn.

Niha jî ew awayê helbestgotinê di nava kurdan de heye û weke çandeke kevnar, di koçk û dîwanxaneyan de tên gotin.

Taybetiyên zimanê helbestê, wê ji zimanên heyî weke pexşan cuda dike.

Têbînî: Ev malikên li jêr şîroveya helbestê ye.

## Mînakek ji pirtûka pîroz a Avesta

Ey xwedayê bilind

Tu bi her tiştî karî

Li gorî kirinên me tewanan didî

Te xweşî daye qencan û tarî daye neqencan!!

# Teybetiyên helbestê:

- Di zimanê helbestê de bi awayekî giştî, peyv ne li gorî wateya xwe ya rast tên bikaranîn.
- Di zimanê helbestê de aşop heye, lê di zimanê rojane de tune ye.
- Zimanê helbestê, taybetiyên zimanê rojane hembêz dike. Lê belê, bikaranîna aşop û gotinên hunerî, zimanê rojane derbas dike.
- Helbest, bi wêne û dîmenên biwate û balkêş derbirîna hest û raman dike.
- Di zimanê helbestê de bi peyvên kêm, pirwate tên armanckirin. Lê di zimanê axaftinê de ev tune ye.
- Di zimanê helbestê de gotinên hunerî bi awayekî pir û bibandor tên bikaranîn.

Mînak: Helbesta Bilbilê dilşadî

Ey bilbilê dilşadî hela, wer bike fîxan
Derdê me giran e ey bira, birîna me kûr e
Gorî li te bitin cerg û dil û mêlak ê hemcan
Dengê te yî xweştir, ji ney û nay û bilûr e
Sê hawe te deng, yek ji sira bayê siba ye
Hawê dî ji dengê xuşîna dehil û reza ye
Hawê sisiya ji bêhina şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşhûr e
Karwanê me va bi rê ketî, şev reş û tarî
Serma ye terez guliyên di berfê her dibarî
Bahoz e çelapek têne me, ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval, rêça me dûre Çar
hawîr me diz û keleş in, têk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin ber bi ber, heyf û mixabin
Qet çar û omîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeqel, gur zûr e zûr
e Meydan e ji bo hirç û çeqel, rovî û keftar
Gorî te bibim bilbil, ji serê darê tu were xwar

***Seydatê Tîrêj***

## Pirsên Nirxandinê

- We çi encam ji helbesta "Ey bilbilê dilşadî" girt? Bi hevalên xwe re parve bike û malika yekem şîrove bike.

- Di nava gelê kurd de, helbest di encama çi de derket? Şîrove bike.

- Gelo helbest bi çi rengî bandorê li şoreşan dike?

Wane 5

# PENDÊN PÊŞIYAN



Gelê kurd, ji aliyê pendên pêşiyan ve gelek dewlemend in. Di vî warî de xwediyê wêjeyeke eşkere ye. Pendên pêşiyan, ji çend gotinên kurt pêk tên. Xwedî wateyeke hêja ne. Ev gotin, ji berê ve li hemberî zoriyan li ber xwe dane û heta roja me ya îro hatine.

Di van pendan de awayê jiyan, rêz û tore, bîr û baweriyên kevn ên netewa kurd di warê; civakî, ramyarî û maldariyê de derdikevin holê. Pêkhatina pendên pêşiyan di dema xwe de bi vî awayî ne: Kengî karesatek, an tevencek pêk hatiye, gotinek li ser hatiye gotin û ew gotin bi rengekî devokî geriyaye û heta niha weke pendeke hêja ji me re maye.

Li ser hemû aliyên jiyanê, mirov dikare pendên pêşiyan bibîne. Ji ber ku di zimanê me de hejmareke pir mezin ji pendên pêşiyan hene. Lê mixabin, ji ber bindestiya gelê kurd, heta niha ev berhem bi giştî nehatine komkirin.

## Taybetiyên pendan:

- Bêjerên van gotinan ne diyar in, lê ev pend, weke cewher ketine nava gencîneya toreya kurdî.
- Gotinên pêşiyan binirx û watedar in. Ji ber vê yekê, ev pendên bibandor; serpêhatiyên civakê vedibêjin.
- Ji taqîkirinên civakê hatine afirandin û her dem mirov jê sûdê werdigire.
- Zêde cih nadin huner û xemilandinê, xwediyê şîroveyeke xwerû ne.
- Bi hevokeke kurt, wateyeke kûr û sergihayî dide.

Mînak:


- Dinya gul e, bêhin bike û bide hevalên xwe.
- Erd birinc be, av jî rûn be; ku xwedî tune be, zû xilas dibe.
- Bi xwe weke baz e, lê nêçîra wî ji xelkê re ye.

## Pirsên Nirxandinê:

- Di pendên pêşiyan de çi derdikeve holê?
- Çi bûye sedem ku pendên pêşiyan, heta niha bi giştî nehatine komkirin?
- Taybetiyên pendên pêşiyan, şîrove bike.
- Çend pendên pêşiyan, bîne ziman û şîrove bike.

Wane 6

# MAMIK



Mamik; ew gotinên ku piranî qalib girtiye û agahiyên girêdayî tişt, mirov, teba, xweza, şînatî û hizirê bi awayekî veşartî tîne ziman, ka ew çi ye û bi hizirînê peydakirina wê dike armanc.

Mamik, weke gelêrî û kesayetî dibin beş. Mamikên gelêrî, berhemeke wêjeya gel e. Mamikên kesayetî, her çi qas berhemeke wêjeyî ye, ji aliyê nivîskar an jî wêjevanekê/î ve tên afirandin.

Mamika ku berhemeke wêjêyê ye, li gorî awayê xwe weke pexşan û hûnandî dibin du beş, lê piraniya wan hûnandî ne.

Mamikên kurdî yên ku xwe dispêrin dîrokeke pir kevnar, hebûna xwe heya roja me ya îro domandine.

Di demên pir kevnar de, dema ku şerê di navbera du kes, du malbat, an jî du eşîran de çêdibû, gelek caran bi pirskirina mamikan, serketî û binketî diyar dibûn û şer bêxwîn bi dawî dibû. Yanî kesê/a bersiva mamikê dizane; weke serketî û yê nizane jî weke binketî dihat pejirandin. Ev rêbaza mamikê, heya niha jî didome.

Her wiha, weke pêşbirkeke zanistî jî tê pejirandin. Ev rêbaz, di toreyên civakî de jî tê bikaranîn.

Weke mînak; di toreyên civakî yên kevnar de kesekî ji bo kesekî digot:" Ger tu bersiva vê mamikê bizanî, ez ê vî tiştî bidim te, yan ji te re xwesteka te pêk bînim." Dema dizanî, daxwaza wî pêk tanî.

Her çi qas bi derketina teknolojiyê re pêwîstiya bi mamikê kêm bibe jî, lê di piraniya welatan de bi taybetî di nava zarok û ciwanan de, mamikgotin xwedî girîngiyeke taybet e.

Rêjeya mamikgotinê, di demsala zivistanê de, di civat û dîwanan de zêdetir dibe.

Mamikgotin, hem lîstikeke, hem jî pêşxistina bîrgeh û hişmendiyê ye.

Di çanda gelê kurd a devokî de, mamikgotin, xwedî roleke pir mezin e.

## Mînakên Mamikê:

**"Zîq û zîq, heşt ling û du pîx"**. Çi ye?

**Şîrove:**

Zîq û zîq; halet

Heşt ling; hejmara lingên du qantirên ku di ber haletê de ne.

Du pîx; du piyê mirov ên ku haletê diajon.

**Bersiv: Cotkarî**

**"Hespê boz, rê kir toz"**. Çi ye?

**Bersiv: Aş**

## Pirsên Nirxandinê:

- Çawa şerê di navbera du hozan de, bêxwîn bi dawî dibû?
- Çend beşên mamikan hene û kîjan bi piranî tê bikaranîn?
- Sûda mamikgotinê ya ji mirovan re, çi ye?
- Çend mamikan peyda bike û li ser lênûsa xwe binivîse.

# BEŞA ÇAREM

- Qonaxa wêjeya kurdî ya dema Avestayê
- Pêşengê wêjeya kurdî yê dema Avestayê
- Pîr Şalyar

Wane 1

# QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA AVESTAYÊ



Di nava her neteweke de, du beşên wêjeyê hene, yek devokî û ya din jî nivîskî ye. Piştî ku wêjeya devokî bi hezarên salan hebûna xwe diparêze, bi derketina nivîsê re, wêjeya nivîskî derdikeve pêşberî me. Hem bi saya fîlozof û hem jî ji bo parastina hemû belgeyên dîrokî, di aliyekî din de jî, heta ku berhemên wêjeya devokî wenda nebin û neyên jibîrkirin; pêwîstî bi nivîsa berheman çêbû.

Di nava gelê kurd de jî ev pêwîstî hebû, lê ji ber sedemên êrîş û dagirkeriya ku bi ser gelê kurd de dihatin, ev derfet bidest nediket û cardin berhemên xwe bi devokî berdewam dikirin.

Her çiqasî gelê kurd di aliyê wêjeyî de dewlemend be jî, lê pêwîst e ku bi wêjeya devokî re, wêjeyeke nivîskî jî derkeve holê. Ev yek derfetê dide ku hemû tiştên di rêya devokê re hatine gotin, bêne belgekirin û di aliyê din de jî hemû berhemên ku dê derkevin êdî bi nivîsê re derkevin… Rewşa vegotina berheman bi awayê devokî heta dema derketina Zerdeşt bi pirtûka xwe ya pîroz "**Avesta**", domand û heta roja me ya îro jî hîn berdewam e.

Zerdeşt, bi nivîsandina Avestaya pîroz a ku bi zimanê avestayî hatiye nivîsandin, di nava konfedresyona Medan de, derket holê. Lê her çiqas Avesta çavkaniya wêjeya Rojhilata Navîn (çanda Aryen) be jî, lê ji ber bêalîbûna Zerdeşt ev wêje li Rojhilata Navîn belav bû; ji ber ku tu kes neçarî fêrbûna wê ne-kir û li ser tu netewên din, nesepand. Reftar û rêbazê Zerdeşt ê aştyane bûn sedem ku her kes xwe fêrî zimanê vê wêjeyê bike.

Li gorî hemû bendên derbasbûyî, em dikarin bibêjin ku pêşengê wêjeya kurdî ya nivîskî, Zerdeşt e. Lê ji bilî pirtûka Zerdeşt, hin berhemên wêjeya kurdî li ser çerm û keviran hatine dîtin. Mînaka vê jî helbesta **"Boraboz"** a ku di sala 330`î B.Z de jiyaye:

“Xwazdî ez tu bi hev re bîn

Werdî bihîrîn qûtran bîn”

“Bi hîv ra hiring xurînî

Bangik dîn bi hîv ra narînî”

Şîroveya helbestê: "Xweziya hingî, çaxê ez û tu bi hev re bûn û em bi hev re diçûn çiyayan, were da ku em bi xurînî herin derve û pev re straneke narînî (nazik) bibêjin".

Piştî ketina konfedrasyona Medan û desthilatdarî dikeve destê Exmîniyan, êdî wêjeya kurdî ji ber sedemên qedexeyan, careke din paş de vedigere û dîsa berhemên xwe bi awayê devokî diparêze, ta ku dighêje serdema Sasaniyan. Qiral Erdşêr di sala 226`an Z, biryar da ku hemû deqên Avestayê bêne berhevkirin û wergere zimanê pehlewî, ji bilî beşa Kasat a ku avestayî ma; ji ber ku gotinên Zerdeşt bi xwe ne. Em çend mînakên peyvên avestayî bînin zimên:

**Sarah:** Serî
**Ap:** Av
**Bratar:** Bira
**Matar:** Dayîk
**Pîtar:** Bav
**Zeraye:** Derya
**Buze:** Bizin
**Zast:** Dest
**Das:** Deh
**Dar:** Heval

## Agahiyên Giştî

Pirtûka Zerdeşt a pîroz "Avesta", ji 21 beşî û hezar bendî pêk tê. Di nava wê de 345700 gotin hebûn. Li ser 12000 çermên çêlekan bi tîpên zêrîn hatiye nivîsandin

Çîroka "Panca Tantra" di navbera salên 600-300 B.Z de, yekemîn çîroka ku li Rojhilata Navîn derketiye.

## Pirsên Nirxandinê:

- Di dema me ya îro de ku wêjeya devokî nayê nivîsandin û nekeve pirtûkan, gelo ev wêje dê bê parastin, an na?

- Piştî hilweşandina konfedrasyona Medan, wêjeya kurdî paş de vegeriyaye. Şîrove bike.

- Çima pêwîstiya netewan bi nivîsandinê hebû? Bi awayekî baş şîrove bike.

## Lêkolîn

Lêkolînekê di derbarê pirtûka pîroz "Avesta" de bikin.

Wane 2

# PÊŞENGÊ WÊJEYA KURDÎ YÊ DEMA AVESTAYÊ



Wekî di waneya bûrî de me nas kir, Zerdeşt pêşengê wêjeya kurdî ya nivîskî ye. Ev yek jî di rêya nivîsandina pirtûka pîroz "**Avesta**" re derket holê.

Zerdeşt: Di serdema konfedrasyona Medan de derketiye. Ew xwediyê pirtûka pîroz a binavê "**Avestayê**" ye û ola Zerdeştiyê ava kiriye.

Zerdeşt, navê wî yê rast, Dexza ye. Ji malbata Spîtama ya medî ye. Li bajarokê nêzîkî Ûrmiyeyê ji dayîk bûye. Ji kurdên ku li Azerbeycanê jiyaye.

Dema ku temenê wî dibe 30 sal, veder (in‘îzal) dibe û berê xwe dide Çiyayê Sebelanê . Li wê derê dikeve nava hizir, ramanên bawerî û felsefeyê û piştre ji hemû mirovahiyê re peyama xwe radigihîne. Ew ramana civakî ya ku xwediyê çandeke pêşketî, jiyaneke nûjen û bilind bû, her çiqas weke wateya olê tê binavkirin jî, rêgezên wê li ser hêmanên xwezayê bûn: ba, erd, roj û av ên ku bingehîn û ji jiyanê re, evra didît.
Tarî û ronahî, xweşî û nexweşî, xerabî û qencî, zanîn û nezanîn weke têgehên nakok, dihatin dîtin. Di baweriya Zerdeşt de têgeheke giring heye, ew jî pîrozdîtina agir e.

Di baweriya Zerdeşt de, du xweda hene; Ahora Mezda û Ahrîman. Ahora Mezda; xwedayê başiyê ye û Ahrîman jî; xwedayê nebaşiyê ye.

Di nava hizir û ramanên ku li ser Çiyayê Sebelanê dikir, roj û şev bala wî dikşînin ji lewra xwest ku pendekê ji vê bûyera ku çêdibe bigire. Dît ku roj ji du tiştan (ro-şev*l* ronahî-tarîtî) pêk tê

û ev dihat wateya ku cîhan ji du tiştan pêk hatiye; ew jî başî û nebaşî ye.


Di vir de dît ku dîroka mirovahiyê di navbera başiya ku Ahora Mezda nûnertiya wê dike û nebaşiya ku Ahrîman nûrtiya wê dike de, maye. Piştî ku wî ev tişt hemû nas kirin, êdî xwest ku baweriya xwe di nava gelê xwe de balav bike. Lê di vir de rastî gelek astengiyan hat û gel li dijî wî rawestiya û ew dûrxist. Dema ku xwest peyama xwe belav bike, kesê zana li dor xwe vehewand û di rêya wan de, Zerdeşt baweriya xwe di nava gelan de belav kir. Paşê gelek kesan jî baweriya xwe bi wî anîn û di destpêkê de kurê apê wî yê bi navê "Mîtomah" bû.

## Lêkolîn:

Bi awayekî berfireh jiyana Zerdeşt lêkolîn bike û bandora hizrên wî bîne zimên.

Wane 3

# PÎR ŞALYAR



Gora Pîr Şalyar

Pîr Şalyar, an Pîr Şehriyar ku bi Pîrê Şalyarê Hewramî navdar bû, yek ji pîr û mezinên baweriya yarsaniyan bû. Navê wî Xwedadad kurê Camaspe ye. Ew di sala 1006'an de li Hewramanê ji dayîk bûye. Di xortaniya xwe de çûye Loristanê, li cem Şaxoşên ê ku rêberê ola yarsaniyan bû û sê salan li wir dimîne.

Li ser daxwaza Şaxoşên vegeriyaye Hewramanê û li wir bîr û baweriya yarsaniyê belav dike. Ew, di zanista gotin û vacê (mentiq) de şareza û pispor bû. Di sala 1098'an de koça dawî kiriye. Hin wî, weke rêberê zerdeştiyan yê herî dawî yê li Hewramanê bi nav dikin.

Pîr Şalyar, pirtûkeke şîretan a bi zaravayê Goranî ya bi navê Marîfeto li pey xwe hiştiye. Ev pirtûk li cem Hewramaniyan pir pîroz e. Li wê herêmê hin dibêjin ku ew ji Quranê kevntir e, ji ber ku islam piştî wê demê gihaştiye Hewramanê.

Malik, bend û şîretên Pîr Şalyar ên ku di vê pirtûkê de hene, ji devê xelkê hatine wergirtin û nivîsandin. Çêja Zerdeştiyê di helbestên Pîr Şalyar de diyar e. Kurdiya wî ji erebî

pak e û ev bi nêrîna hinan, tê wê wateyê ku hîn di serdema wî de, ola islamê negihîştibû Hewramanê.

Pîr Şalyar, li cem xelkê Hewramanê, weke welî û mirovekî xwedî keramet û comerdiyê tê naskirin. Jixwe, wî gelek nexweş sax kirine û lal bi ziman kirine.

Cejina Pîr Şalyar, li Hewramanê, li cem gora wî li nîvê deryayê û di zivistanê de her care, bi dirêjahiya sê rojan tê pîrozkirin.

Her çi qas Pîr Şalyar, piştî islamê bi 400 salî jiyan kiribe jî, lê ji hatina islamê bandor nebûye; şopdarekî ola Zerdeşt e.

Helbestên xwe, beriya ku misilmantî derbasî Hewremanê bibe, bi devokî gotine. Ev helbestên wî, ji zardevan hatine girtin û nivîsandin. Ji ber vê yekê, em vî wêjevanî, weke wêjevanekî beriya islamê dibînin.

**Helbesta Pîr Şalyar:**

**Bi goranî:**

“Dara giyan – deran cerg û dilberg
in, Gahên pir bergen, gahê bê berge,
Kerg cehêlik, hêlê cekergin,
Ruwas ce ruwas, wergen ce wergen”

**Bi kurmancî:**

“Dara giyandar cerg û dil pel in
Carinan têr pel in carinan bê pel in
Keleşêr ji hêkê ye, hêk ji keleşêr e
Rûvî ji rûviyan, gur ji guran

## Pirsên Nirxandinê:

- Navê pirtûka Pîr Şalyar çi ye û bi kîjan zaravayî nivîsandiye?
- Çima Pîr Şalyar neketiye bin bandora ola islamê?
- Pîr Şalyar, di kîjan mijarê de şareza û pispor bû?
- Pîr Şalyar, li Hewremanê bi çi navî dihat naskirin?

# BEŞA PÊNCEM

Behlûlê Mahî

- Baba Recebê Loristanî
- Lîza Xanim
- Ebdulsemedê Babek
- Rihan Xanim
- Dibistanên wêjeyî
- Baba Tahirê Hemedanî
- Dayê Xezana Serketî

Wane 1

# QONAXA WÊJEYA KURDÎ YA DEMA ISLAMÊ



Piştî ku wêjeya kurdî demeke baş li ser lingê xwe rawestiya û gelek dewlemendî di nava wê de çêbûn, bi saya Zerdeşt û pirtûka wî ya pîroz "Avesta" beşa vê wêjeya dewlemend a nivîskî derket holê. Lê wekî ku di waneyên bûrî de derbas bûne, ji ber sedemên şer, êrîş, dagirkeriya ku bi ser gelê kurd de dihatin, ev wêje bi giştî nehatiye nivîsandin. Her wiha ji ber sedemên parçebûnê yên di nava gelê kurd de çêbûbûn, ziman jî belavî zaraveyan bû û vê rewşê heta hatina islamê berdewam kir.

Di sedsala 7`an de, islam wekî ola yekxwedayî ya dawî, li Erebistanê derket û ji wir de li deverên din belav bû. Zimanê vê ola nû jî erebî ye, bi saya pirtûka pîroz (Quran) zimanekî erebî yê standart hat afirandin. Di wê demê de jî gelê ereb belavbûyî û parçekirî bû; bi saya islamê û pirtûka pîroz, vî gelî xwe komî ser hev kirin û bûne yek.

Piştî ku di gelek qadan de bi ser ketin û ola islamê bi gelek gelan ve dane sepandin, êdî çavên erebên misilman li ser hin dever û welatên din vebûn, yek ji van welatan jî; Kurdistan bû.

Di sala 633`yan de, erebên misilman, berê xwe dan Rojhilat Navîn û di encama şer Qadisyê de imperatoriya Persan tê şkandin û şahê sasaniyan direve. Di nava vê şkandinê de gelê

kurd jî tar û mar bû. Şkandina imperatoriya Sasaniyan li ser milê kurdan jî bibû barekî pir giran. Lê kurdan ev ola nû, nepejirandin û piştî berxwedaneke mezin û ji ber zor û zehmetiyan; neçar man ku bipejirînin. Hinekan bi vîna xwe pejirandin, beşekî din jî qet nepejirandin û bi qirkirinê re rû bi rû man û li ber xwe dan. Di vê êrîşê de perestgehên agir hatin vemirandin û wêrankirin, gelek jin û zarok hatin kuştin. Pirtûkên din ên mîna Avesta-Zendavesta ji holê hatin rakirin û tenê pirtûka pîroz (Quran) ma. Gelê kurd neçar ma ku xwe fêrî zimanê erebî bike; ji ber ku zimanê ola islamê ye.

Di vê serdemê de, êdî kurd daketin bajaran û di bajaran de wêjeya nivîskî rû dide. Di heman demê de, heta ku desthilatdariya xwe li ser kurdan zêde bikin, di Kurdistanê de, bi avakirina mizgeftan re perwerdeyên olî dane destpêkirin. Zarokên kurdan ên ku diçûn wan mizgeftan, fêrî ziman û wêjeya erebî dibûn. Gelek ji wan ên mîna Mela Cami`, Ibnûl Esîr û Ibnûl Xelkan ji bo çand, ziman û wêjeya erebî, gelek xebatên mezin kirine.

Ji ber ku mamosteyên ji wan mizgeftan derçûn, kurd bûn, zimanê kurdî yê nivîskî careke din, derdikeve hole û hinaseyek rû dide. Wêjevanên mîna: Baba Tahirê Hemedanî, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqê Teyran û Ehmedê Xanî, dikarîbûn careke din, vê wêjeyê zindî bikin. Lê ji ber ku di nava pêlên pişaftinê de mabûn û ji bandora zimanê erebî, tirkî û farisî, gelek gotinên biyanî di nava helbestên wan de derbas dibin û nikarîbûn wêjeyeke bi zimanê kurdî yê xwerû ava bikin. Lê di encama vê xebata wan de, dikarîbûn hizrê netewî li pêş bixin. Tevî ku ji bandora zimanên din rizgar nebibûn, lê gelek destan, helbest, çîrok û ferheng hatin nivîsandin.

Mînak: Nûbihara Biçûkan, Destana Mem û Zîn, Derwîşê Evdî… hwd.

Nîşaneyên ku didin diyarkirin ku helbest di nava kurdan beriya islamê, li pêşe bû hene. Mînak: Gava muslimanan xwestiye herêma Şarezûr û derdora wê dagir bikin, kurd di nava komkujiyan re derbas kirine. Ev bûyer bi awayekî diyar di vê helbesta li jêr ya wê demê hatiye nivîsandin diyar e. Ev helbest li Silêmaniyê li ser çermekî di Şikefta Cêşanê de hatiye dîtin.

**Ev helbest, li ser çermekî hatiye nivîsandin.**

“ Hurmizgan riman, etran kujan

Wêşan şerde we gewreyî gewrekan

Zorkar ereb kerîne xapûr

Gîna î paley heya şarezûr

Şîn û kenîkan wer rû- û hiwîne

Rewşt Zerdeştre manewe bêkes”

**Bi kurmancî:**

Perestgehên Hurmiz xerab kirin, agirê wî vekuştin

Xwe veşartin ê herî gewre ji gewreyan

Zorkarên ereb, her cih wêran kirin

Gihan Şarezûr gundê paleyan

Hemû keç û jin dîl girtin

Mêrên mêrxas man di nava xwînê de

Siwarên Zerdeşt bêkes man

Hurmiz li tu kesî nehat rehmê

Ev helbest, dema talankirin û wêrankirina kurdan û vemirandina agirê di perestgehan de, diyar dike.

**Hurmiz**: Ahora Mezda, xwedayê xêrê (qenciyê) yê baweriya Zerdeşt e.

## Pirsên Nirxandinê


M) Dema ku islam derbasî nava bajarên kurdan bûye, rewşa wêjeyê, bîne ziman.

N) Çi bandora islamê li ser ziman û wêjeya kurdî hebû?

O) Çima gelê kurd piştî ku islam pejirand, navên erebî yan jî navên peyamberan li zarokên xwe dikirin? Lêkolîn bike.

Wane 2

# BEHLÛLÊ MAHÎ



Navê wî Emerê kurê Leheb e û bi Behlûl hatiye naskirin. Heta niha sala jidayîkbûna wî ne diyar e, lê tê hizirîn ku ew di sedsala heştan de li Mahîlkufê ji dayîk bûye.

Dibe ku di sala 835'an de li Tengegolê koça dawî kiribe û li wê derê hatiye veşartin. Rêbaza Behlûl, rêbaza Yarsan a ku rêbazeke xwedanasîn û derwêşiyê ye û hin jî vê baweriyê weke baweriyeke ji baweriya Mîtrayiyan derketiye, dibînin.

Ew diçe Bexdayê, piştî demekê ji mala xwe ya li Bexdayê qesta kiriye. Li Kirmanşanê rêbaza Yarsan belav kiriye û gelek alîgir (mirîd) peyda kirine.

Tê gotin ku hinan dabaşa wî bi xerabî li cem xelîfeyê pêncem ê Ebasiyan Harûn Elreşîd (766-809) kirbû. Ji ber vê yekê xelîfe fermana kuştina wî da. Lê îmamek nêzîkî xelîfe, ji bo wî ji kuştinê rizgar bike, jê xwest ku ew xwe li dînîtiyê deyne. Xelîfe bi wê qayil kir ku Behlûl dîn bûye û wiha Xelîfe fermana kuştina wî rawestand. Dibêjin piştî wê, ew di nava xelkê de weke Behlûlê dîn dihat naskirin.

Wî helbestên dumalik bi zimanê kurdî (kurdiya goranî) ;ku zimanê mîrnişîna Erdelanê bû, bitîpên erebî vehûnandine û mijarên wan bawreî ne. Helbestên wî yên li ber destan mane; tenê yên ku di pirtûka Serencamê de hatine parastin.

Bahlûl, di van her du malikên xwe de diyar dike ku ew bi nêrîna hin kesan dîn e, lê ew di rastiyê de zana û rêberê yarîsani-yan e.

## Du malik ji helbesteke Behlûlê Mahî

Behlûl zatê wan zat yekdan e
Amiyan maçan Behlûl dêwan e

Kî dî dêwan e, weytewer dane bo
Merkewene meydan gerdûn rana bo

**Wate:**

Behlûl tîrêja Xwedê ye. Her çi qas ku hin kesên bêagahî û nexwende wî weke dîn dizanin! 2Kê dîtiye ku dînek ew qas hêja, zana û jîr be û hespê xwe yê zanistê, di qada hevçerxa gerdûnê de, bibezîne.

Çîroka Behûlê Mahî: Weke tê zanîn, Behlûlê Mahî mirovekî zana û feylesûf bû. Wî gotinên xwe bi awayekî pêkenok digot, lê di rastiya xwe de tijî pend û pir watedar bûn. Rojekê Harûnê Reşîd dibhîze ku Behlûl li bazara qesaban, bi dengekî bilind dikeniya. Dişîne pey wî û sedema kenîna wî jê dipirse. Behlûl wisa bersivê dide: Li bazarê min dît bizin û mih her yek bi lingê xwe hatine hilawestin (daliqandin)!!! Behlûl berdewam kir û

got: Tirsa min ew bû, ku ez gunehê te hilînim, lê piştî min ev dît, ez têgihiştim ku her kes radihêje gunehên xwe hhhhh!!!!

✞☽ Ev penda wî ya navdar, heta roja me ya îro di nava civakê de tê gotin:

"Mih bi lingê xwe tê daliqandin, bizin bi lingê xwe tê daliqandin."

## Wateyên peyvan:

**Serencam:** Pirtûka rêbaza ola yarîsaniyan ne û weke jêdereke wêjeyî tê dîtin.

**Yarsan:** Baweriyeke

**Mîtra:** Navê baweriyekê ye.

## Pirsên Nirxandinê:


û Navê "Behlûl" ji ku hatiye?

û Helbestên behlûl bi çi awayî bûn û bi çi zimanî dinivîsand?

û Penda ku Behlûl ji Harûn Elreşîd re got, bi çi armancê bû? Şîrove bik.

Wane 3

# BABA RECEBÊ LORISTANÎ



Baba Recebê Loristanî, di sedsala 8-9 zayînê de jiyaye. Wêjevan û hunermendekî pir mezin bû û weke alîgirê Behlûlê Mahî tê naskirin. Li gorî pirtûka Serencamê, Baba Recebê Loristanî, di destpêka sedsala 9'an de jî, koça dawî kiriye. Hin malikên bi zaravayê goranî ji vî wêjêvanê hêja mane û gelekî dilgir û kîşîner in.

Baba Recebê Loristanî, di lêdana tembûrê de jî xwedî destekî berz bû û helbestên xwe bi lêdana tembûrê li civat û dîwanxaneyan dixwend.

Beriya baweriya Zerdeşt, di nava kurdan de gelek bawerî hebûn. Beriya ola islamê, di nava kurdan de baweriya Zerdeştî gelekî li pêş bû. Her wiha, hebûna argehan (agirdank) ên li Kurdistanê, vê yekê ji me re ronî dikin.

Bîr û baweriya yarî ya ku bîr û baweriyeke kurdî ye û paşmaya baweriya Zerdeştî, Mazdekî û baweriyên din ên Aryenan ne. Ev bîr û bawerî, pêşî li Loristan û Hewramanê peyda bûye û serokên wan di vê rêbaz û baweriyê de bi zimanê zikmakî hestên xwe yên hundirîn, dianîn ziman.

Ev rêbaz li pêş ketiye û bûye sedema ku Behlûl û alîgirên wî di sedsala 8'an de bi vê rêbazê helbestê birêsin. Êdî her bi vî awayî, ev rêbaz û bawerî li Kurdistanê belav bûye.

Baba Receb jî, yek ji van helbestvanan bû û li gorî pîrê xwe tev geriyaye.

## Malikek ji helbesta Baba Recebê Loristanî:

Saqiya dest im, saqiya dest im
Camî tir bawer bigêre dest im
Ez cemeyxaneya roy elest mest im
We mestî peyman aînim best im

**Wate:**

Meyger bide destê min
Peykeke din bîne, destê min bigire
Ez ji meyxaneya elestê mest û serxweş im
Bi serxweşiyê min peymana baweriya xwe girê da

## Wateyên peyvan:

**Loristan:** Herêmeke rojhilatê Kurdistanê ye.

**Berz:** Bilind

**Kîşîner:** dîtinxweş, cezab

**Asûde:** aramî, tenahî

## Pirsên Nirxandinê:

- Baba Recebê Loristanî, şopdarê kê ye?

- Baweriya yarî, berdewamiya kîjan baweriyê ye?

- Baba Receb, bi kîjan zaravayî nivîsandiye û kengî koça dawî kiriye?

# Agahiyên wêjeyî:

**Nivîsên wêjeyî bi awayekî giştî, dibin du beş:**

- Pexşan
- Hûnandî (helbest)

## 1. Pexşan:



Pexşan, peyv û gotinên hunerî yên bedew, birêkûpêk û bi şêweyekî lihevhatî tên rêzkirin. Lê ew berevajî helbestê, bi şêwazê hûnandî û terazoyî nayên nivîsandin. Ew xwedî şêweyekî taybet e û teşeyeke nivîsê ye. Ew bi zimanekî bijartî, ramaneke zelal, bi vaceke sazkar û qayîl li ser guhdarê xwe bibandor e.

**Hunerên pexşanê:** çîrok, gotar, axaftin, şano û hwd.

**Cureyên pexşanê:**

**1- Pexşana asayî (normal):** Gotinên ku di têkiliyên navbera kesan ên jiyana rojane de, tên bikaranîn.

**2- Pexşana hunerî:** Bi piraniya xwe bi şêwazeke hunerî tê ristin. Bi awayekî rêkûpêk, peyv û hevokan dixemilîne û bi zimanekî zelalê dilsojî û aşopê, bi kar tîne.

### Mînak: Nameya dayîka min a delal:

Xwezî bi dilê min û te be ku rojekê ji rojan em bigihêjin hev û du…

Ez ê te hembêz bikim bi dilekî germ, bi çavên bendewar û tijî hêvî…

Bi lêvên ji hesreta miçiqiyayî û bi rûyekî ken

Ax dayê!

Te çi dît û çi nedît!

Ma qey hestên dayîkan hêsan in?

Te di şevên tarî de xwe dikir çira, lê carna jî tu dibûyî stêrka şevê ku di ezmanan de diçirisî.

Qermiçûngên di rûyê te de, ji min re çîrokan diherikînin êşa kedeke bihezkirin nîşan didin.

Ez wan çavên te yên xemgîn, tijî hêvî û şefqet, radimûsim

## 2. Hûnandî (helbest):

Bi taybetî, ji raman û hestên hûnandî yên ku bi awayekî sazûmankirî ku bandora xwe rasterast li hest û giyana guhdaran dike re, **hûnandî** tê gotin.

Hûnandî, ji rêzik û malikan pêk tê.

Bi pîvan û rêzbendê re pabendiya wê heye.

**Mînak:**

Xwe danaînim bo stem û zorê

Divê serbilind biçime gorê

Ku bi serbilindî çûme goristan

Hêjaye bibim lawê Kurdistan



**Osman Sebrî**

Wane 4

# LÎZA XANIM



Navê vê xatûna dildar Lîza Xanim e ku weke çirayeke ronîdar di asîmanê wêjeya kurdî de diçirise. Lîza Xanim, ji ber ku ji malbata wê re Cafê Ciwanro dihat gotin, heman malbat li dawiya navê wêjevana me jî tê bikaranîn û dibe Lîza Xanima Caf.

Lîza Xanim, di sedsala 11'an de jiyaye. Ew bi eslê xwe ji bajarê Şarezûrê ye. Lê belê, demeke dirêj li Loristanê jiyana xwe domandiye. Di pirtûka Serencamê de jî tê gotin, ku Lîza Xanima Caf yek ji alîgirên Şaxweşîn tê pejirandin yê ku rêbazê yariyan bi rê ve dibir. Lîza Xanim, hin helbestên dumalik ên gelek xweş û balkêş li pey xwe hiştine.

Lîza Xanim, di lêdana tembûrê de jî şareza û hosta bû. Wê helbestên bi awaz û bi lêdana tembûrê li civatan û dîwanxaneyan digotin.

**Çend Malik ji helbestên Lîza Xanimê**

Heyder seraf, Heyde seraf

Çende ne Eyne bîm ne gêc taf

Îsa mewçan penem kiçe Caf

Qebale marî ne taş mesaf

**Wate:** Ey Heyderê Seraf (yek ji alîgirê Şa Xoşîn e), ez demekê li gundê Eyneyê mam, bi surişta wî ya dewlemend û xweşik, kêfxweş dibûm. Niha jî ji min re tê gotin: "Ey keça êla Caf, divaya ku tu li Çiyayê Tisaf bibî alîgira baweriya Yarîsanî.

## Agahiyên wêjeyî:

Taybetiyên Wêjeya Hûnandî

☹✆

Wêjeya hûnandî, nivîsên bipîvan û birêzbend in.

💣✆

Mijar û hizirên ku bi awayê hûnandî tên nivîsandin, di hiş û bîrên mirovan de dimînin.

☠✆

Balê dikişîne li ser pîvan, lihevhatin û xweşikbûnê.

⚐✆

Aliyê wê yê bangkirin û aşopê xurt e.

## Pirsên Nirxandinê:


M) Lîza Xanim, di kîjan sedsalê de jiyaye?

N) Lîza Xanim, alîgira kîjan baweriyê ye?

O) Ji bilî nivîsandina helbestê, çi behreyên Lîza Xanimê hene?

Wane 5

# EBDULSEMEDÊ BABEK



Mijara me vê carê, Ebdulsemedê kurê Mensûrê kurê Babek e. Nasnavê wî yê helbestvanî “**Babek**” e. Li gorî gotina Îbnû Xelkan, ev helbestvanê hêja di sala 974'an de li Colemêrgê hatiye cîhanê.

Yek ji helbestvanê herî berz û navdar e. Helbest û berhemên wî, bi erebî û kurdî ne. Helbestên wî yên bi erebî, di pirtûkên wêjeyî yên erebî de hatine weşandin.

Hin helbestên wî yên bi kurdî, ji bo gotina di koçk û dîwanxaneyan de hatine nivîsîn û ketine destê me. Helbestên wî bi piranî li ser xwedanasî, evîndarî û xwezayê hatine nivîsandin.

Li gorî berhemên wî yên di destê me de helbestên wî gelek şîrîn û dilgir in. Her wiha, sê dîwanên wî hene. Di sala 1020'î de li Colemêrgê di temenê 46'an de koça dawî kir û gelek berhem li pey xwe hiştin.

Li gorî dahûrandin û belgeyên ku di destê me de, roja jidayîkbûn û koça dawî ya vî wêjevanî di sala (974-1020) de ye. Dema koça dawî kir, temenê wî 46 salî bû.

Ebdulsemedê Babek jî weke piranî helbestvanên kurd ên dema xwe, payebûn daye zimanê erebî û dîwan pê nivîsandine. Di wê demê de tişta wî ya ku ji hevalên wî cuda ye, bi zimanê kurdî zaravaya kurmancî helbest nivîsandine. Lê mixabin, ji wan berhemên wî yên kurmancî kêm ji wan bi dest me ketine.

**Helbesteke Ebdilsemedê Babek**

Dilo şad be!xoş dem hat bihar e
Reşemeh ço, terazin bûn diyar e

Nihal derbûn, xişa av hat cûbar e
Befîr ker ker bibû keftî nizar e

Kulîlk û gul bikin derçûn ji kajan
Sivik hat nêrgiza mest kovî xar e

## Wateyên peyvan:

**Terezin:** Beşeke  nefelê ye.

**Kaj:** Beşek ji dara çamê ye.

**Kofî:** Gulika serê nêrgizê ye.

**Mest:** Serxweş

## Pirsên Nirxandinê:

T) Ji helbesta li jor, rêzika duyem a malika yekem, şîrove bike.

U) Naveroka helbestên wî, bi piranî li ser çi bûn?

V) Ebdulsemedê Babek bi çend zimanan, helbest nivîsandiye?

# Agahiyên wêjeyî

**Du cureyên helbesta kurdî hene:**

1. Helbesta kevneşop a bi kêşe û rêzbend:

Helbesta kevneşop bi kêşe û rêzbendê tê nivîsîn. Rêzikên wê, ji aliyê kiteyan ve weke hev in û her dem pabendî kêş û rêzbendê ye.

## Mînak:

Dilo jaro ji xew rabe, ji derdê miletê xemgîn

Xebatê pir bike îro, bi serbestî bike zengîn

Me Tacdîn û Çeko nîn, xeberdarê me bê gorîn

Bi tole û balafir rabin bi zozanê dilê xemgîn

Erê xortê ciwan pirsê li dapîra xwe nakê

Welatê me gelek rind e, eger carek temaşa kê

Li hawîrê cîhan meyzê, xerita wî xuya nakê

Mixabin miletê kurdî, welatê te bibe xemgîn

**Helbest: Ehmedê Namî**

### **1.** Helbesta pexşane (azad):

Helbesta pexşane cudahiya wê ji helbesta kevneşop, ew e: Ew nepabendî rêzbend û kêşeyê ye û bi awayekî azad û serbest rêzikên wê tên nivîsîn.

## Mînak:

**Bilûra min a şîrîn**

Dengê bilûra min

Çiya û zozanên bilind

Kaniyên bi gul û rihan dorgirtî

Guhê şkeft û sere zinaran

Guhdarên te ne!

…

Nalîna me bigihîne

Deşta Sirûç û Diyarbekrê;

L)beriya mêrxasên Berazan

M)         kalîna berxan

Tev şehîna hespan

Li me vegerînin.

**Celadet Bedirxan**

## Lêkolîn

Hûn jî li ser wêjevanekî klasîk û yekî nûjen lêkolînan bikin.

Wane 6

# RÊYHAN XANIM



Ev jina helbestvan û wêjevan a ku evîndar û dildara Yezdan bû, bîrgeha wê bi ronahiya wêje û zanistê ronî bûye. Ji jenga serdem û rojgarê paqij bûye. Navê vê stêrka geş a li asîmanê Loristanê ronî daye, Rêyhan Xanim a Loristanî ye.

Rêyhan Xanima Loristanî, di sedsala 11'an de li derdora Yafteko, li Loristanê ji dayîk bûye. Helbestên wê, li ser mezinahiya Xweda, ronahî û evîna Yezdan bû.

Helbestên wê, xweş û bipîvan bûn. Rêyhan Xanim, li tembûrê dida û helbestên xwe li gel dengê xwe yê xweş li dîwanxaneyan kederên civaka kurd, dane der. Bi vî awayî çand, ziman û wêjeya gelê xwe wisa parastiye.

**Helbesteke Rêyhan Xanim**

"Xwaşîn" elest Xweşîn elest

Serim ce sewday to biyen sermest

Gul û şemamem herdu hane dest

Gewahî meden çi xas çi gest

Wate:

Ey "Şaxweşîn"ê roja elest (roja ezel), serê min ji hezkirina te sermest (serxweş) bû. Gul û şemam her du li destê min de ne, her kes bawerî û îman bi te tîne!

## Pirsên Nirxandinê:

J) Rêyhan Xanim, kengî û li ku derê ji dayîk bûye?

K)Rola jina kurd di parastina wêjeyê de çi ye? Binirxîn.

# DIBISTANÊN WÊJEYÎ

Çawa ku mirov bi herikîna dîrokê re bi pêş ketiye, wêje jî di her pêşketineke hizrî de xwe nû kiriye. Dibistana wêjeyî; rêbazeke nivîsandinê ye. Di her demekê de bi awayekî derketiye holê. Li hemû cîhanê kilasîzim weke dibistana wêjeyî hatiye destnîşankirin. Her wiha wêjevanên kurd jî bêyî ku bê destnîşankirin ev dibistan bi kar anîne. Mînak Baba Tahirê Hemedanî, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi rêbazê kilasîzmê nivîsandine. Li gorî wê demê, dexmeya olî û di gotinên wan de bikaranîna peyvên bijartî, rewanbêj û xweşbêj serdest bûn.

Xelqino werin bibînin

Çi husneke bi kemal e

Heyran ji dil bibînin

Ji sine' zewal celal e

Sene' Xwedê ku danî

Sifhe ji nûrê danaye

E'nber li ser kêşaye

E'nber xet di xal e

**Elî Herîrî**

Çawa di destpêka mijara xwe de me destnîşan kir ku pêşketina hizir dibe sedema guherîna dibistanê, em dibînin ku di wêjeya me de Ehmedê Xanî xwe ji hin bendên kilasîk rizgar dike û ber bi hestê netwî ve diçe.

Rêbazê nivîsa Xanî bandorê li wêjevanên piştî wî dike. Em karin wî weke yekem wêjevanê kurd yê gavek ber bi romantîzmê ve avêtiye, binasin. Her wiha Hecî Qadirê Koyî, Mehmûdê Bazîdî û hwd ji wêjevanên kurd yên dane rêya Xanî. Ev herikîn berdewam dike heta sedsala 19'an û derketina romana kurdî ji hêla Erebê Şemo ve.

Mînakek ji helbesta **Hecî Qadirê Koyî** ya guherîna ramanên ber bi romantîzmê ve:

Hakim û mîrên Kurdistanê

Her ji Botan heta Baban

Yek bi yek havizên şerî'etê bûn

Seyîd û şêxên qewm û milet bûn

Seyîd û şêx ji tirsa wan

Ew ku mirin rê kete ber wan

Seyr bike çawa bûne pûş û agir û nift

Yek li vî alî rû dike ber bi Ecem

Yên din li wî alî dibine dijminên hev

Di sedsala 19'an de sembolîzim li ser asta cîhanî xwe dide pêş. Di berhemên wêjevanên kurd de jî sembolîzim rû dide. Di rêbazên nivîsên Osman Sebrî, Qedrî Can ew dibistan xwiya dibe. Ji ber ku tiştan bi sembolan nîşan dikin ramanên xwe bi sembolan dinixumînin.

Em dikarin bi karanîna sembolan di helbesta li jêr bibînin:

Dixwazin îro bi hîzebûnî
Bi derxin kurdan ji ber karê min
Qirak,tot û tund ketin warê min
Koleyên kolî koledarên min
Ji xeynî felek min hene neyar
Li dora welat bûne çar nikar

**Osman Sebrî**

Qirak û tot sembola dijmina ye.

Di encamê de çawa ev dibistan di wêjeya cîhanî de hatiye xuyakirin, di wêjeya kurdî de jî ,bêyî dabeşkirinek berbiçav, xwe dide rû.

Wane 6

## DIBISTANÊN WÊJEYÎ

1. Kilasîzm (Kevneşopî)
2. Romantîzm (Aşopî, xeyalî)
3. Rîalîzm (Rasteqînî)

N) Naturalîzm (Xwezayî)

O) Sembolîzm



# KLASÎZM

Gelek nivîskar û wêjevan an bûne pêşengên herikîna hizrî yan jî di nava herikîneke hizrî de cih digirin.

Bi derketin û pêşketina hizirê re; wêje jî bi pêş dikeve. Di zimanê kurdî de jî ji ber ku wêje xwediya bingeheke dewlemend e, ev rewş zûtir li pêş ketiye. Li aliyekî din jî guhertin û pêşketinên di wêjeya cîhanî de derketin, bandor li wêjeya kurdî jî kirin.

Wekî ku çawa di sedsala 17`an dema ronesansê de rê li pêşiya klasîzmê vebû, her weha romantîzm jî li hember wê derketiye. Li hember romantîzmê jî realîzm derketiye. Li hember realîzmê; naturalîzm derketiye û li hember van herikînan sembolîzm derketiye holê. Bi vî awayî, her herikîneke hizrî û rêbazekî wejeyî derketiye; bi derketina xwe re bandor li wêjeya kurdî jî kirine.

**Klasîzm**: Ew bi bandora vejînê (ronesansê) derketiye, bandor li ser wêjeyê kiriye. Klasîzm, berhemên kevn ên ku bi wêjeyê ve girêdayî ne, digire dest. Piraniya xwe, berhemên olan ên destpêkê ne û bi navê kevneşopiyê, bi awayekî xwezayî hatine bikaranîn. Lê rêbaza klasîzma cîhanê, piraniya xwe di sedsala 16, 17 û 18'an de diyar bûye, li cem kurdan beriya vê demê dest pê kiriye; pêşengên wê Baba Tahirê Hemedanî û Elî Herîrî ne û di sedsala 9 û 10'an de derketiye holê. Nivîskarên cîhanê yên kevin, berhemên xwe pêşkêş kirine. Damezirînerê rêbaza kevneşopiyê, helbestvanê fransiz **Nicolas Boileau** (Nîkolas Biwêlo) ye. Di van sedsalan de jî gelek nivîskarên navdar, ên weke; Shakespeare (Şêkspîr), Dante (Dantê), Tolstoy (Tolistoy), Dostoyevskî û hwd, derketine.

Di van sedsalan de helbestvanên kurd, ên weke; Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî jiyane.

Berhemên van wêjevanên kurd ên kevnar, bûne bingehê klasîzma Rojhilata Navîn.

**Bingeh û şêweyên ku dibin sedemên geşkirina kevneşopiyê:**

- Girîngiyê didin hişmendî û xwezayê.
- Taybetiya hunermendên kevneşopiyê, beriya her tiştî girîngiyê didin ziman û awayekî tekûz.
- Hunermend di berhemên xwe de nêrînên kesayetî veşartî dihêle. Li gel wî, ya girîng hişmendî û pîvan e.
- Di şanoyê de yekbûna sê tiştan girîng e; dem, cih û bûyer.
- Rêbaza wê, li ser exlaqê paqij tê avakirin.
- Helbestvanên wêjeyê, kesên bijare û di cih de digire dest.

## Lêkolîn:

Hûn jî li ser rêbaza klasîzmê lêkolîn bikin, dinava kgelê kurd de kengî hatiye dîtin şîrove bikin.

Wane 7

# BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ



Yekem danerê çarînan e bi zimanê kurdî. Hozanvanekî kurd e. Ji rojhilatê Kurdistanê, ji bajarê Hemedanê ye. Ew bi Baba Tahirê Uryanî yê Hemedanî tê naskirin.

Navê wî yê rast, Tahir e. Ji ber ku ew ji hêjayên baweriya yarsaniyê bû, jê re digotin Baba. Peyva baba, hemwateya peyva pîr e; ya ku ji bo rêberên olî dihat bikaranîn.

Wî bawerî bi xwedanasiyê (Tesewifê) tanî û ji ber vê yekê jî, navê Uryanî, yanî tazî li xwe kiribû. Ew di sala 937'an de li Hemedanê ji dayîk bûye û li heman cihî di sala 1010'an de koça dawî kiriye.

Ew ji Loristanê ye û helbestên xwe bi zaravaya lorî nivîsîne. Li gorî gelek jêderên dîrokî yên kevn, Baba Tahir kurê malbateke xizan bû. Baba Tahir kesayeteke jîr, şareza, aqilmend û xwedî hişekî mezin bû.

Her çi qas wî bi zaravayê lorî nivîsî be jî, lê goranî jî dizanî. Her wiha, wî carinan zaravayên din jî tevlî helbestên xwe dikirin û bi rêya helbestên xwe yên bi vî awayî, xwe daye naskirin.

“Ez hostadê zimanê pehlewî me
Ji kitaba evînê re jêder im
Ey Xweda eşqa Tahir bênîşan e
Ku ji eşqa seneman bê pî û ser im”

Divê neyê jibîrkirin ku zimanê pehlewî, maka zimanê kurdî ye û jê re kurdiya kevn jî tê gotin.

Baba Tahirê Hemedanî, piraniya temenê xwe, bi danasiyê re derbas kir. Ji xweşî û kêfa cîhanê berdide, li şûna xwarin û vexwarinê, çêj ji fêrbûn û fêrkirinê distand. Piraniya helbestên wî, li ser hezkirina xwedê, xwedanasî û afirîneriyê ne, lê di nava helbestên wî de helbestên evîndariya rast jî hene.

## Helbesteke Baba Tahirê Hemedanî

Ez ew sotî dilê bê pî û ser im

Ku dilê sotî bi eşqa dîlber im

Dilê min daxdayî ye, ji lalerûyan

Di demarên xwe de xwedî niştер im

Rûyê yar ger cilwe dike, di dil de

Bi şahî ez ji tevan ronîtir im

Di xefka ziman de, ez wa mustarib

Weku nêçirê wehşî birîndartir im

Ku ji bilî eşqa te di dil de tiştek hebe

Nav heftê û du gelan de kafir im

Di hedefa vê dunyaya fanî de

Wek tîrek şkestî û bê per im

Her disoj im, disoj im, her disoj im

Bi germî ez ji agir, agirtir im

Ez im Tahir, ku bi derd û cefayê

Xulamtiyê ji Muhemmed re dikim

## Wateyên peyvan:

**Lalerûyan:** Rûyê wan weke gulan e.

**Nişter:** Sîxê ku ji bo berdana xwîna laşê mirovan tê, bikaranîn.

**Cilwe:** Derketin

**Mustarib:** Kesê bi zimanê xwe tê pişaftin û zimanê wî bûye erebî.

**Fanî:** Ya/ê ku tune dibe.

**Cefa:** Dûrketin

## Pirsên Nirxandinê:

5. Baba Tahir kengî ji dayîk bûye û li ku derê koça dawî kiriye?

6. Baba Tahir, piraniya helbestên xwe, bi çi şêweyî nivîsîne?

7. Baba Tahir, herî zêde naveroka helbestên xwe, li ser çi dinivîsîn?

8. Çima furs wî wekî bavê wêjeya farisî bi nav dikin, tevî ku ew kurd e?

Wane 8

# DAYÊ XEZANA SERKETÎ



Dayê Xezana Serketî, navê vê hunermend û wêjevana hêja, Xezana keça Ehmedê Serketî ye. Li gorî pirtûka Serencamê, di destpêka sedsala 11'an de li gundê Serketê, ji dayîk bûye.

Di zarokatiya xwe de bavê xwe winda dike û dimîne sêwiyeke belengaz. Dayîka wê jî ji ber feqîrî û hejariyê, ji bo ku karibe Xezana keça xwe baş perwerde bike û ji bo pêşeroja civakê kar bike û bixebite, bi kesekî din re şû dibe.

Dayê Xezan, di zarokatiya xwe de li gel dayîka xwe dest bi xwendinê dike. Piştî wê li cem mamostayê gundê xwe dixwîne û xwe baş fêrî xwendin û nivîsandinê dike. Vê carê ew berê xwe dide hunermend û helbestvanên kurd.

Bi vê rewşê xweşikbûn û balkêşiya xwezaya Kurdistanê deriyê vehûnandinê ji wê re vedike. Li gel wê jî diçe li ser baweriya Yarî û dibe bawermenda rêbaza Yarî. Ev yek jî vîn û baweriya wê xurtir dike û dest bi nivîsîn û vehûnandina rist û helbestan dike.

Dayê Xezana Serketî yek ji jinên parêzgar û xwedanas bû. Di sedsala heftem a zayînî de, destpêkê wê li dijî Baba Nawusê Serketî, serî hildaye; li dijî wî derketiye û bi wî re dikeve hevrikiyê. Lê piştre, rêbaza wî dipejirîne û dibe alîgira wî. Wê li ser vê yekê gelek helbest nivîsandine. Gel ji bo pejirandina wê rêbazê vexwendiye û bang li gel kiriye.

## Helbesteke Dayê Xezana Serketî

Şêre kirya Cewer, Şêre kirya Cewer
Ne dest bile, merdum, kiriya Cewer
Dadman resen, ne dest î gewr
Destî weş afat dindamiş hezewr

**Wate**: Kurê min Şêro, Baba Nawus gel wêran û talan kiriye û stem û zoriyê li gel dike. Were bike hewar, gel ji destê wî mirovî rizgar bike; weke şêrekî wî têk bibe, da ku gel ji qehr û stemkariya wî rizgar bibe û em jî jê rizgar bibin.

## Wateyên peyvan:

**Cewer:** stem, zordarî

**Weş:** weşandin

**Afat:** karesat

### Pirsên Nirxandinê:

10. Dayê Xezana Serketî, kengî û li ku derê ji dayîk bûye?

11. Dayê Xezana Serketî, bawerî bi çi rêbazî aniye?

106

# BEŞA ŞEŞEM

- Destpêka hatina islamê
- Elî Herîrî
- Şêx Adî
- Nêrgiz Xanim

Wane 1

# PÊVAJOYA DESTPÊKA HATINA ISLAMÊ




Wêjeya kurdî, di rojhilata Navîn de wêjeyeke dewlemend e û li herêmê xebateke mezin ji mirovahiyê re kiriye. Bi taybetî jî, di serdema islamê de.

Her wêjevanekî kurd, bûye dibistaneke zanistê. Her berhema wê demê heta roja me ye îro jî, çavkaniya herî mezin û dewlemend tê dîtin.

Dema ku mirov dest davêje pênûsê û li ser dîroka wêjeya kurdî dinivîse, yekser rastî vê pirsê tê: Kengî wêjeya kurdî hatiye nivîsîn û yekemîn wêjevanê/a kurd kî ye?

Her kesê ku lêkolîn an jî nirxandinekê li ser wêjeya kurdî dike, bêguman neçar dibe ku berê pênûsa xwe bide mêjûya afirandin, derketin û birêveçûna vê wêjeya dewlemend. Her wiha, bixwazî, nexwazî wêjevanên kevnar (klasîk) jiyana wan a destpêkê, dem, rewş û mercê ku ew tê de jiyane û têgehên hizirî yên ku peya kirine, nas bikin.

Dagirkerên ku Kurdistan dagirkirine, gelekî talanker, sitemkar û ji têgeha mirovahiyê dûr in. Lêkolînerên wêjeya kurdî, bi taybetî ya kevnar, di destkeft û berhemên xwe yên wêjeyî û hunerî de, rastî gelek zor û astengiyan hatin. Ji ber vê

yekê, dijminên kurdan kelepûr, kevneşop û destnivîsên hêja yên neteweya kurd talan kirine, yan dane windakirin, an jî şewitandine. Bi vî awayî, hem dîroka gelê kurd, hem jî dîroka yekem nivîsa berhema wêjeya nivîskî ya gelê kurd; tevî gelek hewldanên lêkolîner, wêjevan û rojhilatnasan bi tevahî nehatiye diyarkirin.

Destpêkirina desthilatiya islamê ya di herêmê de bi xwe re pêvajoyeke nû daye destpêkirin. Dema ku em mijara zimanê erebî ya li ser vê wêjeyê jî bînin ziman, bêguman nedîtina vê bandoriyê, di lêkolînê de valahiyekê dihêle.

Bandora wêjeya kesî û zimanê erebî ku di bin siya ola islamê de Kurdistan û hin gelên din xistine bindestên xwe û ser wan gelan, bi taybetî jî gelê kurd çewisandine. Di dema Ebasiyan de hemû berhemên şarezayan, bi erebî hatine nivîsandin. Zimanê erebî; bibû zimanê wêje, ol û hozanvaniyê.

Piştî ku gelê kurd ola islamê pejirand û pê de pêvajoyeke nû ji bo çand, wêje, kesayet û jiyana civakî des pê dike. Ev pêvajo, bi xwe re guhertineke baweriyê jî tîne û kurd dikevin qonaxeke nû. Her wiha dikevin nav çandeke nû. Ew bi xwe jî ji bo belavkirin û pejirandina vê bawerî û çandê, dikevin nava hewldanên girîng.

Di rastiyê de jî gelê kurd di civaka islamî de, cihekî girîng girtiye. Piştî pejirandinê islamê, li hemû herêmên kurdan xwe daye bicihkirin. Ev jî ji dilpakiya kurdan tê. Yekem çavpêketina kurdan a bi islamê re, di sedsala 7'an de çêbûye.

## Pirsên Nirxandinê:

9. Çima lêkolînerên wêjeya kurdî ya kevnar, di xebatên xwe de rastî astengiyan hatine?

10. Bandora zimanê erebî ya li ser wêjeya kurdî, tu çawa dinirxînî?

Wane 2

# ELÎ HERÎRÎ

Elî Herîrî, li gundê Herîrê yê girêdayî navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê di sala 1010'an de ji dayîk bûye. Di sala 1079'an de li gundê Herîrê koça dawî kiriye û li heman cihî hatiye veşartin.



Tê gotin ku Elî Herîrî yekemîn wêjevanê kurd e, ku piştî hatina islamê bi zaravayê kurmancî nivîsiye. Hêjatiya Baba Tahirê Hemedanî di zaravayê lorî de çi be, yê Elî Herîrî jî di zaravayê kurmancî de ew e.

Zaniyar û wêjevanê kurd Ehmedê Xanî; Elî Herîrî yek ji pêşeng û mezinê wêjeya kurdî dîtiye û di vê helbesta xwe de cih û mezinbûna wî diyar dike:

Ger dê hebûya me jî xwedanek

'Alîkeremek letîfedanek

'Ilim û huner û kemal û îz'an

Şi'r û xezel û kîtab û dîwan

Ev cinis bûba li ba wî m'emûl

Ev neqid bûba li nik wî meqbûl

Min dê 'Elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn

Bi navê rûha Melê Cizîrî
Pê hey bikra 'Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimayî heyran

Dîwaneke helbestan a bi zaravayê kurmancî ya Elî Herîrî heye.

Ji malbata Elî Herîrî, gelek zanyarên olî rabûne. Gundê Herîrê cihê zanist û fêrbûna olê bû. Ji ber vê yekê, Elî Herîrî jî weke feylosof û wêjevanekî navdar, di wan dibistanan de perwerde bûye.

Gelek helbestên wî yên binirx di destên me de hene.

-1-

Çavên min xwûn jê dibarî
Ji ber eblqêt xumarî Wekî
ava di carî
Bê wext û bê macal e

-2-

Gerden şûşa nebatê
Lêvê şerbeta heyatê
Ji hisna bit û welatî
Bi min cahî helal e

-3-

Methê di nazenînan
Ûsefê di xûnşîrînan
Wekî dewr û yasînan
Ez her dikim emale

-4-

Baxê ku sed bihar lê
Bilbilê lale zar lê Ku
sed gulê bixar lê
Bilbilî nalanal e

-5-

Ji Hindê bînin taracî
Ji mermerî bînin xeracî
Ji Romê bistînin bac e
Ji bo xemla şepal e

-6-

Dêma xalên di hûr
lê E'nya zilfêt stûr lê
Rû nîva gûhê tûr lê
Mehbûbe, bê mîsal e

-7-

Hisna te ya hebîb e
Dilekimin jê xerîb e
E'lî tu bikî nesîb e
Dest bidit wesal e

-8-

Hisna te ya dilxah e
Dilber lebsî siyah e
Bi min kaa'be Ella
Tewaf dikim her sal e

-9-

Ji Hind bînin talanî
Bikin kilê sibhanî Ji
bo çavê şehilanî
Dema bêtin sersal e

-10-

Çend bibêje Elî sadiq
Ji esrar û di qayiq
Ji wan wesfê di layiq
Ji hisna ya delal e

## Wateyên peyvan:

**Eblqêt:** belek, reş û spî

**Xumar:** serxweş, mest

**Macal:** derfet, delîv

**Nebat:** Şînatî

**Hisn:** nazdarî, xweşikî

**Cahî:** Kesê navdar

**Meth:** Pesin

**Nazenîn:** Ter û nazik

**Ûsefê:** Pesin

**Emal:** Hêvî

**Tarac:** Bazirganî

**Xerac:** bac, bêş

**Zilfe:** Bisk

**Mehbûb:** Hezkirî

**Mîsal:** Mînak

**Hebîb:** Evîndar

**Wesal:** Gihandin

**Siyah:** Reş

**Sibhan:** Xwedayî, xwezayî

## Pirsên Nirxandinê:

9. Malika çaran bixwîne û bi çi rêbazî hatiye nivîsandin, şîrove bike.

10. Di kîjan serdemê de helbest bi zaravayê kurmancî, hatiye nivisandin? Lêkolîn bike.

# Agahiyên Wêjeyî

## Cureyên pîvanê

❖ **Pîvana Kiteyê:** Ji pîvana ku xwe dispêre wekheviya kiteyên rêzikên helbestê re, pîvana kiteyê tê gotin.

Di pîvana kiteyan de, dibe ku rêzik bibe du yan sê parçe; ji cihê ku hatiye veqetandin ê rêzikê re **"rawestek"** tê gotin. Rawestek, peyvê venaqetîne.

Du taybetiyên bingehîn ên pîvana kiteyê hene; **jimara kiteyan** û **rawestek**.

**a- Jimara kiteyan:** Helbesta ku bi pîvana kiteyê hatiye nivîsîn, hejmara kiteyên rêzikên wê, bi qasî hev in.

**b- Rawestek:** Di helbestên ku bi pîvana kiteyan hatine nivîsîn de, bi armanca zêdekirina ahengê, rêz di hin cihên diyar de tê veqetandin. Ji cihên ku van ji hev du vediqetîne re **"rawestek"** tê gotin.

## Mînaka pîvan û rawestekê:

### Keça Kurd

Keçê rabe serî hilde / divê çaxê weha nabî

Binêr jin çûne ezmana / heta kengî di xewda bî?

Dixwazim zû bixwênî xweş / ji ser rû rakî çara reş

Tu gavan pêş de bavêjî / wekî Andêra û Benda bî


Çine ev çarik û pêçî / di rexta de xwe rapêçî

Bi destê te kelaşînkof / bera zana û xwenda bî

**(Cegerxwîn)**

Wane 3

# ŞÊX ADÎ



Şêx Adî, şêxekî zana, parêzger, xwedanas û dilsoj bû. Şêx Adî, di sala 1075'an de li herêma Behdînan ji dayîk bûye. Navê wî yê rast, Adî ye û navê bavê wî Mustefa ye.

Adî, nasnavê wî ye. Li herêma Colemêrgê û bajarê Mûsilê desthilatdarî saz kiriye. Şêx Adî, hem rêberê gel, hem jî wêjevan bû. Gelek helbest û pendên Şêx Adî hene.

Du berhemên Şêx Adî yên bi kurdî hene: Pirtûka yekem, Cilwe ye û ya duyem jî Mishefa Reş e.

Şêx Adî, weke pêxemberê êzîdiyan tê pejirandin. Hozanî û nêrîna wî, weke ya Zerdeşt e. Mishefa Reş a ku bi kurdî hatiye nivîsîn, ji bo êzîdiyan pirtûkeke pîroz e. Hemû lavayên (duayên) wê bi kurdî ne. Mishefa Reş, piştî pirtûka Ibin Wehşiye kevntirîn pexşana kurdî ye.

Şêx Adî, li herêma Şengal û Şêxan serdestiyeke di aliyê bawermendiya olî de çêkiriye û di nava kurdên êzîdî de bûye sembola yekîtî, zanabûn û hevkariyê. Şêx Adî, di sala 1162'yan de koça dawî kiriye. Li herêma Şêxan, li Geliyê Laleşê hatiye veşartin. Gora Şêx Adî, perestgeheke ku ji aliyê hemû kurdên bawermend ên êzîdî ve tê serdankirin.

## Helbesteke Şêx Adî

**Heqo tu padîşah î**
**Xwedanê mêhr û mah î**

**Rezaqê cin û îns î**
**Xwedayê alema quds î**

**Mizgîniyê bibin Kurdistanê**
**Belav ken deftera îmanê**

**Wate:** Ey Xwedayê mezin! Tu Xwedan û afirînerê roj û heyvê yî. Rizqdayê cin û mirovan î. Xwedayê cîhana pîroz î. Mizgîniyê bibin ji bo gelê Kurdistanê. Belav bikin deftera îmanê.

## Wateyên peyvan:

**Heqo:** Xweda

**Mehr:** roj

**Mah:**heyv

**Însî:** Mirov

## Pirsên Nirxandinê:

7. Çend berhemên Şêx Adî hene û bi kîjan zimanî nivîsîne?

8. Şêx Adî, ji kîjan aliyan ve bandor li civakê kiriye?

9. Li ser ezdîtiyê (êzîdiyan) çi dizanin?

## Agahiyên Wêjeyî

### Pîvana Rêzbendê:

Pîvaneke ku li ser bingehê dirêjbûn û kurtbûn, vekirin û girtina kiteyan, çêdibe. Di pîvana rêzbendê de kiteyên rêzikan ên beramberî hev, wekhev in; heger kiteya destpêkê ya rêzika yekem dirêj be, divê kiteya yekem a rêzika duyem jî dirêj be.

**1- Kiteyên vekirî:** Yên ku bi tîpa dengdêr bi dawî dibin. Ew jî du beş in:

- **g. Kiteya vekirî ya dengdirêj:** Bi tîpa dengdêr a dengdirêj bi dawî dibe.
- **h. Kiteya vekirî ya dengkurt:** Bi tîpa dengdêr a dengkurt bi dawî dibe.

**Mînak:**

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| <u>Ger</u> | <u>dê</u> | <u>he</u> | <u>bû</u> | <u>ya</u> | <u>me</u> | <u>ser</u> | <u>fi</u> | <u>ra</u> | <u>zek</u> |
| Girtî | V.dirêj | v.k | v.d | v.d | v.k | g | v.k | v.d | g |

Sahib keremek suxen newazek

**Têbînî:** Di pîvana Rêzbendê de:

- ❖ Ger kite bi tîpa dengdêr a dengkurt bi dawî bibe; vekirî ye û xal (**.**) tê bikaranîn. Ger kite bi tîpa dengdar bi dawî bibe; girtî ye û xêzik (**-**) tê bikaranîn. Kiteya dawî, her dem girtî tê pejirandin û xêzik tê bikaranîn.
- ❖ Ger kiteya vekirî, bi tîpa dengdêra dengdirêj bi dawî bibe, bi xêzikê (-) tê nîşankirin.

Mînaka Helbestê:

**Her mêrekî wan bi bezlê Hatem**

\-  -.-  -  .  -  -  -  -

**Her mêrekî wan bi rezmê Rustem**

\-  -.  -  -  .  -  -  -  -

***Vê helbesta li jêr li gorî pîvana rêzbendê dahûrînin:**

**Lewra ku dema ji xeybê fik bû**

**…………………………………......**

**Tarîx hezar û şêst û yek bû**

**..................................................**

## Agahiyên giştî

Piştî pejirandina ola islamê, rewşenbîrên kurd ku bi zimanê erebî dixwînin û bandor dibin, êdî gelek ji wan berhemên xwe bi erebî dinivîsin. Di wê demê de zimanekî ku di bin bandora erebî de ye, derdikeve holê.

Di heman demê de rewşenbîrên ku berhemên xwe bi kurdî jî dinivîsin, di bin bandora wêjeya erebî de dimînin. Ji ber ku rewşenbîrên kurd ên ku xwe nas dikirin jî, di bin bandora islamê de bûn. Li aliyekî bandora ola islamê û zimanê erebî, li aliyê din desthilatdarî, êrîşên Osmanî û Sefewiyan ên li ser Kurdistanê pêk dihatin, bandoreke mezin li wêjevanên kurd kir.

Ew di nava van her sê hêzan de dijiyan û diketin bin bandora wan. Di encamê de, neçar dibûn ku fêrî her sê zimanên biyanî bibin. Ev, bi awayekî diyar di helbesta jêr de tê dîtin ku bi çar zimanan hatiye hûnandin.

**Erebî**

Fate umrî fî hewake ya hebîbî kule hal

**Farisî**

Ahû nalim him demim şid der fereqet mah û sal

**Osmanî**

Ger benîm kanim dîlersen çoqden olmuşdîr halal

**Kurdî**

Dîn ebter bûm ji eşqê min nema eql û kemal

**Ehmedê Xanî**

Weke ku di helbesta li jor de jî diyar bûye, pêvajoyeke di kesayet, têgeh û jiyana civakî de, dest pê dikir. Lê kurdan toreya xwe ya kevn jî diparastin. Di pêvajoyeke wiha de her ku diçe, ev bandor li ser kurdan zêde dibû.

Weke mînak, wêjevanên kurd ên beriya hatina islamê, ji yên piştî hatina wê, kurdiya wan zelaltir e. Bi vî awayî, bi belavbûna islamê ya li Kurdistanê her ku diçe pişaftin, zêdetir dibe.

Lê wêjevanên kurd ên ku wêjeya xwe bi awayê devokî domandine, derbasî nava hêzên dagirker nebûne û di dibistanên wan de nexwendine; zêde ji vê pişaftinê bandor nebûne. Ne bi zanabûn be jî bi saya erdnîgariya Kurdistanê û berhemdariya wê, ziman û wêjeya xwe parastine.

**Mînak:**

Ay lê weso lê lê lê wesîlayê way way

Te por sorê lê lê lê hine dayê way way

Teşî rêsê lê lê lê çû serayê way way

Mala weso lê lê lê mala wêran way way

**Gelêrî**

## Pirsên Nirxandinê:

5. Ji bo çi rewşenbîrên kurd neçar dibûn ku fêrî her sê zimanên biyanî, bibin?

6. Çima wêjevanên kurd ên beriya hatina islamê, ji yên piştî hatina wê, kurdiya wan zelaltir bû?

Wane 4

# NÊRGIZ XANIMA ŞAREZÛRÎ



Navê vê helbestvana jin, Nêrgiz e. Keça Mela Şukrulahê Şarezûrî ye. Di sala 1313'an de, li Şarezûrê ji dayîk bûye û li wir mezin bûye. Mela Şukrulah ku yek ji helbestvan, zana û navdarên wê serdemê bû, keça xwe fêrî xwendin û zanista islamê dike. Ji ber ku Nêrgiz Xanim jî jê re amade bû, agahiyên zanistî ji ber dike û di demeke kurt de xwe li pêş dixe û nav û dengê xwe li welat belav dike. Ew, dest bi ristina helbestan dike.

Nêrgiz Xanim, di temenê xwe yê 13 salî de bi Abidê Caf re şû dibe. Piştre hevjînê wê diçe ser baweriya Yarî û rêbazên wê dipejirîne. Li pey hevjînê xwe, ew jî diçe ser wê baweriyê û vê rêbazê dipejirîne. Nêrgiz Xanim, bi hevjînê xwe re diçe gundê Şêxan û temenê xwe yê mayî li wir derbas dike. Heta diçe ber dilovaniya xwedayê xwe, wê li wir vedişêrin û gora wê ya pîroz li wir dimîne.

Ji Nêrgiz Xanimê hin helbestên bi zaravaya kurmanciya jêrîn (soranî) li cih mane. Ew helbest di pirtûka Dewreyê Abîd de hatine tomarkirin. Helbestên wê, gelekî dilêş, şîrîn û balkêş in. Ji bilî helbestvaniyê, ew di lêdana tembûrê de jî pispor bû.

## Helbesta Nêrgz Xanim

-1-

Seqî li cem bade deda
Dersî rêgey çade deda

Mêrdan hemû le dewr paş
Pêman dekem gişt temaşa

Qewmê be min neybî bawer
Neyêt bû cem yarî yawer

Her ke bo yar xoy nekujê
Xwînê le rêy yar nerijê

Her ke lem dîn yeqîn neka
Be dil le cem amîn neka

-2-

Her ke negrê qewlê dirust
Bê dîn ew e wek putperest

Her ke şikî bibê be dil
Bawer neka be Şay Adil

Her ke le cem negirê erkan
Berast negirê dînî sultan

Her ke be yar bida azar
Kirdey naçe bo naw tomar

Nergiz her ke bibê kîn e
Bêşik gumra û hem bê dîn e

## Wate:

Meyger li camexane û di nava civata xwedanasan de bade û peyaleyên şerabê didin me. Wane û dersa baweriyê me, hînî me dikin. Hemû mêr li dora paşa kom dibûn, li hev diciviyan û li me guhdar dikirin. Gelekî ku bawerî wî bi me tune be, nayê dîwana me.

Ji bo yar nekuje, xwîna xwe di rêya wê de nerijîne, bawerî bi rêbaza me tune be, bi dil û can nebêje amîn; duristkar û rastbêj

nebe, wê çaxê ew weke pûtperestekî bêbawer e. Her kesê ku di dilê wî de guman hebe, wê baweriya wî/ê bi Xweda tune be, rêz û rêçikên gel nas neke. Her wiha wê dînê Xwedayê mafdar, heq nizanibe û yarê bê vehes bike û wê demê karên wî li lênûsekê heq nayê nivîsîn.

Ey Nêrgiz! her kesê ku kîn di dilê wî de be, bê guman ji rê derketî û bêdîn e.

## Pirsên Nirxandinê

7. Nêrgiz Xanim, kengî û li ku derê ji dayîk bûye?

8. Nêrgiz Xanim, helbestên xwe bi kîjan zaravayî nivisîne?

9. Rola wêjevanên jin, di dema me ya îro de hûn çawa dibînin?

# Agahiyên Wêjeyî

## Pênaseya rêzbendê:

Rêzbend, wekheviya dengên peyvên ku wateya wan ne wekhev in di dawiya helbestan de **"rêzbend (qafiye)"** tê gotin.

## Taybetiyên rêzbendê:

- Di her rêzikê de rawestîneke ahengî, pêk tîne.
- Rêzbend, dibe sedem ku helbest bi awayekî asayî di bîra mirovan de bimîne.
- Di aliyê wateyê de, rêzikên ku nebalkêş in, bi hev ve dike.
- Ji bo peydakirina hizirên nû, dibe alîkar.
- Gotinên xweş, ji helbestê re peyda dike.

## Mînak li ser rêzbendê:

Silavên min li Laleş kin

Li bajarên min î xweş kin

Pîroz e av û xaka te

Çira çavan li min geş kin

(Fîxan Hîmo)

# REALÎZM

Realîzm, di sedsala 19'an de derketiye holê. Realîzm, tevgereke wêjeyî ya bi rastiyê ve girêdayî ye; yan jî tê wateya rastiyê. Realîzm, dixwaze nivîskarê wê, jiyanê her weke heye, bigire dest û guhertinê li gel wê çêneke. Li gorî realîzmê, divê nivîskar rast be û li ser hîmê rastiyê tev bigere. Ne ku li ser aşopan be. Balzac (Balzak), Gustave (Gustêv) Flaubert (filobêrt) û Stendhal; weke nivîskarên navdar ên pêşeng û parêzvanên tevgera realîzmê ne.

## Rêgezên realîzmê:

**1-** Girîngiyê didin belge û çavkaniyan.

**2-** Di jiyana rojane de, bûyerên rast çêbûne û mirovên di wan bûyeran de cih girtine, weke heye radigihînin.

**3-** Wênekirina hawîrdorê bi hemû tiştên wê yên biçûk, weke pesin, cil, deng û reng.

**4-** Nivîskar, nêrînên xwe yên keseyatî vedişêre. Bûyer û lehengên bûyerê, bi awayekî bêalî didin têgihandin.

**5-** Di têgihandina bûyeran de têkîliyên ku bûne sedem û encaman, bingeh digirin.

**6-** Li ser aliyên neyînî yên weke; vaca (mentq) xerab, stemkarî û kedxwariyê, radiweste.

## Pirsên Nirxandinê

1- Realîzm, kengî derketiye holê?

2- Pêşengên realîzmê, kî ne?

3- Rêgezên realîzmê, çi ne?

## Belavkirina Waneyan li ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Wêje çi ye | Girîngiya wêjeyê |
| Cotmeh | Ziman û wêje | Mijar û şew-eyên wêjeyê | Dîroka wêjeya cîhanî | Dîroka wêjeya kurdî |
| Mijdar | Wjeya kurdî ya devokî | Qonaxên wêjeya kurdî | Çîrok , Efsane | Destan , Helbest |
| Berfanbar | Pêndên pêşi-yan , Mamik | Qonaxa wêjeya kurdî ya dema Avestayê | Pêşengê wêjeya kurdî yê dema Avestayê | Pîr Şalyar |
| Rêbendan | **Lêveger** | **Lêveger** | **Bêhinvedan** | **Bêhinve-dan** |
| Reşemeh | Behlûlê Mahî | Baba Recebê Loristanî | Lîza Xanim , Ebdulse-medê Babek | Rihan Xa-nim |
| Avdar | Rêbazên wêjeyî (Klasîzm) | Baba Tahirê Hemedanî | Dayê Xezana Serketî | Pêvajoya destpêka hatina is-lamê |
| Cotan | Elî Herîrî | Şêx Adî | Nêrgiz Xanim | Rêbazên wêjeyî (Realîzm) |
| Gulan | **Lêveger** | **Lêveger** | | |

# WÊJEYA KURDÎ AMADEYÎ

# 2

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Wêjeya Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**

**Komîteya Fotoşopê**

**Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

**BEŞA YEKEM ........ 7**

RISTA WÊJEYÊ ........ 8

TÊKILIYA DI NAVBERA DÎROKA WÊJEYÊ Û DÎROKA GIŞTÎ DE ........ 10

WÊJE Û JIYANA CIVAKÎ ........ 12

DIBISTANÊN WÊJEYÎ ........ 15

WÊJEYA CIVAKÎ ........ 18

SÛDWERGIRTINA JI WÊJEYA CIVAKÎ ........ 21

CUREYÊN ÇÎROKA KURDÎ ........ 24

**BEŞA DUYEM ........ 29**

MELAYÊ CIZÎRÎ ........ 33

FEQIYÊ TEYRAN ........ 37

MELAYÊ BATEYÎ ........ 44

BEKIR BEGÊ ERZÎ ........ 49

EHMEDÊ XANÎ ........ 53

MIRADXANÊ BAZÎDÎ ........ 60

ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ ........ 64

SELÎM SILÊMAN ........ 68

ŞÊX NÛREDÎNÊ BIRÎFKANÎ ........ 71

PERTEW BEGÊ HEKARÎ ........ 74

SIYAHPÛŞ ........ 76

**BEŞA SÊYEM ........ 81**

CELALE XANIMA LORISTANÎ ........ 82

FATIME LOREYA GORANÎ ........ 84

XATU MEY ZERD ........ 86

YAY HEBÎBEYA ŞAREZÛRÎ ........ 89

**BEŞA ÇAREM ........ 93**

MELAYÊ MENSÛRÊ GIRGAŞÎ ........ 94

NALÎ ŞAREZÛRÎ ........ 97

TÊKILIYA DI NAVBERA DIBISTANÊN WÊJEYÎ Û HIZRÊ DE 103

HIN JI DESTPÊKÊN WÊJEYA KURDÎ.........................................108

**BEŞA PÊNCEM ....................................................................115**

SE'DÎ ŞÎRAZÎ.........................................................................116

MENSÛRÊ HELACÎ....................................................................119

CELALUDÎN ELRÛMÎ ..................................................................123

# BEŞA YEKEM

- Rista wêjeyê
- Têkiliya di navbera dîroka wêjeyê û dîroka giştî de
- Wêje û jiyana civakî
- Dibistanên wêjeyî
- Wêjeya civakî
- Sûdwergirtina ji wêjeya civakî
- Cureyên çîrokên kurdî

Wane 1

# RISTA WÊJEYÊ



Wêje, xwedîderketina li xwezayê ye.

Wêje, ne tenê çîrok e yan jî helbesteke ku ji bo kêfxweşiyê tê xwendin, lê ew roleke pir girîng di jiyana mirov de û bi taybet di jiyana civakî de, dilîze. Her wiha ne tenê neynika civakê ya ku diçirisîne ye; ew derbirîna hoşên mirov ên taybet dike, bûyerên civakî tîne ziman û çareyan jî ji van pisgirêkan re, datîne.

Xweşikdîtin û çêjstandina ji gula ku di nava stiriyan de hatiye afirandin, encama vê rêkûpêkiya ku di gerdûnê de ye. Ev jî têgeheke wêjeyî ye. Ji bo wêjeyê, çand pêwîst e. Ji bo ku her tevgera mirov karibe bi erka xwe rabe, pêwîstî bi oksîjen, tîmar û xwînê heye û ev jî di bingeha rayan de ji hev û du re tên rêkirin. Wêje jî di nava civakê de ristek bi vî awayî dilîze.

Pêwîst e mirov jî ji têkiliya wêje bi koma mirovan re, hembêzdar be, lewra pêwîstiya mirovan, bi vejînkirina wêjeyê heye. Ji ber vê yekê, rista wêjeyê di civakê de risteke sereke ye. Civakên ku di nava wan de birêkûpêkiya çand û wêjeyê tune be, ew civak jihevketî ye û bi êş û azara tenêtiyê ve, rû bi rû dimîne; yekbûn û yekîtiya wê, wêran dibe. Eger ew civak li wêjeya xwe xwedî dernekeve, birêkûpêkiyê di nivîsên xwe de bi kar neyne,

dê ev civak wêjeya xwe ji dest bide û bi tunekirinê re, rû bi rû bimîne.

## Pirsên Nirxandinê

- Di civakê de çima rista wêjeyê, risteke sereke ye?
- Civaka kurd bi rêya çi, wê bikaribe wêjeya xwe biparêze?
- Civaka ku bê wêje bimîne, wê çi bi serê wê de bê?

Wane 2

# TÊKILIYA DI NAVBERA DÎROKA WÊJEYÊ Û DÎROKA GIŞTÎ DE





Qadên zanistî yên wekî wêje, felsefe, dîrok û civaknasiyê, bi beşên xwe yên taybet, her yek displîneke xweser e. Heta destpêka sedsala **19**`an jî beşa dîrokê wekî şêweyeke wêjeyê dihat naskirin, heta ku dîroknasan ji xwe re rê û rêbazên zanistî bi kar anîne û cudahiya di navbera wêje û dîrokê de, bi bingehên zanistî ava kirin. Di avakirina vê cudahiya (xweseriya) di navbera van her du displînan de, wêje bêhtir li ser aliyê hestiyarî, ramyarî, feraset û derbirîna felsefîk, radiweste. Dîrok jî serboriyên mirovahiyê yên demên cuda, vedibêje. Ev vegotin jî wekî qada pisporiya van her du displînan e. Lê têkiliya van her du displînan her dem zindî ye, ji ber ku ev her du displîn hev û du temam dikin. Lewra jî em îro berhemên wêjeyî bi hêsanî bi pênaseyeke ku ew berhem belgeyên zindî yên dîrokî û bîra dîrokî ya mirovan/mirovahiyê ne, pênase dikin. Di gelek waran de, berhemên wêjeyî wekî belegeyan ji dîrokê re dibin stûn û çespandinên xurt.

Ji beşa zanistê ya ku bi belgeyan pêşketina civakîbûna mirovahiyê, çand û aboriya wê rave dike re, **"dîrok"** tê gotin. Hemû tiştên ku têkildarî mirovan in, di nava dîrokê de, cih digirin. Dîroka wêjeyê, beşeke ji dîroka giştî ye. Bi pênaseyeke xweştir, beşeke ji dîroka mirovahiyê ye. Pêşketina hizir, raman

û hestên civakê yên ku bi sedsalan jiyaye, nîşan dide û hemû berhemên hizirînê, lêkolîn dike.

Di navbera mijara dîroka giştî û dîroka wêjeyê de, hin cudahiyên girîng hene:

**1-** Mijara ku dîrok pê têkildar dibe, dema borî ye. Di lêkolînan de, xwe dispêre belgeyên dîrokî, jêma û şûnwarên ku civakên mirovahiyê li paş xwe hiştne.
Lê mijara dîroka wêjeyê, mirov û berhemên wê yên hizirî û hestyarî ne.

**2-** Raboriya ku dîrokzan li ser dixebite, dema wê sergihayî ye û bûye malê dîrokê. Raboriya mijara wêjeyê jî bi berhemên hunerî ve hebûna xwe didomîne.

**3-** Berhemên wêjeyî, ji lêkolîna dîroka giştî re, dibin jêder û çavkanî.

**4-** Dîrokzan neçar e, nêrînên kesan ên ku di berheman de lêkolîn kirine bide aliyekî, lê dîroka wêjeyê, nêrîna kesan dinirxîne û dixwaze bi rêya berhemên wan, kesên nivîskar bide naskirin.

**5-** Têgeha dîrokzan û dîroka wêjeyê, li hemberî çavkaniyên ku tên lêkolînkirin, cuda ye. Çavkanî, dibe ku ji bo dîrokzan, yekalî hatibe nivîsandin û xapînok be, lê berhemên wêjeyî xwe weke rastiya xwe datînin holê.

Têkiliya dîroka wêje bi dîroka giştî re bi çi awayî be, bila be, ji ber ku hêmanên zanist û hunerê di nava xwe de dihewînin; dibin sedema berdewamiya vê têkiliyê. Ji ber vê jî wêje, xweşikbûn û rengdayîneke dide dîrokê, dîrok jî mijarekê ku mirov bi aliyê xwe ve bikêşe, dide wêjeyê û bandorê li wan dike.


## Lêkolîn:

Têkiliya wêje bi dîrokê re, lêkolîn bike.

Çi têkiliya wêje û ziman bi hev re heye? Binirxîne.

Wane 3

# WÊJE Û JIYANA CIVAKÎ



Wêjeya ku ji pêdiviya rastiya dîrokî û civakî derdikeve, wêjeya herî binirx û pîroz e. Wêjeya ku rastiya civakê nede diyarkirin, daxwaz û xwestekên gel nede der , pirsgirêk û nakokiyên ku di hindirê civakê de hene, diyar neke û çarenûsa wê jî daneyne, wê demê tu nirx û wateya wê wêjeyê tune ye. Wêjeya rast, ew wêjeya ku bi rastiya zemîna ku jê derketiye, bûye yek.

Hest û ramanên endamên wê civakê pê hişyar dibin; ji ber gelek sedeman nikarin bînin ziman, wê demê wêje bi hemû rê û rêbazên xwe yên rengereng ve, wan tiştan vedibêje, aşkere dike û çareya wê jî datînê holê. Her wiha dibe zimanê dil û mejiyê wî gelî. Jixwe, hin berhemên wêjeyî jî hene ku ji bo hemû mirovên di hin pirsgirêkan de hevbeş in û bêyî ku li nijad, ol, welat û zimanê wan binêre wan hembêz dike, ev dikeve beşa wêjeya gerdûnî. Di vê xalê de Maksîm Gorkî (Maxim Gorky) dibêje: "Wêje, çavê gerdûnê yê her tiştî dibîne û diçe heta kûrahiya derûniya mirovan e." Lê divê bi behaneya gerdûnîbûnê, ji rastiya civaka xwe jî dûr nekeve. Ji ber ku pêwîst e wêjevan, bi wêjeya xwe ve ji tevahiya cîhanê re bibe lêgerê çand, huner, ziman, sinc, rewş, daxwaz û rastiya gelê xwe.

Her dem wêje, bi hemû awa û şêwazên xwe yên cur bi cur amadekirina zemîna şoreşa hişmendî û civakî çêdike. Şoreşa ku weke veciniqînekê bê amadekarî rabe, hêzên giyanî jê re piştevaniyê nekin, wê demê ew şoreş li ser bingeheke sist û lewaz tê avakirin. Ev şoreş dê tu carî nikarebe xwe bixe nava hindirê mejî û giyanê civakê û kesan. Ev jî tê wateya ku şoreşeke bê wêje û huner, bêgiyan û mirî ye. Di vê xalê de Çernîsevskî (Nîkolay Gavrîlovîç) Nikolay Gavrilovich Chernyshevsky wiha dibêje: "Gelê bêwêje, kor û nezan e. Her gel, bi qasî hebûna wêjeya xwe, zana û rewşenbîr e". Ji ber vê yekê, pêwîst e şoreş û raperînên ku pêşvebirina civakan ji xwe re dikin armanc, nirx û giraniyekê bidin wêjeyê.

Kesê ku dixwaze mejî, hest, pîvan û ramanan di nava gel de biçîne û geş bike, divê serî li hêza wêjeyê bide. Hêzên fermanrewa (emperyalîst), hêza enerjiya mezin a wêjeyê dîtine. Ji ber vê yekê, xwestine wêjeyê ji naveroka wê derxin, ji rastiya wê dûr bikin û di bin navê "huner, ji bo hunerê ye" de, ev kiryarên bênirx bi pêş xistin. Ev mejiyê hêzên desthilatd0ar e, naxwazin wêje bi rista hişyarkirina civakê bilîze. Di vê xalê de Dostoyevsky (Dostovîskî) dibêje: "Yek ji erka wêjeyê, şîretkirina mirovahiyê ye." Wêjeya ku ji kûrahiya dil û hindirê gel dernekeve, tu nirx û wateya wê tune ye. Wêje, ji bo xemilandin û xweşikirina jiyanê, risteke herî bedew û diyar dilîze. Wêje, di şoreşa mejî de risteke herî mezin û bibandor dilîze. Di vê xalê de **Ebdullah Ocalan** di pirtûka xwe ya bi navê

**"Çawa Bijîn"** de dibêje; **"Huner û wêje, du amûrên ku bêyî wan civak nabe"**. Ji ber ku rawestina civakî ya li hemberî xwezayê, mirov nikare tenê bi rêya zanist û ramyariyê rave bike. Li ba mirovan têrnekirina giyanî û bi tenê têrkirina daringî, dibe sedem ku mirov li şêweyên têrkirina jiyana giyanî bigere. Wêje dibe sedem ku mirov li hemberî zoriyên jiyanê henaseyê bistîne.

Wêjeya ku şoreşê di mejî û giyana civakê de diafirîne, jê re dibêjin wêjeya şoreşê. Çawa ku şoreş ji bo hilweşandina

zagonên hişk û avakirina zagonên nû ye, ji erkên wêjeya şoreşê jî hilweşandina mejî û ramanên hişk e, avakirin û pêşvebirina raman û giyana nû ye.

## Pirsên Nirxandinê

**1-** Maksîm Gorkî, derbarê wêjeya gerdûnî de çi dibêje?

**2-** Di navbera wêjeya ku xwe dispêre rastiya civakê û ya deshilatdaran de, çi cudahî heye?

**3-** Li gorî te, wêje çawa civakê dixemilîne?

**4-** Erk û rista wêjeyê, lêkolîn bike?

Wane 4

# DIBISTANÊN WÊJEYÎ

## ROMANTÎZM (ROMANTICISM)

Tevgereke hunerî û wêjeyî ye. Di dawiya sedsala **18**`an û destpêka sedsala **19**`an de, li Fransayê derket holê. Ew bi awayekî bilez li hin herêmên Ewrûpayê (Birîtaniya, Almanya û Îspanyayê) belav bû. Wekî reaksyonekê li dijî şoreşa pîşesaziyê derket. Bandoreke wê ya mezin li ser perwerde, dîrok û zanistên xwezayî (jîngeh) heye. Her wiha bandoreke wê ya mezin û giran li ramyariyê jî heye. Girêdaneke wê ya xurt bi radîkalîzm û lîberalîzmê re heye û bandoreke erênî li hişyarkirina hestê netewî dike.

Romantîzm tekez dike ku hêza hestyarî, aşopî û hestyarî jêdera bingehîn a afirîneriya estetîkê ye. Di avakirina hişmendiya tekane de alîkar bû, da ku hizrê rexneyî bi pêş bikeve. Ji sînoran bêhtir, azadiyê diparêze. Pêşketina wê ya herî pir di serdema Victor Hugo (Vîktor Hogo) de bû. Bandorê li hemû cureyên wêjeyê (helbest, roman, çîrok…) dike. Di romantîzmê de rexne û rexnegirî pir bi pêş dikevin.

### ❖ Rêgezên romantîzmê:

- Bingeha romantîzmê li ser hest û aşopan ava dibe.
- Mijarên xwe ji dîrok, çanda gel û wêjeya hemdem digre.
- Giyanê mirovan derman dike, ji rewşên belav, bêbawer û tevlihev sûdê werdigire.
- Ne wekî klasîzmê yekalî ye, tevahî aliyan digire dest.
- Bûyerên bixwîn û kirêt nîşan dide.
- Girîngiyê dide bikaranîna jiyana gel û herêmê. Ne kesê bijarte, lê kesên ji rêzê ku di nava civakê de dijîn, hildibijêre.
- Hunermendên vê herikînê, civakî ne û wekheviyê diparêzin.

## ❖ Romantîzm di wêjeya kurdî de:

Di qonaxa yekem de, li ser rêçika bizava ronakger a romantîk, bêtir bi rûyê xwe yê ramyarî û civakî derket pêş û helbestvanên kurd ên mîna Hecî Qadirê Koyî, Evdulrehîmê Hekarî, Pîremêrd û Cegerxwîn wekî têkoşerên ramyarî û civakî hunerên xwe kirin bin rajeya gelê kurd. Ji ber vê yekê helbestvanên kurd ên romantîk, ji du aliyan xwe bi rê ve dibirin:

- Ji aliyekî gelê kurd li dij dijminan han didan û doza dewleta netewa kurd dikirin.

- Ji aliyê din ve jî dijîtiya desthilatdariya pergalên kurd ên mîna şêx, beg û axayan dikirin. Wan dixwestin guhertinên bingehîn di nava van pergalan de pêk bînin û berê gelê kurd bidin cîhana nûjen.

Di wêjeya kurdî de, yekem helbestvanê romantîk, Hecî Qadirê Koyî ye û piştî wî Cegerxwîn e. Her çi qasî helbestê, rêçika kilasîk be jî lê di naveroka wê de guhertinên giranbuha pêk anîne.

| | |
|---|---|
| Heta ku li hev neyên qebîleyên kurdan<br><br>Her wê wiha bimînin xerabemal<br><br>Hemû cîhan mezin û biçûk<br><br>Xemiliye bi milkekî wekî bûk<br><br>***Hecî Qadirê Koyî*** | Ola me xortan miletperestî<br>Ji me dûr dixî xwarî û sistê<br><br>***Cegerxwîn***<br><br>Keçê rabe serî hilde<br><br>Di vê çaxê wiha nabî<br><br>Binêr jin çûne ezmana<br><br>Heta kengî di xew da bî<br><br>***Cegerxwîn*** |

## Pirsên Nirxandinê


- Romantîzmê di nava civaka kurd de, çi guherîn çêkiriye?
- Di demên berê de, romantîzm di nava kurdan de hebû yan na? Rave bike.
- Cudahiya ku di navbera romantîzm û kilasîzmê de heye, lêkolîn bike?

## Mijar

Mijarekê li ser dengbêjiya di nava kurdan de binivîse û dibistana romantîzmê tê de diyar bike.

Wane 5

# WÊJEYA CIVAKÎ



Têkilya di navbera wêje û civakê de, heman têkilya ku di navbera wêjevan û civakê de ye. Wê di nava wêje û civakê de têkeliyeke xurt afirandiye. Bi taybet divê kesê/a wêjevan xwediyê zanebûn û hişyariyê be. Her wiha divê derbarê hemû tiştên ku li derdorê wî çêdibin, agahdar be.

Wêje, hunereke bedew e ku diyardeyekê ji diyardeyên jiyana civakî, diteyisîne. Rêbaza wê ya derbirîna van diyardeyan, **"peyva xweş û xemilandî"** ye. Ev pênase, rola peyvê û bandora wê ya xurt di derbirînê de, tekez dike. Li dû vê gotina xweş, xurt û bibandor, afrînereke/î hestiyar ku bandorê li hemû derûniya civakê dike, heye.

Roleke peyvê ya girîng û mezin di avakirina civakan de heye. Bi taybet dema ku ew civak di alozî û tengasiyan re derbas dibe. Wêje, helwesta xwe ji van pirsgirêkan diyar dike, li beramberî wan radiweste û çareyan pêşinyar dike. Ji ber vê yekê yê ku herî pir bandorê li civakê dike û pê bandor dibe ,**"wêjevan"**e. Ji ber ku hêza wî ya ku girêdanê di navbera dema niha û dema borî de çêdike, heye. Ev jî tê wateya ku wêjevan li gorî girêdana her du deman (borî-niha) kar dike û wêjeya xwe derdixe pêş, da ku bikariba rajeyê ji civakê re bike.

Di roja me ya îro de jî amûrên ragihandinê yên mîna: TV, radyo, internet û hwd, belavbûna çand û wêjeyê hêsan kirine, wêjeya gelan bi hev dane naskirin û têkilî di nava wan de çêkirine. Lê divê em bizanibin ku her gelek, xwediyê wêjeyeke taybet e. Di vir de, em têdigihêjin ku wêje bi pêşketina civakê re dibe alîkar, ev jî bi rêya xwe, nirxên civakî û çandî ji nifşên nû re radigihîne.

Divê em bizanibin ku li gorî dem, cih û alavên wê dema ku civak tê de dijî, wêje tev digere.

**Mînak**: Di dema ku li odeyan "dengbêjî" li pêş bû, teknolojiya ne li pêş bû, ev dibû sedem ku civak rasterast bi wêjeya xwe ve têkildar be. Ev jî li gorî mercên wê demê bû. Lê di dema niha de em dibînin ku çawa teknolojî li pêş ket, alav, dem û cih jî hatin guhertin. Ji ber ku her kes bi teknolojiyê re mijûl bû û tu girîngiya odeyan nema. Di encama vê de civak ji hev û du belav bû. Di vir de jî rola wêjeyê, ew e ku li çareyan bigere.

Wêje, hunereke xwediya nêzîkatiyên civakî ye û ji her cureyê ramanan ku di civakê de cih girtine, ji hizir û tevgerên mîna bawerî, tore, zagon, huner û hwd, re vekirî ye. Di navbera saziyên gel û yên ku wêjeyê lêkolîn dikin de, girêdaneke xurt heye.

Li gorî vê pênaseyê, wêje jiyanê rave dike. Dîroka wêjeyê jî di heman demê de pêşketina wê ya di dîrokê de lêkolîn dike û derdixe holê. Di wateyeke din de jî zanista civakî, ango jiyana mirovan lêkolîn dike. Bi vî awayî, dîroka wêjeyê; hemû amûrên jiyana civakî di hindirê xwe de digire. Ji aliyê din ve jî ramanên civakê tîmar dike û dîroka tevgera gel zindî dike. Dixwaze civakê bi zanistî rave bike. Ev rewş, diyar dike ku wêje, dîrok û zanist her tim bi hev re meşiyane.

## Pirsên Nirxandinê

- Di nava civakê de, wêje bi çi rengî li pêş dikeve?

- Çawa wêjeya kurdî ji wêjeyên din bandor bûye?

- Teknolojiyê çi bandor li wêje û civaka kurd kiriye? Rave bike.

## Lêkolîn

Li ser dengbêjiyê lêkolîn bike û çi bandora dengbêjan li ser civakê heye? Cudahiya di navbera dengbêjiya kevin û ya nû de diyar bike.

Wane 6

# SÛDWERGIRTINA JI WÊJEYA CIVAKÎ



**Wêje**, ji bo kesên ku bixwazin xwe nas bikin, reftarên xwe biguherin û ji derfetan sûdê werbigirin, çavkaniya rêberiyê ye. Wêje, weke rêbereke çavkaniyê, dikare ji wan re rajeyê bike. Wêje, girîngiyê dide afirîneriya bandorker. Zarok di xwendin û qadên hunerên dramatîk de, çi qas dewlemendiyê bi dest bixin, ew qas jî dikarin di qadên jiyana afirîner de jî serkeftî bin.

Dema ku mirov karibe bi awayekî zanistî nêzîkî gel û çanda wî bibe, wê demê ew ê karibe ji huner û wêjeya wî, gencîneyeke bêdawî pêk bîne. Rewşenbîrên civakekê, ji çanda gelê xwe sûdê werdigirin û berheman li gorî pêwîstî û vîna xwe derdixin holê.

Jixwe pêwîst e çanda rewşenbîran û ya gel bi hev re bibin yek. Ev mijar, pêwîst e ne tenê bi rêbazên wêjeyî û folklorî ve bên lêkolînkirin. Wêjeya civakê, giyanê civakê ye. Ger em bixwazin, wêjeya demên borî têbigihêjin û dîroka wê binivîsin, pêwîst e jiyana civakî ya wê demê, nêrîn û helwestên cur bi cur ên çêbûne, nas bikin. Govendeke gel, dikare bibe mijara berhemeke wêjeyî. Zanînên nivîskar ên li ser bawerî û jiyana civakên cur bi cur hebin û karibin ji wan sûdê werbigirin, divê ji bo vê yekê, bermayên wêjeyî yên di warê zanista civakî û gel de bên lêkolînkirin.

Gelek sûdên xwendina wêjeyê hene, çi civakî be û çi cîhanî be yan jî wêjeyeke netewî be. Hin ji wan jî ev in:

- Wêje girîngiya xwe ji pesindayîna jiyana rasteqînî digire, ev jî di rêya pêşkêşkirina nimûneyên li ser awayê hizirandinê ye.
- Çêjeke kor ji kesê/a xwendevan re pêşkêş dike, da ku wî/ê di aliyê zanistî, razberî û şênberî de, têr bike.
- Wêje, me li bûyerên dîrokî, destan, efsane, çîrok, roman û hwd, vedigerîne û serboriyên wê demê bi me dide nasîn.
- Berhemên kilasîk û nûjen dide naskirin û hevrû dike.
- Berhemên dîrokî yên ku wêjeya civakan bi civakên din dide nasîn, diyar dike û wan lêkolîn dike.
  Mînak: Berhemên Zerdeşt, Ehmedê Xanî…
- Civaka ku wêjeya xwe ji çand û sincê xwe girtibe, bi tu awayî wêjeya sexte napejirîne.
- Dema ku mirov berhemekê dixwîne, serboriyên jiyanê di rêya kesê/a wêjevan re nas dike û ev jî derfetê dide mirov da ku jiyanê di gelek aliyan de nas bike.
- Pirtûkên wêjeyî, dihêlin ku mirov derveyî ramanên xwe bihizire û dihêlin ku bi civakên din hestiyar bibe. Mirov fêrî gelek tiştan dike ku bi heyîna wan nizanî bû.
- Berhemên wêjeyî yên giranbuha derfetê didin mirov da ku karibe ramanên di wêjeya aşopî de tên gotin, binirxîne.

## Pirsên Nirxandinê

- Rola rewşenbîran di civakê de çi ye?

- Civaka ku dîroka xwe lêkolîn neke wê çawa wêjeya xwe nas bike?

- Civaka ku wêjeya xwe neparêze, tu çawa wê civakê dinirxînî? Bi awayekî berfireh şîrove bike.

Wane 7

# CUREYÊN ÇÎROKÊN KURDÎ



Wekî tê zanîn, kurd xwedîwêjeyeke devokî ya dewlemend in. Kurd bi dewlemendiya xwe ya çandî tên nasîn. Mixabin piraniya çanda kurdan ji aliyê gelên din ve tê talankirin û bikaranîn. Her wekî çîrokên kurdan jî heta Ewrûpayê belav bûne. Di van salên dawî de, berhevkirina çanda gelêrî ya kurdan hinekî bi pêş ketiye.

Hin çîrokên kurdan li ser bûyer û kesayetên beriya hezarên salan, diaxivin. Piştî belavbûna ola islamê li Kurdistanê di çîrokên kurdan de hin guhertinên cuda çêbûn; navên gelek lehengan hatiye guhertin.

Mînak: **"Mîrza"** bûye **"Mîrza Mihemed"**.

**Keçelokê Pîrê;** lehengekî çîrokên kurdan e, lê mixabin tirkan bi navê **"Keloglan"** xwedî lê derketine û piraniya çîrokên kurdî wergerandine zimanê tirkî.

Cureyên çîrokê li gorî naveroka wê:

1. Çîroka kevneşopî (kevinar):

Ev çîrok, malê gel e û tê de gelek aşopî û sawîr hene. Bi van çîrokan, civatan li ber agir, şevên zivistanê yên dirêj, derbas dikirin. Di van çîrokan de dabaşa afirîndeyên aşopî yên mîna: Dêwê Heftserî, Teyra Sîmir, Pîra Mirovxwer, Kalê Sêriyanê û

hwd, tê kirin. Mirovên wê demê bi vê cureya çîrokan, valahiyên zanistî yên di mejiyê xwe de, bi aşopî û sawîran dadigirtin, an jî weke pêdivîyeke hizirî didîtin. Armanca wan, derbaskirina şevbêrkan bû, ji wateyên di çîrokê de sûdê bigirin û pendan ji wan derxin.

- Efsane: Çîrokeke ku li ser karîsetekê, bûyerekê, yan jî serpêhatiyekê hatiye gotin. Berhemên wêjeya gelêrî ya gel e. Nifşek, radigihîne nifşekî din û bi awayekî devokî belav dibe. Li ser van her du hêmanan tê avakirin; awarte pîrozî ye. Tişta ku di efsaneyan de tê dabaşkirin, bê pîvan be jî taybetiyeke wê ya bawerkirinê heye. Sê bingehên efsaneyê hene: ol, aşopî û dîrok e. Lehengên efsaneyê, xwedîcihekî taybet in û di bîr û baweriyên gel de jî xwediyê cihekî pîroz in. Her wiha, efsane, di wêjeya kurdî de xwediya payeyeke bilind e. Di efsaneyê de, cih dîrok, ne diyar in.
- Destan: Çîrokên dirêj û hûnandî ne. Bêjerê wê yê destpêkê, ne diyar e û malê gel e. Bi awayekî devokî, ji nifşekî derbasî nifşekî din bûye û piştre derbasî nivîsînê bûye. Lehengên wê, xwediyê taybetiyên awarte ne. Dîroka ku di bûyera destanê de tê vegotin, nediyar e.
- Çîroka vacî (nêzîkî rastiyê): Ev jî, malê gel e û nivîskar, an jî bêjerê wê yê destpêkê, nediyar e. Bûyera wê nêzîkî rastiyê ye û jê tê bawerkirin, lê ne girîng e ku bi rastî jî çêbûbe. Armanca wê, perwerdekirin , gihandina şîret û pendan e.
- Çîroka lawiran (fabil): Ev jî malê gel e û nivîskar an jî bêjerê wê yê destpêkê, nediyar e. Her wiha lehengên wê lawir in, mijarên wê rexneyî ne û xwedîwateyeke kûr in. **Mînak:** Kêzxatûn, Kêzik û Morî…

- Çîroka olî: Çîrokên ku di pirtûkên pîroz ên asîmanî de dabaşa wan hatiye kirin. Em jî weke derhozeyekê (mucîzeyekê) dipejirînin.

**Mînak:** Çîroka Hz.Yûsiv, Hz. Mûsa...

- Çîroka aşopî ya kin: Ev çîrok, piştî hatina olan çêbûye, berhemeke hizirî ya civakî û xwedînirxekî olî ye. Mijarên wê, li derdora rêgezên olî digerin. Ji çîroka kevin a aşopî, kintir e. Hêjayî gotinê ye ku wêjeya kurdî di vê mijarê de xwediya taybetiyekê ye û gelekî dewlemend e.
  **Mînak:** Çîroka Xiltê Kor ê ku mirov bû û ji ber çavtengiya wî, xweda lê girt; ew tewan kir û veguherand lawirekî.

- Çîroka nûjen: Karekî wêjeyî ye, ji aliyê nivîskarekî ve hatiye nivîsandin. Bûyereke jiyanî û berbiçav digire dest, bi kûrahî û ji hemû aliyan ve wê rave dike, da ku bi girêdana dem û cihê wê û rêzkirineke ramanî ve nirxekî mirovahî bide wê. Nakokiyên heyberî û derûnî, dijwarî û aloziyên tê de diyar dike. Divê wê bi awayekî balkêş, bi armanceke diyar, bighê encamekê. Dibe ku lehengên wê, ji aşopên nivîskar bin.
  **Mînak:** Çîroka Reşoyê Darî ya Cegerxwîn ...

- Roman: Weke çîroka nûjen e, lê dirêj e. Jiyana lehengên xwe yên pir û bûyerên bi hev ve girêdayî, vedibêje.
  **Mînak:** Şivanê Kurd ya Erebê Şemo

10. Çîroka kin: Bi zimanekî wêjeyî yê herî xweş bûyerekê vedibêje. Carinan, bi tenê kêliyeke hestî û bi peyvên hindik wateyekê derdibire. Çîroka kin, gotinên wê hevgirtî ne û wateyên wê hembêzdar in. Zêde guh nade xemilandina peyvan. Ev şêweyê çîrokê, ji Rojavayê derbasî Rojhilatê bûye.
    **Mînak:** Mar û Bexçevan ...

11. Çîroka zarokan: Ev cureya çîrokê, ji bo zarokan tê nivîsandin, a herî baş ku ji rewş û jîngeheke nêzî wî be. Ji ber ku zarok, ji guhdarkirinê zû diweste û bala wî ji ser diçe, pêwîst e ku ew bi zimanekî hêsan, xwerû û bi kurtasî bûyeran vebêje. Armanca wê, di hiş û bîra zarokan de çandina nirx û sincên civakî ne. Girîngtirîn hêmanên vê çîrokê, lehengên wê ne. Ji ber ku zarok, ji lasayîkirina lehengê çîrokê hez dikin. Ji mercên lehengê çîrokê, xwedîpesnên pir û cuda bin, lê divê ew leheng ne bêhempa be û ne pêwîst e ku ew mirov, an jî lawir be. Ev çîrok, di çarçoveya armancekî tenê de tê gotin.
   **Mînak:** Şengê û Pengê ...
12. Çîroka pêkenok: Ev cureya çîrokê, têkiliyê bi mejî re çêdike. Çêkirina dijberî û dûrketinê ji ya naskirî ye. Çîroka pêkenok, jihevketina têkiliyên vacî ya di navbera tiştan de ye. Ew berovajî çîroka jandarî (trajedî) ya xemgîn e ku li ser têlên hestiyarî û bêzariyê dilîze. Çîroka pêkenok, dihêle xwendevarê wê, piştî kenîn û girnijînê, kesereke kûr bikişîne. Rexneyê li mijarên taybet û giştî yên civakî, ramyarî û aboriyî dike.
   **Mînak:** Ka em bavên ber aqilan.
13. Serpêhatî: Tişta ku di jiyanê de bi mirov re çêbûye û dixwaze li gorî rastiya wê, bi nifşê piştî xwe re parve bike. Nav û bûyera wê, rasteqîn in. Ji bo belgekirinê hatiye nivîsandin û bûye çavkaniyek ji bo dîroka mirovahiyê.
14. Jînename: Nivîsandina hemû berhem û dîroka jiyana kesekî ye. Bi armanca diyarkirina rist û xebata wî/ê ya bibandor a di civaka wî/ê de ye.
15. Bîranîn: Tomarkirina jiyana kesayeteke navdar û têkoşer e ku ji aliyê kesekê ve hatiye nivîsandin. Bi şêweyekî hêsan û gotinên zelal, balê dikişîne ser bûyer û serpêhatiya jiyana xwe.

## Pirsên Nirxandinê

- Gelê kurd, di rêya çîrokan de, jiyana civakî çawa rave dikir?

- Çi sedem bû ku netewên derdorê, çîrokên kurdî wergerînin zimanê xwe?

- Bi awayekî kurt jînenameya xwe binivîse?

## Lêkolîn

Çîroka kurdî di dema niha de, tu çawa dibînî? Binirxîne.

# BEŞA DUYEM


- Wêjeya kurdî di sedsala 16 û 17'an de
- Melayê Cizîrî
- Feqiyê Teyran
- Melayê Bateyî
- Bekir Begê Erzî
- Ehmedê Xanî
- Miradxanê Bazîdî
- Şerefxanê Bedlîsî
- Selîm Silêman
- Şêx Nûredînê Birîfkanî
- Pertew begê Hekarî
- Siyapûş

# WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA 16 Û 17`AN DE



Bêguman, bi domana dîrokê, erdnîgariya Kurdistanê, dwelemendiya axa wê û cihê wê yê stratejîk, roleke pir girîng di vekirina çavên dagirkeran de lîstiye. Da ku ev ax bê parastin gelê kurd gelek derbên mezin xwar. Ev jî li van sedemên ku li jor bi me re derbas bûn, vedigere. Jixwe her welatekî dixwest ku vê axa dewlemend dagir bike, ji ber vê yekê du imperatoriyên mezin ên dagirker û desthilatdar (Osmanî û Sefewî) Kurdistan jî di navbera van her du imperatoriyan de bû. Pirê caran jî ev ax bûye meydana şerê di navbera van her du imperatoriyan de. Piştî ku Kurdistan ji aliyê osmanî û sefewiyan ve dibe du parçe û şer zêde dibe, ev rewş bala Ehmedê Xanî (**1651-1707**) dikêşe û li ser wiha dibêje:

**"Ev rom û ecem bi wan hesar in**
**Kurmancî hemî li çar kenar in**

**Her du terefan qebîlê kurmanc**
**Bo tîrê qeza kirine armanc"**

Dagirkeran çiqasî hewl dane ku vê axê dagir bikin, lê her tim bi binkeftinan re rû bi rû diman. Ev jî li du sedemên bingehîn vedigere:

- Xwezaya Kurdistanê; çiya, çem û rûbarên wê yên teng ên di nava çiyayan de ne, hilawestina bi wan ve pir zor û zehmet bû. Vê xwezayê rewşa kurdan ya parastinê pir hêsan kiribûn.
- Girêdana gelê kurd bi serxwebûn û hezkirina wî ji azadiyê re.

Osmaniyan, di bin navê islamê de ramyariyên mandelekirin û pişaftinê bi kar tanîn. Di wê demê de wêjeya kurdî, derbasî qonaxeke nû bûbû. Weke me beriya niha jî diyar kiribû, bi hatina islamê re hem xwendina olî pirtir bû, hem jî wêje û zimanê kurdî ketin ber pêlên pişaftinê. Ji bilî hin kesên diyar, wêjevanên ku bi zimanê erebî xwendine, xwe radestî wê çand û wêjeyê kiribûn. Di nava vê aloziyê de jî ji aliyê dîrok û zanistî ve hin gav dihatin avêtin. Ev gavavêtinên binirx, berhemên xwe di sedsalên **16** û **17**`an de, bi awayekî diyar, tînin holê. Di van sedsalan de hestên netewî di nava raman, helbest û stranên wêjevanên kurd de hatin diyarkirin. Ji wê dîrokê û vir de her çi qas bandora wêjeya erebî di nava wêjeya kurdî de diyarker be jî lê her ku diçû hestên netewî di nava rewşenbîr û gelê kurd de, bi pêş diketin. Bêguman, vê pêşketinê, bandoreke erênî ji aliyê netewî, aborî û civakî ve jî çêdikir.

Van hestên netewî, bi Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî ve dest pê kir û heta dema Ehmedê Xanî, gihaşt lûtkeya xwe ya herî bilind. Jixwe, hizirê netewî û wêjeya ramyarî, ji Ehmedê Xanî dest pê kiriye. Ev haydarî û bîreweriya netewî, destpêkê bi awayekî aşkere li cem Xanî peyda bûye.

Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku Kurdistan di nava gelek şer, komkujî û talankirinan de derbas bûye; bi taybet di nava şerê osmanî û sefewiyan de.

## Pirsên Nirxandinê

Bingeha hestên netewî, di destpêkê de li kîjan herêmên Kurdistanê hatiye dîtin?

Wêjeya ramyarî li cem kîjan wêjevanî, dest pê kiriye. Lêkolîn bike û mînakan jî bîne ziman?

Jiyana helbestvanekî ku yê wê serdemê ye, lêkolîn bike.

- Berhemên wî/ê çi ne?
- Ev helbestvanê/a ku tu li ser lêkolîn dikî, bi kîjan wêjeyê bandor bûye?

Wane 1

# MELAYÊ CIZÎRÎ



Di dîroka kurdan de yek ji girîngtirîn kes ê wêjevan **"Melayê Cizîrî"** ye. Mela hem bi helbestên xwe hem jî bi raman û baweriyên xwe di dilê kurdan de xwediyê cihekî taybet e. Navê wî yê rastîn Şêx Ehmedê Bextikî ye. Di helbestên xwe de bi piranî du nasnav bi kar aniye, **"Mela û Nîşanî"**. Li Cizîrê di sala **1570**'yî de hatiye dinyayê û di sala **1640**'î de koça dawî kiriye.

Di warê jidayikbûna wî de dîrokeke misoger nîne; hinek çavkanî sala **1567**'an, hinek ya **1570**'yî, hinek jî ya **1589**'an jidayikbûna wî nîşan didin. Lê mirov dikare sala **1570**'yî wek sala jidayîkbûna Mela bibîne.

Mela di Dibistana Sor de, li cem bavê xwe (Mele Muhemed) dest bi xwendina xwe ya seretayî kiriye. Di Cizîra Botan de Dibistana Sor dibistaneke fermî ya navdar e ku gelek zaniyaran lê xwendine. Piştre ji bo berdewamkirina xwendina xwe çûye Amedê, gundê "Setrabasê". Wekî din jî li Hekarî, Amediyê, Iraq û Misrê jî xwendiye. Piştî xwendina xwe diçe Heskîfê û li wir li ba Mîrê Heskîfê **"Melîk Kamil"** dimîne. Ew dibe evîndarê keça mîr a ku bi navê **"Selma"** tê nasîn. Ji ber vê eşq û evîna xwe ya mecazî di sih saliya xwe de dest bi helbestan dike û ne tenê di nava kurdan de, li cîhanê dibe helbestvanekî bijare. Bi rastî jî Mela di helbestvaniya xwe de ji **Mewlana Camî** û **Şîrazî** û **Goethe** **(gotê)** ne kêmtir e. Ta ku vê yekê ew bi xwe jî di helbesta xwe ya li jêr de, wiha diyar dike:

**Ger luluê mensûr ji nezmê tu dixwazî**
**Wer şi'irê Melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet.**

**Felsefeya Mela:** Fîlozofê Yûnanistanî **Thales (Talis)**, hêmana bingehîn weke avê girtiye dest, **Anaximenes** wek hewayê girtiye dest, **Herakleitos (Hêraklîtos)** weke agir girtiye dest, **Empedokles (Epîdokles)** çar hêmanan tîne ba hev û wan weke **av**, **ax**, **agir** û **hewayê** digire dest xwe. Lê **Melayê Cizîrî** li van hêmanan yeke din jî zêde dike û dibêje "**evîn**" jî yek ji hêmanên bingehîn e. Gava ev çar hêman mirovan berdin jî evîn mirovan bernade û her û her bi wan re dimîne.

"Li gorî Melayê Cizîrî, di nava olan de cudahî tuneye; hemû yek in. Lewra hemû ji rehekê tên û dîsa diçin cihekî; ew cih jî hizûra Xwedê ye.

Mirov dikare bibêje Mela hem bi helbestvaniya xwe, hem jî bi bîr û ramanên xwe, digel ew qas salên borî hîn jî wekî şebçiraxekê di dilê Kurdistanê de pêxistî ye. Şewqa welatperwerî û dildariya wî hîn jî rêya kurdan ronî dike.

Jixwe wekî em dizanin ku Mela û Feqiyê Teyran hemdemê hev in û gelek gotûbêj di nav wan de çêbûne û helbest jî bi hev re gotine. Em dikarin di van malikên li jêr de bibînin:

**Feqî:**

**Gul im ji destê xaran biesmê Muhemed nav im**
**Bilbil im di gulzaran ji işqê lew zirbav im**
**Di remza muhridaran tu roj î ez hetav im**

**Mela:**

**Dûr im ji gulê bixunav e lew zer şibhetê bih im**
**Sosina ereq ji tilavê di firqetê di birjih im**
**Li bal xweda dilave tu hetavî ez sih im**

**Feqî:**

**Birandarê işqê me dûr im ji siha bihan**
**Dizanin medahê kê me d’ hezar û yek û sihan**
**Senaxwanê Melê me li hemû Erd û Cihan**

**Mele:**

**Hindî ku digazehim dikêşim sebr û xîrê**
**Şubhetê çeng û jih im hilak in j’ derba tîrê**
**Senaxwanê Feqeh im îroke di Cizîrê**

Ev yek, ji me re tekez dike ku heta sala **1621**`ê her du jî dijiyan.

Tê gotin jî ku mîrê Heskîfê fermana ku Melayê Cizîrî neyê Heskîfê an jî di sînorê wê re derbas nebe, daye. Em helbesta li jêr bixwînin ku êşa dûriyê ya ku wî dikişand, tê de diyar dibe:

## Xema işqê

**Xema işqê perêhtim ez**
**Hebîba xemrevîn kanê**
**Seraser têk behîtim ez**
**Ji derdê ferq û hicranê**
**Firaqa dilbera rind e**
**Behîtim her wekî find e**
**Musulmanek di rê min**
**de Xeber bit ba li sultanê**
**Xeber bit bal şeker xayê**
**Şepal û xop û zîbayê**
**Ku mêr e belkê bîrê nayê**
**Esîrek wî di zindanê**

**Esîr im lerze û tavê**
**Mi taqet vê ne perwavê**
**Di hebsa wê qe min navê**
**Bikim feryad û fîxanê Mi**
**navêt ez bi firyad kim Li**
**zulma dilberê dad kim**
**Şehîdê şubhê Ferhat kim**
**Bidim rohî ji kovanê**

Melayê Cizîrî bar kir û dîwaneke binirx a bi navê "Eleqd Elcewherî" li pey xwe hişt, tevlî ku gelek helbestên wî winda bûn û ta roja me ya îro nehatine dîtin.

## Piresên Nirxandinê

- Melayê Cizîrî, çawa nerîna xwe di derbarê evînê de daye, binirxîn?

- Tu çi agahiyan li ser dibistana Sor dizanî û çima gelgk wêjevanan lê xwendiye?

- Gotûbêja ku di navbera Mela û Feqî de çêbûye, li gorî helbestê şîrove bike?

Wane 2

# FEQIYÊ TEYRAN



Wêjevanê kul û derdan, evîndar û dildarê navdar Feqiyê Teyran, yek ji klasîkên wêjeya kurdî yên hêja ye. Ew bi navê Feqiyê Teyran tê nasîn. Bi awayekî diyar tê zanîn ku Feqiyê Teyran nasnavê wî ye. Ji bilî Feqiyê Teyran, nasnavên din jî bi kar anîne. Mînak: Mîm û Hê, Mîr Mihê û Miksî.

Ji bo naskirina wî ya bi navê Feqiyê Teyran, du nêrîn hene, ew jî ev in:

- Hin dibêjin wî bi zimanê balindeyan (teyrikan) dizanî
- Hin jî dibêjin, ji ber ku ew bilez dimeşiya.

Feqî, di destana xwe ya Şêxê Senanî de wiha dibêje;

**Lew Mîm û Hê suht işqê**
**Di dih sed û sala sihê**
**Muksî ji wê mey mestehê**
**Tehwîl dikit hîkayetê**

**Muksî ji işqê suhtiye**
**Ev qewl bi şêx ve nuhtiye**
**Halê xwe tê de gohtiye**
**Ji xeyn û lamê hicretê**

Navê wî yê resen, Mihemed e. Di helbestên xwe de jî navê xwe yê resen Mihemed û nasnavên xwe jî carinan bi kar aniye.

Ev mînaka helbesta wî ye;

**Gul im ji destê xaran bi ismê Muhemed nav im**
**Bilbil im di gulzaran ji işqê lew zirbav im**
**Di remza muhridaran tu rojî ez hetav im**

Ew di sala **1549'**an de li gundê Warezorê yê navçeya Miksê, ji dayîk bûye. Lê li gorî helbestên wî jî em têdigihêjin ku Feqiyê Teyran kengî jiyaye û dîroka berhem û jiyana xwe di helbestên xwe de anîne ziman.

Li gorî belgeyên ku di destê me de hene, em gihaştine wê baweriyê ku Feqiyê Teyran di navbera salên (**1549-1631**) de jiyaye. Lê divê neyê jibîrkirin ku Feqiyê Teyran, hemdemê Melayê Cizîrî ye. Ji ber ku di dîwana Melayê Cizîrî de helbestên di navbera Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî de hene.

**Feqî:**

**Birîndarê işqê me dûr im ji siha bihan**
**Dizanin medahê kê me di hezar û yek û sihan**
**Senaxwanê Melê me li hemû erd û cihan**

**Mele:**

**Hindî ku digazehim dikêşim sebr û xîrê**
**Şubhetê çeng û jih im helak in ji derba tîrê**
**Senaxwanê Feqeh im îroke di cizîrê**

Feqiyê Teyran, di sala **1631**`ê de li gundê Şandîsê jiyana xwe ji dest daye û li heman gundî hatiye veşartin. Gora wî, li devera Nemiran, ji aliyê gel ve weke serdangeheke pîroz tê dîtin.

Gelek berhemên navdar ên Feqiyê Teyran hene, ew jî ev in:

- **Dîwana helbestan**
- **Destana Zembîlfiroş**
- **Destana Bersîsê Abid**
- **Destana Şêxê Senanî**
- **Destana Xanê Dimdim**
- **Destana Qewlên Hespê Reş**

Destana Şêxê Senanî, ji **362** malikên çarîne pêk tê. Şêxê Senanî, girîngtirîn berhema Feqiyê Teyran a ku naveroka wê li ser bawerî û evîna resen e. Feqiyê Teyran, mirovekî pir pak bû; xwestiye cihê ku ew lê bijî tu bêmafî lê çênebin, ji ber vê yekê, her tim geriyaye ku cihekî herî baş û paqij bibîne û lê bijî.

Feqiyê Teyran, helbestvanekî gelêrî ye. Helbestên xwe ne bi zimanê koşk û qesran nivîsandine, wî bi ziman û wêjeya gel helbest nivîsandine. Dema ku helbestên wî tên xwendin, gel bi hêsanî têdigihêje. Ji bilî vê jî divê em bizanin ku Feqiyê Teyran bi rêbazekî felsefîk di dema xwe de helbest nivîsîne. Mînaka vê yekê jî helbesta wî ya bi navê "Ey av û av" ku ew gotûbêja xwe ya bi avê re diyar dike.

## Helbesta Ey av û av:

**Ey av û av, ey av û av**
**Ma tu bi işq û muhbetê**
**Mewc û pêlan tavê belav**
**Bê sekan û bê rahetê**

**Bê dev û qîl û pal bibêj**
**Hêdî bi lefzê hal bibêj**
**Ber "Mîm û Hê û Dal" bibêj**
**Şerh û beyana kaxetê**

**Ew reng dibêt ava zelal**
**Buhrîn li min çend mah û sal**
**Qet kes nekir ev reng sual**
**Heta giham vê saetê**

**Keç bûn di kenza qidemî**
**Baxwoy ji işqa Ademî**
**Anîne karê alemî**
**Zahir kirin l'vê suretê**

## WATEYÊN PEYVAN

**Suht:** Şewat
**Muks:** Miks, Navê bajarê ku wî lê xwendiye. **Tehwîl:** Guhartin
**Qewl:** Gotin
**Lamê hicretê:** Koça dawî ya mirov
**Bih:** Dareke êmîş û mêweyan e
**Medah:** Pesindar
**Senaxwan:** Diyarkirina pesnê mirovekî.
**Digazehim:** Gazîkirin

**Şubhetê:** weke, mîna **Çeng:**
Amûreke muzîkê ye. **Jih:**
Têla amûrên muzîkê ye.
**Şerh:** Şîrovekirin
**Beyan:** Daxuyanî
**Kenza qidemî:** Gencîneya kevnar
**Baxwoy:** Xweda

## Pirsên Nirxandinê:

- Feqiyê Teyran li çend dibistanan xwendiye? Wan diyar bike.

- Çima gel ji Feqiyê Teyran hez dikir û helbestên wî zû bi zû ezber dikirin?

- Di nêrîna te de Destana Keleha Dimdimê, çi ji me re diyar dike?
  Dîroka wê lêkolîn bike.
  Pêşengên berxwedana wê, kî bûn?
  Parçeyekî ji Destana Keleha Dimdimê bi hevalên xwe re parve bikin û rave bikin.

# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

## RÊZBEND

Ji wekheviya dengên ku li dawiya rêzikên helbestan tên re, **rêzbend** tê gotin. Rêzbend, herî kêm wekheviya du rêzbendên deng û nivîsîna wan wekhev, lê wateya wan cuda, yan jî wekheviya dengên li dawiya rêzikan re rêzbend tê gotin.

**Rêzbend, li gorî ahenga deng; di navbera xwe de dibe pênc beş:**

- **Rêzbenda dewlemend**
- **Rêzbenda tam**
- **Rêzbenda hevdeng**
- **Rêzbenda tac**
- **Rêzbenda lawaz**

Feqiyê Teyran, di helbestên xwe de hemû cureyên rêzbendê bi kar aniye. Dema ku em temaşeyî malika destpêkê ya helbesta li jêr dikin, dibînin ku rêzbenda dewlemend bi kar aniye.

Mînak**:**

**Ey av û av, ey av û av**
**Ma tu bi 'işq û muhbetê**
**Mewc û pêlan tavê belav**
**Bê sekan û bê rahetê**

Lê dema ku em temaşeyî malika çarem dikin, dibînin ku bi rêzbenda tam nivîsandiye.

Mînak**:**

**Ji kê re dikî zikrê bi hal**
**Qet guşguşê nakî betal**
**Teşbîhê min reht û emal**
**Qet şev û rojan xew netê**

## A. Rêzbenda Dewlemend

Ji wekheviya sê dengan û zêdetir a li dawiya rêzikên helbestê re **"rêzbenda dewlemend"** tê gotin.

Ev wekhevî, divê herî kêm di du rêzikan de hebin. Dema ku em temaşeyî malika li jêr dikin, dibînin ku li dawiya her du rêzikên destpêkê, paşînk heye û beriya paşînkê, rêzbenda dewlemend tê dîtin.

Mînak:

Xweş xeramê ez xulamê → paşînk
→ rêzbenda dewlemend

Nazikê şîrîn kelamê → paşînk
→ rêzbenda dewlemend

Tûtiya eywan meqamê

Dil ji min bir dil ji min.

(Cizîrî)

Wane 3

# MELAYÊ BATEYÎ



Melayê Bateyî di sala **1417**'an de li gundê Batê yê girêdayî Hekariyê, ji dayîk bûye û di sala **1491**'ê de li heman gundî çûye ser dilovaniya xwe. Du berhemên wî yên herî navdar hene, ew jî ev in:

- Mewlûda bi zimanê kurdî
- Dîwana helbestan

Tê gotin ku berhema wî ya herî navdar, Mewlûd e. Mewlûd, destaneke ku jînameya ***Hz. Muhemed*** vedibêje. Di baweriya bawermendên kurd de, weke destaneke pîroz tê pejirandin.

## Beşek ji Mewlûda Melayê Bateyî:

**Hemdê bêhed bo Xwedayê alemîn**
**Ew xwedayê daye me dînê mubîn**

**Em kirin umeta xeyrûl beşer**
**Tabi’ê wî miqtedayê namewer**

**Ew xwedayê malikê milkê ezîm**
**Daye me mîrasê qurana kerîm**

**Dînê me kir kamil û nîmet temam**
**Yanî da me Ehmed û Daruselam**

**Ew Xwedayê bênezîr û Zulcelal**
**Bêheval û bêmîsal û bêzewal**

**Bo cemi’ê muslimîn û salîhe**
**Bo feqîrê Bateyî el-fatîhe**

Navê wî yê resen Huseyn e, lê gelek caran bi nasnavê Ehmed jî dihate nasîn. Ji êla Ertoşiyan e. Di dibistana Miksê de li ber destê Mîr Hesenê Welî xwendiye. Ji ber Melayê Bateyî û mîrê Miksê hem bi hev re xwendibûn û hem jî hevalên hev bûn, her sal berî demsala zivistanê, Mela bi rê diket û berê xwe dida Miksê û li wir bi helbestên xwe yên xweş, dîwana wî digerand.
Her sal dema ku diçû Miksê gel hevalê xwe, ji **10** rojan heta mehekê li wir dima û paşê vedigeriya gundê xwe. Dema Mela vedigere malê helbestekê dinivîse, lê di rê de berf dibare û gelkî bilind dibe, Mela jî li wir di bin berfê de dimîne û jiyana xwe ji dest dide. Heta demsala buharê ku berf tê helîn, termê wî tê dîtin û helbesteke bi navê **"Ji Çireya Paşî û Pê da"** di bêrîka wî de tê dîtin.

## Ji çireya paşî û pê da

**Ji çireya paşê û pê da**
**Melayê Bateyî kanê?**
**Sefer kêşa bi Muksê da**
**Li ser wextê zivistanê**

**Zivistanê li vê yolê**
**Li vê beriyê li vê çolê**
**Gerovê girtî Daholê**
**Mijê havête zozanê**

**Gerovê girtî nesrîna**
**Cemed şîn bû li solîna**
**Girya me tê j' bo Asmîna**
**Perîşan im ji talanê**

Her wiha di helbesteke xwe de biyanbûna xwe û azarên xwe dide diyarkirin û tê de lavayan ji Xweda dike:

YA îlahî ez xerîb im

**Ya îlahî ez xerîb im**
**Daîma her dilkebîb im**
**Bê hebîb û bê tebîb im**
**Mam di nav qewmê xerîb**

**Mutrikêl bab û bira me**
**Sotiyê şem' û çira me**
**Kuştiyê dest dilbera me**
**Mam di nav qewmê xwerîb**

**Kuştiyê tîra xedar im**
**Kes nenas im her dizar im**
**Ez feqîr im birîndar im**
**Mam di nav qewmê xerîb**

**Raziyê bi'efwa letîf im**
**Mecrûhê tîra seqîf im**
**Aşiqê birhê nezîf im**
**Mam di nav qewmê xerîb**

Mele, di vê helbestê de diyar dike ku gelek êş û azaran dikişîne, dûriya xwe ji war û evîna xwe diyar dike, rewşa xwe ya xizaniyê jî tîne ziman ku ew li welatên penaberiyê digere û tu kesî nas nake...

## Wateyên peyvan:

**Kebîb:** Şewat

**Mutrik:** Kesê ku dev ji malbata xwe berdabe û penaber bûbe.

**Zar:** êş, qêrîn

**Mecrûh:** Birîndar

**Seqîf:** Kevirekî hişk bi ser rengê zer ve ye û bi serê tîrê ve vedibe.

**Nezîf:** Herikîna xwînê

## Pirsên Nirxandinê

- Melayê Bateyî dibêje:**"Giriya me tê j' bo Asmîna"**. Gelo, Asmîna kî ye?

- Vê malikê şîrove bike.
  **"Ji çireya paşê û pê da**
  **Melayê Bateyî kanê?**
  **Sefer kêşa bi Muksê da**
  **Li ser wextê zivistanê"**

- Tu jî ser Melayê Bateyî lêkolîn bike:

42. Çîroka mirina Mela bîne ziman
43. Gelek çîrokên Mela yên ku bi wî re çêbûne, hene, yekê ji wan çîrokan binivîse.
44. Li kîjan dibistanê xwendiye û çima her sal diçû cem mîrê Miksê?

### B. Rêzbenda Tam:

Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestê re, "**rêzbenda tam"** tê gotin.

Ev wekhevî, divê herî kêm di du rêzikan de hebe.

Dema ku em temaşeyî malika li jêr dikin, em ê bibînin ku li dawiya her sê rêzikên destpêkê, du dengên wekhev hatine bikaranîn, ji ber vê yekê, rêzbenda tam e.

Mînak:

Her çi fermawayt qebul en qeb**ûl**
→ rêzbenda tam

We yadim meyo wişiyanim meşx**ûl**
→ rêzbenda tam

Medey şahidî ez we bêmuşk**ûl**
→ rêzbenda tam

Ne lewh yaqût atêş kamil

Wane 4

# BEKIR BEGÊ ERZÎ



Navê wî yê rastî Bekir Begê Erzî ye. Di sala 1637`an de li gundê Erzê yê girêdayî navçeya Amediyê ji dayîk bûye. Ew helbestvan û wêjevanekî kurd e. Li deverên Behdînan, Hekarî û Botanê pir navdar e. Navê bavê wî Behder Beg e. Bekir Beg ji malbateke pir navdar û dewlemend bû. Navê gundê wî, bûye paşnavê wî. Li gor rewiştên malbat û malmezinan xwedî bûye. Ji ber ku ew ji malbateke dewlemend bû, jiyaneke xweş derbas kiriye.

Di zarokatiya xwe de bi xwendinê mijûl bûye û her bi zana û şarezayên wê demê re têkiliyên wî hebûn. Piştre ji bo xwendinê, diçe Hucreyên Feqeyan. Ji bo bidawîkirina xwendina xwe, li gelek cihên Kurdistanê digere. Demeke dirêj li Amêdiyê dimîne. Piştre, demekê jiyana xwe, li Dihokê diborîne. Di dawiyê de, xwendina xwe li Akrê tekûz dike, da ku dawî vegere gundê Zêdê û temenê xwe yê mayî di rêya agahdarkirin û perwerdekirina gel de, derbas bike.

Di sala 1672`yan de, di 35 saliya xwe de jiyana xwe ji dest daye û li gorî qewîtiya wî, li goristana Erzê hatiye veşartin. Bekir Beg, yek ji mezintirîn helbestvanên kurd tê pejirandin. Weke stêrkeke geş di asîmanê wêjeya kurdî de diçirise. Bekir Beg, weke gelek helbestvanên din, evîndarê xwezaya Kurdistanê ya xweşik û bedew bû, li gel vê jî delalî, ciwanî û xweşikbûna yara xwe jî ji bîr nedikir. Navê yara wî Medîne bû. Medîne keçeke xweşik bû, li gundê Erzê dijiya û Bekir Beg dibe evîndarê wê. Ji ber vê yekê jî ber xwe dide yara xwe û helbestekê davêje ser û dibêje:

## Helbesta Bekir begê Erzî

**Bi derkevtim temaşa kem têhna rojê dinê dabû**
**Xiyala dîlberê nakim, Medîna min ku peyda bû**

**Medîna kim, ji îhsanê hilên perda dirîzanê**
**Ji burcê hate eywanê, miqabil hat û westabû**

**Miqabil hat û rawesta, du xadim dest li ser desta**
**Li pêşî dîlberê westa, hilat roja l' dinê dabû**

**Hilat roja weku wextê binêrin tali' û bextê**
**Du dest rûnişt li ser textê sifet hûrî Xwedê dabû**

**Sîfet hûrî melek xoybû, elîf bejin perî rûbû**
**Keşîdenûn û ebrû bû, berê xo wê bi min dabû**

**Berê xo da bi min carik, hilîna xanimê çarik**
**Me dît hilbû ji wê narik, çek û zêra şefeq dabû**

## Wateyên peyvan

**Sîfet:** Berjeng

**Ebrû:** birû, birh

**Keşîdenûn:** kêşîner, cezab

**Hilbû:** rabû, bilind bû

**Têhn:** Germahiya rojê

**Nar:** Agir

**Dirîzanê:** Pêşiya derî

**Çek:** Cilûberg

**Miqabil:** Beramber

**Şefeq:** Ronî

## Pirsên Nirxandinê

- Malika li jêr, şîrove bike û di lênûsa xwe de binivîse.

  **"Bi derkevtim temaşa kem têhna rojê dinê dabû**
  **Xiyala dîlberê nakim, Medîna min ku peydabû"**

## C. Rêzbenda Hevdeng:

Ji wekheviya du peyvên ku dengên wan wekhev û wateya wan cuda ye ku li dawiya rêzikên helbestê tên re, **"rêzbenda hevdeng"** tê gotin.

Ev wekhevî, divê herî kêm di du rêzikan de hebin.

Mînak:

Kesên ku di rêya azadiyê de
navêjin tu **gavan** → **rêzbenda hevdeng**


Bê guman dê tim û dayîm

ji serdestan re bibin **gavan** → **rêzbenda hevdeng**

**(Osman Sebrî)**

Wane 5

# EHMEDÊ XANÎ


Ehmedê Xanî (1650-1707).

Ehmedê Xanî nivîskar, helbestvan û fîlozofê herî mezin ê gelê kurd tê nasîn. Xanî, di wêje û toreya kurdî de, weke stûneke bingehîn tê pejirandin. Xanî, wêjevan, zanyar, rewşenbîr û damezirînerê ramana serxwebûn û azadiya gelê xwe, tê dîtin. Ehmedê Xanî, bi xwe dîroka jidayîkbûna xwe di vê malikê de diyar dike.

**"Lewra ku dema ji xeybê fik bû**

**Tarîx hezar û şêst û yek bû"**

Weke ji helbestê jî tê zanîn, Xanî, di sala **1651**`ê de li gundê Xanê ji dayîk bûye. Navê wî Ehmed e, navê bavê wî Şêx Ilyas e, nasnavê wî jî Xanî ye. Ji ber ku Xanî ji malbateke mezin bû ji biçûkanî de, bavê wî ew bi xwendin kiriye. Li dibistanan, waneyên zanistî û li dîwanxaneyan jî waneyên civakî girtine. Mezin dibe û pileya xwendina wî, bi pêş dikeve. Ji bo fêrbûna xwendina erebî, diçe nava feqeyan. Di wê demê de jêhatîbûna herî mezin ew bû ku kesek biçe nava feqeyan û fêrî erebî bibe.

Ehmedê Xanî, piştre diçe bajarê Ruha, Exlat û Bedlîsê û fêrî zanistê dibe. Piştre, derbasî Qahîrayê dibe û li zanîngeha El Ezher dixwîne û weke xwendekarekî pir serkeftî, bawernameya wê zanîngehê, bi dest dixe. Di heman demê de, li hebûn û jana gelê xwe şiyar dibe.

Piştî vedigere Kurdistanê, li ser welatparêziyê dihizire. Ji bo ku karibe hestên welatparêziyê li Kurdistanê belav bike, mewlûdekê dide û bi rêya mewlûdê bi ciwanan re civîneke amojgariyê pêk tîne. Her wiha, ji bo heman armancê ji çîroka Memê Alan, Destana Mem û Zînê dinivîse. Her wiha, li ser pêşxistin, hevgirtin û xwenasîna kurdan, pir helbestan dinivîse.

Ehmedê Xanî, di dema ku kurd hîn hişyar nebûne de, hêjatî û rûmeta wêje û zimanê xwe zanî bû û berhemên xwe, bi zimanê kurdî nivîsandine.

Sedema ku di wê demê de, bi kurdî nivîsandiye jî wiha vedibêje:

**“Xanî ji kemalê bêkemal î**
**Meydana kemalê dîtî xalî**

**Yanî ne ji qabilî û xebîrî**
**Belkî bi te'sub û eşîrî**

**Hasil ji înad eger ji bêdad**
**Ev bede'te kir xilafê mutad**

**Safî şemirand vexwarî durdî**
**Manendê durê lîsanê kurdî**



**Înaye nîzam û întîzamê**
**Kêşaye cefa ji boy 'amê**

**Da xelqî nebêjitin ku ekrad**
**Bê me'rîfet in, bê esl û binyad**

**Enwa'ê milel xwedan kitêb in**
**Kurmancî tenê di bê hisêb in**

**Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc**
**Eşqê nekirin ji bo xwe armanc**

**Têk de ne di talib in, ne metlûb**
**Vêk re ne mehbûb in ew, ne mehbûb**

**Bêbehren e ew ji eşqebazî**
**Farix ji heqîqî û mecazî**

Xanî, di sala **1707**`an de jiyana xwe ji dest daye û li bajarê Bazîdê hatiye veşartin. Gora wî, weke serdangehekê ye; yan jî weke cihekî pîroz tê dîtin. Ehmedê Xanî, di sedsala **16**`an de jiyaye. Di dema Xanî de Rojhilat, ji aliyê zanistê ve ji Rojavayê pêşketîtir bû. Ewropayî, li derfetên çûna Asyayê digeriyan. Di serdema Xanî de rewşa Kurdistanê, pir balkêş bû; Kurdistan, li gorî dema xwe ya raborî ya dema islamê, di qonaxeke herî bilind de bû. Her wiha mîrên kurdan, di sala **1514**`an de Sefewî ji ax û bajarên xwe derxistibûn.

Li ser axa Kurdistanê, di navbera Osmanî û Sefewiyan de, bi sedên salan şer dom kiriye. Ev şer ji beriya Xanî bi 11 salan, bi peymana Qesraşêrîn bi dawî bûye. Di sala **1639**`an bi vê peymanê, Kurdistan bûye du parçe. Ev parçebûn, bû sedem ku di nava mîr û begên kurdan de nakokî û tevlihevî çêbibin. Vê lihevnekirinê, şopên mezin di ramanên Xanî yên çandî û welatparêzî de hiştine. Ev bûyer, dibin hevîrê ramanên Xanî û vê rewşê wiha dibîne.

Her wiha, baweriya Xanî bi hêza gelê kurd dihat. Xanî di wê baweriyê de bû ku gelê kurd heke derfetê bistîne, wê karibe serweriyê ji hemû miletên cîhanê re bike. Her wiha digot: "kurd ne kêmî miletên dinin". Di vê helbestê de wiha diyar dike:

**Bi pênûsa Xanî**

**“Wan girtî bi şûr şehrê Şuhret**
**Tesxîri kirin biladê himet**

**Her mêrekî wan bi bezlê Hatem**
**Her mêrekî wan bi remzê Rustem**

**Bifikirin ji ereb heta va gurcan**
**Kurmanciye bûye şuphê burcan**

**Ev rom û ecem bi wan hesar in**
**Kurmancî hemî li çar kenar in**

**Her du terefan qebîlê kurmanc**
**Bo tîrê qeza kirine armanc**

**Goya ku li serhedan kilîd in**
**Her taîfe sedek in sedîd in**

**Ev qulzemê rom û behra tacîk**
**Hindî ku bikin xurûc û tehrîk**

**Kurmanc dibin bi xûn muletex**
**Wan jêk vedikin mîsala berzex**

**Bi kurdiya îro**

**Ewan zeft kirin welat bi şûran**
**Bi serfirazî ketin sîmoran**

**Her mêrekî wan comerd wek Hatim**
**Her mêreîk wan di şer de Rustem**

**Binêr ji axa ereb ta gurcan**
**Welatê kurdan bûye wek burcan**

**Ecem û rom b 'wan diparêzin**
**Kurmanc jî li çar aliyan rêz in**

**Her du aliyan milletê Kurmanc**
**Ji mirinê re kirine armanc**

**Wek ku kilît bin li ser sînoran**
**Bendavek xurt e her êlek ji wan**

**Her du deryayên tuek û qizilbaş**
**Hingî ku herin pê û herin paş**

**Kurmanc di xûna xwe de dimînin**
**Lew her du behran vediqetînin**

| **Bi pênûsa Xanî** | **Bi kurdiya niha** |
|---|---|
| **Kurmancî ne pir di bêkemal**<br>**in Ema di yetîm û bêmecal in** | **Ne ku wêje li nav kurdan nîn**<br>**e Lê bê derfet û sêwî ne** |
| **Fil cumle ne cahil û nezan in**<br>**Belkî di sefîl û bê xwedan in** | **Bi giştî ne cahil û neza in Lê**<br>**bextreş in û bê xwidan in** |
| **Ger dê hebûya me jî xwedanek**<br>**Alî keremek letîfe danek** | **Eger ku me jî xwedî hebûya**<br>**Ciwnmêrekî pirr zane bûya** |
| **İlm û huner û kemal û îzan**<br>**Şî’r û xezel û kitab û dîwan** | **Huner û wêje zanîn û destan**<br>**Ş'ir û xezel û kitêb û dîwan** |
| **Ev cins bibûya li bawî m'amûl**<br>**Ev neqd bibûya li nik wî meqbûl** | **Hebûya qedrê wana li ba wî**<br>**Ev reng zanîn bipejiranda wî** |
| **Min dê elema kelamê mewzûn**<br>**Alî bikira li banê gerdûn** | **Min dê alaya helbest û ş'iran**<br>**Bilind bikira heta stêran** |
| **Bi navê ruhê Melê Cizîrî**<br>**Pê hey bi kiriya Elî Herîrî** | **Min dê vejanda canê Cizîrî**<br>**Pê sax bikira Eliyê Herîrî** |
| **Kêfek we bida Feqiyê Teyran**<br>**Heta bi ebed bimaye heyran.** | **Şahiyek bida Feqiyê Teyran**<br>**Ku pê her û her bima sergerdan** |

## WATEYÊN PEYVAN

**Amojgarî:** Şîret

**Kemal:** zanist, 'ilim

**Şuhret:** Nav û deng

**Texsîrî:** Kêmasî

**Bilad:** Welat

**Tehrîk**: Tevdan

**Muletex**: Bixwîn

**Bêmecal**: Bêderfet

**Sivîl**: Mirovên bêçek

**'Alî**: Bilind

**Himet:** Hêz

**Remz:** Sembol

**Şubhê:** Mîna

**Hesar:** sênc, dorpêçkirin

**Sedekin:** Bendav

**Sedîdin:** Xurt

**Qulzem:** Derya sor

**Xuruc:** Derketin

**Kerem**: Comerdî

**Letîf**: qeşeng, nazik

**M'emûl**: Bikarhatî û binirx

**Neqd**: Pere

**Ebedî**: Bêdawî

**Mewzûn**: Bikêş

**Iz'an**: zanîn,naskirin

**Taîfe**: bir,berek

## Berhemên Ehmedê Xanî:

- Destana Mem û Zîn
- Nûbuhara Biçûkan (ferhengoka fêrkirina zarokan)
- Eqîda Îmanê
- Dîwana Helbestan

## Pirsên Nirxandinê

- Ehmedê Xanî bi çi zimanî xwendiye, li ku derê xwendiye?

- Li gorî te destana Mem û Zînê bi çi rêbazî hatiye nivîsandin û lehengên destanê çi sembolê diyar dikin?

- Ehmedê Xanî:
- Ji bo zarokan çi xebat kiriye?
- Li ser parçebûna yekem a Kurdistanê çi gotiye?
- Çima Ehmedê Xanî wekî wêjevanê netewî yê yekem tê naskirin? Şîrove bike.
- Rêzbenda Tac:

Ji wekheviya peyvên ku li dawiya rêzika helbestê, ya ku yek di nava ya din de cih digire re "**rêzbenda tac**" tê gotin.

Dema ku em temaşeyî malika li jêr dikin, em ê bibînin ku peyva bûye rêzbenda rêzika yekem, ketiye nava peyva bûye rêzbenda rêzika sêyem û di nava wê de cih girtiye.

Mînak:

Şox û şengê zuhre**reng**ê → paşînk rêzbenda
→ tac

Dil ji min bir dil ji min

Awirên heybet pe**reng**ê → paşînk rêzbenda
→ tac

Dil ji min bir dil ji min

**(Melayê Cizîrî)**

Wane 6

# MIRADXANÊ BAZÎDÎ



Miradxanê Bazîdî, di sala **1743**'yan de li bajarê Bazîda kevin ji dayîk bûye. Beriya ku em derbarê Miradxan de agahiyan bidin, em ê li ser bajarê wî; Bazîdê hin agahiyan bidin û rista vî bajarî ya di warê wêjevanên kurd de nas bikin. Bazîd, di dîroka wêjeya kurdî de taybetiyeke wê ya girîng heye. Di dibistana Bazîdê de gelek helbestvan û wêjevanên kurd, gihîştine asteke wêjeyî ya herî bilind. Navê vî bajarî Bazîda Xayan e, lê kurdan bi kurtasî navê Bazîdê bi kar anîne. Lê tirkan, navê bajêr, weke hemû gund û bajarên Kurdistanê, guhertine û kirine Doxubeyazit.

Bazîd, bajarekî pir kevinar e. Ew dikeve başûrê rojavayê Çiyayê Agirî. Bajarê kevin, di geliyekî teng de ye û bi pênc kîlometreyan dûrî bajarê nû ye. Qesra Ishaq Paşa di navbera her du bajaran de cih digire. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, bajarê nû bi pêş ket û bajarê kevin hat rûxandin. Taybetiya Bazîdê ya ji bo kurdan, ew e ku piştî Ehmedê Xanî li wir bi cihwar bû, êdî bajar bû navendeke çand û wêjeya kurdî. Gelek wêjevan, helbestevan û nivîskarên kurd ji dibistana Ehmedê Xanî derçûn. Ji çend kesên navdar ên ku di vê dibistanê de xwendin û bi nav û deng bûne, yek jî **Miradxan** e. Li gel Miradxan, helbestvan û wêjevanên din ên ku di dibistana Bazîdê de gihîştine radeyên bilind, ev in:

IsmaîlêBazîdî,Mele Mahmûdê Bazîdî û Xelîfe Yûsiv. Li dibistana Bazîdê ku Ehmedê Xanî pirtûkxaneyeke mezin tê de vekiribû, Miradxan jî mîna gelek hemdemên xwe, xwend û ji vê pirtûkxaneya Ehmedê Xanî, sûdeke mezin wergirt. Zarokatiya

xwe, di heman bajarî de borandiye. Di şeşsaliya xwe de dest bi xwendina Quranê kiriye. Piştî wê, bêrawestan li dibistana Ehmedê Xanî ya Bazîdê, dest bi xwendina zanistên olî, wêjeyî - teknîkî kiriye. Piştre li hemû navçêyên Bazîd, Colemêrg, Wan - Bedlîsê digere. Di wê gera xwe de, dibistanên ku kêfa wî ji tekûziya wan re dihat, an jî dema ku rastî seydayekî zana dihat, li wir demekê dima û dixwend. Bi vî awayî, kêmasiyên xwe û yên xwendina xwe çare dikirin. Bi van xebatên xwe yên giranbuha, di temenê xortaniya xwe de bû zana, hosta û wêjevanekî mezin. Armanca vî wêjevanî ew bû ku bikeve rêya Ehmedê Xanî; helbestan binivîse û dema daxwaz hebe, di civatan de bixwîne. Ji ber vê yekê, jiyana Ehmedê Xanî lêkolîn dike.

Ji her tiştî pirtir, kêfa wî ji nivîsandina helbest, destan û xwendina wan re dihat. Gelek berhemên wî yên giranbuha hene. Lê berhemên wî yên di destê me de hene; ji dîwana wî çend malikên helbestan û Destana Zembîlfiroş in. Derbarê dema nivîsandina Destana Zembîlfiroş de, wiha nivîsandiye;

**"Hezar û sed û not sal bûriye**

**Paşê hezara hicriye**

**Miradxan dibê Serhatiye**

**Bi şi'îr û bi gotineke xweş"**

Bi vî awayî, wêjevanê me dibêje; "Min ev destan, di sala **1190**`î yê koçî ku beramberî wê **1776**' ê zayînê ye, nivîsandiye."

Miradxan, Destana Zembîlfiroş bi **254** malikan temam kiriye.

Li gorî hin nivîskaran, Miradxan di salên **(1737-1785**) de jiyaye.

## Pirsên Nirxandinê

- Çima Miradxan dixwest jiyana Ehmedê Xanî nas bike?
- Dibistana Bazîdê wekî kîjan dibistanê dihate nasîn?
- Çima navê Bazîdê ji aliyê dijmin ve, hate guhertin?

## D. Rêzbenda lawaz (nîv rêzbend):

Ji wekheviya dengekî ya li dawiya rêzikên helbestê re, **"rêzbenda lawaz"** tê gotin.

Ev wekhevî, divê herî kêm di du rêzikan de hebe.

Dema ku em temaşeyî malika li jêr dikin, em ê bibînin ku li pêşiya paşînkê, rêzbenda lawaz "**a, a, a**" hatiye bikaranîn. Ev cureya rêzbendê, kêm be jî di helbestên kurdî de heye.

Mînak:

Muhbetê keç mubtel**a** kir → paşînk
→ rêzbenda lewaz

Sur li carya eşker**a** kir → paşînk
→ rêzbenda lewaz

Lawikî qelbim cud**a** kir → paşînk
→ rêzbenda lewaz

Min ji işqa xew ne tê

**(Melayê Cizîrî)**

Wane 7

# ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ



Şerefxanê Bedlîsî, di sala **1543**'yan de li bajarokê Kerherûdê ji dayîk bûye. Weke **Şeref**, dihat binavkirin. Piştî ku desthilatdariya bajarê Bedlîsê da ser milên xwe, nasnavê Xan jî bi navê wî ve hat danîn û weke Şerefxan hat nasîn. Kerherûd, bajarokekî girêdayî bajarê Qumê ye. Dayîka wî keça Emîrxan e. Emîrxan, kesekî navdar, ji malbateke hêja û malmezinên Kerherûdê bû. Navê bavê wî, Şemsedîn e. Şemsedîn, desthilatdarê herêma Bedlîsê bû; ji malbata Şerefxan û kurê Şerefxan bû.

Şerefxanê Bedlîsî, zarokatiya xwe li bajarokê Kerherûdê di nava zarokên xalên xwe de derbas dike. Li wê derê, dibistana seretayî dixwîne. Piştî dibistana seretayî, sê salan Şah Tehmasbe di temenê neh salî de wî dibe qesra xwe û di dibistana Humayun de bi zarokên xwe re, dide xwendin. Di nava zarokên qesrê de dibe mirovekî pêşeng. Di sala **1555**`an de bavê wî dev ji erka xwe ya mezinatiya eşîra Rojkan ber dide. Li ser daxwaza eşîra Rojkan, Şah Tehmasbeyê mezin, Şerefxan di temenê 12 salî de wî li şûna bavê wî, dike fermandar. Vê fermandariya wî, sê salan domand. Gel jî pir jê razî bû. Piştî sê salan, şah ew rê kir bajarê Hemedanê cem xalê wî.

Piştî aloziyên di navbera wî û şah de derketin, di sala **1579**`an de bi alîkariya begên kurd, derbasî bajarê Wanê bû. Piştî têkiliya wî bi Osmaniyan re, ji aliyê Osmaniyan ve mezinatiya Bedlîsî, radestî wî dibe û derbasî Bedlîsê dibe. Li ser textê bapîrê xwe Şerefxan, rûdinê.

Di dema fermandariya xwe de, bi karê nivîskariyê ve mijûl dibe û gelek berhemên hêja dinivîse. Şerefxan, di sala **1604**`an de, di temenê **61** salî de li bajarê Bedlîsê jiyana xwe ji dest dide

- li goristana malbatê, tê veşartin.

## Berhemên Şerefxan:

- Şerefname ya ku li ser dîroka Kurdistanê nivîsiye.
- Dîwana helbestan

## Helbesta Şerefxanê Bedlîsî:

**Ez im weke gogê meydana Cîhanê**
**Beramber çarenûsê bê hêz û tuwanê**

**Bez û lez ji ber kaşû dikim rev**
**Ne arama min heye bi roj, ne xew bi şev**

**Bibîra min tê serpêhatiya jiyana min**
**Demeke dilxweş û sed car nexweş jiyana min**

**Ez zarok bûm, xwe negrî biçûk û sava**
**Bi naz dijiyam, di baweşa dê û bava**

**Li pişt dergûşê, min nekarî ez rabim**
**Gunehê min jî nebû, girê didan destên min**

**Tetên min bi hêz nebûn bikin memik gîr**
**Devê min hîn dikir ji bo mijandina şîr**

**Bi ga û golikê bi meş bi rê dihatim**
**Ber bi pîr, ber bi pîrê dihatim**

**Ji bahoz xwe diparast, bi dar û heta ber bi**
**dar Cî cî disekinim li vir û li wir, li wan aqar**

**Bilezî bûme weke baz û pê gav**
**Ji xewa min xiste derbejn û laşê xav**

**Min dan destê mamoste ku hîn bim**
**Weke berxek bixwîn û bişîr bim**

**Bûme Dara bi darê wî ji zanînê**
**Li ber çavê min temên tarî hilanînê**

**Ji kul û kêmasî û tengiyan der çûm**
**Dersa xwendina seretayî zû bi ser çûm**

**Ez tevan hînbûm ji zanista diyarde**
**Hunermendekî renî hatim bijarde**

## WATEYÊN PEYVAN

**Kaşû:** Darê lêdana gogê ye.

**Tem:** Perda reş, mija ku dikeve ber çavê mirov.

**Sava:** Zarokên biçûk ên şîrmij in.

**Diyar:** Xuyayî

**Binaz:** Bi delalî

**Renî:** pak, paqij

**Tet:** Dest

**Bijar:** hilbijartî, neqandî.

**Dara:** Qehremanekî kurd ê dîrokî ye.

## Lêkolîn

Li ser Şerefxan lêkolîn bike û jiyana wî bîne ziman:

- Pirtûka "Şerefname" ya ku li ser êlên kurdan hatiye nivîsandin bi awayekî kurt lêkolîn bike û tu çawa wê dinirxînî.
- Pirtûka "Şerefname" bi çi zimanî hatiye nivîsandin?
- Girîngiya Şerefnameyê di nava gelê kurd de, diyar bike.

Wane 8

## SELÎM SILÊMAN



Selîm Silêman, di sala **1586**`an de li Hîzana Amedê ji dayîk bûye. Selîm, helbestvan û wêjevanekî dîrokî ye. Di nava wêjevanên di dema xwe de cihekî bilind girtibû. Di nava gel de dabaşa gelek berhemên wî tê kirin, lê mixabin, ji berhemên wî yên ku di destê me de hene, tenê Destana Yûsiv û Zuleyxa ye. Her wiha, dîwaneke wî li gel hin helbestên evîndarî hene.

Di dema zarokatiya xwe de helbest, ji devê kesan digirt û bi awazeke xweş, ew helbest distira. Di nava gel de weke Selîm tê naskirin, lê wî di helbestên xwe de navê xwe weke Ehmed daye nasîn. Qenatê Kurdo jî vî helbestvanê me weke Selîm Silêman bi nav dike.

Li gorî ku Qenatê Kurdo diyar kiriye, Selîm Silêman di dawiya Destaneya Yûsiv û Zuleyxayê de daye xuyakirin ku ew helbestvanê mîrê Hîzanê ye û bi mîrê Hîzanê bandor bûye. Di malikê de jî wiha dibêje:

**"Selîm dil men Silêman im**
**Esîrê mîrê Hîzan im"**

Weke ku di belgeyên di destê me de hene, Selîm hemdemê Şerefxanê Bedlîsî ye.

## Destana Yûsiv û Zuleyxa

**Ema bi se'adat û bi 'enwan**
**Behsê bikin em ji Pîrê Kenan**

**Ev reng ji axretê di mezherî**
**Yûsiv bi cemal bûye meşhûrî**

**Xwîna xwe ji bo mêran beyan ke**
**Teqerîr bike li me eyan ke**

**Yaqûb wî hebû keçek xeber saz**
**Wextê ji peder bihîstî ev raz**

**Beyitî bi me re li koh û çiyan**
**Reh şibhetê teyrekî bihuştan**

### Lêkolîn

Destana **Yûsiv** û **Zuleyxa** lêkolîn bike û hewl bide ku tu çend malikan jê binivîse.

# Agahiyên Wêjeyî

Ji wekheviya du peyvan, an jî pêvekên di heman wate û erkê de dikevin piştî rêzbenda rêzikên helbestê re, **"Paşînk"** tê gotin. Di demên dawî de hin nivîskar, ahenga helbestê tenê bi paşînkê ve çêdikin û her çi qas paşînk di wateya xwe de rêzbenda piştî rêzbendê jî be, rêzbend bi kar anîne.

Paşînk, di nava xwe de dibe sê beş:

## 1. Paşînka bi peyvê çêdibe:

Ew paşînka ku ji peyvan çêdibe.

Mînak:

Ji kul û kêmasî û tengiyan d**er**çûm → paşînk
→ rêzbend

Dersa xwendina seretayî zû bi s**er**çûm → paşînk
→ rêzbend

Wane 9

# ŞÊX NÛREDÎNÊ BIRÎFKANÎ



Navê vî helbestevanî, Nûredîn e û kurê Şêx Evdilcebar e. Weke Şêx Nûredînê Birîfkanî tê naskirin. Di sala **1791**`ê de li gundê Birîfkanê ji dayîk bûye. Birîfkan, gundekî ku bi çend kîlometreyan ji bajarê Dihokê dûr e. Ev wêjevan, di zarokatiya xwe de li cem bavê xwe dixwîne; Quranê û hin pirtûkên din ên olî xwendine. Piştre, çûye hucreya feqeyan. Ji bo xwendinê, li piraniya herêmên Kurdistanê geriyaye. Li Silêmaniyê, li cem Şêx Yusiv Efendî xwendina xwe qedandiye.

Li gorî agahiyan, malbata Şêxê Birîfkanê, ji Xelatê çûye Başûrê Kurdistanê. Li Başûr, hem zanistên gelêrî, hem jî ya feqetiyê dane fêrkirin û rêya rast şanî gel daye. Ji ber van sedeman, şêniyên herêmê ji vê malbatê pir hez kirine û vê malbatê jî nexwestiye wan bişemirînin. Şêx Nûredîn, weke yek ji helbestvanê xwedanasiyê yê kurd tê naskirin.

Ji bilî dîwana xwe ya ku bi zimanê kurdî û erebî nivîsandiye, çend pirtûkên din jî bi zimanê erebî li ser rêz û rêçikên xwedanasiyê nivîsandine. Helbestên wî hem olî, hem jî civakî ne. Di sala **1852**'yan de, di temenê **61** salî de jiyana xwe ji dest daye û li goristana Birîfkanê hatiye veşartin.

## Helbesta Şêx Nûredînê Birîfkanî:

**Rast û çep tîr dane canî rast û çep**
**Qews û reştozê kevanî rast û çep**

**Bê dil û însaf û zalim fitne xîz**
**Sîne xirbal kir nihanî rast û çep**

**Ez hal xwî da bûm me dî bê mirwetan**
**Rête canî min nîşanî rast û çep**

**Tîr û rim dil ma di navê helqe reng**
**Min bi ehwalî nezanî rast û çep**

**Erze dil lew wê dibarit her le ser**
**Şubhê qetrê asîmanî rast û çep**

**Xem ji min nehilgirt lew hucetan**
**Lêk têk bir têne bihanî rast û çep**

**Lê me her dewrane şubhê kiljinî**
**Em lê dewra baxabanî rast û çep**

**Vê cefayê her le nefsa xo diket**
**Bes yeqîn bê şik nezanî rast û çep**

**Ez birîndarê kevanê mal helek**
**Ew Zilîxaya zemanî rast û çep**

**Lê bila fida bit her tenê**
**Dîlberê bînim dixanî rast û çep**

**Ehmedê muxtare dilber nuriya**
**Kamîrat û kamuranî rast û çep**

**Cergê îtûnî te kir armancê tîr**
**Şubhetê Şêxê Yemanî rast û çep**

Wate: Ji rast û çep tîr avêtin min, navmil û singa min, weke bêjingê kun kun kirin. Ez, ê ku di rewşa xwe ya herî baş de bûm, ji nişka ve tîr ketin nava giyanê min. Dilê min weke zeviyekê ye û tîr jî weke baranê rijiyane ser laşê min. Xem û nexweşî, dest ji min nagirin, bi tîran re hev girtine û li hemberî min rawestiyane. Ez evîndarê vê kevanê me ku yarê ji min re avêt û ew jî Zelîxaya serdemê ye. Bila bibe qurbana vê yekê.

Belkî di vê rêyê de çavên wî pê bikevin. Ew dilbera Ehmedê Muxtar e, tenê ew xweşî, kamîranî û bextewarî ye ku cerg lê gerim kir armanca tîrê weke Şêxê Yemanî ku rast û çep lê dane.

**Reştoz:** Tîr

**Insaf:** Dadmendî

**Sîne:** Sing

**Mirwet:** Başî

**Rêhte**: rê kir, şand

**Heleqe:** Xelek

**Ehwal:** Rewş

**Qetrê:** peşka baranê, çelap

**Hucete:** Bihane

**Muxtar:** Bijartî

**Kamîranî:** kêfxweşî, dilşadî

**Cerge:** Kezeb

**Îtûnî:** Pîzot

**Şêxê Yemanî**: Şêxê Senaniyan

## Pirsên Nirxandinê

- Gelo pirtûkên ku bi zimanê erebî hatibûn nivîsandin raje ji wêjeya kurdî re kirin, an na? Rave bike.

- Şêx Nûredînê Birîfkanî, bi kîjan hişmendiyê pirtûkên xwe nivîsandine?

- Helbesta Şêx Nûredînê Birîfkanî bi çi rêbazî hatiye nivîsandin?

Wane 10

# PERTEW BEGÊ HEKARÎ




Pertew Begê Hekarî, navê wî yê rast, Mistefaxan e. Ji malbateke rewşenbîr e û kurê mîrê Hekarî ye. Di sala **1777**'an de li Colemêrgê ji dayîk bûye, di sala **1841**`ê de jiyana xwe ji dest daye û li Colemergê hatiye veşartin. Di dibistana mîrnişînê ya Kurdistanê de xwendiye. Pertew Begê dîwana xwe ya helbestan, di sala **1802** 'yan de nivîsandiye û Sadiq Behadîn Amêdî dîwana Pertew Begê berhev kiriye û dîsan bi tîpên erebî di sala **1978**`an de li Bexdayê çap kiriye. Cara dawî jî Zeynelabidîn Zinar, dîwana wî wergerandiye alfabeya latînî. Di sala **1989**'an li Almanyayê ji aliyê weşanxaneya Rewşen ve hatiye weşandin.

Bi helbestên Melayê Cizîrî bandor bûye, ji ber vê yekê jî di helbestên xwe de rêbazê Melayê Cizîrî bi kar anîbû. Piraniya naveroka helbestên Bertew Beg evînî û dildarî ne. Hin helbestên wî yên dildariyê mîna helbestên Melayê Cizîrî ne û piraniya wan bêserenav in. Di wan helbestan de, hem hizira evîniyê û hem jî çînayetiyê (dewlemendî-belengazî) tên gotin.

Li gor Sadiq Behadînê Amêdî, du dêwanê Pertew Begê Hekarî hene û ew jî ev in:

- **Şah Pertew Hekarî Ebas**
- **Dîwana Pertewî ya rast**

Di dîwana Pertewî ya rast de **174** serenav û **1.758** malik hene. Di malikekê de Pertew ji evîndara xwe re wiha gotiye:

**"Ecêb letîf e, cundî ye, ezman nizane kurdî ye**

**Ageh ji uşaqan niye, mest im ji xemra layezal"**

## Helbesta feqîran:

**Wê ji xezman ku me dîtin şuhmetî koma teter**

**Fitne peyda bûn ji her yek goşeyê sê sed hezar**

**Eskerê tirkan û mestan bûn ji etrafan diyar**

**Way ber halê feqîran, dê keve hewar**

**Nîne esla melceyek cuz saye zilfa eqab**

## Wateyên peyvan:

| | |
|---|---|
| **Xezm:** Meriv | **Şuhmet:** Hejmareke mezin ji mirovan. |
| **Mest:** Serxweş | **Etraf:** Kêlek |
| **Keve**: Ketin | **Melce:** Cihê biewle. |
| **Cuz:** beş, parçe | **Zilfa Eqab:** Zilfa reş**.** |

### Pirsên Nirxandinê

P) Vê malika li jêr şîrove bike:
**"Ecêb letîf e, cundî ye, ezman nizane kurdî ye**
**Ageh ji uşaqan niye, mest im ji xemra layezal"**

Q) Li gorî helbesta **"feqîran"**, hûn hizirê netewî li cem Pertew Beg çawa dibînin?

R) Li ser jiyana Pertew Beg gelek nêrîn hatine gotin, lêkolîn bikin û nêrînan binivîsin.

Wane 11

# SIYAHPÛŞ



Ji hozan û helbestvanên me yê klasîk, Siyahpûş jî heye. Ew bi xwe ji kurdên soran e, lê bi tena serê xwe ji malbata xwe qut bûye û berê xwe daye Bakûrê Kurdistanê; li navçeya Silîvayê bi cih bûye. Wekî helbestvan û nivîskarê kurmancî yê pêşîn li navçeya Silîvayê tê nasîn.

Reseniya navê wî Siyahpûş an jî Siyehpûş e, lê ji ber ku kurmanciya Farqînê nazik û hêsan e, bi navê Siyapoş hatiye binavkirin. Bi kurdî tê wateya reşpêçayî yan jî kesê ku cilên reş li xwe dikin. Dîroka jidayîkbûna wî nayê zanîn, lê di helbestên wî de xuya ye ku ew piştî melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî ye, ji ber ku di helbesta xwe de wiha dibêje:

**"Dil ebirûmes û mîrê**
**Da li min derbek bi têrê**
**Kirme hibba zemherîrê**
**Kanê Melayê Cizîrê**
**Xanî Şêxê Babeşîrê**
**Xemrî gîs û herîrê"**

Ji vê şeşîneyê jî tê xuyakirin ku çawa navê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî bi me re, derbas dibe. Weke tê zanîn, Mela di serê sedsala 16`an de jiyaye. Jixwe Ehmedê Xanî jî di dawiya sedsala 16`an de heta serê sedsala 17`an de jiyaye.
Ji van şîroveyan em tê de dighêjin ku Siyahpûş piştî Ehmedê Xanî ji dayîk bûye.

Weke tê xuyanêkirin Siyahpûş berî ku berê xwe bide Farqînê, li gelek deveran geriyaye û çûye cem zana û mîran. Paşê dema

dibihîze ku li Farqînê zanist bi pêş ketiye, zana û mamosteyên mezin û hêja li wê derê hene, berê xwe dide Farqînê û paşê çûye Hekar, Tehran û Bexdayê.

Bi zimanê kurdî, erebî û farisî dizanîbû. Tê gotin ku ew hemdemê Ismaîlê Bazîdî ye ku di sala **1654-1704**`an de jiyaye.

Em van malikên li jêr bixwînin ku tê de çûna xwe ya ji Îranê ber bi Bexdayê ve dide xuyakirin:

**Ji ya yewme yekûnunnasu pur xewf û muşewweş tê**
**Siyahpûş xweş nezim anî temamê herfê hêcaê**

**Me xwar camek şeraba xweş bi destê saqiyê mehweş**
**Wekî min hiştî Îran û berê xwe daye Bexdayê**

Siyahpûş di hin helbestên xwe de, peyva **Îranî** bi kar aniye, em jî li gorî ku bi me re derbas bûye, wêjevan li gorî dera ku lê jiyaye, an jî dera ku lê ji dayîk bûye nasnavê xwe ji wir digre. Mînak: Melayê Cizîrî, ku ji Cizîra Botanê ye û hwd.

## Berhemên wî:

W)Destana Seyfulmulûk
X) Xezel
Y) Dîwana Helbestan

## Helbesta Xezelî ya Siyahpûş: Dîlberek min dî

**Dîlberek min dî bi çavan
Sed elîf pabûsî bû
Agirek berda hinavan
Şemh û der fanûsî bû**

**Şemh û rihniya zilamê
Agirek berda di 'amê
Zilf û xalên di temamî
Qeyd kirin mehbûs ba damê**

**Şerbeta şîrin kelamê
Terkî min nedît midamê
Sed şikir îro selamê
Kir li min teze xulamê**

**Şerh û teqrîrê îslamê
Fikir û teswîrê kelamê
Reng û elwanê di Camî
Şuhbetê tawûsî bû**

**Şuhbetî çavê di rengê
Qews û ebrûyê di bengê
Mirarê tîra xedengê
Zilf û xal xinçe rengê**

**Kes nedî qet wî çi rengî
Nexşê Maçîn û Firengê
Qet nema qet wî çi rengî
Hikmeta Tîmûr û Lengî**

## Wateyên Peyvan

**Pabûsî:** Dirêj û lihevhatî
**Şemh:** find, mûm
**Zilamê:** Tarîtî
**Di'amê:** Stûn
**Mehbûs:** Girtî
**Terkî:** Paç
**Fireng:** Xaçperest

**Teswîr:** Dîmenên wêjeyê; şibandina bi tiştekî
**Qews:** Kevan
**Ebrû:** Birû
**Bengê:** Avakirin
**Maçîn:** Moxolî

## Pirsên Nirxandinê

- Siyahpûş bi çi rêbazî helbestên xwe nivîsandiye?

- Me li jor gotiye:"helbeasta Xezelî", gelo **"Xezel"** çi wateyê nîşan dide? Şîrove bike û diyar bike ku Xezelî ji kîjan beşa helbestê ye û cudahiya di navbera helbesta Xezelî û ya Tesewifê (derwêşiyê) de, binivîse.

# BEŞA SÊYEM

Celale Xanima Loristanî

- Fatîme Loreya Goranî
- Xatu Mey Zerd
- Yay Hebîbeya Şarezûrî

Wane 1

# CELALE XANIMA LORISTANÎ



Di dîroka wêjeya kurdî de, cihê jinê yê taybet heye. Bi saya wan jî ev wêje dewlemend bû û bi pêş ket. Em ê di vê beşê de, li ser çend wêjevanên jin biaxivin û yek ji wan jî Celale Xanima Loristanî ye.

Celale Xanim, ew jina ku di civaka xwe de, xwediya hestên nazik û coşeke pir bilind û girîngiyeke pir mezin bû.

Celale Xanima Loristanî: Di sala **998**'an de li Loristanê ji dayîk bûye û di nîvê sedsala **11**'an de çûye ser dilovaniya Xweda. Navê bavê wê, Mîrza ye û navê dayîka wê Emanelah e.
Tevî ku di mijarên nivîsandin û xwendina helbestan de şareza û pispor bû, di aliyê din de jî gelek rê û rêzikên baweriya yarîsanî pêk tanîn û li tembûr û hin amûrên din ên muzîkê, dida. Di encumena wê de ya bi navê "Ronahiya Xweda" hemû oldar, wêjevan, kesên zana û xwediyên bîr û baweriyan, li hev vedihewiyan û stranên olî distiran.

Celale Xanima helbestên xwe bi awayê çaryane û bi rêk û pêk dinivîsand. Di helbesteke xwe de wiha gotiye:

**Ey kake Reda, siwar dana**
**Î ferman ama ce heft asmana**
**Xelqê loristan we zoş mezana**
**Paken Celaley Mîrza Amana**

Wate: Ey kake Reda, ey şahsiwarê hêja û mezin! Ev ferman a asîmanê hefta ye, dibêje:"Divê tu Şa Xweşîn bînî dinyayê". Her çi qas xelkê Loristanê bibêjin ew pîç e, lê belê ez Celale keça Mîrza me, hertim pak im.

Di çaryaniyeke din de jî Celale Xanim efsaneyekê bi awayê helbestî bi navê "Bilbil û Gul" dinivîse û tê de wiha dibêje:

**Yaran perê bo, yaran perê bo**
**Zarîken, çenî Bulbul perê bo**
**Ez ew wilenan, amam we lay to**
**Ane petman wêm westim ce no**

Wate: Gelî hevalan! Beşdarî êş, girî û azarên bilbil bibin ku wî nû yariya xwe "Ebîr" winda kiriye; bi wî re alîkar bin, azarên wî parve bikin.

Ey bilbilê awazker, ez ew gul im ku bi te ve hatime, heta ku soza xwe ji nû ve saz bikim ku careke din te bi "Ebîrê" re hevjîn bikim.

## Lêkolîn:

Efsaneya Celale Xanim a bi navê "Gul û Bilbil" lêkolîn bike:

- Te çi sûd ji efsaneyê girt? Gelo berê te xwendiye yan bihîstiye?
- Hevrûkirinê di navbera Celale Xanim di aliyê jidayîkbûna "Şa Xweşîn" û Meryema Ezra ji aliyê jidayîbûna "Îsa" de, çêke.

Wane 2

## FATÎME LOREYA GORANÎ



Ev wêjevana jin a oldar, li bajarê Hemedanê di sedsla 11'an de ji dayîk bûye. Tê gotin ku ew hemdema helbestevanê mezin Baba Tahirê Hemedanî ye. Keça Babe Loreyê Loristanî ye, ji êla Bîrîşahê Goran bû û bi navê Fatîme Lore bi nav û deng bû. Dibêjin wê dev ji xweşiya jiyanê berdaye û xwe ji xwedanasî, sofîtî û derwêşiyê re, vala kiriye; hemû jiyana xwe li vê barê qedandiye.

Fatîme Loreya Goranî, di heman sedsalê de jî jiyana xwe ji dest daye. Ew li rex gora Baba Tahirê Hemedanî, spartine axê.

Yek ji wan wêjevanên ku helbestên xwe bi lêdana tembûrê re digot. Ew di lêdana tembûrê de şareza, jêhatî û zîrek bû. Helbestên xwe bi awayê çaryane dinivîsand. Tê gotin ku Baba Tahirê Hemedanî ketibû evîna wê û ji Şa Xweşîn tika kiribû ku bibe navgîneke di navbera wan de û bi wê re pevjîn bike. Lê Şa Xweşîn gotiye hûn ê hev û du li bihuştê bibînin û bigihêjin hev. Dema ku Baba Tahir Şa Xweşîn dişîne ba Fatîmeyê heta ku bi Baba Tahir re hevjîn bibe, bersiva xwe bi helbestekê ji Şa Xweşîn re dibêje, helbest jî ev e:

**Giyan perê çêş en, giyan perê çêş en**
**Her kes tu daru giyan perê çêş en**
**We namit sewgend derûnim bêş en**
**Bê to giyan û zêl hemîşe rêş en**

Wate: Ey Şa Xweşîn, bê te giyan tune ye û diêşe, pêwîstiya te bi giyanan tune ye. Sûnd bi navê te, dema ku tu diçî hemû endamên laşê min ji êş û birînan kul dibin.

## Pirsên Nirxandinê

P) Fatîme Lore ji ku derê ye û ji kîjan êlê ye?

Q) Çima bi Baba Tahirê Hemedanî re hevjîn nebû?

R) Hewl bide ku tu helbesteke din a Fatîme Loreya Goranî, bîne û binivîse?

Wane 3

# XATU MEY ZERD



Xatu Mey Zerd, ku bi navê Mey Zerdê tê nasîn li Loristanê ji dayîk bûye û li Çiyayê Yaftekoyê jiyana xwe ji dest daye û li wir wê spartine axê. Xatu Mey Zerd di sedsala 11'an de ji dayîk bûye û di heman sedsalê de koça dawî kiriye. Di **12** saliya xwe de çûye cem Şa Xweşîn û li ba wî fêrî rêz, rêçik û bingehên Yarî bûye.

Di hucreya Şa Xweşîn de, dest bi nivîsandina helbestan kiriye û di wir de jî hestên wê yên hunrî derdikevin pêş. Ji ber ku di hucreya Şa Xweşîn de bû û li ber destê wî fêrî gelek tiştan bûye, dergeh ji bîr û baweriyên wê re vebûne û ev bû sedem ku Xatu Mey Zerdê hestên xwe derbirîne. Ji ber vê yekê, wê gelek helbest li ser Şa Xweşîn gotine.

Di gelek cihan de Xatu Mey Zerd, balê dikşîne ser serdema zarokatiya Şa Xweşîn û bi taybet dema ku leşkerên Rûmiyan êrîş birin ser herêma Loristanê; her kes ji mala xwe derketin. Celale Xanim û Mîrza jî Şa Xweşîn di destê wan de bû û bi rê ketin heta ku gihaştin herêmeke biewle û bidarûber bû. Lê ji nişka ve leşkerên romî di wê herêmê de derketin û êrîş birin ser wan. Tê gotin ku di wê demê de mirovekî hêzdar derdikeve û bi tena serê xwe li hember romiyan şer dike û wan tarûmar dike, ji ber vê Celale Xanim dibêje ev Şa Xweşn bû. Xatu Mey Zerd jî li ser wiha dibêje:

**Xweşîn cebar, Xweşîn Cebar**
**Hezar siwar ama yo şahen cebar**
**Cebar Xweşîna êmeşan şikar**
**We rehmetewe bijendî diyar**

Wate: Ey Şa Xweşînê ku di xwedanasiyê de bihêz û zordar e, di vê dinyayê de min bi hezaran siwarên xwedanasiyê yên ku hatine vê derê, dîtin. Lê tenê yek siwarê bihêz heye; ew jî Şa Xweşîn e. Wî bi hêza xwe ya xwedanasiyê me aniye ser vê baweriyê.

Di serdema jiyana Xatu Mey Zerdê de, çend kesên ku pêşengên Yarî bûn derketin holê û ew jî ev in: Pîr Şariyarê Yekem, Sultan Çelewî, Babe Feqê, Babe Hesen, Babe Tahir, Kake Reda û hwd. Xatu Mey Zerd, ji bo payebûn û bilindkirina pîrê xwe, ew ketiye nava hewldanan û berhem afirandiye û helbest vehûnadine.

Li ser pîr Şaryar (Şalyar) wiha dibêje:

**Şehreyar mest, şehreyar mest**
**We rehmetewe biwêmî sermest**

**Diyar bijendî we hey dest hey dest**
**Xiwacam ney hejmet wene neyo kest**

Wate: Ey pîr Şalyarê sermest, derfetê bide ku em hemû li vê herêmê ji ber giraniya xwedanasiyê serxweş û sermest bibin û em rê bidin biyanan bila bêne herêma me û em derî li wan bigirin.

## Pirsên Nirxandinê

P) Xatu Mey Zerd alîgira kê bû?

Q) Ji bo çi her kes ji mala xwe derket û berê xwe dan herêmên din?

R) Helbestên Xatu Mey Zerdê, bi çi rêbazî dihatin nivîsandin û piraniya wan li ser çi bûn?

Wane 4

# YAY HEBÎBEYA ŞAREZÛRÎ



Li gorî hinan, ev helbestvan, di sedsala 14'an de jiyaye û navê wê Hebîbe ye. Hebîbe, keça Şêx Sedredînê Şarezûrî ye. Li gorî bîrnivîsên Qerendî, ev helbestvan, di sala **1282**`yan de li gundê Yawa ji dayîk bûye. Di destpêkê de, Hebîbeyê li cem bavê xwe xwendiye û piştre jî çûye dibistanê. Bi xwendina rêzimana erebî, bi wêjeya erebî û farisî ve mijûl bûye. Piştî wê, bi birayê xwe re çûye Helwanê û li wir du salan feqetiya islamê kiribû û lêkolînên li ser Quranê xwendine.

Dema ku ew vegeriya malê, dît ku bavê wê jiyana xwe ji dest daye. Ji ber vê êşê, ji wir diçe. Hezkirina xweda, ew ber bi evînekê ve dikişand. Ji ber vê yekê, wê û birayê xwe rêya Şêxanê girtin û li wir dibe kevoka baskşkestî ya San Sehak û rêz û rêçikên rêbaza Yarî hîn dibe.

Temenê xwe yê maye, bi dayîna waneyan û rênîşandayîna gel ve derbas kiribû. Hevjîn nebûye. Di sala **1348**`an di **66** saliya xwe de jiyana xwe ji dest daye û li goristana Şêxanê hatiye veşartin. Ji Hebîbeyê, gelek berhem û helbestên şîrîn û xweş mane. Tevahî berhemên wê, di pirtûka Serencamê de hatibûn bi cih kirin.

## Helbesta Hebîbeya Şarezorî:

**Ezîz binyama, Ezîz binyama**
**Ezîz şertiman çenî binyama**

**Ha peyrow, şertî ce girdin cama**
**Sikey başlixman be binyam wama**

**Be derya westen, be derya westen**
**Bargey binyamiman be derya westen**

**Yurt gilême kol ce keştî resten Ha**
**binyamîna ce koy xem mesten**

**Aramîman niya aramîman niya**
**Ezîz bê binyam aramîman niya**

**Pey adî şadî behşetî biya**
**Taze û naxûniman mekeve çiya**

**Ha ce keştî da, ha ce keştî da**
**Yurt remzbarî ha ce keştî da**

**Serafa çenî, xelk û reştî da**
**Elemdar û çerx çew zeştî da**

**Wate:** Ey rêberê min ê xoşewîst, her di roja berê de, me bi Binyamîn re peyman girê daye. Ew di her awayî de, pir rêz û rêçên me ye û em tenê serî dispêrin wî. Bargeha Binyamîn li deryayê ye û niha di qalibê hiriyê û bi tûrikekî di nava keştiyê de dijî. Ew li çiyayê nerihetî û nexweşiyê, serxweş û mest e. Ey rêberê min ê xoşewîst! Bê Binyamîn aramiya me tune ye û ew ji me re şahî û bihuşt e. Em nikarin ji wî dûr bimînin. Vaye Remzbar jî di keştiyê de ye û di keştiyê de zêr û gewheran diguhêre. Ew alhilgirê vê demê ye.

## Pirsên Nirxandinê

W) Yay Hebîbeya Şarezûrî li ku derê ji dayîk bûye û li ku derê jiyana xwe ji dest daye?

X) Yay Hebîbe, kîjan wêje bi pêş xist û çima?

Y) Navê Şa Xweşîn di gelek helbest û berheman de derbas bûye:
Şa Xweşîn kî ye? Lêkolîn bike.
Çîroka serkeftina Şa Xweşîn a li dijî roman binivîse.
Çima gelek helbestvanên Yarîsanî ew pîroz didîtin? Rave bike.

## AGAHIYÊN GIŞTÎ

Baweriya Yarî, baweriyeke herî kevin a herêma Kirmanşahê ye. Bi kurdî weke Yarsanîzm, farisî, Yarasanîzm û ereb jî wan weke Ehlulheq didin nasîn. Lê tê gumankirin ku koka vê baweriyê, ji koka êzdatiyê ye. Ji ber vê yekê, ji gelek aliyan ve weke hev in.

Li gorî hin çavkaniyan, ev bawerî di sedsala 8'an de ji aliyê Behlûlê Mahî ve weke ol, an jî rêol (mezhebekî) hatiye sazkirin. Ev bawerî bi helbest û muzîkê ve tê ragihandin. Di zivistanê de weke elewiyan sê rojan, rojiyê digirin û li ser êgir bi rê ve diçin. Niyazên (dûayên-lavayên) wan bi kurdî ne.

# BEŞA ÇAREM

☠✆ Mele Mensûrê Girgaşî

⚐✆ Nalî Şarezûrî

⚐✆ Têkiliya di navbera dibistana wêjeyî û hizirê de

✈✆ Hin ji destpêkên wêjeya kurdî

Wane 1

## MELE MENSÛRÊ GIRGAŞÎ



Navê vî helbestvanê me Mensûr e; kurê Mele Ehmedê Girgaşî ye. Li gorî çavkaniyên di destên me de hene, ew di sala **1783**`yan de li gundê Girgaşê ji dayîk bûye. Girgaş, gundekî biçûk e ku dikeve rojhilatê bajarê Amedê. Mensûr, di zarokatiya xwe de li cem bavê xwe dixwîne. Piştre çûye hucreya feqeyan û ji bo xwendinê li gelek herêmên Kurdistanê geriyaye. Demekê li Amedê xwendiye û xwendina xwe, li Bedlîsê bi dawî kiriye. Girgaşî, temenê xwe yê mayî, bi dayîna waneyan û rênîşandana gel ve derbas kiribû.

Di sala **1846**`an de jiyana xwe ji dest daye û li Girgaşê spartine axê. Mele Mensûr, weke yek ji helbestvanên herî mezin tê pejirandin. Ew di ristin û hûnandina helbestên evînî, olî û xwezayî de, xwediyê hizirîneke mezin û pêşketî bû. Wisa diyar e ku Mele Mensûr jî weke piraniya helbestvanên din, evîndarê xweşikbûna xwezaya herêma xwe bû. Vê yekê, deriyê hûnandina helbestê jê re vekiribû. Di destpêka her helbesteke xwe de dabaşa xweşbûna bihar û xwezaya Kurdistanê kiribû.

### Helbesta Mele Mensûrê Girgaşî

**Cobar û bax û bostan kamil bibûn tevave**
**Şehlûl û endelîb bûn meşayane hatne nave**
**Cewab bibine reqîban mal nêrgiza xunav e**

**Nêrgiz bişkov daye sosin hem xurûş e**
**Lale pir cefa ye sumbul bi qaba pûş e**
**Bihareke ela ye sosin zêrîn gurûş e**

Wate: Helbestvan pesnê xwezaya welatê xwe dide. Bax bistan û robarên wî bi gul û kulîlkên rengereng xemilîne. Şalûl û bilbil bi serbestî awazan dixwînin. Li hember çavnebariya dexsok û çavnebaran, tîne zimên. Nêrgiz bişkivîne û sosin bi xunavê, ter û şil bûne. Bihar geş bûye, sinbil û lale nû digihên.

## Wateyên peyvan:

**Tevave:**Tevahî

**Şalûl û endelîb:** Cureyek ji cureyên firindeyan e.

**Cewab:** Bersiv

**Reqîb:** Çavdêr

**Xunav:** Barana hûr

**Bişkov:** Xunc, bur'im

**Xirûş:** Coş

**Lale:** Zembeq

**Qaba pûş:** Bergê simbilê

## Pirsên Nirxandinê

L) Mele Mensûrê Girgaşî, helbestên xwe bi piranî li ser çi nivîsîne?

M) Vê malika li jêr şîrove bike:

**"Nêrgiz bişkov daye sosin hem xurûş e**
**Lale pir cefa ye sumbul bi qaba pûş e**
**Bihareke ela ye sosin zêrîn gurûş e"**

**2- Paşînka bi pêvekan pêk tê:**

Paşînka ku ji pêvekan pêk tê :

Mînak:

Nêrgiz bişkov daye sosin hem xurûş e → paşînka bi pêvekê rêzbend

Lale pir cefa ye sumbul bi qaba pûş e → paşînka bi pêvekê rêzbend

Bihareke ela ye sosin zêrîn gurûş e → paşînk bi pêvekê rêzbend

**3- Paşînka birepeyv:**

Li dawiya rêzikên helbestê, birepeyvên ku di heman wateyê, yan jî heman erkê de ji bo ahengê tên bikaranîn, **paşînka birepeyv** tê gotin.

Mînak:

Rast û çep tîr dane canî **rast û çep** → paşînka birepeyv rêzbend

Qews û reştozê kevanî **rast û çep** → paşînka birepeyv rêzbend

Wane 2

# NALÎ ŞAREZORÎ



Navê Nalî yê rast, Mele Xidir e; ew kurê Ehmedê Şaweysê Mikaîlî ye. Nalî bi xwe, nasnavê wî ye. Li ser dîroka jidayîkbûna wî, gelek nêrîn hene. Lê li gorî Elaedîn Secadî ev wêjevan di sala **1797**`an de li Şarezorê, li gundê Qeredaxê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî, li Silêmaniyê li cem Mele Ebdileyê Reş dest pê kiriye. Diçe Xaneqa Mewlana Xalid, piştre diçe Şamê û du-sê salan li wê derê dimîne. Li wê derê, bêriya Silêmaniyê dike û helbesteke bi navê "Qurbana hindek rêyan de bin" dinivîse. Ji Şamê, diçe Stenbolê û li wê derê, mezinên kurdan nas dike. Dibe nasê Ehmed Paşayê Babanê û derbarê wî de helbesteke kurdewarî ya bi navê "Ta Felek Dewir Neda Ser Kewkeba Wî Ava Nebû" dinivîse.

Wêjenasên kurd, Elaedîn Secadî, Gêwî Mukriyanî û Merûf Xeznedar û yên din, Nalî weke pêşengê wêjeya kevnar ê başûrê Kurdistanê dibînin. Nalî, weke gelek wêjevanên dema xwe, evîndarê xweşikbûna welatê xwe bû. Her çi qas di helbestên wî de navê Hebîbeyê weke evîndarekê bê dîtin jî, lê em bawer dikin ku peyva Hebîbeyê ya ku di wateya evînê de ye, ji bo evîndariya warê xwe bi kar anîbû.

Helbestên Nalî, bi piranî helbestên têkel in; hem dildarî, hem jî welatparêzî ne. Ji ber êşa dildariya welatparêziya xwe û neyekbûna gelê xwe, wî nasnavê xwe kiribû Nalî. Nalî, di sala **1855**`an de jiyana xwe ji dest daye. Dîwaneke helbestan li şûna xwe hiştiye. Lê mixabin, gelek helbestên wî yên hêja û binirx hene, ku di dîwanê de cih negirtibûn.

## Helbesta Nalî

**Mûy spî kirdim be şûştim avî eynî şor û şet**
**Şor e şet yeinê ket ê de xo qelb û be bet**

**Helgira, wek momî kafûrî beşew da mû be mûm im**
**Wa siyarû bû be xwênim nuqte nuqte xet bi xet**

**Min delêm şew bû be roj nefsim delê roj bû be şew**
**Ew musîbe çunke çawî pê spî bû min xelet**

**Rewxenî dide rijaye serkitabî xetî xom**
**Çaw le îşî ew spî nûriş be ser ew da seqet**

**Sard û germ e ahekem sewzegiyay kirdim be pûş**
**Payîz rû bû be burdî sûr û zerdî muxtelît**

**Wechekem îsmî beyaz ema wereq zerd û siya**
**Ba muxetet bê be kafûrî keşîdey xoş nemet**

**Çunke lewhî rû siyah rûzerdî bê tezînî ye**
**Xwênî çawim cedwelî bê qetre kanîşî nuqte**

**Neqşî du mûyî bedewrî rû debête eybî şeyb**
**Ayeney rûpakî ye, rûnakî ye, nûr û şemet**

**Ya gedayek e xenî ya padîşahêk e feqîr**
**Lem duwe xalî nî ye (Nalî) le rûy hedî weset**

Wate: Rondikên çavên min, herikîne li ser mûyên reş ên rûyê min. Hemû weke qeleyên reş ku ketibin nava liv û tevgerê û bibin bi qazeke spî mûyên min ên reş weke şevereşê bû.

Çi niha weke rojê spî bûne! Ez ji nefsa xwe ya temakar û serkêş re dibêjim, êdî ew qas evînî û hestiyarî bes e. Mûyên min ên reş jî spî bûn. Dema pîrîtiyê hatiye. Lê belê ji ber ku ew kurê dahatûyê ye û ji bilî reşatiyê, tiştekî din nabîne. Di bersivê de dibêje: “Na wisa nîn e, mûyên spî reş bûne.” Xwîna çavên min, li cihê rondikan li ser çavên min de rijiyaye. Vêca çavên min ji ber êş û jana rijîna vê xwînê, dîtina xwe ji dest daye. Ji ber wê reşahiya çavên min, nikarin tiştekî bibînin; ango, çavên min bi giştî ronahiya xwe ji dest dane û ez kor bûme.

Her wiha, dema di payîzê de rengê pelên daran zer û sor dibin, bayê pîrîtiyê jî rengê rûyê min bi rondikan ji xwînê zer û sor kiriye. Weke Kurkê Yemenî, rengê min zer û sor bûye. Her çend ku di rastiyê de spî ye, lê belê bi pelên zer, reş û xwînê hatiye poşandin û girtin. Mûyên min ên spî jî ku weke kafûrê bûn, ciwanî û xweşikî, xetxetî kiriye. Ger zer bi pêşdariya rûreşiyê ve hebe, dibe sedema ciwanî û hêjayî ye. Ger mûyên rûyê mirov maş û birinc bin, durengiya pîrîtiyê radigihîne û nîşan dide. Ji ber ku, bi giştî dibe awêneya rûpakiyê. Maş û birinc jî dibin nîşan û awêneyên ronahiyê.

## Wateyên peyvan:

**Maş:** Lopî, lobiye, cureyeke fasûliyan e, lê liba wê hûrtir e.

## Pirsên Nirxandinê

P) Nalî Şarezûrî çima li gelek welatan geryaye û sedem çi bû? Şîrove bike.

Q) Helbestên Nalî bi çi zaravayî hatine nivisandin?

R) Mijara helbesta li jor li ser çi hatiye nivisandin, binirxîne?

## AGAHIYÊN WÊJEYÎ

### Cureyên helbestê yên li gorî sazûmaniya rêzbendê

P) **Helbesta Rast:** Rêzbenda hemû rêzikên malikên helbestê, weke hev in.

Lê belê ger di malikê de rêzika dubare hebe, dibe rêzbenda wê rêzikê cuda be.

**“aaaa/bbbb/cccc/…” ; “aaab/cccb/dddb/…**

**“aaaa/bbbb/cccc/**

Mînak**:**

**Ey serwerê dîn mehbetê, ayetê mukerrem** ⟶ **a**

**Îsmê te di hindî sihûfan, bûye mufexxem** ⟶ **a**

**Lutfa te iblîs ji sema kirine mureccem** ⟶ **a**

**Ger tê nebûya nedibû çerxê muezzem** ⟶ **a**

**“aaab/cccb/dddb/…”**


**Wê şepalê miskî xalê → a**
**Dêm durê gerden şemalê → a**
**Cebheta biska semalê → a**
**Dil ji min bir dil ji min → b**

**Zilf û xalan nûn û dalan → a**
**Wan ji min dil bir bitalan → a**
**Goşeyê qewsê hilalan → a**
**Dil ji min bir dil ji min → b**

**Melayê Cizîrî**

Wane 3

# TÊKILIYA DI NAVBERA DIBISTANÊN WÊJEYÎ Û HIZRÊ DE



Gelek nivîskar û helbestvan bûne pêşengê rêbazeke hizirî, yan jî di nava rêbazeke hizirî de, cih girtine. Wêjevan, di heman demê de, mirovên ku hizirî ne. Bi derketin û pêşketina hizir ve di wêjeyê de jî pêşketin çêbûye. Di zimanê me de, ji ber ku wêje xwediya bingeheke dewlemend e, ev rewş zûtir pêk hatiye. Li aliyê din, guhertin û pêşketinên wêjeya cîhanê jî bandoreke erênî li ser pêşketina wêjeya kurdî kiriye.

Ka çawa di nîvê sedsala **18**`an de, vejandin, rê li ber derketina klasîzmê vekir, li hemberî derketina klasîzmê, romantîzm, li hemberî romantîk, realîzm bi rêzê ve natûralîzm derketin holê. Li hemberî van rêbazên wêjeyê, sembolîzm derket holê. Bi vî awayî, bi derketina her rêbazeke hizirî re, pêşketin di wêjeya me de jî çêbûye.

## Pirsên Nirxandinê

û Pêşketina wêjeyê, encama çi bû?

û Bandora pêşketina wêjeya cîhanî, ya li ser wêjeya kurdî, çawa bû?

û Tu jî çend rêbazên wêjeyê, lêkolîn bike.

# DIBISTANA SEMBOLÎZM

Rêbazeke wêjeyî û felsefî ye, ku hemû têgîn, gotin, helbest, stran û hwd ên di rêya ziman de nayên bikaranîn û gotin, sembolîzm wan derbirîn dike, ev jî bi bikaranîna hin sembol, nîşan, hin gotinên taybet û awazên gotinê ku bi awayekî xurt wateyê derdibire û bi formeke veşartî bandorê li heman wateyê bike, pêk tê. Lê divaye ev wate di gelek cihên berfireh de bê bikaranîn. Di vir de jî em têdigihêjin ku sembolîzm hizir û ramanan bi awayê ne yekser derbirîn û rave dike.

Di sala **1880**`ê de, di nava wêjeyên Ewropayê de belav bûye û girîngtirîn rêbaz di nav helbestên stranî de ye. Şopeke kûr di helbestên cîhanî de hiştiye û stûneke wê yê felsefîk di felsefeye Auguste Comte (Ogêst Kant) de ya rê li pêşiya ramanên cîhanî vedike, heye.

Dibistana sembolîk di **50** salên dawî yên sedsala **19**`an de li Fransayê derketiye û li wir jî bi pêş ketiye û di sala **1886**`an de nû wekî dibistan hatiye naskirin û pejirandin. Helbestvanê firansiz Charles Baudelaire (Çaril Bodlêr) helbesta xwe ya bi navê "name" bi rengekî sembolîk û xwerû nivîsandiye; ev helbest bû nimûneya dibistana sembolîk.

Rambo, yekemîn xwendekarên Bodlêr e, dibêje "helbest ji peyvan tê afirandin, ne ji ramanan û Stephane Mallarme (Stîvan Malarmê) serokê dibistana sembolîk e". Sembolîzm di nava nivîsên helbestvanên Amerîkayî Edgar Allan Poe (Êdgar Alon Pû) û Ernest Miller Hemingway (Arnêst Hîminguway) de tê dîtin.

Sembolîzim di nava kurdan de jî ji demên berê de hetiye dîtin
9. bi taybetî di helbestên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî,
Cegerxwîn, Osman Sebrî û hwd de, bi piranî di aliyê nimandin
10. dîmenên wêjeyî de.

## Taybetiyên dibistana sembolîzmê:

- Sembol
- Nepenî: Helbestvanên vê rêbazê, berê xwe didin nepeniya (veşartin-raz) wateyê û dûrî rêbaza vacî, hûrbînî zelaliyê dikevin, ji ber ku ew wekî pexşanê li van rêbazan dinêrin.
- Muzîka helbestê: Helbestvanên semolîk baldarî li muzîka helbestê, bilêvkirina gotin û malikan kirine û sûd ji enerjiya dengî ya tîp, gotinên kit û pêkhatî, wergirtine. Heta ku ev enerjî li cem kesê/a afrîner derbasî rajeya derbirîna derûnî û veguhêzî yê/a xwendevan bibe. Ji ber vê yekê jî sembolîzman xwe dûrî qeyd û bendên klasîzmê xistine. Helbestên taybet bi xwe nivîsandine û xwe ji rêzbendê rizgar kirin. Ev pexşan jî di helbestên Bodlêr ên bi navê "Helbestên Pexşaneyî yên Biçûk" de hene.
- Zimanê nû: Sembolîzman xwe dûrî zimanê kevin ê klasîk ferhengan xistin, heta ku gihaştiye astekê ku wekî rêbaza azad hatiye nasîn.
- Zimanê hestan: Divê ku helbestvanê vê rêbazê her tim xwediyê hestên geş be.

## Pirsên Nirxandinê

12. Sembolîzm di nava kurdan de, çawa dest pê kir?

13. Helbestvanên sembolîzmê bi çi rengî helbestên xwe dinivîsin?

14. Li ser helbestvanekî ku sembolîzm bi kar anîbe, lêkolîn bike.

## 2- Helbesta Pêçayî

Di vê helbestê de, pêwîst e dengên li dawiya rêzika yekem û ya çarem a helbestê wek hev bin. Her wiha, tê xwestin ku rêzbenda rêzika duyem û sêyem heman bin.

Ev tê wateya: **abba/cddc/effe…**


Mînak:

Daim diçî dengê te tê **a**

Dengê te tê bi roj û şev **b**

Pêl radibin ji mewcê kev **b**

Seyrane ji rengê qudretê **a**




**(Feqiyê Teyran)**

## 3- Helbesta Çeprast:

Di vê helbestê de, wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem a helbestê û ya sêyem pêwîst e. Her wiha, tê xwestin ku rêzbenda rêzika duyem û çarem heman bin.

Ev tê wateya: **abab/cdcd/efef…**

Mînak:

Hêj ji min dil herişandê → paşînk

→ **a**

Sotiyê arê te me → paşînk

→ **b**

Hiş û aqil şewişandê → paşînk

→ **a**

Sews û bîmarê te me → paşînk

→ **b**


**Osman Sebrî**

## Wateyên Peyvan

- **Sews:** dîn, nexweşiya derûnî
- **Bîmar:** Nexweş

Wane 4

# HIN JI DESTPÊKÊN WÊJEYA KURDÎ






11. Mînaka yekem a wêjeya kurdî ya nivîskî, weke ku tê zanîn; helbesta destpêkê ya kurdî ji aliyê Borabaz ve di 330`î B.Z. de hatiye nivîsandin.
12. Helbestvanê destpêkê yê kevneşopiya wêjeya kurdî ya dema islamê, Baba Tahirê Hemedanî û Elî Herîrî ne.
13. Helbestvanê kurd ê derwêşî (xwedanasî) yê destpêkê, Melayê Cizîrî ye.
14. Nivîskarê destpêkê yê netewî, Ehmedê Xanî ye.
15. Ferhenga destpêkê ya wêjeya kurdî, "Nûbihara Biçûkan," a Ehmedê Xanî ye.
16. Rêzimana kurdî ya destpêkê, ji aliyê Elî Termoxî ve hatiye nivîsandin (Tesrîf).
17. Yekem kesê helbestên coş û xirûşê bi awayekî nivîskî çêkirine, Feqiyê Teyran e.
11. Rojnameya destpêkê ya kurdî, Rojnameya Kurdistan e ya ku ji aliyê hin rewşenbîrên kurd û Mîr Miqdad Midhet Bedirxan ve hatiye derxistin.
□ Kovara destpêkê ya ku bi zimanê kurdiya bi tîpên latînî hatiye nivîsandin, Kovara Hewar e ya, ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatibû weşandin.
10. Romana destpêkê ya bi navê "Şivanê kurd," a Erebê Şemo ye.

# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

**Helbest:** Cureyeke nivîsînê ya herî girîng e. Hêvî, aşopî û evînî, hemû bi helbestê, tên vegotin.

**Helbest li gorî mijarê, di nava xwe de dibe heşt beş:**

| | |
|---|---|
| **Helbestên Lîrîk** | **(Stranî)** |
| **Helbestên Pastoral** | **(Şivanî)** |
| **Helbestên Dîdaktîk** | **(Fêrkirin)** |
| **Helbestên Epîk** | **(Destanî)** |
| **Helbestên Satîrîk** | **(Rexneker û Pêkenok)** |
| **Helbestên Dramatîk** | **(Şanoyî)** |
| **Helbestên Felsefî** | |
| **Helbestên Zarokan** | |

10. **Helbestên lîrîk (stranî):** Ev helbest, kelecana ku ji dil tê, bi zimanekî coş vedibêje. Helbestvanên berê, berhemên xwe bi saz û tembûrê digotin û ji bo ku lîr jî amûreke muzîkê ya bitêl e, ji vê helbestê re **helbesta lîrîk** hatiye gotin. Dengbêjên me di van stranên xwe de dabaşa evîn, dûrketin, kovanî, axîn û bêrîkirinê dikirin. Di toreya klasîk de helbestvanên me jî gelek berhemên ji vê cureyê li şûna xwe hiştin. Ji wan kesên herî mezin, Feqiyê Teyran e .

**Mînak: Helbesta lîrîk**

**Ey Dîlbera gerden zerî,**
**Way nazika dêm qemerî,**
**Qamet ji mûma fenerî,**
**Wêran ezim, malim xirab**

**Tarûmar kir can û cism e**
**Pisyar in cîran û xizme**
**Ev xizmet babet tilisme**
**Ay dilê min ay dilo**

**Feqiyê Teyran**

i. **Helbestên pastoral (şivanî):** Di van helbestan de dabaşa xweşikbûna xweza, daristan, zozan, çiya, gund, jiyana şivanan û hesreta jiyana wan tê kirin. Peyva pastoral, tê wateya şivan û şivantiyê.

**Mînak: Helbesta pastoral**

**Ji deng û gemara evan bajaran**
**Were em herin zozanan dîlber**
**Ji kîn û kerba evan dilsaran**
**Were em herin zozanan dîlber**

**Herin zozanan nav bexçê hêşîn**
**Li vêra tune bihar û havîn**
**Quncikê cinnetê ka wer tu bibîn**
**Were em herin zozanan dîlber**

**Fikrî Amedî**

- **Helbestên dîdaktîk (fêrkirin):** Helbestên ku ji bo ramanekê bi yekê/î bide pejirandin, an jî di mijarekê de şîretan li yekê/î dike.

**Mînak: Helbesta dîdaktîk**

**Welatê wek buhiştê tev xêr û bêr**
**Biparêzin wekî şêran bibnin mêr**

**Dused partî ji me 'r nabin, bibin yek**
**Vê êşa min bibînin ev bû xwestek**

**Fîxan Hîmo**

7. **Helbestên epîk (destanî):** Helbestên ku mijara wan şer, mêranî, mêrxasî û welatparêzî ye. Carinan bûyereke dîrokî, yan jî mirovek ku bûye malê dîrokê, bi zimanekî coş tên derbirîn.

**Mînak: Helbesta epîk**
Destana Keleha Dimdimê

**Şehîd bin terka dinê kin**
**Navekî j'xwe ra çêkin**
**Bes e kelê asê kin**
**Rabin vêkra hew lêkin**

**Rabû Xanê zêrînzend e**
**Subhê vikra derbend e**
**Xaliqê cindî dixwende**
**Reşandin zer û qend e**

**(Feqiyê Teyran)**

10. **Helbestên satîrîk (rexneker û pêkenok):** Helbestên ku kêmasiyên civakê û mirovan ên veşartî diyar û rexne dike, têkoşîna van kêmasiyan jî dikin.

**Mînak: Helbesta satîrîk**

**Bes e fesadiyê neko!**
**Beko da'wa çi li me diko?**
**Xwedê malê xerabko**
**Beko bû fesadê dinê**
**Çi dixwaze ji me, Mem û**
**Zînê? Kuro-m evîndarê hev in!**
**Xwedê çavê te birjîne!**

**(Nûredîn Yekta)**

- **Helbestên dramatîk (şanoyî):** Di civakê de bûyerên biêş û keder, bikul û xem vedibêjin. Di vê mijarê de, helbesta kurdî pir dewlemend e. Ji ber ku kurd, demeke dirêj di nava derd, birîn û bindestiyî de mane. Di vê mijarê de bê hejmar helbest hatine nivîsandin.

**Mînak: Helbesta diramatîk**

**Tîp û lekên kurd ketin zinaran**
**Li hawîr bumba bû gullebaran**
**Êrîş dibin der komên neyaran**
**De rabe ser xwe, kurê min rabe!**

**Şev ta sipîdê me nîne qet xew**
**Cihan li ber me dibîte rew-rew**
**Nêrkew nexwenî, çi bî mêkew ?**
**De rabe ser xwe, kurê min rabe!**

**(Cegerxwîn)**

7. **Helbestên felsefeyî:** Helbestên ku bi têgehên felsefeyê hatine hûnandin ku wateyeke wê ya kûr heye.

**Mînak: Helbesta felsefî**

**Ey av û av, ey av û av**
**Ma tu bi işq û muhbetê**
**Mewc û pêlan tavê belav**
**Bê sekne û bê rahetê**

**Bê dev û qîl û pal bibêj**
**Hêdî bi lefzê hal bibêj**
**Ber "Mîm û Hê û Dal"**
**bibêj Şerh û beyana kaxetê**

**(Feqiyê Teyran)**

8. **Helbestên zarokan:** Di van helbestan de dabaşa mijarên taybet bi zimanekî taybet, li gorî derûnî û aşopiyên zarokan tê kirin.

**Mînak: Helbestên zarokan**

**Winda bûye mîrîyek**
**Li bazara mala me**
**Hinek li pêy digerin**
**Li balkon û hala me**

**Mîrî bilez berhev bûn**
**Windayî peyda kirin**
**Alî kirin bi hev re**
**Dê û bavê wî şa kirin**

**(Yehiya Elewîferd)**

# BEŞA PÊNCEM

## Wêjevanên Cîhanî

- Se'dî Şîrazî
- Mensûrê Helacî
- Celaludîn Elrûmî

Wane 1

## SE'DÎ ŞÎRAZÎ



Se'dî Şîrazî, di sala **1210**`an de li Şîraza Îranê ji dayîk bûye. Şîrazî, hem ji aliyê hûnandinê ve hem jî di pexşanê de nivîskar û zanyarekî Îranî yê navdar e. Ji ber ku zimanê kurdî û farisî di koka xwe de, cêwî ne, her du jî arî ne û ji hev du pir bandor bûne. Peyvên di jiyana rojane de tên bikaranîn, piraniya wan, yek in. Mînak: Hejmar, navê rojên hefteyê, xwarin û hwd.

Rista Ehmedê Xanî ya di zimanê kurdî de çi be, rista Şîrazî jî di zimanê farisî de wisa ye. Şîrazî piştî xwendina xwe ya seretayî qedandiye, çûye dibistana fermî ya Bexdayê, li wê derê perwerdeya xwe temam kiriye û li gelek deverên cîhanê geriyaye. Mîna: Anatolya, Misir, Sûriye, Delhî û Azerbaycanê. Piştre, li Nînewayê bûye şêwirmendê began, ji ber vê yekê, li gel zanyariya wî, bûye hişmendekî mezin. Piştî demekê, xwe vedikişîne quncikekê û dikeve xewleyê. Ji ber vê yekê, ew ji aliyê baweriya olî ve peyrewê (mirîd) Şêxê Geylanî bû. Heval û dostên wî, vê rewşa wî napejirînin û wî ji xewleyê derdixin. Êdî dest bi nivîsandinê dike û gelek berhemên wî çêdibin. Ji wan ên ku pir tên naskirin, berhemên wî yên bi navê "Gulîstan û Bustan" in. Ev berhem, bi zimanên cuda jî hatine wergerandin. Şîrazî, di sala **1291**`an de li Îranê jiyana xwe ji dest daye û gora wî jî li Şîrazê ye.

### Berhemên Şîrazî:

- Gulîstana Se'dî
- El'eqil Wel'işq
- Bustan
- Nesî'hetul Muluk
- Teqrîrî Dîbace

Se'dî Şîrazî, tenê ne weke wêjevanekî farisî tê naskirin, ji ber ku têkiliyên wî bi gelên mîna: tirkmen, kurd, ereb û hwd ên

Rojhilata Navîn re hebû, weke wêjevanekî Rojhilata Navîn tê naskirin. Ji bo girêdanên xwe yên olî, xwestiye têkiliyên xwe ji tevgerên cîhanê qut bike û xwe bixe quncikeke perestgehê. Lê ji ber ku derdora wî û nasên wî yên zanayên Rojhilata Navîn bi hunera wî nas dikin, wî ji wê quncikê derdixin û dixin nava wêjeya cîhanê.

## Helbestek ji Gulîstana Şîrazî:

**Di nava du neyaran de wisan baxive**

**Ger bibin dost tu şermezar nebe**

**Şerê di navbera du kesan de mîna agir**

**e Fesadê bextreş darkêş e**

**Demê her du alî bi hev şabin**

**Ew di navberê de bextreş û şermezar e**

**Di navbera du kesan de agir hilkirin**

**Ne tiştek rast e**

**Xwe di navê de şewitandin e**

**Bi axaftina dostan re aram be**

**Da ku dijminê xwînxwar guhdarî te neke**

**Tişta tu li ber dîwarî dibêjî şiyar be**

**Da ku li pişt dîwarî guhdar nebe**

**Têbînî: Helbest wergerandî ye.**

## Pirsên Nirxandinê

1. Gelo Se'dî Şîrazî di ristina helbestên xwe de çawa bû?

2. Van malikên li jêr rave bike:

**"Di nava du neyaran de wisan baxive**
**Ger bibin dost tu şermezar nebe**
**Şerê di navbera du kesan de mîna agir e**
**Fesadê bextreş darkêş e**
**Demê her du alî bi hev şabin**
**Ew di navberê de bextreş û şermezar e"**

3. Wêjeya cîhanî lêkolîn bike:

a. Ji aliyê pênaseyê ve.
b. Di bin bandora kîjan wêjeyê de derketiye?
c. Yekemîn wêjevanê ku gotiye :"Dê wêjeyeke cîhanî derkeve", kî ye?

Wane 2

# MENSÛRÊ HELACÎ



Ebû Muxîs, Husên kurê Mensûrê Helac e. Ew di **26.3.858**'an de li gundê Torê yê li bakûr rojhilatê bajarê Beydayê ya ber bakûrê Ehwaz a girêdayî kantona Faris, ji dayîk bûye. Ew bi felsefeya Zerdeşt bandor bûbû. Jixwe bavê wî jî berê Zerdeştî bû, lê di dema xîlafeta Ebasiyan de, wî jî islam weke ol pejirand. Helac bi malbata xwe re, berê xwe da bajarê Wasitê yê li başûrê Bexdayê dikeve û ew hîn nûgihayî bû. Paşê berê xwe da Tusturê ya ku li ser berava Çemê Koron dikeve û li ber destê Sehil Binû Ebdullah ê Tusturî fêrî xwendinê bû. Ji bo nasnavê wî (Helac) gelek nêrînên cuda hene. Hin dibêjin ku bavê wî kevanjenê pembo bû, hin jî dibêjin ku wî bixwe razên kesên oldar, aşkera dikir û dijenand û hin aliyên din jî hin kes dibêjin ku ev nasnav ji aşopê ye.

Peyva Helac peyveke erebî ye, ji kesê/a ku di veçirîna pembo de kar dike (veçinrîner) tê gotin.

Helac, ji Tustur ber bi Besrayê ve diçe û berê xwe dide Emir Binû Osmanê Mekî ku wî kurkê sofîtiyê li Helac kir. Li Besrayê bi keça Ebû Ye'qûb Eleqte' re, hevjîn dibe. Piştî vê jî berê xwe dide Bexdayê cem Şêx Eba Elqasimê Cindî Binû Mihemedê Bexdadî. Di wan deman de Helac berê xwe dide gelek deveran. Dibe ku hin têkiliyên xwe bi zinciyan re, saz kiribe. Bi taybet ev tevger ji zincî û koleyan pêk dihat. Ew di pakirina ax, zevî û malbatên desthilatdarên Kendava Besrayê de, dihatin bikaranîn û stem û zoreke pir giran li wan dikirin. Gelek caran jî ew bê xwarin û cil diman. Ev reftarên desthilatdaran li gel van koleyan bû sedema serhildanê li dij wan û dewleta Ebasiyan. Di encama vê yekê de Qeramîtî û Zencî bûne yek û bi hev re li dijî dewleta

Ebasî, serî hildan. Serokê zinciyan Mihemed Binû Ebdullrehîm ê bi nasnavê Elburqi'î dihate nasîn, navekî Elewî li xwe kir û bi Îsa Binû Ziyad Binû Elî Zeynullabidîn re dibe têkildar.

Di sala **914**`an de, dema ku Helac tê girtin û berê wî didin Bexdayê. Ji ber ku têkiliya Helac bi serokê wan re jî hebû, wî bi têkiliya Qeramîtan re û wekî alîgirekî wan, tawan dikin. Hişmendiya Helac ew bû ku her dem doza guhertina ramyarî û civakî dikir, ev bangkirin jî wekî hişmendiya Qeramîtan bû, ev tawan lê hatin barkirin. Di aliyê din de jî girêdan di navbera hişmendiya wî û baweriya Fatimî-Ismayîliyê de jî hebû.

Xwendekarê wî Brahîm Binû Fatik dibêje:

"Rojekê Helac li Nehawendê bû û dengê zirnê bihîst, pirs kir û got:'ev çi deng e'?"

- Birahîm: Ev deng ê şahiya "Newrozê" ye, roja yekem ji sala nû ye.
- Helac: Em ê kengî Newroza xwe li dar bixin?
- Birahîm: Kengî?
- Helac: Ew roja ku ez bi dar ve bême girêdan, ew roj, Newroz e!

Piştî ku Helac cara yekem diçe Mekayê û nêzî salekê li wir dimîne, vedigere Ahwazê û gelek peyrewên wî çêdibin, careke din ew û **400** peyrewên xwe bi hev re diçin Mekayê. Li Hindistanê, Çînê û gelek deverên din geriyaye û gelek sûd jî ji wan civakan girtiye. Dema ku vedigere Ahwazê, peyrewên wî pir dibin û bi piranî Şî'î ne. Gelek mele û şêxên wê deverê ditirsin ku Helac şûna wan bigire, lewra gotegotên derewîn li ser wî derxistin ji bo ku gel dûrî wî bikeve. Lê Helac dev ji doz û şoreşa xwe bernade; dest bi doza ku divê mirov dest ji "ezezîtiya xwe" berde û hemû giyanê xwe di hezkirina Xweda de biqedîne, kir. Lê ev doza wî ne li gorî hizra Mihemed Binû Dawûd (dadwerê Bexdayê) bû. Di nêrîna Helac de, "zanist di encama rewşên ku bi ser mirov de tên, derdikeve, ev jî di rêya

hezkirina rast ji Xweda re ye", lê Mihemed Dawûd ev nêrîn nepejirand; ji ber ku di nêrîna wî de hezkirin tenê ji hevjîniyê re ye. Ji ber vê yekê jî her tim li dijî Helac derdiket û digot: "Ev mirov Xweda nas nake."

Ji vê jî em têdigihêjin ku Helac li dijî rê û rêçikên islama teng, serî hidaye, ev yek jî bû mijara tawana wî li gel dadwerê Bexdayê û bi xwedanenasiyê tê tewanbarkirin. Dewleta Ebasî helwesta tirs û gumanê ji wî kirin, Şalyar Elî Binû Mihemed kurê Elferat, biryar da ku Helac bê girtin. Di sala **913-914'**an de li Bajarê Sûsê, Helac hat girtin, ew li ser deveyekî girêdan û di nava gel de ew weke alîgirê Qeramîtan dan nasîn û ew kirin zindanê. Ji ber ku Îsa Binû Elcerah ê Qenayî û Hamid Qenayî alîgirên Helac bûn, biryra kuştina wî rawestandin û ji bo ku dijminên wî razî bikin, sizaya wî kirin ku ew **3** rojan bi darekî ve bê girêdan û paşê berê wî bidin zindanê. Helac **8** salan di zindanê de ma. Piştî vê jî ew pêşkêşî dadgehê kirin. Dadmendên ku hatin dadgehê, hatina dadmendekî şafi'î nepejirandin, ji ber dadmendekî şafi'î berê ew berda bû û ew siza nekiribû. Di dadgehê de biryara bidarvekirina wî dan û di **26.3.922**`yan de ew bi dar ve kirin.

Di hin jêderan de, çîroka kuştina Mensûrê Helacî wiha tê gotin: "Helac hevalê Cinan e û Cin jî jê re rajeyê dikin, ji ber vê yekê xelîfe û alîgirên Ebasiyan li dijî wî û ramanên ku ew pê bang dike, derketin. Ew bi efsûnkarî, çetîtî û xwedanenasiyê dane nasî û Paşê biryara kuştina wî dan. Helac hat serjêkirin, termê wî şewitandin û avêtin ava Feratê".

## Hin ji pendên Helac:

1. Her kes mirî ye, tenê xwediyên hezkirinê sax in.
2. Dilên evîndaran biçav in, tiştê ku ew dibînin, bînerên din nabînin.
3. Du kabên di nimêja eşqê de, ku destmêjgirtina wan ne bi xwînê be, nabe.

## Berhemên Helac:

1. Eltewasîn
2. Dîwana Helac
3. Baxê Zanistê


## Lêkolîn

Hişmendî û hizrê Helac çawa bû û doza çi dikir?

a. Di aliyê ramyarî de li dijî kê serhildan li dar xist?
b. Gotina wî ya navdar a "Ena Elheq-Ez Rastî me", çîroka wê çi bû?
c. Helbestên xwe bi çi rêbazî dinivîsand ? Hewl bide ku tu malikekê bîne ziman.

Wane 3

# CELALUDÎN ELROMÎ



Celaludîn Elrûmî, di sala **1207**'an de li Afganistanê ji dayîk bûye û di sala **1273**'an di **66** saliya xwe de, koça xwe ya dawî kiriye, li muzexaneya Mewlana Belex a Konyayê, hatiye veşartin. Li Şam, Bexdad, Nîsabûr û Anatolyayê (Tirkyeya niha) geriya ye. Yek ji kesên Xewarizmî û Selcûqên Romê ye. Helbestvan, nivîskar, wêjevan û fîlozof e, bi zimanê tirkî, erebî û farisî dizanîbû. Xwediyê rêbaza mewlewî ye.

Navê wî yê rast, Mihemed Binû Mihemed Binû Huseyn ê Belexî ye. Di feqetî û hin agahiyên islamî de zîrek bû. Di **4** saliya xwe de, ew û bavê xwe ber bi Bexdayê ve çûne û piştî Bexdayê, berê xwe dane gelek bajarên din ên mîna Şam, Karman û Anatoliyayê ta di **19** saliya xwe de li Koniyayê bi cih bûne.

Di serdema Dewleta Selcûqiyan de li ser destê bavê xwe fêrî xwendinê bûye, piştî ku bavê wî koça dawî kiriye, dest ji xwendinê berdide û berê xwe dide derwêşiyê û dest bi nivîsandin û xwendina helbestan dike. Bandora helbestvanê farisî Ferîd Eldîn li wî dike û pirtûka xwe ya bi navê "Esrarname" wekî diyarî dide Celaludîn, ev pirtûk guhertineke xurt û bibandor di jiyana Celaludîn de diafirîne. Di sala **1244**`an de Şêxê pers yê bi navê Şemsulldîn Eltebrîzî, vî şêxî guhertineke mezin di jiyan û reftarên wî de pêk anî û di rêya Şemsulldîn Eltebrîzî re derbasî nava jiyana derwêşiyê bûye û gelek helbestên bi vî rengî nivîsandibû û ji jiyana cîhanî dûr ketibû, berê xwe da jiyana rewanî.

Di vir de, ji me re xuya dibe ku Şemsulldîn, bandor li Celaludîn kiriye. Li Tirkyeyê jî rêbaza Mewlewî afirandiye; ji ber vê yekê jî gelek caran "Mewlana" ji wî re dihat gotin, ku yek ji rê û resmên vê rêbazê ew e, dîlana ku tê de her mirovek bi tena serê xwe li dora xwe diger e, ev dîlan jî ya herî navdar e.



Dîlana Mewlewî

Di sala **1248**`an de Şemsulldîn Eltebrîzî hate kuştin. Tê gotin ku li deriyê wî ket û ew jî çu ku derî veke û nema hat, ev jî dibe sedema xemgîniya Celaludîn û ji ber vê jî dîwaneke mezin bi navê "Dîwana Şemsulldîn Eltebrîzî" dinivîsîne.

Di sala **1273**`yan de li Koniyayê koça xwe ya dawî kiriye û li wê derê hatiye veşartin. Gora wî jî ji gel re bûye wekî serdangehekê.



Gor û Muzexaneya Celaludîn

## Hin ji pendên Celaludîn:

1. Ez ji te re me, min li min venegerîne.
2. Bêyî evînê... Hemû muzîk bê wate ne.
3. Dîlan, dînbûn e... Perestin jî bargiranî ye.
4. Kaniyek di hindirê te de heye, bi dewla vala negere.

## Berhemên Celaludîn:

1. Dîwana mezin a Tebrîzî
2. Elmesnewiyet Elme'anî
3. Dîwanek ji helbestên çariyane
4. Dîwana Elxezel
5. Elmecalis elseb'a
6. Resa'il elmenber

## Pirsên Nirxandinê

1. Celaludîn Elrûmî, ji kîjan nteweyê ye?

2. Çariyaneyên Celaludîn Elrûmî, di roja me ya îro de çi bandora wê heye?

3. Çima Celaludîn zimanê netewa xwe bi pêş nexistiye û bi piranî zimanê erebî bi pêş xist?

| Belavkirina Waneyan li Ser Sala Xwendinê | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Meh \ Heftî | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
| Rezber | | | Rista Wêjeyê , têkiliya di navbera dîroka wêje û ya giştî de | Wêje û jiyana civakî |
| Cotmeh | Rêbazên wêjeyî | Wêjeya civakî , Sûdwergirtina ji wêjeya Civakî | Cureyên çîroka kurdî | Melayê Cizîrî |
| Mijdar | Feqiyê Teyran | Melayê Bateyî , Bekir Begê Erzî | Ehmedê Xanî | Miradxanê Bazîdî |
| Berfanbar | Şerefxanê Bedlîsî | Selîm Silêman | Şêx Nûredînê Birîfkanî | Pertew Begê Hekarî |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Siyahpûş | Celale Xanima Loristanî | Fatime Loreya Goranî | Xatû Mey Zerd |
| Avdar | Yay Hebîbeya Şarezûrî | Mele Mensûrê Girgaşî | Nalî Şarezûrî | Têkiliyn di navbera rêbazên wêjeyî û hizirî de |
| Cotan | Hin ji destpêkên wêjeya kurdî | Se'dî Şîrazî | Mensûrê Helacî | Celaludîn Elrûmî |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |

# WÊJEYA KURDÎ

## AMADEYÎ 3

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê**
**Komîteya Wêjeya Kurdî**
**ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
  **Komîteya Fotoşopê**
  **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

BEŞA YEKEM......................................................... 7

REWŞA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA 18 Û 19`AN DE ...............8

HECÎ QADIRÊ KOYÎ .........................................................11

PÊŞKETINA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA 19`AN DE ..............18

MESTÛRE ERDELAN-KURDISTANÎ ..........................................21

ŞÊX RIZA TALABANÎ .........................................................26

PÎREMÊRD-TEWFÎQ SILÊMANÎ...............................................31

ŞANO.................................................................................36

DIBISTANA NATURALÎZM.....................................................43

WEFAYÎ..............................................................................44

BEŞA DUYEM ......................................................... 53

DÎROKA WÊJEYA KURDÎ LI YEKÎTIYA SOVYETÊ ...................57

WÊJEYA KURDÎ YA NÛJEN LI YEKÎTIYA SOVYETÊ ...............59

EREBÊ ŞEMO......................................................................63

ROMAN..............................................................................66

QENATÊ KURDO .................................................................71

CASIMÊ CELÎL ....................................................................75

ORDÎXANÊ CELÎL ................................................................78

CELÎLÊ CELÎL ......................................................................81

EMÎNÊ EVDAL .....................................................................84

BEŞA SÊYEM ......................................................... 87

REWŞA KURDAN PIŞTÎ HILWEŞANDINA IMPERATORIYA RÛSÎ Û OSMANÎ..........................................................................88

WÊJEYA KURDÎ PIŞTÎ ŞERÊ CÎHANÎ YÊ YEKEM LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ .....................................................................92

CELADET ELÎ BEDIRXAN .....................................................95

KAMÎRAN ELÎ BEDIRXAN......................................................99

CEGERXWÎN......................................................................104

OSMAN SEBRÎ ........................................................................ 108
QEDRÎCAN ............................................................................ 111
SEYDAYÊ TÎRÊJ ...................................................................... 114
MÛSA ENTER ........................................................................ 117
BEŞA ÇAREM........................................................................ 121
FRANZ KAFKA ........................................................................ 122
NECÎB MEHFÛZ ...................................................................... 125

# BEŞA YEKEM

## Serdema dawî ya klasîka kurdî

- **Rewşa wêjeya kurdî di sedsala 18 û 19`an de**
- **Hecî Qadirê Koyî**
- **Pêşketina wêjeya kurdî di sedsala 19`an de**
- **Mestûre Erdelan-Kurdistanî**
- **Şêx Riza Talabanî**
- **Pîremêrd-Tewfîq Silêmanî**
- **Şano**
- **Dibistana Naturalîzm**
- **Wefayî**

Wane 1

# REWŞA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA 18 Û 19`AN DE

Weke tê zanîn, civakîbûyîna neteweya kurd ji demên pir kevn ve pêk hatiye. Ji berê ve xwedî nivîs û çandê ye. Bi neteweyên din re mil bi mil, ji bo pêşxistina wêje, çand û zanista xwe gavên girîng avêtine.

Lê belê piraniya cih û warên wan ên dîrokî, ji ber derbasbûna demê û guhartinên li cîhanê, bi taybetî piştî hatina islamê, ji holê hatine rakirin.

Beşa Tewratê ya bi zimanê Hexamnişînî hatiye nivîsîn; li ser zagon, xwendin, nivîsîn û çanda Medan axiviye. Li gorî van belgeyan, derdikeve holê ku li Kurdistanê nivîsîn, xwendin, rojname, dadgeh û dadgerî hebû. Her wiha, xwediyê ziman, wêje, zanyarî û çandê bû û çavkaniya pêşketinê ya çand û hûnerê bû. Ev çand û wêjeya kevnar, her çiqas bi gelek pêlên pişaftin û qirkirinê re rû bi rû mabe jî, ji bo ku xwe biparêze, her tim di nava hewldanan de bû.

Pêşketinên wêjeya kurdî ya li bajarên mezin ên Kurdistanê, yên weke; Amed, Bedlîs, Wan û bajarên din ên ku kurd tê de dijiyan, ji aliyê ol, tore, dezgehên civakî, tenduristî, pîşesaziya ji aliyê çandî, bazirganî û sazûmaniya hunerî ve, gihandine asteke bilind a pêşketinê.

Ev yek jî, diyar dike ku gelê Kurd, di asta çand û wejeyê de, gavên mezin avêtine. Bi taybetî, li bajarên Xan û Mîran, mizgeft, dibistan, fêrgeh û wanexane, ji sedsala **19**`an û pê de pêş ketine. Mirovên zana û zanyar, ji nava van wanexaneyan derketine holê. Di van wanexaneyan de zanistên xwedanasiyê, cîhanasiyê û wêjenasiyê, bi nivîsandinê ve dihatin fêrkirin.

Bi vê boneyê, gelek mele û pîrên kurdan ên ji sedsala **19**`an û pê de, xwedî çandeke wêjeyî ya kurdewarî ne. Pêşketina vê rewşê, nîşan dide ku li Kurdistanê, êdî li hemberî dagirkeriyê dema serhildanên gel hatiye û divê çanda gelê Kurd pêşvetir biçe û derfetên derketina huner û wêjeyê bên afirandin. Ev sedsal, bûye destpêkirina pêşxistina wêje û serhildanên gelê Kurd.

Di van sedsalan de, di nava wêjeya kurdî de, gelek guhertin çêbûn, hem ji aliyê bîrdozî û hem jî di aliyê nivîskî de û rêbazê wêjeyî yê wê demê ber bi guhertinê ve çû, êdî gelê Kurd digihêje astekê ku xwe ji bîrdoziya klasîkê, ango derwêşiyê rizgar bike û ber bi hizreke netewî ya nûjen ve biçe, ji aliyê gelek wêjevanan ve, hewldan pêk tên, em bînin bîra xwe; ku çawa Ehmedê Xanî cara yekem hişmendiya netewî daye pêş, lê wî bi xwe nikarîbû xwe ji klasîkê rizgar bike. Gelê Kurd di nava qirkirinê re, derbas dibe û pê re jî êş û azarên gelê Kurd pir dibin û wêjeya wî dipişkive. Di vir de em dikarin pêşengên wêjeya nûjen bi we bidin nasîn û xala ku guherîn tê de çêbûye di dîroka wêjeya kurdî de, yan jî wêjevanên ku serkêşiya wê kirine, bidin nasîn, ku yek ji wan wêjevanê bi nav û deng **Hecî Qadirê Koyî** ye.

Di vê serdemê de, helbestvanê bi nav û deng ê bi navê **Nalî Şarezûrî** wekî helbestvanê dawî yê serdema klasîka kurdî tê nasîn, hin lêkolîner û wêjevan jî wî wekî xala guherînê ya ber bi nûjenî û romantîzmê ve, dibînin. Lê di rastiyê de, wêjevanê ku herî bandor li wêjeyê kiriye û doza xwendina bi zimanê dayîkê, nûjenî, netewperwerî û xwerizgarkirina ji qeyd û bendên derwşiyê, kiriye **Hecî Qadirê Koyî** ye.

# Lêkolîn

Nalî Şarezûrî lêkolîn bike û guherînên di sedsala **18**`an de çêbûne bîne ziman.

Wane 2

# HECÎ QADIRÊ KOYÎ



Navê wî yê rast "Evdulqadir kurê Mele Salih kurê Mele Ehmedê Gewre ye. Bi navê Hecî hatiye nasîn; ev jî ne ji ber çûyîna hecê ye, lê ji ber ku ew di meha heciyan de, jidayîk bûye. Di nava gelê Kurd de, wekî Ehmedê Xanî yê duyem hatiye nasîn; ji ber ku di nava gel de, mirovekî netewperwer û welatparêz bû.

Hecî Qadirê Koyî, di nava gelê Kurd de, helbestvanekî netewperwer e, di sala **1816**`an de, li gundê Gorqereçê yê li başûrî rojavayê bajarê Koyê yê li Başûrê Kurdistanê dikeve, jidayîk bûye. Ew hîn zarokê nav pêçekê ye, bavê wî koça xwe ya dawî dike, dayîka wî jî berê xwe ji neçarî dide bajarê Koyê cem kurxalê wî Mele Ehmed û li ber destê wî fêrî xwendinê dibe. Piştî ku dayîka wî jî koça dawî dike, kurxalê wî xwedîkirina Qadir digre ser milê xwe û li gelek bajarên mîna Serdeşt, Şino û Sablaxê xwendina xwe didomîne û di sala **1862**`yan de, bawernameya xwe ya **12** zanistan bidest dixe.

Zanista feqetiya islamê xwendiye û wekî feqe û mele li gelek bajarên mîna Hewlêr, Serdeşt, Şino, Silêmanî û hwd geriyaye. Li her bajarekî li gel melayê zana maye û ji zanista wî sûdwergirtiye, paşê vedigere Koyê, li bajar çûna Stenbolê bala wî dikêşe û di serê wî de dimîne, bi Keyfî Ciwanroyî re dikeve rêya Stenbolê û berê xwe dide bajar, li Stenbolê dibe mamosteyê Malbata Bedirxan Paşa û di mala Bedirxan Paşa de, berhema Ehmedê Xanî ya "Mem û Zînê" nas dike û dixwîne... hûnandin û ristina wî, pir bala wî dikşîne , bîr û baweriya welatperwerî û netewperweriya Ehmedê Xanî di hişê wî de rûdinê, bi vê yekê jî ew dibe xemxurê neteweya xwe. Helbestên xwe der barê rewşa gel û paşketina wî de dinivîse, şerê desthilatiya Osmanî,

beg, axa, pîr û şêxên Kurdan ên ku gel bindest kirine dike. Di helbestên xwe de mîna Ehmedê Xanî berê xwe dide ronîkirina gelê Kurd, şîretan li wan dike ku berê xwe bidin xwendinê, di şerê azadiyê de yekbin û raberî hev şer nekin. Vê rewşê di helbesteke xwe de diyar dike û dibêje:

**"Heta ku li hev neyên qebîleyên**
**Kurdan Her wê wiha bibin xerabemal**
**Hemû cîhan mezin û biçûk**
**Xemiliye bi milkekî wekî bûk**
**Yekberg in, yekziman û yekreng**
**Bê xeybet û bê 'eyb û 'ar û bê deng**
**Cîhan bi tirên dixwin û didin**
**Her çi merema wan e, dikin**
**Her Kurd in, bi tenê bi pakî merd**
**in Pamalî zeman e, mehsûsî Kurd in**
**Her mane bê deng û mezlûm**
**Mîna erdê xerabe, zarokên me'sûm"**

Hecî Qadirê Koyî; hemû jiyana xwe ya mayî li Stenbolî derbas kir û di sala **1895**`an de koça xwe ya dawî kir û li goristana Qerece Ehmed, bi axê hat spartin.

Hecî Qadirê Koyî di asîmanê wêjeya kurdî de, wekî heyveke bironî ye. Di ciwaniya xwe de, dest bi ristin û nivîsandina helbestan kiriye, di ristina helbestên xwe de berê xwe daye hemû tiştî û di her aliyî de helbest nivîsandiye; dildarî, ayînî, civakî, pîrozî û hwd, lê armanca wî ya bingehîn, şîretkirin û hişyaririna gel bû.

Rêbaza wî ya nivîsandina helbestan; rêbaza klasîlk bû. Bi piranî ji berhemên Kurdî û Nalî hez dikir û hemdemê wan bû.

Gelek helbestên wî yên bi terz û şêweyê nûjen hatine nivîsandin, hene ku naveroka wan jî li gorî rêbaza wî ya klasîk ji hev cuda ne. Ev nûjeniya ku di helbestên Hecî de rû dide, li sedemên erdnîgarî û nûjeniya ku di sedsala **19**`an de li bajêr

derdikeve, vedigere. Ji ber vê yekê jî Hecî Qdir wekî xala guherîna ber bi hizrê netewî û nûjeniyê ve, tê nasakirin.

Di vir de em têdigihêjin ku Hecî Qadir dîroka Kurdistanê nas dike, şopa Ehmedê Xanî berdewam dike, berê gelê Kurd dide hizrandina ku çawa xelk welatê wan li hev du par dikin û di hişyarkirina gel ji aliyê wêjeya wî ve, roleke pir girîng dilîze dema ku bala gel dikêşe ser dengbêj û wêjevanên wî. Bi vê yekê re şerpezeya gelê Kurd jî diyar dike û banga yekîtiyê dike ku gelê Kurd êdî ber bi serxwebûna xwe ve biçe. Di vir de, em Hecî Qadirê Koyî weke pireke di navbera klasîk û nûjeniyê de, binav dikin, tevî ku rêbazê nivîsandina wî hîn jî klasîk e, lê di aliyê bîrdozî de guherînên mezin ava kir û ji wêjeya nûjen re bû bingehekî giranbuha.

## Helbesta her Kurd e li nava hemû milet

**Her Kurd e li nava hemû milet**
**Bê behre ji xwendin û kitabet**

**Bêgane ji tercumeya zimanî**
**Esrarên kitêbên xelkê pê dizanî**

**Yekser alim, mezin û biçûk**
**Nexwendine qet herfên Kurdî**

**Estadê xetên ji van her sêyan e**
**Wekî gund zimanê xwe nizane**

**Mumkîn e der here ji binçengî**
**Heta reqem û xeta Frengî**

**Bo çi kifirê bi zimanê me nûsîn?**
**Miletê bê kitêb û bênûsîn**

**Xeyrî Kurdan tune li rûyê zemîn**
**Qazî, nesir û muftiyên nizam**

**Wê te bigihên ta medres û alim**
**Bo nesîheyê zimanê Kurdan e**
**Şiîra min delîl û birhan e**

## Pirsên Nirxandinê

- Sedema guhertina ku di helbestên Hecî Qadirê Koyî de çêbû, rave bike.

- Rêbaza romantîzmê di kîjan salê de derket holê û li ser çi bingehî hate avakirin? Şîrove bike.

- Hecî Qadirê Koyî bi kîjan helbestvanî bandor bûbû û rêbaza helbestên wî çawa bû?

- Vê helbestê bi awayekî kurt û li gorî têgihiştina xwe şîrove bike:

**"Hakim û mîrên Kurdistanê**
**Her ji Botan heta Baban**
**Yek bi yek hafizên Şerîetê bûn**
**Seyid û şêxên qewm û milet bûn**
**Seyid û şêx ji tirsa wan**
**Ew ku mirin, rê kete ber wan**
**Seyr bike çawa bûne pûş û agir û nift**
**Yek li vî aliyî rû dike ber bi Ecem**
**Yên din li wî aliyî dibin dijminên hev"**

# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

**Pîvana (Pêlawaz):** Pîvaneke li ser bingehên, dirêjî û kurtî, vekirin û girtina kîteyan çêdibe.

Di pîvana pêlewazê de kîteyên rêzikan ên beramberî hev, wekhev in. Her wiha, ger kîteya destpêkê ya rêzika yekem dirêj be, kîteya yekem a rêzika duyem jî dirêj e.

**Kîteyên girtî**: bi tîpa dengdar bi dawî dibin.

**Kîteyên vekirî**: bi tîpa dengdêr bi dawî dibin. Ew jî dibin du beş:

- Kîteya vekirî ya dengdirêj: Bi tîpa dengdêra dengdirêj, bi dawî dibe.
- Kîteya vekirî ya dengkurt: Bi tîpa dengdêra dengkurt, bi dawî dibe.

**Têbînî:** Di pîvana rêzbendê de;

- Ger kîte, bi tîpa dengdêr a (kurt) dawî lê were; vekiriye û xal (.) tê bikaranîn.

- Ger kîte, bi tîpa dengdar dawî lê were; girtiye û xêzik (-) tê bikaranîn.

- Kîteya dawî, her dem girtî tê jimartin û xêzik(-) tê bikaranîn.

- Ger kîteya vekirî, bi tîpa dengdêra dengdirêj dawî lê hatibe; dîsa bi xêzikê (-) tê nîşankirin.

**Mînak:**

**Dilberê îro seher avête cergê min du dox**
**Yek li sîne, yek li dil da lew ji min tên ax û ox**

Dil be rê î ro se her a
\- . - - -. - -
vê te cer gê min du dox
\- . - - - . -
Yek li sî ne yek li dil da
\- . - - - . - -
Lew ji min tên ax û ox
\- . - - - - -

Kîteyên vekirî û girtî yên malikên li jêr, bi xêz û xalê diyar bike.

**"Ji remza dîlberê dîsa, Li min batin vejîn derd e**

**Di libsê tariyê min dî, xuya bû ew siyah cerd e"**

**"Ji narû nûrê teqdîsê, tecela kir li min dîsê**

**Li ser textê xwe Belqîsê, hilanîn bê hîcab perde"**

Wane 3

# PÊŞKETINA WÊJEYA KURDÎ DI SEDSALA 19`AN DE

Weke tê zanîn, civakîbûyîna netewa kurd ji demên pir kevn ve pêk hatiye. Ji berê ve kurd xwedî nîgar, nivîs û çandê ne. Bi netewên din re mil bi mil, ji bo pêşxistina wêje, çand û zanista xwe gavên girîng avêtine. Lê belê piraniya cih û warên wan ên dîrokî, ji ber derbasbûna demê û guhartinên li cîhanê, bi taybetî piştî hatina islamê, ji holê rabûne. Li ser wêjeya kurdî ya kevnar, gelek wêjevanan nêrînên xwe diyar kirine.

Di dawiya sedsala **18**`an de, ji ber sedema kêmbûna şerê di navbera Sefewî, Osmanî û dewletên Ewrûpî de, di encama xwevehesîna Osmaniyan û jidestdana gelek herêmên di bin destên wan de, êrîşên xwe li ser Kurd û herêmên wan zêde kirin. Êdî çand û wêjeya gelê kurd bi qirkirinê re rû bi rû ma, ji bilî guherînên demografîk ji hêla Osmaniyan ve ku li ser Kurdan û netewên din hate pêkanîn, ev jî bû sedema ku wêjevan û nivîskarên kurd ji welat derkevin an jî surgun bibin, ên ku hatin girtin û yên ku hatin kuştin, ku piştî çewisîna serhildana Bedirxaniyan, qirkirina li ser gelê kurd xurtir bû û ji aliyê Osmaniyan ve, vê biryarê didin ku malbata Bedirxaniyan ji welatê wan surgun bikin, êdî wan surgunî Stenbolê dikin û di dibistanên bi navê êlan ên bi hişmendiya Osmanî , perwerde dibin. Tevlî hewildanên wêjeya kurdî ku xwe ji hişmendiya klasîkê rizgar bike, hîn jî perwerde di dibistanên olî de, dihat dayîn, tevî ku ewqas êrîş û dagirkerî bi ser gelê Kurd de dihati;hestên netewî li cem gelê kurd gurtir bû û hewildanên serhildanan nehatin rawestandin.

**Mînak:**

Serhildana Evdulrehman Paşayê Baban (**1806**), Serhildana Mîr Muhemed Paşayê Rewanduzî (**1834 - 1837**), Serhildana

Bedirxan Beg (**1842 - 1848**) û Şêx Ubeydulahê Nehrî li bajarê Şemzînanê (**1880**).

Piştî ku serhildana Bedirxan Beg bi bin ket, êdî li Stenbolê ew kesên ku sugun bûbûn di dibistanên Osmaniyan de, perwerdeya xwe berdewam kirin û rê li ber pêşketinên girîng ji aliyê wêjeyê ve hate vekirin û gelek zanyarên bi nav û deng derketin, mîna Miqdad Midhet Bedirxan. Ev dem wisa derbas dibe ta ku digihêje derketina ciwanên kurd ên mîna Celadet Elî Bedirxan, Nûrî Dêrsimî, Kamîran Bedirxan... û li Rojavayê Kurdistanê, Şam, Misir û Libnanê geriyane, vê rewşê ta derketina rojnameya kurdî ya yekem a bi navê **"Kurdistan"** bi rêveberiya Miqdad Midhet Bedirxan ve li Qahîraya paytexta Misrê, di sala **1898**`an de bi zimanê turkî û kurdî yê bi tîpên erebî, derket. Bi derketina vê rojnameyê re wêjeya kurdî jî bi pêş ket, her çiqasî rastî gelek astengiyên mîna dûrbûn û belavkirina weşanan jî dihat, lê hebûn û pêşketina xwe berdewam kir û bû navgîna yekem a ragihandinê ku tê de êş û azarên gelê Kurd û rewşa wan a ku tê re derbas dibin, tanî zimên û hişmendiya netewî û kurdewarî di nava gelê kurd de li pêş xist.

Mirov dikare bibêje ku di wê demê de, di dema qedexeya zimanê kurdî û pergala tirkîtiyê ya ku li ser gelan dihate sepandin û bi taybet gelê Kurd, rojnameya Kurdistan bû çavkaniya şoreşa gelê kurd li dijî dagirkeriyê.

## Pirsên Nirxandinê

1. Çima Rojnameya Kurdistan, zêde hebûna xwe berdewam nekir û ji Misrê ber bi Cinêvê ve çû?

- Bi çi rengî wêjeya şoreşgerî derket holê û armanca wê çi bû?

- Çima Kurdên ku bi serhildanan radibûn, piştî şkandinê ji welatê xwe surgun dibûn?

Wane 4

# MESTÛRE ERDELAN-KURDISTANÎ



Ev jina helbestvan, nivîskar û dîroknasa yekem a ku dest bi nivîsandina dîrokê kiriye, ev helbestvana ku bi navê Mahşeref tê nasîn wekî stêrkeke geş di asîmanê kurdewariyê de diteyise; Mestûre ye û Mestûre Kurdistanî nasnavê wê ye.

Mestûre Erdelanî di sala **1804**`an de, li bajarê Sinê yê Rojhilatê Kurdistanê, jidayîk bûye û di sala **1848**`an de, li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê koça xwe ya dawî kiriye û li goristana Girdê Seywan, ew spartine axê.

Ji ber ku wê yekemîn pirtûka dîrokî ya bi navê "Dîroka Erdelan" nivîsandiye, wekî helbestvan, nivîskar û dîroknasa jin a yekem tê nasîn.

Mestûre Erdelanî: Navê wê yê rast; Mahşeref xan e. di malbateke dewlemed û desthilatdar de, mezin bûye. Navê bavê wê Ebûl Hesen Begê Qadirî ye. Ew li ber destê bavê xwe fêrî xwendin û nivîsandinê bûye her wiha fêrî zimanê kurdî û farisî jî bûye. Xesroxan, serwerê Erdelanê yê wê demê, hevjînê wê bû, piştî ku Xesroxan koça xwe ya dawî dike, serweriya Erdelanê dikeve bin kontirola Qaçaran û ji ber êrîşên wan, Mestûre û malbata xwe koçî Silêmaniyê ya di bin serweriya Baban de ye, dibin û li wê derê bi cih dibin.

Mestûre bi qasî ku di helbestvaniya xwe de jineke bihêz bû; di bawermendiya xwe de jî xwedî rêz bû. Di jiyana xwe **20** heraz malik, Bi zimanên erebî, farisî û kurdî nivîsandine. Lê mixabin dîwana wê ya helbestan, bi sedema nakokî û qeyranên di nava mîrektiya Erdelanê de, wenda bûye.

lê Kesekî bi navê "Şêx Yehya" hewldaneke mezin da, ku dikarî bû, nêzî **1000** malikên wê berhev bike û di bin navê "Dîwan Mah Şerefxanimî Kurdistanî" de, di sala **1925**`an de, li Tehranê çap bike. (Di hin çavkaniyan de tê gotin ku **2000** malikên wê hatin berhevkirin û çap bûne). Di gel helbestvaniyê de jî wekî dîroknas û dîroknivîs hatiye nasîn ku pirtûkeke bi navê "Dîroka Erdelan" nivîsandiye û di sala **1946**`an de, li Sinê ji aliyê "Nasir Azadpûr" ve, hatiye çapkirin. Her wiha pirtûkeke olî bi navê "Şerî'eta islamê" nivîsand. Ji xwe Mestûre bawernameya 12 zanistan bidestxistiye û pirtûkên wê hûrbînî û lêkûrbûna wê der barê ol û dîrokê de. diyar dikin.

Der barê hevjîniya xwe bi Xesroxan re, di pirtûka Mîrekên Erdelanê de, wiha tê gotin: "Xesroxan, demekê ji bav û apanê wê tengezar bûbû û ji bo dilê wan xweş bike û aştiyê bi wan re bike; Mestûre wekî hevjîn ji xwe re aniye". Li ser vê hezkirinê jî Mestûre di helbesteke xwe de wiha dibêje:

**"Ji bilî ser têkiliya wî min awir tune**
**ye Jixwe ji bilî wî min fikir tune ye**
**Her çiqas hinaseya min ne li bîra min be, ji wî û**
**min Ji bilî hinaseya sar min tune ye"**
**Bextewar im li ber dûrbûna bejna wî ya bedew**
**Ji bilî xema wî, qet min xemgînî tune ye"**

## Berhemên Mestûre Erdelan:

- Dîwana Mestûre
- Mêjûya Erdelan
- Şerî'eta Islamê

## Helbesta Mestûre Kurdistanî

**Xusrewim wehar, xusrewim wehar**
**Ya şa nebûwe, îmsal newehar**

**Ber neyan we ber gulan ce gulzar**
**Nekro dirext şikofe îzhar**

**Ne sehn çemen newano bulbul**
**Henî ne nîşo jale ne rûyî gul**

**Nîlûfer ta heşr ber ne yoce aw**
**Ce rûy gul surx nekêşû gulaw**

Wate: Ey Xusrew! Ey Xweda, bila îsal bihar neyê û dar û ber nebişkivin. Bila bilbil li mêrg û çîmenan awazan nebêje û li ser gul û şaxên daran rûnenê! Nîlûfer jî ta roja dawî û axretê di nava avê de şîn neyê û dernekeve!

## Pirsên Nirxandinê

1. Mestûre Erdelan di demeke çawa de, dijiya? Binirxîne.

2. Piraniya helbestên xwe li ser çi gotiye?

3. Jineke ku di temenê 44 salî de, koça xwe ya dawî kiribe, 20.000 malik, pirtûkeke dîrokî û yeke olî nivîsandibe tu vê jinê çawa dibînî? Binirxîne.

# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

**Pîvan**: Ji pîvana peyvên ku ji bo pêkanîna ahengê tê bikaranîn re **pîvan** tê gotin.

**Pîvana kîteyî**: Pîvana ku xwe dispêre wekheviya kîteyên rêzikên helbestê.


Tu jî, pîvana her du malikên li jêr a kîteyî diyar bike.

**"Ey Dîlbera gerden zerî**
**Wey nazika dêm qemerî**
**Qamet ji mûma fenerî**
**Wêran ez im, malim xirab"**

**Feqiyê Teyran**

Wane 5

# ŞÊX RIZA TALABANÎ



Şêx Riza Talabanî; li gundê Çirîxê yê bi ser navçeya Çemçemalê ya herêma Kerkûkê ve, di sala **1842**`yan de ji dayîk bûye. Navê bavê wî; Evdulrehman e, ku ji êla Talabaniyan e. Li ber destê bavê xwe; fêrî xwendin û nivîsandinê bûye, her wiha fêrî zimanê farisî, erebî û tirkî jî bûye. Di ciwantiya xwe de ,berê xwe daye dibistana Kerkûkê, demekê li cem Hecî Seyîdê Hilmîzade maye û fêrî rêzimana erebî jî bûye, paşê berê xwe dide Silêmaniyê mijûlî xwendina fiqha islamê dibe û di **25** saliya xwe de, berê xwe daye Stenbolê û dawiya jiyana xwe li Bexdayê derbas dike. Piştî du salan ji Stenbolê vegeriyaye û nas dike ku bavê wî koça dawî kiriye û mîrateya bavê wî ketiye destê birayê wî **"Elî"** û tiştekî nade wî; ji bajêr derdikeve û berê xwe dide xalê xwe Xefûr ê li Kerkûkê dimîne, demekê li wir dimîne. Ji xwe, ew ji şêxan û pismamên xwe zivêr dibe, rewşa jiyana xelkê bajarê Kerkûkê bi wî xweş nayê, di helbestên xwe de şerê wan dik

û ji ber vê sedemê di sala **1901** ê de, diçe Bexdayê û li wê derê dimîne, heta sala **1910**`an ku koça xwe ya dawî li wir dike û li gor daxwaza wî, li Goristana Şêx Evdulqadirê Geylanî, ew spartine axê.

Li ser çar zimanan (tirkî, erebî, kurdî û farisî) xwendiye û lêkolîn kiriye û bûye şarezayê van zimanan, bi van her çar zimanan jî helbest nivîsandiye, ev jî zîrekî, şareza û jêhatîbûna wî ji me re diyar dike.

Şêx Riza; pir ji helbestvanên Kurd hezkiriye û piraniya dema xwe di xwendina helbestên wan de, drbas kiriye; ji wan gelek

sûd wergirtiye, di ristin û hûnandina helbestê de pir jîr û zana bû û ew wekî hosta û şasiwarê helbestê tê nasîn. Ji xwe li gel vê yekê jî di ristina helbestan de, roleke wî ya berz û bala hebû, li aliyekî din jî di nivîsîna helbestên evînî û dildarî de jî xwedî hestên geş û hişyar bû.

Naveroka helbestên Şêx Riza bi piranî gilîkirin û gazinên ji derd, xemên dildariyê, bêkedî, bênirxî û nedilsojiya yara wî ne, ji hin kesên din jî giliyên wî hebûn. Dema ku temenê wî mezin dibe û cîhanê dibîne, êdî bîr û bawerî, hişmendiya wî tên guhertin û nema li ser dildar, evîn û hezkirinê dinivîsîne; berê
xwe dide pergalên mîr, paşa û şahan ku wan weke devereke mezin û pûç, dibîne, ji ber ku têdigihêje ku ev mîr û paşa ji bilî çewisandin, zilm û zorê karekî din nakirin, tenê çewisandina gel bûye karê wan. Carinan di hin helbestan de ,pesnê Evdulrehman paşayê Baban dide, ew jî ji ber ku wî nas dikir û dizanîbû ew mirovekî baş e. Li gel rexne û pendên ku li gel dikir, ji mirovên xwedênas pir hez dikir û li wan guhdar dikir.

Dîwana Şêx Riza Talabanî du caran hatiye çapkirin, carekê di sala **1935**`an de, û cara duyem jî di sala **1964**`an de bû.

## Helbesta Şêx Riza Talabanî

**Li bîra min tê Silêmanî ku darûl milkê Baban bû**
**Ne mehkumê Ecem bû, ne suxrekêşê Elî Osman**
**bû Li her tabûrê Esker, rê ne bû, bo meclisa paşa**
**Seydayê muzîkê û neqerta eywanê keyvan bû**
**Çaxê meydana cirîdbazî li dora kanî aksan bû Bi**
**zerba hemla Bexda texsîr kir te hilda Silêmanî**
**zeman rast tu divê bavkê Silêman bû Ereb înkarî**
**fesala we nakin efselin emma Selahedîn ku dinya**
**girt ji zimra kurdê baban bû Qebra pîr ji nûra Elî**
**Baban pir ji rehmet be**
**Barane kafî ehsana wan mîna ewrê nîşan bû**
**Çaxê Ebdulah paşa leşkerê waliyê Sinê şer kir**
**Riza wî wextî emrê wî pênc û şeş tiflê dibistan bû**

## Wateyên peyvan

**Darûl milk:** Mala Milk
**Hemle:** Sefer, pêngav

**Cirîdbazî:** Kesê hespan siwar dibe û dibezîne.

**Zerb:** Lêdan

**Fesal Fesîle:** Hebûna komeke mirovan.

**Emma:** Lê

**Ehsan:** Qencî

**Zimre:** Tuxum

**Tifil:** Zarok

**Eywan:** Salon

## Pirsên Nirxandinê

- Li gorî te, Şêx Riza Talabanî mirovekî çawa bû û çima her tim gel rexne dikir û pend ji wan re digotin?

- Li gorî ku te cureyên helbestê xwendine, helbestên Şêx Riza di kîjan cureyê de cih digirin?

- Li gorî naverokê, helbestên xwe bi çi rêbazî nivîsandiye?

- Çima Şêx Riza ji cih û warê xwe dûr ket?

## LÊVEGERA AGAHIYÊN WÊJEYÎ

**Rêzbend:** Ji wekheviya dengên li dawiya rêzikên helbestan re **"rêzbend"** tê gotin.

Rêzbend, li gorî ahenga deng; di navbera xwe de dibe pênc beş.

- **Rêzbenda lewaz (Nîv rêzbend):** Ji wekheviya dengekî li dawiya rêzikên helbestan re **rêzbenda lewaz** tê gotin.
- **Rêzbenda tam:** Ji wekheviya du dengan li dawiya rêzikên helbestan re **rêzbenda tam** tê gotin.
- **Rêzbenda dewlemend:** Ji wekheviya sê dengan li dawiya rêzikên helbestan re **rêzbenda dewlemend** tê gotin.
- **Rêzbenda tac:** Ji wekheviya çar dengan a li dawiya rêzikên helbestan re **"rêzbenda tac"** tê gotin**.**
- **Rêzbenda hevdeng:** Ji wekheviya du peyvên ku nivîsîn û dengên wan wekhev û wateya wan cuda, dikevin li dawiya rêzikên helbestan re **rêzbenda hevdeng** tê gotin.

Ev wekhevî, herî kêm divê di du rêzikan de hebin.

**Mînak:**

Kesên ku di riya azadiyê de navêjin tu **gavan**

Bêguman,  dê tim û dayîm ji serdestan re bibin **gavan**

### Rahênan:

Rêzbenda malikên li jêr, diyar bike:

**Li bîra min tê Silêmanî ku darûl milkê Baban bû**
**Ne mehkumê Ecem bû, ne suxrekêşê Elî Osman bû**

Wane 6

## PÎREMÊRD-TEWFÎQ SILÊMANÎ



Navê wî Tewfîq Axa kurê Mihemed Axa kurê Hemze Axayê Mesref e . Di sala **1868**`an de li Silêmaniyê ji dayîk bûye û di sala **1950**`yî de li Silêmaniyê koça xwe ya dawî kiriye.

Zarokatiya xwe di malbata xwe de derbas kiriye û çanda zarokatiyê ji zarokên Silêmaniyê yên dema xwe, wergirtiye. Di temenê **6-7** saliya xwe de berê xwe daye hucreya Mele Huseyn Xoce; li ber destê wî fêrî xwendinê bûye û di demeke pir kurt de; helbestên Hafizê Şîrazî xwendine û bi dawî kirine.

Dema ku baş fêrî xwendinê dibe, êdî dibe Feqe û diçe mizgefta Hemze Axa û li ber destê Mele Mihemed fêrî zimanê erebî û farisî dibe û waneyên olî distîne. Paşê mîna hemû helbestvanên kurd li başûrê Kurdistanê geriya ye, li cem mele û zanayên mezin di mizgeftên Silêmaniyê de baş xwendina xwe dike. Di van deman de li dibistanên Kurdistanê geriyaye û dema ku dest bi xwendina dibistanê dike, helbest xwendine. Destpêkê helbestên wêjevanên kurd ên mîna: Hecî Qadirê Koyî, Nalî, Şêx Riza û Mewlewî xwendine û hêdî hêdî bi aliyê ristin û hûnandina helbestan ve çûye. Ji xwe tekez e ku ew bi van helbesvanan bandor bûye û di bin vê bandoriyê de dest bi nivîsandinê kiriye, piraniya helbestên xwe bi zaravayê soranî nivîsandine. Di dîwan û dibistanan de bi dengekî xweş û zelal helbestên xwe dixwendin. Di ciwaniya xwe de nav û dengê wî li deverên Kurdistanê belav dibe û li piraniya deverên Kurdistanê tê nasîn.

Di nava salên **1882**`yan û **1885**`an de, dibe peywirdarê desthilatê. Di sala **1882**`yan de, dibe nivîskarê sernameyê û di sala **1885**`an de li Kerbelayê dibe nivîskarê alîkar. Di sala

**1886**`an de bi Şêx Seyîdê Hefîd ê bavê Şêx Mehmûdê leheng re, berê xwe didin Tirkyeyê û ji Tirkiyyê bi wî re diçe hecê û vedigere. Vê carê bi Şêx Ehmedê Xaneqa û Wefayiyê helbestvan re, dîsa diçe Tirkyeyê. Di sala **1891**`ê de li Stenbolê, dema ku dinasin Tewfîq "Pîremêrd" baş bi zimanê farisî dizane, wî dikin endamê encumena bilind û dibe beg. Li Stenbolê; Pîremêrd diçe dibistana dadê û bawernameya dadmendiyê bidest dixe, paşê bi keçeke Tirk re hevjîn dibe û dest bi karê parêzerî û nivîskariyê dike. Dixwaze ku rojname û kovaran derxîne û biweşîne, di wê demê de, sala **1907**`an de li Stenbolê komeleyek bi navê "Komeleya Alîkarî û Pêşketina Kurd" bi rêveberiya Şêx Evdulqadir Şêx Evdule saz dibe, Pîremêrd jî tevlî vê komeleyê dibe, mijûlî karê ronîkirin û şîretkirina gelê
Kurd dibe. Di heman demê de rojnameyek jî tê damezrandin û Pîremêrd jî bi navê xwe yê resen **"Tewfîq Silêmanî"** di nav de cih girt û berpirsyarê weşana rojnameyê, di helbesta ku di rojnameya pêşî de hatiye weşandin wiha gotiye:

Di sala **1909**`an de, Pîremêrd dibe parêzgerê Colemêrgê û di sala **1918**`an de dibe parêzgerê Amasayê, paşê hevjîna xwe û her du kurên xwe dihêle û vedigere Silêmaniyê.
Di wê demê de rojnameya **"Jîn"** di bin rêveberî û serpereştiya Huseyn Nazim de derket holê û Huseyn Nazim serpereştiya rojnameyê dispêre Pîremêrd. Di sala **1934**`an de Huseyn Nazim koça xwe ya dawî dike û Pîremêrd dibe rêveberê wê û di heman salê de çapxaneyekê kirê dike û lê çapê dike. Di **1937**`an de nakokî di navbera Pîremêrd û Karmendên Silêmaniyê de derdikevin; di encamê de çapxeneyê ji wî distînin û ew jî diçe cihekî din heta sala **1950**`î de karê xwe û weşana hejmaran berdewam dike û di heman salê de koça xwe ya dawî dike.

Pîremêrd, wekî piraniya helbestvanên kurd, di helbestên xwe de dabaşa xweşikbûn û ciwaniya xwezayê kiriye. Li ser

werzan jî axiviye ku werz perçeyek ji xwezayê ne û xweza bi werzan tê holê.

Di felsefeya xwe de, ew dixwaze ku mafê ji mêr û xortan re hatiye nivîsandin, divê heman maf ji keç û jinan re jî bê nivîsandin; da ku em bi aliyê jiyaneke wekhev ve biçin û ji kevneperestiyan rizgar bibin. Ji keçan xwestiye ku ew jî wekî lawan di dibistanan de bixwînin û xwe ji wê perdeya reş rizar bikin. Li ser vê rewşê jî wiha gotiye:

**"Ey keçikno werin mektebê**
**Hûn teskînê dilê me ne**

**Zîneta bax û ba û terqînê ne**
**Rewneqa destê gul im**

**Teze em tê gihîştin**
**Dayîka qenc xwendebar**

**Mesela we têne meydan**
**Qewmekê pê bêye kar**

**Jin şirîka jîna mêr e**
**Nek tenê xerêqa bar û dar e**

**Terbiyeta mêjik mindal e**
**Bo weten bê wijdan helal e"**

## Berhemên Pîremêrd:

- Pendên Pêşiyan; ku di nava helbestên xwe de gotiye û hejmara wan **4.800** pend in
- Çîroka Mem û Zîn (çîrokî Mem û Zîn)
- Dazdeh siwarên Merîwan
- Mehmûd Axayê Şêwekel
- Dîwana Ibrahîm Mewlewî
- Kemençejenî

Piştî mirina wî, hemû berhemên wî li Îraqê di bin navê "Bîranînên Pîremêrd" de, di sala **1951**`ê de hatine berhevkirin û çapkirin.

## Pirsên Nirxandinê

- Pîremêrd, di felsefeya xwe de banga çi dikir û çi gotiye?

- Helbesteke wî li ser Newrozê heye, hewil bide ku tu vê helbestê bîne û binivîse.

- Ji bo pêşketina kovara Jîn, çi xebat kiriye?

- Rojnameya Kurdistan:
- Ji aliyê kê ve û di bin bandora çi de, derket holê?
- Çi guherîn bi xwe re anî holê?
- Di aliyê wêjeyî de, çi xebat ji bo gelê kurd kiriye?

Wane 7

# ŞANO

## 1. Dîroka derketina şanoyê

Şano, ji bilî hunerên din û ji wan cuda, bi destbêkirina jiyana mirovahiyê re dest pê kiriye. Wekî ku mirov, wêjevan, hizirmend û ramyar e, helbet ew ê aşiqê afrînerî û hezkerê bedewiyê be; ji ber vê yekê jî em dibînin ku lîstikvanî û lasakirina hin kes an jî hin lawiran, rewişteke ji xwezaya mirovî ye, ev jî diyar dike ku zarvekirin û lîstikvanî zikmakî ye.

Karê mîna afsûnkarî, rêuresmên olî, şahî, dîlan û stran nîgarkirina ser dîwar û nexşeyên ser keviran û pêşkêşkirina qurbaniyan ji xwedan re, wekî destpêka hunera şanoyê hatine dîtin.

Ev rêûresmên olî, nîgar, nexşe û efsûnkariya li gel mirovê destpêkê bi du erkên girîng radibin, ew jî evin:

- Erkê zanistî û ramyarî: têghiştina jiyan û mirov di rêya bikaranîna xwezayê de diyar dike. Dema ku mirovek, rûyê lawirekî li ser kevirekî dinexşîne wê demê ew dixwaze ku wê bike bin kontirola xwe yan jî dema ku buyera nîşçîrê dinexşîne; wê demê ew diyar dike ku ev xwesteka wî ye û dixwaze wê pêk bîne.
- Erkekî hunerî û estetîkî: Ev jî dema bikaranîna hunerê û çêja xweş di bikaranîna hest û ramanan de diyar dike.

Ji vê yekê jî, em têdghêjin ku rêuresmên olî, stran, nîgar, nexşe û efsûnkarî, dema despêkirina şanoyê diyar dikin.

Li ser tehtên şkeftên Mezra Botan ên ji serdemên Mezolîtîkê (20.000-12.000 sal B.Z) wêneyên mirovên ku kevilên lawiran danîne ber rûyên xwe û tevgerên rîtmîk hatine dîtin; ev jî wekî rûpaş(perde) a despêkê şano tê pejirandin.

## 2. Pênaseya şanoyê

Şano; yek ji beşên hunerê ye û cureyeke wêjeyê ye.

Di wateya xwe ya hunerî de; teşeyekî hunerê ye ku di rêya wê de deqa wêjeyî veguhêzî dîmenan dibe û ji temaşevanan re pêşkêş dibe, şanoger jî li ser dika şanogehê van dîmenan bi tevgerên xwe pêşkêş dikin.

Mirov dikare şanoyê bi awayekî din jî pênase bike ku ew diyardeyeke hunerî ye li ser bingeha hevdîtineke bimebest di navbera şanoger û temaşevanan de, di dem û cihekî taybet û diyar de, bi armanca teyisandina deqeke wêjeyî, pêk tê.

## 3. Cureyên şanoyê

Şano, mîna hemû zanist û wêjeyên din, di nava xwe de dibe du beş:

1- Trajedya
2- Komediya.

Ev dabeşbûna şanoyê bi şaristaniya Yûnan ve tê girêdan. Wekî ku berê bi me re derbas bûye di bingeha xwe de bi rêûresmên olî ve hatiye girêdan.

Ev jî bi şahiyên ku di Yûnanê de ji xwedayê meyê **Diyonisyos** re dihatin pêşkêşkirin, derkrtiye holê.

Di dema werzê tirî de, mey çêdikirin û herkes serxweş dibû û rojên xwe bi kêf û şahî derbas dikirin, dema ku tirî bidawî dibû, her kes xemgîn dibû û ji van bûyeran şanoyên tirajediya û komediya derketin holê.

### Hin navdarên şanoyê

1- Tirajedî: Isxîlos, Yûrpîdîs û Sofoklîs.
2- Komedî: Arîstovans.

## **4.** Dîroka şanoya Kurdî

Dîroka şanoya kurdî, di salên **1900**`î de gelê kurd karîbû dest bi parastina dîroka xwe di rêya nivîsa şanoyê de bike, ev jî di rêya pêşkêşkirina yekemîn şano ku di sala **1905**`an de li Hewlêrê di bin navê **"Tarîtî û Ronahî"**. Bi serpereştiya Evdulerhîm Rehîmê Hekarî jî ve, bi nivîsandina şanoya **"Memê Alan"** dest pê dike û di sala **1918**`an de di Kovara Jîn de li Stenbolê tê weşandin. Di serdema komara Mihabadê de jî şanoyeke din ku bi navê **"Dayîka xwegorî"** hatiye pêşkêşkirin. Ji bilî vê jî li gelek herêmên Kurdistanê xebatên mijara şanoyê hatine kirin, lê ev xebat berdewam nekirin, ev jî ji ber sedemên derketina şer û qedexeya li ser huner, wêje, çand û zimanê kurdî.

Şanoya kurdî; li Bakurê Kurdistanê di salên **1950**`î de peşvecûnek bi dest xist. Ev jî bi serpereştiya Mûsa Enter ku di nivîsa şanoya **"Birîna Reş"** de derket holê.

### Komên ku wê demê avabûne ev in:

- Koma Jiyana Nû li Stenbolê, **1992'an**.
- Koma Evîna Welat li Stenbolê, **1994'an**.
- Koma Amara li Mersînê, **1997'an**.

Pistî van komên şanoyê, gelek kom avabûn lê yên herî li pêş ew bûn. Ev kom bi xebatên xwe yên şanoyî, gelek lîstikên bêhempa di dîroka xwe ya şanoyî de, listin.

Hin ji wan lîstikan jî ev in:

- Koma Jiyana Nû: Ta Sê Êwren Dûr, Rojbaş, Komara Dînan û gelek lîstikên din jî ji aliyê vê komê ve, hatine lîstin.
- Koma Evîna Welat: Govenda Hilo.

Di dema îro de, gelek xebat li ser şanoyê dibin bi armanca ku şanoya kurdî jî bigihêje asteke bilind, ev yek jî bi rewşa civaka gelê Kurd û sedemên erdnîgariya kurdistanê û dewletên dagirker ku derfet nedane gelê kurd ku di her warî xwe li pêş bixe û bi taybet di warê şanogerî de. Lê wekî îro em dibînin ku di nava bernameya Newrozê beşekî taybet ê şanoyê heye û bi

taybet li Rojavayê Kurdistanê cihên taybet ên şanoyê avakirin û tê de lîstikvan şanoyên xwe pêşkêşî gel dikin. Mînak: Navenda Mihemed Şêxo û Navenda Aramê Dîkran…

## Beşek Ji Şanoya Evdulrehîmê Hekarî

## Memê Alan

Kesayet:

- **Memê Alan**
- **Lewend: Hevalê Memo**
- **Çavreş: Dayîka Memo**
- **Xezal: Hevjîna Memo**

### Memo û Çavreş

**Memo:**

**(Tenê)** Belê… Îro Mîr emir kiriye, xeza (êrîş) ye. Neyaran Serhed girtine. Zaryê kurdan, meazellah dê di ber dest û piyên dijnminan de biçin…

Ez ji kî kêmtir im! Ma ez Kurmanc nînim! Ma namûsa her kurdekî namûsa min nîne! Elbet…Elbet ezê biçim. Qiyamet rabit dîsa ez diçim. Xwîn seran bibit dîsa ez xwe nagirim. Heta Xezal jî min meni' biket dîsa ez ranawestim. Ez Memê Alan im. Mîrê Hekariyan emir kiriye; hem Sultan Selahedîn şûrê xwe kêşaye, li pêşîya temamê dinyayê rawestiyaye, Qudsa pîroz diparêze. Tevahiya xaçperestan berhev bûne ku ew ê ji islamê bistînin. Bersiv ji Mîrê Hekariyan hatiye, em dê biçine alîkariya wî. Islam hemî li wê derê berhev bûne. Ji bo çi? Elbet ji bo xezayê. Ma ez ji wan nazdartir im! Ma xêra xezayê dê her ji bo wan bit!

**(Dayika Memo ji der da tê. Wekî kurê xwe weha pir xeyalan dît.)**

**Çavreş:**

Kurê min, Xwedê xêr ke! Te çi bihîstiye tu weha pir hidet î, çavêt te weha sor bûne?

**Memo:**

Dayê, şîrê xwe li min helal bike! Dijminan ser li me rakiriye. Hatine Qudsê ji islamê bistînin. Û Mîr emir kiriye, xeza ye; dê biçine xezayê. Madem ez jî Kurd im û ez jî Alan im, bab û bapîrêt min di vê rê da çûne, divêt ez jî di vê rê da biçim. Te şîrê spî daye min. Şîrê xwe li min helal bike.

**Çavreş:**

Kurê min, di riya dînê xwe û di rêya welatê xwe da eger ez li te helal nekim, Xwedê jî min helal nake. Eger tu îro neçî, sibê dijmin dê bê. Min tu ji bo rojekê weha xwedî kiriye. Ku tu wî cihî ji bo dîn û welatê xwe bigirî, navê Kurdîtiyê, Kurmancîtiyê bilind bikî, min şîrê xwe helal kir. Xwedê digel te bî.

## Pirsên Nirxandinê

- Kesayetên şanoyê lêkolîn bike.

- Trajediya û komediya pênase bike û erka wan diyar bike.

- Di nava gelê Yûnanê de şano bi çi rengî li pêş ket?

- Şanoya "Memê Alan" bixwîne û bi hevalên xwe re guftûgo bike.

Wane 8


# DIBISTANA NATURALÎZM

Natûralîzm, tevgereke wêjeyî ye û di sedsala 19'an de li Fransayê dest pê kiriye. Rêveberê rêbaza Natûralîzmê Emîle Zola ye. Natûralîzm û realizm, manend in. Li gorî Natûralîzmê, her tişt bi mirov û bûyerên xwezayî ve girêdayî ye. Bi taybetî, li ser bingeha rastiyê hatiye avakirin.

## Rêgezên wê:

- Ev rêbaz, awayekî zêdeker ê realîzmê ye.
- Wêjevanê wê, bûyer û kesan bi çavên kesên zana lêkolîn dike û ji têgihandina aliyên wan ê xerab jî, nareve.
- Nivîskar, ji rêgezên bûyerên biyolojîk, ên weke: sedem û encameke diyar dikeve ser rê û vê di wêjeyê de pêk tîne.
- Destûra ku dibêje: huner, berhemê xwezayê ye, digire nava xwe.
- Li gel nivîskarê wê, bandora hawîrdorê ya li ser giyana mirov, pesartina taqîkirin û çavdêriyê girîng in.

# WEFAYÎ



Dibêjin: **"Wefayî serdarê hozanvanê Sablaxê (Mehabad) bû û bilbilê baxê welatê Mukriyan bû"**.

Navê wî yê rast "Hacî Mîrza Rehîm e". Kurê Mela Xefûr e. Di Sala **1844**`an de li bajarê Sablaxê ji dayîk bûye û li heman derê xwendiye û hînî zimanê farisî û wêjeya kurdî bûye. Wî, bi zimanên din jî helbest nivîsandine û gotine.

Şêx Ubeydulahê Nehrî, pê dihese ku Wefayî helbestvan û dengbêjekî xweşgo ye. Wî, gazî Wefayî kiriye û aniye cem xwe. Wefayî, demeke dirêj li gel Şêx Ubeydulahê Nehrî maye. Helbestên evîndarî û hezkirinê jê re gotine. Li gel Şêxê Nehrî, derbasî Silêmaniyê bûye. Li Silêmaniyê, li gel kesên zana fêrî zanînên kurdî bûye.

Piştre bi Şêx Seyîdê Hefîd, Şêx Mustafayê Şêx Evdulsemedê Qazî, Seyîd Ehemedê Xaneqa û Hecî Tewfîq (Pîremêrd) re, çûye Hecê û di sala **1902**`yan bi rê de li Çola Erebistanê nexweş ketiye û jiyana xwe ji dest daye.

Hecî Tewfîq (Pîremêrd) dibêje: **''Min Wefayî bi destê xwe spartiye axê''**.

Wefayî, helbestên xwe piranî li ser evîndarî, xizanî û belengaziyê nivîsandine. Di çêkirina helbest û xemilandina helbestê de awayê Melayê Cizîrî, li ber çavan girtiye.

Dîwana wî ya helbestan, piştî wî di sala **1978**`an de li Bexdayê hatiye çapkirin.

## Helbesta Wefayî

**Xweş e rojek li alem der bi der bim**
**Li nav awza'ê dinya bê xeber bim Ji**
**ber taqeta dîwana asa**
**Ji Xoresanê derya bê xeber bim**
**Şev û roj li çolê her binalim**
**Herîfî şevrevê bayê sehr bim**
**Nezanbe qet kes navnîşanê min**
**Eger aqil eger aşîvte ser bim**
**Li her alî bila bizivire xubara min**
**Li her cih û wara pêwîste seper bim**
**Cara bê hilgire cana ji nav dil**
**Li ronakî dilê yarê xeber bim**
**Li ber çavê termin soranî berzî**
**Geh bê dayîk geh bê bavik bim**
**Xuda! Çawan xwe carê bişewitînim**

## Wateya peyvan

**Alem:** Cîhan

**Awza:** Rewş

**Taqet:** Hêz

**Sehr:** Berbang

**Aşîvte:** Arşîv

**Xubar:** Toza hûr

**Seper:** Sîper

**Ronak:** Ronahî

**Termin:** Termê min yê mirî.

## Pirsên Nirxandinê

- Şêx Ubeydulahê Nehrî, kî ye?

- Wefayî bi çi zimanî helbest dinivîsand û rêbazê wî yê nivîsandinê çi bû?

- Wefayî beşdarî kîjan serhildanê bûye? lêkolîn bike.

- Li gorî te serdema klasîka kurdî, bi çi rengî bi dawî bû? Binirxîne.

# AGAHIYÊN WÊJEYÎ

Ji wekheviya du peyv an jî pêvekên ku di heman wate û erkê de dikevin piştî rêzbenda rêzikên helbestan re, **paşînk** tê gotin.

paşînk, di nava xwe de dibe sê beş:

1. **Paşînka ku bi peyvê ve çêdibe:**

**Mînak:**

Îro ji derba xencerê zanim bi êşanî **mela**

Teşbîhê zulfa dîlberê zanim perîşanî **mela**

2. **Paşînka ku bi pêvekê ve çêdibe:**

**Mînak:**

Xweşe rojek li alem der bi der **bim**

Li nav awza'ê dinya bê xeber **bim**

3. **Paşînka ku bi birepeyvan ve çêdibe:**

**Mînak:**

Ger nêçîrvan ji nêçîrê birevit **çibkim ez**

Per li ber babilîskê ne livit **çibkim ez**

Zaro li ber singê dayê ne nivit **çibkim ez**

Kes bi derdê evî dilî ne kevit **çibkim ez**

## Cureyên helbestê, li gorî teşe û sazûmaniya rêzbendê

Helbest, li gorî sazûmaniya rêzbendê dibe neh beş:

- **Helbesta Rast**: Helbesta ku rêzbenda hemû rêzikên malikên wê wekhev in.

**Wiha tê nîşandan: "aaaa/bbbb/cccc/..."**

**Mînak:**

"Herdû qewsên te ji qudret ne ji y**eng**

Jê bi mîzan bireşînin me xed**eng**

Birîndarin sîna bi ser pencepel**eng**

Romî pişt dît e'cemê bête fer**eng**

Hilbitin qenc ji nêv ateşê c**eng**

Tên suwaşê Hebeş û Nûbî û Z**eng**"

**(Cizîrî)**

- **Helbesta çaring:** Di vê helbestê de rêzbenda rêzika yekem, duyem û sêyem heman in, lê ya çarem cuda ye, jê re rêzbenda giştî tê gotin.

**Wiha tê nîşandan: "aaab/cccb/dddb/…"**

**Mînak:**

Suhtime derdê evînê

Kuştime nakit yeqînê

Kes bawer nakêt vê jînê

Lew bê hal û mal im ez

Agir û pêta di dilda

Meʼneye daxan ku hilda

Ew kîtab naçit tu cilda

,

Hafizê med han im ez

***(*Feqiyê Teyran)**

**45.Helbesta girikdar:** Di vê helbestê de rêzbenda rêzikên malikê hemû wekhev in, lê ya çaran heman hevok dubare dibe.

**Wiha tê nîşadan: aaa hevok/bbb hevok....**

**Mînak:**

Ez  daxwaza xanî me

Rewşa neqşê manî me

Di ristê de kanî me

Ez nizanim çi bêjim

Nakin dengê saza min

Guh nadin awaza min

Yan nizanin raza min

Ez nizanim çi bêjim

**(Cegerxwîn)**

- **Helbesta destaneyî (ser rû):** Ev cure helbest, malikên wê du rêz in û rêzbenda wan wekhev e.

**Wiha tê nîşadan: aa/bb/cc…**

**Mînak:**

Ger dê hebûya me jî xwedanek
,
Alî keremek letîfedanek

Ilm û huner û kemal û izaṅ
Şeir û xezel û kîtab û dîwan

Ev cinis bibûya li ba wî meḿûl
Ev neqid biba li nik wî meqbûl

Min dê eĺema kilamê mewzûn
,
Alî bikira li banê gerdûn

***(*Ehmedê Xanî*)***

- **Helbesta pêçayî:** Di vê helbestê de rêzbenda rêzika yekem û ya çarem, heman in û her wiha tê xwestin ku rêzbenda rêzika duyem û sêyem jî heman bin.

**Wiha tê nîşadan: abba/cddc/effe…**

**Mînak:**

Ala kurdan di nav r**ok**
Çi bedew û bi heybet
Bi çar rengî rengê te
Çi delal û çi xweşk**ok** ***(*Celadet Bedirxan*)***

- **Helbesta çeprast:** Di vê helbestê de rêzbenda rêzika yekem û ya sêyem, heman in û her wiha tê xwestin ku rêzbenda rêzika duyem û çarem jî heman bin.

**Wiha tê nîşandan: abab …**

**Mînak:**

Geş stêrekê dewran veda, cîhan lê bû agedar

Kurdistanê tev şevqe da, ronî bûn tev deşt û

newal Ji bo çilan tarî nema, her tişt li me bû diyar

Tîrêja wê li bakur da, giha welat mal bi mal

***(*Seîd Mela Yîsiv*)***

- **Helbesta puşandî**: Di vê helbestê de rêzbenda rêzika yekem û ya sêyem heman in. Ev rêzbend, bi awayeke giştî di malikên sêtik de hene.

**Wiha tê nîşadan: aba/cdc/efe…**

**Mînak:**

Silêmanî zeman rast tu divê bavkê Silêman bû

Ereb înkarî fesala we nakin efselin emma

Selahedîn ku dinya girt ji zimra kurdê baban bû

**( Şêx Rıza Talabanî )**

- **Helbesta dûrik:** Di vê helbestê de rêzbenda rêzika yekem, duyem û çarem a helbestê wekhev in û rêzbenda rêzika sêyem cuda ye.

**Wiha tê nîşandan: aaba/ccdc/eefe…**

**Mînak:**

Derdên min kûr in wek çemê **Ferat**

Feratê derdan hilat û **dahat**

Derdê pir mezin kula pir giran

Derdê Kurdistan axîna **welat**

Ez tim dinalim her sal û her m**ah**

Qêrîn û firyad hewar û sed **ah**

Digel min digrîn Seyran û Şêrîn

Nalîna dengê Gulnaz û Dilş**ah**

**(Cegerxwîn)**

- **Helbesta yek kêş:** Malikên vê helbestê du rêz in. Rêzbenda rêzikên duyem ên hemû malikan heman in. Tenê di malika yekem de rêzbenda her du rêzikan heman in. Lê di malikên din de rêzbenda rêzika yekem û ya duyem, ji hev cuda ne.

**Wiha tê nîşandan: a a/ba/ca**

**Minak:**

Hûrî peyker dîlberek min dî di camê de eyan

Lew ji min efxan û nalîn her diçin ta kewkeban

Gîsowê çîn çîn muselsel wê ji ser ta zêrî pa

Helqe helqe zûlfê derdorê rûxweş çûn eqreban

**(Kerbelayî)**

# BEŞA DUYEM

## Qonaxa wêjeya kurdî ya nûjen

- Di sedsala 20`an de bandora guhertinên ramyarî û civakî li ser gelê kurd
- Dîroka wêjeya kurdî li Yekîtiya Sovyetê
- Wêjeya kurdî ya nûjen li Yekîtiya Sovyetê
- Erebê Şemo
- Roman
- Qenatê Kurdo
- Casimê Celîl
- Ordîxanê Celîl
- Celîlê Celîl

10.Emînê Evdal

# DI SEDSALA 20`AN DE BANDORA GUHERTINÊN RAMYARÎ Û CIVAKÎ LI SER WÊJYA KURDÎ

Di sedsala **20**`an de guhertinên mezin ên civakî çêbûne. Di vê sedsalê de şoreşa sosyalîzmê û şoreşên rizgariya netewî derketine pêş. Li gelek deveran encam jî girtine. Têkoşîneke bihêz, li hemberî hêzên serdest hatiye bipêşxistin û zemîn ji bo hemû aliyên jiyana wan a civakî, zanistî, wêjeyî, dîrokî, çandî û nivîsê hatiye afirandin. Li gel van êrîşên herî dijwar, bi taybetî yên dewleta Tirk ên li ser ziman, çand û wêjeya kurdî di vê sedsalê de hatine pêkanîn

Êdî ne tenê bi awayê razberî, lê belê bi awayê şênberî û razberî êrîş li ser wêje û hebûna kurdan kirin û xwestin bi awayê şênberî, yan jî razberî kurdan ji dîrokê rakin. Her çiqas di encama van êrîşan de bi hezaran rewşenbîrên kurd hatibin tunekirin jî, lê di vê kiryara xwe de dagirker bi ser neketin û gelê kurd ev sedsal, kiriye sedsala serhildan û berxwedanên netewî.

Wêjeya kurdî ya ku bi hezarê salan derbas bûye û pêş ketiye, gelek helbest û helbestvanên mezin derxistine holê. Nivîsa kurdî, ta sedsala **19**`an de kêm hatiye nivîsandin. Sala **1898**`an bi derketina Rojnameya Kurdistan re, zimanê kurdî gaveke mezin ber bi guherînê ve avêt. Ji bo afirandina alfebeya kurdî, ji aliyê gelek kesan ve gelek hewldan hatine kirin.

Ji aliyê kurdan bi xwe ve zimanê kurdî, heya salên **1932**`yan bi zimanên biyanî hatiye nivîsîn. Bi vê nivîsê re rojname, kovar - dîwanên kurdî hatine çapkirin. Di sedsala **20**`an de nivîsandin - wêjeya kurdî her çiqas ne li gorî tê xwestin be jî, pêşketinek bi xwe re afirandiye.

Bi hilweşandin û belavbûna împaratoriya Osmaniyan re hewldanên rewşenbîrên kurd ên ji bo pêşxistin û parastina ziman û wêjeya kurdî, ji aliyê nijadperestên tirk ve, dihat

astengkirin. Weke me li jor jî diyar kiriye, di encama van çewisandinan de bi hezaran şehîd çêbûne û gelek rewşenbîr neçarî koçberiyeke demdirêj bûne.

Gelê kurd, ji hemû mafên xwe yên ramyarî û netewî hatiye bêparkirin. Bi avabûna Komara Tirkiyeyê re dewletê tevahî mafên gelê kurd mandele kir û hebûna gelê kurd nepejirand. Gava yekem a ku komarê avêtiye, piştî sererastkirina desthilatdariya xwe ya leşkerî û siyasî, bi awayêkî hovane dest bi çewisandina serhildanên kurdan kir û qedexe li ser çand û zimanê gelê kurd danî. Dewleta Tirkiyeyê, nivîsandin, axaftin, folklor, dîlan, navên kurdî û hemû hewldanên gelê kurd çewisandin û qedexe kirin.

Bi avabûna dewleta Îraqê re ji ber ku qedexeyeke weke ya Komara Tirkiyeyê daneniye li ser çand û zimanê kurdî, ev yek bûye sedem ku li başûrê Kurdistanê zanîngehên kurdî vebin û kêm be jî bikaranîna wêjeya kurdî ya bi awayekî serbest gavek bû, bi taybetî li beşê Soran bê domandin. Ev jî, bûye sedema ku gelek nivîskar û hunermendên kurd ji wê deverê derbibin.

Li Îranê jî, her çiqas zimanê farisî yê fermî be jî, zimanê kurdî û wêjeya kurdî xwe parastiye. Ev parastina wêjeya kurdî, ta rûxandina Komara Mehabadê berdewam kiriye. Piştî rûxandina wê, weşana radyoya zimanê kurdî herêmî ma û peywendiya di navbera herêmên Kurdistanê de lewaz ma.

Li rojava, ji ber ku di bin desthilatdariya Fransayê de bû, qedexeyek fermî li ser ziman û çanda gelê kurd tune bû. Rojava û Şam, bûbûn navenda kombûna rewşenbîrên kurd ên ji ber zordariya dewletên dagirker koçber bibûn. Lê bi awayekî fermî, mafê perwerdeya bi zimanê kurdî nehatiye dayîn. Ji aliyê rewşenbîr, helbestvan û nivîskarên kurd ve rojname, kovar, dîwan û gelek berhemên wêjeyî hatine weşandin. Lê dema ku rejîma baas bû desthilatdar, wan jî dest bi girtin, qedexekirin û pişaftinê kirin. Gelek welatiyên kurd bênasname hiştin. Navê

gund û bajarê kurdan guhartin. Kurd bi giştî ji mafê wan ê xwezayî û rewa bêpar hiştin. Ev yek heta Şoreşa Rojava dom kiriye û di pêvajoya vê şoreşê de jî xebatên avakirina pergala jiyana demokratîk û perwerdeya bi zimanê dayîkê, rê li ber pêşketina wêje, huner û hwd vekiriye.

Wane 1

# DÎROKA WÊJEYA KURDÎ LI YEKÎTIYA SOVYETÊ

Di van salên **1880-1914**`an de gelek şer di navbera imperatoriya Osmanî û Rûsî de derketin holê, sedema van şeran jî bi piranî ji bo kontrolkirina her du tengavên navdar **"Derdenîl û Bosfor"** bû. Gelek caran ji ber ku artêşa Rûs gelek deverên di bin destê Osmaniyan de girtibûn û nêzî deverên Kurdistanê bûbûn, şerê wan li ser xaka kurdan jî li dar diket û yê herî zêde ziyan û êş didît jî, gelê kurd bû. Piraniya van şeran jî bi serkeftina Rûsan bi dawî dibûn.

Ji xwe, ev şerên ku dihatin lidarxistin li ser pişta gelê kurd bûbûn barekî giran. Piraniya wan jî di komkujiyan re derbas dibûn bi taybet jî kurdên "elewî û êzîdî", ev kiriyar û şer bûn sedema koçberiyê li ba gelê kurd û neçar man ku berê xwe bidin hin deverên biewle. Di wê demê de jî deverên herî zêde aram û biewle, deverên Qafqasyayê bûn, ji ber vê jî wan berê xwe dan van deveran û li wê derê bi cih bûn. Lê belê piraniya kesên ku berê xwe dan wan deveran, biçûk bûn û di sêwîxaneyan de mezin bûn.

Bi derketina markisîzmê re, di sala **1843**`yan de guhrînên rasterast di nava civakan de çêdibin û bi taybet civaka kurd ew civaka ku di nava wêjeya olî de, hatiye bêhinçikandin û rehên wê li kaniya rêzgarkirnekê digere. Hêdî hêdî guherînan di nava xwe de çêdike û bi daxwaza ku zarokên kurdan li dibistanên fermî bêne perwerdekirin, ne di mizgeft û hicreyên meleyan de.
û xwe rêzgarkirin ji hişmendiya kevin a ku li ser gelan hatibû sepandin ku rêbazên pişaftin û qirkirin di nav de pêk tanîn. Em dikarin bibêjin ku Şoreşa Markisî bandoreke erênî li wêjeya kurdî kiriye û gelek wêjevan jî bi hizrê Markis bandor bûne ji lewra ew weke civaknasê yekem ê nûjeniyê tê naskirin. Di

nêrîneke xwe de wiha dibêje: **"Ol efyona gelan e"**; ev jî tê wateya ku olê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin û civakeke kole ku rajeya wê bike, diafirînin û di dawiyê de vê koletiyê wekî çarenûsa wê dibînin.

Bi belavbûna markisêzmê re; hizrê netewî li cem gelên bindest bêtir li pêş dikeve ku gelê kurd yek ji wan bû. Di dawiya sedsala **19**`an de wêjevanên kurd bi gelek hewildanan ku berê gelê kurd bidin nivîsa pexşanê ango dest bi nivîsa rojname û kovaran bike, tevî vê jî hîn rêzimana erebî tê bikaranîn ku gelek pirsgirêkên bilêvkirin û nivîsandinê di nava zimanê kurdî de çêdikin, tevî van pirsgirêkan Rojnemeya Kurdistan a ku bi zimanê kurdî cara yekem li Qahîrayê ji aliyê Midehet Bedirxan û çend hevalên wî ve hatiye weşandin, rê li ber wêjevanên kurd vedike ku lêkolînên girîng der barê ziman, wêje û dîrokê de bikin.

## Lêkolîn

Kurd çawa ber bi dewletên Yekîtiya Sovyetê ve çûn û di bin çi bandoriyê de bûn û çi pêşketin di çand û wêjeya kurdî de kirin?

Wane 2

# WÊJEYA KURDÎ YA NÛJEN LI YEKÎTIYA SOVYETÊ

Li gorî ku di hin jêderên dîrokî de hatiye gotin ku di sala **1857**`an de yekemîn pirtûka wergerî zimanê kurdî bûye "Incîl" e û li Stenbolê, bi alîkariya hin keşeyên Ermenan hatiye çapkirin. Duyemîn pirtûka ku wergerî kurdî bûye bi navê "Alfebeya kurmancî-Ermenî" ye bi tîpên ermenî û bilêvkirina kurmancî hatiye nivîsandin, ew jî li Stenbolê hatiye çapkirin. Ev pirtûk bi çend taybetiyan hatiye nasîn, hin ji wan jî ev in:

- Yekemîn pirtûka fêrkirina zarokan bû.
- Yekemîn pirtûka şîrovekirina Incîlê bû.
- Yekemîn pirtûka kurdî bi alfebeya ermenî bû.
- Yekemîn ferhenga "kurdî-ermenî" bû û di nava wê de 300 gotin hebûn.

Di sedsala **20**`an de, rê li pêşiya zarokên kurd vedibe ku li dibistanên fermî bi zimanê kurdî perwerde bibin; da ku wêjevan û zanyarên bi nav û deng ji van dibistanan derbiçin û rêyeke nû ji wêjeya kurdî re, vekin.

**"Şoreşa Oktoberê"** ya ku di sala **1917**`an de li Rûsyayê li dar ket. Pêşketinên herî bibandor di jiyana gelek netewan de çêkir û bi taybet pêşketina hestên netewî di nava van netewan de, bi xwe re anî. Di vê şoreşê de gelê ermen mafê xwe bi dest xist û li gorî biryara Lenîn; rê li pêşiya kurdan jî vebû ku bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin û biranşên xwe yên perwerdeyê amade bikin.

Bi hatina sosyalîzmê re û di serdema Lenîn **1921**`ê de piraniya zarokên kurdan ên ku li Sovyetê dijiyan, derbasî dibistanan bûn û gelek dibistanên bi zimanê kurdî hatin vekirin. Bi alîkariya ermeniyan pexşan û wergerê di wêjeya kurdî de bi pêş dikeve, tevî ku çand û wêjeya kurdî li Sovyetê nexwedî dîrokeke dirêj in jî; lê roleke pir girîng di pêşketina wêjeya kurdî

de lîstine; roman, çîrok, kurteçîrok, werger û hwd di nava wêjeyê de li pêş ketin û bandoreke mezin li tevahî Kurdan pêk anîn û hêdî hêdî li hemû beşên Kurdistanê belav bûn.

Li gorî beşên din ên Kurdistanê, li gel ku serjimara kurdên li Sovyetê hindik bû jî, lê nivîskar û wêjevanên mezin ji wir derketin holê. Li ser zimanê kurdî, nakokî û pirsgirêkên wî gelek berhem hatin nivîsandin. Lê belê, ev pêşketin ta serdema hatina Stalîn berdewam bû, paşê roj bi roj paş de vegeriya. Hemû dever û dibistanên kurdan ên hatibûn avakirin, ji ber biryarên Stalîn hatin girtin û hilweşandin û piraniya gelê kurd surgunî sîbîrya û Asyaya Navîn kir.

Di sala **1921**`ê de Hakob Gazaryan Lazo alfebeya ermenî saz kir û di pirtûkeke bi navê "Şamîs" de çap kir û weşand; di vê pirtûkê de hin sembolên ku tîpên dengdêr ên kurdî derbirîn dikin, bikar anîn. Ev pirtûk bû çavkaniya sereke ya alfebeya ermenî, gelek dibistanên mîna dibistana Lazo û komeleya kurdî hatin vekirin û waneyên zimanê kurdî yên alfebeya ermenî di wan de hatin dayîn.

Di sala **1927**`an de yekemîn fîlmê kurdî yê bêdeng û bi dirêjiya 72’xulekan bi navê **"Zarî"** ji aliyê Bîg Nazarof û Armenkîno ku jiyana êzdiyên li ser sînorên Sovyetê vedibêje, hat weşandin.

Di sala **1928**`an de bi alîkariya nivîskarê ermenî Orbêlî; ji bo nivîsandina kurdî, tîpên latînî li şûna alfebeya ermenî hatin bikaranîn. Ev tîpên latînî bi hatina Erebê Şemo û derbasbûna wî ya qada zanist û wêjeyê re derketin holê; ango Erebê Şemo ew bikar anîne. Di sala **1930**`î de bi awayekî fermî tîpên latînî li Ermenistan û Gurcistanê hatin bikaranîn. Di salên **1931-1932**`yan de li Ermenistanê **9** pirtûkên ermenî û rûsî wergerî zimanê kurdî bûn. Di nava salên **1932-1933**`an de nêzî "**40** dibistanên kurdî vebûn" û "**71** mamoste" waneyên kurdî fêrî "**1936** xwendekaran" dikirin. Di heman salê de, di Yekîtiya

Rewşwnbîrên Ermen de beşeke Rewşenbîrên Kurd hate damezrandin û yekemîn berhema wêjeyî ya ku hate weşandin; romana "Şivanê Kurd" a Erebê Şemo bû. Lê li Azerbeycanê çand û wêjeya kurdî, qedexe bû. Li Bakoyê jî tenê pirtûkeke kurdî çap bû û di navbera salên **1933-1936`**an de tenê **6** pirtûkên kurdî hatin çapkirin. Di sala **1934`**an de kongireke rewşenbîrên kurd derbarê çand, ziman û wêjeya kurdî de lidar ket, ku di encama wî de ziman û wêjeya kurdî bêhtir xurt bû û di sala **1937`**an de di Radyoya Êrîvanê de programên bi zimanê kurdî hatin weşandin. Ji ber vê yekê jî salên di navbera **1932-1938`**an wekî serdema zêrîn di pêşketina çand, ziman û wêjeya kurdî de tên binavkirin.

Di sala **1938`**an de ji ber sedemên nêzîkbûna şerê cîhanê yê duyem, girîngiya zêde bi çand û wêjeya kurdî ve nema, Riya Taze hate girtin û çapkirina pirtûkên kurdî jî hatin rawestandin. Di navbera salên **1944-1945`**an de pergalên pişaftinê li ser çand, ziman û wêjeya kurdî hatin pêkanîn û alfebeya latînî hat qedexekirin û li şûna wê tîpên rûsî "kirîlî" hatin bikaranîn. Ji bilî van kiryarên ku li ser kurdan hatine pêkanîn, ji hêla Stalîn ve; nivîskarên kurd ên mîna Erebê Şemo hatin sugunkirin.

Di sala **1956**`an de piştî mirina Stalîn; tevgerên kurdan vehesîna xwe bidest dixin û dest bi karên xwe dikin û pirtûkên kurdî çap dibin. Programê ku di Radyoyê de dihatin weşandin; dîsa dest pê kir û Riya Taze jî weşana xwe careke din berdewam kir.

Di sala **1961`**ê de bêtirî **130** ciwanên kurd ên Sovyetê di Zanîngeha Moskova, Êrîvan, Lenîngrad û Bakoyê de dixwendin. Di vê dema kin de bi dehan kesên akademîk, rojnamevan, rewşenbîr û hunermendên kurd ên mîna: Erebê Şemo, Casimê Celîl, Wezîrê Cindî, Emînê Evdal, Ordîxanê Celîl û hwd, di komarên Yekîtiya Sovyetê de û bi taybet li Ermenistan û Gurcistanê derketin holê.

## Pirsên Nirxandinê

- Bi piranî wêjeya kurdî li Ermenistanê li pêş ketiye, çima?

- Tu çawa rola pêşketina wêjeya nûjen di nava gelê kurd de, dinirxînî?

- Çi berhem li wan deveran hatine çapkirin û gelo di roja me ya îro de peyda dibin an na? Lêkolîn bike.

Wane 3

# EREBÊ ŞEMO



Danerê yekem ê tîpên latînî yên zimanê kurdî, Erebê Şemo ye.

Erebê Şemo, nivîskarekî kurd ê bi nav û deng e. Weke bavê romana kurdî tê naskirin. Yekem romana kurdî ya ku bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin, berhema wî ya bi navê **"Şivanê Kurd"** e. Erebê Şemo, di **23.10.1897**`an de li gundê Susuzê li navçeya Qersê, ku di wê demê de di bin desthilatdariya Rûsyayê de bû, ji dayîk bûye.

Ew jî, ji malbata şêxan bû û di nava civaka xwe de navdar bûn. Erebê Şemo, xwendina xwe ya seretayî li Êrîvanê diqedîne. Wî, ji bilî zimanê kurdî, zimanê rûsî, tirkî, gurcî, almanî, azerî, yewnanî û ermenî jî baş zanibû.

Di sala **1927**`an de li ser daxwaza komîteya navendî ya komunîstên Ermenistanê, Erebê Şemo bi alîkariya Prof. Orbêlî û Ishaq Morgolêv ve yekem car tîpên latînî ji bo nivîsandina kurdî amade kir. Di wê salê de hîndekariya kurdî li Ermenistanê bi van tîpan bi rê ve çû. Di sala **1928**`an de tîpên latîtnî yên ji bo fêrbûna zimanê kurdî, ji aliyê wî û Ishaq Morgolêv ve û bi alîkariya Prof. Orbêlî hatibûn amade kirin, bi fermî li Yekîtiya Sovyetê hatin pejirandin.

Di sala **1929**`an de yekem pirtûka kurdî ya bi tîpên latînî li Êrîvanê bi navê "Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurmancî" ji amadekirina Şemo û Morgolêv hat çapkirin. Ew jî, bû berpirsiyarê yekem ê "Xwendina Dershazirkirinê". Ji **31.03.1930**`î ve bi wê alfebeyê dest bi çapkirina rojnameya **"Riya Teze"** bû û Şemo bû berpirsiyarê herî çalak ê rojnameyê.

Di sala **1931**`ê de Erebê Şemo li Lenîngradê rastî Qanatê Kurdo hat, hevaltiyeke baş di navbera wan de çêbû. Ji wir dest bi xebata xwe ya wêjeyî û zanistî kir. Li wê derê nivîsên der barê pirsgirêkên zimanê kurdî de amade kir û li Ermenistanê çap kir.

Di sala **1937**`an de ji aliyê Stalîn ve hat mişextkirin, ew şand qeraxa Sîbîryayê, heta sala **1956**`an ew li wê derê ma.

Piştî mirina Stalîn, ew hatiye bexşandin û careke din vegeriya Ermenistanê. Di sala **1966**`an de romana xwe ya dîrokî **"Dimdim"** belav dike. Di sala **1967**`an de jî li Moskovayê berhevoka **"Hikayetên Gelê Kurd"** û romana xwe ya bi navê **"Riya Bextewar"** çap kirin.

Di **21.05.1978**`an de li Êrîvanê jiyana xwe ji dest daye. Li ser dîwarê xaniyê ku Erebê Şemo tê de jiyaye, li ser kevirekî mermer bi rûsî wiha hatiye nivîsandin: "Di vê malê de nivîskarê kurd, bolşevîkê kevn, xebatkarê civatî yê bi nav û deng, Erebê Şemo Şamîlov jiyaye".

## Berhemên Erebê Şemo:

- Şanoya Aleksandir Araratyan "Koçekê Derewîn" Wergerandiye kurdî - **1930**
- Şivanê Kurd (Roman - **1935**)
- Li ser pêwendiyên feodalî ya di nava kurdan de - **1936**
- Berbang (Roman – **1958**)
- Dimdim (Roman -  **1965**)
- Hopo (Roman - **1969**)
- Pirtûka Alav
- Bi senaryoya wî, belgefîlmek bi navê "Kurdên Ermenistanê" hatiye çêkirin.

## Karên ku di jiyana xwe de kiriye:

S) Di nava artêşa Rûsyayê de karê wergerê kiriye.
T) Li Ermenistanê rêveberiya peymangeha amadekirina mamosteyan kiriye.
U) Di sala **1918**`an de tevlî Partiya Komunîstên Ermen bû.
V) Di sala **1924**`an de ji peymaangeha Lazarîv a zimanan li Moskovayê, derçûye.
W) Wekî damezrînerê rojnameya Riya Taze tê nasîn.
X) Di sala **1931**`ê de bû endamekî konseya rêveber a Partiya Komunîst a Ermenî.
Y) Ji sala **1930**`î ta sala **1937**`an, serokatiya weşana Riya Taze kiriye.

## Lêkolîn

Erebê Şemo:

Z) Çima bala gelê kurd kişand ser romanê di demeke ku roman di nava kurdan de peyda nedibû?
AA) Bi derketina romanê re, çi guherîn di nava wêjeya kurdî de çêbûn? Binirxîne.

Wane 4

# ROMAN

Têgîneke wêjeyî ye ku koka xwe ji peyva Romanus a latînî digire. Romanus jî tê wateya çîroka bûyera rastîn an jî ya nîgaşî. Bi rêbaza pexşane tê nivîsandin. Roman bi xwe ji rêzeçîrokan pêk tê; lê ew ji çîrokê cudatir e.

Di nava xwe de gelek kesan vedihewîne û li ser çend bûyeran diaxive. Di sedsala **18**`an de li Ewrûpayê bi taybetiya zayenda wêjeyî ya herî bibandor, derketiye holê.

## Hêmanên nivîsandina romanê:

- **Kesayet:** Bê guman, kesên ku di romanê de dabaşa wan tê kirin, mirov bi xwe ne. Di navbera mirov û leheng de peywendiyeke pir xurt heye û li aliyekî din jî ya herî girin kesayet e. Divê ku kesayet mîna hemû mirovan be ku xwedî tirs û hêz, hêvî, xalên xurtbûn û lawaziyê û xwedî armanc be.
- **Kesayeta alîkar (kesayeta duyem):** Dema ku roman lehengekî/ê yan jî du lehengan bigire nava xwe, wê demê divê kesayetin din hebin ku bêyî wan binesaziya romanê pêk nayê, dibe ku tu rola wan tune be jî, lê ku ew nebin; roman jî dê ne serkeftî be.
- **Leheng:** Di berhema wêjeyî de, ew kesayeta sereke ye, divê ku kesayeta leheng her tim nerm be û bikaribe xwe biguherîne. Ew bi xwe wekî tewreya berhema wêjeyî tê; pênasekirin. Ji vê jî hin taybetiyên lehengê/a yên ku roman li ser ava dibe, hene. Ew jî ev in:

- Xwedî biryar e û li dijî pirsgirêkan radiweste, gelek caran ji aliyê hin kesan ve rastî astengiyan jî tê.
- Rikberiyan dipejirîne û divê ku xwedî hêz be.
- Her tim di nava hewildanan de ye û li vê rêbazê digere.
- Hêza xwe kom dike û hevalbendan ji xwe re çêdike.

- û Li dijî stemkariya ku dixwaze wî/ê têk bibe, serî hildide.
- û Demeke dirêj bi êş û azaran re rû bi rû dimîne û paşê bi ser dikeve.
- û Bi hêzeke bixwebawer karibe li hember astengiyan raweste.
- û Li hember nebaşiyan derdikeve.
- û Ji raboriyên xwe sûd werdigire û fêrî nifşê li pey xwe dike.

S) **Cih û dem:** Di navbera jiyana leheng û cih de, peywendiyeke jîngarî heye; ji ber ku mirovên li gund û bajêr jiyan dikin, di nava wan de cudahî hene. Nivîskarê/a romanê jî lehengê/a xwe li gorî rewşa civakî li cihekî guncaw hidibijêre. Dem: Ew jî yek ji hêmanên bingehîn ên romanê ye; ji ber ku bûyerên di romanê de cih digirin an jî guhertina mirovan a ku bingeha romanê ye; di demekê de pêk tê. Li aliyê din jî du demên romanê hene:

S) Dema giştî ya ku bûyerên romanê tê de pêk tên. Mînak: Salek, du sal, mehek, rojek...

T) Dema taybet; ango dema romanê ya ku demek taybet tê de destnîşan dibe û bûyerên romanê di wê demê de pêk tên.

Z) **Kesayeta dijber:** Ew hêza ku lehengê/a romanê pê re dikeve hevrikiyê, ev kesayet di heman demê de nebaşiyê jî belav dike. Dibe ku nebaşî bi gelek awayan di rêya hin kes an jî hin bûyeran de belav bike. Dijberî; nûnertiya yek kesî nake, tenê hewildanan ji bo binkeftina leheng dike. Dibe ku leheng bi xwe, derbarê hin biryarên şaş an hin reftaran de, derbasî nava kêferatê bibe. Dibe ku ev her du kesayetên girîng, rastî hin guhertinan bên; ev jî cureyekî çarekirina kêferatê ye "guhertina di kesayetê de", ne tenê serkeftina lewhengê/a romanê ye.

AA) **Daraştin:** Berdewamiya bûyerên romanê ber bi çareseriyê ve, ew jî dabeşî du beşan dibe:

R) **Daraştina xwerû:** Di vê beşê de bûyer bi awayekî xwezayî derbas dibin, paşê kêferat û nakokî digihêjin lûtikaya xwe û hewildanên çareseriyê derdikevin pêş.

S) **Daraştina pêkhatî:** bûyer tê de ber bi dawiyê ve diçin, paşê kesê/a nivîskar ji çareserî û tevlîheviyan dest pê dike û hewil dide ku wan çareser bike.

## Cureyên romanê:

N) Romana romantîkî
O) Romana polîsî
P) Romana dîrokî
Q) Romana ramyarî
R) Romana niştimanî
S) Romana rasteqînî
T) Romana perwerdeyî
U) Romana derûnî
V) Romana nameyî
W) Romana şoreşgerî
X) Romana fantazyayî
Y) Romana aşopî

## Taybetiyên romanê:

S) Roman dirêj e.
T) Kesayetên wê pir in û bi piranî mirov in.
U) Di romanê de herî kêm du yan sê bûyer hene.
V) Dema wê diyar e.
W) Di romanê de agahiyên ramyarî, civakî, leşkerî û aborî ji bo xurtkirina mijara romanê û girêdana xwendekar bi bûyeran ve, girîng in.
X) Di romanê de dîmenên wêjeyî tên bikaranîn.
Y) Rê dide mirov û dihêle ku di peyvê de bihizire.
Z) Di nivîsandina romanê de, divê dewlemendiya ziman bê bikaranîn.

## Beşek ji romana Şivanê Kurd a Erebê Şemo

### Fikrê nû di nav milet de belav dibin

✈✆ Vê beşa romanê bixwîne û bi hevalên xwe re guftûgo bike û binirxîne:

Dema dayîna xûkiya bega û sixreya wan hatibû; Egîd beg bi xulamên xwe ji eşîrê re da zanîn ku herin ciyê pezê wî yê zivistanê çêkin.

Cangir beg jî emir da êla xwe. Gundiyên feqîr û (yên hinekî xweşhal) berê ku ji xwe re tiştekî bikin diviyabû ku, mal, zar û zêçên xwe li bin ezmên bihêlin, bi mer û bêra herin şixulê bega biqedîne. Gelek ji wan qebûl nekir, li dora Gezû civiyan û ne razîbûna xwe nîşan dan Mecid beg, qamçiyek di dest de, di ber koçera re derbas bû û bi awir li wan nêrî. Tu kes ji yên rûniştî ji bo ikaraha adetên kevin, bihatina wî ranebû.

Xemnakê, baş e, baş e, ronên!...

Egîd beg gote wan di nêzîk de, ezê we ji bav û kalên we bêtir bêxim bin hikma xwe. Hûn bawer dikin ku nîzama we ewê dom bike, ne?!! hûnê paşê bibînin! Ingilîz û Taşnaq çermê we û yê xortê we yên Kumunîst wê rakin…

## Pirsên Nirxandinê

- Cudahiyên di navbera roman û çîrokê de binivîse.
- Romana şoreşgerî li ser çi diaxive û bi piranî mijarên wê çi ne?
- Li gorî nêrîna te, gelê Kurd di warê nivîsandina romanê de, gihaştiye çi astê?

Wane 5

# QENATÊ KURDO



Qanatê Kurdo, di **12.09.1909**`an de li gundê Sûsizê yê girêdayî Qersê, di malbeteke cotkar de ji dayîk dibe.

Qanatê Kurdo, xwendina xwe di dibistana kurdî ya Lazo de dest pê kir. Ya ku sala **1922**`yan bi rêveberiya nivîskarê êzîdî Ehmedê Mîrazî, Lazo (Hakob Xazaryan) û hin dost û xêrxwazên gelê kurd ên ermenî, li bajarê Teblîsê ji bo zarokên kurd hatibû vekirin.

Sala **1928**`an bi pêşniyara Erebê Şemo, 8 ciwanên kurd ji bo xwendinê dişînin Lenîngradê (Saint Petersburg a niha); yek ji wan ciwanan, Qanatê Kurdo bû.

Ew destpêkê dikeve Fakulteya Karkeran û piştî bidawîkirina fakulteyê, xwendina xwe li enstîtuya dîrok, felsefe, zimanzanî û wêjeyê berdewam dike. Êdî di sala **1933**`yan de dema ku ew hîn xwendekarê enstîtuyê bû, bi Erebê Şemo û Îshak Sûkêrman re du gotarên zanyariyê li ser pirsên zimanê kurdî çap dike.

Qanatê Kurdo, di wan salan de li gel xwendina xwe ya enstîtuyê jî, di Fakulteya Karkeran de mamosteyê zimanê kurdî bû.

Piştî bidawîkirina enstîtuyê, li Zanîngeha Lenîngradê ya dewletê, weke xwendekarê aspîrantê (xwendekarê doktoriyê) tê hilbijartin û teza xwe li ser pirsên zimanê kurdî dinivîse û li Enstîtuya Etnografiyê karê xwe yê zanyariyê didomîne. Ew, li zanîngeha Lenîngradê dest bi mamostetiya zimanê kurdî dike.

Di sala **1946**`an de dikeve beşa Enstîtuya Rojhilatnasiyê ya Lenîngradê û heta dawiya jiyana xwe, li wê kar dike. Ji sala **1949**`an heta van salên dawiyê jî, li Ermenîstanê zarokên kurd

bi pirtûkên ku wî amade kiribûn, fêrî rêzimana kurdî dibûn. Mirov dikare bêje ku wî bi tenê karê zanîngehekê kiriye. Nêzî **20** kesî bi serokatiya wî ve tezên xwe yên doktoriyê amade kirine.

Pişka kurdnasiyê, li Lenîngradê meha duyem a sala **1959**`an hatiye damezirandin û rojhilatnasê navdar, dostê gelê kurd Hovsêp Orbêlî bû yekem serokê wê. Lê piştî çend mehan, wî serokatiya wê beşê spart Qanatê Kurdo, ku heta dawiya jiyana xwe serokatiya wê ocaxa kurdnasiyê dike.

Bi serokatiya Qenatê Kurdo ve kabîneya kurdnasiyê li pişka Lenîngradê ya Enstîtuya Rojhilatnasiyê, li seranserî cîhanê bû navenda kurdnasiyê ya herî navdar.

Ji salên **80**`yî ve ew êdî pirsa lêkolîna zimanê peykerên nivîskî datîne. Bi taybetî, yên bi şêwezarê Hewramî û Goranî. Şagirtên wî, bi taybetî profesor Zera Ûsiv, vî karî bi rûspîtî bi pêş ve dibe.

Divê bê gotin ku Qanatê Kurdo, piştevanê alfebeya kurdî ya li ser bingeha tîpên latînî bû. Ew di wê baweriyê de bû ku alfebeya bi tîpên kîrîlî, bi zorê li stûyê kurdên sovyêtê pêçane û çi qas zû ji wê rizgar bibin, ew qas baş e. Wî bi xwe jî, bi alfebeya kirîlî û latînî dinivîsand. Di pirtûkên xwe yên zanyarî û têkstên(nivîsên) kurdî de tenê bi alfebeya latînî didan û digot:
**"Siberoja zimanê kurdî, alfebeya bi tîpên latînî ye"**.

Dema ku bi peymana **11**`ê Adara sala **1970**`yî li Silêmaniyê zanîngeha kurdî vebû, ji bo xwendina korseke li ser zimanê kurdî, Qenatê Kurdo vexwendin Silêmaniyê. Ew gelekî şa bûbû, armanca wî ya bi salan ku di zanîngeheke kurdî de li ser zimanê kurdî semînaran bide, pêk dihat.

Destûra çûyîna wî nedan. Wî zanîbû ku ji bo kurdperwariya wî, rê nedanê biçe Kurdistanê û ev yek ji bo wî bû aloziyeke pir giran.

Salên Cenga Cîhanê ya Duyem jî, dema ku artêşa Yekîtiya Sovyetê ketibû rojhilatê Kurdistanê, wî pir dixwest ji bo berhevkirina metiryalên li ser zimanê kurdî, biçe wir. Lê wê demê, ji ber kurdperweriya wî, rê nedanê.

Di sala **1974**`an de dema ku Yekîtiya Sovyetê bi giştî pişta rejîma Îraqê digirt û çapemeniya di bin destê rejîmê de her dem li dijî serokatiya kurdan dinivîsî. Qenatê Kurdo bi awayekî vekirî piştgiriya şoreşa Başûrê Kurdistanê dikir û li her derê siyaseta Yekîtiya Sovyetê rexne dikir.

Di **31.9.1985**`an de dilê vî mirovê mezin rawestiya û jiyana xwe ji dest da.

## Berhemên Qenatê Kurdo:

11. Zimanê Kurdî: Rêzimana Kurmancî (**1957**)
12. Ferhenga Kurdî (Kurmancî-Rûsî) (**1960**)
13. Beranderkirina Rêzimanên Diyalêktîka Kurdî (Kurmanciya jor û Kurmanciya jêr) (**1973**)
14. Ferhenga Kurdî (Soranî-Rûsî) tevî Zara Yûsûpovayê (**1983**)
15. Tarîxa Edebiyata Kurdî - beşa 1 (**1983**), beşa 2 (**1985**)
16. Gramera zimanê kurdî (**1990**)
17. Dozdeh variyant, Mem û Zîn (**1996**)

Zarokên kurd, li welatê Sovyetê bi pirtûkên wî hînî zimanê dayîkê dibûn. Heta salên **1990**`î deh pirtûkên wî yên waneyan, li Ermenistanê hatine weşandin.

## Lêkolîn

Qenatê Kurdo; ji bo bixwendinkirina zarokên gelê kurd û pêşxistina wan, çi xebat kiriye?

Wane 6

# CASIMÊ CELÎL



Casimê Celîl, di sala **1908**`an de li gundekî navçeya Dîgor a girêdayî bajarê Qersê ji dayîk bûye.

Casimê Celîl, zarokatiya xwe ji pênc salî û pê ve di nava şer de derbas dike. Bi taybetî, dema ku Casimê Celîl derbasî Êrîvanê dibe; li wir rastî sifireya amade nayê. Ji ber vê yekê, di dema çûyînê de nikarîbûn xwarin, kinc, nivîn, pez û dewaran bi xwe re bibin, ku bi hêsanî çend rojan karibin debara xwe pê bikin.

Di wan deman de Yekîtiya Sovyetê, hîn Ermenîstan tevlî xwe nekiribû. Ji ber van sedeman; birçîbûn, belengazî û bêxwedîtî pir zêde bû. Ev kesê giranbuha, bi şevan ji derve radikeve û birçî dimîne. Piştî ku Ermeniyek xêrxwaz û dostê kurdan rastî wî tê,wî radestî sêwîxaneyê dike. Ev wêjevanê hêja, ji aliyê Sêwîxaneya Gonî ve tê xwedîkirin û perwerdekirin. Ji bo ku bi rewşeke rêkûpêk, bi kêrî gel û çanda xwe were, pir xebitiye. Di temenê biçûk de gelek navendên çanda kurd ji gelê xwe re damezirandine. Di temenê **23** saliya xwe **1931**`ê de bû rêveberê Komeleya Kurdan. Di wê xwendingehê de bi sedan keç û xortên kurd dixwendin û karê civata xwe dikirin.

Casimê Celîl, li malbateke kurd û xizan hatiye cîhanê. Navê wî, gihîşt asta herî jor. Temenê wî jî, zêde bibû û gihîştibû **90** salî. Lê gelê wî, ji xebata wî têr nedibû. Dixwest hê jî di nava wan de bimîne. Lê di roja **24.10.1998**`an de jiyana xwe ji dest da.

## Helbesta Singa Çiyê

Ji singa çiyê av tê xwarê
Ava belekiya berfê
Ez heyrana xala çenê
Lê bedewê lê canê

Elbekê tejî ke ji wê avê
Bireşîne ser gulê darê
Bila bêhna miska wan bê
Lê lê canê min heyranê

Cardin avê bi elbê bîne
Dilê min agire agir tîne
Bi ava elbê tu vehesîne
Lê lê canê tu bilezîne

Ez şivanim li serê çiya
Tu xezala best û zeviya Lê
lê canê te hingavtim Te
hingavtim bi çav biriya

## Pirsên Nirxandinê

û Casimê Celîl di çi rewşê de xwe gihand deverên Yekîtiya Sovyetê?

û Di jiyana xwe de ji bo gelê kurd, çi xebat kiriye?

û Hewl bide ku tu hin agahiyan derbarê Radyoya Êrîvanê de binivîse.

Wane 7

# ORDÎXANÊ CELÎL



Di demên Sovyetê de çend nav di warê rajeya tore, wêje, dîrok, çand, ziman, muzîk û zargotina kurdî de derketin pêş, hin ji van kesan jî malbata Casimê Celîlê Osê bû. Vê malbata kurdperwer; kar û xebat li ser dîrok û zargotina kurdî kiriye û di hemû qadên zanistê de cihê xwe girtiye.

Mirov dikare bibêje ku hemû zarokên vê malbatê, piraniya jiyana xwe pêşkêşî pêşxistina wêje, berhevkirin, weşandin, lêkolînkirina zargotina gel û kurdzaniyê kiriye û pirtûkxaneyeke dewlemend li pey xwe hiştiye.

Ordîxanê kurê Casimê Celîl; di **24.08.1932**`yan de li Êrîvanê ji dayîk bûye û di **27.10.2007**`an li Sankt Petersburg (Lenîngradê) koça xwe ya dawî kiriye.

Ordîxanê Celîl; doktorê zimanasî, profesor, zargotinzan û ronakbîrekî kurd ê bi nav û deng e.

Di sala **1951**`ê de li Zanîngeha Êrîvanê; beşa zimanasiyê xwendiye û di sala **1956**`an de xwendina xwe bidawî kiriye. Di heman salê de di Akademiya Zanistî ya Ermenistanê, di beşa kurdolojiyê de wekî berpirsyar kar kiriye. Di sala **1957**`an de li Zanîngeha Lenîngradê di Peymangeha Zanistî ya Rojava de, di beşa kurdî de dest bi kar kiriye.

Ordîxanê Celîl; yekem car dibe berdevkê Radyoya Kurdî û **3** salan karê xwe berdewam dike. Demekê bi birayê xwe Celîlê Celîl û xwişka xwe Cemîla Celîl re, li Gurcistan û Ermenistanê li nav herêmên ku kurd di wan de dijîn, digerin û li ser zargotin

15. wêjeya gelêrî ya kurdî lêkolînan dikin û berheman kom dikin.

Di sala **1958**`an de, Ordîxanê Celîl berê xwe da başûrê Kurdistanê û li wê derê li ser zimanê kurdî lêkolîn kirin. Di sala **1970**`yî de li ser kurdên ku surgunî Kazaxistan û Turkmenistanê bûne, lêkolîn kirin.

Ordîxanê Celîl di **75** saliya xwe de ji ber nexweşiya penceşêrê, li Lenîngradê koça xwe ya dawî kir.

## Berhemên Ordîxanê Celîl:

- Helbest, bi zimanê kurdî, Êrîvan **1959**.
- Têlî Hemze, Bi zimanê kurdî-kirîlî, Êrîvan **1963**.
- Dîlokên Cima'eta Kurda, bi zimanê kurdî-kirîlî, Êrîvan **1966**.
- Destanên Cima'eta Kurdan yên Mêrxasiyê "Xanê Çengzêrîn-Dimdim", lêkolîn û deq, bi zimanê rûsî û kurdî-latînî, Moskova **1967**.
- Mesele û Metelokên Cima'eta Kurda, beşa **1**`ê, bi zimanê kurdî-kirîlî, Êrîvan **1969**.
- Zimanê Kurdî, pirtûka wanedayînê, bi zimanê kurdî-kirîlî, Êrîvan **1969**.
- Mesele û Metelokên Cima'eta Kurda, beşa **2**`yan, bi zimanê kurdî-kirîlî, Êrîvan **1975**.

## Pirsên Nirxandinê


18. Zargotin, çi ye û ji çend beşan pêk tê?

19. Tu jî hewl bide ku çend berhemên Ordîxanê Celîl ji bilî yên li jor hatine diyarkirin, binivîse.

20. Cemîla Celîl; bi awayekî kurt lêkolîn bike û ji bo wêjeya kurdî çi xebat kiriye? Binirxîne.

Wane 8

# CELÎLÊ CELÎL



Celîlê Celîl; di sala **1936**`an li Êrîvanê ya paytexta Ermenistanê ji dayîk bûye. Di malbateke zana û rewşenbîr ku her tim di warê lêkolîn û zanistê de hewldan dikirin de xwedî bûye. Bavê wî Casimê Celîl e; yek ji wan kêsên ku roleke girîng derbarê pêşketina çand, ziman û wêjeya kurdî de lîstiye. Birayê wî Ordîxanê Celîl e; yê ku roleke mezin derbarê dewlemendkirina pirtûkxaneya wêjeyê de lîstiye û xwişka wî Cemîla Celîl e; ya ku gelek stranên kurdî berhev kirine û nêzî **500** stranên kurdî bi rîtm û awaz kirine.

Nivîskar, lêkolîner, zargotinzan û dîroknasekî kurd e. Li zanîngeha Êrîvanê û Akademiya Rojhilatnasiyê ya Lenîngradê xwendiye û di sala **1959**`an de ji beşa dîrokê, derçûye û heta sala **1963**`yan di Akademiya zanistî ya Rojhilatnasiyê ya girêdayî Lenîngiradê de kar kiriye. Piştî pêşkêşkirina projeya xwe ya bi navê **"Tevgera Rizgariya Kurdan ji sala 1850-1880`yî"**, bawernameya doktoriyê bi dest xist. Di navbera salên **1963-1993**`yan de di Peymangeha Rojhilatnasiyê ya girêdayî Akademiya Zanistî ya Ermenistanê de kar kiriye. Di sala **1991**`ê de nasnavê Profesor li wî hatiye kirin.

Ji sala **1994**`an ve li Zanîngeha Viyênayê wekî mamosteyê vekolînên kurdî, kar dike. Pir lêkolîn û berhemên wî yên nirxbuha derbarê dîrok û folklora kurdî de hene.

Nêzî **35** berhem û **100** gotar û vekolînên wî hene. Pirtûkên wî wergerî zimanên erebî, tirkî, ermenî, farisî, almanî û rûsî bûne. Pirtûkên wî yên wergerî zimanê erebî bûne, ev in;
**"Serhildana Şêx Ubeydulahê Nehrî 1880"** û **"Serhildana Kurdan a Çandî û Neteweyî ji sedsala 19`an ta ya 20`an"**.

## Berhemên wî:

12. Serhildana Kurda di sala **1880**`î de, Moskova **1966** bi zimanê rûsî derket, her wiha di sala **1979**`an de bi zimanê erebî derket, di sala **1987**`an de bi zaravayê soranî derket.
13. Zargotina Kurdan, li gel Ordîxanê Celîl.
14. Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan, **200** rûpel, Weşana Jîna Nû **1985**.
15. Çîrokên Kurdî, Weşana Nauka, Moskova, **1989**.
16. Zargotina Kurdên Sûriyê, li gel Ahmet Omer û Ordîxanê Celîl, Weşana Jîna Nû **1989**.
17. Dastanên Kurdî, li gel Ordîxanê Celîl, **244** rûpel, Weşana Zêl, Stanbol **1994**.
18. Autobiografie (otobiyograf'-kurtejiyan) a Ebdurrizaq Bedirxan, **72** rûpel, Weşana Havîbûn **1999**.
19. Dîwaro tera dibêm bûkê tu guhdar be, **158** rûpel, Weşana Pêrî, Stanbol **2000**.
20. Sîyapûş Seyfulmuluk, bi tîpên latînî, Viyena **2000**.

- Sîyapûş Seyfulmuluk, bi tîpên erebî, Viyena **2000**.
- Rûpelên Balkeş Ji Dîroka Gelê Kurd, **195** rûpel, **2002**.
- Keşkûla Kurmancî.
- Çîr û çîvanokên kurdî: Êrîvan **1971** (bi zimanê ermenî).
- Sêzde rûpelên balkêş ji dîroka gelê kurd, Viyena **2002**.
- Feqîyê Teyran Şêxê Sen’anîya (nezîrîye), Viyena **2003**.
- Çîrokê Cima'eta Kurdan, li gel Ordîxanê Celîl, bi zimanê kurdî, Êrîvan **1974**.
- Efsane û destanên kurdî, li gel Ordîxanê Celîl û Zîna Celîl, bi zimanê rûsî, Moskova **1989**. Her ew (parçek) Mixtarat min asatîr û hikayat şerqîye, bi zimanê erebî, Heleb **1996**.
- Mesele û metelokên gelê kurd, li gel Ordîxanê Celîl. Êrîvan **1991**. Her ew, bi tîpên latînî, Viyena **2005**.
- Çîrokên kurdî, li gel Ordîxanê Celîl, bi zimanê almanî, Frankfûrt **1993**.

## Pirsên Nirxandinê

11. Celîlê Celîl di malbateke çawa de mezin bûye?

12. Ji bo pêşketina ziman û çanda gelê kurd, çi xebat li pêş xistiye?

13. Hin berhemên wî li ser kurdên rojavayê Kurdistanê hene, gelo Celîlê Celîl çawa ev berhem nivîsandine? lêkolîn bike.

Wane 9

# EMÎNÊ EVDAL



Gelek caran ji wêjeya kurdên Yekîtiya Sovyetê re dibêjin:**"Wêjeya Sêwiyan"**. Ji ber ku kesên di sêwîxaneyan de mezin bûbûn, roleke pir girîng di damezrandina vê wêjeya giranbuha de, lîstiye. Emînê Evdal jî yek ji wan kesan e.

Emînê Evdal, nivîskar, ronakbîr, helbesvanekî kurd ê Ermenistanê ye. Di reseniya xwe de kurdekî êzîdî ye.

Emînê Evdal, di sala **1906**`an de li gundê Emençayîrê yê navçeya Dîgorê ya girêdayî Qersê ji dayîk bûye, di wê demê de jî devera Qersê di bin serweriya Imperatoriya Rûs de bû û li wê derê nêzî **17** gundên Êzdiyan ên ji êla sîpkî hebûn.

Di salên Cenga Cîhanî ya Yakem de; ji bo ku xwe bigihînin deverên biewle, piraniya Êzdiyên Serhedê koçber dibin û xwe digihînin Ermenistanê, ji malbata Emînê Evdal jî tu kes namîne; ew bi tena serê xwe dimîne û di sêwîxaneyê de xwedî dibe.

Di sala **1924**`an de ji sêwîxaneyê derdikeve û berê xwe dide Teblîsê, piştî du salan vedigere Ermenistanê. Ji ber ku wî di wê demê de xwendina xwe bi dawî kiriye, li gundê kurdan ên Ermenistanê, mamostetiyê dike. Ji sala **1926**`an ve, dest bi berhevkirina hin berhemên derbarê folklora kurdî de dike, lê zanebûna wî têra vî karê binirx nake; ji ber vê jî di sala 1931`ê de tevlî Fakulteya Zimanasiyê ya Zanîngeha Êrîvanê dibe.

Ji ber ku Emînê Evdal li Sêwîxaneyê xwedî bûye û zimanê kurdî ji bîr kiriye; yekemîn helbest û kurteçîroka xwe bi zimanê ermenî dinivîse, yekemîn kurteçîroka wî bi navê **"Casim û Tosin"** di sala **1924**`an de tê çapkirin. Belê piştî vê, êdî Emînê

Evdal bilez xwe fêrî zimanê kurdî dike û nivîsên xwe bi zimanê kurdî dinivîsîne.

Di navbera salên **1933-1937**`an de wî hin pirtûkên din ên fêrkirina zimanê kurdî da çapkirin û di sala **1944**`an de piştî pêşkêşkirina lêkolîna xwe ya bi navê **"Rola jinê di malbata kurdî ya kevn de"** bawernameya xwe ya doktoriyê bi dest dixe.

Di sala **1959**`an de beşeke Akademiya Rojhilatnasiyê ya Ermenistanê hate damezrandin û ew jî tê de amade bû û di sala 1960`î de ji aliyê Parlementoya Ermenistanê ve wekî mamosteyê kedkar û xebatkar hatiye xelatkirin.

Emînê Evdal di **22.09.1964**`an de koça xwe ya dawî kir.

## Berhemên wî:

j. Casim û Tosin, kurteçîrok **1924**.
k. Pirtûka zimanê kurdî, ji bo koma çaran **1933**.
l. Pirtûka zimanê kurdî, ji bo koma pêncan **1934**.
m. Buhar, koma helbestan **1935**.
n. Pirtûka zimanê kurmancî, ji bo refa xwenidnê ya çarem **1936**.
o. Motod (rêbaz) a hînkirina xwendin û nivîsandinê **1936**.
p. Folklora kurmanca, li gel Heciyê Cindî **1936**.
q. Rêbaza zimanê kurmancî, ji bo refa xwendinê ya şeşem, li gel Casimê Celîl **1937**.
r. Tolhildana xwînê di nava kurdan de û dawîanîna wê **1952**.

- Destana Gulîzer, bi zimanê ermenî **1956**.
- Çîrokên gelê kurd, bi zimanê ermenî **1957**.
- Ferhenga kurdî ya rastnivîsînê **1958**.

## Lêkolîn

Heciyê Cindî:

8. Kî ye?
9. Derbarê pêşxistina wêjeya kurdî de, çi xebat kiriye?
10. Li ku derê xwendiye?
11. Berhemên wî çi ne?

# BEŞA SÊYEM

11. Rewşa Kurdan piştî hilweşandina Imperatoriya Rûsî û Osmanî
12. Wêjeya kurdî piştî şerê cîhanî yê yekem li rojavayê Kurdistanê
13. Celadet Elî Bedirxan
14. Kamîran Elî Bedirxan
15. Cegerxwîn
16. Osmanê Sebrî
17. Qedrî Can
18. Seydayê Tîrêj
19. Mûsa Enter

Wane 1

## REWŞA KURDAN PIŞTÎ HILWEŞANDINA IMPERATORIYA RÛSÎ Û OSMANÎ

Mirov dikare hilweşandina van her du imperatoriyên mezin bi lidarxistina Cenga Cîhanî ya Yekem ve girê bide; ango Imperatoriya Osmanî di sala **1909**`an de ber bi hilweşandinê ve diçû û her ku diçû rewşa wê bêhtir aloz dibû û piştî cenga Cîhanê ya Yekem, ev imperatorî hilweşiya. Imperatoriya Rûsî jî, di sala **1917**`an de hat hilweşandin û li şûna wê di sala **1922**`yan de Yekîtiya Sovyetê ya xwedî pergala sosyalît hat damezrandin.

Di van salan de, her dewletek li berjewendiyên xwe digeriya her tim di nava hevrikiyê de bûn ku kîjan berî kîjan dewletê lingê xwe di Rojhilata Navîn de bigire; ji ber vê jî gelek hevpeyman di nava wan de çêbûn, nêzî **9** hevpeymanan di navbera wan dewletan de hatin imzekirin, yek ji wan hevpeymanan; **Sayks-Bîko** ya di sala **1916**`an de hat imzekirin di encama wê de Kurdistan di nava **4** dewletan de hate perçekirin. Wêjeya kurdî di nava xwe de ev perçebûn jiyan kir êdî di nava her perçeyekî de bandor bû û bandor li wê jî kir, bi taybet di aliyê nivîsandinê de ku li başûr û rojhilat bi tîpên erebî û li bakur û rojava bi tîpên latînî dihate nivîsandin, ev jî bû sedema perçebûna wêjeyî û derketina gelek zaraveyan û netêgihiştina navxweyî.

Di van salan de, rewşa gelê kurd êdî pir aloz bû, her tim di nava revandin, kuştin, qirkirin û komkujiyan re derbas bû, taybet di dema şer de ku şer gelek caran li ser xaka Kurdistanê dihat lidarxistin. Piştî derbasbûna şer û imzekirina gelek hevpeymanan; di sala **1923**`yan de û di encama imezeya hevpeymana **"Lozanê"** de Tirkiye wekî komar tê pejirandin, êdî hemû cureyên desthilatdarî û dagirkeriya wêjeyî, sepandina zimanê netewî yê tirkî û bikaranîna hemû cureyên pişaftinê li

ser gelê kurd hatin pêkanîn; a herî aloz jî ew bû ku li Tirkiye, Sûriye, Îraq **( dewletên ku nû avabûne)** û Îranê pergala pişaftina zimanê kurdî dihate pêkanîn û li şûna zimanê kurdî zimanê erebî, tirkî û farisî li ser gelê kurd disepandin. Ev qirkirin bûn sedema encamgirtina kesên ramyar, wêjevan, leşker û hwd. Di encama vê yekê de koçberî li Tirkyeyê derket û gelek kesan berê xwe da başûr û rojavayê Kurdistanê. Ji ber ku di wan deman de hem artêşa Birîtanyayê li Îraqê bû û li Sûryeyê jî artêşa Fransayê hebû û ev her du dewlet ji aliyê van her du dewletên rojavayî ve dihatin birêvebirin.

Di van salan de gelek serhildan û tevgerên rizgarkirina gelê kurd ên mîna: **Serhildana Şêx Seyîd 1925 û Komeleya Xoybûn li Libnan û Sûriyeyê bi rêveberiya Ihsan Nûrî Paşa ji bo piştgirtiya Serhildana Agirî 1927 û hwd** ku bi piranî li bakurê Kurdistanê ku şerê dewleta Tirk a dagerker ku ji aliyê Mistefa Kemal Ataturk ve dihate birêvebirin, derketin holê.

Ne tenê li Tirkyeyê ev desthilatdarî, pişaftin, dagirkerî û kuştin pêk dihatin, lê belê li Îran, Îraq û Sûryeyê jî dihatin pêkanîn û her yekê ji wan bi rêbazekî bikar dianî. Wekî mînak: Ji bo pişaftina zimanê kurdî, rêjîma Sûriyeyê zinara erebî da çêkirin û gelê ereb ên deverên hundir anîn nava gund û bajarên kurdan, heta ku kurd û zimanê wan di nava çand û zimanê vî gelî de bêne pişaftin û tu tevgerên kurdî li Sûriyeyê dernekevin holê. Heman rêbaz li Îraq û Îranê jî hatin pêkanîn. Di encama van kiryaran de, serhildanên gelê kurd jî zêde dibûn û di her demekê de jî rojname û kovar derdiketin holê ku bi piranî wêjeyî û ramyarî bûn, ji bo ku bala gelê kurd bikêşin ser serhildanên wan ên li dijî dagirkeran û li aliyê din jî wêjeya xwe ji bîr nekin, ev jî hin kovarên ku di wan deman derketin holê:

8. Kovara Rojî Kurd, Stenbol, bi zimanê kurdî (soranî û kurmancî) û tirkî, **1913**.
9. Rojnameya Jîn, Stenbol **1919**.

9. Rojnameya Kurdistan, Stenbol, bi zimanê kurdî û tirkiya osmanî ya bi tîpên erebî **1919**.
10. Rojnameya Bangî Kurdistan, Mistefa Paşa **1922**.
11. Rojnameya Bangî Heq, Silêmaniyê **1923**.
12. Rojnameya Jiyanewe, Silêmaniyê **1924**, paşê navê wê hate guhertin û bû Jiyan **1925**.
13. Rojnameya Diyarî Kurdistan, Salih Zekî Sahibqeran, bi zimanê kurdî, tirkî û erebî **1925**.
14. Rojnameya Ronak, Hewlêr **1935**.

Mirov dikare bibêje ku di van salan de tevî qirkirin û pişaftina li ser gelê kurd dihat kirin, gelê kurd li ser lingê xwe ma û tevgerên xwe yên ramyarî, civakî, aborî, leşkerî û hwd ranewestandin û berdewam kirin û her ku dem diçû ji berê bihêztir dibû, bi taybet di dema koçberiya ber bi Sûryê ve. Di nava van koçberan de kesên rewşenbîr û wêjevan ên mîna: Mala Bedirxan Beg, Cegerxwîn, Nûrî Dêrsmî, Osman Sebrî û hwd hebûn. Êdî van kesan karê xwe li Sûriyeyê berdewam kir û bûn bingehek ji pêşxistinan, hem ji aliyê ramyarî hem jî ji aliyê wêjeyî ve.Her wiha derfetên mezin li ber wêjevanên kurd vebûn ku karekî pir girîng bikin, hem li Sûryê hem jî li welatên cuda mîna: Misir, Libinan û hwd.

## Pirsên Nirxandinê

-  Rewşa civaka kurdî di navbera salên **1900** û **1935**`an de bîne ziman.

-  Di navbera salên hilweşîna Imperatoriya Osmanî û dawiya Cenga Cîhanî ya Yekem de, çima wêjeya kurdî paş de vegeriya?

-  Kovara Rojî Kurd lêkolîn bike û derbarê rola wê di pêşketina serhildana gelê kurd a wêjeyî û ramyarî de, biaxive.

Wane 2

# WÊJEYA KURDÎ PIŞTÎ ŞERÊ CÎHANÎ YÊ YEKEM LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

Piştî ku li Tirkiyeyê hemû cureyên pişaftin, desthilatdarî, qirkirin û komkujiyan li ser gelê kurd hatin sepandin, dawîlêanîna hemû serhildanên ku hatin lidarxistin û qedexeyên li ser zimên û piştî çewisandina Serhildana Şêx Seyîd, kiriyarên dewleta Tirk a dagirker li ser gelê kurd zêde û hişktir bûn. Di vir de gelê kurd û bitaybetî wêjevanên kurd neçar man ku ji deverên xwe derkevin û berê xwe bidin hin welatên din ên mîna: Sûriye û Îraqê. Ji ber ku hin aramî li wan deveran hebû û her wiha ji aliyê du hêzên navdewletî dihatin birêvebirin.

Di sala **1927**`an de Komeleya Xoybûn li Libnanê hate damezrandin.

Di van salan de malbata Bedirxan jî berê xwe da Sûryeyê û Celadet Elî Bedirxan li Sûriyeyê di **15.05.1932**`yan de Kovara Hewarê weşand.

Di vir de, gelê kurd derbasî qonaxeke nû dibe, ku komele û hin partî têne avakirin û dest bi tevgerên çandî, wêjeyî û civakî dikin. Li aliyekî din jî rastî qirkirinên çandî û qedexeya zimanê kurdî tên, bi taybet di dema Mihemed Teleb Hilal de, ku piştî vekolîna wî ya ser herêma Cizîr **(Hesekê)** û kurdên lê dijîn, rêjîma Sûryeyê kiryarên xwe li ser gelê kurd zêde kirin, hin ji daxwazên Mihemed Teleb Hilal jî ev in:

3. Veguhestina kurdan ber bi deverên hindur ên mîna: Şam, Lazqiye, Himis, Hema û hwd.
4. Bikaranîna rêbaza nezaniyê û ne avakirina dibistan û peymangehên zanistî li deverên kurdan.
5. Serjimariyek ji herêmê re çêbibe û tê de xuya bibe, ku hemû kurdên wê deverê nasnamya tirkan bi wan re heye yan jî gelê Tirkiyeyê ne.

d. Veguhestina şêxên kurdan ber bi deverên ereban ve, ji ber ku encumenên wan bi rengekî kurdî ne, ne olî ne.
e. Divê ku şerê navxweyî di nava kurdan de pêk bê, ev di rêya hin êlên ereban re ku navê kurdan xirab bikin û di encamê de şer di navbera wan de, derkeve.
f. Divê ku hemû deriyên kar li pêşiya kurdan bên girtin, heta ku neçar bibin ber bi deverên din ve koçber bibin.
g. Divê ku deverên kurdan wekî deverên leşkerî û şer bêne pejirandin.
h. Divê ku zeviyên xwe neçînin û mafê kirêkirina zeviyên çandiniyê bi dest wan nekeve û ev maf ji ereban re hebe.
i. Kesê ku bi erebî neaxive, divê mafê hilbijartinan bidest nexe.

- Guherîna navên gund û bajarên kurdan bi navên erebî. Mnînak: **Kobanê** bû Eynulereb, **Tirbespiyê** bû Elqehtaniye, **Çilaxa** bû Elcewadiye, **Serê Kaniyê** bû Rasuleyn û hwd.
- Ji bilî navên gund û bajaran, navên hemwelatiyan jî bi navên erebî guhertin û navên kurdî qedexe kirin.

Ji bilî van xalên ku hatine diyarkirin, gelek kiriyarên din ên ku li ser kurdan li Sûriyeyê hatine pêkanîn, hene.

Piştî van kiryaran; tevger û komeleyên kurdî pir dibin û tevgerên xwe jî li dij van kiryaran nîşan didin. Hin ji wan kesên ku piştgiriya van tevger û komeleyan kirine jî ev in: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Malbata Qedrî Paşa, Malbata Bedirxan Beg û hwd.

Hin kovar, tevger û komeleyên kurdî ên ku li Sûriyeyê hatine damezrandin, ev in:

4. Komeleya Civata Xêrê, li Hesekê **1932**.
5. Kovara Hawarê, Şam **1932**.
6. Komeleya Hêvî, li Şamê **1937**.
7. Nadiya Ciwanên Kurd, li Amûdê **1938**.

Nadiya Kurdistan a Çandî û Werzişî, li Şamê **1938**.
Nadiya Ciwanên Kurd, li Efrînê **1939**.
Nadiya Selahedîn, li Şamê **1942**.
Kovara Ronahî, Şam **1942**.

d. Komeleya Azadî û Yekîtiya Kurdistanê, **1946**.
e. Hevgirtina Şagirtên Kurd, Heleb **1946**.

## Lêkolîn

Çi berhemên wêjeyî ji aliyê ciwanên kurd ên ku ji ber qirkirinan derketin derveyî welat, hatine lipêşxistin, Lêkolîn bike.

Wane 3

## CELADET ELÎ BEDIRXAN



Celadet Emîn Elî Bedirxan Begê; li Stenbolê di **26.04.1893**`an de ji dayîk bûye.

Ji bo ku Celadet kurdiya xwe û welatperweriya xwe ji bîr neke, bavê wî mamosteyên taybet ji deverên Kurdistanê dixwestin û zarokên xwe li ser destên wan bixwendin dikirin. li gel xwendinê, ew fêrî kevneşopî û dîroka têkoşîna gelê kurd jî dikirin. Tevî van jî bavê wî hin mamosteyên zimanên biyanî yên mîna: ingilîzî, yûnanî, fransî, farisî û rûsî jî dianîn û wan ew fêrî van zimanan dikirin.

Ji ber ku bavê wî şopînerê dadgerî bû û hem ji ber surguniyê her tim li devaran bû, ji ber vê yekê Celadet li deverên cuda, xwendiye.

Piştî ku ew mezin bû, cihê xwe di nava "Tevgera Tirkên Ciwan" de girt û bi wan re li dij Imperatoriya Osmanî, şer kir. Paşê malbata wî li ser destê Sultan Evdulhemîd surgunî Yemenê bû û di sala **1908**`an de û piştî ketina Sultan Evdulhemîd, ew vegeriya Tirkiyeyê û di Şerê Cîhanê yê Yekem de bi nîşaneya serbaz di eniya Qefqasyayê de şer kir. Piştî biserketina Mistefa Kemal, tirkan hemû heyîn û mafên kurdan ji holê rakirin û zimanê kurdî jî qedexe kirin. Her wiha hemû serok û berpirsên doza kurdî ji holê, dûr xistin (hin hatin surgunkirin, hin jî ketin zindanan û hin jî hatin kuştin). Di sala **1922**`yan de kemalîstan fermana bidarvekirina Emîn Bedirxan û her sê kurên wî; Sûreya, Kamîran û Celadet da. Piştî vê yekê Emîn Bedirxan û kurê xwe Sûreya berê xwe dan Misirê û Celadet û Kamîran jî berê xwe dan Almanyayê.

Celadet li Almanyayê xwendina bilind xwend û dîploma parêzeriyê bi dest xist. Di sala **1925**`an de berê xwe da Misirê û

paşê berê xwe da Libnanê. Di sala **1927**`an de bû Serokê Komeleya Xoybûnê û di sala **1930**`î de berê xwe da Sûriyeyê û li Tirbespiyê bi cihwar bû. Di wê demê de jî Sûriye di bin serweriya Fransayê de bû. Li bajêr ji bo piştgiriya Serhildana Agriyê bike, bi kasyetên welatparêz re diciviya û ew dixwest ku biçe bakur tevlî serhildanê bibe, lê ew hîn negihiştibû ser sînor, serhildan têk çû. Di wê demê de hikûmeta Fransayê li Şamê "niştecihbûna neçar" li ser sepand.

Dema ku nas kir ku nema dikare vegere bakur, berê xwe da çekeke biçûk ku ji klaşînkovê cudatir û bihêztir e, ew çek jî pênûs û belavkirina zanistê bû û dest bi karê rewşenbîriyê kir.

Li Şamê, dest bi karê zimanzanî û afirandina alfebeyeke latînî kir. Jixwe Celadet ji sala **1919**`an ve li vê alfebeyê dixebitî û li Almanyayê li ser etîmolojiya kurdî, xwendibû. Ji bo belavkirina alfebeya nû, hizir, raman û hişmendiyê li seranserî Kurdistanê belav bike, pêwîstî bi kovarekê dît û di sala **1931**`ê de destûra weşandina kovarê ji dewleta Fransayê stand.

Di **15.05.1932**`yan de, Kovara Hewarê weşand û bi **57** hejmaran heta sala **1942**`yan weşana xwe, berdewam kir. Piştî Hewarê, di **1942**`yan de Kovara Ronahî hat weşandin û bi **28** hejmaran weşana xwe, berdewam kir.

Mîr Celadet, di **15.07.1951**`ê li gundê Hêcanê yê nêzî Şamê, jiyana xwe ji dest da û li Goristana Şêx Xalidê Neqişbendî li kêleka Bedirxan Beg, ew spartin axê.

## Berhemên Celadet:

- Alfebeya kurdî
- Rêzimana kurdî
- Ferhenga kurdî
- Rêzimana alfebeya kurdî
- Dîbaca Mewlûda Pêxember a Mele Ehmedê Xasî
- Dîbaca Nivêjên Êzîdiyan
- Sînem Xan (Rêbazên ziman ji bo zarokan)
- Hevind  (Şano)

7. Doza kurdî
8. Hawar
9. Ronahî

## Pirsên Nirxandinê

4. Mîr Celadet Bedirxan ji zimanê kurdî re, çi raje (xizmet) kiriye?

5. Mîr Celadet bi çi awayî alfebeya kurdî saz kir?

6. Kovara Hawarê di dema qedexekirina zimanê kurdî de, hat weşandin, tu çawa dinirxînî?

Wane 4

# KAMÎRAN ELÎ BEDIRXAN



Kamîran Elî Bedirxan, di **08.02.1895**`an de li Stenbolê ji dayîk bû. Xwendina xwe ya seretayî û navîn li dibistanên Stenbolê qedand û di Zanîngeha Sultanî de beşa parêzeriyê xwend. Piştî ku xwendina xwe qedand, Kamîran tevlî beşa leşkerî bû, lê bi vê yekê ew rastî gelek rexneyan ji aliyê Celadet, Emîn Bedirxan û Ekrem Cemal Paşa tê û li aliyê din jî ji bo doza kurdî, Mistefa Kemal Ataturk têkiliyên xwe bi wî re saz dikir.

Piştî hilweşandina Imperatoriya Osmanî û hatina Mistefa Kemal, êdî bû dijminê kurdan ê herî mezin û fermana bidarvekirina malbata Emîn Bedirxan û kurên wî da. Ji ber vê yekê ew jî neçar man ku berê xwe bidin welatên derve yên mîna Misir, Libnan, Almanya, Sûriyeyê û hwd. Li Almanyayê, Kamîran tevlî Zanîngeha Laybizx bû û beşa xwendina asta bilind a parêzeriyê xwend û bawernameya doktoriyê bi dest xist. Heta sala **1967**`an ji ber xebatên wan ên giranbuha, dewleta Tirk hewldanên tunekirinê li ser malbatê didomandin û qedexe bû ku malbata Bedirxaniyan derbasî nava xaka bakur û Tirkiyeyê bibe.

Ji ber vê yekê, Kamîran û birayê xwe Celadet Bedirxan, di sala **1930**`î de derbasî rojavayê Kurdistanê bûn. Li wir, xebatên xwe yên giranbuha domandin û bûn nivîskarê Kovara Hawarê.

Kamîran Bedirxan, di sala **1978**`an de li Parîsê jiyana xwe ji dest da.

## Berhemên wî:

1. Tefsîra Quranê, bi kurdî
2. Waneyên Şerîetê̓
3. Helbestên Kurdî
4. Berfa Ronahiyê
5. Rêzimana Kurdî
6. Elfabaya Min
7. Zimanê Kurdî
8. Parçeyên Bijarte
9. Gramera Kurdî
10. Zimanê Mader
11. Despêka Xwendinê

## Helbesta Gulê

**Ne tîr û ne xencer bû**
**Ne mar û ne ejder bû**
**Bihna gulê ez kuştim**
**Ne şûr û ne şeşder bû**

**Ne kanî ne robar e**
**Dinê êvar û sar e**
**Rûyê gulê ez kuştim**
**Erd evraz e û xwar e**

**Dinê bêdeng û zer bû**
**Û tirba min li der bû**
**Çavên gulê ez kuştim**
**Ne êrîş bû ne şer bû**

**Çiya berf û dûman e**
**Gul û sosin nemane**
**Rengê gulê ez kuştim**
**Yê dimire beran e**

## Pirsên Nirxandinê

1. Tu rola Kamîran Bedirxan di pêşketina wêjeya kurdî de, çawa dibînî?

2. Sedemên koçkirina malbata Bedirxaniyan çi bûn?

3. Di Kovara Hawarê de çi nivîs weşandiye, lêkolîn bike.

## AGAHIYÊN WÊJEYÎ

Helbest, dibe du beş:

1. **Helbesta bikêşe:** Ev cureya helbestê bi rêzbend û kêşesazî ve, tê nivîsandin. Li gorî zagona pêlawazan, tê xwestin ku kîteyên rêzikên helbestê weke hev bin û helbestvanê vê cureyê bi kar tîne, neçar e ku girêdayî van zagonan be.
2. **Helbesta nûjen:** Dibe du cure:

a. **Helbesta azad:** Di vê cureya helbestê de helbestvan rêzbendê li ber çavan digire. Lê bi hejmara kîteyên di rêzikan de ne girêdayî ye.

Li gorî nêrîna helbestvanên ku alîgirên vê cureyê ne, girêdan bi zagonên helbesta kêşesaz namîne, ji ber ku azadiya hizir û derbirînê bend dike. Ji ber vê yekê, ev rêbaz ji xwe re rewa dîtin û pê nivîsandin.

### Mînaka helbesta azad: Delal

**Gava em ne çak û durust bin, Teqez**
**ew ji pîsî û neqenciya me ye,**
**Em çawa dikarin bêjin "Sûcê felek û kolîdar tê heye?"**
**Ma heya çi gavê em dê ji sûc û gunehên xwe birevin?**
**Riya rast berdin, bikevin xaçerêyen, deverû bikevin.**
**Riya rast şemirandin ne karê camêran e; teqez qelsî ye,**
**Ji gunehên xwe revîn karê namerdan e, bes pîsî**
**ye. Ji bo çi holê em pîsiyê di xwe datînin?**
**Neyar û nemerdan dilgeş dikin, bi xwe dikenînin. Ev**
**yek bûye nexweşiyek malkambax ketiye canê me.**
**Nizanim ev çi bextreşî ye ku zanayên me pê ketiye**

**Osman Sebrî**

b. **Helbesta pexşan:** Helbestvanê ku vê cureya helbestê dinivîse, bi kîteyan û rêzbendê ve, ne girêdayî ye. Ew hizir û derbirînên xwe, bi hevok û rêzikên serbest dinivîse. Ev cureya helbestê, bi teşeya xwe ve manendî pexşana asayî ye. Lê cudabûna wê, ew bi asoyên aşopiya xwe ve hevok û rêzikên xwe bi wêne, sembol û wateyên xazeyî ve di asta bilind de, dixemilîne û xwe dispêre muzîka peyvê ya hundir. Her wiha bikaranîn û derbirîna ramanê, ne bi awayekî yekser e. Lê belê wê di nava mijekê de dihêle û ravekirina wê dike erkek li ser milên xwendevanan.

## Mînaka helbesta pexşan

**Di bin baranê de**
**Helbest dibe çetr**
**Di bin germa rojê**
**de Helbest dibe**
**sîber Di sermayê de**
**Helbest dibe agir û li şeva tarî de dibe çiraya riya te**
**Çi dema çetr, sîber, agir û çiraya min li cem te**
**nebûn Wê yekê bizane**
**Êdî helbest çûye ava û ez jî mirime**

**Şêrko Bêkes**

Wane 5

# CEGERXWÎN



Şêxmûs Hesen, bi navê xwe yê hunerî Cegerxwîn tê nasîn. Di wê dema ku gelê kurd di bin desthilatdariya axa, beg, muxtar, şêx û meleyan de bû, çavê kurdan li azdiyê vekir û her tim banga wî yekîtî bû. Ew, pira ku wêjeya kurdî derbasî qonaxa nû kiriye û bi zimanê şoreşê axiviye.

Cegerxwîn, di sala **1903**`yan li gundê Hesarê yê girêdayî Kercosa Mêrdînê, ji dayîk bûye. Navê bavê wî, Hesen kurê Mihemed e û navê dayîka wî, Eyşê ye.

Di zarokatiya xwe de şivanî û gavanî kiriye. Ew hîn biçûk bû, dema bavê wî jiyana xwe ji dest da, sêwî ma û li cem xwişka xwe Asya xwedî bû. Piştre berê xwe da xwendinê û ket rêza feqeyan. Li cem Mele Ubeyd, fêrî zanista olî bû û destûrnameya xwe ya olî û zanistî stand. Li gelek deverên Kurdistanê geriyaye, êş û belengaziya kurdan bi çavên xwe dîtiye, bûye mereqdar û dilbêşê gelê xwe. Piştî ku rewşa gelê xwe dît, bandoreke mezin lê bû û bi hêz û baweriyeke mezin derbasî qada wêjeyê bû.

Ji bo ku gelê xwe şiyar bike, helbest nivîsandin û bi rêya helbestê ramanên xwe anîn ziman. Naveroka nivîsên wî li ser welatparêzî, evînî û pirsgirêkên civakî bûn. Cegerxwîn, ji bîrewerî û pêşvebirina civaka kurd re, dibistaneke perwerdehiyê bû. Ew, bi hizir û hestên xwe yên welatparêzî û demokratîk, di dema xwe de şoreşeke bêhempa bû.

Cegerxwîn, di sala **1984**`an de li Stokholmê (paytexta Siwêdê) jiyana xwe ji dest daye. Û li gorî xwesteka wî, ew di hewşa xaniyê wî yê li bajarê Qamişloyê de, spartine axê.

## Berhemên wî:

**Dîwan:**

1. Prîsk û Pêtî, **1945** Şam
2. Sewra Azadî, **1954** Şam
3. Kîme Ez? **1973** Beyrût
4. Ronak, Weşanên Roja Nû, **1980** Stockholm
5. Zend-Avista, Weşanên Roja Nû, **1981** Stockholm
6. Şefaq, Weşanên Roja Nû **1982** Stockholm
7. Hêvî, Weşanên Roja Nû **1983** Stockholm
8. Aşitî, Weşanxana Kurdistan, **1985** Stockholm

**Çîrok û Pexşan:**

1. Salar û Mîdya
2. Şerefnameya Mewzûn
3. Reşoyê Darî
4. Jînameya wî
5. Folklora kurdî, **1988** Siwêd

**Ziman û Ferheng:**

1. Destûra Zimanê Kurdî, **1961 -** Bexda
2. Ferheng, parçeyê yekem, **1962 -** Bexda
3. Ferheng, parçeyê duyem, **1962** – Bexda
4. Rêzimana Kurdî

**Dîrok:**

1. Dîroka Kurdistanê, du beş.

## Helbesta Silav li sifra hazira

Di vê helbestê de diyar dike ku ew dixwaze berê gelê kurd bide xwendin, zanebûn û xwe ji bindestiya mejiyê kevn ên şêx, mele, beg û axayan rizgar bike û hizrê nûjeniyê pêş bixe, ji ber vê jî wiha dibêje û rexne dike:

**Ey sûxtiyê bê nav û deng**
**Dijmin li ser balafir e**
**Pir leşker û top û tifeng**
**Seyda ew e, ew mahir e**
**Sed sal in ev Zeyd û Emir**
**Ceng e digel rîşa melê Mertal**
**di dest wan de bihuşt**
**Gurzê di dest wan agir e**
**Şêxê ko tac û teylesan**
**Wergirtiye rengê Xidir**
**Rûniştiye l' Birca Belek**
**Şahê Ecem Şah Nadir e**
**Ew sofiyê dîl û reben**
**Serqot û xwas û tazî ye**
**Digrî bi hewar û fîxan**
**Şêxê me Evdilqadir e**
**Carek li şêx ew nanerî**
**Da zanibî rast û derew**
**Kincê li şêx şal û qumaş**
**Kincê li sofî çadir e**
**Axa bi deh gundê xwe ve**
**Bawer dike Keyxusrew e**
**Talanker û diz û keleş**
**Wî daye ser rêça gur e**
**Halê me Kurmanca ev e**
**Em dê çilo serbest bijîn**
**Her çî ko çûye guh medê**
**Silav li sifra hazir e**

**Seydayê rast û ronî ye**
**Lewra Cegerxwîn namdar**
**Zana dizanin ew kî ye**
**Ên ker dibêjin kafir e**

## Pirsên Nirxandinê

1. Cudahiya di navbera klasîk û nûjeniyê de çi ye? diyar bike.

2. Axe û meleyeyan çi raje ji gel re pêşkêş kirin û çima Cegerxwîn li dijî wan serî hilda?

3. "Silav li sifira hazira" di nav civaka kurd de çima tê bikaranîn?

Wane 6

# OSMAN SEBRÎ



Osman Sebrî, di sala **1905**`an de li gundê Narincî yê girêdayî Kolika (Kehta) Semsûrê ji dayîk bûye. Bavê wî, serokê eşîra mêrdîsan e. Piştî ku di sala **1915**`an de bavê wî jiyana xwe ji dest da, ew çû cem apê xwe Şikrî. Osman Sebrî, xwendina xwe ya seretayî di **1922**`yan de bi dawî kiriye.

Di sala **1925**`an de dema ku serhildana Şêx Seîd derket holê û ji ber ku malbata wî welatparêz û xwedî giyaneke şoreşgerî bû, bi serhildanê pir bandor bû. Her du apên wî Şikrî û Nûrî, di belgeya serhildanê de hatine darizandin û ji aliyê dadgeha Amedê ve hatine darvekirin. Osman Sebrî jî, bi gunehekî mezin ve hat gunehbarkirin û şandin zindana Denizliyê.

Osman Sebrî, weke kesên din ên kurd, ji ber ku têkoşîna xwe bi awayê ramanî dianî ziman, pir caran rastî êrîşên dewletê dihat û bi tevahî **12** salan hatiye girtin. Osman Sebrî, di sala **1929**`an de derbasî rojavayê Kurdistanê bû. Piştî ev êş, jan, azarî û pişaftinên dewletê dîtin, bû yek ji serkêşên tevgera ramyarî. Di sala **1957**`an de Partî Demokratî Kurd li Sûriyeyê damezirand û demekê serokatiya wê kir. Li gel têkoşîna ramyarî ket nava hewldanên ku li ser êş û derdên gelê kurd binivîse. Ji ber vê yekê, ji aliyê desthilatdaran ve **18** caran hat girtin.

Gelek berhemên giranbuha afirandin, rêziman, çîrok, gotarên dîrokî, helbest, dîwan, serpêhatî û hwd, nivîsandine. Ji ber vê yekê, wî jêhatî û şarezayiya xwe, zêdetir di qada nivîsandina helbestan de, nîşan daye. Wî ramanên xwe yên ramyarî û şoreşgerî, di rêya helbestê re, anîne ziman.

Osman Sebrî, di sala **1993**`yan de li Şamê jiyana xwe ji dest daye. Ew, li gundê Berkevirê (Goristana Şehîdan) yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê, li rojavayê Kurdistanê, spartine axê.

## Berhemên wî:

1. Alfabeya kurdî ya latînî, **1954**.
2. Bahoz, Şam **1956**.
3. Derdên Min (Gotar û Çîrok), Şam, **1956**.
4. Gotinên xav napijin bê tav, helbest, Almanya, helbestên vê dîwanê M. Hemreş Reşo ji kovarên Hawar û Ronahiyê dane hev û tevlî pêşgotina xwe û pêşgotina Dr. Nûredîn Zaza çap kirine, **1981**.
5. Elîfbêya Tekûz, Şam, **1982**.
6. Çar Leheng, Şam, **1984**.
7. Berseva Hoşeng, Şam, **1992**.
8. Bîranînên Osman Sebrî, **2003**.

## Helbesta Zozan

**Zozanê me bilind in**
**Tev bi zevî û gund in**
**Di wan hene avên sar**
**Ji êk nabin ber û dar**
**Raxerên wan gulçîçek**
**Teyr û tû têd lek bi lek**
**Havînan em diçin wan**
**Tevî koç û pez û gan**
**Derbas dikin rojên germ**
**Li ser wê nefela nerm**
**Dilîzin her direvin**
**Heyanî koç dakevin**
**Dema çiya dibin sar**
**Payîz dibe em tên xwar**

## Pirsên Nirxandinê

1. Osman Sebrî derbarê wêje û zimanê kurdî de, çi pêşketin pêşkêş kiriye? Diyar bike.

2. Derbarê zimanê kurdî de, çi têkilî di navbera Osman Sebrî û wêjevanên din de hebû?

3. Di helbesta jor de, mijara ku helbestê girtiye dest çi ye, û li ser çi hatiye nivîsandin? Şîrove bike.

Wane 7

# QEDRÎCAN



Navê Qedrîcan ê rast, Ebdilqadir Ezîz Can e. Navê dayîka wî, Eyşê ye. Ji xelkên Dêrika Çiyayê Mazî ya girêdayî bajarê Mêrdînê ye. Lê bi xwe, tenê ji xwe re gotiye Qedrîcan. Di sala **1911**`an de li Dêrika Çiyayê Mazî ji dayîk bûye. Zarokatiya xwe li wir derbas kiriye. Xwendina dibistana seretayî li Mêrdînê qedandiye. Dibistana navîn, li gel Reşîdê Kurd li Amedê xwendiye. Piştî wê, derbasî bajarê Konyayê bûye û li wir dest bi xwendina dibistana mamostetiyê kiriye. Çend salan ev xwendin domandiye û havînan vedigeriya welat. Bi hêsanî cudahiya di navbera bajarên kurdan û Anatolyayê de û qedexeya li ser zimanê kurdî, dîtiye.

Piştî têkçûna Serhildana Şêx Seyîd, dewleta Tirkiyeyê rewşenbîrên kurd û malbatên welatparêz, dişopand. Qedrîcan jî, ji vê rewşê bê par nema. Ev rewş, bû sedem ku di sala **1927-1928**`an de nikaribe bixwîne û destûrnameyê jî bistine. Piştî demekê, bi hin hevalên xwe yên weke Reşîdê Kurd re derbasî Amûdê ya rojavayê Kurdistanê bûye. Ku Amûdê di wê demê de, di bin destê Fransayê de bû.

Qedrîcan, di hejmara pêşî ya Kovara Hawarê de nivîsandiye.

Qedrîcan, gelek xebatên giranbuha li pey xwe hiştin û gelek xebat li benda wî bûn. Lê mixabin di **61** saliya xwe de, sala **1972**`yan jiyana xwe ji dest da, û li Şamê ew spartin axê.

**Li ser gora wêjevanê Kurd ê hêja, wiha hatiye nivîsîn:**

Camêrê di vê gorê de
Zor nazik û ciwan e Ji
Dêrika çiyayê Mazî
Navê wî Qedrîcan e

Hezar xwezî l'gora wî
Hozanekî kurd e
Welatparêzekî qenc bî
Ruhstîn jê girt can e

Gorê xiste zikê xwe
Ew jî kire qurban e
Ji pişta me kurdan çû
Ev zanayê ziman e

## Helbesta Qedrîcan

**-1-**

Ax welato ax welato
Roja me zû lêhato
Bav û birên me çawan
in Çima xeber jê nehato

**-2-**

Îşev min dît xewnek bi tirs
Tu keremke ji min bipirs
Ez carekê dest pê bikim Da
tu bibîn çi qas bihêrs

**-3-**

Bayekê reş hate ji jor
Li ser min kire borebor
Bigirîn da kaxezek sor
Di nav hebûn du tayên por

**-4-**

Ez çûme cem pîrek zeman
Min got falkê vekî eman
Min daye der ev ruh û can
Derdê min re bibî derman

**-5-**

Pîrê bo min rabû ser xwe
Piyana avê da ber xwe Li
avê xwend, li min nêrî
Dîsa serê xwe da ber xwe

**-6-**

Kaxez bixwîna biran bû
Her du ta porên xwihan bû
Mana wan kûr û giran bû
Ji fala pîrê nihan bû

**-7-**
Birayên me têne kuştin
Bixwînên xwe têne şûştin
Xwihan porê xwe şiyandin
Yanî çima hûn rûniştin

**-8-**
Îro laşê min pir dêşe
Qenc dizanim ji çi dêşe
Lê çi bikim derman nîne
Talî tune bextê reş e

**-9-**
Dermanê ku ez kifş dikim
Bi hêvîna xwe geş dikim
Ji dilbirînên wek xwe re
Pelên hewarê reş dikim

**-10-**
Qedrî bibêje û binale
Şînê girê de, bikale
Namûs nema rûmet nema
Ev çi derd û ev çi hal e

## Pirsên Nirxandinê

1. Rola Qedrîcan di kovara Hawarê de çi bû, û çi di kovarê de dinivîsand?

2. Qedrîcan bi çi rêbazî helbest nivîsandine? Şîrove bike.

3. Di malika **7**`an de wiha dibêje:
   **"Xwihan porê xwe şiyandin**
   **Yanî çima hûn rûniştin"**
   Di nava kurdan de tê çi wateyê? Şîrove bike

Wane 8

## SEYDAYÊ TÎRÊJ



Tîrêj; navê wî yê rast Nayifê kurê Heso ye, di sala **1923**`yan de li gundê Nicim yê girêdayî bajarê Qamişlo ji dayîk bûye. Dema ku dibe 6 salî bavê wî ji gundê xwe koç dike û berê xwe dide gundê Sêmitik ê girêdayî navçeya Amûdê. Li wê derê li ber destê Mele Ibrahîmê Golî; Quran û çend pirtûkên olî dixwîne. Wekî hemû wêjevanên kurd, wî jî di dibistanên olî de dest bi xwendin û nivîsandinê kiriye.

Di sala **1937**`an de berê xwe dide bajarê Amûdê û li bajar dest bi xwendina dibistanê dike û 5 salan lê dixwîne. Lê ji ber mercên aborî xwendina xwe berdewam nekiriye, li wê derê têkiliyên wî bi helbestvanên mezin; Cegerxwîn, Qedrîcan, Hesen Hişyar û Nûredîn Zaza re, xurt bûne û bi wan bandor bûye û evîna helbestnivîsandinê di dilê wî de şax daye. Bi wan re, xebata niştimanperwerî kiriye û di Xoybûnê de cihê xwe girtiye.

Di sala **1952**`yan bi destê hêzên desthilatdar hatiye girtin û dîwaneke helbestên wî ya hîn nehatiye belavkirin û çapkirin, bi destên wan hat talankirin. Di sala **1973**`yan de berê xwe dide parêzgeha Hesekê û li wir niştecih dibe. Cegerxwîn jî di dîwana xwe ya bi navê "Kîme Ez?" de helbestek li ser wî nivîsandiye û wiha gotiye:

**"Ev xwendin û zanebûn**
**Nêzîk dikin serxwebûn**
**Xortên wek te pir zana**
**Gerek bêjin: Nezana**
**Bere destên hev bigrin**
**Di vê rê de em bimirin"**

Wêjevanekî giranbuha û stêrkeke geş e. Di asimanê huner û wêjeya kurdî de diteyîse û her dem ronîdar e. Di kûrahiya deryaya çand û helbestên klasîka kurdî de melevanekî bêhempa ye. Gelek berhemên binirx nivîsandine û bûye şopdarê azadîxwaziya gelê xwe. Hemdemê Cegerxwîn, Osman Sebrî û
Reşîdê Kurd e. Helbestên wî, piranî girêdayî welatparêziyê ne.

Seydayê Tîrêj, di **23.03.2002**`yan de jiyana xwe ji dest daye. Berhemên wî: sê dîwanên helbestan (Zozan, Xelat, Cûdî ) û çend çîrokên wêjeyî, nivîsandine.

## Helbesta Ey Welat

**Ey welat ez canfidayê deşt û zozanê te me**
**Canfidayê av û dehl û bax û bostanê te me**

**Sond û peyman bî li ser min dê te parêz kim**
**welat Xwîna narincî birêjim merdê pê canê te me**

**Dest li ser darê tiving im çok ji erdê nabirim**
**Pasîban û leşkerê armanc û nîşanê te me**

**Can bisojim dibe pêt û agirê cenga welat**
**Agirê Zerdeşt e ez bi xwe perwanê te me**

**Bostekî ez ji te nadim bi welatê Hind û Çîn**
**Tu bihişta îrem î ez sûr û gerdana te me**

**Dê bibirim ez bi şûr û xincaran destê çepel**
**Roja cengê tu dizanî xort û kurdanê te me**


**Dê ji qada te bi der kim ez neyar û dijminan**
**Hem binyat û esasê birc û eywanê te me**

**Di bin hêz û hinara xwe ez te parêz kim welat**
**Ala rengîn jor ve hildim her li ser banê te me**

## Lêkolîn

Jiyana wêjevanê Kurd "Nûrî Dêrsimî" lêkolîn bike û hewl bide ku tu helbesteke wî binivîse û berhemên wî jî diyar bike?

# MÛSA ENTER



(Ez şahidê zindî û sûndxwarî yê tengasiyên Tirkiyê yê **55** salan im. Gelo ez tenê şahid im? Na! Her wiha, ez mehkûm, bersûc û dozdarê Tirkiyê me.)

**Gotina Mûsa Enter**

Mûsa Enter, di sala **1920**`an de li gundê Zivinga Stilîlê yê navçeya Nisêbînê ya girêdayî Mêrdînê ji dayîk bûye. Wî hîn di temenekî biçûk de bavê xwe winda kir û li ber destên dayîka xwe ku muxtara gund bû, mezin bû. Apê Mûsa, dibistana seretayî li Mêrdînê û ya navîn û amadeyî jî li Edeneyê qedandiye.

Piştî xwendina amadeyî, ji bo xwendina felsefeyê, diçe Stenbolê û li zanîngehê gelek xwendekarên kurd nas dike. Mûsa Enter, li ser daxwaza Fayiq Bucak, dest ji felsefeyê berdide û xwe di beşa hiqûqê de tomar dike. Di wê demê de xwendekar û rewşenbîrên kurd, ji bo pirsgirêka netewî dikevin nava liv û tevgerê. Her wiha, Apê Mûsa ji bo ku ciwanên kurd li dora xwe kom bike; hem ji aliyê daringî, hem jî ji aliyê rewanî û ramyarî ve xwedî li wan derkeve, Mala Dicle vekiriye. Piştî salekê jî, li gel hin hevalên xwe Komeleya Hêvî ava kir û bi pêşinyara van kesan, Komeleya Xwendekaran hat damezirandin.

Di sala **1944**`an de bi keça Evdirehman Zapsu, Haleyê re hevjîn dibe. Mûsa Enter, di sala **1948**`an de Mala Firatê vedike û dest bi deranîna rojnameya Çavkaniya Dicleyê dike. Piştî çend salên dirêj, li Amedê bi navê **"Îlerî Yurd"** ango **"Welatê Pêşketî",** dest bi deranîna rojnameyeke din dike û ew ji ber nivîsên xwe, tê girtin.

Di sala **1959**`an de ji ber doza **1949**`an careke din tê girtin û tevlî **49** hevalên xwe, **6** mehan di girtîgehê de dimînin. Mûsa Enter, pirtûka xwe ya bi navê **"Birîna Reş"** di zîndanê de nivîsand. Her wiha, **Ferhenga Kurdî** ya ji **6** hezar peyvan pêk hatiye, amade kir.

Di destpêka salên **1960**`î di nava Partiya karkerên Tirk de bi awayekî fermî dikeve nava ramyariyê. Mûsa Enter, piştî sala **1971**`ê careke din vedigere Kurdistanê û li Amedê ji aliyê hêzên dewletê ve tê girtin û **4** salan di girtîgehê de dimîne.

Ronakbîrê kurd Mûsa Enter, di sala **1976**`an de piştî berdana wî ya ji zîndanê, vedigere gundê Zivingê û li wir jiyana xwe domand û heta **1989**`an li wir dimîne.

Piştî **1989**`an vedigere Stenbolê û di gelek kovar û rojnameyan de ji nû ve dest bi nivîsandinê dike. Di heman demê de, di nava Partiya Keda Gel de ji nû ve dikeve nava ramyariyê. Her wiha, Apê Mûsa di gelek rojname û kovarên weke; Welat, Ülke, Ozgur Gundem û Ozgur Ulke de nivîsên xwe diweşandin. Nivîsên wî, ji aliyê xwendevanan ve bi balkêşî dihatin xwendin.

Roja **20.09.1992**`yan, li Kolana Seyrantepe ya Amedê, dijminan di kesayeta wî de çapemenî û ramana azad, kirin armanc û bi êrîşeke bêbextiyane Mûsa Enter tevlî karwanê şehîdên çapemeniyê bû.

## Xelatên Rojnamegeriyê:

Li Tirkiyê, ji **1993**`yan ve Xelatên Rojnamegeriyê yên Mûsa Enter û Şehîdên Çapemeniyê, tên dayîn.

## Berhemên wî:

1. Birîna Reş, **1959**
2. Ferhenga kurdî - Stenbul, **1967**
3. Hatiralarim, beş 1 - Stenbul, **1991**
4. Hatiralarim, beş 2 - Stenbul, **1992**
5. Çinara Min, Istanbul, Weşanên Avesta

Wêjevanê me yê hêja Mûsa Enter, ji berhemên hûnandî zêdetir, piranî berhemên xwe bi awayê pexşan nivîsandine.

## Pirsên Nirxandinê

1. Çima Mûsa Enter ji aliyê Tirkan ve hat kuştin, armanc jê çi bû?

2. Berhema herî balkêş a ku Mûsa Enter wê nivîsandiye çi ye, û ji bilî nivîsandinê çi kar kiriye?

3. Tu pirtûka "Birîna Reş" çawa dibînî û rewşa wêjeya kurdî di wê demê de çawa dinirxînî?

# BEŞA ÇAREM

## Wêjevanên Cîhanî

1. **Franz Kafka (Franz Kafka)**
2. **Necîb Mehfûz**

Wane 1

# FRANZ KAFKA



Franz Kafka; wêjevan, romanivîs û nivîskarekî Çîkî ye; di reseniya xwe de li ser baweriya cihûyan e. Wekî navdarê romana kabûsî tê naskirin. Berhemên xwe bi zimanê almanî dinivîsandin. Di **03.07.1883**`yan de li Bragê ya girêdayî Almanyayê ji dayîk bûye, di malbateke ji çîna navîn de xwedî bûye. Navê bavê wî; Hêrman e û navê dayîka wî; Yûlî ye.

Li ber destê mamosteyeke/î taybet fêrî zimanê ibrî bûye. Di sala **1901**`ê de li Bragê di Zanîngeha Almanî de beşên zagon, kîmya û wêje xwendine. Di dema jiyana xwe de hin berhemên xwe belav kirin, lê beşa pir ji wan piştî mirina wî hatine weşandin. Di wê demê de tevlî komeleyekê bi navê "Hola Semîner û Xwendina Xwendekarên Alman" bûye û di vê komeleyê de çalakiyên wêjeyî û heunerî pêk dihatin.

Di dema ber bidawîbûna sala xwendinê, Frans Kafka hevalekî xwe yê din bi navê "Maks Brod" nas kir û bi demê re bû hevalê wî yê herî nêzîk.

Di sala **1924**`an de û di bin bandora giranbûna nexweşiya "Êşziraviyê" Kafka ji Berlînê vedigere Bragê û li ber destê Dr. Hovman tê dermankirin.

Di **03.06.1924**`an de, di temenê **40** sal û **11** mehan de jiyana xwe ji dest dide. Sedema mirina wî jî, giraniya nexweşiya wî bû, ji ber ku di zengelorê de bû û nema dikarîbû xwarinê bixwe.

Li ser mirina Franz Kafka nêrîneke din jî heye û wiha tê gotin:**"Ji ber ku ew her tim di tenêtiyê de dihizirî û ji ber êş û azarên nexweşiyê, nexweşiyeke derûnî bi wî re çêdibe û**

**dibe sedema ku her tim di xwekujiyê de bihizire. Demekê diçe bi tena serê xwe dimîne û di dawiyê de berhemên xwe yên nehatine weşandin kom dike; agir bi wan dixe û xwe dikuje. Di wê demê de hevalê wî Maks Brod digihêje ser û dibîne ku hin berhem hîn agir negihaştiye wan û neşewitîne, ew wan kom dike û çap dike".**

## Hin berhemên wî:

1. Nameyên ji Mêlêna re
2. Nameyên ji bavê min re
3. Bijîşkê gundî
4. Keleh
5. Emerîka
6. Guhertin
7. Doz

## Hin gotinên wî:

1. Armancek heye; lê belê awa tune ye!
2. Pirsa ku bersiva wê ne bi wê re be, nehêjayî bersivdayînê ye.
3. Ta ku her gotinek derfetê dide ez wê binivîsim, li derdora xwe bi hemû aliyan ve dinêre û paşê derfeta nivîsandinê dide.
4. Cîhana di serê min de, ji cîhana ku serê min tê de ye mezintir e.
5. Tişta ji girî zehmetir ew e, ku tu nikaribî wî rawestîne!


## Pirsên Nirxandinê

1. Romana "Nameyên ji Mêlêna re" ya herî navdar e, gelo Mêlêna kî ye û çima ew qas name ji wê re dişandin?

2. Kafka, çi bandor li cîhanê kir û cudahiya hizra wî ji ya wêjevanên din, çi ye?

Wane 2

# NECÎB MEHFÛZ



Necîb Mehfûz di sala **1911**`an de li Qahîraya paytexta Misrê ji dayîk bûye. Navê bavê wî Evdulezîz Ibrahîm e. Necîb Mehfûz romanivîs û çîroknivîsekî Misrî ye. Ew yekemîn kesê misrî yê ku Nobel bi dest xistiye. Ji destpêka salên **40**`î ve dest bi nivîsandinê kiriye û hemû bûyerên romanên wî di Misirê de pêk hatine.

Dema ku şoreşa **1919**`an li dar ket, temenê wî **7** sal bûn û vê yekê bandor lê kir. Tevlî Zanîngeha Qahîrayê bû û di sala 1930`î de bawernameya macistêr di felsefeyê de bi dest xist. Dema ku dest bi nivîsandinê kir, kurteçîrokên xwe di Kovara "Name" de belav dikir. Di sala **1939**`an de romana xwe ya yekem a bi navê "Tevlîheviya Çarenûsan" a ku hizrê rasteqîna dîrokî şîrove dike, belav kir. Paşê "Berxwedana Tîba û Radobîs" belav kir.

Di sala **1945**`an de dest bi nivîsandina rêbaza rasteqînî kir û bi taybet di romana "Qahîraya nû" û "Leylan" de hewl daye ku bi rêbaza rasteqîna derûnî binivîse. Paşê di romana "Destpêk û dûmahîk" ê de li rêbaza rasteqîna civakî vegeriyaye. Di romana xwe ya bi navê "Zarokên taxa me" de berê xwe daye rêbaza sembolîzmê. Di romana "Şevên hezar şevî" de berê xwe daye rêbaza fantazyayê.

Di jiyana xwe de bi berhemên Franz Kafka, Selame Mûsa, Cêms Coys (James Joyce) û Marsêl Prost (Marcel Proust) ve bandor bûye.

Romana wî ya herî navdar a ku saziyên olî yên Misrê wê nepejirandin û wekî pirtûka xwedanenasiyê dane nasîn, nehiştin ku li Misrê çap bibe, romana "Zarokên taxa me" bû. Lê tevlî vê jî bi rêya qaçax çend çap ji wê derbasî Misrê bûn û piraniya

pirtûkan li Libnanê hatin çapkirin, li aliyê din jî hewldanên kuştina wî hatine kirin.

Necîb Mehfûz di **29.08.2006**`an de di **95** saliya xwe de li nexweşxaneyê ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest daye.

## Hin berhemên wî:

1. Zarokên taxa me
2. Radobîs
3. Leylan
4. Dilê şevê
5. Serdema hezkirinê
6. Destana belengazan

Ji bilî van romanên hatine diyarkirin gelek romanên din û kurteçîrok jî nivîsandine.

## Hin gotinên wî:

1. Ew kêliya ku tu tê de şaş bibî, dê her kes jibîr bike ku tu çiqasî serkeftî bû.
2. Ku te tu sûd ji binkeftina yekem negirt, wê demê tu hêjayî binkeftineke din e.

## Lêkolîn

Agasa Krîstî (Agatha Christie) lêkolîn bike, rêbaza nivîsandina romanên wê çi ye û piraniya mijarên xwe li ser çi nivîsandine?

| Belavkirina Waneyan li ser Sala Xwendinê | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
| Rezber | | | Rewşa wêjeya kurdî di sedsala 18 û 19`an de | Hecî Qadirê Koyî |
| Cotmeh | Pêşketina wêjeya kurdî di sedsala 19`an de | Mestûre Erdelan-Kurdistanî | Şêx Riza Talabanî | Pîremêrd-Tewfîq Silêmanî |
| Mijdar | Şano | Dibistana Naturalîzm , Wefayî | Dîroka wêjeya kurdî li Yekîtiya Sovyetê | Wêjeya kurdî ya nûjen li Yekîtiya Sovyetê |
| Berfanbar | Erebê Şemo | Roman | Qenatê Kurdo | Casimê Celîl |
| Rêbendan | Ordîxanê Celîl | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Celîlê Celîl | Emînê Evdal | Rewşa Kurdan piştî hilweşandina imperatoriya Rûsî û Osmanî | Wêjeya Kurdî piştî şerê Cîhanî yê Yekem li Rojavayê Kurdistanê |
| Avdar | Celadet Elî Bedirxan | Kamîran Elî Bedirxan | Cegerxwîn | Osman Sebrî |
| Cotan | Qedrî Can | Seydayê Tîrêj | Mûsa Enter | Franz Kafka |
| Gulan | Necîb Mehfûz | Lêveger | | |